# MIZGÎNÎ

## PEYMANA NÛ
## (ÎNCÎL)

Înstîtûta Welger'andina K'itêba Pîroz
Moskva
2011

# MIZGÎNÎ
# PEYMANA NÛ
# (ÎNGÎL)

**bi Standarta Kurmancîya K’urdêd welatêd Kafkazê**

Heger pirs yan pêşnîyarêd we hebin, ji k'erema xwe bi vê navnîşê bişînin:
ibt_inform@ibt.org.ru

H’unurmendê şikilêd bi desta çêkirî Horace Knowles e,
Xudanê neşirkirinê
© The British & Foreign Bible Society e
(K’omela K’itêba Pîroze Înglîstanê û Welatder), 1954, 1967, 1972

Serr’astkir û zêdekira van şikila jî Louise Bass e,
xudanê neşirkirinê © The British & Foreign Bible Society e, 1994

© Институт перевода Библии, 2000, 2011
ISBN 978-93943-172-9

# SERECEM

Pêşgotina Înstîtûtê . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .5
Pêşgotina bona Peymana Nû . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .8
Bona alîkirina xwendevana . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .9

MIZGÎNÎYA LI GORA METTA . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .11
MIZGÎNÎYA LI GORA MARQOS . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .79
MIZGÎNÎYA LI GORA LÛQA . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .122
MIZGÎNÎYA LI GORA YÛH'ENNA . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .190
K'ARÊD ŞANDÎYA . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .242
NE'MA PAWLOS R'OMAYÎYAR'A . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .308
NE'MA PAWLOSE PÊŞIN KORINT'ÎYAR'A . . . . . . . . . . . . . . . .339
NE'MA PAWLOSE DUDA KORINT'ÎYAR'A . . . . . . . . . . . . . . . .368
NE'MA PAWLOS GALATÎYAR'A . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .387
NE'MA PAWLOS EFESÎYAR'A . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .398
NE'MA PAWLOS FÎLÎPÎYAR'A . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .409
NE'MA PAWLOS KOLOSÎYAR'A . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 417
NE'MA PAWLOSE PÊŞIN T'ÊSALONÎKÎYAR'A . . . . . . . . . . . . .425
NE'MA PAWLOSE DUDA T'ÊSALONÎKÎYAR'A . . . . . . . . . . . . .432
NE'MA PAWLOSE PÊŞIN TÎMOT'ÊYOR'A . . . . . . . . . . . . . . . . .436
NE'MA PAWLOSE DUDA TÎMOT'ÊYOR'A . . . . . . . . . . . . . . . . .445
NE'MA PAWLOS TÎTOR'A . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 451
NE'MA PAWLOS FILÎMONR'A . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 455
NE'MA ÎBRANÎYAR'A . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .458
NE'MA AQÛB . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .482
NE'MA PETRÛSE PÊŞIN . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .490
NE'MA PETRÛSE DUDA . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .499
NE'MA YÛH'ENNAYE PÊŞIN . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .505
NE'MA YÛH'ENNAYE DUDA . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 514
NE'MA YÛH'ENNAYE SISÎYA . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 516
NE'MA CIHÛDA . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 518
E'YANTÎYA YÛH'ENNA . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 521

Ferhengok . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 557
Nav-nîşanêd xeberêd k'ilîte sereke . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 600
Navnîşêd çapa û p'era . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 607
Meselêd îsa mesîh . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 609
K'eremetêd îsa mesîh . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 611
Navêd k'itêbêd peymana kevin û peymana nû . . . . . . . . . . . . . . . . . . 614
Xerîte . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 617

# Pêşgotina Înstîtûtê

Înstîtûta Welger'andina K'itêba Pîroz r'azîbûna xwe dide wan welger' û serr'astkirêd vê K'itêba Pîroz, usa jî ewêd mayîne ku li gora karîna xwe alîk'arî dane bona hazirkirina vê k'itêba Mizgînîya Îsa Mesîh, awa gotî Peymana Nû bi zimanê k'urdîya zaravê kurmancî. Em pir' şa ne, ku çend nivîsk'arêd k'urde ji çend welata jî xwe li welger'andina (t'ercime-kirina) Peymana Nû girtine. Ev jî vî h'alê giranda gaveke pêşdaçûyîna zimanê milet e, usa jî xweykirina zimên e. Em bi dilekî şa vê K'itêba Pîroz, Peymana Nû p'êşk'êşî xwendevanêd hêja dikin.

Ew welger'andina destê weda ji ber wê Mizgînîyê hatîye girtinê, ya ku alîyê Înstîtûtêda sala 2000-î hatîye neşirkirinê, niha t'enê bi sivika-yî hatîye lênihêr'andin û ser'astkirinê. Pêştirî wê yekê jî, şirovekirin û ferhengok jî hatine zêdekirinê. Înstîtût r'azîbûna xwe dide wan jî, yêd ku pêşnîyarî û k'omeka serr'astkirinê dane.

### Standarta k'urdîye kirîlî bi h'erfêd latînî

R'ast e, Mizgînî (Încîl, Peymana Nû) bi h'erfêd latînî li gora stan-dart û r'astnivîsara kurmancîya latînî îdî heye. Meremê wê k'itêba welger'andîye destê weda, ne ew e ku cîyê wê bigire yan dewsa wê bixebite. Me'nî ev e, ku pey Şer'ê H'emdinyayêyî Dudar'a h'eta îro, p'ir'anîya k'urdêd welatêd Kafkazê û Asya Navînda k'itêbêd xwe bi h'erfêd kirîlî û bi standarta zarav û r'êzimanîya xwe dane neşirkirinê. Lê belê van axirîyada, hinek hêdî-hêdî dest bi h'erfêd latînî dikin û merî jî hene ku latînî ji kirîlî r'ih'ettir dixûnin. Ji ber vê yekê me qirar kir, ku bona xatirê wan em vê welger'andinê bikin h'erfêd latînî. Awa, ev welger'andina destê weda xût mîna wê çapa h'erfêd kirîlî ye (ya ku sala 2011-a, ji alîya Înstîtûta Welger'andina K'itêba Pîrozda, Moskvê hatîya hazirkirinê), eva h'emû qeyde-qanûnêd r'astnivîsara r'êzima-nîya standarta kirîlî xwey dike, lê t'enê bi h'erfêd latînî ye. Meremê neşirkirina vê çapbûnê ew e, ku alîkarîya wan k'urda bê kirinê, yêd ku welatêd Kafkazê û R'ûsyayêda dijîn, lê dixwazin vê welger'andinê bi h'erfêd latînî bixûnin.

## Welger’andina Peymana Nû bi zimanê k’urdî

Nêzîkî du h’ezar sal pêşda, Peymana Nû bi zimanê yûnanîya kevin hatîye nivîsarê. Ji hingêva h’eta niha ew bi gelek zimanêd dinyayê hatîye welger’andinê. Dinyayêda îro nêzîkî şeş h’ezar h’eysid ziman hene. T’emamîya Peymana Nû niha nêzîkî h’ezar dusid zimanî hatîye welger’andinê. Gelek ji wan miletêd ku bi van zimana xeber didin û Peymana Nû bi zimanê wan welger’andî heye, h’esabê wan gelekî ji h’esabê miletê K’urd hindiktir e.

Eva k’itêba li gora zarav û r’êzimanîya kurmancîya welatêd Kafkazêda (wextekê Sovêtêda) hatîye nivîsarê. Sala 1827-a çend p’arêd K’itêba Pîroz bi kurmancîya Hek’arîyê hatine welger’andinê. Sala 1856 û sala 1857-da pêşîyê Mizgînîya li gora Metta û paşê her çar Mizgînî bi kurmancîya Xarp’ûtê (nêzîkî Elazigê) bi h’erfêd ermenî Stembolêda hatine neşirkirinê. Sala 1872-a t’evayîya Peymana Nû dîsa xût wî zaravîda hatîye neşirkirinê. Ji sala 1900-î h’eta niha çend p’arêd ji Peymana Nû, usa jî t’emamîya Peymana Nû bi çend zaravêd k’urdî hatine neşirkirinê (mesele, kurmancîya T’irkyayê, be’dînî, k’ermanşahî, mûkrî, soranî). Van axirîyada jî çend k’itêbêd welger’andina îroyîn ji alîyê Înstîtûta Welger’andina K’itêba Pîrozva bi kurmancîya welatêd Kafkazêda r’onayî dîtine: Sala 1993-a k’itêba Mizgînîya Metta derk’etîye û 1996-a jî k’itêba Mizgînîya Lûqa û K’arêd Şandîya. Sala 2000-î t’emamîya Peymana Nû derk’etîye, h’îmê k’îjanê niha serr’astkirî destê weda ye.

## Cûr’ê (mêt’oda) xebata vê welger’andinê

Eva k’itêba ji alîyê k’oma Înstîtûtêda hatîye welger’andinê. Kanîya vê k’itêba k’urdîye welger’andî ji k’itêba Peymana Nûye bi zimanê yûnanî ye, awa gotî «The Greek New Testament»*. Ev têk’sta yûnanî ser destnivîsarêd here kevine qenc h’îmgirtî ye, yêd ku îro hene. Nav destnivîsarêd yûnanîya kevinda çend firqîyêd ku têne ber ç’e’va hene,

* The Greek New Testament – ji alîyê United Bible Societies-da neşirkirî ye, r’êdaktorîya 4-a, 1993, Ştûtgart, Gêrmanya.

bona k'îjana jêra r'ûp'elêd k'itêbê hatine şirovekirinê. Lema firqîyêd biç'ûk carna dik'evine nava vê welger'andinê û welger'andinêd zimanêd başqe.

Meremê welger'andinê ev bû, ku hin welger'andin ji têk'sta yûnanî dûr nek'eta û fe'mîna wê jî mîna yûnanî bûya, hin jî ku fe'mîna yûnanî r'ast bibûya stîla kurmancîke xweşe zelal û bedewe îroyîn.

Înstîtûta Welger'andina K'itêba Pîroz

101000 Россия
Москва, Главпочтамт, а/я 360
Институт перевода Библии

# Pêşgotina bona Peymana Nû

K'itêba ku we girtîye destê xwe, jêr'a dibêjin «Peymana Nû». Peymana Nûda bîst h'eft k'itêb hene. Evana pêşîyê bi zimanê yûnanî hatine nivîsarê. Hingê ev ziman zimanekî cime'tî bû, ku p'ir'anîya cime'ta Împêratorîya R'omayê, awa gotî miletêd dor-berêd Be'ra Sipî (Be'ra Navîn) r'ih'et fe'm dikirin û xeber didan.

Nivîsarêd Peymana Nû t'evî yêd Peymana Kevin hevr'a dibine t'evayîya K'itêba Pîroz (awa gotî «Bîblîya»). Nivîsarêd Peymana Kevin û Peymana Nû derheqa wan her du peymanada dibêjin, yêd ku Xwedê t'evî cime'ta Xwe girêdan. Peymana Kevinda nivîsar e ku çawa Xwedê t'evî cime'ta Xwe Îsraêlê peyman girêda û Qanûn* bi destê Mûsa da wan. Peymana Nûda jî nivîsar e ku çawa Xwedê t'evî cime'ta Xwe, awa gotî civîna h'emû bawermendêd Îsa Mesîhe ji her miletî peymaneke din girêda. Ev peyman pê destê Îsa Mesîh hate girêdanê. Himberî wê peymana Xwedêye ku Wî t'evî cime'ta Îsraêlê girêda, eva «nû» ye (Îbranî 9:11-15).

Her çar k'itêbêd pêşine Peymana Nûr'a bi yûnanî dibêjin: «EUAG-GÊLÎON». Xebera «Încîl» ji wê tê û bi kurmancî tê fe'mkirinê «Mizgînî», awa gotî «xebera xêrê». Ev k'itêb derheqa jîyîn û qulixê Îsada dibêjin.

Pey van her çar Mizgînîyar'a k'itêba «K'arêd Şandîya» ye. Eva k'itêba şe'detîya wê yekê dide, çawa pêşîyê bawerîya ser vê Mizgînîyê dinyayêda bela dibû.

Pey vêr'a jî bîst yek ne'me hene, ku ji alîyê şandîya û bawermendêd dine sedsalîya pêşinda hatine nivîsarê. Hinek ji wan ne'ma, berbir'î civînêd cûr'e-cûr'e bajara dibin, hinek jî hema xût berbir'î bawermendêd şexsî dibin (Filîmon, Tîmot'êyo û yêd mayîn). Meremê nivîsk'arêd van ne'ma ew bû, wekî şîreta bidine bawermenda û hînkirina qulixê Îsa wanr'a şirovekin.

Xulese k'itêba bîst h'eftaye paşine Peymana Nûda, k'itêba «E'yantîyê» ye. Eva k'itêba pê dîtinok û xeberêd sur'îye sîmvolî derheqa Xudantîya Îsa Mesîh û serk'etina P'adşatîya Xwedêda dibêje.

---

* Peymana Nûda xebera «Qanûn» bi h'erfa mezin hatîye nivîsarê gava be'sa Qanûna Mûsa dike, awa gotî Qanûna Xwedê. Lê gava be'sa qanûnêd din dike, xebera «qanûn» bi h'erfa biç'ûk hatîye nivîsarê.

# Bona alîkirina xwendevana

Bona alîkirina xwendevana çend tişt hatine hazirkirinê.

Pêşgotinêd her k'itêbekê:

Bona her k'itêbeke Peymana Nû pêşgotinek heye. Ev pêşgotin van axirîyada bona xwendevanêd vî zemanî hatine hazirkirinê, wekî zû ser fikir û meremêd her 27 k'itêba vebin.

Sernivîsarêd p'ara:

Nava welger'andinêda her p'areke biç'ûk bi sernivîsarekê destpêdibe. Mesele, Metta 1:1 bi sernivîsara «R'ik'inyata Îsa» destpêdibe, Metta 1:18 bi «Bûyîna Îsa» destpêdibe, Metta 2:1 bi «Steyrnasêd r'ohilatê» û yêd mayîn. Ev sernivîsar destnivîsarêd e'sasîda t'unene, lê van axirîyada bona alîk'arîya xwendevana hatine hazirkirinê, wekî xwendevan zanibe, merem yan fikira vê p'arê ser çi ye.

Nav-nîşanêd r'êzêd heval-fikir:

Usa jî bona alîk'arîya xwendevana, gava r'êzêd heval-fikir bona p'arekê hene, nav-nîşanêd wan bin sernivîsarada hatine nivîsarê. R'êzêd heval-fikir be'sa wan cîya dikin, k'îderê xût ew serhatî yan fikirêd wan hev digirin. Mesele, bin sernivîsara Metta 1:18 ku derheqa «Bûyîna Îsa»-da dibêje, Lûqa 2:1-7 nava kevanada heye, çimkî li wî cîyî jî derheqa bûyîna Îsada tê gotinê.

Şirovekirinêd jêrê:

Nava k'itêbêda li jêra r'ûp'ela şirovekirin hene. Heger nivîsarêda hûn ser xeberê steyrkê «*» bibînin, wî çaxî ser wî r'ûp'elî jêrê şirovekirinê bixûnin.

H'erfêd **te'rî**:

Çend cara nava nivîsarêda h'erfêd **te'rî** hatine nivîsarê. Eva xebera li gora zimanê yûnanî derbê distînin. Lazim e ku xwendevan xwendina xweda giranî bide wan xebera. (Mesele, bixûnin: Yûh'enna 5:45; Galatî 3:12.)

Şikil, navnîş û xerîte:

Nava vê k'itêbêda, îlayî pişta k'itêbêda şikil, navnîş û xerîte hene, ku k'omekê didine xwendevana. Evana ji alîyê zanava li gora kûltûr û t'arîxa zemanê Îsa Mesîhda hatine hazirkirinê.

Ferhengok:

Fe’mînêd gelek xeberêd giran û nenas nava ferhengokêda hatine şirovekirinê. Gava r’astî xeberêd ze’met bên, yêd ku li cem wan ev nîşan «[f]» heye, ji k’erema xwe ferhengoka pey k’itêbê binihêr’in.

Nav-nîşanêd xeberêd k’ilîte sereke:

Xilazîya k’itêbêda usa jî nav-nîşanêd xeberêd k’ilîte sereke hene. Wêda gelek xeberêd k’ilîte sereke mîna «bawerî», «gune», «dua» û yêd mayîn hene. Bin her xeberêda ji Peymana Nû çend cî hatine k’ifşkirinê, wekî xwendevan bikaribe wê xeberêda k’ûr be.

# MIZGÎNÎYA LI GORA METTA

## Pêşgotin

Li gora r'êzkirina k'itêbêd Peymana[f] Nû, «Mizgînîya[f] Îsa[f] Mesîhe[f] li gora Metta» k'itêba pêşin (e'wlin) e. Bi fikira zana eva k'itêba sedsalîya pêşinda li Entakyayê hatîye nivîsarê. Ji hingêda h'eta niha eva k'itêba bûye ç'e'vkanîk bona wan merivêd[f] ku dixwazin r'astîya Xwedê nas kin, awa gotî Îsa Mesîh. Li gora şe'detîya civîna[f] sedsalîya dudada, xudanê vê k'itêbê Mettayê şandî[f] bûye, yê ku hê berî r'asthatina Îsa xercgir[f] bû, ku jêr'a «Lêwî[f]» jî digotin (Marqos 2:14; Lûqa 5:27).

Eva k'itêba mizgînîya vê yekê dide, ku Îsa ye Xilazkir[f] û P'adşayê ji Xwedêda sozdayî. Eva mizgînîya dibêje, ku Îsa ne t'enê Xilazkirê miletê cihûya[f] ye, lê yê miletêd t'emamîya dinyayê ye jî.

Mizgînîya Metta ji her sê Mizgînîyêd mayîn zêdetir be'sa Peymana[f] Kevin dike, çimkî meremê vê k'itêbê ev e, wekî îzbat ke, ku Îsa hema xût Xwexa ye ew Xilazkirê sozdayî û bi vî awayî nivîsarêd cihûyaye pîroz[f] (awa gotî nivîsarêd Peymana Kevin) hatine sêrî. Metta k'itêba xweda ji çil cara zêdetir be'sa wan nivîsarêd Peymana Kevin dike. Ji wan cîya gelek aha nivîsar in: «Ev yek aha qewimî, ku ew gotina Xudane[f] bi zarê[f] p'êxember[f] hatibû gotinê bê sêrî...» (1:22; 2:15, 17-18, 23; 4:14-16; 8:17; 12:17-21 û yêd mayîn). Usa jî Metta gelek cara dinivîse, ku Îsa çawa «Kur'ê[f] Dawid» tê h'esabê, çimkî Mesîhê sozdayî wê ji r'ik'inyata[f] Dawid[f] p'adşa bihata (1:1, 20; 9:27; 12:23; 15:22; 20:30-31; 21:9, 15; 22:41-45).

Ev Mizgînî ji hersêkêd mayîn bi vî awayî jî berç'e'v dibe, ku dewsa navê «Xwedê» gelek cara xebera «E'zman» hatîye xebatê, sebeb ew bû ku cihûya nedixwestin her gav navê Xwedê banîna ser zarê xwe, çimkî pîroz e, lema jî Metta dûrva dihat. Mesele, dewsa «P'adşatîya[f] Xwedê» 33 cara «P'adşatîya[f] E'zmana» nivîsar e, lê «P'adşatîya Xwedê» t'enê pênc cara nivîsar e.

Nivîsk'arê k'itêbê serhatîya Îsa bi hûr-gilî dinivîse. Ew ji r'ik'inyat û bûyîna Îsada destpêdike, paşê dinivîse Ew çawa pê avê tê nixumandinê[f] (imatkirinê), tê cêr'ibandinê[f], paşê derheqa kirêd Wîye Celîlêda[f] dinivîse, çawa dannasîn kir, hîn kir û nexweş qenc kirin. Paşê dinivîse ku Ew çawa ji Celîlê tê Orşelîmê[f], r'ojêd h'eftîya Xweye xilazîyê li wir çawa derbaz dike û çawa hate xaçkirinê[f] û ji mirinê r'abû.

Mizgînîya Mettada Îsa çawa dersdarekî[f] mezin k'ifş dibe, yê ku h'ukumê Wî heye Qanûna[f] Mûsa[f] şiroveke û bona P'adşatîya Xwedê dannasîn ke. Usa jî dide k'ifşê ku Ew wek'îlê Qanûna Xwedê û peymanêyî amin e, ku meremê Xwedê diqedîne û tîne sêrî. Mizgînîya Mettada hînkirinêd Îsa p'ar-p'ar dîyar dibin û ev p'ar bi vê r'êzkirinê berç'e'v dibin:

**1.** Dannasînîya serê ç'îyê ber merivayê vedike, ku zar'êd P'adşatîya Xwedê çiqasî xwezilî ne û gerekê r'abûn-r'ûniştin, borc û jîyîna xweda jî çawa bin (serê 5-a h'eta 7-a).

**2.** T'emîyêd bona şagirta[f], wekî qulixê şandîtîya xweda çawa P'adşatîya Xwedê dannasîn kin (serê 10-a).

**3.** Sur'a P'adşatîya Xwedê û h'eft mesele (13-a).

**4.** Li ser vê dinê zar'êd P'adşatîya Xwedê, awa gotî bawermendêd Îsa Mesîh gerekê hindava hevda çawa bin (serê 18-a).

**5.** Hînkirinêd li ser r'ojêd axirîyê û hatina P'adşatîya Xwedê (serê 24-a û 25-a).

**Serecema fikira k'itêbê**

R'ik'inyata Îsa û bûyîna wî (1:1–2:23)
Qulixê Yûh'ennayê[f] nixumdar[f] (3:1-12)
Nixumandin û cêr'ibandina Îsa (3:13–4:11)
Dannasînî û şixulêd Îsaye li Celîlêda (4:12–18:35)
R'îya Îsaye ji Celîlê h'eta Orşelîmê (19:1–20:34)
H'eftîya Îsaye xilazîyê li Orşelîmê û dor-berêd wêda (21:1–27:66)
R'abûna Îsa ji mirinê û şagirtava xuyabûna Wî (28:1-20)

### R'ik'inyata Îsa

*(Lûqa 3:23-38)*

1 1 Ev e r'eqema r'ik'inyata[f] Îsa[f]
Mesîh[f], r'ik'inyata Dawid[f],
r'ik'inyata Birahîm[f]:
2 Birahîmr'a Îshaq[f] bû,
Îshaqr'a Aqûb[f] bû,
Aqûbr'a Cihûda[f] û birava bûn,
3 Cihûdar'a Pêrês û Zera bûn, (navê dîya wan T'amar bû),
Pêrêsr'a Hesrûn bû,
Hesrûnr'a R'am* bû,
4 R'amr'a Amînadav bû,
Amînadavr'a Nehşon bû,
Nehşonr'a Selmon bû,
5 Selmonr'a Bowaz bû, (navê dîya wî R'exab[f] bû),
Bowazr'a Ovêd bû, (navê dîya wî R'ût' bû),
Ovêdr'a Yêşa[f] bû
6 û Yêşar'a Dawid p'adşa bû.

Dawid p'adşar'a Silêman[f] bû, (dîya wî berê k'ulfeta[f] Ûrîya bû),
7 Silêmanr'a R'ehobowam bû,
R'ehobowamr'a Ebîya bû,
Ebîyar'a Asaf* bû,
8 Asafr'a Yêhoşefat bû,
Yêhoşefatr'a Yoram bû,
Yoramr'a Ûzîya bû,
9 Ûzîyar'a Yotam bû,
Yotamr'a Ahaz bû,
Ahazr'a Hizqîya bû,
10 Hizqîyar'a Minaşe bû,
Minaşer'a Amos bû,
Amosr'a Yoşîya bû
11 û Yoşîyar'a Yexonîya û birava bûn. Wî çaxî cime't sirgûn[f] çû Babîlonê[f].

12 Lê pey sirgûnçûyîna Babîlonêda,
ji Yexonîyar'a Şaltîyêl bû,
Şaltîyêlr'a Zerûbabel bû,
13 Zerûbabelr'a Abîyûd bû,
Abîyûdr'a Êlyaqîm bû,
Êlyaqîmr'a Azûr bû,
14 Azûrr'a Sadoq bû,
Sadoqr'a Axîn bû,
Axînr'a Êlyûd bû,
15 Êlyûdr'a Êlazar bû,
Êlazarr'a Metan bû,
Metanr'a Aqûb bû,
16 Aqûbr'a Ûsiv[f] bû, mêrê Meryemê[f], ya ku Îsa[f] ji wê welidî, ku Mesîh[f] tê gotinê.
17 Awa ji Birahîm h'eta Dawid
çardeh nisil[f] derbaz bibûn, ji Da-
wid h'eta sirgûnçûyîna Babîlonêda

* 1:3 Nav destnivîsarêd hinekada dewsa «R'am» «Aram» heye.
* 1:7 Nav hinek destnivîsarada dewsa «Asaf» «Asa» heye.

çardeh nisil û ji sirgûnçûyîna Ba-
bîlonêda h'eta Mesîh dîsa çardeh
nisil bûn.

### Bûyîna Îsa

*(Lûqa 2:1-7)*

18 Bûyîna Îsa Mesîh bi vî tihe-
rî bû. Meryema dîya Wî Ûsivr'a
nîşankirî bû, lê dergîstîya xweda
Meryem bi h'ukumê R'uh'ê[f] Pî-
roz h'emle k'ifş bû. 19 Lê Ûsivê
dergîstîyê wê ku merivekî[f] r'ast
bû, nexwest wê r'ûr'eş ke, fiki-
rî ku dizîva wê ber'de. 20 Çaxê
Ûsiv hê ser vê yekê difikirî, va
milyak'etekî[f] Xudan[f] xewnêda
wîva xuya bû û gotê: «Ûsivê kur'ê
Dawid! Netirse, ku dergîstîya xwe
Meryemê bistînî. Ewî ku wê ji wê
bibe, ew ji R'uh'ê Pîroz e. 21 Ewê
kur'ekî bîne û tê navê Wî Îsa*
daynî, çimkî Ewê cime'ta Xwe ji
gunêd wan xilaz[f] ke».
22 Ev her tişt aha qewimî, wekî
ew gotina Xudane bi zarê[f] p'ê-
xember[f] bê sêrî ku dibêje: 23 «Va
qîza bik'ir[f] wê h'emle be, kur'ekê
jêr'a bibe û navê Wî Îmmanûyêl
wê daynin»*, ku tê fe'mkirinê:
«Xwedê t'evî me ye»**.
24 Gava Ûsiv ji xewê h'işyar
bû, ewî li gora gotina milyak'etê
Xudan kir, dergîstîya xwe stand.
25 Lê serê xwe wêr'a danenî, h'eta
ku ew kur'* jêr'a bû. Û navê Wî
Îsa danî.

### Steyrnasêd r'ohilatê

**2** 1 Gava Îsa Beytleh'ma[f] Ci-
hûstanêda[f], r'ojêd p'adşatîya
Hêrodesda bû, hingê çend steyrnas
ji r'ohilatê hatine Orşelîmê[f] 2 û
gotin: «K'anê P'adşê cihûyayî[f] ku
gerekê bibûya? Me steyrka Wî li
r'ohilatê dît û em hatine, ku serê
xwe li ber Wî daynin».
3 Gava Hêrodes p'adşa ev yek
bihîst, t'evîhev bû û t'emamîya
Orşelîmê jî pêr'a. 4 Hingê ewî
h'emû qanûnzanêd[f] cime'tê û
serekêd k'ahîna[f] civandin û ji
wan pirsî: «K'îderê gerekê Mesîh
bibe?» 5 Wana jêr'a got: «Beytle-
h'ma Cihûstanêda, çimkî bi destê
p'êxembera aha nivîsar e:
6 ‹Ya Beytleh'ma welatê Cihûda,

* 1:21 «Îsa» bi zimanê îbranî[f] aha tê fe'mkirinê: «Xudan xilaz dike», yan «xilazkir», yan jî «azabûn».
* 1:23 Îşaya 7:14.
** 1:23 Îşaya 8:8, 10.
* 1:25 Nav hinek destnivîsarada «kur'ê wêyî nixurî» heye.

tu li nav serwêrêd Cihûdayêda
ne yê herî biç’ûk î,
çimkî Serwêrekê ji te r’abe,
ku şivantîyê cime’ta Min Îsra-
êlê[f] bike›*».
7 Hingê Hêrodes dizîva gazî
steyrnasa kir û wextê xuyabûna
steyrkê ji wan pê h’esîya. 8 Paşê ew
şandine Beytleh’mê û got: «Her’in
bona Kur’ik e’seyî pê bih’esin. Çaxê
ku hûn Wî bibînin, minr’a bêjin, ku
ez jî bêm serê xwe li ber daynim».
9 Gava wana ev tişt ji p’adşê
bihîst, çûn. Û va ye ew steyrka
ku li r’ohilatê dîtibûn pêşîya wan
çû, h’eta ser wî cîyê k’u Kur’ik lê
bû sekinî. 10 Gava wana ew steyrk
dît, gelekî eşq û şa bûn, 11 çûne
hindur’, Kur’ik t’evî dîya Wî
Meryemê dîtin, li ber Wî dever’û
çûn, serê xwe li ber danîn û xiz-
nêd xwe vekirin, p’êşk’êşêd[f] zêr’,
bixûrê[f] e’rebî û zimir[f] dane Wî.
12 Lê wan xewnêda e’mir stand,
ku veneger’ine cem Hêrodes, ew
îdî r’êke dinva çûne welatê xwe.

### R’eva ber bi Misirê[f]

13 Gava ku ew ji wir çûn, va mil-
yak’etekî Xudan xewnêda Ûsivva
xuya bû û gotê: «R’abe Kur’ik û
dîya Wî hilde bir’eve Misirê[f]. Li
wir bimîne h’eta ku ez ter’a bêjim,
çimkî Hêrodesê Kur’ik biger’e,
ku Wî bikuje».
14 Ûsiv jî r’abû Kur’ik û dîya
Wî hildan, şev çûne Misirê 15 û
h’eta mirina Hêrodes ewana li wir
man. Ev yek aha bû, ku ew gotina
Xudane bi zarê p’êxember hatibû
gotinê bê sêrî: «Min ji Misirê gazî
Kur’ê Xwe kir»*.

### Qir’a zar’oka

16 Gava Hêrodes dît ku ew ji
steyrnasa hate xapandinê, gelekî
hêrs k’et. Ewî e’mir kir ku h’emû
zar’okêd kur’îne li Beytleh’mê û
dor-berê wê, yêd du salî û ji wan
biç’ûktir hebûn, ku bêne kuştinê,
li gora wî wextê ku ji steyrnasa
pê h’esîya bû. 17 Hingê ew goti-
na bi zarê Yêremîya[f] p’êxember
hate sêrî:
18 «Ji R’amayê dengek hat,
dengê girî û şîna giran,
R’ahêl bona zar’okêd xwe di-
girîya
û nedixwest ku ber dilada bên,
çimkî îdî zar’ok nemabûn»*.

* 2:6 Mîxa 5:2.
* 2:15 Hosêya 11:1.
* 2:18 Yêremîya 31:15.

### Hatina ji Misirê

19 Gava Hêrodes mir, va milya-
k'etekî Xudan li Misirê xewnêda
Ûsivva xuya bû 20 û gotê: «R'abe,
Kur'ik û dîya Wî hilde û her'e we-
latê Îsraêlê, çimkî ewêd pey Kur'ik
k'etibûn ku bikuştana mirine».
21 Ûsiv jî r'abû, Kur'ik û dîya
Wî hildan, veger'îyane welatê
Îsraêlê. 22 Lê gava Ûsiv bihîst
wekî Arxêlayo[f] dewsa bavê xwe,
Hêrodes ser Cihûstanê bûye p'ad-
şa, tirsîya ku her'e wir. Hingê
xewnêda e'mir stand, ku her'e
alîyê qeza Celîlê[f]. 23 Ew jî çûne
bajarê ku jêr'a Nisret digotin lê
hêwirîn. Ev yek aha bû, ku ew
gotina bi zarê p'êxembera bê sêrî
ku dibêje: «Ewê nisretî bê gotinê».

### Dannasînîya Yûh'ennayê[f] nixumdar[f]

*(Marqos 1:1-8; Lûqa 3:1-18; Yûh'enna 1:19-28)*

**3** 1 Wan r'ojada Yûh'ennayê[f]
nixumdar[f] r'abû nava be-
r'îya[f] Cihûstanê dannasîn kir
2 û got: «Ji gunekirinê veger'in[f],
çimkî P'adşatîya[f] E'zmana nêzîk
bûye». 3 Yûh'enna ew bû, bona
k'îjanî Îşaya[f] p'êxember gotibû:
«Dengek ber'îyêda dike gazî:
‹R'îya Xudan hazir bikin
û şiver'îyêd[f] Wî r'ast bikin›»*.
4 K'incê Yûh'enna ji pir'ç'a devê
bû û qayîşeke ç'erm li piştê bû.
Xwarina wî jî kulî[f] û hingivê çolê
bû. 5 Hingê cime'ta Orşelîmê û
t'emamîya Cihûstanê û h'emû
alîyêd ç'emê Ûrdunê dihatine
cem wî, 6 gunêd xwe didane r'û-
yê xwe û ji wî ç'emê Ûrdunêda
dihatine nixumandinê[f].
7 Gava Yûh'enna dît ku ji fêrisî[f]
û sadûqîya[f] jî gelek hatine wekî
bêne nixumandinê, ewî gote wan:
«Ç'êjikêd[f] me'ra! K'ê wer'a got,
ku hûn ji xezeba tê bir'evin? 8 De
bi kirêd qenc bidine k'ifşê, ku
hûn ji gunekirinê veger'îyane.
9 Û nav xweda nefikirin nebêjin:
‹Birahîm bavê me ye›. Ez wer'a
dibêjim, ku Xwedê ji van kevira
jî dikare zar'a Birahîmr'a derxe.
10 Va ye bivir[f] li ser r'awê[f] darê
ye. Her dara ku berê qenc neyne,
wê bê bir'înê û avîtinê nava êgir.
11 Ez we bona guneveger'andinê
bi avê dinixumînim, lê Yekî ji
min qewattir wê bê. Ez ne hêja
me çarixê Wî jî bigirime destê
xwe. Ewê we pê R'uh'ê Pîroz
û êgir binixumîne. 12 Melh'eba

* 3:3 Îşaya 40:3.

Wî destê Wîda ye. Ewê bêdera
Xwe paqij ke, genimê Xwe bike
e'mbarê, lê kayê wê bi agirê ku
natemire bişewitîne».

### Îsa tê nixumandinê

*(Marqos 1:9-11; Lûqa 3:21-22)*

13 Hingê Îsa ji Celîlê hate Ûr-
dunê, cem Yûh'enna, ku ji wî bê
nixumandinê. 14 Lê Yûh'enna
bona vê yekê Wîr'a qayl nedibû
û gote Wî: «Ez h'ewce me ku
bi destê Te bême nixumandinê
û Tu têyî cem min?» 15 Îsa lê
veger'and û gotê: «Niha bihêle,
çimkî li me dik'eve ku em h'emû
r'astîyê aha bînine sêrî[f]». Paşê
Yûh'enna qayl bû.

16 Hema çawa Îsa hate nixu-
mandinê û ji avê derk'et, nişkêva
e'zman vebûn û ewî dît ku R'uh'ê
Xwedê mîna kevotkekê hate xwarê
û ser Wî danî. 17 Û va dengek ji
e'zmana hat: «Ev e Kur'ê Minî
delal, ku ez ji Wî r'azî me».

### Cêr'ibandina[f] Îsa

*(Marqos 1:12-13; Lûqa 4:1-13)*

**4** 1 Hingê R'uh' Îsa bire ber'î-
yê[f], ku ji Mîrêcin[f] bê cêr'i-
bandinê[f]. 2 Ewî çil r'oj û çil şevî
r'ojî[f] girt, peyr'a bir'çî bû. 3 Yê ku
dicêr'ibîne nêzîkî Wî bû û gotê:
«Heger Tu Kur'ê[f] Xwedê yî, de
bêje van kevira ku bibine nan».
4 Lê Îsa lê veger'and û gotê: «Ni-
vîsar e: ‹Însan t'enê bi nên najî,
lê bi her xebera ku ji devê Xwedê
derdik'eve›*».

5 Hingê mîrêcin Ew bire Ba-
jarê Pîroz[f], ser bilindcîya banê
p'aristgehê[f] da sekinandinê 6 û
gote Wî: «Heger Tu Kur'ê Xwedê
yî, de Xwe bavêje xwarê, çimkî
nivîsar e: ‹Xwedê wê t'emîya Te
bide milyak'etêd Xwe û wê Te ser
destê Xwe bigirin, wekî nigê Te
kevir nek'eve›*». 7 Îsa gotê: «Ev jî
nivîsar e: ‹Xudan Xwedêyê xwe
necêr'ibîne›*».

8 Hingê mîrêcin Ew bir r'akire
ser ç'îyakî gelekî bilind û h'emû
p'adşatîyêd dinyayê, r'ewşa wanva
nîşanî Wî dan 9 û gote Wî: «Heger
Tu dever'ûya bêyî, serê Xwe li
ber min daynî, ezê van h'emûya
bidime Te». 10 Hingê Îsa gotê:
«Dûrî Min her'e, cino[f]! Çimkî
nivîsar e: ‹Serê xwe li ber Xudan

* 4:4 Qanûna Ducarî 8:3.
* 4:6 Zebûr 91:11-12.
* 4:7 Qanûna Ducarî 6:16.

Xwedêyê xwe dayne û t'enê Wîr'a
xulamtîyê bike!›*»
11 Wî çaxî mîrêcin Ew hişt çû
û va milyak'et hatin jêr'a ber-
destî kirin.

### Îsa qeza Celîlêda dest bi k'arê Xwe dike

*(Marqos 1:14-15; Lûqa 4:14-15)*

12 Gava Îsa bihîst, wekî Yûh'enna
hate girtinê, Ew r'abû çû Celîlê.
13 Ewî Nisret hişt, çû Kefernahû-
ma devê gola Celîlê, li nav sînorê
Zebûlonê û Neftelîyê cî-war bû.
14 Ev yek aha bû, ku ew gotina
bi zarê Îşaya p'êxember bê sêrî:
15 «Welatê Zebûlonê û welatê
Neftelîyê,
li ser r'îya berbi golê, wî alîyê
Ûrdunê,
Celîla necihûya[f],
16 ew cime'ta ku nav te'rîstanî-
yêda r'ûniştibû,
r'onayîke mezin dît
û ewêd ku li welat û sîya mi-
rinêda r'ûniştibûn,
r'onayî ji wanar'a derk'et».*
17 Ji hingêva Îsa dest bi danna-
sînîyê kir û got: «Ji gunekirinê
veger'in, çimkî P'adşatîya E'z-
mana[f] nêzîk bûye».

### Îsa gazî her çar me'sîgira dike

*(Marqos 1:16-20; Lûqa 5:1-11)*

18 Çaxê Îsa li devê gola Celî-
lê diger'îya, r'astî du bira hat,
Şimh'ûnê[f] ku jêr'a Petrûs[f] dihate
gotinê û Endrawisê birê wî. Wana
t'or' davîte golê, çimkî me'sîgir
bûn. 19 Îsa wanar'a got: «Pey Min
werin, Ezê we bikime nêç'îrvanêd
meriva». 20 Wana jî hema wê demê
t'or'êd xwe hiştin û pey Wî çûn.
21 Gava Îsa ji wî cîyî hinekî pêş-
da çû, r'astî du birêd din jî hat,
Aqûbê[f] Zebedî û Yûh'ennayê[f] birê
wî. Wana t'evî bavê xwe, Zebedî
qeyikêda t'or'êd xwe hîvêz diki-
rin. Îsa gazî wan jî kir. 22 Wana jî
hema wê demê qeyik û bavê xwe
hiştin û pey Wî çûn.

### Îsa dannasîn dike, hîn dike û qenc dike

*(Lûqa 6:17-19)*

23 Îsa li t'emamîya Celîlê dige-
r'îya, k'inîştêd[f] wanda hîn dikir
û Mizgînîya[f] P'adşatîyê dida û
her cûr'e êş û nexweşî jî ku nav
cime'têda hebûn qenc dikirin.
24 Nav-dengê Wî li t'emamîya

* 4:10 Qanûna Ducarî 6:13.

* 4:15-16 Îşaya 9:1-2.

Sûryayê bela bû, cime'tê her cûr'e
merivêd nexweş anîne cem Wî,
yêd ku cûr'e-cûr'e êş û cefada
bûn: Yêd cinak'etî[f], hîvk'etî[f],
şilûşe't û Ewî ew h'emû jî qenc
kirin. 25 Gelek e'lalet jî ji Celîlê, ji
qeza Dêkapolîsê*, ji Orşelîmê, ji
Cihûstanê û ji wî alîyê Ûrdunêyî
r'ohilatê pey Wî diçûn.

### Dannasînîya serê ç'îyê

**5** 1 Çaxê Îsa e'lalet dît, hilk'i-
şîya ç'îyê, r'ûnişt û şagirtêd[f]
Wî hatine cem Wî. 2 Ewî dest bi
hînkirina Xwe kir û wanr'a got:

### Hînkirina bona xwezilîya r'ast

*(Lûqa 6:20-23)*

3 «Xwezî li r'uh'feqîra*,
çimkî P'adşatîya E'zmana ya
wan e.
4 Xwezî li h'eznîya,
çimkî ber dilêd wanda wê bê
hatinê.
5 Xwezî li şkestîya,
çimkî e'rdê p'ara wan be.
6 Xwezî li wan, ku t'î û bir'çîyê
r'astîqedandinê ne,
çimkî ewê t'êr bin.
7 Xwezî li dilr'e'ma,
çimkî ewê r'e'mê bibînin.
8 Xwezî li dilpaqija,
çimkî ewê Xwedê bibînin.
9 Xwezî li wan, ku e'dilayîyê
dikin,
çimkî ewê zar'êd Xwedê bêne
h'esabê.
10 Xwezî li wan, ku bona r'astî-
qedandinê têne zêrandinê,
çimkî P'adşatîya[f] E'zmana ya
wan e.

11 Xwezî li we, gava bona navê
Min we bêhurmet kin, bizêrînin
û her cûr'e buxdan li we bikin.
12 Eşq û şa bin, çimkî heqê we
li e'zmana gelek e. Bi vî cûr'eyî
p'êxemberêd ku berî we hebûn,
zêrandin.

### Xwê û r'onayî

*(Marqos 9:50; Lûqa 14:34-35)*

13 Hûn xwêya e'rdê ne. Lê heger
xwê te'ma xwe unda ke, paşê ewê
bi çi te'mê bistîne? Îdî wê kêrî
tiştekî neyê. Wê bigirin bavêjine
nav dest-p'îya.

---

* 4:25 «Dêkapolîs» bi zimanê yûnanî tê fe'mkirinê: «Dehe Bajar», çimkî eva qeza berêda bi yektîya dehe bajara hatîye çêkirin.
* 5:3 Bi gotineke din: «R'uh'k'esîba», awa gotî r'uh'ê wan h'ewcê Xwedê ye, ber Xwedê şkestî ne.

14 Hûn r'onaya dinyayê ne.
Heger bajarek serê ç'îyê ye, nayê
veşartinê. 15 Kesek jî ç'irê vênaxe
û nake binê firaqê, lê datîne ser
p'êç'irê[f], ku r'onayê bide h'e-
mûyêd ku malêda ne. 16 Usa jî
bira r'onaya we ber meriva şewq
bide, ku ewana kirinêd weye
qenc bibînin û pesinê Bavê[f] weyî
e'zmana bidin.

### Hînkirina bona Qanûnê

17 Nefikirin ku Ez hatime ni-
vîsarêd p'êxembera û Qanûnê
xirab kim. Ez nehatim ku xirab
kim, lê wan h'emûya bînime sê-
rî. 18 Ez r'ast wer'a dibêjim, berî
derbazbûna e'rd û e'zman, deqek
yan jî h'erfeke biç'ûk ji Qanûnê
wê t'u car unda nebe, h'eta ku
h'emû bêne sêrî. 19 Awa k'î ji van
t'emîya yeke here biç'ûk xirab ke û
meriva usa hîn ke, ewê P'adşatîya
E'zmanada ji h'emûya biç'ûktir
bê h'esabê. Lê k'î ku wana pêk
bîne û hîn bike, ewê P'adşatîya
E'zmanada mezin bê h'esabê.
20 Lema Ez wer'a dibêjim, heger
r'astîya we ji r'astîya qanûnzan û
fêrisîya zêdetir nîbe, hûn t'u car
nak'evine P'adşatîya E'zmana.

### Hînkirina derheqa hêrsê û mêrkuştinêda

21 We bihîstîye ku pêşîyar'a
hatîye gotinê: ‹Nekuje!* K'î ku
bikuje, dîwana wî wê bê kirinê›.
22 Lê Ez wer'a dibêjim, k'î ser birê
xwe hêrs k'eve*, wê bibe deyndarê
dîwanê û k'î bêje birê xwe: ‹Bê
aqil›, ewê bibe deyndarê dîwana
civîna giregira û k'î ku bêje: ‹Ax-
max›, wê bibe deyndarê agirê dojê[f].
23 Awa heger tu h'edîya[f] xwe bînî
ser gorîgehê[f] û li wir bê bîra te,
ku dilê birê te ji te maye, 24 h'e-
dîya xwe wê derê li ber gorîgehê
bihêle û pêşîyê her'e birê xwer'a
li hev were û paşê were h'edîya
xwe bide.

25 Çaxê neyarê te te k'aşî cem
h'akim dike, r'êda t'evî wî zû li
hev were. Heger na, ewê te bide
destê h'akim, h'akimê jî te bide
destê berdestîyê xwe û te bavêje
kelê. 26 Ez r'ast ter'a dibêjim, tu ji
wir t'u car dernak'evî h'eta polê[f]*
paşin nedî.

---

* 5:21 Derk'etin 20:13; Qanûna Ducarî 5:17.
* 5:22 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «K'î ku cîkî bê sebeb ser birê xweda hêrs k'eve».
* 5:26 «Pol» p'erê herî hûr e.

## Hînkirina derheqa zinêk’arîyêda

27 We bihîstîye ku hatîye goti-
nê: ‹Zinîyê neke›*. 28 Lê Ez wer’a
dibêjim, k’î bi temê xirab jinekê
binihêr’e, ewî dilê[f] xweda îdî t’evî
wê zinêk’arî kir. 29 Awa heger ç’e’-
vê teyî r’astê te ji r’ê derdixe, wî
derxe û ji xwe bavêje. Bona te hê
qenc e ku endemekî te unda be, lê
bedena te pêva nek’eve ce’nimê[f].
30 Û heger destê teyî r’astê te ji r’ê
derdixe, wî jêke û bavêje. Ter’a hê
qenc e ku endemekî te unda be, lê
bedena te pêva nek’eve ce’nimê.

## Hînkirina derheqa jinber’danêda

*(Metta 19:9; Marqos 10:11-12; Lûqa 16:18)*

31 Ev jî hatîye gotinê: ‹K’î k’ulfeta
xwe ber’de, bira k’axaza jinber’danê
bide wê›*. 32 Lê Ez wer’a dibêjim,
k’î ku bê sebebîya qavîyê[f] jina xwe
ber’de, ew dibe sebebê zinêkirina
wê, heger dîsa ew mêr ke* û k’î
ku yeke mêrber’dayî bistîne, ew
zinîyê dike.

## Hînkirina bona sondê

33 We ev jî bihîstîye ku pêşîyar’a
hatîye gotinê: ‹Derew sond nexwe
û sondê xwe li ber Xudan bîne sê-
rî›*. 34 Lê Ez wer’a dibêjim, t’u car
sond nexwin, ne bi e’zmên, çimkî
ew t’extê Xwedê ye, 35 ne jî bi e’rdê,
çimkî ew cîyê bin p’îyêd Wî ye,
ne jî bi Orşelîmê, çimkî ew bajarê
P’adşê mezin e 36 û ne jî bi serê
xwe sond bixwe, çimkî tu nikarî
mûkî sipî kî yan r’eş kî. 37 Lê bira
gotina we bibe ‹belê-belê› yan jî
‹na-na›. Ji vê zêdetir ji mîrêcin e*.

## Hînkirina derheqa h’eyfhildanêda

*(Lûqa 6:29-30)*

38 We bihîstîye ku hatîye gotinê:
‹Ç’e’v ji ber ç’e’vva, diran ji ber
diranva›*. 39 Lê Ez wer’a dibêjim,
miqabilî xiraba nesekinin. Heger

* 5:27 Derk’etin 20:14; Qanûna Ducarî 5:18.

* 5:31 Qanûna Ducarî 24:1-4.

* 5:32 Ev xebera «heger dîsa ew mêr ke» yûnanîda t’une. Evana me’na zinê-k’arîyê şirovedikin, çimkî e’detê cihûyada[f] îzina jina mêrber’dayî t’unebû dîsa mêr kira, h’eta mêrê wê sax bûya.

* 5:33 Qanûna K’ahîntîyê 19:12; Jimar 30:2.

* 5:37 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Ji yê xirab e».

* 5:38 Derk’etin 21:24; Qanûna K’ahîntîyê 24:20; Qanûna Ducarî 19:21.

yek şemaqekê li r'ûyê teyî r'astê
xe, yê din jî bide ber. 40 Û heger
yek te k'aşî ber dîwanê ke û bi-
xwaze kirasê te ji te bistîne, p'otê
xwe jî jêr'a bihêle. 41 Û heger yekî
qulixêda zorê li te bike, wekî kî-
lomêtirekê* te bibe, t'evî wî duda
her'e. 42 Bide wî, k'î ji te dixwaze
û berê xwe ji wî neguhêze, yê ku
dixwaze ji te deyn bike.

### Dijminêd xwe h'iz bikin

*(Lûqa 6:27-28, 32-36)*

43 We bihîstîye ku hatîye gotinê:
‹Hevalê xwe h'iz bike* û bijene dij-
minê xwe›. 44 Lê Ez wer'a dibêjim,
dijminêd xwe h'iz bikin û bona
wan dua bikin, yêd ku we dizê-
rînin*, 45 wekî hûn bibine zar'êd
Bavê xweyî E'zmana. Çimkî Ew
te'va Xwe derdixe hin ser qenca,
hin jî ser xiraba û baranê dibarîne
hin ser r'asta, hin jî ser ner'asta.
46 Heger hûn wan h'iz bikin, k'î-
jan ku we h'iz dikin, hûnê çi heq
bistînin? Ne xercgir[f] jî usa dikin?
47 Û heger hûn t'enê silavê bidine
birêd xwe, îdî hûn çi tiştî ji ewêd
din zêdetir dikin? Ne p'ûtp'arist[f] jî
usa dikin? 48 Awa k'amil bin, çawa
ku Bavê weyî E'zmana k'amil e.

### Hînkirina bona xêrkirinê

6 1 Haş ji xwe hebin, ku hûn
qencîyêd xwe ber meriva ne-
kin, wekî ji wan bêne k'ifşê. Yan
na, hûn ji Bavê xweyî E'zmana
heq nastînin.
2 Awa çaxê tu xêra dikî, pêşîya
xwe bor'îyê nexe, çawa dur'û k'inîşt
û k'ûçada dikin, wekî meriv pesinê
wan bidin. Ez r'ast wer'a dibêjim,
ku wana heqê xwe îdî standîye.
3 Lê çaxê tu xêra dikî, bira destê
ç'epê nizanibe destê r'astê çi xêr
kir, 4 ku xêrêd te dizîva bin. Û
Bavê teyî tiştêd ku tu dizîva dikî
dibîne, wê heqê te bide te.

### Hînkirina bona dua

*(Lûqa 11:2-4)*

5 Gava hûn dua dikin, mîna
dur'ûya nebin. Ew h'iz dikin k'i-
nîşt û meydanada bisekinin dua
bikin, ku ber meriva bêne k'ifşê.
Ez r'ast wer'a dibêjim, îdî wana

* 5:41 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Mîlek». Mîla R'omê[f] (Îtalya) 1 478.5 mêtir bû.
* 5:43 Ev r'êz «Hevalê xwe h'iz bike» ji Qanûna K'ahîntîyê 19:18 ye.
* 5:44 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «...bona yêd ku nifir'a we dikin, dua bikin û xêrnexwazêd[f] xwer'a qencîyê bikin».

heqê xwe standîye. 6 Lê çaxê tu
dua dikî, bik'eve oda xwe, derî
li xwe bigire û Bavê xwer'a ku
nayê dîtinê duayê xwe bike. Û
Bavê teyî tiştêd ku tu dizîva dikî
dibîne, wê heqê te bide te.

7 Gava ku hûn dua dikin, mî-
na p'ûtp'arista p'ir'xeber nebin.
Wana t'irê[f] bona p'ir' xeberdana
wan duayêd wanê bêne bihîstinê.
8 Hûn mîna wan nebin, çimkî
berî xwestina we, Bavê we zane
çi wer'a lazim e.

9 Lê hûn aha dua bikin:

‹Bavê meyî E'zmana! Navê Te pîroz[f] be*,

10 P'adşatîya Te bê, e'mirê Te be, çawa li e'zmên, usa jî li ser e'rdê.

11 Nanê meyî r'ojê r'oj bi r'oj bide me.

12 Deynêd me bibaxşîne, çawa ku em dibaxşînine deyndarêd xwe.

13 Û me nebe cêr'ibandinê[f], lê me ji yê xirab* xilaz ke, çimkî p'adşatî, qewat û r'ûmet yêd Te ne, h'eta-h'etayê. Amîn[f]**›.

14 Heger hûn neheqîyêd me-
rivaye hindava weda ku dikin
bibaxşînin, Bavê weyî E'zmana jî
wê we bibaxşîne. 15 Lê heger hûn
neheqîyêd meriva nebaxşînin, Ba-
vê we jî neheqîyêd we nabaxşîne.

## Hînkirina bona r'ojîyê

16 Gava ku hûn r'ojî digirin,
mîna dur'ûya me'dekirî nîbin.
Ew me'dê xwe dikin, wekî meriv
bizanibin ku ew r'ojî ne. Ez r'ast
wer'a dibêjim, ku wana heqê xwe
standîye. 17 Lê çaxê tu r'ojî digirî,
serç'e'vê xwe bişo, serê xwe şe
ke*, 18 wekî meriv nizanibin ku
tu r'ojî yî, lê t'enê Bavê teyî ku
nayê dîtinê zanibe. Û Bavê teyî
tiştêd ku tu dizîva dikî dibîne, wê
heqê te bide te.

## Xizna e'zmana

*(Lûqa 12:33-34)*

19 Li ser dinê xiznê xwer'a ne-
civînin. Li vê derê zeng û bizûz
xirab dikin û diz derevedikin di-
dizin. 20 Lê xiznê xwer'a li e'zmên
bicivînin. Li wê derê zeng û bizûz

* 6:9 Bi gotineke din: «Bira însan qedirê navê Teyî pîroz bigire».
* 6:13 Aha jî tê fe'mkirinê: «Ji mîrêcin».
** 6:13 Nav destnivîsarêd here qencda ev yek t'une: «Çimkî p'adşatî, qewat û r'ûmet yêd te ne, h'eta-h'etayê. Amîn».
* 6:17 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Serê xwe r'ûn[f] ke», çawa nîşana şayîyê.

xirab nakin û diz jî derevenakin
nadizin. 21 Çimkî xizna te k’îde-
rê be, dilê te jî wê li wê derê be.

### Ç’ira bedenê
*(Lûqa 11:34-36)*

22 Ç’ira bedenê ç’e’v e. Heger
ç’e’vê te p’ak e, t’emamîya bedena
teyê r’onayî be. 23 Lê heger ç’e’vê
te xirab e, t’emamîya bedena teyê
te’rî be. Awa heger ew r’onaya ku
nav teda ye te’rî ye, te’rî wê çiqas
zêde be!

### Xwedê û hebûka[f] dinyayê
*(Lûqa 16:13)*

24 T’u kes nikare du axar’a xu-
lamtîyê bike, çimkî yan wê h’îlê
wî ji yekî her’e û yê dinê h’iz bike,
yan jî wê qedirê yekî bigire û yê
dinê bêhurmet ke. Hûn nikarin
hin Xwedêr’a, hin jî hebûkêr’a[f]*
xulamtîyê bikin.

### Hînkirina derheqa xemkirinêda
*(Lûqa 12:22-31)*

25 Lema ez wer’a dibêjim, bona
e’mirê xwe xema nekin, ku hûnê
çi bixwin û çi vexwin, ne jî bona
bedena xwe, ku hûnê çi li xwe
kin. Ne e’mir ji xwarinê qîmettir
e û beden jî ji k’inca? 26 Dîna xwe
bidine teyredêd e’zmên. Ewana
ne dir’eşînin, ne didirûn û ne jî
e’mbarada dicivînin, lê Bavê weyî
E’zmana r’isqê wan digihîne. Ne
hûn ji wan qîmettir in? 27 Îdî ji we
k’î dikare bi xemêd xwe deqekê
ser e’mirê xweda zêde ke?*

28 Û bona k’inca hûn çima
xem dikin? Dîna xwe bidine so-
sinêd çolê, çawa şîn dibin, ne
dixebitin û ne jî dir’êsin. 29 Lê
ez wer’a dibêjim, ku Silêman jî
li nava t’emamîya wê xêr-xizna
xweda mîna ji wan yekê xwe ne-
kir. 30 Heger gîhayê çolê, ku îro
heye û sibê davêjine nava êgir,
Xwedê usa dixemilîne, lê çiqas
zêde wê li we ke, kêmbawerno?
31 Îdî xem nekin û nebêjin: ‹Emê
çi bixwin?› yan: ‹Çi vexwin?› yan
jî: ‹Çi li xwe kin?› 32 P’ûtp’arist li
pey wan h’emû tişta dik’evin, lê
Bavê weyî E’zmana zane ku hûn
h’ewcê wan h’emû tişta ne. 33 Lê
berê pêşin li P’adşatîya[f] Xwedê
biger’in û bikin ku r’astîya Wî
biqedînin û ew h’emûyê wer’a

* 6:24 Xeber bi xeber aha ye: «Mamon». Me’na vê ev e: Malê dinê, p’ere, dewletîya vê dinê.

* 6:27 Aha jî tê fe’mkirinê: «Bihustekê li ser bejina xwe dirêj ke».

bêne dayînê. 34 Îdî bona r'oja si-
bê xema nekin, çimkî r'oja sibê
wê bona xwe xema bike. Xemêd
r'ojê besî wê ne.

### Hînkirina derheqa lomekirinêda[f]

*(Lûqa 6:37-38, 41-42)*

7 1 Loma nekin, ku lome[f] li we
nebin. 2 Hûn çi loma bikin,
ew lome jî wê li we bibin û hûn
bi çi çapê bipîvin, bi wê çapê jî
wer'a wê bê pîvanê. 3 Tu çima
qirşikê ç'e'vê birê xweda dibînî,
lê k'êranê ç'e'vê xweda nabînî?
4 Yan jî çawa tu dikarî bêjî birê
xwe: ‹Bihêle ku ez qirşik ji ç'e'vê
te derxim›, lê va ye k'êran ç'e'vê
teda heye? 5 Dur'û! Pêşîyê k'êra-
nê ç'e'vê xwe derxe. Paşê tê qenc
bibînî ku çawa qirşik ji ç'e'vê birê
xwe derxî.

6 Tiştê buhurtî nedine sa û ne jî
dur'êd[f] xwe bavêjine ber beraza.
Heger na, berazê wan bin nigêd
xweda p'êpes kin û seyê jî veger'in
we bidir'înin.

### Bixwazin, biger'in, derî xin

*(Lûqa 11:9-13)*

7 Bixwazin hûnê bistînin, bige-
r'in hûnê bibînin, derî xin wê ber
we vebe. 8 Çimkî k'î ku dixwaze
distîne, k'î ku diger'e dibîne û
k'î ku derî dixe ber vedibe. 9 Ji
we k'îjan e ew meriv, ku kur'ê
wî nan jê bixwaze, ew kevir bidê?
10 Yan jî me'sî bixwaze, ew me'r
bidê? 11 Hûn ku xirab in, zanin
tiştêd qenc bidine zar'êd xwe, lê
Bavê weyî E'zmana wê çiqas tiştêd
qenc bide ewêd ku ji Wî dixwazin.

### Qanûna zêr'

12 Her çi ku hûn dixwazin meriv
bona we bikin, hûn jî usa wana-
r'a bikin. Ev e me'na hînkirina
Qanûnê û p'êxembera.

### Derê teng

*(Lûqa 13:24)*

13 Derê tengr'a bik'evine hindur',
çimkî fire ye ew derî û ber e ew
r'îya ku dibe berbi undabûnê û
gelek in ewêd ku wêda diçin. 14 Lê
gelekî teng e ew derî û ze'met e ew
r'îya ku dibe berbi jîyînê û hindik
in ewêd ku wê r'êyê dibînin.

### Dar û berê wê

*(Lûqa 6:43-45)*

15 H'evza xwe ji p'êxemberêd
derew bikin. Ewê bi p'ostê pêz
bêne cem we, lê hindur'va gurêd
p'er'anî ne. 16 Hûnê wana ji berêd
wan nas bikin. Gelo kesek ji stirîya
tirîya diçine, yan jî ji dir'îya hêjî-
ra? 17 Dara qenc berê qenc dide, lê

dara xirab berê xirab dide. 18 Dara
qenc nikare berê xirab bide, ne jî
dara xirab dikare berê qenc bide.
19 Her dara ku berê qenc nade tê
bir'în û avîtinê nava agir. 20 Awa
hûnê wana ji kirêd wan nas bikin.

### K'î hêjayî P'adşatîya E'zmana ye

*(Lûqa 13:26-27)*

21 Ne ku ewê Minr'a dibêje:
‹Xudan! Xudan!› wê bik'eve P'ad-
şatîya E'zmana, lê ewê bik'evê, yê
ku e'mirê Bavê Minî E'zmana
diqedîne. 22 Wê R'ojê gelekê Min-
r'a bêjin: ‹Xudan! Xudan! Ne me
bi navê Te p'êxembertî[f] kirin û bi
navê Te cin[f] derxistin û bi navê
Te gelek k'eremet kirin?› 23 Hingê
Ezê aşkere wanr'a bêjim: ‹Ji Min
dûr k'evin, neheqno! Min hûn t'u
car nas nekirine›.

### Mala yê serwaxt û mala yê bêfe'm

*(Lûqa 6:47-49)*

24 Awa k'î ku van gotinêd Min
dibihê û wan diqedîne, ew mîna
merivekî serwaxt e, ku mala xwe
ser kêvir çêkir. 25 Baran barî, ba û
lêyî[f] r'abûn, wê malê xistin, lê ew
mal hilneşîya, çimkî h'îmê wê ser
kêvir bû. 26 Lê k'î ku van gotinêd
Min dibihê û naqedîne, ew mîna
merivekî bêfe'm e, ku mala xwe
ser qûmê çêkir. 27 Baran barî, ba
û lêyî r'abûn, wê malê xistin û
ew mal hilşîya, lap wêran bû çû».

### H'ukumê Îsa

28 Gava Îsa ev gotinêd Xwe ser
hevda anî, e'lalet ser hînkirina Wî
zendegirtî[f] man, 29 çimkî Ewî mîna
yekî xweyîh'ukum ew hîn dikirin,
ne ku mîna qanûnzanêd wan.

### Îsa yekî ji k'otîbûnê[f] paqij dike

*(Marqos 1:40-45; Lûqa 5:12-16)*

**8** 1 Paşê Îsa ji ç'îyê hate xwarê,
e'laleteke giran da pey Wî çû.
2 Hingê yekî k'otî[f] hat xwe avîte
ber Wî û gotê: «Xudan! Heger
bixwazî, Tu dikarî min paqij kî*».
3 Îsa destê Xwe dirêj kirê lê k'et
û gotê: «Ez dixwazim. Paqij be!»
Û destxweda ew ji k'otîbûnê paqij
bû. 4 Hingê Îsa jêr'a got: «Binihêr'e,
t'u kesîr'a tiştekî nebêjî, lê her'e
xwe nîşanî k'ahîn ke û h'edîya
ku Mûsa[f] t'emî daye bide, wekî
h'emûyar'a bibe şe'detî».

---

* 8:2 Li gora Qanûna[f] Mûsa[f] merivêd k'otî h'eram[f] bûn. Derheqa merivêd k'otîda van serîya bixûnin: Qanûna K'ahîntîyê 13-14.

### Îsa xulamê sersedekî[f] qenc dike

*(Lûqa 7:1-10; Yûh'enna 4:43-54)*

5 Gava Îsa k'ete Kefernahûmê,
sersedek[f] hate cem Wî, hîvî jê kir
û gotê: 6 «Xudan, xulamê min
şilûşe't malda p'aldaye, gelekî
cefê dibîne». 7 Îsa gote wî: «Ezê
bêm wî qenc kim». 8 Sersed lê
veger'and û gotê: «Xudan, ez ne
hêja me ku Tu bêyî mala min.
Lê t'enê xeberekê bêje û xulamê
minê bi wê xeberê qenc be. 9 Ez
xwexa jî merivekî bin h'ukumda
me û bin destê minda jî esker
hene. Ez yekîr'a dibêjim: ‹Her'e›,
diçe, yekî dinr'a dibêjim: ‹Were›,
tê û xulamê xwer'a dibêjim: ‹Vî
tiştî bike›, dike».
10 Gava Îsa ev yek bihîst, zen-
degirtî ma û gote ewêd ku pey wî
diçûn: «Ez r'ast wer'a dibêjim,
Îsraêlêda jî Min bawerîke[f] aha
yekîda nedîtîye. 11 Ez wer'a di-
bêjim, ku gelekê ji r'ohilatê û ji
r'oavayê bên û şayîya P'adşatîya
E'zmanada t'evî Birahîm, Îshaq û
Aqûb r'ûnên, 12 lê zar'êd P'adşa-
tîyê wê bêne avîtinê te'rîya derva.
Li wir wê bibe girî û ç'irke-ç'irka
dirana». 13 Paşê Îsa sersedr'a got:
«Her'e! Bira li gora bawerîya te
ter'a be». Û wê demê xulamê wî
qenc bû.

### Îsa gelek nexweşa qenc dike

*(Marqos 1:29-34; Lûqa 4:38-41)*

14 Gava Îsa hate mala Petrûs,
xwesîya wî t'ayêda p'aldayî dît.
15 Ewî destê Xwe da destê wê
û t'ayê jê ber'da, r'abû berdestî
Wîr'a kir.
16 Gava r'o çû ava, gelek ci-
nak'etî anîne cem Wî. Ewî bi
xeberê r'uh'êd[f] h'eram derxistin
û h'emû nexweş qenc kirin. 17 Ev
aha bû, ku ew gotina bi zarê Îşa-
ya p'êxember bê sêrî, ku nivîsar
e: «Ewî nexweşîyêd me hildan û
êşêd me birin»*.

### Cabdarîya yêd ku pey Îsa diçin

*(Lûqa 9:57-62)*

18 Çaxê Îsa e'lalet dora Xwe dît,
e'mir li şagirta kir ku her'ine wî
berî golê. 19 Hingê qanûnzanek
nêzîkî Wî bû û gotê: «Dersdar[f]!
Tu k'uda jî her'î, ezê pey Te bêm».
20 Îsa gote wî: «R'ûvîyar'a qul he-
ne, teyredêd e'zmênr'a jî hêlîn, lê
bona Kur'ê[f] Mêriv cîk t'une ku
serê Xwe lê dayne».

---

* 8:17 Îşaya 53:4.

21 Şagirtekî Wî gotê: «Xudan!
Îzinê bide min ku ez pêşîyê he-
r’im bavê xwe defin kim». 22 Lê
Îsa jêr’a got: «Tu pey Min were.
Bira mirî mirîyê xwe defin kin».

### Îsa firtonê[f] diseqir’îne

*(Marqos 4:35-41; Lûqa 8:22-25)*

23 Gava Îsa k’ete qeyikê, şagirtêd
Wî t’evî Wî çûn. 24 Nişkêva firto-
neke[f] mezin li golê r’abû, usa ku
qeyik pêlada unda dibû. Lê Ew
r’azayî bû. 25 Hingê şagirt nêzîkî
Wî bûn, ew h’işyar kirin û gotinê:
«Xudan! Me xilaz ke! Em unda
dibin!» 26 Îsa gote wan: «Çima hûn
usa tirsonek in kêmbawerno?» Wê
demê r’abû li bayê û golê hilat[f] û
h’emû tişt seqir’în. 27 Merivêd t’evî
Wî e’cêbmayî man û gotin: «Ev k’î
ye, ku ba û gol jî êlimî[f] Wî dibin?»

### Îsa du cinak’etîya qenc dike

*(Marqos 5:1-20; Lûqa 8:26-39)*

28 Gava Îsa derbazî wî alîyê t’op-
raxêd Gerdarînê bû, du cinak’etî ji
nav gor’istana derk’etin û r’astî Wî
hatin. Ew usa har bûn, ku kesek
nikaribû wê r’êr’a derbaz bûya.
29 Wana kire qîr’în û gotin: «Tu
çi ji me dixwazî, Kur’ê Xwedê?
Ji wext zûtir hatî cefê bidî me?»
30 Ji wana wêdatir sûrîkî berazayî
mezin diç’êrîya. 31 Cina r’eca ji
Wî kir û gotinê: «Heger Tu me
derdixî, bihêle em her’in bik’evine
nava sûrîyê beraza». 32 Ewî gote
wan: «Her’in!» Ew jî derk’etin
çûn k’etine nava beraza û ew sûrî
pêva jorda r’evî, xwe ji kendêlda
avîtine golê û xeniqîn. 33 Berazvan
r’evîn çûne bajêr, çi ku hatibû serê
cinak’etîya gotin. 34 Hingê h’emû
merivêd bajêr derk’etine pêşîya Îsa
û gava Ew dîtin, r’eca ji Wî kirin
ku ji e’rdê wan her’e.

### Îsa şilûşe’tekî qenc dike û gunêd wî dibaxşîne

*(Marqos 2:1-12; Lûqa 5:17-26)*

**9** 1 Îsa k’ete qeyikê paşda vege-
r’îya hate bajarê Xwe*. 2 Wê
derê şilûşe’tek nivînêda p’aldayî
anîne cem. Gava Îsa bawerîya
wan dît, gote yê şilûşe’t: «La-
wo, ser xwe be! Gunêd te hatine
baxşandinê».
3 Hingê ji qanûnzana hinek
nav xweda fikirîn: «Eva nigê Xwe
Xwedêr’a davêje»*. 4 Fikirêd wan

* 9:1 Li gora Metta 4:13, bajarê Wî Kefernahûm bû.

* 9:3 Aha jî tê fe’mkirinê: «Eva k’ifirîya dike» yan «Eva navê Xwedê bêhurmet dike».

Îsava e’yan bûn û got: «Hûn çima
dilê xweda tiştê xirab difikirin?
5 K’îjan r’ih’et tê gotinê: ‹Gunêd
te hatine baxşandinê›, yan ‹R’abe
û biger’e›? 6 Lê wekî hûn bizanibin
ku h’ukumê Kur’ê Mêriv heye li
ser dinê guna bibaxşîne», hingê
gote yê şilûşe’t: «R’abe nivîna
xwe hilde, her’e mala xwe!» 7 Ew
jî r’abû çû mala xwe. 8 Gava e’la-
letê ev yek dît, xofê ew girtin û
şikirî dane Xwedê, ku ev h’ukum
daye meriva.

### Îsa gazî Metta dike

*(Marqos 2:13-17; Lûqa 5:27-32)*

9 Îsa ji wir pêşda çû, yekî ku
navê wî Metta bû li cîyê xerc-
hildanê r’ûniştî dît û gotê: «Pey
Min were». Ew jî r’abû pey Îsa çû.
10 Gava Îsa mala Mettada ser
sifrê r’ûniştibû, gelek xercgir û
gunek’arêd[f] din hatin t’evî Îsa
û şagirtêd Wî r’ûniştin. 11 Çaxê
fêrisîya ev yek dît, şagirtêd Wîr’a
gotin: «Çima Dersdarê we t’evî
xercgir û gunek’ara dixwe û vedi-
xwe?» 12 Lê gava Îsa ev yek bihîst
wanar’a got: «Saxlem ne h’ewcê
h’ekîm in, lê nexweş. 13 Her’in
me’na van xebera hîn bin: ‹Ez
r’e’mê dixwazim, ne ku qurba-
nê[f]›*. Ez nehatime gazî yêd r’ast
kim, lê gazî gunek’ara».

### Pirsa r’ojîgirtinê

*(Marqos 2:18-22; Lûqa 5:33-39)*

14 Hingê şagirtêd Yûh’enna ha-
tine cem Wî û gotinê: «Çima em
û fêrisî gelek cara r’ojî digirin, lê
şagirtêd Te r’ojî nagirin?» 15 Îsa
gote wan: «Qet dibe ku xwendî-
yêd de’watê şînê bikin, h’eta ku
ze’va t’evî wan e? Lê r’ojê bên,
gava ze’va ji wan bê hildanê, hingê
wê r’ojî bigirin.
16 Kesek pê p’arç’ê nû k’inca
kevin p’îne nake, çimkî p’arç’ê
k’inca kevinva dirûtî wê zorê li
k’inca kevin bike û cîyê qelişî wê
hê li ber hev her’e. 17 Ne jî şerava
nû dikine meşkêd kevin. Heger
usa be, meşkê bit’eqin, şeravê
bir’ije û meşkê jî xirab bin. Lê
şerava nû dikine meşkê nû û her
du jî têne xweyîkirinê».

### Qîzika mirî
### û k’ulfeteke nexweş

*(Marqos 5:21-43; Lûqa 8:40-56)*

18 Gava Îsa hê ev yeka wana-
r’a digot, hema hingê serwêrek
hat xwe avîte ber nigê Wî û go-
tê: «Qîza min hêja mirîye. Lê

---

* 9:13 Hosêya 6:6.

were destê xwe dayne ser wê û
ewê bijî».
19 Îsa r'abû t'evî şagirtêd Xwe
da pey wî çû. 20 Û va k'ulfeteke
nexweş, ku donzdeh salêd wê
bûn ser xûnê vebibû, piştêva
hat û r'îşîyêd k'incê Îsa k'et.
21 Ewê nêta xweda danîbû: «He-
ger ez t'enê k'incê Wî k'evim,
ezê qenc bim». 22 Îsa ser milê
Xweva veger'îya ew dît û gotê:
«E'vdê! Ser xwe be! Bawerîya
te tu qenc kirî». Û wê demê ew
k'ulfet qenc bû.
23 Gava Îsa gihîşte mala serwêr,
dîna Xwe dayê, wê qar'e-qar'a
e'laletê ye û bilûrvan jî zelûlî lê
dixin 24 û gote wan: «Derk'evin!
Qîzik nemirîye, lê hênijîye». Wa-
na qerfê[f] xwe Pê dikirin. 25 Lê
gava cime't derxistine derva, Îsa
çû hindur' destê wê girt û qîzik
r'abû ser xwe. 26 Eva deng-be'sa
t'emamîya wî welatîda bela bû.

### Îsa du kora qenc dike

27 Gava Îsa ji wir derk'et çû, du
merivêd kor dane pey Wî kirine
qîr'în û gotin: «Kur'ê[f] Dawid!
Me were r'e'mê!»
28 Gava ku gihîştine malê, ew
her du kor hatine cem Wî. Îsa
ji wan pirsî û got: «Hûn bawer
dikin, ku Ez dikarim alî we bi-
kim?» Wana got: «Belê Xudan».
29 Hingê Îsa destê Xwe da ç'e'vêd
wan û got: «Li gora bawerîya we
wer'a be». 30 Wê demê ç'e'vêd wan
vebûn. Îsa h'işk t'emî li wan kir
û got: «Haş ji xwe hebin, ku t'u
kes vê yekê neh'ese». 31 Lê ew
derk'etin, t'emamîya wî welatîda
nav û dengê Wî bela kirin.

### Îsa lal qenc dike

32 Çaxê ewana derk'etin çûn,
hineka cinak'etîkî lal anî cem
Îsa. 33 Gava Ewî cin derxist, yê
lal xeber da. E'lalet e'cêbmayî ma
û got: «Li Îsraêlê jî tiştekî aha t'u
car neqewimîye». 34 Lê fêrisîya
got: «Ew bi h'ukumê serwêrê cina
cina derdixe».

### Gunê Îsa li cime'tê tê

35 Îsa h'emû gund û bajara dige-
r'îya, k'inîştêd wanda hîn dikir,
Mizgînîya P'adşatîyê dannasîn
dikir û li nav cime'tê h'emû cû-
r'e nexweşî qenc dikirin. 36 Gava
Ewî e'lalet dît, gunê Wî li wan
hat, çimkî ewana mîna pezê bê
şivan, ber'edayî û belabûyî bûn.
37 Hingê Ewî şagirtêd Xwer'a
got: «Nandirûn[f] gelek e, lê p'ale
hindik in. 38 Awa hîvî ji Xweyê
dirûnê bikin, wekî p'ala nandi-
rûna Xwer'a bişîne».

### Navêd her donzdeh şandîya[f]

*(Marqos 3:13-19; Lûqa 6:12-16)*

**10** 1 Îsa her donzdeh şagirt gazî
cem Xwe kirin û h’ukum
da wan ku r’uh’êd h’eram derxin,
h’emû êş û nexweşîya jî qenc kin.
2 Navê her donzdeh şandîya[f] ev in:
Yê pêşin Şimh’ûn, ku Petrûs tê
gotinê û birê wî Endrawis, Aqû-
bê Zebedî û birê wî Yûh’enna,
3 Fîlîpo û Bertolomeyo, T’ûma û
Mettayê xercgir, Aqûbê[f] Halfawo
û Tedayo* 4 Şimh’ûnê welatp’a-
rist[f]* û Cihûdayê Îsxeryotî[f], ewê
ku nemamîya[f] Îsa kir.

### Şandina her donzdeha

*(Marqos 6:7-13; Lûqa 9:1-6)*

5 Îsa ev her donzdeh şandin,
t’emî li wan kir û got: «Neçine
nava necihûya û nek’evine bajarêd
Sameryayê[f]. 6 Lê pêşîyê her’ine
nav pezêd mala Îsraêlêye unda-
bûyî. 7 Gava hûn her’in, dannasîn
kin û bêjin: ‹P’adşatîya E’zmana
nêzîk bûye›. 8 Nexweşa qenc kin,
mirîya sax kin, k’otîya paqij kin,
cina derxin. We bêheq standîye,
bêheq jî bidin. 9 Li ber pişta xweda
t’u tiştî hilnedin: Ne zêr’, ne zîv,
ne sifir, 10 ne tûrik bona r’ê, ne
du dest kiras, ne çarix, ne şivdar,
çimkî p’ale hêjayî r’isqê xwe ye.
11 Çi bajar yan gundê ku hûn
bik’evinê, maleke hêja bibînin û
li wir bimînin, h’eta ku hûn ji wir
diçin. 12 Gava hûn her’ine malê,
silavê bidine wê û bêjin: ‹E’dila-
yî vê malêr’a›. 13 Û heger ew mal
hêja ye, bira silava we li ser wê
be, lê heger ne hêja ye, bira silava
we li we veger’e. 14 Lê k’î ku we
qebûl neke û guhdarîya xeberêd
we neke, gava ku hûn ji wê ma-
lê, yan jî ji wî bajarî derdik’evin,
t’oza nigêd xwe dawşînin. 15 Ez
r’ast wer’a dibêjim, R’oja[f] Axretê
h’alê welatê Sodom[f] û Gomorayê
wê ji ya wî bajarî çêtir be.

### Mîna pêz li nav gura

*(Marqos 13:9-13; Lûqa 21:12-17)*

16 Va Ez we dişînim çawa pez nava
gura. Îdî mîna me’ra serwaxt bin û
mîna kevotka dilsax. 17 Lê h’evza
xwe ji meriva bikin, ewê we bibine
ber dîwana û k’inîştêd xweda we
bidine ber qamçîya. 18 R’ûyê Minda
wê we bibine ber welîya[f] û p’adşa,

---

* 10:3 Nav hinek destnivîsarada dewsa «Tedayo» «Lêwî[f]» heye, yan jî «Lêwî ku Tedayo hate bernavkirinê».

* 10:4 Aha jî tê fe’mkirinê: «Şimh’ûnê ji Qananê».

ku hûn ber wan û necihûya şe'de-
tîyê bidin. 19 Lê çaxê we bibine ber
dîwana, xem nekin ku hûnê çawa
yan çi xeber din. Tiştêd ku hûnê
xeber din, wê demê wer'a wê bê
dayînê. 20 Çimkî ne ku hûnê xeber
din, lê R'uh'ê Bavê weyî ku nava
weda ye wê xeber de.

21 Bira wê birê xwe bide kuşti-
nê, bavê jî kur'ê xwe û zar' jî wê
himberî dê û bavê xwe r'abin û
wan bidine kuştinê. 22 Bona navê
Min hûnê ber ç'e'vê h'emûya r'eş
bin. Lê k'î ku h'eta xilazîyê teyax
ke ewê xilaz[f] be. 23 Û gava nav vî
bajarîda we bizêrînin, bir'evine
bajarekî din. Ez r'ast wer'a di-
bêjim, h'eta hatina Kur'ê Mêriv,
hûn h'emû bajarêd Îsraêlê pêr'a
nagihînin biger'in.

24 Şagirt ji dersdarê xwe ne
mestir e û ne jî xulam ji axayê
xwe. 25 Besî şagirt e, wekî mîna
dersdarê xwe be û xulam jî mîna
axayê xwe be. Heger malxê malêr'a
‹Belzebûl[f]› gotin, hingê neferêd
wîr'a wê çi bêjin?

### Bizanibin ku tirsa we ji k'ê hebe

*(Lûqa 12:2-7)*

26 Awa îdî t'u car ji meriva
netirsin. Tiştekî dizîva t'une ku
derneyê û ne jî veşartî ku k'ifş
nebe. 27 Çi ku Ez te'rîyêda wer'a
dibêjim, ewî nav r'onayêda bêjin
û çi ku hûn guhada dibihên, ser
bana bikine dengî. 28 Û ji wan
netirsin yêd ku bedenê dikujin,
lê nikarin r'uh' bikujin. Lê hûn ji
Wî bitirsin, Yê ku dikare r'uh' û
bedenê ce'nimêda unda ke. 29 Ne
du ç'ivîk bi diravekî çarqur'ûşê
têne firotanê? Lê yek jî ji wan bêyî
e'mirê Bavê we nak'eve e'rdê. 30 Lê
çi li we dik'eve, her t'êlekî p'or'êd
serê we jimartî ne. 31 Îdî netirsin.
Hûn ji gelek ç'ivîka qîmettir in.

### Îqrar[f] û înk'arkirina[f] Îsa

*(Lûqa 12:8-9)*

32 K'î ku Min ber meriva îqrar[f]
ke, Ezê jî wî ber Bavê Xweyî E'z-
mana îqrar kim. 33 Lê k'î ku Min
ber meriva înk'ar[f] ke, Ezê jî wî ber
Bavê Xweyî E'zmana înk'ar kim.

### Şûr û e'dilayî

*(Lûqa 12:51-53; 14:26-27)*

34 Nefikirin ku Ez hatime di-
nê e'dilayîyê bînim. Ez nehatim
e'dilayîyê bînim, lê şûr. 35 Çimkî
Ez hatim kur' ji bavê, qîzê ji dê
û bûkê ji xwesîyê biqetînim 36 û
dijminêd mêriv wê ji mala wî bin.*

* 10:35-36 Mîxa 7:6.

37 Ewê ku bavê xwe yan dîya xwe
ji Min ze'ftir h'iz dike, ne hêjayî
Min e. Ewê ku kur'ê xwe yan qî-
za xwe ji Min ze'ftir h'iz dike, ne
hêjayî Min e. 38 Ewê ku xaçê[f] xwe
hilnade pey Min nayê, ew ne hêjayî
Min e. 39 K'î e'mirê xwe biger'e,
ewê unda ke, lê k'î e'mirê xwe bona
Min unda ke, ewê bibîne.

### Heqstandin

*(Marqos 9:41)*

40 Ewê ku we qebûl dike, Min
qebûl dike û ewê ku Min qebûl
dike, Yê ku Ez şandime qebûl
dike. 41 Ewê ku p'êxember qebûl
dike çawa p'êxember, wê heqê p'ê-
xember bistîne û ewê ku merivekî
r'ast qebûl dike çawa merivê r'ast,
wê heqê yêd r'ast bistîne. 42 Û ewê
ku t'ase ava sar jî dide yekî ji van
biç'ûka, bona xatirê wê yekê ku
ew şagirtê Min e, Ez r'ast wer'a
dibêjim, ewê t'u car heqê xwe
unda neke».

### Îsa caba pirsa Yûh'ennayê nixumdar dide

*(Lûqa 7:18-35)*

11 1 Çaxê Îsa t'emîyêd ku dane
her donzdeh şagirtêd Xwe
xilaz kirin, ji wî cîyî çû nav bajarêd
wan, ku hîn ke û dannasîn ke.
2 Gava Yûh'enna kelêda bona
şixulêd Mesîh bihîst, çend şa-
girtêd* xwe şandine cem Wî 3 û
jê pirsîn: «Tu Ew î, Yê ku gerekê
bihata, yan em hîvîya yekî din
bin?» 4 Îsa caba wan da û got:
«Her'in, çi ku hûn dibînin û di-
bihên Yûh'ennar'a bêjin. 5 Kor
dibînin, seqet diger'in, k'otî paqij
dibin, ker' dibihên, mirî r'adibin û
feqîrar'a jî Mizgînî tê dayînê. 6 Û
xwezî li wî, ku ji Min p'işk nabe».
7 Gava ewana çûn, Îsa bona
Yûh'enna e'laletêr'a destpêkir
got: «Hûn derk'etine ber'îyê çi
bibînin? Qamîşekî[f] ku ji bayê
dih'eje? 8 Yan hûn derk'etin çi
bibînin? Merivekî k'incê nazik[f]
li xwe kirî? Ne ewêd ku k'incê
nazik li xwe dikin, ew malêd
p'adşada ne? 9 Yan hûn derk'etin
çi bibînin? P'êxemberekî? Belê ez
wer'a dibêjim, ji p'êxemberekî jî
mestir e. 10 Eva ew e, bona k'îjanî
nivîsar e: ‹Va ye Ezê qasidê Xwe
pêşîya Teva bişînim. Ewê r'îya
Te pêşîya Teva hazir ke›*. 11 Ez
r'ast wer'a dibêjim, ji nava ewêd
ku ji k'ulfeta dinê k'etine, t'u kes

* 11:2 Nav hinek destnivîsarada dewsa «çend şagirt» «du şagirt» heye.
* 11:10 Malaxî 3:1.

ji Yûh’ennayê nixumdar mestir
nebûye. Lê P’adşatîya E’zmana-
da yê herî biç’ûk ji wî mestir e.
**12** Ji r’ojêd Yûh’ennayê nixumdar
h’eta niha P’adşatîya E’zmana bi
zorbetîyê tê h’icûmkirinê û yêd
zorbe dikin ku zeftî xwe kin*.
**13** Çimkî h’emû p’êxembera û
Qanûnê h’eta Yûh’enna bona
P’adşatîya E’zmana şe’detî dan*.
**14** Û heger hûn dixwazin vê yekê
qebûl kin, ew e Êlyasê[f] ku ge-
rekê bihata*. **15** Guhê k’ê heye
bira bibihê.

**16** Niha Ez vî nisilî mîna çi bi-
şibînim? Ew mîna wan zar’a ne,
yêd ku bazarada r’ûniştî ne, gazî
hevalêd xwe dikin **17** û dibêjin: ‹Me
bona we zur’nê xist, hûn ner’eqi-
sîn û bona we beyt’[f] gotin, we şîn
nekir›. **18** Yûh’enna hat, ne dixwar,
ne vedixwar û digotin: ‹Cin wîda
heye›. **19** Kur’ê Mêriv hat, dixwe
û vedixwe, bona Wî dibêjin: ‹Va
Ew yekî pey xwarin û vexwarinê
k’etî ye, dostê xercgir û gunek’ara
ye›. Lê serwaxtî[f] bi e’melêd* xwe
k’ifş dibe ku ew r’ast e».

### Bajarêd nebawer

*(Lûqa 10:13-15)*

**20** Hingê Îsa destpêkir li wan
bajara hilat, k’îjanada gelek k’e-
remetêd Wî qewimîbûn, çimkî
ew ji gunekirinê veneger’îyan.
**21** «Wey li te Xorazîn! Wey li te
Beytsayda! Heger ew k’eremetêd
ku nava weda bûn, Sûr û Saydêda
bibûna, ewanayê zûva bi k’urx[f] û
k’ozîyê[f] t’obe[f] bikirana. **22** Lê Ez
wer’a dibêjim, R’oja Axretê, h’alê
Sûrê û Saydê wê ji h’alê we çêtir
be. **23** Û tu Kefernahûm, te t’irê
tê h’eta e’zman bilind bî? Lê tê
h’eta dîyarê[f] mirîya her’î xwarê!
Heger ew k’eremetêd ku nav teda
qewimîn Sodomêda biqewimîyana,
ewê h’eta r’oja îroyîn bima. **24** Lê
Ez wer’a dibêjim, R’oja Axretê
h’alê welatê Sodomê wê ji h’alê
te çêtir be».

### Werin cem min û hêsa bin

*(Lûqa 10:21-22)*

**25** Hingê Îsa got: «Şikir navê Te
be Bavo, Xudanê e’rd û e’zman,

* 11:12 Aha jî tê fe’mkirinê: «P’adşatîya E’zmana bi qewatê pêşda diçe û yêd zorbe dest dixin».

* 11:13 Aha jî tê fe’mkirinê: «Çimkî h’emû p’êxembera û Qanûnê h’eta Yûh’enna p’êxembertî kirin».

* 11:14 Malaxî 4:5.

* 11:19 Nav hinek destnivîsarada dewsa «e’mel» «zar’» heye.

ku Te ev tişt ji zana û bîlana[f] ve-
şartin û li ber zar'a vekirin. 26 Belê
Bavo, çimkî aha li Te xweş hat.

27 Her tişt ji Bavê Min Minr'a
hatîye dayînê. Kesek Kur' nas
nake pêştirî Bavê û kesek Bavê
nas nake pêştirî Kur' û k'îjana-
r'a ku Kur' bixwaze wanva Bavê
bide naskirinê.

28 Werine cem Min h'emûyêd
westîyayî û bargiran û Ezê r'i-
h'etîyê bidime we. 29 Nîrê Min
hildine ser xwe û ji Min hîn bin,
çimkî Ez şkestî me û dilmilahîm
im û hûnê xwer'a r'ih'etîyê bibî-
nin. 30 Çimkî nîrê Min r'ih'et e
û barê Min sivik e».

### Pirsa r'oja[f] şemîyê

*(Marqos 2:23-28; Lûqa 6:1-5)*

**12** 1 Hingê Îsa r'ojeke şemîyê
nava zevîyar'a derbaz bû,
şagirtêd Wî bir'çî bûn û dest-
pêkirin simbilêd genim çinîn
û xwarin. 2 Gava fêrisîya ev yek
dît, Wîr'a gotin: «Hela binihêr'e,
şagirtêd Te tiştê necayîzî r'oja[f]
şemîyê dikin».

3 Îsa wanar'a got: «We ne-
xwendîye ku Dawid çi kir, gava
ew û yêd pêr'a bir'çî bûn? 4 Ne
ew k'ete Xana[f] Xwedê û nanê[f]
Xwedêr'a dayî xwar, ew nan
ne wîr'a cayîz bû bixwara, ne
jî ewêd t'evî wîr'a, lê t'enê k'a-
hînar'a?* 5 Yan jî we Qanûnêda
nexwendîye, ku k'ahîn r'ojêd
şemîyê p'aristgehêda şemîyê
dih'er'imînin û dîsa bê sûc in?
6 Lê Ez wer'a dibêjim, ku li vir
Yekî ji p'aristgehê mestir heye.
7 Heger we zanibûya me'na vê
xeberê çi ye ku tê gotinê: ‹Ez r'e'-
mê dixwazim, ne ku qurbanê›*,
hingê weyê yêd bêsûc gunek'ar
nekirana. 8 Çimkî Kur'ê Mêriv
Xudanê r'oja şemîyê ye».

### Îsa r'oja şemîyê merivê ku destê wî k'işîyabû qenc dike

*(Marqos 3:1-6; Lûqa 6:6-11)*

9 Îsa ji wir r'abû çû, hate k'i-
nîşta wan. 10 Merivek li wir hebû,
ku destê wî k'işîyabû. Hineka
dixwest ku xeyba Îsa bikirana,
ji Wî pirsîn û gotinê: «Cayîz e
ku meriv r'oja şemîyê nexweşa
qenc bikin?»

11 Ewî jî wanar'a got: «Ew ji we
k'î ye, ku pezeke wî hebe û r'oja
şemîyê bik'eve ç'e'lê, wê negire
û dernexe? 12 Lê însan çiqas ji

---

* 12:4 Qanûna K'ahîntîyê 24:9; P'adşatî I, 21:1-6.

* 12:7 Hosêya 6:6.

pêz qîmettir e! Awa r'oja şemîyê
qencîkirin cayîz e». 13 Hingê wî
merivîr'a got: «Destê xwe dirêj
ke». Ewî jî dirêj kir û mîna destê
din qenc bû. 14 Lê fêrisî derk'etine
derva bona Îsa li hev şêwirîn ku
çawa Wî bidine kuştinê.

### Xulamê Xwedêyî bijartî[f]

15 Û gava Îsa pê h'esîya, ji wê
derê çû, gelek e'lalet jî pey Wî
çû. Ewî h'emû jî qenc kirin 16 û
t'emî da wan ku bona Wî nekine
dengî. 17 Eva aha bû ku ew gotina
bi zarê Îşaya p'êxember bê sêrî:

18 «Va ye xulamê Min, yê ku Min bijartîye[f]
û h'izkirîyê Minî ku Min begem kirîye.
Ezê R'uh'ê Xwe daynime ser Wî
û Ewê miletar'a heqîyê e'lam ke.
19 Ewê ne bik'eve h'ucetê, ne bike qar'e-qar'
û ne jî yekê dengê Wî meydanada bibihê.
20 Ew qamîşê p'erç'iqî hûr nake,
p'ilta diç'irûse vênasîne,
h'eta ku heqîyê bigihîne sêrî.
21 Û h'emû milet wê gumana xwe daynine ser navê Wî».*

### Îsa û Belzebûl

*(Marqos 3:20-30; Lûqa 11:14-23; 12:10)*

22 Hingê cinak'etîkî korî lal
anîne cem Wî û Ewî ew qenc
kir, usa ku ewî hin dît û hin jî
xeber da. 23 Û t'emamîya e'laletê
zendegirtî ma û got: «Gelo Ev e
kur'ê Dawid?»
24 Lê gava fêrisîya bihîst gotin:
«Eva bi h'ukumê serwêrê cina
Belzebûl cina derdixe».
25 Lê nêtêd dilê wan Îsava
e'yan bûn û wanar'a got: «Her
p'adşatîya ku nav wêda t'ifaq[f]
t'unebe wê wêran be û her bajar
yan mala ku li nava wêda t'ifaq
t'unebe ew namîne. 26 Heger mî-
rêcin xwexa xwe derdixe, ku usa
ye nava p'adşatîya wîda bêt'ifaqî
heye, îdî p'adşatîya wî wê çawa
bimîne? 27 Heger Ez bi h'ukumê
Belzebûl cina derdixim, lê yêd ku
pey we tên bi çi derdixin? Wekî
usa ye ewê bibine h'akimêd we.
28 Lê heger Ez bi h'ukumê R'uh'ê
Xwedê cina derdixim, îdî P'ad-
şatîya Xwedê gihîştîye we. 29 Yan
çawa yek dikare bik'eve mala
mêrxasekî û hebûka wî t'alan ke,
heger pêşîyê wî mêrxasî girênede?

* 12:18-21 Îşaya 42:1-4.

Gava girêda, hingê wê bikaribe
mala wî t'alan ke.
30 K'î ku ne t'evî Min e, miqabilî
Min e û k'î ku t'evî Min t'op nake,
bela dike. 31 Bona vê yekê Ez wer'a
dibêjim, her gune û gotinêd xirab
wê li meriva bêne baxşandinê, lê
ewê ku gotineke xirab miqabilî
R'uh' bêje, li wî nayê baxşandinê.
32 K'î tiştekî miqabilî Kur'ê Mêriv
bêje, wê bê baxşandinê, lê heger
yek hindava R'uh'ê Pîrozda bêje,
li wî nayê baxşandinê, ne vê dinê
ne jî wê dinê.

## Dar û berê wê

*(Lûqa 6:43-45)*

33 Heger dar qenc e, berê wê jî
qenc e, heger dar xirab e, berê wê
jî xirab e, çimkî dar ji berê xwe
tê naskirinê. 34 Ç'êjikêd me'ra!
Hûn çawa dikarin qenc xeber
din, heger hûn xirab in? Çimkî
dil çiva t'ijî ye zar jî ewê dibêje.
35 Merivê qenc, ji xizna xweye
qenc qencîyê derdixe, lê merivê
xirab, ji xizna xweye xirab xirabîyê
derdixe. 36 Ez wer'a dibêjim, R'oja
Axretê meriv bona her xebereke
p'ûç' ku xeber didin wê cabdar
bin. 37 Çimkî hûnê bi xeberêd
xwe bêsûc bin û bi xeberêd xwe
gunek'ar bin».

## K'eremetekê çawa nîşan dixwazin

*(Marqos 8:11-12; Lûqa 11:29-32)*

38 Hingê hineka ji qanûnzan û
fêrisîya Wîr'a gotin: «Dersdar! Em
dixwazin ku nîşanekê ji Te bibînin».
39 Ewî li wan veger'and û got: «Nisilê
xirab û xalifî[f] nîşanekê dixwaze,
lê jêr'a nîşaneke din nayê dayînê
pêştirî nîşana Ûnis[f] p'êxember.
40 Çawa ku Ûnis sê r'oj û sê şeva
zikê h'ûtda ma*, Kur'ê Mêriv jî
usa wê sê r'oj û sê şeva nava k'û-
rayîya e'rdêda bimîne. 41 Merivêd
Nînewayê[f] wê R'oja Axretê r'abin
û vî nisilî neheq kin, çimkî ewana
bi dannasînîya Ûnis ji gunekirinê
veger'îyan û va Yekî ji Ûnis mestir
li vir heye. 42 P'adşa Başûrê[f]* R'o-
ja Axretê wê r'abe vî nisilî neheq
ke, çimkî ewa ji serê dinê hat, ku
serwaxtîya Silêman bibihê û va ye
Yekî ji Silêman mestir li vir heye.

## Paşda hatina r'uh'ê h'eram

*(Lûqa 11:24-26)*

43 Çaxê r'uh'ê h'eram ji mêriv
dertê, cîyê bê av diger'e ku r'ih'etîyê

---

* 12:40 Ûnis 1:17.
* 12:42 P'adşati III, 10:1-13. Ew p'adşa ji Şeba E'rebistanê hate cem Silêman p'adşa.

bibîne. Lê gava nabîne, 44 hingê
ew dibêje: ‹Ez veger'ime wê mala
xweye ku jê derk'etime›. Gava ew
tê, dibîne wê mal vala, paqijkirî
û hevdayî ye. 45 Hingê diçe h'eft
cinêd dine ji xwe xirabtir jî tîne,
dik'evine wir dijîn. Û axirîya wî
merivî ji pêşîyê xirabtir dibe. Usa
jî wê bê serê vî nisilê xirab».

### Dê û birayêd Îsa

*(Marqos 3:31-35; Lûqa 8:19-21)*

46 Hê Ewî e'laletêr'a xeber dida,
va dîya Wî û birayêd Wî li derva
sekinîn, dixwestin t'evî Wî xeber
dana. 47 Yekî jêr'a got: «Va dîya Te
û birayêd Te derva ne û dixwazin
t'evî Te xeber din». 48 Ewî jî li wî
veger'and û gotê: «K'î ye dîya Min
û k'î ne birayêd Min?» 49 Hingê
destê Xwe dirêjî şagirtêd Xwe kir
û got: «Va ne dê û birayêd Min!
50 Çimkî k'î ku xwestina Bavê Minî
e'zmana bîne sêrî, ew e birê Min,
xûşka Min û dîya Min».

### Mesela t'oximr'eş[f]

*(Marqos 4:1-9; Lûqa 8:4-8)*

**13** 1 Wê r'ojê Îsa ji malê der-
k'et, li devê golê r'ûnişt.
2 Û haqas e'lalet hate cem Wî, ku
Ew k'erba k'ete qeyikê r'ûnişt û
t'emamîya e'laletê devê golê se-
kinî. 3 Ewî gelek tişt bi mesela ew
hîn kirin û got: «T'oximr'eş[f] r'abû
çû ku t'oxim bir'eşîne. 4 Gava di-
r'eşand, hinek ji wan k'etine devê
r'ê, teyrede hatin û ew xwarin.
5 Hinekêd din k'etine ser e'rdê
kevirî, ku li wir xwelî kêm bû. Ew
zû şîn bûn, çimkî telaşê xwelîyê
ne k'ûr bû. 6 Lê çaxê te'v derk'et,
ew ç'ilmisîn û çimkî r'awêd wan
t'unebûn, h'işk bûn. 7 Hinekêd din
k'etine nava stirîya, stirî r'abûn û
ew xeniqandin. 8 Lê hinekêd din jî
k'etine nava e'rdê qenc û ber dan,
yê sed, yê şêst û yê sî. 9 Guhê k'ê
heye bira bibihê!»

### Îsa çima bi mesela xeber dide

*(Marqos 4:10-12; Lûqa 8:9-10)*

10 Wê gavê şagirtêd Wî nêzîk
bûnê û gotinê: «Çima bi mesela
Tu wanar'a xeber didî?» 11 Ewî li
wan veger'and û got: «Wer'a hatîye
dayînê ku hûn sur'êd P'adşatîya
E'zmana bizanibin, lê wanar'a
nehatîye dayînê. 12 Çimkî k'êr'a
ku heye, wê hê lê zêde be û serda
bir'ije û k'êr'a ku t'une, çi heye jî
wê jê bê standinê. 13 Ez bona wê
yekê bi mesela wanr'a xeber didim,
ku ewana dinihêr'in û nabînin,
dibihên, lê guhê xwe nadine ser
û fe'm nakin. 14 Li ser wan p'ê-
xembertîya Îşaya tê sêrî ku dibêje:

‹Hûnê bibihên û guh bidinê,
lê fe’m nekin,
hûnê binihêr’in û dîna xwe
bidinê, lê nebînin.
15 Çimkî eva cime’ta serh’işk e,
bi guha giran dibihên
û ç’e’vêd xwe girtine,
wekî bi ç’e’va nebînin,
bi guha nebihên
û bi h’iş fe’m nekin, veneger’in,
ku Ez wan qenc kim›*.
16 Lê xwezî li ç’e’vêd we, ku
dibînin û guhêd we, ku dibihên.
17 Ez r’ast wer’a dibêjim, gelek
p’êxember û merivêd r’ast h’izre-
ta dîtina van tiştа bûn çi ku hûn
dibînin, lê nedîtin û bibihîstana
çi ku hûn dibihên, lê nebihîstin.

### Şirovekirina mesela t’oximr’eş

*(Marqos 4:13-20; Lûqa 8:11-15)*

18 Niha hûn şirovekirina mesela
t’oximr’eş bibihên. 19 Her kesê ku
xebera P’adşatîyê dibihê û fe’m
nake, yê Xirab* tê t’oximê dilê
wîda çandî dir’evîne. Eva ew in ku
devê r’ê hatine çandinê. 20 Ewêd
li e’rdê kevirî hatine çandinê ew
in, ku çaxê xeberê dibihên, ew zû
bi eşq û şa qebûl dikin. 21 Lê r’aw
ku nava wanda t’unene, dirêj t’aw
nakin. Gava bona xeberê r’astî
tengasîya[f] yan zêrandinê tên, ew
zû ji r’ê dik’evin. 22 Ewêd li nava
stirîyada hatine çandinê ew in, ku
xeberê dibihên û xemêd vê din-
yayê û derewêd dewletîyê xeberê
dixeniqînin, ew bê ber dimînin.
23 Lê ewêd li nava e’rdê qencda
hatine çandinê ew in, ku xeberê
dibihên, fe’m dikin û ber didin,
hinek sed, hinek şêst û hinek sî».

### Mesela genim û zîwanê

24 Îsa meseleke din jî wanar’a
pêşda anî û got: «P’adşatîya E’z-
mana mîna vê yekê ye: Merivekî
nav e’rdê xweda t’oximê qenc çand.
25 Gava h’emû r’azayî bûn, dijminê
wî hat û li nav genimda zîwan jî
çand û çû. 26 Gava genim gihîşt
berê xwe da, hingê zîwan jî pêr’a
k’ifş bûn. 27 Xulamêd xweyê e’rdê
nêzîkî wî bûn û gotinê: ‹Axayê
me! Te nava e’rdê xweda t’oximê
qenc neçand? Lê ev zîwan ji k’u
hatin?› 28 Ewî li wan veger’and û
got: ‹Dijminekî ev tişt kirîye›. Xu-
lama jî gote wî: ‹Niha tu qayl î ku
em her’in wan r’akin?› 29 Ewî got:
‹Na, nebe çaxê hûn zîwanê r’akin,

* 13:15 Îşaya 6:9-10.
* 13:19 Bi gotineke din: «Mîrêcin».

gênim jî pêr'a derxin. 30 Bihêlin
bira her du jî hevr'a bigihîjin h'eta
r'oja nandirûnê. R'oja nandirûnê
ezê p'alar'a bêjim, pêşîyê zîwanê
biçinin, gur'z-gur'z girêdin bona
şewatê, lê gênim bikine e'mbara
min›».

### Du meselêd li ser P'adşatîya Xwedê:

*(Marqos 4:30-32; Lûqa 13:18-21)*

31 Meseleke din jî wanar'a pêşda
anî û got: «P'adşatîya E'zmana
mîna vê yekê ye: Merivekî h'ebeke
t'oximê xerdalê[f] hilda, nav e'rdê
xweda çand. 32 Ew ji h'emû t'oxima
hûrtir e, lê gava digihîje, ji h'emû
p'incar'a mestir dibe û dibe dar,
usa ku teyredêd e'zmên tên hêlî-
nêd xwe ser ç'iqilêd wê çêdikin».
33 Îsa meseleke din jî wanar'a
got: «P'adşatîya E'zmana mîna
hevîrtir'şk[f] e, ku k'ulfetekê hilda,
nava sê kod* arda stira, h'eta ku
h'emû hilat».

### Îsa bi mesela xeber dide

*(Marqos 4:33-34)*

34 Îsa ev h'emû tişt bi mesela
e'laletêr'a gotin û bê mesele t'u
tişt wanar'a nedigot. 35 Ev yek aha
bû, ku ew gotina bi zarê p'êxem-
ber bê sêrî:

«Ezê bi mesela wanr'a xeber
dim,
tiştêd ji wextê e'firandina din-
yayêda veşartî gilî kim»*.

### Şirovekirina mesela genim û zîwanê

36 Hingê Îsa e'lalet hişt, hate
mal. Şagirtêd Wî hatine cem
Wî û gotinê: «Mesela genim û
zîwanê mer'a şiroveke». 37 Ewî
li wan veger'and û got: «Ewê ku
t'oximê qenc çand, Kur'ê Mêriv
e. 38 E'rd dinya ye, t'oximê qenc
jî merivêd p'ara P'adşatîyê ne, lê
zîwan merivêd p'ara yê Xirab in.
39 Dijminê ku ew çand, mîrêcin
e. Nandirûn axirîya dinyayê ye,
p'ale jî milyak'et in. 40 Û çawa
ku zîwanê t'op dikin dişewitînin,
axirîya vê dinyayê jî wê usa be.
41 Kur'ê Mêriv wê milyak'etêd
Xwe bişîne û ewê ji P'adşatîya
Wî h'emûyêd ku merîya ji r'ê
derdixin û neheqîyê dikin bibi-
jêrin 42 û bavêjine k'ûra agir. Li
wir wê bibe girî û ç'irke-ç'irka
dirana. 43 Hingê merivêd r'ast
wê P'adşatîya Bavê xweda mîna

* 13:33 Sê kodêd cihûya dikir qasî 25 kîlograma.

* 13:35 Zebûr 78:2.

te’vê şewq bidin. Guhê k’ê heye
bira bibihê!

### Meselêd xizna veşartî û dur’ê qîmet

44 P’adşatîya E’zmana mîna vê
yekê ye: E’rdekîda xizneke veşartî
hebû. Merivek wê dibîne, vedi-
şêre, şabûna diçe h’emû hebûka
xwe difiroşe û wî e’rdî dik’ir’e.
45 Dîsa P’adşatîya E’zmana
mîna vê yekê ye: Merivekî bazir-
ganî dur’êd r’ind diger’e. 46 Gava
dur’ekî p’ir’ qîmet dibîne, diçe
h’emû hebûka xwe difiroşe û wî
dur’î dik’ir’e.

### Mesela t’or’a avîtî

47 Dîsa P’adşatîya E’zmana mî-
na vê yekê ye: T’or’ek tê avîtinê
nava be’rê û h’emû cûr’e me’sî
dik’evinê. 48 Gava t’or’ t’ijî dibe,
dik’işînine devê be’rê û r’ûdinîn
me’sîyêd kêr dibijêrin dikine der-
dana[f], lê yêd bêkêr wêda davêjin.
49 Axirîya dinyayê jî wê usa be.
Milyak’etê derk’evin xiraba ji
nav qenca bibijêrin 50 û bavêjine
k’ûra agir. Li wir wê bibe girî û
ç’irke-ç’irka dirana».

### R’astîyêd kevin û nû

51 Îsa ji wan pirsî: «We ev h’e-
mû tişt fe’m kirin?» Wana jêr’a
got: «Belê». 52 Ewî jî wanar’a got:
«Bona vê yekê her qanûnzanek ku
P’adşatîya E’zmana hîn bûye, mîna
merivekî xweyîmilk’ e, ku ji xizna
xwe tiştêd kevin û nû derdixe».

### Bajarê Nisretê, li k’u Îsa mezin bibû, Wî qebûl nake

*(Marqos 6:1-6; Lûqa 4:16-30)*

53 Gava Îsa ev mesele xilaz kirin,
ji wir çû 54 hate cî-misk’enê Xwe,
k’inîşta wanda ew hîn dikirin. Ew
jî zendegirtî diman û digotin: «Ev
serwaxtî û qewata k’eremeta ji k’u
gihîştîyê? 55 Ne Ev kur’ê necar e?
Ne navê dîya Wî Meryem e? Ne
Aqûb[f], Ûsiv[f], Şimh’ûn û Cihûda[f]
birêd Wî ne? 56 Ne h’emû xûşkêd
Wî cem me ne? Ev h’emû tişt ji
k’u gihîştine Wî?» 57 Bi vî awayî
ew ji Wî çûn, lê Îsa wanar’a got:
«P’êxember t’u cîyî ne bêqedir e,
pêştirî mala xwe û cî-misk’enê
xweda». 58 Ewî li wê derê gelek
k’eremet nekirin, çimkî bawerîya
wan t’unebû.

### Kuştina Yûh’ennayê nixumdar

*(Marqos 6:14-29; Lûqa 9:7-9)*

**14** 1 Hingê Hêrodesê serwêrê
Celîlê bona Îsa bihîst, 2 xu-
lamêd xwer’a got: «Eva Yûh’ennayê
nixumdar e ji nav mirîya r’abûye.
Lema jî pê wî k’eremet têne kirinê».

3 Çimkî Hêrodes Yûh’enna gir-
tibû girêdabû û avîtibû kelê, r’ûyê
Hêrodîya jina Fîlîpoyê birê xwe-
da. 4 Çimkî Yûh’enna Hêrodesr’a
çend cara gotibû: «Ne r’ast e ku tu
Hêrodîyayê bistînî». 5 Û Hêrodes
jî dixwest ew bikuşta, lê ji cime’tê
ditirsîya, çimkî cime’tê Yûh’enna
çawa p’êxember qebûl dikir.

6 Gava r’oja bûyîna Hêrodes hat,
qîza Hêrodîyayê şayîyêda bona
wan r’eqisî û dilê Hêrodes gelekî
xweş hat. 7 Ewî sond xwar û gote
qîzikê: «Tu çi bixwazî ezê bidime
te». 8 Qîzik jî ji dîya xwe hatibû
şîretkirinê û gotê: «K’a li vir, ser
sinîyê serê Yûh’ennayê nixumdar
bide min». 9 P’adşa ber xwe k’et,
lê çimkî li ber t’eglîfkirîya sond
xwaribû, e’mir kir ku xwestina wê
bê dayînê. 10 Ewî şand kelêda serê
Yûh’enna da lêxistinê 11 û serê wî li
ser sinîyê anîn dane keç’ikê. Keç’ikê
jî dîya xwer’a bir. 12 Hingê şagirtêd
wî hatin cinyazê wî hildan û ew
defin kirin. Paşê çûn Îsar’a gotin.

### Îsa pênc h’ezara t’êr dike

*(Marqos 6:30-44; Lûqa 9:10-17; Yûh’enna 6:1-14)*

13 Gava Îsa ev yek bihîst, ji wê
derê bi qeyikê t’enê çû cîkî xewle.
Lê gava e’laletê bihîst, ji bajara
peya pey Wî çûn. 14 Çaxê Îsa ji
qeyikê derk’et û e’laleteke giran
dît, hingê gunê Wî li wan hat û
nexweşêd wan qenc kirin.

15 Berê êvarê şagirtêd Wî ha-
tine cem û gotinê: «Ev der cîkî
xikî-xwelî ye, îdî dereng e. Îzina
e’laletê bide ku her’ine gunda
xwer’a xurek bik’ir’in». 16 Lê Îsa
wanar’a got: «Ne h’ewce ye ku ew
her’in. Hûn xurek bidine wan».
17 Wana lê veger’and û gotinê: «Li
vir pêştirî pênc nan û du me’sîya
tiştekî meyî mayîn t’une». 18 Ewî
wanar’a got: «Wan nan û me’sîya
bînine cem Min». 19 Îsa e’mir kir
ku e’lalet li ser şînayîyê r’ûnên. Ewî
her pênc nan û her du me’sî hildan,
berê Xwe e’zmênda kir şikirî da û
ew nan kerkirin. Paşê da şagirta,
şagirta jî da e’laletê. 20 H’emûya
jî xwar t’êr bûn û donzdeh sele jî
t’ijî hûrikêd bermayî berev kirin.
21 Ewêd ku xwarin, pêştirî jin û
zar’a weke pênc h’ezar mêrî bûn.

### Îsa p’îya li ser avêr’a diçe

*(Marqos 6:45-52; Yûh’enna 6:15-21)*

22 Pêr’a-pêr’a Îsa p’êyî ser şagirta
kir, ku bik’evine qeyikê û pêşîya
Wî derbazî wî berî golê bin, h’eta
ku Xwexa e’laletê ver’êke. 23 Çaxê
Ewî e’lalet ver’êkir, t’enê r’abû çû
serê ç’îyê, ku dua bike. Gava r’o çû

ava, Ew li wira t'enê bû, 24 lê qeyik
îdî ji devê golê dûr k'etibû û nava
pêlada bû, çimkî ba miqabilî wê bû.
25 Qereberbangê Îsa ser golêr'a
peya diçû nêzîkî wan dibû. 26 Lê
gava şagirta dît ku Ew ser golêr'a
peya diçe, bizdîyan û gotine hev:
«Ev xeyal[f] e!» Û wana ji tirsa kire
qîr'în. 27 Lê Îsa wê demê deng da
wan û got: «Ser xwe bin! Ez im!
Netirsin!» 28 Petrûs lê veger'and û
gotê: «Xudan, heger Tu yî, e'mir
ke ku ez ser avêr'a bême cem Te».
29 Îsa gotê: «Were!» Petrûs ji qeyikê
peya bû, ser avêr'a çû, ku her'e cem
Îsa. 30 Lê çaxê ewî bayê qayîm dît
tirsîya û îdî wê nuq bûya, kire qîr'în:
«Xudan, min xilaz ke!» 31 Wê demê
Îsa destê Xwe dirêjî wî kir, ew girt
û jêr'a got: «Kêmbawero! Çima tu
dudilî bûyî?» 32 Çaxê k'etine qeyi-
kê, ba sekinî. 33 Û ewêd qeyikêda
serê xwe li ber Wî danîn û gotinê:
«R'astî Tu Kur'ê Xwedê yî».

### Îsa Cênîsartêda nexweşa qenc dike

*(Marqos 6:53-56)*

34 Gava ew derbazî wî berî
golê bûn, li alîyê Cênîsartêva
gihîştine bejê[f]. 35 Binelîyêd wir
Ew nas kirin, şandin t'emamîya
dor-bera, h'emû nexweş anîne
cem Wî. 36 Wana hîvî jê dikir ku
t'enê r'îşîyêd k'incê Wî k'evin.
Û h'emûyêd ku lê dik'etin ji ne-
xweşîyêd xwe qenc dibûn.

### R'aw-r'izimêd[f] kal-bava û xebera Xwedê

*(Marqos 7:1-13)*

**15** 1 Hingê fêrisî û qanûnzanêd
Orşelîmê hatine cem Îsa
û gotinê: 2 «Çima şagirtêd Te pey
r'aw-r'izimêd[f] kal û bava naçin?
Destneşûştî nan dixwin».
3 Ewî li wan veger'and û got: «Lê
hûn çima bona r'aw-r'izimêd xwe
pey t'emîyê Xwedê naçin? 4 Çimkî
Xwedê got: ‹Qedirê dê û bavê xwe
bigire›* û ‹Ewê ku gilîkî qolayî
dê û bavê xwer'a bêje gerekê bê
kuştinê›**. 5 Lê hûn dibêjin: ‹Ewê
ku dîya xwer'a yan bavê xwer'a
bêje: Ew alîk'arîya ku gerekê ji
min bigihîje te ew Xwedêr'a tê
dayînê, 6 îdî ji wî nak'eve ku ew
qedirê dê û bavê xwe bigire›. Bi
vî awayî bona xatirê r'aw-r'izimêd
xwe hûn xebera Xwedê dikine
xwelî. 7 Dur'ûno! Îşaya bona we
r'ast p'êxembertî kirîye û gotîye:

* 15:4 Derk'etin 20:12; Qanûna Ducarî 5:16.
** 15:4 Derk'etin 21:17; Qanûna K'ahîntîyê 20:9.

8 ‹Eva cime’ta bi zarê xwe qedirê
Min digire,
lê dilê wan ji Min dûr e.
9 Badîhewa[f] Min dih’ebînin,
t’emîyêd meriva çawa qanûnêd
Min cime’tê hîn dikin›*».

### Tiştêd ku mêriv dih’er’imînin

*(Marqos 7:14-23)*

10 Hingê Îsa e’lalet gazî cem
Xwe kir û gote wan: «Bibihên
û fe’m bikin! 11 Ne ku tiştê diçe
dêv, ew meriva dih’er’imîne, lê
çi ku ji dêv dertê, ew meriva di-
h’er’imîne».
12 Hingê şagirtêd Wî hatin û
gotine Wî: «Tu zanî gava fêrisîya
ev xeber bihîst, dilê wan ma?»
13 Ewî li wan veger’and û got:
«Her dara ku Bavê Minî E’zmana
daneç’ikandîye, wê ji k’okêva bê
r’akirinê. 14 Ji wan veger’in! Ewe
kor in û r’êberê kora ne. Heger
kor r’êberîyê kora bike, her du-
yê jî bik’evine ç’e’lê». 15 Petrûs
lê veger’and û gotê: «Vê meselê
mer’a şiroveke».
16 Îsa got: «Hûn jî hela hê fe’m
nakin? 17 Çima hûn fe’m nakin,
çi ku diçe dêv, derbazî nav-dil
dibe û derdik’eve derva? 18 Lê
ew tiştêd ku ji dêv dertên, ew ji
dil dertên û hema ev in ku mê-
riv dih’er’imînin. 19 Çimkî ji dil[f]
fikirêd xirab, kuştin, zinêk’arî,
qavî, dizî, derewî, buxdan dertên.
20 Ev in ku meriva dih’er’imînin,
lê destneşûştî nanxwarin meriva
nah’er’imîne».

### Bawerîya k’ulfeta kenanî[f]

*(Marqos 7:24-30)*

21 Îsa r’abû ji wê derê çû alîyê
Sûr û Saydê. 22 Û va k’ulfeteke
kenanî[f] ji wan dera hat, kire gazî
û gote Wî: «Xudan, Kur’ê Da-
wid, min were r’e’mê. Qîza min
cina dik’eve, gelekî cefê dibîne».
23 Lê Ewî caba wê neda. Şagirtêd
Wî nêzîkî Wî bûn hîvî jê kirin û
gotin: «Tiştekî bêje vê, bira dûrî
me k’eve, çimkî pey me k’etîye
dike qar’e-qar’». 24 Ewî cab da û
got: «Ez t’enê bona pezêd mala
Îsraêlêye undabûyî hatime şan-
dinê». 25 Lê ew k’ulfeta hat xwe
avîte nigê Wî û gotê: «Xudan, alî
min bike!» 26 Ewî li wê veger’and
û gotê: «Ev ne r’ast e, wekî nanê
ber zar’a hildin û bavêjine ber sa».
27 Ewê jî got: «Belê Xudan, ne se jî
wan hûrikêd ku ji sifra xweyê wan
dik’evine e’rdê dixwin?» 28 Wî çaxî

* 15:9 Îşaya 29:13.

Îsa lê veger’and û gotê: «E’vdê,
bawerîya te mezin e. Bira anegorî
xwestina te ter’a be». Hema ji wê
demê qîza wê qenc bû.

### Qenckirina geleka

29 Îsa ji wir çû ber gola Celîlê,
r’abû serê ç’îyê r’ûnişt. 30 E’lale-
teke giran hate cem Wî, ku t’evî
xwe gelek seqet, kor, lal, şilû-
şe’t û nexweşêd mayîn anîbûn û
avîtine ber p’îyêd Îsa. Ewî jî ew
qenc kirin. 31 Gava e’laletê dît
ku lala xeber dan, şilûşe’t qenc
bûn, seqet ger’îyan û ç’e’vê kora
vebûn, zendegirtî man û pesinê
navê Xwedêyê Îsraêlê dan.

### Îsa çar h’ezara t’êr dike

*(Marqos 8:1-10)*

32 Îsa gazî şagirtêd Xwe kir û
got: «Gunê Min vê e’laletê tê.
Eva sê r’oj e t’evî Min e û tiştekî
wanî xwarinê t’une. Ez naxwazim
wan bir’çî ver’êkim ku r’êva dilê
wan xweva her’e». 33 Şagirtêd Wî
jêr’a gotin: «Li vê ber’îyê emê ji
k’u haqas nan bînin, wekî evê
e’laleta giran t’êr kin?» 34 Îsa
wanar’a got: «Çend nanê we
hene?» Wana got: «H’eft nan û
çend me’sîyêd hûr».
35 Îsa e’mir kir ku e’lalet ser
e’rdê r’ûnê. 36 Ewî her h’eft nan
û ew me’sî hildan şikirî da û ker-
kirin. Paşê dane şagirta, şagirta
jî dane e’laletê. 37 H’emûya jî t’êr
xwar û h’eft zembîl jî t’ijî hûrikêd
bermayî berev kirin. 38 Ewêd ku
xwarin, pêştirî jin û zar’a, weke
çar h’ezar mêrî bûn. 39 Paşê Ewî
e’lalet ver’êkir, k’ete qeyikekê û
hate sînorê Megedanê.

### K’eremetekê çawa nîşan ji e’zmên dixwazin

*(Marqos 8:11-13; Lûqa 12:54-56)*

**16** 1 Fêrisî û sadûqî hatine
cem Wî ku Wî bicêr’ibî-
nin û jê xwestin ku ji e’zmana
nîşanekê nîşanî wana ke. 2 Ewî
li wan veger’and û got: «Gava
dibe êvar, hûn dibêjin: ‹Hewa
wê xweş be, çimkî e’zman sor
bûye›. 3 Lê serê sibehê dibêjin:
‹Îro hewa wê xweş nîbe, çimkî
e’zman xumam û sor e›. Hûn
r’ûyê e’zmên e’nene dikin ku
hewayê çawa be, lê nîşanêd ze-
mana e’nene nakin*. 4 Nisilê
xirab û xalifî nîşanekê dixwaze,
lê jêr’a nîşaneke din nayê dayînê,
pêştirî nîşana Ûnis p’êxember».
Û Ewî ew hiştin û çû.

* 16:3 Nav hinek destnivîsarada ji r’êza 2-a h’eta ya 3-a t’uneye.

### Hevîrtir’şkê fêrisî û sadûqîya

*(Marqos 8:14-21)*

5 Gava şagirtêd wî derbazî wî
alî bûn, bîr kirin xwer’a nan hil-
dana. 6 Îsa wanar’a got: «Miqatî
xwe bin, h’evza xwe ji hevîrtir’ş-
kê fêrisî û sadûqîya bikin». 7 Lê
ewana nav hevda xeber didan û
digotin: «Nanê me t’une, lema
aha dibêje». 8 Lê ev yek Îsava
e’yan bû û got: «Kêmbawerno!
Hûn çima nav hevda xeber didin,
ku nanê we t’une? 9 Hûn hê fe’m
nakin? Nayê bîra we, çawa pênc
nana t’êra pênc h’ezar meriva kir
û we çend sele bermayî hildan?
10 Û h’eft nana jî t’êra çar h’ezar
meriva kir û we çend zembîl ber-
mayî hildan? 11 Hûn çawa fe’m
nakin, wekî Min bona nan wer’a
negot? Lê bona wê yekê, ku hûn
h’evza xwe ji hevîrtir’şkê fêrisî û
sadûqîya bikin».

12 Şagirta hingê fe’m kir, wekî
Ewî bona hevîrtir’şkê nan wanr’a
negot, ku h’evza xwe bikin, lê ji
hînkirina fêrisî û sadûqîya.

### Petrûs şe’detîyê li ser Îsa dide

*(Marqos 8:27-30; Lûqa 9:18-21)*

13 Îsa çû alîyê Qeyserîya Fîlî-
poyê û ji şagirtêd Xwe pirsî: «Bi
t’exmîna meriva Kur’ê Mêriv k’î
ye?» 14 Wana got: «Hinek dibêjin
‹Yûh’ennayê nixumdar e›, hinekêd
din dibêjin ‹Êlyas e›, lê hinekêd
mayîn jî dibêjin ‹Yêremîya ye, yan
jî yek ji p’êxembera ye››.

15 Ewî ji wan pirsî: «Lê hûn çi
dibêjin? Bi t’exmîna we Ez k’î
me?» 16 Şimh’ûn-Petrûs lê vege-
r’and û gotê: «Tu Mesîh î, Kur’ê
Xwedêyê sax». 17 Îsa lê veger’and
û gotê: «Xwezî li te, Şimh’ûnê
kur’ê Yûh’enna*, çimkî xûn û
goşt ev yek e’yanî te nekirin, lê
Bavê Minî e’zmana. 18 Ez ter’a
dibêjim, ku tu Petrûs* î, awa gotî
qeyak î û li ser vî qeyayî Ezê ci-
vîna[f] Xwe çêkim û qewata mirinê
wê pê nikaribe. 19 Û Ezê k’ilîtêd
P’adşatîya E’zmana bidime destê
te û çi ku tu li ser e’rdê girêdî,
e’zmanada jî wê girêdayî be û çi
ku tu li ser e’rdê vekî, e’zmanada
jî wê vekirî be».

* 16:17 Bi yûnanî xeber bi xeber «kur’ê Yona» nivîsar e. Bi zimanê aramî «Yona» kurtkirina navê «Yûh’enna» û «Ûnis» e.

* 16:18 «Petrûs» bi zimanê yûnanî tê fe’mkirinê: «Qeya» yan «kevir».

20 Hingê Îsa t'emî şagirtêd Xwe
kir, wekî kesîr'a nebêjin, ku Ew
Mesîh e.

### Îsa derheqa cefa û mirina Xweda dibêje

*(Marqos 8:31–9:1; Lûqa 9:22-27)*

21 Pey wê yekêr'a Îsa destpêkir
şagirtêd Xwer'a e'yan kir ku ge-
rekê Ew her'e Orşelîmê, ji alîyê
r'ûspîya[f], serekêd k'ahîna û qa-
nûnzanada gelek cefa bik'işîne
û bê kuştinê, lê r'oja sisîya ji
mirinê r'abe.
22 Lê Petrûs Ew da alîkî, lê hilat
û gotê: «Dûrî hindava Te, Xudan!
Ew tişt t'u car li Te neqewime!»
23 Îsa ser Petrûsda veger'îya û gotê:
«Ji ber ç'e'vê Min betavebe, Cino!
Tu bona Min p'işkbûn î, çimkî
ew nêt-fikira te ne ji Xwedê ye,
lê ji merivayê ye».
24 Hingê Îsa şagirtêd Xwer'a got:
«Heger yek dixwaze li pey Min
bê, bira xwe înk'ar ke, xaçê xwe
hilde û li pey Min bê. 25 Çimkî k'î
ku dixwaze e'mirê xwe xilaz ke,
ewê unda ke û k'î ku e'mirê xwe
bona Min unda ke, ewê bibîne.
26 Çi feyde heger meriv t'emamîya
dinyayê qazinc ke, lê e'mirê xwe
unda ke? Yan jî meriv çi dikare
ber e'mirê xweva bide? 27 Çimkî
Kur'ê Mêriv wê bi r'ûmeta Bavê
Xwe t'evî milyak'etêd Xwe bê.
Hingê wê anegorî e'melêd her
kesî bide wan*. 28 Ez r'ast wer'a
dibêjim, hinekêd li vir sekinî he-
ne wê mirinê nebînin, h'eta ku
Kur'ê Mêriv bi P'adşatîya Xweva
tê nebînin».

### Şagirt Îsa nava nûr û r'ûmetêda dibînin

*(Marqos 9:2-13; Lûqa 9:28-36)*

17 1 Pey şeş r'ojar'a Îsa t'evî
Xwe Petrûs, Aqûb û birê
wî Yûh'enna hildan û r'akirine
ç'îyakî bilind, li wir ew t'enê bûn.
2 Hingê r'engê Wî li ber ç'e'vê wan
hate guhastinê. R'ûyê Wî mîna
te'vê biriqî û k'incêd Wî jî mîna
nûrê çîl-qerqaş bûn. 3 Nişkêva
Mûsa û Êlyas wanva xuya bûn û
t'evî Wî xeber dan. 4 Hingê Petrûs
Îsar'a got: «Xudan! Çawa r'ind e
ku em vir in! Heger Tu bixwazî,
ezê sê h'olika li vê derê çêkim,
yekê Ter'a, yekê Mûsar'a, yekê jî
Êlyasr'a».
5 Ewî hê xeber dida, nişkêva
e'wrekî r'onayî hat û ser wan kire
sî, dengek ji e'wr hat û got: «Ev e
Kur'ê Minî delal, ku Ez jê r'azî

* 16:27 Zebûr 62:12.

me. Guhdarîya Wî bikin!» 6 Gava
şagirta ew deng bihîst, dever'ûya
çûn û r'isasê ew girtin. 7 Lê Îsa
nêzîkî wan bû, dest da wan û
got: «R'abin, netirsin». 8 Wana jî
serê xwe bilind kir û pêştirî Îsa
kesek nedîtin.

9 Çaxê ji ç'îyê dihatine xwarê,
Îsa t'emî da wan û got: «Ew dîtina
ku we dît kesîr'a nebêjin, h'eta
ku Kur'ê Mêriv ji nav mirîya
r'anebe». 10 Şagirtêd Wî jê pir-
sîn: «Lê çima qanûnzan dibêjin
pêşîyê gerekê Êlyas bê?»* 11 Îsa
li wan veger'and û got: «R'ast e,
pêşîyê Êlyasê bê û her tiştî wê
dîsa bîne cî. 12 Lê Ez wer'a di-
bêjim, ku Êlyas hatîye jî, lê ew
nas nekirin û çawa ku xwestin,
usa serê wî kirin. Wê usa jî serê
Kur'ê Mêriv bikin».

13 Hingê şagirta fe'm kir, ku
bona Yûh'ennayê nixumdar wa-
nar'a got.

### Îsa kur'ikekî cinak'etî qenc dike

*(Marqos 9:14-29; Lûqa 9:37-43a)*

14 Çaxê hatine cem e'laletê,
merivek nêzîkî Îsa bû, ber çok
da û gotê: 15 «Xudan, li kur'ê
min were r'e'mê! Ew hîvê[f] di-
k'eve û gelekî cefa dibîne. Carna
dik'eve nava agir û carna jî nava
avê. 16 Min ew anî cem şagirtêd
Te, lê wana nikaribû ew qenc ki-
ra». 17 Îsa got: «Nisilê nebawer û
xalifî! H'eta k'engê Ezê t'evî we
bim? H'eta k'engê Ezê we sebir
kim? Ewî bînine vir cem Min».
18 Îsa lê hilat, cin jê derk'et, kur'ik
pêr'a-pêr'a qenc bû.

19 Hingê şagirt t'enê hatine cem
Îsa û jê pirsîn: «Me çima nikaribû
ew cin derxista?» 20 Îsa gote wan:
«Bona kêmbawerîya we. Ez r'ast
wer'a dibêjim, heger bawerîya
we weke h'ebeke t'oximê xerdalê
hebe, hûnê vî ç'îyayîr'a bêjin: ‹Ji
vir derbazî wî alî be!› û wê derbaz
be. Û bona we tiştekî nebûyînê
wê t'unebe. 21 Lê ev cisinê ha pê
tiştekî din dernayê, pêştirî bi dua
û bi r'ojîya»*.

### Îsa dîsa derheqa mirina xweda dibêje

*(Marqos 9:30-32; Lûqa 9:43b-45)*

22 Gava şagirt Celîlêda civîyan,
Îsa wanar'a got: «Kur'ê Mêriv wê

* 17:10 Malaxî 4:5.

* 17:21 Nav destnivîsarêd here qencda r'êza 21-ê t'une.

bik'eve destê meriva, 23 ewê Wî
bikujin, lê r'oja sisîya wê r'abe».
Û ewana gelekî ber xwe k'etin.

### Xercdayîna p'aristgehê

24 Çaxê ew hatine Kefernahûmê,
xercgirêd duzîvê bona p'aristge-
hê* hatine cem Petrûs û gotinê:
«Dersdarê we xercê duzîvê nade?»
25 Ewî got: «Belê». Çaxê Petrûs
hate malê, pêşîyê Îsa ji wî pirsî:
«Şimh'ûn! Tu çawa t'exmîn dikî?
P'adşêd dinyayê xerc yan bac ji k'ê
distînin, ji bajarvanêd xwe, yan ji
xerîba?» 26 Petrûs gotê: «Ji xerîba».
Îsa gote wî: «Ku usa ye bajarvan
aza ne. 27 Lê wekî em van p'işk[f]
nekin, her'e golê şewkê bavêjê û
me'sîyê pêşin ku derdik'eve, bigire
devê wî veke û tê nalekî çarzîvê
bibînî. Ewî hilde, dewsa Min û
xwe bide wan».

### K'î ye yê herî mezin?

*(Marqos 9:33-37; Lûqa 9:46-48)*

**18** 1 Wî çaxî şagirt hatine
cem Îsa û gotinê: «Li nav
P'adşatîya E'zmanada k'î ye yê
herî mezin?» 2 Îsa zar'okek gazî
cem Xwe kir, ew nav wanda da
sekinandinê 3 û got: «Ez r'ast we-
r'a dibêjim, heger hûn veneger'in
û nebine mîna zar'oka, hûn t'u
car nak'evine P'adşatîya E'zma-
na. 4 Awa k'î ku mîna vê zar'okê
xwe biç'ûk ke, ew e yê herî mezin
P'adşatîya E'zmanada. 5 Û k'î ku
zar'okeke aha bi navê Min qebûl
ke, ew Min qebûl dike.

### Jir'êderxistin

*(Marqos 9:42-48; Lûqa 17:1-2)*

6 Lê k'î ku ji van biç'ûka yekî,
yê ku bawerîya xwe Min tîne ji
r'ê derxe, wîr'a hê qenc e, wekî
beraşek stûyê wîva bê girêdanê
û binê be'rêda bixeniqe. 7 Wey li
dinyayê, bona ewêd ku meriva
ji r'ê derdixin. Nabe ku ew tişt
nebin, lê wey li wî ku meriv bi wî
ji r'ê dik'evin.

8 Heger destê te yan nigê te, te ji
r'ê derxe, wî jêke û ji xwe bavêje.
Bona te hê qenc e ku tu qop yan
seqet bik'evî jîyînê, ne ku du dest
yan du nigêd te hebin û bêyî avî-
tinê nava agirê h'eta-h'etayê. 9 Û
heger ç'e'vê te, te ji r'ê derdixe, wî
derxe û bavêje. Bona te hê qenc e
ku tu bi ç'e'vekî bik'evî jîyînê, ne
ku bi du ç'e'va bêyî avîtinê nava
agirê dojê.

* 17:24 Li gora Qanûna Mûsa nalekî «duzîvê» çawa xerc bona p'aristgehê didan (Derk'etin 30:13).

### Mesela peza undabûyî

*(Lûqa 15:3-7)*

**10** Haş ji xwe hebin ku hûn ji van
biç'ûka yekî bêhurmet nekin, çimkî
Ez wer'a dibêjim, ku milyak'etêd
wan li e'zmana t'imê r'ûyê Bavê
Minî e'zmana dibînin. **11** Kur'ê
Mêriv hat ku yê undabûyî biger'e
û xilaz ke*. **12** Hûn çawa t'exmîn
dikin? Heger sed pezêd merivekî
hebin û yek ji wan unda be, ewê
nod neha nehêle ç'îya-banîya û
neçe ku ya undabûyî biger'e? **13** Lê
gava bibîne, ez r'ast wer'a dibêjim,
ewê bona wê hê gelekî şa be, ne
ku bona nod nehêd dine ku unda
nebûne. **14** Usa jî Bavê weyî* e'z-
mana naxwaze ku ji van biç'ûka
yek unda be.

### Birê ku gune dike

*(Lûqa 17:3)*

**15** Heger birê te neheqîyê li te*
bike, gava tu û ew t'enê ne, wî şîret
ke. Heger ewî guhdarîya te kir,
îdî te birê xwe qazinc kir. **16** Lê
heger guhdarîya te nekir, yekî yan
duduyêd din jî t'evî xwe hilde,
wekî: ‹Bi devê du yan sê şe'da
her tişt îzbat be›*. **17** Lê heger ewî
guhdarîya wan jî nekir, civînêr'a[f]
bêje. Û heger guhdarîya civînê jî
nekir, bira ew bona te bibe mîna
p'ûtp'arist û xercgira.

**18** Ez r'ast wer'a dibêjim, çi ku
hûn ser e'rdê girêdin, li e'zmên jî
wê girêdayî be û çi ku hûn li ser
e'rdê vekin, li e'zmên jî wê vekirî be.

**19** Dîsa Ez r'ast wer'a dibêjim,
heger dudu ji we li ser e'rdê bi
t'ifaq bona tiştekî dua bikin û
bixwazin, Bavê Minî e'zmana wê
bide we. **20** Çimkî k'îderê du yan
sê meriv bi navê Min bicivin, Ez
li wir nava wanda me».

### Mesela bona baxşandin û nebaxşandinê

**21** Hingê Petrûs nêzîkî Wî bû
û gotê: «Xudan. Gava birê min
neheqîyê li min bike, gerekê ez
çend cara bibaxşînimê, h'eta
h'eft cara?» **22** Îsa gote wî: «Ez
nabêjime te h'eta h'eft cara, lê
h'eta h'eftê cara h'eft*. **23** Çimkî

* 18:11 Nav destnivîsarêd here qencda r'êza 11-a t'une.
* 18:14 Nav hinek destnivîsarada dewsa «we» «Min» heye.
* 18:15 Nav hinek destnivîsarada «li te» t'une.
* 18:16 Qanûna Ducarî 19:15.
* 18:22 Aha jî tê fe'mkirinê: «H'eftê û h'eft».

P'adşatîya E'zmana mîna vê yekê
ye: P'adşakî xwest t'evî xulamêd
xwe heq-h'esabê xwe r'ast ke.
24 Gava dest bi h'esaba kir, yek
anîne cem wî, ku dehe h'ezar
telantî* deyndarê wî bû. 25 Lê
çimkî nikaribû deynê xwe bida,
xweyê wî e'mir kir, ku ew, jina
wî, zar'êd wî û h'emû hebûka wî
bêne firotanê, ku deynê wî bê
dayînê. 26 Hingê xulam dever'ûya
çû nigê wî, lava jê kir û got: ‹Li
min sebir ke. Ezê h'emû jî li te
veger'înim›. 27 Gunê xweyê wî
li wî hat, ew ber'da û deynê wî
jî baxşandê.

28 Lê çaxê ew xulam derk'et,
r'astî xulam-hevalekî xwe hat ku
sed zîvî[f]* deyndarê wî bû, dest kire
xeneqê û gotê: ‹Tu çiqasî deyn-
darê min î bide!› 29 Hingê hevalê
xulam xwe avîte nigê wî, jê lava
kir û gotê: ‹Li min sebir ke. Ezê
li te veger'înim›. 30 Lê ewî guh
neda wî, çû ew avîte kelê, h'eta
ku ew deynê xwe bide. 31 Çaxê
xulam-hevalêd wîye din ev yek
dîtin, gelekî ber xwe k'etin û çûn
xweyê xwer'a tiştêd ku qewimîbû
gilî kirin. 32 Hingê axayê wî gazî
wî kir û gotê: ‹Xulamê xirab! Min
h'emû deynê te baxşande te, bona
wê yekê ku te lava ji min kir. 33 Lê
ji te nedik'et ku tu jî li xulam-he-
valê xwe bihatayî r'e'mê çawa ku
ez te hatime r'e'mê?› 34 Û axayê
wî hêrs k'et, ew da destê zulm-
darêd kelê, h'eta ku h'emû deynê
xwe veger'îne. 35 Usa jî Bavê Minî
E'zmana wê li serê we her yekî
bike, heger hûn bi dil nebaxşînine
birê xwe».

### Pirsa jinber'danê

*(Marqos 10:1-12)*

**19** 1 Çaxê ku Îsa ew xeber
ser hevda anîn, ji Celîlê
derk'et hate sînorê Cihûstanê, wî
alî ç'emê Ûrdunê. 2 Gelek e'lalet
li pey Wî çûn û Ewî li wê derê
ew qenc kirin. 3 Ji fêrisîya hinek
nêzîkî Wî bûn û bona cêr'ibandinê
jê pirsîn: «Gelo li gora Qanûnê
r'ast e, ku bona her me'nîkê mêr
jina xwe ber'de?» 4 Ewî caba wan
da û got: «We ne xwendîye, serê
sêrîda E'firandar ew ‹qisimê mêr
û jinêda xuliqandin?›* 5 û got:

* 18:24 Qîmetê telantekî heqê p'alekî panzdeh sala zêdetir bû.
* 18:28 Qîmetê zîvekî weke r'ojxebateke p'ala bû.
* 19:4 Destpêbûn 1:27; 5:1-2.
* 19:5 Destpêbûn 2:24.

‹Bona vê yekê mêr wê dê û bavê
xwe bihêle, xwe li jinê bigire û
her du wê bibine bedenek›*. 6 Awa
îdî ew ne dudu ne, lê bedenek
in. Bona vê yekê ewêd ku Xwedê
kirine yek, bira meriv ji hevdu
neqetîne».
7 Wana jêr'a got: «Lê çima Mûsa
t'emî kir, ku mêr k'axaza jinber'-
danê bide jinê û wê ber'de?»* 8 Ewî
li wan veger'and û got: «Mûsa ji
dest serh'işkîya we îzin da we ku
hûn jinêd xwe ber'din. Lê serîda
ne usa bû. 9 Ez wer'a dibêjim, k'î
ku bê sebebîya qavîyê jina xwe
ber'de û yeke din bistîne, ew zi-
nêk'arîyê dike*».
10 Şagirtêd Wî jêr'a gotin: «Heger
nav jin û mêrda tiştekî aha heye,
hê qenc e wekî qet nezewicin».
11 Îsa wanr'a got: «Her kesîr'a
ev yek dest nade, lê t'enê wanr'a
k'îjanar'a hatîye dayînê. 12 Çimkî
nemêr[f] hene, ku ji zikmakîyêda usa
bûne û nemêr jî hene, ku ji destê
meriva bûne nemêr û nemêr jî he-
ne, ku bona P'adşatîya E'zmana
wana xwe nemêr kirin. K'êr'a ev
yek dest dide, bira usa jî bike».

### Îsa dua zar'oka dike

*(Marqos 10:13-16;
Lûqa 18:15-17)*

13 Hingê zar'ok anîne cem Îsa,
ku destêd Xwe dayne ser wan û
dua li wan bike. Lê şagirtêd Wî li
yêd danîn hilatin. 14 Îsa got: «Bira
ew zar'ok bêne cem Min, pêşîya
wan negirin, çimkî P'adşatîya
E'zmana p'ara yêd usa ye». 15 Û
Îsa destêd Xwe danîne ser wan
û ji wir çû.

### Xortekî dewletî li jîyîna[f] h'eta-h'etayê diger'e

*(Marqos 10:17-31;
Lûqa 18:18-30)*

16 Hingê yek nêzîkî Wî bû û
gotê: «Dersdar! Ez çi qencîyê
bikim, wekî jîyîna h'eta-h'etayê
war bim?» 17 Ewî jêr'a got: «Tu çi-
ma bona qencîyê ji Min dipirsî?*
T'enê Yekî qenc heye. Lê heger tu
dixwazî, bik'evî jîyîna h'eta-h'e-
tayê, t'emîyêd Xwedê xwey ke».
18 Ewî ji Îsa pirsî: «K'îjan in?» Îsa
gotê: «Nekuje, zinêk'arîyê neke,
nedize, şe'detîya derew nede,

---

* 19:7 Qanûna Ducarî 24:1-4.

* 19:9 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Û k'î ku ya ber'dayî bistîne zinêk'arîyê dike».

* 19:17 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Tu çima Minr'a qenc dibêjî?»

19 qedirê dê û bavê xwe bigire* û
hevalê xwe weke xwe h’iz bike**».
20 Xort jêr’a got: «Min ev h’emû
xweyî kirine. Îdî çi kêmasîya min
heye?» 21 Îsa gotê: «Heger tu di-
xwazî k’amil bî, her’e hebûka xwe
bifiroşe bide feqîra, hingê xizna
te wê li e’zmana hebe. Û pey
min were». 22 Gava xort ev xeber
bihîstin, ber xwe k’et û çû, çimkî
gelek hebûka wî hebû.

23 Hingê Îsa gote şagirtêd Xwe:
«Ez r’ast wer’a dibêjim, dewletîyar’a
ze’met e ku bik’evine P’adşatîya[f]
E’zmana. 24 Ez dîsa wer’a dibêjim,
deve wê qula derzîyêr’a hê r’ih’et
derbaz be, ne ku dewletî bik’eve
P’adşatîya[f] Xwedê». 25 Gava şagirta
ev yek bihîst, gelekî e’cêbmayî man
û gotin: «Îdî k’î dikare xilaz be?»
26 Îsa li wan nihêr’î û got: «Ew tişt
ji destê mêriv nayê, lê Xwedê her
tiştî dikare bike».

27 Wê gavê Petrûs lê veger’and û
gotê: «Awa me h’emû tişt hiştîye
û pey te hatine, lê axirîya me wê
çawa be?» 28 Îsa gote wan: «Ez
r’ast wer’a dibêjim, gava Kur’ê
Mêriv Dinya Nûda li ser t’extê
Xweyî r’ûmet r’ûnê, hûnêd ku li
pey Min tên, ser donzdeh k’ursîya
r’ûnên û dîwana donzdeh qebîlêd[f]
Îsraêlê bikin. 29 Û h’emûyêd ku
mala xwe, yan birêd xwe, yan
xûşkêd xwe, yan bavê xwe, yan
dîya xwe, yan jina xwe*, yan zar’êd
xwe, yan e’rdêd xwe bona navê
Min hiştine, ewê sed qat bistîne
û wê jîyîna h’eta-h’etayê jî war be.
30 Lê gelekêd pêş wê bibine paş û
yêd paş wê bibine pêş».

### P’alêd r’ezêd[f] tirîya û heqê wan

**20** 1 «P’adşatîya E’zmana
mîna vê yekê ye: Merivekî
xweyîmilk’ sibehê zû r’abû, wekî
bona r’ezê[f] tirîyêd xwe p’ala bigi-
re. 2 Ewî p’alar’a r’ojê zîvek qirar
kir û ew şandine nava r’ezê xwe.
3 Nêzîkî sih’eta neha* derk’et,
hinekêd dine ku bazarêda betal

* 19:19 Derk’etin 20:12-16; Qanûna Ducarî 5:16-20.

** 19:19 Qanûna K’ahîntîyê 19:18.

* 19:29 Nav gelek destnivîsarêd here qencda «yan jina xwe» t’une.

* 20:3 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Sih’eta sisîya». Lê wî çaxî li gora e’detê cihûya sih’eta sisîya bi sih’eta îroyîn sih’eta nehaye sibehê zû ye. Bona cihûya, hingê sih’et derk’etina r’ojêva destpêdibû. Usa jî ev şirovekirin bona r’êza 4-a h’eta 9-a ye.

sekinîbûn dîtin 4 û gote wan: ‹Hûn
jî her’ine nava r’ezê min û çi heqê
we ye, ezê bidime we›. Ew jî çûn.
5 Dîsa sih’eta donzdeha û sih’eta
sisîya derk’et û usa kir. 6 Û nêzîkî
sih’eta pênca derk’et, hinekêd din
jî ku betal sekinîbûn dîtin û gote
wan: ‹Çima t’emamîya r’ojê hûn
li vir betal sekinîne?› 7 Wana jêr’a
got: ‹Kesekî em p’ale negirtin›.
Ewî wanar’a got: ‹Hûn jî her’ine
nava r’ezê min›.
8 Gava r’o çû ava, xweyê r’ez
wek’îlê mala xwer’a got: ‹Gazî
p’ala ke, heqê wan bidê, ji yêd
paşin destpêbike h’eta yêd pêşin›.
9 Ew p’alêd ku sih’eta pênca girti-
bûn, hatin û her yekî zîvek stand.
10 Gava yêd pêşin jî hatin, wana
t’irê ewê zêde bistînin. Lê wana
jî her yekî zîvek stand. 11 Gava
heqê xwe standin, hindava xwe-
yê r’ezda bîna xwe teng kirin û
gotin: 12 ‹Me t’emamîya giranîya
r’ojê û germa wê k’işand, lê evêd
paşwextîyê ku hatin sih’etekê jî
nexebitîn, te ew himberî me ki-
rin›. 13 Malxê ji wan yekîr’a got:
‹Heval! Ez neheqîyê li te nakim.
Tu minr’a zîvekî qayl nebûyî?
14 Heqê xwe bistîne û her’e. Ez
dixwazim çawa ku min da te, usa
jî bidime evê paşin. 15 Yan îzina
min li ser malê min t’une, çi ku
ez bixwazim wê jî bikim? Yan tu
h’evsûdîyê dikî, ku ez mer’d im?›
16 Bi vî awayî yêd paş wê bibine
pêş û yêd pêş wê bibine paş*».

### Îsa cara sisîya derheqa mirina xweda dibêje

*(Marqos 10:32-34; Lûqa 18:31-34)*

17 Çaxê Îsa hildik’işîya Orşelîmê,
t’enê her donzdeh şagirtêd Xwe
t’evî Xwe birin û r’êda gote wan:
18 «Bibihên! Em hevraz diçine
Orşelîmê. Kur’ê Mêriv wê bik’eve
destê serekêd k’ahîna û qanûnza-
na. Ewê jêr’a kuştinê derxin 19 û
Wî bidine destê necihûya, wekî
qerfê xwe li Wî bikin, bidin ber
qamçîya û xaç[f] kin. Lê r’oja sisîya
Ewê ji mirinê r’abe».

### Xwestina dîya kur’êd Zebedî

*(Marqos 10:35-45)*

20 Hingê dîya kur’êd Zebedî t’evî
her du kur’êd xwe hate cem Îsa,
xwe avîte nigê Wî tiştek jê dixwest.
21 Îsa jê pirsî: «Tu çi dixwazî?»
Ewê gote Wî: «Bêje, ku ev her

* 20:16 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Çimkî gazîkirî gelek in, lê bi-
jartî hindik in».

du kur'êd min li nav P'adşatîya
Teda, yek li milê Teyî r'astê, yê
din jî li milê Teyî ç'epê r'ûnê».
22 Lê Îsa li wan veger'and û got:
«Hûn nizanin çi dixwazin. Gelo
hûn dikarin ji wê k'asê vexwin,
ya ku Ezê vexwim?*» Wana gote
Wî: «Belê, em dikarin». 23 Ewî
wanar'a got: «R'ast e hûnê wê
k'asa Min vexwin, lê îzina li milê
Minî ç'ep û r'astê r'ûniştinê ne
destê Minda ye. Ew cî bona wan
in, k'îjanar'a alîyê Bavê Minda
hatine hazirkirinê».

24 Gava her dehe şagirtêd din
ev yek bihîst, dilê wan ji her du
bira ma. 25 Lê Îsa ew gazî cem
xwe kirin û got: «Hûn zanin
ku mîrêd mileta serdestîyê wan
dikin û giregirêd wan h'ukumî
ser wan dikin. 26 Lê nava weda
gerekê usa nîbe. K'î ku nava weda
dixwaze bibe yê mezin, gerekê
bibe berdestîyê we. 27 Û k'î ku
nava weda dixwaze bibe pêş,
gerekê bibe xulamê we, 28 çawa
ku Kur'ê Mêriv nehatîye ku jê-
r'a berdestîyê bikin, lê wekî Ew
Xwexa berdestîyê bike û e'mirê
Xwe bide, ku geleka bik'ir'e».

### Îsa du kora qenc dike

*(Marqos 10:46-52;*
*Lûqa 18:35-43)*

29 Gava ewana ji Erîhayê derk'e-
tin, e'laleteke giran da pey Wî çû.
30 Va du kor ser wê r'ê r'ûniştibûn.
Gava bihîstin ku Îsa derbaz dibe,
kirine qîr'în û gotinê: «Xudan*,
Kur'ê Dawid, li me were r'e'mê».
31 E'laletê li wan hilat, ku dengê
xwe bibir'in, lê wana hê kire qîr'în
û gotinê: «Xudan, Kur'ê Dawid,
me were r'e'mê!» 32 Îsa sekinî, ga-
zî wan kir û got: «Hûn çi ji Min
dixwazin ku Ez bona we bikim?»
33 Wana jêr'a got: «Xudan, bira
ç'e'vêd me vebin». 34 Gunê Îsa li
wan hat û dest danî ser ç'e'vêd wan.
Destxweda ç'e'vêd wan dîtin, dane
pey Îsa çûn.

### Îsa bi r'ûmet dik'eve Orşelîmê

*(Marqos 11:1-11; Lûqa 19:28-38;*
*Yûh'enna 12:12-19)*

21 1 Gava ew nêzîkî Orşelîmê
bûn, hatine gundê Beyt-
facê, ç'îyayê[f] Zeyt'ûnê. Hingê Îsa
du şagirtêd Xwe şandin 2 û wanar'a

* 20:22 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Yan bi wê nixumandinê bêne nixumandinê, ku Ezê bême nixumandinê?»
* 20:30 Nav hinek destnivîsarada «Xudan» t'une.

got: «Her'ine wî gundê pêşberî xwe
û hûnê k'ereke girêdayî ce'şik ber
bibînin. Wan k'era vekin bînine
cem Min. **3** Heger yek wer'a tiştekî
bêje, hûn bêjin: ‹Xudanr'a lazim
in› û ewê zû wan bişîne».
**4** Eva usa qewimî, ku ew gotina
bi zarê p'êxember bê sêrî:
**5** «Bêjine bajarê Sîyonê[f]:
‹Va P'adşê te tê cem te,
berbihêr, li k'erê
û ce'şika k'erê sîyarbûyî›*».
**6** Şagirt çûn û çawa ku Îsa t'emî
dabû wan usa kirin. **7** K'er û ce'şik
anîn, k'incêd xwe avîtine ser wan
û Ew li wan sîyar bû. **8** E'laleteke
giran k'incêd xwe ser r'ê r'adixis-
tin, hineka jî ç'iqilê dara dibir'în
û ser r'ê r'adixistin. **9** E'laleta ku
li pêşîya Wî û li pey Wî diçû,
dikire qîr'în û digot: «Hosanna[f]
Kur'ê Dawidr'a! Bimbarek e Ewê
ku bi navê Xudan tê!* Hosanna
Yê Herî Jorinr'a!**»
**10** Gava Îsa k'ete Orşelîmê, t'e-
mamîya bajêr h'ejîya û pirsîn: «Ev
k'î ye?» **11** E'laletê got: «Eva Îsayê
P'êxember e, ji Nisreta Celîlê».

**Îsa p'aristgehêda**

*(Marqos 11:15-19; Lûqa 19:45-48; Yûh'enna 2:13-22)*

**12** Îsa k'ete p'aristgehê û h'e-
mûyêd ku p'aristgehêda t'ucaretî[f]
dikirin derxistin. T'extêd p'ere-
guhêr'a û k'ursîyêd kevotkfiroşa
welger'andin **13** û gote wan: «Nivî-
sar e: ‹Mala Min mala dua wê bê
h'esabê›*, lê we ew kirîye ‹şkefta
qaçaxa›!**»
**14** Li wir p'aristgehêda kor û
seqet hatine cem Wî û Ewî ew
qenc kirin. **15** Lê gava ku serekêd
k'ahîna û qanûnzana ew k'ereme-
têd ku Îsa kirin dîtin û usa jî ew
zar'êd ku p'aristgehêda dikirine
qîr'în û digotin: «Hosanna Kur'ê
Dawidr'a!» hêrs k'etin **16** û gotine
Wî: «Tu dibihêyî ev çi dibêjin?»
Îsa wanar'a got: «Belê. We qet
nexwendîye ku: ‹Te bi zarêd t'ifal
û dergûşa pesindayîn anî sêrî›?*»

* 21:5 Zekerîya 9:9; Îşaya 62:11.
* 21:9 Zebûr 118:25-26.
** 21:9 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Hosanna bilindayîyêda». «Bilindayî» be'sa cîyê Xwedê dike.
* 21:13 Îşaya 56:7.
** 21:13 Yêremîya 7:11.
* 21:16 Zebûr 8:2.

17 Û Ewî ew li wir hiştin, ji
bajêr derk'et, çû Beytanyayê û
şev li wir ma.

### Dara hêjîrêye h'işkbûyî

*(Marqos 11:12-14, 20-24)*

18 Sibehê zû, çaxê Ew vege-
r'îya bajêr, bir'çî bû. 19 Ser r'ê
dareke hêjîrê dît, nêzîkî wê bû,
lê pêştirî belga[f] tiştekî din pêva
nedît û darêr'a got: «Ji vir şûnda
tu h'eta-h'etayê ber nedî!» Û dar
pêr'a-pêr'a h'işk bû.
20 Gava şagirta ev yek dît, zende-
girtî man û gotin: «Çawa ev dara
hêjîrê pêr'a-pêr'a h'işk bû?» 21 Îsa
caba wan da û got: «Ez r'ast wer'a
dibêjim, heger bawerîya we hebe
û dudilî nebin, hûnê ne t'enê çi
ku hate serê vê dara hêjîrê bikin,
lê heger hûn vî ç'îyayîr'a jî bêjin:
‹R'abe xwe bavêje be'rê›, wê bibe.
22 Heger bawerîya we hebe, hûn
çi ku nava duada bixwazin, hûnê
bistînin».

### Pirsa derheqa h'ukumê Îsada

*(Marqos 11:27-33; Lûqa 20:1-8)*

23 Gava Ew hate p'aristgehê û
cime't hîn kir, serekêd k'ahîna
û r'ûspîyêd cime'tê hatine cem
Wî û gotinê: «Tu bi çi h'ukumî
van kira dikî? Û k'ê ev h'ukum
daye Te?» 24 Îsa li wan veger'and
û got: «Ezê jî tiştekî ji we bipir-
sim. Heger we caba Min da, Ezê
jî wer'a bêjim Ez bi çi h'ukumî
van kira dikim. 25 H'ukumê ni-
xumandina Yûh'enna ji k'u bû,
ji e'zmên bû, yan ji meriva bû?»
Ewana nav hevda şêwirîn û gotin:
«Heger em bêjin: ‹Ji e'zmên bû›,
Ewê mer'a bêje: ‹Lê we çima ew
bawer nekir?› 26 Lê heger em bê-
jin: ‹Ji meriva bû›, em ji e'laletê
ditirsin, çimkî h'emûya qebûl
dikir ku Yûh'enna p'êxember
bû». 27 Wana caba Îsa da û gotin:
«Em nizanin». Ewî wanr'a got:
«Ez jî wer'a nabêjim ku Ez bi çi
h'ukumî van kira dikim.

### Mesela du kur'a

28 Hûn çawa t'exmîn dikin?
Du kur'êd merivekî hebûn. Ewî
kur'ê xweyî mezinr'a got: ‹Lawo!
Îro her'e nav r'ez, şixul bike›.
29 Ewî lê veger'and û got: ‹Ez
naçim›, lê paşê p'oşman bû û
çû. 30 Hingê bav çû cem yê din
ewî jî aha got: ‹Belê, ezê her'im
bavo›, lê neçû. 31 Niha ji van her
du kur'a k'îjanî gur'a[f] bavê xwe
kir?» Wana gote Wî: «Yê mezin».
Îsa jî gote wan: «Ez r'ast wer'a
dibêjim, ku xercgir û ç'e'vder[f]
wê berî we bik'evine P'adşatîya
Xwedê. 32 Çimkî Yûh'enna hat ku

r'îya r'astîyê nîşanî we ke, we ew
bawer nekir, lê xercgir û ç'e'v-
dera ew bawer kirin. We ev tişt
dît jî, lê dîsa hûn li xwe mukur'
nehatin, ku we ew bawer bikira.

### Mesela r'ezê tirîya û r'ezvana

*(Marqos 12:1-12; Lûqa 20:9-19)*

33 Meseleke din jî bibihên.
Merivekî xweyîmilk' hebû, r'ezê
tirîya danî, dora wê sûr kir h'ew-
zekî tirîh'incir'andinê têda k'ola,
hêlaneke nobedara çêkir û ew bi
k'irê da r'ezvana, çû welatekî din.
34 Gava wextê berdayînê nêzîk bû,
ewî xulamêd xwe şandine cem
r'ezvana, wekî ji berê r'ezê wî
jêr'a bînin. 35 R'ezvana xulamêd
wî girtin, yek k'utan, yê din kuş-
tin û yekî din jî dane ber kevira.
36 Ewî xulamne din şandin, ji
yêd pêşin gelektir û wana usa jî
anîne serê wan. 37 Axirîyê, kur'ê
xwe şande cem wan û got: ‹Hil-
bet wê ji kur'ê min şerm bikin›.
38 Lê gava r'ezvan ç'e'v kur'ê wî
k'etin, hevr'a gotin: ‹Ev warê wî
ye. Werin em vî bikujin û bibine
xweyê mîrat'a[f] wî›. 39 Û ew girtin
ji r'ez derxistine der û kuştin.
40 Lê gava xweyê r'ez bê, wê çi
serê wan r'ezvana bike?» 41 Gotine
Wî: «Wê qir'a wan neheqa bîne
û r'ez bide r'ezvanêd usa, yêd ku
wê wextda berê r'ezê wî bidinê».
42 Îsa gote wan: «We nivîsarêda
qet nexwendîye?
‹Ew kevirê ku hosta t'exsîr[f] kir,
ew bû serê e'nîşkê[f].
Ev yek ji alîyê Xudanda qewimî
û li ber ç'e'vê me h'eyr-h'ujme-
k'ar e!›*
43 Bona vê yekê Ez wer'a dibêjim,
ku P'adşatîya Xwedê wê ji we bê
standinê û miletekî usar'a bê
dayînê, wekî bona Wî ber bîne.
44 K'î ku bik'eve ser vî kevirî, wê
hûrdexweşî be û ew kevir bik'e-
ve ser k'ê, wê wî bih'incir'îne»*.
45 Gava serekêd k'ahîna û fêrisîya
meselêd Wî bihîstin, fe'm kirin
ku Ew bona wan dibêje. 46 Kirin
ku Wî bigirin, lê ji e'laletê tirsî-
yan, çimkî Ew weke p'êxemberekî
qebûl dikirin.

### Mesela de'watê

*(Lûqa 14:15-24)*

22 1 Dîsa Îsa bi mesela wanar'a
xeber da û got: 2 «P'ad-
şatîya E'zmana mîna vê yekê ye:
P'adşakî de'wata kur'ê xwe kir.

---

* 21:42 Zebûr 118:22-23.

* 21:44 Nav hinek destnivîsarada r'êza 44-a t'une.

3 Ewî xulamêd xwe şandin ku
gazî xwendîyêd de’watê kin, lê
wana nexwestin bên. 4 Xulamne
din şandin û got: ‹Xwendîyar’a
bêjin: Min canega û h’eywanêd
xweye dermalîkirî serjêkirine û
nanê xwe hazir kirîye, her tişt
hazir e. Werine de’watê!› 5 Lê
wana pişt guhê xweva avît, yek
çû e’rdê xwe û yê din t’ucaretîya[f]
xwe. 6 Yêd mayîn jî xulamêd wî
girtin, k’utan û kuştin. 7 Çaxê
p’adşê bihîst, hêrs k’et, ordîya xwe
şand qir’a ewêd ku xulam kuştin
anî û bajarê wan şewitand. 8 Hingê
gote xulamêd xwe: ‹De’wat hazir
e, lê xwendî ne hêja bûn. 9 R’a-
bin her’ine serê r’îya û hûn k’ê
ku bibînin, t’eglîfî de’watê kin›.
10 Û ew xulam derk’etine serê
r’îya, k’î ku dîtin, qenc û xirab,
t’ev civandin û mala de’watê bi
xwendîyava t’ijî bû.

11 Lê gava p’adşa çû hindur’ ku
xwendîya bibîne, merivek li wir dît
ku k’incê de’watê lê t’unebû 12 û
gote wî: ‹Heval! Tu çawa bê k’incê
de’watê k’etî vir?› Ewî deng nekir.
13 Wê gavê p’adşê berdestîyar’a got:
‹Dest û p’îyê wî girêdin, bigirin
bavêjine te’rîya derva. Li wir wê
bibe qîr’în û ç’irke-ç’irka dirana›.
14 Awa gazîkirî gelek in, lê bijartî
hindik in».

### Pirsa xercdayîn û nedayînê

*(Marqos 12:13-17;*
*Lûqa 20:20-26)*

15 Hingê fêrisî çûn şêwirîn, ku
Wî çawa bi xebera bigirin. 16 Wana
şagirtêd xwe t’evî piştgirêd Hê-
rodes şandine cem Wî û gotinê:
«Dersdar! Em zanin ku Tu yekî
r’ast î û r’îya Xwedê r’ast hîn dikî.
Minetê ji kesî nagirî, çimkî nav
merivada firqîyê danaynî. 17 Niha
bêje me, Tu çawa t’exmîn dikî?
Gelo r’ast e ku em xerc bidine
Qeyser[f] yan na?»

18 Îsa qelpîya wan zanibû û
got: «Çima hûn Min dicêr’ibî-
nin, dur’ûno? 19 P’erê xercdayînê
nîşanî Min kin». Û wana zîvek
Wîr’a anî. 20 Îsa ji wan pirsî: «Ev
navê nivîsar û sifet[f] yê k’ê ye?»
21 Wana got: «Yêd Qeyser in».
Hingê gote wan: «Awa çi ku yêd
Qeyser in bidine Qeyser û çi yêd
Xwedê ne bidine Xwedê». 22 Gava
wan bihîst zendegirtî man, Ew
hiştin û çûn.

### Pirsa r’abûna mirîya

*(Marqos 12:18-27;*
*Lûqa 20:27-40)*

23 Sadûqî[f], ku dibêjin r’abûna
mirîya t’une, wê r’ojê hineke ji
wan hatine cem Îsa jê pirsîn 24 û

gotinê: «Dersdar! Mûsa got: ‹Heger
yek bêzur’et bimire, bira birê wî
jina wî bistîne û warê birê xwe
şîn ke›*. **25** Awa h’eft bira li cem
me hebûn. Birê mezin zewicî,
bêzur’et mir, jina wî birê wîr’a
ma. **26** Usa jî hate serê birê duda
û yê sisîya, xulese hate serê her
h’efta jî. **27** Li pey h’emûyar’a ew
jina jî mir. **28** De îjar wê R’oja[f]
R’abûna mirîya ew k’ulfetê bi-
be jina k’îjanî ji wan her h’efta?
Çimkî h’emûya jî ew standibû».

**29** Îsa li wan veger’and û got:
«Hûn xalifî ne, çimkî ne nivî-
sara zanin, ne jî qewata Xwedê.
**30** R’oja R’abûna mirîya ne wê
bizewicin, ne jî mêr kin, lê ewê
mîna milyak’etêd e’zmên* bin.
**31** Lê derheqa r’abûna mirîyada,
çima we ew xebera ku Xwedê
wer’a gotibû nexwendîye? **32** ‹Ez
Xwedêyê Birahîm, Xwedêyê Îshaq
û Xwedêyê Aqûb im›*. Xwedê ne
Xwedêyê mirîya ye, lê Xwedêyê
zêndîya ye».

**33** Gava e’laletê ev tişt bihîstin,
ser hînkirina Wî zendegirtî man.

## T’emîya ser t’emîyar’a

*(Marqos 12:28-34;*
*Lûqa 10:25-28)*

**34** Lê gava fêrisîya bihîst ku Îsa
sadûqî dengbir’î kirin, h’emû li
cîkî civîyan. **35** Hingê ji wan qa-
nûnzana yekî pirs da Îsa ku Wî
bicêr’ibîne û gotê: **36** «Dersdar.
Qanûnêda k’îjan e t’emîya here
mezin?» **37** Îsa gote wî: «‹Xudan
Xwedêyê xwe h’iz bike bi t’e-
mamîya dilê[f] xwe, bi t’emamîya
canîya xwe û bi t’emamîya h’işê
xwe›*. **38** Ev e t’emîya pêşin û here
mezin. **39** Û ya duda jî mîna vê ye:
‹Hevalê xwe weke xwe h’iz bike›*.
**40** Ji van her du t’emîyava h’emû
nivîsarêd p’êxembera û Qanûnê
girêdayî ne».

## Mesîh kur’ê k’ê ye?

*(Marqos 12:35-37;*
*Lûqa 20:41-44)*

**41** Gava fêrisî civîyan, Îsa ji wan
pirsî **42** û got: «Hûn bona Mesîh çi
difikirin, t’exmîna we Ew kur’ê k’ê
ye?» Jêr’a gotin: «Kur’ê Dawid e».

* 22:24 Qanûna Ducarî 25:5.
* 22:30 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Milyak’etêd Xwedê».
* 22:32 Derk’etin 3:6.
* 22:37 Qanûna Ducarî 6:5.
* 22:39 Qanûna K’ahîntîyê 19:18.

43 Îsa gote wan: «Lê çawa Dawid
Wî pê R’uh’ Xudanê xwe h’esab
dike? Çimkî wî got:
44 ‹Xudan gote Xudanê min:
Li milê Minî r’astê r’ûnê,
h’eta ku Ez dijminêd Te bikime
binê p’îyêd Te›*.
45 Heger Dawid Wî ‹Xudan› h’esab
dike, Ew çawa dibe kur’ê wî?» 46 Û
kesekî nikaribû caba Wî bida û
li pey wê r’ojêr’a kesekî newêribû
pirsek jê bikira.

### H’evza xwe ji qanûnzan û fêrisîya bikin

*(Marqos 12:38-40; Lûqa 11:37-52; 20:45-47)*

23 1 Hingê Îsa e’lalet û şa-
girtêd Xwer’a xeber da
û got: 2 «Qanûnzan û fêrisî li ser
k’ursîya Mûsa r’ûniştine. 3 Îdî
ewana çi wer’a bêjin xwey kin û
biqedînin, lê mîna wan nekin,
çimkî ewana dibêjin, lê nakin.
4 Barêd giran û ze’met girêdidin,
datînine ser milêd meriva, lê ew
xwexa naxwazin t’ilîya xwe jî bi-
dinê. 5 Ew her tiştî dikin, ku ber
meriva bêne k’ifşê. K’îsikêd mezin
li mil û e’nîyêd xweva girêdidin* û
r’îşîyêd k’incêd xwe dirêj dikin**.
6 Şayîyada herema[f] jorin h’iz dikin,
k’inîştada jî k’ursîyêd pêşin, 7 ba-
zarada silavê bidine wan û meriv
jî wanr’a ‹mamosta*› bêjin. 8 Lê
bira wer’a nebêjin: ‹Mamosta›,
çimkî dersdarê we yek e* û hûn
h’emû jî bira ne. 9 Li ser dinê hûn
t’u kesîr’a nebêjin: ‹Bavo›, çimkî
Bavê we yek e, ku e’zmana ye.
10 Ne jî wer’a bêjin: ‹R’êber›, çim-
kî R’êberê we yek e, ew Mesîh e.
11 Bira nava weda yê herî mezin
bibe berdestîyê we. 12 K’î ku xwe
bilind ke, ewê nimiz be, lê k’î ku
xwe nimiz ke, ewê bilind be.

* 22:44 Zebûr 110:1.

* 23:5 Çawa ku Qanûna Ducarî 6:8-da nivîsar e, cihûya k’îsikêd mil û e’nîyêd xweda nivîsarêd sereke û t’emîyêd Xwedêye ji Peymana[f] Kevin xwey dikirin. Ev in ew nivîsarêd ji k’itêbêd Mûsa ku gelekî dikirine k’îsika: Derk’etin 13:1-10; 13:11-16; Qanûna Ducarî 6:4-9; 11:13-21.

** 23:5 «R’îşîyêd k’incêd xwe dirêj dikin», wekî bidine k’ifşê, ku ew ji alîyê Xwedêda Xwedêr’a dayî û amin in (Jimar 15:37-41; Qanûna Ducarî 22:12).

* 23:7 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «R’abbî». «R’abbî» bi zimanê aramî[f] tê fe’mkirinê: «Dersdar».

* 23:8 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Ew Mesîh e».

**Wey li dur'ûya**

13 Lê wey li we qanûnzan û
fêrisîya! Dur'ûno! Hûn derê P'ad-
şatîya E'zmana li ber meriva
dadidin. Ne hûn dik'evinê û ne
jî dihêlin ewêd ku dixwazin bi-
k'evinê. 14 Wey li we qanûnzan
û fêrisîya! Dur'ûno! Alîkîva hûn
malêd jinebîya h'ûfî xwe dikin,
alîyê dinva jî bi dur'ûtî duayê xwe
dirêj dikin. Bona vê yekê dîwana
we wê hê giran be*. 15 Wey li we
qanûnzan û fêrisîya! Dur'ûno!
Hûn be'r û bejê li hev didin, ku
yekî nebawer bînin ser r'îya xwe.
Gava meremê we dibe, hûn ewî ji
xwe du cara zêdetir dikine p'ara
ce'nimê. 16 Wey li we r'êberêd kor,
hûn dibêjin: ‹K'î ku bi p'aristgehê
sond dixwe, ne tiştek e. Lê k'î ku
bi zêr'ê li nav p'aristgehê sond di-
xwe, dibe deyndar›. 17 Hey bêh'iş
û korno! K'îjan mezin e, zêr' yan
p'aristgeh, ku zêr' h'elal[f] dike?
18 Usa jî hûn dibêjin: ‹K'î ku bi
gorîgehê sond dixwe ne tiştek e,
lê k'î ku bi h'edîya li ser gorîgehê
sond dixwe, dibe deyndar›. 19 Hey
korno!* K'îjan e mezin? H'edî
yan gorîgeh, ku h'edîyê h'elal
dike? 20 Awa k'î ku bi gorîgehê
sond dixwe, ew hin bi wê sond
dixwe, hin jî bi h'emû tiştêd ku
ser wê hene sond dixwe. 21 K'î ku
bi p'aristgehê sond dixwe, ew hin
bi wê sond dixwe, hin jî bi Yê ku
wêda dijî sond dixwe. 22 Û k'î ku
bi e'zmên sond dixwe, ew hin bi
t'extê Xwedê sond dixwe, hin jî
bi Yê ku li ser R'ûniştîye sond
dixwe. 23 Wey li we qanûnzan û
fêrisîya! Dur'ûno! Hûn dehekê[f]
pûngê[f], anîsoyê[f] û k'êmûnê[f] didin,
lê tiştêd Qanûnêye pêş, awa gotî
heqîyê, r'e'mê û bawerîyê davê-
jine pişt guhê xwe. We gerekê ev
yek bikirana û dest ji yêd mayîn
nek'işanda. 24 R'êberêd kor! Hûn
k'ermêşa diparzinin, lê deva da-
diqurtînin! 25 Wey li we qanûnzan
û fêrisîya! Dur'ûno! Hûn t'as û
fîncana r'ûyê dervava paqij dikin,
lê hindur'va t'ijî timayî û ç'e'v-
bir'çîyî ne*. 26 Fêrisîyê kor! Pêşîyê
hindur'ê fîncan û t'asê paqij ke,
wekî li derva jî paqij be. 27 Wey li
we qanûnzan û fêrisîya! Dur'ûno!

* 23:14 Nav destnivîsarêd here qencda r'êza 14-a t'une.

* 23:19 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Hey bêh'iş û korno».

* 23:25 Aha jî tê fe'mkirinê: «Lê hindur'va bi tiştêd zulmê û ç'e'vbir'çîyê qazinckirîva t'ijî ne».

Hûn mîna t'irbêd sipîkirî ne, ku dervava bedew xuya dibin, lê hindur'va bi hestûyê mirîya û bi h'emû h'eramîyêva t'ijî ne. 28 Usa jî hûn derva merivava r'ast k'ifş dibin, lê hindur'va hûn dur'û ne û neheq in.

### Îsa axirîya wan wanr'a dibêje

29 Wey li we qanûnzan û fêrisîya! Dur'ûno! Hûn mexberêd p'êxembera çêdikin û t'irbê yêd r'ast dixemilînin 30 û dibêjin: ‹Heger em r'ojêd bavêd xweda bûna, me t'evî wan xûna p'êxembera nedir'êt›. 31 Îdî hûn niha xwexa didine îzbatkirinê, ku hûn zar'êd wan bava ne, yêd ku p'êxember kuştine. 32 De kêmasîya xirabîyêd bavêd xwe t'emam kin. 33 Me'rno! Ç'êjikêd me'ra! Hûnê çawa ji dîwana dojê[f] bir'evin?

34 Bona vê yekê va Ezê p'êxembera, serwaxta û qanûnzana bişînime cem we û hûnê ji wan hineka bikujin, xaç kin, hineka jî nav k'inîştêd xweda bidine ber qamçîya û bajar-bajar bizêrînin. 35 H'emû xûna bêsûce ku ser r'ûyê e'rdê hatîye r'êtinê wê bê ser we, ji xûna Habîlê[f] bêsûc h'eta xûna Zekerîyayê kur'ê Berexîya, ewê ku we nav p'aristgeh û gorîgehêda kuşt. 36 Ez r'ast wer'a dibêjim, ev h'emû xûnê bê serê vî nisilî.

### Îsa li ser Orşelîmê dilovîne

*(Lûqa 13:34-35)*

37 Orşelîm! Orşelîm! Te p'êxember dikuştin û şandîyêd cem xwe didane ber kevira! Çend cara Min xwest ku zar'êd te usa bicivanda, çawa mirîşk cûcûkêd xwe bin baskê xweda dicivîne, lê we nexwest! 38 Va mala we wê xirabe û destjêk'işandî bimîne.
39 Ez wer'a dibêjim, îdî ji vir şûnda hûn Min t'u car nabînin, h'eta ku bêjin: ‹Bimbarek e Ewê ku bi navê Xudan tê›*».

### Îsa pêşda derheqa wêranbûna p'aristgehêda dibêje

*(Marqos 13:1-2; Lûqa 21:5-6)*

**24** 1 Gava Îsa ji p'aristgehê derk'et çû, şagirt çûne cem Wî, ku avayîyêd p'aristgehê nîşanî Wî kin. 2 Îsa wanr'a got: «Hûn van h'emûya dibînin? Ez r'ast wer'a dibêjim, ev h'emûyê jî wêran bin, li vir kevirê li ser kevir qet nemîne!»

* 23:39 Zebûr 118:26.

### Tengasî û zêrandin

*(Marqos 13:3-13; Lûqa 21:7-19)*

3 Çaxê Ew ser ç’îyayê Zeyt’û-
nê r’ûniştibû, şagirtêd Wî t’enê
hatine cem Wî û jê pirsîn: «Bêje
me, ev tişt wê k’engê biqewimin?
Û nîşana hatina Te û axirîya vê
dinyayê wê çawa be?» 4 Îsa caba
wan da û got: «Haş ji xwe hebin,
ku t’u kes we nexapîne, 5 çimkî
gelek wê pê navê Min bên û bêjin:
‹Ez im Mesîh› û wê geleka bixali-
fînin. 6 Hûnê dengê şer’a û be’sa
şer’a bibihên, lê haş ji xwe hebin
ku hûn xwe unda nekin. Gerekê
ev tişt biqewimin, lê ew hê ne
axirî ye. 7 Miletê r’abe li ser milet,
p’adşatî li ser p’adşatîyê, cî-cîya
wê xelayî-celayê û e’rdh’ejê bibin.
8 Lê ev h’emû mîna êşa k’ulfetê ye,
ku destpêdike pê digire. 9 Hingê
wê we bidine cefê, we bikujin û
bona navê Min ber ç’e’vê h’emû
mileta r’eş bin. 10 Hingê gelekê
ji r’ê bik’evin, nemamîya hevdu
bikin û ber ç’e’vê hev bik’evin.
11 Gelek p’êxemberêd derew wê
derk’evin û geleka bixalifînin. 12 Ji
dest zêdebûna neheqîyê h’izkiri-
na geleka wê sar be. 13 Lê k’î ku
h’eta xilazîyê teyax ke, ewê xilaz
be. 14 Û ev Mizgînîya P’adşatîyê
wê li nav t’emamîya dinyayê bê
dannasînkirinê, ku h’emû miletar’a
bibe şe’detî û hingê xilazî wê bê.

### H’eramîya Wêrankirinê

*(Marqos 13:14-23;
Lûqa 21:20-24)*

15 Çaxê hûn ‹h’eramîya wêranki-
rinê›* cîyê pîrozda sekinî bibînin,
çawa ku Danîyêl p’êxember got»,
(ewê ku dixûne bira fe’m bike),
16 «hingê ewêd ku Cihûstanêda ne
bira bir’evine ç’îya. 17 Ewê ku ser
xanî ye bira jorda neyê xwarê ku
ji mala xwe tiştekî hilde. 18 Û ewê
ku k’ewşênda ye bira veneger’e ku
p’otê xwe hilde. 19 Lê wey li h’emla
û destdergûşa wan r’ojada! 20 Dua
bikin, ku r’eva we nek’eve zivistanê,
yan jî r’oja şemîyê. 21 Çimkî hingê
tengasîke usa mezin wê bibe, ku
ji destpêbûna dinyayê h’eta niha
mîna wê nebûye û ne jî wê bibe.
22 Heger ew r’oj kin nebûna, t’u
kes xilaz nedibû, lê bona xatirê
bijartîya ew r’ojê kin bin.

23 Hingê, heger yek wer’a bêje:
‹Va ye Mesîh›, yan jî ‹Wa ye›,
bawer nekin. 24 Çimkî mesîh û
p’êxemberêd derew wê derên,
nîşan û k’eremetêd mezin bikin,

* 24:15 Danîyêl 9:27; 11:31; 12:11.

ku bikaribin bijartîyêd Xwedê jî
bixalifînin. 25 Va ye Min pêşda
wer'a got.

26 Heger ewana wer'a bêjin: ‹Wa
ye Mesîh ber'îyêda ye›, dernek'e-
vin, yan: ‹Va ye Ew filan odêda
ye›, bawer nekin. 27 Çimkî çawa
birûsk ji r'ohilatê birq dide û h'e-
ta r'oavayê xuya dibe, wê hatina
Kur'ê Mêriv jî usa be. 28 Beret'e[f]
k'îderê hebe, teyrê jî li wir bicivin.

### Hatina Kur'ê Mêriv

*(Marqos 13:24-27;*
*Lûqa 21:25-28)*

29 Li pey tengasîya wan r'ojar'a,
r'ûyê r'oyê wê bê girtinê
û hîvê jî r'onaya xwe nede,
steyrkê ji e'zmên bik'evin
û t'opêd e'zmana wê ji r'îyêd
xwe derên*.
30 Hingê nîşana Kur'ê Mêriv wê
li e'zmên xuya be û h'emû mile-
têd dinyayê wê şînê bikin, gava
bibînin Kur'ê Mêriv li ser e'wrêd
e'zmên bi qewat û r'ûmeta me-
zin tê*. 31 Ewê milyak'etêd Xwe
bi bor'îya dengê bilind bişîne û
wê bijartîyêd Wî ji her çar qulba
berev kin, ji p'er'ekî e'zmana h'eta
p'er'ê din.

### Dersa dara hêjîrê

*(Marqos 13:28-31;*
*Lûqa 21:29-33)*

32 Ji dara hêjîrê dersekê hîn bin.
Çaxê ç'iqilêd wê ter' dibin û belgêd
wê dibişkivin, îdî hûn zanin ku
havîn nêzîk e. 33 Usa jî gava hûn
van h'emû tişta bibînin, bizanibin
ku ev tişt* nêzîk e, li ber şêmîkê
ye. 34 Ez r'ast wer'a dibêjim, eva
nisila derbaz nabe, h'eta ku ev
h'emû tişt neqewimin. 35 E'rd û
e'zmanê derbaz bin, lê gotinêd
Min t'u car derbaz nabin.

### R'oj û sih'et ne e'yan e

*(Marqos 13:32-37;*
*Lûqa 17:26-30, 34-36)*

36 Lê bona wê r'ojê û wê sih'etê
t'u kes nizane, ne milyak'etêd
e'zmana, ne jî Kur'*, lê t'enê
Bav. 37 Çawa ku r'ojêd Nuhda[f]
qewimî, hatina Kur'ê Mêriv jî
wê usa biqewime. 38 Çawa ku
wan r'ojêd berî lêyîyê meriva di-
xwarin, vedixwarin, dizewicîn

---

* 24:29 Aha jî tê fe'mkirinê: «Qewatêd e'zmana wê bih'ejin».
* 24:30 Îşaya 13:10; 34:4; Danîyêl 7:13. (Bixûnin: E'yantî 1:7.)
* 24:33 Aha jî tê fe'mkirinê: «Ew, awa gotî Mesîh nêzîk e, li ber şêmîkê ye».
* 24:36 Nav hinek destnivîsarada «ne jî Kur'» t'une.

û mêr dikirin, h’eta wê r’oja ku
Nuh k’ete gemîyê* 39 û meriv pê
neh’esîyan, h’eta ku lêyî r’abû û
h’emû jî xeniqandin. Hatina Kur’ê
Mêriv jî wê usa be. 40 Hingê du
meriv wê nav e’rdê xweda bin, yekê
bê hildanê û yê dinê bê hiştinê.
41 Û du k’ulfetê ser destar’ekî bin,
yekê bê hildanê, ya din bê hişti-
nê. 42 Awa h’işyar bimînin, çimkî
hûn nizanin Xudanê weyê k’îjan
r’ojê bê. 43 Lê vê yekê bizanibin.
Heger xweyê malê bizanibûya ku
dizê k’îjan dema şevê bihata, wê
h’işyar bima û nehişta ku mala wî
derevekira. 44 Bona vê yekê hûn
jî hazir bin, çimkî Kur’ê Mêriv
wê sih’eteke usada bê, ku hûn ne
ç’e’vnihêr’î ne.

### Xulamê amin û xulamê bêamin

*(Lûqa 12:35-48)*

45 Awa k’î ye ew xulamê amin
û serwaxt, ku axayê wî ew ser
xulamêd xwe serwêr k’ifş kir, ku
wextda xwarina wan bide wan?
46 Xwezî li wî xulamî, ku çaxê
axayê wî bê, ewî usa bibîne. 47 Ez
r’ast wer’a dibêjim, ewê wî bike
serwêrê t’emamîya hebûka xwe.
48 Lê heger xulamê xirab dilê
xweda bêje: ‹Axayê min hatina
xwe derengî êxist› 49 û destpêke li
xulam-hevalêd xwe xe û t’evî yêd
serxweş bixwe û vexwe, 50 axayê
wî xulamî wê r’ojeke usa bê, ku
ew ne hîvîyê ye û sih’eteke usa,
ku ew nizane. 51 Ewê wî qet-qetî
ke û p’ara wî wê t’evî dur’ûya ke.
Li wir wê bibe girî û ç’irke-ç’ir-
ka dirana.

### Mesela dehe qîzêd bik’ir

**25** 1 Hingê P’adşatîya E’zmana
wê mîna vê yekê be: Dehe
qîzêd bik’ir ç’irêd xwe hildan pêşîya
ze’vêda çûn. 2 Ji wan pênc serwaxt
bûn, lê pênc bêfe’m. 3 Bêfe’ma
ç’irêd xwe hildan, lê r’ûn xwer’a
hilnedan, 4 lê serwaxta t’evî ç’ira
r’ûn jî derdanada xwer’a hildan.
5 Gava ze’va derengî k’et, h’emû
jî hênijîn û xewr’a çûn.
6 Nîvê şevê dengek hat: ‹Va
ye ze’va tê! Pêşîya wîda her’in!›
7 Hingê h’emû bik’ir r’abûn ç’i-
rêd xwe saz kirin. 8 Bêfe’ma gote
serwaxta: ‹Ji wî r’ûnê xwe bidine
me jî, çimkî ç’irêd me vêdisin›.
9 Lê serwaxta caba wan da û gotin:
‹Na xêr, ev r’ûn wê t’êra me û we
neke. Qenc e ku hûn her’ine cem
yêd ku difiroşin xwer’a bik’ir’in›.

* 24:38 Destpêbûn 6-8.

**10** Gava ew çûn bik’ir’in, ze’va hat
û ewêd hazir t’ev wî k’etine de’-
watê û derî hate girtinê. **11** Paşê
bik’irêd din hatin û gotin: ‹Em
xulam, Em xulam! Derî li me
veke!› **12** Lê ewî caba wan da got:
‹Ez r’ast wer’a dibêjim, ez we nas
nakim›. **13** Awa h’işyar bimînin,
çimkî hûn ne r’oja hatina Kur’ê
Mêriv zanin, ne jî sih’etê.

## Mesela sê xulama

*(Lûqa 19:11-27)*

**14** Wî çaxî P’adşatîya E’zmana
wê mîna vê yekê be: Merivek ku
wê derk’eta r’êwîtîyê, gazî xula-
mêd xwe kir û hebûka xwe sparte[f]
wan. **15** Pênc telant* dane yekî,
du telant dane yekî û telantek jî
da yekî, her kesîr’a weke qewata
wî û r’êk’et çû. **16** Ewê ku pênc
telant standibûn, pêr’a-pêr’a çû
bi wan k’ir’î û firot, pêncêd din jî
qazinc kirin. **17** Usa jî ewê ku du
telant standibûn, duduyêd din jî
qazinc kirin. **18** Lê ewê ku telan-
tek standibû, çû e’rd k’ola û zîvê
axayê xwe têda veşart.

**19** Pey gelek wextr’a axayê wan
xulama hat û xwest heq-h’esabê
xwe t’evî wan r’ast ke. **20** Ewê ku
pênc telant standibûn pêşda hat,
pênc telantêd mayîn jî anîn û got:
‹Axayê min, te pênc telant dabûne
min. Va min ser wanda pêncêd
din jî qazinc kirine›. **21** Axayê wî
gotêda: ‹E’ferim, xulamê qenc û
amin! Tu nav tiştêd hindikîda amin
mayî, ezê te daynime ser gelek
tişta. Bik’eve şayîya axayê xwe!›

**22** Ewê ku du telant standibûn
jî hat û got: ‹Ez xulam! Te du
telant dabûne min. Va min du-
duyêd din jî li ser wanda qazinc
kirine›. **23** Axayê wî gotê: ‹E’ferim,
xulamê qenc û amin! Tu nav tiş-
têd hindikîda amin mayî, ezê te
daynime ser gelek tişta. Bik’eve
şayîya axayê xwe!›

**24** Lê ewê ku telantek standibû
hat û got: ‹Axayê min, min zanibû
ku tu merivekî h’işk î. Ji wî cîyê
te neçandîye didirûyî û cîyê ku te
ne r’eşandîye berev dikî. **25** Ez jî
tirsîyam û çûm telantê te e’rdêda
veşart. Hanê malê te ter’a be›.
**26** Axayê wî lê veger’and û gotê:
‹Xulamê xirab û xwer’anedîtî! Te
zanibû ez ji wî cîyê ku min ne-
çandîye didirûm û ji wî cîyê ku
min ner’eşandîye berev dikim,
**27** te çima zîvê min neda k’arkira
û ez bihatama min malê xwe bi
selef bistanda? **28** Niha telant ji

* 25:15 Qîmetê telantekî heqê p’alekî panzdeh sala zêdetir bû.

wî bistînin û bidine ewê ku dehe
telantêd wî hene. 29 Çimkî yê k'ê
ku heye, wîr'a wê bê dayînê û
serda zêde be, lê yê k'ê ku t'une,
çi heye jî wê jê bê standinê. 30 Lê
ew xulamê bêkêr bavêjine te'rîya
derva. Li wir wê bibe girî û ç'ir-
ke-ç'irka dirana›.

### R'oja[f] Axretê

31 Gava Kur'ê Mêriv t'evî h'emû
milyak'eta û r'ûmeta Xweva bê,
hingê wê ser t'extê Xweyî r'ûmetê
r'ûnê 32 h'emû milet wê li ber Wî
bicivin. Ewê wana ji hev başqe ke,
çawa şivan pêz ji bizina vediqetî-
ne. 33 Ewê pêz li milê Xweyî r'astê
bide sekinandinê, lê bizina li milê
Xweyî ç'epê. 34 Hingê P'adşa wê
yêd li milê Xweyî r'astêr'a bêje:
‹Werin bimbarekbûyîyêd alîyê Bavê
Minda! Ew P'adşatîya ku bona
we ji wextê e'firandina dinyayêda
hazir bûye war bin. 35 Çimkî Ez
bir'çî bûm we xwarin da Min, Ez
t'î bûm we av da Min, Ez xerîb
bûm we Ez qebûl kirim, 36 Ez
te'zî bûm we Ez k'inc kirim, Ez
nexweş bûm hûn ser Minda hatin,
Ez kelêda bûm hûn hatine cem
Min›. 37 Hingê yêd r'ast wê Wî-
r'a bêjin: ‹Xudan, me k'engê Tu
bir'çî dîtî û xwarin daye Te? Yan
me Tu t'î dîtî û av daye Te? 38 Me
k'engê Tu xerîb dîtî û Tu qebûl
kirî, yan jî Tu te'zî dîtî û Tu k'inc
kirî? 39 K'engê me Tu nexweş yan
kelêda dîtî û em hatine cem Te?›
40 P'adşayê jî wanr'a bêje: ‹Ez r'ast
wer'a dibêjim, heger we qencî ji
van xûşk-birêd Mine yê herî bi-
ç'ûk yekîr'a kir, we Minr'a kir›.
41 Hingê Ewê yêd milê Xweyî
ç'epêr'a bêje: ‹Nifir'lêbûyîno! Dûrî
Min her'in nava agirê h'eta-h'eta-
yê, ku bona mîrêcin û milyak'etêd
wî hazir bûye*. 42 Çimkî Ez bir'çî
bûm we xwarin neda Min, Ez t'î
bûm we av neda Min, 43 Ez xerîb
bûm we Ez qebûl nekirim, Ez
te'zî bûm we Ez k'inc nekirim,
Ez nexweş û kelêda bûm hûn ser
Minda nehatin›. 44 Hingê ewê
Wîr'a bêjin: ‹Xudan! Me k'engê
Tu bir'çî yan t'î, yan xerîb, yan
bê sit'ar, yan nexweş, yan kelêda
dîtî û me alîk'arî neda Te?› 45 Wî
çaxî Ewê caba wan bide û bêje:
‹Ez r'ast wer'a dibêjim, heger we
qencî ji evêd herî biç'ûk yekîr'a
nekir, we Minr'a jî nekir›. 46 Û
evê her'ine cefê h'eta-h'etayê, lê
yêd r'ast wê her'ine jîyîna h'e-
ta-h'etayê».

* 25:41 E'yantî 20:10.

# Girtin, xaçkirin[f] û r'abûna Îsa

### Şêwira kuştina Îsa
*(Marqos 14:1-2; Lûqa 22:1-2;*
*Yûh'enna 11:45-53)*

**26** 1 Gava Îsa ev h'emû xeber
xilaz kirin, şagirtêd Xwer'a
got: 2 «Hûn zanin ku wê du r'oja
şûnda Cejina[f] Derbazbûnê be. Û
Kur'ê Mêriv wê bê dayînê ku bê
xaçkirinê».
3 Hingê serekêd k'ahîna û r'ûs-
pîyêd cime'tê seraya serekk'ahînda
ku navê wî Qeyafa bû civîyan 4 û
li hev şêwirîn ku Îsa dizîva bi fêl-
bazîyê bigirin, bikujin. 5 Lê wana
digot: «Bira ev yek cejinêda nîbe,
wekî cime't r'anebe ser niga».

### Îsa Beytanyayêda tê r'ûnkirinê[f]
*(Marqos 14:3-9;*
*Yûh'enna 12:1-8)*

6 Çaxê Îsa li Beytanyayê mala
Şimh'ûnê k'otîda bû, 7 k'ulfeteke
ku derdaneke wêye alabastirêyî
r'ûnê bînxweş hebû, hate cem
Wî û çaxê Ew li ser sifrê r'ûniştî
bû, ewê ew r'ûn r'ête ser serê Wî.
8 Gava şagirta ev yek dît, li wan
xweş nehat û gotinê: «Çima eva
zîyana bû? 9 Eva r'ûna[f] wê qîmetekî
biha bihata firotanê û feqîrar'a
bihata belakirinê».
10 Lê ew yek Îsava e'yan bû û
wanar'a got: «Çima hûn xatirê
wê k'ulfetê dik'evin? Ewê tiştekî
qenc bona Min kir. 11 Feqîrê her
gav t'evî we bin, lê Ezê her gav t'evî
we nîbim. 12 Ewê bona definkirina[f]
Min ew r'ûn r'ête ser bedena Min.
13 Ez r'ast wer'a dibêjim, dinyayêda
k'îderê eva Mizgînîya bê danna-
sînkirinê, wê kirina vê k'ulfetê jî
bona bîranîna wê bê gotinê».

### Cihûda nemamîya Îsa dike
*(Marqos 14:10-11; Lûqa 22:3-6)*

14 Hingê yek ji her donzdeha ku
Cihûdayê Îsxeryotî dihate gotinê,
çû cem serekêd k'ahîna 15 û got:
«Hûnê çi bidine min, wekî ez Wî
bidime destê we?» Û wana sî zîv
jimirîn danê. 16 Ji wir şûnda ew
mecalekê diger'îya ku çawa Îsa
bide destê wan.

### Îsa t'evî şagirtêd Xwe şîva Cejina Derbazbûnê dixwe
*(Marqos 14:12-21; Lûqa 22:7-13;*
*Yûh'enna 13:21-30)*

17 Li r'oja pêşine Cejina[f] Nanê
Şkeva, şagirt hatine cem Îsa û

jêr'a gotin: «Tu li k'u dixwazî
Şîva Cejina Derbazbûnê bixwî,
wekî em Ter'a hazir kin?» 18 Ewî
jî got: «Her'ine bajêr, cem filan
merivî û bêjine wî: ‹Dersdar di-
bêje: R'oja Min nêzîk e. Ezê t'evî
şagirtêd Xwe mala teda Cejina
Derbazbûnê derbaz kim›». 19 Û
şagirta usa kir, çawa ku Îsa wa-
nar'a e'mir kiribû û şîva Cejina
Derbazbûnê hazir kirin.
20 Êvarê t'ev her donzdeha ser
sifrê r'ûniştin. 21 Gava wana hê
dixwar, Îsa got: «Ez r'ast wer'a
dibêjim, yekî ji we wê nemamîya
Min bike». 22 Şagirt gelekî ber xwe
k'etin û her yekî ji wan gote Wî:
«Xudan, dibe ku ez im?» 23 Ewî
li wan veger'and û got: «Ewê ku
pe'rîyê Xwe t'evî Min t'asêda kir,
ewê nemamîya Min bike. 24 R'ast
Kur'ê Mêriv wê usa her'e çawa ku
bona Wî hatîye nivîsarê, lê wey
li wî merivê ku nemamîya Kur'ê
Mêriv bike! Wîr'a hê qenc bû ku
ew qet dinê nek'eta». 25 Cihûdayê
ku wê nemamîya Wî bikira, lê
veger'and û gotê: «Dersdar, dibe
ku ez im?» Îsa wîr'a got: «Te bi
devê xwe got».

### Şîva Xudan

*(Marqos 14:22-26; Lûqa 22:14-23; Korint'î I, 11:23-25)*

26 Awa gava wana hê nan dixwar,
Îsa nan hilda şikirî da, kerkir da
şagirta û got: «Han hildin bixwin.
Eva bedena Min e».
27 Peyr'a k'as hilda şikirî da, da
wan û wanar'a got: «Hûn h'emû
jî ji vê vexwin, 28 eva xûna Min e
bona peymanê[f]*, ku bona bax-
şandina gunêd geleka tê r'êtinê.
29 Lê Ez wer'a dibêjim, îdî Ez ji
vir şûnda t'u car ji vê meya tirîyê
venaxwim, h'eta wê r'oja ku Ezê
t'evî we P'adşatîya Bavê Xweda ji
ya nû vexwim».
30 Paşê wana zebûrek[f] stira,
derk'etin çûne ç'îyayê Zeyt'ûnê.

### Îsa derheqa înk'arîya Petrûsda dibêje

*(Marqos 14:27-31; Lûqa 22:31-34; Yûh'enna 13:36-38)*

31 Hingê Îsa wanar'a got: «Îşev
hûn h'emûyê jî ji Min p'işk bin
her'in, çimkî nivîsar e: ‹Ezê li
şivên xim û pezê jî bela-belayî
be›*. 32 Lê gava ku Ez ji miri-
nê r'abim, Ezê berî we her'ime

* 26:28 Nav hinek destnivîsarada «peymana nû» heye.

* 26:31 Zekerîya 13:7.

Celîlê». 33 Petrûs lê veger'and û
gotê: «Heger h'emû jî ji Te p'işk
bin her'in, lê ez t'u car ji Te na-
çim». 34 Îsa wîr'a got: «Ez r'ast
ter'a dibêjim, hema îşev hê berî
bangdana dîk, tê sê cara Min
înk'ar kî». 35 Petrûs Wîr'a got:
«Heger cî bê, ezê t'evî Te bimirim
jî, lê t'u car Te înk'ar nakim».
H'emû şagirta jî usa got.

### Îsa li Gêtşemanîyê dua dike

*(Marqos 14:32-42;*
*Lûqa 22:39-46)*

36 Hingê Îsa t'evî wan çû wî
cîyê ku jêr'a Gêtşemanî dibêjin û
şagirtar'a got: «Vira r'ûnên, h'eta
Ez her'im dera han dua bikim».
37 Ewî t'evî Xwe Petrûs û her du
kur'êd Zebedî hildan, k'eser hatê
û ber Xwe k'et. 38 Hingê Îsa wa-
nar'a got: «Dilê Min haqas derd
û k'eder e, mîna ber mirinê. Vira
bimînin û t'evî Min h'işyar bin».
39 Hinekî pêşda çû Xwe deve-
r'ûya avît dua kir û got: «Bavê
Min! Heger dibe, bira ev k'asa
cefê ser Minr'a derbaz be. Lê ne
ku çawa Ez dixwazim, lê bira
xwestina Te be».
40 Paşê hate cem şagirta, ew
r'azayî dîtin û gote Petrûs: «We
nikaribû ku sih'etekê hûn t'evî
Min h'işyar bimana? 41 H'işyar
bimînin û dua bikin, wekî hûn
nek'evine nava cêr'ibandinê. Belê
r'uh' r'azî ye, lê beden sist e».
42 Careke din jî Îsa çû dua kir
û got: «Bavê Min! Heger nabe
ku ev k'asa cefê ji Min derbaz be
h'eta ku Ez wê venexwim, bira
xwestina Te be».
43 Îsa hat, ew dîsa xewêda dîtin,
ç'e'vêd wan ji xewê venedibûn.
44 Û ew hiştin çû, cara sisîya dua
kir, dîsa ew xeber gotin.
45 Hingê hate cem şagirta û
wanar'a got: «Hûn hela hê r'azayî
ne û r'ih'et dibin? Va wext pêr'a
gihîşt ku Kur'ê Mêriv bik'eve
destê gunek'ara. 46 R'abin em
her'in. Va ye ewê ku nemamîya
Min dike nêzîk bû».

### Girtina Îsa

*(Marqos 14:43-50; Lûqa*
*22:47-53; Yûh'enna 18:3-12)*

47 Ewî hê xeber dida, nişkêva
Cihûdayê ku yek ji wan donzdeha
bû hat. Ewî t'evî xwe ji alîyê sere-
kêd k'ahîna û r'ûspîyêd cime'têda
e'laleteke giran anîbû, bi dara û
şûra. 48 Awa nemamê Wî e'şeret
dabû wan û gotibû: «Ez k'îjanî
ku r'amûsim, Ew e, Wî bigirin».
49 Hingê Cihûda nêzîkî Îsa bû
û gotê: «Silav li Te, dersdar!» û
r'amûsa. 50 Îsa wîr'a got: «Heval,

tê çi bikî zû bike!»* Wê gavê ew
pêşda hatin, dest avîtine Îsa û
Ew girtin. 51 Nişkêva yekî ji ewêd
ku t'evî Îsa bû, r'abû şûrê xwe
k'işand li xulamê serekk'ahîn xist
û guhê wî pekand. 52 Wê gavê Îsa
wîr'a got: «Şûrê xwe bike cî. K'î
ku şûr hiltîne, ewê bi şûr her'e.
53 Te t'irê Ez nikarim ji Bavê
Xwe bixwazim wekî pêr'a-pêr'a
donzdeh ordîya zêdetir milyak'et
bigihîne Min? 54 Lê nivîsar wê
çawa bêne sêrî ku dibêjin, gerekê
h'emû aha bin?»

55 Wê gavê Îsa e'laletêr'a got:
«Tê bêjî we ser qaçaxekîda girtîye,
ku hûn bi dara û şûra hatine Min
bigirin? Ne Ez her r'oj t'evî we
p'aristgehêda r'ûdiniştim Min hûn
hîn dikirin, lê we Ez nedigirtim.
56 Lê ev h'emû tişt qewimîn, ku
nivîsarêd p'êxembera bêne sêrî».
Wê demê h'emû şagirta Ew hiş-
tin û r'evîn.

**Îsa li ber civîna[f] giregira**

*(Marqos 14:53-65; Lûqa 22:54-55, 63-71; Yûh'enna 18:13-14, 19-24)*

57 Yêd ku Îsa girtin, Ew birine
cem Qeyafayê serekk'ahîn, li wî
cîyê ku qanûnzan û r'ûspî civî-
yabûn. 58 Petrûs jî dûrva h'eta
h'ewşa serekk'ahîn p'ê-p'ê pey
Wî çû k'ete hindur' û li nav no-
bedara r'ûnişt, ku bizanibe axirî
wê çawa be. 59 Serekêd k'ahîna
û t'emamîya civîna[f] giregira jî
miqabilî Îsa şe'detîke derew dige-
r'îyan ku Wî bikujin, 60 lê nedîtin.
Gelek şe'dêd derew jî hatin, dîsa
nedîtin. Paşê du şe'dêd derew
pêşda hatin 61 û gotin: «Evî got:
‹Ez dikarim p'aristgeha Xwedê
hilşînim û nava sê r'ojada dîsa
wê çêkim›».

62 Serekk'ahîn[f] r'abû ser p'îya
û Wîr'a got: «Bona van şe'detîya
ku evana miqabilî Te didin Tu
çima cabekê nadî?» 63 Lê Îsa
dengê Xwe nekir. Serekk'ahîn
dîsa Wîr'a got: «Ez Te bi Xwedêyê
sax didime sondê. Mer'a bêje, Tu
yî Mesîh, Kur'ê Xwedê?» 64 Îsa
gote wî: «Te bi devê xwe got. Lê
Ez wer'a dibêjim,

ji vir şûnda hûnê Kur'ê Mêriv
li k'êleka[f] Yê Herî Zor,
li milê Wîyî r'astê r'ûniştî
û li ser e'wrêd e'zmên tê bibînin»*.

---

* 26:50 Aha jî tê fe'mkirinê: «Heval, tu bona çi hatî?»

* 26:64 Zebûr 110:1; Danîyêl 7:13.

65 Hingê serekk'ahîn k'incêd
xwe qelaştin û got: «Eva Xwedê
bêhurmet dike! Îdî şe'de çî mer'a
ne? Va we bihîst Ewî çawa Xwe-
dê bêhurmet kir! 66 Weva çawa
xuya dike?» Wana jî lê veger'and
û gotin: «Wîr'a kuştin dik'eve».
67 Wê gavê t'ûyî r'ûyê Wî kirin,
bi k'ulma lêxistin, hineka jî şemaq
lê didan 68 û digotinê: «Mesîh,
p'êxembertîyê mer'a bike, k'a k'î
bû ku Te xist?»

### Petrûs Îsa înk'ar dike

*(Marqos 14:66-72; Lûqa 22:56-62;*
*Yûh'enna 18:15-18, 25-27)*

69 Wî çaxî Petrûs derva li h'ew-
şêda r'ûniştibû. Carîk hate cem
wî û gotê: «Tu jî t'evî Îsayê Celîlê
bûyî». 70 Lê ewî li ber h'emûya
înk'ar kir û got: «Ez nizanim tu
çi dibêjî».
71 Çaxê ew çû ber dergeh, yeke
din ew dît û gote ewêd ku li wir
bûn: «Evê han jî t'evî Îsayê Nisretê
bû». 72 Ewî dîsa bi sond înk'ar kir
got: «Ez wî merivî nas nakim».
73 Xêlekê şûnda ewêd ku li wir
bûn çûne cem Petrûs û gotinê:
«Hebe-t'unebe tu jî ji wan î, çimkî
xeberdana te te difiroşe». 74 Hingê
ewî nifir' xwe kir, sond xwar û got:
«Ez wî merivî nas nakim».
Wê gavê dîk bang da 75 û Pet-
rûs ew gotina Îsa anî bîra xwe ku
wîr'a gotibû: «Berî bangdana dîk,
tê sê cara Min înk'ar kî». Derk'ete
derva û k'ele-k'el girîya.

### Îsa dibine ber Pîlato[f]

*(Marqos 15:1; Lûqa 23:1-2;*
*Yûh'enna 18:28-32)*

**27** 1 Gava sibeh safî bû, t'e-
mamîya serekêd k'ahîna
û r'ûspîyêd cime'tê li hev şêwirîn
ku Îsa çawa bidine kuştinê. 2 Ew
girêdan, birin dane destê Pîla-
toyê[f] welî.

### Axirîya Cihûda

*(K'arêd Şandîya 1:18-19)*

3 Hingê Cihûdayê ku nemamîya
Wî kir, dît ku Îsa hate neheqkirinê,
p'oşman bû, ew sî zîv veger'ande
serekêd k'ahîna û r'ûspîya 4 û got:
«Min gune kir. Ez bûme sebebê
xûna bêsûc». Wana jî gote wî: «Çi
mer'a ne? Tu zanî». 5 Ewî jî ew zîv
avîtine nav p'aristgehê, derk'et çû
xwe xeniqand.
6 Serekêd k'ahîna zîv hildan û
gotin: «Ne r'ast e ku em van bi-
kine nav xizna p'aristgehê, çimkî
ew heqê xûnê ye». 7 Hingê ew li
hev şêwirîn û bi wan zîva E'rdê
Axînker k'ir'în, bona t'irbêd

xerîba. 8 Lema ew e’rd h’eta îro jî
«E’rdê Xûnê» tê gotinê. 9 Hingê
ew gotina bi zarê Yêremîya p’ê-
xember hate sêrî: «Sî zîv qîmet
dan, weke wî qîmetê ku hineke
ji zar’êd Îsraêlê qayl bûn 10 û ew
dane E’rdê Axînker, çawa ku
Xudan minr’a e’mir kir»*.

### Pirsa Pîlato

*(Marqos 15:2-5;*
*Lûqa 23:3-5;*
*Yûh’enna 18:33-38)*

11 Îsa ber welî sekinî, welî ji Wî
pirsî û got: «Tu yî p’adşê cihûya?»
Îsa wîr’a got: «Te bi devê xwe
got». 12 Lê çaxê serekêd k’ahî-
na û r’ûspîya davîtine Wî, Ewî
qet caba kesekî neda. 13 Hingê
Pîlato Wîr’a got: «Tu nabihêyî
çiqas şikîyatê[f] Te dikin?» 14 Ewî
dîsa caba kesekî neda, h’eta welî
jî şaş ma.

### Dîwanêda h’ukumê kuştinê li ser Îsa derdixin

*(Marqos 15:6-15;*
*Lûqa 23:13-25;*
*Yûh’enna 18:39–19:16)*

15 E’detê welî bû ku li cejinêda
bi xwestina e’laletê girtîk wan-
r’a ber’da. 16 Hingê girtîkî wanî
k’ifş hebû, ku navê wî Barabas
bû. 17 Gava ku ewana civîyan,
Pîlato wanar’a got: «Hûn k’îjanî
dixwazin ku ez bona we ber’dim,
Barabas yan Îsayê ku Mesîh tê
gotinê?» 18 Ewî zanibû ku ji dest
h’evsûdîyê Îsa dabûne destê wî.

19 Gava ew li herema dîwanê
r’ûniştibû, k’ulfeta wî cab şand
û got: «K’arê te ewî Bêsûc ne-
k’etîye, çimkî vê şeva derbazbûyî
xewnêda bona Wî gelek tişt ser
minr’a derbaz bûn». 20 Lê serekêd
k’ahîna û r’ûspîya e’lalet r’azî
kir, ku Barabas bixwazin û Îsa
unda kin. 21 Welî dîsa wanar’a
got: «Hûn ji van her duya k’îjanî
dixwazin ku ez wer’a ber’dim?»
Wana jî got: «Barabas!» 22 Pî-
lato wanar’a got: «Lê ez Îsayê
ku Mesîh jêr’a dibêjin çawa bi-
kim?» H’emûya jî got: «Bira bê
xaçkirinê!» 23 Welî got: «Lê Evî
çi xirabî kirîye?» Hingê wana
hê kire qîr’în û gotin: «Bira bê
xaçkirinê!»

24 Pîlato jî dît, wekî tiştek k’arê
nade, lê hê şer’ û de’w destpêdibe,
av hilda li ber e’laletê destêd xwe
şûştin û got: «Ez ji xûna Vî bêsûc
im. Hûn xwexa binihêr’in». 25 Û
t’emamîya cime’tê caba wî da û

* 27:10 Zekerîya 11:12-13; Yêremîya 32:6-9.

got: «Bira xûna Wî li ser me û li
ser zar'êd me be!»
26 Hingê Pîlato Barabas wana-
r'a ber'da, lê Îsa da ber qamçîya
û da destê wan ku bê xaçkirinê.

### Esker qerfê xwe li Îsa dikin

*(Marqos 15:16-20;*
*Yûh'enna 19:2-3)*

27 Hingê eskerêd welî Îsa birine
hindur'ê qesirê û t'emamîya r'efa
eskera ser Wî civîya. 28 K'incê Wî
jê êxistin û çuxekî sorê gevez lê
kirin. 29 Paşê t'acek ji stirîya ve-
girtin dane serê Wî û qamîşek jî
dane destê Wîyî r'astê. Hingê ber
Wî çok dan, qerfê xwe pê kirin û
gotin: «Xweş be, P'adşê Cihûda!»
30 T'ûyî Wî kirin, qamîş hildan
serê Wî xistin. 31 Pey qerfkirinêr'a
çuxê sor ji Wî êxistin û k'incê Wî
lêkirin û dane pêşîya xwe birin
ku Wî xaç kin.

### Xaçkirina Îsa

*(Marqos 15:21-32;*
*Lûqa 23:26-43;*
*Yûh'enna 19:17-27)*

32 Çaxê ew derk'etine derva,
eskera yekî kûrênî dît ku navê wî
Şimh'ûn bû, p'êyî ser wî kirin ku
xaçê Wî hilde. 33 Ewana gihîştine
wî cîyê ku jêr'a Golgota digotin,
ku tê fe'mkirinê: «Cîyê Qafa».
34 Şerava zirav t'evkirî danê ku
vexwe. Lê çaxê Ewî te'm kir,
nexwest vexwe.
35 Ew xaç kirin, ser k'incê Wî
p'eşk avîtin û li nav xweda bela
kirin*. 36 Paşê wê derê r'ûniştin
û nobedarî li Wî kirin. 37 Ne-
heqîya Wî nivîsîn danîn fêza
serê Wî: «EV ÎSA, P'ADŞÊ
CIHÛYA YE».
38 Hingê du qaçax jî t'evî Wî
hatine xaçkirinê, yek milê r'astê
û yê din milê ç'epê. 39 Ewêd ku
wirr'a diçûn-dihatin Ew bêhurmet
dikirin, serê xwe dih'ejandin 40 û
digotinê: «Ne Teyê p'aristgeh hil-
şanda û sê r'ojada çêkira? De Xwe
xilaz ke, heger Tu Kur'ê Xwedê
yî! Ji xaç were xwarê!» 41 Usa jî
serekêd k'ahîna, qanûnzana û
r'ûspîya t'evayî qerfê xwe Wî
dikirin û digotin: 42 «Xelq xilaz
kir, lê Xwe nikare xilaz ke! Ev
nîne P'adşê Îsraêlê? De bira niha
ji xaç bê xwarê û emê bawerîya
xwe Wî bînin. 43 Gumana Xwe

* 27:35 Nav destnivîsarêd paşwextîyêda ev jî heye: «Ku gotina p'êxember bê sêrî: ‹K'incêd Min li nav hevda bela kirin û ser çuxê Min p'eşk avîtin›» (Zebûr 22:18).

danî ser Xwedê, de bira niha Wî
xilaz ke, heger Xwedê ji Wî r'azî
ye, çimkî got: ‹Ez Kur'ê Xwedê
me›». 44 Qaçaxêd ku t'evî Wî ha-
tine xaçkirinê, wana jî usa te'n
li Wî dixistin.

### Mirina Îsa

*(Marqos 15:33-41;*
*Lûqa 23:44-49;*
*Yûh'enna 19:28-30)*

45 Nîvro ji sih'eta donzdeha
h'eta sih'eta sisîya t'emamîya
e'rdê bû te'rî. 46 Nêzîkî sih'eta
sisîya Îsa bi dengekî bilind ki-
re qîr'în û got: «Êlî, Êlî, lama
sabaxtanî?» ku tê fe'mkirinê:
«Xwedêyê Min, Xwedêyê Min,
Te çima Ez hiştim?»* 47 Ewê ku
nêzîk sekinîbûn, gava ev xeber
bihîstin, gotin: «Ew gazî Êlyas
dike». 48 Yek ji wan bi lez bezî,
lûfika[f] be'rê hilda sirkêda kir, li
ser qamîşekîva danî û da Wî ku
vexwe. 49 Lê hinekêd din gotin:
«Bisekine. Em bibînin, k'a Êlyasê
bê Wî xilaz ke?»
50 Îsa dîsa bi dengekî bilind kire
gazî û r'uh'ê Xwe da.
51 Hema hingê p'er'da p'a-
ristgehê ji sêrî h'eta binî qelişî,
bû du tîşa[f]. E'rd h'ejîya, kevir
qelişîn, 52 t'irb vebûn û gelek
mirîyêd buhurtî r'abûn. 53 Ew
ji t'irba derk'etin pey r'abûna
Îsar'a, çûne Bajarê Pîroz û ge-
leka ew dîtin.
54 Çaxê sersed û ewêd ku t'evî
wî nobedarîya Îsa dikirin, e'rdh'ej
û ew h'emû tiştê qewimî dîtin,
r'isasê ew girtin û gotin: «R'astî
jî Eva Kur'ê Xwedê bû!»
55 Li wê derê gelek k'ulfet jî
hebûn, ku dûrva dinihêr'în. Ew
ji Celîlê li pey Îsa hatibûn, ber-
destî Wîr'a kiribûn. 56 Meryema
Mejdelanî, Meryema dîya Aqûb
û Ûsiv[f] û dîya her du kur'êd Ze-
bedî li nav wanda bûn.

### Definkirina Îsa

*(Marqos 15:42-47;*
*Lûqa 23:50-56;*
*Yûh'enna 19:38-42)*

57 Berê êvarê merivekî dewletî
ji Arîmetyayê hat, ku navê wî
Ûsiv[f] bû. Ew jî yek ji şagirtêd
Îsa bû. 58 Ew çû cem Pîlato û
cinyazê Îsa ji wî xwest. Wê ga-
vê Pîlato e'mir kir ku cinyaz
bê dayînê. 59 Ûsiv cinyaz hilda,
qedekê k'itanîyî paqijda k'efen[f]

* 27:46 Zebûr 22:1.

kir 60 û danî nav t’irba* xweye
nû ku qeyêda k’olabû. Paşê ewî
kevirekî mezin holî ber derê t’irbê
kir û çû. 61 Meryema Mejdelanî
û Meryema din li wê derê bûn û
pêşberî t’irbê r’ûniştibûn.

### Nobedarêd t’irbê

62 R’oja din ku pey r’oja[f] t’ivda-
rekkirinê* bû, serekêd k’ahîna û
fêrisîya li cem Pîlato civîyan 63 û
gotin: «Em xulam, tê bîra me,
ku Ewî derewîn saxtîya Xweda
gotibû: ‹Ezê r’oja sisîya ji miri-
nê r’abim›. 64 Niha e’mir ke ku
h’eta r’oja sisîya miqatî t’irbê
bin, nebe ku şagirtêd Wî bên Wî
bidizin û cime’têr’a bêjin: ‹Ew ji
mirinê r’abûye›. Îdî xalifandina
paşîyê ji ya pêşîyê xirabtir be».
65 Pîlato wanr’a got: «Va ne wer’a
eskerêd nobedar. Her’in çawa ku
hûn zanin usa jî miqatî t’irbê
bin». 66 Ew jî çûn miqatî t’irbê
bûn, kevir mor kirin û eskerêd
nobedar li ber danîn.

### Îsa ji mirinê r’adibe

*(Marqos 16:1-8; Lûqa 24:1-12; Yûh’enna 20:1-10)*

**28** 1 Pey şemîyêr’a, r’oja yek-
şemê* serê sibehê zû Mer-
yema Mejdelanî û Meryema din
hatin ku t’irbê bibînin. 2 Nişkêva
e’rd qayîm h’ejîya, çimkî milyak’e-
tekî Xudan ji e’zmên hate xwarê,
kevir ji ber t’irbê wêda kir û ser
r’ûnişt. 3 Dîndara wî mîna birûskê
bû û k’incê wî mîna berfê sipî bûn.
4 Nobedar ji tirsa wî t’evîhev bûn
û bûne mîna mirîya. 5 Milyak’et
wan k’ulfetar’a got: «Netirsin! Ez
zanim hûn li Wî Îsayî diger’in,
Yê ku hate xaçkirinê. 6 Ew ne li
vir e, çimkî Ew ji mirinê r’abûye,
çawa ku Ewî gotibû. Werin wî
cîyê ku Ew* p’aldayî bû bibînin.
7 Zû her’in bêjine şagirtêd Wî:
‹Ew ji mirinê r’abûye û Ewê berî
we her’e Celîlê. Li wir hûnê Wî
bibînin›. Va ye min wer’a got».
8 Ew bi xof û eşqeke mezin lez
ji t’irbê derk’etin û lezandin ku

* 27:60 T’irba Îsa mixarek bû. Cihûya hingê destê k’êva bihata mirîyêd xwe dikirine mixara. Ew yan şkeft bûn yan jî qeyada dik’olan.
* 27:62 «R’oja t’ivdarekkirinê» r’oja înîyê bû.
* 28:1 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «R’oja h’eftîyêye pêşin», çimkî bona cihûya, r’oja h’eftîyêye pêşin yekşem bû, awa gotî «le’d».
* 28:6 Nav hinek destnivîsarada «Xudan» heye.

şagirtar’a bêjin. 9 Nişkêva Îsa r’astî
wan hat û got: «Silav li we!» Ewana
nêzîkî Wî bûn, xwe avîtine nigêd
Wî girtin û serê xwe ber danîn.
10 Hingê Îsa wanar’a got: «Ne-
tirsin! Her’in bêjine birêd Min,
ku ew her’ine Celîlê û li wir wê
Min bibînin».

### Nobedar têne r’uşetkirinê[f]

11 Çaxê ku k’ulfet çûn, hinek
ji nobedara hatine bajêr û tiştêd
ku qewimîbûn serekêd k’ahîna-
r’a gotin. 12 Serekêd k’ahîna t’evî
r’ûspîya civîyan û şêwirîn. Paşê
wana gelek p’ere dane nobedara
13 û gotin: «Bêjin: ‹Çaxê em xe-
wêda bûn, şagirtêd Wî hatin Ew
dizîn›. 14 Û heger ev tişt bigihîje
guhê welî, emê wî r’azî kin û we
bêxem kin». 15 Wana jî p’ere hil-
dan û usa kirin, çawa ku hatibûne
hînkirinê. Û ev gotin li nav ci-
hûyada h’eta r’oja îro bela bûye.

### Îsa Xwe nîşanî şagirtêd Xwe dike

*(Marqos 16:14-18; Lûqa 24:36-49;*
*Yûh’enna 20:19-23;*
*K’arêd Şandîya 1:6-8)*

16 Her yanzdeh şagirt jî çûne
Celîlê wî ç’îyayê ku Îsa wanr’a
gotibû. 17 Gava ku dîtin, serê xwe
ber Wî danîn, lê hinek jî dudilî
bûn. 18 Îsa nêzîkî wan bû, wanr’a
xeber da û got: «H’emû h’ukumê
e’rd û e’zmên Minr’a hate dayînê.
19 Niha her’in h’emû mileta hîn
kin û wana bi navê Bav, Kur’ û
R’uh’ê[f] Pîroz binixumînin[f] 20 û wan
h’emû t’emîyêd ku Min dane we
mileta hîn kin, wekî ew xwey kin.
Ez va îroda her t’im h’eta axirîya
dinyayê t’evî we me!»

# MIZGÎNÎYA LI GORA MARQOS

## Pêşgotin

«Mizgînîya[f] Îsa[f] Mesîhe[f] li gora Marqos» ji nava her çar Mizgînîyada ya here kin e û berî her sê Mizgînîya jî hatîye nivîsarê. Bi fikira gelek zana ew berî sala h'eftêyî (70-î pey bûyîna Îsa) hatîye nivîsarê, gava Orşelîm[f] wêran bû.

Li gora şe'detîya civîna[f] sedsalîya dudada, Marqos xwexa ew Yûh'enna-Marqos e, derheqa k'îjanîda k'itêba K'arê Şandîyada (12:12, 25; 13:4-5; 15:37-39) û usa jî çend ne'mêd şandîyada[f] be'sa wî dikin (Kolosî 4:10; Filîmon 24; Tîmot'êyo II, 4:11). Ewî gelekî r'êwîtî t'evî Pawlos û Barnabas[f] kirîye, usa jî yekî gelekî nêzîkî Petrûsê[f] Şandî bû (Petrûs I, 5:13).

K'itêb sêrîda dibêje ku fikira wê derheqa Mizgînîya Îsa Mesîhda ye (1:1). Hatina Îsa Mesîh da k'ifşê, ku ew wextê Xwedê k'ifş kiribû pêr'a gihîştîye, wekî xilazbûnê[f] bide merivayê[f] (1:15). Marqos Îsa tîne ber ç'e'va, ku Ew yekî xweyîh'ukum e û h'ukumê Wî nava hînkirinê, cinderxistinê, usa jî gunebaxşandinêda k'ifş e. Hingê Îsa hêdî-hêdî Xwe şagirtêd[f] xweva dide naskirinê ku Ew Mesîh e, awa gotî K'ifşkirîyê Xwedê ye. Lê Îsa çiqasî Xwe şagirtêd xweva dide naskirinê, haqasî li ser mirin û r'abûna Xwe xeber dide, ya ku wê Orşelîmêda biqewimîya. Îsa Xwer'a dibêje «Kur'ê[f] Meriv», yê ku hate dinyayê, wekî e'mirê Xwe bide ku meriv ji qeydêd gune[f] xilaz bin.

Mizgînîya Marqos hê gelekî ser kirêd Îsa disekine, ne ku ser hînkirina Wî. Bona Yûh'ennayê[f] nixumdar[f], usa jî nixumandin[f] û cêr'ibandina[f] Îsa kin hatîye nivîsarê. Paşê carekêr'a derbazî ser şixulê Wîyî nexweşqenckirinê û hînkirina Wî dibe. Çiqas diçû şagirtêd Wî hê Ew nas dikirin, dijminêd Wî jî hê k'în Wîr'a dajotin. Serêd xilazîyêda (11-a h'eta 16-a) bona h'eftîya Îsaye xilazîyê nivîsar e, derheqa xaçbûn[f] û r'abûna Wîye ji mirinê.

Eva Mizgînîya gelekî şe'detîya kirêd Îsa dide û tiherekî zelal û kurt hatîye nivîsarê, eva Îsa berç'e'v tîne û dide k'ifşê, wekî her xwendevanek mîna sersed[f] bikaribe bike gazî bêje: «R'ast ev meriv Kur'ê[f] Xwedê ye» (15:39).

Eva Mizgînîya gelekî li ser cefak'işandina Îsa disekine, usa jî ser cefayêd wan, yêd ku wê li pey Wî her'in. Li gora fikira mesîhîyêd[f] berê, Marqos eva Mizgînîya bajarê R'omêda[f] nivîsîye. Ji vê yekê tê k'ifşê, ku Marqos ev yek hê bona bawermendêd R'omayêda nivîsîye, çimkî bawermendêd wî çaxî gelek cefa ji destê Nêronê Qeyserê[f] Împêratorîya R'omayê didîtin, (h'ukumeta wî ji sala 54-a h'eta 68-a bû).

**Serecema fikira k'itêbê**

Destpêbûna Mizgînîyê (1:1-13)
Dannasînî û şixulêd Îsaye Celîlêda[f] (1:14–9:50)
R'îya Îsaye ji Celîlê h'eta Orşelîmê (10:1-52)
H'eftîya Îsaye xilazîyê li Orşelîmê û dor-berêd wêda (11:1–15:47)
R'abûna Îsa ji mirinê (16:1-8)
Pey r'abûnêr'a xuyabûn û jorhilatina Îsa (16:9-20)

**Dannasînîya Yûh'ennayê[f] nixumdar[f]**

*(Metta 3:1-12; Lûqa 3:1-18; Yûh'enna 1:19-28)*

1 1 Mizgînîya[f] Îsa[f] Mesîhê[f] Kur'ê[f]
Xwedê bi vî tiherî destpêbû:
2 Çawa ku k'itêba Îşaya[f] P'êxemberda[f] hatîye nivîsarê:

«Va ye Ezê qasidê Xwe pêşîya
Teva bişînim.
Ewê bona Te r'ê hazir ke»*.
3 «Dengek ber'îyêda[f] dike gazî:
‹R'îya Xudan[f] hazir bikin
û şiver'îyêd[f] Wî r'ast bikin›*».
4 Awa Yûh'enna[f] ber'îyêda xuya
bû, cime't dinixumand û dannasîn
dikir, ku ji gunekirinê veger'in[f] û

* 1:2 Malaxî 3:1.
* 1:3 Îşaya 40:3.

bêne nixumandinê[f], wekî gunêd
wan bêne baxşandinê. 5 Ji h'emû
welatê Cihûstanê[f] û t'emamîya
cime'ta Orşelîmê[f] dihate cem wî,
gunêd xwe didane r'ûyê xwe û ç'emê
Ûrdunêda bi destê wî dinixumîn.
6 Yûh'enna k'inceke ji pir'ç'a devê li
xwe kiribû û li pişta xwe jî qayîşeke
ç'erm girêdabû. Xwarina wî kulî[f]
û hingivê çolê bû. 7 Ewî dannasîn
dikir û digot: «Yekî ji min qewattir
wê bê. Ez ne hêja me, ku ta bim
û benê çarixê Wî jî vekim. 8 Min
hûn bi avê nixumandin, lê Ewê
we bi R'uh'ê[f] Pîroz binixumîne».

### Îsa tê nixumandin û cêr'ibandinê[f]

*(Metta 3:13–4:11; Lûqa 3:21-22; 4:1-13)*

9 Û wan r'ojada Îsa ji bajarê
Nisreta Celîlê[f] hat û bi destê Yû-
h'enna ç'emê Ûrdunêda hate ni-
xumandinê. 10 Hema çawa Îsa ji
avê derk'et, dît ku e'zman vebûn
û R'uh' mîna kevotkekê li ser Wî
danî. 11 Û dengek ji e'zmana hat
û got: «Tu Kur'ê Minî delal î Ez
ji Te r'azî me».

12 Wê gavê R'uh' berê Îsa da
ber'îyê. 13 Ew çil r'ojî[f] li ber'îyê ma
û ji mîrêcin[f] hate cêr'ibandinê[f].
Ew t'evî r'e'wira bû û milyak'eta[f]
jêr'a berdestî kirin.

### Îsa qeza Celîlêda dest bi k'arê Xwe dike

*(Metta 4:12-17; Lûqa 4:14-15)*

14 Pey girtina Yûh'ennar'a Îsa çû
qeza Celîlê û dest bi dannasînîya
Mizgînîya Xwedê kir 15 û digot:
«Wext pêr'a gihîştîye, P'adşatîya[f]
Xwedê nêzîk bûye, ji gunekirinê
veger'in û bawerîya[f] xwe Mizgî-
nîyê bînin!»

### Îsa gazî her çar me'sîgira dike

*(Metta 4:18-22; Lûqa 5:1-11)*

16 Gava Îsa li devê gola Celîlê di-
ger'îya, r'astî Şimh'ûn[f] û Endrawisê
birê wî hat. Wana t'or' davîte golê,
çimkî me'sîgir bûn. 17 Îsa gote wan:
«Pey Min werin, Ezê we bikime
nêç'îrvanêd meriva[f]». 18 Wana jî
hema wê demê t'or'êd xwe hiştin
û pey Wî çûn. 19 Dema ku Îsa ji wî
cîyî hinekî pêşda çû, r'astî kur'êd
Zebedî, Aqûb[f] û Yûh'ennayê[f] birê
wî hat. Wana qeyikêda t'or'êd xwe
hîvêz dikirin. 20 Hingê Îsa gazî wan
kir, wana jî bavê xwe Zebedî t'evî
p'ala qeyikêda hişt û pey Wî çûn.

### Îsa r'uh'ê[f] h'eram[f] derdixe

*(Lûqa 4:31-37)*

21 Ew gihîştine Kefernahû-
mê. Îsa wê r'oja[f] şemîyê r'ast

k'ete k'inîştê û dest bi hînkirinê
kir. **22** Ewana li ser hînkirina Wî
zendegirtî[f] mabûn, çimkî Ewî
mîna yekî xweyîh'ukum ew hîn
dikirin, ne ku mîna qanûnzana[f].
**23** Hingê k'inîşta[f] wanda merivek
hebû, ku r'uh'ê[f] h'eramva girtî
bû. Wî kire qîr'în û got: **24** «Tu çi
ji me dixwazî, ya Îsayê Nisretê?
Tu hatîyî qir'a me bînî? Ez zanim
Tu k'î yî. Tu Pîrozê Xwedê yî!»
**25** Îsa lê hilat[f] û got: «Ker' be û jê
derk'eve!» **26** Hingê r'uh'ê h'eram
ew veç'ir'ikand û bi dengekî bilind
kire qîr'în û jê derk'et. **27** H'emû
zendegirtî man, hevr'a k'etine
pirs-pirsîyara û digotin: «Ev çi
yek e? Çi hînkirineke nû ye! Bi
h'ukum Ew e'mirî li r'uh'êd h'e-
ram dike û ew jî êlimî[f] Wî dibin».
**28** Û nav û dengê Îsa pêr'a-pêr'a
h'emû dor-berêd Celîlê bela bû.

### Îsa gelek nexweşa qenc dike

*(Metta 8:14-17; Lûqa 4:38-41)*

**29** Gava ku Îsa ji k'inîştê der-
k'et, t'evî Aqûb û Yûh'enna r'ast
çûne mala Şimh'ûn û Endrawis.
**30** Xwesîya Şimh'ûn t'ayêda p'al-
dayî bû. Hingê bona wê Îsar'a
gotin. **31** Îsa jî çû nêzîk, destê wê
girt r'akir û t'ayê jê ber'da, r'a-
bû berdestî wanr'a kir. **32** Êvarê,
gava r'o çû ava, h'emû nexweş
û yêd cinak'etî[f] anîne cem Wî.
**33** T'emamîya cime'ta bajêr li ber
dêrî civîya. **34** Îsa gelek merivêd
bi nexweşîyêd cûr'e-cûr'e qenc
kirin. Gelek cin[f] jî derxistin û
nedihişt ku cin xeber din, çimkî
cina zanibû ku Ew K'î ye.

### Îsa Mizgînîya Xwedê qeza Celîlêda bela dike

**35** Qereberbanga sibehê r'abû,
derk'et çû cîkî xewle û wir dua
kir. **36** Şimh'ûn û yêd t'evî Wî
li Îsa ger'îyan **37** û gava ku wan
Ew dît, gotinê: «H'emû li Te di-
ger'in». **38** Îsa wanr'a got: «Em
her'ine gund-bajarêd nêzîk, wekî
Ez li wan dera jî dannasîn kim,
çimkî Ez bona vê yekê hatime».
**39** Û li t'emamîya Celîlê diger'îya,
k'inîştêd wanda dannasîn dikir û
cin derdixistin.

### Îsa yekî ji k'otîbûnê[f] paqij dike

*(Metta 8:1-4; Lûqa 5:12-16)*

**40** Û yekî k'otî[f] hat, li ber Îsa
çok da, r'eca jê kir û gotê: «Heger
Tu bixwazî, dikarî min paqij kî».
**41** Gunê Îsa pê hat, destê Xwe dirêj
kir lê k'et û gotê: «Ez dixwazim.
Paqij be!» **42** Û pey vê gotinêr'a
destxweda k'otîbûn jê çû û ew paqij
bû. **43** Îsa pêr'a-pêr'a ew derxiste

der, h’işk t’emî li wî kir 44 û wîr’a
got: «Binihêr’e t’u kesîr’a tiştekî
nebêjî, lê her’e xwe nîşanî k’ahîn[f]
ke û çawa ku Mûsa[f] t’emî daye,
h’edîya[f] xwe bide, wekî h’emûya-
r’a bibe şe’detî, ku tu paqij bûyî».
45 Lê ew meriv derk’et destpêkir
aşkere got û eva yeka bela kir,
usa ku Îsa îdî nikaribû aşkere
biçûya bajarekî, lê ji bajêr der li
cîyêd xewle dima. Û cime’t ji her
alîyava dihatine cem Wî.

### Îsa şilûşe’tekî qenc dike û gunêd wî dibaxşîne

*(Metta 9:1-8; Lûqa 5:17-26)*

2 1 Pey çend r’ojar’a Îsa veger’îya
Kefernahûmê. Hingê hate
bihîstinê, ku Ew malda ye. 2 Ma-
lêda haqas meriv civîyan, h’eta ku
li ber dêrî jî cî-sit’ar t’unebû. Îsa
xebera mizgînîyê ew hîn dikirin.
3 Û meriv hatin, ji nav wanda çar
meriva şilûşe’tek hildabûn danîne
cem Îsa. 4 Lê ji dest e’laletê r’ê
nedîtin ku nêzîkî Îsa bûna, wana
banê xanîyê ku Îsa têda bû qul kir
û merivê şilûşe’t ber’êva daxis-
tine jêrê. 5 Gava ku Îsa bawerîya
wan dît, gote yê şilûşe’t: «Lawo,
gunêd te hatine baxşandinê». 6 Ji
qanûnzana hinek wira r’ûniştibûn
û dilê xweda digotin: 7 «Evî han
çima usa xeber dide? Eva nigê xwe
Xwedêr’a davêje! Pêştirî Xwedê k’î
dikare guna bibaxşîne?»
8 Destxweda r’uh’ê Îsava e’yan
bû ku evana aha difikirin, Ewî
got: «Hûn çima tiştêd aha dilê
xweda difikirin? 9 K’îjan r’ih’et e,
şilûşe’tr’a bêjin: ‹Gunêd te hatine
baxşandinê?› yan bêjinê: ‹R’abe
ber’a xwe hilde û biger’e?› 10 Lê
wekî hûn bizanibin ku h’ukumê
Kur’ê[f] Mêriv heye li ser e’rdê gu-
na bibaxşîne...» 11 gote yê şilûşe’t:
«Ez ter’a dibêjim, r’abe ber’a xwe
hilde, her’e mala xwe». 12 Ew jî
pêr’a-pêr’a li ber ç’e’vê her kesî
r’abû, ber’a xwe hilda, derk’et û
çû. H’emû jî h’eyîrî man, şikirî
dane Xwedê û gotin: «Me tiştekî
usa t’u car nedîtîye!»

### Îsa gazî Lêwî[f] dike

*(Metta 9:9-13; Lûqa 5:27-32)*

13 Îsa dîsa çû devê golê. T’ema-
mîya e’lalet dihate cem Wî û Ewî
jî ew hîn dikirin. 14 Çaxê Îsa r’êda
çû, Lêwîyê[f] kur’ê Halfawo li cîyê
xerchildanê r’ûniştî dît û gotê: «Pey
Min were». Ew jî r’abû pey Îsa çû.
15 Gava Îsa mala Lêwîda ser sifrê
bû, gelek xercgir[f] û gunek’ar[f] t’evî
Wî û şagirtêd[f] Wî li ser sifrê r’ûniş-
tibûn, çimkî yêd pey Wî diçûn gelek
bûn. 16 Gava qanûnzanêd ji nava
fêrisîya[f] dîtin ku Îsa t’evî xercgir

û gunek’ara li ser sifrê r’ûniştî ye,
ji şagirtêd Wî pirsîn: «Çima Ew
t’evî xercgir û gunek’ara dixwe û
vedixwe?» 17 Çaxê Îsa bihîst, wan-
r’a got: «Saxlem ne h’ewcê h’ekîm
in, lê nexweş. Ez ne hatime gazî
yêd r’ast kim, lê gazî gunek’ara».

### Pirsa r’ojîgirtinê

*(Metta 9:14-17; Lûqa 5:33-39)*

18 Carekê şagirtêd Yûh’enna û
fêrisîya r’ojî digirtin. Çend meriv
hatine cem Îsa û jê pirsîn: «Çima
şagirtêd Yûh’enna û yêd fêrisîya
r’ojîya digirin, lê şagirtêd Te r’ojî
nagirin?» 19 Îsa gote wan: «H’eta
ze’va t’evî wan e, gelo dibe ku
xwendîyêd de’watê r’ojî bigirin?
H’eta ze’va t’evî wan e, ew nikarin
r’ojî bigirin! 20 Lê r’oj wê bên, gava
ze’va ji wan bê hildanê, hingê wê
r’ojê wê r’ojî bigirin. 21 T’u kes pê
p’arç’ê nû k’inca kevin p’îne na-
ke. Heger usa bike, p’arç’ê k’inca
kevinva dirûtî wê zorê li k’inca
kevin bike û cîyê qelişî wê hê li
ber hevva her’e.

22 Û ne jî kesek şerava nû dike
meşkêd kevin. Heger usa bike,
şerava nû wê meşka bit’eqîne,
hin şeravê unda be, hin jî meşk.
Lê şerava nû dikine meşkêd nû».

### Pirsa r’oja şemîyê

*(Metta 12:1-8; Lûqa 6:1-5)*

23 Îsa r’ojeke şemîyê nava zevî-
yar’a derbaz dibû û şagirtêd Wî
r’êva destpêkirin simbilêd gênim
çinîn. 24 Fêrisîya Îsar’a got: «Bi-
nihêr’e! Çima şagirtêd Te tiştê
necayîzî r’oja şemîyê dikin?» 25 Îsa
li wan veger’and û got: «We qet
nexwendîye ku Dawid[f] ji h’ew-
cetîyê çi kir, gava ew û yêd pêr’a
bir’çî bûn? 26 Ew wextê Evyatarê
serekk’ahînda k’ete Xana[f] Xwedê
û nanê[f] Xwedêr’a dayî xwar, ku
ew nan pêştirî k’ahîna ne cayîz
bû yekî din bixwara. Serda jî ew
nan da yêd t’evî xwe»*. 27 Paşê ser
gotina Xweda zêde kir gote wan:
«R’oja şemîyê bona însên hate
danînê, ne ku însan bona r’oja
şemîyê! 28 Awa gotî Kur’ê Mêriv
Xudanê r’oja şemîyê ye jî».

### Îsa r’oja şemîyê merivê ku destê wî k’işîyabû qenc dike

*(Metta 12:9-14; Lûqa 6:6-11)*

**3** 1 Û Îsa dîsa k’ete k’inîştê. Li
wê derê merivek hebû, ku destê
wî k’işîyabû. 2 Û ç’e’vê hineka ser
Wî bû, gelo r’oja şemîyê Ewê wî
qenc ke yan na, wekî xeyba Wî

* 2:26 Qanûna K’ahîntîyê 24:9; P’adşatî I, 21:1-6.

bikin. 3 Îsa merivê destk’işîyayîr’a
got: «R’abe vê govekê bisekine!»
4 Paşê wanr’a got: «R’oja şemîyê
qencîkirin cayîz e, yan xirabîkirin?
R’uh’ekî xilaz[f] kin, yan unda kin?»
Lê wan deng nekir. 5 Îsa bi hêrs li
dora Xwe nihêr’î, bona serh’işkîya
wan ber Xwe k’et û wî merivîr’a got:
«Destê xwe dirêj ke». Ewî jî dirêj
kir û destê wî dîsa qenc bû. 6 Fêrisî
derk’etine derva û pêr’a-pêr’a t’evî
Hêrodesîya[f] şêwirîn, ku çawa Wî
bidine kuştinê.

## Civata li devê golê

7 Îsa t’evî şagirtêd Xwe çû devê
golê. Ji Celîlê e’laleteke giran pey
Wî çû. 8 Gava ku wana kirinêd Wî
bihîstin, ji Cihûstanê, Orşelîmê,
Îdûmeyayê, wî alîyê Ûrdunêyî r’o-
hilatê, usa jî ji qeza Sûr û Saydê
gelek meriv hatine cem Wî. 9 Û
Îsa ji dest e’laletê şagirtêd Xwer’a
got, ku Wîr’a qeyikekê hazir kin,
wekî nek’eve li ber de’fa. 10 Çimkî
Îsa gelek meriv qenc kirin, usa ku
yêd nexweş t’opî ser dibûn, wekî
destê xwe bidana Wî. 11 Dema
ku r’uh’êd h’eram Ew didîtin, li
ber Wî dever’ûya xwe davîtine
e’rdê, dikirine qîr’în û digotin:
«Tu Kur’ê Xwedê yî!» 12 Lê Îsa
h’işk t’emî li wan dikir, ku bona
Wî nekine dengî.

## Bijartina her donzdeha

*(Metta 10:1-4; Lûqa 6:12-16)*

13 Îsa hilk’işîya ç’îyê û merivêd
ku Wî dixwestin gazî cem Xwe
kirin. Ew jî çûne cem Wî. 14 Ewî
donzdeh meriv bijartin, navêd wan
«şandî[f]» danî, ku t’evî Wî bimînin
û wan bişîne, wekî dannasîn kin.
15 Û h’ukum da wan ku cina der-
xin. 16 Her donzdehêd bijartî ev in:
Şimh’ûn (ku navê wî kire Petrûs[f]),
17 Aqûbê[f] Zebedî û Yûh’ennayê
birê wî, (ewî navê Boanerces li
wan kir, ku tê fe’mkirinê: «Kur’êd
Gur’înîya E’zmên») 18 Endra-
wis, Fîlîpo, Bertolomeyo, Metta,
T’ûma, Aqûbê[f] kur’ê Halfawo,
Tedayo, Şimh’ûnê welatp’arist[f]
19 û Cihûdayê[f] Îsxeryotî yê ku bû
nemamê Îsa.

## Îsa û Belzebûl[f]

*(Metta 12:22-32; Lûqa 11:14-23; 12:10)*

20 Paşê Îsa çû malekê. Dîsa
haqas e’lalet civîya, h’eta ku ni-
karibûn nanê xwe jî bixwarana.
21 Gava yêd ji xûn û qinêta Wî
bihîstin, derk’etin Wî bigirin,
çimkî wana digot: «Ewî h’işê Xwe
unda kirîye!» 22 Û ew qanûnza-
nêd ku ji Orşelîmê berjêr bibûn,
digotin: «Belzebûl[f] Wîda heye!

Ew bi h'ukumê serwêrê cina ci-
na derdixe!» 23 Îsa jî ew gazî cem
Xwe kirin û bi mesela wanr'a got:
«Mîrêcin çawa dikare xwexa xwe
derxe? 24 Heger nav p'adşatîkêda
t'ifaq[f] t'unebe, ew nikare bimî-
ne. 25 Mala ku bêt'ifaqî bik'evê,
ew mal nikare bimîne. 26 Heger
mîrêcin r'abe himberî xwe û bi-
be dutîretî, ew nikare bimîne,
lê belê wê xilazîya wî bê. 27 Lê
belê t'u kes nikare bik'eve mala
mêrxasekî û hebûka[f] wî t'alan ke,
heger pêşîyê wî mêrxasî girênede.
Gava girêda, hingê wê bikaribe
mala wî t'alan ke.

28 Ez r'ast wer'a dibêjim, her
gune û her gotina xirab ku bêjin
wê li bendêd dinê bêne baxşan-
dinê, 29 lê k'î ku gotineke xirab
miqabilî R'uh'ê Pîroz bêje, t'u
car li wî nayê baxşandinê. Ewê
bi wî guneyî h'eta-h'etayê sûcdar
be». 30 Îsa ev yek got, çimkî wan
digot: «R'uh'ê h'eram Wîda heye».

### Dê û birayêd Îsa

*(Metta 12:46-50; Lûqa 8:19-21)*

31 Hingê dê û birayêd Îsa hatin,
li derva sekinîn, yek şandine pey
Wî û gazî Wî kirin. 32 E'laleta ku
li dora Wî r'ûniştibû gote Wî: «Va
dîya Te û birayêd Te derva pirsa
Te dikin». 33 Îsa caba wan da û
got: «Dîya Min û birayêd Min
k'î ne?» 34 Hingê li yêd dora Xwe
r'ûniştî nihêr'î û got: «Va ne dê
û birayêd Min! 35 Her kesê ku
xwestina Xwedê bîne sêrî[f], ew e
birê Min, xûşka Min û dîya Min».

### Mesela t'oximr'eş[f]

*(Metta 13:1-9; Lûqa 8:4-8)*

**4** 1 Îsa dîsa li devê golê dest bi
hînkirinê kir. E'laleteke usa
mezin li dora Wî civîya, k'erba Ew
k'ete qeyika li ser golê û r'ûnişt.
T'emamîya e'laletê li devê golê
bû 2 û Wî bi mesela ew hînî gelek
tişta dikirin. Hînkirina Xweda
got: 3 «Guhdarî! T'oximr'eş[f] r'abû
çû ku t'oxim bir'eşîne. 4 Çaxê ewî
t'oximê xwe dir'eşand, hinek jê
k'etine devê r'ê, teyrede hatin û
ew xwarin. 5 Û hinek k'etine ser
e'rdê kevirî, li wir ku xwelî kêm
bû. Ew zû şîn bûn, çimkî telaşê
xwelîyê ne k'ûr bû. 6 Çaxê te'v
derk'et, ew ç'ilmisîn û çimkî r'a-
wêd[f] wan t'unebûn, h'işk bûn. 7 Û
hinekêd din k'etine nava stirîya,
stirî r'abûn ew xeniqandin û ber
nedan. 8 Û hinekêd din jî k'etine
nava e'rdê qenc û şîn bûn, me-
zin bûn û hineka sî, hineka şêst,
hineka sed car ber dan».

9 Û Îsa wanr'a got: «Guhê k'êyî
bihîstinê heye bira bibihê».

## Îsa çima bi mesela xeber dide

*(Metta 13:10-17; Lûqa 8:9-10)*

**10** Gava Îsa t'enê ma, yêd dora
Wî girtibûn t'evî her donzdeha,
bona van mesela jê pirsîn. **11** Ewî
caba wan da û got: «Wer'a hatîye
dayînê ku hûn sur'êd P'adşatîya
Xwedê bizanibin, lê bona wan, yêd
ku derva ne, her tişt bi mesela tê
gotinê, **12** wekî:

‹Çiqasî binihêr'in jî, nebînin,
çiqasî bibihên jî, fe'm nekin,
wekî nebe ku veger'in[f] û li wan
bê afûkirinê[f]›*».

## Şirovekirina mesela t'oximr'eş

*(Metta 13:18-23; Lûqa 8:11-15)*

**13** Hingê Îsa wanr'a got: «Hûn
vê meselê fe'm nakin? Lê îdî hûnê
h'emû mesela çawa fe'm bikin?
**14** T'oximr'eş xeberê dir'eşîne.
**15** Ewêd li devê r'ê ku xeber lê tê
çandinê, ew in, ku gava dibihên,
pêr'a-pêr'a mîrêcin tê û xebera
dilê[f] wanda çandî derdixe. **16** Ewêd
li ser e'rdê kevirî ew in, ku gava
xeberê dibihên, ew zû bi eşq û
şa wê qebûl dikin, **17** lê çimkî
r'awêd wan t'unene, ew dirêj
t'aw nakin. Û gava bona xeberê
r'astî tengasîya[f] yan zêrandinê
tên, zû ji r'ê dik'evin. **18** Û ewêd
nava stirîyada hatine çandinê ew
in, ku xeberê dibihên, **19** xemêd
vê dinyayê, derewêd dewletîyê
û xwestina tiştêd din dik'evine
navê û xeberê dixeniqînin, ew
bê ber dimînin. **20** Û ewêd e'rdê
qencda hatine çandinê ew in,
ku xeberê dibihên, qebûl dikin,
hinek sî, hinek şêst û hinek jî sed
car ber didin».

## Ç'ira ser p'êç'irê[f]

*(Lûqa 8:16-18)*

**21** Û Îsa wanr'a got: «Gava ç'irê
tînine hindur', bona çi tînin? Bona
bin selikê, yan bona bin nivînê?
Ne tînin ku daynine ser p'êç'i-
rê[f]? **22** T'u tiştê veşartî t'uneye ku
neyê aşkerekirinê û ne jî tiştekî
dizîva heye ku nek'eve ber r'ona-
yê. **23** Guhê k'êyî bihîstinê heye
bira bibihê».

**24** Îsa wanr'a got: «Dîna xwe
bidine tiştêd ku hûn dibihên.
Hûn bi çi çapê bipîvin, bi wê
pîvanê jî wê wer'a bê pîvanê û
serda jî wê hê zêde be. **25** Çimkî
k'êr'a ku heye, wê hê lê zêde be
û k'êr'a ku t'une, çi heye jî wê jê
bê standinê».

---

* 4:12 Îşaya 6:9-10.

### Mesela t'oximê şîn dibe

26 Û Îsa got: «P'adşatîya Xwedê
mîna vê yekê ye: Merivek t'oxim
dir'eşîne nav e'rdê. 27 Û şev û r'oj
r'adizê, r'adibe, t'oxim şîn dibe,
bilind dibe û xwexa pê nah'ese
ku ev çawa dibe. 28 E'rd ji xwe
ber dide, pêşîyê zîl, paşê simbil,
peyr'a jî genimê gihîştî simbilda.
29 Gava ku ber digihîje, meriv îdî
de'sê davêjê, çimkî dema nandi-
rûnê[f] pêr'a gihîştîye».

### Mesela h'eba t'oximê xerdalê[f]

*(Metta 13:31-32; Lûqa 13:18-19)*

30 Û Îsa got: «Em P'adşatîya
Xwedê mîna çi bişibînin? Yan jî
em wê bi k'îjan meselê şirovekin?
31 Ew mîna h'ebeke t'oximê xer-
dalê ye ku ji h'emû t'oximêd ku
ser e'rdê têne çandinê hûrtir e.
32 Lê gava ew tê çandinê digihîje,
ji h'emû p'incar'a mestir dibe û
ç'iqilêd mezin dide, usa ku tey-
redêd e'zmên dikarin xwe bidine
bin sîya wê».

### Îsa bi mesela xeber dide

*(Metta 13:34-35)*

33 Bi gelek meselêd bi vî awayî
wanr'a haqas xeber dida, çiqas ku
wana dikaribû fe'm bikira. 34 Bê
mesele wanr'a tiştek nedigot, lê
şagirtêd Xwer'a başqe her tişt
şirovedikir.

### Îsa firtonê[f] diseqir'îne

*(Metta 8:23-27; Lûqa 8:22-25)*

35 Wê r'ojê, gava r'o çû ava, Îsa
şagirtêd Xwer'a got: «Em derbazî
wî berî golê bin». 36 Şagirt ji e'laletê
qetîyan, k'etine wê qeyika ku Îsa
têda bû û wana Ew t'evî xwe bir.
Qeyikêd din jî t'evî Wî bûn. 37 De
îjar firtoneke[f] mezin li wan r'abû,
pêla usa li qeyikê dixist, ku îdî
ew bû bi avê t'ijî bibûya. 38 Lê Îsa
paşîya qeyikêda serê Xwe danîbû
ser be'lgî û r'azabû. Wana Ew
h'işyar kir û gotinê: «Dersdar[f], ne
xema Teye ku em unda dibin?»
39 Îsa r'abû, li bayê hilat û e'mirî
ser golê kir got: «Bisekine, ker'
be!» Firtonê danî û h'emû tişt
seqir'în. 40 Îsa wanr'a got: «Hûn
çima ditirsin? Hê çawa bawerîya
we t'une?» 41 Saweke giran li wana
girt û hevdur'a gotin: «Gelo ev k'î
ye, ku ba û gol jî êlimî[f] Wî dibin?»

### Îsa yekî cinak'etî qenc dike

*(Metta 8:28-34; Lûqa 8:26-39)*

5 1 Ewana derbazî wî berî gola
Celîlê bûn û gihîştine t'op-
raxêd Girasînê. 2 Gava ku Îsa ji
qeyikê derk'et, hingê ji nav go-
r'istana merivek r'astî Wî hat, ku

r’uh’ê h’eram pêr’a bû. 3 Ew nav
gor’istanada dima û t’u kesî îdî
nikaribû bi zincîra jî ew girêda.
4 Çimkî gelek cara ew bi qeyd û
zincîra girêdabûn, lê wî zincîr
qetandibûn û qeyd şkênandibûn.
T’u kesî nikaribû ew zeft bikira.
5 T’imê şev û r’oj gor’istanada û
serê ç’îya dikire qîr’în, pê kevira
xwe birîndar dikir.

6 Gava ewî dûrva Îsa dît, bezî,
xwe avîte ber niga 7 û bi dengekî
bilind kire qîr’în û gotê: «Tu çi ji
min dixwazî, Îsayê Kur’ê Xwe-
dêyê Herî Jorin? Tu xatirê Xwedê
kî, min nede cefê!» 8 Ewî ev yek
digot, çimkî Îsa digotê: «Hey
r’uh’ê h’eram! Ji vî merivî der-
k’eve!» 9 Îsa jê pirsî û got: «Navê
te çi ye?» Ewî jî got: «Navê min
K’omesker e, çimkî em gelek in».
10 Û gelekî r’eca ji Îsa dikir, ku
wan ji wê t’opraxê dernexe. 11 Wir
li sîngê ç’îyê sûrîkî berazayî mezin
diç’êrîya. 12 R’uh’êd h’eram r’eca
ji Îsa kirin û gotin: «Me bişîne
nava beraza, em bik’evine nava
wan». 13 Ewî jî îzin da wan, r’uh’êd
h’eram derk’etin û k’etine nava
beraza. Ew sûrî nêzîkî du h’ezar
beraza bû, ew jorda r’evî, xwe ji
kendêlda avîtine golê û xeniqîn.
14 Berazvan r’evîn çûne bajar û
gunda, ev yek gilî kirin. Û binelî[f]
hatin ku tiştêd bûyî bibînin. 15 Û
hatine cem Îsa, dîna xwe danê,
wê ew merivê cinak’etîyî ku k’o-
meskereke cina pêr’a bû, k’incê
wî lê, ser h’işê xweda hatî r’ûniştî
ye. Hingê ew tirsîyan. 16 Ewêd
ku ev yek dîtibûn cime’têr’a gilî
kirin, ku çi hate serê wî cinak’etî
û beraza. 17 Hingê wana r’eca ji
Îsa kir, ku Ew ji e’rdê wan her’e.

18 Gava Îsa k’ete qeyikê, ewî ku
cinak’etî bû, r’eca jê kir, ku t’evî
Wî her’e. 19 Lê Îsa nehişt û jêr’a
got: «Veger’e mala xwe û neferêd
mala xwer’a bêje, ku Xudan bona
te çi kir û çawa li te hate r’e’mê».
20 Ew jî çû û destpêkir çi ku Îsa
bona wî kiribû qeza Dêkapolîsêda*
bela kir û her kes e’cêbmayî dima.

## Qîzika mirî û k’ulfeteke[f] nexweş

*(Metta 9:18-26; Lûqa 8:40-56)*

21 Gava Îsa dîsa bi qeyikê derbazî
wî berê din bû, e’laleteke giran li
dora Wî civîya. Gava Ew li devê
golê bû, 22 yekî ji serwêrêd k’inîştê
ku navê wî Yayîro bû hate cem Wî,

* 5:20 «Dêkapolîs» bi zimanê yûnanî tê fe’mkirinê: «Dehe Bajar», çimkî eva qeza berêda bi yektîya dehe bajara hatîye çêkirin.

gava wî Îsa dît, xwe avîte nigêd Wî,
23 gelek r'eca jê kir û got: «Qîzika
min li ber mirinê ye. Were û destêd
Xwe dayne ser wê, ku qenc be û
bijî». 24 Îsa r'abû t'evî wî çû.

E'laleteke giran pey Wî diçû û
tengasî didane Wî. 25 Wir k'ul-
fetek[f] jî hebû, ku donzdeh salê
wê bûn, ser xûnê vebibû. 26 Ewê
gelekî destê h'ekîmada k'işandibû
û h'emû hebûka xwe xerc kiribû,
lê t'u ç'are lê nebibû û serda hê
xirab bibû. 27 Ewê derheqa Îsada
bihîst, piştêva hate nava e'laletê
û li k'incê Wî k'et. 28 Çimkî ewê
dilê xweda digot: «Heger ez t'enê
k'incê Wî jî k'evim, ezê qenc bim».
29 Û pêr'a-pêr'a xûn jê ç'ikîya û
bedena xweda t'exmîn kir, ku ji
êşa xwe qenc bû. 30 Îsa destxweda
pê h'esîya ku qewatek jê çû, nav
e'laletêda zivir'î û pirsî: «K'ê li
k'incêd Min k'et?» 31 Şagirtêd Wî
gotin: «Tu dibînî ku e'lalet ten-
gasîyê dide Te, lê Tu dibêjî: ‹K'ê
li Min k'et?›» 32 Lê Îsa dor-berê
Xwe dinihêr'î ku bibîne, k'ê ev
yek kir. 33 Hingê k'ulfet li xwe
h'esîya ku çi li wê qewimî, bi tirsê
û lerizekê hat xwe avîte ber Wî û
her tişt r'ast got. 34 Îsa wêr'a got:
«E'vdê! Bawerîya te tu qenc kirî.
Bi xêr û silamet her'e û ji êşa xwe
qenc be».

35 Îsa hê xeber dida, ji mala
serwêrê k'inîştê meriv hatin û
gotin: «Qîza te mir, îdî ze'metê
nede Dersdar». 36 Lê Îsa guh neda
gotina wan, wî serekê k'inîştêr'a
got: «Netirse, t'enê bawer bike!»
37 Ewî nehişt ku kes pey Wî her'e,
pêştirî Petrûs, Aqûb û Yûh'enna-
yê birê wî. 38 Çaxê gihîştine mala
serekê k'inîştê, Îsa dît wê hêwerza
wan e, digirîn û dikine qar'e-qar'.
39 Gava Ew k'ete hindur', wanr'a
got: «Çima hûn dikin qalme-qalm
û digirîn? Zar' nemirîye, lê hêni-
jîye». 40 Wana qerfê xwe pê dikir.

Lê Îsa h'emû derxistine derva,
dê û bavê qîzikê t'evî her sê şa-
girtêd Xwe hildan û k'ete cîyê ku
qîzik lê bû. 41 Destê qîzikê girt û
gote wê: «Talîta qûm!» ku tê fe'm-
kirinê: «Qîzik, ez ter'a dibêjim,
r'abe!» 42 Qîzik pêr'a-pêr'a r'abû
û ger'îya. Ew donzdeh salî bû.
Ewêd ku dîtin h'işê serê wan çû.
43 Îsa h'işk t'emî li wan kir, ku vê
yekê kesîr'a nebêjin û wanr'a got,
ku xwarinê bidine wê.

### Bajarê Nisretê, li k'u Îsa mezin bibû, Wî qebûl nake

*(Metta 13:53-58; Lûqa 4:16-30)*

6 1 Îsa ji wira derk'et û çû cî-mis-
k'enê Xwe. Şagirtêd Wî jî pey
Wî çûn. 2 Çaxê r'oja şemîyê hat,

Wî k'inîştêda dest bi hînkirinê
kir û geleka ku bihîst zendegirtî
mabûn û digotin: «Evî merivî ev
tişt ji k'u anîne? Ev çi serwaxtî[f]
ye ku jêr'a hatîye dayînê? Û ev
çi k'eremet in ku bi destê Wî di-
qewimin? 3 Ne Ev necar e? Ne
Ev kur'ê Meryemê[f] û birê Aqûb[f],
Yûsês, Cihûda[f] û Şimh'ûn e? Ne
xûşkêd Wî li vir nav meda ne?»
Bi vî awayî ew ji Wî çûn.
4 Îsa wanr'a got: «P'êxember
t'u cîyî ne bêqedir e, pêştirî nava
cî-misk'enê xwe, merivêd xwe û
mala xweda». 5 Ewî li wê derê ni-
karibû t'u k'eremet bikira, t'enê
destê Xwe danî ser çend nexweşa
û ew qenc kirin. 6 Ew ser nebawe-
rîya wan e'cêbmayî ma.

## Şandina her donzdeha

*(Metta 10:5-15; Lûqa 9:1-6)*

Îsa li gundêd dor-bera diger'î-
ya û hîn dikir. 7 Wî her donzdeh
gazî cem Xwe kirin, destpêkir ew
cot-cot şandin û h'ukumê li ser
r'uh'êd h'eramr'a da wan. 8 T'emî
da wan û got: «Bona r'ê, pêştirî
şivdara destê xwe t'u tiştî xwer'a
hilnedin: Ne nan, ne tûrik û ne
jî p'era ber piştа xweda. 9 Çarixêd
xwe bikine p'îyê xwe, lê du dest
kiras xwer'a hilnedin». 10 Serda
zêde kir gote wan: «Ew mala ku
hûn bik'evinê, wê malêda jî bimî-
nin, h'eta hûn ji wî cîyî derk'evin.
11 Ew cîyêd ku we qebûl nekin û
guhdarîya gotina we nekin, ji wir
derk'evin û t'oza nigêd xwe daw-
şînin, wekî wanar'a bibe şe'detî».
12 Ew jî r'ê k'etin çûn û danna-
sîn dikirin ku meriv ji gunekirinê
veger'in. 13 Wana gelek cin der-
dixistin û r'ûn[f] li gelek nexweşa
didan û ew qenc dikirin.

## Kuştina Yûh'ennayê nixumdar[f]

*(Metta 14:1-12; Lûqa 9:7-9)*

14 Hêrodes p'adşa ev yek bihîst,
çimkî nav û dengê Îsa derk'etibû.
Hineka digot: «Eva Yûh'ennayê
nixumdar[f] e ji nav mirîya r'abû-
ye. Lema jî pê wî k'eremet têne
kirinê». 15 Lê hineka jî digot:
«Eva Êlyas[f] e». Hinekêd din jî
digotin: «Eva p'êxemberekî mîna
p'êxemberêd berê ye». 16 Lê gava
Hêrodes ev yek bihîst, got: «Eva
ew Yûh'enna ye, yê ku min serê
wî lêxistîye, ji nav mirîya r'abû-
ye!» 17-18 Çimkî Hêrodes xwexa
Hêrodîya jina Fîlîpoyê birê xwe
standibû, lê Yûh'enna jêr'a çend
cara gotibû: «Ne r'ast e ku tu
jina birê xwe bistînî». Hêrodes
jî k'erbî Hêrodîyayê Yûh'enna
dabû girtinê, girêdabû û avîtibû

kelê. **19** Lema Hêrodîyayê k’în
Yûh’ennar’a dajot, dixwest wî
bide kuştinê, lê nikaribû, **20** çim-
kî Hêrodes ji Yûh’enna ditirsîya
û ew xwey dikir. Ewî zanibû ku
Yûh’enna merivekî r’ast û buhurtî
ye. Gava ku guhdarîya gotina wî
dikir, serê wî t’evîhev dibû*, lê
dîsa bi h’ewas guh dida gotina wî.
**21** Awa carekê mecal vebû. Hêrodes
bona r’oja bûyîna xwe, e’silzada,
serh’ezarêd[f] eskera û giregirêd
Celîlêr’a mesref danî. **22** Gava
qîza Hêrodîyayê k’ete hindur’ û
r’eqisî, ev yek li dilê Hêrodes û
t’eglîfkirîyêd li ser sifrê r’ûniştî
xweş hat. Hingê p’adşê gote qîzikê:
«Tu ji min çi bixwazî, ezê bidime
te». **23** Û wî jêr’a sond xwar got:
«Tu ji min çi bixwazî, ezê bidi-
me te, h’eta nîvê p’adşatîya xwe
jî!» **24** Qîzik derk’ete derva û çû ji
dîya xwe pirsî: «Ez çi bixwazim?»
Dîya wê jî got: «Serê Yûh’ennayê
nixumdar». **25** Qîzikê lezand çû
cem p’adşê û xwestina xwe jêr’a
got: «Ez dixwazim ku tu niha serê
Yûh’ennayê nixumdar li ser sinîyê
bidî min». **26** P’adşa gelekî ber xwe
k’et, lê çimkî li ber t’eglîfkirîya
sond xwaribû, nexwest sozê xwe
betal kira. **27** P’adşê pêr’a-pêr’a
e’mirî ser celat kir, ku her’e serê
Yûh’enna bîne. Celat jî çû kelê-
da, serê wî lêxist **28** û li ser sinîyê
anî û da keç’ikê. Ewê jî ew hilda
bir da dîya xwe. **29** Gava şagirtêd
Yûh’enna ev yek bihîstin, hatin
cinyazê wî birin kirine t’irbê.

### Îsa pênc h’ezara t’êr dike

*(Metta 14:13-21; Lûqa 9:10-17; Yûh’enna 6:1-14)*

**30** Û şandî[f] veger’îyane cem Îsa,
h’emû tiştêd ku kiribûn û hîn
kiribûn jêr’a gotin. **31** Îsa wanr’a
got: «De werin em t’enê her’ine
cîkî xewle û hinekî r’ih’et bin».
Çimkî gelek dihatin û diçûn, wa-
na mecal nedidît ku nanê xwe jî
bixwarana. **32** Û ew t’enê bi qeyikê
çûne cîkî xewle. **33** Lê geleka ku
çûyîna wan dît, ew nas kirin, ji
h’emû bajara peya bezîn û berî
wan gihîştine wî cîyî. **34** Çaxê Îsa
ji qeyikê derk’et û Wî e’laleteke
giran dît, hingê gunê Wî li wan
hat, çimkî ew mîna pezêd bê şi-
van bûn. Destpêkir gelek tişt ew
hîn kirin. **35** Îdî çimkî dereng bû,
şagirtêd Îsa hatin û gotinê: «Ev
der cîkî xikî-xwelî ye, wext jî îdî

* 6:20 Nav hinek destnivîsarada dewsa «serê wî t’evîhev dibû» aha ye: «Wî gelek tişt dikir».

dereng e. 36 Cime'tê ber'de ku ew
her'ine gund û bergêd der-dora û
xwer'a tiştêd xwarinê bik'ir'in».
37 Lê Îsa li wan veger'and û got:
«Hûn xurek bidine wan!» Jêr'a
gotin: «Em her'in bahê dusid
zîvî[f] nan bik'ir'in û wan bidine
xwarinê?»

38 Îsa wanr'a got: «Her'in bi-
nihêr'in, k'a çend nanêd we he-
ne». Gava ku pê h'esîyan, gotin:
«Pênc nan û du me'sî hene». 39 Wî
e'mir kir ku h'emû jî k'om-k'om
li ser gîhayê şîn r'ûnên. 40 Ew jî
k'om-k'om, sed-sed, pêncî-pêncî
li e'rdê r'ûniştin.

41 Îsa her pênc nan û her du
me'sî hildan, berê Xwe e'zmênda
kir şikirî da, ew nan kerkirin û
da şagirtêd Xwe, wekî ew daynine
ber e'laletê. Û her du me'sî jî li
h'emûya bela kir. 42 H'emûya xwar
û t'êr bûn. 43 Ji wan nan û me'sîya
donzdeh seleyêd t'ijî hûrik berev
kirin. 44 Yêd ku ji wî nanî xwarin
weke pênc h'ezar mêrî bûn.

### Îsa p'îya li ser avêr'a diçe

*(Metta 14:22-33; Yûh'enna 6:15-21)*

45 Destxweda Ewî p'êyî ser şa-
girtêd Xwe kir, ku bik'evine qeyikê
û pêşîya Wî derbazî wî berî golê,
Beytsaydayê bin, h'eta ku Xwexa
cime'tê ver'êke. 46 Pey ver'êkirinêr'a
r'abû çû serê ç'îyê, ku dua bike.
47 Gava ku r'o çû ava, qeyik nava
golêda bû û Îsa t'enê devê golê
bû. 48 Îsa dît ku şagirt bêrk'işan-
dinêda gelekî ze'metê dik'işînin,
çimkî ba miqabilî wan bû. Nêzîkî
qereberbangê Îsa ser golêr'a peya
diçû nêzîkî wan dibû. Wî xwest
ku ber wanr'a derbaz bûya, 49 lê
çaxê wana dît ku Îsa ser golêr'a
peya diçe, wan t'irê[f] xeyaleke[f] ku
dibînin û kirine qîr'în. 50 Çimkî
h'emûya jî Ew dît û tirsîyan. Lê
Îsa wê demê deng da wan û got:
«Ser xwe bin! Ez im. Netirsin!»
51 Hingê Ew k'ete qeyikê cem
wan û ba sekinî. Şagirt e'cêbmayî
man, h'işê serê wan çû, 52 çimkî
ew qewimandina li ser nên hê
serê wanda r'ûneniştibû, fe'mê
wan dadayî bû.

### Îsa Cênîsartêda nexweşa qenc dike

*(Metta 14:34-36)*

53 Ew derbazî wî berî golê bûn û
li alîyê Cênîsartêva gihîştine bejê[f],
qeyîk cî kirin. 54 Gava ji qeyikê
peya bûn, cime'tê pêr'a-pêr'a
Îsa nas kir. 55 Ew t'emamîya wê
qezayê virda-wêda bezîn û dest-
pêkirin nexweş nivînava danîne
wî cîyê ku dibihîstin Îsa lê bû.

**56** Her cîyêd ku Îsa diçûyê, heger
bajar bûna, gund bûna, berge bû-
na, nexweş bazarada dadanîn û
hîvî jê dikirin ku t'enê li r'îşîyêd
k'incêd Wî k'evin. Û h'emûyêd
ku lê dik'etin, ji nexweşîyêd xwe
qenc dibûn.

### R'aw-r'izimêd[f] kal-bava û xebera Xwedê

*(Metta 15:1-9)*

**7** **1** Fêrisîya û hinek qanûnza-
nêd ku ji Orşelîmê hatibûn,
dora Îsa girtin. **2** Wana dît ku
hineke ji şagirtêd Wî bi destêd
h'eram, awa gotî destneşûştî nan
dixwin. **3** Fêrisî û h'emû cihû[f]
pey r'aw-r'izimêd[f] kal û bavêd
xwe diçin, h'eta ku destêd xwe
r'ind neşon, nanê xwe naxwin
**4** û ji bazarê jî çi tînin, h'eta avê
nexin, naxwin*. Gelek e'detêd
din jî hene, ku ji kal û bava hil-
dane û diqedînin: Mesele, mîna
şûştina t'asa, şerbika û firaqêd
sifire mayîn**. **5** Hingê fêrisî û
qanûnzana ji Îsa pirsîn: «Çima
şagirtêd Te pey r'aw-r'izimêd
kal û bava naçin û bi destêd h'e-
ram* nan dixwin?» **6** Ewî li wan
veger'and û got: «Îşaya bona we
dur'ûya r'ast p'êxembertî[f] kirîye!
Çawa ku hatîye nivîsarê:

‹Eva cime'ta bi zarê[f] xwe qedirê
Min digire,
lê dilê[f] wan ji Min dûr e.
**7** Badîhewa[f] Min dih'ebînin,
t'emîyêd meriva çawa qanûnêd
Min cime'tê hîn dikin›*.

**8** Hûn t'emîyêd Xwedê dihêlin
û pey r'aw-r'izimêd merivayîyê
dik'evin». **9** Û got: «Hûn t'emî-
yêd Xwedê r'ind didine alîkî,
wekî r'aw-r'izimêd xwe xwey kin.
**10** Mesele, Mûsa gotîye: ‹Qedirê
dê û bavê xwe bigire›* û ‹Ewê
ku gilîkî qolayî dê û bavê xwer'a
bêje, gerekê bê kuştinê›**. **11** Lê
hûn dibêjin: ‹K'î ku dîya xwe yan
bavê xwer'a bêje: Ew alîk'arîya
ku gerekê ji min bigihîje te, ew
«qurban»[f] e›, (awa gotî dîyarîk e
ku Xwedêr'a tê dayînê) **12** hûn îdî
nahêlin ku ew tiştekî dê û bavê

---

* 7:4 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Û ji bazarê jî tên, h'eta avê ser xweda nekin, nên naxwin».

** 7:4 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Usa jî cî-nivîna».

* 7:5 Nav destnivîsarêd qencda dewsa «bi destêd h'eram» «destqilêr» heye.

* 7:7 Îşaya 29:13.

* 7:10 Derk'etin 20:12; Qanûna Ducarî 5:16.

** 7:10 Derk'etin 21:17; Qanûna K'ahîntîyê 20:9.

xwer'a bike! 13 Bi vî awayî, hûn
bi wan r'aw-r'izimêd xweye ku
derbazî nisilêd[f] nû dikin, xebera
Xwedê dikine xwelî. Û hûn gelek
tiştêd aha dikin».

### Tiştêd ku mêriv dih'er'imînin

*(Metta 15:10-20)*

14 Hingê Îsa e'lalet dîsa gazî
cem Xwe kir û gote wan: «Hûn
h'emû guhdarîya Min bikin û
fe'm kin. 15 Tiştekî usa t'une, ku
ji derva bik'eve nav-dilê mêriv û
wî bih'er'imîne, lê ew tiştêd ku ji
dil dertên, ew mêriv dih'er'imî-
nin. 16 Guhê k'êyî bihîstinê heye
bira bibihê»*.
17 Gava ji e'laletê qetîya hate
mal, şagirtêd Wî me'na wê meselê
jê pirsîn. 18 Îsa li wan veger'and
û got: «Hûn hê nagihîjine gilî-
ya? Çima hûn fe'm nakin, çi ku
ji derva dik'eve nav-dilê mêriv,
nikare wî bih'er'imîne. 19 Çim-
kî ew ne ku dik'evine dilê wî, lê
diçine zikê wî û ji wir jî dertên
derva». (Bi vî awayî Îsa da k'ifşê,
ku h'emû xwarin jî h'elal[f] in.) 20 Û
got: «Ew tiştêd ku ji dilê mêriv
derdik'evin, ew wî dih'er'imînin.
21 Çimkî ji hindur', ji dilê meriv
fikirêd xirab derdik'evin: Qavî[f],
dizî, kuştin, 22 zinêk'arî, timayî,
xirabî, fêlbazî, toltî, ç'e'vê xirab,
buxdanbêjî, k'ubarî û bêaqilî.
23 Ev h'emû tiştêd xirab ji dil der-
dik'evin û mêriv dih'er'imînin».

### Bawerîya k'ulfeta Fînîkya Sûryayê

*(Metta 15:21-28)*

24 Îsa ji wê derê r'abû çû sînorê
Sûrê. Çû malekê û nedixwest ku
kesek pê bih'esîya, lê nikaribû Xwe
veşarta. 25 K'ulfeteke ku qîzika wê
r'uh'ê h'eramva girtî bû, bona Îsa
pê h'esîya, lez hat û xwe avîte ber
nigêd Wî. 26 Ew k'ulfet yûnan[f] bû,
e'silê xweda jî ji Fînîkya Sûryayê
bû. Wê lava ji Îsa kir, ku cin ji qîza
wê derxe. 27 Îsa wêr'a got: «Bihêle
bira pêşîyê zar' t'êr bin, çimkî
ne r'ast e ku nan ber zar'a hildin
û bavêjine ber sa». 28 Ewê li Wî
veger'and û got: «Belê Xudan, ne
se jî wan hûrikêd ber zar'aye binê
sifrêda mayî dixwin?» 29 Hingê
Ewî k'ulfetêr'a got: «Bona xatirê
vê gotina te, tu dikarî her'î. Cin
ji qîzika te derk'et». 30 K'ulfet jî
çû mala xwe, dîna xwe dayê, wê
qîzik nav nivînêda p'alda ye û cin
jî jê derk'etîye.

* 7:16 Nav destnivîsarêd here qencda r'êza 16-a t'une.

### Merivekî ker' û lal xeber dide

31 Pey wê yekêr'a Îsa ji sînorê
Sûrê derk'et, nava Saydêr'a der-
baz bû, qeza Dêkapolîsêr'a hate
gola Celîlê. 32 Merivekî ker' û lal
anîne cem Wî û lava jê kirin ku
destê Xwe dayne ser wî. 33 Îsa ew
meriv ji e'laletê qetand, t'ilîyêd
Xwe kirine guhêd wî, destê Xweda
t'ûkir, li zimanê wî da. 34 Û berê
Xwe e'zmênda kir, k'eser hatê û
got: «Effata!» ku tê fe'mkirinê:
«Vebe!» 35 Û dest xweda guhêd
wî bihîstin, zimanê wî vebû û
zelal dest bi xeberdanê kir. 36 Îsa
t'emî li wan kir, ku kesîr'a ne-
bêjin. Lê Ewî çiqas t'emî li wan
dikir, wana haqas zêde bela dikir.
37 Meriv gelekî e'cêbmayî mabûn
û digotin: «Evî h'emû tişt qenc
kir: Hin ker'a dide bihîstinê, hin
jî lala dide xeberdanê».

### Îsa çar h'ezara t'êr dike

*(Metta 15:32-39)*

**8** 1 Wan r'ojada dîsa e'laleteke
giran civîya. Tiştekî wanî
xwarinê t'unebû ku bixwarana,
Îsa gazî şagirtêd Xwe kir û got:
2 «Gunê Min li vê e'laletê tê. Ev
sê r'oj e t'evî Min e û tiştekî wanî
xwarinê t'une. 3 Heger Ez wan bir'çî
ver'êkime malêd wan, dilê wanê
r'êva xweva her'e û ji van hinek
jî ji cîyêd dûr hatine». 4 Şagirtêd
Wî lê veger'andin û gotin: «Li vê
ber'îyê[f] emê ji k'u haqas nan dest
xin, ku vê cime'tê t'êr kin?» 5 Îsa ji
wan pirsî: «Çend nanêd we hene?»
Wana got: «H'eft». 6 Hingê e'mir
kir ku e'lalet ser e'rdê r'ûnê. Ewî
ew h'eft nan hildan şikirî da, ew
kerkirin û paşê dane şagirtêd Xwe,
ku daynine ber e'laletê. Wana ew
danîne ber wan. 7 Û çend me'sîyêd
wane hûr jî hebûn. Îsa bona wan
jî şikirî da û got: «Van jî daynine
ber e'laletê». 8 Wana xwar û t'êr
bûn. Paşê h'eft zembîl ji hûrikêd
bermayî berev kirin. 9 Ewêd ku
xwarin, weke çar h'ezar meriva
bûn. Gava ku Îsa ew ver'êkirin,
10 pêr'a-pêr'a t'evî şagirtêd Xwe
k'ete qeyikê û çûne qeza Dal-
manûtayê.

### K'eremetekê çawa nîşan ji e'zmana dixwazin

*(Metta 16:1-4)*

11 Fêrisî hatin û destpêkirin
Îsar'a k'etine de'wê. Ew dicêr'i-
bandin û ji Wî nîşanek ji e'zmên
dixwestin. 12 K'ûr k'eser hatê û
got: «Çima eva nisila li nîşanekê
diger'e? Ez r'ast wer'a dibêjim ku
vî nisilîr'a nîşanek nayê dayînê».

13 Wî ew hiştin, dîsa k’ete qeyikê
û derbazî wî berî golê bû.

### Hevîrtir’şkê[f] fêrisîya û Hêrodes

*(Metta 16:5-12)*

14 Îjar şagirta bîr kiribû ku xwe-
r’a nan hildana. Li cem wan,
qeyikêda pêştirî nanekî tiştekî
wanî xwarinê t’unebû. 15 Îsa t’emî
da wan û got: «Miqatî xwe bin,
h’evza xwe ji hevîrtir’şkê[f] fêrisîya
û usa jî yê Hêrodes* bikin». 16 Lê
ewana nav hevda xeber didan û
digotin: «Nanê me t’une, lema
aha dibêje». 17 Îsava e’yan bû ku
ew çi dibêjin û wanr’a got: «Hûn
çima nav hevda xeber didin, ku
nanê we t’une? Hela hê hûn fe’m
nakin? Û serê weda r’ûnanî, hela
hê hûn nagihîjine gilîya?
18 Ç’e’vê we hene, hûn nabînin?
Guhê we hene, hûn nabihên?
Çawa nayê bîra we*, 19 çaxê Min
pênc nan bona pênc h’ezar meriva
kerkirin? We ji hûrikêd bermayî
çend seleyêd t’ijî berev kirin?»
Wan lê veger’and û gotin: «Donz-
deh». 20 «Û gava Min h’eft nan
bona çar h’ezar meriva kerkirin,
we çend zembîlêd t’ijî bermayî
berev kirin?» Wan got: «H’eft».
21 Îsa wanr’a got: «Lê çima hûn
hê fe’m nakin?»

### Li Beytsaydayê qenckirina korekî

22 Û ew hatine Beytsaydayê.
Hineka merivekî kor anî cem Îsa û
lava jê kirin, ku destê Xwe dayne
ser wî. 23 Ewî jî destê merivê kor
girt, ji gund derxiste der, t’ûyî
ç’e’vêd wî kirin û destêd Xwe
danîne ser wî, pirsî: «Tu tiştekî
dibînî?» 24 Ewî jî li jorê nihêr’î û
got: «Ez meriva dibînim, lê mîna
dara ne, ku diger’in». 25 Dîsa Îsa
destêd Xwe danîne ser ç’e’vêd wî,
kor zûr’ bû nihêr’î û ç’e’vêd wî
vebûn, her tişt zelal dît. 26 Îsa ew
şande mala wî û jêr’a got: «Ne-
k’eve nava gund»*.

### Petrûs şe’detîyê li ser Îsa dide

*(Metta 16:13-20; Lûqa 9:18-21)*

27 Îsa t’evî şagirtêd Xwe çû gun-
dêd Qeyserîya Fîlîpoyê û r’êda ji
şagirtêd Xwe pirsî: «Bi t’exmîna
meriva Ez k’î me?» 28 Wan lê

* 8:15 Nav hinek destnivîsarada dewsa «Hêrodes» «Hêrodesîya» heye.

* 8:18 Yêremîya 5:21; Hezekîyêl 12:2.

* 8:26 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Gundda kesekîr’a tiştekî nebêjî».

veger’and û gotin: «Hinek dibêjin
‹Yûh’ennayê nixumdar e›, hine-
kêd din dibêjin ‹Êlyas e›, hinekêd
mayîn jî dibêjin ‹yek ji p’êxembera
ye›». **29** Îsa ji wan pirsî: «Lê hûn
çi dibêjin? Bi t’exmîna we Ez k’î
me?» Petrûs lê veger’and û gotê:
«T’u Mesîh î». **30** Ewî t’emî li wan
kir, ku derheqa Wîda kesîr’a tiş-
tekî nebêjin.

### Îsa derheqa cefa û mirina Xweda dibêje

*(Metta 16:21-28; Lûqa 9:22-27)*

**31** Pey vê yekêr’a Îsa destpêkir
şagirtêd Xwe hîn kir, ku gerekê
Kur’ê Mêriv gelekî cefê bik’işîne,
ji alîyê r’ûspîya[f], serekêd k’ahîna
û qanûnzanada bê t’exsîrkirinê[f]
û kuştinê, lê r’oja sisîya ji mirinê
r’abe. **32** Ewî ev yek zelal got. Hin-
gê Petrûs Ew da alîkî û lê hilat.
**33** Lê Îsa ser milê Xweva zivir’î û
li şagirtêd Xwe nihêr’î, li Petrûs
hilat û got: «Ji ber ç’e’vê Min be-
tavebe, cino! Çimkî nêt-fikira te
ne ji Xwedê ye, lê ji merivayê ye».

**34** Paşê Îsa gazî e’laletê û şagirtêd
Xwe kirin, wanr’a got: «Heger yek
dixwaze li pey Min bê, bira xwe
înk’ar[f] ke, xaçê[f] xwe hilde û pey
Min bê. **35** Çimkî k’î ku dixwaze
e’mirê xwe xilaz ke, ewê wî unda
ke û k’î ku e’mirê xwe bona Min û
Mizgînîyê unda ke, ewê wî xilaz ke.
**36** Çi feyde heger meriv t’emamîya
dinyayê qazinc ke, lê e’mirê xwe
unda ke? **37** Yan jî meriv çi dikare
ber e’mirê xweva bide? **38** Ewê ku
Min û xeberêd Min nav vî nisilê
xalifî[f] û gunek’arda şerm h’esab ke,
Kur’ê Mêriv jî wê wî şerm h’esab
ke, gava r’ûmeta Bavê[f] Xweva t’evî
milyak’etêd pîroz[f] bê».

**9** **1** Û Ewî wanr’a got: «Ez r’ast
wer’a dibêjim, ku hinekêd li
vir sekinî hene wê mirinê nebî-
nin, h’eta ku nebînin P’adşatîya
Xwedê bi qewat tê».

### Şagirt Îsa nava nûr û r’ûmetêda dibînin

*(Metta 17:1-13; Lûqa 9:28-36)*

**2** Pey şeş r’ojar’a Îsa t’evî Xwe
Petrûs, Aqûb û Yûh’enna hildan
û r’akirine ç’îyakî bilind, li wir
ew t’enê bûn. Hingê r’engê Wî
li ber ç’e’vê wan hate guhastinê.
**3** K’incêd Wî usa çîl-qerqaş bûn
û haqasî biriqîn, ku li ser r’ûyê
e’rdê t’u tiştekî k’incsipîkirinê
nikaribû ew haqasî sipî bikira.
**4** Hingê Êlyas û Mûsa wanva xuya
bûn û t’evî Îsa xeber dan. **5** Petrûs
Îsar’a got: «Dersdar, çawa r’ind e
ku em vir in! De emê sê h’olika
çêkin, yekê Ter’a, yekê Mûsar’a û

yekê jî Êlyasr'a». 6 Ew usa tirsîya
bûn, ku Petrûs nizanibû çi bêje.
7 Wê gavê e'wrek derk'et li ser
wan kire sî û dengek ji e'wr hat:
«Ev e Kur'ê Minî delal! Guhda-
rîya Wî bikin!» 8 Nişkêva şagirta
li dora xwe nihêr'î, pêştirî Îsa
kesek nedîtin.
9 Çaxê ji ç'îyê dihatine xwarê,
Îsa t'emî li wan kir got: «Çi ku
we dît t'u kesîr'a nebêjin, h'eta ku
Kur'ê Mêriv ji mirinê r'anebe».
10 Şagirta ev t'emî xwey kir û ji
hevdu pirsîn, k'a me'na vê r'abûna
ji mirinê çi ye. 11 Û wana jê pirsî:
«Gelo çima qanûnzan dibêjin pê-
şîyê gerekê Êlyas bê?»* 12 Ewî jî
wanr'a got: «R'ast e, pêşîyê Êlyasê
bê û her tiştî wê dîsa bîne cî. Lê
çima hatîye nivîsarê, ku Kur'ê
Mêriv wê gelekî cefê bik'işîne
û bê bêhurmetkirinê? 13 Lê Ez
wer'a dibêjim, Êlyas hatîye jî û
çawa ku bona wî hatibû nivîsarê,
usa jî serê wî kirin, çawa ku dilê
wan xwest».

### Îsa kur'ikekî cinak'etî qenc dike

*(Metta 17:14-21; Lûqa 9:37-43a)*

14 Gava veger'îyane cem şagirtêd
din, dîtin li dora wan e'laleteke
giran girtîye û qanûnzan jî wanr'a
k'etibûne de'wê. 15 Hingê t'ema-
mîya e'laletê ku Îsa dît, gelekî
e'cêbmayî ma, berbi Wî bezîn
û silav danê. 16 Îsa ji şagirta pir-
sî: «Hûn bona çi wanr'a k'etine
de'wê?»
17 Ji nav e'laletê merivekî lê
veger'and û got: «Dersdar! Min
kur'ê xweyî r'uh'ê lalva girtî anî
cem Te. 18 K'îderê ku pê digire wî
e'rdê dixe, k'ef dêv dik'eve, diran
lê dikine ç'irke-ç'irk û r'eq dibe.
Min hîvî ji şagirtêd Te kir, ku vî
r'uh'î derxin, lê nikaribûn».
19 Îsa li wan veger'and û got:
«Hey nisilê nebawer! H'eta k'engê
Ezê t'evî we bim? H'eta k'engê Ezê
li we sebir kim? Wî bînine cem
Min». 20 Wana kur'ik anîne cem
Îsa. Gava ku r'uh'ê h'eram Îsa dît,
pêr'a-pêr'a kur'ik veç'ir'ikand. Ew
k'ete e'rdê, k'ef dêv k'et û p'irpitî.
21 Îsa ji bavê wî pirsî: «Ji k'engêva
ev yeka t'evî wî diqewime?» Ewî
got: «Ji zar'otîyêda. 22 Û vî r'uh'î
gelek cara eva avîtîye nava êgir
û avê, ku wî bikuje. Lê heger ji
destê Te tê, tiştekî bike bira gunê
Te li me bê, alîk'arîya me bike!»
23 Îsa wîr'a got: «Te got çi? ‹He-
ger ji destê te tê?› Bona yê bawer

* 9:11 Malaxî 4:5.

dike her tişt dibe». 24 Wê gavê
bavê kur’ik kire qîr’în û got: «Ez
bawer dikim. Alîk’arîya nebawe-
rîya min bike!» 25 Gava Îsa dît ku
e’lalet dibeze, t’opî ser Wî dibe,
li r’uh’ê h’eram hilat û got: «Hey
r’uh’ê ker’ û lal, Ez e’mirî ser te
dikim: Ji kur’ik derk’eve û careke
din nek’evî nava wî!» 26 R’uh’ kire
qîr’în, kur’ik qayîm veç’ir’ikand jê
derk’et. Û kur’ik bû mîna mirîya,
usa ku geleka digot: «Ew mir!»
27 Lê Îsa destê wî girt, ew r’akir.
Kur’ik jî r’abû sekinî. 28 Çaxê Îsa
k’ete malê, şagirtêd Wî başqe jê
pirsîn: «Me çima nikaribû ew cin
derxista?» 29 Îsa li wan veger’and
û got: «Cinê vî cûr’eyî bi t’u tiştî
dernayê, pêştirî bi dua*».

### Îsa dîsa derheqa mirina Xweda dibêje

*(Metta 17:22-23; Lûqa 9:43b-45)*

30 Ji wir çûn û nav Celîlêr’a
derbaz bûn. Îsa nedixwest ku
kes vê yekê bih’ese, 31 çimkî Ewî
şagirtêd Xwe hîn dikir û wanr’a
digot: «Kur’ê Mêriv wê bik’eve
destê meriva, ewê Wî bikujin, lê
pey kuştinêr’a r’oja sisîya wê r’abe».
32 Lê wana ev gotin fe’m nedikir,
ditirsîyan jî ku ji Wî bipirsin.

### K’î ye yê herî mezin?

*(Metta 18:1-5; Lûqa 9:46-48)*

33 Û ew hatine Kefernahûmê.
Gava Îsa malda bû, ji şagirta
pirsî: «Hûn r’êda bona çi hevr’a
k’etibûne de’wê?» 34 Wana dengê
xwe nekir, çimkî r’êda nav hevda
xeber dabûn, k’a ji wan k’î ye yê
herî mezin. 35 Îsa r’ûnişt, gazî her
donzdeha kir û wanr’a got: «Heger
yek dixwaze bibe yê pêş, gerekê
ew bibe yê herî paş û xulamê
h’emûya». 36 Û destê zar’okekê
girt, nav wanda da sekinandinê,
paşê ew zar’ok da h’emêza Xwe û
wanr’a got: 37 «K’î zar’okeke aha
bi navê Min qebûl ke, ew Min
qebûl dike. Û k’î ku Min qebûl
ke, ew ne ku Min, lê Yê ku Ez
şandime qebûl dike».

### Yê ne miqabilî me ye, ew pişta me ye

*(Lûqa 9:49-50)*

38 Yûh’enna Îsar’a got: «Ders-
dar! Me merivek dît ku bi navê
Te cin derdixistin, lê me kir ku
em nehêlin, çimkî ew pey me
nayê». 39 Lê Îsa got: «Pêşîyê li wî
negirin. Kesek t’une ku bi navê
Min k’eremetekê bike û pêr’a-pêr’a

* 9:29 Nav destnivîsarêd paşwextîyêda aha ye: «Pêştirî bi dua û r’ojîyê».

bikaribe hindava Minda xirab
xeber de. **40** Çimkî ewê ku ne
miqabilî me ye, ew pişta me ye.
**41** Ez r'ast wer'a dibêjim, ewê ku
t'ase av bide we bona xatirê wê
yekê, ku hûn p'ara Mesîh in, ewê
heqê xwe qet unda neke.

### Jir'êderxistin

*(Metta 18:6-9; Lûqa 17:1-2)*

**42** K'î ku ji van biç'ûka yekî, yê
ku bawerîya xwe Min tîne ji r'ê
derxe, wîr'a hê qenc e, ku beraşek
stûyê wîva bê girêdanê û bê avîtinê
nava be'rê. **43-44** Heger destê te, te
ji r'ê derdixe, wî jêke! Bona te hê
qenc e, ku tu qop bik'evî jîyînê,
ne ku du destêd te hebin û her'î
ce'nimê[f], nava agirê ku qet nate-
mire.* **45-46** Heger nigê te, te ji r'ê
derdixe, wî jêke! Bona te hê qenc
e, ku tu bê nig bik'evî jîyînê, ne ku
du nigêd te hebin û bêyî avîtinê
ce'nimê. **47** Heger ç'e'vê te, te ji
r'ê derdixe, wî derxe! Bona te hê
qenc e, ku tu bi ç'e'vekî bik'evî
P'adşatîya Xwedê, ne ku du ç'e'vê
te hebin û bêyî avîtinê ce'nimê.
**48** Wê derê ‹ewê ji kurmê nemirî
bêne kotinê û agirê jî netemire›*.
**49** Çimkî her merivekê bi êgir bê
xwêkirinê*. **50** Xwê tiştekî qenc e.
Lê heger xwê şor'ayîya xwe unda
ke, hûnê çawa dîsa şor'ayîya wê
bînine cî? Bira te'ma xwê nava
weda be û bi hevr'a e'dilayîyêda
bijîn».

### Pirsa jinber'danê

*(Metta 19:1-12; Lûqa 16:18)*

**10** **1** Îsa ji wir r'abû çû sînorê
Cihûstanê û derbazî wî
alîyê ç'emê Ûrdunê bû. Dîsa e'la-
letê li dora Wî girt û çawa e'detê
Wî bû, Ewî dîsa ew hîn kirin. **2** Ji
fêrisîya hinek nêzîkî Wî bûn û
jê pirsîn, wekî Wî bicêr'ibînin:
«Gelo li gora Qanûnê r'ast e, ku
mêr jina xwe ber'de?» **3** Îsa caba
wan da û got: «Mûsa çi t'emî
da we?» **4** Wana got: «Mûsa îzin
da, ku mêr k'axaza jinber'danê
binivîse û jinê ber'de»*. **5** Lê Îsa
wanr'a got: «Ji dest serh'işkîya

* 9:43-44, 45-46 Nav hinek destnivîsarada, r'êza 48-a xilazîya r'êza 44 û 46-ada tê wek'ilandinê: «Wê derê ewê ji kurmê nemirî bêne kotinê û agirê jî netemire».

* 9:48 Îşaya 66:24.

* 9:49 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Û her qurbanê bi xwê bê xwêkirinê». Hinek aha fe'm dikin: «Çimkî her merivekê bi êgir bê safîkirinê, çawa ku her qurban bi xwê tê xwêkirinê». Qanûna K'ahîntîyê 2:13.

* 10:4 Qanûna Ducarî 24:1-3.

we Mûsa ev t'emî wer'a nivîsî.
6 Lê serê sêrîda, wextê e'firan-
dinê Xwedê ew ‹qisimê mêr û
jinêda xuliqandin›*. 7 ‹Bona vê
yekê mêrê dê û bavê xwe bihêle,
xwe li jina xwe bigire 8 û her du
wê bibine bedenek›*. Awa îdî
ew ne dudu ne, lê bedenek in.
9 Bona vê yekê ewêd ku Xwedê
ew kirine yek, bira meriv wan
ji hevdu neqetîne». 10 Gava ew
dîsa malda bûn, şagirta bona vê
meselê ji Wî pirsîn. 11 Îsa wanr'a
got: «K'î ku jina xwe ber'de û
yeke din bistîne, hindava wêda
zinêk'arîyê dike 12 û heger jin jî
mêrê xwe ber'de û yekî din bis-
tîne, zinêk'arîyê dike».

**Îsa dua zar'oka dike**

*(Metta 19:13-15; Lûqa 18:15-17)*

13 Awa zar'ok danîne cem Îsa,
ku destê Xwe dayne ser wan, lê
şagirt li yêd danîn hilatin. 14 Gava
ku Îsa ev yek dît, hêrs k'et û wan-
r'a got: «Bira ew zar'ok bêne cem
Min, pêşîya wan negirin, çimkî
P'adşatîya Xwedê p'ara yêd aha
ye. 15 Ez r'ast wer'a dibêjim, k'î
P'adşatîya[f] Xwedê mîna zar'okekê
qebûl neke, ew t'u car nak'eve nava
wê». 16 Paşê ew zar' dane h'emêza
Xwe, destê Xwe danî ser wan û
dua li wan kir.

**Yekî dewletî li jîyîna[f] h'eta-h'etayê diger'e**

*(Metta 19:16-30; Lûqa 18:18-30)*

17 Gava Îsa r'îya Xweda diçû,
yek berbi Wî bezî, çû li ber Wî
çok da û jê pirsî: «Dersdarê qenc,
ez çi bikim, wekî jîyîna h'eta-h'e-
tayê war bim?» 18 Îsa wîr'a got:
«Tu çima Minr'a dibêjî qenc?
Qenc t'enê Xwedê ye, pêştirî Wî
kesekî din t'une. 19 Tu t'emîya
zanî: ‹Nekuje, zinêk'arîyê neke,
nedize, şe'detîya derew nede,
xûdana xelqê nexwe, qedirê dê
û bavê xwe bigire›*».
20 Ewî got: «Dersdar, ev h'emû
jî min ji cahiltîya xweda xwey
kirine». 21 Îsa lê nihêr'î, ew h'iz
kir û gotê: «Hê kêmasîke te heye.
Her'e çî te heye bifiroşe, belayî
feqîra ke, hingê xizna te wê li
e'zmên hebe. Û pey Min were*».
22 Li ser vê gotinê ewî r'eng avît,

* 10:6 Destpêbûn 1:27; 5:2.
* 10:8 Destpêbûn 2:24.
* 10:19 Derk'etin 20:12-16; Qanûna Ducarî 5:16-20.
* 10:21 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Û xaçê xwe hilde, pey Min were».

me'dekirî çû, çimkî gelek hebûka
wî hebû.
**23** Îsa li dora Xwe nihêr'î û şa-
girtêd Xwer'a got: «Dewletîyar'a
çiqas ze'met e, ku bik'evine P'ad-
şatîya Xwedê!» **24** Şagirt ser van
gotinêd Wî e'cêbmayî man, lê Îsa
dîsa dûmayî kir û got: «Lawno!
Wanr'a çiqas ze'met e, bik'evine
P'adşatîya Xwedê, yêd ku gu-
mana xwe datînine ser dewleta
xwe!* **25** Deve wê qula derzîyêr'a
hê r'ih'et derbaz be, ne ku dew-
letî bik'eve P'adşatîya Xwedê».
**26** Şagirt gelekî e'cêbmayî man û
hevr'a gotin: «Îdî k'î dikare xilaz[f]
be?» **27** Îsa li wan nihêr'î û got:
«Ew tişt ji destê mêriv nayê, lê
ji destê Xwedê tê, çimkî Xwedê
dikare her tiştî bike». **28** Hingê
Petrûs destpêkir jêr'a got: «Awa
me h'emû tişt hiştîye û pey Te
hatine». **29** Îsa wanr'a got: «Ez
r'ast wer'a dibêjim, t'u kes t'une
ku bona Min û Mizgînîyê mal,
yan bira, yan xûşk, yan dê, yan
bav, yan zar', yan e'rdêd xwe
hiştibin, **30** û li vê dinê sed qat
mala, bira, xûşka, dîya, zar'a û
e'rda t'evî zêrandina nestîne û
dinya dinda jî jîyîna h'eta-h'etayê.
**31** Lê gelekêd pêş wê bibine yêd
paş û yêd paş wê bibine yêd pêş».

### Îsa cara sisîya derheqa mirina Xweda dibêje

*(Metta 20:17-19; Lûqa 18:31-34)*

**32** Awa ew li ser r'ê bûn û hev-
raz diçûne Orşelîmê, Îsa li pêşîya
wan diçû, şagirt e'cêbmayî diman
û ewêd li pey dihatin ditirsîyan.
Ewî dîsa her donzdeh dane alîkî
û destpêkir ew tiştêd ku wê serê
Wî biqewimîyana wanr'a got:
**33** «Bibihên! Em hevraz diçine
Orşelîmê. Kur'ê Mêriv wê bik'eve
destê serekêd k'ahîna û qanûn-
zana. Ewê jêr'a kuştinê derxin û
Wî bidine destê necihûya[f] **34** û ewê
qerfê xwe li Wî bikin, t'ûkinê,
bidine ber qamçîya, Wî bikujin.
Û r'oja sisîya wê ji mirinê r'abe».

### Xwestina Aqûb û Yûh'enna

*(Metta 20:20-28)*

**35** Hingê kur'êd Zebedî, Aqûb û
Yûh'enna nêzîkî Îsa bûn û gotinê:
«Dersdar, em dixwazin wekî em
ji Te çi hîvî kin, Tu bona me bi-
kî». **36** Ewî jî ji wan pirsî: «Hûn çi
dixwazin ku Ez bona we bikim?»
**37** Wan jêr'a got: «Îzinê bide ku

* 10:24 Nav hinek destnivîsarada «yêd ku gumana xwe danîne ser dewleta xwe» t'une.

r’ûmeta Teda ji me yek li milê
Teyî r’astê, yê din jî li milê Teyî
ç’epê r’ûnê». **38** Îsa wanr’a got:
«Hûn nizanin çi dixwazin. Gelo
hûn dikarin ji wê k’asê vexwin,
ya ku Ezê vexwim? Yan jî bi wê
nixumandinê bêne nixumandinê
bi k’îjanê Ezê bême nixuman-
dinê?» **39** Wana jêr’a got: «Em
dikarin». Îsa wanr’a got: «Belê
hûnê vexwin ji wê k’asa ku Ezê
vexwim û bêne nixumandinê bi
wê nixumandina ku Ezê pê bême
nixumandinê, **40** lê îzina li milê
Minî ç’ep û r’astê r’ûniştinê ne
destê Minda ye. Ew cî bona wan
in, k’îjanar’a hatine hazirkirinê».
**41** Gava her dehe şagirtêd din ev
yek bihîst, dilê wan ji Aqûb û
Yûh’enna ma. **42** Lê Îsa ew gazî
cem Xwe kirin û got: «Hûn zanin
yêd ku nav miletada[f] serwêr têne
h’esabê, serdestîyê li wan dikin
û giregirêd wan jî h’ukumî ser
wan dikin. **43** Lê nava weda bira
usa nîbe. K’î ku nava weda di-
xwaze bibe yê mezin, gerekê bibe
berdestîyê we. **44** Û k’î ku nava
weda dixwaze bibe pêş, gerekê
bibe xulamê h’emûya. **45** Çimkî
Kur’ê[f] Mêriv jî nehatîye ku jêr’a
berdestîyê bikin, lê wekî Ew Xwe-
xa berdestîyê bike û e’mirê Xwe
bide ku geleka bik’ir’e».

### Îsa p’arskirekî kor bajarê Erîhayêda qenc dike

*(Metta 20:29-34; Lûqa 18:35-43)*

**46** Paşê ew hatine Erîhayê. Gava
Îsa t’evî şagirtêd Xwe û e’lalete-
ke giranva ji bajêr derk’et, Kur’ê
Tîmeyo, Bartîmeyoyê kor* li ser
r’ê r’ûniştibû p’ars dikir. **47** Gava
bihîst ku Îsayê Nisretê derbaz
dibe, destpêkir kire qîr’în û got:
«Îsayê Kur’ê[f] Dawid, li min were
r’e’mê!» **48** Geleka li wî hilat, wekî
dengê xwe bibir’e, lê ewî hê dikire
qîr’în û digot: «Kur’ê Dawid, li
min were r’e’mê!» **49** Îsa sekinî û
got: «Gazî wî kin». Gazî yê kor
kirin û wîr’a gotin: «Ç’e’vê te r’o-
nik! R’abe ser xwe, gazî te dike».
**50** Ewî jî p’otê xwe avît, banzda
ser xwe û hate cem Îsa. **51** Îsa jê
pirsî: «Tu çi ji Min dixwazî ku
Ez bona te bikim?» Yê kor jêr’a
got: «Dersdar, dixwazim ç’e’vêd
min bibînin». **52** Û Îsa jêr’a got:
«Her’e, bawerîya te tu qenc kirî».
Û wî çaxî ç’e’vêd wî dîtin, da
pey Îsa çû.

* 10:46 Aha jî tê fe’mkirinê: «Bar-Tîmeyo», awa gotî «Kur’ê-Tîmeyo». «Bar» bi zimanê aramî[f] «kur’» e.

## Îsa bi r’ûmet dik’eve Orşelîmê

*(Metta 21:1-11; Lûqa 19:28-40; Yûh’enna 12:12-19)*

**11** 1 Gava ew nêzîkî Orşelîmê
bûn û gihîştine ç’îyayê[f]
Zeyt’ûnê û gundêd Beytfacê û
Beytanyayê, hingê Îsa du şagir-
têd Xwe şandin 2 û wanr’a got:
«Her’ine wî gundê pêşberî xwe.
Hema çawa ku hûn bik’evinê,
hûnê ce’şikeke girêdayî bibînin
ku hê kesek lê sîyar nebûye. Ewê
vekin û bînin. 3 Û heger yek ji we
bipirse û bêje: ‹Hûn çima vê yekê
dikin?› bêjinê: ‹Xudanr’a lazim e
û wê destxweda bişîne vir›». 4 Ew
şagirt çûn û li ber derî li k’ûçê,
ce’şikeke girêdayî dîtin. Gava
vedikirin, 5 hinekêd wir sekinî
pirsîn: «Hûn çi dikin? Çima wê
ce’şikê vedikin?» 6 Şagirta caba
wan usa da, çawa ku Îsa wanr’a
gotibû. Û ew hiştin. 7 Ce’şik Îsar’a
anîn, k’incêd xwe avîtine ser wê û
Ew li wê sîyar bû. 8 Geleka k’incêd
xwe ser r’ê r’adixistin, hineka jî ji
k’ewşên ç’iqilêd dara dibir’în, ser
r’ê r’adixistin. 9 Yêd li pêşîya Wî û
pey Wî ku diçûn dikirine qîr’în:
«Hosanna! Bimbarek e Ewê ku
bi navê Xudan tê!* 10 Bimbarek e
ew P’adşatîya bavê me Dawide ku
tê. Hosanna Yê Herî Jorinr’a!*»
11 Îsa k’ete Orşelîmê, çû p’a-
ristgehê[f]. Ç’e’vê Xwe li her tiştî
ger’and, lê çimkî îdî êvar bû, t’evî
her donzdeha çû Beytanyayê.

## Dara hêjîrêye h’işkbûyî

*(Metta 21:18-19)*

12 R’oja dinê, gava ew ji Bey-
tanyayê derdik’etin, Îsa bir’çî bû.
13 Dûrva dareke hêjîrêye belgdayî[f]
dît, berbi wê çû, k’a tiştekê ser
hebe. Gava gihîşte darê, pêştirî
belga tiştek nedît, çimkî hê ne
wextê hêjîra bû. 14 Hingê Ewî wê
darêr’a got: «Bira îdî t’u kes t’u
car berê te nexwe». Şagirtêd Wî
ev gotin bihîstin.

## Îsa p’aristgehê paqij dike

*(Metta 21:12-17; Lûqa 19:45-48; Yûh’enna 2:13-22)*

15 Û ew hatine Orşelîmê. Îsa
k’ete p’aristgehê û destpêkir ewêd
ku p’aristgehêda dik’ir’în û di-
firotin derxistine derva. T’extêd

* 11:9-10 Zebûr 118:25-26; Lûqa 1:32-33.
* 11:10 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Hosanna bilindayîyêda». «Bilindayî» be’sa cîyê Xwedê dike.

p'ereguhêr'a û k'ursîyêd kevotk-
firoşa welger'andin 16 û nehişt,
ku t'u kes tiştekî p'aristgehêr'a
derbaz ke. 17 Ew hîn kirin û got:
«Çima ne nivîsar e: ‹Mala Min
wê bona h'emû mileta mala dua
bê h'esabê›*? Lê we ew kirîye
‹şkefta qaçaxa›**». 18 Serekêd
k'ahîna û qanûnzana ev yek ku
bihîstin, destpêkirin ku çawa
bikin Wî bikine fesalê bikujin.
Ewana ji Wî ditirsîyan, çimkî
t'emamîya e'laletê ser hînkirina
Wî zendegirtî mabû. 19 Gava ku
r'o çû ava, Ew ji bajêr derk'etin.

## Dersa dara hêjîrê

*(Metta 21:20-22)*

20 Serê sibehê, gava ewana ber
darêr'a derbaz bûn, dîtin ku ew
dara hêjîrê r'awê xweva h'işk bûye.
21 K'ete bîra Petrûs û ewî Îsar'a
got: «Dersdar, dîna Xwe bidê,
ew dara hêjîrêye ku Te nifir' lê
kir h'işk bûye». 22 Îsa wanr'a got:
«Bawerîya we bira ser Xwedê hebe.
23 Ez r'ast wer'a dibêjim, k'î ku vî
ç'îyayîr'a bêje: ‹R'abe xwe bavêje
be'rê› û dudilî nebe, lê bawer bike
ku gotina wî wê biqewime, usa jî
wê bibe. 24 Bona vê yekê Ez wer'a
dibêjim, hûn çi ku nava duada
bixwazin, bawer bikin ku we îdî
standîye û xwestina we wê bê sêrî.
25 Û gava ku hûn disekinin û dua
dikin, bibaxşînin, heger tiştekî
we hindava kesekîda hebe, wekî
Bavê weyî e'zmana jî neheqîyêd
we bibaxşîne we. 26* Lê heger hûn
nebaxşînin, Bavê weyî e'zmana
jî neheqîyêd we nabaxşîne we».

## Pirsa derheqa h'ukumê Îsada

*(Metta 21:23-27; Lûqa 20:1-8)*

27 Û ew dîsa hatine Orşelîmê.
Dema ku Îsa p'aristgehêda dige-
r'îya, serekêd k'ahîna, qanûnzan û
r'ûspî hatine cem Wî 28 û jê pirsîn:
«Tu bi çi h'ukumî van kira dikî?
K'ê ev h'ukum daye Te, ku Tu van
kira bikî?» 29 Îsa wanr'a got: «Ezê
jî tiştekî ji we bipirsim. Heger we
caba Min da, Ezê jî wer'a bêjim, ku
Ez bi çi h'ukumî van kira dikim:
30 H'ukumê nixumandina Yûh'enna
ji e'zmên bû yan ji meriva? Caba
Min bidin!» 31 Ewana nav hevda
şêwirîn û gotin: «Heger em bêjin:
‹Ji e'zmên bû›, Ewê bêje: ‹Lê we
çima ew bawer nekir?› 32 Lê heger

---

* 11:17 Îşaya 56:7.

** 11:17 Yêremîya 7:11.

* 11:26 Nav destnivîsarêd qencda r'êza 26-a t'une.

em bêjin: ‹Ji meriva bû?..›» Ew ji
e’laletê ditirsîyan, çimkî h’emûya
qebûl kiribû ku Yûh’enna r’ast
p’êxember bû. **33** Caba Îsa dan û
gotin: «Em nizanin». Îsa wanr’a
got: «Ez jî wer’a nabêjim ku Ez bi
çi h’ukumî van kira dikim».

### Mesela r’ezê[f] tirîya û r’ezvana

*(Metta 21:33-46; Lûqa 20:9-19)*

**12** **1** Û bi mesela dest bi xe-
berdanê kir, wanr’a got:
«Merivekî r’ezê[f] tirîya danî, dora
wê sûr kir, h’ewzekî tirîh’incir’an-
dinê têda k’ola, hêlaneke nobedara
çêkir û ew bi k’irê da r’ezvana,
çû welatekî din. **2** Wextda xula-
mek şande cem r’ezvana, wekî
ji wî r’ezî berê p’ara xwe ji wan
bistîne. **3** Lê wana ew girt, k’utan
û destvala ver’êkirin. **4** Û wî dîsa
xulamekî din şande cem wan, lê
wana serî lê şkênand û ew r’obet
kirin. **5** Ewî yekî din şand, wana
ew jî kuşt. Wî gelekêd din şandin,
wana hinek ji wan k’utan û hinek
jî kuştin. **6** Bona wî t’enê yek mabû
ku bişanda, kur’ê xweyî delal. Xu-
lese r’abû ew jî şand û got: ‹Hilbet
wê ji kur’ê min şerm bikin›. **7** Lê
ev r’ezvanêd han li hev şêwirîn û
gotin: ‹Ev warê wî ye! Werin em
vî bikujin, mîrat’ê[f] mer’a bimîne›.
**8** Hingê ew girtin kuştin û cinyazê
wî ji r’ez derxistine der. **9** De îjar
xweyê r’ez wê çi bike? Ne ewê bê
qir’a r’ezvana bîne û r’ez bide hi-
nekêd din? **10** Çima we ew nivîsar
nexwendîye?

‹Ew kevirê ku hosta t’exsîr kir,
ew bû serê e’nîşkê[f].
**11** Ev yek ji alîyê Xudanda qewimî
û li ber ç’e’vê me h’eyr-h’uj-
mek’ar e!›*»

**12** Serwêrêd cihûya[f] fe’m kirin, ku
Îsa ev mesele anî ser wan, kirin ku
Wî bigirin, lê ji e’laletê tirsîyan,
k’erba Ew hiştin û çûn.

### Pirsa xercdayîn û nedayînê

*(Metta 22:15-22; Lûqa 20:20-26)*

**13** Paşê wana hineke ji fêrisîya
û piştgirêd Hêrodes şandine cem
Wî, wekî Wî bi xeberêd devê Wî
bigirin. **14** Ewana hatin û jêr’a gotin:
«Dersdar! Em zanin ku Tu yekî
r’ast î. Minetê ji kesî nakî, çimkî
nav merivada firqîyê danaynî, lê
r’îya Xwedê r’ast hîn dikî. Gelo r’ast
e ku em xerc bidine Qeyser[f] yan
na? Em bidin, yan nedin?» **15** Lê
dur’ûtîya wan ku Îsava e’yan bû
got: «Çima hûn Min dicêr’ibînin?

* 12:11 Zebûr 118:22-23.

Minr’a zîvekî bînin ku Ez bibînim».
16 Wana jêr’a zîvek anî. Ewî ji wan
pirsî: «Ev navê nivîsar û sifet[f] yê k’ê
ye?» Wana got: «Yêd Qeyser in».
17 Îsa wanr’a got: «Wekî usa ye, çi
ku yêd Qeyser in bidine Qeyser û
çi ku yêd Xwedê ne bidine Xwedê».
Û ser Wî e’cêbmayî man.

## Pirsa r’abûna mirîya

*(Metta 22:23-33; Lûqa 20:27-40)*

18 Sadûqî[f], ku dibêjin r’abûna
mirîya t’une, hineke ji wan hatine
cem Îsa û jê pirsîn: 19 «Dersdar!
Mûsa mer’a nivîsîye: ‹Heger birê
yekî bêzur’et bimire û jinê stûxar
bihêle, bira birê wî jina wî bistîne
û warê birê xwe şîn ke›*. 20 Awa
h’eft bira hebûn. Birê mezin jinek
stand, bêzur’et mir. 21 Biç’ûkê wî
ew jin stand, ew jî bêzur’et mir,
usa jî hate serê yê sisîya. 22 Xulese
van her h’eft bira jî ew jin stand û
bêzur’et mirin, pey wanr’a jî ew jin
mir. 23 De îjar wê R’oja[f] R’abûnê,
gava mirî r’abin, eva jina wê k’îjan
birayîr’a bik’eve? Çimkî her h’efta
jî ewa standibû».

24 Îsa li wan veger’and û got:
«Ne hûn ji dest vê yekê xalifî ne,
ku ne nivîsara zanin, ne jî qewata
Xwedê? 25 Gava yêd mirî ji mirinê
r’abin, wê ne bizewicin û ne jî mêr
kin, çimkî ewê mîna milyak’etêd
e’zmana bin. 26 Lê derheqa r’abûna
mirîyada, çima we K’itêba Mû-
sada* nexwendîye serhatîya dara
dir’îyêda ku çawa Xwedê Mûsar’a
dibêje: ‹Ez Xwedêyê Birahîm[f],
Xwedêyê Îshaq[f] û Xwedêyê Aqûb[f]
im›**? 27 Ew ne Xwedêyê mirîya
ye, lê Xwedêyê zêndîya ye. Hûn
lap xalifî ne!»

## T’emîya ser t’emîyar’a

*(Metta 22:34-40; Lûqa 10:25-28)*

28 Qanûnzanekî ku şer’-de’wê
wan bihîst û dîna xwe jî dayê,
ku Îsa çawa qenc caba wan da,
nêzîkî Îsa bû û jê pirsî: «K’îjan
t’emî ser h’emû t’emîyar’a ye?»
29 Îsa lê veger’and: «Ev e t’emîya
ser t’emîyar’a: ‹Bibihê, Îsraêl!
Xudan Xwedêyê me Xudanek
e*. 30 Xudan Xwedêyê xwe h’iz
bike, bi t’emamîya dilê[f] xwe, bi

---

* 12:19 Qanûna Ducarî 25:5.

* 12:26 «K’itêba Mûsa» tê fe’mkirinê: «Her pênc k’itêbêd pêşine Peymana[f] Kevin».

** 12:26 Derk’etin 3:6.

* 12:29 Aha jî tê fe’mkirinê: «Xudan Xwedêyê me, t’enê Ew e Xudan».

t’emamîya canîya xwe, bi t’ema-
mîya h’işê xwe û bi t’emamîya
qewata xwe›*. **31** Ya duda jî ev e:
‹Hevalê xwe weke xwe h’iz bike›*.
Ji van mestir t’u t’emî t’une». **32** Îjar
qanûnzan Wîr’a got: «R’ast e,
Dersdar! Te r’ast got, ku ‹Xudan
yek e û ji Wî pêştir yekî mayîn
t’une›*. **33** Û ‹bi t’emamîya dil,
bi t’emamîya aqil, bi t’emamîya
qewatê Xwedê h’izkirin› û ‹he-
valê xwe jî weke xwe h’izkirin›
ser her dîyarîyêd[f] t’evayîşewatê
û qurbanêd mayînr’a ye»*. **34** Îsa
dîna Xwe dayê, ku wî bi aqilî
caba xwe da, jêr’a got: «Tu ji
P’adşatîya Xwedê ne dûr î». Pey
vê yekêr’a, îdî t’u kesî newêribû
tiştek ji Wî bipirsîya.

### Mesîh kur’ê k’ê ye?

*(Metta 22:41-46; Lûqa 20:41-44)*

**35** Gava ku Îsa p’aristgehêda
hîn dikir, got: «Qanûnzan çawa
dibêjin ku Mesîh kur’ê Dawid
e? **36** Ne Dawid xwexa pê R’uh’ê
Pîroz dibêje?

‹Xudan gote Xudanê min:
Li milê Minî r’astê r’ûnê,
h’eta ku Ez dijminêd Te bikime
binê p’îyêd Te›*.

**37** Awa Dawid xwexa ku Wî ‹Xu-
dan› h’esab dike, îdî Ew çawa
dibe kur’ê Dawid?»

### Qanûnzanêd dur’û

*(Metta 23:1-36; Lûqa 20:45-47)*

Wê e’laleta giran bi dil û eşq
guhdarîya Îsa dikir. **38** Hînkiri-
na Xweda Ewî got: «H’evza xwe
ji wan qanûnzana bikin, yêd ku
h’iz dikin bi çuxêd dirêj biger’in,
bazarada silavê bidine wan, **39** k’i-
nîştada k’ursîyêd pêşin bigirin û
şayîyada jî herema[f] jorin r’ûnên.
**40** Evana alîkîva malêd jinebîya
h’ûfî xwe dikin, alîyê dinva jî bo-
na xwek’ifşkirinê duayê xwe dirêj
dikin. Dîwana wanê hê giran be».

### Dîyarîya jinebîya belengaz

*(Lûqa 21:1-4)*

**41** Îsa li pêşberî p’eredanga[f] p’a-
ristgehê r’ûnişt û dîna Xwe dayê,

* 12:30 Qanûna Ducarî 6:4-5.
* 12:31 Qanûna K’ahîntîyê 19:18.
* 12:32 Qanûna Ducarî 6:4; 4:35; Îşaya 45:21.
* 12:33 Qanûna Ducarî 6:5; Qanûna K’ahîntîyê 19:18; P’adşatî I, 15:22; Hosêya 6:6.
* 12:36 Zebûr 110:1.

ku e'laletê çawa p'ere davîtine
p'eredangê. Gelek dewletîya ge-
lek avîtinê. 42 Jinebîke belengaz jî
hat û du pol[f], ku dikire qur'ûşek,
avîtê. 43 Îsa şagirtêd Xwe gazî cem
Xwe kirin û wanr'a got: «Ez r'ast
wer'a dibêjim, ku evê jinebîya
belengaz ji van h'emûya ze'ftir
avîte p'eredangê, 44 Van h'emû-
ya ji zêdeya hebûka xwe avîtinê.
Lê evê vê belengazîya xweda çî
wê hebû ku pê e'bûrê xwe bikira
h'emû avîtê».

**Îsa pêşda derheqa wêranbûna p'aristgehêda dibêje**

*(Metta 24:1-2; Lûqa 21:5-6)*

13 1 Gava Îsa ji p'aristgehê
derk'et, ji şagirtêd Wî yekî
Wîr'a got: «Dersdar! Hela dîna
Xwe bidê ev çi kevir in û çi avayî
ne!» 2 Îsa li wî veger'and û gotê:
«Tu van avayîyêd mezin dibînî?
Ev h'emûyê jî wêran bin, li vir
kevirê li ser kevir qet nemîne!»

**Tengasî û zêrandin**

*(Metta 24:3-14; Lûqa 21:7-19)*

3 Gava Îsa li ç'îyayê Zeyt'ûnê,
li pêşberî p'aristgehê r'ûniştibû,
Petrûs, Aqûb, Yûh'enna û Endra-
wis başqe jê pirsîn: 4 «Bêje me, ew
tişt wê k'engê biqewimin? Û berî
qewimandina wan h'emûya, çi
nîşanê bibin?» 5 Hingê Îsa dest-
pêkir û wanr'a got: «Haş ji xwe
hebin, ku t'u kes we nexapîne.
6 Gelek wê pê navê Min bên û
bêjin: ‹Ez im Mesîh› û wê gele-
ka bixalifînin. 7 Gava hûn dengê
şer'a û be'sa şer'a bibihên, hûn
xwe unda nekin. Gerekê ev tişt
biqewimin, lê ew hê ne axirî ye.
8 Miletê r'abe ser milet, p'adşa-
tîyê r'abe ser p'adşatîyê, cî-cîya
wê e'rdh'ej û xelayî-celayê bibin.
Lê ev h'emû mîna êşa k'ulfetê ye,
ku destpêdike pê digire.

9 Lê hûn haş ji xwe hebin! Wê
we bibine ber dîwana û k'inîştada
we bik'utin. Bona Min wê we ber
welî[f] û p'adşa bidine sekinandinê,
wekî hûn ber wan şe'detîyê bidin.
10 Gerekê pêşîyê Mizgînî h'emû
miletar'a bê dayînê. 11 Gava ku we
bigirin bibine ber dîwanê, pêşda
xem nekin ku hûnê çi bêjin. Lê
wê demê çi wer'a bê dayînê, wê
jî bêjin, çimkî ne ku hûnê xeber
din, lê R'uh'ê Pîroz. 12 Bira wê
birê xwe bide kuştinê û bav kur'ê
xwe. Zar'ê r'abine ser dê û bavê
xwe û wan bidine kuştinê. 13 Û
bona navê Min hûnê ber ç'e'vê
h'emûya r'eş bin. Lê ewê ku h'eta
xilazîyê teyax ke, ewê xilaz be.

## H’eramîya Wêrankirinê

*(Metta 24:15-21; Lûqa 21:20-24)*

14 Awa çaxê hûn wê ‹h’eramîya
wêrankirinê›* bibînin, li wî cîyê
necayîz sekinî», (ewê ku dixûne
bira fe’m bike) «hingê ewêd ku
Cihûstanêda ne bira bir’evine
ç’îya. 15 Û ewê ku ser xanî ye
bira jorda neyê xwarê û nek’eve
hindur’, wekî tiştekî hilde. 16 Û
ewê ku k’ewşênda ye bira vene-
ger’e ku p’otê xwe hilde. 17 Lê
wey li h’emla û destdergûşa wan
r’ojada! 18 Dua bikin ku ev yek
zivistanêda neqewime. 19 Çimkî
wan r’ojada wê tengasîke usa bi-
be, wekî ji r’oja ku Xwedê dinya
e’firandîye h’eta niha nebûye û
ne jî wê bibe. 20 Heger Xudan ew
r’oj kin nekirina, t’u kes xilaz
nedibû, lê bona xatirê wan bi-
jartîyêd ku Wî bijartine, ew r’oj
kin kirine.

21 Hingê, heger yek wer’a bê-
je: ‹Mesîh va ye li vir e›, yan jî:
‹Wa ye dera han e›, bawer nekin.
22 Çimkî mesîh û p’êxemberêd
derew wê derên. Wê nîşan û k’e-
remeta bikin, heger dest wanva
bê, wê bijartîya jî bixalifînin.
23 Lê hûn haş ji xwe hebin! Min
her tişt pêşda wer’a got.

## Hatina Kur’ê Mêriv

*(Metta 24:29-31; Lûqa 21:25-28)*

24 Lê wan r’ojada, pey wê ten-
gasîyêr’a,

‹r’ûyê r’oyê wê bê girtinê
û hîvê r’onaya xwe nede,
25 steyrkê ji e’zmên bik’evin,
û t’opêd e’zmana wê ji r’îyêd
xwe derên*›**.

26 Û hingê wê bibînin, Kur’ê
Mêriv bi qewata mezin û r’ûmet
e’wrava tê*. 27 Wî çaxî Ewê mil-
yak’etêd Xwe bişîne û bijartîyêd
Xwe ji her çar qulba berev ke, ji
p’er’êd e’rdê girtî h’eta p’er’êd
e’zmên.

## Dersa dara hêjîrê

*(Metta 24:32-35; Lûqa 21:29-33)*

28 Ji dara hêjîrê dersekê hîn
bin: Çaxê ku ç’iqilêd wê ter’
dibin û belgêd wê dibişkivin,
îdî hûn zanin ku havîn nêzîk e.
29 Usa jî gava hûn bibînin ku ev

---

* 13:14 Danîyêl 9:27; 11:31; 12:11.

* 13:25 Aha jî tê fe’mkirinê: «Qewatêd e’zmana wê bih’ejin».

** 13:25 Îşaya 13:10; 34:4; Yoêl 2:10, 31; 3:15.

* 13:26 Danîyêl 7:13. (Bixûnin: E’yantî 1:7.)

yek diqewimin, bizanibin ku Ew
nêzîk e, li ber şêmîkê ye. 30 Ez
r’ast wer’a dibêjim, eva nisila
derbaz nabe, h’eta ku ev h’emû
tişt neqewimin. 31 E’rd û e’zmanê
derbaz bin, lê gotinêd Min t’u
car derbaz nabin.

### R’oj û sih’et ne e’yan e

*(Metta 24:36-44)*

32 Lê bona wê r’ojê û wê sih’etê
t’u kes nizane, ne milyak’etêd
e’zmên û ne jî Kur’, lê t’enê
Bav. 33 Haş ji xwe hebin! H’işyar
bimînin!* Çimkî hûn nizanin
k’engê wextê pêr’a bigihîje. 34 Ev
yek mîna merivekî ye, ku mala
xwe dihêle û derdik’eve r’êwîtîyê.
Berî çûyînê t’emîya mala xwe
dide xulamêd xwe, şixulê wan
her kesî didê û e’mirî ser der-
gehvan dike, ku h’işyar bimîne.
35 Bona vê yekê h’işyar bimînin,
çimkî hûn nizanin malxê malê
wê k’engê bê, êvarê yan nîvê şevê,
yan wextê bangdana dîka, yan
serê sibehê. 36 Nebe ku nişkêva
Ew bê û we xewêda bigire. 37 Ez
çi wer’a dibêjim, h’emûyar’a di-
bêjim: H’işyar bimînin!»

## Girtin, xaçkirin[f] û r’abûna Îsa

### Şêwira kuştina Îsa

*(Metta 26:1-5; Lûqa 22:1-2;*
*Yûh’enna 11:45-53)*

14 1 Awa du r’oj şûnda wê
Cejina[f] Derbazbûnê û Ce-
jina[f] Nanê Şkeva bibûya. Serekêd
k’ahîna û qanûnzana mecalekê
diger’îyan, ku çawa Îsa dizîva bi
fêlbazîyê bigirin, bikujin 2 û di-
gotin: «Bira ev yek cejinêda nîbe,
wekî cime’t r’anebe ser niga».

### Îsa Beytanyayêda tê r’ûnkirinê[f]

*(Metta 26:6-13; Yûh’enna 12:1-8)*

3 Gava Îsa li Beytanyayê mala
Şimh’ûnê k’otîda, li ser sifrê r’ûniştî
bû, k’ulfetek hat, derdaneke[f] wêye
alabastirêyî r’ûnê nardêyî[f] safî û
gelekî biha hebû. Wê ew şûşe şkê-
nand û ew r’ûn r’ête ser serê Îsa.
4 Hineke wir hêrs k’etin û hevr’a
digotin: «H’eyfa vî r’ûnî! Çima

* 13:33 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Û dua bikin».

eva zîyana bû? 5 Me dikaribû ev
r'ûna sêsid zîvî zêdetir bifirota û
belayî feqîra kira». Bi vî awayî ew
k'ulfeta r'ezîl kirin.
6 Lê Îsa got: «Ji wê k'ulfetê vege-
r'in! Çima hûn xatirê wê dik'evin?
Ewê tiştekî qenc bona Min kir.
7 Feqîrê her gav t'evî we bin. K'engê
hûn bixwazin, hûn dikarin qencîyê
wanr'a bikin. Lê Ezê her gav nav
weda nîbim. 8 Çi ji destê wê dihat
ewê kir. Ewê pêşda bedena Min
definkirinêr'a[f] r'ûn[f] kir. 9 Ez r'ast
wer'a dibêjim, dinyayêda k'îderê
eva Mizgînîya bê dannasînkirinê,
wê kirina vê k'ulfetê jî bona bîr-
anîna wê bê gotinê».

### Cihûda nemamîya[f] Îsa dike

*(Metta 26:14-16; Lûqa 22:3-6)*

10 Hingê Cihûdayê Îsxeryotî, yekî
ji her donzdeha, çû cem serekêd
k'ahîna, wekî Îsa bide destê wan.
11 Wan jî gava ev yek bihîst, şa bûn
û p'ere wîr'a soz dan. Û Cihûda
ji hingêva mecalekê diger'îya ku
çawa Îsa bide destê wan.

### Îsa t'evî şagirta şîva Cejina Derbazbûnê dixwe

*(Metta 26:17-25; Lûqa 22:7-14, 21-23; Yûh'enna 13:21-30)*

12 R'oja pêşine Cejina Nanê
Şkevada ku berxê qurbana Cejina
Derbazbûnê dihate serjêkirinê,
şagirta ji Îsa pirsî: «Tu li k'u di-
xwazî Şîva Cejina Derbazbûnê
bixwî, wekî em her'in ter'a hazir
kin?» 13 Îsa du şagirtêd Xwe şan-
din û wanr'a got: «Her'ine bajêr.
Merivekê r'astî we bê, cêr'ê avê
li ser mila. Pey wî her'ine wê
mala ku ew diçê 14 û bêjine xwe-
yê malê: ‹Dersdar dibêje: K'anê
ew oda mêvana, ya ku Ezê têda
t'evî şagirtêd Xwe şîva Cejina
Derbazbûnê bixwim?› 15 Hingê
ewê li qatê jorin odeke mezine
hevdayî û hazir nîşanî we ke, li
wê derê şîvê bona me hazir kin».
16 Şagirta da ser r'ê çûne bajêr û
çawa ku wanar'a gotibû usa jî
dîtin û şîva Cejina Derbazbûnê
hazir kirin.
17 Gava r'o çû ava, Îsa t'evî her
donzdeha çû wê derê. 18 Çaxê li
ser sifrê r'ûniştin û nanê xwe
dixwarin, Îsa got: «Ez r'ast wer'a
dibêjim, yekî ji we wê nemamîya[f]
Min bike, yê ku t'evî Min nên
dixwe». 19 Ew ber xwe k'etin û
destpêkirin yek-yek ji Wî pirsîn:
«Dibe ku ez im?» 20 Ewî wanr'a
got: «Ew yek nava we her donz-
dehada ye, yê ku pe'rîyê xwe t'evî
Min t'asêda dike. 21 R'ast Kur'ê
Mêriv wê usa her'e çawa ku bona
Wî hatîye nivîsarê. Lê wey li wî

merivê ku nemamîya Kur'ê Mêriv
bike! Wîr'a hê qenc bû ku ew qet
dinê nek'eta».

### Şîva Xudan

*(Metta 26:26-30; Lûqa 22:14-23;*
*Korint'î I, 11:23-25)*

**22** Gava wana hê nan dixwar,
Îsa nan hilda şikirî da, kerkir da
şagirta û got: «Han hildin! Eva
bedena Min e». **23** Peyr'a k'as hilda
şikirî da û da wan. H'emûya jî ji
wê vexwar. **24** Û wanr'a got: «Eva
xûna Min e bona peymanê[f]*, ku
bona geleka tê r'êtinê. **25** Ez r'ast
wer'a dibêjim, îdî Ez ji vir şûnda
t'u car ji meya tirîyê venaxwim,
h'eta wê r'oja ku Ezê P'adşatîya
Xwedêda ji ya nû vexwim».
**26** Paşê wana zebûrek[f] stira,
derk'etin çûne ç'îyayê Zeyt'ûnê.

### Îsa derheqa înk'arîya Petrûsda dibêje

*(Metta 26:31-35; Lûqa 22:31-34;*
*Yûh'enna 13:36-38)*

**27** Û Îsa wanr'a got: «Hûn h'e-
mûyê jî ji Min p'işk bin her'in,
çimkî nivîsar e:

> ‹Ezê li şivên xim û pezê jî be-
> la-belayî be›*.

**28** Lê gava ku Ez ji mirinê r'a-
bim, Ezê berî we her'ime Celîlê».
**29** Petrûs jêr'a got: «Heger h'emû
jî ji Te p'işk bin her'in, lê ez na».
**30** Îsa wîr'a got: «Ez r'ast ter'a
dibêjim, hema îşev hê berî ku dîk
du cara bang de, tê sê cara Min
înk'ar kî». **31** Lê Petrûs ser ya xwe
dima û digot: «Heger cî bê, ezê t'evî
Te bimirim jî, lê t'u car Te înk'ar
nakim!» H'emûya jî aha digot.

### Îsa li Gêtşemanîyê dua dike

*(Metta 26:36-46;*
*Lûqa 22:39-46)*

**32** Pey wê yekêr'a ew çûne wî cîyê
ku jêr'a Gêtşemanî dibêjin û Ewî
şagirtêd Xwer'a got: «Vira r'ûnên,
h'eta ku Ez dua bikim». **33** Wî Pet-
rûs, Aqûb û Yûh'enna t'evî Xwe
birin û destpêkir k'eser k'işand
û Xweda şewitî. **34** Wî wanr'a got:
«Dilê Min haqas derd û k'eder e,
mîna ber mirinê. Vira bimînin û
h'işyar bin». **35** Hinekî pêşda çû,
Xwe dever'û avîte e'rdê û dua kir,
ku heger mecal hebe, eva sih'eta ser
Wîr'a derbaz be. **36** Û got: «Abba[f],
Bavo! Her mecal ji destê Te tê.
Evê k'asê ji Min dûr xe. Lê bira
xwestina Min nîbe, lê ya Te be».

---

* 14:24 Nav hinek destnivîsarada «peymana nû» heye.
* 14:27 Zekerîya 13:7.

37 Paşê hate cem şagirta, ew r'a-
zayî dîtin û gote Petrûs: «Şimh'ûn,
tu r'azayî? Te nikaribû ku sih'etekê
tu h'işyar bimayî? 38 H'işyar bimînin
û dua bikin, wekî hûn nek'evine
nava cêr'ibandinê. Belê r'uh' r'azî
ye, lê beden sist e».

39 Dîsa çû dua kir, xût ew xeber
gotin. 40 Û hat dîsa ew xewêda
dîtin, çimkî ç'e'vêd wan ji xewê
venedibûn. Û nizanibûn çi caba
Wî bidana. 41 Cara sisîya jî hat û
wanr'a got: «Hûn hela hê r'azayî
ne û r'ih'et dibin? Bes e! Wext
pêr'a gihîşt. Va ye Kur'ê Mêriv
dik'eve destê gunek'ara. 42 R'abin
em her'in. Va ye ewê ku nemamîya
Min dike nêzîk bû».

## Girtina Îsa

*(Metta 26:47-56; Lûqa 22:47-53;
Yûh'enna 18:3-12)*

43 Hema hingê gava Wî hê xe-
ber dida, Cihûdayê ku yek ji her
donzdeha bû, hat. Ewî t'evî xwe
ji alîyê serekêd k'ahîna, qanûn-
zana û r'ûspîyada e'laleteke gi-
ran anîbû, bi dara û şûra. 44 Awa
nemamê Wî e'şeret dabû wan û
gotibû: «Ez k'îjanî ku r'amûsim,
Ew e, Wî bigirin û bi fesal bibin».
45 Hema hingê jî Cihûda hate cem
Îsa û got: «Dersdar!*» û r'amûsa.
46 Wana dest avîte Îsa û Ew gir-
tin. 47 Lê yekî ji yêd ku t'evî Wî
sekinî bûn, şûrê xwe k'işand li
xulamê serekk'ahîn xist û guhê wî
pekand. 48 Hingê Îsa wanr'a got:
«Tê bêjî we ser qaçaxekîda girtîye,
ku hûn bi dara û şûra hatine Min
bigirin? 49 Ne Ez her r'oj t'evî we
p'aristgehêda bûm Min hûn hîn
dikirin, lê we Ez nedigirtim. Lê
bona ku nivîsar bêne sêrî, ev yek
qewimî». 50 Hingê h'emû şagirta
Ew hişt û r'evîn. 51 Xortek pey Wî
diçû, p'arç'ekî k'itanê li bedena
wîye te'zî p'êç'ayî bû. E'laletê
ew girt, 52 lê wî ew k'itan hişt û
r'ût-te'zî ji destê wan r'evî.

## Îsa li ber civîna[f] giregira

*(Metta 26:57-68; Lûqa 22:54-55,
63-71; Yûh'enna 18:13-14, 19-24)*

53 Îsa birine cem serekk'ahîn.
H'emû serekêd k'ahîna, r'ûspî û
qanûnzan wir civîyan. 54 Petrûs
dûrva p'ê-p'ê pey Wî çû, h'eta
k'ete h'ewşa serekk'ahîn. Wir t'evî
nobedara li ber êgir r'ûnişt û xwe
germ dikir. 55 Serekêd k'ahîna û
t'emamîya civîna[f] giregira jî li

* 14:45 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «R'abbî». «R'abbî» bi zimanê aramî tê fe'mkirinê: «Dersdar».

şe'detîke miqabilî Îsa diger'îyan,
wekî Wî bikujin, lê ne didîtin.
**56** Geleka miqabilî Wî şe'detîya
derew dida, lê şe'detîya wan hevdu
nedigirt. **57** Hingê hinek r'abûn û
miqabilî Wî şe'detîya derew dan
û gotin: **58** «Me bihîst ku Vî me-
rivî got: ‹Ezê vê p'aristgeha ku
bi desta hatîye çêkirinê hilşînim
û sê r'ojada p'aristgeheke dine
bê destlêk'etin çêkim›». **59** Lê
şe'detîya wan jî hevdu nedigirt.
**60** Hingê serekk'ahîn r'abû nava
wanda sekinî û ji Îsa pirsî: «Bona
van şe'detîya ku evana miqabilî
Te didin Tu çima cabekê nadî?»
**61** Lê Ewî dengê Xwe nekir û t'u
cab neda. Serekk'ahîn[f] dîsa ji Wî
pirsî û gotê: «Tu yî Mesîh, Kur'ê
Yê hêjayî şikirîyê?» **62** Îsa gotê: «Ez
im. Û hûnê Kur'ê Mêriv li k'êleka[f]
Yê Herî Zor, li milê wîyî r'astê
r'ûniştî û li ser e'wrêd e'zmên tê
bibînin»*. **63** Hingê serekk'ahîn
k'incêd xwe qelaştin û got: «Îdî
şe'de çî mer'a ne? **64** We bihîst
Ewî çawa Xwedê bêhurmet kir!
Weva çawa xuya dibe?» H'emûya
jî Ew neheq kirin gotin, ku Ew
yê kuştinê ye. **65** Hingê hineka
destpêkir t'ûyî Wî kirin, r'ûyê
Wî nixamtin, dane ber k'ulma
û jêr'a gotin: «De p'êxembertîyê
bike!» Nobedara jî Ew bir û dane
ber şemaqa.

### Petrûs Îsa înk'ar dike

*(Metta 26:69-75; Lûqa 22:56-62;*
*Yûh'enna 18:15-18, 25-27)*

**66** Gava Petrûs li jêrê h'ewşêda
bû, ji carîyêd serekk'ahîn yek hate
wir. **67** Ewê ku dît Petrûs xwe li ber
êgir germ dike, li wî nihêr'î û got:
«Tu jî t'evî ewî nisretî[f] bûyî, t'evî
Îsa». **68** Lê ewî înk'ar kir û got:
«Ez nizanim û fe'm nakim ku tu
çi dibêjî». Ew ji h'ewşê derk'et çû
sivdera li ber dergeh, dîk bang da.
**69** Gava ku carîyê ew li wê derê dît,
dîsa gote yêd dor-bera sekinî bûn:
«Eva jî yekî ji wan e». **70** Lê ewî dî-
sa înk'ar kir. Û xêlekê şûnda, yêd
ku wir sekinî bûn, dîsa Petrûsr'a
gotin: «Hebe-t'unebe tu jî ji wan
î, çimkî tu ji Celîlê yî û xeberdana
te jî te difiroşe*». **71** Lê Petrûs dest
bi nifir'a kir, sond xwar û got: «Ez
Wî merivî nas nakim, bona k'îjanî
hûn dibêjin». **72** Pêr'a-pêr'a dîk cara
duda bang da. Û Petrûs ew gotina

---

* 14:62 Zebûr 110:1; Danîyêl 7:13.
* 14:70 Nav destnivîsarêd here qencda ev yek t'une: «Û xeberdana te jî te difiroşe».

Îsa ku wîr’a gotibû anî bîra xwe:
«Berî ku dîk du cara bang de, tê
sê cara Min înk’ar kî». Li ser vê
yekê destpêkir girîya.

### Îsa li ber Pîlato[f]

*(Metta 27:1-2, 11-14; Lûqa 23:1-5; Yûh’enna 18:28-38)*

**15** 1 Serê sibehê zû serekêd
k’ahîna t’evî r’ûspîya, qa-
nûnzana û t’emamîya civîna gire-
girar’a şêwirîn. Îsa girêdan û birin
dane destê Pîlato[f]. 2 Pîlato ji Wî
pirsî û got: «Tu yî P’adşê cihûya?»
Ewî cab da û got: «Te bi devê xwe
got». 3 Hingê serekêd k’ahîna gelek
tiştada avîtine Wî. 4 Pîlato dîsa ji
Wî pirsî û got: «Tu qet cabekê nadî?
Dîna Xwe bidê, ku çiqasî davêjine
Te!» 5 Lê Îsa îdî t’u cab neda wî,
h’eta ku Pîlato şaş ma.

### Dîwanêda h’ukumê kuştinê li ser Îsa derdixin

*(Metta 27:15-26; Lûqa 23:13-25; Yûh’enna 18:39–19:16)*

6 Awa her Cejina Derbazbûnêda
e’detê welî bû, ku girtîkî cime’tê-
r’a ber’de, k’îjan ku wan bixwesta.
7 Girtîk kelêda hebû navê wî Bara-
bas, ku t’evî r’aberîk’arêd hevalêd
xwe serhildanêda mêr kuştibûn.
8 E’lalet civîya û ji welî xwest ku
ew li anegorî wî e’detê xwe xwes-
tina wan bike. 9 Pîlato jî wanr’a
got: «Hûn dixwazin wekî ez bona
we P’adşê cihûya ber’dim?» 10 Ewî
zanibû ku serekêd k’ahîna ji dest
h’evsûdîyê Îsa dabûne destê wî.
11 Lê serekêd k’ahîna hê nav e’laletê
dan, ku bixwazin wekî Barabas
bona wan bê ber’danê. 12 Pîlato
dîsa ji wan pirsî û got: «Lê ez îdî
Ewî çawa bikim, yê ku hûn jêr’a
P’adşê cihûya dibêjin?» 13 Wana
kire qîr’în û gotin: «Wî xaç[f] ke!»
14 Pîlato wanr’a got: «Çima? Evî çi
xirabî kirîye?» Lê wana hê dikire
qîr’în: «Wî xaç ke!» 15 Pîlato xwest
ku e’lalet r’azî kira, Barabas bona
wan ber’da. Û Îsa da ber qamçîya
û da destê wan, wekî bê xaçkirinê.

### Esker qerfê xwe li Îsa dikin

*(Metta 27:27-30; Yûh’enna 19:2-3)*

16 Hingê eskera Ew bire hindur’ê
serayê, awa gotî h’ewşa qesira welî
û h’emû r’efa eskera li ser civandin.
17 Çuxekî şîrk[f] lê kirin û t’acek ji
stirîya vegirtî dane sêrî. 18 Destpê-
kirin silav danê û gotin: «Xweş be
P’adşê cihûya!» 19 Pê qamîş[f] li serê
Wî dixistin, t’ûyî Wî dikirin û li
ser çoka li ber Wî ta dibûn. 20 Lê
pey qerfkirinêr’a, ew çuxê şîrk jê
êxistin, k’incêd Wî lê kirin û birine
derva ku Wî xaç kin.

### Xaçkirina Îsa

*(Metta 27:32-44; Lûqa 23:26-43;*
*Yûh’enna 19:17-27)*

**21** Şimh’ûnê ji Kûrênê, bavê
Skender û R’ûfo wirr’a derbaz
dibû, ku ji k’ewşên dihat. Eskera
p’êyî ser wî kirin ku xaçê Îsa hilde.
**22** Îsa birine wî cîyê ku jêr’a Golgota
digotin, ku tê fe’mkirinê: «Cîyê
Qafa». **23** Şerava zimir[f]* t’evkirî
danê ku vexwe, lê Wî venexwar.
**24** Ew xaç kirin, ser k’incêd Wî
p’eşk avîtin, k’a k’êr’a wê çi bi-
k’eve, nava xweda bela kirin*. **25** Û
sibehê sih’et nehe bû, gava Ew xaç
kirin. **26** Nivîsara neheqîya Wî aha
nivîsar bû: «P’ADŞÊ CIHÛYA».
**27** T’evî Wî du qaçax jî xaç kirin,
yek li milê Wîyî r’astê, yê din li
milê Wîyî ç’epê. **28** Bi vî awayî ew
nivîsar hate sêrî, ya ku dibêje: «Ew
t’evî zulmk’ara hate h’esabê»*. **29** Û
ewêd ku wirr’a diçûn-dihatin, ew
bêhurmet dikirin, serê xwe dih’e-
jandin û digotinê: «Hêyî! Ne Teyê
p’aristgeh hilşanda û sê r’ojada
çêkira, **30** de Xwe xilaz ke, ji xaç
were xwarê!» **31** Usa jî serekêd k’a-
hîna t’evî qanûnzana nav xweda
qerfê xwe lê dikirin û digotin:
«Xelq xilaz kir, lê Xwe nikare xilaz
ke! **32** De bira niha Mesîh, P’adşê
Îsraêlê ji xaçê bê xwarê, wekî em
bibînin û bawer bikin». Yêd t’evî
Wî hatibûne xaçkirinê jî te’n li
Wî dixistin.

### Mirina Îsa

*(Metta 27:45-56; Lûqa 23:44-49;*
*Yûh’enna 19:28-30)*

**33** Nîvro ji sih’eta donzdeha h’e-
ta sih’eta sisîya, t’emamîya e’rdê
bû te’rî. **34** Û sih’eta sisîya Îsa bi
dengekî bilind kire qîr’în û got:
«Êloyî, Êloyî, lama sabaxtanî?»
ku tê fe’mkirinê: «Xwedêyê Min,
Xwedêyê Min, Te çima Ez hiştim?»*
**35** Ewê ku nêzîk sekinîbûn, gava
ev xeber bihîstin, gotin: «Bini-
hêr’in, Ew gazî Êlyas dike». **36** Ji
wan yek bezî, lûfika[f] be’rê hilda
sirkêda kir, qamîşekîva danî û
dirêjî Wî kir, ku vexwe û got:
«Bisekinin. Em bibînin k’a Êlyasê
bê Wî bîne xwarê».
**37** Îsa bi dengekî bilind kire
qîr’în û r’uh’ê Xwe da. **38** Wî çaxî

---

* 15:23 Hingê «zimir» ber êşêva didane nexweş.
* 15:24 Zebûr 22:18.
* 15:28 Nav destnivîsarêd here qencda r’êza 28-a t’une.
* 15:34 Zebûr 22:1.

p’er’da p’aristgehê ji sêrî h’eta binî
qelişî, bû du tîşa[f]. 39 Sersedê ku
li pêşberî Îsa sekinî bû, gava dît
ku Îsa çawa r’uh’ê Xwe da*, got:
«R’astî jî eva Meriva Kur’ê Xwedê
bû!» 40 Li wê derê k’ulfet jî hebûn,
ku dûrva li vê yekê dinihêr’în.
Meryema Mejdelanî, Meryema
dîya her du bira, Aqûbê biç’ûk û
Yûsês û usa jî Seloma nav wanda
bûn. 41 Evana hingê, gava Îsa li
Celîlê bû, pey Wî diçûn û jêr’a
xizmetk’arî dikirin. Pêştirî van,
gelek k’ulfetêd din jî wir hebûn,
ku t’evî Îsa hatibûne Orşelîmê.

## Definkirina Îsa

*(Metta 27:57-61; Lûqa 23:50-56; Yûh’enna 19:38-42)*

42 Ev yek r’oja[f] t’ivdarekkirinê
bû, awa gotî r’oja berî şemîyê.
Berê êvarê 43 Ûsivê[f] Arîmetyayî
hat, ew yekî xweyîqedir û endemê
civîna giregira bû. Ew xwexa jî li
hîvîya P’adşatîya Xwedê bû. Wî
turuş kir, çû cem Pîlato, cinya-
zê Îsa jê xwest. 44 Pîlato bihîst
ku Îsa îdî mirîye, e’cêbmayî
ma. Gazî sersed[f] kir û jê pirsî:
«R’ast e ku Ew usa zû mirîye?»
45 Gava ew ji sersed e’seyî pê
h’esîya, cinyaz da Ûsiv. 46 Wî
qedekê k’itanî k’ir’î, cinyaz anî
xwarê, pê k’efen[f] kir, t’irbekêda
danî, ya ku qeyêda k’olayî bû.
Kevirek hol kire ber derê t’irbê.
47 Meryema Mejdelanî û Mer-
yema dîya Yûsês dîtin ku ew li
k’u derê hate definkirinê.

## Îsa ji mirinê r’adibe

*(Metta 28:1-8; Lûqa 24:1-12; Yûh’enna 20:1-10)*

**16** 1 Pey r’oja şemîyêr’a Mer-
yema Mejdelanî, Mer-
yema dîya Aqûb û Seloma çûn
biharet[f] k’ir’în, wekî her’in li
cinyazê Îsa din. 2 R’oja h’eftîyêye
pêşin serê sibehê zû, wextê r’o
derk’et, ew çûne ser t’irbê. 3 Wana
r’êva hevr’a digot: «K’î wê bona
me kevir ji ber derê t’irbê hol
ke?» 4 Çimkî kevir gelekî mezin
bû. Û gava ku li jorê nihêr’în,
dîna xwe danê, ku kevir ji ber hol
kirî ye. 5 Û çaxê çûne hindur’ê
t’irbê, dîna xwe danê, xortekî
çuxê sipî wergirtî wê li alîyê
r’astê r’ûniştî ye. K’ulfet gelek
zendegirtî man. 6 Lê ewî wanr’a
got: «Zendegirtî nemînin! Hûn
li wî Îsayê Nisretê diger’in, Yê
ku hate xaçkirinê. Ew ji mirinê
r’abûye! Ew ne li vir e. Va ye ew

* 15:39 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «kire qar’în û r’uh’ê Xwe da».

cîyê ku Ew lê danîbû. 7 De niha
her'in bêjine şagirtêd Wî û Pet-
rûs, ku Ewê berî we her'e Celîlê.
Li wir hûnê Wî bibînin, çawa ku
Ewî wer'a gotîye». 8 Ew k'ulfet
ji t'irbê derk'etin r'evîn, çimkî
r'isasê ew girtibûn û dilerizîn.
Kesîr'a jî tiştek negotin, çimkî
sawê li wan girtibû.

### Îsa Xwe nîşanî Meryema Mejdelanî dike

*(Metta 28:9-10; Yûh'enna 20:11-18)*

9 Gava Îsa r'oja h'eftîyêye pêşin
sibehê zû ji mirinê r'abû, Wî pêşîyê
Xwe nîşanî Meryema Mejdelanî
kir, ya ku h'eft cin jê derxistibû*.
10 Ewê jî çû ew yek gîhande ewêd
ku t'evî Îsa ger'îyabûn, ku şîn di-
kirin û digirîyan. 11 Lê gava wana
bihîst ku Îsa sax e û Xwe nîşanî
Meryemê kirîye, bawer nekirin.

### Îsa Xwe nîşanî du şagirtêd Xwe dike

*(Lûqa 24:13-35)*

12 Pey van yekar'a Ewî Xwe dil-
qekî dinda nîşanî ji wan duda kir,
yêd ku diçûne k'ewşên. 13 Ewana jî
çûn ew xeber gîhandine yêd mayîn.
Lê gotina wan jî bawer nekirin.

### Îsa Xwe nîşanî yanzdeh şagirta dike

*(Metta 28:16-20; Lûqa 24:36-49; Yûh'enna 20:19-23; K'arêd Şandîya 1:6-8)*

14 Pey vê yekêr'a Îsa Xwe nîşanî
yanzdeha kir, gava ew li ser sifrê
r'ûniştibûn. Ewî li wan hilat bona
nebawerî û serh'işkîya wan, çimkî
wana yêd ku Ew ji mirinê r'abûyî
dîtibûn bawer nekirin. 15 Û wan-
r'a got: «Her'ine her çar alîyêd
dinyayê û Mizgînîyê bidine her
merivî. 16 Ewê ku bawer bike û bê
nixumandinê wê xilaz be, lê ewê
ku bawer neke dîwana wî wê bibe.
17 Ewê ku bawer dikin, ev nîşanê
wanr'a dîyar bin: Bi navê Min
wê cina derxin, bi zimanêd nû
wê xeber din, 18 wê me'ra bi destê
xwe bigirin û heger ew tiştekî je'r
jî vexwin, t'u zirarê li wan nebe.
Ewê destêd xwe daynine ser ne-
xweşa û nexweşê qenc bin».

### Jorhilatina Îsa

*(Lûqa 24:50-53; K'arêd Şandîya 1:9-11)*

19 Awa Xudan Îsa pey wê xe-
berdana t'evî wanr'a hilk'işîya

* 16:9 Nav hinek destnivîsar û welger'andinêd kevinda ji r'êza 9-a h'eta ya 20-î t'uneye.

e’zmên û li milê Xwedêyî r’astê
r’ûnişt. [20] Şagirt jî çûn, li her cîyî
dannasîn kirin. Xudan piştovanê
wan bû û bi van nîşana xebera
Xwe dida îzbatkirinê, k’îjanêd
ku bi destê wan dibûn.

# MIZGÎNÎYA LI GORA LÛQA

## Pêşgotin

Lûqa yekî yûnanî doxtor (h’ekîm) û dîrokzan (t’arîxzan) bû. Evî t’evî Pawlos gelekî r’êwîtî kirîye (Filîmon 24; Kolosî 4:14; Tîmot’êyo II, 4:11) û nava şixulê şandîtîya[f] Pawlosda jî gelekî alîk’arîya wî kirîye.

Bi fikira gelek zana eva Mizgînîya[f] nêzîkî sala 80-î hatîye nivîsarê, cîkî nee’yan ji Filistînê der.

Destpêbûna k’itêbêda derheqa bûyîna Yûh’ennayê[f] nixumdar[f], mizgînîya bûyîna Îsa[f] û şikirdayîna çend merivada[f] nivîsar e, k’îjana hatina Îsaye ji Xwedêda didane k’ifşê. Vê Mizgînîyêda bona e’mirê Îsa hê gelekî dibêje, ji bûyîna Yûh’ennayê nixumdar girtî h’eta ji nav mirîya r’abûna Îsa. Lûqa xwestîye derheqa e’mirê Îsada bi hûr-gilî binivîse. Pey mirin-r’abûna wîr’a Lûqa derheqa belabûna Mizgînîyêda k’itêba «K’arêd Şandîya» nivîsîye.

«Mizgînîya li gora Lûqa» e’yan dike ku Îsa çawa Xilazkirê[f] sozdayî bona Îsraêlê[f] ji Xwedêda şandî ye û usa jî Xilazkirê h’emû meriva ye. Eva Mizgînîya bi tiherekî başqe h’izkirina Xwedê dide k’ifşê, îlahî[f] hindava merivêd şkestîda. Geleka navê vê mizgînîyê danîye: «Mizgînîya bona gunek’ara[f], şkestîya, belengaza, bêxweya, jinebîya û xerîba».

Vê Mizgînîyêda fikira «şabûn û şikirdayînê» jî heye, îlahî serîyêd pêşinda, ku li ser e’lamkirina hatina Îsa dinivîse. Çend k’ulamêd şikirdayînê jî vira hene û xwedênasa gelek qur’nada bi van k’ulama h’ebandina xwe derbaz kirine. Mesele, k’ulama milyak’eta[f] (2:14), ya Meryemê[f] (1:46-55), ya Zekerîya (1:68-79) û ya Şimh’ûn (2:29-32). Xilazîya k’itêbêda jî nêta şabûnê k’ifş dibe, li k’u Îsa diçe e’zmên û yêd li pey Îsa p’aristgehêda[f] dicivin, şikirîya xwe didine Xwedê (24:52-53).

Hinek p’arêd berbiç’e’v jî ew in, ku çend serhatî û mesele t’enê vê mizgînîyêda hene. Awa mesele: K’ulama milyak’eta, dema bûyîna Îsa, hazirîya şivana, Îsayê donzdeh salî p’aristgehêda, mesela «kur’ê undabûyî û birê wî», t’obekirina[f] qaçaxekî ser xaçê[f] û tiştêd mayîn.

## Serecema fikira k'itêbê

Pêşgotina Lûqa (1:1-4)
Bûyîna Yûh'ennayê nixumdar, bûyîna Îsa û zar'otîya wan (1:5–2:52)
Qulixê Yûh'ennayê nixumdar (3:1-20)
Nixumandin[f] û cêr'ibandina[f] Îsa (3:21–4:13)
Dannasînî û şixulêd Îsaye li Celîlêda[f] (4:14–9:50)
R'îya Îsaye ji Celîlê h'eta Orşelîmê[f] (9:51–19:27)
H'eftîya Îsaye xilazîyê li Orşelîmê û dor-berêd wêda (19:28–23:56)
R'abûna Îsaye ji mirinê, xuyabûna Wî şagirtava[f] û jorhilatina Wî (24:1-53)

### Pêşgotina Lûqa T'êyofîlor'a

1 [1]T'êyofîloyê xweyîqedir, niha
geleka destpêkirîye serhatîya
wan tiştêd nava meda bûyî usa
r'êz kin, [2]çawa ewêd ku pêşîyê bi
ç'e'vê xwe dîtibûn û ev Mizgînî[f]
bela dikirin, mer'a gotin. [3]Ez jî
çawa yekî hê zûva r'ast pey wan
h'emû tişta diçûm, min r'ê têr'a
dît ku bi hûr-gilî ter'a binivîsim,
[4]wekî tu r'astîya wan tiştêd ku hîn
bûyî, bizanibî.

### Mizgînîya milyak'et[f] bona bûyîna Yûh'ennayê[f] nixumdar[f]

[5]Çaxê Hêrodes p'adşayê Ci-
hûstanê[f] bû, k'ahînek[f] ji bereka
Ebîya hebû, navê wî Zekerîya
bû. Jina wî jî ji e'silê Harûn[f] bû,
navê wê Êlîzabêt. [6]Evana her du
jî li ber Xwedê r'ast bûn û nav
h'emû t'emî û qanûnêd Xudanda[f]
bêqusûr diçûn. [7]Lê zar'êd wan
t'unebûn, çimkî Êlîzabêtê zar'
nedanîn û her duya jî e'mirê xwe
derbaz kiribûn.

[8]Awa çaxê Zekerîya dora bereka
xweda xizmetk'arîya k'ahîntîyê
li ber Xwedê dikir, [9]bi e'detê
k'ahîntîyêda p'eşk wîr'a k'et, ku
her'e p'aristgeha[f] Xudan, bixûrê[f]
bişewitîne. [10]Û dema şewitandina
bixûrê, t'emamîya cime'tê derva
dua dikir. [11]Hingê milyak'etê[f] Xu-
dan wîva xuya bû û alîyê r'astêva
k'êleka[f] gorîgeha[f] bixûrê sekinî.
[12]Çaxê Zekerîya dît, t'evîhev bû

û saw k'ete ser wî. 13 Lê milya-
k'et wîr'a got: «Zekerîya, netirse!
Dua te hate bihîstinê, k'ulfeta[f] te
Êlîzabêtê ter'a kur'ekî bîne û tê
navê wî Yûh'enna[f] daynî.

14 Ewê ter'a bibe eşq û şayî
û gelekê bi bûyîna wî şa bin.
15 Çimkî ewê li ber Xudan mezin be.
T'u car gerekê şerav-araqê venexwe*.
Û hê zikê dîya xweda, wê bi R'uh'ê[f] Pîroz t'ijî be.
16 Wê ji zar'êd Îsraêlê[f] geleka berbi Xudan Xwedêyê wan veger'îne.
17 Ewê bi r'uh' û qewata Êlyas[f] p'êxember[f] pêşîya Xudanva her'e*,
wê dilê bava ser zar'ada û neêlima berbi fe'mdarîya r'asta veger'îne,
wekî cime'tekê bona Xudan hazir ke».

18 Zekerîya milyak'etr'a got: «Ezê
vê yekê çawa bizanibim? Ez kal
im û k'ulfeta min jî e'mirê xwe
îdî derbaz kirîye»*.

19 Milyak'et[f] lê veger'and û gotê:
«Ez Cibrayîl im, ku li ber Xwedê disekinim.
Û ez hatime şandinê,
ku ter'a bêjim û vê mizgînîyê bidime te*.
20 Va tê lal bî û nikaribî xeber dî,
h'eta wê r'oja ku ev tişt bêne sêrî,
çimkî te ew gotinêd min bawer nekirin,
ku wê wextê xweda bêne sêrî».

21 H'eta hingê cime't hîvîya
Zekerîya bû û e'cêbmayî diman,
ku ew p'aristgehêda derengî di-
k'et. 22 Û çaxê ew derk'ete derva,
îdî nikaribû wanar'a xeber da.
Wana şik bir, ku p'aristgehêda
tişt hatîye li ber ç'e'va. Û ewî bi
nîşana wanar'a xeber dida û lal
ma. 23 Gava r'ojêd xizmetkirina
wî xilaz bûn, çû mala xwe. 24 Pey
wan r'ojar'a, k'ulfeta wî, Êlîzabêt
h'emle derk'et, pênc meha ewê xwe
vedişart û digot: 25 «Ev çi yek bû
van r'ojada Xudan bona min kir,
h'alê minda nihêr'î û qara min ji
nav meriva[f] da hildanê».

* 1:15 Eva zar'a, awa gotî Yûh'ennayê[f] nixumdar[f] yekî «nezîr[f]» dihate h'esabê. Bona cûr'e-cûr'e qeyde-qanûnêd nezîr Jimar 6:1-21-da bixûnin.
* 1:17 Malaxî 4:5-6.
* 1:18 Destpêbûn 18:11.
* 1:19 Danîyêl 8:16; 9:21.

## Mizgînîya milyak’et bona bûyîna Îsa[f]

26 Meha şeşada Xwedê milyak’et[f]
Cibrayîl şande bajarekî Celîlê[f] ku
navê wî Nisret bû, 27 cem qîzeke
bik’ir[f], ya ku merivekî bi navê
Ûsivê[f] mala[f] Dawidr’a[f] nîşanki-
rî bû. Navê qîzikê Meryem[f] bû.
28 Milyak’et wêva xuya bû û gotê:
«Silav li te qîzika k’erem[f] lê bû-
yîyê, Xudan t’evî te ye*». 29 Ewa
ser gotina wî t’evîhev bû û fikirî:
«Gelo ev çi silav e?» 30 Û milya-
k’et jêr’a got: «Meryem, netirse!
Çimkî te k’erem ji Xwedê stand.
31 Va tê h’emle derêyî Kur’ekî bînî
û navê Wî Îsa[f] daynî.

32 Ewê mezin be û Kur’ê Yê Herî
Jorin wê bê gotinê.
Û Xudan Xwedê wê t’extê bavê
Wî Dawid bide Wî.
33 Ewê h’eta-h’etayê p’adşatîyê
ser mala[f] Aqûb[f] bike
û xilazîya P’adşatîya Wî wê
t’unebe».

34 Meryemê milyak’etr’a got: «Ev
yekê çawa bibe, çimkî ez hela hê
qîz im?» 35 Milyak’et lê veger’and
û got: «R’uh’ê Pîroz wê bê ser te
û qewata Yê Herî Jorin wê ser te
bike sî. Bona vê yekê ew Pîrozê
ku wê ji te bibe, ew Kur’ê[f] Xwedê
wê bê gotinê. 36 Va ye omida te
Êlîzabêt jî, ya ku bêzur’et dihate
gotinê, wê mezinayîya xweda eva
meha şeşa ye kur’ekîda h’emle ye.
37 Çimkî cem Xwedê tiştekî nebû-
yînê t’une». 38 Wî çaxî Meryemê
got: «Ez carîya Xudan im. Bira
anegorî gotina te bona min bibe».
Û milyak’et ji cem wê çû.

## Meryem serîkî Êlîzabêtê dixe

39 Wan r’ojada Meryem r’abû lez
çû alîyê ç’îya, bajarekî Cihûda[f].
40 Ew k’ete mala Zekerîya û silav
da Êlîzabêtê. 41 Gava Êlîzabêtê
silava Meryemê bihîst, zar’ok zikê
wêda livîya. Êlîzabêt R’uh’ê Pî-
rozva t’ijî bû 42 û bi dengekî bilind
kire gazî got: «Tu nav k’ulfetada
bimbarek î û berê zikê teda jî
bimbarek e. 43 Ev çi bextewarîk
e ku dîya Xudanê min ser minda
hat? 44 Gava dengê silava te k’e-
te guhê min, zar’ok zikê minda
ji şabûna lîst. 45 Xwezî li wê, ku
gotina Xudan bawer dike, ku çi
jêr’a hatîye gotinê, wê bê sêrî».
46 Meryemê got*:

* 1:28 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Tu nav k’ulfetada bimbarek î».
* 1:46-55 P’adşatî I, 2:1-10.

«Nefsa min pesinê Xudan dide
47 û r'uh'ê min bi Xwedê Xilaz-
kirê[f] min şa dibe,
48 çimkî Ewî berê Xwe milûktîya
carîya Xweda kir.
Va ji vir şûnda h'emû nisilê[f]
xwezîya xwe li min bînin,
49 çimkî Xwedêyê Zor bona min
tiştêd p'ir' mezin kirin.
Navê Wî pîroz e.
50 R'e'ma Wî qir'ne-qir'ne li ser
wan e,
yêd ku ji Wî ditirsin.
51 Qewata destê Xwe Ewî da k'ifşê
û yêd ku dilê[f] xweda k'ubar-ba-
bax in bela-belayî kirin.
52 Yêd qewat ji k'ursîya anîn
xwarê
û yêd milûk bilind kirin*.
53 Yêd bir'çî bi tiştêd qenc t'êr
kirin
û yêd dewletî destvala ver'ê-
kirin.
54 R'e'ma Xwe anî bîra Xwe,
alî xulamê Xwe, Îsraêl kir,
55 çawa kal-bavêd me, Birahîm[f] û
zur'eta wîr'a bona h'eta-h'e-
tayê sozê Xwe dabû»*.
56 Meryem weke sê meha cem
Êlîzabêtê ma, paşê veger'îya ma-
la xwe.

## Bûyîna Yûh'ennayê nixumdar

57 Awa dema welidandina Êlî-
zabêtê pêr'a gihîşt, kur'ek jêr'a
bû. 58 Heval-hogirêd wê bihîstin
ku Xudan r'e'ma xweye mezin
bona wê kirîye, t'evî wê şa dibûn.
59 R'oja h'eyştada hatin ku
kur'ik sinet[f] kin û navê bavê wî
Zekerîya lê kin. 60 Lê dîya wî got:
«Na, navê wî gerekê Yûh'enna be».
61 Wêr'a gotin: «Nava merivêd teda
bi wî navî kesek t'une». 62 Hingê
wana bi nîşana ji bavê wî pirsîn
ku çi navî dixwaze wî ke. 63 Ewî
jî t'extek xwest û li ser nivîsî:
«Navê wî Yûh'enna ye». H'emû
e'cêbmayî man. 64 Destxweda
zar-zimanê[f] wî vebû, xeber da,
şikirî da Xwedê. 65 Tirsê h'emû
cînarêd wan girt û t'emamîya
ç'îyayêd Cihûstanêda bona vê
yekê dihate gotinê. 66 H'emûyêd
ku dibihîstin, bîra xweda xwey
dikirin, digotin: «Gelo ev kur'i-
kê bibe çi?» Çimkî destê Xudan
pêr'a bû.

## P'êxembertîya[f] Zekerîya

67 Bavê wî Zekerîya bi R'uh'ê
Pîroz t'ijî bû, p'êxembertî kir û got:

* 1:52 Îbo 12:19; 5:11.
* 1:55 Mîxa 7:20; Destpêbûn 17:7.

68 «Şikir ji Xudan Xwedêyê Îsraêlêr'a
ku serîk da cime'ta Xwe û azayî jêr'a anî*.
69 Ji mala xulamê Xwe Dawid
bona me Xilazkirekî[f] zor* r'akir,
70 çawa Ewî hê berêda bi devê p'êxemberêd Xweye pîroz[f] gotîye,
71 ku em ji dijminêd xwe
û destê h'emû xêrnexwaza[f] xilaz bin*,
72 r'e'mê kal-bavêd me bike,
peymana[f] Xweye pîroz
73 û wê sonda ku bavê me Birahîmr'a xwar bîr bîne*,
74 wekî ji destê dijmina azabûyî,
em bikaribin bê tirs û xof,
75 h'emû r'ojêd e'mirê xweda,
r'ast û h'elal Wî bih'ebînin.

76 Tu, lo kur'iko, tê p'êxemberê Yê Herî Jorin bêyî gotinê,
tê pêşîya Xudanva her'î, wekî r'îya Wî hazir kî*
77 û zanebûna azayîyê bidî cime'ta Wî
bi baxşandina gunêd wan.
78 Ji r'e'm û h'uba Xwedêyê me
çawa jorda r'o ku dertê, usa wê serîkî bide me,
79 wekî yêd ku te'rîstanîyê û bin sîya mirinêda dimînin r'onayî ke
û nigêd me dayne ser r'îya e'dilayîyê»*.

80 Kur'ik mezin dibû û bi r'uh' qewat digirt û h'eta r'oja Îsraêlêva xuya bû jî li ber'îyê[f] dima.

## Bûyîna Îsa

*(Metta 1:18-25)*

**2** 1 Wan r'ojada ji Awgûstoyê Qeyser[f] e'mir derk'et, ku h'emû merivêd Împêratorîya R'omayê bêne navnivîsarê. 2 Ev navnivîsara pêşin hêna Kûrênyoyê welîyê[f] Sûryayêda hate kirinê.
3 H'emû diçûne bajarê xwe, ku her kes navê xwe bide nivîsarê.
4 Ûsiv jî ji bajarê Nisreta Celîlê

---

* 1:68 Zebûr 41:13; 111:9.
* 1:69 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Stirûkî xilazkirinê». Stirû gelek cara çawa nîşana qewatê ye.
* 1:71 Zebûr 106:10.
* 1:73 Zebûr 106:45-46; Zebûr 105:8-9; Destpêbûn 17:7.
* 1:76 Îşaya 40:3; Malaxî 3:1.
* 1:79 Malaxî 4:2; Îşaya 9:2; 58:8; 60:1-2.

r'abû hevraz çû Cihûstanê, bajarê[f]
bûyîna Dawid, ku jêr'a Beytle-
h'm[f] digotin, çimkî ew ji mal û
qebîla Dawid bû. 5 Ew çû ku t'evî
Meryema dergîstîya xwe bik'eve
navnivîsarê. Meryem jî h'emle bû.
6 Çaxê ewana li Beytleh'mê bûn,
r'oja welidandina wê pêr'a gihîşt
7 û kur'ê xweyî Nixurî anî, Ew
p'êç'ekêda p'êç'a û afir'da danî,
çimkî mêvanxanêda bona wan
cî t'unebû.

### Milyak'et û şivan

8 Li wir çolê şivan hebûn, ku
wê şevê xweyîtîya kerîyê pezêd
xwe dikirin. 9 Milyak'etê Xu-
dan wanva xuya bû û r'ûmeta
Xudan dora wan şewq da, ew
gelekî tirsîyan. 10 Lê milyak'et
wanar'a got: «Netirsin! Va ye ez
Mizgînîya şabûneke mezin didime
we, ku wê bona t'emamîya milet
be. 11 Îro wer'a bajarê[f] Dawidda
Xilazkirek[f] bû, ew Mesîh[f] Xudan
e. 12 Eva wer'a bibe nîşan: Hûnê
zar'okekê p'êç'ekêda p'êç'ayî
afir'da bibînin». 13 Nişkêva t'evî
wî ordîke milyak'etêd e'zmana-
ye mezin k'ifş bû, pesinê Xwedê
didan û digotin:

14 «Şikir Xwedêyê Herî Jorinr'a,
e'dilayî ser dinê wan merivar'a,
ji k'îjana Xwedê r'azî ye*».

15 Gava milyak'et ji wan dûr
k'etin hilatine e'zmên, şivana
hevr'a got: «De werin em her'i-
ne Beytleh'mê, ev tiştê bûyî, ku
Xudan em pê h'esandin, bibînin».
16 Û bi lez hatin, Meryem,
Ûsiv û Zar'a afir'da r'azayî dî-
tin. 17 Gava Ew dîtin, çi ku bona
Kur'ik wanr'a hatibû e'lamkirinê,
gotin. 18 Her kesê ku ji şivana ev
tişt dibihîstin, zendegirtî[f] diman.
19 Lê Meryemê ev h'emû tişt dilê
xweda xwey dikirin û li ser wan
difikirî. 20 Şivan veger'îyan, bona
tiştêd bihîstî û dîtî pesin û şikirî
didane Xwedê. Ev h'emû usa bûn
çawa wanar'a hatibû gotinê.

### Navdanîna Îsa

21 R'oja h'eyşta gava kur'ik sinet
kirin, navê Wî Îsa[f] danîn, çawa ku
hê berî h'emlebûna dê, milyak'et
bona vê yekê gotibû.

### Îsa dibine p'aristgehê, ku p'êşk'êşî[f] Xwedê kin

22 Çaxê anegorî Qanûna[f] Mû-
sa[f] r'ojêd paqijbûna wan t'emam

* 2:14 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Li ser dinê e'dilayî, nav merivada xweşîtî».

bûn, kur’ik birine Orşelîmê[f], ku
Wî p’êşk’êşî Xudan kin*, 23 çawa
ku Qanûna Xudanda nivîsar e:
«Her nixurîkî nêrîn ku bet’inê
vedike, nedirê[f] Xudan be»* 24 û
li gora gotina Qanûna Xudan:
«Cotek fatimok[f] yan jî du cûcû-
kêd kevotka»* h’edî[f] bê dayînê.

25 Hingê merivek Orşelîmêda
hebû, navê wî Şimh’ûn bû. Ew
merivekî r’ast, xwedêxof û li hî-
vîya berdilîya[f]* Îsraêlê bû. R’uh’ê
Pîroz jî li ser wî bû 26 û wîr’a go-
tibû: «H’eta ku tu Mesîhê Xudan
nebînî, namirî». 27 Hingê ew bi
r’êberîya R’uh’ hate p’aristgehê.
Çaxê dê û bavêva Îsayê biç’ûk
anîn ku li gora e’detê Qanûnê
bona Wî bikin, 28 Şimh’ûn Kur’ik
hilda da h’emêza xwe, şikirî da
Xwedê û got:

29 «Ya Xweyî, niha li gora sozê Xwe
bi xêr û silamet berdestîyê Xwe ber’de.
30 Çimkî ç’e’vê min azakirina Te dît,
31 ya ku Te ber ç’e’vê h’emû mileta hazir kirîye*,
32 ku bibe r’onayîya ber ç’e’vê necihûya[f]
û qedir-hurmet[f] cime’ta Te Îsraêlr’a»*.

33 Dê û bavê Wî ser tiştêd ku
Şimh’ûn bona Wî digotin, zen-
degirtî mabûn. 34 Şimh’ûn dua
wan kir û dîya Wî Meryemêr’a
got: «Bibihên, Eva ewî k’ifşkirî
ye, Yê ku wê Îsraêlêda bibe se-
bebê k’etin-r’abûna geleka, usa jî
bibe nîşanek, ku gelekê miqabilî
Wî r’abin 35 û bi vî awayî fikirêd
gelek dila wê e’yan bin. Û dilê
ter’a jî mîna tîrekê wê derbaz be».

36 Li wir ji r’ik’inyata Aşêr, qîzeke
Fanowêle p’êxember hebû, navê
wê Hana. Ewê gelek e’mir derbaz
kiribû, pey qîztîya xwer’a h’eft sala
cem mêrê xwe mabû. 37 Ew jinebîke
h’eyştê çar salî bû* û ji p’aristgehê

* 2:22 Qanûna K’ahîntîyê 12:3, 6.
* 2:23 Derk’etin 13:2, 12, 15.
* 2:24 Qanûna K’ahîntîyê 12:8.
* 2:25 Bi gotineke din: «Baristanîya Îsraêlê, bona xilazkirin[f] yan azabûna Îsraêlê».
* 2:31 Îşaya 40:5; 52:10.
* 2:32 Îşaya 42:6; 49:6; 52:10.
* 2:37 Aha tê fe’mkirinê, yan: «E’mirê wê h’eyştê çar salî bû» yan jî: «H’eyş-têçar sala jinebî mabû».

dûr nedik'et, şev û r'oj bi dua û
r'ojîya[f] Xwedê dih'eband. **38** Eva
jî wê demê hat, şikirî da Xwedê û
t'evî h'emûyêd ku ç'e'vnihêr'îya
azabûna Orşelîmê bûn, derheqa
kur'ikda xeber da.

### Meryem, Ûsiv û Îsayê biç'ûk vediger'ine Nisretê

**39** Gava Ûsiv û Meryemê her
tişt li gora Qanûna Xudan kirin,
veger'îyane Celîlê, bajarê xwe
Nisretê **40** Kur'ik mezin û qewat
dibû, bi serwaxtîyê[f] t'ijî dibû, k'e-
rema Xwedê jî bi Wîr'a bû.

### Îsayê donzdeh salî p'aristgehêda

**41** Dê û bavê Wî her sal Cejina[f]
Derbazbûnêda diçûne Orşelîmê.
**42** Çaxê Ew bû donzdeh salî, li
gora e'det ewana hevraz çûne
cejinê. **43** Gava r'ojêd cejinê xi-
laz bûn û paşda vediger'îyane
mala xwe, Îsayê xişîm li Orşe-
lîmê ma. Lê dê û bavê Wî haş ji
Wî t'unebûn, **44** wana t'irê[f] t'evî
r'êwîya ye. R'îya r'ojekê hatin,
nav heval-hogirêd xweda li Wî
ger'îyan. **45** Gava Ew nedîtin,
paşda veger'îyane Orşelîmê, li
Wî ger'îyan. **46** R'oja sisîya wana
Ew p'aristgehêda dît. Ew t'evî
dersdara r'ûniştibû, guhdarîya
wan dikir û pirs didane wan.
**47** H'emûyêd ku xeberdana Wî
dibihîstin, ser zanebûn û cabêd
Wî zendegirtî diman. **48** Gava dê
û bavê Wî ew dîtin, h'eyîrîn û
dîya Wî jêr'a got: «Lawo! Te çi-
ma usa serê me kir? Ez û bavê te
k'el-bîn li Te diger'îyan». **49** Ewî
wanr'a got: «Hûn çima li Min
diger'îyan? We nizanibû gerekê
Ez mala Bavê[f] Xweda bim?» **50** Lê
wana fe'm nekir Ewî çi got. **51** Ew
t'evî wan veger'îya hate Nisretê
û gur'a[f] wanda bû. Lê dîya Wî
ev h'emû tişt dilê xweda xwey
dikirin. **52** Û Îsa bi serwaxtîyê û
bejinêda pêşda diçû û li Xwedê
û meriva xweş dihat.

### Dannasînîya Yûh'ennayê nixumdar

*(Metta 3:1-12; Marqos 1:1-8; Yûh'enna 1:19-28)*

**3** **1** Panzdeh salîya p'adşatîya
Tîberyoyê Qeyserda, Pîla-
toyê[f] Pontîyo welîyê Cihûstanê
bû, Hêrodes serwêrê Celîlê bû,
Fîlîpoyê birê wî serwêrê qeza
Îtûryayê û Traxonîdayê bû û
Lûsanyas serwêrê Avêlînyayê
bû, **2** Henan û Qeyafa jî serek-
k'ahîn bûn. Hingê xebera Xwedê
ber'îyêda Yûh'ennayê kur'ê Ze-
kerîyar'a hat **3** û Yûh'enna hate

h'emû dor-berêd ç'emê Ûrdunê
dannasîn dikir, ku cime't ji gu-
nekirinê veger'e[f] û bi avê bê
nixumandinê[f], wekî Xwedê wan
bibaxşîne. 4 Çawa k'itêba Îşaya[f]
p'êxemberda nivîsar e ku dibêje:

«Dengê ber'îyêda dike gazî:
‹R'îya Xudan hazir bikin
û şiver'îyêd[f] Wî r'ast bikin.
5 H'emû gelî bira t'ijî bin,
ç'îya-banî nimiz bin,
r'îyêd xaro-maro r'ast bin
û ç'e'l-ç'ûl dûz bin.
6 Û her kesê azayîya Xwedê
bibîne›»*.

7 Gelek dihatine cem Yûh'enna,
ku ji wî bêne nixumandinê. Ewî
wanr'a digot: «Ç'êjikêd[f] me'ra!
K'ê wer'a got, ku hûn ji xezeba
tê bir'evin? 8 De bi kirêd qenc
bidine k'ifşê, ku hûn ji gunekirinê
veger'îyane. Û r'anebin nebêjin:
‹Birahîm bavê me ye›. Ez wer'a
dibêjim, ku Xwedê ji van kevira
jî dikare zar'a Birahîmr'a derxe.
9 Va ye bivir[f] li ser r'awê[f] darê ye.
Her dara ku berê qenc neyne, wê
bê bir'înê û avîtinê nava êgir».
10 E'laletê ji wî pirsî û got: «Lê
em çi bikin?» 11 Ewî li wan vege-
r'and û got: «Du dest k'incê k'ê
hene, bira yekî bide wî, yê k'ê
ku t'une û xurekê k'ê heye, bira
dîsa usa bike». 12 Xercgir[f] jî hatin
ku bêne nixumandinê û wîr'a
gotin: «Dersdar[f], em çi bikin?»
13 Ewî wanr'a got: «Çiqas ji we tê
xwestinê ji wî zêdetir nestînin».
14 Eskera jî ji wî pirsî: «Lê em çi
bikin?» Ewî wanr'a got: «Kesekî
neşêlînin, bêbextîyê li xelqê nekin
û bi heqê xwe r'azî bin».

15 H'emû hîvîyê bûn û bona
Yûh'enna dilê xweda digotin:
«Gelo ev e Mesîh?» 16 Yûh'enna
li h'emûya veger'and û got: «Ez
we bi avê dinixumînim, lê Yekî
ji min qewattir wê bê. Ez ne hêja
me benê çarixêd Wî jî vekim.
Ewê we pê R'uh'ê Pîroz û êgir
binixumîne. 17 Melh'eba Wî destê
Wîda ye. Ewê bêdera Xwe paqij
ke, genim bike e'mbara Xwe, lê
kayê wê bi agirê ku natemire
bişewitîne».

18 Awa Yûh'enna bi gelek tiştêd
din jî xelq şîret dikir û Mizgînî
dida. 19 Lê gava Yûh'enna li Hêro-
desê serwêr jî hilat[f] bona Hêrodîya
jina birê wî û h'emû xirabîyêd ku
wî dikirin, 20 hingê Hêrodes ser
van kirinada ev neheqî jî kir, ku
Yûh'enna avîte kelê.

* 3:6 Îşaya 40:3-5.

### Îsa tê nixumandinê

*(Metta 3:13-17; Marqos 1:9-11)*

21 Gava h'emû cime't dihate
nixumandinê, Îsa jî hate nixu-
mandinê. Wê demê ku dua dikir,
e'zman vebû 22 û R'uh'ê Pîroz bi
bedenî mîna kevotkekê ser Wî
danî û dengek ji e'zmên hat û
got: «Tu kur'ê Minî delal î, ku Ez
ji Te r'azî me».

### R'ik'inyata Îsa

*(Metta 1:1-17)*

23 Îsa nêzîkî sî salî bû, gava
Ewî dest bi k'arê Xwe kir û wan
t'irê Ew kur'ê Ûsiv bû, Ûsivê Elî,
24 Elîyê Metat, Metatê Lêwî, Lê-
wîyê Melk'ê, Melk'êyê Yannay,
Yannayê Ûsiv, 25 Ûsivê Metîtîya,
Metîtîyayê Amos, Amosê Nehûm,
Nehûmê Heslî, Heslîyê Necay,
26 Necayê Mehat, Mehatê Metîtîya,
Metîtîyayê Şêmeyîn, Şêmeyînê
Yûsêx, Yûsêxê Yoda, 27 Yodayê
Yûhenan, Yûhenanê R'êşa, R'êşayê
Zerûbabel, Zerûbabelê Şaltîyêl,
Şaltîyêlê Nerî, 28 Nerîyê Melk'ê,
Melk'êyê Êdî, Êdîyê Qosam,
Qosamê Êlmedam, Êlmedamê
Er, 29 Erê Yêşû, Yêşûyê Êlîyazêr,
Êlîyazêrê Yorîm, Yorîmê Metat,
Metatê Lêwî, 30 Lêwîyê Şimh'ûn,
Şimh'ûnê Cihûda, Cihûdayê Ûsiv,
Ûsivê Yonam, Yonamê Êlyaqîm,
31 Êlyaqîmê Melyo, Melyoyê Me-
na, Menayê Metîtîya, Metîtîyayê
Nat'an, Nat'anê Dawid, 32 Dawidê
Yêşa[f], Yêşayê Ovêd, Ovêdê Bo-
waz, Bowazê Selmon, Selmonê
Nehşon, 33 Nehşonê Amînadav,
Amînadavê Admîn, Admînê Aram,
Aramê Hesrûn, Hesrûnê Pêrês,
Pêrêsê Cihûda, 34 Cihûdayê Aqûb,
Aqûbê Îshaq[f], Îshaqê Birahîm,
Birahîmê Têrah, Têrahê Nehor,
35 Nehorê Serûx, Serûxê R'êwo,
R'êwoyê Pêlêg, Pêlêgê Eber, Eberê
Şelah, 36 Şelahê Qênan, Qênanê
Arpexşad, Arpexşadê Sam, Samê
Nuh[f], Nuhê Lamex, 37 Lamexê
Metûşela, Metûşelayê Henox,
Henoxê Yarêd, Yarêdê Mahala-
lêl, Mahalalêlê Qênan, 38 Qênanê
Enoş, Enoşê Sêt', Sêt'ê Adem[f] û
Ademê Xwedê.

### Cêr'ibandina[f] Îsa

*(Metta 4:1-11; Marqos 1:12-13)*

**4** 1 Îsa bi R'uh'ê Pîrozva t'ijî
ji Ûrdunê veger'îya, R'uh'
ber'îyêda r'êberîya Wî dikir,
2 çil r'ojî ji mîrêcin[f] hate cêr'i-
bandinê[f]. Ewî wan r'ojada tiştek
nexwar û gava ew r'oj derbaz
bûn, bir'çî bû.
3 Hingê mîrêcin Wîr'a got:
«Heger Tu Kur'ê Xwedê yî, vî

kevirîr'a bêje ku bibe nan». 4 Îsa lê veger'and û got: «Nivîsar e: ‹Însan t'enê bi nên najî›* **».

5 Hingê mîrêcin Ew r'akire ser cîkî bilind, deqêda h'emû p'adşatîyêd dinyayê nîşanî Wî dan 6 û gote Wî: «Ezê r'ewş û serwêrtîya van h'emûya bidime destê Te, çimkî minr'a hatîye dayînê û k'êr'a ku bixwazim ezê bidimê. 7 Heger niha Tu serê xwe li ber min daynî, ev h'emû wê p'ara Te bin». 8 Îsa lê veger'and û got: «Nivîsar e: ‹Serê xwe li ber Xudan Xwedêyê xwe dayne û t'enê Wî bih'ebîne!›*»

9 Paşê mîrêcin Îsa bire Orşelîmê, Ew ser bilindcîya banê p'aristgehê da sekinandinê û gote Wî: «Heger Tu Kur'ê Xwedê yî, de Xwe ji vir bavêje xwarê. 10 Çimkî nivîsar e: ‹Xwedê wê t'emîya Te bide milyak'etêd Xwe, ku Te xwey kin› 11 û: ‹Ewê Te ser destê xwe bigirin, wekî nigê Te kevir nek'eve›*». 12 Îsa lê veger'and û got: «Hatîye gotinê ku: ‹Xudan Xwedêyê xwe necêr'ibîne!›*» 13 Û gava mîrêcin h'emû cêr'ibandin xilaz kirin, demekê ji Wî dûr k'et.

### Îsa qeza Celîlêda dest bi k'arê Xwe dike

*(Metta 4:12-17; Marqos 1:14-15)*

14 Îsa bi qewata R'uh' veger'îya Celîlê û nav-dengê Wî h'emû alîyêd wî welatîda bela bû. 15 Ewî k'inîştêd[f] wanda hîn dikir û h'emûya pesinê Wî didan.

### Bajarê Nisretê, li k'u Îsa mezin bibû, Wî qebûl nake

*(Metta 13:53-58; Marqos 6:1-6)*

16 Ew hate Nisretê, wî cîyê ku Ew lê mezin bibû, mîna e'detê Xwe r'oja[f] şemîyê Ew k'ete k'inîştê û r'abû ku bixûne. 17 K'itêba Îşaya p'êxember dane Wî û gava k'itêba gulomatkkirî vekir, ew cî dît ku aha nivîsar bû:

18 «R'uh'ê Xudan li ser Min e,
çimkî Ewî Ez bi r'ûnkirinê[f]
k'ifş kirim,
wekî Mizgînîyê bidime feqîra,

* 4:4 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Ne ku t'enê însan bi nên dijî, lê bi her xebereke Xwedê».
** 4:4 Qanûna Ducarî 8:3.
* 4:8 Qanûna Ducarî 6:13.
* 4:11 Zebûr 91:11-12.
* 4:12 Qanûna Ducarî 6:16.

û Ez şandime hêsîrar’a boy
serbestîyê[f]
û korar’a boy dîtinê dannasîn
kim,
azayîyê bidime bindesta
19 û sala Xudane r’e’mê* jî bidime
naskirinê»**.
20 Û k’itêb gulomatk kir da ber-
destî r’ûnişt û k’inîştêda h’emû
zûr’ bibûn li Wî dinihêr’în. 21 Ewî
destpêkir wanar’a got: «Eva nivî-
sara îro hate sêrî, gava we bihîst».
22 H’emûya jî bona Wî qenc xeber
didan û ser xeberdana Wîye me’rîfet
zendegirtî mabûn û digotin: «Eva
ne kur’ê Ûsiv e?» 23 Ewî wanr’a
got: «Hûnê r’ast vê gotinê ser Min
bêjin: ‹H’ekîmo! De h’ekîmtîyê li
xwe bike. Û ew tiştêd me bihîstin
ku Te Kefernahûmêda kirin, li
vir cî-misk’enê xweda jî bike›».
24 Û got: «Ez r’ast wer’a dibêjim,
p’êxember cî-misk’enê xweda
bêqedir e. 25 Ez r’astîyê wer’a
dibêjim, gelek jinebî Îsraêlêda
hêna Êlyasda hebûn, çaxê sê sal
û şeş meha e’zman hate girtinê
û t’emamîya welêtda bû xelayî-
ke giran. 26 Lê Êlyas kesekîr’a
nehate şandinê, pêştirî jinebîya
ji bajarê Serepta Saydêr’a*. 27 Û
gelek k’otî[f] jî Îsraêlêda hêna Êlîşa[f]
p’êxemberda hebûn û ji wan t’u
kes paqij nebû, pêştirî Ne’manê[f]
ji Sûryayê»*. 28 Gava h’emûyêd
k’inîştêda ev yek bihîstin, hêrs
k’etin. 29 R’abûn Ew ji bajêr der-
xistin, birin ser wî ç’îyayê li k’u
bajarê wan hatibû çêkirinê, wekî
Wî ji kendêlda bavêjin. 30 Lê Ew
nav wanr’a derbaz bû çû.

### Îsa r’uh’ê[f] h’eram[f] derdixe

*(Marqos 1:21-28)*

31 Îsa berjêr bû hate bajarê Ke-
fernahûma Celîlê û r’oja şemîyê
ew hîn dikirin. 32 Ew li ser hînki-
rina Wî zendegirtî mabûn, çimkî
xeberdana Wî bi h’ukum bû. 33 Û
k’inîştêda merivek hebû, ku r’uh’ê[f]
cinayî[f] h’eram[f] pêr’a hebû. Ewî bi
dengekî bilind kire qîr’în: 34 «Weyê!
Tu çi ji me dixwazî Îsayê Nisretê?
Tu hatîyî qir’a me bînî? Ez zanim
Tu k’î yî. Tu Pîrozê Xwedê yî!»
35 Îsa lê hilat û got: «Ker’ be û jê
derk’eve!» Cin ew ber wan li e’rdê
xist û bê zirardayîn ji wî derk’et.

* 4:19 Aha jî tê fe’mkirinê: «Sala qebûlkirina Xudan».
** 4:18-19 Îşaya 61:1-2.
* 4:25-26 P’adşatî III, 17:8-16.
* 4:27 P’adşatî IV, 5:1-14.

36 H'emû zendegirtî man, hevr'a
digotin: «Ev çi gotin e? Ew bi
h'ukum û qewatê e'mirî li r'uh'êd
h'eram dike û derdik'evin?» 37 Û
be'sa Wî h'emû dor-bera bela dibû.

### Îsa gelek nexweşa qenc dike

*(Metta 8:14-17; Marqos 1:29-34)*

38 Ew ji k'inîştê derk'et çû mala
Şimh'ûn[f]. Xwesîya Şimh'ûn te'l
t'ayêda dine'lîya û bona wê ji Wî
hîvî kirin. 39 Îsa ser wêr'a sekinî,
li t'ayê hilat û t'ayê jê ber'da.
Destxweda r'abû ser xwe, berdestî
wanr'a kir. 40 Gava r'o diçû ava,
h'emûyêd ku cûr'e-cûr'e nexwe-
şîyêd wan hebûn anîne cem Wî.
Ewî destê Xwe danî ser wan her
yekî û ew qenc kirin. 41 Ji geleka
jî cin derdik'etin, dikirine qîr'în
û digotin: «Tu Kur'ê Xwedê yî!»
Lê Îsa li wan hilat û nedihişt ew
xeber din, çimkî zanibûn ku Ew
Mesîh e.

### Dannasînîya t'emamîya Cihûstanê

42 Sibeh ku zelal bû, Îsa r'abû çû
cîkî xewle. E'lalet li Wî diger'îyan
û h'eta cem Wî hatin, nedihiştin
ku Ew dest ji wan bik'işîne. 43 Lê
Ewî wanr'a got: «Gerekê Ez baja-
rêd dinda jî Mizgînîya P'adşatîya[f]
Xwedê bidim, çimkî Ez bona wê
yekê hatime şandinê». 44 Û k'inîş-
têd Cihûstanêda* dannasîn dikir.

### Îsa gazî şagirtêd[f] Xweye pêşin dike

*(Metta 4:18-22; Marqos 1:16-20)*

**5** 1 Carekê Îsa li ber gola Cê-
nîsartê sekinîbû û e'laletê
dora Wî girt, ku xebera Xwedê
bibihê. 2 Û Ewî du qeyik devê
golê dîtin, me'sîgir ji wan der-
k'etibûn û t'or'êd xwe dişûştin.
3 Îsa k'ete qeyikeke ji wan, ku ya
Şimh'ûn bû, hîvî ji wî kir, ku qe-
yikê hinekî ji bejê[f] dûr xe. Û Ew
r'ûnişt, ji qeyikê e'lalet hîn kir.
4 Çaxê Ewî xeberdana Xwe xilaz
kir, Şimh'ûnr'a got: «Qeyikê bibe
cîyê k'ûr û t'or'êd xwe bavêjine
nêç'îrê». 5 Şimh'ûn lê veger'and
û got: «Mamosta, me t'emamîya
şevê kir-nekir tiştek negirt, lê bo-
na xatirê Te ezê t'or'a bavêjimê».
6 Û gava usa kirin, haqas me'sî
k'etinê, ku t'or'êd wan diqetîyan.
7 Û bi nîşana gazî hevalêd xweye
qeyika dinda dikirin, ku bên alî
wan bikin. Û ewana hatin her du
qeyik jî t'ijî kirin, hindik mabû
nuq bûna. 8 Gava Şimh'ûn-Petrûs

* 4:44 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Celîlêda».

ev yek dît, xwe avîte çokê Îsa û
got: «Xudan, dûrî min her’e, ez
yekî gunek’ar[f] im». 9 Çimkî bo-
na wan me’sîyêd girtî xofê wî û
h’emûyêd pêr’a girtibû, 10 usa jî
Aqûb[f] û Yûh’ennayê[f] kur’êd Ze-
bedî, ku hevalêd Şimh’ûn bûn. Û
Îsa Şimh’ûnr’a got: «Netirse! Ji
vir şûnda tê meriva mîna me’sîya
bigirî». 11 Û qeyik derxistine bejê,
her tişt hiştin pey Wî çûn.

### Îsa yekî ji k’otîbûnê paqij dike

*(Metta 8:1-4; Marqos 1:40-45)*

12 Gava Îsa bajarekîda bû, li wir
merivekî serdapêda k’otî hebû.
Çaxê ewî Îsa dît, xwe dever’ûya
avît jê lava kir û got: «Xudan!
Heger bixwazî, Tu dikarî min
paqij kî». 13 Û Îsa destê Xwe dirêj
kirê, lê k’et û got: «Ez dixwazim.
Paqij be!» Û destxweda k’otîbûn jê
çû. 14 Îsa t’emî da wî, ku vê yekê
kesîr’a nebêje, lê got: «Her’e xwe
nîşanî k’ahîn ke û çawa Mûsa
t’emî daye, h’edîya paqijbûna
xwe bide, wekî h’emûyar’a bibe
şe’detî, ku tu paqij bûyî». 15 Nav
û dengê Îsa hê bela dibû û p’ir’
e’lalet dicivîya ku guhdarîya Wî
bikin û ji nexweşîyêd xwe qenc
bin. 16 Lê Ewî Xwe li cîyê xewle
digirt û dua dikir.

### Îsa şilûşe’tekî qenc dike û gunêd wî dibaxşîne

*(Metta 9:1-8; Marqos 2:1-12)*

17 R’ojekê çaxê Ewî hîn di-
kir, fêrisî[f] û dersdarêd Qanûnê jî
r’ûniştibûn, ku ji h’emû gundêd
Celîlê, Cihûstanê û ji Orşelîmê
hatibûn. Qewata Xudan hazir
bû, wekî Îsa nexweşêd wan qenc
bike. 18 Wê demê çend merîya
yekî şilûşe’t nivînêva anîn û di-
xwestin ew bibirana hindur’ û li
ber Îsa danîna. 19 Û gava wana ji
dest e’laleta giran t’u r’ê nedîtin
ku wî bînine hindur’, r’abûne ser
xênî, k’ermîd vekirin, nivînêva
daxistine nava malê, li ber Îsa.
20 Gava Ewî bawerîya wan dît,
gote yê şilûşe’t: «E’vdo, gunêd te
hatine baxşandinê». 21 Qanûnzan
û fêrisîya destpêkir fikirîn û hevr’a
gotin: «Ev k’î ye aha Xwedê bêhur-
met dike? Pêştirî Xwedê k’î dikare
guna bibaxşîne?» 22 Fikirêd wan
Îsava e’yan bûn û li wan veger’and
got: «Hûn çi dilê xweda difikirin?
23 K’îjan r’ih’et tê gotinê: ‹Gunêd
te hatine baxşandinê›, yan: ‹R’abe
û biger’e?› 24 Lê wekî hûn bizanibin
ku h’ukumê Kur’ê[f] Mêriv heye li
ser dinê guna bibaxşîne», gote yê
şilûşe’t: «Ez ter’a dibêjim, r’abe
nivîna xwe hilde her’e mala xwe».

25 Ew jî ber ç'e'vê wan pêr'a-pêr'a
r'abû û nivîna ku li ser p'aldayî bû
hilda çû mala xwe û şikirî dida
Xwedê. 26 H'emû h'eyr-h'ujmek'ar
man û şikirî didane Xwedê, bi
xofa mezin digotin: «Îro me tiştêd
nebûyî dîtin».

### Îsa gazî Lêwî[f] dike

*(Metta 9:9-13; Marqos 2:13-17)*

27 Pey wê yekêr'a Îsa derk'et, li
cîyê xerchildanê xercgirekî r'ûniştî
dît ku navê wî Lêwî[f] bû û gotê:
«Pey Min were». 28 Ewî jî her tişt
hişt, r'abû pey Wî çû. 29 Lêwî mala
xweda hurmeteke mezin jêr'a kir.
T'evî wan gelek xercgir û hinekêd
mayîn jî li ser sifrê r'ûniştibûn.
30 Fêrisîya û qanûnzanêd wan bîna
xwe teng kirin û şagirtêd[f] Wîr'a
gotin: «Çima hûn t'evî xercgir û
gunek'ara dixwin û vedixwin?» 31 Îsa
li wan veger'and û got: «Saxlem
ne h'ewcê h'ekîm in, lê nexweş.
32 Ez nehatime gazî yêd r'ast kim,
lê gazî gunek'ara bona t'obeyîyê[f]».

### Pirsa r'ojîgirtinê

*(Metta 9:14-17; Marqos 2:18-22)*

33 Wana ji Îsa pirsî: «Çima şagir-
têd Yûh'enna û usa jî yêd fêrisîya
t'imê r'ojî digirin û dua dikin, lê
şagirtêd Te dixwin û vedixwin?»
34 Ewî jî gote wan: «Hûn dikarin
bêjine xwendîyêd de'watê: ‹R'ojî
bigirin›, h'eta ku ze'va t'evî wan
e? 35 Lê r'ojê bên, gava ze'va ji wan
bê hildanê, hingê wan r'ojada wê
r'ojî bigirin».

36 Ewî meselek jî wanr'a got:
«Kesek ji p'arç'ê nû nabir'e û
k'inca kevin p'îne nake. Heger
usa bike, hin p'arç'ê nû diqelêşe,
hin jî kevin û nû li hev nakin.
37 Û ne jî kesek şerava nû dike
meşkêd kevin. Heger usa bike,
şerava nû wê meşka bit'eqîne û
bir'ije, meşkê jî xirab bin. 38 Lê
gerekê şerava nû bikine meşkêd
nû*. 39 Û kesek pey şerava kevinr'a
naxwaze ya nû vexwe, çimkî ya
kevin hê lê xweş tê».

### Pirsa r'oja[f] şemîyê

*(Metta 12:1-8; Marqos 2:23-28)*

**6** 1 R'ojeke şemîyê Îsa nava ze-
vîyar'a derbaz dibû, şagirtêd
Wî simbilêd genim diçinîn, destêd
xweda difirikandin û dixwarin.
2 Lê ji fêrisîya hineka got: «Çima
hûn tiştê necayîzî r'oja[f] şemîyê
dikin?» 3 Îsa li wan veger'and û
got: «We nexwendîye ku Dawid
çi kir, gava ew û yêd pêr'a bir'çî

* 5:38 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Ku her du jî bêne xweykirinê».

bûn? **4** Ne ew k'ete Xana[f] Xwedê
û nanê[f] Xwedêr'a dayî hilda, hin
xwexa xwar, hin jî da yêd t'evî
xwe, wekî t'u kesîr'a ne cayîz bû
bixwara, pêştirî k'ahîna?»* **5** Û
veger'îya wanr'a got: «Kur'ê Mêriv
Xudanê şemîyê ye jî».

### Îsa r'oja şemîyê merivê ku destê wî k'işîyabû qenc dike

*(Metta 12:9-14; Marqos 3:1-6)*

**6** Û r'oja şemîke din Îsa çû k'i-
nîştê, ku hîn bike. Merivek li wir
hebû, ku destê wîyî r'astê k'işîya-
bû. **7** Ç'e'vê qanûnzan û fêrisîya li
ser Wî bûn, gelo wê r'oja şemîyê
nexweşa qenc ke yan na, wekî
me'nîke wan hebe, ku xeyba Wî
bikin. **8** Lê fikirêd wan Îsava e'yan
bûn û wî merivê destk'işîyayîr'a
got: «R'abe vê govekê bisekine».
Ew jî r'abû sekinî. **9** Hingê Îsa
wanr'a got: «Ezê pirsekê ji we
bikim. R'oja şemîyê çi cayîz e
bikin: Qencî yan xirabî, r'uh'ekî
xilaz kin yan unda kin?» **10** Û Îsa
li h'emûyêd dora Xwe nihêr'î, wî
merivîr'a got: «Destê xwe dirêj
ke». Ewî jî usa kir û destê wî dîsa
qenc bû. **11** Hingê wana ji hêrsa
xwe dixwar, nav hevda dişêwirîn,
ku çi bînine serê Îsa.

### Bijartina her donzdeh şandîya[f]

*(Metta 10:1-4; Marqos 3:13-19)*

**12** Wan r'ojada Îsa çû serê ç'îyê,
ku dua bike û t'emamîya şevê ber
Xwedê bi dua derbaz kir. **13** Çaxê
sibeh zelal bû, Ewî gazî şagirtêd
Xwe kirin û donzdeh meriv ji
nav wan bijartin, ku navêd wan
jî «şandî[f]» danî: **14** Şimh'ûnê ku
navê wî danî Petrûs[f] û birê wî
Endrawis, Aqûb û Yûh'enna,
Fîlîpo û Bertolomeyo, **15** Metta û
T'ûma, Aqûbê[f] Halfawo û Şimh'û-
nê ku welatp'arist[f] dihate gotinê.
**16** Cihûdayê Aqûb û Cihûdayê[f]
Îsxeryotî, ku nemamîya[f] Wî kir.

### Îsa dannasîn dike, hîn dike û qenc dike

*(Metta 4:23-25)*

**17** Ew bi t'evî wan berjêr bû hat,
r'astekê sekinî. Li wê derê k'ome-
ke şagirtaye mezin û cime'teke
giran ji t'emamîya Cihûstanê,
Orşelîmê û ji devê be'ra Sûrê
û Saydê civîyayî bûn. **18** Ewa-
na hatibûn, wekî guhdarîya Wî
bikin û ji nexweşîyêd xwe qenc
bin. Û yêd ji r'uh'êd h'eram cefa
dik'işandin jî qenc dibûn. **19** Û

* 6:4 Qanûna K'ahîntîyê 24:9; P'adşatî I, 21:1-6.

t'emamîya e'laletê jî dice'dand, wekî destê xwe bidana Wî, çimkî qewat ji Wî derdik'et û her kes ji wan qenc dibû.

### Yêd xwezilî û ne xwezilî

*(Metta 5:1-12)*

20 Îsa berê Xwe da şagirtêd Xwe û got:

«Xwezî li we feqîra,
çimkî P'adşatîya[f] Xwedê ya we ye.
21 Xwezî li we, ku hûn niha bir'çî ne,
çimkî hûnê t'êr bin.
Xwezî li we, ku hûn niha digirîn,
çimkî hûnê bik'enin.
22 Xwezî li we, gava hûn bona Kur'ê Mêriv ber ç'e'vê merîya r'eş bin,
gava we qebûl nekin, we bêhurmet kin
û navê xirab ser we derxin.

23 Wê r'ojê eşq bin û ji şabûna bira nigêd we e'rd negire, çimkî va heqê we li e'zmên gelek e, çimkî kal-bavêd wan jî serê p'êxembera usa dikirin.

24 Lê wey li we dewletîya,
çimkî hûn gihîştine meremê xwe.
25 Wey li we, ku hûn niha t'êr in,
çimkî hûnê bir'çî bin.
Wey li we, ku hûn niha dik'enin,
çimkî hûnê bigirîn û şînê bikin.
26 Wey li we, ku h'emû meriv bona we qenc xeber didin,
çimkî kal-bavêd wan jî p'êxemberêd derewr'a usa dikirin.

### Dijminêd xwe h'iz bikin

*(Metta 5:38-48; 7:12a)*

27 Lê Ez wer'a, yêd ku dibihên
dibêjim, dijminêd xwe h'iz bikin,
xêrnexwazêd xwer'a qencîyê bi-
kin. 28 Nifir'kirêd xwe bimbarek
kin û bona yêd xirabîyê we dikin,
dua bikin. 29 Heger yek r'ûyê te
xe, yê din jî bide ber û yê ku
p'otê te ji te bistîne, kirasê xwe
jî jêr'a bihêle. 30 Bide wî, k'î ji te
dixwaze û k'î ji te distîne paşda
nexwaze. 31 Û çawa hûn dixwa-
zin meriv bona we bikin, hûn jî
usa wanr'a bikin. 32 Heger hûn
wan h'iz bikin, k'îjan ku we h'iz
dikin, çi feyde? Ne gunek'ar jî
wan h'iz dikin, k'îjan ku wan h'iz
dikin? 33 Û heger hûn qencîkirêd
xwer'a qencîyê bikin, çi feyde?
Ne gunek'ar jî usa dikin? 34 Û
heger hûn deyn didine yêd usa,
ji k'îjana gumana we heye paşda
bistînin, çi feyde? Ne gunek'ar jî
deyn didine gunek'ara, ku dîsa

haqasî paşda bistînin? 35 Lê hûn
dijminêd xwe h'iz bikin, qencîyê
bikin, deyn bidin û hîvîya vege-
r'andinê nemînin. Heqê weyê
gelek be û hûnê bibine zar'êd
Yê Herî Jorin. Çimkî Ew bona
bêşêkira jî, ner'asta jî qenc e.
36 Dilr'e'm bin, çawa Bavê[f] we
dilr'e'm e.

### Hînkirina derheqa lomekirinêda[f]

*(Metta 7:1-5)*

37 Loma nekin û lomeyê li we
nebin, neheqîyê nekin, neheqî wê
li we nebe, bibaxşînin wer'a wê bê
baxşandinê. 38 Bidin, wer'a wê bê
dayînê, bi pîvaneke t'ijî h'ejandî,
dewisandî, serî qûç' wê bikine p'êşa
we. Çimkî bi çi çapê hûn bipîvin,
bi wê jî wer'a wê bê pîvanê». 39 Ewî
meselek jî wanr'a got: «Gelo kor
dikare r'êberîyê kora bike? Ne her
duyê jî bik'evine ç'e'lê? 40 Şagirt
ji dersdarê xwe ne mestir e, lê
ewê ku xwendina xwe r'ind pêk
tîne, dikare mîna dersdarê xwe
be. 41 Tu çima qirşikê ç'e'vê birê
xweda dibînî, lê k'êranê ç'e'vê
xweda nabînî? 42 Yan jî çawa tu
dikarî bêjî birê xwe: ‹Bira, bihêle
ku ez qirşik ji ç'e'vê te derxim›, lê
tu k'êranê ç'e'vê xweda nabînî?
Dur'û! Pêşîyê k'êranê ç'e'vê xwe
derxe. Paşê tê qenc bibînî ku ça-
wa qirşik ji ç'e'vê birê xwe derxî.

### Dar û berê wê

*(Metta 7:17-20; 12:34b, 35)*

43 Dara qenc berê xirab nade,
ne jî dara xirab berê qenc. 44 Her
dar ji berê xwe tê naskirinê, kesek
ji stirîya hêjîra naçine û ne jî ji
dir'îyê tirîya. 45 Merivê qenc, ji
xizna dilê xweyî qenc, qencîyê
dertîne, lê merivê xirab, ji xizna
dilê xweyî xirab xirabîyê dertîne.
Çimkî dilê wî çiva t'ijî ye zar jî
ewê dibêje.

### H'îmêd du mala

*(Metta 7:24-27)*

46 Hûn çima Minr'a ‹Xudan!
Xudan!› dibêjin û wan tiştêd ku
Ez wer'a dibêjim nakin? 47 Her
kesê ku tê cem Min gotinêd Min
dibihê û diqedîne, Ez wer'a bêjim
mîna k'ê ye. 48 Ew mîna merivekî
ye, yê ku malê çêdike, e'rdê dik'o-
le k'ûr dike, h'îmê wê li ser kêvir
datîne. Û gava lêyî[f] r'adibe, ç'em
li wê malê dixe, ew nah'eje, çimkî
r'ind hatibû çêkirinê. 49 Lê ewê
xeberêd Min dibihê û naqedîne,
mîna merivekî ye, yê ku ser xwelîyê
bê h'îm malê xwer'a çêdike. Gava
ç'em lê dixe, destxweda hildişê,
wêran dibe, li ber mîrat'ê diçe».

## Îsa xulamê sersedekî[f] qenc dike

*(Metta 8:5-13; Yûh'enna 4:43-54)*

**7** 1 Gava Îsa ew gotinêd ku
wê guhdarar'a bigota xi-
laz kirin, çû Kefernahûmê. 2 Û
xulamê sersedekî[f], ku bona wî
yekî hêja bû, nexweş ber mirinê
bû. 3 Gava ewî bona Îsa bihîst,
r'ûspîyêd[f] cihûya[f] şandine cem
Wî û jê hîvî kir, ku bê xulamê
wî xilaz ke. 4 Ewana hatine cem
Îsa, gelekî hîvî jê kirin û gotin:
«Ew hêja ye ku Tu evê qencîyê
jêr'a bikî, 5 çimkî ew miletê me
h'iz dike û k'inîşt jî bona me
çêkirîye». 6 Hingê Îsa t'evî wan
çû. Gava nêzîkî malê bû, sersed
çend dostêd xwe şandine pêşîya
Wî, Wîr'a got: «Xudan, ze'metê
nebîne, çimkî ez ne hêja me ku
Tu bêyî mala min. 7 Bona vê ye-
kê min xwe layîqî Te negirt, ku
bihatama pey Te jî. T'enê xebe-
rekê bêje û xulamê minê qenc be.
8 Çimkî ez xwexa jî merivekî bin
h'ukumda me û bin destê minda
jî esker hene. Ez yekîr'a dibêjim:
‹Her'e›, diçe, yekî dinr'a dibêjim:
‹Were›, tê û ji xulamê xwer'a
dibêjim: ‹Evî tiştî bike›, dike».
9 Gava Îsa ev yek bihîst, ser wî
zendegirtî ma û veger'îya ser wê
cime'ta ku pey Wî diçû, got: «Ez
wer'a dibêjim, Min Îsraêlêda jî
bawerîke aha yekîda nedîtîye».
10 Û ewêd şandî veger'îyane mal,
dîtin ku wê ew xulam qenc bûye.

## Saxbûna kur'ê jinebîyê

11 R'ojeke din Îsa çû bajarekî,
ku navê wî Nayîn bû û şagirtêd
Wî jî t'evî e'laleteke giran Wîr'a
diçûn. 12 Gava nêzîkî dergehê
bajêr bû, va mirîk derdixistin.
Ew kur'ê jinebîke tayê t'enê bû û
gelek hewarî jî ji bajêr pêr'a diçûn.
13 Gava Xudan dê dît, gunê Wî lê
hat û wêr'a got: «Negirî». 14 Ew
nêzîkî darbestê bû girt û ewêd ku
dibirin sekinîn, Îsa got: «Xorto!
Ez ter'a dibêjim, r'abe!» 15 Mirî
r'abû r'ûnişt, destpêkir xeber da
û Îsa ew da dîya wî. 16 Û saw k'ete
ser h'emûya, şikirî didane Xwedê
û digotin: «P'êxemberekî mezin
nava meda derk'etîye!» û: «Xwedê
serîk daye miletê Xwe!» 17 Nav û
dengê Wî t'emamîya Cihûstanê
û dor-berê wê bela bû.

## Îsa caba pirsa Yûh'ennayê nixumdar dide

*(Metta 11:1-19)*

18 Şagirtêd Yûh'enna Yûh'en-
nar'a bona van h'emû tişta gotin.
Yûh'enna jî gazî du şagirtêd xwe

kir **19** û ew şandine cem Xudan,
wekî jê bipirsin: «Tu Ew î, Yê ku
gerekê bihata, yan em hîvîya yekî
din bin?» **20** Ew merî hatine cem
Îsa û gotin: «Yûh'ennayê nixum-
dar[f] em şandine cem Te, ku ji Te
bipirsin, Tu Ew î, Yê ku gerekê
bihata, yan em hîvîya yekî din
bin?» **21** Û wê demê Îsa gelek ji
nexweşîya, derba, ji r'uh'êd xirab
qenc kirin û ç'e'vêd gelek kora
vekirin. **22** Îsa li wan veger'and û
got: «Her'in, çi ku we dît û bihîst
Yûh'ennar'a bêjin: Kor dibînin,
seqet diger'in, k'otî paqij dibin,
ker' dibihên, mirî r'adibin û fe-
qîrar'a jî Mizgînî tê dayînê. **23** Û
xwezî li wî, ku ji Min p'işk nabe».

**24** Gava ewêd ku Yûh'enna şan-
dibûn çûn, Îsa bona Yûh'enna
e'laletêr'a destpêkir got: «Hûn
derk'etine ber'îyê çi bibînin? Qa-
mîşekî[f] ku ji bayê dih'eje? **25** Yan
derk'etin çi bibînin? Merivekî
k'incê nazik[f] li xwe kirî? Ne
ewêd ku k'incê nazik xwe dikin
û e'mirê r'ind derbaz dikin, ew
malêd p'adşada ne? **26** Yan hûn
derk'etin çi bibînin? P'êxembe-
rekî? Belê, Ez wer'a dibêjim, ji
p'êxemberekî jî mestir e. **27** Eva
ew e, bona k'îjanî nivîsar e: ‹Va
ye Ezê qasidê Xwe pêşîya Teva
bişînim. Ewê r'îya Te pêşîya Teva
hazir ke›*. **28** Ez wer'a dibêjim,
ji nava ewêd ku ji k'ulfeta dinê
k'etine, t'u kes ji Yûh'enna mestir
nebûye, lê P'adşatîya Xwedêda yê
herî biç'ûk ji wî mestir e». **29** Gava
t'emamîya cime'tê, usa jî xercgira
ev yek bihîst, t'ivdîra Xwedê r'ast
h'esab kirin, çimkî bi nixumandina
Yûh'enna hatibûne nixumandinê.
**30** Lê fêrisî û qanûnzana bona xwe
t'ivdîra Xwedê t'exsîr[f] kirin, çimkî
wana nexwest ku ji Yûh'enna bêne
nixumandinê.

**31** Îsa serda zêde kir got: «Ez
merivêd vî nisilî mîna çi bişibînim?
Yan ew mîna çi ne? **32** Ew mîna
wan zar'a ne, yêd ku bazarêda
r'ûniştî ne, gazî hevdu dikin û
dibêjin: ‹Me bona we zur'nê xist,
hûn ner'eqisîn û bona we beyt'[f]
got, hûn negirîyan›. **33** Yûh'ennayê
nixumdar hat, ne nan dixwar, ne
jî şerav vedixwar*, we digot: ‹Cin
wîda heye›. **34** Kur'ê Mêriv hat,
dixwe û vedixwe, hûn bona Wî
dibêjin: ‹Va Ew yekî pey xwarin
û vexwarinê k'etî ye, dostê xercgir
û gunek'ara ye›. **35** Lê h'emûyêd

* 7:27 Malaxî 3:1.

* 7:33 Yûh'ennayê nixumdar yekî «nezîr[f]» dihate h'esabê.

ku pey serwaxtîyê diçin ew k’ifş
dikin ku serwaxtî r’ast e*».

### Îsa mala Şimh’ûnda k’ulfeta gunek’ar dibaxşîne

36 Yekî fêrisî hîvî ji Îsa kir, ku
t’evî wî xwarinê bixwe. Ew jî çû
mala wî fêrisîyî, ser sifrê r’ûnişt.
37 Û wî bajarîda k’ulfeteke ç’e’vder[f]
hebû. Gava wê bihîst ku Ew mala
fêrisîda ser sifrê r’ûniştîye, derda-
neke[f] alabastirêyî r’ûnê bînxweş
anî, 38 piştêva ber nigêd Wî sekinî
girîya, bi hêsirêd xwe nigêd Wî şil
kirin û bi p’or’ê serê xwe jî ziha
kirin. Paşê nigêd Wî r’amûsan,
bi r’ûnê bînxweş jî r’ûn[f] kirin.
39 Gava wî fêrisîyê ku ew t’eglîf
kiribû ev yek dît, dilê xweda got:
«Heger Eva p’êxember bûya, wê
bizanibûya ku k’î ye û yeke ça-
wa ye destê xwe daye Wî», çimkî
yeke ç’e’vder bû. 40 Îsa wîr’a got:
«Şimh’ûn, Ez dixwazim tiştekî
ter’a bêjim». Ewî jî got: «K’erem
ke bêje, dersdar». Îsa got: 41 «Du
deyndarêd yekî hebûn, yek pênsid
zîvî[f] deyndarê wî bû, yek jî pêncî.
42 Lê çimkî tiştekî wan t’unebû ku
deynê xwe bidana, ewî baxşan-
de her duya jî. Niha ji wan her
duya k’îjanê gelekî wî h’iz bike?»
43 Şimh’ûn lê veger’and û gotê:
«T’exmîna min ewê ku gelek jêr’a
hate baxşandinê». Îsa wîr’a got:
«Te r’ast tê derxist». 44 Û ser k’ul-
fetêda veger’îya, Şimh’ûnr’a got:
«Vê k’ulfetê tu dibînî? Ez hatime
mala te, bona nigêd Min te av
neda, lê evê bi hêsirêd xwe nigêd
Min şil kirin û bi p’or’ê serê xwe jî
ziha kirin. 45 Te r’amûsanek neda
Min, lê ji hingêva ku Ez hatime
vir, evê dest ji r’amûsana nigêd
Min nek’işandîye. 46 Te serê Min
r’ûn[f] nekir, lê evê bi r’ûnê bînxweş
nigêd Min r’ûn kirin. 47 Bona vê
yekê Ez ter’a dibêjim, gunêd vê
ku gelek bûn hatine baxşandinê,
lema evê gelek h’iz kir. Çimkî
k’êr’a gelek têne baxşandinê, gelek
jî h’iz dike. Lê k’êr’a hindik têne
baxşandinê, ew hindikî h’iz dike».
48 Û wêr’a got: «Gunêd te hatine
baxşandinê». 49 Hingê ewêd ku
t’evî Wî ser sifrê r’ûniştibûn nav
xweda digotin: «Eva k’î ye, h’eta
ku guna jî dibaxşîne?» 50 Û Îsa wê
k’ulfetêr’a got: «Bawerîya te tu
xilaz kirî. Bi xêr û silamet her’e».

* 7:35 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Serwaxtî ji h’emû zar’êd xwe r’ast k’ifş dibe». Hinek jî aha fe’m dikin: «Serwaxtî ji h’emû e’melêd xwe k’ifş dibe ku ew r’ast e».

## K’ulfetêd ku pey Îsa diçûn

**8** 1 Pey vê yekêr’a Îsa gund û ba-
jara diger’îya, dannasîn dikir,
Mizgînîya P’adşatîya Xwedê dida
û her donzdeh şagirt jî Pêr’a bûn,
2 usa jî çend k’ulfetêd ku ji r’uh’êd
xirab û nexweşîya qenc bibûn: Mer-
yema ku jêr’a Mejdelanî digotin,
ya ku h’eft cin jê derk’etibûn 3 û
Yohana, jina Xûzayê wek’îlxercê[f]
mala Hêrodes, Sosin û gelekêd
mayîn, ku wana bi hebûka[f] xweva
wanr’a berdestî dikirin.

## Mesela t’oximr’eş[f]

*(Metta 13:1-9; Marqos 4:1-9)*

4 Û gava e’laleteke giran ji gelek
bajara cem Îsa civîya, Ewî mese-
lek got: 5 «T’oximr’eş[f] r’abû çû ku
t’oxim bir’eşîne. Gava dir’eşand,
hinek k’etine devê r’ê hatine p’ê-
peskirinê û teyredêd e’zmên hatin
ew xwarin. 6 Û hinek jî k’etine
cîyê kevirî, gava şîn bûn, ji dest
kêmasîya şilayê h’işk bûn. 7 Û
hinek jî k’etine nava stirîya, stirî
jî pêr’a şîn bûn û ew xeniqandin.
8 Hinekêd din jî k’etine nava e’rdê
qenc û şîn bûn, sed car ber dan».
Gava ev yek got, kire gazî: «Guhê
k’êyî bihîstinê heye bira bibihê!»

## Îsa çima bi mesela xeber dide

*(Metta 13:10-17; Marqos 4:10-12)*

9 Şagirtêd Wî jê pirsîn: «Me’na
evê meselê çi ye?» 10 Ewî got: «We-
r’a hatîye dayînê, ku hûn sur’êd
P’adşatîya Xwedê bizanibin, lê
yêd mayînr’a bi mesela tê xeber-
danê ku: ‹Binihêr’in û nebînin,
bibihên û fe’m nekin›*.

## Şirovekirina mesela t’oximr’eş

*(Metta 13:18-23; Marqos 4:13-20)*

11 Ev e me’na vê meselê: T’ox-
im xebera Xwedê ye. 12 T’oximêd
ku k’etine devê r’ê ew in, yêd ku
xeberê dibihên, lê mîrêcin tê xe-
berê ji dilê wan derdixe, ku nebe
bawer bikin û xilaz[f] bin. 13 T’o-
ximêd ku k’etine cîyê kevirî ew
in, yêd ku gava xeberê dibihên,
bi eşq û şa qebûl dikin. Lê çimkî
r’awêd wan t’unene, demeke kin
bawer dikin û wextê cêr’ibandinê
dik’evin. 14 T’oximêd ku k’etine
nava stirîya ew in, yêd ku xeberê
dibihên, xemêd dinêva, dewlet û
şabûna vî e’mirîva mijûl dibin,

* 8:10 Îşaya 6:9.

dixeniqin û berêd wan nagihî-
jin. 15 Û t'oximêd k'etine nav
e'rdê qenc ew in, yêd ku bi dilê
sax û qenc xeberê dibihên, dilê
xweda xwey dikin û bi sebir berê
xwe didin.

### Ç'ira ser p'êç'irê[f]

*(Marqos 4:21-25)*

16 T'u kes ç'ira vêxistî nake bin
firaqê, ne jî dike bin cî-nivînê, lê
datîne ser p'êç'irê[f], wekî ewêd ku
dik'evine hindur', r'onayê bibînin.
17 Çimkî tiştekî veşartî t'une ku
derneyê û ne jî tiştekî dizîva, ku
xuya nebe û neyê ber r'onayê.
18 Awa dîna xwe bidinê ku hûn
çawa dibihên, çimkî k'êr'a ku
heye, wê hê lê zêde be û k'êr'a
ku t'une, ewê ku wî t'irê heye jî,
wê jê bê standinê».

### Dê û birayêd Îsa

*(Metta 12:46-50;
Marqos 3:31-35)*

19 Hingê dê û birayêd Wî hatine
cem Wî, lê ji dest ze'fbûna e'laletê
nikaribûn nêzîkî Wî bûna. 20 Cab
dane Wî ku: «Dîya Te û birayêd
Te derva sekinî ne û dixwazin Te
bibînin». 21 Ewî jî li wan veger'and
û got: «Dê û birayêd Min ew in,
yêd ku xebera Xwedê dibihên û
diqedînin».

### Îsa firtonê[f] diseqir'îne

*(Metta 8:23-27; Marqos 4:35-41)*

22 R'ojekê Îsa şagirtêd Xweva
k'ete qeyikê û gote wan: «Em
derbazî wî berî golê bin». Û r'ê-
k'etin. 23 Gava qeyikêda diçûn,
Ew xewr'a çû. Û firtonek[f] li golê
r'abû, qeyik t'ijî av dibû, ew qe-
zîyêda bûn. 24 Hingê şagirt nêzîkî
Wî bûn, Ew h'işyar kirin û gotinê:
«Mamosta, Mamosta! Em unda
dibin!» Ew r'abû, li bayê û pêlêd
avê hilat, ew sekinîn û seqir'în.
25 Hingê Ewî wanr'a got: «Bawe-
rîya we k'anê ye?» Û wana bi xof,
e'cêbmayî hevr'a gotin: «Gelo ev
k'î ye, ku e'mirî ser bê û avê jî
dike û êlimî[f] Wî dibin?»

### Îsa yekî cinak'etî[f] qenc dike

*(Metta 8:28-34; Marqos 5:1-20)*

26 Ewana bi qeyikê çûne t'op-
raxêd Girasînê, pêşberî Celîlê.
27 Gava Ew derk'ete bejê, ji wî
bajarî merivek derk'ete pêşîya Wî,
ku cin nav wîda bûn. Ewî zûva ne
k'inc li xwe dikirin û ne jî malda
disekinî, nava gor'istanada dima.
28 Gava ewî Îsa dît, kire qîr'în
k'ete ber Wî û bi dengekî bilind
got: «Tu çi ji min dixwazî Îsayê
Kur'ê Xwedêyê Herî Jorin? Ez

r'eca ji Te dikim, min nede cefê!»
29 Çimkî Îsa e'mirî ser r'uh'ê h'eram
kiribû, ku ji wî merivî derk'eve.
Ew gelek cara cina dik'et, gava
bi qeyd û zincîra jî girêdidan,
ewî dîsa qeyd diqetandin û cina
ew çola dixist. 30 Hingê Îsa ji wî
pirsî û gotê: «Navê te çi ye?» Ewî
got: «K'omesker*», çimkî gelek
cin k'etibûne nava wî. 31 Û cina
lava Wî dikir, ku e'mir neke ew
her'ine gelîyê[f] hey-wayê. 32 Li wî
cîyî sûrîkî berazayî mezin hebû, ku
serê ç'îyê diç'êrîya. Cina r'eca jê
dikir, ku îzinê bide wan, ew her'in
bik'evine nava beraza. Ewî îzin da.
33 Û cin ji nav wî merivî derk'etin,
çûn k'etine nava beraza û ew sûrî
jorda r'evî, xwe ji kendêlda avîtine
golê xeniqîn. 34 Gava berazvana ev
yek dît, r'evîn çûne bajar û gunda,
ev yek gilî kirin. 35 Meriv r'abûn
çûn, ku tiştê bûyî bibînin. Gava
hatine cem Îsa, dîna xwe danê,
wê ew merivê ku cin jê derk'eti-
bûn, k'incê wî lê, ser h'işê xweda
hatî, li ber nigêd Îsa r'ûniştî ye.
Hingê ew tirsîyan. 36 Ewêd ku ev
yek dîtibûn, yêd mayînr'a gotin,
ku çawa ewî cinak'etî[f] qenc bû.
37 Hingê h'emû binelîyêd[f] dor-be-
rêd Girasînê hîvî ji Îsa kirin, ku ji
wan dûr k'eve, çimkî saweke mezin
ew girtibûn. Ew jî k'ete qeyikê û
paşda veger'îya. 38 Lê ew merivê
ku cin jê derk'etibûn lava Wî kir,
ku ew jî t'evî Wî her'e. Lê Îsa ew
ver'êkir û got: 39 «Veger'e mala
xwe û çi ku Xwedê bona te kir
gilî ke». Û ew çû, çi ku Îsa bona
wî kiribû t'emamîya bajêrda digot
û dikire dengî.

### Qîza mirî û k'ulfeta nexweş

*(Metta 9:18-26; Marqos 5:21-43)*

40 Û çaxê Îsa veger'îya, e'lale-
tê Ew qebûl kir, çimkî h'emû jî
hîvîya Wî bûn. 41 Hingê merivekî
navê wî Yayîro, serwêrê k'inîştê,
hat xwe avîte nigêd Îsa û hîvî jê
kir, ku her'e mala wî. 42 Çimkî
t'enê qîzeke wîye donzdeh salî
hebû û ew jî ber mirinê bû. Ga-
va Îsa diçû, e'laletê ze'met dida
Wî. 43 Wir k'ulfetek jî hebû, ku
donzdeh salê wê bûn*, ser xûnê

* 8:30 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Lêgêyon», awa gotî «k'omeke cinaye bêh'esab».

* 8:43 Anegorî Qanûna Mûsa k'ulfeta ser xûnê vebûyî h'er'imî dihate h'esabê. Her kesê ku wê dik'et dih'er'imî (nepaqij dihate h'esabê). Îzina wê t'unebû ku nêzîkî tiştekî pîroz bûye. Bixûnin: Qanûna K'ahîntîyê 15:19-31.

vebibû. Ewê h'emû hebûka xwe
dabû h'ekîma, lê t'u kesî ç'are lê
nekiribû. 44 Eva piştêva hat li r'î-
şîyêd k'incê Wî k'et û destxweda
xûn jê ç'ikîya. 45 Îsa got: «Ew k'î
bû ku li Min k'et?» Gava h'emûya
înk'ar[f] kir, Petrûs* got: «Mamos-
ta, e'lalet Te de'f dide, tengasîyê[f]
dide Te**». 46 Lê Îsa got: «Yek li
Min k'et, çimkî Ez pê h'esîyam
ku ji Min qewat derk'et». 47 Û gava
k'ulfetê dît ku nehate veşartinê,
lerizî, hat xwe avîte ber Wî û
li ber t'emamîya cime'tê Wîr'a
got, ku bona çi li Wî k'et û çawa
pêr'a-pêr'a qenc bû. 48 Ewî wêr'a
got: «E'vdê!* Bawerîya te tu qenc
kirî. Bi xêr û silamet her'e». 49 Ewî
hê xeber dida, ji mala serwêrê
k'inîştê yekî hat û got: «Qîza te
mir, îdî ze'metê nede dersdar».
50 Gava Îsa ev yek bihîst, wîr'a
got: «Netirse, t'enê bawer bike û
wê qenc be». 51 Gava Ew çû mal,
nehişt kesek her'e hindur', pêştirî
Petrûs, Yûh'enna, Aqûb û dê û
bavê qîzikê. 52 H'emû digirîyan û
şîna wê dikirin, lê Îsa got: «Ne-
girîn. Ew nemirîye, lê hênijîye».
53 Wana qerfê xwe Pê dikir, çimkî
zanibûn ku ewa mirîye. 54* Û Îsa
destê wê girt, deng da wê û got:
«Qîzik, r'abe!» 55 Û r'uh'ê wê lê
veger'îya, pêr'a-pêr'a r'abû ser xwe.
Îsa e'mir kir, ku xurek bidine wê.
56 Dê û bavê wê zendegirtî man.
Lê Ewî t'emî li wan kir, ku vê
yekê kesîr'a nebêjin.

### Şandina her donzdeha

*(Metta 10:5-15; Marqos 6:7-13)*

9 1 Îsa gazî her donzdeh şagirtêd
Xwe kir, qewat û h'ukum da
wan, ku h'emû cina derxin û ji
nexweşîya qenc kin. 2 Ew şandin,
ku P'adşatîya Xwedê dannasîn kin
û nexweşa qenc kin 3 û wanar'a
got: «Bona r'ê tiştekî hilnedin, ne
şivdar, ne tûrik, ne nan, ne p'ere,
ne jî du dest kiras. 4 Çi mala ku
hûn her'inê, wir bimînin û ji wir
r'êk'evin. 5 Û ew dera ku we qebûl
nekin, gava ji wî bajarî dertên,
t'oza nigêd xwe dawşînin, wekî
wanar'a bibe şe'detî». 6 Û şagirt
r'abûn, gund-gund ger'îyan û
her dera Mizgînî dan, nexweş
qenc kirin.

* 8:45 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Û yêd pêr'a».
** 8:45 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Û Tu dibêjî, k'î bû, li Min k'et?»
* 8:48 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Serxwe be!»
* 8:54 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Îsa h'emû derxistine derva...»

### Şaşîya Hêrodes

*(Metta 14:1-12; Marqos 6:14-29)*

7 Awa Hêrodesê serwêr bona
h'emû kirinêd Îsa bihîst û t'e-
vîhev bû, çimkî hineka digot:
«Eva Yûh'enna ye, ji nav mirîya
r'abûye» 8 û hineka jî digot: «Êlyas
e k'ifş bûye» û hinekêd mayîn jî
digotin: «Eva yek ji p'êxemberêd
berê ye sax bûye». 9 Hêrodes got:
«Min serê Yûh'enna da lêxistinê,
lê Eva k'î ye ku ez derheqa Wîda
van tişta dibihêm?» Û wî dixwest
Îsa bidîta.

### Îsa pênc h'ezara t'êr dike

*(Metta 14:13-21;*
*Marqos 6:30-44;*
*Yûh'enna 6:1-14)*

10 Gava şandî veger'îyan, çi
ku wan kiribû Îsar'a gilî kirin.
Ewî t'enê şandîyêd Xwe t'evî Xwe
hildan û çûne berbi bajarê Beyt-
saydayê. 11 Gava e'lalet pê h'esîya,
pey Wî çû. Îsa ew qebûl kirin û
t'evî wan bona P'adşatîya Xwe-
dê xeber dida û ewêd ku h'ewcê
qencbûnê bûn qenc kirin. 12 Berê
êvarê her donzdeh hatine cem Wî
û jêr'a gotin: «E'laletê ber'de, ku
her'in gund û bergêd dor-bera
cî-war bin û xwer'a xurek dest
xin, çimkî em li cîkî xikî-xwelî
ne». 13 Lê Îsa wanr'a got: «Hûn
xurek bidine wan». Wana jî lê
veger'and û gotin: «Pêştirî pênc
nan û du me'sîya wekî mayîn
tiştekî me t'une, heger em ne-
çin t'emamîya cime'têr'a xurek
nek'ir'in?» 14 Çimkî weke pênc
h'ezar mêrî bûn. Ewî şagirtêd
Xwer'a got: «Cime'tê pêncî-pêncî
bidine r'ûniştandinê». 15 Û usa
kirin, h'emû jî dane r'ûniştandi-
nê. 16 Ewî ew pênc nan û her du
me'sî hildan, berê Xwe e'zmênda
kir şikirî da, kerkir û da şagirta,
ku belayî e'laletê kin. 17 H'emûya
jî xwar t'êr bûn û donzdeh sele
jî hûrikêd bermayî berev kirin.

### Petrûs şe'detîyê li ser Îsa dide

*(Metta 16:13-19;*
*Marqos 8:27-29)*

18 Carekê Îsa bi t'enê t'evî
şagirtêd Xwe dua dikir, ji wan
pirsî: «Bi t'exmîna cime'tê Ez
k'î me?» 19 Wana lê veger'and û
gotin: «Hinek dibêjin ‹Yûh'ennayê
nixumdar e›, hinekêd din dibêjin
‹Êlyas e›, hinekêd mayîn jî dibêjin
‹yek ji p'êxemberêd berê ye sax
bûye›». 20 Ewî ji wan pirsî: «Lê
hûn çi dibêjin? Bi t'exmîna we
Ez k'î me?» Petrûs lê veger'and
û got: «Tu Mesîhê Xwedê yî».

### Îsa derheqa cefa û mirina Xweda dibêje

*(Metta 16:20-28; Marqos 8:30–9:1)*

21 Hingê Îsa h’işk t’emî da wan,
ku wê yekê kesîr’a nebêjin. 22 Û ewî
got: «Kur’ê Mêriv gerekê gelekî
cefa bik’işîne, ji alîyê r’ûspîya,
serekêd k’ahîna û qanûnzanada
bê t’exsîrkirin û kuştinê, lê r’oja
sisîya wê ji mirinê r’abe».

### Xaçê[f] xwe hilde û li pey min were

23 Û Îsa h’emûyar’a got: «Heger
yek dixwaze li pey Min bê, bira
xwe înk’ar ke û her r’oj xaçê[f] xwe
hilde û li pey Min bê. 24 Çimkî k’î
ku dixwaze e’mirê xwe xilaz ke,
ewê unda ke û k’î ku e’mirê xwe
bona Min unda ke, ewê xilaz ke.
25 Çi feyde, heger meriv t’emamîya
dinyayê qazinc ke, lê e’mirê xwe
unda ke yan zirarê xe? 26 Û k’î Min
û xeberêd Min şerm h’esab ke, Ku-
r’ê Mêriv jî wê wî şerm h’esab ke,
gava Ew bi r’ûmeta Xwe, r’ûmeta
Bavê û milyak’etêd pîrozva bê.
27 Ez r’ast wer’a dibêjim, hinekêd
li vir sekinî wê mirinê nebînin,
h’eta ku P’adşatîya Xwedê bibînin».

### Şagirt Îsa nava nûr û r’ûmetêda dibînin

*(Metta 17:1-8; Marqos 9:2-8)*

28 Pey vê xeberdanêr’a weke h’ef-
têkê şûnda, Îsa Petrûs, Yûh’enna
û Aqûb hildan çûne serê ç’îyê ku
dua bikin. 29 Gava Îsa dua dikir,
r’engê r’ûyê Wî hate guhastinê,
k’incêd Wî çîl-qerqaş bûn, biriqîn.
30 Û va du meriva t’evî Wî xeber
didan, yek Mûsa bû, yek jî Êlyas.
31 Ewana bi r’ûmet k’ifş bûn û
bona mirina Wî xeber didan, ku
Orşelîmêda wê bibûya. 32 Ç’e’vêd
Petrûs û ewêd t’evî wî ji xewê
giran bibûn, lê gava h’işyar bûn,
r’ûmeta Wî û her du merivêd cem
Wî sekinî dîtin. 33 Çaxê ewana ji
Wî dûr k’etin, Petrûs Îsar’a got:
«Mamosta, çawa r’ind e ku em
vir in! De emê sê h’olika çêkin,
yekê Ter’a, yekê Mûsar’a û yekê
jî Êlyasr’a». Çimkî ewî nizanibû
ew çi dibêje. 34 Gava ewî hê xeber
dida, e’wrek hat û ser wan kire sî.
Û çaxê k’etine bin wî e’wrî, ewana
tirsîyan. 35 Û ji wî e’wrî dengek hat
û got: «Ev e Kur’ê Min, Bijartî-
yê Min[f]*! Guhdarîya Wî bikin!»
36 Gava ew deng hat, Îsa t’enê ma.

* 9:35 Nav hinek destnivîsarada dewsa «bijartî» «delalî» heye. Li gora Îşaya 42:1 Mesîh bijartîyê Xwedê ye.

Û wana dengê xwe bir’î, wan r’o-
jada çi ku dîtibûn kesîr’a negotin.

### Îsa kur’ikekî cinak’etî qenc dike

*(Metta 17:14-18; Marqos 9:14-27)*

37 R’oja dinê, gava ewana ji ç’î-
yê hatine xwarê, e’laleteke giran
pêşîya Wîda hat. 38 Hingê ji nav
e’laletê merivekî gazî kir û got:
«Dersdar, ez hîvî ji Te dikim, bi
ç’e’vê r’e’mê li kur’ê min binihêr’e.
Ew tayê minî t’enê ye. 39 R’uh’e-
kî xirab wî digire û nişkêva dike
qîr’în vediç’ir’ike, k’ef ser dik’eve
hûrdexweşî dibe û bi zorekê ji wî
dûr dik’eve. 40 Min lava ji şagirtêd
Te kir, ku cin jê derxin, lê wana
nikaribû». 41 Îsa got: «Nisilê nebawer
û xalifî[f]! H’eta k’engê Ezê t’evî we
bim û li we sebir kim? Kur’ê xwe
bîne vir». 42 Gava hê dihat, cin ew
e’rdê xist û veç’ir’ikî. Îsa li r’uh’ê
h’eram hilat, kur’ik qenc kir û da
bavê wî. 43 T’emamîya cime’tê ser
mezinayîya Xwedê zendegirtî mabû.

### Îsa dîsa derheqa mirina Xweda dibêje

*(Metta 17:22-23; Marqos 9:30-32)*

Û çaxê h’emû ser her tiştêd
ku Îsa dikirin e’cêbmayî mabûn,
Ewî şagirtêd Xwer’a got: 44 «Hûn
van xebera bîra xweda xwey kin:
Kur’ê Mêriv wê bik’eve destê
meriva». 45 Lê wana ev yek fe’m
nekir, çimkî ev ji wan veşartî bû
ku fe’m nekin û turuş nedikirin
jî bona wê yekê ji Wî bipirsîyana.

### K’î ye yê herî mezin?

*(Metta 18:1-5; Marqos 9:33-37)*

46 Nav şagirtada pirs pêşda
hat, ku nava wanda k’î ye yê herî
mezin. 47 Lê nêtêd dilê wan Îsava
e’yan bûn, zar’okek anî cem Xwe
da sekinandinê 48 û wanr’a got:
«K’î ku evê zar’okê bi navê Min
qebûl ke, ew Min qebûl dike. Û
k’î ku Min qebûl ke, Yê ku Ez
şandime qebûl dike. Awa ewî nava
we h’emûyada yê herî biç’ûk e,
ew e yê herî mezin».

### Yê ne miqabilî we ye, ew alîyê we ye

*(Marqos 9:38-40)*

49 Yûh’enna r’abû û got: «Ma-
mosta, me merivek dît ku bi navê
Te cin derdixistin, lê me kir ku em
nehêlin, çimkî ew pey me nayê».
50 Lê Îsa wîr’a got: «Pêşîyê li wî
negirin, çimkî ewê ku ne miqabilî
we ye, ew pişta we ye».

### Gundekî samerîya[f] Îsa qebûl nake

51 Û çaxê ew r’ojêd ku Îsayê
bihata hildanê nêzîk bûn, Ewî

berê Xwe da Orşelîmê, ku her'e
wir. **52** Û pêşîya Xwe merî şandin,
ewana çûne gundekî Sameryayê[f]
ku bona Wî hazirîyê bibînin. **53** Lê
samerîya[f] Ew li wir qebûl nekir,
çimkî berê Wî k'etibû Orşelîmê.
**54** Gava şagirtêd Wî Aqûb û Yû-
h'enna ev yek dît, gotin: «Xudan,
Tu dixwazî em ji e'zmên agir
bixwazin ku bibare û qir'a van
bîne?*»** **55** Lê Ew veger'îya, li
wan hilat*. **56** Û çûne gundekî din.

### Cabdarîya yêd ku pey Îsa diçin

*(Metta 8:19-22)*

**57** Û çaxê ewana r'êda bûn,
yekî Wîr'a got: «Tu k'uda jî her'î
ezê pey Te bêm». **58** Îsa gote wî:
«R'ûvîyar'a qul hene, teyredêd
e'zmênr'a jî hêlîn, lê bona Ku-
r'ê Mêriv cîk t'une ku serê Xwe
lê dayne». **59** Îsa yekî dinr'a got:
«Pey min were». Ewî jî got: «Xu-
dan! Îzinê bide min, ku ez pêşîyê
her'im bavê xwe defin kim». **60** Lê
Îsa wîr'a got: «Bira mirî mirîyê
xwe defin kin. Tu her'e P'adşatîya
Xwedê dannasîn ke». **61** Yekî din
jî got: «Ezê pey te bêm Xudan, lê
t'enê îzinê bide min, ku ez pêşîyê
xatirê xwe ji neferêd mala xwe
bixwazim». **62** Îsa got: «K'î ku
destê xwe datîne ser k'otanê û li
pişt xweva dinihêr'e, ew ne hêjayî
P'adşatîya Xwedê ye».

### Şandina h'eftê du şagirta

**10** **1** Pey vê yekêr'a Xudan
h'eftê du* şagirtêd din jî
k'ifş kirin û ewana dudu-dudu
pêşîya Xweva şandine wan cî û
bajara, k'îderê Xwexa wê biçûyayê
**2** û wanar'a got: «Nandirûn[f] gelek
e, lê p'ale hindik in. Awa hîvî ji
Xweyê nandirûnê bikin, wekî
p'ala nandirûna Xwer'a bişîne.
**3** Her'in, Ez va we mîna berxa
dişînime nava gura. **4** Xwer'a ne
k'îsik hildin, ne tûrik, ne jî çarixa.
Û r'êva silavê* nedine t'u kesî, **5** çi
mala ku hûn her'inê, pêşîyê bêjin:

---

* 9:54 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Çawa Êlyas kir».

** 9:54 P'adşatî IV, 1:9-16.

* 9:55 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Û got: ‹Hûn nizanin xweyê çi r'uh'î ne. Çimkî Kur'ê Mêriv nehat, ku r'uh'ê meriva unda ke, lê xilaz ke›».

* 10:1 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «H'eftê».

* 10:4 Aha tê fe'mkirinê: «R'êva nesekinin, wekî bi silavdayînê wextê xwe unda nekin».

‹E’dilayî vê malêr’a›. **6** Û heger li
wir merivekî hêjayî e’dilayîyê hebe,
e’dilayîya weyê li ser wî bimîne.
Lê heger t’unebe, wê li we veger’e.
**7** Û wê malêda bimînin, çi xwa-
rinê jî bidine we, ewê jî bixwin û
vexwin, çimkî p’ale hêjayî heqê
xwe ye. Û mal bi mal neger’in.
**8** K’îjan bajarê ku hûn her’inê û
we qebûl kin, çi daynine ber we,
bixwin. **9** Nexweşêd navda qenc
kin û wanr’a bêjin: ‹P’adşatîya
Xwedê nêzîkî we bûye›. **10** Lê ew
bajarê ku hûn her’inê û we qebûl
nekin, derêne meydana û bêjin:
**11** ‹Em wê t’oza ku ji bajarê we
nigêd meva girtîye jî li ser weda
dawdişînin. Lê vê yekê bizani-
bin ku P’adşatîya Xwedê nêzîkî
we bûye›. **12** Ez ji wer’a dibêjim,
R’oja[f] Axretê h’alê Sodomê[f] wê ji
ya wî bajarî çêtir be*.

## Bajarêd nebawer

*(Metta 11:20-24)*

**13** Wey li te Xorazîn! Wey li te
Beytsayda! Heger ew k’eremetêd
ku nava weda bûn, Sûr û Sayda-
yêda* bibûna, ewanayê zûva bi
k’urx[f] nav k’ozîyêda[f] r’ûniştî t’obe
bikirana. **14** Lê R’oja Axretê h’alê
Sûr û Saydayê wê ji h’alê we çêtir
be. **15** Û tu Kefernahûm, te t’irê
tê h’eta e’zmên bilind bî? Lê tê
h’eta dîyarê[f] mirîya her’î xwarê!
**16** Ewê guhdarîya we dike, guh-
darîya Min dike û ewê we t’exsîr
dike, Min t’exsîr dike, lê ewê Min
t’exsîr dike, yê ku Ez şandime
t’exsîr dike».

## Veger’andina h’eftê duda

**17** Ew h’eftê du şagirt bi eşq û şa
veger’îyan û gotin: «Xudan, cin
jî saya navê Te êlimî me dibûn».
**18** Ewî wanar’a got: «Min mîrêcin
dît, çawa birûska ji e’zmên jorda
k’etî. **19** Awa Min h’ukum daye we,
ku hûn me’r û dûp’işka û t’ema-
mîya qewata dijmin p’êpeskin û
qet t’u tiştê zirarê nede we. **20** Lê
bi wê yekê şa nebin ku cin êlimî
we dibin, lê şa bin, ku navêd we
li e’zmana nivîsar e».

## Şabûna Îsa

*(Metta 11:25-27; 13:16-17)*

**21** Wî çaxî Ew bi R’uh’ê Pîroz şa
bû û got: «Şikir navê Te be Bavo,
Xudanê e’rd û e’zman, ku Te ev

* 10:12 Destpêbûn 19.

* 10:13 Xorazîn û Beytsayda bajarêd cihûya bûn, lê Sûr û Sayda ew bajarêd necihûya bûn, awa gotî p’ûtp’arist bûn.

tişt ji zana û bîlana[f] veşartin û li
ber zar’a vekir. Belê Bavo, çimkî
aha li Te xweş hat. 22 Her tişt ji
Bavê Min Minr’a hatîye dayînê.
Kesek nizane Kur’[f] k’î ye, pêştirî
Bavê û kesek nizane Bav k’î ye,
pêştirî Kur’ û yêd ku Kur’ bixwaze
wanva Bavê bide naskirinê». 23 Û
wê gavê ser şagirtêd Xweda vege-
r’îya û wanar’a başqe got: «Xwezî
li wan ç’e’va, çi ku hûn dibînin
ew jî dibînin. 24 Çimkî Ez wer’a
dibêjim, ku gelek p’êxember û
p’adşa xwestin ew tiştêd ku hûn
dibînin bidîtana, lê nedîtin û ew
tiştêd ku hûn dibihên bibihîstana,
lê nebihîstin».

### Mesela samerîyê qenc

25 Hingê qanûnzanek r’abû Ew
cêr’iband û got: «Dersdar, ez çi
bikim, wekî jîyîna[f] h’eta-h’etayê
bistînim?» 26 Ewî jî wîr’a got:
«Qanûnêda çi nivîsar e? Tu çawa
dixûnî?» 27 Ewî lê veger’and û got:
«‹Xudan Xwedêyê xwe h’iz bike, bi
t’emamîya dilê[f] xwe, bi t’emamîya
canîya xwe, bi t’emamîya qewata
xwe û bi t’emamîya h’işê xwe›*,
‹hevalê xwe jî weke xwe h’iz bi-
ke›**». 28 Û Îsa wîr’a got: «Te r’ast
got. Usa bike û tê bijîyî». 29 Lê ewî
xwest xwe r’ast derxe, Îsar’a got:
«Hevalê min k’î ye?» 30 Îsa lê ve-
ger’and û got: «Merivek hebû, ew
ji Orşelîmê berjêrî Erîhayê dibû.
Ew k’ete destê qaçaxa û wana ew
te’zî kir, k’utan û nîvkuştî hiştin
çûn. 31 Usa qewimî ku k’ahînek
wê r’êda dihat. Gava ew dît, berr’a
derbaz bû çû. 32 Usa jî yekî lêwî[f]
hat, gihîşte wî cîyî, li wî nihêr’î,
berr’a derbaz bû çû. 33 Paşê r’êwîkî
samerî hat. Gava ew dît, gunê wî
lê hat. 34 Ew nêzîkî wî bû, bizir û
şerav li birînêd wî xistin, p’êç’a
û ew danî ser k’erk’edanê xwe
bire mêvanxanê û bona wî xem
kir. 35 R’oja dinê du zîv derxistin
dane xweyê mêvanxanê û got:
‹Xweyîtîyê li vî bike, tu çi jî ser wî
zêde xerc kî, gava ez veger’îyam,
ezê li te veger’înim›.

36 Niha t’exmîna te, ji wan her-
sêka k’îjan bû hevalê wî merivê
ku k’ete destê qaçaxa?» 37 Ewî jî
got: «Ewê ku gune lê anî». Îsa
wîr’a got: «Her’e tu jî usa bike».

### Îsa mala Mert’a û Meryemêda

38 Çaxê r’êk’etin çûn, Îsa k’ete
gundekî. K’ulfetek ku navê wê

* 10:27 Qanûna Ducarî 6:5.

** 10:27 Qanûna K’ahîntîyê 19:18.

Mert'a bû Ew bire mala xwe.
39 Xûşkeke wê jî hebû, navê wê
Meryem. Ewa ber nigêd Xudan
r'ûniştibû û guhdarîya xeberêd Wî
dikir. 40 Mert'a jî ku gelek t'ivda-
rekdîtinêva gîro bû, hat sekinî û
Îsar'a got: «Xudan, qet xema Te
nîne ku xûşka min nava vê t'iv-
darekdîtinêda ez t'enê hiştime?
Bêje wê ku alî min bike». 41 Xu-
dan lê veger'and û gotê: «Mert'a,
Mert'a, tu bona gelek tişta xema
dikî û t'evîhev dibî. 42 Lê t'enê
tiştek lazim e, ew p'ara qenc jî
Meryemê xwer'a bijart û ji wê
nayê standinê».

### Hînkirina bona duakirinê

*(Metta 6:9-13; 7:7-11)*

11 1 Carekê Îsa cîkî dua dikir,
gava xilaz kir, ji şagirtêd
Wî yekî jêr'a got: «Xudan, me
hînî duakirinê ke, çawa Yûh'en-
na şagirtêd xwe hîn kirin». 2 Ewî
wanar'a got: «Gava hûn dua dikin,
aha bêjin:

Bavo*,
Navê Te pîroz be.
P'adşatîya Te bê**.
3 Nanê meyî r'ojê r'oj bi r'oj bide
me.
4 Û gunêd me bibaxşîne,
çimkî em jî dibaxşînine h'emû
deyndarêd xwe
û me nebe cêr'ibandinê*».

5 Û wanar'a got: «Ji we k'îjan
e ku dostekî wî hebe û nîvê şevê
her'e mala wî jêr'a bêje: ‹Dosto,
sê nana deynî bide min. 6 Çimkî
pismamekî min ji r'ê dager'îya-
ye hatîye mala min, tiştekî minî
xwarinê t'une, ku daynime ber wî›.
7 Û ew jî hindur'da lê veger'îne û
bêje: ‹Derî îdî dada ye, ez û zar'êd
xweva jî nava cî-nivînada ne, ze'-
metê nede min, ez nikarim r'abim
bidime te›. 8 Ez wer'a dibêjim,
heger ew bona dostîyê jî r'anebe
nên nede wî, lê bona bêarzîya wî
wê r'abe çiqas jêr'a lazim be bide
wî. 9 Ez wer'a dibêjim, bixwazin
hûnê bistînin, biger'in hûnê bi-
bînin, derî xin wê ber we vebe.
10 Çimkî k'î ku dixwaze distîne,
k'î ku diger'e dibîne û k'î ku derî
dixe ber wî vedibe.

11 Ji we k'îjan e ew bav, ku kur'ê
wî me'sî bixwaze, dewsa me'sî

* 11:2 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Bavê meyî e'zmana».

** 11:2 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «E'mirê Te be, çawa li e'zmên usa jî li ser e'rdê».

* 11:4 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Lê me ji yê xirab xilaz ke».

me’r bidê*, 12 yan jî hêkê bixwaze,
dûp’işkê bidê? 13 Hûn ku xirab in,
zanin tiştêd qenc bidine zar’êd
xwe, lê Bavê e’zmana wê çiqas
zêde R’uh’ê Pîroz bide ewêd ku
ji Wî dixwazin».

### Îsa û Belzebûl[f]

*(Metta 12:22-30;*
*Marqos 3:20-27)*

14 Carekê Îsa cinê lal ji yekî
derdixist, çaxê ku cin derk’et, ewî
lal xeber da û e’lalet zendegirtî
ma. 15 Lê ji wan hineka got: «Ew
bi h’ukumê Belzebûlê[f] serwêrê
cina cina derdixe». 16 Hineka jî
Ew dicêr’iband, nîşanêd e’zmên
ji Wî dixwestin. 17 Lê nêtêd dilê
wan Îsava e’yan bûn û wanar’a got:
«Her p’adşatîya ku nava wêda t’ifaq[f]
t’unebe wê wêran be û mala ku
bêt’ifaqî bik’evê, ew mal namîne.
18 Hûn dibêjin, ku Ez bi h’ukumê
Belzebûl cina derdixim. Lê heger
mîrêcin nava xweda bêt’ifaq be,
p’adşatîya wî wê çawa bimîne?
19 Û heger Ez bi Belzebûl cina
derdixim, lê yêd ku pey we tên*
bi çi derdixin? Heger usa be, ewê
we lomek’ar kin. 20 Lê heger Ez
bi t’ilîya Xwedê cina derdixim,
wekî usa ye P’adşatîya Xwedê
gihîştîye we. 21 Çaxê yekî qewat bi
ç’ek xweyîtîyê mala xwe dike, t’u
tiştê wî zirar lê nabe. 22 Lê gava
yekî ji wî qewattir bê û wî bigire,
wê ew ç’ekê ku wî gumana xwe
dabû ser jê bistîne, hebûka wî jî
bela ke. 23 K’î ku ne t’evî Min e,
miqabilî Min e û k’î ku t’evî Min
t’op nake, bela dike.

### Veger’andina r’uh’ê h’eram

*(Metta 12:43-45)*

24 Çaxê r’uh’ê h’eram ji mêriv
dertê, cîyê bê av diger’e, ku r’ih’e-
tîyê bibîne û gava nabîne, dibêje:
‹Ez veger’ime wê mala xweye ku jê
derk’etime›. 25 Û gava tê, paqijkirî
û hevdayî dibîne. 26 Hingê diçe
h’eft cinêd dine ji xwe xirabtir jî
tîne, dik’evine wir dijîn. Û axirîya
wî merivî ji pêşîyê xirabtir dibe».

### Xwezilîya r’ast

27 Çaxê Îsa hê xeber dida, ji nava
e’laletê k’ulfetekê dengê xwe bilind
kir û Wîr’a got: «Xwezî li wî bet’i-
nî, ku Tu xweda xweykirî û wan
bistana, ku şîr dane Te». 28 Lê Ewî
got: «Hê xwezî li wan, yêd ku xe-
bera Xwedê dibihên û pêk tînin».

---

* 11:11 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Kur’ê wî nan jê bixwaze, kevir bidê?»
* 11:19 Aha jî tê fe’mkirinê: «Zar’êd we».

### K’eremetekê çawa nîşan dixwazin

*(Metta 12:38-42; Marqos 8:12)*

29 Çaxê e’lalet ser Wî dicivîya,
Îsa destpêkir û got: «Eva nisila
xirab e, nîşanekê dixwaze, lê jêr’a
nîşaneke din nayê dayînê pêştirî
nîşana Ûnis[f] p’êxember. 30 Çawa
Ûnis bona Nînewaya bû nîşan,
usa jî Kur’ê Mêriv wê vî nisilîr’a
bibe nîşan*. 31 P’adşa Başûrê[f] wê
R’oja Axretê t’evî merivêd vî nisilî
r’abe û wan neheq ke, çimkî ewa
ji serê dinê hat, ku serwaxtîya
Silêman[f] bibihê û va ye Yekî ji
Silêman mestir li vir heye*. 32 Me-
rivêd Nînewayê R’oja Axretê wê
t’evî vî nisilî r’abin û wan neheq
kin, çimkî ewana bi dannasînîya
Ûnis ji gunekirinê veger’îyan. Va
ye Yekî ji Ûnis mestir li vir heye.

### Ç’ira bedenê

*(Metta 5:15; 6:22-23)*

33 Kesek ç’irê vênaxe û danayne
cîyê xewle, ne jî dike binê firaqê,
lê datîne ser p’êç’irê, wekî ewê ku
dik’evine hindur’, r’onayê bibînin.
34 Ç’ira bedena te ç’e’vê te ye.
Heger ç’e’vê te p’ak e, t’emamîya
bedena teyê r’onayî be. Lê heger
ç’e’vê te xirab e, bedena teyê jî
te’rî be. 35 Awa haş ji xwe hebe,
dibe ku ew r’onaya nava teda te’rî
ye. 36 Heger t’emamîya bedena te
r’onayî ye û p’areke te’rî t’une,
h’emûyê jî r’onayî be, çawa ç’ira
bi şewqa xwe te r’onayî dike».

### Îsa fêrisî û qanûnzana neheq dike

*(Metta 23:1-36; Marqos 12:38-40; Lûqa 20:45-47)*

37 Gava xeberdana Xwe xilaz kir,
yekî fêrisî hîvî jê kir ku her’e t’evî
wî nan bixwe. Ew jî çû, li ser sifrê
r’ûnişt. 38 Gava fêrisî dît ku Ewî
pêşîya nanxwarinê li gora e’detê
dîn destêd Xwe neşûştin, zende-
girtî ma. 39 Lê Xudan wîr’a got:
«Awa hûn fêrisîya t’as û fîncana
r’ûyê dervava paqij dikin, lê dilê
we hindur’va bi timayê û xira-
bîyava t’ijî ye. 40 Bêfe’mno! Ewê
ku derva çêkir, hindur’ çênekir?
41 Awa bi çiva t’as û fîncanêd we
t’ijî ne, bi wan xwer’a xêra bikin
û her tiştê wer’a h’elal[f] be. 42 Lê
wey li we fêrisîya! Hûn dehekê[f]
pûngê[f], ce’t’rîyê[f] û h’emû p’inca-
r’a didin, lê heqîyê û h’izkirina

---

* 11:30 Ûnis 3.

* 11:31 P’adşatî III, 10:1-13.

Xwedê davêjine pişt guhê xwe.
We gerekê ev yek bikirana û dest
ji yêd mayîn nek'işanda. 43 Wey
li we fêrisîya, ku hûn k'inîştada
k'ursîyêd pêşin h'iz dikin, baza-
rada jî silava. 44 Wey li we! Hûn
mîna t'irbêd bê nav-nîşan in, ku
meriv ser wan diger'in û nizanin».
45 Ji qanûnzana yekî lê veger'and
û got: «Dersdar, Tu bi van xebera
me jî bêhurmet dikî». 46 Ewî got:
«Wey li we qanûnzana jî, çimkî
hûn barêd giran didine ser milê
meriva, lê t'ilîke xwe jî nadine
wan bara. 47 Wey li we, ku hûn
t'irbêd wan p'êxembera çêdikin,
yêd ku kal-bavêd we ew kuştine.
48 Bi wê yekê hûn şe'detîya xwe
didin, ku hûn havijîya xwe kiri-
nêd kal-bavêd xwe tînin. Ewana
p'êxember dikuştin û hûn t'irbêd
wan çêdikin. 49 Lema jî serwax-
tîya Xwedê got: ‹Ezê p'êxember
û şandîya bişînime cem wan, ji
wan hineka wê bikujin, hineka jî
bizêrînin›. 50 Bona vê yekê xûna
h'emû p'êxembera, ku ji wextê e'fi-
randina dinyayêda hatîye r'êtinê, ji
vî nisilî wê bê xwestinê, 51 ji xûna
Habîl[f] h'eta xûna Zekerîya, ya ku
nav gorîgehê[f] û p'aristgehêda hate
r'êtinê. Ez r'ast wer'a dibêjim, ji
vî nisilî wê bê xwestinê. 52 Wey li
we qanûnzana, ku we k'ilîta za-
nebûnê hildaye. Ne hûn k'etinê û
ne jî we hiştîye yêd ku dixwazin
bik'evinê». 53 Û gava Ew r'abû ku
her'e, qanûnzan û fêrisî qilqilîn,
bona gelek tişta Wîr'a k'etine
de'wê. 54 Û ber devê Wî sekinî
bûn, wekî bi xeberekê bikaribin
Wî bigirin û gunek'ar kin.

## Hînkirina derheqa dur'ûtîyêda

12 1 Wî çaxî, gava bi h'ezara
merî civîyan, usa ku ser
hevr'a derbaz dibûn, Ewî pêşîyê
destpêkir şagirtêd Xwer'a got:
«H'evza xwe ji hevîrtir'şkê[f] fêrisî-
ya bikin, Ez tînime ser dur'ûtîya
wan. 2 Tiştekî dizîva t'une ku
derneyê û ne jî veşartî ku k'ifş
nebe. 3 We çi te'rîyêda gotîye, ewê
r'onayêda bê bihîstinê û we çi li
malê guhada xeber daye, ewê ser
bana bibe dengî.

## Bizanibin ku tirsa we ji k'ê hebe

*(Metta 10:28-31)*

4 Ez we pismamêd Xwer'a di-
bêjim, ji wana netirsin, yêd ku
bedenê dikujin, ji wê pêştir tiştekî
din nikarin bikin. 5 Lê Ezê wer'a
bêjim, ku hûn ji k'ê bitirsin. Ji
Wî bitirsin, Yê ku pey kuştinê-
r'a jî h'ukumê Wî heye bavêje

ce'nimê[f]. Belê, Ez wer'a dibêjim
ji Wî bitirsin! 6 Ne pênc ç'ivîk bi
du diravêd çarqur'ûşê têne firo-
tanê? Lê Xwedê ji wan yekî jî bîr
nake. 7 Usa jî her t'êlekî p'or'êd
serê we jimartî ye. Netirsin, hûn
ji gelek ç'ivîka qîmettir in.

### Îqrar[f] û înk'arkirina Îsa

*(Metta 10:32-33; 12:32; 10:19-20)*

8 Ez wer'a dibêjim, k'î ku ber
meriva Min îqrar[f] ke, Kur'ê Mêriv
jî wê wî ber milyak'etêd Xwedê
îqrar ke. 9 Û k'î ku Min ber meriva
înk'ar ke, ewê jî ber milyak'etêd
Xwedê bê înk'arkirinê. 10 Û k'î ku
tiştekî miqabilî Kur'ê Mêriv bêje,
wê bê baxşandinê. Lê k'î ku goti-
neke xirab miqabilî R'uh'ê Pîroz
bêje, li wî nayê baxşandinê. 11 Û
gava we bibine k'inîşta yan ber
h'akim yan serwêrêd h'ukumetê,
hûn xem nekin ku hûnê çawa caba
xwe bidin yan çi bêjin. 12 Çimkî
R'uh'ê Pîroz ewê demê wê we
hîn ke, çi lazim e ku hûn bêjin».

### Dewletîyê bêfe'm

13 Ji nava e'laletê yekî Wîr'a got:
«Dersdar, bêje birê min, bira mî-
rat'a[f] bavê min minr'a p'areveke».
14 Ewî wîr'a got: «Heval, k'ê Ez
ser we h'akim yan jî p'arkir k'ifş
kirime?» 15 Û gote wan: «Haş ji
xwe hebin û h'evza xwe ji her cûr'e
timayê bikin, çimkî e'mirê însên
zêdebûna hebûka wîva girêdayî
nîne». 16 Ewî meselek jî wanr'a
got: «Zevîya merivekî dewletî
gelek ber da. 17 Û ewî dilê xweda
got: ‹Ez çawa bikim? Cî jî t'une
ku deremeta xwe têkimê›. 18 Û got:
‹Ezê aha bikim, e'mbarêd xwe
hilşînim û hê yêd mezin çêkim,
h'emû deremet û hebûka xwe jî
bikime wir. 19 Û xwexa xwer'a
bêjim: E'vdo! Te bona xwe t'êra
gelek sala, gelek hebûk daye ser
hev, r'ûnê bixwe, vexwe û şa be›.
20 Lê Xwedê gote wî: ‹Bêfe'mo! Îşev
r'uh'ê teyê ji te bê standinê. Ev
hebûka te berev kirîye wê k'êr'a
bimîne?› 21 Usa jî wê bê serê her
kesî, yê ku bona xwe xiznê t'op
dike û pê Xwedê dewletî nabe».

### Hînkirina derheqa xemkirinêda

*(Metta 6:25-34)*

22 Hingê Ewî şagirtêd Xwer'a
got: «Lema Ez wer'a dibêjim, bona
e'mirê xwe xema nekin, ku hûnê çi
bixwin, ne jî bona bedena xwe, ku
hûnê çi li xwe kin. 23 Çimkî e'mir
ji xwarinê qîmettir e û beden jî ji
k'inca. 24 Dîna xwe bidine qar'qa-
r'a[f], ne dir'eşînin, ne didirûn û ne
jî e'mbar yan k'îlerêd wan hene, lê

Xwedê r'isqê wan digihîne. Hûn
çiqasî ji teyreda qîmettir in! 25 Îdî ji
we k'î dikare bi xemêd xwe deqekê
ser e'mirê xweda zêde ke*? 26 He-
ger hûn wî tiştê herî biç'ûk nikarin
bikin, îdî çima bona tiştêd mayîn
xem dikin? 27 Dîna xwe bidine so-
sina, çawa şîn dibin, ne dixebitin
û ne dir'êsin. Ez wer'a dibêjim,
ku Silêman jî nava t'emamîya wê
xêr-xizna xweda mîna ji wan yekê
xwe nekir. 28 Heger gîhayê çolê, ku
îro heye û sibê davêjine nava êgir,
Xwedê usa dixemilîne, lê çiqas
zêde wê li we ke, kêmbawerno?
29 Li van tişta neger'in, ku hûnê
çi bixwin yan çi vexwin. Ber xwe
nek'evin. 30 Çimkî p'ûtp'aristêd[f]
dinyayê li pey wan h'emû tişta
dik'evin, lê Bavê we zane ku hûn
h'ewcê wan tişta ne. 31 Lê ber wêva
hûn li P'adşatîya Wî biger'in û ewê
wer'a bêne dayînê.

### Xizna e'zmana
*(Metta 6:19-21)*

32 Netirse, kerîyê pêzî biç'ûk!
Çimkî li Bavê we xweş hat, ku
p'adşatîyê bide we. 33 Hebûka
xwe bifiroşin û xwer'a xêra bikin.
Xwer'a k'îsikê ku nar'ize û xizna
e'zmanaye ku kêm nabe qazinc
kin. Li wê derê ne dizê nêzîk bê
û ne jî wê bizûzê bixwe. 34 Çimkî
xizna we k'îderê be, dilê weyê jî
li wê derê be.

### Xulamê h'işyar
*(Metta 24:45-51)*

35 Bira pişta we girêdayî û ç'i-
rêd we vêxistî bin. 36 Hûn mîna
wan meriva bin, yêd ku hîvîya
axayê xwe ne, ku ewê k'engê ji
de'watê veger'e, ku çaxê bê dêrî
xe, pêr'a-pêr'a r'abin dêrî vekin.
37 Xwezî li wan xulama, ku çaxê
axayê wan bê, wan h'işyar bibîne.
Ez r'ast wer'a dibêjim, ewê pişta
xwe girêde, wan ser sifrê bide
r'ûniştandinê û berdestîyê wanr'a
bike. 38 Û heger axayê wan nîvê şevê
yan jî berbanga sibehê bê û wan
usa bibîne, ew xulamana xwezilî
ne. 39 Lê hûn vê yekê bizanibin,
heger xweyê malê bizanibûya
ku dizê k'îjan sih'etê bihata, wê
nehişta ku mala wî derevekira.
40 Awa hûn jî hazir bin, çimkî ew
sih'eta ku dilê wer'a derbaz nabe,
Kur'ê Mêriv wê bê».

### Xulamê amin û xulamê bêamin

41 Petrûs got: «Xudan, eva me-
sela te t'enê bona me got yan

* 12:25 Aha jî tê fe'mkirinê: «Bihustekê li ser bejina xwe dirêj ke».

bona h'emûya?» 42 Xudan got:
«K'î ye ew wek'îlxercê[f] amin û
serwaxt, ku axayê wî, wê wî ser
xulamêd xwe serwêr k'ifş ke, ku
wextda xwarina wan bide wan.
43 Xwezî li wî xulamî, ku çaxê
axayê wî bê, ewî usa bibîne.
44 Ez r'ast wer'a dibêjim, ewê wî
bike serwêrê t'emamîya hebûka
xwe. 45 Lê heger ew xulam dilê
xweda bêje: ‹Axayê min hatina
xwe derengî dêxe› û destpêke li
xulam û carîya xe, bixwe, vexwe
û serxweş be, 46 axayê wî xula-
mî wê r'ojeke usa bê, ku ew ne
hîvîyê ye û sih'eteke usa, ku ew
nizane. Wê wî qet-qetî ke û p'ara
wî t'evî p'ara bêamina ke. 47 Û
ew xulamê ku xwestina axayê
xwe zane û k'arê xwe nake, ne
jî li gora xwestina wî dike, wê
gelekî bê k'utanê. 48 Lê ewê ku ji
nezanîya xwe tiştekî hêjayî k'u-
tanê dike, wê hindikî bê k'utanê.
K'êr'a gelek hatîye dayînê, gelek
jî wê jê bê xwestinê û k'êr'a gelek
hatîye spartinê[f], cabdarîya wî jî
wê gelek be.

### Îsa dibe sebebê cudebûnê

*(Metta 10:34-36)*

49 Ez hatim, wekî êgir bavêjime
ser dinê û Min çawa dixwest wekî
îdî alav bida. 50 Lê nixumandineke
Min heye, ku Ez gerekê pê bê-
me nixumandinê û dilê Min qet
ne r'ih'et e h'eta ku ew bê sêrî.
51 We t'irê Ez hatim e'dilayîyê
bidime dinê? Ez wer'a dibêjim
na, lê bona cudebûnê. 52 Ji vir
şûnda malekêda pênc merivê ji
hev cude bin, sisê wê miqabilî
duda bin, dudu miqabilî sisîya.
53 Bavê r'abe miqabilî kur', kur'
jî bavê, dê qîzê, qîz jî dê, xwesî
bûkê û bûk jî xwesîyê».

### Nîşanêd zemên

*(Metta 16:2-3; 5:25-26)*

54 Û Ewî e'laletêr'a jî got: «Çaxê
ji r'oavayê e'wr dertê, hûn dest-
xweda dibêjin: ‹Baranê bibare› û
usa jî dibe. 55 Û gava bayê başûrê
tê, hûn dibêjin: ‹Hewayê germ
be› û usa dibe. 56 Dur'ûno! Hûn
r'ûyê e'zmên e'nene dikin he-
wayê çawa be, lê çawa vî zemanî
e'nene nakin?

57 Hûn çima xwexa nadine li
ber h'esaba, ku k'îjan e r'ast?
58 Çaxê neyarê te te k'aşî cem
h'akim dike, usa bike, ku r'êva
t'evî wî li hev bêyî. Nebe ew te
bide destê h'akim, h'akim jî te
bide destê seresker û ew jî te ba-
vêje kelê. 59 Ez ter'a dibêjim, tu ji
wir t'u car dernak'evî h'eta polê[f]
paşin nedî».

### Ji gunekirinê veger’in[f], ku unda nebin

**13** [1] Wî çaxî hinek hatin bona
wan celîlîya Îsar’a gotin,
xûna k’îjana Pîlato t’evî xûna
qurbanêd[f] wan kiribû. [2] Îsa li wan
veger’and û got: «We t’irê ew ce-
lîlîyêd ku ev yek hate serê wan, ji
h’emû celîlîyêd mayîn gunek’ar-
tir bûn? [3] Ez wer’a dibêjim, na!
Lê belê heger hûn ji gunekirinê
veneger’in, hûn h’emûyê jî r’oja
wanda her’in. [4] Yan jî ew h’îjdeh
merivêd ku kela[f] Sîlwamê ser
wanda k’et mirin, we t’irê ewa-
na ji h’emû binelîyêd Orşelîmê
gunek’artir bûn? [5] Na! Ez wer’a
dibêjim, heger hûn ji gunekirinê
veneger’in, hûn h’emûyê jî r’oja
wanda her’in».

### Mesela dara hêjîrêye bê ber

[6] Ewî eva mesela jî got: «Merivek
hebû, nava r’ezê[f] tirîyê wîda dareke
hêjîrêye nikandî hebû. R’ojekê
ew hat, ku ser wê ber biger’e, lê
nedît. [7] Wî çaxî r’ezvanr’a got:
‹Eva muxdarê sê sala ye ez têm,
berê vê dara hêjîrê diger’im, lê
nabînim. Evê bibir’e! Badîhe-
wa[f] çima cî girtîye?› [8] R’ezvan
lê veger’and û got: ‹Axa, îsal jî
wê sebir ke. Ezê dora wê vedim
û p’eyn[f] bikimê. [9] Heger saleke
din ber bide, qenc e, lê heger
nede, paşê bibir’e›».

### R’oja şemîyê qenckirina k’ulfeta qoncikî

[10] R’ojeke şemîyê Îsa k’inîştekê-
da hîn dikir. [11] Li wir k’ulfeteke
qoncikî hebû, ku h’îjdeh salêd
wê bû, r’uh’ê nexweşîyê pêr’a
bû. Ewê qet nikaribû xwe r’ast
kira. [12] Gava Îsa ew dît, gazî wê
kir û gotê: «E’vdê! Tu ji nexwe-
şîya xwe aza yî!» [13] Û Ewî destêd
Xwe danîn ser wê, ew pêr’a-pêr’a
r’ast bû û şikirî dida Xwedê. [14] Lê
serwêrê k’inîştê hêrs k’et, ku Îsa
r’oja şemîyê nexweş qenc kir û
e’laletêr’a got: «Şeş r’oj bona
şixulkirinê hene, hûn nava wan
r’ojada dikarin bên qenc bin, ne
ku r’oja şemîyê». [15] Xudan lê ve-
ger’and û gotê: «Dur’ûno! Ji we
k’îjan r’oja şemîyê gayê xwe yan
k’era xwe ji afir’ venake û nabe
ser avê? [16] Ne eva jî qîza Birahîm
e, ku eva muxdarê h’îjdeh salêd
wê bûn, mîrêcin ew girêdabû. Ne
lazim bû ku ew r’oja şemîyê ji wê
qeydê vebûya?» [17] Û gava ev yek
got, h’emûyêd ku miqabilî Wî bûn
şermî man. Û t’emamîya e’laletê
bona wan k’eremetêd Wîye r’ûmetî
ku Wî dikirin şa dibû.

## Du meselêd li ser P'adşatîya Xwedê

*(Metta 13:31-33; Marqos 4:30-32)*

**18** Peyr'a Îsa got: «P'adşatîya
Xwedê mîna çi ye? Û Ez wê him-
berî çi kim? **19** Ew mîna h'ebeke
t'oximê xerdalê ye, ku merivekî
hilda baxçê xweda çand. Û gava
ew mezin bû, bû dar, teyredêd
e'zmên hêlînêd xwe ser ç'iqilêd
wê çêkirin».
**20** Ewî dîsa got: «Ez P'adşatîya
Xwedê himberî çi kim? **21** Ew mîna
hevîrtir'şk e, ku k'ulfetekê hilda
nava sê kod* arda stira, h'eta ku
h'emû hilat».

## Derê teng

*(Metta 7:13-14, 21-23)*

**22** Îsa gund û bajarar'a derbaz
dibû, hîn dikir û berbi Orşelîmê
diçû. **23** Yekî Wîr'a got: «Xudan,
gelo hindik in, ewêd ku wê xilaz
bin?» Ewî wanr'a got: **24** «Bice'dî-
nin, ku hûn derê tengr'a bik'evine
hindur', çimkî Ez wer'a dibêjim,
gelekê bixwazin bik'evinê û wê
nikaribin. **25** Û peyr'a, ku xweyê
malê r'abe derî bigire, hingê hûnê
derva bimînin û derî xin bêjin:
‹Em xulam, derî li me veke›. Ewê
li we veger'îne û bêje: ‹Ez niza-
nim hûn ji k'u ne›. **26** Hingê hûnê
bêjin: ‹Me t'evî Te xwar, vexwar
û Te k'ûçêd meda hîn dikir›.
**27** Lê Ewê bêje: ‹Ez wer'a dibêjim,
Ez nizanim ku hûn ji k'u ne. Ji
Min dûr k'evin, hûn h'emûyêd
ku neheqîyê dikin!› **28** Li wir wê
bibe girî û ç'irke-ç'irka dirana,
gava hûn Birahîm, Îshaq, Aqûb
û h'emû p'êxembera P'adşatîya
Xwedêda bibînin, xwe jî derva
avîtî. **29** Û wê ji r'ohilat-r'oavayê
û bakur[f]-başûrê bên, P'adşatîya
Xwedêda ser sifrê r'ûnên. **30** Awa
bizanibin ku hinekêd paş wê bibine
pêş û hinekêd pêş wê bibine paş».

## Îsa li ser Orşelîmê dilovîne

*(Metta 23:37-39)*

**31** Wê demê çend fêrisî hatin
û Wîr'a gotin: «R'abe ji vir he-
r'e, çimkî Hêrodes dixwaze Te
bikuje». **32** Û Ewî wanr'a got:
«Her'in wî r'ûvîyîr'a bêjin: ‹Va
Ez îro, sibê cina derdixim, ne-
xweşa qenc dikim û r'oja sisîya
Ezê bigihîjime meremê Xwe›.
**33** Lê gerekê Ez îro, sibê, dusibe
r'îya Xweda her'im, çimkî nabe

* 13:21 Sê kodêd cihûya[f] dikir qasî 25 kîlograma.

ku p’êxemberek ji Orşelîmê der
unda be. 34 Orşelîm! Orşelîm! Tu
ku p’êxembera dikujî û şandîyêd
cem xwe didî ber kevira. Çend
cara Min xwest ku zar’êd te usa
bicivanda, çawa mirîşk cûcûkêd
xwe bin baskêd xweda dicivîne,
lê te nexwest! 35 Va mala te wê
xirabe bimîne. Ez wer’a dibêjim,
îdî hûn Min t’u car nabînin, h’eta
ku hûn bêjin: ‹Bimbarek e Ewê
ku bi navê Xudan tê›*».

### Îsa li mala fêrisîda nexweşekî qenc dike

14 1 R’ojeke şemîyê Îsa bo-
na nanxwarinê çû mala
serwêrekî fêrisîya. Wana ç’e’vê
xwe ji ser Wî nedibir’î. 2 Li wir
pêşberî Wî merivekî bi nexweşîya
avzê[f] hebû. 3 Îsa ji qanûnzan û
fêrisîya pirsî û got: «R’oja şemî-
yê qenckirin cayîz e yan na?»
4 Wana dengê xwe nekir. Hingê
Ewî nexweş girt, qenc kir û ve-
r’êkir. 5 Paşê Ewî wanr’a got:
«Ji we k’îjan e, heger kur’ê* wî
yan gayê wî bik’eve bîrê, r’oja
şemîyê pêr’a-pêr’a dest nevêjê
dernexe?» 6 Nikaribûn caba vê
pirsa Wî bidana.

### Hînkirina derheqa yêd ku li navê xwe diger’in

7 Û gava Ewî dît, wekî merivêd
t’eglîfkirî çawa xwe cîyê jorin di-
girtin, meselek wanr’a got: 8 «Gava
yek te gazî de’watê dike, cîyê jorin
r’ûnenî, nebe ku yekî ji te qedir-
tir jî alîyê wîda t’eglîfkirî be, 9 û
xweyê de’watê, awa gotî t’eglîf-
kirîyê we her duya, bê ter’a bêje:
‹K’erema xwe cî bide filan kesê›.
Hingê tê ji şerma xwe r’abî cîyê
jêrin r’ûnêyî. 10 Lê çaxê te t’eglîf
dikin, her’e cîyê jêrin r’ûnê, ku
çaxê xweyê de’watê bê ter’a bêje:
‹Pismam, k’erem ke, derbazî jorê
be!› Hingê qedirê teyê ber ç’e’vê
h’emû r’ûniştîya bilind be. 11 Awa
her kesê ku xwe bilind ke, wê
nimiz be û k’î ku xwe nimiz ke,
wê bilind be».
12 Û Îsa t’eglîfkirîyê Xwer’a got:
«Çaxê tu firavînê yan şîvê datînî,
gazî heval-hogir, bira-pismam yan
jî der-cînarêd xweye dewletî neke,
nebe ew jî te t’eglîf kin û qencîya
te li te veger’înin. 13 Lê gava tu
xwarinekê datînî, gazî feqîr, seqet,
yêd dikulin û kora ke. 14 Hingê tê
xwezilî bî, çimkî ewana nikarin

* 13:35 Zebûr 118:26.
* 14:5 Nav hinek destnivîsarada dewsa «kur’» «k’er» heye.

qencîya te li te veger'înin, lê belê
R'oja[f] R'abûna r'astaye ji mirinê
wê li te bê veger'andinê».

### Mesela şayîya giran

*(Metta 22:1-10)*

15 Gava ji hazira yekî ev yek
bihîst, Wîr'a got: «Xwezî li wî, ku
P'adşatîya Xwedêda nên bixwe».
16 Lê Îsa wîr'a got: «Merivekî şayîke
giran hazir kir û gelek merî t'eglîf
kirin. 17 Gava wextê şayîyê pêr'a
gihîşt, ewî xulamê xwe şand, ku
h'emû t'eglîfkirîyar'a bêje: ‹Her
tişt îdî hazir e, k'erem kin werin›.
18 Lê her yekî destpêkir me'nî girt.
Yê pêşin wîr'a got: ‹Min xwer'a
e'rd k'ir'îye, ez e'seyî gerekê her'im
bibînim. Ez hîvî ji te dikim, min
bibaxşîne›. 19 Û yê din got: ‹Min
pênc cot ga k'ir'îne, ez diçim ku
wan bicêr'ibînim. Ez hîvî ji te di-
kim, min bibaxşîne›. 20 Yê sisîya jî
got: ‹Ez zewicîme, lema nikarim
bêm›. 21 Û ew xulam veger'îya
hat, ev h'emû axayê xwer'a gilî
kirin. Hingê axa hêrs k'et, xulamê
xwer'a got: ‹Zû her'e meydan û
k'ûçêd bajêr, feqîra, qopa, seqeta
û kora t'op ke bîne vir›. 22 Peyr'a
xulêm gotê: ‹Axayê min, te çawa
e'mir kir, min usa jî kir, lê dîsa
cî heye›. 23 Û axê xulêmr'a got:
‹Derk'eve serê r'ê û dirba, zorê
li her kesî bike bîne vir, ku mala
min t'ijî be. 24 Ez wer'a dibêjim,
ku ji wan merivêd t'eglîfkirî t'u
kes ji şayîya min wê tiştekî te'm
neke›».

### Çawa bibine şagirtê Îsa

*(Metta 10:37-38)*

25 Pey vê yekêr'a e'laleteke gi-
ran t'evî Îsa diçû û Ew ser wanda
veger'îya û got: 26 «Heger yek pey
Min bê û Min ji dê û bavê xwe,
ji jin û zar'êd xwe, ji xûşk û bira-
yêd xwe û usa jî ji xwe ze'ftir h'iz
neke, nikare bibe şagirtê Min.
27 Û k'î ku xaçê xwe hilnede pey
Min neyê, ew nikare bibe şagirtê
Min. 28 Ji we k'îjan e, ku bixwaze
bilindcîke nobedara çêke, pêşîyê
r'ûnenî nede ber h'esêb, gelo qe-
wata wîyê bigihîjê bîne sêrî[f] yan
na? 29 Nebe ku h'îmê wê dayne û
nikaribe bîne sêrî, yêd ku bibînin
lê bik'enin 30 û bêjin: ‹Evî merivî
destpêkir çêke û nikaribû banîya
sêrî›. 31 Yan jî k'îjan p'adşa p'ad-
şakîr'a derê şêr', pêşîyê r'ûnenî
neşêwire, gelo wê bikaribe bi dehe
h'ezara ber yekî ku bi bîst h'ezarî
tê ser wî bike şer'? 32 Heger ew pê
nikare, gava hê dûr e wê qasidê
xwe bişîne, bona lihevhatinê hîvî
jê bike. 33 Awa ji we her kes, k'î
ku destê xwe ji t'emamîya hebûna

xwe nek'işîne, ew nikare bibe
şagirtê Min.

### Xwêya bê te'm

*(Metta 5:13; Marqos 9:50)*

34 Xwê tiştekî qenc e. Lê he-
ger ew te'ma xwe unda ke, paşê
ewê bi çi te'mê bistîne? 35 Ne wê
dewsa xwelîyê bigire û ne jî dewsa
p'eyn. Wê bavêjine wêda. Guhê
k'êyî bihîstinê heye bira bibihê».

### Peza undabûyî

*(Metta 18:12-14)*

**15** 1 Awa h'emû xercgir û gu-
nek'ar nêzîkî Wî dibûn, ku
guhê xwe bidana ser gotinêd Wî.
2 Lê fêrisî û qanûnzana bîna xwe
teng dikir û digotin: «Eva gune-
k'ara qebûl dike û t'evî wan nan
dixwe». 3 Û Îsa eva mesela wanr'a
got: 4 «Ji we k'î ye ew merî, ku
sed pezêd wî hebin û gava yekî
ji wan unda ke, nod neha çol û
besta nehêle û pey ya undabûyî
nek'eve, h'eta ku wê bibîne? 5 Û
gava bibîne, wê ji şabûna dayne
ser milê xwe, 6 veger'e malê,
gazî der û cînara ke û wanr'a
bêje: ‹T'evî min şa bin! Min peza
xweye undabûyî dît›. 7 Ez wer'a
dibêjim, usa jî li e'zmên bona
gunek'arekî ku t'obe dike, hê
wê bibe şabûneke mezin, ne ku
bona nod nehêd r'ast, k'îjanar'a
t'obekirin ne h'ewce ye.

### Zîvê undabûyî

8 Yan k'îjan e ew k'ulfeta ku
dehe zîvêd wê hebin û gava yekî
ji wan unda ke, wê ç'irê vênexe,
malê gêzî neke û qenc lê nager'e,
h'eta ku zîvê xwe bibîne? 9 Û çaxê
ew bibîne, wê gazî der û cînara ke
û wanr'a bêje: ‹T'evî min şa bin!
Min zîvê xweyî undakirî dît›. 10 Ez
wer'a dibêjim, usa jî milyak'etêd
Xwedê bona gunek'arekî ku t'obe
dike, şa dibin».

### Kur'ê undabûyî û birê wî

11 Û Îsa got: «Du kur'êd merivekî
hebûn. 12 Yê biç'ûk gote bavê xwe:
‹Bavo, ji hebûka xwe çi ku p'ara
min dik'eve, bide min›. Û ewî
wanar'a hebûk p'arevekir. 13 Pey
çend r'ojar'a kur'ê biç'ûk her tiştê
xwe t'op kir çû welatekî dûr. Li wir
ewî e'mirê toltîyê derbaz kir, h'emû
hebûka xwe p'ûç' kir. 14 Û gava tiş-
tek dêstda nema, wî welatîda jî bû
xelayîke mezin û ew k'ete h'alekî
giran. 15 Çû xwe li bajarvanekî wî
welatî girt û ewî ew şande k'ewşên
ber beraza. 16 Ew h'ewce bû ku zikê
xwe bi wan xirnûfêd[f] ku beraza
dixwar t'êr bikira, lê kesekî ew jî
nedida wî. 17 Lê gava ew ser h'işê

xweda hat, got: ‹Çiqas p’ale mala
bavê minda hene, ku nan dixwin û
ber wan dimîne, lê ez vira bir’çîna
dimirim. **18** Ez r’abim her’ime cem
bavê xwe û wîr’a bêjim: Bavo, min
ber te û e’zmên gune kir. **19** Ez îdî
ne hêjayî kur’tîya te me. T’enê
mîna p’alekî xwe min qebûl ke›.
**20** Û r’abû hate cem bavê xwe. Lê
gava hê dûrva bavê ew dît, dilê
wî ser şewitî, berbi wî bezî, ew
h’emêz kir û r’amûsa. **21** Kur’ jêr’a
got: ‹Bavo, min ber te û e’zmên
gune kir. Ez îdî ne hêjayî kur’tîya
te me›. **22** Lê bavê xulamêd xwe-
r’a got: ‹Zû bikin, çuxê lapî r’ind
bînin lê kin, gustîlê têkine t’ilîyê
û sola jî bikine niga. **23** Canegayê
dermalîkirî bînin, serjêkin, em
bixwin û şa bin. **24** Çimkî ev kur’ê
min mirî bû, sax bû, undabûyî bû,
hate dîtinê›. Û dest bi şayîyê kirin.

**25** Wî çaxî kur’ê wîyî mezin li
k’ewşên bû. Gava hat nêzîkî malê
bû, dengê stiran û r’eqasê bihîst.
**26** Ewî gazî ji xulama yekî kir û jê
pirsî: ‹Ev çi h’ewal e?› **27** Xulêm
wîr’a got: ‹Birê te hatîye, bavê te
canegayê dermalîkirî serjêkirîye,
çimkî ew sax û silamet veger’îyaye›.
**28** Bira hêrs k’et û nexwest ku her’e
hindur’. Bav derk’ete derva, lava
wî kir. **29** Ewî li bavê xwe veger’and
û got: ‹Eva muxdarê çend sala ne
ku ez ter’a xulamtîyê dikim û ji
gur’a te qet dernek’etime, te qet
karek jî nedaye min ku min t’evî
heval-hogirêd xwe k’êf bikira. **30** Lê
gava ew kur’ê teyî ku hebûka te bir,
t’evî qava[f] p’ûç’ kir hat, te bona
wî canegayê dermalîkirî serjêkir›.
**31** Bavê jêr’a got: ‹Lawo, tu her gav
t’evî min î û h’emû hebûka min ya
te ye. **32** Gerekê em eşq û şa bûna,
çimkî ev birê te mirî bû, sax bû û
undabûyî bû, hate dîtinê›».

## Wek’îlxercê[f] bêamin, lê serwaxt

**16** **1** Îsa şagirtêd Xwer’a got:
«Merivekî dewletî hebû,
wek’îlxercekî wî hebû. R’ojekê
gilî gihîşte wî, yançîye[f] wek’îl-
xercê wî hebûka wî p’ûç’ dike.
**2** Ewî jî gazî wî kir û gotê: ‹Ev
çi yek e ku ez bona te dibihêm?
Heq-h’esabê wek’îlxerctîya xwe
bide, çimkî îdî tu nikarî wek’îl-
xerctîyê bikî›. **3** Wek’îlxerc dilê
xweda got: ‹Ez çi bikim? Axayê
min ji wek’îlxerctîyê min der-
dixe, e’rdk’olan li min nabe, ji
p’arskirinê jî şerm dikim. **4** Ez
zanim ezê niha çi bikim, ku malêd
xweda min qebûl kin, gava ez ji
wek’îlxerctîyê derk’evim›. **5** Ewî
yek-yek gazî deyndarêd axayê xwe
kir û yê pêşinr’a got: ‹Tu çiqasî

deyndarê axayê min î?› **6** Ewî got:
‹Sed k’ûp* bizirê zeyt’ûnê› û wî-
r’a got: ‹Han nivîsara xwe hilde
û zû r’ûnê binivîse pêncî›. **7** Paşê
yê dinr’a got: ‹Tu çiqasî deyndar
î?› Ewî jî got: ‹Sed ç’e’l* genim› û
wîr’a got: ‹Han nivîsara xwe hilde
û binivîse h’eyştê›. **8** Û axa pesinê
wek’îlxercê bêamin da, wekî ewî
bi aqilî kir. Awa merivêd vê dinê
hindava xweda ji merivêd r’onayê
serwaxttir in. **9** Ez wer’a dibêjim,
hûn bi hebûka vê dinê hevala
xwer’a dest xin û gava hebûk kêm
be, we bin konêd h’eta-h’etayêda
qebûl kin. **10** Ewê ku nava tiştêd
hindikîda amin e, nava tiştêd
gelekîda jî amin e, lê ewê ku nava
tiştêd hindikîda bêamin e, nava
tiştêd gelekîda jî bêamin e. **11** He-
ger hûn nava hebûka vê dinêda
bêamin bûn, k’ê wê hebûka r’ast
bide we? **12** Heger hûn nav tiştê
yê xerîbda amin nîbin, ya we k’ê
wê bide we? **13** Xulamek nikare
du axar’a xulamtîyê bike, çimkî
yan wê h’îlê wî ji yekî her’e û yê
dinê h’iz bike, yan jî wê qedirê
yekî bigire û yê dinê bêhurmet
ke. Hûn nikarin hin Xwedêr’a,
hin jî hebûkêr’a xulamtîyê bikin».

### Qanûn û P’adşatîya Xwedê

*(Metta 11:12-13; 5:31-32;*
*Marqos 10:11-12)*

**14** Gava fêrisîya ev h’emû tişt
bihîstin, qerfê xwe li Îsa dikirin,
çimkî p’ereh’iz bûn. **15** Îsa wanr’a
got: «Hûn ew in yêd ku xwe ber
meriva r’ast didine k’ifşê, lê Xwe-
dê dilê we zane. Bizanibin ku ew
tiştê nav merivada xweyîqedir e,
ew li ber Xwedê h’eram[f] e. **16** Ze-
manê Qanûn û p’êxembera h’eta
Yûh’enna k’işand, ji wir şûnda
P’adşatîya Xwedê tê dannasînki-
rinê û her kes dice’dîne bi qewatê
bik’eve wir. **17** Lê e’rd û e’zmanê hê
r’ih’et derbaz bin, ne ku ji Qanûnê
noktek unda be. **18** K’î ku jina xwe
ber’de û yeke din bistîne, zinêk’a-
rîyê dike. Û k’î ku ya mêrber’dayî
distîne, zinêk’arîyê dike.

### Merivê dewletî û Lazarê feqîr

**19** Merivekî dewletî hebû, ku
k’incê r’ewş û nazik* li xwe dikir û

* 16:6 K’ûpekî cihûya qasî 35 lîtir av hildida.
* 16:7 Ç’e’leke cihûya qasî h’ewzekî 390 lîtirî bû.
* 16:19 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «K’incê şîrk[f] û k’itanê xas», ku hingê gelekî biha bûn.

her r’oj bi eşq-şa k’êf dikir. 20 Me-
rivekî feqîr jî hebû, navê wî Lazar.
Ew nava p’izikêd p’îsda ber derê
yê dewletî k’etî bû. 21 Û ç’e’vê wî
bermayîyê sifra dewletîda dima, ku
dixwest kurmê xwe pê bişkênanda.
Se jî dihatin, birînêd wî dalastin.
22 R’oj hat feqîr mir, milyak’eta ew
birine cem Birahîm. Yê dewletî jî
mir, defin kirin. 23 Gava yê dewletî
dîyarê mirîyada cefa dik’işand, serê
xwe bilind kir, ji dûrva Birahîm
dît û Lazar h’emêzêda. 24 Ewî
deng dayê û gotê: ‹Bavê Birahîm,
li min were r’e’mê. Lazar bişîne,
ku serê t’ilîya xwe avêda ke bîne
zarê min şil ke, çimkî ez k’ûra vî
agirîda dişewitim›. 25 Lê Birahîm
gotê: ‹Lawo! Bîne bîra xwe, ku te
qencîyêd p’ara xwe nav zemanê
e’mirê xweda standine, lê Lazar
zelûlî k’işandîye. Niha jî dilê wî
li vir r’ih’et e, lê tu nava cefada
yî. 26 Û pêştirî vê yekê jî, gelîkî
bêbinî nava me û weda heye. Ne
yê vir dikarin derbazî cem we bin,
ne jî yê wir dikarin derbazî cem
me bin›. 27 Hingê ewî gotê: ‹Bavo,
wekî usa ye, ez hîvî ji te dikim, tu
ewî bişîne mala bavê min, 28 çimkî
pênc birayêd min jî hene, bira her’e
t’emîyê bide wan, wekî ew jî neyêne
vî cîyê cefa›. 29 Lê Birahîm gotê:
‹Mûsa û p’êxemberêd wan hene.
Bira guhdarîya wan bikin›. 30 Ewî
jî got: ‹Na, bavê Birahîm, heger
ji mirîya yek her’e cem wan, wê
ji gunekirinê veger’in›. 31 Hingê
Birahîm wîr’a got: ‹Heger guh-
darîya Mûsa û p’êxembera nakin,
yek ji mirîya r’abe jî, dîsa ewana
bawer nakin›».

### Çend gotinêd Îsa derheqa gunekirinê, baxşandinê, bawerkirinê û borcdayînêda

*(Metta 18:6-7, 21-22; Marqos 9:42)*

# 17

1 Îsa şagirtêd Xwer’a got:
«Nabe ku sebebîya jir’êk’e-
tinê t’unebe, lê wey li wî, ku bibe
sebebê vê yekê. 2 Wîr’a hê qenc e,
ku beraşek stûyê wîva bê girêdan
û avîtinê nava be’rê, ne ku ji vanêd
biç’ûk yekî ji r’ê derxe. 3 Haş ji xwe
hebin! Heger birê te guna bike, lê
hilê, heger ser kirina xwe p’oşman
be, wî bibaxşîne. 4 Û heger nava
r’ojêda h’eft cara neheqîyê li te
bike û veger’e, ter’a bêje: ‹Ez t’obe
dikim›, wî bibaxşîne».

5 Şandîya Xudanr’a got: «Ba-
werîya me zêde ke». 6 Xudan got:
«Heger bawerîya we weke h’ebeke
t’oximê xerdalê hebe û vê dara t’û-
têr’a bêjin: ‹Ji vir r’abe û be’rêda
daç’ike›, ewê ya we bike.

7 Ji we k’îjan e, ewê ku xula-
mekî wîyî cotk’ar yan şivan hebe,

gava ew ji k'ewşên bê, wîr'a bêje:
‹Bilezîne k'erem ke ser sifrê›?
8 Wê pêşîyê jêr'a nebêje: ‹Şîva
min hazir ke, pişta xwe girêde
û berdestîyê minr'a bike. Ez bi-
xwim û vexwim, paşê jî tu bixwe
û vexwe›? 9 Gelo bona ew tiştêd
ku xulêmr'a hatine e'mirkirinê û
wî kirine, axayê wî wê jêr'a bêje:
‹Ze'f r'azî me›? 10 Usa jî hûn,
gava ew h'emû tiştêd ku wer'a
hatine e'mirkirinê bikin, bêjin:
‹Em xulamêd bêkêr in. Çi ku li
me dik'et, me ew kir›».

### Qenckirina dehe k'otîya

11 Gava Îsa berbi Orşelîmê di-
çû, nava Sameryayê û Celîlêr'a
derbaz dibû. 12 Çaxê Ew dik'ete
gundekî, dehe merivêd k'otî r'astî
Wî hatin dûr sekinîn 13 û bi dengê
bilind gotinê: «Îsayê mamosta,
li me were r'e'mê». 14 Û gava Îsa
ew dîtin, wanr'a got: «Her'in xwe
nîşanî k'ahîna kin». Û çaxê ew hê
diçûn, paqij bûn. 15 Lê gava ji wan
yekî dît ku ew paqij bûye, paşda
veger'îya, bi dengekî bilind şikirî
dida Xwedê. 16 Ewî xwe dever'û
avîte ber nigêd Îsa û r'azîbûn dida
Wî. Ew samerî bû. 17 Hingê Îsa
got: «Ne her dehe jî paqij bûn, lê
k'anê ne her nehêd din? 18 Çima
pêştirî evî merivê xerîb kesek ji
wan veneger'îya, ku bihata şikirî
bida Xwedê?» 19 Û wîr'a got: «R'abe
her'e. Bawerîya te tu qenc kirî».

### Hatina P'adşatîya Xwedê

*(Metta 24:23-28, 37-41)*

20 Gava fêrisîya ji Îsa pirsî, P'ad-
şatîya Xwedê wê k'engê bê, Ewî li
wan veger'and û got: «P'adşatîya
Xwedê aşkere nayê. 21 Ne jî wê bê-
jin: ‹Va ye vir e!› yan jî: ‹Wê dera
han e!› Çimkî P'adşatîya Xwedê
nava weda ye». 22 Û şagirtêd Xwe-
r'a got: «Wê r'ojê bên, ku hûnê
h'izreta r'ojeke Kur'ê Mêriv bin,
lê nabînin. 23 Û heger wer'a bêjin:
‹Va ye vir e!› yan: ‹Dera han e!›
pey nek'evin neçin. 24 Çimkî çawa
birûsk ji alîkî e'zmên birq dide û
t'emamîya e'zmên r'onayî dike,
Kur'ê Mêriv jî wê r'oja xweda usa
be. 25 Lê pêşîyê gerekê Ew gele-
kî cefa bik'işîne û ji vî miletî bê
t'exsîrkirinê. 26 Çawa r'ojêd Nuhda
diqewimîn, usa jî wê r'ojêd Kur'ê
Mêrivda biqewimin. 27 Hingê di-
xwarin, vedixwarin, dizewicîn û
mêr dikirin, h'eta wê r'oja ku Nuh
k'ete gemîyê, lêyî r'abû qir'a h'e-
mûya anî*. 28 Û usa jî çawa r'ojêd

* 17:27 Destpêbûn 6-8.

Lûtda[f] bûn, dixwarin, vedixwarin,
dik'ir'în, difirotin, dir'eşandin û
çêdikirin. **29** Lê ew r'oja ku Lût ji
Sodomê derk'et, agir û k'irk'ût[f] ji
e'zmên barî, qir'a h'emûya anî*.
**30** Ew r'ojê jî wê usa be, gava Kur'ê
Mêriv k'ifş be.

**31** Wê r'ojê k'î ser xênî ye û
hebûka wî jî malda ye, bira jor-
da neyê, ku tiştekî hilde û ewê li
k'ewşên e, bira paşda veneger'e.
**32** Jina Lût bînine bîra xwe*. **33** K'î
ku dixwaze e'mirê xwe xilaz ke,
wê unda ke, lê k'î ku e'mirê xwe
unda ke, wê xilaz ke. **34** Ez wer'a
dibêjim, wê şevê heger du merî
nivînekêda bin, yekê bê hildanê,
yekê bê hiştinê. **35** Û heger du
k'ulfet ser destar'ekî bin, yekê
bê hildanê û ya din bê hiştinê»*.
**37** Wana lê veger'and û gotin: «Xu-
dan, evê li k'îderê bibe?» Ewî ji
wanr'a got: «Beret'e[f] li k'u hebe,
teyrê jî li wir bicivin».

## Mesela jinebîyê û h'akim

**18** **1** Îsa meselek bona wê ye-
kê şagirtar'a got, wekî her
gav dua bikin û aciz nebin **2** û got:
«Bajarekîda h'akimek hebû, ew ne
ji Xwedê ditirsîya û ne jî minet ji
mêriv dikir. **3** Wî bajarîda jinebîk
jî hebû, her gav dihate cem wî û
digot: ‹Heqîyê bike, min ji destê
neyarê min xilaz ke›. **4** H'akim
gelek wext guh nedida wê, lê paşê
xwexa xwer'a got: ‹Ez ji Xwedê
natirsim û ji mêriv jî minetê na-
kim, **5** lê bona xatirê wê yekê, ku
eva jinebîya tê ze'metê dide min,
ezê heqîyê jêr'a bikim, ku her gav
neyê min aciz neke›». **6** Û Xudan
got: «Bibihên ku h'akimê ner'ast
çi got. **7** Gelo Xwedê jî bijartîyêd
Xwer'a wê heqîyê neke, yêd ku şev
û r'oj hewara xwe Wî datînin? Yan
Ewê caba wan derengî bêxe? **8** Ez
wer'a dibêjim, wê destxweda heqî-
yê bike. Lê gava Kur'ê[f] Mêriv bê,
gelo ser dinê wê bawerîyê bibîne?»

## Mesela fêrisî û xercgir

**9** Ev mesele jî wanr'a got, yêd ku
xwexa xweda guman bûn, yançîye
ewe r'ast in û h'emûyêd mayîn ber
tiştekî h'esab nedikirin. **10** «Du
merî hilk'işîyane p'aristgehê, ku
dua bikin. Yek fêrisî bû, yek jî

* 17:29 Destpêbûn 19.
* 17:32 Destpêbûn 19:23-26.
* 17:35 Nav hinek destnivîsarada r'êza 36-a jî heye: «Û heger du meriv li k'ewşên bin, yekê bê hildanê û yê dinê bê hiştinê».

xercgir. 11 Ewê fêrisî t’enê seki-
nîbû xweda guman bi vî cûr’eyî
dua dikir: ‹Xwedêyê min, şikirdar
im, ku ez ne mîna wan meriva
me, yêd ku t’alanîyê, neheqîyê,
zinêk’arîyê dikin û ne jî mîna
vî xercgirî me. 12 Lê ez h’eftîyê
du cara r’ojî digirim û dehekê ji
h’emû k’ara xwe jî didim›. 13 Lê
ewî xercgir dûr sekinîbû, r’ûyê wî
nedigirt li e’zmên jî binihêr’îya,
sîngê xwe dixist û digot: ‹Xwedê,
li min gunek’arî were r’e’mê›.
14 Ez wer’a dibêjim, ku ev xercgira
r’asth’esabbûyî[f] çû mala xwe, ne
ku yê din. Awa her kesê ku xwe
bilind ke, wê nimiz be, lê k’î ku
xwe nimiz ke, wê bilind be».

### Îsa dua zar’oka dike

*(Metta 19:13-15;*
*Marqos 10:13-16)*

15 T’ifal jî anîne cem Îsa, ku destê
Xwe dayne ser wan. Gava şagirta ev
yek dît, li yêd danîn hilatin. 16 Lê
Îsa gazî zar’oka kir û got: «Bira ew
zar’ok bêne cem Min, pêşîya wan
negirin, çimkî P’adşatîya Xwedê
p’ara yêd aha ye. 17 Ez wer’a r’ast
dibêjim, k’î P’adşatîya Xwedê mîna
zar’okekê qebûl neke, ew t’u car
nak’eve nava wê».

### Serwêrekî cihûyayî dewletî li jîyîna h’eta-h’etayê diger’e

*(Metta 19:16-30;*
*Marqos 10:17-31)*

18 Serwêrekî ji Wî pirsî û got:
«Dersdarê qenc, ez çi bikim, we-
kî jîyîna h’eta-h’etayê war bim?»
19 Îsa wîr’a got: «Tu çima Minr’a
dibêjî qenc? Qenc t’enê Xwedê
ye, pêştirî Wî kesekî din t’une.
20 Tu t’emîya zanî: ‹Zinêk’arîyê
neke, nekuje, nedize, şe’detîya
derew nede, qedirê dê û bavê
xwe bigire›*». 21 Ewî jî got: «Ev
h’emû jî min ji cahiltîya xweda
xwey kirine». 22 Gava Îsa ev yek
bihîst, wîr’a got: «Tiştekî te hê
kêm e, her tiştê xwe bifiroşe,
belayî feqîra ke, hingê xizna te
wê li e’zmana hebe. Û pey Min
were». 23 Gava ewî ev yek bihîst,
eşqa wî şkest, çimkî gelekî dewletî
bû. 24 Îsa dît ku beşera wî nexweş
e, got: «Çiqasî ze’met e bona yêd
xweyîhebûk ku bik’evine P’adşatîya
Xwedê. 25 Deve wê qula derzîyêr’a
hê r’ih’et derbaz be, ne ku dew-
letî bik’eve P’adşatîya Xwedê».
26 Ewêd ku dibihîstin, gotin: «Îdî
k’î dikare xilaz be?» 27 Û Îsa got:
«Ew tiştê ku ji destê mêriv nayê,

* 18:20 Derk’etin 20:12-16; Qanûna Ducarî 5:16-20.

Xwedê dikare bike». **28** Petrûs got:
«Awa me her tiştêd xwe hiştine û
pey Te hatine». **29** Ewî wanr'a got:
«Ez r'ast wer'a dibêjim, her kesê
ku bona P'adşatîya Xwedê mal,
yan jin û zar', yan xûşk û bira,
yan dê û bav hiştibe, **30** wê vê dinê
hê zêde bistîne û dinya dinda jî
jîyîna h'eta-h'etayê».

### Îsa cara sisîya derheqa mirina xweda dibêje

*(Metta 20:17-19;*
*Marqos 10:32-34)*

**31** Ewî her donzdeh dane alîkî û
wanr'a got: «Bibihên! Em hevraz
diçine Orşelîmê û h'emû tiştêd ku
bi destê p'êxembera bona Kur'ê
Mêriv hatine nivîsarê, wê bêne
sêrî. **32** Ewê bik'eve destê necihûya,
wê qerfê xwe lê bikin, bêhurmet
kin, t'ûkinê, **33** bidine ber qamçî-
ya, Wî bikujin. Û r'oja sisîya wê ji
mirinê r'abe». **34** Şagirta t'u tişt ji
van xebera fe'm nekirin. Ev yek
ji wan veşartî bû û ev gotin serê
wanda r'ûnedinişt.

### Îsa p'arskirekî kor bajarê Erîhayêda qenc dike

*(Metta 20:29-34;*
*Marqos 10:46-52)*

**35** Gava Ew nêzîkî Erîhayê bû,
yekî kor li ser r'ê r'ûniştî p'ars
dikir. **36** Û gava bihîst ku e'lalet
ber wîr'a derbaz dibe, pirsî: «Ev
çi h'ewal e?» **37** Wîr'a gotin: «Îsayê
Nisretê derbaz dibe». **38** Hingê ewî
kire qîr'în û got: «Îsa, Kur'ê Da-
wid[f], li min were r'e'mê!» **39** Û yê
ku pêşîyê diçûn, li wî hilatin, ku
dengê xwe bibir'e, lê ewî hê dikire
qîr'în: «Kur'ê Dawid, li min were
r'e'mê!» **40** Îsa cîda sekinî û e'mir
kir, ku ewî bînine cem Wî. Û ga-
va kor nêzîkî Wî bû, ji wî pirsî û
got: **41** «Tu çi ji Min dixwazî ku Ez
bona te bikim?» Ewî got: «Xudan,
dixwazim ç'e'vêd min bibînin».
**42** Û Îsa wîr'a got: «Bira bibînin,
bawerîya te tu qenc kirî!» **43** Û
destxweda ç'e'vêd wî dîtin, da
pey Îsa çû û şikirî dida Xwedê.
T'emamîya wê cime'tê ku ev yek
dît, pesinê Xwedê didan.

### Îsa û xercgir

**19** **1** Îsa k'ete Erîhayê û wê-
r'a derbaz dibû. **2** Li wir
merivekî dewletî hebû, serwêrê
xercgira, navê wî Zexayo. **3** Ewî
dikir ku Îsa bidîta k'a Ew k'î ye, lê
dest e'laletê nikaribû bidîta, çimkî
bejinêda kin bû. **4** Ew pêşda bezî
r'abû ser dareke hêjîrêye stirîn,
wekî Îsa bibîne, çimkî Ewê hema
li wirr'a derbaz bibûya. **5** Û çaxê
Îsa hate wî cîyî, li jor nihêr'î û

gote wî: «Zexayo! Zû bike ji wir
were xwarê, çimkî Ez gerekê îro
mala teda bimînim». 6 Zexayo le-
zand jorda hate xwarê û bi eşq-şa
Ew qebûl kir. 7 H'emûyêd ku ev
yek dîtin, bîna xwe teng dikirin
û digotin: «Ew bû mêvanê meri-
vekî gunek'ar». 8 Lê Zexayo pêş
h'emûyava sekinî û gote Xudan:
«Xudan, ez va nîvê hebûka xwe
didime feqîra û min neheqî k'ê jî
kiribe, ezê çar car lê veger'înim».
9 Îsa wîr'a got: «Îro ev mal xilaz
bû, çimkî eva jî zar'a Birahîm
e. 10 Bona vê yekê Kur'ê Mêriv
hat, wekî li yêd undabûyî biger'e
û xilaz ke».

### Mesela dehe zêr'a

*(Metta 25:14-30)*

11 Û wana hê ev tişt dibihîstin,
Îsa meseleke din jî anî ser wê ye-
kê, ku Ew nêzîkî Orşelîmê dibû
û wana t'irê P'adşatîya Xwedê
wê zûtirekê k'ifş be. 12 Ewî got:
«Merivekî e'silzade çû welatekî
dûr, ku p'adşatîya xwe bistîne û
veger'e. 13 Gazî dehe xulamêd
xwe kir, dehe zêr' dane wan û
got: ‹Van bidine xebatê, h'eta
ku ez veger'im›. 14 Lê bajarvana
k'îna wî girtibû, qasid li pey wî
şandin û gotin: ‹Em naxwazin
ew p'adşatîyê li ser me bike›. 15 Û
gava ewî p'adşatîya xwe stand
veger'îya, gazî wan xulama kir,
k'îjanêd ku ewî p'ere dabûne
wan, wekî bizanibe k'a her ye-
kî çiqas kirîye k'ar. 16 Yê pêşin
hat û gotê: ‹Ez xulam, zêr'ekî te
dehe zêr' kire k'ar›. 17 Axayê wî
jêr'a got: ‹E'ferim, xulamê qenc!
Tu nava wî tiştê hindikîda amin
mayî, serwêrtîyê dehe bajara bi-
ke›. 18 Yê duda jî hat û got: ‹Ez
xulam, zêr'ekî te pênc zêr' kire
k'ar›. 19 Axayê wî jêr'a got: ‹Tu jî
ser pênc bajara be›. 20 Paşê yekî
din hat û got: ‹Ez xulam, va ye
zêr'ê te, min destmalêda p'êç'ayî
hildabû. 21 Çimkî ez ji te ditirsîyam,
min zanibû tu merivekî h'işk î, çi
ku te danenîye, hildidî û çi ku te
neçandîye, didirûyî›. 22 Û wî jêr'a
got: ‹Ezê hema bi devê te dîwana
te bikim, xulamê xirab! Heger te
zanibû ku ez merivekî h'işk im,
çi ku min danenîye, hildidim û
çi ku neçandîye, didirûm, 23 te
çima p'erê min neda k'arkira, ku
ez bihatama min bi selef bistan-
da?› 24 Û hazirar'a got: ‹Wî zêr'î ji
wî bistînin û bidine ewê ku dehe
zêr'êd wî hene›. 25 Wîr'a gotin:
‹Xudan, dehe zêr'êd wî hene›.
26 Ewî got: ‹Ez wer'a dibêjim, yê
k'ê ku heye, wîr'a wê bê dayînê,
lê yê k'ê ku t'une, çi heye jî wê jê

bê standinê. 27 Lê belê wan neya-
rêd min jî, k’îjana nedixwest ez
p’adşatîyê li ser wan bikim, bînine
vir, ber ç’e’vê min wan bikujin›».

### Îsa bi r’ûmet dik’eve Orşelîmê

*(Metta 21:1-11; Marqos 11:1-11; Yûh’enna 12:12-19)*

28 Îsa pey vê xeberdanêr’a pêşda
çû, wekî hevraz her’e Orşelîmê.
29 Û gava nêzîkî gundêd Beytfacê
û Beytanyayê bû, wî cîyê ku jêr’a
digotin ç’îyayê[f] Zeyt’ûnê, hingê
du şagirtêd Xwe şandin 30 û got:
«Her’ine wî gundê pêşberî xwe,
gava hûn bik’evinê, hûnê ce’şikeke
girêdayî bibînin ku hê kesek lê
sîyar nebûye. Ewê vekin û bînin.
31 Heger yek ji we bipirse: ‹Hûn
çima wê vedikin?› bêjin, ku Xu-
danr’a lazim e». 32 Ewêd şandî
çûn, çawa ku wanr’a hatibû gotinê,
usa jî dîtin. 33 Û wana hê ce’şik
vedikir, xweyêd wê wanr’a gotin:
«Hûn çima vê ce’şikê vedikin?»
34 Şagirta got: «Xudanr’a lazim e».
35 Û ew anîne cem Îsa, k’incêd xwe
avîtine ser wê û Îsa lê sîyar kirin.
36 Gava diçû, cime’tê k’incêd xwe
ser r’ê r’adixistin. 37 Û gava Ew
nêzîkî p’êberjêrê ç’îyayê Zeyt’û-
nê bû, t’emamîya k’oma şagirta
destpêkirin şa dibûn û bi dengê
bilind bona h’emû k’eremetêd ku
dîtibûn şikirî didane Xwedê 38 û
digotin: «Bimbarek e ew P’adşayê
ku bi navê Xudan tê!* E’dilayî li
e’zmên û şikirî li Yê Herî Jorin**!»
39 Lê ji nav e’laletê çend fêrisîya
Îsar’a got: «Dersdar, li şagirtêd
Xwe hilê». 40 Ewî li wan veger’and
û got: «Ez wer’a dibêjim, heger
evana dengê xwe bibir’in, kevirê
bikine qîr’în».

### Îsa bona Orşelîmê digirî

41 Û gava nêzîkî Orşelîmê bû,
li bajêr nihêr’î, serda girîya 42 û
got: «Xwezî te hema îro bizani-
bûya e’dilayîya te çiva girêdayî
ye! Lê niha ji ber ç’e’vê te hate
veşartinê. 43 Wê r’oj ser teda bên,
ku dijminêd teyê dora te çeper’ê
girêdin û ji her alîyava h’icûmî
ser te kin. 44 Wê te û zar’êd te
nava teda bikin ax-xwelî û kevir
li ser kevir nahêlin. Çimkî wex-
tê ku Xwedê serîk da te, tu xwe
neh’esîyayî».

* 19:38 Zebûr 118:26.

** 19:38 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Şikirî bilindayîyêda». «Bilindayî» be’sa cîyê Xwedê dike.

### Îsa p'aristgehêda

*(Metta 21:12-17; Marqos 11:15-19;*
*Yûh'enna 2:13-22)*

45 Û k'ete p'aristgehê, dest-
pêkir yêd ku difirotin derxistin
46 û wanr'a got: «Nivîsar e: ‹Mala
Min wê mala dua be›*. Lê we ew
kirîye ‹şkefta qaçaxa›**». 47 Û
her r'oj p'aristgehêda hîn dikir,
lê serekêd k'ahîna, qanûnzan û
giregirêd cime'tê pey k'etibûn, ku
çawa Wî bikujin. 48 Lê nikaribûn
tiştek bikirana, çimkî t'emamîya
cime'tê Wîva girêdayî bû û guh-
darîya Wî dikir.

### Pirsa derheqa h'ukumê Îsada

*(Metta 21:23-27;*
*Marqos 11:27-33)*

**20** 1 Û r'ojeke ji wan r'ojada,
gava Ewî p'aristgehêda
xelq hîn dikir û Mizgînî dida,
serekêd k'ahîna û qanûnzan t'evî
r'ûspîya hatine cem Wî 2 û gotin:
«Bêje me, Tu bi çi h'ukumî van
kira dikî? K'ê ev h'ukum daye
Te?» 3 Ewî li wan veger'and û got:
«Ez jî tiştekî ji we bipirsim û hûn
Minr'a bêjin: 4 H'ukumê nixu-
mandina Yûh'enna ji e'zmên bû
yan ji meriva?» 5 Ewana nav hevda
şêwirîn û gotin: «Heger em bêjin:
‹Ji e'zmên bû›, Ewê bêje: ‹Lê we
çima ew bawer[f] nekir?› 6 Lê heger
em bêjin: ‹Ji meriva bû›, t'emamî-
ya cime'tê wê me bide ber kevira,
çimkî ew e'seyî bawer dikin, ku
Yûh'enna p'êxember bû». 7 Wana
caba Wî da û gotin: «Em nizanin
ji k'u bû». 8 Îsa wanr'a got: «Ez jî
wer'a nabêjim, ku bi çi h'ukumî
van kira dikim».

### Mesela r'ezê tirîya û r'ezvana

*(Metta 21:33-46; Marqos 12:1-12)*

9 Û Îsa destpêkir ev mesele
cime'têr'a got: «Merivekî r'ezê
tirîya danî û ew bi k'irê da r'ez-
vana, wextekî dirêj çû welatekî
din. 10 Û wextda xulamek şande
cem r'ezvana, wekî ji wî r'ezî berê
p'ara wî wîr'a bişînin, lê r'ezvana
xulamê wî k'uta û destvala ver'ê-
kirin. 11 Axê xulamekî din jî şand,
wana ew jî k'uta, ew r'obet kirin
û destvala ver'êkirin. 12 Yê sisîya
jî şand, vana eva jî birîndar kir
û ji r'ez derxistin. 13 Xweyê r'ez
got: ‹Ez çi bikim? Kur'ê xweyî
delal bişînim, hilbet wê ji wî
şerm bikin›. 14 Lê gava r'ezvan

* 19:46 Îşaya 56:7.
** 19:46 Yêremîya 7:11.

ç'e'v wî k'etin, li hev şêwirîn û gotin: ‹Ev warê wî ye! Werin em wî bikujin, ku mîrat'a[f] wî mer'a bimîne›. **15** Û ew ji r'ez derxistine der û kuştin. Awa xweyê r'ez wê çi bîne serê wan? **16** Ne ewê bê qir'a wan r'ezvana bîne û r'ez bide hinekêd din». Gava ev yek bihîstin, gotin: «Xwedê neke». **17** Û Îsa li wan nihêr'î û got: «Lê ew çi ye, ku nivîsar e?

‹Ew kevirê ku hosta t'exsîr kir,
ew bû serê e'nîşkê[f]›*.

**18** Her kesê ku bik'eve ser wî kevirî, wê hûrdexweşî be û ew kevir bik'eve ser k'ê, wê wî bih'incir'îne». **19** Serekêd k'ahîna û qanûnzana wê demê kirin ku Wî bigirin, çimkî fe'm kirin, ku Ewî ev mesele anî ser wan, lê ji cime'tê tirsîyan.

## Pirsa xercdayîn û nedayînê

*(Metta 22:15-22; Marqos 12:13-17)*

**20** Û ç'e'vêd wan li Îsa bûn, çend merivêd ce'sûs şandin, ku bi dur'ûtî xwe dewsa r'asta danîbûn, wekî Wî bi xebera bigirin û bidine destê h'ukumetê û dîwana welî. **21** Wana ji Wî pirsî û gotinê: «Dersdar, em zanin ku Tu r'ast xeber didî û hîn dikî, nav merivada firqîyê jî danaynî, lê r'îya Xwedê r'ast hîn dikî. **22** Gelo r'ast e ku em xerc bidine Qeyser yan na?» **23** Ewî ku fêlbazîya wan zanibû wanar'a got*: **24** «Zîvekî nîşanî Min kin. Ev navê nivîsar û sifet[f] yê k'ê ye ser?» **25** Wana got: «Yêd Qeyser in». Ewî wanr'a got: «Wekî usa ye, çi ku yêd Qeyser in, bidine Qeyser û çi yêd Xwedê ne bidine Xwedê». **26** Û nikaribûn ber cime'tê nava xebera Wîda Ew bigirtana, ser cabdayîna Wî zendegirtî dengê xwe bir'în.

## Pirsa r'abûna mirîya

*(Metta 22:23-33; Marqos 12:18-27)*

**27** Sadûqî[f], ku dibêjin r'abûna mirîya t'une, hineke ji wan hatine cem Wî ji Wî pirsîn û gotin: **28** «Dersdar, Mûsa mer'a nivîsîye: ‹Heger birê yekî bizewice û bêzur'et bimire, bira birê wî jina wî bistîne û warê birê xwe şîn ke›*. **29** Awa h'eft bira hebûn. Birê mezin jinek stand, bêzur'et mir. **30** Peyr'a yê duda **31** û paşê yê sisîya ew jin stand, heyneser wan

* 20:17 Zebûr 118:22.
* 20:23 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Hûn çima Min dicêr'ibînin?»
* 20:28 Qanûna Ducarî 25:5.

her h'efta jî ew jin stand û zar'
pey wan nek'etin, mirin. 32 Pey
gişkar'a ew k'ulfeta jî mir. 33 De
îjar wê R'oja R'abûna mirîya ew
k'ulfetê bibe jina k'îjanî? Çimkî
her h'efta jî ew standibû». 34 Îsa
li wan veger'and û got: «Merivê
vê dinê dizewicin û mêr dikin.
35 Lê ewêd ku hêjayî wê dinê bin
û bigihîjine r'abûna mirîya, ne wê
bizewicin û ne jî mêr kin. 36 Ewê
îdî nikaribin bimirin, ew weke
milyak'eta ne. Ew zar'êd Xwedê
ne, çimkî p'ara r'abûna mirîya
ne. 37 Lê bona r'abûna mirîya,
Mûsa jî daye k'ifşê. Ew serhatîya
dara dir'îyêda bona Xudan dibê-
je: ‹Xwedêyê Birahîm, Xwedêyê
Îshaq, Xwedêyê Aqûb›*. 38 Awa
Xwedê ne Xwedêyê mirîya ye, lê yê
zêndîya ye, çimkî bona Wî h'emû
jî sax in». 39 Ji qanûnzana hineka
lê veger'and û gotinê: «Dersdar,
Te qenc got». 40 Û îdî kesekî ne-
wêribû ku tiştekî jî ji Wî bipirse.

**Mesîh kur'ê k'ê ye?**

*(Metta 22:41-46;
Marqos 12:35-37)*

41 Û Îsa wanar'a got: «Çawa
dibêjin ku Mesîh kur'ê Dawid
e? 42 Dawid xwexa k'itêba Zebû-
rada[f] dibêje:

‹Xudan gote Xudanê min:
Li milê Minî r'astê r'ûnê,
43 h'eta ku dijminêd Te bikime
binê p'îyêd Te›*.

44 Awa heger Dawid Wî ‹Xudan›
h'esab dike, îdî Ew çawa dibe
kur'ê Dawid?»

**H'evza xwe ji qanûnzana bikin**

*(Metta 23:1-36; Marqos 12:38-40;
Lûqa 11:37-54)*

45 Hê t'emamîya cime'tê guhdarî
dikir, Ewî şagirtêd Xwer'a got:
46 «H'evza xwe ji wan qanûnzana
bikin, yêd ku h'iz dikin bi çuxêd
dirêj biger'in, bazarada silavê
bidine wan, k'inîştada k'ursîyêd
pêşin bigirin û şayîyada jî here-
ma[f] jorin r'ûnên. 47 Evana alîkîva
malêd jinebîya h'ûfî xwe dikin,
alîyê dinva jî bona xwek'ifşkirinê
duayê xwe dirêj dikin. Dîwana
wanê hê giran be».

**Dîyarîya jinebîya belengaz**

*(Marqos 12:41-44)*

**21** 1 Îsa dîna Xwe dayê û dît
ku dewletîya h'edîyêd xwe
davîtine p'eredanga[f] p'aristgehê.

---

* 20:37 Derk'etin 3:6.

* 20:43 Zebûr 110:1.

2 Ewî belengazeke jinebî jî dît ku
du pol avîte wir 3 û Îsa got: «Ez
r'ast wer'a dibêjim, ku evê jinebî-
ya belengaz ji van h'emûya ze'ftir
avîtê. 4 Çimkî wan h'emûya ji
bermayîyêd xwe avîtine nava h'e-
dîya, lê evê vê belengazîya xweda
h'emû tiştê ku wê pê e'bûrê xwe
bikira avîtê».

### Îsa pêşda derheqa wêranbûna p'aristgehêda dibêje

*(Metta 24:1-2; Marqos 13:1-2)*

5 Û çaxê hineka bona p'aristge-
hê digotin, ku bi kevirê bedew û
p'êşk'êşa hatîye xemilandinê, Ewî
got: 6 «Van h'emû tiştêd ku hûn
dibînin, r'ojê bên kevirê li ser kevir
nemîne, h'emûyê jî wêran bin!»

### Tengasî û zêrandin

*(Metta 24:3-14; Marqos 13:3-13)*

7 Û ji Wî pirsîn gotinê: «Dersdar,
ev tişt wê k'engê biqewimin? Û
çi nîşanê bibe, gava ev yek biqe-
wimin?» 8 Ewî got: «Haş ji xwe
hebin, ku hûn neyêne xapandinê,
çimkî gelek wê pê navê Min bên û
bêjin: ‹Ez im Mesîh› û: ‹Ew wext
nêzîk e›, pey wan neçin. 9 Gava
hûn bona şer' û de'wa bibihên,
netirsin, çimkî gerekê pêşîyê ev
tişt biqewimin, lê axirîya dinê
ne hingê ye». 10 Hingê wanr'a
got: «Miletê r'abe li ser milet,
p'adşatî li ser p'adşatîya, 11 cî-cîya
e'rdh'ejêd mezin, xelayî-celayê û
mîna nexweşîya h'al wê bibin, li
e'zmên jî tiştêd xof û tirs û nîşa-
nêd mezin wê biqewimin. 12 Lê
berî van h'emû tişta, wê dest
bavêjine we, we bizêrînin, bibine
ber dîwana k'inîşta û bikine kela.
Bona navê Min wê we bibine ber
p'adşa û welîya. 13 Evê wer'a bibe
me'nî, ku hûn bona Min şe'detîyê
bidin. 14 Û awa vê yekê bikine bîra
xwe, ku pêşda xem nekin hûnê
çi caba xwe bidin. 15 Çimkî Ezê
zar-ziman û serwaxtîyê bidime
we, ku dijminêd weyê nikaribin
li ber we xeber din yan bisekinin.
16 Dê û bavêd we, bira-pismam û
dostêd we wê we bidine girtinê û
ji we hineka jî wê bikujin. 17 Bona
navê Min hûnê ber ç'e'vê h'emûya
r'eş bin. 18 Lê t'u mûkê ji serê we
kêm nebe. 19 Bi sebira xwe hûnê
r'uh'ê xwe xilaz kin.

### Îsa derheqa wêranbûna Orşelîmêda xeber dide

*(Metta 24:15-21; Marqos 13:14-19)*

20 Lê gava hûn bibînin ku or-
dîya dora Orşelîmê girtîye, hingê
bizanibin ku wêranbûna wê nêzîk
e. 21 Hingê ewêd ku Cihûstanêda

ne, bira bir’evine ç’îya û ewêd
ku Orşelîmêda ne, bira derên,
ewêd k’ewşênda ne, bira nek’evi-
ne bajêr. 22 Çimkî ew r’oj, r’ojêd
h’eyfhildanê ne, wekî her çi ku
hatîye nivîsarê bê sêrî. 23 Lê wey
li h’emla û destdergûşa wan r’oja-
da, çimkî tengasîke mezin wê bê
serê dinê û xezeb evê cime’têr’a.
24 Ewê bi devê şûr bik’evin û nav
h’emû miletada hêsîr bêne birinê.
Orşelîmê jî ber p’îyêd miletêd
p’ûtp’arist her’e, h’eta ku wextê
wan mileta xilaz be.

## Hatina Kur’ê Mêriv

*(Metta 24:29-31;*
*Marqos 13:24-27)*

25 Û ser r’oyê, hîvê û steyrka
nîşanê bibin. Li ser dinê jî miletê
ji dest dengê xuşînîya pêlêd be’rê
bibizdin û xwe unda kin. 26 Dilê
meriva jî ji tirsa wê bisekine, bona
ew tiştêd ku wê bêne serê t’emamîya
dinê, çimkî t’opêd e’zmana wê ji
r’îyêd xwe derên*. 27 Û hingê wê
bibînin ku ‹Kur’ê Mêriv e’wrava
bi qewat û r’ûmeta mezin tê›*.
28 Gava ev tişt destpêbibin, hûn
r’abin serê xwe bilind kin, çimkî
azabûna we îdî nêzîk e».

## Dersa dara hêjîrê

*(Metta 24:32-35;*
*Marqos 13:28-31)*

29 Û meselek wanr’a got: «Hûn
dîna xwe bidine dara hêjîrê û h’e-
mû dara. 30 Gava dibişkivin, hûn
bi wê yekê zanin ku havîn nêzîk
e. 31 Usa jî gava hûn bibînin ku
ev yek diqewimin, bizanibin ku
P’adşatîya Xwedê nêzîk e. 32 Ez
r’ast wer’a dibêjim, ku eva nisila
derbaz nabe, h’eta ku ev h’emû
tişt neqewimin. 33 E’rd û e’zmanê
derbaz bin, lê gotinêd Min t’u car
derbaz nabin.

## R’anezên

34 Miqatî xwe bin, nebe ku
dilê we p’ir’xurîyê, serxweşîyê
û xemêd vê dinyayêva girêdayî
be, nişkêva ew R’oj ser weda bê.
35 Çimkî ew r’ojê mîna t’elê bê
serê h’emû merivêd li ser dinê.
36 H’işyar bimînin û her gav dua
bikin, wekî hûn bikaribin ji wan
h’emû tiştêd ku wê biqewimin
bir’evin-xilaz bin û li ber Kur’ê
Mêriv r’ûspî bisekinin». 37 Îsa
r’ojê p’aristgehêda hîn dikir, lê
şevê diçû serê wî ç’îyayî dima, ku

* 21:26 Aha jî tê fe’mkirinê: «Qewatêd e’zmana wê bih’ejin».
* 21:27 Danîyêl 7:13. (Bixûnin: E’yantî 1:7.)

jêr’a digotin ç’îyayê Zeyt’ûnê. 38 Û
t’emamîya cime’tê sibehê zû diçû
p’aristgehê cem Wî, ku xeberêd
Wî bibihên.

## Girtin, xaçkirin[f] û r’abûna Îsa

### Şêwira kuştina Îsa

*(Metta 26:1-5, 14, 16;*
*Marqos 14:1-2, 10-11;*
*Yûh’enna 11:45-53)*

**22** 1 Cejina[f] Nanê Şkeva nêzîk
bû, ya ku jêr’a Cejina[f] Der-
bazbûnê dibêjin. 2 Serekêd k’ahîna
û qanûnzana mecalekê diger’îyan
ku Wî bikujin, çimkî ji cime’tê
ditirsîyan. 3 Hingê mîrêcin k’ete
qelpê dilê Cihûdayê[f] ku Îsxeryotî
dihate gotinê, ew yek ji wan her
donzdeha bû. 4 Eva r’abû çû t’evî
serekêd k’ahîna û serwêrêd nobe-
darêd p’aristgehê, wanr’a xeber da,
wekî Îsa bide destê wan. 5 Evana
şa bûn û wîr’a qayl bûn, ku p’era
bidine wî. 6 Cihûda r’azî bû û hil-
da ser xwe, ku mecalê bibîne Ewî
bi dizî cime’têva bide destê wan.

### T’ivdarekdîtina şîva Cejina Derbazbûnê

*(Metta 26:17-25; Marqos 14:12-21;*
*Yûh’enna 13:21-30)*

7 R’oja Cejina Nanê Şkeva hat,
ku e’det bû berxê qurbana Cejina
Derbazbûnê bihata serjêkirinê. 8 Îsa
Petrûs û Yûh’enna şandin û got:
«Her’in Şîva Cejina Derbazbûnê
mer’a hazir kin, wekî em bixwin».
9 Wana jê pirsî: «Tu li k’u dixwazî
ku em hazir kin?» 10 Ewî jî wanar’a
got: «Gava ku hûn bik’evine ba-
jêr, va merivekê r’astî we bê, cêr’ê
avê li ser mila. Pey wî her’ine wê
mala ku ew diçê, 11 û xweyê ma-
lêr’a bêjin: ‹Dersdar ter’a dibêje:
K’anê ew oda mêvana, ya ku Ezê
têda t’evî şagirtêd Xwe şîva Cejina
Derbazbûnê bixwim?› 12 Hingê
ewê li qatê jorin odeke mezine
hevdayî nîşanî we ke û wir jî hûn
hazir kin». 13 Ewana çûn, çawa ku
wanar’a gotibû usa jî dîtin û şîva
Cejina Derbazbûnê hazir kirin.

### Şîva Xudan

*(Metta 26:26-30; Marqos 14:22-26;*
*Korint’î I, 11:23-25)*

14 Û gava wext pêr’a gihîşt, Ew
bi t’evî şandîya li ser sifrê r’ûnişt
15 û wanr’a got: «Ez gelekî h’izreta
vê Şîva Cejina Derbazbûnê bûm,
ku Min t’evî we berî cefê Xwe bi-
xwara. 16 Çimkî Ez wer’a dibêjim,
Ez îdî ji vê t’u car naxwim, h’eta

ku P'adşatîya Xwedêda bibe».
17 Û k'as hilda, şikirîya Xwe ji
Xwedê anî û got: «Hildin evê û
nav xweda bela kin. 18 Ez wer'a
dibêjim, wekî Ez îdî t'u car ji
meya tirîyê venaxwim, h'eta ku
P'adşatîya Xwedê bê». 19 Û nan
hilda şikirî da, kerkir da wan û
got: «Eva bedena Min e, ku bona
we tê dayînê. Vê yekê bona bîr-
anîna Min bikin».

20 Usa jî k'as pey şîvêr'a hilda
û got: «Eva k'asa peymana nû ye,
pê xûna Min girêdayî, ku bona
we tê r'êtinê. 21 Lê va destê yê ku
nemamîya Min bike, li ser vê sifrê
t'evî Min e. 22 R'ast Kur'ê Mêriv
wê usa her'e, çawa ku bona Wî
nivîsar e, lê wey li wî merivî, ku
wê nemamîya Kur'ê Mêriv bike».
23 Û wana destpêkir nav hevda ji
hev pirsîn: «Gelo k'î ye ewî nav
meda, ku vê yekê wê bike?»

### De'wa bona mezinayîyê

24 Û nav wanda de'w pêşda hat,
ku ji nav wanda k'îjan wê yê herî
mezin bê h'esabê. 25 Îsa wanr'a
got: «P'adşayêd mileta cime'ta
xwe bindest dikin û ewêd ser wan
h'ukum dikin xêrxwazêd wan têne
gotinê. 26 Lê hûn usa nebin, yê nav
wedayî herî mezin, bira bibe mîna
yê herî biç'ûk û bira yê serwêrtîyê
dike jî bibe mîna yê xulamtîyê
dike. 27 Niha k'î ye mezin, yê li
sifrê r'ûniştî yan berdestî? Ne yê
li sifrê r'ûniştî? Û Ez nava weda
mîna berdestîkî me.

28 Hûn in, yêd ku nava cêr'iban-
dinêd Minda h'eta niha t'evî Min
mane. 29 Û Ezê P'adşatîyê bidime
we, çawa Bavê Min ew da Min,
30 wekî hûn P'adşatîya Minda ji
sifra Min bixwin û vexwin û ser
k'ursîya r'ûnên, dîwana donzdeh
qebîlêd[f] Îsraêlê bikin.

### Îsa derheqa înk'arîya Şimh'ûn-Petrûsda dibêje

*(Metta 26:31-35; Marqos 14:27-31; Yûh'enna 13:36-38)*

31 Şimh'ûn! Şimh'ûn! Va ye mî-
rêcin xwest wekî we mîna genim
bêjingê xe. 32 Lê Min bona te dua
kir, wekî bawerîya te kêm nebe û
gava tu veger'î, dil bidî ber bira-
yêd xwe». 33 Û Petrûs Wîr'a got:
«Xudan, ez hazir im t'evî Te bême
girtinê û kuştinê jî». 34 Îsa wîr'a
got: «Petrûs! Ez ter'a dibêjim,
îro hê berî bangdana dîk, tê sê
cara bêjî, wekî tu Min nas nakî».

### Derheqa tengasîya mezinda

35 Û Îsa wanr'a got: «Gava
Min hûn bê k'îsik, tûrik û çarix
şandin, hûn h'ewcê tiştekî bûn?»

Wana got: «Na». 36 Hingê got: «Lê
niha k’îsikê k’ê heye bira hilde
û usa jî tûrik. Û yê ku bê şûr e,
bira k’incê xwe bifiroşe û xwer’a
şûrekî bik’ir’e. 37 Lê Ez wer’a di-
bêjim, ku gerekê eva nivîsara ser
Min bê sêrî, ku: ‹Ew t’evî ner’asta
hate h’esabê›*. Û çi ku bona Min
nivîsar e, ser qewimandinê ye».
38 Şagirta Wîr’a got: «Xudan, va
ne vira du şûr hene». Ewî wanr’a
got: «Bes e».

### Îsa serê ç’îyayê Zeyt’ûnê dua dike

*(Metta 26:36-46; Marqos 14:32-42)*

39 Û Îsa li gora e’detê Xwe r’abû
çû ç’îyayê Zeyt’ûnê, şagirtêd Wî
jî li pey çûn. 40 Û gava gihîşte cî,
wanr’a got: «Dua bikin, ku hûn
nek’evine nava cêr’ibandinê». 41 Û
Xwexa qasî keviravîtinekê ji wan
dûr k’et, çok da dua kir 42 û got:
«Bavo, heger e’mirê Te ye, evê
k’asê ji Min dûr xe. Lê bira xwes-
tina Te be, ne ku ya Min». 43 Û
ji e’zmên milyak’etek Wîva xuya
bû û Ew qewat kir. 44 Ewî nava
cefê giranda, hê bi dilê k’el dua
dikir. Xûdana Wî mîna dilopêd
xûnêye gir dir’ijîyane e’rdê.* 45 Û
ji dua r’abû, hate cem şagirtêd
Xwe, ewana k’erba k’ederê r’a-
zayî dîtin. 46 Û wanr’a got: «Hûn
çima r’adizên? R’abin dua bikin,
ku nek’evine nava cêr’ibandinê».

### Girtina Îsa

*(Metta 26:47-56; Marqos 14:43-50; Yûh’enna 18:3-11)*

47 Ewî hê xeber dida, nişkêva
e’laletekê ser Wîda girt û yekî ji
her donzdeha, navê wî Cihûda,
pêşîya wan k’etibû û nêzîkî Wî bû
ku Wî r’amûse. 48 Îsa wîr’a got:
«Cihûda! Tu bi r’amûsanê Kur’ê
Mêriv didî destê wan?» 49 Gava
ewêd t’evî Wî dîtin ku wê çi bi-
qewime, Wîr’a gotin: «Xudan, em
bi şûr li wan xin?» 50 Û ji wan yekî
bi şûr li xulamê serekk’ahîn xist û
guhê wîyî r’astê pekand. 51 Hingê
Îsa got: «Bes e, bihêlin». Û dest
da guhê wî, qenc kir. 52 Paşê Îsa
gote serekêd k’ahîna, serwêrêd
nobedarêd p’aristgehê û r’ûspî-
yêd ku hatibûne ser Wî: «Tê bêjî
hûn bi şûr û dara hatine pêşîya
qaçaxekî? 53 Ne Ez her gav t’evî
we p’aristgehêda bûm, we destê
xwe ne dida Min. Lê niha wextê
we ye û h’ukumê te’rîstanîyê ye».

* 22:37 Îşaya 53:12.
* 22:43-44 Nav hinek destnivîsarada ji r’êza 43-a h’eta ya 44-a t’uneye.

### Petrûs Îsa înk’ar dike

*(Metta 26:57-58, 67-75;*
*Marqos 14:53-54, 66-72;*
*Yûh’enna 18:12-18, 25-27)*

**54** Û Ew girtin, birin kirine
mala serekk’ahîn. Petrûs jî dûrva
p’ê-p’ê li pey Wî diçû. **55** Ga-
va wana goveka h’ewşêda agir
vêxist û dorê r’ûniştin, Petrûs
jî li wir t’evî wan r’ûnişt. **56** Û
carîkê ew li ber agir r’ûniştî dît,
li wî nihêr’î û got: «Eva jî t’evî
Wî bû». **57** Lê Petrûs înk’ar kir û
gotê: «Ez Wî nas nakim, e’vdê!»
**58** Xêlekê şûnda yekî din ew dît û
got: «Tu jî ji wan î». Petrûs wîr’a
got: «Pismam, ez ne ji wan im».
**59** Û weke sih’etekê jî derbaz bû,
yekî din jî dida zora xwe û di-
gotê: «Hebe-t’unebe eva meriva
t’evî Wî bû, çimkî ji Celîlê ye».
**60** Lê Petrûs got: «Filan kes! Ez
nizanim tu çi dibêjî». Û xeber
hê dêvda bû, destxweda dîk bang
da. **61** Xudan ser Petrûsda vege-
r’îya li wî nihêr’î, hingê Petrûs
gotina Xudan anî bîra xwe, ku
wîr’a gotibû: «Îro hê berî bang-
dana dîk, tê sê cara Min înk’ar
kî». **62** Û Petrûs derk’ete derva
k’ele-k’el girîya.

### Îsa dibe pêk’enî û tê k’utanê

**63** Û ewêd ku nobedarî li Îsa
dikirin, qerfê xwe li Wî dikirin,
dik’utan. **64** Ç’e’vêd Wî girêdan
û ji Wî dipirsîn, digotin: «De
p’êxembertîyê bike, k’a k’î bû
ku Te xist?» **65** Û bi gelek gotinêd
mayîn jî Ew bêhurmet dikirin.

### Îsa li ber civîna[f] giregira

*(Metta 26:59-66;*
*Marqos 14:55-64;*
*Yûh’enna 18:19-24)*

**66** Û gava sibeh zelal bû, k’oma
r’ûspîyêd cime’tê, serekêd k’ahîna
û qanûnzana civîyan. Îsa k’aşî
dîwanxana xwe kirin **67** û goti-
nê: «Heger Tu yî Mesîh, mer’a
bêje?» Îsa wanr’a got: «Heger Ez
wer’a bêjim jî, yek e hûn dîsa ba-
wer nakin. **68** Û heger pirsekê jî
bidime we, hûnê dîsa caba Min
nadin. **69** Ji vir şûnda Kur’ê Mêriv
wê li k’êleka Xwedêyê Herî Zor,
li milê Wîyî r’astê r’ûnê»*. **70** Û
h’emûya bi hevr’a got: «Wekî usa
ye Tu Kur’ê Xwedê yî?» Ewî wan-
r’a got: «Hûn xwexa dibêjin ku
Ez Ew im». **71** Û wana got: «Îdî
şe’de çî mer’a ne? Me xwexa ji
devê Wî bihîst».

* 22:69 Zebûr 110:1.

### Îsa li ber Pîlato

*(Metta 27:1-2, 11-14;*
*Marqos 15:1-5;*
*Yûh'enna 18:28-38)*

**23** 1 Û t'emamîya e'laleta wan
r'abû, Îsa birine cem Pî-
lato. 2 Û dest bi xeybê kirin gotin:
«Me Ev meriva dît ku miletê me
dixalifîne û ne jî dihêle ku xerc
bidine Qeyser. Bona Xwe jî dibêje:
‹Ez Mesîh P'adşa me›». 3 Pîlato
ji Wî pirsî û gotê: «Tu yî p'adşê
cihûya[f]?» Ewî lê veger'and û go-
tê: «Te bi devê xwe got». 4 Pîlato
serekêd k'ahîna û e'laletêr'a got:
«Ez t'u neheqîyê Vî merivîda
nabînim». 5 Lê ewana ser ya xwe
man û gotin: «Evî merivî nava
t'emamîya Cihûstanê, ji Celîlê
destpêkirî h'eta vira, cime't bi
hînkirina Xweva t'evîhev kirîye».

### Îsa li ber Hêrodes

6 Gava Pîlato bona Celîlê bi-
hîst, pirsî: «Ev meriva ji Celîlê
ye?» 7 Gava pê h'esîya, ku Ew
bin h'ukumê Hêrodesda ye, Ew
şande cem Hêrodes, ku ew jî wan
r'ojada hatibû Orşelîmê. 8 Gava
Hêrodes ç'e'v Îsa k'et, gelekî şa
bû. Ewî hê zûva dixwest ku Ew
bidîta, çimkî ewî gelek tişt bona
Wî bihîstibûn û h'izreta Wî bû,
ku k'eremetekê bi destê Wî bibîne.
9 Hêrodes gelek pirs dane Wî, lê
Îsa caba t'u pirsê neda. 10 Serekêd
k'ahîna û qanûnzana jî sekinîbûn
û gelekî davîtine Wî. 11 Hêrodes jî
bi eskerêd xweva Ew bêqedir kir,
pê k'enîyan, paşê k'incê r'ewş da
lê kirinê, dîsa paşda şande cem
Pîlato. 12 Wê r'ojê Pîlato û Hê-
rodes li hev hatin, çimkî pêşîyê
nava wanda dijminatî hebû.

### Dîwanêda h'ukumê kuştinê li ser Îsa derdixin

*(Metta 27:15-26; Marqos 15:6-15;*
*Yûh'enna 18:39—19:16)*

13 Pîlato gazî serekêd k'ahîna,
serwêra û cime'tê kir, 14 wanr'a
got: «We Ev meriva anî cem min,
çawa Yekî cime'tê dixalifîne.
Awa min li ber we her tişt ji Wî
pirsî, lê ji wan xirabîyêd ku hûn
gilî dikin, min t'u tişt li ser Vî
merivî nedît. 15 Û ne jî Hêrodes
dît, lema jî wî Ew li ser meda ve-
ger'and. Evî tiştekî usa nekirîye
ku bê kuştinê. 16 Ezê Wî bidime
ber qamçîya û ber'dim»*. 18 Lê

* 23:16 Nav hinek destnivîsarada r'êza 17-a jî heye: «Awa e'seyî lazim bû Pî-
lato cejinêda girtîk wanr'a ber'da».

t'emamîya e'laletê bi hevr'a kire
qîr'în û got: «Wî li r'ûbarî dinê
nehêle! Barabas bona me ber'de!»
19 Barabas yekî bona serhildanê
û mêrkuştina bajêrda bûyî hatibû
girtinê. 20 Pîlato dîsa destpêkir
xeber da, çimkî wî dixwest ku
Îsa bida ber'danê. 21 Lê wana hê
dikire qîr'în û digot: «Xaç[f] ke!
Ewî xaç ke!» 22 Ewî cara sisîya
wanr'a got: «Evî çi xirabî kirîye?
Min li ser Vî neheqî nedît ku Ew
bê kuştinê. Ez Wî bidime ber
qamçîya û ber'dim». 23 Lê ewana
bi dengê bilind ser ya xwe bûn û
dixwestin ku Ew bê xaçkirinê.
Sewta wan serk'et. 24 Pîlato qi-
rara xwe da, ku bi xwestina wan
be. 25 Anegorî xwestina wan, yê
ku bona serhildanê û mêrkuştinê
kelêda bû, ber'da. Lê Îsa hişte ser
xwestina dilê wan.

### Xaçkirina Îsa

*(Metta 27:31-44; Marqos 15:21-32; Yûh'enna 19:17-27)*

26 Û gava eskera Ew dane pêşî-
ya xwe birin, yekî kûrênî navê wî
Şimh'ûn, ku ji k'ewşên dihat, ew
girtin û xaç danîne ser milê wî,
ku li pey Îsa bibe. 27 Û e'laleteke
cime'têye giran li pey Wî diçû,
usa jî k'ulfetêd ku şîna Wî diki-
rin û digirîyan. 28 Îsa li ser wanda
veger'îya û got: «Qîzêd Orşelîmê!
Ser Minda negirîn, lê ser xwe û
zar'êd xweda bigirîn. 29 Çimkî va
wê r'ojê bên ku wê bêjin: ‹Xwezî
li wan k'ulfetêd bêzur'et, ku zar'
neanîne û nemêjandine›*. 30 Hingê
merivê destpêkin bêjin: ‹Ç'îyano!
Li ser meda bik'evin. Girno! Me
veşêrin›*. 31 Heger serê dara Ter'
aha dikin, lê h'alê dara h'işk wê
çawa be?»

32 Du merivêd neheq jî anîn,
ku Pêr'a bêne kuştinê. 33 Û gava
gihîştine wî cîyê ku Qaf tê gotin,
li wir Ew xaç kirin. Û ewêd ne-
heq jî yek li milê r'astê xaç kirin
û yek jî li milê ç'epê. 34 Hingê Îsa
got: «Bavo, bibaxşîne van, çimkî
nizanin çi dikin». Ser k'incêd Wî
p'eşk avîtin wekî nava xweda bela
kin*. 35 Û cime't sekinîbû dinihêr'î.
Serwêra jî qerfê xwe li Wî dikirin
û digotin: «Xelq xilaz kirin, de
bira Xwe jî xilaz ke, heger Ew e

* 23:29 Aha jî tê fe'mkirinê: «Xwezî li wan k'ulfetêd bêzur'et û wan bet'ina ku zar' neanîne û wan bistana ku nemêjandine».
* 23:30 Hosêya 10:8.
* 23:34 Zebûr 22:18.

Mesîh, bijartîyê[f] Xwedê». **36** Esker
jî li Wî dik’enîyan, pêşda dihatin,
sirke[f] didanê **37** û digotin: «Heger
Tu yî p’adşayê cihûya, de Xwexa
Xwe xilaz ke». **38** Û fêza serê Wî jî
nivîsar bû*, ku: «EVA P’ADŞAYÊ
CIHÛYA YE».

**39** Ji wan neheqêd dardakirî,
yekî Îsa bêhurmet dikir û digotê:
«Tu ne Mesîh î? De me xilaz ke,
Xwe jî pêr’a». **40** Lê hevalê wî lê
hilat û got: «Tu ji Xwedê natirsî?
Ne tu jî xût wî cezayîda yî? **41** Ev
heqê me ye, ku ez û tu anegorî
e’melêd xwe dik’işînin, lê Evî t’u
xirabî nekirîye». **42** Û Îsar’a got:
«Îsa, min bîr bînî, gava P’adşatîya
Xweva bêyî*». **43** Îsa wîr’a got: «Ez
r’ast ter’a dibêjim, îro tê t’evî Min
buhiştêda[f] bî».

## Mirina Îsa

*(Metta 27:45-56; Marqos 15:33-41; Yûh’enna 19:28-30)*

**44** Gava nîvro sih’et nêzîkî donz-
deha bû, t’emamîya e’rdê h’eta
sih’eta sisîya bû te’rî **45** û r’ûyê
r’oyê hate girtinê. P’er’da p’arist-
gehê nîvîda bû du tîşa[f]. **46** Û Îsa
bi dengê bilind kire gazî û got:
«Bavo, r’uh’ê Xwe didime destê
Te»*. Û gava ev yek got, r’uh’ê
Xwe da. **47** Sersed ev tiştê bûyî ku
dît, şikirî da Xwedê û got: «R’astî
Eva merivekî r’ast bû». **48** Û t’e-
mamîya e’laletê, ku li wir bona
t’emaşê civîyayî bû, ev yeka dît,
sîngêd xwe dixistin, paşda vedi-
ger’îyane malêd xwe. **49** H’emû
nasêd Wî jî û ew k’ulfetêd ku ji
Celîlê hatibûn, dûr sekinî bûn û
ev tişt didîtin.

## Definkirina[f] Îsa

*(Metta 27:57-61; Marqos 15:42-47; Yûh’enna 19:38-42)*

**50** Merivekî qencî şîrh’elal û
endemê civîna giregira cihûya
hebû, navê wî Ûsiv[f]. **51** Eva ji
bajarê Arîmetya Cihûstanê bû û
xwexa jî hîvîya P’adşatîya Xwedê
bû. Ew t’evî şêwir û kirina civîna
wan nebibû. **52** Ew r’abû çû cem
Pîlato û cinyazê Îsa ji wî xwest.
**53** Cinyaz ji xaçê anî xwarê, qe-
dekê k’itanîda k’efen[f] kir û danî
nav t’irba qeyêda k’olayî, ku t’u
car wêda kesek nehatibû danînê.

---

* 23:38 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Û fêza serê Wî bi yûnanî, latînî û îbranî[f] nivîsar bû».

* 23:42 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Gava Tu bigihîjî P’adşatîya Xwe».

* 23:46 Zebûr 31:5.

54 Û ew r'oja[f] t'ivdarekkirinêda bû
û êvara şemîyê destpêdikir. 55 Û
ew k'ulfetêd ku ji Celîlê t'evî Îsa
hatibûn, ew jî pey wî çûn û ew
t'irba ku çawa cinyazê Wî têda
hate danînê, dîtin. 56 Û paşda
veger'îyan, biharet[f] û r'ûnê[f] bîn-
xweş hazir kirin û anegorî t'emîya
Qanûnê r'oja şemîyê r'ih'et bûn.

### Îsa ji mirinê r'adibe

*(Metta 28:1-10; Marqos 16:1-8;
Yûh'enna 20:1-10)*

**24** 1 R'oja yekşemê sibehê zû,
wan k'ulfeta biharetêd
hazirkirî hildan çûne ser t'irbê.
2 Lê wana kevir ji ber t'irbê hol-
kirî dît. 3 Gava k'etine hindur',
cinyazê Xudan Îsa nedîtin. 4 Gava
ewana hê bona vê yekê met'el-
mayî mabûn, nişkêva du merî bi
k'incê nûranî li ber wan sekinîn.
5 Û gava k'ulfet ji tirsa k'etine ser
r'ûyê xwe, wan meriva wanr'a
got: «Hûn çima li Yê sax nava
mirîyada diger'in? 6 Ew ne li vir
e, Ew ji mirinê r'abûye. Bînine
bîra xwe, ku çaxê hê Celîlêda bû,
çi wer'a got: 7 ‹Gerekê Kur'ê Mêriv
bik'eve destê merivêd ner'ast, bê
xaçkirinê û r'oja sisîya ji mirinê
r'abe›». 8 Û wana gotina Îsa bîr
anîn 9 û ji t'irbê veger'îyan, eva
yeka her yanzdeha û h'emûyêd
mayînr'a gotin. 10 Yêd ku şandî-
yar'a gotin, evana bûn: Meryema
Mejdelanî, Yohana û Meryema
dîya Aqûb, bi t'evî hinekêd ma-
yîn. 11 Şandîyava çawa gotineke
p'ûç' xuya bû û wana k'ulfet bawer
nekirin. 12 Lê Petrûs r'abû berbi
t'irbê bezî, qûz bû nihêr'î, t'enê
k'efenê Wî wir bû û met'elmayî
çû, difikirî gelo çawa bû.

### Li ser R'îya Emwasê

*(Marqos 16:12-13)*

13 Wê r'ojê du şagirt diçûne
gundekî, ku ji Orşelîmê donzdeh
kîlomêtirî dûr bû, navê wî Emwas
bû. 14 Wana bi hevr'a bona her tiş-
tê qewimî xeber didan. 15 Û gava
ewana nav hevda xeber didan û
dişêwirîn, Îsa Xwexa jî nêzîkî wan
bû, t'evî wan çû. 16 Lê ç'e'vêd wan
girtî bûn, ku Wî nas nekin. 17 Îsa
wanr'a got: «Hûn vê r'êyêda çi
hevr'a xeber didin?» Ewana me'-
dekirî sekinîn*. 18 Yekî ji wan, ku
navê wî Klêpas bû, lê veger'and û
got: «Ew çawa ji Orşelîmê t'enê Te
nebihîstîye ku van r'ojêd paşinda

* 24:17 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Hûn vê r'êyêda çi hevr'a xeber didin û me'dekirî ne?»

wir çi qewimîye?» 19 Ewî ji wan
pirsî û got: «Çi bûye?» Wana lê
veger'and gotê: «Bona Îsayê Nis-
retê, ku Ew bi e'mel û xeberêd
Xwe li ber Xwedê û t'emamîya
milet p'êxemberekî zor bû 20 û
çawa serekêd k'ahîna û serwêrêd
me nemamîya kuştina Wî kirin,
xaç kirin. 21 Em wê gumanê bûn
ku Ewî wê Îsraêlê aza bikira.
Wekî din jî eva r'oja sisîya ye, ku
ev tişt bûne. 22 Lê çend k'ulfetêd
nav meda jî em e'cêbmayî kirin.
Ewana sibehê zû çûbûne ser t'irbê
23 û cinyazê Wî li wir nedîtibûn,
veger'îyan hatin mer'a gotin, ku:
‹Me milyak'et dîtin, mer'a gotin,
ku Ew sax e›. 24 Û ji me hinek
jî çûne ser t'irbê, çawa ku wan
k'ulfeta gotibû, usa bû, lê Ew
nedîtin». 25 Hingê Ewî wanr'a got:
«Hey însanêd bê fikir, hûn çiqasî
giran h'emû gotinêd p'êxembera
bawer dikin? 26 Ne gerekê Mesîh
cefa bik'işanda û bik'eta r'ûmeta
Xwe?» 27 Û Wî destpêkir ji Mûsa
û h'emû p'êxembera, çi ku wan
k'itêbada bona Wî nivîsar bûn,
wanar'a şirovekirin.

28 Gava nêzîkî wî gundê ku
diçûnê bûn, Ewî usa da k'ifşê,
yançîye Ew diçe cîkî dûr. 29 Lê
wana zor li Wî kir û got: «Îşev
li cem me bimîne, çimkî êvar e,
r'o çûye ava». Û Ew çû hindur',
ku li cem wan bimîne. 30 Lê gava
Ew t'evî wan ser sifrê r'ûnişt, nan
hilda, şikirîya Xwe ji Xwedê anî,
kerkir da wan. 31 Hingê ç'e'vêd
wan vebûn, Ew nas kirin û Ew
ber ç'e'vê wan betavebû. 32 Wa-
na hevr'a got: «Lema, gava Ewî
r'êda mer'a xeber dida û nivîsar
mer'a şirovedikirin, agir dilê me
dik'et». 33 Ew wê gavê r'abûn ve-
ger'îyane Orşelîmê û her yanzdeh
t'evî yêd mayîn civîyayî dîtin,
34 gotin: «R'astî Xudan sax bûye
û Şimh'ûnva xuya bûye!» 35 Paşê
wan her duya gilî kir, ku çawa
r'êda r'astî Wî hatin û çaxê Wî
nan kerkir, Ew nas kirin.

## Îsa Xwe nîşanî şagirtêd Xwe dike

*(Metta 28:16-20; Marqos 16:14-18; Yûh'enna 20:19-23; K'arêd Şandîya 1:6-8)*

36 Wana hê bona vê yekê xe-
ber dida, Îsa nava wanda sekinî
û wanr'a got: «E'dilayî wer'a».
37 Ewana ji tirsa bizdîyan û wan
t'irê xeyalekî[f] dibînin. 38 Lê Ewî
wanr'a got: «Hûn çima şaşmayî
mane û dudilî ne? 39 Awa li dest
û p'îyêd Min binihêr'in, ku Ez
Xwexa me. Û destê xwe bidine Min
û bibînin, çimkî goşt û hestûyêd

r'uh' t'unene, çawa ku hûn di-
bînin yêd Min hene». **40** Gava ev
yek got, dest û p'îyêd Xwe nîşanî
wan kirin. **41** Û hê ji şabûna bawer
nedikirin, h'eyr-h'ujmek'ar ma-
bûn, Ewî wanr'a got: «Qet tiştekî
xwarinê li cem we heye?» **42** Wana
çîtî me'sîyê pijandî da Wî*. **43** Ewî
hilda li ber ç'e'vê wan xwar **44** û
wanar'a got: «Ev bûn ew gotinêd
ku gava Ez t'evî we bûm, Min we-
r'a gotibûn: ‹Gerekê her tiştêd ku
bona Min Qanûna Mûsa, nivîsarêd
p'êxembera û Zebûrada[f] nivîsar
bûn bihatana sêrî›». **45** Hingê fe'mê
wan vekir, ku nivîsara fe'm bikin.
**46** Û wanr'a got: «Awa nivîsar e,
ku Mesîh gerekê cefa bik'işîne û
r'oja sisîya ji mirinê r'abe **47** û ji
Orşelîmê girtî bi navê Wî t'obe-
yî û baxşandina guna nav h'emû
miletada wê bê dannasînkirinê.
**48** Û hûn in şe'dêd van h'emû tişta.
**49** Û va Ezê sozê Bavê Xwe wer'a
bişînim. Orşelîmêda bimînin,
h'eta hûn qewatê ji jor bistînin».

### Jorhilatina Îsa

*(Marqos 16:19-20;*
*K'arêd Şandîya 1:9-11)*

**50** Û ew h'eta Beytanyayê birin,
destê Xwe bilind kir, dua wan kir.
**51** Û hê dua dikir, ji wan qetîya,
berbi e'zmên hate hilatinê. **52** Şa-
girta jî serê xwe ber Wî danî, bi
eşq û şa veger'îyane Orşelîmê.
**53** Û her gav p'aristgehêda bûn,
pesinê Xwedê didan.

* 24:42 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Û mirt'oxa hingiv».

# MIZGÎNÎYA LI GORA YÛH’ENNA

## Pêşgotin

Li gora fikira gelek zana, nivîsk’arê vê k’itêbê xilazîya sedsalîya pêşinda eva serhatîya nivîsîye. Nivîsk’ar xwexa navê xwe k’itêbêda nade. Lê tê fe’mkirinê, ku nivîsk’ar yek ji her donzdeh şagirtêd[f] Îsa[f] bûye, awa gotî Yûh’ennayê[f] kur’ê Zebedî. Îsa hingê gazî wî kir, gava ew hê me’sîgir bû (Metta 4:21; Marqos 1:19; Lûqa 5:10). Usa jî tê fe’mkirinê, ku Yûh’enna ew şagirt bû, bona k’îjanî ku aha nivîsar e: «Şagirtê ku Îsa jê h’iz dikir» (Yûh’enna 13:23; 19:26; 20:2; 21:7, 20, 24).

Yûh’enna ser pirsa jîyîna[f] h’eta-h’etayê disekine, k’îjanî ku meriv[f] dikare bistîne. Belê Yûh’enna dinivîse ku meremê vê nivîsarê ev e, wekî xwendevan bawer bike, ku Îsa ye Xilazkirê[f] sozdayî, Kur’ê[f] Xwedê û pê vê bawerîyê[f] jîyîna h’eta-h’etayê bistîne (20:31).

«Mizgînîya[f] li gora Yûh’enna» hindava her sê Mizgînîyêd mayînda (ya Metta, Marqos û Lûqa) tiherekî din berç’e’v dibe. Vê Mizgînîyêda xwendevan r’astî çend qewimandina tên, yêd ku mizgîndarêd[f] mayîn nivîsarêd xweda nedane k’ifşê. Mesele: de’wata Qanayêda, xeberdana Îsaye t’evî Nîkodêmo, k’ulfeta[f] samerî[f], qencbûna yê Beythastayêda û yê ji zikmakîyêda kor, usa jî saxkirina Lazarê mirî. Mizgîndarêd mayîn Metta, Marqos û Lûqa gelekî li ser kirêd Îsaye Celîlêda[f] disekinin, lê Yûh’enna li ser kirêd Orşelîmêda[f] disekine. Usa jî k’itêbêda çend cara ev gotin hene: «Ez im filan tişt yan bêvan tişt» û gelek ji wan gotina jî bi nîşanêd (k’eremetêd) Îsava girêdayî ne. Mesele, Ew derheqa Xweda aha dibêje: «Ez im nanê jîyînê» (6:35), «Ez im r’onaya dinyayê» (8:12), «Ez im derê pêz» (10:7), «Ez im şivanê qenc» (10:11), «Ez im r’abûn û jîyîn» (11:25), «Ez im r’ê, r’astî û jîyîn» (14:6) û «Ez im k’ola tirîyêye r’ast» (15:1).

Mizgîndarêd mayîn hînkirina Îsa bi mesela dibêjin, lê Yûh’enna aşkere bona heleqetîya Îsaye t’evî Bavê[f] Xwe Xwedê dibêje. Usa jî Îsa

navê Xwedêtîyê bona Xwe bi k'ar tîne: «EZ EW IM» (8:24, 28; 13:19) û «EZ HEME» (8:58).

K'itêb belayî ser çend p'ara dibe. Pêşgotina xweda Yûh'enna dinivîse ku Xebera Xwedêye h'eta-h'etayê û Îsa yek in.

P'ara k'itêbêye pêşin ji serê 2-a h'eta 11-a bona gelek k'eremeta dibêje û ew h'emû jî e'yan dikin ku Îsa Mesîh[f] e, Ew Xilazkirê sozdayî ye û Kur'ê Xwedê ye. Ev p'ara k'itêbê derheqa wan merivada dibêje, yêd ku bawerîya xwe Îsa anîn bûne peyçûyêd Wî, lê h'erçê mayîn miqabilî Wî sekinîn û nexwestin Wî bawer bikin.

P'ara duda ji serê 13-a h'eta 17-a dibêje, ku Îsa berî girtin û xaçbûna[f] Xwe t'evî şagirta çawa pismam xeber dide, ku wan bişidîne.

P'ara sisîyada jî ji serê 18-a h'eta 21-ê derheqa girtin, xaçbûn, mirin, ji mirin-r'abûnê û jorhilatina Wîda dibêje.

K'itêba Mizgînîya Yûh'enna dide k'ifşê ku Îsa «Xebera Xwedê» ye, ku bi bedenî hat nava meda hêwirî. Ew e Xilazkirê dinyayê (4:42), R'onayîya ku h'emû meriva r'onayî dike (1:9), Ew Xwexa nîşana h'izkirina Xwedê ye, hindava h'emû merivêd dinyayêda (3:16). Yûh'enna dîna xwe dide ser dannasînî û fikira Îsa, bi k'îjana Xwedêtîya Îsa û gelek r'astîyêd din e'yan dibin. Nava dannasînîyêd Îsada fikira mêriv diçe ser wan xebera, yêd ku her r'oj têne bik'aranînê, lê Îsa ew çawa nîşanêd sur' nava r'astîya r'uh'anîda dane xebatê, ku yek bikaribe fe'm bike. Awa mesele: nan, av, r'onayî, şivan, pez, baxçe û tiştêd mayîn.

**Serecema fikira k'itêbê**

Pêşgotin (1:1-18)
Yûh'ennayê[f] nixumdar[f] û şagirtêd Îsaye pêşin (1:19-51)
Şixulêd Îsaye li dor-berê ç'emê Ûrdunê û nav Celîlê (2:1—12:50)
Îsa xatirê Xwe ji şagirtêd Xwe dixwaze, dil dide li ber wan û bona wan dua dike (13:1—17:26)
Girtin, dîwankirin, xaçkirin û definkirina[f] Îsa (18:1—19:42)
R'abûna Îsaye ji mirinê û xuyabûna Wî (20:1-31)
Paşgotin: Xuyabûneke din Celîlêda (21:1-25)

## Pêşgotina Yûh’enna: Destpêbûnêda Xeber hebû

1 1 Destpêbûnêda Xeber hebû.
Xeber t’evî Xwedê bû û Xeber
Xwexa Xwedê bû. 2 Ew destpêbûnê-
da t’evî Xwedê bû. 3 Her tişt bi Wî
e’firîn û bêyî Wî t’u tişt neqewimî,
çi ku qewimî. 4 Kanîya jîyînê Ew
bû û jîyîn jî r’onaya meriva[f] bû.
5 R’onayî te’rîstanîyêda şewq dide
û te’rîstanîyê Pê nikaribûye.

6 Merivekî ji alîyê Xwedêda şandî
hebû, ku navê wî Yûh’enna[f] bû.
7 Ew bona şe’detîyê hat, wekî bona
R’onayê şe’detîyê bide, ku h’emû
pê wî bawer bikin. 8 Ew xwexa
ne ew R’onayî bû, lê ew hat ku
şe’detîya R’onayê bide. 9 R’onaya
r’ast Ew e, k’îjan ku tê dinyayê û
h’emû meriva r’onayî dike. 10 Ew
dinyayêda bû û dinya pê Wî e’fi-
rî, lê dinyayê Ew nas nekir. 11 Ew
hate ser warê Xwe, lê cime’ta Wî
Ew qebûl nekir. 12 Lê ewêd ku Ew
qebûl kirin û bawerîya[f] xwe navê
Wî anîn, Ewî da, ku heqîya wan
hebe bibine zar’êd Xwedê. 13 Evana
ne ji xûnê, ne ji xwestina bedenê
û ne jî ji xwestina merivayê bûne,
lê ew ji Xwedê bûne.

14 Û Xeber bû xûn û goşt, bi
k’erem[f] û r’astîyêva t’ijî nav meda
konê Xwe danî. Me r’ûmeta Wî
dît, ew r’ûmeta Kur’ê Bavêyî[f] tayê
t’enê. 15 Yûh’enna bona Wî şe’detî
da û bi dengekî bilind got: «Eva
ye, bona K’îjanî min gotibû: ‹Ewê
ku pey min tê Ew ser minr’a ye,
çimkî Ew berî min hebû›». 16 Me
h’emûya ji t’êr-t’ijîya Wî k’erem
ser k’eremêda stand*. 17 Çimkî
Qanûn bi destê Mûsa[f] hate da-
yînê, k’erem û r’astî bi destê Îsa[f]
Mesîh[f]. 18 T’u kesî t’u car Xwedê
nedîtîye, lê Yê Tayê T’enêyî ku
xût Xwedê ye* û h’emêza Bavêda
ye, Ewî Ew da e’yankirinê.

## Şe’detîya Yûh’ennayê nixumdar[f]

*(Metta 3:1-12; Marqos 1:1-8; Lûqa 3:15-17)*

19 Ev bû Şe’detîya Yûh’enna:
Gava cihûya[f] ji Orşelîmê[f] k’ahîn[f]

* 1:16 Aha jî tê fe’mkirinê: «K’erem ji ber k’eremêva stand», awa gotî k’erema Peymana[f] Nûye Îsa[f] Mesîh[f] cîyê k’erema Peymana[f] Kevine ç’îyayê Sînayê[f] girtîye. Hinek jî fe’m dikin, ku ji k’erema Îsa, k’erem e’mirê bawermendada heye û hê zêde dibe.

* 1:18 Nav destnivîsarêd here qencda aha ye: «Yê Bêşirîkî-Bêheval ku h’emêza Bavêda ye». Nav hinek destnivîsarêd dinda jî aha ye: «Kur’ê Bêşirîkî-Bêheval ku h’emêza Bavêda ye».

û lêwî[f] şandin, wekî ji Yûh’enna
bipirsin, ku ew k’î ye, Yûh’enna
hilda ser xwe, **20** înk’ar[f] nekir û
aşkere got: «Ez ne Mesîh me».
**21** Wana jê pirsî: «Lê tu k’î yî?
Êlyas[f] î?»* Ewî got: «Na». «Ew
p’êxemberê[f]** sozdayî yî?» Cab
da: «Na». **22** Hingê jêr’a gotin: «De
bêje, tu k’î yî, wekî em cabekê
wanr’a bibin, yêd ku em şandine.
Tu bona xwe çi dibêjî?» **23** Ewî
got: «Ez ew deng im ku ber’îyê-
da[f] dike gazî: ‹R’îya Xudan[f] r’ast
bikin!›* çawa ku Îşaya[f] p’êxember
gotîye». **24** Ewêd ku hatibûne şan-
dinê ji fêrisîya[f] bûn. **25** Wana jê
pirsî: «Lê îdî çima dinixumînî[f],
heger tu ne Mesîh î, ne Êlyas û
ne jî p’êxember?» **26** Yûh’enna li
wan veger’and û got: «Ez bi avê
dinixumînim, lê Yek nav weda
heye, ku hûn Wî nas nakin. **27** Ew
e, Yê ku pey min tê, ku ez ne
hêja me, wekî benê çarixêd Wî
jî vekim». **28** Ev h’emû li wî berî
Ûrdunê, li Beytanyayê, wî cîyê
ku Yûh’enna li wir dinixumand
qewimîn.

## Berxê Xwedê

**29** R’oja dinê Yûh’enna dît ku Îsa
berbi wî tê, ewî got: «Va ye! Berxê
Xwedê, Yê ku gunêd dinyayê hildide!
**30** Ev e bona K’îjanî min gotibû:
‹Pey minr’a Yekê bê, ku ser min-
r’a ye, çimkî Ew berî min hebû›.
**31** Min nizanibû Ew k’î ye, lê ez
hatime bi avê dinixumînim, wekî
Wî Îsraêlêva[f] bidime e’yankirinê».
**32** Yûh’enna eva şe’detîya da û
got: «Min dît ku R’uh’ ji e’zmên
mîna kevotkekê hat ser Wî danî
û ma. **33** Min nizanibû Ew k’î ye,
lê Ewê ku ez şandim, ku bi avê
binixumînim, minr’a got: ‹Tu
k’îjanî bibînî ku r’uh’ tê ser da-
tîne û dimîne, Ew e ku bi R’uh’ê[f]
Pîroz dinixumîne›. **34** Min jî dît û
şe’detî da ku Ev e Kur’ê[f] Xwedê».

## Şagirtêd[f] pêşîyê

**35** R’oja dinê Yûh’enna dîsa t’evî
du şagirtêd[f] xwe sekinî bû. **36** Dît
ku Îsa wirar’a derbaz dibe, got:
«Va ye Berxê Xwedê!» **37** Ev yek
ku bihîstin, her du şagirt pey Îsa

* 1:21 Malaxî 4:5.

** 1:21 Gelek cihû[f] li hîvîya p’êxemberekî bûn, yekî mîna Mûsa yan jî yekî ji wî qewattir, ku wê bihata wextê hatina Mesîh e’lam bikira (Qanûna Ducarî 18:15, 18; Yûh’enna 6:14; 7:40).

* 1:23 Îşaya 40:3.

çûn. 38 Îsa li pişt Xweva veger’îya
û dît ku wana daye pey Wî tên,
wanr’a got: «Hûn çi dixwazin?»
Wana jêr’a got: «R’abbî», ku tê
fe’mkirinê: «Dersdar[f]», «Tu li k’u
derê dimînî?» 39 Ewî wanr’a got:
«Werin hûnê bibînin». Wana çû û
dît ku Ew li k’u dimîne. Îdî sih’et
nêzîkî çara bû û wê r’ojê ew li
cem Wî man.

40 Ji wan her duya, yêd ku ji
Yûh’enna bihîstin û pey Îsa çûn,
yek Endrawisê birê Şimh’ûn-Pet-
rûs bû. 41 Ewî pêr’a-pêr’a birê
xwe Şimh’ûn[f] dît û jêr’a got: «Me
Mesîh[f] dît», ku tê fe’mkirinê: «Yê
K’ifşkirî»*. 42 Wî ew anî cem Îsa.
Îsa li Şimh’ûn nihêr’î û gotê: «Tu,
Şimh’ûnê kur’ê Yûh’enna, tê Kîfas
bêyî gotinê» (awa gotî «Petrûs[f]»,
ku tê fe’mkirinê: «Qeya»).

### Îsa gazî Fîlîpo û Natanyêl dike

43 R’oja dinê Îsa qirar kir ku
her’e Celîlê[f]. Wî Fîlîpo dît û jêr’a
got: «Pey min were!» 44 Fîlîpo ji
Beytsaydayê bû, ji bajarê Endrawis
û Petrûs. 45 Fîlîpo çû Natanyêl dît û
jêr’a got: «Me Ew dît, bona k’îjanî
Mûsa Qanûnêda û p’êxembera jî
nivîsarêd xweda salixê Wî dabûn,
Îsayê Kur’ê Ûsivê[f] ji Nisretê».
46 Natanyêl jê pirsî: «Qet dibe ku
tiştekî p’ak ji Nisretê derk’eve?»
Fîlîpo jêr’a got: «Were û bibîne!»
47 Gava Îsa dît ku Natanyêl berbi
Wî tê, derheqa wîda got: «Va ye
îsraêlîkî heqî-h’elal ku dilê wîda
mixenetî t’une». 48 Natanyêl jê
pirsî: «Çawa min nas dikî?» Îsa lê
veger’and û gotê: «Hê Fîlîpo gazî
te nekiribû, gava ku tu li binê dara
hêjîrê r’ûniştî bûyî, Min tu dîtî».
49 Natanyêl jêr’a got: «Dersdar, Tu
Kur’ê Xwedê yî! Tu P’adşê Îsraêlê
yî!» 50 Îsa lê veger’and û gotê: «Tu
bona vê yekê bawer dikî, wekî
Min ter’a got: ‹Min tu li binê dara
hêjîrê dîtî?› Tê tiştêd ji vê mestir
bibînî». 51 Û jêr’a got: «Ez r’ast bê
xêlif wer’a dibêjim, hûnê bibînin
e’zman vebûye û milyak’etêd[f]
Xwedê çawa ji ser Kur’ê[f] Mêriv
hildik’işin, peya dibin»*.

### De’wata li gundê Qanaya Celîlê

2 1 Du r’oja şûnda bajarê Qanaya
Celîlêda de’watek hebû. Dîya

* 1:41 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «XRÎSTOS». «XRÎSTOS» bi zimanê yûnanî tê fe’mkirinê: «Yê K’ifşkirî», «Yê Bijartî[f]» û «Yê R’ûnkirî[f]».
* 1:51 Destpêbûn 28:12.

Îsa jî li wê derê bû, 2 Îsa û şagir-
têd Wî jî bona de’watê hatibûne
t’eglîfkirinê. 3 Gava kêmasî k’ete
şeravê, dîya Îsa jêr’a got: «Şerava
wan nema». 4 Îsa lê veger’and û
gotê: «E’vdê, çî te Min k’etîye?
Hê ne wextê Min e». 5 Dîya Wî
berdestîyar’a got: «Çi ku wer’a
bêje, bikin». 6 Û şeş k’ûpêd kevirî
hebûn, ku li gora e’detêd cihûya
bona şûştin-veşûştina wana li wir
danîbûn. Ji wana her yekî ji h’eyş-
tê h’eta sed bîst lîtir av hildida.
7 Îsa wanr’a got: «Van k’ûpa t’ijî
av kin». Û wana jî lêvar’a dagirt.
8 Paşê wanar’a got: «Niha hinekî
dagirin, bibin bidine serde’watî».
Ewana jî ew bir. 9 Gava serde’watî
ji wê ava ku bibû şerav te’m kir,
wî tê dernexist ku ew ji k’u hat,
lê berdestîyêd ku av k’işandibûn
zanibûn. Serde’watî gazî ze’vê
kir 10 û jêr’a got: «Her kes pêşîyê
şerava xweye r’ind datîne ser t’ex-
te û paşê gava vexwarî ne, ew ya
ner’ind derdixe. Lê te şerava r’ind
h’eta niha xwey kirîye».

11 Eva nîşana Îsaye pêşin bû,
ku Wî Qanaya Celîlêda kir. Bi
vî awayî Ewî r’ûmeta Xwe da xu-
yakirinê û şagirtêd Wî bawerîya
xwe Wî anîn.

12 Pey vê yekêr’a, Îsa t’evî dîya
Xwe, birêd Xwe û şagirtêd Xwe
çû Kefernahûmê, lê gelek r’oja
Ew li wê derê neman.

### Îsa p’aristgehê[f] paqij dike

*(Metta 21:12-13; Marqos 11:15-17; Lûqa 19:45-46)*

13 Cejina[f] cihûyaye Derbazbûnê
nêzîk bû, Îsa hevraz çû Orşelîmê.
14 P’aristgehêda[f] Ewî yêd ku dewar,
pez û kevotk difirotin, usa jî yêd
p’ereguhêr’ r’ûniştî dîtin. 15 De îjar
Wî ji bena qamçîk çêkir, h’emû ji
p’aristgehê pez û dewarêd wan-
va derxistin, p’erêd p’ereguhêr’a
r’êtin û t’extêd wan welger’andin.
16 Kevotkfiroşar’a got: «Vana ji vê
derê hildin! Îdî mala Bavê Min
nekine bazargeh!» 17 Hate bîra
şagirtêd Wî ku aha hatîye nivî-
sarê: «Xîreta hindava mala Teda
agir Min dixe»*. 18 Hingê cihûya
jê pirsî: «Tê çi nîşanê nîşanî me
kî, ku h’ukumê Te heye van tişta
bikî?» 19 Îsa li wan veger’and û got:
«Vê p’aristgehê hilşînin, Ezê nava
sê r’ojada r’akim». 20 Hingê cihûya
jêr’a got: «Nava çil şeş salada eva
p’aristgeha hatîye çêkirinê. Çawa
Tê wê nava sê r’ojada r’akî?» 21 Lê
Îsa derheqa p’aristgeha bedena

* 2:17 Zebûr 69:9.

Xweda xeber dida. **22** Peyr'a gava Ew ji mirinê r'abû, şagirta ew gotina Wî anî bîra xwe û wana ew nivîsar û gotina Îsa bawer kirin.

### Dilê[f] her merivî Îsava e'yan e

**23** Awa gava ku Îsa Cejina Derbazbûnêda li Orşelîmê bû, geleka ew nîşanêd ku Wî dikirin dîtin, bawerîya xwe navê Wî anîn. **24** Lê Îsa bawerîya Xwe li wan nedanî, çimkî dilê[f] h'emû meriva Wîva e'yan bû. **25** Ne h'ewce bû, ku yekî hindava merivekîda şe'detî bida, çimkî Wî dilê meriva zanibû.

### Îsa û Nîkodêmo

**3** **1** Ji fêrisîya merivek hebû, navê wî Nîkodêmo, ku serekekî cihûya bû. **2** Eva şev hate cem Îsa û jêr'a got: «Mamosta, em zanin ku Tu ji Xwedêda çawa dersdar hatîyî, çimkî ew nîşanêd ku Tu dikî, heger Xwedê ne pêr'a be, t'u kes nikare bike».

**3** Îsa lê veger'and û gotê: «Ez r'ast bê xêlif ter'a dibêjim, heger merivek dîsa nû nebe*, ew nikare P'adşatîya[f] Xwedê bibîne». **4** Nîkodêmo jê pirsî: «Meriv ku îdî mezin bûye, ew çawa dikare dîsa nû bibe? Qet dibe ku ew careke din bik'eve zikê dîya xwe û ji dîya xwe dîsa bibe?» **5** Îsa lê veger'and û gotê: «Ez r'ast bê xêlif ter'a dibêjim, h'eta ku meriv ji avê û R'uh' nebe, ew nikare bik'eve P'adşatîya Xwedê. **6** Yê ku ji bedenê dibe beden e, yê ku ji R'uh' dibe r'uh' e. **7** Tu e'cêbmayî nemîne ku Min ter'a got: Gerekê hûn dîsa nû bibin*. **8** Ba* li k'u derê dixwaze r'adibe. Tu dengê wî dibihêyî, lê nizanî ew ji k'u tê û k'uda diçe. Her kesê ku ji R'uh'* dibe jî usa ye».

**9** Nîkodêmo jê pirsî: «Ew çawa dibe?» **10** Îsa lê veger'and û gotê: «Tu dersdarê Îsraêlê yî û hê van yeka nizanî? **11** Ez r'ast bê xêlif ter'a dibêjim, tiştê ku em zanin wê dibêjin, tiştê ku me dîtîye şe'detîya wê didin. Lê belê hûn şe'detîya me qebûl nakin. **12** Heger Ez derheqa tiştêd li vê dinêda wer'a dibêjim hûn bawer nakin, lê wekî derheqa tiştêd li e'zmana bêjim, hûnê çawa bawer bikin? **13** Kesek hilnek'işîyaye e'zmên, pêştirî Ewî ku ji e'zmên peya bû, Kur'ê Mêriv. **14** Çawa

* 3:3 Aha jî tê fe'mkirinê: «Heger merivek ji jor nebe».
* 3:7 Aha jî tê fe'mkirinê: «Gerekê hûn ji jor bibin».
* 3:8 Bi zimanêd yûnanî û îbranî[f] xebera «Ba» û «R'uh'» yek in.

ku Mûsa ber'îyêda[f] me'r bilind
kir, usa jî gerekê Kur'ê Mêriv bê
bilindkirinê, 15 wekî her kesê ku
bawerîya xwe Wî bîne, jîyîna wîye
h'eta-h'etayê hebe.

16 Çimkî Xwedê usa dinya h'iz
kir, ku Kur'ê[f] Xweyî tayê t'enê
berva da, wekî her kesê ku ba-
werîya xwe Wî bîne unda nebe,
lê jîyîna wîye h'eta-h'etayê hebe.
17 Çimkî Xwedê Kur'ê Xwe neşande
dinyayê, ku dîwana dinê bike, lê
wekî dinya pê Wî xilaz[f] be. 18 Yê
ku bawerîya xwe Wî bîne, dîwana
wî nabe, lê ewê ku bawerayî xwe
Wî nayne, îdî dîwana wî bûye
jî, çimkî ewî bawerîya xwe navê
Kur'ê Xwedêyî tayê t'enê neanî.
19 Dîwan bi vî awayî dibe: R'onayî
hate dinyayê, lê meriva te'rîstanî
ji r'onayê zêdetir h'iz kir, çimkî
kirêd wan xirabî bûn. 20 Her kesê
ku xirabîyê dike, r'onayî ber ç'e'va
r'eş e. Ew xwe li r'onayê nagire,
wekî kirinêd wî xuya nebin. 21 Lê
ewê ku r'astîyê dike, ew xwe li
r'onayê digire, wekî e'yan be, ku
kirêd wî Xwedêda hatine kirinê».

## Îsa û Yûh'ennayê nixumdar[f]

22 Pey vê yekêr'a Îsa û şagirtêd
Wî çûne qeza Cihûstanê[f]. Îsa li wê
derê t'evî wan dima û dinixumand.
23 Yûh'enna jî li E'ynona nêzîkî
Salîmê dinixumand, çimkî av li
wir gelek bû. Meriv dihatine wê
derê û dinixumîn. 24 Yûh'enna hê
neavîtibûne kelê.

25 Hingê nav şagirtêd Yûh'en-
na û cihûkîda li ser pirsa e'detêd
şûştin-veşûştinê de'w pêşda hat.
26 Ew şagirt çûne cem Yûh'enna
û jêr'a gotin: «Dersdar, Ewî ku
li wî berî ç'emê Ûrdunê t'evî te
bû û te bona Wî şe'detî da, va
Ew Xwexa dinixumîne û h'emû
diçine cem Wî».

27 Yûh'enna cab da û got: «Me-
rivek nikare tiştekî hilde ser xwe,
heger ew ji e'zmên jêr'a nehatibe
dayînê. 28 Hûn xwexa şe'dêd min
in, ku min gotîye: ‹Ez ne Mesîh
im, lê yê li pêşîya Wî şandî me›.
29 Bûk bona k'ê be ze'va ew xwe-
xa ye. Lê çawa destebirakê ze'vê
sekinî bona wî dibihê û bi dengê
wî şa dibe, usa jî niha dilê min
şabûnêva t'ijî bû. 30 Ew gerekê
mezin be, lê ez biç'ûk bim.

## Yê ku ji e'zmana tê

31 Ewê ku ji jor hatîye, Ew ser
h'emûyar'a ye. Ewê ku ji vê dinê
ye, ew yê vê dinê ye û ew ji vê
dinê xeber dide. Lê Ewê ku ji
e'zmên hatîye, Ew ser h'emûyar'a
ye. 32 Wî çi dît û çi bihîst bona
wê yekê şe'detîyê dide, lê t'u kes

şe’detîya Wî qebûl nake. **33** Yê ku
şe’detîya Wî qebûl dike, ew mak
dike ku Xwedê r’ast e. **34** Ewê ku
Xwedê şandîye Ew gotinêd Xwedê
dibêje, çimkî Xwedê R’uh’ bê çap
dide Wî. **35** Bav Kur’ h’iz dike û
her tişt daye destê Wî. **36** Ewê ku
bawerîya xwe Kur’ tîne, jîyîna wîye
h’eta-h’etayê heye. Ewê ku gur’a[f]
Kur’ nake, ew jîyînê nabîne, lê
xezeba Xwedê li ser wî dimîne».

### Ava jîyîna[f] h’eta-h’etayê û h’ebandina bi r’uh’ û r’astîyê

**4** **1** Fêrisîya bihîst ku Îsa ji Yû-
h’enna zêdetir şagirta dicivîne
û bi avê dinixumîne, **2** lê r’ast Îsa
Xwexa nedinixumand, lê şagirtêd
Wî dinixumandin. **3** Hingê Îsa ku
vê yekê pê h’esîya, Ewî Cihûstan
hişt û dîsa çû Celîlê.

**4** Usa qewimî ku gerekê Ew
Sameryayêr’a[f] derbaz bibûya.
**5** Ew hate bajarekî Sameryayê ku
navê wî Sûxar bû. Ew der nêzîkî
wî e’rdî bû, ku Aqûb[f] dabû kur’ê
xwe Ûsiv[f]. **6** Bîra Aqûb li wê derê
bû. Îsa usa ji r’êwîtîyê westîyayî,
li k’êleka[f] bîrê r’ûnişt. Îdî r’oj
nîvro bû.

**7** K’ulfeteke samerî[f] hat ku avê
bik’işîne. Îsa wêr’a got: «Avekê
bide Min, Ez vexwim». **8** Şagirtêd
Wî jî çûbûne bajêr, ku xurek bi-
k’ir’in. **9** Wê k’ulfeta[f] samerî jêr’a
got: «Tu cihû yî û ez jî k’ulfeteke
samerî me. Tu çawa ji min avê
dixwazî?» Çimkî t’u heleqetîya
cihûya t’evî samerîya t’unebû*.
**10** Îsa lê veger’and û gotê: «Heger
te dayîna Xwedê bizanibûya û
bizanibî K’î ye ku ter’a dibêje:
‹Avekê bide Min Ez vexwim›,
teyê ji Wî av bixwesta û Ewî wê
ava jîyînê bida te». **11** K’ulfetê
jêr’a got: «Ez xulam, tiştekî Teyî
ku Tu pê avê bik’işînî t’une û bîr
jî k’ûr e! De îjar Tê ava jîyînê ji
k’u derê bînî? **12** Çima Tu ji bavê
me Aqûb mestir î, yê ku eva bîra
daye me û ji vê ewî, zar’êd wî,
pez û dewarêd wî jê vexwarine?»
**13** Îsa caba wê da û gotê: «Her ke-
sê ku ji vê avê vexwe, ewê dîsa t’î
be. **14** Lê ewê ku ji wê avê vexwe,
ya ku Ez bidimê, ewê t’u car t’î
nebe. Belê ew ava ku Ezê bidime
wî, wê dilê wîda bibe kanîke avê,
ku wê bona jîyîna h’eta-h’etayê[f]
bilq bide». **15** K’ulfetê jêr’a got:
«Ez xulam, de bide min wê avê,

---

* 4:9 Aha tê fe’mkirinê, ew derdanêd[f] ku samerîya didane xebatê cihûya ew h’eram[f] h’esab dikirin.

ku ez îdî t'î nebim û neyêm ji vir
avê nek'işînim».
16 Îsa lê veger'and û gotê: «Her'e
gazî mêrê xwe ke û were vira».
17 K'ulfetê caba Wî da û got: «Mêrê
min t'une». Îsa jêr'a got: «Te r'ast
got: ‹Mêrê min t'une›, 18 çimkî
pênc mêrêd te hebûne û yê ku
niha jî tu pêr'a yî ne mêrê te ye.
Te ev yeka r'ast got». 19 K'ulfetê
jêr'a got: «Ez xulam, ez dibînim
Tu p'êxember î. 20 Kal û bavêd me
li serê vî ç'îyayî Xwedê h'eban-
dine, lê hûn dibêjin cîyê Xwedê
h'ebandinê gerekê li Orşelîmê be».
21 Îsa jêr'a got: «E'vdê, Min bawer
bike, wextê bê, ku hûnê ne li vî
ç'îyayî û ne jî li Orşelîmê Bavê
bih'ebînin. 22 Hûn samerî Wî dih'e-
bînin, K'îjanî ku hûn nas nakin,
lê em cihû Wî dih'ebînin, K'îjanî
em nas dikin, çimkî xilazbûn ji
cihûya tê. 23 Lê belê wextê bê,
îdî pêr'a gihîştîye jî, ku yêd r'ast
dih'ebînin wê bi R'uh' û R'astîyê
Bavê bih'ebînin, çimkî Bav yêd
aha dih'ebînin diger'e. 24 Xwedê
R'uh' e û yêd ku Wî dih'ebînin
jî gerekê bi R'uh' û R'astîyê Wî
bih'ebînin». 25 K'ulfetê jêr'a got:
«Ez zanim ku Mesîhê[f] bê», (awa
gotî «Yê K'ifşkirî»). «Gava Ew bê,
Ewê derheqa her tiştîda mer'a gilî
ke». 26 Îsa jêr'a got: «EZ EW IM*,
ku t'evî te xeber didim».
27 Ser xeberdana wanda şagirtêd
Îsa hatin. Ew gelekî e'cêbmayî man,
ku Wî t'evî k'ulfetê xeber dida,
lê kesî negotê: «Tu çi dixwazî?»
yan «bona çi t'evî wê xeber didî?»
28 Hingê k'ulfetê cêr'ê xwe hişt, çû
bajêr û cime'têr'a got: 29 «Werin
Wî merivî bibînin, Yê ku h'emû
tiştêd ku min berê kiribûn minr'a
gotin. Gelo Ev e Mesîh?» 30 Ew ji
bajêr derk'etin û hatine cem Wî.
31 Wî wextîda şagirtêd Wî lava jê
dikirin û digotinê: «Dersdar, tiş-
tekî bixwe!» 32 Lê Ewî wanr'a got:
«Xurekê Minî xwarinê heye, hûn
nizanin». 33 Şagirta ji hevdu pirsî:
«Gelo kesekî jêr'a xwarin anîye?»
34 Îsa wanr'a got: «Xwarina
Min ew e, ku Ez xwestina Yê ku
Ez şandime bikim û şixulêd Wî
bînime sêrî[f]. 35 Çima hûn xwexa
nabêjin: ‹H'eta nandirûnê[f] hê
çar meh hene›? Va ye Ez wer'a
dibêjim, ç'e'vêd xwe vekin û dîna
xwe bidine zevîya, ew çawa zer

* 4:26 Aha jî tê fe'mkirinê: «EZ HEME, ku t'evî te xeber didim». Peymana Kevinda «EZ HEME» navekî Xwedê ye (Derk'etin 3:13-14). Şirovekirina vê bin r'êza Yûh'enna 8:58-da bixûnin.

bûne, dirûtinêr’a hazir in! 36 Yê
ku didirû heqê xwe distîne û
bona jîyîna h’eta-h’etayê ber t’op
dike, wekî yê diçîne û yê didirû
bi hevr’a şa bin. 37 Vira ev gotin
r’ast e, ku: ‹Yek diçîne û yekî din
didirû›. 38 Min hûn şandin ku
hûn wê bidirûn, ser k’îjanê hûn
nexebitîne, hinekêd din xebitîn û
hûn li ser xebata wan r’ûniştin».

## Cime’ta samerîyê bawerîya xwe Îsa tînin

39 Gelek samerîyêd ji wî bajarî
bawerîya xwe li Wî anîn, bona go-
tina wê k’ulfetê ku digot: «H’emû
tiştêd ku min kiribûn, Ewî minr’a
gotin». 40 Û gava samerî hatine
cem Wî, lava jê kirin, ku Ew li
cem wan bimîne. Ew jî du r’oja
li wê derê ma. 41 Geleka bona wê
xeberdana Wî bawerîya xwe li Wî
anîn 42 û wê k’ulfetêr’a gotin: «Em
îdî ne ku pê gotina te bawer dikin,
lê me xwexa bihîst û em zanin ku
ev e r’ast Xilazkirê[f] dinyayê».

## Îsa kur’ê qulixk’arekî qenc dike

*(Metta 8:5-13; Lûqa 7:1-10)*

43 Pey van her du r’ojar’a Îsa ji
wir r’abû çû Celîlê. 44 Îsa xwexa
şe’detî dabû, ku r’ûmeta p’êxember
cî-misk’enê wîda t’une. 45 Gava ku
Ew hate Celîlê, celîlîya Ew qebûl
kir, çimkî ewana xwexa jî bona
Cejina Derbazbûnê çûbûne Orşelî-
mê û tiştêd ku Wî kiribûn dîtibûn.
46 Îsa dîsa çû Qanaya Celîlê,
k’îderê av kiribû şerav. Wê derê qu-
lixk’arekî qesirê hebû, ku kur’ê wî
li Kefernahûmê nexweş bû. 47 Gava
ewî bihîst ku Îsa ji Cihûstanê ha-
tîye Celîlê, hate cem Wî û lava jê
kir, ku her’e Kefernahûmê kur’ê
wîyî bertelef qenc ke. 48 Îsa wîr’a
got: «H’eta ku hûn nîşan û k’ere-
meta nebînin, hûn t’u car bawer
nakin». 49 Qulixk’arê qesirê jêr’a
got: «Ez xulam, were em her’in,
hela hê kur’ê min nemirîye». 50 Îsa
lê veger’and û gotê: «Her’e, kur’ê
te sax-silamet e». Wî merivî jî ew
gotina Îsa bawer kir û çû. 51 Ew hê
negihîştibûyê, xulamêd wî pêşîya
wîda hatin û jêr’a gotin: «Kur’ê te
sax-silamet e». 52 Ewî ji xulamêd
xwe pirsî: «K’îjan sih’etêda ew
berbi qencbûnê çû?» Wana gote
wî: «Duhu pey nîvror’a sih’eta yekê
t’ayê jê ber’da». 53 Hingê bavê ku-
r’ik tê derxist, ku ew wê sih’etêda
bû, gava Îsa jêr’a got: «Kur’ê te
sax-silamet e». Bi vî awayî wî û
t’emamîya neferêd mala wî ba-
wer kirin. 54 Eva nîşana duda bû
ku Îsa kir, gava Ew ji Cihûstanê
hate Celîlê.

## Nexweşê sî û h’eyşt sala qenc dibe

**5** **1** Pey vê yekêr’a cejineke
cihûya hat û Îsa hevraz çû
Orşelîmê.

**2** Li Orşelîmê, li ber dergehê Pêz
h’ewzek hebû, ku bi îbranî[f] jêr’a
dibêjin Beytzat’a, pênc hêwange-
hêd wê hebûn. **3** Wan hêwangehada
gelek nexweş p’aldayî bûn: Yêd
kor, şilûşe’t û k’ût. **4** Evana hîvîya
lihevk’etina avê bûn, çimkî car-cara
milyak’etekî Xudan dik’ete avê û
li hev dixist. Û pey lihevk’etina
avêr’a, k’ê berî h’emûya bik’eta avê,
ew ji nexweşîya xwe qenc dibû*.
**5** Merivek li wê derê hebû, ku ne-
xweşê sî h’eyşt sala bû. **6** Îsa gava
ew li wir p’aldayî dît û zanibû jî ku
ew zûva nexweş e, wîr’a got: «Tu
dixwazî qenc bî?» **7** Yê nexweş lê
veger’and û gotê: «Ez xulam, ke-
sekî min t’une, wekî gava av li hev
dik’eve, min bavêje h’ewz. H’eta
ez h’izî didime xwe xwe bavêjimê,
yekî din berî min xwe davêjê». **8** Îsa
jêr’a got: «R’abe ber’a xwe hilde
û biger’e». **9** Pêr’a-pêr’a ew meriv
qenc bû, ber’a xwe hilda û ger’îya.

Ew r’oja[f] şemîyê bû. **10** Hingê
cihûya wî merivê qencbûyîr’a got:
«Îro şemî ye! Qanûn îzinê nade
ku tu ber’a xwe hildî». **11** Ewî li
wan veger’and û got: «K’ê ez qenc
kirim Ewî minr’a got: ‹Ber’a xwe
hilde û biger’e›». **12** Wana jê pirsî:
«Ew k’î bû ku ter’a got: ‹Ber’a xwe
hilde û biger’e?›» **13** Lê yê qencbûyî
nizanibû Ew k’î bû, çimkî Îsa Xwe
nava e’laleta wirda betavekir. **14** Pey
vê yekêr’a Îsa ew p’aristgehêda dît
û jêr’a got: «Binihêr’e, tu qenc
bûyî! Îdî guna neke, wekî tiştekî
hê xirab neyê serê te».

**15** Wî merivî çû cihûyar’a gilî
kir, Yê ku ew qenc kirîye Îsa ye.
**16** Bona vê yekê îdî cihû pey Îsa
k’etin, çimkî Wî ev yekana r’oja
şemîyêda dikirin. **17** Hingê Îsa li
wan veger’and û got: «Bavê Min
h’eta niha şixulê Xwe dike, Ez jî
dikim». **18** Bona vê yekê cihûya hê
dikir ku Wî bikujin, çimkî Wî ne
t’enê r’oja[f] şemîyê t’er’ibandibû,
lê Xwedê kiribû Bavê Xwe û Xwe
himberî Xwedê kiribû.

## Xwedê h’ukum daye Kur’

**19** Lema Îsa wanr’a got: «Ez
r’ast bê xêlif wer’a dibêjim, ku
Kur’ nikare xweserîxwe tiştekî
bike, ew t’enê wan tiştêd ku di-
bîne Bav dike, Ew jî dike. Bav çi

* 5:4 Nav destnivîsarêd here qencda r’êza 4-a t’une.

dike Kur’ jî usa dike. 20 Çimkî
Bav Kur’ h’iz dike û her tiştêd
ku Xwexa dike nîşanî Wî dike.
Ewê hê tiştêd mezin nîşanî Wî
bike û hûnê e’cêbmayî bimînin.
21 Çawa ku Bav dikare mirîya sax
ke û jîyînê bide wan, usa jî Kur’[f]
dikare k’îjana Ew dixwaze, jîyînê
bide wan. 22 Serda jî Bav dîwana
t’u kesî nake, lê h’emû h’ukumê
dîwankirinê daye Kur’, 23 wekî
h’emû qedirê Kur’ bizanibin, çawa
qedirê Bavê zanin. Yê ku qedirê
Kur’ nizane, ew qedirê Bavê ku
Ew şandîye jî nizane.

24 Ez r’ast bê xêlif wer’a dibê-
jim: Her kesê ku guh bide gotinêd
Min û Wî bawer bike, Yê ku Ez
şandime, jîyîna wîye h’eta-h’etayê
heye. Dîwana wî nayê kirinê, lê
ew ji mirinê derbazî jîyînê bûye.
25 Ez r’ast bê xêlif wer’a dibêjim,
wext tê û pêr’a gihîştîye jî, ku
mirîyê dengê Kur’ê Xwedê bibi-
hên û ewêd ku bibihên wê bijîn.
26 Çimkî çawa Bav kanîya jîyînê
ye, usa jî kir wekî Kur’ Xwexa
kanîya jîyînê be. 27 Ewî h’uku-
mê dîwankirinê jî da Wî, çimkî
Ew Kur’ê[f] Mêriv e. 28 Li vê yekê
e’cêbmayî nemînin, çimkî wext
nêzîk dibe, ku h’emûyêd t’irbada
wê dengê Wî bibihên 29 û derk’e-
vin. Yêd ku qencî kirine wê bona
jîyînê r’abin, yêd ku xirabî kirine
bona dîwanê.

30 Ez Xwexa nikarim tiştekî bi-
kim. Çawa ku Ez dibihêm, usa jî
dîwanê dikim. Dîwankirina Min
r’ast e, çimkî Ez ne ku li xwestina
Xwe diger’im, lê xwestina Yê ku
Ez şandime.

## Şe’detîya bona Îsa

31 Heger Ez bona Xwe şe’detîyê
bidim, şe’detîya Min ne r’ast e.
32 Lê yekî din heye ku bona Min
şe’detîyê dide û Ez zanim ew
şe’detîya ku Ew bona Min dide
r’ast e. 33 We meriv şandine cem
Yûh’enna û wî şe’detîya r’astîyê
da. 34 Lê Ez ne h’ewcê şe’detîya
meriva me, Ez t’enê van tiş-
ta dibêjim, wekî hûn xilaz bin.
35 Yûh’enna ç’irak bû ku dişixulî
û r’onayî dida. We xwest ku hinek
wext bi r’onaya wî şa bin. 36 Lê ew
şe’detîya bona Min ser şe’detîya
Yûh’ennar’a ye. Çimkî ew şixulêd
ku Bavê spartine[f] Min, wekî Ez
wan bînime sêrî, hema ew şixul in,
yêd ku Ez dikim, şe’detîyê bona
Min didin, ku Bavê Ez şandime.
37 Û Bav ku Ez şandime, Wî Xwexa
bona Min şe’detî daye. We t’u car
ne dengê Wî bihîstîye, ne r’ûyê
Wî dîtîye 38 û ne jî gotina Wî dilê
weda dimîne, çimkî hûn Ewî ku

Wî şandîye bawer nakin. 39 Hûn
nivîsarada k’ûr dibin, çimkî hûn
dibêjin, jîyîna weye h’eta-h’eta-
yê wanda ye û hema ew xwexa
şe’detîya Min didin. 40 Lê hûn
naxwazin bêne cem Min, wekî
jîyîna we hebe.

41 Ez ne h’ewcê şikirdayîna me-
rivayê me, 42 lê Ez we nas dikim
û zanim ku dilê[f] weda h’izkirina
Xwedê t’une. 43 Ez bi navê Bavê
Xwe hatim û hûn Min qebûl nakin.
Lê heger yekî din bi navê xwe bê,
hûnê wî qebûl kin. 44 Hûnê çawa
bikaribin Min bawer bikin, he-
ger hûn nav hevda r’ûmeta navê
xwe diger’in, lê ew r’ûmeta ku ji
Xwedêyê bêşirîkî-bêhevale nage-
r’in? 45 Nefikirin ku **Ezê** we li ber
Bavê neheq kim. Yek heye, ku we
neheq dike, hema ew **Mûsa** ye ku
we gumana xwe danîye ser wî.
46 Heger we Mûsa bawer bikira,
weyê Ez jî bawer bikirama, çimkî
ewî derheqa Minda nivîsîye. 47 Lê
heger hûn nivîsarêd wî bawer
nakin, hûnê çawa gotinêd Min
bawer bikin?»

### Îsa pênc h’ezara t’êr dike

*(Metta 14:13-21; Marqos 6:30-44; Lûqa 9:10-17)*

**6** 1 Pey vê yekêr’a Îsa derbazî
wî berî gola Celîlê bû, ku
jêr’a Teberîya dibêjin. 2 E’laleteke
giran pey Wî diçû, çimkî wan ew
nîşanêd k’eremet dîtibûn, yêd ku
Wî li ser nexweşa kiribûn. 3 Îsa
r’abû serê ç’îyê û li wê derê t’evî
şagirtêd Xwe r’ûnişt. 4 Cejina
cihûyaye Derbazbûnê nêzîk bû.

5 Gava Îsa li dora Xwe nihêr’î,
dît ku e’laleteke giran berbi Wî
tê, gote Fîlîpo: «Emê nên ji k’u
derê bik’ir’in, wekî ev meriva-
na bixwin?» 6 Ewî ev yek got,
ku wî bicêr’ibîne[f], çimkî Xwexa
zanibû ku wê çi bikira. 7 Fîlîpo
lê veger’and û gotê: «Bahê dusid
zîvî[f] nan jî t’êra van nake, hema
wekî her yekîr’a pe’rîk jî bik’eve!»
8 Ji şagirta yekî, Endrawisê birê
Şimh’ûn-Petrûs gote Wî: 9 «Vir
xortek heye, ku pênc nanêd ceh
û du me’sîyêd wî hene. Lê bona
haqas meriva ev çi ye?»

10 Îsa got: «Meriva li e’rdê bidine
r’ûniştandinê». Şînayîya wir gelek
bû, ew mêrêd ku r’ûniştin, weke
pênc h’ezara bûn. 11 Hingê Îsa
ew nan hildan şikirî da û belayî
r’ûniştîya kir. Bi vî awayî jî me’sî
bela kirin, çiqas ku xwestin. 12 Û
gava t’êr xwarin, Ewî şagirtêd
Xwer’a got: «Wan hûrikêd ber-
mayî bidine hev, wekî tiştek p’ûç’
nebe». 13 Şagirta jî ji ber ewêd
ku pênc nanêd ceh xwaribûn,

donzdeh sele ji hûrikêd bermayî
t'ijî berev kirin.
14 Gava van meriva dît ku Îsa
ev nîşan kir, gotin: «R'ast Ev e ew
p'êxemberê ku wê bihata dinyayê!»
15 Hingê Îsa pê h'esîya ku ewê bên
û Wî bi zorê bibin bikine p'adşa,
dîsa Ew t'enê hilk'işîya ç'îyê.

**Îsa p'îya li ser avêr'a diçe**

*(Metta 14:22-27;*
*Marqos 6:45-52)*

16 Gava r'o çû ava, şagirtêd Wî
berjêrî devê golê bûn. 17 Ew k'e-
tine qeyikekê û r'ê k'etin, wekî
derbazî Kefernahûmê, wî berî
golê bin. Îdî te'rî k'etibû e'rdê, lê
Îsa hê Xwe wanr'a negîhandibû.
18 Firtoneke[f] qayîm r'abû, golê
da ber pêla. 19 Gava wan bêr k'i-
şandin qasî pênc-şeş kîlomêtira
pêşda çûn, wan dît ku Îsa peya
ser golêr'a tê nêzîkî qeyikê dibe.
R'isasê ew girtin, 20 lê Îsa wanr'a
got: «Netirsin, Ez im!» 21 Hingê
wan xwest ku Ew hildana qeyikê.
Qeyik pêr'a-pêr'a gihîşte wî alîyê
ku wan dixwest biçûnayê.

**Meriv li Îsa diger'in**

22 R'oja dinê ew e'laleta ku li
wî berî golê mabû, zanibû ku li
wir alîyê wan t'enê qeyikek hebû,
ew jî şagirtêd Wî t'enê k'etibûnê
derbaz bibûn, lê Îsa nek'etibû wê
qeyikê. 23 Ji alîyê Teberîyayê hi-
nek qeyikêd din hatin nêzîkî wî
cîyî bûn, k'îderê pey şikirdayîna
Xudanr'a nan xwaribûn. 24 Gava
meriva dît ku ne Îsa li wir e û ne
jî şagirtêd Wî, hingê ew xwexa jî
k'etine qeyika û çûne Kefernahû-
mê, wekî li Îsa biger'in.

**Îsa ye nanê jîyîna**
**h'eta-h'etayê**

25 Gava wan Îsa li wî berî go-
lê dît, jêr'a gotin: «Dersdar, Tu
k'engê hatî vê derê?» 26 Îsa li wan
veger'and û got: «Ez r'ast bê xêlif
wer'a dibêjim, hûn li Min dige-
r'in, ne ku bona wê yekê, ku we
nîşan dîtine, lê bona wê yekê,
ku we ji wî nanî xwar û t'êr bûn.
27 Bona xwarina p'ûç' nexebitin,
lê bona wê xwarinê bixebitin, ya
ku jîyîna h'eta-h'etayêda dimîne,
k'îjanê Kur'ê Mêriv wê bide we,
çimkî Bav Xwedê mora Xwe li
Wî xistîye».
28 Û wan jê pirsî: «Gerekê em
çi bikin, wekî wan şixulêd Xwedê
bînine sêrî?» 29 Îsa li wan veger'and
û got: «Şixulê Xwedê ev e, ku hûn
bawerîya xwe Wî bînin, Yê ku Ewî
şandîye». 30 Wana ser vê yekê jêr'a
got: «Ku usa ye Tê çi nîşanê bikî,
wekî em bibînin û Te bawer bikin?

Tê çi şixulî bikî? 31 Kal û bavêd me
ber’îyêda mana[f] xwarin, çawa ku
hatîye nivîsarê: ‹Wî ji e’zmên bona
xwarina wan nan da›*».

32 Îsa wanr’a got: «Ez r’ast bê
xêlif wer’a dibêjim, ew ne ku Mûsa
bû ku ji e’zmên nan da we, lê Bavê
Min bû. Belê Ew Bavê Min e, ku
wî nanê r’ast ji e’zmên dide we!
33 Çimkî ew nanê Xwedê dide ew
e, ku ji e’zmên tê xwarê û jîyînê
dide dinyayê». 34 Wan lê veger’and
û gotinê: «Em xulam, de her gav
vî nanî bide me».

35 Îsa wanr’a got: «Ez im nanê
jîyînê. Her kesê ku bê cem Min,
ew qet bir’çî nabe û her kesê ku
bawerîya xwe Min bîne, t’u car
t’î nabe. 36 Lê çawa ku Min we-
r’a got, we Ez dîtim jî, lê hûn hê
bawer nakin. 37 Ew h’emûyêd ku
Bav dide Min, wê bêne cem Min
û her kesê ku bê cem Min, Ez t’u
car berî wî nadim. 38 Çimkî Ez
ji e’zmên hatime xwarê, ne ku
xwestina Xwe bikim, lê xwestina
Wî, Yê ku Ez şandime. 39 Xwestina
Yê ku Ez şandime ev e, wekî Ez ji
h’emûyêd ku Wî dane Min t’u kesî
unda nekim, lê R’oja[f] Axretêda ji
mirinê r’akim. 40 Çimkî xwestina
Bavê Min ev e, wekî her kesê ku
Kur’ bibîne û bawerîya xwe Wî
bîne, jîyîna Wîye h’eta-h’etayê
hebe. Û R’oja Axretêda jî Ezê wî
ji mirinê r’akim».

41 Cihûya hindava Wîda bîna
xwe teng kir, çimkî Wî got: «Nanê
ku ji e’zmên hate xwarê Ez im».
42 Û digotin: «Ne eva Îsayê kur’ê
Ûsiv e, ku em dê û bavê Wî nas
dikin? Îdî eva çawa dibêje: ‹Ez ji
e’zmên hatime xwarê›?»

43 Îsa cab da û wanr’a got: «Nav
hevda nekine p’iste-p’ist. 44 T’u
kes nikare bê cem Min, h’eta
Bavê ku Ez şandime, wî berbi
Min nek’işîne. Û R’oja Axretê
Ezê wî ji mirinê r’akim. 45 Li alîyê
nivîsarêd p’êxemberada hatîye ni-
vîsarê: ‹H’emûyê ji alîyê Xwedêda
bêne hînkirinê›*. Her kesê ku ji
Bav bibihê û hîn be wê bê cem
Min. 46 Bi vê yekê Ez nabêjim,
ku kesekî Bav dîtîye. Ewê ku ji
Xwedê ye, t’enê Ewî Bav dîtîye.
47 Ez r’ast bê xêlif wer’a dibêjim,
ewê ku bawer dike jîyîna wîye
h’eta-h’etayê heye. 48 Ez im nanê
jîyînê. 49 Kal û bavêd we ber’îyêda
mana xwarin û mirin. 50 Lê ev e
ew nanê ku ji e’zmên hatîye xwarê,

* 6:31 Derk’etin 16:4; Zebûr 78:24.
* 6:45 Îşaya 54:13.

wekî her kesê ku jê bixwe nemire.
51 Ez im nanê jîyînê ku ji e’zmên
hatime xwarê. K’î ku ji Vî nanî
bixwe, wê h’eta-h’etayê bijî. Ew
nanê ku Ezê bona jîyîna dinyayê
bidim, ew bedena Min e».

52 Li ser vê yekê cihû hevr’a
k’etine de’wê û gotin: «Eva çawa
dikare bedena Xwe bide me ku em
bixwin?» 53 Hingê Îsa wanr’a got:
«Ez r’ast bê xêlif wer’a dibêjim,
h’eta ku hûn bedena Kur’ê Mêriv
nexwin û xûna Wî venexwin, jî-
yînê nava weda t’unebe. 54 Yê ku
bedena Min bixwe û xûna Min
vexwe, wê jîyîna wîye h’eta-h’e-
tayê hebe û Ezê wî R’oja Axretê
ji mirinê r’akim. 55 Çimkî bedena
Min xwarina r’ast e û Xûna Min
jî vexwarina r’ast e. 56 Ewê ku
bedena Min dixwe û xûna Min
vedixwe, ew nava Minda dimîne,
Ez jî nava wîda. 57 Çawa Bav, ka-
nîya jîyînê* Ez şandim û bi destê
Bavê Ez sax im, bi vî awayî jî yê
ku Min bixwe, wê bi destê Min
sax bimîne. 58 Ev e Ew nanê ku ji
e’zmên hatîye xwarê. Ev ne mîna
wî manayî ye, ku kal û bavêd we
xwarin, lê mirin. Ewê ku Vî nanî
bixwe, wê h’eta-h’etayê bijî». 59 Îsa
ev xeber k’inîştêda[f] gotin, gava Wî
Kefernahûmêda hîn dikir.

## Xeberêd jîyîna h’eta-h’etayê

60 Ji şagirtêd Wî geleka gava ev
xeber bihîstin, gotin: «Ev çi xeber-
ne giran in! K’î dikare guhdarîya
gotinêd Wî bike?» 61 Lê Îsava e’yan
bû ku şagirt li ser vê yekê nava
hevda dikine p’iste-p’ist, wanr’a
got: «Ev yek we p’işk[f] dike? 62 Lê
hingê hûnê çi bêjin, heger bibînin
Kur’ê Mêriv r’adibe wî cîyê ku berê
lê bû? 63 R’uh’ jîyînê dide, beden
berga tiştekî nagire. Ew xeberêd
ku Min wer’a gotin, R’uh’ û jîyîn
in. 64 Lê nava weda hinek hene
bawer nakin». Îsa hê serê sêrîda
zanibû ku k’î bawer nake û k’î ye
ewî ku wê nemamîya[f] Wî bike.
65 Û Wî got: «Bona vê yekê Min
wer’a got: Kesek nikare bê cem
Min h’eta ku ew ji alîyê Bavêda
jêr’a nehatibe dayînê».

66 Bona vê yekê ji şagirtêd Wî
gelek paşda çûn û îdî t’evî Wî
nediger’îyan. 67 Hingê Îsa ji her
donzdeha pirsî: «Dibe ku hûn jî
dixwazin her’in?» 68 Şimh’ûn-Pet-
rûs lê veger’and û gotê: «Xudan,
emê her’ine cem k’ê? Gotinêd

* 6:57 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Bavê sax» ku tê fe’mkirinê, jîyîn ji wî dertê.

jîyîna h’eta-h’etayê cem Te ne.
**69** Û me bawer kirîye û em zanin
ku Tu yî Pîrozê Xwedê». **70** Îsa li
wan veger’and û got: «Çima Min
hûn her donzdeh nebijartin? Lê
belê yek ji we cin[f] e». **71** Wî ev yek
bona Cihûdayê[f] kur’ê Şimh’ûnê
Îsxeryotî digot, çimkî r’ast e ew
yek ji her donzdeha bû, lê dîsa wê
nemamîya Îsa bikira.

### Îsa û birêd Xweva

**7** **1** Pey vê yekêr’a Îsa Celîlêda
diger’îya. Wî nedixwest ku
Cihûstanêda biger’îya, çimkî cihû
pey k’etibûn ku bikuştana. **2** Gava
Cejina[f] cihûyaye H’olikçêkirinê
nêzîk bû, **3** birêd Wî jêr’a gotin:
«Ji vir r’abe her’e Cihûstanê, wekî
şagirtêd Te ew kirêd ku Tu dikî
bibînin. **4** Çimkî merivê ku dixwaze
aşkere xwe bide naskirinê, kirinêd
xwe venaşêre. Heger Tu xweyê van
kira yî, xwe dinyayêva e’yan ke».
**5** Birêd Wî jî bawerîya xwe jê neda-
nîn. **6** Îsa wanr’a got: «Wextê Min
hê nehatîye, lê her t’im wext destê
weda ye. **7** Dinya nikare bijene we,
lê dijene Min, çimkî Ez şe’detîyê
didim, ku kirêd wê xirab in. **8** Hûn
xwexa hevraz her’ine vê cejinê, lê
Ez hela hê* nayêmê, çimkî wextê
Min hê t’am nehatîye». **9** Ew yek
wanr’a got û li Celîlê ma.

### Îsa t’evî cejinê dibe

**10** Lê çaxê birêd Wî hevraz
çûne cejinê, Ew jî r’abû çû wir,
ne ku aşkere, lê bi dizîva. **11** Wî
çaxî cihû cejinêda lê diger’îyan
û digotin: «Ew k’anê ye?» **12** Nav
e’laletêda bona Wî gelek xeberdan
diçû. Hineka digot: «Ew merivekî
qenc e», hineka jî digot: «Na, Ew
cime’tê ji r’ê derdixe». **13** Lê ji tirsa
cihûya, kesî newêribû aşkere bona
Wî tiştek bigota.
**14** Lê nîvê cejinêda Îsa hevraz çû
k’ete p’aristgehê û dest bi hînkiri-
nê kir. **15** Cihû e’cêbmayî diman û
digotin: «Evî nexwendîye, ew çawa
haqas nivîsar zane?» **16** Îsa li wan
veger’and û got: «Hînkirina Min
ne ji Min e, lê ji Wî ye, Yê ku Ez
şandime. **17** Heger merivek bixwa-
ze e’mirê Wî biqedîne, wê hingê
bizanibe ev hînkirina Min gelo
ji Xwedê ye, yan Ez xweserîxwe
xeber didim. **18** Yê ku xweserîxwe
xeber dide, ew li navê xwe diger’e,
lê Ewê ku li navê Yê ku Ew şandîye
diger’e, Ew yekî r’ast e û li cem
Wî qelpî t’une. **19** Ne Mûsa Qanûn
da we? Û ji we t’u kes jî Qanûnê

* 7:8 Nav destnivîsarêd qencda «hela hê» t’une.

naqedîne. Hûn çima dixwazin Min
bikujin?» 20 Cime'tê lê veger'and û
gotê: «Tu cinak'etî[f] yî! K'î dixwaze
Te bikuje?» 21 Îsa li wan veger'and
û got: «Min k'eremetek kir, hûn
h'emû jî e'cêbmayî mane. 22 Mûsa
sinetkirin[f] da we, (ew jî ne ku ji
Mûsa hat, lê ji kal û bava) û hûn
r'oja şemîyê mêriv sinet dikin.
23 Heger hûn r'oja şemîyê zar'a
sinet dikin wekî Qanûna[f] Mûsa
net'er'ibe, îdî çima hûn hêrsa xwe
li ser Min r'adikin, wekî Min r'oja
şemîyêda merivek serda-pêda qenc
kir? 24 Li anegorî dîtina ç'e'vêd
xwe dîwanê nekin, lê li anegorî
r'astîyê dîwanê bikin».

## Şika ser Îsa

25 Hingê hineke ji Orşelîmê
gotin: «Eva ne ew e, yê ku di-
xwestin bikuştana? 26 Û va ye Ew
aşkere xeber dide û t'u kes jî jêr'a
tiştekî nabêje. Dibe ku serwêr pê
h'esîyane, ku Eva Mesîh e? 27 Lê
r'ast em zanin ku eva ji k'u ye. Lê
gava ku Mesîh bê, kesê nizanibe
ku ew ji k'u ye».

28 Hingê Îsa p'aristgehêda wextê
hînkirinê dengê Xwe bilind kir û
got: «Hûn Min nas dikin û zanin
ku Ez ji k'u me? Ez xweserîxwe
nehatime. Lê Yê ku Ez şandime,
Ew ser r'astîyê ye, hûn Wî nas
nakin. 29 Ez Wî nas dikim, çimkî
Ez ji Wî me û Ewî Ez şandime».

30 Hingê kirin ku Wî bigirin,
lê kesekî nikaribû Ew bigirta,
çimkî hê wextê Wî nehatibû.
31 Lê ji e'laletê geleka bawerîya
xwe Wî anî û gotin: «Gava ku
Mesîh bê, Ewê ji kirinêd vî zê-
detir nîşana bike?»

## Bona girtina Îsa nobedar têne şandinê

32 Fêrisîya ew gote-gota derhe-
qa Wîda ji nava cime'tê bihîst û
serekêd k'ahîna nobedar şandin,
wekî Wî bigirin. 33 Îsa got: «Ezê
hinek wext jî t'evî we bimînim,
paşê Ezê her'ime cem Wî, Yê
ku Ez şandime. 34 Hûnê li Min
biger'in, lê Min nabînin. Cîyê
ku Ezê lê bimînim, hûn nikarin
bên». 35 Hingê cihûya hevdur'a
gotin: «Ev merivê k'uda her'e,
ku emê Wî nebînin? Qey nêta
Wî heye her'e cem cime'ta meye
ku li nav yûnanada[f] bela bûye û
yûnana hîn ke? 36 Ev çi xeberdan
e ew dike: ‹Hûnê li Min biger'in
û Min nebînin, cîyê ku Ezê lê
bimînim, hûnê nikaribin bên›?»

## Ç'emêd ava jîyînê

37 R'oja xilazîyê, r'oja cejinêye
here e'zîz, Îsa sekinî û bi dengekî

bilind got: «Heger yek t’î ye, bira
bê cem Min û vexwe. 38 Ewê ku
bawerîya xwe Min bîne*, çawa
ku nivîsar dibêje: ‹Wê ji nav-dilê
wî ç’emêd ava jîyînê bik’işin›»**.
39 Îsa ev gotin bona wî R’uh’ê Pî-
roz got, k’îjan ku bawermendêd
Wî wê bistandana. R’uh’ê Pîroz
hê nehatibû dayînê, çimkî Îsa hê
nehatibû r’ûmetkirinê.

### Dutîretîya nav e’laletê

40 Gava wana ev gotin bihîst,
hinekêd ji e’laletê gotin: «R’astî
jî eva ew p’êxember e». 41 Hineka
jî got: «Eva Mesîh e», lê hinekêd
din jî gotin: «Çima Mesîhê ji
Celîlê bê? 42 Ne nivîsar dibêje,
ku Mesîhê ji zur’eta Dawid[f] û ji
gundê Dawid wê bê, awa gotî ji
Beytleh’mê[f]?» 43 Bi vî awayî nav
e’laletêda, li ser Wî dutîretî pêşda
hat. 44 Hinekêd ji wan xwestin Ew
bigirtana, lê t’u kesî dest neda Wî.

### Nebawerîya serwêrêd cihûya

45 Hingê nobedar veger’îyane
cem fêrisî û serekêd k’ahîna. Wana
ji nobedara pirsî: «We çima Ew ne-
anî?» 46 Nobedara li wan veger’and
û gotin: «T’u kesî t’u cara mîna
wî merivî xeber nedaye!» 47 Hingê
fêrisîya li wan veger’and û gotin:
«Îdî ewî hûn jî ji r’ê derxistine?
48 T’u ji serwêr û fêrisîya kesekî
bawerîya xwe jê anîye, 49 pêştirî
vê cime’ta me’rim, ku Qanûnê
nizane û nifir’ lê ye?» 50 Nîkodê-
mo, yê ku berê çûbû cem Îsa û ji
fêrisîya bû, wanr’a got: 51 «Gelo
Qanûna me dîwana mêriv dike,
h’eta ku guhdarîya wî neke û
nizanibe ku ew çi dike?» 52 Li wî
veger’andin û gotin: «Dibe ku tu
jî ji Celîlê yî? K’ûr e’nene ke, tê
bibînî ku ji Celîlê t’u p’êxember
dernak’evin».

### Jina gunek’ar[f] tê baxşandinê

53 Û her kes çû mala xwe,
8 1 lê Îsa çû ç’îyayê[f] Zeyt’û-
nê. 2 Serê sibehê zû Ew dîsa
veger’îya p’aristgehê, t’emamîya
cime’tê hate cem Wî. Ew r’ûnişt û
destpêkir ew hîn kirin. 3 Qanûnzan[f]
û fêrisîya jineke ku zinêk’arîyêda
hatibû girtinê anîn û li ber h’emûya
dane sekinandinê. 4 Wana jêr’a got:
«Dersdar, eva jina zinêk’arîyêda

* 7:38 Xilazîya r’êza 37-a û serê r’êza 38-a aha jî tê fe’mkirinê: «Heger yek t’î ye, bira bê cem min û ewê ku Min bawer bike, bira vexwe».
** 7:38 Îsaya 58:11; Hezekîyêl 47:1; Zekerîya 14:8.

hate girtinê. 5 Qanûnêda Mûsa
t’emî daye me, ku em yêd aha bi-
dine ber kevira. Awa Tu çi dibêjî?»
6 Bi vê gotinê Ew dicêr’ibandin,
wekî nigê wan cî bigire, Wî neheq
derxin. Lê Îsa Xwe qûz kir û bi
t’ilîya Xwe li ser e’rdê nivîsî. 7 Lê
gava wan serhev-serhev dipirsîn,
Ewî serê Xwe bilind kir û wanr’a
got: «Nava weda k’î bêgune ye,
bira kevirê pêşin ew bavêje wê».
8 Û dîsa Wî Xwe qûz kir û bi t’i-
lîya Xwe ser e’rdê nivîsî. 9 Wana
ku ev yek bihîst, ji mezina girtî
yek-yek derk’etin. Îsa t’enê ma û
k’ulfet jî li wir sekinî mabû. 10 Îsa
serê Xwe bilind kir û wêr’a got:
«E’vdê, k’anê ne? Kesekî tu neheq
nekirî?» 11 Ewê gote Wî: «T’u kes
nema, ez xulam!» Û Îsa gotê: «Ez
jî te neheq nakim. Her’e û îdî ji
vir şûnda guna neke»*.

### R’onaya dinyayê

12 Îsa dîsa t’evî wan xeber da û
got: «Ez im r’onaya dinyayê. Ewê
ku pey Min bê, wê t’u car te’rîyêda
neger’e, lê wê r’onaya wîye jîyînê
hebe». 13 Fêrisîya lê veger’and û
gotinê: «Tu şe’detîyê bona Xwe didî,
şe’detîya Te ne r’ast e». 14 Îsa caba
wana da û got: «Heger Ez Xwexa
bona Xwe şe’detîyê didim, şe’de-
tîya Min r’ast e, çimkî Ez zanim
Ez ji k’u hatime û k’uda diçim.
Lê hûn nizanin ku Ez ji k’u têm,
yan k’uda diçim. 15 Hûn li anegorî
dîtina ç’e’va dîwanê dikin, lê Ez
dîwana t’u kesî nakim. 16 Lê heger
Ez dîwanê bikim jî, dîwankirina
Min r’ast e, çimkî Ez ne t’enê me,
Ez û Bav em hevr’a ne, yê ku Ez
şandime. 17 Qanûna weda jî nivîsar
e, ku şe’detîya du meriva r’ast e*.
18 Ez bona Xwe şe’detîyê didim û
Bavê ku Ez şandime jî bona Min
şe’detîyê dide».

19 Hingê wan jê pirsî: «K’anê ye
Bavê Te?» Îsa li wan veger’and û
got: «Hûn ne Min nas dikin, ne
jî Bavê Min. Heger we Ez nas
bikirama, weyê Bavê Min jî nas
bikira». 20 Îsa ev xeber p’aristgehêda
wextê hînkirina Xwe gotin, li wê
oda ku dîyarî têda dihate t’opki-
rinê, lê kesî Ew negirt, çimkî hê
wextê Wî nehatibû.

### Îsa ne ji vê dinê ye

21 Wî dîsa wanr’a got: «Ez di-
çim, hûnê li Min biger’in û hûnê
nav gunêd xweda bimirin. Hûn

* 8:11 Nav destnivîsarêd here qencda ji 7:53-a h’eta 8:11-a t’uneye.
* 8:17 Qanûna Ducarî 19:15.

nikarin bêne wî cîyê ku Ezê he-
r’imê». 22 Ser vê yekê cihûya got:
«Dibe ku evê Xwe bikuje ku di-
bêje: ‹Hûn nikarin bêne wî cîyê
ku Ezê her’imê›?»
23 Îsa wanr’a got: «Hûn ji jêrê
ne, Ez ji jorê me, hûn ji vê dinya-
yê ne, lê Ez ne ji vê dinyayê me.
24 Bona vê yekê Min wer’a got, ku
hûnê nav gunêd xweda bimirin.
Heger hûn bawer nekin ku EZ
EW IM*, hûnê nav gunêd xweda
bimirin». 25 Hingê jê pirsîn: «Tu k’î
yî?» Îsa wanr’a got: «Ez Ew im,
Yê ku serê sêrîda wer’a dibêjim.
26 Gelek tişt hene, ku Ez derheqa
weda bêjim û dîwana we bikim.
Lê Yê ku Ez şandime ser r’astîyê
ye û çi ku Min ji Wî bihîstîye, Ez
dinyayêr’a wê dibêjim».
27 Wana xeberdana Wî fe’m nekir,
ku Wî anî ser Bavê. 28 Hingê Îsa
wanr’a got: «K’engê hûn Kur’ê
Mêriv bilind kin, hûnê hingê
bizanibin ku EZ EW IM* û Min
qet t’u tişt xweserîxwe nekirîye,
lê Bavê çawa Ez hîn kirime, Ez
usa xeber didim. 29 Û Yê ku Ez
şandime t’evî Min e û Wî Ez t’e-
nê nehiştime, çimkî Ez her gav
kirinêd ku Wî xweş tên, dikim».
30 Gava Îsa aha xeber da, gelek
meriva bawerîya xwe Wî anî.

## R’astîyê we aza ke

31 Hingê Îsa gote wan cihûya, yêd
ku bawerîya xwe Wî anîn: «Heger
hûn ser hînkirina Min bimînin,
hûnê r’ast şagirtêd Min bin. 32 Hûnê
r’astîyê nas kin û r’astîyê we aza
ke». 33 Wana lê veger’and û gotinê:
«Em ji zur’eta Birahîm[f] in û t’u
car me xulamtî kesîr’a nekirîye.
Tu çawa dibêjî: ‹Hûnê aza bin›?»
34 Îsa li wan veger’and û got:
«Ez r’ast bê xêlif wer’a dibêjim,
her kesê ku guna dike, ew xulamê
guna ye. 35 Xulam h’eta-h’etayê
malêda namîne, lê kur’ h’eta-h’e-
tayê dimîne. 36 Awa heger Kur’ê
Xwedê we aza ke, hûnê r’astî aza
bin. 37 Ez zanim ku hûn ji zur’eta
Birahîm in, lê hûn dikin ku Min
bikujin, çimkî xeberêd Min dilê
weda cî nabin. 38 Min çi ku cem
Bavê Xwe dîtîye, Ez wê dibêjim,
we jî çi ku cem bavê xwe bihîstine
wê yekê dikin».

## Zar’êd mîrêcin

39 Wana lê veger’and û gotinê:
«Bavê me Birahîm e». Îsa wanr’a

* 8:24 Şirovekirinê bin r’êza Yûh’enna 8:58-da bixûnin.
* 8:28 Şirovekirinê bin r’êza Yûh’enna 8:58-da bixûnin.

got: «Heger hûn zar’êd Birahîm
bûna, weyê kirêd Birahîm biki-
rana. 40 Lê niha hûn dikin ku
Min bikujin, yekî usa ku r’astî
ji Xwedê bihîstîye, wer’a dibêje.
Birahîm tiştekî aha nekir. 41 Hûn
kirêd bavê xwe dikin». Hingê
Wîr’a gotin: «Em r’îya zinêk’a-
rîyêda dinê nek’etine! Bavekî
me heye, Ew jî Xwedê ye». 42 Îsa
wanr’a got: «Heger Xwedê Bavê
we bûya, weyê Ez h’iz bikirama,
çimkî Ez ji cem Xwedê r’abûm
hatime vir. Ez ne ku xweserî-
xwe hatime, lê Ewî Ez şandime.
43 Çima hûn tiştêd ku Ez dibêjim
fe’m nakin? Çimkî hûn nikarin
gotinêd Min bibin. 44 Hûn bavê
xweda ji mîrêcin in û dixwazin
xwestinêd bavê xwe bînine sêrî.
Ew ji serê sêrîda qet’il bû û wî t’u
car xwe r’astîyê negirtîye*, çimkî
nava wîda r’astî t’une. Gava ew
derewa dike, ew gora binyat’a
xwe dike, çimkî ew derewîn e û
bavê derewa ye. 45 Lê çimkî Ez
r’astîyê dibêjim, hûn Min bawer
nakin. 46 Ji we k’î dikare îzbat ke,
ku gunê Min heye? Awa heger
r’astîyê dibêjim, çima hûn Min
bawer nakin? 47 Ewê ku ji Xwedê
ye, gotinêd Xwedê dibihê. Bona
wê yekê hûn gotinêd Xwedê nabi-
hên, çimkî hûn ne ji Xwedê ne».

**Îsa û Birahîm**

48 Cihûya lê veger’and û gotinê:
«Çima em r’ast nabêjin, ku Tu
samerî yî û cina dik’evî?» 49 Îsa
wanr’a got: «Ez cina nak’evim. Ez
qedirê Bavê Xwe digirim, lê hûn
Min bêhurmet dikin. 50 Ez r’ûmeta
navê Xwe nager’im, lê yek heye
ku lê diger’e û serda dinihêr’e.
51 Ez r’ast bê xêlif wer’a dibêjim,
heger yek gotina Min xwey ke, ew
t’u car mirinê nabîne». 52 Hingê
cihûya jêr’a got: «Îdî em zanin
ku Tu cina dik’evî! Birahîm jî
mir, p’êxember jî mirin û niha
Tu dibêjî: ‹Heger yek gotina Min
xwey ke, t’u car namire›. 53 Çima
Tu ji bavê me Birahîm çêtir î?
Ew mir, p’êxember jî mirin. Tu
Xwe dewsa k’ê datînî?»
54 Îsa cab da: «Heger Ez xwexa
r’ûmeta navê Xwe bilind kim,
r’ûmeta navê Min ne tiştek e.
Ew, Bavê Min e, Yê ku r’ûmeta
navê Min bilind dike, k’îjanîr’a
hûn dibêjin: ‹Xwedêyê me ye›.
55 Hûn Wî qet nas nakin, lê Ez
Wî nas dikim. Heger Ez bêjim,
Ez Wî nas nakim, Ezê jî mîna

* 8:44 Aha jî tê fe’mkirinê: «Ew t’u car nebû alîyê r’astîyê».

we derew derêm, lê Ez Wî nas
dikim û gotina Wî xwey dikim.
56 Bavê we Birahîm h’eyra wê
r’oja Minda bû, wî dît û şa bû».
57 Bona vê yekê cihûya jêr’a got:
«Tu hê pêncî salî t’une yî! Te Bi-
rahîm jî dîtîye?» 58 Îsa wanr’a got:
«Ez r’ast bê xêlif wer’a dibêjim,
hê berî Birahîm EZ HEME»*.
59 Hingê wan kevir hildan ku
bavêjine Wî, lê Îsa Xwe ji wan
vedizî û ji p’aristgehê derk’ete
derva çû.

### Vebûna ç’e’vêd yekî zikmakîyêda kor

9 1 Gava ku Îsa derbaz dibû,
Ewî merivekî ji zikmakî-
yêda kor dît. 2 Şagirtêd Wî jê
pirsîn: «Dersdar, gunê k’ê ye ku
ev meriva kor ji dîya xwe bûye?
Gunê wî ye, yan yê dê û bavê
wî ye?» 3 Îsa li wan veger’and
û got: «Ne gunê wî ye, ne jî yê
dê û bavê wî ye, lê ev yek aha
bûye, wekî kirêd Xwedê li ser wî
bêne e’yankirinê. 4 H’eta ku r’oj
heye, gerekê em kirêd Wî bikin,
Yê ku Ez şandime. Şev tê, hingê
t’u kesê nikaribe tiştekî bike.
5 H’eta ku Ez dinyayêda me,
r’onaya dinyayê me».
6 Ewî ev yek ku got, t’ûyî e’rdê
kir, ji t’ûkê h’er’î çêkir, ew h’e-
r’î ç’e’vê wî merivî da 7 û jêr’a
got: «Her’e serç’e’vê xwe h’ewzê
Sîlwamêda bişo», (ku ev nav tê
fe’mkirin «Şandî»). Ewî jî çû
serç’e’vê xwe şûşt û bi ç’e’vêd
vebûyî veger’îya.
8 Cînarêd Wî û ewêd ku berê ew
dîtibûn ku wî p’ars dikir, digotin:
«Eva ewî kor nîne, ku r’ûdinişt û
p’ars dikir?» 9 Hineka digot: «Eva
ew e», hineka jî digot: «Na, ne ew
e, lê mîna wî ye». Lê wî xwexa
digot: «Ez ew im». 10 Hingê jê
pirsîn: «Ku usa ye ç’e’vêd te çawa
vebûne?» 11 Ewî li wan veger’and
û got: «Ew merivê ku jêr’a dibêjin
Îsa, Ewî h’er’î çêkir û li ç’e’vêd
min dan û minr’a got: ‹Her’e
h’ewzê Sîlwamê û serç’e’vê xwe
bişo›. Ez jî çûm, min serç’e’vê
xwe şûşt û ç’e’vêd min vebûn».
12 Wana jê pirsî: «K’a Ew k’u ye?»
Ewî got: «Ez nizanim».

### Fêrisî gilîya ji yê qencbûyî dik’işînin

13 Wana ew merivê ku berê kor
bû, birine cem fêrisîya. 14 Ew r’o-
ja ku Îsa h’er’î çêkir û ç’e’vêd wî
vekirin, şemî bû. 15 Fêrisîya jî jê

* 8:58 Derk’etin 3:13-14.

pirsî, k’a çawa ç’e’vêd wî vebûne?
Ewî wanr’a got: «H’er’î li ç’e’vêd
min da, min serç’e’vê xwe şûşt û
niha ez dibînim». 16 Hingê hine-
ke ji fêrisîya got: «Ev meriva ne ji
Xwedê ye, çimkî Ew r’oja şemîyê
xwey nake». Lê hineka jî digot:
«Merivekî gunek’ar çawa dikare van
k’eremeta bike?» Bi vî awayî nav
wanda bû dutîretî. 17 Hingê, dîsa
gotine yê ku kor bû: «Tu çi dibêjî
bona Ewî ku ç’e’vêd te vekirin?»
Ewî jî got: «Ew p’êxember e».

18 Lê cihûya bawer nedikir ku
ew kor bûye û ç’e’vêd wî vebûne,
h’eta gazî dê û bavê wî nekirin
19 û ji dê û bavê wî nepirsîn: «Ev
e ew kur’ê weyî ku hûn dibêjin, ji
zikmakîyêda kor e? Eva çawa niha
dibîne?» 20 Dê û bavê wî li wan
veger’andin û gotin: «Em zanin ku
eva kur’ê me ye û ji zikmakîyêda
kor e. 21 Lê niha ew çawa dibîne,
em nizanin, yan k’ê ç’e’vêd wî
vekirine, em wê jî nizanin. Ew
îdî mezin e, ji wî bipirsin, bira
ew caba xwe bide». 22 Dê û bavê
wî ji tirsa cihûya aha gotin, çimkî
cihûya pêşda ya xwe kiribûne yek:
«Heger k’î bêje Îsa Mesîh e, ewê
ji k’inîştê bê derxistinê». 23 Lema
dê û bavê wî gotin: «Ew îdî mezin
e, ji wî bipirsin».

24 Awa cara duda wana gazî wî
merivê ku kor bû kirin û gotinê:
«Ber Xwedê r’ast bêje!* Em zanin
ku Ew Meriva gunek’ar e». 25 Ewî
li wan veger’and û got: «Ez ni-
zanim Ew gunek’ar e, yan na, lê
ez t’enê tiştekî zanim ku ez kor
bûm û niha dibînim». 26 Dîsa ji
wî pirsîn: «Ewî çi te kir? Ç’e’vêd
te çawa vekirin?» 27 Ewî li wan
veger’and û got: «Min hêja wer’a
got, lê we guhdarî nekir. Çima
hûn dixwazin dîsa bibihên? Dibe
ku hûn jî dixwazin bibine şagir-
têd Wî?» 28 Wana ew bêhurmet
kir û gotin: «Tu yî şagirtê Wî, lê
em şagirtêd Mûsa ne! 29 Em za-
nin ku Xwedê t’evî Mûsa xeber
daye, lê bona Vî em nizanin ku
Ew ji k’u ye!»

30 Evî merivî li wan veger’and û
got: «Hema ev e e’cêba giran, ku
hûn nizanin Ew ji k’u ye, lê Wî
ç’e’vêd min vekirin. 31 Em zanin
ku Xwedê dengê gunek’ara nabihê.
Lê heger merivek xwedênas e û
xwestina Wî dike, Xwedê dengê
wî dibihê. 32 Hê berêda t’u cara
qet nehatîye bihîstinê, ku yekî

* 9:24 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Şikirîyê bide Xwedê», çawa wî bidine sondê (Yêşû 7:19).

ç'e'vêd merivekî zikmakîyêda kor
vekiribin. 33 Heger Eva Meriva ji
Xwedêda nîbûya Wî nikaribû t'u
tişt bikira». 34 Caba wî dan û gotin:
«Tu serda-pêda nav gunada dinê
k'etî yî û me hîn dikî?» Û ew ji
k'inîştê derxistine der.

### Korbûna r'uh'anî

35 Gava Îsa bihîst ku ew der-
xistine der, ew dît û jêr'a got: «Tu
bawerîya xwe Kur'ê Mêriv tînî?»
36 Ewî pirsî û gotê: «Ez xulam, Ew
K'î ye, wekî ez bawerîya xwe Wî
bînim?» 37 Îsa jêr'a got: «Te Ew dît
û Ew e Yê ku niha t'evî te xeber
dide». 38 Ewî got: «Xudan, ez ba-
wer dikim!» û ber Wî ta bû. 39 Îsa
got: «Ez bona dîwankirinê hatime
vê dinyayê, wekî yêd ku nabînin
bibînin û yêd ku dibînin kor bin».
40 Hineke ji fêrisîya li wir hazir
bûn, gava ev yek bihîstin, jêr'a
gotin: «Çima em jî kor in?» 41 Îsa
gote wan: «Heger hûn kor bûna,
gunêd weyê t'unebûna. Lê niha
hûn ku dibêjin: ‹Em dibînin›,
didine k'ifşê ku hûn nava gunêd
xweda dimînin.

### Şivan û pezêd wî

10 1 Ez r'ast bê xêlif wer'a
dibêjim, ewê ku dêrîr'a
nak'eve axilê pêz, lê cîkî dinr'a
dik'evê, ew diz û qaçax e. 2 Lê ewê
ku dêrîr'a dik'evê, ew şivanê pêz
e. 3 Dergehvan derî li ber vedike,
pez dengê wî dibihê û ew bi nava
gazî pezêd xwe dike û wan derdixe
derva. 4 Gava ew pezêd xwe gişkî
derdixe, pêşîyê dik'eve û pez jî pey
wî diçe, çimkî dengê wî nas dikin.
5 Ew t'u car pey yekî xerîb naçin,
lê ji wî dir'evin, çimkî dengê yê
xerîb nas nakin».
6 Îsa ev mesele wanr'a got, lê
wan fe'm nekir, ku Ew çi wanr'a
dibêje.

### Şivanê qenc

7 Awa Îsa dîsa wanr'a got: «Ez
r'ast bê xêlif wer'a dibêjim, Ez im
derê pêz. 8 Ew h'emûyêd ku berî
Min hatine diz û qaçax in, lê pêz
guhdarîya wan nekirîye. 9 Ez im
derî. Yê ku bi destê Min bik'eve
hindur', wê xilaz be. Ewê bik'eve
hindur', derk'eve û ç'êrê bibîne.
10 Diz t'enê bona dizîyê, kuştinê
û qir'kirinê tê. Lê Ez hatime ku
jîyîna wan hebe, jîyîna ser jîyînê.
11 Ez im şivanê qenc. Şivanê
qenc e'mirê Xwe bona pezê Xwe
dide. 12 Lê yê p'îgar[f], ku ne şivan
e û pez jî ne yê wî ye, gava dibîne
gur tê, ew pêz dihêle û dir'eve.
Gur jî dik'eve nava pêz t'ûr'-t'ûr'î
dike. 13 P'îgar dir'eve, çimkî ew

p'îgar e û li ber pêz nak'eve. 14 Ez
im şivanê qenc. Ez yêd Xwe nas
dikim û yêd Min jî Min nas dikin,
15 çawa ku Bav Min nas dike, Ez
jî usa Wî nas dikim û e'mirê Xwe
bona pezêd Xwe didim. 16 Pezêd
Mine din jî hene, yêd ku ne vî
axlîda ne. Gerekê Ez wana jî bî-
nim û ewê dengê Min bibihên û
bibine kerîk ber şivanekî. 17 Bona
vê yekê Bav Min h'iz dike, çimkî
Ez e'mirê Xwe didim, wekî Ez wê
dîsa bistînim. 18 T'u kes wî e'mirî
ji Min nastîne, lê Ez Xwexa wî
didim. H'ukumê Min heye, Ez wî
bidim û h'ukumê Min heye dîsa
wî bistînim. Min ev t'emî ji Bavê
Xwe standîye».

19 Bona vê xeberdanê dîsa nava
cihûyada bû dutîretî. 20 Ji wan
geleka digot: «Eva cinak'etî[f] ye
û dîn e. Çima hûn guhdarîya Wî
dikin?» 21 Hinekêd din jî digotin:
«Eva xeberdana ne ya cinak'etîya
ye. Qet cin dikarin ç'e'vêd kora
vekin?»

### Nebawerîya cihûya

22 Hingê li Orşelîmê Cejina[f]
Pîrozkirina P'aristgehê* hat û
zivistan bû. 23 Îsa li p'aristgehê
hêwangeha Silêmanda[f] diger'îya.
24 Cihûya li dora Wî girt û jê pir-
sîn: «H'eta k'engê Tê me şikêda
bihêlî? Heger Tu yî Mesîh, mer'a
aşkere bêje!»

25 Îsa li wan veger'and û got:
«Min wer'a got, lê we bawer
nekir. Ew kirêd ku Ez bi navê
Bavê Xwe dikim, ew bona Min
şe'detîyê didin, 26 lê hûn bawer
nakin, çimkî hûn ne ji pezêd
Min in. 27 Pezêd Min dengê Min
dibihên, Ez jî wan nas dikim û
ew pey Min tên. 28 Ez jîyîna h'e-
ta-h'etayê didime wan û ew t'u
car unda nabin û t'u kesê wan
ji destê Min dernexe. 29 Ewêd
ku Bavê Min dane Min, ser her
tiştîr'a ne* û t'u kes nikare wan
ji destê Bavê Min derxe. 30 Ez û
Bav yek in».

31 Li wir cihûya dîsa kevir hil-
dan, ku Wî bidine ber kevira. 32 Îsa
wanr'a got: «Min ji Bavê gelek
kirêd qenc nîşanî we kirin. Hûn
bona k'îjan kirî Min didine ber
kevira?» 33 Cihûya lê veger'and û
gotinê: «Em bona kirêd qenc Te
nadine ber kevira, lê çimkî Tu

---

* 10:22 Bi gotineke din: «Buhurtî-jibarekirina P'aristgehê».
* 10:29 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Bavê Minî ku ew dane Min, ser h'emûyar'a ye».

Xwedê bêhurmet dikî! Tu meriv
î, lê Xwe dikî Xwedê».
34 Îsa li wan veger’and û got: «Ne
Qanûna weda nivîsar e, ku Xwedê
got: ‹Hûn Xwedê ne›*? 35 Heger Ew
wan ‹Xwedê› h’esab dike, k’îjana-
r’a xebera Xwedê hatîye dayînê
(û nabe jî ku ew nivîsar betal be),
36 de îjar hûn Wîr’a çawa dibêjin:
‹Tu Xwedê bêhurmet dikî›, Yê ku
Bavê pîroz[f] kir* û şande dinyayê,
çimkî Min got: ‹Ez Kur’ê Xwedê
me›. 37 Heger Ez kirêd Bavê Xwe
nakim, Min bawer nekin. 38 Lê wekî
dikim, heger hûn Min bawer nakin
jî, hema wan kirêd ku Ez dikim
bawer bikin, wekî hûn bizanibin
û fe’m kin, ku Bav nava Minda
ye û Ez nava Wîda me». 39 Hingê
dîsa xwestin ku Wî bigirin, lê Îsa
ji destê wan derk’et.
40 Îsa dîsa derbazî wî alîyê ç’emê
Ûrdunê bû û li wê derê ma, wî cîyê
ku Yûh’enna pêşda dinixumand.
41 Gelek meriv dihatine cem Wî
û nav xweda digotin: «Yûh’enna
t’u nîşan nekir, lê çi tiştêd ku
Yûh’enna derheqa Vî merivîda
gotine, h’emû r’ast derk’etin».
42 Û li wê derê geleka bawerîya
xwe Wî anî.

## Mirina Lazar

11 1 Merivek hebû navê wî
Lazar, ew nexweş k’et.
Ew ji Beytanyayê bû, ji wî gundê
Meryemê[f] û xûşka wê Mert’ayê.
2 Eva ew Meryema[f] bû, ya ku r’ûnê
bînxweş li Xudan dabû û bi p’or’ê
xwe nigêd Wî paqij kiribûn, ew
Lazarê birê wê bû nexweş. 3 Awa
her du xûşka Îsar’a cab şandin û
gotin: «Xudan, va ewî ku Tu jê
h’iz dikî nexweş e». 4 Îsa gava ev
yek bihîst, got: «Ev ne nexweşîya
mirinê ye, lê bona r’ûmeta Xwedê
ye, wekî bi wê yekê r’ûmeta Kur’ê
Xwedê bilind be».
5 Îsa Mert’a, xûşka wê û Lazarê
birê wan h’iz dikirin. 6 Lê gava Wî
bihîst ku Lazar nexweş e, Ew du
r’ojêd din jî li wî cîyî derengî bû.
7 Peyr’a Wî şagirtêd Xwer’a got:
«Werin em dîsa her’ine Cihûsta-
nê». 8 Şagirta jêr’a got: «Dersdar,
çendek pêşda cihûya dikir ku Te
bidine ber kevira, Tu dîsa diçî wê
derê?» 9 Îsa li wan veger’and û got:
«Ne r’oj donzdeh sih’et e? Heger
yek r’ojê biger’e ew nalik’ume,
çimkî r’onaya vê dinyayê dibîne.
10 Lê heger yek şevê biger’e, ew

* 10:34 Zebûr 82:6.
* 10:36 Bi gotineke din: «Buhurtî-jibare kir, başqe kir».

dilik’ume, çimkî t’evî wî r’onayî
t’une». 11 Pey vê xeberdanêr’a Ewî
wanr’a got: «Pismamê me Lazar
xewr’a çûye, lê Ezê her’im ku
wî h’işyar kim». 12 Şagirta jêr’a
got: «Xudan, heger ew r’azaye,
wê r’abe ser xwe». 13 Îsa derheqa
mirina wîda digot, lê wan t’irê[f]
ku Ew bona r’azana wî dibêje.
14 Hingê Îsa aşkere wanr’a got:
«Lazar mir. 15 Û Ez şa me ku ne
li wira bûm, çimkî eva yeka wê
bona k’ara bawerîya we be. Lê
dîsa werin em her’ine cem wî».
16 Hingê T’ûmayê ku digotinê
«Heval-cêwî», şagirtêd hevalêd
xwer’a got: «Em jî her’in, ku t’evî
Wî bimirin».

**Îsa ye r’abûna mirîya û jîyîn**

17 Gava Îsa çû, Wî dît ku îdî ew
çar r’ojê Lazar bû defin kiribûn.
18 Beytanya nêzîkî Orşelîmê bû,
weke sê kîlomêtira jê dûr bû.
19 Gelek cihû hatibûne serxweşîya
Mert’a û Meryemê, bona mirina
birê wan.

20 Gava Mert’ayê bihîst ku Îsa
tê, ew pêşîya Wîda çû, lê Meryem
malda ma. 21 Mert’ayê gote Îsa:
«Xudan, heger Tu vir bûyayî, birê
min nedimir. 22 Lê niha jî ez zanim
Tu çi ji Xwedê bixwazî, Ewê bide
Te». 23 Îsa gote wê: «Birê teyê ji
mirinê r’abe». 24 Mert’ayê lê ve-
ger’and: «Ez zanim R’oja Axretê,
R’oja[f] R’abûnê ewê r’abe». 25 Îsa
gote wê: «Ez im r’abûn û jîyîn!
Ewê ku bawerîya xwe Min bîne,
heger bimire jî wê bijî. 26 Û ewê
ku dijî û bawerîya xwe Min tîne,
ew qet namire. Tu vê yekê bawer
dikî?» 27 Mert’ayê Wîr’a got: «Belê
Xudan, ez bawer dikim, ku Tu
Mesîh î, Kur’ê Xwedê, Yê ku wê
bihata dinyayê».

**Îsa digirî**

28 Pey vê gotinêr’a, çû gazî xûşka
xwe Meryemê kir û dizîva gotê:
«Dersdar hatîye û gazî te dike».
29 Gava ku wê bihîst, zû r’abû
çû. 30 Îsa hê nek’etibû gund, lê
li wî cîyî mabû, k’îderê Mert’a
r’astî Wî hatibû. 31 Cihûyêd ku
malêda t’evî wê bûn û li ber di-
lê wêda dihatin, gava dîtin ku
Meryem zû r’abû derk’ete derva,
dane pey wê çûn. Wan t’irê ku
ew diçe ser t’irbê bigirî. 32 Gava
Meryem gihîşte wî cîyî ku Îsa lê
bû, Ew dît, xwe avîte ber niga
û gotê: «Xudan, heger Tu li vê
derê bûyayî, birê min nedimir».
33 Gava ku Îsa ç’e’v girîyê wê û
girîyê cihûyêd ku pêr’a hatibûn
k’et, k’esera k’ûr hatê û dilê Wî

êşîya. 34 Û ji wan pirsî: «We ew
li k'u defin kirîye?» Wîr'a gotin:
«Xudan, were û bibîne». 35 Îsa gi-
rîya. 36 Hingê cihûya got: «Dîna
xwe bidinê, çiqas jê h'iz dikir!»
37 Ji wan hineka jî got: «Evî ku
ç'e'vêd yê kor vekirin, nikaribû usa
bikira, ku ev meriva jî nemira?»

## Îsa Lazarê mirî sax dike

38 Li ser vê yekê Îsa dîsa k'ûr
k'eser k'işand û çû ser t'irbê. Ew
t'irb şkeftek bû û kevirek ber devê
wê bû. 39 Îsa got: «Vî kevirî wêda
kin». Xûşka yê mirî, Mert'ayê
Wîr'a got: «Xudan, îdî niha bîn
k'etîyê, îro çarê wî ye mirîye».
40 Îsa gote wê: «Min ter'a negot,
heger tu bawer bikî, tê r'ûmeta
Xwedê bibînî?» 41 Hingê kevir
wêda kirin. Îsa serê Xwe bilind
kir û got: «Bavo, Ez ze'f r'azî me
ku Te dengê Min bihîst. 42 Ez
zanim ku Tu her gav dengê Min
dibihêyî, lê Min bona xatirê vê
cime'ta sekinî got, wekî bawer
bikin ku Te Ez şandime».

43 Pey vê gotinêr'a bi dengekî
bilind kire gazî: «Lazar, derk'e-
ve!» 44 Yê mirî jî dest û p'îyêd wî
bi k'itan k'efenkirî[f] û serç'e'vê wî
bi destmalekê nixamtî derk'ete
derva. Îsa wanr'a got: «Wî vekin
û bihêlin bira her'e».

## Şêwira kuştina Îsa

*(Metta 26:1-5; Marqos 14:1-2;*
*Lûqa 22:1-2)*

45 Hingê gelek cihûyêd ku ha-
tibûne cem Meryemê, ev kirina
Îsa ku dîtin, bawerîya xwe Wî
anîn. 46 Lê ji wan hinek jî çûne
cem fêrisîya û ev kirina Îsa wanr'a
gotin. 47 Û hingê fêrisî û serekêd
k'ahîna civîna[f] giregira gîhandine
hev û gotin: «Emê çi bikin? Eva
meriva gelek nîşana dike. 48 He-
ger em Wî aha bihêlin, h'emû wê
bawerîya xwe Wî bînin û r'omayî
jî wê bên, cîyê meyî pîroz[f] wêran
kin û k'oka miletê me jî bînin».

49 Yekî ji wan, Qeyafayê ku wê
salê serekk'ahîn bû, wanr'a got:
«Hûn qet tiştekî fe'm nakin! 50 Ne
jî digihîjine gilîya ku mer'a hê dest
dide merivek bimire bona cime'tê,
ne ku t'emamîya milet unda be».
51 Ev yeka ewî h'emdê xwe negot,
lê çimkî ew serekk'ahînê wê salê
bû, p'êxembertî[f] kir, ku Îsayê ber
miletva bimire. 52 Û ne ku t'enê
bona milet, lê bona zar'êd Xwe-
dêye belabûyî jî, ku wan bicivîne û
bike yek. 53 Awa îdî pey wê r'ojêr'a
şêwira kuştina Îsa kirin.

54 Bona vê yekê Îsa îdî aşkere
nava cihûyada nediger'îya, lê ji
wir çû ber'îyê cîkî nêzîkî bajarê

ku jêr’a Efrayîm digotin û t’evî
şagirtêd Xwe li wê derê ma.
55 Cejina cihûyaye Derbazbûnê
nêzîk bû, gelek merivêd ji dor-bera
berî cejinê hevraz çûne Orşelîmê,
wekî li gora e’det xwe bişon-veşon.
56 Hingê ewana li wê derê Îsa di-
ger’îyan û p’aristgehêda disekinîn,
ji hevdu dipirsîn: «Hûn çi dibêjin?
Ewê e’se neyê vê cejinê?» 57 Fêrisî
û serekêd k’ahîna jî e’mir derxis-
tibûn, heger kesek bizanibe Ew li
k’u derê ye, gerekê guhê wan pê
xin, wekî ew Wî bigirin.

### Îsa Beytanyayêda tê r’ûnkirinê[f]

*(Metta 26:6-13; Marqos 14:3-9)*

**12** 1 Şeş r’oj berî Cejina Der-
bazbûnê, Îsa hate Beytan-
yayê, wî cîyê ku Lazar lê dima, yê
ku Îsa ew ji nav mirîya r’akiribû.
2 Li wê derê wana qedirek jêr’a
kirin. Mert’ayê xizmetk’arî dikir,
Lazar jî t’evî Îsa nava wanda li ser
sifrê r’ûniştî bû. 3 Hingê Meryemê
lîtirekî r’omayî* bi r’ûnê nardêyî[f]
safî û biha hilda, ser nigêd Îsada
kir û pê p’or’ê xwe nigêd Wî ziha
kirin. Bîna r’ûnê nardê mal hilda.
4 Lê ji şagirtêd Wî yekî, Cihûdayê
Îsxeryotî, yê ku wê paşê nemamîya
Wî bikira got: 5 «Çima ev r’ûnê
nardê sêsid zîvî* nehate firotanê,
ku li belengaza bihata belakirinê?»
6 Ewî ev yek digot, ne ku xema wî
belengaz bûn, lê çimkî ew diz bû,
k’îsikê p’era cem wî bû û çi ku
dik’etê, ewî jê diç’opand.
7 Hingê Îsa gote wî: «Ji wê
k’ulfetê veger’e. Îdî çima vî r’ûnî
h’eta r’oja definkirina[f] Min xwey
ke?* 8 Feqîrê her gav t’evî we bin,
lê Ezê her gav t’evî we nîbim».

### Şêwira kuştina Lazar

9 Ji cihûya geleka bihîst ku Îsa li
wê derê ye hatin. Ew ne ku t’enê
bona Îsa hatin, lê wekî Lazarê ku
ji nav mirîya r’akirîye jî bibînin.
10 Hingê serekêd k’ahîna şêwirîn
ku Lazar jî bikujin, 11 çimkî r’ûyê
wîda gelek cihû diçûn bawerîya
xwe Îsa danîn.

### Îsa bi r’ûmet dik’eve Orşelîmê

*(Metta 21:1-11; Marqos 11:1-11; Lûqa 19:28-40)*

12 R’oja dinê e’laleteke giran
ku hatibû cejinê, gava bihîst ku

---

* 12:3 «Lîtirekî r’omayî» hingê weke 325 giramê niha bû.

* 12:5 «Sêsid zîv» hingê weke xebata p’alekî t’emamîya salê bû.

* 12:7 Aha jî tê fe’mkirinê: «Bira vî r’ûnî bona r’oja definkirina Min xwey ke».

Îsa tê Orşelîmê, 13 wana ç’iqilêd
xurmê hildan çûne pêşîya Wî û
kirine qîr’în:

«Hosanna[f]! Bimbarek e Ewê
ku bi navê Xudan tê*, P’adşê
Îsraêlê!»

14 Îsa ce’şikek dît û lê sîyar bû,
çawa nivîsar e:

15 «Netirse bajarê Sîyonê[f]*.
Va ye P’adşê te tê, li ce’şika
k’erê sîyar bûyî»**.

16 Şagirtêd Wî pêşîyê eva yeka
fe’m nekirin, lê gava Îsa k’ete r’û-
meta Xwe, hingê hate bîra wan,
ku ev yek bona Wî hatibû nivîsarê
û bona Wî eva yeka kirin. 17 Ew
cime’ta ku hingê t’evî Wî bû, gava
Wî Lazar ji mirinê r’akir û e’mir kir
ku ji gor’ê derê, şe’detîya wê yekê
dida. 18 Bona vê yekê cime’t pêşîya
Wîda çû, çimkî wana bihîstibû ku
Ewî eva nîşana kirîye. 19 Fêrisîya jî
hevr’a got: «Hûn dibînin eva yeka
ji qewata me der e. Va t’emamîya
dinyayê pey Wî çû!»

### Hinek yûnan li Îsa diger’in

20 Nav wanda çend yûnan[f] jî
hebûn, ku bona h’ebandinê ce-
jinêda hevraz çûbûne Orşelîmê.
21 Evana hatine cem Fîlîpoyê ji
bajarê Beytsayda Celîlê hîvî jê
kirin û gotinê: «Em xulam, em
dixwazin Îsa bibînin». 22 Fîlîpo
çû eva yeka Endrawisr’a got,
Endrawis û Fîlîpo jî çûn Îsar’a
gotin. 23 Îsa li wan veger’and û
got: «Ew sih’eta ku Kur’ê Mêriv
wê bê r’ûmetkirinê pêr’a gihîşt.
24 Ez r’ast bê xêlif wer’a dibêjim,
heger h’eba gênim nek’eve e’rdê
û nemire, ewê t’enê bimîne, lê
heger ew bimire, wê gelek ber
bide. 25 Yê ku e’mirê xwe h’iz
dike, ewê unda ke, lê ewê ku li
vê dinyayê dijene e’mirê xwe, ew
wî bona jîyîna h’eta-h’etayê xwey
dike. 26 Ewê ku bixwaze Minr’a
xizmetk’arîyê bike, bira pey Min
bê. Ez li k’u derê bim, xizmetk’arê
Min jî wê li wê derê be. Heger yek
Minr’a xizmetk’arîyê dike, Bav jî
wê qedirê wî bigire.

### Îsa mirina Xwe e’lam dike

27 Niha agir dilê Min k’etîye.
Ez çi bêjim? Bêjim: ‹Bavo, Min
ji vê sih’etê xilaz ke›? Ne Ez bona
vê sih’etê hatime? 28 Bavo, navê
Xwe bilind ke». Hingê dengek ji

* 12:13 Zebûr 118:25-26.
* 12:15 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Qîza Sîyonê».
** 12:15 Zekerîya 9:9.

e’zmên hat: «Min bilind kir û Ezê
dîsa bilind kim!»
29 Ew e’laleta ku li wir sekinîbû
dibihîst got: «Gur’înîya e’zmên bû».
Hineka jî digot: «Milyak’etekî t’evî
Wî xeber da». 30 Îsa cab da û got:
«Eva denga bona Min nehat, lê
bona we. 31 Niha ye wextê dîwana
vê dinyayê, niha serwêrê vê dinyayê
wê bê avîtinê derva. 32 Gava Ez ji
e’rdê berbi jor bême hildanê, Ezê
h’emûya berbi Xwe bik’işînim».
33 Ewî bi vê gotinê dida fe’mkirinê,
ku Ewê bi çi cûr’eyî bimire.
34 Hingê e’laletê lê veger’and û
gotê: «Me ji Qanûnê bihîstîye ku
Mesîhê h’eta-h’etayê bimîne. Îdî Tu
çawa dibêjî: ‹Gerekê Kur’ê Mêriv
berbi jor bê hildanê›? K’î ye ew
‹Kur’ê Mêriv›?» 35 Îsa wanr’a got:
«Hinek wext jî r’onayî wê t’evî we
be. H’eta ku r’onayî t’evî we ye,
bimeşin, nebe ku te’rî ser weda bê.
Ewê ku te’rîyêda dimeşe, ew nizane
k’uda diçe. 36 H’eta ku r’onayî t’evî
we ye, bawerîya xwe r’onayê bînin,
wekî hûn bibine zar’êd r’onayê».

**Nebawerîya cihûya**

Gava Îsa ev yekana gotin çû
û Xwe ji ber wan veşart. 37 Ser
haqas nîşanar’a ku Wî li ber wan
kirin, lê wana dîsa bawerîya xwe
li Wî nedanîn. 38 Ev yek aha bû,
wekî ew gotina Îşaya p’êxember
bê sêrî:

«Xudan, k’ê ew gotina ku me
got bawer kir?
Û zenda Xudan k’êva e’yan
bû?»*

39 Bona wê yekê wana nikaribû
bawer bikirana, çimkî Îşaya aha
jî gotîye:

40 «Xwedê ç’e’vêd wan kor kirin
û ava r’eş anî ser h’işê wan,
wekî bi ç’e’va nebînin,
bi h’işa fe’m nekin
û veneger’in ku Ez wan qenc
kim»*.

41 Îşaya aha got, çimkî wî r’û-
meta Îsa dît û li ser Wî xeber da.
42 Lê belê dîsa jî ji serwêra geleka
bawerîya xwe Wî anî. Lê ji tirsa
fêrisîya, li xwe mukur’ nedihatin,
ku ji k’inîştê neyêne derxistinê.
43 Li wan hê xweş dihat ku meriv
pesinê wan bidin, ne ku Xwedê.

**Gotina Îsa h’akimê R’oja Axretê ye**

44 Hingê Îsa bi dengekî bilind
got: «Ewê ku bawerîya xwe Min

* 12:38 Îşaya 53:1.
* 12:40 Îşaya 6:10.

tîne, ew bawerîya xwe Min nayne,
lê Yê ku Ez şandime. 45 Û ewê
ku Min dibîne, yê ku Ez şandi-
me dibîne. 46 Ez çawa r’onayîdar
hatime dinyayê, wekî her kesê ku
bawerîya xwe Min bîne, te’rîyêda
nemîne. 47 Heger yek gotina Min
bibihê û neqedîne, Ez dîwana wî
nakim. Ez nehatime ku dîwana
dinyayê bikim, lê wekî dinyayê
xilaz kim. 48 Ewê ku Min t’exsîr[f]
dike û gotinêd Min qebûl nake,
yek heye ku wê dîwana wî bike,
awa gotî ew gotina ku Min gotîye,
ewê R’oja Axretê dîwana wî bike.
49 Çimkî Min xweserîxwe nego-
tin, lê Bavê ku Ez şandime, Ewî
t’emî daye Min ku Ez çi bêjim û
çi xeber dim. 50 Û Ez zanim ku
t’emîya Wî jîyîna h’eta-h’etayê
ye. Awa çi ku Ez dibêjim, çawa
Bavê gotîye Min Ez usa dibêjim».

## T’emî û gotinêd Îsaye axirîyê

### Îsa nigêd şagirta dişo

13 1 Berî Cejina Derbazbûnê,
Îsa zanibû ku sih’eta Wî
pêr’a gihîştîye ku ji vê dinyayê
derê û her’e cem Bavê. Ewî h’e-
mûyêd Xweye ku vê dinyayêda h’iz
kiribûn, h’eta dereca here bilind jî
ew h’iz kirin*. 2 Wextê şîvxwari-
nê, mîrêcin qelpê xirab avîte dilê
Cihûdayê kur’ê Şimh’ûnê Îsxer-
yotî, ku nemamîya Îsa bike. 3 Îsa
zanibû ku Bavê her tişt daye destê
Wî, Ew ji cem Xwedê hatîye û wê
dîsa veger’e cem Xwedê. 4 Hingê
Ew ji ser şîvê r’abû, p’otê Xwe da-
nî alîkî û p’êşgîrek hilda li pişta
Xwe girêda. 5 Paşê av kire t’eştê û
destpêkir nigêd şagirtêd Xwe şûştin
û bi p’êşgîra girêdayî ziha kirin.
6 Gava dor gihîşte Şimh’ûn-Petrûs,
ewî gotê: «Xudan, Tê nigêd min
bişoyî?» 7 Îsa lê veger’and û gotê:
«Ez niha çi dikim tu fe’m nakî,
lê paşê tê fe’m bikî». 8 Petrûs jêr’a
got: «T’u car Tê nigêd min neşoyî!»
Îsa lê veger’and û gotê: «Heger Ez
nigêd te neşom, p’ara te wê t’evî
Min t’unebe». 9 Şimh’ûn-Petrûs
Wîr’a got: «Xudan, ku usa ye ne
t’enê nigêd min, lê dest û serê min
jî bişo!» 10 Îsa gotê: «Ewê ku hatîye
şûştinê, pêştirî niga, wekî mayîn
ne h’ewce ye dereke din bê şûşti-
nê. Ew xwexa t’emam-pêva paqij
e. Hûn paqij in, lê ne ku h’emû».

* 13:1 Aha jî tê fe’mkirinê: «Û h’eta xilazîyê jî ew h’iz kirin».

11 Çimkî Îsa zanibû k’î wê nema-
mîya Wî bike, bona wê yekê got:
«Hûn h’emû ne paqij in».
12 Gava nigêd wan şûştin, p’o-
tê Xwe avîte ser Xwe û dîsa li ser
sifrê r’ûnişt. Ji wan pirsî: «Gelo
hûn zanin ku Min bona we çi kir?
13 Hûn Min Dersdar û Xudan h’e-
sab dikin, hûn r’ast dikin, Ez hema
usa jî heme. 14 Awa heger Min bi
vê Xudan û Dersdarîya Xweva ni-
gêd we şûştin, gerekê hûn jî nigêd
hevdu bişon. 15 Min nexşek nîşanî
we kir, wekî çawa Min bona we
kir, hûn jî usa bikin. 16 Ez r’ast bê
xêlif wer’a dibêjim, xulam ji axayê
xwe ne mestir e, ne jî yê ku hatîye
şandinê ji yê ku ew şandîye mestir
e. 17 Heger hûn vê yekê zanin, hûnê
xwezilî bin heger biqedînin.

### Îsa girtina xwe dide e’yankirinê

*(Metta 26:20-25;*
*Marqos 14:17-21; Lûqa 22:21-23)*

18 Ez bona we h’emûya nabê-
jim, çimkî Ez zanim Min k’îjan
bijartine. Lê gerekê nivîsar bê sêrî:
‹Yê ku nanê Min xwar
p’eh’în avîte Min›*.
19 Ez nihava, hê berî qewiman-
dinê van tişta wer’a dibêjim, wekî,
gava biqewimin hûn bawer bikin,
ku EZ EW IM*. 20 Ez r’ast bê xêlif
wer’a dibêjim, ewê ku wî qebûl ke,
k’îjanî ku Ez dişînim, ew Min qe-
bûl dike û ewê ku Min qebûl dike,
Yê ku Ez şandime qebûl dike».
21 Îsa gava eva yeka got, r’uh’da
gelekî qilqilî, Wî aşkere şe’detî
da û got: «Ez r’ast bê xêlif wer’a
dibêjim, yekî ji we wê nemamîya
Min bike».
22 Şagirta şaşmayî li hevdu ni-
hêr’î, gelo ew bona k’ê dibêje.
23 Yekî ji şagirtêd Wî, yê ku Îsa jê
h’iz dikir, xwe avîtibû h’emêza Îsa.
24 Şimh’ûn-Petrûs wîr’a bi ç’e’va
dikir ku bipirse: «K’a Ew bona k’ê
dibêje». 25 Ewî jî xwe da ber sîngê
Îsa pirsî: «Xudan, ew k’î ye?»
26 Îsa cab da û got: «Ew e, yê ku
Ez vî pe’rîyê nan xwarinêda kim
bidimê». Û pe’rîyê nan xwarinêda
kir, da Cihûdayê kur’ê Şimh’ûnê
Îsxeryotî. 27 Ewî hema çawa pe’rî
ji dêst girt, mîrêcin k’ete nava wî.
Îsa wîr’a got: «Tê çi bikî zû bike».
28 Lê yêd ku li ser sifrê r’ûniştî-
bûn, t’u kesî fe’m nekir, ku Ewî
çima wîr’a aha got. 29 K’îsikê
p’era ku cem Cihûda bû, lema
hineka t’irê, ku Îsa wîr’a dibêje:

* 13:18 Zebûr 41:9.
* 13:19 Şirovekirinê bin r’êza Yûh’enna 8:58-da bixûnin.

«Tiştêd ku cejinêda mer'a lazim
in bik'ir'e», yan jî «tiştekî bide
belengaza». 30 Ewî jî gava ew pe'rî
hilda, pêr'a-pêr'a derk'ete derva.
Îdî şev bû.

### T'emîya nû: Ji hevdu h'iz bikin

31 Gava ew derk'ete derva, Îsa
got: «Niha Kur'ê Mêriv hate r'û-
metkirinê û Xwedê jî bi Wî hate
r'ûmetkirinê. 32 Heger Xwedê pê
Wî hate r'ûmetkirinê, Xwedê jî wê
pê Xwe Wî r'ûmet ke û zûtirê wê
Wî r'ûmet ke. 33 Lawno! Ez gelek
wext t'evî we namînim. Hûnê li
Min biger'in, lê niha Ez wer'a
dibêjim, çawa ku Min cihûyar'a
jî got, hûn nikarin bêne wî cîyê
ku Ez diçimê.

34 Ez t'emîke nû didime we:
Hevdu h'iz bikin. Çawa ku Min
hûn h'iz kirin, hûn jî usa hevdu
h'iz bikin. 35 Bi vê yekê h'emûyê
zanibin hûn şagirtêd Min in, heger
hûn hevdu h'iz bikin».

### Îsa derheqa înk'arîya Petrûsda dibêje

*(Metta 26:31-35; Marqos 14:27-31; Lûqa 22:31-34)*

36 Şimh'ûn-Petrûs gote Wî:
«Xudan, Tê k'uda her'î?» Îsa lê
veger'and û gotê: «Wî cîyê ku Ez
diçimê, tu niha nikarî pey Min
bêyî, lê paşê tê pey Min bêyî».
37 Petrûs gote Wî: «Xudan, çima
ez niha nikarim pey Te bêm? Ezê
e'mirê xwe jî bona Te bidim». 38 Îsa
lê veger'and û gotê: «Tê e'mirê xwe
bona Min bidî? Ez r'ast bê xêlif
ter'a dibêjim, hê berî bangdana
dîk tê sê cara Min înk'ar kî.

### R'îya ku dibe berbi Bavê

**14** 1 Bira dilê we neqilqile.
Bawerîya xwe Xwedê bî-
nin û bawerîya xwe Min jî bînin.
2 Mala Bavê Minda gelek cîyêd
mayînê hene, Ez niha diçim wer'a
cî hazir kim. Heger usa nîbûya,
Min wer'a nedigot? 3 Gava Ez
her'im û wer'a cî hazir kim, Ezê
dîsa bêm û we bibime cem Xwe,
wekî Ez li k'u bim, hûn jî li wê
derê bin. 4 Hûn r'îya wî cîyê ku
Ez diçimê zanin».

5 T'ûma jêr'a got: «Xudan, em
nizanin Tu k'uda diçî, emê çawa
r'ê bizanibin?» 6 Îsa wîr'a got:
«Ez im, r'ê, r'astî û jîyîn. T'enê
pê Min yek dikare bê cem Bavê.
7 Heger we Ez nas kirime, hûnê
Bavê Min jî nas bikin*. Awa ji
vir şûnda hûn Wî nas dikin û we
Ew dîtîye».

8 Fîlîpo jêr'a got: «Xudan, k'a
Bavê nîşanî me ke, besî me ye!»

9 Îsa jêr'a got: «Fîlîpo! Haqas wext
Ez t'evî we me û hê tu Min nas
nakî? Yê ku Ez dîtime, Bav dîtîye.
Tu çawa dibêjî: ‹Bavê nîşanî me
ke›? 10 Tu bawer nakî ku Ez nava
Bavêda me û Bav nava Minda ye?
Ev xeberêd ku Ez wer'a dibêjim,
ne ku xweserîxwe dibêjim, lê ew
Bavê ku nava Minda dimîne, Ew
e ku ya Xwe dike. 11 Min bawer
bikin, ku Ez nava Bavêda me û
Bav jî nava Minda ye. Lê heger
na, hema pê van kirêd Min bawer
bikin. 12 Ez r'ast bê xêlif wer'a di-
bêjim, ewê ku bawerîya xwe Min
bîne, ew kirêd ku Ez dikim, ewê
xwexa jî bike. Û ji van kira mestir
jî wê bike, çimkî Ez diçime cem
Bavê Xwe. 13 Pê navê Min hûn çi
bixwazin, Ezê bikim, wekî Bav
pê Kur' bê r'ûmetkirinê. 14 Heger
hûn pê navê Min tiştekî bixwazin
Ezê bikim.

## Îsa soz dide ku R'uh'ê Pîroz bişîne

15 Heger hûn Min h'iz dikin,
hûnê t'emîyêd Min xwey kin.
16 Ezê jî ji Bavê hîvî kim û Ewê
Piştovanekî din bide we, wekî
h'eta-h'etayê t'evî we bimîne.
17 Ew e ew R'uh'ê* ku r'astîyê
e'lam dike û dinya nikare Wî
qebûl ke, çimkî ne Wî dibîne û
ne jî Wî nas dike. Lê hûn Wî nas
dikin, çimkî Ew t'evî we dimîne
û wê nava weda be.

18 Ez we sêwî[f] nahêlim, Ezê
dîsa ser weda bêm. 19 Hinekî
şûnda îdî dinyayê Min nebîne,
lê hûnê Min bibînin. Çimkî Ez
dijîm, hûnê jî bijîn. 20 Wê r'ojê
hûnê bizanibin ku Ez nava Bavê
Xweda me, hûn nava Minda ne
û Ez jî nava weda me.

21 Ewê ku t'emîyêd Min qebûl
dike û wan xwey dike, ew e yê ku
Min h'iz dike. Û ewê ku Min h'iz
dike, ewê ji alîyê Bavê Minda bê
h'izkirinê. Ezê jî wî h'iz bikim û
Xwe wîva e'yan kim».

22 Cihûda[f], ne yê Îsxeryotî gote
Wî: «Xudan, ewê çawa be, ku Tê
Xwe meva e'yan kî, lê dinyayê-
va na?»

23 Îsa lê veger'and û gotê: «Her
kesê ku Min h'iz bike, wê gotina
Min xwey ke, Bavê Minê jî wî
h'iz bike û Emê bêne cem wî,
t'evî wî bimînin. 24 Ewê ku Min

* 14:7 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Heger we Ez nas bikirama, weyê Bavê Min jî nas bikira».

* 14:17 Aha jî tê fe'mkirinê: «R'uh'ê R'astîyê ku dinya nikare Wî qebûl ke».

h'iz nake, ew gotinêd Min xwey
nake. Evê gotina ku hûn dibihên
ne ya Min e, lê ya Bavê Min e, ku
Ez şandime. 25 Hela hê ku Ez li
cem we me, Min ev yekana wer'a
gotin. 26 Lê Piştovan, awa gotî
R'uh'ê[f] Pîroz, ku Bav wê bi navê
Min bişîne, Ewê we hînî h'emû
tiştî ke û her tiştêd ku Min wer'a
gotine, wê bîne bîra we.

27 Ez e'dilayîyê wer'a dihêlim,
wê e'dilayîya Xwe didime we.
Ez usa nadim çawa ku dinya
dide we. Bira dilê we neqilqile
û netirsin! 28 We bihîst ku Min
wer'a got: ‹Ezê her'im, lê dîsa
ser weda bêm!› Heger we Ez h'iz
bikirama, hûnê şa bibûna ku Ez
diçime cem Bavê, çimkî Bav ser
Minr'a ye. 29 Û niha ev yekana
Min berî qewimandinê wer'a go-
tin, wekî gava ew yek biqewimin,
hûn bawer bikin. 30 Îdî Ezê t'evî
we gelekî xeber nedim, çimkî va
ye serwêrê vê dinyayê tê. H'uku-
mê wî qet ser Min t'une, 31 lê bira
dinya bizanibe wekî Ez Bavê h'iz
dikim û Bavê çawa t'emî li Min
kirîye Ez usa dikim.

R'abin, em ji vir her'in.

### K'ola tirîyêye r'ast

15 1 Ez im k'ola tirîyêye r'ast,
Bavê Min jî r'ezvan e. 2 Her
ç'iqilê Minva ku ber nade ew di-
bir'e. Lê ew ç'iqilê ku ber dide ji
çirpîya paqij dike, wekî hê gelekî
ber bide. 3 Hûn îdî paqij in bi wê
gotinê ya ku Min wer'a gotîye.
4 Nav Minda bimînin, Ez jî nav
weda. Çawa ç'iqil xwexa nikare
ber bide, heger k'olêva nemîne,
usa jî hûn nikarin, heger Minva
nemînin.

5 Ez im k'ola tirîyê, hûn jî ç'iqil
in. Ewê ku Minva dimîne û Ez
jî wîva dimînim, ewê gelekî ber
bide. Çimkî bêyî Min hûn nikarin
t'u tiştî bikin. 6 Heger yek Minva
nemîne, ew mîna ç'iqilekî wêda
avîtî ye, ku h'işk dibe. Û t'op dikin
davêjine nava êgir dişewitînin.
7 Heger hûn nava Minda bimînin
û gotinêd Min jî nava weda bimî-
nin, hûn çi dixwazin bixwazin, wê
wer'a bê dayînê. 8 Bi vê yekê Bavê
Minê bê r'ûmetkirinê, gava hûn
pê gelek berdayînê bidine k'ifşê,
ku hûn bûne şagirtêd Min.

9 Bav çawa Min h'iz dike, Ez
jî usa we h'iz dikim. H'izkirina
Minda bimînin. 10 Heger hûn
t'emîyêd Min xwey kin, hûnê
h'izkirina Minda bimînin, çawa
ku Min t'emîyêd Bavê Xwe xwey
kirin û h'izkirina Wîda dimînim.
11 Min ev yekana wer'a gotin, wekî
şabûna Min nava weda bimîne

û şabûna we t'emam be. 12 Ev e
t'emîya Min: Hevdu h'iz bikin,
çawa ku Min hûn h'iz kirin. 13 T'u
h'izkirin ser wê h'izkirinêr'a t'une,
ku yek e'mirê xwe ber dostêd xweva
bide. 14 Hûn dostêd Min in, heger
hûn wan t'emîyêd ku Ez didime
we xwey dikin. 15 Ji vir şûnda Ez
we ‹xulam› h'esab nakim, çimkî
xulam haş pê t'une ku axayê wî çi
dike. Min hûn dost h'esab kirin,
çimkî her tiştêd ku Min ji Bavê
Xwe bihîstin weva dane e'yan-
kirinê. 16 Ne ku we Ez bijartim,
lê Min hûn bijartin û k'ifş kirin,
wekî hûn her'in ber bidin û berê
we bimîne. Hingê hûn çi ku pê
navê Min ji Bavê bixwazin, Ewê
bide we. 17 Ez t'emîya vê yekê
didim, ku hûn hevdu h'iz bikin.

### Neyartîya dinyayê

18 Heger dinya bijene we, biza-
nibin ku berî we jenîyaye Min.
19 Heger hûn p'ara dinyayê bûna,
dinyayê yêd xwe h'iz bikira. Lê
Min hûn ji dinyayê bijartine, hûn
ne p'ara dinyayê ne, lema dinya
dijene we. 20 Wê xebera ku Min
wer'a gotîye bînine bîra xwe, ku:
‹Xulam ne ser axayê xwer'a ye›.
Heger Ez zêrandime, wê we jî bi-
zêrînin. Heger gotina Min xwey
kirine, wê gotina we jî xwey kin.
21 Lê van h'emû tişta bona navê
Min wê bînine serê we, çimkî Wî
nas nakin, Yê ku Ez şandime.

22 Heger Ez nehatama û Min
wanr'a xeber neda, gunêd wanê
t'unebûna. Lê ew niha nikarin
caba gunêd xwe bidin. 23 Ewê ku
dijene Min, ew dijene Bavê Min
jî. 24 Heger Min nav wanda nekira-
na, ew kirêd ku t'u kesî nekirine,
gunêd wanê t'unebûna. Lê niha
dîtin, hin jenîyane Min, hin jî
Bavê Min. 25 Lê belê ev yek bû,
wekî ew gotina ku Qanûna wanda
hatîye nivîsarê bê sêrî:

‹Cîkî badîhewa[f] jenîyane Min›*.

26 Gava ew Piştovan bê, k'îja-
nî Ezê ji Bavê wer'a bişînim, ew
R'uh'ê ku wê r'astîyê wer'a gilî ke,
Yê ku ji Bavê dertê, hingê Ewê
bona Min şe'detîyê bide. 27 Hûnê
jî şe'detîyê bidin, çimkî serê sêrîda
hûn t'evî Min bûne.

## 16

1 Min ev yekana wer'a go-
tin, wekî hûn p'işk[f] nebin.
2 Ewê we ji k'inîşta derxine derva.
Wextê jî bê, wekî k'î ku we bikuje
jî, wê bifikire yançîye ew Xwedêr'a
qulix dike. 3 Wê van tişta bikin,

* 15:25 Zebûr 35:19; 69:4.

çimkî wana ne Bav nas kir û ne
jî Ez nas kirim. 4 Lê belê Min ev
yekana wer’a gotin, wekî gava
ew wext bê, hûn bînine bîra xwe
ku Min ev yekana wer’a gotine.

### K’arê R’uh’ê Pîroz

Min serê sêrîda ev tişt wer’a
negotin, çimkî Ez t’evî we bûm.
5 Lê niha Ez diçime cem Yê ku
Ez şandime û ji we t’u kes ji Min
napirse: ‹Tê k’uda her’î?› 6 Min ku
ev yekana wer’a gotin, lema dilê
we k’eserêva t’ijî bûye. 7 Lê belê
Ez r’astîyê wer’a dibêjim, bona
we hê r’ind e ku Ez her’im. He-
ger Ez neçim, Piştovan wê neyê
cem we, lê heger Ez her’im, Ezê
Wî bişînime cem we. 8 Gava Ew
bê, Ewê gunêd merivêd dinê bide
r’ûyê wan, heqî-neheqîyê li ber
wan veke û dîwana Xwedê wanva
e’yan ke. 9 Bona guna wê e’yan ke,
çimkî ewana bawerîya xwe Min
naynin. 10 Bona heqî-neheqîyê wê
e’yan ke, çimkî Ez diçime cem
Bavê Xwe û îdî hûnê Min nebî-
nin. 11 Bona dîwana Xwedê wê
e’yan ke, çimkî dîwana serwêrê
vê dinyayê bûye.

12 Hê gelek tişt hene ku Ez
wer’a bêjim, lê niha hûn nikarin
wan bibin. 13 Lê gava ew R’uh’ê
R’astîyê bê, Ewê we berbi t’ema-
mîya r’astîyê bibe. Çimkî Ewê ne
ku xweserîxwe xeber de, lê çi ku
bibihê, Ewê wê yekê bêje û tiştêd
ku hê neqewimîne wê wer’a gilî
ke. 14 Ewê r’ûmeta navê Min bi-
lind ke, çimkî Ewê ji Min bistîne
û wer’a gilî ke. 15 Her tiştêd Bavê
ku hene ew yêd Min in. Lema
Min got, ku R’uh’ê ji Min bistîne
û wer’a gilî ke.

### Berxwek’etin û şabûn

16 Hinekî şûnda hûnê Min ne-
bînin û dîsa hinekî şûnda hûnê
Min bibînin». 17 Hingê şagirtêd
Wî hineka hevdur’a gotin: «Eva
çi gotin e ku Ew mer’a dibêje?
‹Hinekî şûnda hûnê Min nebî-
nin› û dîsa ‹hinekî şûnda hûnê
Min bibînin›. Dibêje jî: ‹Çimkî
Ez diçime cem Bavê Xwe›?» 18 Û
wana digot: «Ev ‹hinek wext› ku
dibêje, ew çi ye? Em fe’m nakin
ku Ew çi dixwaze bêje».

19 Îsa zanibû ku ew dixwazin jê
bipirsin, hingê wanr’a got: «Hûn
bona vê gotina Min ji hev dipirsin,
ku Min got: ‹Hinekî şûnda hûnê
Min nebînin› û dîsa ‹hinekî şûn-
da hûnê Min bibînin›? 20 Ez r’ast
bê xêlif wer’a dibêjim, hûnê şîn
û girî bin, lê dinyayê şa be, hûnê
ber xwe k’evin, lê berxwek’etina
weyê bibe şabûn. 21 Gava jinek

dik'eve ber zar'ê, cefê dik'işîne,
çimkî sih'eta wê pêr'a gihîştîye.
Lê gava zar' jêr'a dibe, îdî cefa
nayê bîrê ji dest wê şabûnê, ku
merîk hate dinê. 22 R'ast e hûn jî
niha ber xwe dik'evin, lê Ezê we
dîsa bibînim û dilê weyê bi eşq
û şabûnêva t'ijî be û t'u kesê wê
şabûnê ji we nestîne. 23 Ewê r'ojê
hûnê ji Min t'u tiştî nepirsin. Ez
r'ast bê xêlif wer'a dibêjim, ku hûn
pê navê Min çi ji Bavê bixwazin,
Ewê bide we. 24 H'eta niha we pê
navê Min t'u tişt nexwestîye. Bi-
xwazin, hûnê bistînin, usa wekî
şabûna we t'emam be.

### Min dinya bindest kir

25 Min ev yekana wer'a bi mesela
gotin. Wextê bê Ezê îdî bi mesela
wer'a xeber nedim, lê aşkere der-
heqa Bavêda wer'a bêjim. 26 Wê
r'ojê hûnê pê navê Min bixwazin.
Ez wer'a nabêjim ku Ezê bona we
hîvî ji Bavê bikim. 27 Bav Xwexa
we h'iz dike, çimkî we Ez h'iz
kirime û bawer kirîye ku Ez ji
cem Xwedê hatime. 28 Ez ji Bavê
qetîyam û hatime dinyayê. Dîsa
Ez dinyayê dihêlim û diçime
cem Bavê».

29 Şagirtêd Wî gotinê: «Va ye Tu
niha aşkere xeber didî, ne ku pê
mesela. 30 Niha em fe'm dikin, ku
Tu her tiştî zanî û ne h'ewce ye ku
ji Te bipirsin, Tu pêşda cabê didî.
Bona vê yekê em bawer dikin, ku
Tu ji cem Xwedê hatîyî».

31 Îsa wanr'a got: «Niha hûn
bawer dikin? 32 Va wextê bê û
hatîye jî, ku hûnê bela-belayî bin,
her kesê her'e cîyê xwe û Min
t'enê bihêle. Lê Ez ne t'enê me,
çimkî Bav t'evî Min e. 33 Min ev
yekana wer'a gotin, wekî pê Min
hûn xweyê e'dilayîyê bin. Hûnê
dinyayêda tengasîyê[f] bibînin, lê
mêrxas bin! Min dinya kire bin-
destê Xwe».

### Îsa bona bawermenda dua dike

17 1 Çaxê Îsa ev yekana gotin,
berê Xwe e'zmênda kir û
got: «Bavo, wext pêr'a gihîştîye.
Kur'ê Xwe r'ûmet ke, wekî Kur'
jî Te r'ûmet ke. 2 Te h'ukumê li
ser t'emamîya merivayê da Wî,
wekî jîyîna h'eta-h'etayê bide
h'emûyêd ku Te dane Wî. 3 Ev e
jîyîna h'eta-h'etayê, wekî ew Te
nas kin, çawa Xwedêyê r'astî bê-
şirîkî-bêheval û usa jî Îsa Mesîhê
ku Te şandîye. 4 Min Tu li ser r'ûyê
e'rdê r'ûmet kirî, ew şixulê Te
dabû Min ku Ez bikim Min anî
sêrî. 5 Bavo, bi wê r'ûmeta Mine
ku hê berî e'firandina dinyayê li

cem Te hebû niha Min r'ûmet
ke li ber Xwe.

6 Min Tu wan merivava e'yan
kirî, yêd ku Te ji dinyayê dane
Min. Ew yêd Te bûn, Te ew dane
Min û wana gotina Te xwey kir.
7 Niha ew îdî zanin her tiştêd ku
Te dane Min ew ji Te ne. 8 Ew
xeberêd ku Te dane Min, Min jî
dane wan û wana ew qebûl kir,
ewê r'astîyê pê h'esîyan, ku Ez ji
Te hatime û bawer kirin ku Te
Ez şandime.

9 Ez bona wan hîvî dikim. Ne
ku bona dinyayê hîvî dikim, lê
bona yêd ku Te dane Min, çimkî
ew yêd Te ne. 10 Çi ku yêd Min
in, ew yêd Te ne, çi ku yêd Te
ne, ew yêd Min in. Û Ez bi wan
r'ûmetkirî me. 11 Niha Ez tême
cem Te, Ez îdî ne dinyayêda me,
lê ewana dinyayêda ne. Ya Bavê
Pîroz! Pê wî navê Xweyî ku Te
daye Min van xwey ke*, wekî
bibin yek, çawa Ez û Tu yek in.
12 Gava Ez t'evî wan bûm, Min
ew pê navê Te xwey dikirin, pê
wî navê ku Te daye Min, Min
xweyîtî li wan kir. Ji wana t'u kes
unda nebû, pêştirî yê mirinêr'a
dayî, wekî nivîsar bê sêrî. 13 Lê
niha Ez tême cem Te û van yeka
dinyayêda dibêjim, wekî şabû-
na Min dilê wanda t'emam be.
14 Min xebera Te gîhande wan û
dinya jenîya wan, çimkî ew ne
ji dinyayê ne, çawa ku Ez ne ji
dinyayê me. 15 Ez hîvî nakim ku
Tu wana ji dinyayê hildî, lê wekî
Tu wan ji yê Xirab xwey kî. 16 Ew
ne ji dinyayê ne, çawa ku Ez ne
ji dinyayê me. 17 Wan bi r'astîya
Xwe buhurtî-jibare ke. Xebera Te
r'astî ye. 18 Çawa ku Te Ez şan-
dime dinyayê, Min jî ew şandine
dinyayê. 19 Bona wan Ez Xwe
buhurtî-jibare dikim, wekî ew
jî bi r'astîyê buhurtî-jibare bin.

20 Ez ne t'enê bona wan hîvî
dikim, lê bona wan jî, yêd ku bi
gotina wan wê bawerîya xwe Min
bînin, 21 wekî h'emû jî bibine yek.
Bavo, çawa Tu nava Minda yî û Ez
nava Teda me, usa jî bira ew nava
Meda bin*, bi vî awayî dinyayê ba-
wer bike, ku Te Ez şandime. 22 Ew
r'ûmeta ku Te da Min, Min da
wan, wekî ew bibin yek, çawa Ez

* 17:11 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Pê navê Xwe van xwey ke, yêd ku Te dane Min».

* 17:21 Nav hinek destnivîsarada dewsa «usa jî bira ew nava Meda bin» aha ye: «usa jî bira ew t'evî Me bibine yek».

û Tu yek in: 23 Ez nava wanda, Tu
jî nava Minda, wekî ew t'ifaqêda[f]
lap gihîştî bin û dinya bizanibe
ku Te Ez şandim û usa wan h'iz
dikî, çawa Min h'iz dikî.
24 Ya Bavo, Ez dixwazim wekî
yêd ku Te dane Min, Ez li k'u
bim, ew jî t'evî Min bin, wekî ew
r'ûmeta ku Te daye Min bibînin,
çimkî hê berî e'firandina dinyayê
Te Ez h'iz kirime. 25 Ya Bavê r'ast!
Dinya Te nas nake, lê Ez Te nas
dikim û evana jî zanin wekî Te
Ez şandime. 26 Min Tu wanva
dayî e'yankirinê û Ezê hê bidime
e'yankirinê, wekî ew h'izkirina ku
Te Ez pê h'iz kirime nava wanda
be û Ez jî nava wanda bim».

## Girtin, xaçkirin[f] û r'abûna Îsa

### Girtina Îsa

*(Metta 26:47-56; Marqos 14:43-50; Lûqa 22:47-53)*

18 1 Pey vê xeberdanêr'a Îsa
t'evî şagirtêd Xwe derbazî
wî alîyê newala Qidronê bû. Li
wê derê baxçek hebû, Îsa şagirtêd
Xweva k'etinê. 2 Cihûda jî yê ku
wê nemamîya Wî bikira ew cî za-
nibû, çimkî Îsa û şagirtêd Xweva
gelek cara li wê derê dicivîyan.
3 Awa Cihûda k'omeke eskera û
nobedara xwer'a ji alîyê fêrisî û
serekêd k'ahînada hildabû, bi
fenera, agir û ç'eka hate wî cîyî.
4 Îsa her tiştê zanibû ku wê çi bê
serê Wî, pêşda çû û wanr'a got:
«Hûn li k'ê diger'in?» 5 Wana
lê veger'and û gotinê: «Li Îsayê
Nisretê!» Îsa gote wan: «EZ IM».
Cihûdayê ku nemamîya Wî
kiribû jî t'evî wan bû. 6 Gava got
ku: «EZ IM*!» ser piştê çûn û
k'etine e'rdê. 7 Hingê Îsa dîsa ji
wan pirsî: «Hûn li k'ê diger'in?»
Wan got: «Îsayê Nisretê».
8 Îsa li wan veger'and û got: «Min
wer'a got, ku Ez im. Awa heger
hûn li Min diger'in, bihêlin bira
evana her'in». 9 Ev yek bû wekî ew
xebera wîye ku berê gotibû r'ast
derê: «Ewêd ku Te dane Min,
Min ji wan t'u kes unda nekir»*.
10 Hingê Şimh'ûn-Petrûs ew
şûrê ku pêr'a bû k'işand û avîte
xulamê serekk'ahîn û guhê wîyî
r'astê pekand. Navê wî xulamî

* 18:6 Şirovekirinê bin r'êza Yûh'enna 8:58-da bixûnin.
* 18:9 Yûh'enna 6:39.

Malxo bû. 11 Îsa Petrûsr’a got:
«Şûr têke qavê[f]! Ezê çawa wê k’asa
ku Bavê daye Min venexwim?»

### Îsa ber serekk’ahîn

*(Metta 26:57-58; Marqos 14:53-54;
Lûqa 22:54)*

12 Pey vê yekêr’a k’oma eskera û
serdarê wan û nobedarêd cihûya
Îsa girtin û girêdan. 13 Pêşîyê Ew
birine cem Henanê xezûrê Qeyafa.
Qeyafa serekk’ahînê wê salê bû.
14 Eva ew Qeyafa bû, yê ku cihû
şîret kiribûn û gotibû: «Hê r’ind
e, bira yek bona cime’tê bimire».

### Petrûs Îsa înk’ar dike

*(Metta 26:69-70;
Marqos 14:66-68;
Lûqa 22:55-57)*

15 Şimh’ûn-Petrûs û şagirtekî
din pey Îsa diçûn. Ew şagirt ku
nasê serekk’ahîn bû, t’evî Îsa k’ete
h’ewşa serekk’ahîn, 16 lê Petrûs
derva li ber dêrî sekinî. Paşê ew
şagirtê nasê serekk’ahîn derk’et û
t’evî dergehvanê xeber da, Petrûs
bire hindur’. 17 Hingê wê carîya
dergehvan ji Petrûs pirsî: «Dibe
ku tu jî ji şagirtêd Vî merivî yî?»
Petrûs gotê: «Na, ez nînim».
18 Wî çaxî, hewa ku sar bû,
xulam û nobedara pê k’omirê
agir vêxistibûn, sekinîbûn û xwe
germ dikirin. Petrûs jî li cem wan
sekinîbû, xwe germ dikir.

### Pirsa serekk’ahîn

*(Metta 26:59-66;
Marqos 14:55-64; Lûqa 22:66-71)*

19 Hingê serekk’ahîn ji Îsa
derheqa şagirtêd Wî û hînkirina
Wîda pirsî. 20 Îsa cab da û got:
«Min dinyayêr’a aşkere xeber
daye, her gav k’inîştada usa jî
p’aristgehêda, k’îderê ku h’emû
cihû dicivîyan hîn dikirin. Min
t’u tişt dizîva negotîye. 21 Tu çima
ji Min dipirsî? Ji yêd ku bihîstine
bipirse, k’a Min wanr’a çi gotîye.
Ew zanin Min çi gotîye».
22 Gava Îsa ev yek got, no-
bedarekî li wir sekinî şemaqek
li Wî xist û got: «Tu çawa caba
serekk’ahîn didî?» 23 Îsa lê vege-
r’and û gotê: «Heger Min xirab
xeber da, xirabîya Min bêje. Lê
heger Ez r’ast dibêjim, tu çima
Min dixî?» 24 Hingê Henan Ew
girêdayî şande cem Qeyafayê
serekk’ahîn.

### Petrûs dîsa Îsa înk’ar dike

*(Metta 26:71-75; Marqos 14:69-72;
Lûqa 22:58-62)*

25 Şimh’ûn-Petrûs hê li wir se-
kinî xwe germ dikir. Ji wî pirsîn:
«Dibe ku tu jî ji şagirtêd Wî yî?»

Ewî înk’ar kir û got: «Na, ez nî-
nim». 26 Xulamekî serekk’ahîn, ji
xwexatîya wî, yê ku Petrûs guhê wî
pekandibû, jê pirsî: «Ne baxçeda
min tu t’evî Wî dîtî?» 27 Hingê
Petrûs dîsa înk’ar kir û wê demê
dîk bang da.

### Îsa li ber Pîlato[f]

*(Metta 27:1-2, 11-14;*
*Marqos 15:1-5; Lûqa 23:1-5)*

28 Wî çaxî Îsa ji cem Qeyafa
birine qesira welî[f]. Serê sibehê zû
bû û cihû nek’etine qesirê, wekî
xwe li gora e’detêd şûştin-veşûştinê
neh’er’imînin, ku bikaribin xwa-
rina Cejina[f] Derbazbûnê bixwin.
29 Hingê Pîlato[f] derk’ete derva,
hate cem wan û pirsî: «Hûn Vî
merivî çida neheq dikin?»
30 Wana lê veger’and û gotinê:
«Heger Ew ne yekî zulmk’ar bûya,
me Ew nedida destê te». 31 Hin-
gê Pîlato wanr’a got: «Hanê hûn
xwexa Vî bibin û li anegorî qanûna
xwe dîwana Wî bikin». Cihûya
lê veger’and û gotinê: «Îzina me
t’une ku em t’u kesî bikujin».
32 Ev yeka bû, ku ew gotina Îsa
bê sêrî, ku dabû fe’mkirinê, Ewê
çawa bimire.
33 Hingê Pîlato dîsa k’ete qesira
welî, gazî Îsa kir û jê pirsî: «Tu yî
P’adşê cihûya?» 34 Îsa lê veger’and
û gotê: «Tu vê yekê xwexa dibêjî,
yan hinekêd din bona Min ter’a
gotine?»
35 Pîlato got: «Çima ez cihû me?
Miletê Te û serekêd k’ahîna Tu
dane destê min. Te çi kirîye?» 36 Îsa
cab da û got: «P’adşatîya Min ne
ji vê dinyayê ye. Heger p’adşatîya
Min ji vê dinyayê bûya, berdestîyêd
Minê şer’ kirana ku Ez nek’etama
destê cihûya. Lê p’adşatîya Min
ne ji vê dinyayê ye».
37 Hingê Pîlato jêr’a got: «Wekî
usa ye Tu p’adşa yî?» Îsa cab da û
got: «Tu xwexa dibêjî Min ku: ‹Tu
p’adşa yî›. Ez bona vê yekê bûme
û bona vê yekê hatime dinyayê,
wekî bona r’astîyê şe’detîyê bidim.
Her kesê ku ji alîyê r’astîyê ye,
guh dide dengê Min».
38 Pîlato jê pirsî: «R’astî çi ye?»

### Dîwanêda h’ukumê kuştinê li ser Îsa derdixin

*(Metta 27:15-31;*
*Marqos 15:6-20; Lûqa 23:13-25)*

Pey vê pirsêr’a, Pîlato dîsa der-
k’ete derva cem cihûya û wanr’a
got: «Ez t’u neheqîyê Vîda nabî-
nim. 39 Lê ev e’detê we ye ku ez
Cejina Derbazbûnêda yekî girtî
bona we ber’dim. Hûn dixwazin
ku ez bona we P’adşê cihûya
ber’dim?»

**40** Hingê wan hê kire qîr’în, go-
tin: «Ne ku Vî merivî, lê Barabas
ber’de!» Barabas jî qaçaxek bû.

# 19

**1** Hingê Pîlato Îsa bir û
da ber qamçîya. **2** Eskera
jî t’acek ji stirîya vegirtin û dane
serê Wî û çuxekî şîrk[f] li Wî kirin.
**3** Li ber Wî disekinîn û digotin:
«Xweş be, P’adşê cihûya!» Û şe-
maq li Wî dixistin.

**4** Pîlato dîsa derk’ete derva û
wanr’a got: «Va ye niha ez Wî
tînime derva cem we, wekî hûn
bizanibin ku min t’u sûc Wîda
nedîtîye». **5** Hingê Îsa t’acê sti-
rî li sêrî û çuxê şîrk lê derk’ete
derva. Pîlato wanr’a got: «Va ye
Ew meriva!»

**6** Gava serekêd k’ahîna û no-
bedara Ew dît, kirine qîr’în û
gotin: «Wî xaç[f] ke, Wî xaç ke!»
Pîlato wanr’a got: «Hûn Wî bibin
xaç kin. Ez xwexa t’u sûcî Wîda
nabînim».

**7** Cihûya lê veger’and û gotinê:
«Qanûneke me heye û anegorî
wê qanûnê* gerekê Ew bê kuşti-
nê, çimkî Wî Xwe Kur’ê Xwedê
h’esab kir».

**8** Gava Pîlato ev yek bihîst, hê
tirs k’ete ser. **9** Ew dîsa çû hindur’ê
qesira welî û Îsar’a got: «Tu ji k’u
yî?» Lê Îsa caba wî neda. **10** Pîlato
gote Wî: «Tu t’evî min xeber nadî?
Tu nizanî ku h’ukumê min heye
ez Te ber’dim û h’ukumê min
heye Te bidime xaçkirinê?»

**11** Îsa lê veger’and û gotê: «Heger
ji jor ter’a nehata dayînê, t’u h’u-
kumê te wê li ser Min t’unebûya.
Lema gunê wî, yê ku Ez dame
destê te hê mezin e».

**12** Pey wê yekêr’a Pîlato dikir
ku Îsa ber’da, lê cihûya kire qî-
r’în û gotin: «Heger tu Vî merivî
ber’dî, tu ne dostê Qeyser[f] î! Her
kesê ku xwe p’adşa h’esab dike,
ew neyarê Qeyser e!»

**13** Gava Pîlato ev yek bihîst,
Îsa derxiste derva û ew li herema[f]
dîwanê r’ûnişt, wî cîyê ku jêr’a
digotin «Selê Kevirî», bi îbranî
Gabata. **14** R’oja[f] t’ivdarekkirina
Cejina Derbazbûnê bû, nîvro
nêzîkî sih’eta donzdeha Pîlato
cihûyar’a got: «Va ye P’adşê we!»

**15** Lê wana kire qîr’în: «Wî bi-
be, Wî bibe! Wî xaç ke!» Pîlato
wanr’a got: «P’adşê we xaç kim?»
Serekêd k’ahîna lê veger’andin:
«Pêştirî Qeyser p’adşakî din bo-
na me t’une!» **16** Hingê ewî Îsa
da destê wan, wekî bê xaçkirinê.

* 19:7 Qanûna K’ahîntîyê 24:16.

### Xaçkirina Îsa

*(Metta 27:32-44; Marqos
15:21-32; Lûqa 23:26-43)*

Wan Îsa hilda birin. 17 Îsa Xwe-
xa xaçê Xwe hilda û derk'ete wî
cîyê ku jêr'a dibêjin «Cîyê Qaf»,
bi îbranî «Golgota». 18 Li wê derê
Ew t'evî du merivêd din xaç ki-
rin, her yek li k'êlekekê, Îsa nava
wanda bû. 19 Pîlato t'extek jî nivîsî
û fêza xaçê xist, ku aha nivîsar
bû: «ÎSAYÊ NISRETÊ, P'ADŞÊ
CIHÛYA». 20 Gelek cihûya ev
nivîsara ser t'exte xwendin, çimkî
ew cîyê ku Îsa lê hatibû xaçkirinê
nêzîkî bajêr bû û bi îbranî, latînî
û yûnanî hatibû nivîsarê. 21 Se-
rekêd k'ahînêd cihûya Pîlator'a
gotin: «Nenivîse ‹P'adşê cihûya›!
Lê binivîse ku ‹Wî got: Ez P'adşê
cihûya me›». 22 Pîlato got: «Min
çi nivîsî, nivîsî».

23 Gava eskera Îsa xaç kirin,
k'incêd Wî hildan, kirine çar p'ara,
her yekîr'a p'arek. Lê k'inca Wîye
ser jî hebû, ku ji sêrî h'eta binî
hûnandî û bêdirûn bû. 24 Hingê
hevdur'a gotin: «Werin em vî ne-
qelêşin, em p'eşk bavêjin, k'a wê
k'êr'a bik'eve». Ev yek bû, wekî
nivîsar bê sêrî:

«K'incêd Min nav xweda p'a-
revekirin
û ser p'otê Min p'eşk avîtin»*.
Eskera jî hema ev yek kir.

25 Li ber xaçê Îsa dîya Wî, xa-
tîya Wî, Meryema jina Klopas û
Meryema Mejdelanî sekinî bûn.
26 Îsa ku dîya Xwe û ew şagirtê ku
Wî jê h'iz dikir li wê derê sekinî
dîtin, dîya Xwer'a got: «E'vdê! Va
ye kur'ê te!» 27 Paşê gote şagirt:
«Va ye dîya te!» Ji hingêva evî
şagirtî ew bire mala xwe.

### Mirina Îsa

*(Metta 27:45-56; Marqos
15:33-41; Lûqa 23:44-49)*

28 Pey vê yekêr'a Îsa zanibû her
tiştêd ku wê bibûna îdî qewimîn,
hingê Wî got: «Ez t'î me», wekî
nivîsar bê sêrî. 29 Li wir firaqeke
sirkêva dagirtî hebû. Wana lûfi-
ka[f] be'rê sirkêda kir, serê darika
zoxêva[f] danîn û dirêjî ber devê Wî
kirin. 30 Gava ku Îsa sirke[f] vexwar,
got: «T'emam qewimî!» Serê Xwe
berjêr kir û r'uh'ê Xwe da.

### Gotina p'êxember tê sêrî

31 Ev yek ku r'oja[f] t'ivdarekki-
rinêda qewimî, cihûya nedixwest
wekî cinyaz li ser xaçê bimana,

* 19:24 Zebûr 22:18.

çimkî ew şemî bona wana r'oje-
ke gelek e'zîz bû. Wana ji Pîlato
hîvî kir, wekî hestûyêd r'e'nêd
xaçbûyîya bêne şkênandinê û ji
wir bêne hildanê. 32 Hingê esker
hatin, pêşîyê hestûyêd r'e'nêd yekî
şkênandin û peyr'a r'e'nêd yê din,
ku t'evî wî hatibû xaçkirinê. 33 Lê
gava ku ew nêzîkî Îsa bûn û dîtin
ku Ew îdî mirîye, wana hestûyêd
r'e'nêd Wî neşkênandin. 34 Lê dîsa
ji eskera yekî r'im nek'sa Wîr'a kir
û pêr'a-pêr'a av û xûnê avît. 35 Yê
ku ev yek dît şe'detî da, wekî hûn
jî bawer bikin. Şe'detîya wî r'ast e
û ew zane ku r'astîyê dibêje. 36 Ev
yeka qewimî, wekî ew nivîsar bê sêrî:

«T'u hestûyê Wî wê neyê şkê-
nandinê»*.

37 Nivîsareke din jî aha dibêje:

«Ewê li Wî binihêr'in, nek'sa
k'îjanî qul kirin»*.

## Definkirina Îsa

*(Metta 27:57-61; Marqos 15:42-47; Lûqa 23:50-56)*

38 Pey vê yekêr'a, Ûsivê[f] ji Arî-
metyayê ku şagirtê Îsa bû, lê ji
tirsa cihûya xwe e'yan nedikir,
hîvî ji Pîlato kir ku cinyazê Îsa ji
xaçê peya ke û Pîlato îzin dayê.
Hingê ew çû cinyazê Îsa ji xaçê
peya kir. 39 Nîkodêmo jî t'evî wî
hat, yê ku pêşda şev hatibû cem
Îsa, nêzîkî sî kîlogram* ûd[f] û
zimir[f] t'evhevkirî anî. 40 Cinya-
zê Îsa hildan, li anegorî e'detê
definkirina cihûya, biharet[f] lê
dan û Ew qedekê k'itanîda k'efen
kirin. 41 Li wî cîyê ku Îsa lê ha-
tibû xaçkirinê baxçek hebû û wî
baxçeyîda jî t'irbeke nû hebû ku
hê t'u kes têda nehatibû danînê.
42 Îsa kirine wê t'irbê, çimkî r'oja
t'ivdarekkirina cihûya bû, t'irb jî
nêzîk bû.

## T'irba vala

*(Metta 28:1-10; Marqos 16:1-8; Lûqa 24:1-12)*

20 1 R'oja yekşemê*, qereber-
banga sibehê zû, Meryema
Mejdelanî çû ser t'irbê. Dîna xwe
dayê, wê kevir ji ber derê t'irbê
wêda kirî ye. 2 Destxweda r'evî
çû cem Şimh'ûn-Petrûs û wî

---

* 19:36 Derk'etin 12:46; Jimar 9:12; Zebûr 34:20.

* 19:37 Zekerîya 12:10.

* 19:39 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Sed lîtir». Sed lîtirêd r'omayîyaye hingê qasî sî kîlogramêd îroyîn e.

* 20:1 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «R'oja h'eftîyêye pêşin», çimkî bona cihûya r'oja h'eftîyêye pêşin yekşem bû, awa gotî «le'd».

şagirtê din, yê ku Îsa jê h’iz di-
kir û wanr’a got: «Xudan ji t’irbê
derxistine û em nizanin ku Ew
danîne k’u derê!»
3 Hema hingê Petrûs û şagirtê
din derk’etine derva û berbi t’irbê
çûn. 4 Her du jî hevr’a dir’evîyan,
lê şagirtê din ji Petrûs zûtir di-
r’evîya û ew pêşîya wî gihîşte ser
t’irbê. 5 Wî xwe qûz kir û dîna
xwe dayê, wê k’efen li wir e, lê
xwexa nek’ete hindur’. 6 Hingê
Şimh’ûn-Petrûs ku pey wî dihat
gihîştê, k’ete hindur’ê t’irbê, dîna
xwe dayê, wê k’efen li wir e 7 û
destmala sêrî ne t’evî k’efen bû,
lê qatkirî alîkî danî bû. 8 Paşê
şagirtê din jî k’ete hindur’, yê ku
pêşîyê gihîştibû ser t’irbê. Ewî dît
û bawer kir. 9 Wan hê nivîsar fe’m
nekiribû, ku gerekê Îsa ji mirinê
r’abûya. 10 Pey vê yekêr’a şagirt
veger’îyane cîyêd xwe.

## Îsa Xwe nîşanî Meryema Mejdelanî dike

*(Marqos 16:9-11)*

11 Lê Meryem ji t’irbê der se-
kinîbû û digirîya. Wê bi girî xwe
qûz kir û li hindur’ê t’irbê nihêr’î,
12 hingê dîna xwe dayê, wê du
milyak’etêd k’incsipî, li wî cîyê ku
cinyazê Îsa lê danîbû r’ûniştine,
yek berserîyê û yê din binp’îyê.
13 Milyak’eta wêr’a got: «E’vdê!
Tu çima digirîyî?» Meryemê got:
«Xudanê min hildane û ez nizanim
Ew danîne k’u derê». 14 Gava ewê
ev yek got, li pişt xweva veger’îya
û dît ku Îsa li wê derê sekinîye, lê
wê nizanibû ku ew Îsa ye. 15 Îsa
gote wê: «E’vdê, tu çima digirî-
yî? Tu li k’ê diger’î?» Meryemê
t’irê qey ew r’ezvan e, ewê gotê:
«Ez xulam, heger te Ew hildaye,
minr’a bêje te Ew danîye k’u de-
rê, wekî ez Wî ji wê derê hildim».
16 Îsa gotê: «Meryem!» Meryemê
berê xwe da Wî û bi îbranî gotê:
«R’abbonî!» ku tê fe’mkirinê:
«Dersdar».
17 Îsa gote wê: «Min negire,
çimkî Ez hê r’anebûme cem
Bavê. Lê her’e cem birêd Min
û wanr’a bêje. ‹Ezê r’abime cem
Bavê Xwe û cem Bavê we, cem
Xwedêyê Xwe û cem Xwedêyê
we›». 18 Meryema Mejdelanî çû
cem şagirta û wanr’a got: «Min
Xudan dît» û tiştêd ku Îsa wêr’a
gotibû wanr’a gilî kir.

## Îsa Xwe nîşanî şagirtêd Xwe dike

*(Metta 28:16-20; Marqos 16:14-18; Lûqa 24:36-49)*

19 Xût wê êvarê, r’oja yekşemê,
gava şagirt civîyayî bûn, ji tirsa

cihûya jî derî li ser wan dadayî
bûn, hingê Îsa hat nava wanda
sekinî û wanr'a got: «E'dilayî
wer'a». 20 Ev tişt got, dest û nek'sa
Xwe nîşanî wan kirin. Hingê şa-
girt gelekî şa bûn, gava ku Xudan
dîtin. 21 Paşê Îsa dîsa wanr'a got:
«E'dilayî wer'a. Çawa ku Bavê Ez
şandim, usa jî Ez we dişînim».
22 Ev yek ku got, p'ifî ser wan
kir û wanr'a got: «Hanê R'uh'ê
Pîroz bistînin. 23 Hûn gunêd k'ê
bibaxşînin, ewê bêne baxşandinê,
gunêd k'ê nebaxşînin, ewê neyne
baxşandinê».

## Îsa û T'ûma

24 T'ûmayê yekî ji her donzde-
ha, ku jêr'a «Heval-cêwî» digotin,
ne t'evî wan bû gava ku Îsa hat.
25 Hingê şagirtêd mayîn wîr'a
gotin: «Me Xudan dît». Ewî wan-
r'a got: «H'eta ku ez dewsa mixa
destêd Wîda nebînim, t'ilîya xwe
nedime ser dewsa mixa û destê
xwe jî nekime nek'sa Wî, ez t'u
car bawer nakim».

26 Pey h'eyşt r'ojar'a, şagirtêd
Îsa dîsa malda bûn û T'ûma jî
t'evî wan bû. Derî dadayî bûn, lê
Îsa hat, nava wanda sekinî û got:
«E'dilayî wer'a». 27 Paşê T'ûmar'a
got: «T'ilîya xwe bîne vir û destêd
Min binihêr'e, destê xwe jî bîne
û bike nek'sa Min. Nebawerîyê
neke, lê bawer bike!»

28 T'ûma lê veger'and û gotê:
«Xudanê min û Xwedêyê min!»
29 Îsa gote wî: «Te Ez dîtim lema
bawer kir? Xwezî li wan, yêd ku
nedîtine, lê bawer dikin!»

## Meremê vê k'itêbê

30 Îsa li ber şagirtêd Xwe hê
gelek nîşanêd din jî kirin, ku vê
k'itêbêda nehatine nivîsarê. 31 Lê
belê ev hatine nivîsarê, wekî hûn
bawer bikin, ku Îsa ye Mesîh,
Kur'ê Xwedê û bi vê bawerîya pê
navê Wî jîyîna we hebe.

## Îsa û girtina me'sîya

**21** 1 Pey vê yekêr'a Îsa dîsa
Xwe li devê gola Tebe-
rîyayê nîşanî şagirtêd Xwe kir.
Ew bi vî awayî qewimî: 2 Şim-
h'ûn-Petrûs, T'ûmayê ku jêr'a
digotin «Heval-cêwî», Natanyêlê
ji Qanaya Celîlê, kur'êd Zebedî û
du şagirtêd Îsaye din hevr'a bûn.
3 Şimh'ûn-Petrûs wanr'a got: «Ez
diçim ku me'sîya bigirim». Wana
wîr'a got: «Em jî t'evî te tên». Hingê
ew r'abûn çûn k'etine qeyikekê,
lê wê şevê t'u tişt negirtin.

4 Sibeh safî bû, Îsa li devê go-
lê sekinî, lê şagirta nizanibû ku
Ew Îsa ye. 5 Hingê Îsa gote wan:

«Lawikno! We tişt negirtîye?»
Wana lê veger’and û gotinê: «Na».
6 Ewî gote wan: «T’or’ê bavêjine
alîyê qeyikêyî r’astê hûnê bigi-
rin». Wana jî t’or’ avîtê û ji dest
gelekbûna me’sîya nikaribûn ku
t’or’ bik’işandana.
7 Hingê wî şagirtê ku Îsa jê h’iz
dikir Petrûsr’a got: «Ew Xudan
e!» Gava Şimh’ûn-Petrûs bihîst
ku ew Xudan e, k’inca xwe avîte
ser xwe, çimkî ew te’zî bû û xwe
avîte golê. 8 Lê şagirtêd mayîn
t’or’ me’sîyava k’işandin û pê
qeyikê gihîştine bejê[f], çimkî ew
ne dûr bûn, lê qasî sed mêtirî
dûrî bejê bûn.

### Îsa t’evî şagirtêd xwe nan dixwe

9 Gava ew derk’etine bejê, wir
agirê ji k’omirê vêxistî dîtin, me’sî
li ser û nan jî li ber. 10 Îsa wanr’a
got: «Hinek ji wan me’sîyêd ku we
hêja girtine bînin». 11 Şimh’ûn-Pet-
rûs jî k’ete qeyikê û t’or’ k’işande
bejê, ya ku sed pêncî sê me’sîyêd
gir têda bûn. Haqas gelek bûn jî,
lê dîsa t’or’ neqelişî.
12 Îsa wanr’a got: «Werin te’ş-
tê bixwin». Ji şagirta t’u kesî jî
turuş nekir ku jê bipirsîya: «Tu
k’î yî?» Çimkî wana zanibû ku
Ew Xudan e. 13 Hingê Îsa nêzîk
bû, ew nan hilda da wan û usa
jî me’sî. 14 Eva îdî cara sisîya bû
ku Îsa pey mirin-r’abûna Xwer’a
şagirtêd Xweva xuya bû.

### Îsa û Petrûs

15 Gava wan te’ştê xwar, Îsa ji
Şimh’ûn-Petrûs pirsî: «Şimh’ûnê
kur’ê Yûh’enna, tu Min gelekî
h’iz dikî, yan ew Min gelekî h’iz
dikin?*» Petrûs jêr’a got: «Belê
Xudan, Tu zanî ku ez Te h’iz di-
kim». Îsa wîr’a got: «Berxêd Min
biç’êrîne».
16 Îsa cara duda wîr’a got: «Şim-
h’ûnê kur’ê Yûh’enna, tu Min h’iz
dikî?» Ewî got: «Belê Xudan, Tu
zanî ez Te h’iz dikim». Îsa jêr’a
got: «Şivantîyê pezêd Min bike».
17 Îsa cara sisêya ji Petrûs pir-
sî: «Şimh’ûnê kur’ê Yûh’enna,
tu Min h’iz dikî?» Hingê dilê
Petrûs êşîya ku Wî sê cara wîr’a
got: «Tu Min h’iz dikî?» û got:
«Xudan, Tu her tiştî zanî, Tu zanî
ku ez Te h’iz dikim». Îsa wîr’a
got: «Pezêd Min biç’êrîne. 18 Ez
r’ast bê xêlif ter’a dibêjim, gava
ku tu xort bûyî, te xwexa qayîşa
xwe girêdida û k’uda te dixwest

* 21:15 Aha jî tê fe’mkirinê: «Tu Min ji wan ze’ftir h’iz dikî?»

diçûyî. Lê gava ku tu kal bî, tê
destêd xwe bilind kî û yekî dinê
pişta te girêde û te bibe wî cîyê ku
tu naxwazî her’êyî». 19 Wî ev yek
got, da e’yankirinê ku ewê bi çi
cûr’e mirinê r’ûmetê bide Xwedê.
Pey vê yekêr’a Wî Petrûsr’a got:
«Pey Min were».

### Îsa û şagirtê h’izkirî

20 Petrûs pişt xweva zivir’î, dît
ew şagirtê ku Îsa jê h’iz dike pey
wan tê. Eva ew şagirt bû, yê ku
şîva êvarêda xwe avîtibû h’emêza
Îsa û gotibû: «Xudan ew k’î ye, ku
wê nemamîya Te bike?» 21 Petrûs
gava ew dît, ji Îsa pirsî: «Xudan,
lê îjar evê çawa be?»
22 Îsa wîr’a got: «Heger Ez bi-
xwazim ku ew bimîne h’eta Ez
bêm, çî ter’a ye? Tu pey Min were!»
23 Eva gotina nava xûşk-birada
bela bû, yanê ew şagirtê nemire.
Lê belê Îsa bona wî negotibû, ku
ew namire, lê gotibû: «Heger Ez
bixwazim ku ew bimîne h’eta Ez
bêm, çî ter’a ye?»
24 Eva ew şagirt e, yê ku bona
van yeka şe’detîyê dide, usa jî ev
yek nivîsîn. Em zanin ku şe’de-
tîya wî r’ast e.
25 Hê gelek kirêd din jî hene,
yêd ku Îsa kirine. Heger ew bi
hûr-gilî bihatana nivîsarê, bi
t’exmîna min, ew k’itêbêd nivîsar
wê dinyayêda cî nebûna.

# K'ARÊD ŞANDÎYA

## Pêşgotin

K'itêba «K'arêd Şandîya» dûmayîya «Mizgînîya[f] Lûqa» ye, ya ku bi destê Lûqa hatîye nivîsarê. Meremê k'itêbê ew e, ku şiroveke pey-çûyêd Mesîh[f] çawa bi r'êberîya R'uh'ê[f] Pîroz li Orşelîmê[f], Cihûstanê[f], Sameryayê[f] û welatêd mayînda bûne şe'dêd Wî (1:8). Usa jî dide k'ifşê, ku civîna[f] nû bi çi zelûlîyê û te'lî-tengîyê h'îmê xwe girt û bi alîk'arîya R'uh'ê Pîroz çawa nava wan oxirmêd giranda pêşda diçû. Alîkî dinva jî gava hê k'ûr dibî, dibînî ku eva k'itêba t'arîxa mesîhîyê[f] ye, ku ji Filistînê nava cihûya[f] destpêbû û paşê bû bawerîke[f] t'emamîya dinyayê.

Em dikarin K'arê Şandîya ser sê p'ara p'arevekin:

**1.** Belabûna mesîhîyê Orşelîmêda, pey jorhilatina Îsar'a (1:1–8:3)
**2.** Belabûna mesîhîyê ji Orşelîmê û Cihûstanêda girtî h'eta Sameryayê, Şamê û cîyêd dine dor-berêd Filistînê (8:4–12:25)
**3.** Belabûna mesîhîyê nava welatêd dor-berê Be'ra Sipî (Be'ra Navberê), h'eta R'omayê[f] (13:1–28:31)

Ji wan qewimandinêd vê k'itêbêda yeke here berbiç'e'v bona kirêd R'uh'ê Pîroz nivîsar e, ku R'oja[f] Pêncîye h'esabda li Orşelîmê ser bawermendada çawa qewat barî û r'êberîya civînê kir, civîn û serwêrêd wê nav xebata wanda qewat kirin. Hînkirinêd mesîhîyêd pêşin nava dannasînkirinada xuya dibe. Awa mesele, nava dannasînîya Petrûsê[f] şandîda[f] pey standina R'uh'ê Pîrozr'a (2:14-36), nava dannasînîya p'aristgehêda[f] pey qencbûna yê nigseqetr'a (3:11-26), cabdayîna Steyfanda ber civîna giregirêd Orşelîmê (7:1-53) û gotinêd Pawlosda (13:16-41; 17:22-31; 20:18-35; 22:1-21; 24:10-21; 26:2-23). Ew qewimandinêd k'itêbêda ku têne bîranînê didine k'ifşê, ku çawa dannasînkirin û hînkirinêd şandîya bi wê qudretê têne kirinê, ya ku bi qewata R'uh'ê Pîroz civînêda nava e'mirê bawermendada tê k'ifşê û bi civînê Mizgînîya Îsa Mesîh dinyayêda bela dibe.

**Serecema fikira k’itêbê**

Hazirkirina şe’detîya şandîya (1:1-26)
1. Soz û t’emîya Îsaye xilazîyê (1:1-14)
2. Bijartina Matîyo dewsa Cihûdayê[f] Îsxeryot (1:15-26)

Şe’detîya Orşelîmêda (2:1–8:3)
Şe’detîya welatêd Cihûstanê û Sameryayêda (8:4–12:25)
Qulixê Pawlos (13:1–28:31)
1. R’êwîtîya Pawlosê şandîye pêşin (13:1–14:28)
2. Şêwira civîna Orşelîmêda (15:1-35)
3. R’êwîtîya Pawlosê şandîye duda (15:36–18:22)
4. R’êwîtîya Pawlosê şandîye sisîya (18:23–21:16)
5. Pawlosê girtî Orşelîmêda, Qeyserîyêda û r’êwîtîya wîye h’eta R’omayê û axirî (21:17–28:31)

## Bona R’uh’ê[f] Pîrozî sozdayî

*(Lûqa 24:49)*

**1** 1 T’êyofîloyê xweyîqedir, min
k’itêba xweye pêşinda* der-
heqa wan h’emû tiştada nivîsî,
çi ku Îsa kir û hîn kir, ji sêrîda
2 h’eta wê r’oja ku berbi e’zmên
hate hilatinê. Lê hê berî e’zmên
hilatinê Ewî bi R’uh’ê[f] Pîroz t’emî
li şandîyêd[f] Xweye bijartî kir. 3 Pey
wan cefayêd Xwer’a Ewî gelek cara
Xwe nîşanî wan dida, r’ast dida
îzbatkirinê ku Ew sax e. Navbera
çil r’ojîda wanva xuya dibû û der-
heqa P’adşatîya[f] Xwedêda wanar’a
xeber dida. 4 Carekê gava Ewî t’evî
wan nan dixwar, t’emî da wan û
got: «Ji Orşelîmê[f] dernek’evin, lê
belê hîvîya sozê Bavê[f] bisekinin,
bona k’îjanî we ji Min bihîst*.
5 Yûh’enna[f] bi avê nixumand, lê
hûnê çend r’oja şûnda bi R’uh’ê
Pîroz bêne nixumandinê[f]»*.

## Jorhilatina Îsa

*(Marqos 16:19-20; Lûqa 24:50-53)*

6 Gava şagirt[f] hevr’a cîkî bûn,
ji Îsa pirsîn û gotinê: «Xudan[f], vî

* 1:1 Lûqa 1:1-4.
* 1:4 Lûqa 24:49.
* 1:5 Metta 3:11; Marqos 1:8; Lûqa 3:16; Yûh’enna 1:33.

zemanîda Tê P’adşatîya Îsraêlê[f]
li wan veger’înî?» **7** Ewî li wan
veger’and û got: «Ew ne îşê we
ye ku hûn wan wext û zemana
bizanibin yêd ku Bavê bi h’ukumê
Xwe k’ifş kirine. **8** Lê gava R’uh’ê
Pîroz bê ser we, hûnê qewatê
bistînin û ji Orşelîmêda girtî
t’emamîya Cihûstanê[f], Samer-
yayê[f] û h’eta serê dinê jî bibine
şe’dêd Min»*. **9** Gava ev yek got,
ber ç’e’vê wan berbi e’zmên hate
hilatinê û e’wrekî ji ber ç’e’vê
wan Ew veşart*.

**10** Ew hê zûr’ bibûn li çûyî-
na Wîye e’zmên dinihêr’în, va
du merivêd[f] k’incsipî cem wan
sekinîn **11** û gotin: «Gelî celîlî-
ya[f]! Hûn çima usa sekinî ne û li
e’zmên dinihêr’in? Ew Îsayê ku
ji nav we hate hilatinê, wê usa jî
bê, çawa we dît Ew çû e’zmên».

### Bijartina Matîyo dewsa Cihûdayê[f] Îsxeryotî

*(Metta 27:3-10)*

**12** Hingê ewana ji ç’îyayê[f] Zey-
t’ûnê veger’îyane Orşelîmê, ku
r’îya r’ojeke şemîyê* dûrî Or-
şelîmê bû. **13** Gava hatine bajêr,
çûne oda mezine jorin, ew cîyê
ku Petrûs[f] û Yûh’enna[f], Aqûb[f],
Endrawis, Fîlîpo, T’ûma, Ber-
tolomeyo, Metta, Aqûbê[f] Hal-
fawo, Şimh’ûnê welatp’arist[f] û
Cihûdayê[f] Aqûb têda diman*.
**14** Van h’emûya her gav hevr’a
t’evî k’ulfeta[f] û Meryema[f] dîya
Îsa û birayêd Wî dua dikirin.

**15** Wan r’ojada Petrûs nava ba-
wermendada r’abû, (ku li wir
qasî sed bîst merivî bûn) û got:
**16** «Gelî bira! Gerekê ev nivîsara
bihata sêrî, çawa ku berî vê yekê
R’uh’ê Pîroz bi devê Dawid[f] bona
Cihûda[f] gotibû, ku ew bû r’êberê
wan, yêd ku Îsa girtin. **17** Ew t’evî
me nav h’esabê meda bû û p’ara
wî jî nava vî qulixîda[f] bû».

**18** (Ewî bi heqê kirê xweyî ne-
heq e’rdek stand û li wir ser sêrî
k’et, zik lê qelişî dil-h’inavê wî
h’emû r’ijîyan. **19** Eva yeka h’emû
binelîyêd[f] Orşelîmêva e’yan bû,
h’eta bi zimanê xwe jî wî e’rdîr’a

---

* 1:8 Metta 28:19; Marqos 16:15; Lûqa 24:47-48.
* 1:9 Marqos 16:19; Lûqa 24:50-51.
* 1:12 Bi gotineke din: «Kîlomêtirekê».
* 1:13 Metta 10:2-4; Marqos 3:16-19; Lûqa 6:14-16.
* 1:19 Metta 27:3-8.

Heqildima gotin, awa gotî «E'rdê
xûnê».)*
20 Petrûs dûmayî kir got: «Ça-
wa k'itêba Zebûrada[f] jî nivîsar e:

‹De bira mala wî xirabe be,
kesek têda nemîne›*

û:

‹De bira qulixê wîyî serwêrtîyê
yekî din bistîne›**.

21 Awa gerekê yek ji wan mêra be,
k'îjan ku t'emamîya wî wextî t'e-
vî me bûne gava Xudan Îsa t'evî
me diçû dihat, 22 ji nixumandina
Yûh'ennada girtî h'eta wê r'oja ku
Ew ji nav me berbi e'zmên hate
hilatinê. Ew gerekê t'evî me bibe
şe'dê r'abûna Wîye ji mirinê».
23 Du merî dane sekinandinê,
yek Ûsivê[f] ku jêr'a Barsabo digo-
tin (ku navê wî danîbûn Yûsto)
û yê din Matîyo. 24 Dua kirin û
gotin: «Xudan, Tu ku dilê[f] her
kesî zanî, ji van her duya k'îjanî
ku Tu dibijêrî bide k'ifşê, 25 wekî
evî qulixê şandîtîyê bistîne, ji
k'îjanî Cihûda[f] jê k'et ku her'e
cîyê xwe». 26 P'eşk ser wan avîtin,
p'ara Matîyo k'et û ew ser h'esabê
yanzdeh şandîyada zêde bû.

## Hatina R'uh'ê Pîroz R'oja[f] Pêncîye h'esabda

2 1 Gava R'oja Pêncîye h'esab
hat*, h'emû jî hevr'a cîkî bûn.
2 Nişkêva ji e'zmên mîna dengê bayê
qayîm dengek hat û t'emamîya wê
mala ku têda r'ûniştibûn t'ijî kir.
3 Hingê zimanêd mîna alava êgir
wanva xuya bûn û li ser her yekî ji
wan danîn. 4 H'emû bi R'uh'ê Pî-
roz t'ijî bûn û destpêkirin zimanêd
mayîn xeber dan, çawa ku R'uh'ê
Pîroz ew didane xeberdanê.
5 Wî çaxî Orşelîmêda cihûyêd[f]
xwedêxof diman, ew ji nav h'e-
mû miletêd bin p'er'ê e'zmênda
hatibûn. 6 Gava ew deng hat,
cime'teke giran civîya û t'evîhev
bû, çimkî dibihîstin ku ewana bi
zimanêd wan her yekî xeber didan
7 û h'eyr-h'ujmek'ar, zendegirtî[f]
mayî digotin: «Ev h'emûyêd ku
xeber didin ne ji Celîlê[f] ne? 8 Lê
çawa ji me her yek wî zimanî dibi-
hê, yê ku em navda dinê k'etine?
9 Partoyî, medî, e'lamî, binelîyêd
Mesopotamyayê, Cihûstanê, Ke-
pedokyayê, Pontosê, Asyayê*,

* 1:20 Zebûr 69:25.
** 1:20 Zebûr 109:8.
* 2:1 Qanûna K'ahîntîyê 23:15-21; Qanûna Ducarî 16:9-11.
* 2:9 Wî çaxî «Asya» kêm û zêde weke T'irkya îroyîn nas dikirin.

10 Firîgyayê, Pamfîlyayê, Misirê[f] û
yêd li alîyê Lîbyaya nêzîkî Kûrênê
û usa jî yêd xerîbe ji R'omê[f] hatî,
11 cihû[f] û necihûyêd[f] ku hatine ser
bawerîya[f] cihûya, usa jî kirêtî û
e'reb. Em dibihên ku evana bi
zimanê me kirêd Xwedêye mezin
dibêjin». 12 H'emûya h'eyr-h'uj-
mek'ar şaşmayî hevdur'a digotin:
«Ev çi h'ewal e?» 13 Lê hineka jî
qerfê xwe dikirin û digotin: «Pê
şerava nû serxweş bûne».

### Dannasînîya Petrûse pey hatina R'uh'ê Pîrozr'a

14 Hingê Petrûs t'evî her yanz-
deha r'abû dengê xwe hilda û
cime'têr'a got: «Gelî cihûya û
h'emûyêd ku Orşelîmêda dimînin!
Bira ev yeka weva e'yan be û guh
bidine xeberêd min. 15 Evana ne
serxweş in, çawa ku hûn difikirin,
hê sibeh zû sih'et nehe ye*. 16 Lê
eva ew yek e, çi ku Yoêl p'êxem-
ber[f] gotîye:

17 ‹R'ojêd axirîyêda Xwedê dibêje
wê aha be:
Ezê ji R'uh'ê Xwe ser h'emû
merivada bibarînim,
kur' û qîzêd weyê p'êxember-
tîyê[f] bikin,
cahilêd weyê dîtinoka bibînin
û kal-pîrêd weyê jî xewna.
18 Belê, Ezê wan r'ojada R'uh'ê
Xwe ser xulam û carîyêd
Xweda jî bibarînim
û wê p'êxembertîyê bikin.
19 Jor li e'zmên
tiştêd e'cêbmayî bidime k'ifşê
û jêr ser e'rdê jî nîşana,
xûn û agir, dû û dûxan.
20 R'oyê biqare
û hîvê jî sor be mîna xûnê,
hê berî hatina R'oja[f] Xudane
mezin û nave nîşan.
21 Û wê usa be, her kesê ku ga-
zî navê Xudan ke wê xilaz[f]
be›*.

22 Gelî îsraêlîya, van xebera
bibihên! Îsayê Nisretê, merivekî
ku ji alîyê Xwedêda k'ifşkirî bû,
Xwedê pê Wî nava weda nîşan,
k'eremet û kirêd qewat kirin, çawa
ku hûn xwexa jî zanin. 23 Bona Wî
Xwedê hê pêşda qirar kiribû û bi
zanebûna Wî Ew k'ete destê we,
we jî bi destê ner'asta darmixê
xist kuşt*. 24 Lê Xwedê qeydêd

* 2:15 Cihûya li gora e'detê xwe serê sibê nan nedixwarin h'eta sih'eta neha pey duar'a.
* 2:21 Yoêl 2:28-32.
* 2:23 Metta 27:35; Marqos 15:24; Lûqa 23:33; Yûh'enna 19:18.

mirinêye cefê vekirin, Ew ji mi-
rinê r'akir, çimkî mirinê nikaribû
h'ukumî ser Wî bikira*. 25 Dawid
bona Wî dibêje:

‹Min t'imê Xudan pêşîya xwe
didît,
çimkî Ew li alîyê minî r'astê
ye, ku ez nelik'umim.
26 Bona wê yekê dilê min şa bû,
zimanê min jî ji eşqa nesekinî,
bedena mine mirî jî wê bi gu-
man bijî,
27 çimkî Tu min dîyarê[f] mirîyada
nahêlî,
ne jî Tê bihêlî ku Pîrozê Te
bir'ize.
28 Te r'îyêd e'mir minva e'yan
kirin
û Tê şabûna dîndara Xweva
min t'ijî kî›*.

29 Gelî bira! H'ewce ye ku ez
aşkere bona Dawidê bave'şîr we-
r'a bêjim, ku ew mir defin kirin,
t'irba wî h'eta r'oja îro jî nava
meda ye. 30 Lê ew ku p'êxember
bû, wî zanibû ku Xwedê bi sond
wîr'a soz daye, wê ji bedena wî
Yekî dayne ser t'extê wî*. 31 Ewî
ev yek hê pêşda dît û bona r'a-
bûna Mesîh[f] got, ku Ewê dîyarê
mirîyada nemîne, ne jî bedena
Wîyê bir'ize*. 32 Eva ew Îsa bû,
yê ku Xwedê Ew ji mirinê r'a-
kir, ku em h'emû jî şe'de ne.
33 Xwedê Ew hilk'işand da k'ê-
leka[f] Xweye r'astê, Ewî jî R'uh'ê
Pîrozî sozdayî ji Bavê stand û
jorda barand, çawa ku hûn ni-
ha dibînin û dibihên. 34 R'ast e
Dawid neçûbû e'zmana, lê wî
xwexa ev yek got:

‹Xudan gote Xudanê min,
k'êleka Mine r'astê r'ûnê,
35 h'eta ku Ez dijminêd Te bikime
binê p'îyêd Te›*.

36 Niha bira t'emamîya mala Îsraêl
r'ind zanibe ew Îsayê ku we xaç[f]
kir, Xwedê Ew hin kire Xudan,
hin jî Mesîh».

37 Cime'tê ev yek ku bihîst, mî-
na tîrekê dilê wan k'et, Petrûs û
şandîyêd mayînr'a gotin: «Em çi
bikin, gelî bira?» 38 Petrûs wanr'a
got: «T'obe[f] kin û bira ji we her
yek bi navê Îsa Mesîh bona bax-
şandina guna bê nixumandinê[f]

* 2:24 Metta 28:5-6; Marqos 16:6; Lûqa 24:5.
* 2:28 Zebûr 16:8-11.
* 2:30 P'adşatî IV, 7:12-13; Zebûr 132:11.
* 2:31 Zebûr 16:10.
* 2:35 Zebûr 110:1.

û hûnê R’uh’ê[f] Pîroz p’êşk’êş[f] bistînin. 39 Ev soz bona we û zar’êd we ye, usa jî bona h’emûyêd dûr e ku Xudan Xwedê meyê gazî wan ke».

40 Petrûs bi gelek xeberêd mayîn bi me’rîfetî t’emî da û hîvî ji wan kir û got: «Xwe ji vî nisilê[f] neheq xilaz kin». 41 Ewêd ku xeberêd wî qebûl kirin, pê avê hatine nixumandinê[f] û wê r’ojê weke sê h’ezara li hev zêde bûn. 42 Wan t’imê xwe li hînkirina şandîya digirt, li hev dicivîyan, nan kerdikirin* û dua dikirin.

### E’mirê bawermenda

43 Xof û tirs dik’ete ser her kesî û bi destê şandîya gelek k’eremet û nîşan dibûn. 44 H’emû bawermend hevr’a bûn û her tiştêd wan yek bû. 45 Hebûk[f] û milk’ê xwe jî difirotin û belayî h’emûyêd h’ewce dikirin. 46 Her r’oj bi t’ifaq[f] diçûne p’aristgehê[f], malada nan kerdikirin û eşq-şa bi dilê sax xwarin dixwarin, 47 şikirîya xwe Xwedê danîn û t’emamîya cime’tê li wan xweş bû. Xudan jî r’oj bi r’oj h’esabê xilazbûyîya[f] zêde dikir.

### Qencbûna yê nigada seqet p’aristgehêda

**3** 1 Carekê Petrûs û Yûh’enna wextê duayê sih’eta sisîya hildik’işîyane p’aristgehê. 2 Merivekî ji zikmakîyêda nigada seqet hebû, ku her r’oj danîn ber dergehê p’aristgehêyî ku Bedew dihate gotinê dadanîn, ku ji yêd dihatine p’aristgehê p’ars kira. 3 Evî ku dît Petrûs û Yûh’enna dik’evine p’aristgehê, lava wan kir ku p’arsê bidinê. 4 Petrûs t’evî Yûh’enna li wî nihêr’î û gotê: «Li me binihêr’e!» 5 Ewî jî li wan nihêr’î û ç’e’vê wî lê bû, ku wê tiştekî ji wan bistîne. 6 Hingê Petrûs gotê: «Zêr’ û zîvê min t’une, lê çî min heye ezê Wî bidime te. Bi navê Îsa Mesîhê Nisretê r’abe biger’e». 7 Destê wîyî r’astê girt r’akir, pêr’a-pêr’a qudûmê çoka û gûzekêd wî şidîyan. 8 Ewî banzda ser xwe sekinî, destpêkir ger’îya û t’evî wan k’ete p’aristgehê diger’îya, banzdida û şikirî dida Xwedê. 9 Gava t’emamîya cime’tê dît ku ew diger’e û şikirîyê dide Xwedê, 10 nas kirin ku ew e, yê ku bona p’arsê ber dergehê p’aristgehêyî Bedew r’ûdinişt û bona tiştê ku

* 2:42 Li vê derê tê fe’mkirinê, ku bawermenda pêşîyê nan dixwar, paşê Şîva Xudan derbaz dikirin.

t'evî wî qewimî zendegirtî mabûn
û dih'eyîrîn.

### Petrûs hêwangeha Silêmanda[f] dannasîn dike

**11** Evî ku Petrûs û Yûh'enna
ber'nedidan, t'emamîya cime'-
tê e'cêbmayî berbir'î wan bezî,
h'eta wî cîyê ku jêr'a digotin hê-
wangeha Silêman. **12** Petrûs ku
ev yek dît, cime'têr'a got: «Gelî
îsraêlîya! Hûn çima bona vê yekê
e'cêbmayî mane? Çima tiherekî
li me dinihêr'in? Tê bêjî qey me
bi qewat yan xwedêp'aristîya xwe
ew da ger'ê? **13** Xwedêyê Birahîm[f],
Îshaq[f], Aqûb û Xwedêyê kal-bavêd
me, Berdestîyê Xwe Îsa r'ûmet
kir*. We nemamîya[f] Wî kir û ber
Pîlato[f] t'exsîr kir, gava ewî qirar
kiribû ku Wî ber'de. **14** We yê Pî-
roz[f] û r'ast t'exsîr kir û yê mêrkuj
xwest ku wer'a bê ber'danê*. **15** We
Ç'e'vkanîyê jîyînê kuşt, lê Xwedê
Ew ji mirinê r'akir û em xwexa
şe'de ne. **16** Û qewata navê Wî eva
meriva qenc kir, k'îjanî ku hûn
dibînin û nas dikin. Belê wê ba-
werîya[f] bi navê Wî eva ber ç'e'vê
we h'emûya sax-silamet kir.

**17** Niha gelî bira, ez zanim ku we
jî mîna serwêrêd xwe bi nezanîya
xwe kirîye. **18** Lê Xwedê çawa berî
vê yekê bi devê h'emû p'êxembe-
ra bona cefê Mesîhê Xwe gotibû,
usa jî kir. **19** Awa t'obe kin û berbi
Xwedê veger'in[f], ku gunêd we
bêne r'esîtkirinê. **20** Hingê wextêd
jîyîndarîyê ji h'izûrîya Xudan wê
bên û Ewê Îsa bişîne, wî Mesîhê
ku berêda bona we k'ifş kirîye.
**21** Lazim e Ew li e'zmên bimîne,
h'eta ku Xwedê her tiştî nû çêke*,
çawa ku hê berê pêşda Xwedê bi
devê p'êxemberêd Xweye pîroz
gotibû. **22** Belê Mûsa[f] got: ‹Xudan
Xwedêyê we wê ji nav birayêd we-
da P'êxemberekî mîna min wer'a
derxe. Her çi ku wer'a bêje, gerekê
hûn guhdarîya Wî bikin. **23** Her
k'î ku guhdarîya Wî p'êxemberî
neke, ji nav cime'tê wê bê qetandin
û undakirinê›*. **24** Û h'emû p'ê-
xembera jî, ji Samûêl[f] girtî û yêd
peyr'a çi ku gotine, bona van r'oja
xeber dane. **25** Hûn mîrat'xurêd[f]

* 3:13 Derk'etin 3:14-15.
* 3:14 Lûqa 23:13-23.
* 3:21 Aha jî tê fe'mkirinê: «H'eta ku Xwedê her tiştî bîne sêrî», awa gotî her tiştêd ku bi devê p'êxembera derheqa Îsa Mesîhda hatine gotinê.
* 3:23 Qanûna Ducarî 18:15, 18, 19.

p'êxembera û wê peymanê[f] ne,
ya ku Xwedê t'evî kal-bavêd we*
girêda. Ewî gote Birahîm: ‹Bi
zur'eta te ezê dua h'emû miletêd
dinyayê bikim›**. 26 Xwedê Ber-
destîyê Xwe Îsa miletr'a derxist
û pêşîyê şande cem we, ku dua
we bike û bi vî awayî we her kesî
ji xirabîyêd we veger'îne».

### Petrûs û Yûh'enna li ber civîna[f] giregira

4 1 Petrûs û Yûh'enna hê cim-
e'têr'a xeber didan, k'ahîna[f]
û serwêrê nobedarêd p'aristgehê
t'evî sadûqîya[f] ser wanda girtin.
2 Ewana aciz bibûn, çimkî wana
cime't hîn dikir, ku Îsa ji mirinê
r'abûye, îzbat dikirin ku mirîyê
r'abin. 3 Ew girtin kirine kelê h'e-
ta r'oja dinê, çimkî îdî êvar bû.
4 Lê gelekêd ku xeber dibihîstin
bawer kirin, h'esabê wan gihîşte
pênc h'ezara.

5 R'oja dinê serwêr, r'ûspî[f] û
qanûnzan[f] civîyane Orşelîmê.
6 Henanê serekk'ahîn, Qeyafa,
Yûh'enna, Skender û h'emûyêd
mayîne ji xûn-qinêta serekk'ahîn
jî li wir bûn, 7 Petrûs û Yûh'enna
nava xweda dane sekinandinê û
pirsîn: «We bi çi qewatê yan bi
çi navî ev yeka kir?» 8 Wê demê
Petrûs bi R'uh'ê Pîroz t'ijî wa-
nar'a got: «Gelî serwêrêd cime'tê
û r'ûspîya! 9 Heger hûn îro bona
vê qencîya ku vî seqetîr'a bû ji
me dipirsin, ku ew çawa qenc
bûye, 10 bira we û t'emamîya mi-
letê Îsraêlêva e'yan be, ku eva bi
saya navê Îsa Mesîhê Nisretê li
ber we qencbûyî sekinî ye, Ewê
ku we xaç kir û Xwedê ji mirinê
r'akir. 11 Ew e ‹Ew kevirê ku ji we
hosta hate bêr'ûmetkirinê û bû
serê e'nîşkê[f]›*. 12 Bi kesekî mayîn
xilazbûn[f] t'une, çimkî bin p'er'ê
e'zmênda navekî din merivar'a
nehatîye dayînê, ku em bikaribin
bi wî xilaz bin».

13 Gava wana mêrk'îmîya Pet-
rûs û Yûh'enna dît û pê h'esîyan
ku evana merivne nexwendî û
nezan in, e'cêbmayî man û nas
kirin, ku evana t'evî Îsa bûne.
14 Lê ew merivê qencbûyî ku t'e-
vî wan sekinî dîtin û nikaribûn
tiştek bigotana. 15 Hingê e'mirî
li wan kirin, ku ew ji civîna[f]
giregira derên û hevr'a şêwirîn,

---

* 3:25 Nav hinek destnivîsarada dewsa «we» «me» heye.

** 3:25 Destpêbûn 22:18; 26:4.

* 4:11 Zebûr 118:22.

16 gotin: «Em van meriva çawa
bikin? Çimkî h’emû binelîyêd
Orşelîmêva e’yan e ku bi destê
van k’eremeteke berbiç’e’v bû û
em nikarin înk’ar kin. 17 Lê wekî
nava cime’têda hê bela nebe, em
gefê li wan bixwin, ku t’u car bi
Wî Navî kesîr’a xeber nedin».

18 Dîsa gazî wan kirin, t’emî
dane wan, ku t’u car bi navê Îsa
xeber nedin û hîn nekin. 19 Lê
Petrûs û Yûh’enna li wan vege-
r’andin û gotin: «K’a hûn xwexa
bifikirin, gelo ev yek ber Xwedê
r’ast e ku em gur’a[f] we bikin, ne
ya Xwedê? 20 Em nikarin bona
wan tiştêd ku me xwexa dîtin û
bihîstin nekine dengî». 21 Wana
dîsa gef li wan xwar û ber’dan.
Ber cime’tê me’nîk ser wan ne-
dîtin ku ceza bidana wan, çimkî
h’emûya jî bona ew tiştê qewimî
şikirî didane Xwedê. 22 E’mirê wî
merivê ku ev k’eremeta qencbûnê
jêr’a bû çil salî jortir bû.

### Duayê bawermenda

23 Gava Petrûs û Yûh’enna
hatine ber’danê, ew çûne cem
k’oma xwe û wanr’a her tişt gi-
lî kirin, çi ku serekêd k’ahîn û
r’ûspîya wanar’a gotibûn. 24 Wana
jî gava bihîst, hevr’a dengê xwe
hildan gazî Xwedê kirin û gotin:
«Ya Xweyî, E’firandarê e’rd û
e’zmên, be’rê û h’emûyêd nav
wanda*, 25 Te bi R’uh’ê Pîroz
pê devê bavê me, berdestîyê Xwe
Dawid got:

‹Çima necihû qilqilîn û milet
jî bona tiştêd p’ûç’ fikirîn?
26 P’adşêd dinyayê hazir sekinîn
û serwêr hevr’a miqabilî Xu-
dan û Mesîhê Wî civîyan›*.
27 Belê r’ast vî bajarîda ser ber-
destîyê Te Îsayê pîroz, Yê ku Te
bi r’ûnkirinê[f] k’ifş kir, Hêrodes[f]
û Pîlatoyê Pontîyo t’evî necihûya
û miletê Îsraêlê civîyan*, 28 we-
kî wan tişta bikin, çi ku Te hê
berêda anegorî qewat û e’mirê
Xwe k’ifş kiribû bibin. 29 Niha
ya Xudan, ser gef û gur’îya wan-
da binihêr’e, k’eremê xulamêd
Xwer’a bike, wekî em mêrk’îmî
xebera Te xeber din, 30 destê Xwe
dirêj ke, wekî bi navê berdestîyê
Te Îsayê pîroz ji nexweşîya qenc
bin, nîşan û k’eremet biqewimin».
31 Hema çawa wana dua xilaz

* 4:24 Derk’etin 20:11; Nehemîya 9:6; Zebûr 146:6.
* 4:26 Zebûr 2:1-2.
* 4:27 Metta 27:1-2; Marqos 15:1; Lûqa 23:1-11; Yûh’enna 18:28-29.

kir, ew cîyê ku ew civîyayî bûn
h’ejîya û h’emû bi R’uh’ê Pîroz
t’ijî bûn, xebera Xwedê mêrk’îmî
xeber didan.

### Her tiştê bawermenda yek bû

32 Dil û r’uh’ê t’emamîya cim-
e’ta bawermenda yek bû. Ji wana
t’u kesî hebûka xwer’a nedigot
ku: «Ya min e», lê her tiştêd wan
yek bû. 33 Şandîya bi qewata zor
şe’detîya mirin-r’abûna Xudan
Îsa didan û k’eremeke[f] mezin ser
wan h’emûya bû. 34 Nava wanda
t’u kes h’ewcê tiştekî nîbû. Ewêd
ku xweyê e’rda yan mala bûn,
difirotin û qîmetê wan tiştêd
firotî danîn 35 ber p’îyêd şandîya
dadanîn û wana jî k’êr’a çi lazim
bûya bela dikirin. 36 Awa yekî lê-
wî[f] ji Qubrisê, navê wî Ûsiv[f], ku
şandîya jêr’a digot Barnabas[f], ku
tê fe’mkirinê: «Yê Dildayînê*»,
37 e’rdekî wî hebû firot, qîmetê
wî anî ber p’îyêd şandîya danî.

### Gunê Hananîya û Safêrîyayê

5 1 Lê merivekî navê wî Ha-
nanîya t’evî jina xwe Safê-
rîyayê milk’ek firot, 2 ji qîmetê
wê hinek veşart, ku jin jî haş pê
hebû, hinek jî anî li ber p’îyêd
şandîya danî. 3 Hingê Petrûs wîr’a
got: «Hananîya! Ev çawa bû ku
mîrêcin[f] qelpê xirab kire dilê te,
ku tu R’uh’ê Pîrozr’a derewa bikî
û ji qîmetê e’rdê hinekî veşêrî?
4 Berî firotanê ne ew ya te bû?
Û pey firotanêr’a jî qîmetê wê
destê teda nîbû? Te çima ev yek
kire dilê xwe? Te ne ku merivar’a
derew kir, lê Xwedêr’a». 5 Gava
Hananîya ev xeber bihîstin, k’et
r’uh’ê xwe da û tirseke mezin
h’emûyêd ku bihîstin girt. 6 Xort
jî r’abûn ew k’efen[f] kirin û birine
derva defin kirin.

7 Weke sê sih’eta derbaz bû,
jina wî ku nizanibû çi qewimîye,
k’ete hindur’. 8 Petrûs jê pirsî got:
«Minr’a bêje, we hebûka xwe he-
ma haqasî firot?» Ewê got: «Belê,
hema haqasî». 9 Hingê Petrûs
wêr’a got: «Hûn çima bûne yek
ku R’uh’ê Xudan bicêr’ibînin[f]?
Va ne dengê nigêd wan merivêd
ku mêrê te defin kirine ji pişt
dêrî tên, wê te jî derxine derva».
10 Pêr’a-pêr’a ew k’ulfet k’ete ber
nigêd wî û r’uh’ê xwe da. Hingê
xort k’etine hindur’, ewa mirîtî
dîtin, hildan birin k’êleka mêrê

* 4:36 Navê «Barnabas» bi zimanê aramî[f] xeber bi xeber: «Kur’ê Dildayînê». Aha tê fe’mkirinê: «Yê ku dil dida ber însên».

wê defin kirin. 11 Tirseke mezin
k'ete ser t'emamîya civînê[f] û h'e-
mûyêd ku ev yek bihîstin.

### K'eremetêd bi destê şandîya

12 Bi destê şandîya gelek nîşan
û k'eremet nav cime'têda dibûn.
(H'emû bawermend hevr'a hê-
wangeha Silêmanda dicivîyan.
13 T'u kesî ji yêd mayîn newêribû
nêzîkî wan bûya, lê belê cime'tê
jî qedirê wan digirt. 14 Lê dîsa
e'laleta jina û mêra hê-hê zê-
de dibûn, yêd ku bawerîya xwe
Xudan danîn.) 15 Bona vê yekê
xelqê nexweş derdixistine serê
r'îya, dadanîne ser darbesta û
ber'a, wekî gava Petrûs derbaz
be, t'enê sîya wî bik'eve ser ji
wan hineka. 16 E'lalet jî ji bajarêd
dor-bera dihatine Orşelîmê, t'evî
xwe nexweş û yêd ku ji r'uh'êd[f]
h'eram[f] cefa dik'işandin danîn
û h'emû jî qenc dibûn.

### Zêrandina şandîya

17 Serekk'ahîn[f] û h'emûyêd t'evî
wî, ku ji k'omela sadûqîya bûn,
h'evsûdîyêva dagirtî r'abûn 18 dest
avîtine şandîya, avîtine kela[f] cim-
e'tîyê. 19 Lê milyak'etekî[f] Xudan
wê şevê dergehêd kelê vekirin,
ew derxistine derva û gote wan:
20 «Her'in p'aristgehêda bisekinin
û cime'têr'a van h'emû gotinêd vê
jîyînê bêjin». 21 Wana jî guhdarî
kir, sibehê zû k'etine p'aristgehê,
destpêkirin hîn kirin.

Hingê serekk'ahîn k'oma xweva
hat, t'evî t'emamîya k'oma r'ûspî-
yêd Îsraêlê, civîna giregira civand
û şandine kelê ku şandîya bînin.
22 Lê gava berdestî çûn, ew kelêda
nedîtin, veger'îyan hatin û gotin:
23 «Kela ji her alîyava dadayî bû
û nobedar jî li ber dergeha bûn,
lê gava me vekir, me hindur'da
t'u kes nedît». 24 Gava serwêrê
nobedarêd p'aristgehê û serekêd
k'ahîna ev xeber bihîstin, ser wan
e'cêbmayî man digotin: «Gelo
çi qewimîye?» 25 Wê demê yekî
hat wanr'a got: «Va ew merivêd
we avîtibûne kelê, p'aristgehêda
sekinî ne û cime'tê hîn dikin!»
26 Wî çaxî serwêrê nobedara ber-
destîyava t'evayî çûn ew anîn, lê
ne bi zorbetîyê, çimkî ji cime'tê
ditirsîyan, ku wan nedine ber
kevira.

27 Ew birin ber civîna giregira
dane sekinandinê, serekk'ahîn ji
wan pirsî 28 û got: «Me h'işk t'emî
li we nekir, ku bi Wî Navî hîn ne-
kin? Lê va we Orşelîm bi hînkirina
xweva t'ijî kirîye, hûn dixwazin
cabdarîya xûna Wî Merivî bikine

stûyê me»*. **29** Petrûs û şandîyêd
mayînva cab dan û gotin: «Em
gerekê gur'a Xwedê bikin, ne ku
ya meriva. **30** Xwedêyê kal-bavêd
me Îsa ji mirinê r'akir, Ewê ku
we darva dardakir kuşt. **31** Xwedê
Ew bilind kir danî li milê Xweyî
r'astê, ku bibe R'êber û Xilazkir[f],
wekî mecala t'obeyê û baxşandina
guna bide Îsraêlê. **32** Em şe'dê van
tişta ne, usa jî R'uh'ê Pîroz, k'î-
jan Xwedê da wan, yêd ku gur'a
Wîda ne».

**33** Gava wana ev yek bihîst, gelekî
hêrs k'etin û dixwestin wan bikujin.
**34** Lê fêrisîkî[f] dersdarê[f] Qanûnê
hebû, navê wî Gamalyêl û nava
t'emamîya cime'têda jî xweyîqe-
dir bû. Eva civîna giregirada r'abû
sekinî e'mir kir ku şandîya xêlekê
derxine derva **35** û wanr'a got: «Gelî
îsraêlîya! Hindava vanda haş ji xwe
hebin ku hûnê çi bikin. **36** Wex-
tekê T'ewdas pêşda hat, ku xwe
danîbû dewsa yekî mezin û weke
çarsid merivî jî xwe lê girtibûn, ew
hate kuştinê, h'emû peyçûyêd wî jî
t'ûr'-t'ûr'î bûn û kes nema. **37** Pey
wîr'a Cihûdayê Celîlê jî r'ojêd nav-
nivîsarêda r'abû e'laleteke giran li
pey xwe bir, lê ew hate kuştinê û
h'emûyêd pey wî diçûn jî bela-belayî
bûn. **38** Û niha ez vî h'alîda wer'a
dibêjim, ji van meriva veger'in û
wan ber'din. Heger ew şêwir yan
şixul merivatî be, wê betal be, **39** lê
heger ji Xwedêda ye, hûn nikarin
betal kin. Miqatî xwe bin nebe ku
hûn r'abine ber Xwedê».

Civîna giregira gur'a wî kir,
**40** gazî şandîya kirin, ew dane ber
qamçîya, e'mirî ser wan kirin, ku
îdî bi navê Îsa xeber nedin û ber'-
dan. **41** Evana jî ji civîna giregira
çûn, şa dibûn ku bona navê Îsa
hêjayî r'ezîlkirinê bûne. **42** Her
r'oj li p'aristgehê û malada t'imê
Mizgînî[f] didan û hîn dikirin ku
Mesîh, Îsa ye.

### Bijartina h'eft k'omekdara

**6** **1** Wan r'ojada gava şagirt zêde
dibûn, cihûyêd ku yûnanî[f]
xeber didan hindava cihûyêd îb-
ranîda[f]* bîna xwe teng dikirin,
çimkî xurekê ku her r'oj dihate
belakirinê nedigihîşte jinebîyêd
wan. **2** Wî çaxî her donzdeha gazî
k'oma şagirta kir û gotin: «Ev yek
ne r'ast e ku em dannasînîya xebera

* 5:28 Metta 27:25.

* 6:1 «Cihûyêd îbranî» ew bûn ku li welatê xweda mezin bibûn zimanê Îbranî yan Aramî xeber didan.

Xwedê bihêlin, xurek belakirinêva
mijûl bin. 3 Niha gelî bira, ji nava
xweda h’eft merivêd bi şe’detîya
navê qenc bibijêrin, ku bi îzbatî
R’uh’ê Pîroz û serwaxtîyêva[f] t’ijî
ne, wekî em wan daynine ser vî
şixulî. 4 Lê emê xwe bidine dua û
dannasînîya xeberê». 5 Eva yeka
h’emû bawermenda xweş hat û ev
merivana bijartin: Steyfan, meri-
vekî bi bawerî û R’uh’ê Pîrozva
t’ijî, Fîlîpo, Prokoro, Nîkanor,
Tîmon, Parmênas û Nîkoloyê ji
Entakyayê, ku ji p’ûtp’aristîyê[f]
hatibû ser bawerîya cihûya. 6 Eva-
na ber şandîya dane sekinandinê,
şandîya jî dua kirin û destêd xwe
dane ser wan. 7 Û xebera Xwedê
pêşda diçû, e’laleta şagirta Orşelî-
mêda gelekî zêde dibû û ji k’ahîna
jî geleka bawerî qebûl dikirin.

## Girtina Steyfan

8 Steyfan, ew merivekî bi k’e-
rem û qewata Xwedêva t’ijî bû,
nav cime’têda k’eremet û nîşanêd
mezin dikirin. 9 Lê hinekêd ji
k’inîşta[f] ku Azayî* dihate gotinê,
cihûyêd ji Kûrênê û Skenderyayê
û usa jî cihûyêd ji qezayêd Kîlîk-
yayê û Asyayê r’abûn t’evî Steyfan
k’etine de’wê. 10 Lê nikaribûn li
ber wê serwaxtîyê û wî R’uh’ê ku
pê xeber dida bisekinîyana. 11 Wî
çaxî dizîva serê çend merîya t’ijî
kirin ku bêjin: «Me bihîst ku eva
tiştêd miqabilî Mûsa û Xwedê
dibêje». 12 Bi vî awayî cime’t,
r’ûspî û qanûnzan t’evîhev kirin,
r’ahiştine Steyfan, ew girtin û k’aşî
civîna giregira kirin. 13 Şe’dêd
derew anîn dane sekinandinê û
wan got: «Eva t’erka xeberdana
miqabilî vî cîyê pîroz û Qanû-
na[f] Mûsa nake. 14 Me ji devê wî
bihîst ku got: ‹Îsayê Nisretê wê
vê P’aristgehê hilşîne û e’detêd
ku Mûsa dane me biguhêze››.
15 H’emûyêd civîna giregirada
r’ûniştî gava li wî nihêr’în, dîna
xwe danê r’eng-r’ûyê wî mîna
r’eng-r’ûyê milyak’eta bû.

## Cabdayîna Steyfan li ber civîna giregira

7 1 Hingê serekk’ahîn Stey-
fanr’a got: «Ev yek r’ast in?»
2 Ewî got: «Gelî bav û bira, bibi-
hên! Gava bavê me Birahîm hê
Mesopotamyayêda dima, ku hê
neçûbû bajarê H’aranê, Xwedêyê
r’ûmetê wîva xuya bû 3 û jêr’a got:

* 6:9 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Libertîn», ku tê fe’mkirinê: «Aza-
yîya xulama».

‹Ji welat û pismamêd xwe biqete
û her'e wî welatê ku ezê nîşanî te
kim›*. **4** Hingê Birahîm ji welatê
k'ildanîya derk'et li H'aranê ma.
Pey mirina bavê wîr'a Xwedê ew
warguhaste vî welatê ku hûn niha
têda dimînin. **5** Li vê derê wargeh
neda wî, ne jî dewsa nigekî, lê soz
da ku vî welatî çawa milk' bide
wî û pey wîr'a jî bide zur'eta wî,
gava ku hê zar'êd wî t'unebûn*.
**6** Xwedê wîr'a aha got: ‹Zur'eta
teyê welatê xelqêda xerîbîyêda
be, wê wan bikine xulam û çarsid
salî bidine cefê. **7** Lê dîwana wî
miletê ku wê jêr'a bibine xulam›
Xwedê got, ‹Ezê bikim, pey wê
yekêr'a ewê derên, li vî cîyî Min
bih'ebînin›*. **8** Paşê sinet[f] çawa
nîşana peymanê da Birahîm. Awa
gava Îshaq jêr'a bû, r'oja h'eyşta
ew sinet kir û Îshaq jî Aqûb usa
kir, Aqûb jî her donzdeh kur'êd
xweye bave'şîrêd me usa kirin*.

**9** Bave'şîra jî ji h'evsûdîyê Ûsiv[f]
çawa xulam firotin, ku wî bibine
Misirê, lê Xwedê t'evî wî bû*,
**10** ew ji h'emû tengasîyêd wî xilaz
kir. Gava ew ber Firewinê[f] p'adşê
Misirê sekinî, Xwedê k'erem û
serwaxtî dayê, p'adşê jî Ûsiv ser
Misirê û t'emamîya mala xwe
kire serwêr*. **11** Hingê t'emamîya
welatê Misirê û Kenanêda[f] bû
xelayî û k'etine oxirmê giran,
kal-bavêd me nikaribûn xurek
destxistana.* **12** Aqûb ku bihîst li
Misirê genim dest dik'eve, cara
pêşin kal-bavêd me şandin. **13** Cara
duda Ûsiv xwe birayêd xweva da
naskirinê û e'silê wî Firewinva
e'yan bû. **14** Hingê Ûsiv şand gazî
bavê xwe Aqûb û t'emamîya mala
wî kir, ku serhev h'eftê pênc nefs
bûn. **15** Aqûb berjêrî Misirê bû,
ew û kal-bavêd me wir mirin.
**16** Cinyazêd wan birine Şexemê
kirine wî mezelê ku Birahîm bi
qîmetekî zîva ji kur'êd Hamorê
Şexemê k'ir'îbû*.

**17** Gava ew wextê ku Xwedê bi
sond Birahîmr'a soz dabû nêzîk

* 7:3 Destpêbûn 12:1.
* 7:5 Destpêbûn 17:8; 48:8.
* 7:7 Destpêbûn 15:13-14; Derk'etin 3:12.
* 7:8 Destpêbûn 17:10-14.
* 7:9 Destpêbûn 37:11-28; 39:2, 21.
* 7:10 Destpêbûn 37:1-36; 39:1—41:46.
* 7:11-15 Destpêbûn 41:53—47:31; 49:33.
* 7:16 Yêşû 24:32.

dibû, cime't Misirêda gelekî zêde
bibû. 18 Wî çaxî p'adşakî din Mi-
sirêda r'abû, ku derheqa Ûsivda
tiştek nizanibû*. 19 Ewî h'ilek'arî
li miletê me kir û kal-bavêd me
dane cefê, p'êyî ser wan kir, ku
ew zar'okêd xwe bavêjine derva,
ku nejîn*. 20 Wî çaxî Mûsa ji dîya
xwe bû, ew yekî gelekî bedew bû
û sê meha mala bavê xweda me-
zin bû.* 21 Gava ew hate avîtinê,
qîza Firewin ew hilda bir, çawa
kur' xwer'a mezin kir. 22 Mûsa
t'emamîya serwaxtîya misirîya
hîn bû, xeberdan û şixulê xweda
jî zor bû.

23 Gava çil salîya wî t'emam bû,
dilê wîr'a derbaz bû ku serîkî bide
xûşk-birayêd xwe zar'êd Îsraêl.
24 Ewî yekî îsraêlî dît ku yekî misirî
neheqî lê dikir, çû pişta wî, h'eyf
hilda yê misirî kuşt. 25 Mûsa t'irê[f]
xûşk-birayêd wîyê fe'm bikin, ku
Xwedê wê bi destê wî xilazbûnê
bide wan, lê fe'm nekirin. 26 R'o-
ja dinê r'astî du îsraêlîya hat ku
şer' dikirin, xwest ku wan li hev
bîne û got: ‹E'vdno! Hûn bira ne,
çima neheqîyê li hevdu dikin?›
27 Lê ewê ku neheqî li hevalê xwe
dikir, ew de'f da û gotê: ‹K'ê tu
ser me serwêr û h'akim k'ifş kirî?
28 Yan tu dixwazî min jî mîna wî
misirîyê duhu bikujî?›* 29 Gava
Mûsa ev yek bihîst, r'evî welatê
Midyanê xerîbîyêda ma û li wir
du kur' jêr'a bûn*.

30 Pey çil salîr'a ber'îyêda li
ç'îyayê Sînayê[f] milyak'etek nava
alava agirê dir'îyêda wîva xuya
bû.* 31 Mûsa ku dît, li ser wê
yekê e'cêbmayî ma. Gava nêzîk
dibûyê ku bibîne, dengê Xudan
bihîst: 32 ‹Ez Xwedêyê kal-bavêd
te, Xwedêyê Birahîm, Îshaq û
Aqûb im›. Mûsa dilerizî û newê-
ribû binihêr'îya. 33 Hingê Xudan
gotê: ‹Çarixêd nigêd xwe bêxe,
çimkî ew cîyê ku tu lê sekinî yî
e'rdê pîroz e. 34 Belê Min cefê
cime'ta Xwe Misirêda dît û za-
rînîya wan bihîst, peya bûm ku
wan xilaz kim. De niha were Ez
te bişînime Misirê›.

* 7:18 Derk'etin 1:7-8.
* 7:19 Derk'etin 1:10-11, 22.
* 7:20-22 Derk'etin 2:1-10.
* 7:28 Derk'etin 2:14.
* 7:29 Derk'etin 2:11-22; 18:3-4.
* 7:30-34 Derk'etin 3:1-10.

**35** Ew Mûsayê ku t'exsîr kirin
û gotinê: ‹K'ê tu ser me serwêr
û h'akim k'ifş kirî?› Xwedê bi
destê wî milyak'etê ku nav di-
r'îyêda wîva xuya bû, ew çawa
serwêr û xilazkir şand*. **36** Ewî ew
ji Misirê derxistin, Misirê, be'ra
Sor û ber'îyêda[f] çil salî nîşan û
k'eremet kirin*. **37** Mûsa hema
ew bû, yê ku zar'êd Îsraêlr'a
got: ‹Xwedê wê ji nav birayêd
weda p'êxemberekî mîna min
bona we r'ake›*. **38** Mûsa ew bû,
yê ku ber'îyêda nava cime'tê
bû, li serê ç'îyayê Sînayê jî t'evî
wî milyak'etî bû, k'îjanî t'evî wî
kal-bavêd mer'a xeber dida. Eva
ew bû, yê ku ew xeberêd jîyînê
hildidan ku bide me*.

**39** Lê kal-bavêd me nexwestin
gur'a wî bikin, ew t'exsîr[f] kirin,
dilêd xweda veger'îyane Misi-
rê **40** û Harûnr'a[f] gotin: ‹Mer'a
xwedêya çêke, ku pêşîya me
k'evin, çimkî ew Mûsayê ku em
ji welatê Misirê derxistin, em
nizanin çi hate serê wî›*. **41** Hema
wan r'ojada p'ûtekî mîna golika
çêkirin, qurban[f] wî p'ûtîr'a dan
û bona şixulê destê xwe k'êf ki-
rin*. **42** Hingê Xwedê berê Xwe ji
wan guhast û hişt ku ew steyrkêd
e'zmên bih'ebînin, çawa k'itêba
p'êxemberada nivîsar e:

‹Gelo çil salî qurban û h'edî[f]
we ber'îyêda Minr'a dan,
Mala Îsraêl?
**43** Na, lê we konê Molox xwedê
û steyrka R'emfan xwedêyê
xwe hildidan,
ev sûret in, yêd ku we çêkirin,
wekî hûn wan bih'ebînin.
Bona vê yekê Ezê we biguhêzime
wî alîyê welatê Babîlonê[f]›*.

**44** Konê[f] Şe'detîyê ber'îyêda t'evî
kal-bavêd me bû. Ew usa hate çê-
kirinê, çawa Ewê ku Mûsar'a xeber
da, e'mir kir ku mîna wî şikilê
ku dîtibû çêke*. **45** Paşê kal-bavêd
me jî ew konê ku ji pêşîya wanr'a
mabû, hildan anîne vî welatî, wî
wextê ku wan t'evî Yêşû[f] ji wan

* 7:35 Derk'etin 2:14; 3:2.
* 7:36 Derk'etin 7:3; 14:21; Jimar 14:33.
* 7:37 Qanûna Ducarî 18:15.
* 7:38 Derk'etin 19:1–20:17; Qanûna Ducarî 5.
* 7:40 Derk'etin 32:1.
* 7:41 Derk'etin 32:2-6.
* 7:43 Amos 5:25-27.
* 7:44 Derk'etin 25:8-9, 40.

mileta zeft kiribûn û Xwedê ji ber
kal-bavêd meva berî wan mileta
dabû. Ew kon li wir ma h'eta
wextê Dawid*. 46 Dawid jî k'erem
ji Xwedê stand, xwest ku xanekê
bona Xwedêyê Aqûb çêke*. 47 Lê
Silêman bona Wî xanek çêkir*.
48 Lê belê Yê Herî Jorin malêd
bi desta çêkirîda namîne, çawa
p'êxember dibêje:

49 ‹E'zman k'ursîya Min e,
e'rd jî binê p'îyêd Min e.
Hûnê çi malê Minr'a çêkin?
Xudan dibêje.
Yan jî çi cîyî bona r'ih'etîya
Min?
50 Ne destêd Min ev her tişt çê-
kirine?*›

51 Serh'işkno! K'afir û guhada
ker'no!* Hûn t'imê miqabilî R'u-
h'ê Pîroz disekinin, kal-bavêd
we çawa bûne, hûn jî usa ne**.
52 Kal-bavêd we ji p'êxembera
k'îjan nezêrandin? Ewêd ku hê
berêda bona hatina Yê R'ast di-
gotin, dikuştin. Û va niha jî we
nemamîya Wî kir û kuşt. 53 Wer'a
Qanûn bi destê milyak'eta hate
dayînê, lê we xwey nekir!»

**Kuştina Steyfan**

54 Gava ev tişt dibihîstin, he-
wa wan dik'et û diranêd xwe ser
wî diç'ir'ikandin. 55 Lê Steyfan
bi R'uh'ê Pîroz t'ijî berê xwe
e'zmênda kir, r'ûmeta Xwedê û
Îsa li milê Xwedêyî r'astê sekinî
dît 56 û got: «Va ye ez e'zmana
vebûyî dibînim û Kur'ê[f] Mêriv
li milê Xwedêyî r'astê sekinî!»
57 Wî çaxî wana kire qîr'în û
guhêd xwe girtin, h'emû hevr'a
r'ahiştine wî, 58 ew ji bajêr der-
xistin, dane ber kevira. Şe'da jî
k'incêd xwe danîne ber nigêd
xortekî navê wî Şawûl. 59 Gava
kevir davîtinê, Steyfan dua kir
û got: «Xudan Îsa, r'uh'ê min
bistîne». 60 Hingê wî çok da, bi
dengê bilind kire gazî: «Xudan,
vê yekê vanar'a gune[f] h'esab ne-
ke». Aha ku got, hênijî*.

* 7:45 Yêşû 3:14-17.
* 7:46 P'adşatî II, 7:1-16; Dîrok I, 17:1-14.
* 7:47 P'adşatî III, 6; Dîrok II, 3:1-17.
* 7:50 Îşaya 66:1-2.
* 7:51 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Dil û guhada bê sinetno».
** 7:51 Îşaya 63:10.
* 7:60 Bi zaravekî din: «K'ete xewê». Aha tê fe'mkirinê: «R'uh'ê xwe da, mir».

**8** 1 Şawûl jî qayl bû, ku ew bê
kuştinê.

### Şawûl pey bawermenda dik’eve

Ewê r’ojê miqabilî civîna[f]
Orşelîmêda zêrandineke giran
destpêbû. Pêştirî şandîya h’emû-
yêd bawermend belayî t’opraxêd
Cihûstanê û Sameryayê bûn.
2 Merivêd xwedêxof Steyfan defin
kirin û şîneke giran ser kirin.
3 Lê Şawûl gelek zirar dida civî-
nê, mal-mal diger’îya jin û mêr
k’aşî derva dikirin davîtine kelê*.

### Fîlîpo Sameryayêda Mizgînîyê dide

4 Ewêd bela-belayî bibûn dige-
r’îyan, Mizgînîya xeberê didan.
5 Fîlîpo jî berjêrî bajarekî Sa-
meryayê bû, wanr’a bona Mesîh
dannasîn dikir. 6 E’laletê bi dil
guhdarîya gotinêd Fîlîpo dikir,
gava dibihîstin û didîtin ew k’e-
remetêd ku wî dikirin. 7 Ji gelek
cinak’etîya[f] r’uh’êd h’eram bi dengê
bilind dikirine qîr’în derdik’etin
û gelek şilûşe’t, nigada seqet qenc
dibûn. 8 Hingê şabûneke mezin
k’ete wî bajarî.
9 Merivek wî bajarîda hebû navê
wî Şimh’ûn, ewî hê zûva sêrbazî[f]
dikir û samerî[f] e’cêbmayî dikirin
û xwe jî danîbû dewsa yekî mezin.
10 T’emamîya cime’tê ji biç’ûka
h’eta mezina bi dil guh didane
wî û digotin: «Ev e ew ‹Qewata
Xwedêye mezin› ku dibêjin».
11 Bi dil guh didane wî, çimkî
ewî zûva bi sêrbazîyêd xwe ew
e’cêbmayî kiribûn. 12 Lê gava ewî
ew mizgînîya Fîlîpo bawer kir,
ya ku bona P’adşatîya Xwedê û
navê Îsa Mesîh dida, hin mêr
hin jin, h’emû jî pê avê hatine
nixumandinê. 13 Şimh’ûn xwexa
jî bawer kir hate nixumandinê û
t’imê t’evî Fîlîpo bû. Û gava ew
nîşan û k’eremetêd zor ku dibûn
didît, e’cêbmayî dima.
14 Şandîyêd Orşelîmêda gava
bihîstin, wekî Sameryayê xebe-
ra Xwedê qebûl kirîye, Petrûs
û Yûh’enna şandine cem wan.
15 Ew ku berjêr bûn, bona wan
dua kirin ku R’uh’ê Pîroz bis-
tînin, 16 çimkî h’eta hingê hê
R’uh’ê Pîroz nehatibû ser ji wan
t’u kesî, t’enê bi navê Xudan Îsa
hatibûne nixumandinê. 17 Hingê
Petrûs û Yûh’enna destêd xwe

* 8:3 K’arêd Şandîya 22:4-5; 26:9-11.

danîne ser wan û wana R'uh'ê
Pîroz stand.

18 Gava Şimh'ûn dît, wekî bi
dest danîna şandîya R'uh'ê Pîroz
distînin, p'ere dirêjî wan kir 19 û
got: «Evî h'ukumî bidine min jî,
ku ez destê xwe daynime ser k'ê,
R'uh'ê Pîroz bistîne». 20 Lê Petrûs
wîr'a got: «Zîvê te bira t'evî te
bit'er'ibe! Te t'irê p'êşk'êşa Xwedê
p'eretî tê standinê! 21 P'ara te vê
yekêda tiştek t'une, çimkî dilê te
li ber Xwedê ne r'ast e. 22 Niha
ji wê xirabîya xwe veger'e, r'eca
ji Xudan bike, belkî ev nêta teye
xirab bê baxşandinê, 23 çimkî ez
te nava te'layîya zirav û qeydêd
neheqîyêda dibînim». 24 Şimh'ûn
lê veger'and û got: «Hûn bona
min hîvî ji Xudan bikin, wekî
ji ew gotinêd we t'u tişt neyê
serê min».

25 Gava wana şe'detî da û xebera
Xudan xeber dan, paşda veger'î-
yane Orşelîmê û li ser r'îya xwe
gelek gundêd Sameryayêda jî
Mizgînî didan.

### Fîlîpo û nemêrê[f] ji welatê Etyûpîyê

26 Hingê milyak'etekî Xudan
Fîlîpor'a got: «R'abe her'e alîyê
başûrê[f], ser wê r'îya ku ji Orşe-
lîmê berjêrî Gazzayê dibe», ku
çol-bestek bû. 27 Ew jî r'abû çû û
dîna xwe dayê, va ye nemêrekî[f]
ji Etyûpîyê wezîrê Kendakê, awa
gotî p'adşa Etyûpîyê, ku wek'îlê
t'emamîya xizna wê bû, bona
h'ebandinê hatibû Orşelîmê.
28 Ew ji wir vediger'îya û e'reba
xweda k'itêba Îşaya[f] p'êxember
dixwend. 29 R'uh' Fîlîpor'a got:
«Pêşda her'e û r'ex e'rebêva he-
re». 30 Fîlîpo jî bezî nêzîk bûyê,
bihîst ku ew k'itêba Îşaya p'ê-
xember dixûne û jê pirsî: «Çi ku
tu dixûnî fe'm dikî?» 31 Ewî gotê:
«Ezê çawa bikaribim fe'm bikim,
heger yek minr'a şiroveneke?» Û
hîvî ji Fîlîpo kir ku r'abe r'ex wî
r'ûnê. 32 Ew cîyê ku wî nivîsarêda
dixwend ev bû:

«Mîna peza bona serjêkirinê
hate birinê
û çawa berxa li ber qusêsê xwe
nake k'alîn,
devê Xwe venake.
33 Ew nimiz kirin û heqê Wî jê
standin.
Derheqa zur'eta Wîda k'ê wê
gilî ke?
Çimkî e'mirê Wî ji r'ûbarê
dinê hate hildanê»*.

* 8:33 Îşaya 53:7-8.

34 Nemêr ji Fîlîpo pirsî û gotê:
«Ez hîvî dikim minr’a bêje, p’ê-
xember van tişta bona k’ê dibêje?
Bona xwe yan bona yekî mayîn?»
35 Fîlîpo r’abû wê nivîsarêda dest-
pêkir derheqa Mizgînîya Îsada
wîr’a şirovekir.
36-37 Gava r’îya xweda diçûn,
ew gihîştine avekê û nemêr got:
«Va ye av, îdî çi nahêle ku ez
bême nixumandinê?»* 38 Û ne-
mêr e’mir kir, ku e’rebê bidine
sekinandinê, her du jî k’etine
avê û Fîlîpo nemêr nixumand.
39 Gava ewana ji avê derk’etin,
R’uh’ê Xudan Fîlîpo hilda, îdî
nemêr Fîlîpo nedît, ew eşq û
şa r’îya xweda çû. 40 Lê Fîlîpo
Aşdodêda xuya bû û diger’îya,
Mizgînî dida her bajarî, h’eta
Qeyserîyê jî hat.

### Çawa Şawûl li Îsa vediger’e

*(K’arêd Şandîya 22:6-16;*
*26:12-18)*

9 1 Şawûl jî h’eta hingê hê gef
li şagirtêd Xudan dixwar ku
wan bide kuştinê. Ew çû cem
serekk’ahîn, 2 destûrne’me ser
k’inîştêd Şamê ji wî xwestin, wekî
h’ukumê wî hebe jin û mêrêd ku
li pey vê R’ê diçin heger bibîne,
wan bigire girêdayî bîne Orşe-
lîmê. 3 Gava diçû nêzîkî Şamê
bû, nişkêva ji e’zmên r’onayîkê
dora wî şewq da. 4 Ew k’ete e’rdê
û dengek bihîst ku wîr’a digot:
«Şawûl, Şawûl! Tu çima Min
dizêrînî?» 5 Ewî jî got: «Tu k’î yî,
Xudan?» Wî dengî gotê: «Ez ew
Îsa me, Yê ku tu dizêrînî*. 6 De
niha r’abe her’e bajêr, wê ter’a bê
gotinê tê çi bikî». 7 Ew merivêd
ku t’evî wî diçûn sar bûn seki-
nîn û zar-ziman k’etin. Wan ew
deng dibihîst, lê kesek nedidîtin.
8 Şawûl ji e’rdê r’abû, ç’e’vêd wî
vekirî bûn, lê tişt nedidît. Hin-
gê destê wî girtin birine Şamê.
9 Ew sê r’oja kor ma, ne xwar û
ne jî vexwar.
10 Şamêda şagirtekî navê wî
Hananîya hebû, Xudan dîtino-
kêda hate ber ç’e’va û wîr’a got:

* 8:36-37 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Fîlîpo wîr’a got: ‹Heger tu bi t’emamîya dilê xwe bawer dikî, dikarî›. Ewî lê veger’and û got: ‹Ez bawer dikim, ku Îsa Mesîh Kur’ê[f] Xwedê ye›».
* 9:5 Nav hinek welger’andinêd kevinda ev jî heye: «‹Tu çifta xwe nikarî bavêjî şiva sertûj›. Ew jî lerizî û şaşmayî got: ‹Xudan, Tu çi dixwazî ez bikim?› Û Xudan wîr’a got».

«Hananîya!» Ewî got: «Ez vira
me, Xudan». 11 Xudan wîr'a got:
«R'abe her'e wê k'ûça ku jêr'a
R'ast dibêjin, mala Cihûdada
bona yekî ji Tarsûsê navê wî Şa-
wûl bipirse, çimkî va ye ew dua
dike, 12 dîna xwe dayê, va merîk
dîtinokêda hate ber ç'e'va, navê
wî Hananîya, ew hat destêd xwe
danîne ser wî, ku ew dîsa bibîne».
13 Hananîya lê veger'and û got:
«Xudan, bona vî merivî min ji
geleka bihîstîye, wekî Orşelîmêda
wî çiqas xirabî li cime'ta Te kirîye.
14 Vir jî alîyê serekêd k'ahînada
h'ukumê wî heye, h'emûyêd ku
gazî navê Te dikin bigire». 15 Lê
Xudan jêr'a got: «Tu her'e, çimkî
Min ew çawa hacetek bijartîye,
wekî navê Min necihûya, p'adşa
û zar'êd Îsraêlêva bide naskiri-
nê. 16 Ezê Xwexa nîşanî wî kim,
ku çiqasî gerekê bona navê Min
cefê bik'işîne».

17 Hananîya jî çû k'ete wê ma-
lê, destê xwe danî ser wî û gotê:
«Şawûl bira! Xudan ez şandime,
ew Îsayê r'êva r'astî te hat, wekî
tu dîsa bibînî û bi R'uh'ê Pîroz
t'ijî bî». 18 Destxweda ji ç'e'vêd wî
mîna kapekê tişt jê warîyan, dît,
r'abû pê avê hate nixumandinê,
19 xwarin xwar û qewata wî hate cî.

### Şawûl bajarê Şamêda Mizgînîyê dide

Çend r'oja Şawûl cem şagir-
têd Şamêda ma. 20 Destxweda
Şawûl destpêkir k'inîştada bona
Îsa dannasîn kir û got ku: «Ew
Kur'ê Xwedê ye». 21 H'emûyêd
ku dibihîstin, e'cêbmayî diman û
digotin: «Eva ew nîne, ku Orşelî-
mêda yêd ku gazî Vî Navî dikirin
dikuştin? Û bona wê yekê hatîye
vir jî, wekî wan bigire û bibe bide
destê serekêd k'ahîna?» 22 Lê Şa-
wûl hînkirinêda hê qewat dibû,
îzbat dikir ku Mesîh hema Îsa ye
û dengê h'emû cihûyêd Şamêda
dida bir'înê.

23 Gava gelek r'oj derbaz bûn,
cihû şêwirîn ku wî bikujin, 24 lê
Şawûl nêta wane xirab h'esîya.
Ew şev û r'oj ber dergehêd bajêr
bûn ku wî bikujin, 25 lê şagirtêd
wî jî şev ew bi zembîlê dîwêrva
daxistin*.

### Şawûl Orşelîmêda

26 Gava Şawûl hate Orşelîmê,
wî dikir ku t'evî şagirta be, lê

* 9:25 Korint'î II, 11:32-33.

h'emû ji wî ditirsîyan, wan bawer
nedikirin ku ew jî bûye şagirt.
27 Hingê Barnabas ew hilda bire
cem şandîya û wanr'a gilî kir,
ku ewî r'êda çawa Xudan dîtîye
û t'evî wî xeber daye, Şamêda jî
çawa mêrk'îmî navê Îsa dannasîn
kirîye. 28 Şawûl Orşelîmêda t'evî
wan r'adibû-r'ûdinişt û bi navê
Îsa Xudan mêrk'îmî dannasîn
dikir. 29 Usa jî t'evî cihûyêd ku bi
yûnanî[f] xeber didan bi xeberdanê
dik'ete de'wê, wana jî dikir ku ew
bikuşta. 30 Gava bira vê yekê h'e-
sîyan, ew berjêr birine Qeyserîyê
û derbazî Tarsûsê kirin.
31 Awa civîn li t'emamîya Cihûs-
tanê, Celîlê û Sameryayê demekê
e'dilayîyêda bû, r'uh'anîyêda ava
dibû, bi xofa Xudan û bi dildayîna
R'uh'ê Pîroz pêşda diçû, bawer-
mend zêde dibûn.

## Qencbûna Eynêyas

32 Petrûs jî h'emû cîya diger'îya
û berjêrî cem cime'ta Xwedêye
Lîdayê jî bû. 33 Wir merivek dît
navê wî Eynêyas, ku h'eyşt sa-
lêd wî bûn, şilûşe't cî-nivînada
p'aldayî bû. 34 Petrûs wîr'a got:
«Eynêyas! Îsa Mesîh te qenc
dike. R'abe û nivîna xwe bide
hev». Ew pêr'a-pêr'a r'abû ser
xwe. 35 H'emû binelîyêd Lîdayê
û deşta Şaronê ew dîtin û berbi
Xudan veger'îyan.

## Saxbûna Tabît'ayê

36 Yafayêda k'ulfeteke şagirt
hebû, navê wê Tabît'a, ku «Xe-
zal» tê welger'andinê. Eva nava
h'emû qencî û xêrkirinada mabû.
37 Wan r'ojada ewa nexweş k'et mir
û ew şûştin oda jorinda danîn.
38 Yafa nêzîkî Lîdayê bû. Gava
şagirta bihîst ku Petrûs li wir e,
du merî şandin hîvî kirin û go-
tin: «Derengî nebe zû were cem
me». 39 Petrûs jî r'abû t'evî wan
hat. Gava gihîşte wir, ew birine
oda jorin, h'emû jinebîya dora wî
girt û bi girî ew k'inc û kirasêd
ku saxîya xweda Xezalê bona
wan dirûtibûn, nîşanî wî didan.
40 Hingê Petrûs h'emû derxisti-
ne derva, çok da dua kir û ser
cinyazda veger'îya got: «Tabît'a!
R'abe ser xwe». Ewê ç'e'vêd xwe
vekirin, li Petrûs nihêr'î, r'abû
r'ûnişt. 41 Ewî destê xwe da wê
r'akire p'îya, paşê gazî cime'ta
Xwedê û jinebîya kir, ew sax ber
wan da sekinandinê. 42 Eva yeka
t'emamîya Yafayêda bela bû û
geleka bawerîya xwe Xudan anîn.
43 Petrûs gelek r'oja li Yafayê mala
Şimh'ûnê ç'ermkerda ma.

### Kor’nêlyoyê necihû[f] gazî Petrûs dike û dîtinoka Petrûs

**10** 1 Qeyserîyêda merivekî
navê wî Kor’nêlyo hebû,
r’efa «Ordîya Îtalyayêda» sersed[f]
bû. 2 Ew mala xweva yekî xwey-
îman û xwedêxof bû, cime’ta
cihûyar’a jî gelek xêr dikirin û
her gav ber Xwedê dua dikir.
3 Ewî nîvro nêzîkî sih’eta sisîya
dîtinokêda ber ç’e’vê xwe aşkere
milyak’etekî Xwedê dît ku hate
cem wî û wîr’a got: «Kor’nêlyo!»
4 Ewî ku li wî nihêr’î, saw k’ete
ser û got: «Çi ye Xudan?» Mil-
yak’et gotê: «Xwedê dua û xêrêd
te qebûl kirin û ew bîr nake. 5 De
niha merîya bişîne Yafayê, gazî
Şimh’ûn[f] ke, yê ku jêr’a Petrûs
dibêjin. 6 Ew çawa mêvan mala
Şimh’ûnê ç’ermkerda ber be’rê
dimîne». 7 Gava ew milyak’etê ku
wîr’a xeber dida çû, ewî gazî du
xulamêd malê û eskerekî berdestîyî
xweyîman kir 8 û her tişt wanr’a
gilî kir şandine Yafayê.

9 R’oja dinê ewana hê diçûn û
nêzîkî bajêr dibûn, Petrûs nêzîkî
sih’eta donzdeha r’abû ser xênî
ku dua bike. 10 Ew bir’çî bû xwest
ku nan bixwe. Hê gava nan hazir
dikirin, mîna sih’etekê ser wîr’a
derbaz bû. 11 Û wî dîna xwe da-
yê, va e’zman vebû, tiştekî mîna
destexana mezin her çar goşava
dardabû, dihate xwarê ser e’rdê.
12 Ser wê her cûr’e h’eywanêd çarp’ê,
şûlikîyêd e’rdê û teyredêd e’zmên
hebûn. 13 Deng hate wî: «R’abe
Petrûs, serjêke û bixwe». 14 Lê
Petrûs got: «H’aşa ji min Xudan,
min t’u car tiştekî h’eram[f] yan p’îs
nexwarîye». 15 Cara duda ew deng
hate wî: «Ew tiştê ku Xwedê h’elal[f]
kirîye tu h’eram h’esab neke». 16 Eva
yeka sê cara qewimî û hingê ew
destexan e’zmênva hate hilatinê.

17 Petrûs hê e’cêbmayî nav xwe-
da difikirî: «Ev çi dîtinok bû min
dît?» va ew merivêd ku Kor’nêlyo
şandibûn li ber dergeh sekinîn û
mala Şimh’ûn pirsîn. 18 Deng dan
gotin: «Şimh’ûnê ku jêr’a Petrûs
dibêjin li vir mêvan e?» 19 Pet-
rûs hê ser wê dîtinokê difikirî,
R’uh’ jêr’a got: «Va ne sê merî li
te diger’in. 20 De îdî r’abe her’e
xwarê û dudilî nebe t’evî wan he-
r’e, çimkî Min ewana şandine».
21 Petrûs jî peya bû, çû cem wan
meriva û got: «Ez im ewê ku hûn
lê diger’in. Hûn bona çi hatine?»
22 Wan got: «Kor’nêlyoyê sersed
em şandine. Ew merivekî r’ast,
xwedêxof û alîyê t’emamîya miletê
cihûyada jî xweyîyê şe’detîya qenc

e. Ewî e'mir ji milyak'etekî pîroz
stand, ku te gazî mala xwe ke û
xeberdana te bibihê». 23 Hingê
Petrûs ew t'eglîfî malê kirin, cîyê
şevê da wan.

R'oja dinê Petrûs r'abû t'evî wan
çû, çend bawermendêd Yafayê jî
t'evî wî çûn. 24 R'oja din gihîştine
Qeyserîyê, Kor'nêlyo jî gazî xwexatî
û dostêd xwe kiribû û hîvîya wan
bû. 25 Gava Petrûs dik'ete hindur',
Kor'nêlyo pêşîya wîda çû û k'ete
ber niga û ber ta bû. 26 Lê Petrûs
ew r'akire p'îya û gotê: «R'abe
bisekine, ez xwexa jî merî me».
27 Wîr'a bi xeberdanê k'ete hin-
dur' û li wir gelek civîyayî dîtin.
28 Ewî wanar'a got: «Hûn xwexa
zanin ku ne e'detê mêrê cihû ye,
ku t'evî necihûya r'abe-r'ûnî, yan
hevva her'in-bên. Lê Xwedê ber
min vekir, wekî ez t'u kesî p'îs yan
h'eram h'esab nekim. 29 Bona wê
yekê jî gava gazî min kirin, min
na-na nekir r'abûm hatim. Û ez
niha dipirsim, we bona çi gazî
min kirîye?»

30 Kor'nêlyo got: «Berî çar
r'oja, nêzîkî vî çaxî min duayê
sih'eta sisîya mala xweda di-
kir*, nişkêva merivek bi k'incê
çîl-qerqaş li ber min sekinî 31 û
got: ‹Kor'nêlyo! Xwedê duayêd
te bihîstin û xêrêd teye kirî jî
bîr anîn. 32 Niha merîya bişîne
Yafayê gazî Şimh'ûn ke, yê ku
jêr'a Petrûs dibêjin, ew çawa
mêvan li mala Şimh'ûnê ç'erm-
kerda ber be'rê dimîne›*. 33 Min
jî pêr'a-pêr'a şandine cem te û
te jî qenc kir ku tu hatî. Niha
em h'emû jî li ber Xwedê sekinî
ne, ku çi ji Xudan ter'a hatîye
e'mirkirinê bêjî, em jî bibihên».

## Dannasînîya Petrûs mala Kor'nêlyoda

34 Petrûs dest bi xeberdanê kir
û got: «Ez niha fe'm dikim, wekî
Xwedê r'astî jî firqîyê nake nava
mileta*. 35 Lê ji nav her miletîda,
yê ku ji Wî xof dike û r'astîyê di-
ke li Wî qebûl e. 36 Hûn îdî r'ind
zanin ku Xwedê eva xebera zar'êd
Îsraêlr'a şand, bi Îsa Mesîh Mizgî-
nîya e'dilayîyê da, Yê ku Xudanê
h'emûya ye. 37 Usa jî zanin ji Celîlê
girtî t'emamîya Cihûstanêda çi

* 10:30 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Berî çar r'oja, h'eta vî çaxî min r'ojî digirt û duayê sih'eta sisîya mala xweda dikir».

* 10:32 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Ewê bê ter'a xeber de».

* 10:34 Qanûna Ducarî 10:17.

qewimî, pey wê nixumandinêr’a,
ya ku Yûh’enna dannasîn kir,
38 çawa Xwedê Îsayê Nisretê bi
R’uh’ê Pîroz û qewatê k’ifş kir, ku
bi qencîkirinê ger’îya û h’emûyêd
ku bin bindestîya mîrêcinda bûn
qenc kirin, çimkî Xwedê t’evî Wî
bû. 39 Em xwexa şe’dêd wan h’emû
tişta ne, yêd ku Ewî t’opraxêd Ci-
hûstanê û Orşelîmêda kirin. Paşê
Ew darva dardakirin û kuştin, 40 lê
Xwedê Ew r’oja sisîya ji mirinê r’a-
kir, da e’yankirinê, 41 ne ku h’emû
cime’têr’a, lê wan şe’dar’a, yêd ku
pêşîyê ji alîyê Xwedêda hatibûne
bijartinê, awa gotî mer’a, yêd ku
pey mirin-r’abûna Wîr’a t’evî Wî
xwarin û vexwarin. 42 Û Ewî t’e-
mî li me kir, wekî em cime’têr’a
dannasîn kin û şe’detîyê bidin ku
Ew e h’akimê mirîya û zêndîya
ji Xwedêda k’ifşkirî. 43 H’emû
p’êxember şe’detîya Wî didin, ku
h’emûyêd bawerîya xwe Wî bînin,
wê bi saya navê Wî baxşandina
guna bistînin».

### Necihû jî R’uh’ê Pîroz distînin

44 Petrûs hê ev tişt digotin, R’u-
h’ê Pîroz hate ser h’emûyêd ku ev
gotin dibihîstin. 45 Bawermendêd
e’silê xweda cihû*, yêd ku t’evî
Petrûs hatibûn, zendegirtî man,
ku R’uh’ê[f] Pîroz çawa p’êşk’êş
ser necihûyada** jî barî, 46 çimkî
bihîstin ku wana bi zimana xeber
didan û şikirî didane Xwedê. Hingê
Petrûs got: 47 «Îdî k’î dikare nehêle
ku evana pê avê bêne nixumandi-
nê[f], yêd ku mîna me R’uh’ê Pîroz
jî standin?» 48 Wî çaxî e’mir kir ku
bi navê Îsa Mesîh bêne nixuman-
dinê. Paşê wana hîvî ji wî kir ku
çend r’oja li wir bimîne.

### Petrûs civîna Orşelîmêr’a şirovedike ku çima çûbû mala yekî necihû[f]

11 1 Şandîya û bawermendêd
alîyê Cihûstanêda diman,
bihîstin ku necihûya jî xebera
Xwedê qebûl kirine. 2 Gava Petrûs
hevraz çû Orşelîmê, bawermen-
dêd e’silê xweda cihû ew neheq
dikirin û 3 digotin: «Tu çûyî cem
merivêd nesinetkirî û te t’evî wan
nan xwarîye!» 4 Hingê Petrûs dest-
pêkir bi hûr-gilî wanr’a şirovekir
û got: 5 «Min bajarê Yafayêda dua
dikir, mîna sih’etekê ser minr’a
derbaz bû. Û min dîtinokêda li

* 10:45 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Sinetkirî».
** 10:45 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Nesinetkirîyada».

ber ç'e'vê xwe dît, derdaneke
mîna destexana mezin her çar
goşava ji e'zmên dardabû hate
xwarê, li ber min sekinî. 6 Ez
hê zûr' bibûm min lê dinihêr'î,
min dîna xwe dayê, va ne h'ey-
wanêd çarp'ê, r'e'wir, şûlikîyêd
e'rdê û teyredêd e'zmên. 7 Hingê
min dengek bihîst ku minr'a got:
‹R'abe Petrûs, serjêke û bixwe›.
8 Lê min got: ‹H'aşa ji min, Xu-
dan, t'u car tiştekî h'eram yan
p'îs nek'etîye devê min›. 9 Cara
duda ewî dengî ji e'zmên li min
veger'and û got: ‹Ew tiştêd ku
Xwedê h'elal kirîye, tu h'eram
h'esab neke›. 10 Eva yeka sê cara
qewimî û her tişt paşda e'zmên-
va hate k'işandinê. 11 Hema wî
çaxî sê merîyêd ku ji Qeyserîyê
şandibûne pey min ber mala ku
em têda diman sekinîn. 12 R'uh'
minr'a got: ‹T'evî wan her'e, dudilî
nebe›. Ev her şeş bira jî t'evî min
hatin û em çûne mala wî merivî.
13 Ewî mer'a got, ku çawa mala
xweda milyak'et dîtîye, ku sekinî
ye wîr'a gotîye: ‹Merîya bişîne
Yafayê û gazî Şimh'ûn ke, yê ku
jêr'a Petrûs dibêjin. 14 Ewê ter'a
wan gotina bêje, bi k'îjana tê û
t'emamîya neferêd mala xweva
xilaz bî›. 15 Û min hema dest bi
xeberdanê kir, R'uh'ê Pîroz hate
ser wan, çawa pêşîyê hate ser me.
16 Wî çaxî hate bîra min ew xebera
ku Xudan gotibû: ‹Yûh'enna bi
avê nixumand, lê hûnê bi R'uh'ê
Pîroz bêne nixumandinê›*. 17 Awa
heger Xwedê xût ew p'êşk'êş da
wan, k'îjan da me, gava me ba-
werîya xwe Xudan Îsa Mesîh anî,
ez k'î bûm ku miqabilî Xwedê
bisekinîyama?»

18 Gava ku ev yeka bihîstin, den-
gê xwe bir'în, şikirî dane Xwedê
û gotin: «Wekî usa ye Xwedê eva
mecala da necihûya jî, ku ji gu-
nekirinê veger'in û bijîn».

### Bawermendêd bajarê Entakyayê

19 Ewêd ku ji dest wê zêrandina
pey kuştina Steyfanr'a bela-belayî
bibûn, gihîştine h'eta Fînîkyayê,
Qubrisê û Entakyayê û t'enê ci-
hûyar'a xeber dannasîn dikirin*.
20 Lê nava wanda hinek ji merivêd
Qubrisê û Kûrênê hebûn, ku gava
çûn k'etine Entakyayê, yûnanar'a[f]*

* 11:16 K'arêd Şandîya 1:5.
* 11:19 K'arêd Şandîya 8:1-4.
* 11:20 Aha jî tê fe'mkirinê: «Merivêd ji welatêd mayîne ku yûnanî xeber didan».

jî xeber didan, Mizgînîya Xudan
Îsa didan. 21 Destê Xudan wanr'a
bû, geleka bawer kir, berbi Xudan
veger'îyan.

22 Bona wan ev deng-be'sa gi-
hîşte civîna[f] Orşelîmê, Barnabas
şandine Entakyayê. 23 Gava gihîştê
û k'erema Xwedê dît, şa bû û dil
dida wan h'emûya ku bi t'ema-
mîya dilê xweva Xudanr'a amin
bimînin. 24 Barnabas merivekî
qenc, R'uh'ê Pîroz û bawerîyêva
t'ijî bû. Gelek cime't ser bawer-
mendêd Xudanda zêde bû.

25 Hingê Barnabas derbazî
Tarsûsê bû, ku li Şawûl biger'e,
26 ew dît anî Entakyayê. Ewana
hevr'a t'emamîya salekê t'evî
civînê[f] dicivîyan û gelek cime't
hîn dikirin. Pêşîyê Entakyayêda
şagirt «mesîhî[f]» hatine navkirinê.

27 Wan r'oja ji Orşelîmê p'êxem-
ber berjêrî Entakyayê bûn. 28 Ji
wan yek, ku navê wî Hagabo bû,
r'abû bi R'uh' e'lam kir, ku wê
t'emamîya dinyayêda bibe xelayîke
giran. Û usa jî eva xelaya hêna
Klawdyo Qeyserda[f] bû*. 29 Hingê
şagirtêd Entakyayê qirar kirin ku
ji destê k'êva çiqas tê alîk'arîyê
bona bawermendêd Cihûstanê
bişînin. 30 Usa jî kirin, bi destê
Barnabas û Şawûl berpirsîyarêd
civînêr'a şandin.

### Kuştina Aqûb[f] û girtina Petrûs

**12** 1 Wan çaxada Hêrodes[f]
p'adşa destê xwe hilda
ser hinekêd ji civînê ku wan bide
cefê, 2 Aqûbê[f] birê Yûh'enna bi
şûr da kuştinê. 3 Ewî dîna xwe
dayê, ku kirina wî li cihûya xweş
hat, r'abû Petrûs jî da girtinê. Ev
yek r'ojêd Cejina[f] Nanê Şkeva-
da qewimîn. 4 Gava Petrûs girt,
avîte kelê sparte[f] çar t'axima, ku
her t'aximek çar-çar esker bûn,
wekî miqatî wî bin. Nêta wî ew
bû ku pey Cejina Derbazbûnêr'a
wî derxe ber cime'tê, dîwana wî
bike. 5 Îdî Petrûs kelêda girtî bû,
lê civînê bona wî bi dil û can, bi
dua hîvî ji Xwedê dikir.

### Azabûna Petrûs

6 Wê şevê, ku sibetirê Hêrodes
dixwest ew derxista ber cime'tê,
bona dîwankirinê, Petrûs bi du
zincîra girêdayî nava du eskerada
r'azayî bû, nobedara jî ber dêrî
nobedarîya kelê dikir. 7 Nişkêva
milyak'etekî[f] Xudan ber sekinî,
r'onayê wî cîyî şewq da û niç'ande

* 11:28 K'arêd Şandîya 21:10.

k’êleka Petrûs, ew h’işyar kir û
gotê: «Zû r’abe». Zincîr ji destêd
wî k’etin. 8 Hingê milyak’et wîr’a
got: «Pişta xwe girêde û çarixêd
xwe ser nigêd xweva ke». Ewî jî usa
kir. Paşê wîr’a got: «Qap’ûtê xwe
bavêje ser xwe û pey min were».
9 Petrûs jî derk’et da pey wî çû, lê
nizanibû ew kirina milyak’et r’ast
e, wî t’irê xewnê dibîne. 10 Ewana
ji nobedarêd pêşin û duda derbaz
bûn, h’eta dergehê h’esinî hatin,
k’îjanî derdixiste nav bajêr. Der-
geh xwexa li ber wan vebû, ji wir
derk’etin k’ûçekê derbaz bûn,
nişkêva milyak’et ji wî qetîya.
11 Hingê Petrûs ser h’işê xweda
hat, got: «Ez niha r’ast zanim ku
Xudan milyak’etê Xwe şand, ez ji
destê Hêrodes û ji wan h’emû tiştêd
ku cihû hîvîyê bûn xilaz kirim».
12 Gava ev yek fe’m kir, çû mala
Meryema dîya Yûh’ennayê ku jêr’a
Marqos digotin, ku li wir gelek
civîyabûn dua dikirin. 13 Petrûs
dergeh xist, carîke navê wê R’o-
da çû guhê xwe da ser. 14 Dengê
Petrûs nas kir, ji şabûna dergeh
venekir, lê r’evî çû hindur’ got:
«Petrûs li ber dergeh sekinî ye!»
15 Wana wêr’a got: «Te h’işê xwe
unda kirîye?» Lê ewa ser ya xwe
bû, ku r’ast e. Wana got: «Qey
milyak’etê wî ye?»
16 Petrûs jî serhev-serhev dergeh
dixist. Gava vekirin ew dîtin, h’i-
şê serê wan çû. 17 Ewî destê xwe
h’ejand ku ker’ bin û gilî kir çawa
Xudan ew ji kelê derxistîye, usa
jî got: «Vê yekê Aqûb[f] û xûşk-bi-
rayêd dinr’a jî bêjin». Xwexa jî
r’abû çû cîkî din.
18 Sibeh ku safî bû, esker gele-
kî t’evîhev bûn, gelo çi hate serê
Petrûs? 19 Gava Hêrodes li wî ge-
r’îya û ew nedît, ji eskera her tişt
pirsî û e’mir kir ku bêne kuştinê.
Paşê Hêrodes ji Cihûstanê berjêrî
Qeyserîyê bû û wir ma.

### Mirina Hêrodes P’adşa

20 Hêrodes li miletêd Sûr û
Saydayê r’abibû xezebê. Evana
jî hevr’a r’abûn hatin, Bilasto
wek’îlê mala Hêrodes anîne r’ayê
û hîvî kirin ku li hev bên, çimkî
bajarêd wan ji welatê wî p’adşayî
xurek distandin. 21 R’ojeke k’ifş-
kirî Hêrodes k’incê p’adşatîyê
lê, li herema[f] dîwanê r’ûnişt û
bi cime’tî wanar’a xeber dida.
22 E’laletê jî dikire qîr’în û digot:
«Eva dengê xwedêkî ye, ne yê
merîya ye!» 23 Destxweda milya-
k’etekî Xudan wî xist, bona ku
wî şikirî neda Xwedê, kurmî bû
mir. 24 Lê xebera Xwedê berfire
û zêde dibû.

25 Barnabas û Şawûl gava qu-
lixê xwe qedandin, ji Orşelîmê
veger'îyan, Yûh'ennayê ku jêr'a
Marqos digotin jî t'evî xwe anîn.

## R'êwîtîya Pawlose pêşin, t'evî Barnabas (13:1–14:28)

### R'uh'ê Pîroz Pawlos û Barnabas dişîne

13 1 Civîna Entakyayêda çend
p'êxember û dersdar he-
bûn, Barnabas, Şimh'ûnê ku jêr'a
Nîgêr* digotin, Lûkyoyê ji Kûrênê,
Menayînê ku t'evî Hêrodesê[f] ser-
wêr** mezin bibû û Şawûl. 2 Evana
ku nava h'ebandina Xudanda bûn
û r'ojî[f] digirtin, R'uh'ê[f] Pîroz
wanr'a got: «Barnabas û Şawûl
Minr'a bona wî şixulê ku Min
gazî wan kirîye cude kin». 3 Wî
çaxî r'ojî girtin, dua kirin, destêd
xwe danîne ser wan û ew şandin.

### Şandî girava[f] Qubrisêda Mizgînîyê didin

4 Awa evana ku ji R'uh'ê Pîroz
hatine şandinê, berjêrî Sêlûkyayê
bûn û ji wir bi gemîyê derbazî Qub-
risê bûn. 5 Gava gihîştine Selamîsê,
k'inîştêd cihûyada xebera Xwedê
dannasîn dikirin û Yûh'enna jî
k'omekdarê wan bû. 6 Ew t'ema-
mîya wê giravê ger'îyan, gihîştine
h'eta Pafosê. Li wir p'êxemberekî
cihûyayî derew û sêrbaz dîtin ku
navê wî Baryêşû bû. 7 Eva yekî ji
berdestîyêd Sergîyo Pawlosê welî[f]
bû. Sergîyo Pawlos jî merivekî
aqil bû, evî gazî Barnabas û Şa-
wûl kir, ku xebera Xwedê bibihê.
8 Lê Baryêşûyê sêrbaz, awa gotî
bi yûnanî Êlûmas, miqabilî wan
r'abû û dikir ku welî ji bawerîyê
bixalifîne[f]. 9 Hingê Şawûlê ku jêr'a
Pawlos jî dibêjin, bi R'uh'ê Pîroz
t'ijî li wî sêrbazî nihêr'î 10 û gotê:
«Hey mixeneto û h'emû fêlbazîyava
t'ijîyo! Cewrikê mîrêcin! Dijmi-
nê t'emamîya r'astîyê! Tê h'eta
k'engê t'erka xalifandina r'îyêd
Xudane r'ast nekî? 11 Va destê
Xudan niha wê ser te giran be,
tê kor bî û demekê te'vê nebînî».
Û destxweda mij û dûman hate
ser wî, virda-wêda dik'et r'êber
dixwestin. 12 Wî çaxî welî ku ev
yek dît, bawer kir, ser wê hînki-
rina bona Xudan e'cêbmayî ma.

* 13:1 «Nîgêr» jî çawa «merivê ç'ermê r'eş» tê fe'mkirinê.

** 13:1 Eva Hêrodesa, awa gotî Hêrodes-Antîpas, serwêrê Celîlê bû (Lûqa 3:1).

## Pawlos û Barnabas li bajarê Entakya qeza Pisîdyayê

13 Hingê Pawlos hevalêd xweva
bi gemîyê ji Pafosê r'êk'etin hatine
Pergêya Pamfîlyayê. Yûh'enna li
wir ji wan qetîya, veger'îya Or-
şelîmê. 14 Ewana jî ji Pergê çûne
Entakya Pisîdyayê, r'oja[f] şemîyê
k'etine k'inîştê r'ûniştin. 15 Pey
xwendina Qanûn û nivîsarêd p'ê-
xemberar'a serwêrêd k'inîştê yek
şandine cem wan û gotin: «Gelî
bira, heger gotineke we heye ku
dil bidine cime'tê, k'erem kin
bêjin». 16 Pawlos r'abû, destê xwe
h'ejand û got:

«Gelî cime'ta Îsraêlê û necihû-
yêd ku ji Xwedê ditirsin guhdar
bin! 17 Xwedêyê vî miletê Îsraêlê
kal-bavêd me bijartin û milet li
welatê Misirê xerîbîyêda zêde kir.
Bi destê zor ew ji wir derxistin*,
18 çil salî ber'îyêda* li wan sebir
kir**. 19 Welatê Kenanêda k'oka
h'eft mileta anî, e'rdê wan çawa
cî-war da cime'ta Xwe*. 20 H'eta
hingê çarsid pêncî sal derbaz bû. Ji
wir şûnda h'akim dane wan h'eta
hêna Samûêl p'êxember*. 21 Paşê
p'adşa xwestin, Xwedê çil salî
yekî ji e'şîra Binyamîn[f], Şawûlê
kur'ê Kîs da wan*. 22 Gava ew
avît, Dawid ser wan kire p'adşa,
ku bona wî şe'detî da û got: ‹Min
Dawidê Yêşa[f] merîk dilê Xwer'a
dît, wê xwestina Min gişkî bîne
sêrî[f]›*. 23 Ji zur'eta wî Xwedê ane-
gorî sozê Xwe Îsraêlr'a Xilazkirek
r'akir, hema xût Îsa. 24 Berî hatina
Wî, pêşîyê Yûh'enna t'emamîya
miletê Îsraêlêr'a dannasîn kir,
ku ji gunekirinê veger'in[f] û bêne
nixumandinê*. 25 Gava Yûh'en-
na şixulê xwe ser hevda anî, got:
‹Hûn bona min çawa difikirin,
ez k'î me? Ez ne Ew im, bona
k'îjanî hûn difikirin. Lê va ye
Ew pey min tê, ku ez ne hêja me
benê çarixêd nigêd Wî vekim›*.

---

* 13:17 Derk'etin 1:7; 12:51.

* 13:18 Jimar 14:34.

** 13:18 Nav hinek destnivîsarada dewsa «li wan sebir kir» «ew xwey kirin» heye.

* 13:19 Qanûna Ducarî 7:1; Yêşû 14-19.

* 13:20 H'akimtî 2:16; P'adşatî I, 3:20.

* 13:21 P'adşatî I, 8:5; 10:21.

* 13:22 P'adşatî I, 13:14.

* 13:24 Lûqa 3:3.

* 13:25 Lûqa 3:16.

26 Gelî bira, zar'êd xûn-qinêta
Birahîm û necihûyêd nava we-
daye ku ji Xwedê ditirsin, mer'a
ev xebera ku pê xilaz dibin hate
şandinê. 27 Binelîyêd Orşelîmê
û serwêrêd wan Îsa çawa Xilaz-
kir nas nekirin, lê gava dîwana
Wî kirin, gotinêd p'êxemberaye
ku her şemî dixûnin anîne sêrî.
28 Neheqîya bona kuştinê jî ser
Wî nedîtin, lê dîsa hîvî ji Pîlato
kirin ku Wî bide kuştinê*. 29 Ga-
va her tiştêd ku bona Wî nivîsar
bûn anîne sêrî, ji dar anîne xwarê
kirine t'irbê*. 30 Lê Xwedê Ew ji
mirinê r'akir 31 û gelek r'oja Xwe
wanva da xuyakirinê, k'îjan ji Ce-
lîlê t'evî Wî hatibûne Orşelîmê.
Niha jî ew li ber cime'tê şe'dêd
Wî ne*. 32 Û em vê Mizgînîyê di-
dine we: Çi ku Xwedê kal-bavêd
mer'a soz dabû, 33 Ewî bona me
kir, awa gotî zar'êd wanr'a, gava
Îsa ji mirinê r'akir. Çawa Zebûra
dudada jî nivîsar e:

‹Tu Kur'ê Min î,
Tu îro Minr'a bûyî›*.

34 Bona vê yekê ku Ew ji mirinê
r'akir û îdî Ew t'u car nar'ize,
Xwedê aha gotîye:

‹Ezê wan dua-dirozgêd pîroze
amin û Dawidr'a sozdayî ser
weda bibarînim›*.

35 Zebûreke dinda jî dibêje:

‹Tu nahêlî Pîrozê Te bir'ize›*.

36 Belê Dawid zemanê xweda
qirara Xwedêr'a xulamtî kir mir
û gihîşte pêşîyêd xwe, bedena wî
r'izî. 37 Lê Ewê ku Xwedê ji mirinê
r'akir ner'izî. 38 Niha bira ev yek
weva e'yan be, gelî bira, ku bi saya
Îsa wer'a bona baxşandina guna
tê dannasînkirinê. Û ji wan her
tiştêd ku hûn bi Qanûna Mûsa
nikaribûn bêsûc bûna, 39 niha
k'î ku bawerîya xwe Îsa bîne wê
bêsûc be. 40 Haş ji xwe hebin, ne-
be ev tiştê ku p'êxembera gotîye
bê serê we:

41 ‹Binihêr'in k'ubar-babaxno,
e'cêbmayî bin û betavebin,
çimkî Ezê r'ojêd weda kirekî
bikim,
kirekî usa, ku yek wer'a bêje jî

* 13:28 Lûqa 23:21-23.
* 13:29 Lûqa 23:50-56.
* 13:31 K'arêd Şandîya 1:3.
* 13:33 Zebûr 2:7.
* 13:34 Îşaya 55:3.
* 13:35 Zebûr 16:10.

hûnê bawer nekin›*».
42 Gava Barnabas û Pawlos ji
wir derk’etin, hîvî ji wan kirin, ku
şemîya din jî bona wê yekê wanr’a
xeber din. 43 Gava civîna k’inîştê
bela bû, gelek cihû û ji necihûyêd
ku hatibûne ser bawerîya cihûya
pey Pawlos û Barnabas diçûn.
Wanar’a xeber didan û dil dida-
ne wan, wekî t’imê nava k’erema
Xwedêda bimînin.
44 R’oja şemîya din nêzîkî t’e-
mamîya bajêr civîya, ku xebera
Xudan bibihê. 45 Gava cihûya ew
e’lalet dît, ji h’evsûdîyê miqabilî
gotinêd Pawlos sekinîn û ew bê-
hurmet kirin. 46 Hingê Pawlos û
Barnabas mêrk’îmî gotin: «Gerekê
pêşîyê xebera Xwedê wer’a bihata
xeberdanê, lê hûn ku xebera Xwedê
t’exsîr dikin û xwe layîqî jîyîna[f]
h’eta-h’etayê nakin, va em vedi-
ger’ine berbi necihûya. 47 Çimkî
Xudan aha e’mirî me kir: ‹Min
Tu kirî r’onaya necihûya, wekî
h’eta serê dinyayê bibî mecala
xilazbûnê›*».
48 Gava yêd necihû ev yek bi-
hîstin, şa bûn şikirî didane gotina
Xudan. Û ewêd ku bona jîyîna
h’eta-h’etayê k’ifşkirî bûn, ba-
wer kirin.
49 Xebera Xudan t’emamîya
welêtda bela bû. 50 Lê cihûya hê-
lan dane k’ulfetêd xwedêbawere
xweyîqedir, t’evî giregirêd bajêr,
miqabilî Pawlos û Barnabas r’a-
kirin û ji sînorêd xwe derxistin.
51 Wana jî t’oza nigêd xwe ser
wanda dawşand, çûne Qonyayê*
52 û şagirt bi şabûnê û R’uh’ê Pî-
rozva t’ijî bûn.

### Pawlos û Barnabas bajarê Qonyayêda

14 1 Qonyayêda jî ev yek mîna
her car qewimî: Pawlos û
Barnabas k’etine k’inîşta cihûya,
usa xeber dan, wekî e’laleteke gi-
ran ji cihû û necihûya bawer kirin.
2 Lê cihûyêd ku bawer nekirin
dilê necihûya qilqilandin û r’a-
kirine miqabilî bira. 3 Awa ewana
gelek wext li wir man, mêrk’îmî
ser Xudan xeber didan, Xudan jî
xebera k’erema Xwe îzbat dikir,
bi destêd wan nîşan û k’eremet
didane kirinê. 4 Lê dutîretî k’ete
bajêr, hinek li alîyê cihûya bûn,
hinek jî li alîyê şandîya. 5 Hingê

* 13:41 Hebaqûq 1:5.
* 13:47 Îşaya 49:6.
* 13:51 Lûqa 9:5.

hineke ji necihûya û cihûya t'evî
serwêrêd xwe qirar kirin ku wan
bêhurmet kin û bidine ber kevira,
**6** lê ew pê h'esîyan r'evîne Lîstrayê
û Dêrbê, bajarêd Lûkayonya, usa
jî dor-berêd wan. **7** Û li wan dera
Mizgînî didan.

### Pawlos û Barnabas Lîstra û Dêrbêda

**8** Lîstrayêda yekî ji zikmakî-
yêda nigada şilûşe't r'ûniştî bû,
ku t'u cara neger'îyabû. **9** Ewî jî
guhdarîya Pawlos dikir, Pawlos li
wî nihêr'î û gava dît bawerîya wî
bona qencbûnê heye, **10** bi dengê
bilind gotê: «R'abe ser nigêd xwe
r'ast bisekine!» Ewî jî banzda ser
xwe, destpêkir ger'îya. **11** E'laletê
gava kirina Pawlos dît, dengê xwe
hildan bi lûkayonî gotin: «Xwedê
dilqê însênda hatine xwarê cem
me!» **12** Barnabasr'a Zews[f] gotin,
Pawlosr'a jî Hermês[f], çimkî xeber-
danêda yê pêş ew bû. **13** K'ahînê
Zewsê ku p'aristgeha wî li pêşberî
bajêr bû, ga bi k'ofîyava[f] anîne
ber dergeh, xwest ku t'evî e'laletê
şandîyar'a bike qurban. **14** Lê gava
şandîya, Barnabas û Pawlosva ev
yek bihîst, k'incêd xwe qelaştin û
r'evîne nava e'laletê, kirine gazî
û gotin: **15** «E'vdno! Hûn çima vê
yekê dikin? Em jî binyat'a xweda
merîne mîna we ne, Mizgînîyê
didine we, ku hûn ji wan tiştêd
p'ûç' veger'in berbi Xwedêyê sax
bên, Yê ku e'rd û e'zman, be'r û
h'emûyêd nava wanda e'firandî-
ye*. **16** Ewî zemanê bihurîda hişt
ku her milet r'îya xweda her'e.
**17** Lê Xwexa Xwe bê şe'detî nehişt,
qencî wer'a kir, ji e'zmên baran
barand, r'ez[f] jî demsalada dane
we, bi xurekva hûn t'êr kirin û
şabûn jî kire dilê we». **18** Bi van
gotina wana bi zorekê e'lalet zeft
kir, ku qurbana bona wan nedin.
**19** Hingê ji Entakyayê û Qonyayê
cihû hatin, e'lalet dane alîyê xwe,
Pawlos dane ber kevira, ji bajêr
k'aşî der kirin, wan t'irê mirîye.
**20** Lê gava şagirta dora wî girt, ew
r'abû k'ete bajêr û r'oja dinê t'evî
Barnabas r'abû çû Dêrbê.

### Pawlos û Barnabas vediger'ine Entakyaya qeza Sûryayê

**21** Wana ku wî bajarîda Mizgînî
dan û gelek kirine şagirt, veger'î-
yane Lîstrayê, Qonyayê û Entak-
yayê. **22** Dilê şagirta dişidandin
û dil didane wan, ku bawerîyêda
bimînin û digotin: «Gerekê em

* 14:15 Derk'etin 20:11; Zebûr 146:6.

bi gelek cefak'işandinê bik'evi-
ne P'adşatîya Xwedê». 23 Wana
bona her civînekê berpirsîyar
k'ifş kirin, bi r'ojî dua kirin û ew
spartine wî Xudanê ku bawerîya
xwe jê anîbûn.

24 Ew nava Pisîdyayêr'a derbaz
bûn, paşê hatine Pamfîlyayê.
25 Pergêda jî xebera Xwedê dannasîn
kirin, berjêr çûne Entalyayê. 26 Ji
wir jî bi gemîyê çûne Entakyayê,
wî cîyê ku spartî k'erema Xwedê
bibûn bona wî şixulê ku ser hevda
anîn. 27 Gava hatin, civîn li hev
civandin û wanr'a gilî kirin, ku
Xwedê t'evî wan çi tişt kirine û
çawa dergehê bawerîyê ber neci-
hûya jî vekir. 28 Li wir gelek wext
t'evî şagirta man.

**Şêwira civîna Orşelîmêda**

**15** 1 Hinek ji Cihûstanê ber-
jêrî Entakyayê bibûn û
bira hîn dikirin digotin: «Heger
hûn li gora e'detê Mûsa neyêne
sinetkirinê, hûn xilaz nabin»*.
2 Nava wan û Pawlos, Barnabasda
gelek de'w-doz pêşda hat, hingê
bira qirar kir ku bona vê pirsê
Pawlos û Barnabas, usa jî ji wan
çend kes hevraz her'ine Orşelî-
mê, cem şandî û berpirsîyara.
3 Civînê ku ew ver'êkirin, ewana
Fînîkyê û Sameryayêva derbaz
bûn û h'emû bawermendar'a
bona veger'andina necihûya gilî
dikirin, bi vê yekê ew gelekî şa
kirin. 4 Gava gihîştine Orşelîmê,
civînê, şandîya û berpirsîyara ew
qebûl kirin û çi ku Xwedê t'evî
wan kiribû wanr'a gilî kirin. 5 Lê
hinek bawermendêd ji k'omela
fêrisîya r'abûn gotin: «Gerekê
van sinet kin û wanar'a bêjin, ku
Qanûna Mûsa xwey kin».

6 Şandî û berpirsîyar civîyan,
ku bona vê yekê bişêwirin. 7 Pey
gelek de'w-dozêr'a Petrûs r'abû
ser p'îya û wanr'a got: «Gelî bira!
Hûn xwexa zanin ku Xwedê r'ojêd
pêşinda ez nav weda bijartim, ku
necihû xebera Mizgînîyê ji devê
min bibihên û bawer bikin*. 8 Xwe-
dêyê ku dila zane da îzbatkirinê,
ku necihû jî Wîva qebûl in, gava
R'uh'ê Pîroz da wan jî, çawa da
me*. 9 Nava me û wanda t'u fir-
qî danenî, bi bawerîyê dilê wan
paqij kir. 10 Îdî çima hûn Xwedê
dicêr'ibînin, nîrekî usa datînine

* 15:1 Qanûna K'ahîntîyê 12:3.
* 15:7 K'arêd Şandîya 10.
* 15:8 K'arêd Şandîya 10:44; 2:4.

ser stûyê şagirta, ku ne kal-bavêd
me karibûne bibin, ne jî me? **11** Ev
yek aha nabe, lê em bawer dikin,
ku çawa em bi k'erema Xudan Îsa
xilaz dibin, usa jî ew».

**12** Hingê t'emamîya civatê den-
gê xwe bir'î û guhê xwe dane ser
gotinêd Barnabas û Pawlos ku
Xwedê bi destêd wan çiqas nî-
şan û k'eremet nava necihûyada
kiribûn. **13** Gava ewana ker' bûn,
Aqûb[f] deng hilda û got: «Gelî bira!
Guh bidine min. **14** Şimh'ûn gilî
kir, ku çawa pêşîyê Xwedê r'e'ma
Xwe li necihûya kiribû, ku ji nava
wan cime'tekê derxe, wekî navê
Wî hildine ser xwe. **15** Vê yekêr'a
gotinêd p'êxembera jî li hev di-
girin, çawa nivîsar e:

**16** ‹Ji vir şûnda Ezê veger'im,
konê Dawidî k'etî dîsa vegirim,
çî wî jî ku xirab bûye Ezê çê-
kim
û wî dîsa bidime r'agirtinê,
**17** wekî h'erçê merivêd mayîn
û h'emû necihûyêd ku navê
Min ser wan e,
li Xudan biger'in.
**18** Ew Xudanê ku van tişta hê ji
dewrêd berêda e'yan kirîye
dibêje›*.

**19** Bona vê yekê jî ez aha r'ê têr'a
dibînim ku em ze'metê nedine
ewêd ku ji necihûya berbi Xwe-
dê tên, **20** lê em ne'mekê wanr'a
binivîsin, ku h'evza xwe ji wan
qurbanêd ku p'ûtar'a têne dayînê
bikin, usa jî ji bênamûsîyê, goştê
mirar[f] û xûnê*. **21** Fe'mdarî ye ku
hê qur'nêd derbazbûyîda Qanûna
Mûsa her bajarîda tê hînkirinê û
h'emû r'ojêd şemîya k'inîştada
wê dixûnin».

### Cabdayîna civîna Orşelîmê

**22** Hingê li şandîya, berpirsîyara
û t'emamîya civînê xweş hat, ku
ji nava xweda çend meriva bibi-
jêrin û t'evî Pawlos û Barnabas
bişînine Entakyayê. Ev bûn yêd
ku hatine şandinê: Cihûdayê ku
jêr'a digotin Barsabo û Sîlas. Nava
bawermendada evana e'yan bûn.
**23** Bi destê wan ev ne'me şandin
aha nivîsar:

«Em birayêd weye şandî û ber-
pirsîyar silava li we birayêd ji
necihûyaye Entakyayê, Sûryayê
û Kîlîkyayê dikin.

**24** Me bihîstîye ku ji nava me hi-
nek derk'etine, ku me xwexa t'emî

---

* 15:18 Amos 9:11-12 û Îşaya 45:21.

* 15:20 Derk'etin 34:15-17; Qanûna K'ahîntîyê 18:6-23; 17:10-16.

nedane wan, lê wan bi xeberêd
xwe ze'met dane we û fikirêd we
t'evîhev kirine*. 25 Bona vê yekê li
t'emamîya şêwira civîna me xweş
hat, ku em meriva bibijêrin t'evî
birayêd meye delal Barnabas û
Pawlos bişînine cem we, 26 yêd ku
e'mirê xwe dane navê Xudanê me
Îsa Mesîh. 27 Awa em Cihûda û
Sîlas dişînin, wekî ew jî van tişta
bi devê xwe wer'a bêjin. 28 Li R'u-
h'ê Pîroz xweş hat, usa jî li me,
ku t'u barî nedine ser milê we,
pêştirî van tiştêd h'ewce: 29 Dûrî
qurbanêd p'ûta, xûnê, mirarîyê[f] û
bênamûsîyê bin. Heger hûn xwe ji
van tişta xwey kin, qenc e. Hûn
xweş bin, de ma xatirê we».
30 Hingê ew ver'êkirin, berjêr
çûne Entakyayê cime't civandin,
ne'me dane wan. 31 Gava xwen-
din, bona wê dildayînê p'ir' şa
bûn. 32 Cihûda û Sîlas jî ku p'ê-
xember bûn, bi gelek xebera dil
dane bawermenda û ew şidandin.
33-34 Gelek wext li wir man, paşê
bawermenda ew bi xêr û silamet
paşda şandine cem wan, yêd ku
ew şandibûn.* 35 Pawlos û Barna-
bas jî Entakyayêda diman, t'evî
gelekêd mayîn xebera Xudan hîn
dikirin û dannasîn dikirin.

## R'êwîtîya Pawlose duda (15:36–18:22)

### Pawlos û Barnabas ji hevdu diqetin

36 Çend r'oja şûnda Pawlos gote
Barnabas: «Were em veger'in serîkî
bidine wan xûşk-bira, k'îjanar'a
me h'emû bajarada xebera Xudan
dannasîn kirîye, dîna xwe bidinê
k'a h'alê wan çawa ye». 37 Barnabas
dixwest Yûh'ennayê ku jêr'a Mar-
qos digotin jî t'evî xwe bibirana,
38 lê Pawlos r'ê têr'a nedidît, yê
Pamfîlyayêda ji wan qetîya û t'evî
wan şixul nekir t'evî xwe bibirana*.
39 Hingê ya wan li hev negirt, ev
bû me'nî ji hev qetîyan. Barnabas
Marqos hilda bi gemîyê çû Qubri-
sê, 40 Pawlos jî Sîlas bijart û ji bira

* 15:24 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Dibêjin: ‹Gerekê hûn bêne sinetkirinê û Qanûna Mûsa xwey kin›».
* 15:33-34 Nav hinek destnivîsar û welger'andinêd kevinda ev jî heye: «Lê li Sîlas xweş hat, li wir bimîne».
* 15:38 K'arêd Şandîya 13:13.

spartî k'erema Xudan bûn, r'êk'etin
çûn. **41** Li Sûryayê û Kîlîkyayê di-
ger'îyan, civîn dişidandin.

### Tîmot'êyo hevaltîyê Pawlos û Sîlasr'a dike

**16** **1** Hingê Pawlos hate Dêrbê
û Lîstrayê. Li wir şagirtek
hebû navê wî Tîmot'êyo, kur'ê
k'ulfeteke cihûye bawermend bû, lê
bavê wî yûnan bû. **2** Bawermendêd
Lîstrayê û Qonyayê hindava wîda
qenc xeber didan. **3** Pawlos xwest wî
t'evî xwe bibe û bona wan cihûyêd
wan dera girt ew sinet kir, çimkî
h'emûya jî zanibû ku bavê wî yûnan
e. **4** Gava bajarar'a derbaz dibûn,
ew t'emîyêd ku şandîya û berpir-
sîyarêd Orşelîmê qirar kiribûn,
didane bawermenda ku xwey kin.
**5** Awa civîn jî bawerîyêda dişidîyan
û r'oj bi r'oj h'esabê wan zêde dibû.

### Mekedonî xewnêda gazî Pawlos dikin

**6** Nava sînorêd Firîgya û Ga-
latyayêda ger'îyan, çimkî R'uh'ê[f]
Pîroz nehişt ku qeza Asyayêda
xebera Xwedê bêjin. **7** Gava nêzî-
kî Mîsyayê bûn, kirin ku her'ine
Bîtênyayê, lê R'uh'ê Îsa îzin neda
wan **8** û ber Mîsyayêva derbaz bûn
berjêr çûne Troyayê. **9** Şev Pawlos
dîtinokêda ber ç'e'vê xwe dît, yekî
mekedonî sekinî bû hîvî ji wî dikir
û digot: «Were Mekedonyayê alî
me bike». **10** Gava wî ew dîtinok
dît, me* destxweda xwest ku he-
r'ine Mekedonyayê. Me fe'm kir,
ku Xwedê me dişîne wir, wekî
Mizgînîyê bidine wan.

### Fîlîpyayêda Lîdya berbi Xudan vediger'e

**11** Em ji Troyayê bi gemîyê
derk'etin r'ast çûne Samotraxê,
r'oja dinê Nêyapolîsê. **12** Ji wir jî
çûne Fîlîpyayê, bajarekî ne'yîya
Mekedonyayêyî e'yan, usa jî ku
bajarekî R'omayê* ye. Wî bajarîda
em çend r'oja man. **13** R'oja şemî-
yê em ji dergehê bajêr derk'etin
çûne devê ç'êm, ew der çawa em
difikirîn, cîyê dua bû. Me r'ûniştî

* 16:10 Lûqayê nivîsk'arê vê k'itêbê wî çaxî cem Pawlos bû, lema jî dibêje «me».

* 16:12 Fîlîpya Mekedonyayêda bû, ne ser e'rdê Îtalyayê bû, lê dîsa «bajarekî R'omayê» dihate h'esabê (bi yûnanî xeber bi xeber dibêje, ku ew «Kolonîya R'omayê» ye). Heqê bajarvanêd Fîlîpyayê weke heqê her bajarvanekî ji bajarêd Îtalyayêye mayîn bû, mesele, xweserîxwe dîwana xwe dikirin, xerc nedidane R'omê. Lema r'êzêd 16:21-da merivêd bajêr xwe h'esab dikin çawa bajarvanêd[f] R'omayê.

t'evî k'ulfetêd civîyayî xeber dida,
14 k'ulfeteke xwedêbawer ji baja-
rê Tîyatîrayê, navê wê Lîdya ku
k'incêd şîrk[f] difirotin, guhdarî
dikir. Xudan dilê wê vekir ku guh
bide gotinêd Pawlos. 15 Gava ew
neferêd xweva pê avê hatine ni-
xumandinê, hîvî ji me kir û got:
«Heger hûn min bawermenda
Xudan h'esab dikin, k'erem kine
mala min, li wir bimînin». Û zor
li me kir em birin.

### Pawlos û Sîlas bajarê Fîlîpyayêda têne girtinê

16 Carekê em diçûne cîyê dua-
kirinê, carîk r'astî me hat, ku
r'uh'ê k'oç'ektîyê pêr'a bû, evê
bi wê k'oç'ektîyê xweyêd xwer'a
p'ir' k'ar danî. 17 Eva pey Pawlos
û me k'etibû, dikire qîr'în û digot:
«Ev merivana xulamêd Xwedêyê
Herî Jorin in, ku wer'a bona r'îya
xilazbûnê dannasîn dikin!» 18 Ev
yeka ewê gelek r'oja dikir, h'eta
ku Pawlos aciz bû, veger'îya û wî
r'uh'îr'a got: «Bi navê Îsa Mesîh
e'mirî te dikim ji wê derê!» Û pê-
r'a-pêr'a ew ji wê derk'et. 19 Gava
xweyêd wê dîtin ku gumana k'ara
wan hate bir'înê, Pawlos û Sîlas
girtin, k'aşî meydana bajêr cem
serwêra kirin, 20 ew birine ber
serdarêd R'omayê û gotin: «Ev
merivana cihû ne û bajarê me
t'evîhev dikin. 21 E'detê usa me
bajarvanêd[f] R'omayê hîn dikin,
ku ne mer'a cayîz e qebûl kin,
ne jî bikin». 22 E'laletê h'icûmî
ser wan kir, serdara jî k'incêd ser
wan qelaştin û e'mir kirin ku wan
bidine ber şiva. 23 Pey gelek lêda-
nêr'a avîtine kelê û e'mirî serwêrê
kelê kirin, ku r'ind miqatîyê wan
bike. 24 Ewî ku ev e'mir stand,
ew avîtine zindanê û nigêd wan
qeydada şidandin.
25 Nêzîkî nîvê şevê Pawlos û
Sîlas dua dikirin û eşqî Xwedê
distiran, girtîya jî guhê xwe da-
nîbûne ser wan. 26 Nişkêva e'rd
qayîm h'ejîya, h'eta ku h'îmêd
kelê jî çûn-hatin, destxweda h'emû
derî vebûn, qeyd-zincîrêd h'emûya
hatine vekirinê. 27 Gava serwêrê
kelê h'işyar bû û derêd kelê vekirî
dîtin, şûr k'işand ku xwe bikuje,
çimkî wî t'irê girtî r'evîne*. 28 Lê
Pawlos bi dengê bilind kire gazî û
got: «T'u zîyanê nede e'mirê xwe,

* 16:27 Wî çaxî gava girtîk ji kelê bir'evîya, hingê çi ceza ku digihîşte girtî, gerekê serwêrê kelê dewsa wî bik'işanda. Awa gotî, heger yekî hêjayî mirinê bir'evîya, hingê gerekê serwêrê kelê dewsa wî bihata kuştinê.

em h'emû jî vira ne!» 29 Ewî ç'ira xwest, r'evî hindur', lerizî xwe avîte ber Pawlos û Sîlas. 30 Ew derxistin û got: «Ez xulam! Ez çi gerekê bikim ku xilaz bim?» 31 Wana jî got: «Bawerîya xwe Xudan Îsa bîne, tê neferêd xweva xilaz bî». 32 Hingê xebera Xudan wî û wan h'emûyar'a gotin, yêd ku mala wîda bûn. 33 Hema wê şevê serwêrê kelê ew birin, birînêd wan şûştin û pêr'a-pêr'a ew neferêd xweva pê avê hatine nixumandinê. 34 Ew anîne mala xwe, sifre li ber wan danî û t'emamîya neferêd xweva şa bûn, ku bawerîya xwe Xwedê anîn.

35 Gava sibeh safî bû, serdara zapidêd xwe şandin û gotin: «Wan meriva ber'de». 36 Serwêrê kelê ev yek Pawlosr'a got: «Serdar merî şandine wekî hûn bêne ber'danê. Niha r'abin bi xêr û silamet her'in». 37 Lê Pawlos wanr'a got: «Em, bajarvanêd[f] R'omayê, bê dîwan bi cime'tî dane ber şiva avîtine kelê! Û niha dixwazin bi dizîva me derxin? Na, ev yek nabe, bira xwexa bên me derxin». 38 Zapida ev xeberana gîhandine serdara. Gava ku bihîstin ew bajarvanêd R'omayê ne, tirsîyan 39 hatin xwe avîtine wan, paşê ew derxistin û hîvî kirin ku ji bajarê wan her'in. 40 Ew jî ji kelê derk'etin çûne mala Lîdyayê, li wir xûşk-bira dîtin, dil dane wan û paşê r'êk'etin çûn.

## Qalme-qalma bajarê T'êsalonîkêda

**17** 1 Ewana Emfîpolîs û Apolonyayêva derbaz bûn hatine T'êsalonîkê, wî cîyê ku k'inîşta cihûya hebû. 2 Pawlos jî mîna e'detê xwe çû nava wan û sê r'ojêd şemîyê wanar'a dik'ete xeberdanê, ji nivîsara 3 şirovedikir û wanr'a îzbat dikir, ku gerekê Mesîh cefa bik'işanda û ji mirinê r'abûya û digot: «Ev Îsayê ku ez wer'a dannasîn dikim, ew Mesîh e». 4 Hinekêd ji wan bawer kirin xwe li Pawlos û Sîlas girtin, usa jî e'laleteke xwedêbawerêd yûnan[f] û gelek k'ulfetêd xweyîqedir.

5 Lê ji cihûya hineka ji h'evsûdîyê çend merivêd bêkêre ner'ast civandin, kirine qalme-qalm, bajar t'evîhev kirin û h'icûmî ser mala Yason kirin, dixwestin Pawlos û Sîlas banîna ber cime'tê. 6 Gava ew nedîtin, Yason t'evî çend birava k'aşî cem serwêrêd bajêr kirin, dikirine qîr'în digotin: «Ewêd dinya t'evîhev kirine gihîştine vira jî 7 û Yason ew qebûl kirine mala xwe! Evana h'emû jî miqabilî e'mirêd Qeyser diçin û

dibêjin: ‹P'adşakî din heye, navê
wî Îsa ye›». **8** Bi van gotina e'lalet
û serwêrêd bajêr t'evîhev kirin.
**9** Hingê ji Yason û yêd mayîn
k'efîl[f] standin, ew ber'dan.

### Pawlos û Sîlas bajarê Beroyayêda

**10** Hema çawa te'rî k'ete e'rdê,
bira Pawlos û Sîlas şandine Be-
royayê. Ew ku gihîştine wir, çûne
k'inîşta cihûya. **11** Ev cihû ji yêd
T'êsalonîkê serwaxttir bûn, xebera
Xwedê bi dil û can qebûl kirin û
her r'oj nivîsarada k'ûr dibûn, k'a
ev tişt usa ne. **12** Ji wana geleka
bawer kir, usa jî gelek k'ulfetêd
yûnane xweyîqedir û mêr jî ne kêm
bûn. **13** Gava cihûyêd T'êsalonîkê
bihîstin ku Pawlos xebera Xwedê
Beroyayêda jî dannasîn dike, hatin
wir jî hêlan dane e'laletê û ew t'e-
vîhev kirin. **14** Wî çaxî bira Pawlos
destxweda şandine ber be'rê, lê
Sîlas û Tîmot'êyo Beroyayêda man.
**15** Ewêd ku Pawlos ver'êdikirin,
ew h'eta At'înayê birin, paşê ji
Pawlos t'emî standin ku Sîlas û
Tîmot'êyo zû her'in bigihîjine wî,
xwexa jî paşda veger'îyan.

### Pawlos li bajarê At'înayê

**16** Gava At'înayêda Pawlos hîvîya
wan bû, dilê wî ne r'ih'et bû, çim-
kî dît bajar nava p'ûtp'aristîyêda
bû. **17** Awa ewî k'inîştêda cihû û
yûnanêd[f] xwedêbawerr'a û li mey-
danê bajêrda jî her r'oj r'astî k'ê
dihat wanr'a dik'ete xeberdanê.
**18** Çend fîlosofêd êpîkûrî[f] û stoy-
xî[f] wîr'a k'etine h'ucetê û hineka
digot: «Evî devbelayî bêt'ewşe çi
dixwaze bêje?» Hineka jî digot:
«Usa tê k'ifşê, ku eva derheqa
xwedêyêd xerîbda dannasîn dike».
Aha digotin, çimkî ewî bona Îsa
û r'abûna mirîya dannasîn dikir.
**19** Wî çaxî ew hildan birine ber
civîna Aryopagoyê[f] û gotin: «Em
dikarin bona wê hînkirina nûye
ku tu dannasîn dikî bizanibin?
**20** Tu tiştêd xerîb me didî bihîs-
tinê, lema jî em dixwazin me'na
wan bizanibin». **21** H'emû at'înî
û xerîbêd ku wir diman, tiştekî
mayînva mijûl nedibûn, pêştirî
tiştêd nû gotinê yan bihîstinê.

**22** Hingê Pawlos ber civîna Ar-
yopagoyêda sekinî û got: «Gelî
at'înîya! Ez dîna xwe didimê,
ku hûn ji h'emû alîyava gelekî
h'ebandinêva mijûl in. **23** Çimkî
gava ez ger'îyam, min dîna xwe
da h'ebandinêd we, min gorî-
gehek[f] dît ku ser wê nivîsar bû
‹XWEDÊYÊ NENASR'A›. Awa
Ewê ku hûn nas nakin dih'ebî-
nin, ez bona Wî wer'a dannasîn

dikim. 24 Xwedêyê ku ev dinya û
h’emûyêd nava wêda e’firandî-
ye, Ew Xudanê e’rd û e’zmên e
û p’aristgehêd bi desta çêkirîda
namîne*, 25 ne jî ç’e’vê Wî destê
meriva ye ku xizmetk’arîya Wî
bikin, çawa Yekî h’ewcê tiştekî,
lê Ew xwexa e’mir, bînê û her tiştî
dide h’emûya. 26 H’emû miletêd
dinyayê ji xûnekî xuliqand, ku
ser r’ûyê t’emamîya dinyayê bijîn.
Ewî zeman û sînorêd cî-misk’ena
wanr’a k’ifş kirin. 27 Ewî ev yekana
kirin, wekî meriv li Wî biger’in,
belkî bip’elînin bibînin. Lê Ew
Xwedê ji me her kesî ne dûr e jî,
28 çimkî ‹em bi Wî dijîn, dimeşin
û hene›*. Çawa çend şayîrêd we jî
gotine: ‹Em r’ast zar’êd Wî ne›**.

29 Awa ku em ji Xwedê bûne,
gerekê em Xwedê aha neşibînin
mîna zêr’, zîv, yan kevirê ku bi
h’iş û hostatîya meriva hatine
k’olandinê. 30 Xwedê dîna Xwe
nedaye h’emû zemanêd ku me-
rivayîyê Ew nas nekirîye, lê niha
her dera t’emî li h’emû meriva
dike, ku ji gunekirinê veger’in[f].
31 Çimkî Ewî r’ojek k’ifş kirîye,
k’îjanêda wê dîwana dinê r’ast
bi destê Merivekî bike, Yê ku
Ewî k’ifş kirîye. Xwedê ev yeka-
na h’emûyar’a dane îzbatkirinê,
gava Ew meriv ji mirinê r’akir».

32 Gava bona r’abûna mirîya
bihîstin, hinek pê k’enîyan, lê
hineka jî got: «Bona wê yekê emê
careke din ji te bibihên». 33 Û
Pawlos ji nav civîna wan derk’et
çû. 34 Lê hineka xwe li wî girt,
bawer kirin. Nava wanda bûn Dî-
yonîsyoyê endemê Aryopagoyê û
k’ulfeteke navê wê Damerîs, t’evî
hinekêd mayîn.

### Pawlos bajarê Korint’êda

**18** 1 Ji wir şûnda Pawlos ji
At’înê r’êk’et hate Korint’ê.
2 Li wir yekî cihû navê wî Akîla
dît, bûyîna xweda ji Pontosê. Eva
t’evî k’ulfeta xwe Priskîlayê nû
ji Îtalyayê hatibû, çimkî Qeyser
Klawdyo e’mir kiribû, ku h’emû
cihû ji R’omê derk’evin. Pawlos

* 17:24 P’adşatî III, 8:27.
* 17:28 Eva gotina ji zanekî bi navê Epîmênîdes bû. Ew yekî şayîr bû û ji bajarê Kinososê girava Kirêtîyê bû. Ew qasî 600 salî berî Îsa Mesîh bibû.
** 17:28 Eva gotina ji nivîsareke Aratûs şayîr e, ku bona xwedêkî xwe nivîsîye, k’îjanî yûnana dih’eband. Aratûs şayîr ji qeza Kîlîkyayê bû, qasî 300 salî berî Îsa Mesîh bibû. Pawlos xwexa jî ji qeza Kîlîkyayê bû.

çû cem wan, 3 cem wan ma û t'evî
wan xebitî, çimkî p'êşê wan yek
bû, kon çêdikirin. 4 Ew h'emû
r'ojêd şemîya k'inîştada cihû û
yûnanar'a[f] dik'ete xeberdanê, ew
didane bawerkirinê.

5 Gava Sîlas û Tîmot'êyo ji Me-
kedonyayê hatin, Pawlos bi xîret
t'emamîya wextê xwe da hînkirina
Xeberê* û cihûyar'a şe'detî dida
ku Mesîh, Îsa ye. 6 Gava ew mi-
qabilî wî r'abûn û ew bêhurmet
kirin, ewî k'incê xwe dawşand û
gote wan: «Xûna we serê we be, ez
bêsûc im. Ji vir şûnda ezê her'ime
cem necihûya». 7 Ew hingê ji wir
çû k'ete mala yekî navê wî Tîto
Yûsto. Ew merivekî necihû bû, lê
xwedêbawer bû, mala wî k'êleka
k'inîştê bû. 8 Kirîspoyê serwêrê
k'inîştê jî neferêd xweva bawerî-
ya xwe Xudan anî û ji korint'îya
geleka ku bihîstin, bawer kirin û
pê avê hatine nixumandinê.

9 Şevekê Xudan dîtinokêda hate
ber ç'e'vê Pawlos û gotê: «Netirse,
xeber de û xwe ker' neke. 10 Çimkî
Ez t'evî te me û kesekê ber te r'a-
nebe zîyanê nede te, çimkî gelek
cime'ta Min vî bajarîda heye».
11 Ew li wê derê salekê û şeş meha
ma, ew hînî xebera Xwedê dikirin.

12 Hêna welîyê Galîyoyê Axa-
yayêda cihû bûne yek, h'icûmî ser
Pawlos kirin û birine ber dîwanê
13 gotin: «Eva cime'tê hîn dike, ku
ne li gora qanûnê Xwedê bih'ebî-
nin». 14 Gava Pawlos wê destpêkira
xeber da, Galîyo cihûyar'a got:
«Heger gilî bona neheqîyê û xi-
rabîyê bûya, cihûno, dibû ku min
guhdarîya we bikira, 15 lê heger
pirs ser xebera, nava û qanûna
we ye, hûn xwexa binihêr'in.
Ez naxwazim bibime h'akimê
van tişta». 16 Û ew ji dîwanxanê
derxistin. 17 Hingê h'emûya Sos-
tênîsê serwêrê k'inîştê girtin, li
ber dîwanxanê k'utan, lê qet xema
Galîyo jî nîbû.

### Pawlos vediger'e Entakyayê

18 Pawlos gelek r'oja dîsa li wir
ma, paşê xatirê xwe ji bawermenda
xwest, bi gemîyê çû alîyê Sûryayê.
Priskîla û Akîla jî t'evî wî bûn.
Ewî Kenxêryayêda p'or'ê xwe
kur' kiribû, çimkî ad-qirarkirî*

* 18:5 Nav hinek destnivîsarada dewsa «Xeber» «R'uh'va» heye, ku hin aha fe'm dikin: «Bi alava R'uh'va girêdayî».

* 18:18 Wê ad-qirarêr'a «nezîr[f]» dibêjin. Derheqa qeyde-qanûnêd nezîrda Jimar 6:1-21-da bixûnin.

bû. **19** Ew gihîştine Efesê, Priskîla
û Akîla li wir hiştin, xwexa k'ete
k'inîştê cihûyar'a k'ete xeberdanê.
**20** Wana hîvî ji wî kir, ku hinekî
dirêj li wir bimîne, ew qayl ne-
bû. **21** Lê gava xatirê xwe ji wan
xwest, got: «Ezê dîsa ser weda
bêm, heger Xwedê h'iz bike»*. Bi
gemîyê ji Efesê çû. **22** Gava gihîşte
Qeyserîyê, hevraz çû Orşelîmê
silav da civînê, paşê berjêr çû
Entakyayê. **23** Gava hinek wext li
wir ma, r'abû berêva k'ete welatê
Galatya û Firîgya, h'emû şagirt
bawerîyêda dişidandin.

### Apolo bajarê Efesêda Mizgînîyê dide

**24** Cihûkî navê wî Apolo, bû-
yîna xweda ji Skenderyayê, hate
Efesê. Eva gotinbêjekî serxwe û
nivîsarêd[f] pîrozda zanekî zor bû.
**25** Ew R'îya Xudanda hînbûyî bû,
agirê xîretê sêrî k'etibû* bona
Îsa r'ast xeber dida û hîn dikir,
lê t'enê nixumandina Yûh'enna
zanibû. **26** Evî destpêkir k'inîştê-
da mêrk'îmî xeber da. Lê gava
Priskîlayê û Akîla xeberdana wî
bihîstin, ew birine cem xwe, hê
r'ast R'îya Xwedê wîr'a şirovekirin.
**27** Apolo ku xwest her'e Axayayê,
bira dil dane ber û şagirtar'a jî
ne'mek nivîsîn ku wî qebûl kin.
Gava gihîşte wir, ew gelekî kêrî
wan hat, yêd ku bi k'erema Xwedê
bibûne bawermend. **28** Çimkî bi
cime'tî xeberdanêda ya wî li ser
ya cihûya dik'et, bi nivîsarêd pîroz
dida îzbatkirinê, ku Mesîh, Îsa ye.

## R'êwîtîya Pawlose sisîya (18:23; 19:1–21:16)

### Pawlos Efesêda

**19** **1** Gava Apolo hê Korint'êda
bû, Pawlos cîyê jorinr'a
derbaz bû berjêrî Efesê bû û li
wir çend şagirt dîtin **2** û ji wan
pirsî: «Gava we bawer kir, we
R'uh'ê Pîroz stand?» Wana got:
«Me qet nebihîstîye jî ku R'uh'ê
Pîroz heye». **3** Ewî wanr'a got: «Lê
hûn bi çi hatine nixumandinê?»
Wana got: «Bi nixumandina Yû-
h'enna». **4** Pawlos got: «Yûh'enna
bona guneveger'andinê nixumand

---

* 18:21 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Ez gerekê e'se evê cejina ku tê Or-
şelîmêda derbaz kim. Lê ezê dîsa ser weda bêm, heger Xwedê h'iz bike».
* 18:25 Aha jî tê fe'mkirinê: «Bi alava R'uh'ê Xwedê».

û cime’têr’a got: ‹Yê ku pey minr’a
tê bawerîya xwe Wî bînin›, awa
gotî Îsa»*. 5 Gava ev yek bihîstin,
bi navê Xudan Îsa hatine nixu-
mandinê. 6 Û gava Pawlos destêd
xwe danîne ser wan, R’uh’ê Pîroz
hate ser wan, bi zimana xeber dan
û p’êxembertî kirin. 7 Evana weke
donzdeh merîya bûn.

8 Pawlos k’ete k’inîştê, sê meha
mêrk’îmî xeber dida, bona P’ad-
şatîya Xwedê wanr’a dik’ete xe-
berdanê û ew didane bawerkirinê.
9 Lê gava hineke serh’işk miqabil
derk’etin û li ber cime’tê R’îya
Xudan bêhurmet dikirin, Pawlos
ji wan qetîya, şagirt başqe kirin û
her r’oj dersxana Tîranoda wanr’a
dik’ete xeberdanê. 10 Evê yekê du
sala k’işand, h’eta ku h’emû cihû
û yûnanêd[f] ku qeza Asyayêda
diman, Xebera Xudan bihîstin.

### Her h’eft kur’êd Skêwa

11 Xwedê bi destê Pawlos gelek
k’eremetêd zor dikirin, 12 h’eta ku
ew destmal û şalikêd ku Pawlos lê
dik’etin nexweşar’a dibirin, ew qenc
dibûn û r’uh’êd xirab derdik’etin.
13 Çend cihûyêd ger’ok hebûn ku
xwe dabûne cinderxistinê, wan
dikir ku ser yêd ku r’uh’êd xirab
nava wanda hebûn, pê navê Xudan
Îsa berî wan din û digotin: «Em pê
wî Îsayê ku Pawlos dannasîn dike
berî we didin». 14 Eva yeka her h’eft
kur’êd Skêwayê serekk’ahînekî ci-
hûya dikirin. 15 Carekê r’uh’ê xirab
li wan veger’and û got: «Ez Îsa nas
dikim, bona Pawlos jî zanim, lê
hûn k’î ne?» 16 Hingê ew merivê
ku r’uh’ê xirab têda bû, banzda ser
wan, qewata wî wan h’emûyada çû
ew usa k’utan, wekî ew ji wê malê
te’zî û birîndar r’evîn. 17 Bona vê
yekê h’emû cihû û yûnanêd ku
Efesêda diman pê h’esîyan. Tirs
k’ete ser wan h’emûya û navê
Xudan Îsa bilind dibû. 18 Gelek
bawermend jî dihatin gunêd xwe
didane r’ûyê xwe û kirêd xwe
digotin. 19 Yêd sêrbazîyêva jî ku
mijûl dibûn, geleka k’itêbêd xwe
t’op dikirine cîkî û li ber h’emûya
dişewitandin. Qîmetê wan h’esab
kirin, pêncî h’ezar zîv[f] derk’et. 20 Bi
vî awayî Xebera Xudan bi zorayî
hê pêşda diçû û qewat dibû.

### Şer’-de’wa Efesêda

21 Gava ev tişt bûn, Pawlos qirar
kir* ku Mekedonyayê û Axayayêva

* 19:4 Lûqa 3:1-18.
* 19:21 Aha jî tê fe’mkirinê: «Pawlos bi r’êberîya R’uh’ qirar kir».

derbaz be her'e Orşelîmê û got:
«Pey çûyîna wirar'a gerekê ez
her'im R'omê jî bibînim». 22 Ewî
du k'omekdarêd xwe Tîmot'êyo
û Êrasto şandine Mekedonyayê
û ew hinekî jî li qeza Asyayê ma.
23 Wan çaxada bona R'îya Xudan
gelekî şer'-de'w pêşda hat. 24 Yekî
zîvker hebû navê wî Dîmîtrîyo.
Evî p'aristgehêd xwedêya navê
wê Artemîs[f] cûr'ê ya e'detîda bi
zîv biç'ûk çêdikirin û gelek k'ar
hostar'a danî. 25 Ewî gazî wan
h'emû hosta, usa jî yêd mîna
xweyîyê vî p'êşeyî[f] kirin û got:
«Gelî hevala! Hûn zanin ku k'ara
me vî şixulîda ye. 26 Hûn jî dibi-
hên û dibînin ku evî Pawlosî ne
ku t'enê Efesêda, lê bawerîya we
hebe t'emamîya qeza Asyayêda jî
serê gelek cime'ta t'ijî kirîye ji r'ê
derxistîye û dibêje: ‹Ew xwedêyêd
ku bi desta çêkirî ne, ew ne xwedê
ne›. 27 Zîyana wê ne t'enê ew e
ku p'êşê me tê bêhurmetkirinê,
lê p'aristgeha Artemîs xwedêya
mezin wê ber tiştekî neyê h'esabê
û wê qedirê mezinayîya wê bi-
k'eve, ya ku h'emû qeza Asya û
dinya dih'ebîne».

28 Gava ev yek bihîstin, bi
k'în-box t'ijî bûn, dikirine qî-
r'în û digotin: «Artemîsa efesîya
mezin e!» 29 T'emamîya bajêr qil-
qilî, r'ahişte Gayos û Erîstarxoyê
mekedonî, ku heval-r'êyêd Pawlos
bûn, hevr'a r'evîne dîtindarê[f].
30 Pawlos jî xwest ku bik'eve nava
wê e'laletê, lê şagirta nehişt. 31 Ji
hinek serwêrêd qeza Asyayê jî
ku dostêd wî bûn, merî şandine
cem wî û hîvî jê kirin, ku neçe
dîtindarê. 32 Hema wî wextîda
hineka cûr'ekî, hineka jî cûr'ekî
din dikirine qîr'în, çimkî k'om-
bûna wan t'evîhevbûyî bû, geleka
jî nizanibû ew bona çi jî civîyane.
33 Hineka ji e'laletê Skender pêşda
birin, çimkî cihûya ew pêşda de'f
dan. Skender destê xwe bilind kir,
xwest caba xwe bide. 34 Lê gava pê
h'esîyan ku ew cihû ye, h'emûya
bi dengekî weke du sih'eta kirine
qîr'în: «Artemîsa efesîya mezin e!»
35 Paşê k'atibê[f]* bajêr e'lalet
seqir'and û got: «Gelî efesîya! K'î
nizane ku bajarê Efesê xweyîtîyê**
p'aristgeha Artemîsa mezin dike,
ya ku kevirê wêyî pîroz ji e'zmên
hatîye xwarê? 36 Çawa vê yekêda

* 19:35 K'atibê bajêr ji nava k'oma giregirêd bajêrda yekî e'yan bû. Xebateke wî jî ew bû, wekî qirarêd civîna bajarvana binivîse û e'lam bike.
** 19:35 Bi gotineke din: «Micêwir û bajarê wê p'ûtê ne».

ku tiştekî xêlif t’une, lema jî ge-
rekê hûn xwe r’ih’et xwey kin û
tiştekî bi berzeqîyê nekin. 37 We
ev merivana anîne vira, evana ne
t’alankirêd p’aristgehê ne û ne
jî xwedêya me bêhurmet kirine.
38 Awa heger şikîyatê[f] Dîmîtrîyo
û hostayêd t’evî wî ser yekî heye,
bira her’ine dîwanxanê, h’akim
hene. Li wir ew dikarin şikîya-
tê xwe hevdu bikin. 39 Lê heger
xwestina we bona tiştekî din e,
bira civateke e’detîda bê lênihê-
r’andinê. 40 Çimkî zîyana me jî vê
yekêda heye û bona şer’ê îroyîn
emê bêne neheqkirinê[f] û me’nîk
t’une, ku em pê bikaribin bona
vê k’ombûnê caba xwe bidin».
41 Gava ev yek got, civat bela kir.

## Pawlos diçe berbi Mekedonyayê û Yûnanistanê[f]

**20** 1 Gava qalme-qalm seqir’î,
Pawlos gazî şagirta kir, dil
da wan û xatirê xwe ji wan xwest,
r’abû çû Mekedonyayê. 2 Li wan
alîya ger’îya, bi gelek gotina dil
dane wan. Paşê çû Yûnanistanê[f],
3 weke sê meha li wir derbaz kir.
Gava k’arê xwe dikir ku biçûya
Sûryayê, cihûya bona wî şêwireke
mixenetîyê kir, ew jî fikirî Me-
kedonyayêva veger’e. 4 T’evî wî ji
Beroyayê Sopatroyê kur’ê Pîro, ji
T’êsalonîkê Erîstarxo û Sêkûndo,
Gayosê ji Dêrbê û Tîmot’êyo, ji
qeza Asyayê Tixîko û Trofîmo çûn.
5 Evana pêşîya me çûne Troyayê,
li wir hîvîya me bûn. 6 Em jî pey
r’ojêd Cejina Nanê Şkevar’a bi
gemîyê ji Fîlîpyayê çûn, pênc r’o-
jada gihîştine Troyayê, cem wan.
Em wir h’eft r’oja man.

## Saxbûna Eytûxo Troyayêda

7 R’oja h’eftîyêye pêşin em bona
nankerkirinê civîyayî bûn, Pawlos
ku wê r’oja din biçûya, wanar’a
xeber dida û h’eta nîvê şevê xeber-
dana xwe dirêj kir. 8 Ew oda em
têda civîyayî bûn, gelek ç’ira têda
hebûn. 9 Xortek jî navê wî Eytûxo,
ser p’encerê r’ûniştî dihênijî û k’ete
xewa k’ûr. Û gava Pawlos xeberdana
xwe dirêj dikir, ew xewa k’ûrda ji
qatê sisîya jorda k’et û mirîtî ew
hildan. 10 Pawlos peyayî jêrê bû,
xwe avîte ser wî, da h’emêza xwe
û got: «Xwe unda nekin, çimkî
r’uh’ê wî wîda ye». 11 Paşê hilk’i-
şîya hat, nan kerkir xwar û h’eta
sibehê dirêj xeber da û r’abû çû.
12 Xort jî sax-silamet anîne mal,
bêh’esab dil hate ber wan.

## Ji Troyayê berbi Mîletosê

13 Em çûn k’etine gemîyê r’ê-
k’etin û berbi Asosê çûn, ku ji

wê derê me gerekê Pawlos hilda,
çimkî ewî mer’a gotibû: «Ezê peya
bêm». 14 Gava li Asosê r’astî me
hat, me ew hilda çûne Mitûla-
nê. 15 Ji wir jî em çûn, r’oja dinê
gihîştine pêşberî Xîyayê, r’ojtira
din gihîştine Samosê*, sibehtira
din jî gihîştine Mîletosê. 16 Pawlos
nêta xwe danîbû bi gemîyê ber
Efesêr’a derbaz bûya, ku nebe
wextê xwe qeza Asyayêda unda
ke, çimkî dilezand ku heger jêr’a
li hev bê, R’oja Pêncîye h’esab ew
li Orşelîmê be.

### Pawlos xatirê xwe ji berpirsîyarêd civîna Efesê dixwaze

17 Ji Mîletosê merî şande Efesê
û gazî berpirsîyarêd civînê[f] kirin.
18 Gava ew hatine cem wî, wanr’a
got: «Hûn xwexa zanin wê r’oja
pêşinda gava min nigê xwe avîte
qeza Asyayê, h’eta niha wer’a ça-
wa bûme. 19 Min Xudanr’a t’am
şkestî bi gelek hêsira, nava wan
cêr’ibandinada qulix kirîye, k’îjan
ku ji şêwirêd cihûya dihatine serê
min, 20 Hûn zanin ku min t’u car
xwe ji tiştêd kêrhatîye bona we
nedaye paş, lê h’emû wer’a gotine
û aşkere mal bi mal hûn hîn kiri-
ne. 21 Min bi me’rîfetî hin hîvî ji
cihûya, hin jî ji necihûya kir, ku
veger’ine[f] berbi Xwedê û bawerîya
xwe Xudanê me Îsa bînin. 22 Û
va ez bin destê R’uh’ê Pîrozda
diçime Orşelîmê, wir wê çi bê
serê min, ez nizanim. 23 T’enê
R’uh’ê Pîroz h’emû bajarîda t’e-
mîyê dide min û dibêje ku: ‹Qeyd
û tengasî[f] pêşîya te ne›. 24 Lê ez
e’mirê xwe layîqî t’u tiştî nakim,
t’enê dikim* bigihîjime meremê
xwe û wê qulixa ku min ji Xu-
dan Îsa standîye bînime sêrî, awa
gotî Mizgînîya k’erema Xwedê bi
me’rîfetî dannasîn kim.
25 Niha ez zanim îdî hûn h’e-
mûyêd ku ez nav weda ger’îyame
û P’adşatîya Xwedê dannasîn ki-
rîye r’ûyê min nabînin. 26 Bona
vê yekê ez r’oja îroyîn li ber we
şe’detîyê didim, ku cabdarê xûna
we t’u kesî nînim, 27 çimkî min
xwe neda paş, t’emamîya qirara
Xwedê wer’a got. 28 Niha miqatî
xwe û t’emamîya wî kerê pêz bin,
ku R’uh’ê Pîroz hûn ser berpirsî-
yar* k’ifş kirine. Şivantîyê civîna

* 20:15 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Şev mane Trîgîlyayê».
* 20:24 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «bi eşq û şa».
* 20:28 Aha jî tê fe’mkirinê: «Serwêr».

Xwedê bikin, ya ku Wî bi xûna
Xwe qazinc kir. 29 Ez zanim pey
çûyîna minr'a gurêd devxûn wê
bik'evine nava we û h'eyfa wan
wê kêrî neyê. 30 Ji nava weda jî
merivê derên û tiştêd xêlif wê xe-
ber din, ku şagirta pey xwe bibin.
31 Bona vê yekê h'işyar bimînin û
bîr nekin, ku min hûn her kes, sê
sala şev û r'oj bê r'ih'etî bi hêsira
şîret kirine.
32 Niha ez we dispêrime[f] Xwedê
û Xebera k'erema Wî, ku dikare
we r'uh'anîyêda ava ke û p'ara
we t'evî t'emamîya cime'ta Xwe
ke. 33 Min havijîya xwe zêr', zîv
û k'incê t'u kesî neanîye. 34 Hûn
xwexa zanin ez û yêd t'evî min
em h'ewcê çi jî bûne, ev destêd
min xebitîne. 35 Min pê h'emû
şixulêd xwe nîşanî we kirîye, ku
çawa gerekê bixebitin k'omekê
bidine k'etîya û xebera Xudan Îsa
bîr bînin ku got: ‹Xwezî li dayîya,
ne ku li standîya›».
36 Gava ev yek got, t'evî h'emûya
çok da dua kir. 37 H'emû jî gelekî
girîyan, xwe avîtine stûyê Pawlos
û r'amûsan. 38 Dilêd wan hê zêde
bona wê xebera wî dişewitî ku
got: «Hûn îdî r'ûyê min nabînin».
Paşê ew h'eta gemîyê ver'êkirin.

**Pawlos diçe Orşelîmê**

21 1 Gava em ji wan qetîyan,
bi gemîyê r'êk'etin, r'ast
çûn gihîştine Kosê, r'oja dinê
R'odosê û ji wir Patarayê. 2 Me
gemîk dît ku diçû Fînîkyayê, em
k'etine wê r'êk'etin. 3 Gava Qub-
risê xuya kir, me ew milê ç'epêva
hişt. Em berbi qeza Sûryayê çûn
gihîştine bajarê Sûrê, çimkî barê
gemîyê wir gerekê bihata valaki-
rinê. 4 Me şagirt dîtin, em h'eft
r'oja li wir man. Wana bi R'uh'ê
Pîroz digote Pawlos ku neçe Orşe-
lîmê. 5 Lê gava me ew r'oj derbaz
kirin, em r'abûn çûn û h'emûya
jina û zar'ava h'eta bajêr der em
ver'êkirin û devê be'rê me çok da
dua kir. 6 Paşê me xatirê xwe ji
hev xwest k'etine gemîyê, ewana
jî veger'îyane malêd xwe.
7 Me r'êwîtî bi gemîyê ji Sûrê dû-
mayî kir, em gihîştine Pitolêmayê,
me wir xûşk-bira silav kirin, em
r'ojekê mane cem wan. 8 R'oja din
em ji wir r'êk'etin çûne Qeyserî-
yê mala Fîlîpoyê mizgîndar[f], ew
yek ji wan her h'eft k'omekdarêd
k'ifşkirî bû*. Em li cem wî man.
9 Çar qîzêd wîye bik'ir[f] hebûn, ku
p'êxembertî dikirin. 10 Gava em

* 21:8 K'arêd Şandîya 6:1-6; 8:5.

gelek r'oja li wir man, ji Cihûstanê
p'êxemberekî navê wî Hagabo berjêr
bû*. 11 Gava hate cem me, qayîşa
pişta Pawlos hilda, dest û p'îyêd
xwe girêda û got: «R'uh'ê Pîroz
aha dibêje: ‹Ew merivê xweyê vê
qayîşê cihûyê Orşelîmêda aha wî
girêdin û bidine destê necihûya›».
12 Gava ev yek me bihîst, t'evî yêd
wir me lava kir, ku ew hilnek'işe
neçe Orşelîmê. 13 Lê Pawlos cab
da û got: «Hûn çi dikin? Çima
hûn digirîn û dilê min dişkênin?
Ez Orşelîmêda bona navê Xudan
Îsa ne ku t'enê bona girêdanê, lê
bona kuştinê jî hazir im». 14 Gava
me nikaribû ew banîya ser ya xwe,
me dengê xwe bir'î û got: «Bira
e'mirê Xudan be».

15 Çend r'oja şûnda me k'arê xwe
kir, em hilk'işîyan çûne Orşelîmê.
16 T'evî me çend şagirtêd Qeyserîyê
jî hatin, em birine mala şagirtekî
zûva, ku navê wî Minaso bû, ji
Qubrisê, wekî em li wir bimînin,

### Pawlos serîkî Aqûb û berpirsîyara dixe

17 Gava em gihîştine Orşelîmê,
bawermenda em eşq û şa qebûl
kirin. 18 R'oja dinê Pawlos t'evî me
çû cem Aqûb, h'emû berpirsîyar jî
hazir bûn. 19 Pawlos silav da wan,
yek-yek çi ku Xwedê bi qulixê wî
nava necihûyada kiribû, wanar'a
gilî kir. 20 Wana ku ev yek bihîst,
şikirî dane Xwedê û usa jî Paw-
losr'a gotin: «Dîna xwe bidê, çiqas
h'ezara cihûyêd bawermend hene
û h'emû jî xîretk'êşêd Qanûnê ne.
21 Awa wana bona te bihîstîye ku
tu h'emû cihûyêd nava necihûyada
hîn dikî, ku dest ji Qanûna Mûsa
bik'işînin û dibêjî ku ew kur'êd
xwe sinet nekin û pey e'det jî
neçin. 22 Niha em çi bikin? Wê
e'se bibihên ku tu hatîyî. 23 De
r'abe em çi ter'a dibêjin bike.
Vir cem me çar meriv hene ku
ad-qirar* kirine. 24 Wan xwer'a
hilde, t'evî wan li gora e'det paqij
be û xercê wan hilde ser xwe, ku
p'or'ê serê xwe kur' kin. Hingê
her kesê zanibe ew tiştêd ku bona
te bihîstine derew in û tu xwexa
jî pey Qanûna Mûsa diçî. 25 Lê
bona wan necihûyêd ku hatine ser
bawerîyê, me wanr'a qirara xwe
nivîsîye şandîye, wekî ew h'evza
xwe ji wan qurbanêd p'ûtp'aristîyê,

* 21:10 K'arêd Şandîya 11:28.
* 21:23 Wê ad-qirarêr'a «nezîr[f]» dibêjin. Derheqa qeyde-qanûnêd nezîrda Jimar 6:13-21-da bixûnin.

xûnê, goştê mirar[f] û bênamûsîyê
bikin»*. 26 Hingê Pawlos ew merî
r’oja dinê hildan, t’evî wan paqij
bû, k’ete p’aristgehê û xilazîya
r’ojêd paqijbûnê da e’lamkirinê,
ku wê k’engê bona wan her kesî
h’edî* bê dayînê.

## Pawlos p’aristgehêda tê girtinê

27 Gava her h’eft r’oj ser hevda
hatin, ji cihûyêd qeza Asyayê Paw-
los p’aristgehêda dîtin, t’emamîya
e’laletê t’evr’akirin, dest avîtinê
28 û kirine qîr’în gotin: «Hewar,
îsraêlîno! Alîk’arîyê bikin! Eva
ew meriv e, yê ku li her dera
h’emûya miqabilî cime’ta me,
Qanûna Mûsa û vî cîyî hîn dike,
hê serda jî yûnan kirine p’arist-
gehê, ev cîyê pîroz h’er’imand».
29 Ev yeka gotin, çimkî pêşîyê
bajêrda Trofîmoyê ji Efesê t’evî
wî dîtibûn û wan t’irê Pawlos ew
kirîye p’aristgehê.

30 T’emamîya bajêr h’ejîya, e’la-
let bi lez k’om bû, Pawlos girtin
ji p’aristgehê k’aşî derva kirin û
derêd wê pêr’a-pêr’a hatine girtinê.
31 Gava wan dikir ku wî bikujin,
cab gihîşte serh’ezarê[f] r’efa eskera,
wekî t’emamîya Orşelîmê t’evîhev
bûye. 32 Ewî pêr’a-pêr’a esker û
sersed hildan, bi lez çû ser wan.
Gava wana serh’ezar eskerava dîtin,
dest ji Pawlos k’utanê k’işandin.
33 Wî çaxî serh’ezar hate nêzîk,
ew girt, e’mir kir ku bi du zincîra
wî girêdin. Hingê pirsî: «Ev k’î
ye û çi kirîye?» 34 Nava e’laletêda
bona wî her yekî cûr’ekî dikire
qar’e-qar’. Ewî gava ji dest qal-
me-qalma cime’tê nikaribû e’seyî
bizanibûya, e’mir kir wî bibine
eskerxanê. 35 Gava Pawlos gihîşte
p’êpelînga, eskera ew bilindkirî
birin, çimkî e’laletê zor dida wî,
36 li pey wî diçûn, dikirine qîr’în
û digotin: «Wî bikujin!»

## Pawlos caba xwe li ber e’laletê dide

37 Îdî Pawlos wê bibirana hin-
dur’ê eskerxanê, ewî serh’ezarr’a
got: «Îzina min heye t’evî te xe-
ber dim?» Ewî got: «Tu yûnanî
jî zanî? 38 Ku usa ye tu ne ewî
misirî yî, yê ku çendek pêşda
kire şer’-de’w, çar h’ezar qaça-
xêd mêrkuj derxistine ber’îyê».

* 21:25 K’arêd Şandîya 15:29.

* 21:26 Bona cihûyêd ku xwe paqij dikirin, çawa h’elal bûyî, wanr’a qurban dihate dayînê.

**39** Pawlos got: «Ez merivekî cihû
me, ji Tarsûsa Kîlîkyayê, ne ba-
jarvanekî bê nav-nîşan im. Ez
hîvî ji te dikim, îzinê bide ku ez
vê cime’têr’a xeber dim». **40** Gava
ewî îzin da, Pawlos ser p’êpelîn-
ga sekinî, destê xwe bilind kir,
cime’tê ku dengê xwe bir’î, ewî
bi zimanê îbranî xeber da û got:

**22** **1** «Gelî bav û bira! Niha
guhdarîya min bikin, ku
ez caba xwe bidim». **2** Gava bi-
hîstin ku ew wanar’a bi zimanê
îbranî k’ete xeberdanê, ker’ bûn
hê dengê xwe bir’în. Û wî got:
**3** «Ez merivekî cihû me, bajarê
Tarsûsa Kîlîkyayêda ji dîya xwe
bûme, lê vî bajarîda bin destê
Gamalyêlda çawa şagirt mezin
bûme û h’emû Qanûna kal-bava
jî bi fesal-r’ast hîn bûme, hindava
Xwedêda jî xweyîxîret bûm, çawa
ku hûn h’emû îro*. **4** Min h’eta
kuştinê jî yêd ku pey vê R’ê diçûn,
dizêrandin û qisimê jin û mêra
girêdidan davîtine kelê*, **5** çawa
serekk’ahîn û t’emamîya civîna
r’ûspîya jî şe’dê min in. Min ser
birayêd cihûtîyêdaye Şamê ne’me
ji wan hildabûn diçûm wekî yêd
wir jî girêdayî bînime Orşelîmê
ku bidine cezayê.

**6** Gava ez hê r’ê diçûm, nêzîkî
Şamê bûm, r’o nava r’ojê nişkêva
ji e’zmên dora min r’onayîke qa-
yîm şewq da. **7** Ez k’etime e’rdê û
min dengek bihîst ku minr’a got:
‹Şawûl! Şawûl! Tu çima Min di-
zêrînî?› **8** Min lê veger’and: ‹Tu k’î
yî, Xudan?› Ewî minr’a got: ‹Ez
Îsayê Nisretê me, Yê ku tu dizê-
rînî›. **9** Ewêd t’evî min jî r’onayî
dîtin, lê dengê ku minr’a xeber
dida nedibihîstin. **10** Hingê min
got: ‹Ez çi bikim, Xudan?› Xudan
minr’a got: ‹R’abe her’e Şamê û li
wir her tiştê ku bona te k’ifşkirî ye
bikî, wê ter’a bê gotinê›. **11** Min ku
ji dest şewqa wê r’onayê nedidît,
hingê yêd t’evî min destê min
girtin, ez birime Şamê.

**12** Yekî navê wî Hananîya,
anegorî Qanûnê xwedêxof, nav
cihûyêd Şamêda jî ew xweyîyê
şe’detîya qenc bû, **13** eva hat cem
min sekinî û got: ‹Şawûl bira,
bibîne!› Min destxweda dît û
li wî nihêr’î. **14** Ewî minr’a got:
‹Xwedêyê kal-bavêd me tu k’ifş
kirî ku e’mirê Wî bizanibî û Yê
R’ast bibînî, xebera devê Wî

* 22:3 K’arêd Şandîya 5:34-39.
* 22:4 K’arêd Şandîya 8:3; 26:9-11.

bibihêyî, 15 çimkî tê ber h'emû
meriva bona wan tiştêd te dîtin
û bihîstin bibî şe'dê Wî. 16 Îdî
çima derengî dêxî? R'abe were
nixumandinê, gazî navê Wî ke ji
gunêd xwe were şûştinê›.

17 Gava ez veger'îyame Orşe-
lîmê û p'aristgehêda dua dikir,
mîna sih'etê ser minr'a derbaz
bû, 18 min Ew dît û Wî minr'a got:
‹Bike bilezîne ji Orşelîmê derê,
çimkî ew şe'detîya ku tê bona
Min bidî ewê qebûl nekin›. 19 Min
got: ‹Xudan, ew qenc zanin ku ez
bûm, ewî h'emû k'inîştada yêd
bawerîya xwe Te danîn, davîtine
kelê û ew dik'utan. 20 Gava xûna
Steyfanê şe'dê Te dir'ijîya, ez xwe-
xa jî wir hazir û r'azî bûm, min
nobedarî k'incêd yêd ew kuştin
dikir›*. 21 Hingê Ewî minr'a got:
‹Her'e, Ezê te bişînime dûr cem
necihûya›».

### Pawlos bajarvantîya xweda r'omayî ye

22 H'eta van xebera e'laletê
guhdarîya wî kir, paşê bi dengê
bilind gotin: «R'ûbarî dinê wî ne-
hêle! Yêd mîna wî gerekê nejîn!»
23 Wana dikirine qîr'în, k'incê
xwe diqelaştin davîtin û xwelî
dir'eşandine hewa. 24 Serh'ezar
e'mir kir, ku wî bibine esker-
xanê û got: «Bidin ber qamçîya
jê bipirsin, bizanibin k'a sûcê
wî çi ye, wekî usa ser wî dikine
qar'e-qar'». 25 Gava bi qayîşêd
ç'erm girêdan, Pawlos sersedê
sekinîr'a got: «Gelo eva cayîz e
ku hûn li bajarvanekî R'omayê
xin, yê ku hê dîwana wî nebûye?»
26 Sersed gava ev yek bihîst, çû
cem serh'ezar û got: «Tu çi dikî?
Eva meriva bajarvanê[f] R'omayê
ye». 27 Serh'ezar nêzîkî Pawlos
bû û wîr'a got: «Minr'a bêje, tu
bajarvanê R'omayê yî?» Ewî got:
«Belê». 28 Serh'ezar lê veger'and û
got: «Min bi gelek p'era ew bajar-
vantî standîye». Pawlos got: «Lê
ez yekr'ojîya xweda bajarvanê wir
im». 29 Û destxweda ewêd ku wê
lêxistana û gilî jê bik'işandana ji
wî dûr k'etin. Serh'ezar xwexa jî
tirsîya, gava bihîst ku bajarvanê
R'omayê ye, çimkî ewî ew dabû
girêdanê.

### Pawlos li ber civîna giregira

30 Sibetira din serh'ezar xwest
r'ast bizanibe k'a cihû çima şi-
kîyatê Pawlos dikin. Ew ber'da

* 22:20 K'arêd Şandîya 7:58.

û e'mir kir, ku serekêd k'ahîna
civîna giregirava bê. Hingê Pawlos
anî li ber wan da sekinandinê.

23 1 Pawlos dîna xwe da ci-
vîna giregira û got: «Gelî
bira! Min bi îsafa r'ih'et li ber
Xwedê e'mirê xwe h'eta îro derbaz
kirîye». 2 Hananîyayê serekk'ahîn
e'mirî berdestîyêd nêzîkî Pawlos
kirin ku dêvda bidinê. 3 Hingê
Pawlos wîr'a got: «Xwedêyê jî li te
xe, dîwarê sîwaxkirî! Tu r'ûniştî
yî anegorî Qanûnê dîwana min
dikî û ji Qanûnê der e'mir dikî ku
ew min xin»*. 4 Yêd cem Pawlos
sekinî gotin: «Tu serekk'ahînê
Xwedê bêhurmet dikî?» 5 Pawlos
got: «Birano, min nizanibû ku
ew serekk'ahîn e. Çawa nivîsar e:
‹Hindava serwêrê miletê xweda
xirab xeber nede›*».

6 Hingê Pawlos pê h'esîya ku
alîkî sadûqî ne, alîkî jî fêrisî, wê
civînêda kire gazî û got: «Gelî
bira! Ez fêrisî me, kur'ê fêrisîya!
Bona gumana r'abûna mirîya
dîwana min dikin». 7 Gava ev
yek got, fêrisî û sadûqî hevr'a
k'etine h'ucetê û dutîretî k'e-
te nava k'omê, 8 (çimkî sadûqî
dibêjin ne r'abûna mirîya heye,
ne milyak'et, ne jî r'uh', lê fêrisî
hersêka jî qebûl dikin)*. 9 Hingê
qalme-qalma mezin hê pêşda
hat, ji qanûnzanêd alîyê fêrisîya
hinek r'abûne p'îya û deng hildan
mêrk'îmî gotin: «Em vî merivî-
da t'u xirabîyê nabînin. Belkî
r'uh'ekî yan milyak'etekî vîr'a
xeber daye?» 10 Gava şer'-de'w
zêde bû, serh'ezar tirsîya ku ew
Pawlos qet-qetî kin, e'mirî eskera
kir ku her'ine jêrê ewî ji nav wan
bigirin bibine eskerxanê.

11 Şevtira din Xudan li ber wî
sekinî û gotê: «Serxwe be, te çawa
şe'detîya Min Orşelîmêda da, usa
jî gerekê R'omêda şe'detîyê bidî».

### Cihû t'elekê bona kuştina Pawlos hazir dikin

12 Sibeh ku zelal bû, hinek cihû
bûne yek û sond xwarin, ku h'eta
Pawlos nekujin, ne bixwin, ne jî
vexwin. 13 Ewêd ku ew sond xwarin
ji çilî zêdetir bûn. 14 Evana çûne
cem serekêd k'ahîn û r'ûspîya
gotin: «Me sond xwarîye, h'eta
ku em Pawlos nekujin, tiştekî

* 23:3 Metta 23:27-28.
* 23:5 Derk'etin 22:28.
* 23:8 Metta 22:23; Marqos 12:18; Lûqa 20:27.

te'm nekin. 15 Awa hûn t'evî ci-
vîna giregira bêjine serh'ezar ku
ewî sibê bîne cem we, yançîye[f]
hûn dixwazin derheqa wîda her
tiştî hê r'ast pê bih'esin, emê jî
hê berî hatina wî hazir bin ku
wî bikujin».
16 Lê xarzîyê Pawlos bona vê
t'elekê bihîst, hat k'ete eskerxanê
Pawlosr'a got. 17 Pawlos jî gazî
sersedekî kir û gotê: «Evî xortî
bibe cem serh'ezar, dixwaze tiştekî
wîr'a bêje». 18 Ewî jî xort bire cem
serh'ezar û gotê: «Pawlosê girtî
gazî min kir, hîvî kir ku vî xortî
bînime cem te, tiştekî wîyî gotinê
ter'a heye». 19 Serh'ezar destê wî
girt, bire alîkî û pirsî: «Tu çi di-
xwazî e'lamî min kî?» 20 Ewî got:
«Cihûya qirar kirîye ku hîvî ji te
bikin, wekî sibê Pawlos bibî civîna
giregira, yançîye dixwazin derheqa
wîda her tiştî hê r'ast bizanibin.
21 Lê wan bawer neke, çimkî ji wan
çil merîya zêdetir xwe veşartine,
hîvîya wî ne. Wana sond xwarîye,
ku ne bixwin, ne jî vexwin h'eta
wî nekujin. Wana niha k'arê xwe
kirîye, hîvîya qirara te ne». 22 Wî
çaxî serh'ezar xort ver'êkir û t'emî
da wî: «Kesîr'a nebêje, ku te ev
yek minr'a gotîye».

**Pawlos dişînine Qeyserîyê cem Felîksê welî**

23 Serh'ezar gazî du serseda kir
û got: «Dusid eskerî hazir kin,
h'eftê sîyarî, dusid jî r'imdar, wekî
şev sih'eta neha h'eta Qeyserîyê
her'in. 24 Usa jî çend hespa ha-
zir kin, wekî Pawlos lê sîyar kin,
ku bê qede bê bela bibine cem
Felîksê welî». 25 Ne'mek jî bi vê
fikirê nivîsî:
26 «Ji Klawdyo Lûsyo,
Silav Felîksê welîyê xweyî-
qedirr'a!
27 Eva meriva ji cihûya hatibû
girtinê, wê bi destê wan bihata
kuştinê, ez pê h'esîyam ku r'o-
mayî ye, bi eskerava gihîştimê
û min ew xilaz kir. 28 Min xwest
ku bizanibim k'a bona çi şikîyatê
wî dikin, min ew bire ber civîna
giregirêd wan 29 û k'ifş kir, ku
şikîyatê wan ser pirsêd qanûna
wan e, lê bona kuştinê yan gir-
tinê xirabîya wî t'uneye. 30 Gava
cab gihîşte min, ku cihûya bona
wî merivî t'elekek hazir kirîye,
min destxweda ew şande cem
te û e'mirî li şikîyatkira kir, ku
çî wanî miqabilî wî hebe, li ber
te bêjin*».

* 23:30 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Saxîya te dixwazim».

31 Eskera jî anegorî wî e’mirê
ku standin, Pawlos şev hildan
birine Entîpetrîsê. 32 R’oja dinê
yêd sîyarî Pawlosr’a danîn ku
t’evî wî her’in, lê yêd peya xwexa
veger’îyane eskerxanê. 33 Ewêd
sîyarî gihîştine Qeyserîyê, ne’me
dane welî, Pawlos jî dane destê
wî. 34 Ewî ew ne’me xwend, pirsî
ji k’îjan qezayê ye, ku pê h’esîya
ji Kîlîkyayê ye, 35 got: «Ezê hingê
guhdarîya te bikim, k’engê şikîyat-
kirêd te bên». Û e’mir kir, ku ew
qesira Hêrodesda bê xweykirinê.

### Cihû şikîyatê Pawlos dikin

**24** 1 Pênc r’oja şûnda Hana-
nîyayê serekk’ahîn t’evî
hineke ji r’ûspîya û Tertûloyê
zanebêj[f] berjêr bû hate Qeyserîyê.
Vana bona Pawlos gilî-gazinê xwe
welîr’a kirin. 2-3 Gava gazî Pawlos
kirin, Tertûlo dest bi şikîyata kir
û got: «Em t’imê û her dera wan
kirinêd te dişêkirînin, Felîksê
xweyîqedir, ku saya serê te evî
miletê me gelek e’dilayî dîtîye û
gelekî pêşda çûye. 4 Lê wekî ge-
lekî serê te neêşînim, hîvî dikim
ji k’erema xwe kin guhdarîya me
bike. 5 Me ev meriva dît, çawa
mîna belakê k’etîye nava h’emû
cihûyêd ser dinê t’evîhev dike û
r’êberê k’omela nisretîya[f] ye. 6 Evî
kir ku p’aristgehê jî bih’er’imîne,
lê me ew girt*. 8 Heger tu ji wî
bipirsî, tê xwexa bikaribî ji wî
her tiştî bizanibî k’a bona çi em
şikîyatê wî dikin». 9 Cihûya jî go-
tina wî e’seyî kirin, gotin: «Belê,
ev yek usa ye».

### Pawlos caba xwe li ber Felîksê welî dide

10 Gava welî pê serîya kir ku ew
xeber de, Pawlos lê veger’and û
gotê: «Ez zanim ku gelek sal in
tu h’akimê vî miletî yî, ezê jî bi
r’ezedilî bona xwe caba xwe bidim.
11 Çawa ku tu dikarî bizanibî, eva
donzdeh r’oj t’une, ku ez bona
h’ebandinê hevraz çûbûme Or-
şelîmê. 12 Evana ez nedîtime ku
p’aristgehêda t’evî yekî têk’evime
de’wê, yan jî k’inîştada usa jî cîkî
din bajêrda e’laletê dora xwe t’op
kim. 13 Û ne jî niha dikarin gotinêd
xwe îzbat kin, ku bona çi şikîyatê
min dikin. 14 Lê ezê aşkere ter’a
bêjim, wekî li gora wê R’îya ku

* 24:6 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Me dixwest ku em dîwana wî anegorî qanûna xwe bikin, (r’êza 7) lê Lûsyoyê serh’ezar ser meda girt, bi zorê ji destê me stand û e’mir kir, ku şikîyatkirê wî bêne cem te».

ewana jêr’a k’omela şih’itî[f] dibêjin,
ez hema usa Xwedêyê kal-bavêd
xwe dih’ebînim. Û çi ku Qanûn û
nivîsarêd p’êxemberada jî nivîsar
e, bawer dikim. 15 Ez Xwedêda jî
guman im, çawa ku ew jî wê gu-
manê ne, ku h’emû heq û neheqê
ji mirinê r’abin. 16 Bona vê yekê
çiqas ji min tê, ez dice’dînim
h’emû wextî bi îsafa r’ih’et li ber
Xwedê û meriva bim.
17 Awa pey gelek salar’a ez ve-
ger’îyam hatime Orşelîmê, ku
k’omekê bidime miletê xwe û
h’edîya bidim. 18 Hingê wî şixulîda
ez p’aristgehêda paqijbûyî dîtim li
gora e’detê me. Ez ne t’evî e’laletê
bûm, ne jî şer’ûda. 19 Lê ji wan
çend cihûyêd qeza Asyayê li wir
bûn. Heger hindava minda tiştekî
wanî gotinê hebûya, ew gerekê bi-
hatana ber te bisekinîyana şikîyatê
min bikirana. 20 Yan jî bira evana
bêjin, gava ez ber civîna giregira
sekinî bûm, çi xirabî ser min dîtin,
21 pêştirî vê yekê, ku min bi dengê
bilind nava wanda gotîye: ‹Bona
bawerîya r’abûna mirîya hûn îro
dîwana min dikin›»*.
22 Felîksva ew R’ê ku r’ind e’yan
bû, hingê ewî şixulê wan paşda
avît û got: «K’engê Lûsyoyê ser-
h’ezar berjêr bê, ezê hingê bona
şixulê we qirara xwe bidim». 23 Ewî
e’mirî sersed kir, ku Pawlos p’i-
r’î-hindikî aza xwey kin û îzina
heval-hogirêd wî jî bidin, yê ku
wê k’omekdarîya wî bikin.

**Pawlos girtî dimîne**

24 Çend r’oja şûnda Felîks t’evî
Dirûsîla k’ulfeta xweye cihû hat,
gazî Pawlos kir û bona wê bawerîya
ser Mesîh Îsa ji wî bihîst. 25 Paw-
los hê bona r’astîyê, xwegirtinê û
dîwana Xwedêye ku wê bê xeber
dida, Felîks saw k’işand û got:
«Tu niha her’e. Gava wextê min
hebe, ezê gazî te kim». 26 Usa jî
ew wê gumanê bû, ku ji Pawlos
p’ere bistanda, bona wê yekê jî
gelek cara gazî wî dikir û t’evî
wî xeber dida.
27 Gava du sal derbaz bûn,
dewsa Felîks Porkîyo Fêsto bû
welî. Felîks jî ku dixwest qencî
cihûyar’a bikira, Pawlos girtî hişt.

**Pawlos de’wa dîwana
Qeyser dike**

25 1 Pey sê r’ojar’a, gava
Fêsto derbazî ser qulixa
xwe bû, ew ji Qeyserîyê hevraz
çû Orşelîmê. 2 Serekêd k’ahîna

* 24:21 K’arêd Şandîya 23:6.

û giregirêd cihûya bona Pawlos
şikîyatê xwe li wî kirin 3 û hîvî
kirin ku bike qencî wî bîne Orşe-
lîmê, çimkî wana t'elek çêkiribû
ku r'êva wî bikujin. 4 Lê Fêsto li
wan veger'and û got: «Pawlos wê
li Qeyserîyê girtî bimîne û ezê
xwexa jî zûtirê her'ime wir. 5 Awa
bira serwêrêd we t'evî min berjêr
bin û heger neheqîke wî merivî jî
hebe, bira gunek'arîya wî bêje».
6 Wir nehe-dehe r'oja nav wan-
da ma, paşê berjêr çû Qeyserîyê,
r'oja din li herema dîwanê r'û-
nişt, e'mir kir ku Pawlos bînin.
7 Gava Pawlos hat, cihûyêd ku ji
Orşelîmê berjêr hatibûn dora wî
girtin û gelek buxdanêd giran li
wî dikirin, lê nikaribûn îzbat ki-
rina. 8 Pawlos caba xwe da û got:
«Min hindava Qanûna cihûya
yan p'aristgehê yan jî Qeyserda
t'u neheqî nekirîye».
9 Fêsto jî xwest ku cihûyar'a
qencîyê bike, li Pawlos veger'and
û got: «Tu dixwazî hevraz her'î
Orşelîmê, ku bona van tişta dî-
wana te ber min wir bê kirinê?»
10 Pawlos got: «Ez li ber dîwana
Qeyser sekinî me, li k'u jî dîwana
min gerekê bibe. Min xirabîk li
cihûya nekirîye, çawa tu xwexa jî
qenc zanî. 11 Awa heger ez neheq
im û min tiştekî usa kirîye ku ge-
rekê bême kuştinê, ez ji mirinê
venak'işim, lê heger neheqîya min
vê yekêda t'une, çawa ku ewana
şer'a davêjine min, kes nikare
min bide destê wan. Ez de'wa
dîwana Qeyser dikim». 12 Hingê
Fêsto t'evî şîretk'ara xeber da,
paşê li wî veger'and û gotê: «Tu
de'wa Qeyser dikî, gerekê tu her'î
cem Qeyser».

### Pawlos li ber Egrîpa[f] û xûşka wî Bernikê

13 Çend r'oj derbaz bûn, Egrîpa
p'adşa û Bernikê hatine Qeyse-
rîyê, ku Fêsto silav kin. 14 Gava
gelek r'oj li wir derbaz kirin, Fêsto
bona Pawlos e'lamî p'adşê kir û
got: «Vir merivek heye ku ji hêna
Felîksda ew girtî maye. 15 Gava ez
çûme Orşelîmê, serekêd k'ahîna
û r'ûspîyêd cihûya şikîyatê wî
ber min kirin û hîvî kirin ku ez
dîwana wî bikim. 16 Min li wan
veger'and û got, wekî ne e'detê
r'omayîya ye ku merivekî bêxeda
bidine der, h'eta mecalê nedine
yê gunek'ar, ku li ber şikîyatkirêd
xwe bisekine û r'û bi r'û ber wan
caba xwe bide. 17 Gava ewana
hatine vira, min derengî neêxist,
r'oja dinê ez li herema dîwanê
r'ûniştim û min e'mir kir, ku wî
merivî bînin. 18 Gava yêd ku ew

gunek'ar dikirin r'abûn ku xeber
din, min bona çi xirabîyêd ku şik
dibire wî, t'u kesî bona wan yeka
tiştek negot. 19 Lê de'wa wan t'evî
wî bona pirsa h'ebandina wan bû
û ser Îsakî mirî, ku Pawlos dibêje
Ew sax e. 20 Hingê min nizanibû
ku çawa ev pirsana e'seyî bikira-
na, min ji wî pirsî: ‹Tu dixwazî
her'î Orşelîmê, ku bona van tişta
ber dîwanê bisekinî?› 21 Lê çaxê
Pawlos xwest ku şixulê wî her'e
ber Qeyser û bê lênihêr'andinê,
min e'mir kir ku ew girtî bimî-
ne, h'eta ku ez wî bişînime cem
Qeyser». 22 Egrîpa Fêstor'a got:
«Min jî dixwest xeberdana wî
merivî bibihîsta». Ewî jî got: «Tê
sibê wî bibihêyî».
23 R'oja dinê Egrîpa û Bernikê
bi r'ewşa mezin t'evî serh'ezar û
giregirêd bajêr hatine k'oç'ikserê,
Fêsto e'mir kir û Pawlos anîn.
24 Fêsto got: «Egrîpa p'adşa û
h'emûyêd hazir! Hûn vî dibînin,
t'emamîya cime'ta cihûya hin
Orşelîmêda, hin jî vira şikîyatê vî
ber min dikirin û dikirine qîr'în
digotin: ‹Ew gerekê sax nemîne!›
25 Lê min k'ifş kir ku evî tiştekî
usa nekirîye ku bê kuştinê û xwe-
xa jî de'wa dîwana Qeyser dike,
min qirar kir ku wî bişînim. 26 Lê
bona vî tiştekî e'seyî t'une xweyê
xwer'a binivîsim, bona vê yekê
min ev anî ber we, îlahî[f] ber te
Egrîpa p'adşa, wekî ev yek dîsa
bê lênihêr'andinê, hingê tiştekî
minî nivîsarê wê hebe. 27 Çimkî
tiştekî bê aqilî ye, heger ez girtî-
kî bişînim û bona sûcê wî tiştekî
nenivîsim».

### Cabdarîya Pawlos li ber Egrîpa

26 1 Hingê Egrîpa Pawlosr'a
got: «Îzina te heye ku tu
bona xwe xeber dî». Wê demê Paw-
los destê xwe bilind kir, caba xwe
da. 2 «Egrîpa p'adşa, bona h'emû
şikîyatêd ku cihû li min dikin, ez
îro xwe bextewar h'esab dikim ku
ber te sekinî me caba xwe didim,
3 îlahî vê pirsêda ku tu haş ji h'emû
e'det û pirsêd cihûya heyî. Bona
vê yekê ez ji te hîvî dikim, bi sebir
guhdarîya min bikî.
4 H'emû cihû zanin ku min çawa
e'mirê xwe ji zar'otîya xweda girtî
nava miletê xwe û li Orşelîmêda
derbaz kirîye. 5 Ewana zûva min
nas dikin, heger bixwazin, dikarin
şe'detîyê bidin, wekî ez anegorî
e'detê k'omela dînê meyî h'işk
jî fêrisî bûme. 6 Û niha jî bona
gumana wî sozê ku Xwedê da-
ye kal-bavêd me dîwana min tê
kirinê, 7 xût bona wî sozê ku her

donzdeh e'şîrêd me bi dil û can,
şev û r'oj Xwedê h'ebandine, wekî
bigihîjine ewê yekê. Belê bona vê
gumanê ye, ku cihû şikîyatê min
dikin, p'adşayî xweş be. 8 Hûn
çima nikarin bawer bikin, ku
Xwedê wê mirîya ji mirinê r'ake?

9 Min xwexa jî kiribû deynê
stûyê xwe, ku miqabilî navê Îsayê
Nisretê gelek tişt bikira 10 û min
Orşelîmêda kir jî. Min ji serekêd
k'ahîna h'ukum stand û gelekêd
ji cime'ta Xwedê davîtine kelê û
gava dihatine kuştinê, min jî den-
gê xwe dida. 11 H'emû k'inîştada
gelek cara min ew didane cezayê
û dikir ku zorê bidime wan ku
wê bawerîya xwe înk'ar kin. Min
k'îna wan girtibû, h'eta bajarêd
xerîbda jî ew dizêrandin*.

12 Awa ez carekê bi h'ukum û
e'mirê serekêd k'ahîna diçûme
Şamê. 13 R'oj nîvro bû, p'adşayî
xweş be, r'êva min dît ji e'zmên
r'onayîke ji r'onayîya te'vê zortir
dora min û yêd t'evî min diha-
tin şewq da. 14 Em h'emû k'etine
e'rdê, min dengek bihîst ku bi
zimanê îbranî minr'a got: ‹Şawûl!
Şawûl! Tu çima Min dizêrînî? Tu
bi k'ulmê nikarî her'î dirêşê*›.
15 Min got: ‹Tu k'î yî, Xudan?›
Xudan got: ‹Ez ew Îsa me, Yê
ku tu dizêrînî. 16 Niha r'abe ser
nigêd xwe, Ez bona wê yekê teva
xuya bûm, ku te bikime berdes-
tîyê Xwe û şe'dê wî tiştê ku te dît
û wan tiştêd ku Ezê paşê ber te
vekim. 17 Ezê te ji destê cime'ta
Îsraêlê û necihûya xilaz kim. Va
Ez te dişînime nava wan, 18 wekî
ç'e'vêd wan vekî, ji te'rîstanîyê
berbi r'onayê û ji h'ukumê mîrê-
cin berbi Xwedê veger'înî, wekî bi
saya wê bawerîya ser min, gunêd
wan bêne baxşandinê û t'evî p'ara
cime'ta Min bin›.

19 Awa Egrîpa p'adşa, ez miqabilî
wê dîtina li berç'e'vaye ji e'zmên
nesekinîm. 20 Lê min pêşîyê yêd
Şamê, Orşelîmê û t'emamîya
t'opraxêd Cihûstanêr'a dannasîn
kir, usa jî necihûyar'a, ku t'obe
kin berbi Xwedê veger'in û kirêd
qenc bikin, wekî bê k'ifşê ew ji
gunekirinê veger'îyane*. 21 Bona
vê yekê cihûya ez p'aristgehê-
da girtim, xwestin min bikujin.
22 Lê min ji Xwedê k'omek stand
û h'eta îro ez mame, şe'detîyê

* 26:11 K'arêd Şandîya 8:3; 22:4-5.

* 26:14 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Tu çifta nikarî bavêjî şiva sertûj».

* 26:20 K'arêd Şandîya 9:20-29.

didime biç’ûk û mezina. Tiştekî
zêde jî ji wan tiştêd ku p’êxem-
bera û Mûsa gotibûn wê bibin,
min negotîye: 23 Gerekê Mesîh
cefa bik’işanda, bibûya yê pêşin
ji nava mirîya r’abûyî û r’onaya
xilazbûnê miletêd cihû û neci-
hûyar’a dannasîn kira»*.

24 Gava Pawlos aha caba xwe da,
Fêsto bi dengê bilind got: «Tu xwe
unda dikî, Pawlos! P’ir’xwendina
te te unda dike». 25 Pawlos gotê:
«Ez xwe unda nakim Fêstoyê
xweyîqedir, lê xeberêd r’ast û çê
dibêjim. 26 P’adşa haş ji van tişta
heye, lema jî ez aza xeber didim û
bawer nakim ku tiştek ji wî veşartî
mabe, çimkî ev yeka qulç’ekîda
nebûye. 27 Egrîpa p’adşa, tu p’ê-
xembera bawer dikî? Zanim ku tu
bawer dikî». 28 Egrîpa Pawlosr’a
got: «Te t’irê tu usa zû dikarî min
bikî mesîhî[f]?»* 29 Pawlos got: «Ez
hîvî ji Xwedê dikim, zû-dereng
ne ku t’enê tu, lê h’emûyêd ku
îro guhdarîya min dikin, usa bin
çawa ez im, pêştirî van qeyda».

30 Hingê p’adşa r’abû p’îya,
welî, Bernikê û h’emûyêd t’evî wî
r’ûniştî jî pêr’a. 31 Ew derk’etine
derva, hevr’a xeber dan û gotin:
«Eva meriva tiştekî usa nake ku bê
kuştinê yan girtinê». 32 Lê Egrîpa
Fêstor’a got: «Me dikaribû eva
meriva ber’da, heger evî de’wa
dîwana Qeyser nekira».

## R’êwîtîya Pawlose paşin h’eta R’omê (27:1–28:16)

### Pawlos bi gemîyê dibine bajarê R’omê

27 1 Gava qirar kirin ku em
bi gemîyê her’ine Îtalyayê,
Pawlos û çend girtîyêd din dane
destê sersedekî ji r’efa eskerêd
Qeyser, navê wî Yûlyo. 2 Em k’etine
gemîke ji Edremîtê, ku wê gemî-
wargehêd qeza Asyayêva biçûya
û r’êk’etin. Erîstarxoyê mekedonî
jî ji T’êsalonîkê mer’a bû. 3 R’oja
dinê em Saydayê peya bûn, Yûlyo
qencî Pawlosr’a kir, îzin da ku
her’e cem dostêd xwe, wekî bona
wî xem bikin. 4 Ji wir r’êk’etin,
dest bayê pêşîya me, em te’ldê
Qubrisêr’a derbaz bûn. 5 Gava
em nava be’ra pêşberî Kîlîkya-
yê û Pamfîlyayêva derbaz bûn,

* 26:23 Korint’î I, 15:20; Îşaya 42:6; 49:6.
* 26:28 Aha jî tê fe’mkirinê: «Hindik ma ku tu min jî bikî mesîhî».

gihîştine Lîkyayê, bajarê Mîrayê.
6 Wir sersed gemîke Skenderyayê
dît ku diçû Îtalyayê, em kirine wê
gemîyê. 7 Hêdî-hêdî gelek r'ojada
em bi zorekê nêzîkî Kinîdyayê bûn.
Bê ku r'ê nedida me, em binat'ara
Kirêtayê ber Salmonêr'a derbaz
bûn. 8 Em bi zorekê wirr'a derbaz
bûn gihîştine cîkî, ku jêr'a dibêjin
Gemîwargehêd[f] Bedew, ku nêzîkî
bajarê Laseyayê bû.

9 Gelek wext ku li wir derbaz
bû, r'êwîtîya gemîyê jî bi qezîyava
girêdayî bû, R'oja R'ojîya[f]* jî îdî
derbaz bibû. Pawlos şîret li wan kir
û got: 10 «Gelî meriva! Ez dibînim
ku ev r'êwîtîya bi gemîyê gelek zî-
yanê û cefava girêdayî ye, ne ku
t'enê bona bar û gemîyê, lê bona
e'mirê me jî». 11 Lê sersed hê gur'a
gemîvan[f] û xweyê gemîyê dikir, ne
ku xeberêd Pawlos. 12 Ew gemîwar-
geh bona derbazkirina zivistanê
ne qenc bû, lema jî geleka ji wan
qirara xwe da ku ji wir her'in, belkî
bikaribin bigihîjine bajarê Fînîksê
û li wir zivistanê derbaz kin. Eva
bajara gemîwargeheke girava Ki-
rêtayê ye, ku li başûr-r'oavayê û
bakur[f]-r'oavayê dinihêr'e.

### Firtona[f] be'rê

13 Gava bayê başûrêyî nerm hat,
wana t'irê îdî gihîştine meremê
xwe, lengere k'işandin r'êk'etin û
xwe li hêşîya[f] Kirêtayê girtî çûn.
14 Lê xêlekê şûnda firtoneke[f] qayîm
li me r'abû, ku jêr'a dibêjin Êvrî-
kilon*. 15 Firtonê li gemîyê xist û
gemî nikaribû miqabilî wê biçûya,
dest jê k'işandî em ji bê hatine
ajotinê. 16 Me xwe da ber te'ldê
giraveke biç'ûk, navê wê Kawda,
li wir bi zorekê qeyik girt 17 k'i-
şande jor û bi werisa gemî binîva
şidandin. Ewana tirsîyan ku nebe
gemî lîla[f] Sûrtisêda r'ûnê, bap'êş[f]
anîne xwarê û aha ji bê dihatine
ajotinê. 18 Ji dest qayîmîya firtonê,
barê gemîyê r'oja din r'êtine be'rê.
19 R'oja sisîya wana bi destê xwe
hacetêd gemîyê avîtine be'rê. 20 Ew
çend r'oj bûn te'v û steyrk nediha-
tine xuyanê, firtone jî nedisekinî.
Heyneser bona xilazbûnê gumana
me h'emû hate bir'înê.

* 27:9 Bi gotineke din: «R'ojîya R'oja[f] K'ewandinê» (Qanûna K'ahîntîyê 16:29; 23:26-32). R'oja vê cejinê her sal hev nagire, carna dik'eve meha neha, carna jî ya deha. Heger ev serhatî sala 59-da qewimîbe çawa hinek zane bawer dikin, hingê ev qewimandin dik'eve 5-ê meha deha h'esabê niha.
* 27:14 «Êvrîkilon» bi zimanê yûnanî aha tê fe'mkirinê: «Bayê ku ji bakur-r'ohilatê tê».

**21** Ew çend r'oj bûn jî bir'çî ma-
bûn, Pawlos nava wanda sekinî û
got: «Gerekê we gur'a min bikira
e'vdno, ji Kirêtayê dernek'etana,
hingê weyê ev zîyan û cefa nek'i-
şanda. **22** Niha jî ez hîvî dikim,
ku hûn dil bidine ber xwe, çim-
kî pêştirî gemîyê zîyanê li me
t'u kesî nebe. **23** Çimkî hema vê
şeva derbazbûyî milyak'etekî[f] wî
Xwedêyê ku ez p'ara Wî me û Wî
dih'ebînim, minva xuya bû **24** û
got: ‹Netirse, Pawlos! Gerekê tu
li ber Qeyser bisekinî. Va Xwedê
h'emûyêd t'evî te gemîyêda dane
xatirê te›. **25** Niha dil bidine ber xwe
e'vdno, çimkî ez Xwedêda bawer
im, ku çawa minr'a hate gotinê,
wê usa jî bibe. **26** Lê t'enê emê
bêne ajotinê û beja giravekê xin».

**27** Şeva çardeha bû ku em be'ra
Adrîyatîkêda ji bê dihatine ajoti-
nê. Nîvê şevê gemîvana k'ifş kir,
ku digihîştine bejekê[f], **28** k'ûrpîv
avîtinê, dîtin ku qasî çil mêti-
rî bû, hinekî jî pêşda çûn, dîsa
avîtinê dîtin ku qasî sî mêtirî
bû. **29** Hingê em tirsîyan ku nebe
em cîkî kevirî xin, paşîya gemî-
yêva çar lengere avîtin û bi dua
ç'e'vnihêr'îya sibehê bûn. **30** Lê
gemîvana xwest ku ji gemîyê bi-
r'evin, qeyik ji gemîyê peya kirin,
bi wê me'nîyê yançîye dixwazin
pêşîya gemîyêva jî lengera bavêjin,
**31** Pawlos sersed û eskerar'a got:
«Heger evana gemîyêda nemînin,
hûn nikarin xilaz bin». **32** Hingê
eskera kapêd qeyikê qetandin,
ber'dan ku wêda her'e.

**33** Berbanga sibehê Pawlos hîvî
ji wan h'emûya kir ku nên bixwin
û got: «Eva çardeh r'oj e ku hûn
ç'e'vnihêr'î bir'çî mane û we t'u
tiştnexwarîye. **34** Awa ez hîvî ji
we dikim, nanê xwe bixwin, ku
ev jî bona xilazbûna we ye, t'êlekî
p'or'ê serê weyê unda nebe». **35** Û
gava ev yek got, nan hilda li ber
h'emûya şikirîya xwe Xwedê anî,
kerkir û destpêkir xwar. **36** Wî çaxî
bîn hate ber h'emûya, wan jî nan
xwar. **37** Em h'emû hevr'a gemîyêda
dusid h'eftê şeş merî bûn. **38** Gava
nan xwarin, t'êr bûn, genim r'êtine
be'rê gemî sivik kirin.

### Qezîya gemîyê

**39** Sibeh ku zelal bû, e'rd nas
nedikirin, lê delaveke be'rê r'aç'e'v
kirin, ku hêşîya wê hebû û dixwes-
tin belkî bikaribin binê gemîyê
wir e'rdê xin. **40** Lengere ji binî
qetandin, be'rêda hiştin, hingê jî
werisêd fitilokêd[f] zivir'andinê ku
digirtin sist kirin û bap'êşa pêş dane
bê, xwe li wê hêşîya be'rê girtin.
**41** Lê li girekî binê avê xistin, lîlêda

r'ûnişt, pozê gemîyê têda ma û îdî
neh'ejîya, pişta wê jî ji dest qayîmî-
ya pêla hûrdexweşî dibû. 42 Hingê
eskera qirar kirin ku girtîya bikujin,
wekî sobek'arîyê nedin ner'evin.
43 Lê sersed ku dixwest Pawlos
xilaz kira, nehişt ku ew şêwira
xwe bînine sêrî. Hingê e'mir kir
ku yêd sobek'arîyê zanin, pêşîyê
xwe bavêjine avê derêne bejê, 44 lê
yêd mayîn, hinek ser t'exta, hinek
jî ser p'arç'êd gemîyê derên. Û
bi vî awayî aha h'emû xilaz bûn,
derk'etine bejê.

## Girava Maltayêda

**28** 1 Gava em xilaz bûn, hingê
em pê h'esîyan, ku navê wê
giravê Malta ye. 2 Binelîyêd wir
gelek qedir-hurmet[f] mer'a kirin,
agir vêxistin, ji ber wê sermayê û
barana ku destpêkir em qebûl kirin.
3 Hingê Pawlos bermile qirş berev
kir danî ser êgir, me'rek ji dest ger-
mê derk'et, dev avîte destê wî girt.
4 Binelîya gava r'e'wirê destê wîva
dardabûyî dît, hevr'a gotin: «Eva
r'astî mêrkuj e, ji be'rê xilaz bû, lê
xudanê Heqîyê nehişt ku ew bijî».
5 Lê Pawlos r'e'wirê destê xweva
dawşande nava êgir û zîyan li wî
nebû. 6 Ewana jî hîvîya wê yekê
bûn ku wê biwerime yan nişkêva
bik'eve bimire, gava gelekî hîvîyê
man û dîtin ku t'u tişt li wî nehat,
fikirê xwe guhastin û gotin: «Eva
xwedêk e».

7 Li wî cîyê dor-berêd wan ber-
gêd serwêrê wê giravê hebûn, ku
navê wî Poplîyo bû. Ewî hurmet
mer'a kir, sê r'oja em cem xwe
xwey kirin. 8 Bavê Poplîyo t'ayêda
bi zikêşîyê nexweş p'aldayî bû.
Pawlos çû cem wî, dua kir, destêd
xwe danîne ser wî û ew qenc kir.
9 Gava ev yeka qewimî, nexweşêd
mayîne wê giravêda jî dihatin qenc
dibûn. 10 Wana gelek qedir-hurmet
mer'a kirin û gava em r'êk'etin,
ew tiştêd ku bona r'ê wê kêrî me
bihatana mer'a dagirtin.

## Ji Maltayê h'eta R'omê

11 Sê meha şûnda em bi gemîya
Skenderyayê r'êk'etin, ku wê jî
zivistan li wê giravêda derbaz
kiribû, şikilê her du xudanêd He-
val-cêwî* jî ser bû. 12 Em gihîştine

* 28:11 Usa tê fe'mkirinê ku şikilê «xudanêd Heval-cêwî» ser pozê gemîyê darda k'olayî bûn, yan jî «xudanêd Heval-cêwî» navê gemîyê bû. «Xudanêd Heval-cêwî» ew xwexa xwedêyêd yûnanaye heval-cêwî bûn, kur'êd Zews, navê yekî Kastor, navê yê din jî Polûks bû. Gemîvana ew dih'ebandin, bi yûnanî jî wanr'a digotin: «Dîyoskûro».

Sîrekûsê, sê r’oja wir man. 13 Ji
wir jî em çûn gihîştine R’êgîyomê.
R’ojekê şûnda bayê başûrê hat,
em du r’ojada gihîştine Potîyolê.
14 Wir me xûşk-bira dîtin û hîvî
ji me kirin, ku em h’eftêkê wir
bimînin. Û bi vî awayî em gihîş-
tine R’omê. 15 Xûşk-birayêd wir jî
bona me bihîstibûn, pêşîya meda
hatin h’eta Meydana Epîyû û Sê
Mêvanxana. Pawlos ku ew dîtin,
şikirî da Xwedê û dilê wî şidîya.

### Pawlos R’omêda Mizgînîyê dide

16 Gava em gihîştine R’omê*,
îzin dane Pawlos ku t’enê t’evî
wî eskerê ku nobedarîyê wî dike
bimîne. 17 Sê r’oja şûnda Pawlos
gazî giregirêd cihûya kir, gava
ew hatin, wanr’a got: «Gelî bira!
Min tiştekî miqabilî cime’tê yan
kal û bava nekirîye, lê Orşelîmêda
ez girtim dame destê r’omayîya.
18 Gava ez anîme ber dîwanê,
xwestin min ber’din, çimkî ser
min bona kuştinê t’u xirabî nedî-
tin. 19 Lê gava cihûya miqabilî wê
yekê xeber dan, min îdî bêç’arîya
xwe de’wa Qeyser kir, lê ne bona
wê yekê, ku şikîyatê miletê xwe
bikira*. 20 Lema jî min hîvî kir, ku
we bibînim û t’evî we xeber dim.
Belê ez bona gumana Îsraêlê van
qeyd-zincîrada me». 21 Wana jî wî-
r’a got: «Me bona te ji Cihûstanê
ne ne’me standîye, ne jî ji birayêd
me kes hatîye bona xirabîya te gilî
kirîye yan xeber daye. 22 Lê em
dixwazin ji te bibihên, k’a bîr û
bawerîya te çi ye, çimkî bona wê
k’omelê meva îdî e’yan e ku h’e-
mû cîya miqabilî wê xeber didin».

23 Awa r’ojek k’ifşkirin û wê r’o-
jêda gelek hatine wî cîyê ku Pawlos
têda dima. Ewî sibê h’eta êvarê
wanar’a bona P’adşatîya Xwedê
şirovedikir û bi me’rîfetî dannasîn
dikir, derheqa Îsada jî bi Qanûna
Mûsa û nivîsarêd p’êxembera ew
didane bawerkirinê. 24 Hineka xwe
li gotinêd wî girtin, hineka jî bawer
nekir. 25 Awa berî çûyîna wan nava
wanda bû dutîretî gava Pawlos ev
yek got: «Çawa r’ast R’uh’ê Pîroz
bi Îşaya p’êxember t’evî kal-bavêd
me xeber da 26 û got:

‹Her’e cem vê cime’tê û bêje:
Hûnê bibihên û guh bidinê, lê
fe’m nekin,
hûnê binihêr’in û dîna xwe
bidinê, lê nebînin.

* 28:16 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Sersed girtî spartine seresker».
* 28:19 K’arêd Şandîya 25:11.

27 Çimkî eva cime'ta serh'işk e,
bi guha giran dibihên
û ç'e'vêd xwe girtine,
wekî bi ç'e'va nebînin,
bi guha nebihên
û bi h'iş fe'm nekin, veneger'in,
ku Ez wan qenc kim›*.
28 Awa bira weva e'yan be, wekî
xilazkirina Xwedê necihûyar'a
hate şandinê û ewê guhdarîya
Wî bikin»*.
30 Pawlos t'am du sala mala
xweye k'irêkirîda ma, k'î jî di-
hate cem wî, h'emû qebûl diki-
rin. 31 Ewî P'adşatîya Xwedê bi
mêrk'îmî bê pêşîgirtin dannasîn
dikir û derheqa Xudan Îsa Mesîh-
da hîn dikir.

* 28:27 Îşaya 6:9-10.
* 28:28 Nav hinek destnivîsarada r'êza 29-a jî heye: «Û gava ev yek got, cihû derk'etine derva û qir'ika hev digirtin».

# NE'MA PAWLOS R'OMAYÎYAR'A

## Pêşgotin

Pey r'abûna Mesîhe[f] ji mirinê, gava çend sal derbaz bûn, mesîhî[f] gihîştine R'omayê[f] jî, awa gotî p'ayt'extê Împêratorîya R'omayê. Pawlosê ku qulixê şandîtîyê[f] ji Xwedê standibû, wekî nava necihûyada bixebite, xwest her'e R'omayê û ji wir jî her'e h'eta Spanyayê. Berî wê r'êwîtîyê Pawlos bawermendêd R'omayêr'a evê ne'mê dinivîse (15:24-28). Bi fikira zana ewî eva ne'ma sala 56-a, 57-da bajarê Korint'êda nivîsîye. Ne'mêda şirovedike, ku çawa bawerî[f] û k'erem[f] e'mirê bawermendada cî digire û ya xwe dike.

Pawlos aha destpêdike. Ew pêşîyê civînê[f] silav dike û paşê bona bawermenda dua dike, pêr'a-pêr'a nêt-meremê ne'mê e'yan dike û dibêje: «Mizgînî[f] dide k'ifşê, ku Xwedê çawa meriva[f] r'ast[f] (bêsûc) h'esab dike, dike kirasê xwe, ev yek ji sêrî h'eta binî bi bawerîyê ye» (1:17).

Pawlos îdî bi vê fikirê pêşda diçe bi hûr-gilî dinivîse: T'emamîya merivayê, heger cihû[f] bin yan necihû[f], h'ewcê wê yekê ne, ku li ber Xwedê r'ast bêne h'esabê, çimkî h'emû jî bin h'ukumê gunada dimînin. Em dibînin ku li ber Xwedê yê r'ast ew e, k'î bawerîya xwe Îsa Mesîh tîne. Peyr'a Pawlos derheqa jîyîna nûda (e'mirê t'ezeda) dinivîse, ya ku meriv yektîya Mesîhda distîne. Bawermend jî t'evî Xwedê e'dil dibe û saya R'uh'ê[f] Pîroz ji bindestîya nîrê gune[f] û mirinê xilaz[f] dibe. Ji serê 5-da h'eta 8-a jî Pawlos meremê Qanûna Xwedê û qewata R'uh'ê Xwedêyî nava e'mirê bawermendada şirovedike. Usa jî Pawlos e'nene dike, ku cihû û necihû nava qirara Xwedêda çi cîyî digirin. Ew tê ser wê fikirê ku t'exsîrkirina[f] cihûya hindava Mesîhda, ew p'areke t'ivdîr û qirara Xwedê ye, wekî bikaribe t'emamîya merivayê bi saya Îsa Mesîh bigihîne k'erema Xwedê. Pawlos bawer bû, ku cihû wê t'imê Îsa t'exsîr nekin, zemanê bê ku ewê Îsa qebûl kin.

Paşê Pawlos dinivîse, ku gerekê e’mirê bawermenda çawa ser h’îmê h’izkirinê be. Şandî pirsêd cûr’e-cûr’e e’nene dike, ku çawa Xwedê bi-h’ebînin û jêr’a qulix kin. Usa jî derheqa borcê bawermendaye hindava h’ukumetê û hevduda dinivîse, pirsêd îsafêva[f] girêdayî. Ne’mê bi silava, t’emîya û şikirdayînê ser hevda tîne.

### Serecema fikira ne’mê

Pêşgotin û fikira sere (1:1-17)
Meriv h’ewcê xilazbûnê[f] ne (1:18—3:20)
Soz-qirarêd bona xilazbûnê (3:21—4:25)
Jîyîna nûye yektîya Mesîhda (5:1—8:39)
Cime’ta Îsraêlê[f] nava qirara Xwedêda (9:1—11:36)
R’abûn-r’ûniştina bawermenda (12:1—15:13)
Paşgotin û silavkirin (15:14—16:27)

Peymana[f] Nûda, îlahî ne’ma R’omayîyêda xebera «Qanûn» bi h’erfa mezin hatîye nivîsarê gava be’sa Qanûna[f] Mûsa[f] dike, awa gotî Qanûna Xwedê. Lê gava be’sa qanûnêd din dike, xebera «qanûn» bi h’erfa biç’ûk hatîye nivîsarê.

### Silavkirin

**1** [1] Ji Pawlos, xulamê Mesîh[f]
Îsa, şandîtîyêr’a[f] gazîkirî,
bona belakirina wê Mizgînîya[f]
Xwedêye k’ifşkirî, [2] ya ku Wî hê
pêşda nivîsarêd[f] pîrozda bi zarê[f]
p’êxemberêd[f] Xwe soz dabû. [3-4] Eva
Mizgînîya bona Kur’ê[f] Wî, Xuda-
nê[f] me Îsa Mesîh e, ku bi bedenî
ji zur’eta Dawid[f] bû û bi R’uh’ê[f]
Pîrozîyê, gava ji mirinê r’abû,
qudretêda çawa Kur’ê[f] Xwedê xuya
bû. [5] Bi Wî me k’erema[f] şandîtîyê
stand, wekî bona navê Wî h’emû
mileta hîn kin, ku bawer bikin û
guhdar bin. [6] Hûn jî nava wanda
hatine gazîkirinê, ku bibine p’ara
Îsa Mesîh.
[7] Ji we h’emûyar’a, h’izkirîyêd
Xwedêye pîrozbûnêr’a[f] gazîkirî,
ku R’omayêda dimînin, k’erem[f]
û e’dilayî be, ji Xwedêyê Bavê[f] me
û Xudan Îsa Mesîh.

### Pawlos h’eyra bawermendêd R’omayêda ye

**8** Berê pêşin ez bi destê Îsa
Mesîh bona we h’emûya r’azîbûnê
didime Xwedêyê xwe, çimkî ba-
werîya[f] we t’emamîya dinyayêda
tê gotinê. **9** Xwedê şe’dê min e,
ew Xwedêyê ku ez nava Miz-
gînîya Kur’ê Wîda bi dil û can
xulamtîyê dikim, ez her gav we
bîr tînim **10** û t’imê nava duayêd
xweda hîvî dikim, ku bi e’mirê
Xwedê carekê r’ê bik’eve min,
ser weda bêm. **11** Çimkî ez gele-
kî h’eyra dîtina weda me, wekî
p’êşk’êşeke[f] r’uh’anî bigihînime
we, ku hûn bawerîyêda bişidin.
**12** Awa gotî ez jî t’evî we, em dil
bidine ber hev, bi wê bawerîya
min û weye her du alîyava.

**13** Ez dixwazim ku hûn zani-
bin xûşk-birano, wekî gelek cara
min xwestîye bême cem we, ku
k’eda min nava weda jî hebe,
çawa nava necihûyêd[f] mayînda,
lê h’eta niha r’ê nek’etîye min*.
**14** Ez borcdarê h’emû mileta me,
hin yê yûnanêd pêşdaçûyî û hin jî
yê miletêd paşdamayî, deyndarê
serwaxta û bêfe’ma me. **15** Awa ez
bi dil û can dixwazim Mizgînîyê
bidime we jî, yêd ku R’omayêda
dimînin.

**16** Belê ez Mizgînîyê şerm h’esab
nakim, çimkî ew qewata Xwedê
ye, bona xilazbûna[f] h’emû bawer-
menda, pêşîyê bona cihûya[f], paşê
necihûya[f]. **17** Çimkî Mizgînî dide
k’ifşê, ku Xwedê çawa meriva[f] r’ast
h’esab dike, dike kirasê xwe*, ev
yek ji sêrî h’eta binî bi bawerîyê

---

* 1:13 K’arêd Şandîya 19:21.

* 1:17 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Wêda (Mizgînîyêda) r’astîya Xwedê e’yan dibe». Nivîsarêd pîrozda «r’astîya Xwedê» bi çend cûr’a tê fe’mkirinê. Carna r’astî çawa «heqîya Xwedê» tê fe’mkirinê, ew h’unurekî Wî ye, yanê Xwedê Xwexa ser r’astîyê ye çawa H’akimê heq. Lê carna jî «r’astîya Xwedê» tê fe’mkirinê çawa kirineke Wî ye, ku çawa Ew mêriv bêsûc dike û r’ast h’esab dike, ne ku t’enê vê yekê, lê mêriv t’evî Xwe dike yek jî, awa gotî Xwedê wî «dike kirasê Xwe». Hingê însan ber ç’e’vê Wî mîna Wî r’ast xuya dibe. Vê ne’ma Pawlosda ew gelek cara bi vî awayî tê fe’mkirinê. Peymana[f] Kevinda jî tê hînkirinê, ku merîyê r’ast ew e, gunêd k’îjanî hatine baxşandinê (Zebûr 32; R’omayî 4:4-8). Wekî din jî «r’astîya Xwedê» gelek cara fikira xilazkirinêva[f] girêdayî ye: Xwedê r’ast e, amin e û xweyê sozê Xwe ye û yê ku gazî Wî dike, gora sozê Xwe xilaz dike (Zebûr 51:14; Îşaya 46:12-13).

ye, çawa nivîsar e: «Yê r’ast wê
bijî, çimkî bawer dike»**.

### H’emû meriv gunek’ar[f] in

18 Xezeba Xwedê ji e’zmên ser
h’emû bêxwedêtî û neheqîya wan
meriva xuya dibe, k’îjan ku bi
neheqîyêd xwe nahêlin ku r’astî
xuya be. 19 Çimkî çi ku gerekê bona
Xwedê bizanibin wanva e’yan e,
çimkî Xwedê wanva e’yan kirîye.
20 R’ast ji e’firandina dinyayêda
h’unurêd Wîye nexuya, awa gotî
qudreta Wîye h’eta-h’etayê û Xwe-
dêtîya Wî bi e’firîna xuya dibin,
zelal têne dîtinê. Bi vî awayî kes
nikare cabê bide. 21 Belê wan
Xwedê nas dikir, lê pesinê Wî
nedan çawa Xwedê, ne jî ji Wî
r’azî bûn, lê belê ew nava fikirêd
xweda p’ûç’ bûn û ji dest bêfe’-
mîyê şûna r’eşva çûn. 22 Wana
got: «Eme serwaxt in», lê bêfe’m
derk’etin 23 û r’ûmeta Xwedêyê
nemirî şikilê merivê p’ûç’î-mi-
rî, teyreda, çarp’ê û şûlikîyar’a
guhêr’în*.

24 Lema jî Xwedê ew bi xwestina
dilê wan dane destê h’eramîyê[f],
ku bedena xwe nava hevda bih’e-
r’imînin. 25 Wana r’astîya hindava
Xwedêda derewîyêr’a guhêr’în û
serê xwe li ber e’firîna danîn,
ew h’ebandin, ne ku E’firandarê
h’eta-h’etayê ku hêjayî şikirîyê
ye. Amîn[f].

26 Bona vê yekê Xwedê ew da-
ne bênamûsîyê, h’eta jinêd wan
jî h’ewcetîya xweye e’detê dinê
h’ewcetîya ek’sîe’detîyêr’a gu-
hêr’în. 27 Usa jî mêra h’ewcetîya
jinaye e’detî hiştin, pê temêd
xweye xirab bi hevr’a şewitîn,
mêra t’evî mêra r’obetî dikir û
heqê jir’êk’etina xweye qazinc-
kirî hildidane ser xwe. 28 Û çawa
wana nexwest Xwedê zanebûna
xweda xweykirana, Xwedê jî ew
dane fikirêd bêt’ewşe, ku ewana
tiştêd necayîz bikin. 29 Evana her
neheqîyê, neqencîyê*, timayîyê,
xirabîyava t’ijî ne: Bi h’evsûdîyê,
mêrkujîyê, berzeqîyê[f], mixenetîyê,
xêrnexwazîyêva[f] dagirtî, gilîger’o,
30 buxdanbêj, nexwedêh’iz, bêşerm,
pozbilind, k’ubar-babax, yê xira-
bîyê çêdike, ne gur’a[f] dê-bavada,
31 bêfe’m, bêamin, bêîsaf, bêr’e’m.
32 Belê evana haş ji qanûna Xwe-
dê hene, ku yêd van tişta dikin

** 1:17 Aha jî tê fe’mkirinê: «Yê bi bawerîyê r’asth’esabbûyî wê bijî». Hebaqûq 2:4.
* 1:23 Qanûna Ducarî 4:15-18.
* 1:29 Nav hinek destnivîsarada «qavî[f]» jî heye.

hêjayî mirinê ne, lê belê ne ku
t'enê van tişta dikin, lê havijîya
xwe ji kirîya jî tînin.

### Dîwana Xwedêye heq

**2** 1 Awa e'vdo, dixwazî k'î bî,
gava loma dikî, tu nikarî xwe
bêsûc kî. Çawa loma xelqê dikî, usa
jî tu xwe lomek'ar[f] dikî, çimkî tu
ku loma dikî, xût wan tişta dikî*.
2 Lê em zanin ku dîwana Xwedê
wê bi r'astîyê ser wanda bê, yêd
ku tiştêd usa dikin. 3 Awa e'vdo,
tu ku loma xweyê van kira dikî û
tu xwexa jî wan tişta dikî, te t'irê[f]
tê ji dîwana Xwedê bir'evî? 4 Yan
jî tu ku dewlemendtîya şîrinayî,
berbihêrî û sebira Wî bêhurmet
dikî, tu nizanî ku şîrinayîya Xwe-
dê te dibe berbi t'obekirinê[f]? 5 Lê
tu bi serh'işkî û dilkevirîya xwe
xezebê ser xweda dicivînî, bona
R'oja Xezebê, gava dîwana Xwedêye
heq xuya be. 6 Ewê weke e'melê
her kesî bîne pêşîya wan*. 7 Jîyîna
h'eta-h'etayê wê bide wan, yêd ku
t'imê bi dûmika dirêj nava kirinêd
qencda ne, ku hurmetê, r'ûmetê
û nemirîyê dixwazin. 8 Lê hêrs û
xezebê ser wanda be, yêd ku k'ara
xwe diger'in, dest ji r'astîyê kirine
û xwe dane xirabîyê. 9 Tengasî[f] û
zulmê ser wan h'emûyada bê, yêd
xirabîyê dikin, pêşîyê ser cihûya[f],
paşê ser necihûya. 10 Lê hurmet,
r'ûmet û e'dilayî wê wan h'emû-
yar'a be, yêd ku qencîyê dikin,
pêşîyê cihûr'a û paşê necihûr'a.
11 Çimkî li cem Xwedê firqî t'une*.
12 Ewêd bêyî Qanûna Mûsa[f] ku
gune[f] dikin, bêyî Qanûn jî wê unda
bin, lê ewêd xweyîqanûn ku gune
dikin, bi Qanûnê jî wê dîwana wan
bibe. 13 Çimkî ne ku ewêd Qanûnê
dibihên li ber Xwedê r'ast[f] in, lê
ewêd ku Qanûnê diqedînin wê
r'ast bêne h'esabê. 14 Necihûyêd
ku Qanûna wan t'une, gava bê
h'emdê xwe xwestinêd Qanûnê
diqedînin, belê ewe bê Qanûn in,
xwexa bona xwe dibine qanûn.
15 Çimkî evana didine k'ifşê, ku
xwestina Qanûnê dilê[f] wanda
nivîsar e. Îsafa wan jî şe'detîya
vê yekê dide û fikirêd wan carna
li wan neheq dikin, carna bêsûc
dikin. 16 Wê R'ojê wê usa be, gava
Xwedê bi destê Mesîh Îsa dîwana
tiştêd merivaye dizîva bike, anegorî
Mizgînîya ku ez dannasîn dikim.

* 2:1 Metta 7:1-2.
* 2:6 Zebûr 62:12; Gotinêd Silêman 24:12.
* 2:11 Qanûna Ducarî 10:17.

### Cihû û Qanûn

17 Awa tu cihû têyî h’esabê, te
xwe spartîye[f] Qanûnê û bi Xwedêyê
xwe difir’î, 18 xwestina Wî zanî û ji
Qanûnê hîn bûyî, qencî-xirabîyê ji
hev derdixî. 19 Û tu ser xwe guman
î, ku r’êberê kora yî, r’onayîya ber
yêd te’rîyêda, 20 şîretk’arê bêfe’-
ma, dersdarê xişîma. Tu xweda
jî guman î, ku bi Qanûnê xût tu
xweyê t’erzê zanebûnê û r’astîyê
yî. 21 Lê belê awa tu ku hevalê xwe
hîn dikî, xwexa xwe hîn nakî?
Dannasîn dikî, ku nedizin, lê tu
didizî? 22 Dibêjî: «Zinîyê neke»,
lê zinîyê dikî? Ji p’ûta[f] zivêr î, lê
p’aristgehêd[f] wan t’alan dikî*?
23 Bi Qanûnê difir’î, lê Qanû-
nê dit’er’ibînî, Xwedê bêhurmet
dikî? 24 Çawa nivîsar e: «R’ûyê
we cihûyada navê Xwedê nava
necihûyada tê bêhurmetkirinê»*.

25 Belê k’ara sinetîyê[f] wê hebe,
heger Qanûnê biqedînî. Lê heger
tu Qanûnê dit’er’ibînî, sinetbûna
te dibe bêsinetî. 26 Usa jî, heger yê
nesinetkirî t’emîyêd Qanûnê biqe-
dîne, nesinetîya wî wê sinetî neyê
h’esabê? 27 Û yê binyat’a xweda
nesinetkirî ku Qanûnê diqedîne,
wê dîwana te bike, ku tu xweyê
nivîsar û sinetîyê yî, lê Qanûnê
dit’er’ibînî. 28 Çimkî cihû ne ew e,
ku dervava ye û sinetî ne ew e, ku
dervava ser bedenê ye. 29 Lê cihû
ew e, yê ku dilê xweda cihû ye û
sinetîya r’ast dilê sinetbûyî ye, bi
R’uh’, ne bi Qanûna nivîsar. Yê
ha, ne ku meriv p’eyê wî didin,
lê Xwedê*.

## 3

1 Îdî cihû çiva zêde ye? Yan jî
çi feyda sinetîyê heye? 2 Ge-
lekî, bi her alîyava. Berê pêşin
wê yekêva, ku gotinêd Xwedê li
wan hatine spartinê. 3 Awa heger
ji wan hinek amin neman, dibe
ku ji dest bêaminîya wan Xwedê
wê bêamin derê? 4 T’u car! De
bira Xwedê r’ast be û h’emû meriv
derew, çawa nivîsar e:

«Wekî gotinêd Xweda Tu bêsûc
derêyî
û dîwana Xweda Tu serk’evî»*.

5 Lê heger neheqîya me heqîya
Xwedê dide k’ifşê, em çi bêjin?
Wekî usa ye Xwedê neheq e, ku

---

* 2:22 Aha jî tê fe’mkirinê: «P’aristgehê dih’er’imînî».
* 2:24 Îşaya 52:5.
* 2:29 Qanûna Ducarî 30:6.
* 3:4 Zebûr 51:4.

xezebê tîne serê me? (Bi merivayî
xeber didim). 6 T'u car! Heger ne
usa be, Xwedê wê çawa dîwana
dinê bike?
7 Lê heger r'astîya Xwedê, bona
r'ûmeta Wî, bi derewîya min hê
k'ifş dibe, lê îdî çima wê dîwana
min mîna gunek'arekî bê kirinê?
8 Û gelo heq e ku em aha bêjin:
«Xirabîyê bikin, ku bibe qencî»,
çawa hinek şer'a li me gilî dikin,
yanê em usa dibêjin? Ew meriv
wê r'ast ser bela xwe vebin.

## Merivê r'ast t'une, h'emû gunek'ar in

9 Awa em îdî çi bêjin? Em cihû
tiştekîva ji necihûya çêtir in? Na
xêr! Çimkî me îdî jor da k'ifşê,
çawa cihû, usa jî necihû, h'emû jî
bin h'ukumê guneda[f] ne. 10 Çawa
nivîsar e:

«Yekî r'ast t'une, t'u kes t'une,
11 kesek t'une, ku fe'm bike,
kesek t'une, li Xwedê biger'e.
12 H'emû bende xalifî[f] ne,
bi hevr'a t'evayî bêkêr bûne,
yekî qencîyê bike t'une, t'u kes
t'une.*
13 Gewrîya wane t'irba vekirî ye,
zimanê wane derewîn e*,
je'ra me'ra bin zarê wan e**.
14 Devê wana t'ijî nifir' û te'lî
ye*,
15 nigê wane xûnr'êtinêr'a dile-
zîne.
16 R'îya wane qede û bela ne.
17 R'îya e'dilayîyê nasnekirî ne,*
18 tirsa Xwedê li ber ç'e'va qet
t'unî ne*».

19 Awa em zanin Qanûn çi ku
dibêje, wanar'a dibêje, yêd ku
bin h'ukumê Qanûnêda ne, we-
kî h'emû dev bêne girêdanê û
t'emamîya dinyayê li ber dîwana
Xwedê cabdar be. 20 Çimkî bi
kirêd Qanûnê t'u qûl-bende wê
li ber Xwedê r'ast[f] derneyê, lê bi
Qanûnê gune tê naskirinê.

## Însan li ber Xwedê bi bawerîyê r'ast tê h'esabê

21 Lê niha bêyî Qanûnê, r'as-
th'esabkirina Xwedê xuya bûye,

---

* 3:10-12 Zebûr 14:1-3; 53:1-3; Zanebêj 7:20.
* 3:13 Zebûr 5:9.
** 3:13 Zebûr 140:3.
* 3:14 Zebûr 10:7.
* 3:15-17 Îşaya 59:7-8.
* 3:18 Zebûr 36:1.

bona k'îjanê Qanûn û p'êxember
jî şe'detîyê didin. 22 Ev e r'asth'e-
sabkirina Xwedê: K'î bawerîya
xwe Îsa Mesîh tîne, Xwedê wan
h'emûya li ber Xwe r'ast h'esab di-
ke*. Firqî t'une, 23 çimkî h'emûya
gune[f] kir û negihîştine r'ûmeta*
Xwedê. 24 Lê ji k'erema Wî, bi
azakirina Mesîh Îsa r'asth'esab-
bûnê[f] p'êşk'êş distînin. 25 Xwedê
Ew k'ifş kiribû, ku Ew bi xûna
Xwe li ber gunêd wan k'eve, yêd
ku vê yekê bawer bikin. Xwedê
ev yeka kir, ku r'asth'esabkiri-
na Xwe bide k'ifşê, çimkî Wî bi
sebira Xwe guh neda wan gunêd
ku pêşda hatibûne kirinê. 26 Awa
gotî Xwedê bi Îsa ev yek kir, wekî
r'asth'esabkirina[f] Xwe vî zemanî-
da bide k'ifşê, ku Xwexa r'ast e û
her kesê ku bawerîya xwe Îsa tîne,
wan r'ast[f] h'esab dike.

27 Awa îdî çi maye ku em pê
bifir'in? H'emû p'ûç' bû çû. Çi-
ma p'ûç' bû? Çimkî em Qanûnê
diqedînin? Na xêr, lê çimkî em
bawer dikin. 28 Çimkî meva fe'm-
darî ye, ku meriv bi bawerîyê r'ast
h'esab dibe, bêyî kirêd Qanûnê.
29 Yan Xwedê t'enê Xwedê cihûya
ye? Ne yê necihûya ye? Belê, yê
necihûya ye jî, 30 çimkî Xwedê yek
e û ew yêd sinetbûyî bi bawerîyê
r'ast h'esab dike û nesinetbûyîya
jî dîsa bi wê bawerîyê. 31 Wekî usa
ye em bi bawerîyê Qanûnê betal
dikin? T'u car, lê em Qanûnê
mak dikin.

### Birahîm[f] bi bawerîyê r'ast hate h'esabê

**4** 1 Em îdî çi bêjin bona Bi-
rahîmê[f] bave'şîrê xwe, alîyê
bedenêda? Ewî çi dît? 2 Heger
Birahîm bi kirêd xwe r'ast h'esab
bibûya, hingê dikaribû bi kirêd
xwe bifir'îya, lê ne li ber Xwedê.
3 Lê k'a nivîsar çi dibêje? «Birahîm
Xwedê bawer[f] kir û ew yek jêr'a
r'astî hate h'esabê»*. 4 Awa heger
yek şixulekî dike, maşê wî jêr'a
nayê dayîn çawa p'êşk'êş, lê çawa
deyn. 5 Lê heger gumana yekî ne
ser şixulê wî ye, lê bawerîya xwe

* 3:22 Galatî 2:16.
* 3:23 Xwedê meriv dilqê Xweda xuliqand û ev e'firînê Wî qenc bû, lê mêriv neheqî kir û negihîşte wê r'ûmet û k'amiltîyê ku Xwedê bona wî hazir kiribû. Derheqa r'ûmeta Xwedêda, ya ku bawermendê bistînin van r'êza bixûnin: R'omayî 8:18, 21, 29, 30; Fîlîpî 3:21; Destpêbûn 1:26-27; E'yantî 21:9-11.
* 4:3 Destpêbûn 15:6; Galatî 3:6.

Wî tîne, Yê ku nep’aka bêsûc di-
ke, bi vê bawerîyê ew r’ast h’esab
dibe. 6 Dawid jî aha xwezîya xwe li
wî merivî tîne, yê ku Xwedê bêyî
kira wî r’ast h’esab dike.

7 «Xwezî li wan, ku neheqîyêd
wan hatine baxşandinê
û gunêd wan hatine nixamtinê.
8 Xwezî li wî bendeyî, ku Xudan
wîr’a gune h’esab nake».*

9 Gelo eva xwezîya li sinetbûyîya
tê dayînê, yan nesinetbûyîya? Ça-
wa me got, ku bawerîya Birahîm
jêr’a r’astî hate h’esabê*. 10 Lê belê
k’engê hate h’esabê? Pey sinetbû-
nêr’a, yan berî sinetbûnê? Ne ku
pey sinetbûnêr’a, lê berî sinetbûnê.
11 Û paşê ewî sinetbûn nîşan stand,
çawa mora r’asth’esabbûnê, bi wê
bawerîya xweye berî sinetbûnê. Bi
vî awayî Birahîm bû bavê h’emû
bawermendêd nesinetbûyî, wekî
ew jî r’ast bêne h’esabê* 12 û usa
jî bû bavê sinetbûyîya, ne ku t’enê
yê sinetbûyîya, lê yê wan jî, k’îjan
p’êga wê bawerîyêda diçin, ya ku
Birahîmê bavê me hê berî sinet-
bûnê bawer kir.

### Xwedê sozê xwe bi bawerîyê dide

13 Ew sozê Birahîm û zur’eta
wîr’a hate dayînê ku dinyayê war
bin, ne ku bi kirêd Qanûnê bû, lê
bi wê yekê bû, ku wî bawer kir û
r’ast hate h’esabê*. 14 Heger t’enê
ewêd ji kirêd Qanûnê bibûna xweyê
war, hingê bawerî wê p’ûç’ bûya û
sozê jî betal bûya*. 15 Çimkî Qa-
nûn hêrsê r’adike. Dera ku qanûn
t’une, qanûnt’er’ibandin jî t’une.

16 Bi vî awayî soz bi bawerîyê
tê standinê, wekî soz bona h’e-
mû zur’etêd Birahîm p’êşk’êşeke
erêkirî be, ne ku t’enê bona wane
yêd ku qanûnê diqedînin, lê bo-
na wan jî, yêd ku mîna Birahîm
bawer dikin. Çimkî Birahîm bavê
me h’emûya ye*, 17 çawa nivîsar
e: «Min tu kirî bavê gelek mi-
leta»*. Ew bavê me ye, li ber wî
Xwedêyê ku ewî bawer kir, wekî

* 4:7-8 Zebûr 32:1-2.
* 4:9 Destpêbûn 15:6.
* 4:11 Destpêbûn 17:10.
* 4:13 Destpêbûn 17:4-6; Galatî 3:29.
* 4:14 Galatî 3:18.
* 4:16 Galatî 3:7.
* 4:17 Destpêbûn 17:5.

Ew mirîya sax dike û gazî tiş-
têd t’unene dike, çawa ku hene.
18 Wî cîyê ku guman nemabû,
Birahîm bi guman bawer kir, ku
ewê bibe bavê gelek mileta, çawa
hatibû gotinê: «Zur’eta teyê jî wê
haqasa be»*. 19 Û ew bawerîyêda
sist nebû, ne h’alê qalibê xweda
nihêr’î, wekî îdî mîna mirîya bû,
(çimkî ew nêzîkî sed salî bû) û ne
jî bet’ina Serayêye mirî nihêr’î*.
20 Lê bawerîya xwe li sozê Xwedê
anî û dudilî nebû, bi bawerîyê
ser qewata xweda hat, şikirîya
xwe Xwedê anî 21 û wê yekêda
bawer bû, ku Yê soz daye wê
bîne sêrî[f] jî. 22 Bona vê bawerîyê
«jêr’a r’astî hate h’esabê»*. 23 Lê
ev gotin ne t’enê bona Birahîm
hate nivîsarê, ku Xwedê ew r’ast
h’esab kir, 24 lê belê ew bona me
jî nivîsar e. R’astbûnê mer’a jî
bê h’esabê, k’îjanêd ku bawerîya
xwe Wî tînin, Yê ku Xudanê me
Îsa ji mirinê r’akir. 25 Îsa bona
neheqîyêd me hate kuştinê û ji
mirinê r’abû, ku em r’ast bêne
h’esabê*.

### Bi Îsa Mesîh em t’evî Xwedê li hev hatine

5 1 Awa ku em bi bawerîyê r’ast
hatine h’esabê, e’dilayîya me
t’evî Xwedê heye bi saya Xudanê
me Îsa Mesîh. 2 Pê Wî me bi ba-
werîyê mecal dît t’evî wê k’eremê
bin, k’îjanêda em sekinîne. Û bi
wê gumana ku emê t’evî r’ûmeta
Xwedê bin difir’in. 3 Û ne t’enê bi
vê yekê, lê em bi tengasîyêd xwe jî
difir’in, çimkî em zanin ku tengasî
sebirê tîne, 4 sebir jî k’etin-r’abû-
nê, k’etin-r’abûn jî gumanê. 5 Û
guman jî me r’ûr’eş nake, çimkî
h’izkirina Xwedê ser meda bi wî
R’uh’ê Pîroz barîye, Yê ku mer’a
hatîye dayînê. 6 Çimkî gava eme
hê bêç’are* bûn, Mesîh bona me
nep’aka wextda mir. 7 Degme bona
merivekî r’ast yek bimire, belkî
bona merivekî qenc yekê biwêre
bimire, 8 lê belê Xwedê h’izkiri-
na Xwe hindava meda hingê da
k’ifşê, gava eme hê gunek’ar bûn,
Mesîh bona me mir. 9 Niha em
ku bi xûna Wî li ber Xwedê r’ast

* 4:18 Destpêbûn 15:5.
* 4:19 Destpêbûn 17:17.
* 4:22 Destpêbûn 15:6.
* 4:25 Îşaya 53:4-5.
* 5:6 Aha jî tê fe’mkirinê: «Bêt’aqet».

h'esab bûne, hê çiqas zêde emê
bi Wî ji xezebê xilaz bin. 10 Heger
em t'evî Xwedê bi mirina Kur'ê
Wî li hev hatin, gava eme neyar
bûn, lê hê çiqas zêde pê wê lihev-
hatinê emê bi jîyîna Wî xilaz bin.
11 Û ne t'enê haqas, lê bi Xwedê jî
em difir'in, saya Xudanê xwe Îsa
Mesîh, bi K'îjanî em t'evî Xwedê
li hev hatine.

## Adem[f] û Mesîh

12 Awa bi merivekî gune k'ete
dinê û ji gune jî mirin hat. Bi vî
awayî mirin ser h'emû meriva bela
bû, çimkî h'emûya jî gune kir*.
13 Berî Qanûnê, dinyayêda gune
hebû, lê dera ku qanûn t'une, gune
nayê h'esabê. 14 Lê belê mirinê ji
Adem[f] girtî h'eta Mûsa h'ukum
kir, h'eta ser wan jî, yêd ku mîna
Adem gur'a Xwedê dernek'etin.

Adem mîna t'erzekî Wî bû, Yê
ku wê peyr'a bihata. 15 Lê p'êşk'êşa
Xwedê mîna neheqîya Adem nîne.
Çimkî heger bi neheqîya merivekî
gelek mirin, hê çiqas zêde k'erema[f]
Xwedê û dayîna ku bi k'erema
Merivekî, yanê ya Îsa Mesîh ser
geleka zêde bû. 16 Û p'êşk'êş ne usa
ye, çawa heqê gunê yekî, çimkî
dîwanê bi gunekî sûcdarî anî, lê
p'êşk'êşê ji gelek neheqîya bêsûc
kir. 17 Çimkî heger bi neheqîya
merivekî û r'ûyê wîda mirinê
h'ukum kir, çiqas zêde ewêd ku
k'erema Xwedêye dewlemend û
r'asth'esabbûnê p'êşk'êş distînin
wê jîyînêda bi saya Yekî, awa gotî
Îsa Mesîh p'adşatîyê bikin.

18 Awa bi vî awayî pê neheqîkê
dîwana t'emamîya merivayê bû, usa
jî bi kirineke r'ast h'emû meriv wê
r'ast bêne h'esabê û jîyînê bistînin.
19 Çawa bi neguhdarîya yekî gelek
bûne gunek'ar, usa jî bi guhdarîya
Yekî gelek wê r'ast bêne h'esabê.
20 Lê belê Qanûn k'ete navê, ku
neheqî zêde be, lê li k'îderê gune
zêde bû, k'erem jî li wir hê zêde
bû, 21 wekî çawa gune bi mirinê
h'ukum kir, usa jî k'erema Xwedê
bi r'asth'esabkirinê h'ukum bike,
me bibe berbi jîyîna[f] h'eta-h'etayê
bi saya Xudanê me Îsa Mesîh.

## Bona guna mirî, lê bona Mesîh sax

6 1 Lê em niha çi bêjin? Em
nava gunada bimînin, ku
k'erema[f] Xwedê ser meda zêde
be? 2 T'u car! Em ku hindava
gunada mirin, çawa dikarin hê
nava wanda bijîn? 3 Hûn nizanin

* 5:12 Destpêbûn 3:6.

em ku yektîya Mesîh Îsada hatine
nixumandinê[f], mirina Wîda hatine
nixumandinê? 4 Bi nixumandinê
em îdî t'evî mirina Wî bûne û t'evî
Wî hatine definkirinê[f], wekî çawa
Mesîh bi r'ûmeta Bavê ji mirinê
r'abû, usa jî emê bikaribin jîyîna
nûda bijîn*.

5 Çimkî heger em mîna mirina
Wî mirin t'evî Wî bûn, emê usa jî
mîna r'abûna Wî ji mirinê r'abin.
6 Em vê yekê zanin ku binyat'a
meye kevin t'evî Wî xaç[f] bû, wekî
qalibê gunek'ar serî hilnede, ku
ji vir şûnda em nebine xulamêd
gune. 7 Çimkî ewê ku mirîye, ew
ji gune azabûyî ye. 8 Awa heger
em t'evî Mesîh mirine, em ba-
wer dikin, ku emê t'evî Wî bijîn
jî. 9 Çimkî em zanin Mesîh ku ji
mirinê r'abûye, îdî namire, mirin
ser Wî îdî h'ukum nake. 10 Mirina
Ew mir, hindava guneda carekê
bona her t'im mir, lê jîyîna ku niha
dijî, hindava Xwedêda dijî. 11 Usa
jî hûn xwe hindava guneda mirî
h'esab kin, lê hindava Xwedêda
sax, bi saya Mesîh Îsa.

12 Awa bira îdî gune h'ukumî
ser qalibê weyî p'ûç'î-mirî neke,
ku hûn gur'a xwestinêd wî bikin.
13 Û endemêd qalibê xwe nedine
gune ku bibine hacetêd neheqîyê,
lê belê xwe bidine destê Xwedê,
çawa yekî ji mirinê r'abûyî, bi-
ra endemêd we bibine hacetêd
heqîyê, bona Xwedê. 14 Û gune
wê serwêrtîyê li we neke, çimkî
hûn ne bin qanûnêda ne, lê bin
k'eremêda.

### Xulamêd heqîyê

15 Îdî çi? Em guna bikin, çimkî
ne bin qanûnêda ne, lê bin k'e-
remê? T'u car! 16 Hûn haqas tişt
nizanin ku hûn bona xulamtîyê
destê k'êva diçin û gur'a k'ê dikin,
dibine xulamêd wî? Heger hûn
xulamêd gune bin, diçine berbi
mirinê, lê heger hûn xulamêd
Xwedê bin, gur'a Wîda bin, diçine
berbi r'asth'esabbûnê[f]. 17 Lê şikir ji
Xwedê, hûn ku wextekê xulamêd
gune bûn, lê we bi dil û can gura
t'erzê wê hînkirinê kir, ya ku we
xwe spartê. 18 Hûn ji gune aza bûn
û bûne xulamêd heqîyê. 19 (Ez mî-
na e'detê merivayê dibêjim, bona
binyat'a weye merivayîye bêt'aqet.)
We çawa wextekê endemêd xwe
dane neheqîyê ku bibine xulamêd
h'eramîyê û neheqîyê, usa jî niha
endemêd xwe bidine h'elalîyê[f] ku
bibine xulamêd heqîyê.

* 6:4 Kolosî 2:12.

20 Gava hûn xulamêd gune bûn,
ji heqîyê aza bûn. 21 Hingê we ji
kirinêd xwe çi ber çinîn, bona
k'îjana niha hûn şerm dikin? Ew
axirîyê mêriv dibine berbi miri-
nê. 22 Lê niha hûn ji gune ku aza
bûn û bûne xulamêd Xwedê, berê
h'elalîyê diçinin û axirîya wan jî
jîyîna h'eta-h'etayê ye. 23 Çimkî
maşê gune mirin e, lê p'êşk'êşa
Xwedê jîyîna h'eta-h'etayê ye, bi
saya Xudanê me Mesîh Îsa.

### T'erzekî qenc ji qanûna h'al-zewacê

**7** 1 Hûn r'ind fe'm dikin xûşk-bi-
rano, ezê niha derheqa çida
wer'a xeber dim, çimkî ez t'evî wan
xeber didim, yêd ku haş ji qanûnê
hene: Qanûn ser mêriv haqas wext
h'ukum dike, h'eta ku meriv sax
e. 2 Mesele, jina mêrkirî bi qanûnê
mêrê xweyî saxva girêdayî ye, lê
heger mêr lê dimire, ew hingê ji
wê qanûna ku mêrva girêdayî bû
aza dibe. 3 Awa heger mêrê wê hê
sax be ew bibe jina mêrekî din,
wê zinêk'ar bê h'esabê, lê heger
mêr lê bimire, ew ji wê qanûnê
aza dibe û zinêk'ar nabe, heger
bibe jina mêrekî din. 4 Usa jî
hûn xûşk-birayêd min, bi bedena
Mesîh hindava Qanûnêda mirin,
ku bibine p'ara yekî din, Yê ku ji
mirinê r'abûye, wekî hûn Xwedêr'a
ber bînin. 5 Çimkî gava me hê bi
binyat'a merivayê dijît, temê guna,
ku ji Qanûnê serî hildidan, nava
qalibêd meda ya xwe dikirin, ku
em berê mirinê bidin. 6 Lê niha
em hindava Qanûnêda mirin, ji
wê xilaz bûn, bi k'îjanê em girtî
bûn, ku em bi jîyîna nûye r'uh'anî
xulamtîyê Xwedêr'a bikin, ne ku
bi r'îya Qanûna nivîsar.

### Qanûn û gune

7 Awa em çi bêjin? Gelo Qanûn
gune ye? Na xêr! Lê belê minê
gune nas nekira, heger Qanûnê
nîbûya. Mesele, dilhavijî jî minê
nizanibûya gune ye, heger Qa-
nûnê negotibûya: «Dilhavijîyê
neke»*. 8 Lê gune ji t'emîyê me-
cal stand, nava minda her cûr'e
dilhavijî pêşda anîn. Çimkî bê
qanûn gune mirî ye. 9 Ez xwexa
wextekê bêyî qanûn sax bûm, lê
gava t'emî gihîşte min, gune sax
bû 10 û ez mirim. Ew t'emîya ku
wê jîyîn bida min, hema ew jî
bû sebebê mirina min. 11 Çimkî
gune ji t'emîyê mecal stand ez
xapandim û bi wê kuştim.

* 7:7 Derk'etin 20:17; Qanûna Ducarî 5:21.

12 Awa Qanûn pîroz e û t’emîya wê pîroz, r’ast û qenc e. 13 Wekî usa ye ya qenc minr’a bû mirin? Na xêr! Lê ev kirê gune bû, ku bi ya qenc mirin ser minda anî. Ev yek aha bû, wekî h’unurê gune k’ifş be û bi t’emîyê hê gunek’arîya gune k’ifş be.

### Şer’ê nexuyayî nava însênda

14 Belê em zanin ku Qanûn r’uh’anî ye, lê ez xûn û goşt im, xulamekî guner’a firotî. 15 Çimkî ez fe’m nakim çi dikim. Ne ku wî tiştî dikim, çi ku dixwazim, lê wî tiştî dikim, çi ku ber ç’e’vê min r’eş e*. 16 Lê heger ez tiştê ne bi dilê xwe dikim, Qanûnêr’a qayl im, ku ew qenc e. 17 Lê awa ne ku ez wê yekê dikim, lê belê gunê ku nava minda dimîne dike. 18 Ez zanim ku nava minda, awa gotî binyat’a minda, t’u tiştê qenc namîne, çimkî xîreta min qebûl nake, lê ew yek minr’a li hev nayê. 19 Belê wê qencîya ku dixwazim bikim nakim, lê xirabîya ku naxwazim wê dikim. 20 Heger ez wî tiştê ne bi dilê xwe dikim, îdî ne ku ez dikim, lê ew gunê ku nava minda dimîne, ew dike.

21 Awa ez qanûnekê dibînim: Gava dixwazim ku qencîyê bikim, bê h’emdê min dibe xirabî. 22 Ez bi k’ûrayîya dilê xwe qanûna Xwedê begem dikim, 23 lê qanûneke din nava xweda dibînim ku miqabilî wê qanûna h’işê min begem kirîye dike şer’ û min dike hêsîrê qanûna guna, ya ku nava minda ye. 24 Ez çi merivekî hêsîr-belengaz im! K’î wê min ji destê vî qalibê p’ûç’î-mirî xilaz ke? 25 (Şikir ji Xwedêr’a, bi saya Xudanê me Îsa Mesîh!)

Bi vî awayî ez xwexa bi h’iş-aqilê xwe xulamtîyê qanûna Xwedêr’a dikim û bi qalibê xwe xulamtîyê qanûna gunar’a dikim.

### Jîyîna bi R’uh’ê Xwedê

**8** 1 Niha îdî dîwana wan nabe, yêd ku t’evî Mesîh Îsa bûne yek*. 2 Çimkî qanûna R’uh’ê ku jîyînê dide, bi saya Mesîh Îsa ez ji qanûna guna û mirinê xilaz[f] kirim. 3 Belê çi ku Qanûnê ji dest bêt’aqetîya binyat’a merivayê nikaribû bikira, Xwedê ew

* 7:15 Galatî 5:17.

* 8:1 Nav destnivîsarêd paşwextîyêda ev jî heye: «Bi binyat’a merivayî najîn, lê bi R’uh’» (8:4 binihêr’in).

yek kir, Kur’ê Xwe dilqê binyat’a
merivayîye gunek’arda bona guna
şand. Û aha Ewî wê binyat’êda
dîwana gune kir, 4 wekî r’astbû-
na t’emîyêd Qanûnê nava meda
bê qedandinê, em ku bi binyat’a
merivayî najîn, lê bi R’uh’. 5 Yêd
ku li gora binyat’a merivayê dijîn,
ew ser tiştêd binyat’a merivayê
difikirin, lê yêd li gora R’uh’ di-
jîn, ew ser tiştêd R’uh’ difikirin.
6 Axirîya fikira binyat’a merivayê
mirin e, lê axirîya fikira R’uh’
jîyîn û e’dilayî ye. 7 Çimkî fikira
binyat’a merivayê dijminê Xwedê
ye, ew ber qanûna Xwedê xwe
naşkêne, ne jî dikare. 8 Ewêd bi
binyat’a merivayê dijîn, nikarin
li Xwedê xweş bên.

9 Lê hûn bi binyat’a merivayî
najîn, lê bi R’uh’ dijîn, heger r’ast
R’uh’ê Xwedê nava weda dimîne.
Lê heger R’uh’ê Mesîh dilê yekî-
da t’une, ew ne p’ara Wî ye. 10 Û
heger Mesîh dilê weda ye, qalib
mirî ye, çimkî we gune kir, lê
R’uh’ jîyîn e bona we, çimkî hûn
r’ast hatine h’esabê. 11 Û heger
ew R’uh’ê ku Îsa ji mirinê r’akir
nava weda dijî, ku usa ye Ewê
Mesîh ji mirinê r’akir, wê bi wî
R’uh’ê Xweyî nava weda, jîyînê
bide qalibê weyî p’ûç’î-mirî jî.

12 Bona vê yekê xûşk-birano,
em deyndar in, lê ne deyndarêd
binyat’a merivayê, ku li gora wê
bijîn. 13 Çimkî heger hûn li go-
ra binyat’a merivayê bijîn, hûnê
bimirin, lê heger hûn bi R’uh’
kirêd binyat’a merivayê bikujin,
hûnê bijîn.

14 Ewêd ku bi R’uh’ê Xwedê têne
r’êberîkirinê, ew in lawêd Xwedê.
15 Çimkî we r’uh’ekî usa nestandî-
ye, ku we dîsa bike xulam bitirsin,
lê we ew R’uh’ standîye, Yê ku
we dike lawêd Xwedê, bi K’îjanî
gazî Wî dikin: «Abba[f]!» awa gotî
«Bavo!»* 16 Hema ew R’uh’ Xwexa
t’evî r’uh’ê me şe’detîyê dide, ku
em zar’êd Xwedê ne. 17 Û heger
zar’ in, usa jî xweyîwar in, warê
Xwedê ne û t’evî wartîya Mesîh in.
Belê heger em t’evî cefayê Mesîh
bûne, emê t’evî r’ûmeta Wî bin jî.

## R’ûmeta sozdayî

18 Ez aha t’exmîn dikim, ku ce-
fê meyî vî zemanî, li ber r’ûmeta
wê meva* e’yan be, ne t’u tişt e.
19 H’emû e’firîn jî bê sebir ç’e’v-
nihêr’î xuyabûna lawêd Xwedê ne.

---

* 8:15-17 Galatî 4:5-7.

* 8:18 Aha jî tê fe’mkirinê: «Nava meda».

20 Belê e'firîn jî ber bayê betalîyê
k'etin, ne ku bi h'emdê xwe, lê
Xwedê ew dane vê yekê*. Lê be-
lê ew guman hebû, 21 ku e'firînê
xwexa jî ji wê xulamtîya p'ûç'
aza bin û t'evî azayî û r'ûmeta
zar'êd Xwedê bin. 22 Çimkî em
zanin ku h'emû e'firîn h'eta niha
bi hevr'a dikine zare-zar û mîna
êşa k'ulfetê[f] dik'işînin. 23 Û ne
t'enê e'firîn, lê em xwexa jî, ku
me çawa berê[f] deremeta pêşin*
R'uh'ê Pîroz stand, nava xweda
zare-zar in û wê hîvîyê ne, h'eta
em heqê lawtîya Xwedê bistînin,
awa gotî em bigihîjine azayîya qa-
libê xwe**. 24 Belê vê gumanêda
em xilaz bûn. Lê ew gumana ku
tê dîtinê, ew ne guman e, çimkî
yek çawa dikare gumana wî tiştî
be, k'îjan li ber ç'e'va ye? 25 Lê
heger gumana me li tiştê nedîtî
ye, em bi sebirê hîvîyê bimînin.

26 Usa jî R'uh'ê[f] Pîroz tê hewara
bêt'aqetîya me, çimkî em nizanin
gerekê çawa dua bikin*, lê R'uh'ê
Pîroz Xwexa bi gotinêd k'esere
nayêne ser zar-zimana, bona me
lava-navçêtîyê dike. 27 Û Yê dila
e'nene dike zane fikira R'uh'ê
Pîroz çi ye, çimkî Ew weke qi-
rara Xwedê bona merivêd Xwedê
lava-navçêtîyê dike.

28 Em zanin ku her tiştîda Xwedê
dike ku wanr'a bibe qencî, yêd ku
Wî h'iz dikin* û li gora qaz-qudreta
Wî gazîkirî ne. 29 Çimkî Xwedê
k'îjan pêşda bijartin, ew jî pêşda
k'ifş kirin, ku bibine mîna Kur'ê
Wî, wekî Îsa nava gelek xûşk-bi-
rada nixurî be. 30 K'îjan pêşda
k'ifş kirin, gazî wan jî kir û gazî
k'îjana kir, ew jî bêsûc kirin û
k'îjan bêsûc kirin, ew jî xweyî-
r'ûmet kirin.

### H'izkirina Xwedê: Heger Îsa yar e, k'î wê neyar be?

31 Awa em çi bêjin bona van
tişta? Heger Xwedê pişta me ye,

---

* [8:20] Destpêbûn 3:17.
* [8:23] Aha tê fe'mkirinê: «Xwedê çawa p'êşk'êşa pêşin R'uh'ê Pîroz dide» yan jî: «R'uh'ê Pîroz çawa berê deremeta Xwedêye pêşine ku Xwedê dide bawermend distînin».
** [8:23] Korint'î II, 5:1-4.
* [8:26] Aha jî tê fe'mkirinê: «Bona çi dua bikin».
* [8:28] Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Em zanin ku her tişt wanr'a dibine qencî yêd ku Xwedê h'iz dikin».

k'î dikare miqabilî me be? 32 Ewê
ku h'eyfa Wî Kur'ê Wî nehat, lê
bona me h'emûya da der, îdî wê
çawa her tiştî t'evî Wî p'êşk'êşî
me neke? 33 K'î dikare bijartîyêd
Xwedê gunek'ar ke? Xwedê ye,
ku wan bêsûc dike. 34 K'î dikare
wan neheq ke? Mesîh Îsa ye ku
bona wan mir, lê belê ji mirinê
r'abû jî û k'êleka[f] Xwedêye r'astê
ye, bona me lava-navçêtîyê dike.
35 Çi wê bikaribe me ji wê h'izki-
rina Mesîh biqetîne? Derd-kul,
te'lî-tengî, zêrandin, xelayî-cela-
yî, bêsit'arî, qede-bela yan şûr?
36 Çawa nivîsar e:

«Bona Te em her r'oj ber mi-
rinê ne,
mîna peza serjêkirinê h'esab
dibin»*.

37 Lê em nava van h'emû tiş-
tada hê zêde serdik'evin, bi saya
Ewî ku em h'iz kirin. 38 Çimkî
ez e'seyî zanim ku ne mirin, ne
jîyîn, ne milyak'et[f], ne şexsek,
ne tiştêd hazir, ne tiştêd wê bên,
ne t'u qewat, 39 ne yêd jorin, ne
yêd jêrin* û ne jî e'firînekî mayîn
dikare me ji h'izkirina Xwedê
biqetîne, ya ku bi destê Xudan
Mesîh Îsa p'ara me k'etîye.

### Xwedê û miletê wî cihûyê bijartî

9 1 Ez bi Mesîh bê xêlif r'ast
dibêjim û îsafa[f] min jî bi saya
R'uh'ê Pîroz minr'a şe'detîyê dide,
2 ku ez gelekî ber xwe dik'evim û
kula dilê min jî k'ûr e. 3 Çimkî min
xwexa dixwest nifir' li min bibûya,
t'êla min ji Mesîh biqetîya, bona
miletê minî ji xûn-goştê min, 4 ku
îsraêlî[f] ne. Li wan dik'eve bibine
lawêd Xwedê, Xwedê r'ûmeta
Xwe nîşanî wan da, peyman[f] t'evî
wan girêdan, qanûnêd Xwe dane
wan û kirine xweyêd h'ebandin
û sozêd dayî*. 5 Kal-bav jî ji wan
in û Mesîh jî alîyê xûn û goştda
ji nav wan hat, ku ser h'emûyar'a
Xwedêyê h'eta-h'etayêyî hêjayî
şikirîyê ye. Amîn.

6 Lê belê naqewime ku sozê
Xwedê xêlif derê, çimkî ne ku ew
h'emû ne îsraêlî, yêd ku ji Îsraêl
dinê k'etine 7 û ne jî h'emûyêd ji
bedena Birahîm bûne zar'êd wî-
ye heq-h'elal in, lê hatîye gotinê:

* 8:36 Zebûr 44:22.

* 8:39 Aha jî tê fe'mkirinê: «Ne bilindayî, ne k'ûrayî».

* 9:4 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Li wan dik'eve bibine zar'êd Xwedê, xweyêd r'ûmet, peymana, Qanûna dayî, h'ebandin û sozêd dayî».

«Zur'eta teyê Îshaqda[f] bê navkiri-
nê»*. **8** Awa gotî zar'êd Xwedê ne
ew in, yêd ku ji bedena t'ebîyetî
ne, lê zar'êd sozdayî wê zur'et bêne
h'esabê. **9** Çimkî sozê gotî ev bû:
«Saleke din vî çaxî ezê li ser teda
bêm û kur'ekê Serayêr'a bibe»*.
**10** Lê ne t'enê ev bû, R'êvêka[f] jî bi
du kur'a ji bavekî h'emle derk'et,
awa gotî ji bavê me Îshaq. **11-12** Gava
kur'ik hê nebibûn, hê qencî-xirabî
nekiribûn, R'êvêkayêr'a hate go-
tinê: «Yê mezin wê xulamtîyê li
yê biç'ûk bike».* Ev yek bû, wekî
qirara Xwedê weke bijartina Wî
derê, ne ku kirava girêdayî be, lê
li gora gazîya Xwedê be. **13** Çawa
nivîsar e: «Min Aqûb[f] h'iz kir, lê
ji Esaw[f] çûm»*.

**14** Em îdî çi bêjin? Gelo neheqî-
ya Xwedê heye? Na xêr! **15** Çimkî
Mûsar'a dibêje: «Ez k'îjanî bême
r'e'mê, Ezê bême r'e'mê û dilê
Min ser k'ê bişewite, wê bişewi-
te»*. **16** Ev yek îdî ne ji xwestin
yan xîreta mêriv e, lê ji r'e'ma
Xwedê ye. **17** Çimkî nivîsara pîroz
Firewinr'a[f] dibêje: «Bona wê yekê
Min tu kirî p'adşa, wekî qewata
Xwe bi te bidime k'ifşê û navê Min
t'emamîya dinyayêda bê gotinê»*.
**18** Awa Xwedê k'îjana dixwaze
tê r'e'mê û k'îjana dixwaze wan
serh'işk dike.

### Hêrs û r'e'ma Xwedê

**19** Ku usa ye tê minr'a bêjî: «Lê
îdî çima Xwedê me neheq dike?
K'î dikare li ber qirara Wî r'abe?»
**20** Lê tu k'î yî, e'vdo, ku li ber
gotina Xwedê r'adibî? Gelo cêr'
dikare cêr'kerr'a bêje: «Te çima
ez aha çêkirime?»* **21** Çima h'u-
kumê cêr'ker ser axê t'une ku ji
wê h'er'îya stirayî hin derdanêd[f]
bona r'ûmetê çêke, hin jî bona
bêr'ûmetê? **22** Lê çi vê yekêr'a
heye, heger Xwedê xwest berî
k'ifşkirina hêrs û qewata Xwe, bi
dûmika dirêj gelekî sebira Xwe
li wan derdanêd hêjayî hêrsê
bîne, yêd ku undabûnêr'a hazir

* 9:7 Destpêbûn 21:12.
* 9:9 Destpêbûn 18:10, 14.
* 9:11-12 Destpêbûn 25:23.
* 9:13 Malaxî 1:2-3.
* 9:15 Derk'etin 33:19.
* 9:17 Derk'etin 9:16.
* 9:20 Îşaya 29:16; 45:9.

sekinî ne?* 23 Wî ev yek kir, we-
kî dewlemendtîya r'ûmeta Xwe
wan derdanar'a bide k'ifşê, yêd
ku bûne xweyê vê r'e'mê, k'îjan
ku Wî pêşda hazir kiribûn, wekî
ew t'evî r'ûmeta Wî bibûna. 24 Û
ew derdanêd gazîkirî em in, ne
ku t'enê ji cihûya, lê ji necihûya
jî, 25 çawa k'itêba Hosêyada Ew
dibêje:

«Cime'ta ku ne cime'ta Min e,
Ezê bêjimê: ‹Cime'ta Min›
û ya ne delal Ezê bêjimê: ‹De-
lal›»*.

26 Û «wê dera ku wanr'a hate
gotinê: ‹Hûn ne cime'ta Min
in›,
hema li wir jî ewê lawêd Xwe-
dêyê sax bêne gotinê»*.

27 Îşaya[f] jî bona Îsraêl dike gazî
dibêje:

«Heger h'esabê zar'êd Îsraêl
weke qûma be'rê be, t'enê
hinek wê jê xilaz be.
28 Çimkî Xudan wê kin û kurt
zûtirê dîwana dinê bike».*

29 Û çawa Îşaya berî vê yekê
got: «Heger Xudanê Zor mer'a
zur'et nehişta, emê bik'etana
r'oja Sodomê[f] û bibûna mîna
Gomorayê»**.

### Îsraêl û Mizgînî

30 Em îdî çi bêjin? Necihûyêd
ku pey r'asth'esabbûnê nedi-
çûn, gihîştine r'asth'esabbûnê,
wê r'asth'esabbûna ji bawerîyê,
31 lê Îsraêl ku pey Qanûnê diçû
ku r'ast bê h'esabê, negihîşte wê
yekê. 32 Çima? Çimkî ew ne ku
bi bawerîyê bû, lê bi kirêd xwe.
Û ew ser kevirê lik'umandinêda
k'et hol bû, 33 çawa nivîsar e:

«Va Ez kevirekî lik'umandinê
Sîyonêda[f] datînim,
zinarekî jê holbûnê
lê her kesê ku bawerîya xwe
Wî bîne, wê şermî nebe»*.

* 9:22 Aha jî tê fe'mkirinê: «Lê çi vê yekêr'a heye, heger Xwedê bi dûmika dirêj li wan derdana sebir dike, k'îjan hêjayî wê hêrsê ne û undabûnêr'a hazir sekinî ne, çimkî Wî xwest hêrsa Xwe bide k'ifşê û qewata Xwe wanva e'yan ke?»
* 9:25 Hoseya 2:23.
* 9:26 Hoseya 1:10.
* 9:27-28 Îşaya 10:22-23.
* 9:29 Îşaya 1:9.
** 9:29 Destpêbûn 19.
* 9:33 Îşaya 8:14; 28:16.

10 1 Xûşk-birano! Dua û xwes-
tina dilê min ji Xwedê bona
xilazbûna Îsraêlê ye. 2 Ez şe'dê
wana me, ku ew hindava Xwe-
dêda xweyîxîret in, lê ev yek bê
zanebûn e. 3 Wana fe'm nekir, ku
Xwedê çawa mêriv r'ast h'esab dike,
xwestin bi cûr'ê xwe h'îmê heqîyê
daynin û li ber heqîya Xwedê ta
nebûn. 4 Çimkî bi Mesîh Qanûn
ser hevda hat, ku her bawermend
bi wî r'ast bê h'esabê.

## Her kes dikare xilaz be

5 Bona wê r'asth'esabbûna ji Qa-
nûnê Mûsa aha dinivîse: «Merivê
ku Qanûnê biqedîne, bi wê jî ewê
bijî»*. 6 Lê r'asth'esabbûna ku ji
bawerîyê ye, aha dibêje: «Dilê xwe-
da nebêje: K'ê wê r'abe e'zmên?»*
(awa gotî Mesîh jorda bîne), 7 yan:
«K'ê wê her'e dîyarê mirîya?»* (awa
gotî Mesîh ji nava mirîya derxe).
8 Lê belê nivîsar çi dibêje? «Xebera
Xwedê li cem te ye, li ser zarê te
ye û dilê teda ye»*, (awa gotî ew
xebera bawerîyê, ya ku em danna-
sîn dikin). 9 Heger tu bi devê xwe
îqrar[f] bikî, ku Îsa Xudan e û dilê
xweda bawer bikî, ku Xwedê Ew ji
nava mirîya r'akirîye, tê xilaz bî.
10 Çimkî bi dil yek bawer dike, r'ast
tê h'esabê û bi dev îqrar dike, xilaz
dibe. 11 Çawa nivîsar dibêje: «Her
kesê ku bawerîya xwe Wî bîne, wê
şermî nebe»*. 12 Li vir firqî t'une
nava cihû û necihûyada, çimkî
Xudanê h'emûya yek e, hindava
wan h'emûyada jî mer'd e, k'îjanêd
gazî Wî dikin. 13 Çimkî nivîsar
dibêje: «K'î gazî navê Xudan ke,
wê xilaz be»*.

## Qusûra Îsraêlê

14 Lê wê çawa gazî Wî kin, heger
bawerîya xwe Wî neanîne? Yan
wê çawa bawerîya xwe Wî bînin,
heger bona Wî nebihîstine? Yan
wê çawa bibihên, heger xeber
dannasîn nebe? 15 Yan wê çawa
xeberê dannasîn kin, heger neyêne
şandinê? Çawa nivîsar e: «Çiqasî
h'ewas in gavêd yêd mizgînîya
xêrê didin!»*

* 10:5 Qanûna K'ahîntîyê 18:5.
* 10:6 Qanûna Ducarî 30:12.
* 10:7 Qanûna Ducarî 30:13.
* 10:8 Qanûna Ducarî 30:14.
* 10:11 Îşaya 28:16.
* 10:13 Yoêl 2:32.
* 10:15 Îşaya 52:7.

**16** Lê h'emûya gur'a Mizgînîyê
nekir, çimkî Îşaya dibêje: «Xudan,
k'ê ew gotina ku me got bawer
kir?»* **17** Awa bawerî ji bihîstinê tê
û bihîstin jî ji gotinêd bona Mesîh.
**18** Lê belê ez dipirsim: Gelo wa-
na ne bihîst? Naqewime. Çimkî
nivîsar e:

«Dengê wan t'emamîya e'rdê
hilda û xebera wan li qulbêd
dinyayê bela bû»*.

**19** Ez dîsa dipirsim: Gelo Îsraêl
pê neh'esîya? Pêşîyê Mûsa dibêje:

«Ezê bi miletê ne milet hêlana
bidime we
û bi miletekî bêfe'm hêrsa we
r'akim»*.

**20** Û Îşaya mêrk'îmî dibêje:

«Ez wanva derk'etim, k'îjan li
Min nediger'îyan
û Ez wanva e'yan bûm, k'îjana
bona Min nedipirsîn»*.

**21** Lê belê bona Îsraêlê dibêje:
«T'emamîya r'ojê Min destê Xwe
dirêjî miletekî serh'işk û xwese-
rîxwe kir»*.

### R'e'ma Xwedê hindava miletê Wî Îsraêlêda

**11** **1** Awa ez dipirsim: Gelo
Xwedê dest ji cime'ta Xwe
kir? Na xêr! Ez xwexa jî îsraêlî
me, ji zur'eta Birahîm im, ji qe-
bîla Binyamîn[f]*. **2** Xwedê dest ji
cime'ta Xwe nekir, k'îjan pêşda
bijartibû. Yan hûn nizanin ser-
hatîya Êlyasda[f] nivîsar çi dibêje
çawa, wî şikîyatê[f] Îsraêlê li Xwedê
dikir digot? **3** «Xudan, p'êxembe-
rêd Te kuştin, gorîgehêd[f] Te xirab
kirin, t'enê ez mame û pey min
jî k'etine ku bikujin»*. **4** Lê caba
Xwedê çi bû? «Min Xwer'a h'eft
h'ezar merî xwey kirine, yêd ku
li ber Bae'l[f] çok nedane»*. **5** Usa
jî niha vî zemanîda hineke bi
k'erema Xwedê bijartî mane. **6** Û
heger bi k'eremê ye, îdî ne ji ki-
ra ye, heger usa bûya, k'erem îdî
nedibû k'erem.
**7** Îdî çi? Îsraêl negihîşte wê
çi ku diger'îya, lê yêd bijartî

---

* 10:16 Îşaya 53:1.
* 10:18 Zebûr 19:4.
* 10:19 Qanûna Ducarî 32:21.
* 10:20 Îşaya 65:1.
* 10:21 Îşaya 65:2.
* 11:1 Fîlîpî 3:5.
* 11:3 P'adşatî III, 19:10, 14.
* 11:4 P'adşatî III, 19:18.

gihîştinê û yêd mayîn kor bûn,
8 çawa nivîsar e:

«Xwedê şever'eşa kora anî ser
wan,
ku bi ç'e'va nebînin û bi guha
nebihên, h'eta r'oja îroyîn»*.

9 Û Dawid dibêje:

«De bira t'ext-sifirêd wan li
wan bibine t'or' û t'elek,
qede-bela jî heqê wan be.
10 Bira ava r'eş bê ser ç'e'vêd wan,
nebînin
û pişta wan t'imê tewîyayî be».*

11 Awa ez dipirsim: Gelo ew ji
r'ê derk'etin, ku unda bin? Na
xêr! Lê neheqîya wan bû sebebê
xilazbûna necihûya, ku pozê wan
jî bişewite. 12 Heger neheqîya wan
bû sebeb ku dinya dewletî be û
k'etina wan bû sebeb ku necihû
dewletî bin, lê wê hê çiqas k'ar
be gava t'emamîya wan xilaz be!

## Xilazbûna necihûya

13 Niha ez we necihûyar'a di-
bêjim: Belê ez şandîyê necihûya
me, qulixê xwe bilind dikim,
14 belkî bikaribim pozê yêd ji xûn
û goştê xwe bidime şewatê û ji
wan hineka jî xilaz kim. 15 Çimkî
heger t'exsîrbûna[f] wan bû sebebê
lihevhatina dinyayê t'evî Xwedê,
îdî lê qebûlbûna wanê bibe çi,
heger ne saxbûna mirîya?

16 Heger girika hevîr, çawa be-
rê[f] deremeta pêşin Xwedêr'a dayî
h'elal e, ku usa ye t'emamîya şkevê
pêva h'elal e*. Û heger r'aw pîroz
in, ç'iqil jî pêr'a pîroz in. 17 Heger
ji wan ç'iqila hinek şkestin, lê tu,
necihû dara zeyt'ûnêye beyanî bû-
yî, dewsa wan hatî servakirinê û
t'evî qinyata r'awêd zeyt'ûnê bûyî,
18 tu dilê xwe li wan ç'iqilêd şkestî
şa neke. Lê heger dilê xwe şa kî,
bîr bîne, wekî ne ku te r'aw jor
girtine, lê r'awa tu girtîyî. 19 Îdî tê
bêjî: «Ç'iqil şkestin, wekî ez bême
servakirinê». 20 R'ast e. Ewana ji
dest nebawerîyê şkestin û te bi ba-
werîyê h'îm girt. K'ubar nebe, lê
bitirse. 21 Çimkî heger h'eyfa Xwedê
ç'iqilêd binyat'î nehat, h'eyfa Wî
wê te jî neyê. 22 Awa dîna xwe bi-
de şîrinayî û h'işkîya Xwedê, Ew
h'işk e hindava ji r'êk'etîyada û
şîrin e hindava teda, heger nava
şîrinayîyêda bimînî. Lê heger na,
tê jî bêyî bir'înê. 23 Lê heger cihû
nava nebawerîyêda nemînin, wê

* 11:8 Qanûna Ducarî 29:4; Îşaya 29:10.
* 11:9-10 Zebûr 69:22-23.
* 11:16 Jimar 15:19, 20.

bêne servakirinê, çimkî Xwedê dîsa
dikare wan servake. 24 Çimkî heger
tu, necihû wekî binyat'a xweda
ç'iqilê zeyt'ûna beyanî bûyî û hatî
bir'în, ser wê zeyt'ûna qence ne
ji binyat'a xwe hatî servakirinê,
lê hê çiqas r'ih'et ewê ku ç'iqilêd
binyat'î ne, wê ser zeyt'ûna xwe
bêne servakirinê.

### R'e'ma Xwedêye hindava h'emûyada

25 Ez naxwazim xûşk-birano, ku
hûn haş ji vê sur'ê t'unebin, ku
hûn xwe dewsa zana daneynin.
P'areke miletê Îsraêlê wê serh'işk
bimîne, h'eta h'esabê wan neci-
hûyêd ku wê xilaz bin t'emam be.
26 Bi vî awayî t'emamîya Îsraêlê
wê xilaz be, çawa nivîsar e:

«Azakir wê ji Sîyonê bê
û bêxwedêtîyê ji Aqûb dûr xe.
27 Û ev e peymana Mine t'evî wan,
gava Ez gunêd wan hildim»*.

28 Mizgînîyê ku dinihêr'î, ewana
dijmin in bona xatirê we, lê bijar-
tinê ku dinihêr'î, ewana h'izkirî
ne, bona xatirê kal-bavêd wan.
29 Çimkî Xwedê k'îjana dibijêre û
p'êşk'êşa dide k'ê, wê yekêda ne
p'oşman e. 30 Çawa we jî wextekê
guhdarîya Xwedê nedikir, lê niha
bi neguhdarîya wana we r'e'm dît,
31 usa jî ewana niha bûne neguh-
dar, wekî bi r'e'mdîtina we ew jî
r'e'mê bibînin. 32 Çimkî Xwedê
h'emû kirine girtîyêd neguhda-
rîyê, wekî h'emûya jî bê r'e'mê.

### Pesindayîna zanebûna Xwedê

33 Çiqasî k'ûr in dewlemendtî,
serwaxtî[f] û zanebûna Xwedê! Qi-
rarêd Wî çiqasî ji h'iş-aqila dûr
in û kes serederîyê ji r'îyêd Wî
nake!* 34 Çawa nivîsar e:

«K'ê nêta Xudan pê h'esîya?
Yan k'ê bû şîretk'arê Wî?*
35 Yan k'ê pêşda tiştek daye Wî,
wekî Ew dîsa li wan veger'îne?»*

36 Çimkî her tişt ji Wî, bi Wî û
bona Wî ne. Şikir ji Wîr'a h'e-
ta-h'etayê. Amîn*.

### Qurbanêd[f] saxe durufkirî

12 1 Awa ez hîvî ji we di-
kim xûşk-birano, bona

---

* 11:27 Îşaya 59:20-21; 27:9.

* 11:33 Îşaya 55:8-9.

* 11:34 Îşaya 40:13; Yêremîya 23:18.

* 11:35 Îbo 41:11.

* 11:36 Korint'î I, 8:6.

wê dilşewatîya Xwedê, qalibê xwe
dîyarî Xwedê kin, çawa qurbaneke[f]
saxe durufkirî, li Wî qebûl, ya ku
h'ebandina weye r'uh'anî* ye. 2 Û
nek'evine kirasê bendê vê dinyayê,
lê bi nûbûyîna h'işê xwe werine
guhastinê, wekî bizanibin çi ye
qirara Xwedê, ku qencî, xweşî û
k'amilî ye.

3 Ez bi wê k'erema ku Xwedê
da min, we her kesîr'a dibêjim:
Çiqas ji we dik'eve, ji wê zêdetir
nefikirin, lê ser xwe bin, bira her
kes weke wê bawerîya ku Xwedê
p'arevekir, bifikire. 4 Çawa qalibê
meda gelek endem hene û h'emû
endem kirekî nakin,* 5 usa jî em
gelek in, lê yektîya Mesîhda em
bedenek in û her kes ji me endemêd
hev in. 6 Awa anegorî wê k'erema
mer'a hatîye dayînê, p'êşk'êşêd
xweye cûr'e-cûr'e bidine xebatê.
Heger p'êşk'êşa p'êxembertîyê[f] ye,
bira weke wê çapa bawerîyê bidine
xebatê, 7 heger xizmetk'arî ye, bira
nava xizmetk'arîyêda bin, heger
hînkirin e, bira pey hînkirinê bin,
8 yê dil dide mêriv, bira li pey wê
yekê be, ewê p'arevedike, bira bi
mer'danî bike, ewê serwêr e, bira
xîret be, ewê qencîyê dike, bira
bi eşq û şa bike.

9 H'izkirina we h'ilek'arî nî-
be, ji xirabîyê zivêr bin, xwe li
qencîyê bigirin. 10 H'izkirinêda
çawa xûşk-bira ser hev şewat bin,
qedirkirinêda ji hevdu derbaztir
bin, 11 xîretêda xwer'anedîtî nîbin,
r'uh'ê xweda* alav din, xizmet-
k'arîya Xudan bikin, 12 bi gumanê
şa bin, tengasîyada sebir kin, her
gav dua bikin, 13 destê xwe dirêjî
cime'ta Xwedêye destteng kin,
pey mêvanh'izîyê bin.

14 Yê we dizêrînin hûn dua wan
bikin, belê dua bikin û nifir'a li
wan nekin*. 15 T'evî yêd şa dibin
şa bin û t'evî yêd digirîn bigirîn.
16 Fikira we her kesî hindava hevda
yek be, k'ubar-babax nîbin, lê t'evî
p'erîşana nimiz bin, xwe dewsa
zana daneynin*.

17 Ji ber xirabîyêva xirabîyê li t'u
kesî nekin. Çi li ber ç'e'vê h'emû

* 12:1 Aha jî tê fe'mkirinê: «H'ebandina weye r'ast», yan «H'ebandina weye t'ebîyetî».
* 12:4-8 Korint'î I, 12:4-12.
* 12:11 Aha jî tê fe'mkirinê: «Bi R'uh'ê Xwedê alav din».
* 12:14 Metta 5:44.
* 12:16 Gotinêd Silêman 3:7.

meriva qenc e, wê bikin. 18 Çiqas
ji dest we tê, t'evî h'emû meriva
e'dilayîyêda bin. 19 H'eyfê hilnedin,
delalno, lê cî bidine hêrsa Xwe-
dê, çimkî nivîsar e: «H'eyfhildan
destê Min e, Ezê h'eyfê hilînim,
Xudan dibêje»*. 20 Lê belê ev jî
heye: «Heger dijminê te bir'çî ye,
nên bidê û heger t'î ye, avê bidê,
çimkî tu bi vê yekê pirîskê êgir
ser serê wî t'op dikî»*. 21 Nehêle
xirabî ser te k'eve, lê bi qencîyê
tu ser xirabîyê k'eve.

### Heleqetîya bawermenda t'evî serwêr û h'ukumetêd vê dinê

13 1 Her merivek bira gur'a
wan h'ukumetîyada be, ku
ser wîr'a ne, çimkî t'u h'ukumetî
bêyî destûra Xwedê t'une û ewê
ku hene jî, ji Xwedêda ne. 2 Awa
k'î ku ber h'ukumetîyê r'adibe, ew
ber e'mirê Xwedê r'adibe û ewê ku
r'adibin, dîwana Xwedê ser xweda
tînin. 3 Çimkî serdar yêd qencîyê
dikin natirsînin, lê yêd xirabîyê.
Tu dixwazî ji h'ukumetê netirsî?
Xwe li qencîyê bigire, tê bibî şîrinê
wê. 4 Çimkî ew xizmetk'arê Xwedê
ye bona qencîyêd te. Lê heger xwe
li xirabîyê bigirî, jê bitirse, çimkî
wî badîhewa[f] şûr girênedaye. Ew
xizmetk'arê Xwedê ye, ku hêrsa
Wî ser wanda bir'êje, k'îjanêd ku
xirabîyê dikin. 5 Lema em gerekê
gura h'ukumetada bin, ne t'enê
wekî em li ber hêrsê nek'evin,
lê belê wekî îsafa me jî dilê me
r'ih'et bihêle.

6 Bona vê yekê jî hûn xerc jî
didin, çimkî ew xulamêd Xwedê
ne, borcdarêd xercstandinê ne*.
7 Awa k'êr'a çi dik'eve, li wan
veger'înin, k'êr'a xerc dik'eve,
xerc bidinê, k'êr'a selef dik'evin,
selefa bidinê, ji k'ê gerekê bitir-
sin, bitirsin, k'êr'a qedir dik'eve,
qedirê wî bigirin.

### H'izkirina hindava hevda

8 T'u tiştîda deyndarê t'u kesî
nemînin, pêştirî li hev h'izkirinê,
çimkî k'î ku hevalê xwe h'iz dike,
t'emamîya Qanûnê diqedîne. 9 Ev
t'emîyêd ku hene: «Zinîyê neke,
nekuje, nedize, dilhavijîyê neke»*
û her çi t'emîyêd ku hene, dik'e-
vine nava vê gotinê: «Hevalê xwe

* 12:19 Qanûna Ducarî 32:35.
* 12:20 Gotinêd Silêman 25:21, 22.
* 13:6 Metta 22:21.
* 13:9 Derk'etin 20:13-15, 17; Qanûna Ducarî 5:17-19, 21.

weke xwe h'iz bike»**. 10 H'izkirin
xirabîyê li hevalê xwe nake. Awa
h'izkirin serê Qanûnê digire.
11 Vê yekê bikin, çimkî hûn za-
nin ev çi zeman e. Niha îdî wext
e hûn ji xewê h'işyar bin, çimkî
niha xilazbûn hê nêzîkî me ye, ne
ku hingê gava me bawer kir. 12 Şev
gelek çûye, sibeh nêzîk bûye, awa
kirêd te'rîstanîyê em ji xwe dûr
xin û ç'ekêd r'onayîyê ser xweva
kin. 13 Usa bijîn çawa r'onaya r'o-
jê, bê kûç'iksantîyê, serxweşîyê,
bênamûsîyê, h'eramîyê, şer'ûdî-
yê û h'evsûdîyê. 14 Lê Xudan Îsa
Mesîh li xwe bikin mert'al û guh
nedine wan xwestinêd binyat'a
xweye merivayî.

### Loma li birayê xwe neke

**14** 1 Ewê ku bawerîyêda sist e,
qebûl kin, lê ne ku bona
bîr-bawerîya wî jêr'a bik'evine
de'wê. 2 Yek bawer dike, ku her
tiştî dikare bixwe, lê yê sist e,
t'enê p'incar'ê dixwe. 3 Ewê ku
dixwe, bira yê naxwe bêhurmet
neke û ewê ku naxwe, bira loma
yê dixwe neke, çimkî Xwedê ew
qebûl kirîye. 4 Tu k'î yî ku loma
xulamê xelqê dikî? Heger sekinî
be yan k'etî be, ew îşê Xweyê wî
ye. Lê wê bisekine, çimkî Xudan
dikare wî bide sekinandinê.
5 Yek r'ojekê ser r'ojê dinr'a digire,
yek jî h'emû r'oja weke hev digire.
Bira her kes fe'mîna xweda bawer
be. 6 K'ê r'ojekê xwer'a e'zîz h'esab
dike, bona Xudan e'zîz h'esab di-
ke, usa jî ewê dixwe bona Xudan
dixwe, çimkî şikirîyê dide Xwedê.
Û yê naxwe jî bona Xudan naxwe
û şikirîyê dide Xwedê. 7 Ji me tu
kes bona xwe najî û t'u kes jî bona
xwe namire. 8 Heger em dijîn, bona
Xudan dijîn û heger em dimirin
bona Xudan dimirin. Awa heger
em bijîn yan bimirin, p'ara Xudan
in. 9 Bona vê yekê jî Mesîh mir û
sax bû, wekî hin h'ukumî ser mi-
rîya bike, hin jî ser zêndîya. 10 Îdî
tu çima loma birê xwe dikî? Yan
tu çima birê xwe bêhurmet dikî?
Em h'emûyê jî li ber dîwana Xwedê
bisekinin*. 11 Çimkî nivîsar e: «Ez
saxîya Xwe kim, Xudan dibêje, ku
her çok wê li ber Min bitewe û her
kesê bêje: ‹Tu yî Xwedê›»*. 12 Awa
ji me her kesê bona xwe cabê li
ber Xwedê bide.

** 13:9 Qanûna K'ahîntîyê 19:18.
* 14:10 Korint'î II, 5:10.
* 14:11 Îşaya 49:18; 45:23.

### Birê xwe p’işk[f] neke

13 De îdî em loma hevdu nekin,
lê hûn xwer’a bidine ber h’esaba,
çawa bikin ku nig nedine li ber
bira, ku nelik’umin yan p’işk[f] ne-
bin. 14 Ez vê yekê zanim û Xudan
Îsada guman im, ku tiştekî ji xwe
h’eram[f] t’une, lê bona wî h’eram e,
yê ku h’eram h’esab dike. 15 Heger
bi xwarina xwe tu dilê birê xwe
ji xwe dihêlî, îdî jîyîna te ne bi
h’izkirinê ye. Bi xwarina xwe wî
unda neke, bona k’îjanî Mesîh
mir. 16 Bira ew tiştêd ku tu bona
xwe qenc dibînî, nebe me’nî ku
xirabî bê gotinê. 17 Çimkî P’adşa-
tîya[f] Xwedê xwarin û vexwarinêda
nîne, lê heqî, e’dilayî û şabûnêda
ye, ku dayîna R’uh’ê Pîroz in.
18 K’ê bi van xulamtîyê Mesîhr’a
dike, ew li Xwedê xweş tê û dibe
şîrinê meriva.

19 Awa em hindava hevda ser
nêta e’dilayîyê û bawerî ava-
kirinê bin. 20 R’ûyê xwarinêda
şixulê Xwedê xirab nekin. Her
tişt h’elal e, t’enê bona wî merivî
ne r’ast e, yê ku bi xwarina xwe
dibe bayîsê k’etina xelqê. 21 Qenc
e ne goşt bixwî, ne şeravê vexwî
û ne jî tiştekî usa bikî, ku birê
te bik’eve. 22 Tu çawa bawer dikî,
bira nava te û Xwedêda bimîne.
Xwezî li wî, yê ku bi van tiştêd
ku fe’m dike ku r’ast in, xwe
gunek’ar nake. 23 Lê heger yek
dixwe dudilîyê dike, dîwanê ser
xweda tîne, çimkî bi bawerîyê
naxwe. Û her tiştê ku ne bi ba-
werîyê ye, gune ye.

### Tu li xelqê xweş were, ne ku li xwe

**15** 1 Em ku bawerîyêda qe-
wat in, gerekê bik’evine
bin barê sista, ne ku em li xwe
xweş bên. 2 Bira ji me her kes alî-
yê qencîyêda li hevalê xwe xweş
bê, ku bawerîyêda bişide. 3 Çimkî
Mesîh jî ne ku li Xwe xweş hat,
lê çawa nivîsar e: «Ew qarêd ku li
Te dikin, li Min dikin»*. 4 Lê çi
ku pêşda k’itêbada hate nivîsarê,
bona hînbûna me hate nivîsarê,
wekî em bi sebirê û wan gotinêd
nivîsarada ku bînê didine ber me,
xweyîguman bin. 5 De bira Xwe-
dêyê sebirê û bîna li ber her kesî
bide we, ku hûn hindava hevda
ser nêtekê bin, weke nexş-t’erzê
Mesîh Îsa, 6 ku hûn h’emû bi dil
û zarekî şikirîyê bidine Xwedêyê
Bavê Xudanê me Îsa Mesîh.

* 15:3 Zebûr 69:9.

### Mizgînî bona necihûya

7 Bona vê yekê bona şikirîya
Xwedê hevdu qebûl kin, çawa
Mesîh em qebûl kirin. 8 Çimkî
ez wer'a dibêjim, ku Mesîh bû
xizmetk'arê cihûya, bona aminî-
ya Xwedê e'yan ke, wekî ew sozê
kal-bavar'a hatîye dayînê, mak ke
9 û necihû bona r'e'ma Wî şikirîyê
bidine Xwedê. Çawa nivîsar e:

«Bona vê yekê Ezê nav neci-
hûyada pesinê Te bidim
û eşqî navê Te bistirêm»*.

10 Û dîsa dibêje:

«Gelî necihûya, şa bin t'evî
miletê Wî!»*

11 Û dîsa dibêje:

«Şikirîyê bidine Xudan gelî
necihûya
û pesinê Wî bidin, h'emû cim-
e'tno»*.

12 Îşaya jî dibêje:

«Tamareke Yêşa[f] wê derê,
bibe mîrê necihûya
û necihû wê gumana xwe bi-
dine ser Wî»*.

13 Bira Xwedêyê gumanê dilê we
bi şabûnê û e'dilayîyêva bik'im-
k'imîne, bona wê bawerîya we,
wekî gumana we bi qewata R'uh'ê
Pîroz zêde be.

### Xizmetk'arîya Pawlose bona necihûya

14 Ez xwexa weda guman im
xûşk-birayêd min, ku hûn qen-
cîyada mane û zanebûnêva jî
dagirtî ne, dikarin hevdu şîret
kin. 15 Lê alîkîva min turuş kir
wer'a nivîsî, ku wan tişta bikime
bîra we, bona wê k'erema ku ji
Xwedêda minr'a hatîye dayînê,
16 wekî ez nava necihûyada bi-
bime berdestîyê Mesîh Îsa. Ez
nava Mizgînîdayîna Xwedêda
mîna k'ahînekî[f] xizmetk'arîyê
dikim, ku h'edîbûna[f] necihûya
qebûl be, bi R'uh'ê Pîroz buhur-
tî-jibare be. 17 Awa ez dikarim bi
saya Mesîh Îsa pê xizmetk'arîya
xweye bona Xwedê bifir'im. 18 Ez
turuş nakim bona tiştekî usa
xeber dim, pêştirî wan tiştêd ku
Mesîh bi destê min kirine, bona
guhdarîya necihûya, heger bi xe-
bera be yan kira be, 19 bi qewata
nîşana û k'eremeta, bi qewata

* 15:9 Zebûr 18:49.
* 15:10 Qanûna Ducarî 32:43.
* 15:11 Zebûr 117:1.
* 15:12 Îşaya 11:10.

R'uh'ê Xwedê. Û bi vî awayî ez
ji Orşelîmê[f] girtî h'eta Îlîrkûmê
ger'îyam, Mizgînîya Mesîhva
t'ijî kir. **20** Min dice'dand ku
wan dera Mizgînîyê dannasîn
kim, k'îderêd bona navê Mesîh
nehatibû bihîstinê, wekî nebe ku
ez ser h'îmê hinekêd din çêkim.
**21** Lê belê çawa nivîsar e:

«K'îjanar'a bona Wî nehatîye
gotinê, wê bibînin
û k'îjana bona Wî ne bihîstîye,
wê bizanibin»*.

## T'ivdîra Pawlose bona r'omayîya

**22** Lema gelek cara r'ê nedi-
k'ete min ser weda bihatama.
**23** Lê niha îdî van alîya cîyê usa
t'une p'êgeh lê nek'etibe û ev
çend sal e ez dikim bême cem
we, **24** gava her'ime Spanyayê.
Awa gumana min heye, ku ezê
ser r'îya xwe serîkî li we xim û ji
wir hûn min ver'êkin ez her'ime
Spanyayê, gava bîna min hinekî
pê we derê. **25** Lê niha ez diçime
Orşelîmê, ku bi k'omekdayînê
xizmetk'arîya cime'ta Xwedê
bikim. **26** Çimkî xûşk-birayêd
Mekedonyayê û Axayayê bi hevr'a
qayl bûn, ku alîk'arîkê bidine
cime'ta Xwedêye belengaz, yêd
ku Orşelîmêda dimînin. **27** Ew
qayl bûn û deyndarê wan in jî.
Çimkî necihûya alîyê r'uh'anîda
k'omek ji cihûya standin, gerekê
ew jî alîyê hebûka[f] dinêda k'o-
mekê bidine wan. **28** Awa pey vê
kirinêr'a, gava k'omeka t'opkirî
bigihînime cî, ezê bêm cem we,
ji wir derbazî Spanyayê bim. **29** Ez
zanim gava bême cem we, ezê
bi dewlemendtîya dua-dirozgêd
Mesîh* bêm.

**30** Ez hîvî ji we dikim xûşk-bi-
rano, bi saya Xudanê me Îsa
Mesîh û wê h'izkirina ji R'uh',
wekî hûn bi duayêd xweye li ber
Xwedê t'evî şer'k'arîya min bin.
**31** Dua bikin, wekî ez ji destê wan
xilaz bim, yêd ku Cihûstanêda[f]
nebawer in û wekî xizmetk'arîya
mine bona k'omekdayînê Orşe-
lîmêda li cime'ta Xwedê xweş
bê. **32** Û bi vî awayî ezê bi e'mirê
Xwedê, bi dilekî şa bême cem we
û hinekî t'evî we hêsa bim. **33** De
bira Xwedêyê e'dilayîyê t'evî we
h'emûya be. Amîn.

---

* 15:21 Îşaya 52:15.

* 15:29 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Bi dewlemendtîya dua-dirozgêd Mizgînîya Mesîh».

### Silavêd Pawlose axirîyê

16 1 Ez t’emîya xûşka Foybê
didime we, ya ku berdestîya
civîna Kenxêryayê dike. 2 Hûn wê
bi navê Xudan qebûl kin, çawa li
cime’ta Xwedê dik’eve û gava dibe
h’ewcê tiştekî, destê xwe dirêjî wê
kin, çimkî ewê jî xweyîtî geleka
kirîye û usa jî min.
3 Silavê bidine Priskîlayê û
Akîla*, heval-xebatêd mine şixulê
Mesîh Îsada. 4 Wana bona min dest
ji e’mirê xwe k’işand, ne ku t’enê
ez ji wan r’azî me, lê t’emamîya
civînêd ji necihûya jî. 5 Û li civîna
mala wanda jî silav kin.
Apênetoyê delalê min jî silav
kin, ku Asyayêda bawermendê
Mesîhî[f] pêşin e. 6 Silavê bidine
Meryemê, ku bona we gelek xûdan
r’êtîye. 7 Silavê bidine Endronî-
ko û Yûnyasê pismam û hevalêd
mine kelêda. Ew nava şandîyada
e’yan in û berî min bawerîya xwe
Mesîh anîne.
8 Silavê bidine Emplîyato, de-
lalê minî ji Xudan. 9 Silavê bidine
Ûrbano heval-xebatê meyî şixulê
Mesîhda û Staxoyê delalê min.
10 Silavê bidine Apêlîs, ku bona
Mesîh yekî k’etî-r’abûyî ye. Silavê
bidine mala Arîstopolo. 11 Silavê
bidine Hêrodîyonê pismamê min.
Silavê bidine wan, yêd ku ji mala
Nerkîso ne, nav bawerîya Xudanda
ne. 12 Silavê bidine Tirîfênayê û
Tirîfosayê, k’îjan bona navê Xudan
dixebitin. Silavê bidine Persîsêya
delal, ku gelekî xûdan r’êtîye bona
Xudan. 13 Silavê bidine R’ûfoyê
bijartîyê* Xudan û dîya wî û usa
jî çawa dîya min. 14 Silavê bidi-
ne Asînkrîto, Flêgon, Hermês,
Patrobas, Hermas û xûşk-birayêd
mayîne t’evî wan. 15 Silavê bidine
Fîlologo û Yûlîya, Nêroyîs û xûşka
wî, usa jî Olîmpas û t’emamîya
cime’ta Xwedêye t’evî wan.
16 Silavê bidine hev bi r’amûsana
şîrê h’elal. H’emû civînêd Mesîh
li we silav dikin.

### T’emîyêd axirîyê

17 Niha ez hîvî ji we dikim
xûşk-birano, ku hûn h’evza xwe
ji wan bikin, yêd ku ji wê hînbûnê
der, ya ku hûn hîn bûne, cudebûnê
pêşda tînin û xelqê p’işk dikin.
Ji wan dûr bin. 18 Çimkî yêd usa
xulamtîyê li Xudanê me, Mesîh
nakin, lê zikê xwe diç’êrînin. Bi

* 16:3 K’arêd Şandîya 18.
* 16:13 Aha jî tê fe’mkirinê: «R’ûfoyê nav şixulê Xudanda e’yan».

zarê xweş û h’ilek’arîyê, yêd saxikê
dilê xwe dixapînin. 19 Guhdarîya
we nav h’emûyada bi nav û deng
e û ez bona we şa me, lê dixwa-
zim ku hûn serwaxt bin hindava
qencîyêda û dilsax bin hindava
xirabîyêda. 20 Û Xwedêyê e’di-
layîyê zûtirekê wê serê mîrêcin[f]
binê nigêd weda bip’elêxe.

K’erema Xudanê me Îsa Mesîh
t’evî we be.

21 Tîmot’êyoyê heval-xebatê min
li we silav dike, usa jî Lûkyo, Ya-
son û Sospatroyê pismamêd min.

22 Ez Tertîyo jî bi navê Xudan
li we silav dikim, yê ku ev ne’-
me nivîsî.

23 Gayos li we silav dike, qo-
naxê min û yê t’emamîya civînê.
Êrastoyê ser xizna bajêr li we si-
lav dike û usa jî birayê Kiwarto.
24 K’erema Xudanê me Îsa Mesîh
t’evî we h’emûya be. Amîn*.

**Dua û şikirdayîn**

25 Niha şikir ji Wîr’a, Yê ku
dikare we bawerîyêda bişidîne,
weke wê Mizgînîya ku ez bona
Îsa Mesîh dannasîn dikim, weke
aşkerebûna wê sur’a ku hê dewrêd
berêye bihurîda veşartî mabû,
26 lê niha bi nivîsarêd p’êxembe-
ra e’yan bû û bi e’mirê Xwedêyê
h’eta-h’etayê hate naskirinê, wekî
h’emû milet bawer bikin û guhdar
bin. 27 Şikir ji Xwedêyê t’enêyî
serwaxtr’a, bi saya Îsa Mesîh,
h’eta-h’etayê. Amîn*.

* 16:24 Nav destnivîsarêd here qencda r’êza 24-a t’une.
* 16:27 Nav hinek destnivîsarada r’êza 25 h’eta 27-a t’unene.

# NE’MA PAWLOSE PÊŞIN KORINT’ÎYAR’A

## Pêşgotin

Korint’ bajarekî Yûnanistanêyî[f] e’yan bû, ew p’ayt’extê qeza Axayayêye R’omayê bû. Bi destê Pawlos h’îmê civîna[f] Mesîh li wir hate danînê, gava dema r’êwîtîya xweye dudada ew li wir 18 meha ma (K’arêd Şandîya 18:11, 18). Korint’ bajarekî gul û geş û navî-deng bû, ne ku t’enê alîyê t’ucaretîyêda[f], lê usa jî alîyê r’abûn-r’ûniştinê, zanebûn û h’ebandinêda, çimkî her milet li wir diman. Lê belê alîkîva jî bênamûsîyêda h’ewla xwe dewlê avîtibûn. Û vê yekê gelekî h’ukumî ser civîna nû dikir û her cûr’e ze’metî pêşda danî.

Aha k’ifş dibe ku eva ne’ma nêzîkî sala 54-a Efesêda korint’îyar’a hatîye nivîsarê, dema r’êwîtîya Pawlose 3-a (Korint’î I, 16:8; K’arêd Şandîya 19:1). Şandî[f] bi vê ne’mê ser wan pirsa disekine, k’îjan ku ser e’mirê civîna nû bibûne giranî, usa jî ser heleqetîya wan r’abûn-r’ûniştin û çi ku bawerîya[f] bawermendava girêdayî bû.

Xemê Pawlos dup’a bona dutîretîya civînê û ç’e’vderîya[f] wan bû (serêd 1-ê h’eta 6-a). Usa jî ew pirsêd h’al-zewacê (serê 7-a), îsafê[f] (serêd 8-a h’eta 11:1), qeyde-qanûnêd civînê, p’êşk’êşêd[f] R’uh’ê[f] Pîroz (serêd 11-a h’eta 14-a) û fikira r’abûna mirîya (serê 15-a) e’nene dike. Û k’ûr dide k’ifşê, ku Mizgînî[f] çawa van pirsa dinihêr’e û caba wan dide.

Serê 13-da derheqa h’izkirinêda xeber dide, ku ew ji Xwedêda mêrivr’a p’êşk’êşeke here mezin e. Belkî ev serî p’ara here e’yan e, nava vê p’arêda.

**Serecema fikira ne’mê**

Pêşgotin (1:1-9)
Dutîretîya nava civînê (1:10–4:21)
Pirsa bona h’al-zewacê (5:1–7:40)

Pirsa îsafê û xwe dûr xweykirina bawermenda ji r'aw-r'izimêd[f] mileta (8:1–11:1)
E'mir, h'ebandin û t'erbetîya civînê (11:2–14:40)
R'abûna Mesîh û bawermenda ji mirinê (15:1-58)
K'omekt'opkirina bawermenda bona civîna Cihûstanê[f] (16:1-4)
Çend t'ivdîrêd Pawlos û paşgotin (16:5-24)

### Silavkirin

1 [1] Ji Pawlosê ku bi e'mirê
Xwedê şandîtîya[f] Mesîh Îsar'a
gazîkirî, t'evî Sostênîsê bira,
[2] civîna[f] Xwedêye Korint'êr'a,
buhurtî-jibarebûyîyêd yektîya
Mesîh Îsada, yêd pîrozbûnêr'a[f]
gazîkirî, t'evî wan h'emûyêd ku
her dera gazî navê Xudanê[f] me
Îsa Mesîh dikin, Ew Xudanê
wan û me ye:
[3] De bira k'erem[f] û e'dilayîya
Xwedêyê Bavê[f] me û Xudan Îsa
Mesîh li we be.

### Şikirdarîya Pawlos

[4] Ez her gav bona we şikirîyê
didime Xwedêyê xwe, bona wê
k'erema[f] Wî, ya ku bi saya Mesîh
Îsa wer'a hatîye dayînê. [5] Belê
hûn bi yektîya Wî her tiştîda
dewletî bûn, her xeberdanê û her
zanebûnêda. [6] Hînkirina derheqa
Mesîhda nava weda h'îmê xwe
usa girtîye, [7] ku hûn kêmasîya t'u
p'êşk'êşê[f] nak'işînin, gava hîvîya
xuyabûna Xudanê me Îsa Mesîh
in. [8] Ewê we h'eta xilazîyê h'îm-
girtî xwey ke, ku hûn R'oja hatina
Xudanê me Îsa Mesîh bêlek'e bin.
[9] Amin e ew Xwedêyê ku gazî we
kir, wekî hûn t'evî Kur'ê Wî Îsa
Mesîhê Xudanê me bin.

### Dutîretîya civîna Korint'êda

[10] De ez îdî hîvî ji we dikim
xûşk-birano, bi navê Xudanê me
Îsa Mesîh, bira gotina we h'emû-
ya yek be û dutîretî nava weda
t'unebin, lê h'emû jî bi hevr'a bin
û ser nêt-meremekî bin. [11] Çimkî
min salixê we ji mala Xiloyê hilda
xûşk-birano, ku nava weda de'w-doz
hene. [12] Awa gotî dixwazim bê-
jim, wekî nava weda yek dibêje:
«Ez Pawlosî me», yek dibêje: «Ez

Apoloyî me», yek jî dibêje: «Ez
Petrûsî[f]* me» û yekî din jî dibêje:
«Ez Mesîhî me». **13** Çima Mesîh
p’arevebûyî ye? Çima Pawlos bona
we xaç[f] bûye? Yan bi navê Pawlos
hûn pê avê hatine nixumandinê[f]?
**14** Ez ji Xwedê r’azî me, ku min ji
we t’u kes nenixumand, pêştirî
Kirîspo û Gayos. **15** Niha t’u kes
nikare bêje, ku hûn bi navê min
hatine nixumandinê. **16** (R’ast e
min mala Steyfan jî nixumand.
Lê wekî mayîn nayê bîra min,
ku min yekî din nixumandibe.)
**17** Çimkî Mesîh ez nixumandinêr’a
neşandim, lê Mizgînîdayînêr’a[f] û
ez vê yekê nadime zora xeberdana
zimên, ku nebe qewata xaçê Mesîh
ber tiştekî neyê h’esabê.

## Mesîh qudreta Xwedê û serwaxtîya[f] Xwedê ye

**18** R’ast e hînkirina derheqa
xaçda undabûyîyar’a bêh’işî ye, lê
me xilazbûyîyar’a[f], qewata Xwedê
ye. **19** Çawa nivîsar e:

> «Ezê serwaxtîya[f] serwaxta unda kim
> û bîlantîya[f] bîlana betal kim»*.

**20** K’anên serwaxt? K’anên zane?
K’anên aqilmendêd vê dinyayê? Ne
serwaxtîya vê dinyayê Xwedê kire
bêh’işî? **21** Çimkî serwaxtîya Xwe-
dê nehişt ku dinya bi serwaxtîya
xwe Wî nas ke, lê li Xwedê xweş
hat, bi wê hînkirina «bêh’işî» yêd
ku bawer dikin xilaz[f] ke. **22** Cihû[f]
k’eremeta dixwazin û yûnan jî
serwaxtîyê diger’in. **23** Lê em,
Mesîhê xaçbûyî dannasîn dikin,
cihûyar’a p’işkbûn[f] e, necihûyar’a[f]
jî bêh’işî, **24** lê bona yêd ku Xwedê
gazî wan dike, heger cihû bin,
heger necihû, ew xeber Mesîh e,
qewata Xwedê û serwaxtîya Xwe-
dê. **25** Çimkî ew kirêd Xwedêye
ku ber ç’e’vê meriva[f] bêh’işî xuya
dibin, ew ji serwaxtîya merivayê
serwaxttir in û ber ç’e’vê meriva
çiqas sistîya Xwedê xuya dibe, ew
ji qewata merivayê qewattir e*.
**26** Dîna xwe bidinê xûşk-bi-
rano, hûn k’î bûne ku Xwedêda
hatine gazîkirinê: Alîyê dinêda ji
we gelek ne serwaxt bûne, ji we
gelek dinêda ne zor bûne û ne jî

---

* 1:12 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Kîfas». «Kîfas» bi zimanê aramî[f] tê fe’mkirinê: «Petrûs».
* 1:19 Îşaya 29:14.
* 1:25 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Çimkî bêh’işîya Xwedê ji (serwax-tîya) meriva serwaxttir e û sistîya Xwedê ji (qewata) merivayê qewattir e».

ji we gelek malêd r'engînda bûne.
27 Lê Xwedê bêh'işêd dinê bijartin,
wekî serwaxta bide şermê û sistêd
dinê bijartin, wekî yêd qewat bide
şermê 28 û Xwedê yêd dinêbêxe-
bere bêr'ûmet û yêd ne t'u tişt
bijartin, ku heyînêd berbiç'e'v r'et
ke her'e, 29 wekî t'u qûl-bende li
ber Xwedê pê xwe nefir'e. 30 Ewî
hûn t'evî Mesîh Îsa kirin û Mesîh
bona me kire serwaxtî. Em bi Wî
r'ast[f] têne h'esabê, pîroz[f] û aza
dibin. 31 Awa çawa nivîsar e: «Yê
ku difir'e, bira bi Xudan bifir'e»*.

## Hînkirina derheqa Îsayê xaçbûyîda

**2** 1 Ez jî gava hatime cem we
xûşk-birano, ez bi xeber yan
serwaxtîya k'emale giran nehatim
sur'a* Xwedê weva e'yan kim.
2 Çimkî gava ez nava weda bûm,
min nêta xweda danenî ku tiştekî
din hîn kim*, pêştirî Îsa Mesîh
û Ew jî Yê xaçbûyî. 3 Ez xwexa
h'alekî sistda, bi xof û tirs nava
weda bûm. 4 Û gotin û hînkirina
min, ne ku bi xeberêd serwaxtîya
merivayîye zarxweşîyê bû, lê bi
îzbatîya qewata R'uh'ê[f] Pîroz bû*.
5 Ev yek aha bû, wekî bawerîya[f]
we bi serwaxtîya merivayê nîbe,
lê bi qewata Xwedê be.

## Serwaxtîya Xwedê

6 Lê belê derheqa serwaxtîyê-
da em yêd r'uh'anîye gihîştîr'a
xeber didin, lê ne serwaxtîya vê
dinê û ne jî ya serwêrêd vê dinê,
ku h'ukumê wan betal dibe. 7 Lê
em derheqa serwaxtîya Xwedêye
sur'e veşartîda xeber didin, ya ku
Xwedê hê berî e'firandina din-
yayê, bona r'ûmeta me qirar kir.
8 Ji serwêrêd vê dinyayê t'u kesî
ev serwaxtîya fe'm nekir, çimkî
heger fe'm bikirana, wê Xudanê
r'ûmetê xaç nekirana. 9 Lê çawa
nivîsar e:

«Ew tiştêd ku ç'e'va nedîtine
û guha nebihîstine,
dilê[f] mêrivr'a derbaz nebûne,
Xwedê bona wan hazir kirine,
yêd ku Wî h'iz dikin»*.

---

* 1:31 Yêremîya 9:24.
* 2:1 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Şe'detî» (çawa «hînkirin»).
* 2:2 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Zanibim». Awa gotî Pawlos nexwest pêştirî Îsa tiştekî din çawa zanebûn hîn bikira.
* 2:4 Aha jî tê fe'mkirinê: «Lê ev yek xuyabûna qewata R'uh'ê Pîroz bû».
* 2:9 Îşaya 64:4.

[10] Lê belê Xwedê bi R'uh'ê Xwe
ev yek li ber me vekir. Çimkî
R'uh' her tiştî e'nene dike, h'eta
nêt-meremêd Xwedêye k'ûr jî.
[11] K'î haş ji kêl-me'nîyêd mêriv
heye, pêştirî wî r'uh'ê nava wîda?
Usa jî kes haş ji ya Xwedê t'une,
pêştirî R'uh'ê Xwedê. [12] Me ne
ku r'uh'ê vê dinyayê standîye,
lê ew R'uh'ê ji Xwedê, wekî em
wan tiştêd ji Xwedêda mer'a
dayî fe'm bikin. [13] Em bona van
tişta bi gotinêd ji serwaxtîya
merivayê hînbûyî xeber nadin,
lê bi gotinêd hînkirina ji R'uh'ê
Xwedê xeber didin, tiştêd r'u-
h'anî wanr'a şirovedikin, yêd ku
xweyî-R'uh'ê Xwedê ne*. [14] Lê
merivê nexweyî-R'uh' wan tiştêd
R'uh'ê Xwedê qebûl nake, bi ya
wî ev yekana bêh'işî ne û nikare
jî fe'm bike, çimkî h'alê wan tiş-
ta bi r'uh'anî têne e'nenekirinê.
[15] Lê yê xweyî-R'uh'ê Xwedê her
tiştî e'nene dike, lê belê xwexa ji
kesekî nayê e'nenekirinê. [16] Çawa
nivîsar e: «K'ê nêt-fikira Xudan
pê h'esîya, ku şîretekê bide Wî?»*
Lê nêt-fikira Mesîh serê meda ye.

## Qulixk'arêd Xwedê

**3** [1] Lê min xûşk-birano, nika-
ribû t'evî we xeber da çawa
t'evî yêd xweyî-R'uh'ê Xwedê, lê
çawa t'evî bendêd vê dinê, çawa
t'evî xişîmêd bawerîya Mesîhda.
[2] Min şîr da we, lê ne ku xwari-
na giran, çimkî we hê nikaribû
bixwara. Û hûn niha jî nikarin
bixwin, [3] çimkî hûn hela hê mîna
bendêd vê dinê ne. H'eta ku nava
weda h'evsûdî û hevr'ik'î* hene,
gelo ev yekana ne merivayî ne? Û
hûn mîna bendêd vê dinê najîn?
[4] Mesele ku gava yek dibêje: «Ez
Pawlosî me» û yê din: «Ez Apo-
loyî me», hûn ne mîna bendêd
vê dinê ne?

[5] Îdî k'î ye Apolo? K'î ye Paw-
los? Ew qulixk'arêd Xwedê ne,
bi k'îjana we bawer kir. Xudan
çiqas şixul daye wan her kesî,
haqasî jî dikin. [6] Min daç'ikand,
Apolo avda, lê Xwedê gîhand*.
[7] Awa ne yê daç'ikand tiştek e,
ne jî yê avda, lê yê gîhand, ku
Xwedê ye. [8] Yê daç'ikand û yê
avda yek in û her kesê heqê xwe

* 2:13 Aha jî tê fe'mkirinê: «Tiştêd r'uh'anî, bi r'uh'anî şirovedikin».
* 2:16 Îşaya 40:13.
* 3:3 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Dutîretî».
* 3:6 K'arêd Şandîya 18:4-11; 18:24-28.

bistîne, weke xebata xwe. 9 Çimkî
em t'evayî bona Xwedê dixebitin,
hûn jî zevîya Xwedê ne, avayîyê
Xwedê ne.

10 Min jî weke wê k'erema ku
Xwedê da min, mîna çîredeste-
kî[f] serwaxt h'îm avît, lê yekî din
ser çêdike. Lê belê t'enê bira her
kes haş ji xwe hebe, çawa çêdi-
ke. 11 Çimkî h'îmekî din kesek
nikare bavêje, pêştirî yê avîtî,
ku Îsa Mesîh e. 12 Li ser vî h'îmî
yek dikare bi zêr', zîv, kevirêd
qîmet, dar, gîhê, yan kayê çêke,
13 lê bi çi tiştî jî çêke, şixulê her
kesî wê e'yan be, çimkî ew R'oj
wê bide k'ifşê, ewê bi êgir e'yan
be û kirê her kesî çi h'alîda be,
agirê bicêr'ibîne[f]. 14 Heger şixulê
yekî ser vî h'îmê çêkirî bimîne,
ewê heq bistîne, 15 lê heger şixulê
yekî bişewite, ewê zîyanê bik'işîne,
lê xwexa wê xilaz be, çawa yekî
nava êgirr'a derbazbûyî.

16 Çima hûn nizanin ku hûn
p'aristgeha[f] Xwedê ne û R'uh'ê
Xwedê nava weda dimîne?* 17 Heger
yek p'aristgeha Xwedê wêran ke,
Xwedê jî wê wî wêran ke, çimkî
p'aristgeha Xwedê pîroz e û hûn
in ew p'aristgeh.

18 Bira t'u kes xwe nexapîne.
Heger yek ji we li gora qeydêd vê
dinyayê xwe serwaxt dibîne, bira
bibe bêh'iş, wekî bibe serwaxt.
19 Çimkî serwaxtîya vê dinyayê li
ber Xwedê bêh'işî ye. Çawa nivîsar
e: «Ew serwaxta nava h'ilek'arîya
wanda digire»* 20 û dîsa: «Xudan
zane ku şêwirêd serwaxta p'ûç'
in»*. 21 De bira îdî t'u kes pê me-
riva nefir'e! Belê her tişt jî p'ara
we ne. 22 Pawlos, Apolo, Petrûs*,
dinya, jîyîn, mirin, tiştêd ku niha
hene, yan yêd wê bên, her tişt p'ara
we ne, 23 hûn jî p'ara Mesîh in û
Mesîh jî p'ara Xwedê ye!

### Berdestîyêd Mesîh

4 1 Awa gerekê meriv me usa
h'esab kin, çawa berdestîyêd
Mesîh û wek'îlêd sur'êd Xwedê.
2 Ji wek'îl jî dik'eve ku ew amin
be. 3 Lê bona min ev yek ne t'u tişt
e, ku fikirêd we yan yêd dîwana
merivayê ser min çi ne, ez xwexa
jî loma li xwe nakim. 4 Îsafa min
r'ih'et e, ne ku bi vê yekê ez xwe

* 3:16 Korint'î I, 6:19; Korint'î II, 6:16.
* 3:19 Îbo 5:13.
* 3:20 Zebûr 94:11.
* 3:22 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Kîfas».

sofî dikim, lê h’akimê min Xudan
e. 5 Awa ji wext zûtir loma nekin,
h’eta hatina Xudan. Ewê tiştêd
te’rîyêda veşartî derxe r’onayê
û şêwirêd dila[f] bide e’yankirinê.
Û hingê her kesê qîmetê xwe ji
Xwedê bistîne.

6 Ev yekana xûşk-birano, min
bona we anîne ser xwe û Apolo,
wekî hûn vê yekê ji me hîn bin:
«Ji nivîsarê derneyên». Hingê ji
we t’u kes wê yek pê yekî nefir’e.
7 K’î te ji xelqê firqî dike? Çî te
heye, ku te p’êşk’êş[f] nestandîye?
Lê wekî te standîye, çima p’eyê
xwe didî çawa te nestandibe?

8 Hûn îdî t’êr bûne, îdî h’ir’
bûne! Bêyî me îdî bûne p’adşa!
Ax xwezî hûn bibûna p’adşa, emê
jî t’evî we bibûna p’adşa! 9 Çimkî
ez t’exmîn dikim, ku Xwedê em
şandî avîtine paşîya k’oç’a, çawa
ji mirinêr’a dayî. Em dinêda bû-
ne îtoyîn[f], hin li ber milyak’eta[f],
hin jî ber meriva. 10 Em bêh’iş in
bona Mesîh, lê hûn serwaxt in
yektîya Mesîhda! Eme sist in, lê
hûne qewat! Hûne xweyîr’ûmet
in, lê eme bêr’ûmet! 11 H’eta niha
jî em bir’çî dimînin, t’î dimînin,
bê sit’ar dibin, têne k’utanê û de-
ro-der dibin. 12 Em bi destê xwe
dixebitin, bi xûdana xwe dijîn.
Gava me r’ezîl dikin, em dua li
wan dikin, gava me dizêrînin, em
sebir dikin, 13 gava navê mer’a di-
lîzin, em li ber wan dadixin. Em
bûne gemara vê dinyayê, h’eta niha
jî her tiştîda bûne xwelî!

14 Ez vê yekê wer’a dinivîsim,
ne ku we bidime şermê, lê wekî
we mîna zar’êd xweye delal şîret
kim. 15 Heger wê jîyîna weye t’evî
Mesîhda bi h’ezara t’erbetdarêd[f]
we hebin, lê t’enê bavekî we heye,
çimkî wê jîyîna weye t’evî Mesîh
Îsada hûn ji min bi Mizgînîdayînê
dinê k’etin. 16 Awa hîvî ji we di-
kim, ç’e’v bidine min*.** 17 Bona
vê yekê min Tîmot’êyo ser weda
şand, lawê xweyî delal û hindava
Xudanda amin. Ewê wan r’ê-dir-
bêd mine Mesîh Îsada girtî bike
bîra we, ku ez çawa li her dera,
h’emû civîna hîn dikim.

18 Hinek ji we babax bûne, wan
t’irê[f] ezê neyême cem we. 19 Lê
ezê zûtirekê ser weda bêm, he-
ger Xudan h’iz bike û ezê ne ku
li gotinêd babaxa binihêr’im, lê

* 4:16 Korint’î I, 11:1; Fîlîpî 3:17.

** 4:16 Nav hinek destnivîsarêd paşwextîyêda ev jî heye: «Çawa min jî ç’e’v da Îsa».

h'unurêd wan. 20 Çimkî P'adşatîya[f]
Xwedê ne ku xeberdanêda ye, lê
h'unurda ye. 21 Hûn çawa dixwa-
zin? Ez bi k'ulmê ser weda bêm,
yan bi h'izkirinê û berbihêrîyê?

### Zirara bênamûsîya civînêda

5 1 Deng heye ku nava weda
bênamûsî jî heye û ew jî bê-
namûsîke usa, wekî nava p'ût-
p'aristada[f] jî t'une, ku yek dest
davêje dêmar'îya xwe*. 2 Û hûn
ji k'ubarîyê h'ir' bûne! Ne gerekê
we şîn bikira û yê xweyê vî kirî
ji nava xwe derxista? 3-4 Lê belê
çawa ez bedenî ne nava weda me,
lê r'uh'ê xweda hazir im û çawa
yekî hazir, min îdî bona yê vî tiştî
dike qirara xwe bi navê Xudanê
me Îsa daye. Gava hûn cîkî di-
civin, r'uh'ê min jî t'evî we, bi
qewata Xudanê me Îsa 5 wî merivî
bidine destê mîrêcin[f], ku qalibê
wî unda be û r'uh'ê wî xilaz be
R'oja[f] Xudanda.

6 Ne qenc e ku hûn fir'naq
dibin! Gelo hûn nizanin ku hi-
nek hevîrtir'şk[f] t'emamîya şkevê
hiltîne? 7 Vî hevîrtir'şkê kevin ji
xwe dûr xin, ku hûn bibine hevîrê
nûyî bê hevîrtir'şk, çawa hûn usa
ne jî. Çimkî Berxê meyî Cejina
Derbazbûnê[f], awa gotî Mesîh
bona me hate serjêkirinê. 8 De
em vê cejinê derbaz kin, ne ku
bi hevîrtir'şkê kevinî neheqîyê û
xirabîyê, lê bi nanê bê hevîrtir'şk,
bi nanê h'elalîyê û r'astîyê.*

9 Min wer'a ne'mêda nivîsîbû, ku
t'evî qava[f] nebin. 10 Ne ku gotina
min derheqa qava, timak'ara, t'a-
lankir yan p'ûtp'aristêd vê dinêda
bû. Heger usa bûya, gerekê hûn
lap ji dinê derk'etana. 11 Lê belê
min wer'a nivîsî, ku hûn t'evî wî
nebin, yê ku navê xwedênasîyê
ser e, lê qav e, tima ye, p'ûtp'arist
e, buxdanbêj e, serxweş e, yan jî
t'alankir e. T'evî yê usa h'eta nên
jî nexwin! 12-13 Çî minr'a ye ez
dîwana yêd ji civînê der bikim?
Xwedê wê dîwana wan bike. Lê
dîwana yêd civînêda destêd weda
ye. Awa çawa nivîsar e: «Merivê
xirab ji nava xwe derxin».*

### Pirsa derheqa de'w-doza nava bawermendada

6 1 Gelo eva k'arê kirinê ye,
gava yek ji we, nava wî û birê

* 5:1 Qanûna Ducarî 22:30.
* 5:7-8 Derk'etin 12; 13:7.
* 5:12-13 Qanûna Ducarî 17:7; 19:19; 22:21, 24; 24:7.

wîda de'w-doz pêşda tê, turuş
dike li ber nep'aka wê yekê dide
safîkirinê, ne ku li ber cime'ta
Xwedê? 2 Çima hûn nizanin ku
cime'ta Xwedê wê dîwana dinê
bike? Û heger bi destê we wê
dîwana dinyayê bê kirinê, gelo
hûn nikarin van pirsêd sivik jî
safî kin? 3 Çima hûn nizanin ku
emê dîwana milyak'eta jî bikin?
Îdî k'u dimîne dîwana pirsêd vê
dinyayê nekin? 4 Awa heger nava
weda pirsêd vê dinêye safîkirinê
hebin, hûn çawa dikarin h'akimtîyê
bidine destê yêd usa, ku ji alîyê
civînêda ne t'u tişt in? 5 Ez aha
dibêjim, ku hûn şerm bikin! Gelo
nava weda yekî serwaxt t'une, ku
bikaribe nava birada serederîyê
bike? 6 Lê bira birêr'a dik'eve
de'w-dozê, ew jî li ber nebawera!

7 We r'astî vê yekêda lap da-
ye der, ku hûn hevr'a dik'evine
dergeh-dîwana. Gelo hê qenc
nîne, ku hûn bêne neheqkirinê?
Gelo hê qenc nîne, ku hûn bêne
şêlandinê? 8 Lê hûn neheqîyê di-
kin û dişêlînin, ew jî xûşk-bira!
9 Çima hûn nizanin ku yêd neheq
wê P'adşatîya Xwedê war nebin?
Nexapin! Ne bênamûs, ne p'ût-
p'arist, ne zinêk'ar, ne jinêd hevr'a
dibin r'obet, ne mêrêd hevr'a dibin
r'obet,* 10 ne diz, ne timak'ar, ne
serxweş, ne buxdanbêj, ne jî t'a-
lankir P'adşatîya Xwedê wê war
nebe. 11 Û ji we hinek usa bûn.
Lê hûn ji guna hatine şûştinê,
hûn hatine buhurtî-jibarekirinê,
hûn r'ast[f] hatine h'esabê bi navê
Xudan Îsa Mesîh û bi R'uh'ê
Xwedêyê me.

## Bira bedenêd we Xwedêr'a xizmetk'arîyê bike

12 Dibêjin: «Her tişt minr'a e'det
e», belê, lê her tişt ne k'ar e. «Her
tişt minr'a e'det e», lê t'u tişt gerekê
h'ukumî ser min neke. 13 Dibêjin:
«Xwarin bona zik e, zik jî bona
xwarinê ye», lê Xwedê her duya
jî wê unda ke. Lê beden ne bona
qavîyê ye, lê bona xizmetk'arîya
Xudan e û Xudan jî bona bedenê
xem dike. 14 Û Xwedêyê ku Xudan
ji mirinê r'akir, wê me jî ji mirinê
r'ake bi qewata Xwe. 15 Çima hûn
nizanin ku bedenêd we endemêd
Mesîh in? Ez endemêd Mesîh
hildim t'evî qava kim? T'u car!
16 Yan hûn nizanin yê ku t'evî
qava dibe, t'evî wê dibe bedenek?

* 6:9 Binihêr'e: R'omayî 1:26-27.
* 6:16 Destpêbûn 2:24.

Çawa nivîsar dibêje: «Her du wê
bibine bedenek»*. **17** Lê ewê ku
t’evî Xudan dibe, dibe r’uh’ek.

**18** Ji qavîyê bir’evin! H’emû
gunêd mayîne ku meriv dike, ji
bedenê der e, lê ewê ku qavîyê
dike, miqabilî bedena xwe guna
dike. **19** Çima hûn nizanin ku be-
denêd we p’aristgeha R’uh’ê[f] Pîroz
in, ku nava weda ye, K’îjan we
ji Xwedê stand? Hûn ne xweyîyê
serê xwe ne*. **20** Hûn bi qîmetekî
biha hatine k’ir’înê. Bona vê ye-
kê bikin ku pê bedena we şikirî
Xwedêr’a bê dayînê*.

### Pirsêd h’al-zewacê

**7** **1** Lê niha derheqa wan pirsêd
ku we minr’a nivîsîn: «Qenc e
wekî mêr nêzîkî jinê nebe?»* **2** Lê
bona ku pêşîya her cûr’e qavîyê
bê girtinê, bira mêr bê jin nebe
û jin jî bê mêr. **3** Mêr bira deynê
jinê bidê, jin jî deynê mêr. **4** Jin ne
xweya qalibê xwe ye, lê mêr, usa
jî mêr ne xweyê qalibê xwe ye, lê
jin. **5** Ji hevdu na-na nekin, pêştirî
wê demê, gava hûn bi hevr’a bona
wextekê t’ifaq[f] qirar dikin wekî
xwe bidine duakirinê*, lê paşê
dîsa li hev veger’in, ku mîrêcin we
necêr’ibîne[f] ji dest bêt’awîya we.
**6** Ez vê yekê dihêlime ser exterîya
we, ne ku e’mir dikim. **7** R’ast e,
min dixwest ku h’emû meriv mî-
na min bûna, lê her merivekîr’a
dayîneke ji Xwedê heye, yek ha
ye, yek jî aha ye.

**8** Lê yêd bê jin û jinebîyar’a ez
dibêjim: Qenc e ku ew mîna min
bimînin. **9** Lê heger xwe zeft na-
kin, bira bizewicin-mêr kin, çimkî
qenc e ku ew bizewicin-mêr kin,
ne ku xweda bişewitin.

**10** Lê yêd zewicî-mêrkirîr’a, ne
ku ez e’mir dikim, lê belê Xudan:
Bira jin ji mêr neqete*, **11** heger
biqete jî, bira mêr neke yan jî
mêrê xwer’a li hev bê. Û mêr jî
bira jina xwe ber’nede.

---

* 6:19 Korint’î I, 3:16; Korint’î II, 6:16.

* 6:20 Nav hinek destnivîsarêd paşwextîyêda aha ye: «Bona vê yekê pê beden û r’uh’ê xwe Xwedêr’a şikirîyê bidine dayînê, yêd ku p’ara Xwedê ne».

* 7:1 Derheqa «Qenc e wekî mêr nêzîkî jinê nebe?» hinek fe’m dikin ku eva caba Pawlos e, hinekêd mayîn jî dibêjin ku eva pirsa korint’îya ye yan jî bîr-bawerîya wan e.

* 7:5 Nav hinek destnivîsarêd paşwextîyêda ev jî heye: «r’ojî[f]».

* 7:10 Metta 5:32; 19:9; Lûqa 16:18.

12 Lê yêd mayînr’a ez dibêjim,
ne ku Xudan: Heger jina birakî
nebawer be û bixwaze t’evî wî
bimîne, bira wê ber’nede. 13 Û
jineke ku mêrê wê nebawer be û
ew bixwaze t’evî wê bimîne, bira ji
wî neqete. 14 Çimkî mêrê nebawer
bi jina bawermend h’elal dibe û
jina nebawer jî bi mêrê bawermend
h’elal dibe. Heger usa nîbûya,
zar’êd weyê h’eram[f] bûna, lê ni-
ha h’elal in. 15 Lê heger nebawer
biqete, bira biqete. Xûşk yan bira
vê derecêda aza ye. Belê Xwedê
gazî we e’dilayîyê kir. 16 Tu çi zanî
k’ulfetê[f], belkî tê mêrê xwe xilaz
kî? Yan jî tu çi zanî mêro, belkî
tê k’ulfeta xwe xilaz kî?

### Bawermend gerekê li gora e’mirê Xwedê bijîn

17 Wekî din ez dibêjim: Xudan
çawa p’ara her kesî da û çawa
Xwedê gazî her kesî kir, bira we-
ke wê yekê jî bijî. Ev e t’emîya ku
ez didime h’emû civîna. 18 Heger
yek sinetkirî[f] bû gava hate gazî-
kirinê, bira sinetbûna xwe îdî
neguhêze. Heger yek nesinetkirî
bû gava hate gazîkirinê, bira îdî
sinet nebe. 19 Ne sinetbûn tiştek e
û ne jî nesinetbûn, lê serî t’emî-
yêd Xwedê qedandin e. 20 K’î çi
h’alîda bû gava Xwedê gazî kirê,
bira nava wêda jî bimîne. 21 Xu-
lam bûyî gava hatî gazîkirinê?
Xem neke. Lê heger dikarî aza
bî, wê mecalê ji destê xwe neke.
22 Çimkî ew xulamê ku hate ga-
zîkirinê, wekî bibe p’ara Xudan,
ew azayê Xudan e, usa jî ewê ku
aza bû gava hate gazîkirinê, ew
xulamê Mesîh e. 23 Hûn bi qîme-
tekî biha hatine k’ir’înê, nebine
xulamêd meriva. 24 Xûşk-birano,
k’î çi h’alîda hate gazîkirinê, bira
nava wêda jî li ber Xwedê bimîne.

### Pirsêd bona qîz û xorta

25 Lê niha çi ji qîz û xorta* di-
k’eve, min derheqa wanda e’mir
ji Xudan nestandîye, lê t’enê ez
fikira xwe dibêjim, çawa yekî ji
Xudan r’e’m standî ku hindava
Wîda amin e. 26 Ez bona tenga-
sîya[f] niha aha r’ê têr’a dibînim ku
meriv çi derecêda ye, bira usa jî
bimîne. 27 Jinêva girêdayî yî? Neke
ku jê biqetî. Bê jin î? Jinê neger’e.
28 Lê heger bizewicî, gune[f] nakî û
heger qîz mêr ke, gune nake. Lê
yêd usa wê r’astî oxirmêd giran
bên, ez dixwazim we ji wê yekê
xwey kim.

* 7:25 Bi yûnanî xeber bi xeber, dewsa «qîz û xorta» «bik’ira[f]» heye.

29 Ez wer'a dibêjim birano: Wext
hindik maye. Ji vir şûnda ewê ku
jina wî heye bira usa be çawa yê
bê jin, 30 ewê ku digirî çawa yê
nagirî, ewê ku şa dibe çawa yê
şa nabe, ewê ku dik'ir'e çawa ne
xweyê wan tişta be, 31 û ewê ku
şixulê dinêva mijûl dibe çawa yê
pêva mijûl nabe, çimkî ev dinya
e'yan derbaz dibe.

32 Lê ez dixwazim ku hûn ji
xema dûr bin. Yê nezewicî şi-
xulêd Xudanva gîro ye, ku çawa
bike li Xudan xweş bê. 33 Lê yê
zewicî xemêd dinêva gîro ye, ku
çawa bike li jina xwe xweş bê 34 û
ser du r'îya sekinî ye. Jina bêmêr
yan qîz şixulêd Xudanva gîro ye*.
Meremê wê ew e, ku ew r'uh' û
qalibê xweda buhurtî-jibare be,
lê ya mêrkirî xemêd dinêva gîro
ye, ku çawa bike li mêrê xwe xweş
bê. 35 Ez van tişta bona k'ara we
dibêjim, ne ku bar didime ser
milê we, lê dixwazim wekî hûn
bi t'erbet û bi dil û can şixulêd
Xudanva gîro bin.

36 Lê heger yek fe'm dike, wekî
hindava dergîstîya xweda r'astîyê
nake, temê wî jî xirab bûye* ku
gerekê bizewice, bira usa bike
çawa dixwaze, gune nake, bira
hevdu bistînin. 37 Lê ewê ku gi-
ranî ser wî t'une, lê li temê xwe
dikare û dilê xweda qirar kirîye
ku dergîstîya xwe usa xwey ke
çawa berê, ew tiştekî qenc dike.
38 Awa yê dergîstîya xwe distî-
ne, qenc dike, lê yê ku wê bik'ir
dihêle, hê qenc dike.* 39 Jin ne
xweserîxwe ye h'eta ku mêrê wê
sax e, lê heger mêr lê bimire, ew
aza ye, t'evî k'ê bixwaze dikare
mêr ke, t'enê bawermendê Xu-
dan be. 40 Lê ewê hê xwezilî be,
ku usa bimîne. Ev e fikira min

---

* 7:34 Nav hinek destnivîsarada r'êza 34-a aha destpêdibe: «Nava ya mêrkirî û nemêrkirîda[f] firqî heye, ya nemêrkirî şixulêd Xudanva gîro ye».

* 7:36 Aha jî tê fe'mkirinê: «E'mirê wê derbaz dibe».

* 7:36-38 Hinek zane dibêjin, ku li gora e'detê yûnana xort dikaribû dergîstîya xwe bik'ir[f] xwey bikira, h'eta ku dilê wî dixwest. Hinekêd din jî van r'êza aha fe'm dikin: «(R'êza 36) Lê heger yek fe'm dike, wekî hindava qîza xweda r'astîyê nake, çimkî e'mirê wê derbaz dibe, bira usa bike çawa dixwaze, gune nake, bira bide mêr. (R'êza 37) Lê ewê ku giranîyê ser xwe k'ifş nake, lê ser ya xwe ye û dilê xweda jî qirar kirîye ku qîza xwe nede mêr, ew tiştekî qenc dike. (R'êza 38) Awa yê qîza xwe dide mêr qenc dike, lê yê bik'ir dihêle hê qenc dike».

û t'exmîna min R'uh'ê Xwedê
nava minda heye.

### Pirsa xwarina qurbanêd[f] p'ûtp'aristîyê

**8** 1 Lê niha çi ku ji pirsa qurba-
nêd p'ûta dik'eve: Fe'mdarî
ye ku zanebûna me her kesî jî
heye. Zanebûn p'işika mêriv di-
werimîne, lê h'izkirin ava dike.
2 Heger yek t'exmîn dike, ku ew
tiştekî zane, ew r'ast hê tiştekî usa
nizane çawa ku lazim e bizanibe.
3 Lê heger yek Xwedê h'iz dike,
ew ji alîyê Wîva naskirî ye.

4 Awa derheqa wan qurbanêd
p'ûtaye ku merî dixwin: Em zanin
ku p'ût heyîna xweva p'ûç' in û
Xwedêkî din t'une, pêştirî yekî*.
5 Heger bi navêd din jî xwedê
hebin, yan li e'rdê yan li e'zmên,
çawa bêh'esab xwedê û bêh'esab
xudan hene jî, 6 lê bona me t'enê
Xwedêk heye, Bav, E'firandarê
her tiştî, em jî bona Wî hene û
t'enê Xudanek heye, Îsa Mesîh,
bi K'îjanî her tişt xuliqî ne û bi
saya Wî em hene.

7 Lê ev zanebûn cem her kesî
t'une. H'eta niha hê dilê hineka
pey p'ûtp'aristîyê ye, ku gava wî
goştî dixwin, h'esab dikin çawa
qurbanêd p'ûta û xwe dih'er'i-
mînin, çimkî îsafa[f] xweye sistda
fikara dike. 8 Lê belê xwarin me
li ber Xwedê nade sekinandinê.
Heger em bixwin, tiştekî zêde
nakin û heger nexwin, tiştekî jî
kêm nakin.

9 Lê haş ji xwe hebin, nebe ku
ew azaya we bibe kevirek li ber
nigê sista. 10 Em bêjin, heger me-
rivekî ku îsafa xweye sistda fikara
dike te bibîne, wekî tu «xweyî-
zanebûn» î û li sifra p'aristgeha
p'ûtda r'ûniştî yî, ne ew kirê te
wê dil bide wî, ku ew jî qurba-
nêd p'ûtp'aristîyê bixwe? 11 Û ji
dest wê «zanebûna» te, birê teyî
sist, bona k'îjanî Mesîh mir, wê
unda be. 12 Bi vî awayî, gava tu
neheqîyê li xûşk-birêd xwe dikî
û îsafa wane sist birîndar dikî, li
ber Mesîh neheqîyê dikî. 13 Awa
heger xwarin dibe kevirê li ber
p'îyê birê min, gerekê îdî t'u car
ez goşt nexwim, wekî birê xwe
p'işk[f] nekim.

### Îzin û mecalêd şandîya

**9** 1 Ne ez aza me? Ne ez şandî
me? Ne min Xudanê me Îsa
bi ç'e'va dît? Ne hûn pê xûdana
min p'ara Xudan k'etin? 2 Heger ez

* 8:4 Qanûna Ducarî 6:4.

şandîyê hinekêd mayîn nîbim, lê belê bê şik şandîyê we me! Çimkî mora şandîtîya min hûn in, ku p’ara Xudan k’etin.

3 Caba min bona yêd ku dikin ji min gilîya bik’işînin ev e: 4 Gelo îzina me t’une em ji ber xebata xweva bixwin û vexwin? 5 Gelo îzina me t’une em k’ulfeteke bawerîyêda t’evî xwe biger’înin, çawa şandîyêd din, birayêd Xudan û Petrûs* dikin. 6 Yan gerekê ez û Barnabas[f] t’enê bixebitin serê xwe xwey kin? 7 K’îjan esker ji k’îsê xwe eskerîyê dike? K’î r’ez[f] datîne û berê wê naxwe yan yê li ber pêz e şîrê pêz venaxwe? 8 Ez van tişta bi merivayî nabêjim. Ne Qanûn jî wê yekê dibêje? 9 Çawa Qanûna[f] Mûsada[f] nivîsar e: «Devê gayê bêderêda dixebite girênede»*. Gelo xema Xwedê bona ga ye? 10 Yan wê yekê bona me dibêje? Belê, ev yek bona me hate nivîsarê, wekî ewê ku cotê xwe dike, gerekê bi guman cot ke û yê kam dike, gerekê guman be, ku wê k’eda xwe bixwe jî. 11 Heger me nava weda tiştêd r’uh’anî çandin, gelo tiştekî mezin e, ku ji we tiştêd vê dinê bidirûn? 12 Heger îzina hinekêd din heye k’arê ji we bibînin, ne ya me hê zêde heye?

Lê me ev îzin pêk neanî. Serda jî li her tiştî sebir kir, ku nebine pêşîbir’ê Mizgînîya[f] Mesîh. 13 Hûn nizanin ewêd ku p’aristgehêda dixebitin ji p’aristgehê jî dixwin? Û ewêd xizmetk’arîya gorîgehê[f] dikin, ji gorîgehê jî p’ara xwe distînin*. 14 Usa jî Xudan e’mir kir, ku yêd Mizgînîyê dannasîn dikin, ji Mizgînîyê bijîn*.

15 Lê min ji van îzina qet yek pêk neanî, ne jî niha dinivîsim ku van îzina pêk bînim. De bira ez bimirim, ne ku yek r’ûspîtîya min betal ke. 16 Belê ez nikarim p’eya bidime xwe heger ez Mizgînîyê dannasîn kim, çimkî ev deynê stûyê min e. Wey li min heger ez Mizgînîyê dannasîn nekim! 17 Û heger min ev yeka bi h’emdê xwe bikira, hingê xelata minê hebûya, lê ez vê yekê ne bi h’emdê xwe dikim, çimkî eva qulixek e li min hatîye spartinê. 18 Awa îdî çi ye xelata min? Ev e, ku ez dannasînîya

* 9:5 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Kîfas».
* 9:9 Qanûna Ducarî 25:4.
* 9:13 Qanûna Ducarî 18:1.
* 9:14 Lûqa 10:7-8.

xweda Mizgînîyê bê heq bidim,
îzina xwe Mizgînîdayînêda bi zora
xwe pêk neynim.
19 R'ast e ez ji her kesî aza me,
lê ez dîsa xwe dikime xulamê
h'emûya, wekî hê geleka qazinc
kim. 20 Bona cihûya, dibime mîna
cihûya, wekî cihûya qazinc kim.
Awa gotî bona yêd bin Qanûna
Mûsada, dibime mîna yêd bin
Qanûnê, wekî yêd bin Qanûnêda
qazinc kim, (lê ne ku ez bin Qanû-
nêda me). 21 Bona yêd bê Qanûn,
dibime mîna yêd bê Qanûn, wekî
yêd bê Qanûn jî qazinc kim, (ne
ku ez bê qanûna Xwedê me, lê ez
bin qanûna Mesîhda me). 22 Bona
sista dibime mîna sista, wekî yêd
sist qazinc kim. Bona h'emûya ez
dik'evime h'alê her kesî, wekî her
derecada bikaribim hineka xilaz
kim. 23 Van h'emû tişta ez îdî bona
Mizgînîyê dikim, wekî ez bibime
heval-p'arê dua-dirozgêd ser wê.
24 Hûn nizanin yêd lecmeyda-
nêda ne, h'emû jî dir'evin, lê t'enê
yek xelatê distîne? Usa bir'evin,
ku hûn bistînin. 25 Ewêd ku di-
k'evine lecê, xwe hînî gelek tiştî
dikin, wekî wê k'ofîya[f] ku diç'il-
mise bistînin, lê kirina me bona
k'ofîya h'eta-h'etayê ye. 26 Bona
wê yekê ez usa nar'evim çawa yêd
bêmerem, yan jî bi k'ulma her'ime
bê. 27 Lê ez zordarîyê qalibê xwe
dikim û wê zeft dikim, ku nebe
xelqê gazî lecê kim, lê ew xwexa
ji dest min her'e.

### Xwedê necêr'ibînin, çawa cime'ta Îsraêlê[f] cêr'iband

**10** 1 Naxwazim xûşk-birano,
ku hûn nizanibin wekî
kal-bavêd me h'emû jî bin sîya
e'wrda bûn û h'emû jî Be'ra Sor-
r'a derbaz bûn*. 2 H'emû jî t'evî
Mûsa bûne yek, e'wr û be'rêda
hatine nixumandinê[f]. 3 H'emûya
jî xût ew xwarina r'uh'anî xwar*
4 û h'emûya jî xût ew vexwarina
r'uh'anî vexwar, çimkî ji wî Qe-
yayê r'uh'anî vedixwarin, Yê ku
t'evî wan diçû û ew Qeya Mesîh
bû*. 5 Lê Xwedê gelekêd ji wan
begem nekirin, lema cinyazêd
wan ber'îyêda[f] her dera k'etî man*.
6 Îdî ew tişt bona me bûne me-
selêd gotî, wekî em havijîya xwe

* 10:1 Derk'etin 13:21-22; 14:22-29.
* 10:3 Derk'etin 16:35.
* 10:4 Derk'etin 17:6; Jimar 20:11.
* 10:5 Jimar 14:29-30.

ji tiştêd xirab neynin, çawa wan
dilhavijî kir*. **7** Ne jî bibin p'ûtp'a-
rist, çawa ji wan hinek bûn, bona
k'îjana nivîsar e: «Cime'tê r'ûnişt
xwar, vexwar û r'abûn namûsa
hevr'a lîstin»*. **8** Em qavîyê nekin,
çawa ji wan hineka qavî kir û r'o-
jekêda bîst sê h'ezar merî k'etin
qir' bûn*. **9** Mesîh* necêr'ibînin,
çawa ji wan hineka cêr'iband û bi
me'ra hatine lêdanê mirin**. **10** Û
bîna xwe teng nekin, çawa ji wan
hineka bîntengî kirin û bi destê
milyak'etê mirinê k'oka wan hat*.

**11** Ev h'emû tişt çawa meselêd
gotî dihatine serê wan, lê bona me
ku em axirîya van dewrada dijîn,
çawa şîret hatine nivîsarê. **12** Awa
k'î difikire ku ew miqer'm sekinî
ye, bira haş ji xwe hebe ku nek'e-
ve. **13** Cêr'ibandinêd usa nayêne
serê we, pêştirî wan cêr'ibandinêd
ku têne serê merivêd mayîn. Lê
Xwedê amin e, Ew nahêle ku hûn
ji qewata xwe der bêne cêr'ibandi-
nê. Ewê cêr'ibandinêda delîlekê jî
bike, ku hûn bikaribin teyax kin*.

**14** Awa delalêd min, ji p'ûtp'a-
ristîyê bir'evin. **15** Ez çawa t'evî
serwaxta xeber didim. Hûn xwexa
bidine ber h'esaba, ez çi dibêjim.
**16** Ew k'asa Şîva Xudan, ya ku em
pê şikirîyê didin, ne heleqetîya
xûna Mesîh e? Ew nanê ku em
kerdikin, ne heleqetîya bedena
Mesîh e?* **17** Nanek heye, lema
em h'emû jî bedenek in, çimkî
em h'emû jî ji wî nanî kerdikin.

**18** Dîna xwe bidine cime'ta Îsra-
êlê: Ewêd ku qurbana dixwin, t'evî
wê p'ara gorîgehê nabin?* **19** Belê
ez çi bêjim? Gelo p'ût ji xwe tiş-
tek e, yan qurbanêd p'ûtar'a têne
dayînê berga tiştekî digirin? **20** Na
xêr! Lê gotina min ev e, ku ew
tiştêd p'ûtp'arist dikine qurban,
cinar'a[f] dikin, ne ku Xwedêr'a.
Û ez naxwazim ku heleqetîya we

* 10:6 Jimar 11:4.
* 10:7 Derk'etin 32:6.
* 10:8 Jimar 25:1-18.
* 10:9 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Xudan».
** 10:9 Jimar 21:5-6.
* 10:10 Jimar 16:41-49.
* 10:13 Aha jî tê fe'mkirinê: «Xwedê wê bike ku hûn teyax kin û bi vî awayî hûnê bikaribin ji wê yekê xilaz bin».
* 10:16 Metta 26:26-28.
* 10:18 Qanûna K'ahîntîyê 7:6.

t'evî cina hebe*. 21 Hûn nikarin
hin k'asa Xudan vexwin, hin jî
k'asa cina. Hûn nikarin hin ji
sifra Xudan bixwin, hin jî ji sifra
cina. 22 Yan em bikin ku xîreta
Xudan qebûl neke?* Çima em ji
Wî qewattir in?

23 Dibêjin: «Her tişt e'det e»,
belê, lê her tişt ne k'ar e. «Her
tişt e'det e», lê her tişt ava nake.
24 Nebe ku yek k'ara xwe biger'e,
lê ya hevalê xwe.

25 Çi ku qesabxanada tê firotanê
bixwin, pey pirs-pirsîyara nek'evin,
bona fikarkirina îsafê. 26 Çawa
nivîsar e: «Dinya bi xêr-xizna
xweva ya Xudan e»*. 27 Heger ji
nebawera yek we t'eglîf ke û hûn
bixwazin her'in, çi bidine ber we
bixwin, pey pirs-pirsîyara nek'e-
vin, bona fikarkirina îsafê. 28 (Lê
heger yek wer'a bêje: «Eva qurban
e», îdî nexwin bona yê ku hûn pê
h'esandin û bona fikarkirina îsafê.
29 Gotina min ne bona fikara îsa-
fa we ye, lê ya hevalê we.) Çima
gerekê azayîya min bona fikara
îsafa yekî mayîn bê lomek'arki-
rinê[f]? 30 Heger ez şikirîyê didime
Xwedê dixwim, çima bona wê yekê
xeyba min dikin, wekî ez şikirîya
xwe Xwedê tînim?

31 Awa heger hûn bixwin, ve-
xwin, yan çi şixulî ku hûn bikin,
her tiştî bona şikirdayîna Xwedê
bikin. 32 Ne nig bavêjine ber ci-
hûya, ne ber necihûya, ne jî ber
civîna Xwedê, 33 çawa ez jî her
alîyava li h'emûya xweş têm û
k'ara xwe nager'im, lê ya geleka,
wekî xilaz bin.

11 1 Ç'e'v bidine min, çawa
ez jî ç'e'v didime Mesîh*.

### Bona sernixamtin û serqotîyê dema h'ebandinêda

2 Ez p'eyê we didim, wekî hûn
h'emû derecada min bîr tînin û
ew r'aw-r'izimêd[f] ku min dane
we pêk tînin. 3 Lê ez dixwazim
ku hûn zanibin wekî serê her mêrî

* 10:20 Qanûna Ducarî 32:17.
* 10:22 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Yan em bikin ku hêlanê bidine k'umr'eşîya[f] Xudan». K'umr'eşîya Xudan r'uh'anî tê fe'mkirinê. Peymana[f] Kevinda, gava cime'ta Xwedê dest ji Xwedê k'işand û p'ût h'ebandin, ew usa dihate h'esabê çawa jina yekî ç'e'v bavêje mêrekî din. Hoseya 2:2-13; Yêremîya 3:6-10, 20.
* 10:26 Zebûr 24:1; 50:12; 89:11.
* 11:1 Korint'î I, 4:16; Fîlîpî 3:17.

Mesîh e, serê jinê mêr e û serê Mesîh Xwedê ye. **4** Her mêrê ku sernixamtî dua yan p'êxembertîyê[f] dike, ew serê xwe bêhurmet dike. **5** Û her k'ulfeta ku serqot dua yan p'êxembertîyê dike, ew serê xwe bêhurmet dike. Ew dibe mîna yeke p'or'kur'kirî. **6** Awa gotî, heger k'ulfet serê xwe nenixême, bira p'or'ê xwe jî bibir'e. Lê heger k'ulfetêr'a e'yb e, ku p'or'ê xwe bibir'e yan bide ber dûzan, ku usa ye bira serê xwe binixême. **7** Ne cayîz e mêr serê xwe binixême, çimkî ew sûret û r'ûmeta Xwedê ye, lê jin r'ûmeta mêr e. **8** (Çimkî ne ku mêr ji jinê ye, lê jin ji mêr e* **9** û mêr bona jinê nexuliqî, lê jin bona mêr.) **10** Bona vê yekê gerekê k'ulfet serê xwe binixême, çawa nîşana bin h'ukumda, bona milyak'etêd ku dibînin*. **11** Lê belê yektîya Xudanda ne jin bê mêr dibe, ne jî mêr bê jin. **12** Çimkî çawa jin ji mêr e, usa jî mêr ji jinê ye, lê h'emû jî ji Xwedê ne.

**13** Hûn xwexa bidine ber h'işa, gelo ji k'ulfetê dik'eve, wekî serqot ber Xwedê dua bike? **14** Ne t'ebîyet jî we hîn dike, ku p'or'ê dirêj r'ewşa mêr davêje? **15** Lê r'ewşa jinê p'or'ê dirêj e, çimkî ew p'or' jêr'a bona nixamtinê hatîye dayînê. **16** Lê heger yek bixwaze vê yekêr'a bik'eve de'wê, e'detekî meyî din t'une û ne jî yê civînêd Xwedê.

## Şîva Xudan

*(Metta 26:26-29; Marqos 14:22-25; Lûqa 22:14-20)*

**17** Lê vê t'emîyêda ez p'eyê we nadim, çimkî gava hûn dicivin, ew nabe k'ara we, lê zîyana we. **18** Berî her tiştî, ez dibihêm, gava ku hûn dicivine civînê, nava weda dibe dutîretî û kêm-zêde ez bawer dikim. **19** Belê, e'seyî dutîretî wê bik'eve nava we, wekî yêd nava wedaye jibare k'ifş bin. **20** Awa hûn ku dicivine cîkî, eva nabe şîva Xudan ku hûn dixwin, **21** çimkî gava her yek ji we dixwe, h'ece-h'eca wî ye ser şîvê dik'eve. Yek bir'çî dimîne û yê din k'êfxweş dibe. **22** Çima malêd we t'unene, ku hûn wanda bixwin û vexwin? Yan çima civîna Xwedê bêhurmet dikin û desttenga didine şermê?

---

* 11:8 Destpêbûn 2:18-23.

* 11:10 Aha jî tê fe'mkirinê: «Bona vê yekê û bona milyak'etêd ku dibînin, gerekê k'ulfet sergirêdayî be, çawa nîşana ku h'ukumê wê heye dua û p'êxembertîyê bike».

Ez çi wer'a bêjim? P'eyê we bidim
bona vê yekê? Ez vê yekê nikarim!
23 Min ev yek ji Xudan stand
û da we, ku Xudan Îsa wê şe-
va ku hate nemamkirinê, nan
hilda 24 şikirî da, kerkir û got:
«Eva bedena Min e bona we. Vê
yekê bona bîranîna Min bikin».
25 Usa jî k'as pey şîvêr'a hilda û
got: «Eva k'asa peymana[f] nû ye,
pê xûna Min girêdayî. Vê yekê
bona bîranîna Min bikin, çi car
gava hûn jê vexwin».* 26 Her car,
gava hûn vî nanî bixwin û ji vê
k'asê vexwin, mirina Xudan bikine
dengî, h'eta hatina Wî.

27 Awa k'î bi nelayîqî nanê Xu-
dan bixwe yan k'asa Wî vexwe,
wê deyndarê beden û xûna Wî be.
28 Lema bira meriv pêşîyê dilê xwe
binihêr'e û paşê ji wî nanî bixwe
û ji wê k'asê vexwe. 29 Çimkî k'î
bixwe û vexwe û fe'mîna bedena
Xudan* nizanibe, ew dîwana xwe
dixwe û vedixwe. 30 Lema jî nava
weda gelek nexweş û xweyîzede
hene û hinek jî mirine. 31 Lê heger
me dîwana xwe bikira, dîwana
meyê nehata kirinê, 32 lê gava dî-
wana me bibe, em ji Xudan têne
şîretkirinê, wekî dîwana me t'evî
dinyayê nebe.

33 Awa xûşk-birayêd min, gava
bona şîva Xudan bicivin, hîvîya
hevdu bisekinin. 34 Lê heger yek
bir'çî ye, bira mala xweda bixwe,
ku nebe, gava hûn bicivin, dîwanê
ser xweda bînin. Bona pirsêd ma-
yîn, gava bêm ezê hingê safî kim.

### P'êşk'êşêd[f] R'uh'ê[f] Pîroz

**12** 1 Lê niha çi ji p'êşk'êşêd
R'uh'anî dik'eve xûşk-bi-
rano, ez naxwazim ku hûn nezan
bin. 2 Weva e'yan e gava hûn
p'ûtp'arist bûn, hûn usa pey p'û-
têd ker'e lal k'etibûn, her alîyava
k'etibûne bin qolêd wan. 3 Bona
vê yekê jî ez wer'a dibêjim, t'u kes
t'une ku bi r'êberîya R'uh'ê Xwedê
xeber de û bêje: «Bira nifir' li Îsa
be». Û kesek jî nikare bêje: «Îsa
Xudan e», heger ne bi r'êberîya
R'uh'ê Pîroz.

4 Awa cûr'e-cûr'e p'êşk'êşêd
R'uh'anî hene, lê xût dayîna wî
R'uh'î ne*, 5 cûr'e-cûr'e qulix
jî hene, lê hema wî Xudanîr'a
qulix dikin, 6 usa jî cûr'e-cûr'e
karîn hene, lê xût ew Xwedê ye,

* 11:24-25 Lûqa 22:18-19.
* 11:29 Nav hinek destnivîsarada dewsa «bedena Xudan» t'enê «beden» heye.
* 12:4-12 R'omayî 12:4-8.

ku van dayînada karînê dide her
kesî. 7 Lê her kesîr'a R'uh' bona
k'ara h'emûya xuya dibe. 8 Yekî-
r'a ji R'uh' xebera serwaxtîyê tê
dayînê, yekîr'a xebera zanebûnê
xût ji wî R'uh'î, 9 yekî dinr'a ba-
werî[f] xût ji wî R'uh'î, yekî dinr'a
p'êşk'êşêd nexweşqenckirinê xût
ji wî R'uh'î, 10 yekî dinr'a qewat,
wekî k'eremeta bike, yekî dinr'a
p'êxembertî*, yekî dinr'a fe'mîna
ku r'uh'a ji hev derxe, yekî dinr'a
zimanêd xerîb, yekîr'a jî şirove-
kirina wan zimana. 11 Ev h'emû
jî xût Xwexa ew R'uh' dike û her
kesîr'a başqe-başqe p'arevedike,
çawa ku dixwaze.

### Beden yek e, endem gelek in

12 Çawa beden yek e û gelek
endemêd wê hene, lê dîsa ew
h'emû hevr'a bedenek in, usa jî
Mesîh e. 13 R'ast usa jî yektîya
R'uh'ekîda em h'emû hatine ni-
xumandinê[f], ku bibine bedenek,
hin cihû hin necihû, hin xulam
hin aza û em h'emû jî ji wî R'uh'î
dane vexwarinê.

14 Belê beden ne t'enê endemek
e, lê ji geleka ye. 15 Heger nig bêje:
«Ez ne ji bedenê me, çimkî ez ne
dest im», gelo eva me'nî ye, ku ew
ne ji bedenê ye? 16 Û heger guh
bêje: «Ez ne ji bedenê me, çimkî
ez ne ç'e'v im», gelo eva me'nî ye,
ku ew ne ji bedenê ye? 17 Heger
t'emamîya bedenê ç'e'v bûya, lê
bihîstinê li k'u bûya? Heger h'e-
mû beden guh bûya, bînhildanê
li ku bûya? 18 Lê r'ast Xwedê ew
endem yeko-yeko bedenekêda cî
kirin, çawa Wî xwest. 19 Heger
h'emû endemek bûna, bedenê li
ku bûya? 20 Lê r'ast niha endem
gelek in, lê beden yek e.

21 Ç'e'v nikare bêje dest: «Tu
kêrî min nayêyî!» Û ne jî serî ni-
gar'a dikare bêje: «Hûn kêrî min
nayên!» 22 Lê serda ew endemêd
bedenêye ku sist k'ifş dibin, ew hê
ferz in 23 û ew endemêd bedenêye
bêqedir têne h'esabê, em hê qedirê
wan zanin û yêd e'ybe nava wêda,
em hê bi t'erbet dinixêmin, 24 lê
endemêd meye bêe'yb ne h'ew-
cê wê yekê ne. Lê Xwedê beden

* 12:10 K'itêba[f] Pîrozda û îlahî[f] nava vê ne'ma Pawlosda, xebera «p'êxembertî» fire tê fe'mkirinê. Yê ku p'êxembertîyê dike, ew bi r'êberîya R'uh'ê Pîroz gotineke ji Xwedê e'lamî meriva dike. Çawa Pawlos Korint'î I, 14:3-da dibêje, yê ku p'êxembertîyê dike, bawerîya meriva ava dike, dil dide ber wan û ber dilê wanda tê. Îdî p'êxembertî ne t'enê bona tiştêd ku hê neqewimî ye.

hevva kir, ku yê bêqedir hê qedir
bistîne, 25 wekî dutîretî nek'eve
nava bedenê, lê h'emû endem
ji hevdur'a şewat bin. 26 Lema,
gava endemek êşê dik'işîne, h'e-
mû endem hevr'a dêşin, lê gava
endemek tê pesindayînê, h'emû
endem t'evî wê şa dibin.

27 Awa hûn bedena Mesîh in û
her yek ji we endemekî bedena
Wî ye. 28 Û Xwedê pêşîyê hinek
civînêda kirine şandî, ya duda
p'êxember[f], ya sisîya dersdar, paşê
yêd k'eremetkir, peyr'a yêd xweyîyê
p'êşk'êşêd nexweşqenckirinê, k'o-
mekdarîyê, se'vîtîyê û yêd zimanêd
xerîb*. 29 Çima h'emû şandî ne?
Çima h'emû p'êxember in? Çima
h'emû dersdar in? Çima h'emû
k'eremeta dikin? 30 Çima h'emû
xweyîyê p'êşk'êşêd nexweşqencki-
rinê ne? Çima h'emû bi zimanêd
xerîb xeber didin? Çima h'emû
zimana şirovedikin? 31 De hûn
h'eyra p'êşk'êşêd hê mezinda bin.

Lê ezê r'êke here qenc jî nîşanî
we kim.

### H'izkirin

**13** 1 Heger ez bi zimanêd me-
riva yan milyak'eta xeber
dim, lê dilê minda h'izkirin t'u-
nebe, ezê bibime mîna wî zengilê
ku dike zingîn yan jî bolmêd sifre
ku dikine şingîn. 2 Heger p'êşk'êşa
p'êxembertîyê minr'a hebe û ser
h'emû sur'a vebim, h'emû zane-
bûnê fe'm bikim û heger bawerîya
min jî haqas hebe, h'eta ç'îya jî
ji cî biguhêzim, lê h'izkirin dilê
minda t'unebe, ez ne t'u tişt im*.
3 Û heger hebûka xwe pêva belayî
belengaza kim û bedena xwe jî
bidime der bona şewitandinê, lê
h'izkirin dilê minda t'unebe, t'u
k'ar nagihîje min.

4 H'izkirin dûmikdirêj û şîrin
e, h'izkirin h'evsûdîyê nake, h'iz-
kirin k'ubar nabe, p'işika xweda
nawerime, 5 bêp'ergal nîne, ya xwe
nager'e, zû hêrs nak'eve, k'înê najo,
6 dilê xwe li neheqîyê şa nake, lê
r'astîyêr'a şa dibe. 7 H'izkirin her
gav dadixe, her gav bawer dike,
her gav xweyîguman e, her gav
sebir dike.

8 H'izkirin t'u car k'uta nabe.
Heger p'êxembertî hebin, wê betal
bin, heger zimanêd xerîb hebin,
wê dengêd wan bêne bir'înê, heger
zanebûn hebe, wê derbaz be her'e.
9 Belê em ji p'ir'î-hindikî zanin

* 12:28 Efesî 4:11.
* 13:2 Metta 17:20; 21:21.

û ji p'ir'î-hindikî p'êxembertîyê
dikin. 10 Lê gava k'amiltî bê, hin-
gê nek'amiltî wê derbaz be her'e.

11 Gava ez zar' bûm, min mîna
zar'a xeber dida, mîna zar'a difi-
kirîm, mîna zar'a dida ber h'esêb.
Gava ez mezin bûm, ew tiştêd
zar'otîyê min ji xwe dûr xistin.
12 Niha em çawa qeret'ûkî neyni-
kêda dibînin, lê hingê emê r'û bi
r'û bibînin. Niha ez ji p'ir'î-hin-
dikî zanim, lê hingê ezê t'am nas
bikim, çawa ez hatime naskirinê.

13 Awa niha ev hersêk dimînin:
Bawerî, guman û h'izkirin. Lê
h'izkirin ser wanr'a ye.

### Bona p'êşk'êşêd R'uh'ê Pîroz: P'êxembertî û zimanêd xerîb

**14** 1 Demana h'izkirinêda bin û
h'eyra p'êşk'êşêd r'uh'anîda
bin, îlahî p'êxembertîkirinê. 2 Ewê
ku bi zimanê xerîb xeber dide,
ew ne ku mêrivr'a xeber dide, lê
Xwedêr'a, çimkî kesek Wî fe'm
nake. Ew bi qewata R'uh' sur'a
dibêje. 3 Lê belê yê ku p'êxem-
bertîyê dike, ew mêrivr'a xeber
dide, bawerîya wan ava dike, dil
dide ber wan û ber dilê wanda tê.
4 Ewê ku bi zimanêd xerîb xeber
dide, t'enê bawerîya xwe ava dike,
lê ewê ku p'êxembertîyê dike, ci-
vînê pêva ava dike. 5 Ez dixwazim
ku hûn h'emû jî bi zimanêd xerîb
xeber din, lê ez hê dixwazim ku
hûn p'êxembertîyê bikin, çimkî
yê p'êxembertîyê dike, ji yêd bi
zimanêd xerîb xeber dide çêtir e,
pêştirî wî wextê ku tê şirovekirinê,
wekî civîn bê avakirinê.

6 Awa xûşk-birano, heger ez bê-
me cem we bi zimanêd xerîb xeber
dim, ezê çi k'arê bidime we? T'u
k'arê nadim heger ez e'yantîyê, yan
zanebûnê, yan p'êxembertîyê, yan
hînkirinê wer'a neynim? 7 Hacetêd
nebînbere ku deng derdixin, em
bêjin bilûr be, yan çeng[f], heger dengê
wan nezelal be, wê çawa zanibin çi
miqam tê lêxistinê? 8 Yan jî, heger
bor'î dengekî nenas derxe, k'ê wê
k'arê xwe li şêr' bike? 9 Usa jî hûn,
heger bi zimên xebereke fe'mdarî
nebêjin, wê çawa bizanibin hûn
çi dibêjin? Xeberdana weyê mîna
bayê sar be. 10 K'ifş e ku dinyayêda
çiqas cûr'e-cûr'e ziman hene, lê ji
wan yek jî bê fe'mîn nîne. 11 Lê,
heger ez zimanekî fe'm nakim,
ez bona yê wî zimanî xeber dide
xerîb im û yê xeber dide jî bona
min xerîb e. 12 Usa jî hûn ku h'eyra
p'êşk'êşêd r'uh'anîda ne, nava wan
p'êşk'êşada hê pêşda her'in, k'îjan
civînê ava dikin.

13 Bona vê yekê ewê ku bi zi-
manêd xerîb xeber dide, bira dua

bike ku şiroveke jî. 14 Çimkî gava
ez bi zimanêd xerîb dua dikim,
ew r'uh'ê min dua dike, lê h'işê
minda tişt r'ûnanî. 15 Ez çi bikim?
Ezê hin bi r'uh'ê xwe dua bikim,
hin jî bi h'işê xwe, hin bi r'uh'ê
xwe bistirêm, hin jî bi h'işê xwe.
16 Heger tu bi r'uh'ê xwe şikirîyê
bidî, ewê ku mîna nezana sekinî
ye, wê çawa r'azîdarîya ter'a qayl
be bêje: «Amîn[f]»? Ew qet fe'm
nake jî, tu çi dibêjî. 17 Belê tu r'ind
r'azîbûnê didî, lê bawerîya yê din
nayê avakirinê.

18 Ez ji Xwedêyê xwe r'azî me,
ku ji we h'emûya ze'ftir bi zima-
nêd xerîb xeber didim. 19 Lê belê
civînêda ez hê dixwazim pênc
xeberêd fe'mdarî bêjim, wekî
hinekêd din jî hîn bikim, ne ku
bi h'ezara xeberêd xerîb.

20 Xûşk-birano, h'işê xweda zar'
nîbin! Hindava xirabîyêda mîna
zar'a bin, lê h'işê xweda gihîştî
bin. 21 Qanûnêda nivîsar e:

«Ezê bi merivêd xweyê zima-
nêd xerîb û zarêd[f] xerîba vê
cime'têr'a xeber dim,
lê belê wê hingê jî guhdarîya
Min nekin, Xudan dibêje»*.

22 Awa p'êşk'êşa zimanêd xerîb nî-
şanek e, ne ku bona bawermenda,
lê bona nebawera û p'êxembertî jî
ne ku bona nebawera ye, lê bona
bawermenda*. 23 Heger t'emamî-
ya civînê pêva bicive û h'emû jî
zimanêd xerîb xeber din, hingê
hineke nezan yan nebawer bik'evine
hindur', wê nebêjin: «Evana dîn
bûne»? 24 Lê heger h'emû jî p'êxem-
bertîyê bikin, hingê yekî nebawer
yan nezan bik'eve hindur', wê ji
h'emû gotinêd wan xwe mukur'
bê û bê gunek'arkirinê[f], 25 sur'êd
dilê wîda jî wê bêne e'yankirinê
û dever'û li ber Xwedê bik'eve,
wî bih'ebîne û deng hilde bêje:
«R'astî jî Xwedê nav weda ye!»

### E'rf-e'detêd civînê

26 Em îdî çawa bikin gelî
xûşk-bira? Gava hûn dicivine
cîkî, her kesê ji we çî wî hebe,
heger k'ulam be, hînkirin be,
e'yantî be, xeberdana zimanêd
xerîb be, şirovekirina zimanêd

---

* 14:21 Îşaya 28:11-12; Qanûna Ducarî 28:49.

* 14:22 Xebera «nîşan» li vir bi du cûr'a tê fe'mkirinê, k'ar û zirar. P'êxembertî nîşaneke k'ar e bona bawermenda, çimkî pê wê bawerîya wan tê şidandinê, k'arê dik'evin. Lê xeberdana bi zimanêd xerîb bona nebawera nîşaneke zirar e, çimkî fe'm nakin, k'arê nak'evin.

xerîb be, bira h'emû jî bona ava-
bûna civînê bin. 27 Heger yek bi
zimanê xerîb xeber dide, bira
dudu bin, yan ya lape ze'f sisê,
lê bira yek pey yekîr'a xeber de û
yek jî şiroveke. 28 Lê heger kesek
t'une ku şiroveke, bira ew civî-
nêda dengê xwe neke, t'enê ber
xweda Xwedêr'a xeber de. 29 Û
ji p'êxembera jî bira dudu bin,
yan ya lape ze'f sisê xeber din
û yêd din bira e'nene kin. 30 Lê
heger li ber yekî ji nava r'ûniştîya
jî tiştek vebe, îdî bira yê pêşin
dengê xwe bibir'e. 31 Çimkî hûn
h'emû jî, yek pey yekîr'a dikarin
p'êxembertîyê bikin, wekî h'emû
jî hîn bin û h'emû jî dil bistînin.
32 Û r'uh'êd p'êxembera bin se'-
vîtîya p'êxemberada ne, 33 çimkî
Xwedê ne Xwedêyê bêp'ergalîyê
ye, lê Yê e'dilayîyê ye.

Çawa nava h'emû civînêd cime'ta
Xwedêda*, 34 bira jinêd we civînê-
da xwe ker' kin, çimkî îzina wan
t'une xeber din, lê bira guhdar
bin, çawa Qanûn jî dibêje. 35 Lê
heger ew tiştekî dixwazin biza-
nibin, bira li malê ji mêrêd xwe
bipirsin, çimkî ne cayîz e ku jin
civînêda xeber de.

36 T'u xebera Xwedê ji we derk'et?
Yan t'enê gihîşte we? 37 Heger yek
difikire, ku xwexa p'êxember e
yan r'uh'anî ye, bira zanibe çi ku
min wer'a nivîsîn, t'emîya Xudan
e. 38 Lê heger yek guh nade van
tişta, hûn jî guh nedine wî.

39 Awa xûşk-birano, h'eyra p'ê-
xembertîkirinêda bin û dengê yêd
bi zimanêd xerîb xeber didin ne-
dine bir'înê. 40 T'enê her tişt bira
bi t'erbet, cî bi cî û maqûlî be.

## R'abûna Mesîhe ji mirinê

**15** 1 Ez wê Mizgînîyê[f] di-
xwazim bînime bîra we
xûşk-birano, ya ku min wer'a
dannasîn kir û we qebûl kir, ser
wê jî sekinîne. 2 Bi wê jî hûn xi-
laz dibin, heger wê xeberê, ya ku
min wer'a dannasîn kir, qewîn
bigirin. Heger na, bawerîya weyê
badîhewa[f] be.

3 Min ev yeka ser her tiştîr'a,
çawa stand, usa jî da we, ku Mesîh
bona gunêd me mir, li gora nivî-
sara* 4 û hate definkirinê[f], r'oja

* 14:33 Aha jî tê fe'mkirinê ku ev xeber «çawa nava h'emû civînêd cime'ta Xwedêda» r'êza 33-va girêdayî ye, ne ku r'êza 34-va. Awa gotî ev tê fe'mkirinê çawa fikireke xweserîxwe ye: «Nava h'emû civînêd cime'ta Xwedêda aha ye».
* 15:3 Îşaya 53:5-12.

sisîya Ew Xwedêda ji mirinê r'abû
li gora nivîsara*, 5 Petrûsva* xuya
bû, peyr'a her donzdeh şandî-
yava**. 6 Paşê carekêr'a pênsid
xûşk-birayî zêdetirva xuya bû,
ji wan gelek h'eta niha sax in, lê
hinek jî mirine. 7 Paşê Aqûbva[f]
xuya bû, peyr'a h'emû şandîyava.

8 Axirîyê, pey h'emûyar'a minva
xuya bû, çawa yekî ne serê xwe ji
dîya xwe bûyî*. 9 Çimkî ez ji şan-
dîya yê herî paş im, ku ne layîq
im şandî jî bême gotinê, çimkî
min civîna Xwedê zêrand*. 10 Lê
ez bi k'erema Xwedê me çi jî he-
me û k'erema Wî ku bi minr'a ye,
boş-betal nîbû. Lê serda ez ji wan
h'emû şandîya ze'ftir xebitîm û ne
ku ez bûm, lê k'erema Xwedêye
ku bi minr'a ye. 11 Awa heger ez
bim, yan ew bin, em h'emû jî
aha dannasîn dikin û we aha jî
bawer kirîye.

## R'abûna bawermendaye ji mirinê

12 Awa heger em dannasîn dikin,
ku Mesîh ji mirinê r'abûye, çawa
ji we hinek dibêjin, ku r'abûna
mirîya t'une? 13 Heger r'abûna
mirîya t'une, ku usa ye Mesîh
jî ji mirinê r'anebûye. 14 Û heger
Mesîh ji mirinê r'anebûye, ku usa
ye dannasînîya me jî boş-betal e
û bawerîya we jî boş-betal e. 15 Û
emê jî bibine şe'dêd Xwedêye derew,
çimkî me bona Xwedê şe'detî da,
ku Ewî Mesîh ji mirinê r'akir, lê
heger mirîyê r'anebin, ku usa ye
Ew jî ji mirinê r'anekirîye. 16 Çimkî
heger mirîyê r'anebin, ku usa ye
Mesîh jî ji mirinê r'anebûye. 17 Û
heger Mesîh ji mirinê r'anebûye,
wekî usa ye bawerîya we badîhewa
ye, hela hê hûne nava gunêd xweda
ne 18 û ewêd bawerîya Mesîhda jî
mirine unda bûne. 19 Heger t'enê
em bona vê jîyînê gumana xwe
Mesîh tînin, ku usa ye em ji h'emû
meriva me'rimtir in.

20 Lê r'ast Mesîh ji mirinê r'a-
bûye, çawa berê[f] deremeta pêşin
ji nava mirîya r'abûyî. 21 Mirin
r'ûyê merivekîda bû, bi merivekî
jî wê r'abûna mirîya bibe. 22 Çawa
h'emûyêd ji Adem[f] bûyî dimirin,

* 15:4 Zebûra 16:8-10.
* 15:5 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Kîfas».
** 15:5 Lûqa 24:34-36; Metta 28:16-17; Marqos 16:14; Yûh'enna 20:19.
* 15:8 K'arêd Şandîya 9:3-6.
* 15:9 K'arêd Şandîya 8:3.

usa jî h'emûyêd ji Mesîh bûyî wê
sax bin. 23 Lê her kes dora xweda:
Pêşîyê Mesîh çawa berê deremeta
pêşin, paşê yêd p'ara Mesîh, wextê
hatina Wîda. 24 Hingê axirî wê bê,
gava k'oka her serwêrtîyê, h'uku-
metîyê û qewatê bîne û p'adşatîyê
bide destê Bav Xwedê. 25 Çimkî
Ew gerekê p'adşatîyê bike, h'eta
ku Xwedê h'emû dijmina bike binê
p'îyêd Wî*. 26 Dijminê xilazîyê ku
wê k'okê lê bîne, mirin xwexa ye,
27 çimkî nivîsar dibêje: «Xwedê
her tişt binê p'îyada êlimî[f] Wî
kir». Lê gava tê gotinê «her tişt»
êlimî Wî kir, fe'mdarî ye, pêştirî
Wî Xwedêyî, Yê ku her tişt êlimî
Wî kir*. 28 Û gava her tişt êlimî
Wî bin, hingê Kur' Xwexa jî wê
êlimî Wî Xwedêyî be, Yê ku her
tişt êlimî Wî kir, wekî her tiştîda
Ew bibe Xwedêyê her tiştî.

29 Wekî din gotî, ewêd ku bo-
na mirîya têne nixumandinê wê
çi bikin? Heger mirîyê t'u car
r'anebin, îdî çima bona mirîya
têne nixumandinê? 30 Çima em
jî her gav xwe davêjine ser sêla
sor? 31 Ew fir'naqbûna min şe'de
ye, xûşk-birano, ya ku ez pê we
fir'naq dibim yektîya Mesîh Îsayê
Xudanê meda, ez her r'oj dest ji
e'mirê xwe dik'işînim. 32 Heger
min Efesêda şer'ê xwe dereca
merivayêda t'evî «se'va» kir, çi
k'ete k'îsê min? Heger r'abûna
mirîya wê t'unebe, de îdî «em
bixwin-vexwin, çimkî emê sibê
bimirin»*, çawa hinek dibêjin.
33 Nexapin! «Hevaltîya xirab merivê
xweyîp'ergal xirab dike»*. 34 R'ast
bifikirin, ser h'işê xweda werin,
îdî guna nekin, çimkî hinek ji we
hê Xwedê nas nakin, ez vê yekê
dibêjim, ku hûn şerm bikin.

### Qalibê nûyî pey r'abûna mirinêr'a

35 Lê belê yekê bêje: «Mirî çawa
dikarin r'abin û qalibê wanê çawa
be?» 36 Serê aqil! Ew t'oximê ku tu
diçînî, h'eta «nemire» jîyînêr'a şîn
nabe. 37 Û ew tiştê ku tu diçînî,
ne ku wî qalibî diçînî, k'îjan ku
wê bigihîje, lê h'ebeke sade ye,
mesele genim, yan jî ji t'oximêd

* 15:25 Zebûr 110:1.
* 15:27 Zebûr 8:6.
* 15:32 Îşaya 22:13; 56:12.
* 15:33 Eva gotineke yekî yûnan e, navê wî «Menander», berî Îsa ji sala 342-a h'eta sala 291-a hebû.

mayîn. 38 Û Xwedê qalib dide
wî t'oximî, çawa ku dixwaze û
her t'oximek qalibê xwe distîne.
39 H'emû qalib xûn-goştek nînin,
qalibê mêriv başqe ye û qalibê
h'eywên başqe, yê teyreda başqe
ye, yê me'sîya jî başqe. 40 Qalibêd
li e'zmên jî hene, qalibêd li dinê
jî hene, lê r'ewşa yêd e'zmên baş-
qe ye û yêd dinê başqe. 41 R'ewşa
te'vê başqe ye, r'ewşa hîvê başqe
û r'ewşa steyrka jî başqe ye û her
steyrkek bi r'ewşa xwe ji hev têne
firqîkirinê. 42 Bi vî awayî jî r'abûna
mirîya ye: Qalibê dêris tê çandinê,
yê nedêris wê r'abe. 43 Ew bêr'ewş
tê çandinê, bi r'ewşê wê r'abe, ew
bêt'aqetîyê tê çandinê, bi qewatê
wê r'abe. 44 Qalibê bînber tê çan-
dinê û qalibê r'uh'anî wê r'abe.

Çawa ku qalibê bînber heye, usa
jî qalibê r'uh'anî heye. 45 Aha jî
nivîsar e: «Merivê pêşin Adem[f],
bû bînberekî sax»*, lê Ademê paş-
in bû r'uh'ekî jîyîndayînê. 46 Lê
belê pêşîyê yê r'uh'anî nebû, lê yê
bînber, paşê yê r'uh'anî. 47 Merivê
pêşin ji xwelîya e'rdê bû, merivê
duda ji e'zmên bû. 48 Çawa yê ji
xwelîyê bû, usa jî yêd ji xwelîyê
ne, çawa yê ji e'zmên e, usa jî yêd
ji e'zmên in. 49 Û me çawa kirasê
yê ji xwelîyê li xwe kirîye, emê usa
jî kirasê yê ji e'zmên li xwe kin.

50 Gotina min ev e xûşk-bira-
no, wekî xûn û goşt li P'adşatîya
Xwedê nikarin war bin, ne jî dê-
risbûn wê li nedêrisbûnê war be.
51 K'a bibihên, ez sur'ekê wer'a
bêjim: Em h'emûyê nemirin, lê
em h'emûyê jî bêne guhastinê*,
52 nişkêva, çawa ç'e'vê xwe bigi-
rî-vekî, dema bor'îya axirîyê bê
lêdanê. Çimkî gava bor'î bê lêdanê,
mirî wê nedêrisbûyî r'abin, emê jî
bêne guhastinê. 53 Çimkî gerekê
evî dêris nedêrisîyê li xwe wergire
û evî mirî nemirîyê li xwe wergire.
54 Lê gava evî dêris nedêrisîyê li
xwe wergire û evî mirî nemirîyê
li xwe wergire, hingê ew gotinê
bê sêrî, ku nivîsar e:

«Serk'etinê mirin h'ûfî xwe
kir»*.
55 «Mirin, k'anê qîlê je'ra te?
Mirin, k'anê serk'etina te?»*
56 Qîlê mirinê gune ye û qewata
guna ji Qanûnê ye. 57 Lê şikir ji

* 15:45 Destpêbûn 2:7.
* 15:51-52 T'êsalonîkî I, 4:14-17.
* 15:54 Îşaya 25:8.
* 15:55 Hoseya 13:14.

Xwedê, ku em bi destê Xudanê
me Îsa Mesîh ser xistin.
58 Awa xûşk-birayêd mine de-
lal, qewîn bimînin, ji cîyê xwe
neh'ejin, her gav şixulê Xudanda
pêşda her'in, bizanibin xebata
we boş-betal nîne li ber Xudan.

### Bona k'omekt'opkirinê

**16** 1 Lê niha derheqa k'omek-
t'opkirina bona cime'ta
Xwedê, min çawa t'emî da civînêd
Galatyayê, hûn jî usa bikin: 2 Her
yekşem, destê ji we her kesîva çiqas
tê, bira tiştekî destê xwer'a paş xe,
nebe ku gava ez bêm, hingê bê
t'opkirinê. 3 Û gava ez bêm, hûn
jî r'ê k'îjanar'a dibînin, ezê pê
destê wan, bi nivîsar p'êşk'êşêd
we bişînime Orşelîmê[f]. 4 Û heger
minr'a jî bik'eve, ku ez her'im, îdî
ewê t'evî min bên.

### T'ivdîrêd Pawlos

5 Pey çûyîna qeza Mekedonya-
yêr'a, ezê serîkî li we xim, çimkî
ezê Mekedonyayêr'a derbaz bim.
6 Dibe ku li cem we bimînim, yan
jî zivistana xwe wir derbaz kim û
hingê hûn dikarin min ver'êkin,
ez k'uda ku her'im. 7 Çimkî ez
niha naxwazim ku we ser r'îya
xwe bibînim her'im, lê ez guman
im ku xêlekê cem we bimînim,
heger Xudan h'iz bike. 8 Lê niha
ezê h'eta R'oja[f] Pêncîye h'esab, li
Efesê bimînim, 9 çimkî dergehekî
xêrêyî mezin li ber min vebûye û
peyk'etîyêd min gelek in.
10 Heger Tîmot'êyo bê cem we,
usa bikin ku ew ji we venek'işe,
çimkî ew jî bona Xudan dixebi-
te, çawa ez. 11 Usa bira tu kes wî
bêqedir neke. Wî bi xêr-silamet
ver'êkin, wekî bê cem min, çimkî
ez hîvîya wî û birayêd t'evî wî me.
12 Lê derheqa Apoloyê birada,
min gelekî lava jê kir, ku t'evî bira
ser weda bihata, lê nêta wî hatinê
niha qet t'unebû, lê wê bê, gava
mecal bik'evê.

### Gotinêd axirîyê

13 H'işyar bimînin, bawerîyêda
h'îmgirtî bin, e'gît bin, bişidin,
14 bira her kirinêd we bi h'izki-
rinê bin.
15 Niha hûn zanin ku Stêfanas
mala xweva bawermendêd qeza
Axayayêye pêşin e û wan xwe dane
xizmetk'arîya cime'ta Xwedê. Îdî
ez hîvî ji we dikim xûşk-birano,
16 ku hûn gur'a[f] yêd usada bin,
usa jî gur'a wan h'emûyada, yêd
ku t'evî şixulê vê xebatê dibin.
17 Ez bona hatina Stêfanas,
Fortûnato û Axayîko şa me,
barê dilê minda wana dewsa

we girt, 18 bi wê yekê dilê min
û we jî r'ih'et kirin. Qedirê yêd
usa bigirin.
19 Civînêd qeza Asyayêda li we
silav dikin. Akîla û Priskîla t'evî
civîna mala xweda gelekî yektîya
Xudanda li we silav dikin. 20 H'e-
mû xûşk-birayêd vir li we silav
dikin. Bi r'amûsana şîrê h'elal li
hevdu silav kin.
21 Ev silav, bi destnivîsara min
Pawlos e. 22 Heger yek Xudan h'iz
nake, bira nifir' li wî be. «Ma-
ranat'a*». 23 K'erema Xudan Îsa
li we be. 24 Ez we p'ara Mesîh Îsa
k'etîya h'iz dikim.

* 16:22 «Maranat'a» bi zimanê aramî tê fe'mkirinê: «Ya Xudan were».

# NE’MA PAWLOSE DUDA KORINT’ÎYAR’A

## Pêşgotin

Xuya dibe ku «Ne’ma Korint’îyaye Duda» jî mîna ne’ma pêşin, Pawlos dema r’êwîtîya xweye 3-da nivîsîye, nêzîkî sala 56-a. Gava ewî nivîsî, heleqetîya wî û civîna[f] Korint’ê hevr’a haqasî p’ak nîbû. Xuya dibe ku ji endemêd civînê hinek himberî wî r’abibûn, ewî jî berk’ li wan hilatibû[f], lê ne’ma xweda sebir û h’izkirina xwe hindava wanda xwey kirîye û gumana xwe jî ji wan nebir’îye, ku wê axirîyê hevr’a t’ifaq[f] bin û miqabilbûnê t’unebe.

Pawlos p’ara ne’mêye pêşinda heleqetîya xwe û civîna Korint’ê e’nene dike û şirovedike, ku çima ne’ma berêda usa h’işk li wan hilatibû, yêd ku miqabilî wî bûn. Ew niha vê ne’mêda şikirdayîna xwe e’lam dike, ku hilatina[f] wîye h’işk bû me’nî, ku ew ser kirina xwe p’oşman bûn, veger’îyan û gotinêd wîr’a qayl bûn (serêd 1-ê h’eta 7-a).

Paşê Pawlos r’ê dide ber bawermenda, ku ew alîyê p’êşk’êşêd[f] bona alîk’arîya bawermendêd Cihûstanêye[f] destteng mer’d bin (serêd 8-a h’eta 9-a).

Serêd xilazîyêda jî Pawlos derheqa qulixê şandîtî[f] û r’abûn-r’ûniştina xweda dibêje. Ew bona wan dibêje, yêd ku xwe çawa şandîyêd r’ast h’esab dikirin, lê Pawlos şandîyê derew (serêd 10-a h’eta 13-a). Lê belê vê ne’mêda meremê Pawlos t’u car ne ew bû, ku ewî navê xwe bilind kira, yan xwe bilind bigirta û p’eyê hînkirina xwe bida. Lê ew piştgirîyê qulixê şandîtîya xwe dike, wekî bikaribe Mizgînîya[f] r’ast bide qebûlkirinê, ku h’emû jî Mesîh nas kin û qebûl kin çawa Xudan[f].

### Serecema fikira ne’mê

Pêşgotin (1:1-11)
Pawlos û civîna Korint’ê (1:12–7:16)

K'omekdarîya bona bawermendêd Cihûstanê (8:1—9:15)
Cabdayîna Pawlos bona h'ukumê şandîtîya xwe (10:1—13:10)
Paşgotin (13:11-13)

### Silavkirin

1 [1] Ji Pawlosê bi e'mirê Xwedê
şandîyê[f] Mesîh Îsa û Tîmo-
t'êyoyê birayê me,
civîna[f] Xwedêye Korint'êr'a û
wê t'emamîya cime'ta Xwedêr'a,
ya ku t'evayîya qeza Axayayêda ye:
[2] De bira k'erem[f] û e'dilayîya
Bavê[f] me Xwedê û Xudan[f] Îsa
Mesîh li we be.

### Pawlos şikirîyê dide Xwedê

[3] Şikir Xwedêyê Bavê Xudanê
me Îsa Mesîhr'a, Bavê dilşewa-
tîyê û Xwedêyê h'emû berdilîyê[f].
[4] Ew nava h'emû te'lî-tengîyada
dil dide ber me, wekî em jî bi-
karibin dil bidine ber wan, yêd
ku nava her cûr'e te'lî-tengîyada
ne, bi wê berdilîyê, pê k'îjanê em
xwexa ji Xwedê têne berdilîkirinê.
[5] Belê çawa em t'evî wan cefayêd
Mesîhe gelek dibin, usa jî gelekî
bi destê Mesîh ber dilê meda tê
hatinê. [6] Heger em te'lî-tengîyada
ne, ew bona berdilî û xilazbûna[f]
we ye û heger em berdilîkirî ne,
ew bona wê berdilîya we ye, ku
hûn bikaribin bi sebirê wan te'-
lî-tengîya bik'işînin, k'îjana em
jî dik'işînin. [7] Û em weda e'seyî
guman in, çimkî em zanin ku hûn
çawa t'evî cefayêd me ne, usa jî
t'evî berdilîya me ne.
[8] Em naxwazin ku hûn haş ji
wan te'lî-tengîya t'unebin xûşk-bi-
rano, yêd ku me qeza Asyayêda
k'işandin. Em ji qewata xwe der
haqasî k'etine bin barêd giran,
h'eta ku me destê xwe ji e'mirê
xwe jî k'işand. [9] Belê me xwer'a
qirara mirinê h'esab kir, lê ev yek
bû wekî em gumana xwe nedine
ser xwe, lê ser Xwedê, Yê ku mi-
rîya ji gor'a r'adike. [10] Ji destê wê
mirina tirs û xof Ewî em xilaz[f]
kirin û wê xilaz ke jî. Û gumana
me heye ku wê dîsa me xilaz ke,
[11] bi alîk'arîya wan duayêd ku
hûn bona me dikin. Bi vî awayî
bi saya duayêd geleka k'erem[f] wê
mer'a bê dayînê û gelekê bona me
şikirîyê bidine Xwedê.

### Pawlos şirovedike çima neçûye Korint’ê

12 R’ûspîtîya me ev e: Îsafa me
şe’detîyê dide, wekî me bi dilê
sax û vekirî* ji Xwedêda li vê di-
nê e’mirê xwe derbaz kir, îlahî[f]
hindava weda, ne ku bi serwaxtîya[f]
merivayîyê[f], lê bi k’erema Xwedê.
13 Em tiştekî din wer’a nanivîsin,
pêştirî wan tiştêd ku hûn dikarin
bixûnin û fe’m bikin û ez guman
im ku hûnê t’am fe’m bikin,
14 çawa ji p’ir’î-hindikî we em
fe’m kirine, wekî hûn bigihîjine
wê fe’mînê ku em r’ûspîtîya we
ne, çawa hûn jî ya me ne, R’oja
hatina Xudan Îsa.

15 Min bi vê gumanê şêwira
xwe kir, pêşîyê bihatama cem
we, ku we du cara k’erem bistan-
da, 16 awa gotî serîk bida we, ji
cem we biçûma Mekedonyayê û
ji Mekedonyayê jî dîsa ser weda
veger’îyama, ku we jî ez li alîyê
Cihûstanêda[f] ver’êkirama*. 17 Ga-
va ez aha dişêwirîm, gelo min
sivikayî kir? Yan şêwira xweda
mîna bendê vê dinyayê şêwi-
rîm, ku «Belê» û «Na»-ya min
sibeh-êvar nebe yek? 18 Lê Xwedê
şe’de ye, ku sozê me wer’a nebû-
ye «Belê» û paşê «Na». 19 Çimkî
Kur’ê[f] Xwedê, Îsa Mesîh ku pê
me wer’a hate dannasînkirinê, (bi
min, Sîlas* û Tîmot’êyo), «Belê»
û «Na» nebû, lê nava Wîda t’imê
«Belê» ye. 20 Çimkî h’emû sozêd
Xwedê bi Îsa Mesîh «Belê» ne,
lema jî em bi Wî «Amîn[f]» dibêjin,
bona r’ûmeta Xwedê. 21 Û Xwedê
ye, yê ku em weva t’evayî yektîya
Mesîhda h’îmgirtî kirin. Xût Wî
em k’ifş kirin 22 û mora Xwe danî
ser me, R’uh’ê[f] Pîroz kire dilê
me çawa bihê[f] ji ber sozê Xweva.

23 Lê ser minr’a Xwedê şe’de
ye, ku min qêmîşî we nekir, ku
nehatime Korint’ê. 24 Em h’uku-
mî ser bawerîya[f] we nakin, çimkî
hûn bawerîyêda şidîyayî ne, lê em
t’evî we dixebitin bona şabûna we.

2 1 Awa min xwexa xwer’a qirar
kir ku dîsa neyêm dilê we
bêşînim. 2 Çimkî heger ez dilê
we bêşînim, îdî k’ê wê dilê min
şa ke, pêştirî ewêd ku min dilê
wan êşandine? 3 Min ew yek ne’ma
xweda nivîsîbû, ku nebe gava ez

* 1:12 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Bi dilsaxîyê û h’elalîyê».

* 1:16 K’arêd Şandîya 19:21.

* 1:19 Bi yûnanî «Sîlvano» nivîsar e, ku cûr’ekî navê «Sîlas» e.

bêm, yêd ku gerekê min şa kin,
ew dilê min bêşînin. Çimkî ez we
h'emûyada guman im, ku şabûna
min şabûna we h'emûya ye. **4** Min
bi gelek hêsira, bi gelek k'eder û
k'esera dilê xwe wer'a nivîsî, we-
kî hûn ne ku li ber xwe k'evin,
lê wekî wê k'ûrayîya h'izkirina
mine hindava xweda fe'm bikin.

### Berbihêrîya hindava yê neheqda

**5** Awa heger yekî dilêşî kir, ne
ku t'enê dilê min êşand, lê yê
hineka jî, wekî gelekî zêde ne-
kim, nebêjim yê we h'emûya jî.
**6** Ew ceza besî wî merivî ye, ku
ji we geleka wîr'a hatîye dayînê.
**7** Lê niha hûn gerekê bibaxşînine
wî û li ber dilê wîda bên, wekî
k'erbî berxwek'etinê xwe unda
neke. **8** Awa ez hîvî ji we dikim,
h'izkirina xwe hindava wîda mak
kin. **9** Hema bona wê yekê jî min
nivîsîye, wekî we bicêr'ibînim[f]
bizanibim k'a hûn her tiştîda
guhdar in. **10** Heger hûn tiştekî
dibaxşînine yekî, ez jî t'evî we me.
Û heger tiştekî baxşandinê hebe,
bona we li ber dîndara Mesîh di-
baxşînim, **11** wekî mîrêcin[f] piştê
li me neşkêne, çimkî em haş ji
h'unurêd wî hene.

### Xemgînîya Pawlose li Troyayê

**12** Gava ez bona Mizgînîdayîna[f]
Mesîh gihîştime Troyayê, min dît
ku Xudan derîk li ber min veki-
rîye. **13** Lê dilê min ne r'ih'et bû,
çimkî min birê xwe Tîto li wir
nedît. Hingê min xatirê xwe ji wan
xwest, çûme qeza Mekedonyayê*.

### Serk'etina bi saya Mesîh

**14** Lê şikir ji Xwedê, ku t'imê me
p'êga k'oma Mesîhe serk'etinêda
pêşda dibe* û bîna naskirina xwe
bi me her dera bela dike. **15** Çimkî
em bîna Mesîhe xweş in li ber
Xwedê, hin nava xilazbûyîyada,
hin nava undabûyîyada. **16** Bona
hineka em bîna mirinê ne, ku wan
berbi mirinê dibe û bona hineka
jî bîna jîyînê, ku wan berbi jîyînê
dibe. Û k'î dikare vî barî hilde?
**17** Em ne mîna hineka ne, yêd ku
xebera Xwedê k'ara xweva girê-
didin, lê belê em çawa merivne
ji Xwedêda şandî, li ber Xwedê
bi heleqetîya Mesîh pê sitqê dilê
r'ast xeber didin.

* 2:13 K'arêd Şandîya 20:1.
* 2:14 Aha jî tê fe'mkirinê: «Ku t'imê me bi Mesîh ser dixe».

## Qulixk'arêd Peymana Nû

**3** 1 Gelo em dîsa vediger'in,
xwexa pesinê xwe bidin? Yan
mîna hineka mer'a lazim e em
şe'dene'ma ser weda bişînin, yan ji
we bistînin? 2 Ne hûn in şe'dene'-
mêd me dilê meda nivîsar, alîyê
her merivîda naskirî û xwendî?
3 K'ifş e ku hûn ne'ma Mesîh in
bi xizmetk'arîya me nivîsar, ne ku
bi h'ubirê, lê bi R'uh'ê Xwedêyê
sax, ne ku ser selêd kevirî, lê ser
t'extêd dilê xûn û goşt*.

4 Em vê yekê Xwedêda guman
in bi saya Mesîh. 5 Ne ku em ji
xwe h'esab dikin ku em layîqî vê
kirinê ne, lê karîna me ji Xwedê
ye. 6 Ewî ew karîn da me, wekî
em bibine qulixk'arêd peymana[f]
nû, ne ku yê nivîsarê, lê yê R'uh',
çimkî qanûna nivîsar dikuje, lê
R'uh' dide jîyînê.

7 Awa heger ew qulixê ku ser
kevira bi h'erfa k'olayî bû û axirîyê
mirinê pêşda tîne haqas xwe-
yîr'ûmet bû, wekî zar'êd Îsraêl[f]
nikaribûn r'ûyê Mûsa[f] binihêr'î-
yana, ji dest wê şewqa r'ûyê wîyî
ku dîsa wê derbaz bûya biçûya*,
8 lê belê qulixê R'uh' wê hê çiqas
xweyîr'ûmet be? 9 Çimkî heger ew
qulixê ku axirîyê dîwan ser me-
rivada danî, haqas xweyîr'ûmet
bû, hê çiqas zêde wê xweyîr'ûmet
be ew qulixê ku meriv pê bêsûc
dibin. 10 Belê yê ku xweyîr'ûmet
bû, ew bêr'ûmet derk'et ji ber wê
r'ûmeta ku ser wêr'a bû. 11 Heger
qulixê ku wê derbaz bibûya biçû-
ya xweyîr'ûmet bû, îdî yê ku wê
bimîne, hê çiqas xweyîr'ûmet e!

12 Awa em xweyê vê gumanê ne,
lema xeberdana xweda mêrk'îmî
ne. 13 Em ne mîna Mûsa ne, ça-
wa wî xêlî avîtibû ser r'ûyê xwe,
wekî zar'êd Îsraêl h'eta xilazîyê
ew r'ûmeta wê derbaz bûya nedî-
tana*. 14 Belê ew sewdayê xweda
fe'mekorî bûn û h'eta îro jî gava
peymana kevin dixûnin, xût ew
xêlî ser fe'mê wan dimîne. Ew
hingê tê hildanê, gava ew dibine
p'ara Mesîh. 15 Belê h'eta îro jî,
gava Qanûna[f] Mûsa dixûnin, xêlî
ser fe'mê wan dimîne, 16 lê gava
yek li Xudan veger'e, hingê «ew
xêlî tê hildanê»*. 17 Û ew Xudan

* 3:3 Derk'etin 24:12; Yêremîya 31:33; Hezekîyêl 11:19; 36:26.
* 3:7 Derk'etin 34:29.
* 3:13 Derk'etin 34:33.
* 3:16 Derk'etin 34:34.

R'uh' e û R'uh'ê Xudan li k'u
derê be, li wê derê jî azayî heye.
18 Awa em h'emû jî r'ûkî bêxêlî-
kirî mîna neynikê şewqa r'ûme-
ta Xudan vediger'înin* û em bi
derecêd r'ûmet bi r'ûmetê têne
guhastinê, dibine xût ew sûretê
Wî, ev yek bi alîk'arîya Xudan e,
ku xwexa R'uh' e.

## Xizna r'uh'anîye derdanêd[f] h'er'îda

4 1 Bona vê yekê em ji vî qu-
lixî venak'işin, ya ku me bi
r'e'ma Xwedê standîye. 2 Lê belê
em ji tiştêd e'ybe dizîva dûr in û
fêlbazîya nakin, xebera Xwedêda
qelpîyê nakin. Lê serda em r'astîyê
e'yan dikin û bi vî awayî xwe dî-
yarî îsafa[f] her merivî dikin li ber
Xwedê. 3 Lê heger ev Mizgînîya
ku em didin veşartî ye jî, ew li
ber undabûyîya veşartî ye. 4 Mîrê
vê dinyayêyî neheq şever'eşa kora
anîye ser fe'mê nebawera, wekî
r'onaya Mizgînîya r'ûmeta Mesîh
nede ser wan, Yê ku sûretê Xwe-
dê ye. 5 Em ne ku xwe dannasîn
dikin, lê Îsa Mesîh çawa Xudan
û xwe jî çawa xulamêd we, bona
Îsa. 6 Wî Xwedêyê ku got: «Bira ji
te'rîyê r'onayî derê»*, Wî xwexa
dilê meda şewq da, wekî em r'û-
meta Xwedê nas kin, bi wê şewqa
ku ji r'ûyê Mesîh dertê.

7 Lê ev xizne nava me derdanêd
h'er'îda heye, wekî bê k'ifşê ku zo-
rayîya qewatê ji Xwedê ye, ne ku ji
me. 8 Em her alîyava te'lî-tengîyada
ne, lê nav dest-p'îyê tengasîyada[f]
naçin, derecê bêgumanda ne, lê
bêguman nînin, 9 xweyîneyar in,
lê ne bêyar in, lêdayî-k'etî ne, lê
ne undabûyî ne. 10 Her gav em
mirina Îsa bedenêd xweda dibin,
wekî jîyîna Îsa jî bedena meda k'ifş
be. 11 Çimkî eme ku sax in, bona
Îsa mirinêr'a têne dayînê, wekî
jîyîna Îsa jî qalibê meyî mirîda
k'ifş be. 12 Awa mirin nava meda
ya xwe dike, lê jîyîn nava weda.

13 Çawa nivîsar e: «Min bawer
kir, lema xeber da»*. Xût bi wî
r'uh'ê bawerîyê em jî bawer dikin
û lema xeber didin. 14 Em zanin
Ewê ku Xudan Îsa ji mirinê r'akir,
wê me jî t'evî Îsa ji mirinê r'ake
û me t'evî we ber xwe bide seki-
nandinê. 15 Belê ev h'emû bona we
ye, ku gava k'erem hê ser gelekada

* 3:18 Aha jî tê fe'mkirinê: «Em h'emû jî r'ûkî bêxêlîkirî r'ûmeta Xudan dibînin».
* 4:6 Destpêbûn 1:3.
* 4:13 Zebûr 116:10.

bir'ije, şikirdarîya r'ûmeta Xwedê
jî hê zêde be.
16 Lema em ji vê yekê vena-
k'işin. Belê em ji dervava dêris
dibin diçin, lê dilda r'oj bi r'oj
nûyejîyîn dibin. 17 Çimkî cefêd
meye dem-deme sivik me dikine
xweyîyê r'ûmeta girane h'eta-h'e-
tayêye bê himber. 18 Awa em dîna
xwe nadine tiştêd xuya dibin, lê
yêd nexuya, çimkî tiştêd xuya
bona wextekî ne, lê yêd nexuya
h'eta-h'etayî ne.

5 1 Çimkî em zanin, heger
qalibê meyî axîn mîna konê
firarî xirab be, maleke meye h'e-
ta-h'etayê li e'zmana heye, ya ku
bê dest ji Xwedêda çêkirî ye. 2 Û
belê em vî konîda dine'lin, h'ey-
ra wê yekêda ne, ku mala xweye
e'zmanî li xwe wergirin, 3 wekî,
gava em wê xwe wergirin, bê sit'ar
k'ifş nebin. 4 Belê h'eta ku em vî
konîda dimînin, bin barê giranda
dine'lin, ne ku em dixwazin vî ji
xwe bêxin, lê ya e'zmanî ser xwe
wergirin, wekî yê xweyîmirin wê
jîyînêda betavebe[f] here. 5 Xwedê
Xwexa em vê yekêr'a hazir kirine
û R'uh'ê Xwe çawa bihê[f] ji ber
sozê Xweva da me.
6 Awa em her gav vê yekêda
e'seyî guman in. Em zanin h'eta
em vî qalibîda dimînin ji Xudan
dûr in, 7 çimkî em bi bawerîyê
dijîn, ne ku bi dîtina ç'e'va. 8 Û
gumana meye e'seyî heye û hê
dixwazin ji vî qalibî derên li cem
Xudan bihêwirin. 9 Bona vê yekê
em dice'dînin, ku heger em bimî-
nin yan derên, t'enê li Wî xweş
bên. 10 Çimkî gerekê em h'emû
jî li ber dîwana Mesîh bisekinin,
wekî her kes weke wan e'melêd
qalibê xweda kirî bistîne, çi ku
kiribe, qencî yan xirabî*.

### Qulixê şandîtîyê bona lihevanîna t'evî Xwedê

11 Awa em ku haş ji xofa Xudan
hene, dikin ku meriva bînine r'ayê.
Û em Xwedêva jî e'yan in, guman
heye, ku em îsafa weva jî e'yan in.
12 Ne ku em ber we dîsa pesinê
xwe didin, lê mecalê didine we,
ku hûn bi me bifir'in, wekî tiştekî
weyî gotinê wanr'a hebe, yêd ku
bi dîtina ç'e'va difir'in, ne ku bi
ya dilada. 13 Heger me h'işê xwe
unda kirîye, ew bona Xwedê ye,
lê heger em ser h'işê xwe ne, ew
bona we ye. 14 H'izkirina Mesîhe
hindava meda p'êyî ser me dike,

* 5:10 R'omayî 14:10.

çimkî em fe'm dikin, ku yek bona
h'emûya mirîye, ku usa ye h'emû
jî mirine. 15 Mesîh bona h'emûya
mir, wekî ewêd sax bona xwe sax
nîbin, lê bona Wî, Yê ku bona
wan mir û ji mirinê r'abû.

16 Çi li me dik'eve, em îdî niha
kesekî bi tiherê merivayî nanihê-
r'in. R'ast e wextekê me bi tiherê
merivayî Mesîh nihêr'î, lê niha îdî
em usa nanihêr'in. 17 Awa heger yek
yektîya Mesîhda ye, ew e'firînekî
nû ye, tiştêd kevin derbaz bûn çûn
û va yêd nû* hatin. 18 Ev her tişt ji
Xwedêda ne, ku em bi Mesîh t'evî
Xwe li hev anîn û qulixê lihevanînê
da me. 19 Awa gotî Xwedê bi Mesîh
dinya t'evî Xwe li hev anî, neheqîyêd
wan wanr'a neheqî h'esab nekirin
û gotina lihevanînê sparte[f] me.
20 Awa em ji alîyê Mesîhda qasi-
dîyê dikin, çawa ku Xwedê bi me
hîvî ji we dike: Em alîyê Mesîhda
r'eca ji we dikin, t'evî Xwedê li hev
werin! 21 Ewî ku heleqetîya Wî t'evî
guna t'unebû, Xwedê Ew bona me
kire heval-p'arê guna*, wekî em
yektîya Wîda bibine heval-p'arêd
r'astîya[f] Xwedê.

6 1 Em jî çawa heval-xebatêd
Xwedê îdî hîvî ji we dikin,
yêd ku k'erema Xwedê standine,
nehêlin ku ew k'erem bêfeyde be.
2 Çimkî Xwedê dibêje:

> «Dema r'e'm-k'eremê Min
> dengê te bihîst
> û r'oja xilazbûnêda hatime
> hewara te»*.

Va niha ye dema r'e'm-k'eremê!
Va niha ye r'oja xilazbûnê!

3 Em dikin t'u tiştîda nebine
bayîsê k'etina t'u kesî, wekî qulixê
me neyê lomek'arkirinê[f]. 4 Lê her
tiştîda em xwe bi sebira xweye
mezin didine k'ifşê, çawa qulix-
k'arêd Xwedê: Te'lî-tengîyada,
hêsîrî-belengazîya û derd-kulada,
5 lêdanada, kelada[f] û her alîyava
h'icûmkirî, k'esirî, bêxew, bir'çî*,
6 bi nixta h'elal, bi zanebûnê, bi
dilê fire, bi şîrinayîyê, bi R'uh'ê
Pîroz û bi h'izkirina bêh'ilek'a-
rî, 7 bi gotina r'astîyê û qewata
Xwedê. Em bi destê ç'ep û r'astê
jî r'asth'esabûnêva sîlih'kirî ne,
8 hurmetê û bêhurmetîyêda, qedir
û r'ezîlîyêda. Me h'esab dikin çawa
yêd derewîn, lê em ser r'astîyê ne,

* 5:17 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Û va her tişt nû bûye».
* 5:21 Aha jî tê fe'mkirinê: «Xwedê Ew bona me kire qurban[f] bona guna».
* 6:2 Îşaya 49:8.
* 6:5 K'arêd Şandîya 16:22-23; 17:1-10.

9 me h'esab dikin çawa yêd nenas,
lê yêd bi nav û deng in, çawa yêd
mirî, lê va ye eme sax in, çawa
ceza standî, lê nekuştî ne, 10 em
çawa yêd zelûlîyêda ne, lê em her
t'im şa ne, çawa yêd belengaz,
lê em geleka dewletî dikin, çawa
k'ifş dibe yanê tiştekî me t'une,
lê her tiştêd me hene.
11 Me vekirî wer'a xeber daye
gelî korint'îya, dilê me jî hindava
weda fire ye. 12 Hûn ji alîyê meda
bînteng nabin, lê hûn bîna xwe li
xwe teng dikin. 13 Ez çawa t'evî
zar'êd xwe xeber didim, hûn jî
weke wê yekê li me veger'înin û
dilê xwe mer'a vekin.

### P'ûtp'aristîyêva[f] girêdayî nîbin

14 T'evî nebawera nek'evine
binê nîrekî. Çi k'arê heqîyê t'evî
neheqîyê heye? Yan çi heleqetî-
ya r'onayê t'evî te'rîyê? 15 Û çi
t'ifaqîya[f] Mesîh t'evî cin[f]* heye?
Yan çi p'ar nava bawermenda û
nebawerada heye? 16 Yan jî çi he-
valtîya p'aristgeha[f] Xwedê t'evî ya
p'ûta heye? Çimkî em p'aristgeha
Xwedêyê sax in! Çawa Xwedê got:

«Ezê nava wanda bimînim,
nava wanda bimeşim,
Xwedêyê wan bim
û ewê jî cime'ta Min bin»*.
17 Bona vê yekê «Xudan dibêje:
De r'abin ji nava wan derên,
cude bin.
Li tiştêd h'eram[f] nek'evin,
û Ezê we qebûl kim*,
18 Bavê we bim,
hûnê jî kur' û qîzêd Min bin,
Xudanê H'emû Zorayîyê di-
bêje*».

7 1 Em ku xweyê van soza ne
delalno, de em xwe ji h'emû
k'irêtîya* qalib û r'uh'ê xwe paqij
kin û bi xofa Xwedê lap buhur-
tî-jibare bin.

### Şabûna Pawlos

2 Me dilê xweda cî kin! Me
neheqî t'u kesî nekirîye, zîyan
nedaye t'u kesî û kesek k'ara
xwer'a nedaye xebatê. 3 Ez vê
yekê nabêjim ku we neheq kim,

* 6:15 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Belîar». «Belîar» navekî cin e.
* 6:16 Qanûna K'ahîntîyê 26:12; Yêremîya 32:38; Hezekîyêl 37:27.
* 6:17 Îşaya 52:11; Hezekîyêl 20:34, 41.
* 6:18 P'adşatî II. 7:8, 14.
* 7:1 Bi gotineke din: «P'îs, mir'dar'».

lê çawa min pêşda gotîye, hûn
dilê meda ne, heger em bimirin
yan bijîn em t'evî we ne. 4 Ez
gelekî weda guman im, gelekî
pê we fir'naq dibim! Nava h'emû
te'lî-tengîyêd meda berdilîya we
ji serê min zêdetir e û şabûnêda
k'im-k'imî me.

5 Belê gava em gihîştine Me-
kedonyayê, me qet r'ih'etî nedît,
lê me h'emû alîyava te'lî-tengî
k'işandin, dor-bera şer'-de'w
bûn, dilada jî xem û derd bûn.
6 Lê Xwedêyê ku ber dilê şkes-
tîyada tê, bi hatina Tîto dil da
ber me 7 û ne ku t'enê pê hatina
wî, lê bi wê yekê jî, ku çawa we
dil dabû ber wî. Ewî mer'a gilî
kir, ku hûn çiqasî demana min-
da ne, şîn û girî ne û xîreta min
dik'işînin. Bi vê yekê dilê min
hê şabûn k'etê.

8 Belê heger min pê wê ne'mê
dilê we êşand, ez ne p'oşman im.
R'ast e ez p'oşman bûm, gava min
dît ku wê ne'mê hinek wext dilê
we êşand. 9 Lê niha ez şa me, ne
ku bona wê yekê ku hûn ber xwe
k'etine, lê çimkî hûn bona t'obe-
kirinê[f] ber xwe k'etin. Hûn li gora
xwestina Xwedê ber xwe k'etin,
usa ku we t'u zîyan ji me nedît.
10 Berxwek'etina li gora xwestina
Xwedê mêriv berbi t'obeyîyê dibe
ku xilaz ke û p'oşmanî têda t'une,
lê berxwek'etina ji vê dinyayê
berbi mirinê dibe. 11 De dîna xwe
bidine wê berxwek'etina li gora
xwestina Xwedê ku çiqas k'ar da
we: We çawa ce'dand bi r'ûspîtî
caba xwe da! Çi hêrs, çi xof, çi
h'izret, çi xîret, çi cezadayîna bona
neheqîyê! We h'emû alîyava xwe
da k'ifşê, ku hûn van yekada ser
nixta h'elal in. 12 Awa ew ne'ma
ku min wer'a nivîsî, ne bona wî
bû, yê ku neheqî kir û ne bona
yê hate neheqkirinê, lê belê wekî
ew demana weye hindava meda
li ber Xwedê e'yan be. 13 Bona vê
yekê dil hate ber me.

Pêştirî wê berdilhatinêda, hê
gelekî dil hate ber me bona şabûna
Tîto, çimkî we h'emûya dilê wî
r'ih'et kiribû. 14 Li ber wî ez pê we
fir'naq bûm û ez r'ûr'eş dernek'e-
tim. Lê çawa her tiştê ku me wer'a
got r'ast bû, usa jî ew fir'naqîya
meye ber Tîto r'ast derk'et. 15 Û
dilê wî hê ser we germ bûye, gava
bona guhdarîya we h'emûya bîr
tîne, ku we çawa bi xof û tirs ew
qebûl kirîye. 16 Ez şa me, ku her
tiştîda weda guman im.

### Mer'danîya bawermenda

8 1 Îjar xûşk-birano, em wê
k'erema Xwedê weva didine

h'esandinê, ya ku civînêd Meke-
donyayêr'a hatîye dayînê*. 2 Nava
wê hêsîrî-belengazîya ku pê hatine
cêr'ibandinê û nava k'esîbîya xweye
giranda jî, şabûna wan hê zêde bû
û hê xwe dane mer'danîyê. 3 Ez
şe'de me, ku wana weke qewata
xwe û ji qewata xwe zêdetir jî bi
r'ezedilî didan, 4 gelekî hîvî jî di-
kirin, ku em qedirê wan bigirin,
bihêlin ku ew t'evî vê k'omekdayîna
bona cime'ta Xwedê bin. 5 Û ne
haqas çiqas ku gumana me hebû,
lê canîya xwe pêva pêşîyê dane
Xudan û paşê me, bi e'mirê Xwedê.
6 Îdî hingê me ji Tîto hîvî kir, ku
ew wî şixulê qencî ku nava weda
destpêkir, xilaz ke jî. 7 Çawa hûn
her tiştîda t'êre-t'ijî ne, bawerîyê,
xeberdanê, zanebûnê, t'emamîya
xîretêda û wê h'izkirina xweye
hindava meda, usa jî vî şixulê
qencda t'êr-t'ijî bin.

8 Ez vê xeberdanêda e'mirî ser
we nakim, lê wekî hûn ç'e'v bidine
xîreta hinekêd din bona k'omek-
dayînê, dixwazim we bicêr'ibînim,
k'a hûn h'izkirinêda çiqas şîrh'elal
in. 9 Çimkî hûn k'erema Xudanê
me Îsa Mesîh zanin: R'ast e Ew
yekî dewletî bû, lê bona we k'esîb
bû, wekî hûn bi k'esîbbûna Wî
dewletî bin.

10 Ez vê yekêda fikira xwe wer'a
dibêjim: Ev yek bona k'ara we ye,
çimkî hê sala parva ne ku t'enê we
pêşîyê destpêkir wê yekê bikin, lê
usa jî hûn pêşîyê wê yekêr'a r'azî
bûn. 11 De îjar vê kirina xwe bî-
nine sêrî[f], wekî r'ezedilîya xweda
çiqas xîret dikin, haqas jî bînine
sêrî, weke qewata xwe. 12 Çimkî
heger hûn bi r'ezedilî k'omekê
bidin, ew weke wê yekê qebûl e,
çiqas destê k'êva tê, lê ne weke
wê yekê, ku dêstda t'une.

13 Ez ne ku firêqetîya hineka
dixwazim û tengasîya we, lê wekî
her tişt weke hev be. 14 Niha zêdeya
we dikare kêmasîya wan t'ijî ke û
r'ojekê jî zêdeya wanê kêmasîya
we t'ijî ke. Bi vî awayî wê weke
hev derê, 15 çawa nivîsar e:
«K'ê gelek t'op kir, zêde nebû
û k'ê hindik t'op kir, kêm nebû»*.

### Tîto û hevalêd xweva

16 Şikir ji Xwedê ku ew xîret da
Tîto jî, ku alî we bike. 17 Ew ne
ku t'enê hîvîkirina mer'a r'azî bû,
lê xîreta wî jî qebûl nekir, xwest
bi r'ezedilî bê cem we. 18 T'evî wî

* 8:1 R'omayî 15:26.
* 8:15 Derk'etin 16:18.

em wî birayî dişînin, yê ku h’emû
civînada bona Mizgînîdayînê
pesinê wî didin 19 û ne ku t’enê
haqas, lê usa jî ji alîyê civînada
hate bijartinê, ku bibe hevalê wê
r’êwîtîya ku em k’omekdayînêr’a
qulix dikin, bona r’ûmeta Xudan
û wekî em dilxwestina xwe jî vê
yekêda bidine k’ifşê. 20 Em h’evza
xwe ji vê yekê jî dikin, ku nebe
yek vî qulixê meyî mer’ddayînê-
da me lomek’ar ke. 21 Çimkî em
dikin r’ast derên, ne ku t’enê li
ber Xudan, lê li ber meriva jî.

22 Em t’evî wan her du bira,
birakî xweyî din jî dişînin, yê ku
me gelek tiştîda ew cêr’ibandîye
û t’imê jî xîretk’êş dîtîye û niha
jî hê xîretk’êş e hindava weda,
çimkî ew gelekî weda guman e.
23 Heger pirs bê ser Tîto, ew heval
û xebatk’arê t’evî min e bona we.
Lê heger bê ser wan her du birayêd
me, ewana ji alîyê civînêda şandî
ne, bona r’ûmeta Mesîh dixebitin.
24 Awa h’izkirina xwe û ew pesinê
ku me bona we daye, wanr’a bidine
îzbatkirinê, wekî h’emû civîn wê
yekê bibînin.

9 1 Derheqa k’omekdayîna
cime’ta Xwedêda ev tiştekî
zêde ye, ku ez wer’a binivîsim.
2 Çimkî ez wê r’ezedilîya we
zanim û nava mekedonîyada pê
we fir’naq dibim dibêjim, ku we
bawermendêd qeza Axayayê hê
sala parva k’arê xwe k’omekdayînê
kirîye û ev xîretk’êşîya we, gelek
ji nav wanda leqandine. 3 Û ez jî
wan birayêd xwe dişînim, wekî
fir’naqîya mine hindava weda,
wê yekêda betal derneyê, lê hûn
usa hazir bin, çawa min wanr’a
gotîye, 4 ku nebe heger mekedonî
t’evî min bên û bibînin hûn ne
hazir in, em şermî bin (naxwazim
bêjim hûn jî) wê gumanêda, ya
ku em weda guman bûn. 5 Lema
jî min r’ê têr’a dît, hîvî ji bira
kir, ku berî min bêne cem we û
t’ivdarekê wê p’êşk’êşa[f] gumre,
ya ku we soz dabû bibînin. Hingê
ewê bi r’ezedilîyê hazir be, ne ku
bi destê zorê.

**Gumredayîn û berêd wê**

6 Vê yekê bîr nekin: Yê dest dide
ber çandinê, wê hindikî jî bidirû,
lê yê dest nade ber çandinê, wê
gumre jî bidirû. 7 Dilê her kesîr’a
çiqas derbaz dibe, bira haqasî jî
bide, ne ku bide lê dilê wî pey be
yan bi borcdarîyê be, çimkî Xwe-
dê yê bi dil û eşq dide h’iz dike.
8 Xwedê dikare h’emû alîyava ser
weda bibarîne, wekî her alîyada
her gav h’emû tiştêd weye kêrhatî

hebin û zêde be jî bona her kirinêd
qenc. **9** Çawa nivîsar e:
«Wî gumre da belengaza,
qencîkirina Wî* h'eta-h'etayê
dimîne»**.
**10** Ewê ku t'oxim dide t'oximr'eş[f]
û nan jî bona xwarinê, wê t'oxim
p'êşk'êşî we ke û zêde ke, berêd
qencîkirina we* jî bigihîne**.
**11** Hûnê her tiştîva dewletî bin,
wekî her alîyava mer'd bin û ew
qencîyêd hûn bi destê me dikin,
bibine me'nî ku şikirîyê bidine
Xwedê. **12** Û gava hûn vî qulixî di-
kin, ne ku t'enê kêmasîya cime'ta
Xwedê t'ijî dikin, lê ev yek dike ku
Xwedêr'a hê şikirdayîn zêde be.
**13** Ev kirina we r'astîya bawerîya we
îzbat dike, bi vî awayî şikirîya xwe
Xwedê tînin bona guhdarîkirina
Mizgînîya Mesîhe ku hûn îqrar[f]
dikin û bona wê mer'danîya we,
ku hûn alîk'arîya wan û h'emû-
ya dikin. **14** Û ewê bona we dua
bikin, h'eyra weda bin, bona wê
k'erema Xwedêye ser k'erema, ya
ku wer'a hatîye dayînê. **15** Şikir ji
Xwedê bona wê dayîna wîye ku
nayê gotin!

### Cabdayîna Pawlos bona h'ukumê şandîtîya xwe

**10** **1** Ez, Pawlos xwexa hîvî
ji we dikim, bi milûktî û
şîrinayîya Mesîh, çawa tê gotinê
ku ez r'û bi r'û nava weda mîna
berxekî me, lê dûrva hindava
weda mîna şêrekî me. **2** Ez r'eca
dikim, usa nekin ku gava bêm jî
bibime şêr, çimkî ez e'seyî zanim
ku ez dikarim turuş kim hindava
wanda jî h'işk bim, yêd ku bona
me usa difikirin, yançîye[f] em bi
merivayî dikin. **3** Belê r'ast e em
meriv in, lê bi merivayî eskerîyê
nakin. **4** Ç'ekêd eskerîya me, ne
yê merivayî ne, lê yêd qewate
ji Xwedê ne, bona wêrankirina
t'e'bîya. **5** Em wan şêwira û h'emû
bilindcîyêd k'ubarîyêye miqabilî
zanebûna Xwedê betal dikin û
h'emû fikira dikine hêsîr, êlimî[f]
Mesîh dikin. **6** Em hazir in ceza
bidine h'emû neguhdara, gava
guhdarîya we t'am be.
**7** Hûn r'eng-r'ûya dinihêr'in.
K'î xweda guman e, ku ew p'ara
Mesîh e? Bira vê jî bifikire, ku

* 9:9 Aha jî tê fe'mkirinê: «Heqîya Wî».
** 9:9 Zebûr 112:9 (111:9).
* 9:10 Aha jî tê fe'mkirinê: «Berêd heqîya we».
** 9:10 Îşaya 55:10.

çawa ew p’ara Mesîh e, usa jî
em in. 8 Çimkî heger ez hinekî jî
zêde difir’im, bona wê h’ukum-
darîya ku Xudan da me, tiştekî
şermîyê têda t’une, ew bona
avabûna bawerîya we ye, ne ku
xirabbûnê. 9 Awa ez dikim ku usa
k’ifş nebe, yanê ez bi ne’meyêd
xwe we ditirsînim. 10 Çawa hinek
dibêjin: «Ne’meyêd wî h’işk in û
bi qewat in, lê ew dîndara xweva
belengazek e û xeberdanêda jî
yekî pênebûyî ye». 11 Yêd usa bira
fe’m bikin, em dûrva bi xeber û
ne’meyêd xweva çawa ne, nêzîk
kirêd xweda jî usa ne.
12 R’ast em newêrin, xwe ser
mêzînê bik’işînin û himberî wan
kin, yêd ku xwexa pesinê xwe
didin. Ewana nadine ber h’işê
xwe, gava nava xweda xwe pê
hev çap dikin û xwe didine ber
hev. 13 Lê çi ji p’eydayîna me di-
k’eve, em nigê xwe ji ber’a xwe
dirêjtir nakin, lê weke wî sînorê
dayî, çiqas Xwedê kire p’ara me,
ku digihîje h’eta cem we. 14 Em
ji sînor der gaveke xwe navêjin,
çawa hê negihîştibine cem we,
çimkî gava r’astîyê k’eve em bi
Mizgînîdayîna Mesîh îdî gihîş-
tine h’eta cem we. 15 Em ji sînor
dernayên û pê xebata hinekêd din
nafir’in. Lê em wê gumanê ne,
ku bawerîya we bigihîje, weke wê
dayîna ku me standîye, xebata me
jî nava weda hê zêde berfire be.
16 Em dixwazin ku ji we wêdatir
derbaz bin, Mizgînîyê cîyêd din
jî dannasîn kin, ne ku em bi ki-
rê yekî din bifir’in, yê ku sînorê
xweda kirîye. 17 Lê çawa nivîsar
e: «Yê ku difir’e, bira pê Xudan
bifir’e»*. 18 Çimkî ne ku ewê p’eyê
xwe dide, li Xudan qebûl e, lê yê
ku Xudan p’eyê wî dide.

### Pawlos û şandîyêd derew

11 1 Ez dixwazim ku hûn
bikaribin hinekî bêh’işî-
ya min bibihêrin! Lê bikin ku
bibihêrin jî! 2 Ez k’umr’eşîyê we
dikim, bi wê k’umr’eşîya[f] Xwe-
dê. Çimkî min hûn yekîr’a, awa
gotî Mesîhr’a nîşan kirin, wekî
we mîna qîzeke bik’ir[f] li ber Wî
bidime sekinandinê. 3 Lê t’enê
ez ditirsim, tuwere çawa me’r bi
fêlbazîya xwe Hêwa xapand, usa jî
ew h’işê we biçelqîne û hûn destê
xwe ji şîrh’elalî û dilsaxîya xweye
hindava Mesîhda bikin*. 4 Gava

* 10:17 Yêremîya 9:24.

* 11:3 Destpêbûn 3:1-6, 13.

yek tê û Îsakî din dannasîn dike,
k'îjan me dannasîn nekirîye, yan
r'uh'ekî din hûn distînin, k'îjan
we ji me nestandîye, yan mizgî-
nîke din dide, ku me nedaye we,
hûn van tiştа r'ind dibin. **5** Lê bi
t'exmîna min ez t'u tiştîva ji wan
şandîyêd e'yane ha kêmtir nînim!
**6** Dibe ez xeberdanêda ne ser xwe
me, lê ne alîyê zanebûnêda. Me
ev yek h'emû alîyava her tiştîda
nîşanî we daye.

**7** Gelo min gune kir[f], ku Miz-
gînîya Xwedê bê heq da we, xwe
jî ber we şkênand, ku hûn bilind
bin? **8** Min civînêd mayîn t'alan
kirin ji ber heqê xweva, wekî
xizmetk'arîyê wer'a bikim. **9** Û
gava ez li cem we bûme h'ewcê
tiştekî, min giranî neda ji we t'u
kesî, çimkî ew bawermendêd ku
ji Mekedonyayê hatibûn, çi kê-
masîyêd min hebûn, wana destê
xwe dirêjî min kir. Belê min her
alîyava kirîye ku giranîyê nedime
we û dikim ku nedim jî*. **10** Bi wê
r'astîya Mesîh, ya ku nava minda
ye, r'ûspîtîya min wê dor-berêd
qeza Axayayêda jî betal derneyê.
**11** Çima ez aha dikim? Ez we h'iz
nakim? Wê yekê Xwedê zane!
**12** Û ez çawa dikim, ezê usa jî
bikim, wekî r'ê nek'eve wan, yêd
ku me'nîya diger'in, wekî p'eyê
xwe bidin, yançîye ew jî mîna
me dixebitin.

**13** Lê na, yêd usa şandîyêd de-
rew in, p'alêd qelp in, xwe dikine
dilqê şandîyêd Mesîhe r'ast. **14** Û
ev yek ne tiştekî e'cêbmayînê ye!
Mîrêcin xwexa jî xwe dike dilqê
milyak'etê[f] r'onayîyê. **15** Hilbet ne
tiştekî mezin e, ku xizmetk'arêd
wî jî bik'evine dilqê xizmetk'arêd
heqîyê. Axirîya wanê weke e'me-
lêd wan be.

### Pawlos p'eyê xwe te'lî-tengîyêd xweda dide

**16** Dîsa dibêjim, bira t'u kes min
bêh'iş h'esab neke. Lê heger hûn
dikin jî, îdî bira min mîna yekî
bêh'iş qebûl kin, ku ez jî hinekî
p'eya bême xwe. **17** Çi ku dibê-
jim, r'ast e li Xudan xweş nayê,
lê çawa yekî bê h'emdî xwe, ber
bayê navê xwe k'etî. **18** Gelek bi
merivayî p'eyê xwe didin, ezê jî
p'eya bême xwe. **19** Hûn merivne
serwaxt in, lema bi dilekî şa li
bêh'işa sebir dikin! **20** Belê, hûn
sebir dikin, gava yek we dike xu-
lam, yan hebûka[f] we dixwe, yan
we k'ara xwer'a dide xebatê, yan

* 11:9 Fîlîpî 4:15-18.

ser wer'a k'ubar dibe, yan r'ûyê
we dixe. 21 Ez bi şermîyê dibêjim,
ku em wê yekêda pênebûyî bûn!

Heger yek r'ûyê wî digire bi tiş-
tekî bifir'e, r'ûyê min jî digire, (ez
vê yekê ji bêfe'mîya xwe dibêjim).
22 Ewana îbranî[f] ne? Ez jî. Îsraêlî
ne? Ez jî. Ji r'ik'inyata Birahîm[f]
in? Ez jî. 23 Qulixk'arêd Mesîh in?
(Bêh'işî xeber didim), ez hê ji wan
zêdetir im! Ji wan ze'ftir xebitîme,
ji wan ze'ftir k'etime kela, ji wan
ze'ftir lêdan xwarîye, gelek cara
h'eta ber derê mirinê jî çûme.
24 Bi destê cihûya[f] pênc cara, ji
çilî yek kêm, bi qamçîya hatime
lêdanê*, 25 sê cara bi destê r'omîya
bi şiva hatime lêdanê, carekê ez
dame ber kevira, sê cara r'astî
gemîwelger'andinê hatime, şev û
r'ojekê be'rêda mame*. 26 Gelek
r'êwîtîyêd xweda nava cûr'e-cûr'e
qede-belada bûme: Ji ç'ema, ji
r'êbir'a, ji miletê xwe, ji necihûya[f],
bajêrda, çol-bestada, ser be'rê,
ji birayêd derew*. 27 Dixebitîm,
diçerçirîm, gelek cara xewê şeva
nedikir, t'î-bir'çî, gelek cara bê
nan, sermê û bêsit'arîyêda bûm.
28 Pêştirî tiştêd mayîn, xemêd
h'emû civînaye her r'oj jî ser min
t'op dibin. 29 Gava yek ser h'alê
xweda digirî, ez jî t'evî wî digirîm!
Gava yek ji r'ê tê derxistinê, dilê
min jî diqilqile!

30 Heger lazim be ez p'eyê xwe
bidim, ezê ser h'alêd xweye sist
p'eya bême xwe. 31 Xwedêyê Bavê
Xudan Îsa, ku h'eta-h'etayê hêja-
yî şikirîyê ye, zane ku ez derewa
nakim. 32 Bajarê Şamêda welîyê[f]
berdestîyê Arêtas p'adşa, bona ku
min bigire, nobedar dabûne ber
dergehêd bajêr*, 33 ez pê sepetê
p'encerekêr'a sûrêva daxistime
xwarê û ji destê wî r'evîm.

## Dîtin û e'yantîyêd Pawlose e'zmanî

**12** 1 Min dik'eve ez p'eya
bidime xwe, lê r'astî k'ara
wê t'une. Lê belê ezê niha derbazî
ser wan dîtin û e'yantîya bim, yêd
ku Xudan nîşanî min dane. 2 Ez
bawermendekî Mesîh nas dikim,
çardeh sal pêşda, (nizanim qa-
libda bû, nizanim bê qalib bû,
ew Xwedê zane), h'eta e'zmanê

* 11:24 Qanûna Ducarî 25:3.
* 11:25 K'arêd Şandîya 16:22; 14:19.
* 11:26 K'arêd Şandîya 9:23-25; 14:5.
* 11:32 K'arêd Şandîya 9:23-25.

sisîya* hate hilatinê. 3 Û ez za-
nim ku ev meriva, (qalibda bû,
bê qalib bû, ez nizanim, wê yekê
Xwedê zane), 4 h'eta buhiştê[f] hate
hilatinê û tiştêd nayêne gotinê
bihîstin ku ji mêriv nak'eve bona
wan tişta xeber de jî. 5 Ezê bona
yê ha p'eya bême xwe, lê bona
xwe p'eya nadime xwe, pêştirî
ser h'alê sistîyêd xwe. 6 Lê heger
ez bixwazim jî p'eyê xwe bidim,
ev ne bêh'işî ye, çimkî ez r'astîyê
dibêjim. Lê ez xwe digirim, ku
nebe yek ser min tiştekî zêde
bifikire, pêştirî tiştê ku ji min
dibihê yan dibîne.

7 Û wekî nebe ez bona gelek
e'yantîyêd neberh'işa k'ubar bim,
belake mîna derzîkê qalibê minda
minr'a hate dayînê, milyak'etekî
ji mîrêcin, ku t'epa bê min, wekî
ez k'ubar nebim. 8 Bona vê yekê
min sê cara hîvî ji Xudan kir, ku
vê yekê ji min dûr xe, 9 lê Ewî
minr'a got: «K'erema Min besî te
ye, çimkî qewata Min sistîyada
mîyaser dibe». Awa ezê bi dilekî
şa h'alê sistîyêd xweda bifir'im,
wekî qewata Mesîh nava minda
be. 10 Lema jî ez bona navê Mesîh
sistîya, qara, hêsîrî-belengazîya,
zêrandina û te'lî-tengîya begem
dikim, çimkî gava ez sist dibim,
hingê qewat dibim.

### Xemêd Pawlos hindava korint'îyada

11 R'astî min bêh'işî kir ku p'eyê
xwe da, lê we p'êyî ser min kir!
Gerekê we p'eyê min bida. Ez t'u
tiştîva ji wan şandîyêd weye e'yan
kêmtir nîme, lê ez xwexa jî ne t'u
tişt im. 12 Nîşanêd şandîtîya r'ast,
awa gotî nîşan, k'eremet û kirêd
qewat, nava weda bi t'emamîya
sebirê hatine kirinê. 13 Min çi tiştîva
qedirê we ji qedirê civînêd mayîn
kêmtir girtîye, pêştirî wê yekê ku
min giranî neda we? Bibaxşînine
min vê neheqîyê!

14 Eva sê car e ez k'arê xwe dikim,
ku ser weda bêm. Û ez giranîyê
nadime we. Ç'e'vê min ne li hebû-
ka we ye, lê li we ye! Çimkî ne ku
gerekê zar' bona dê-bava bikin, lê
dê-bav bona zar'a. 15 Ezê bi dilekî
şa, xwe jî û mal-h'alê xwe jî bona
we bidim. Heger ez hê gelekî we
h'iz bikim, gelo hûnê min hin-
dikî h'iz bikin? 16 Em ha hildin,
ku min giranî nedaye we, lê bi
ya hineka ezî h'ilek'ar bûme û bi
fêlbazîya xwe hûn avîtine t'eleka
xwe. 17 Gelo min bi destê ewêd ku

* 12:2 Hinek difikirin, ku dema Pawlosda «e'zmanê sisîya» yê herî jorin bû.

min ser weda şandin, hûn k'ara
xwer'a dane xebatê? 18 Min hîvî
ji Tîto kir û ew bira t'evî wî şand.
Gelo Tîto hûn k'ara xwer'a dane
xebatê? Me bi r'uh'ekî nedikir?
Em r'êkêda nediçûn?

19 Dibe ku hûn t'emamîya vî
wextîda difikirin, ku em dixwazin
xwe li ber we r'ûspî kin? Na! Lê
li ber Xwedê em yektîya Mesîhda
xeber didin û her tiştî delalno,
bona k'ara we dibêjin. 20 Ez di-
tirsim, gava ez bêm, tuwere we
usa nebînim, çawa ez dixwazim
û hûn jî min usa nebînin, ça-
wa hûn dixwazin. Ditirsim ku
hê nava weda şer'-de'w hebin,
h'evsûdî, hêrsk'etin, hevr'ik'î*,
xeyb, buxdan, k'ubar-babaxî û
bêt'erbetî. 21 Ditirsim, ku gava
ez dîsa ser weda bêm, Xwedêyê
min serê min li ber we berjêr ke
û bona geleka şînê bikim, k'îja-
na pêşda gune kirine û ji kirêd
h'eramîyê, bênamûsîyê û toltîyê
t'obe nekiribin.

### T'emî û silavêd axirîyê

**13** 1 Eva cara sisîya ye ezê ser
weda bêm. Çawa nivîsar e:
«Gerekê bi devê du yan sê şe'da her
tişt bê e'seyîkirinê»*. 2 Min berê
gotîye û niha jî dibêjim, çawa cara
duda nava weda hazir bûm, niha
jî dîsa dûrva wanr'a dinivîsim,
yêd ku pêşda gune kirine û usa
jî h'emûyar'a: Gava dîsa bêm, îdî
ez nadime xatirê t'u kesî, 3 çimkî
hûn k'etine bin e'nena, ku biza-
nibin, gelo Mesîh pê min xeber
dide. Ew hindava weda ne sist
e, lê nava weda qewat e. 4 R'ast e
Ew bi sistîyê hate xaçkirinê[f], lê bi
qewata Xwedê sax e. Em yektîya
Wîda sist dibin, lê bi qewata Xwedê
hindava **weda** emê bijîn t'evî Wî.

5 Hûn dilê xwe bicêr'ibînin, k'a
hûn nava bawerîyêda ne? Xwe
e'nene kin. Hûn fe'm nakin, ku
Îsa Mesîh nava weda ye, t'enê
cêr'ibandinêda hûn pênebûyî nî-
bin? 6 Lê guman heye, ku hûnê
fe'm bikin, ku em ne pênebûyî
ne. 7 Lê em dua ji Xwedê dikin,
ku hûn xirabîyê nekin, ne ku wekî
em cêr'ibandinêda qenc k'ifş bin,
lê wekî hûn qencîyê bikin, heger
em pênebûyî jî k'ifş bin. 8 Çimkî
em nikarin tiştekî li r'astîyê bi-
kin, lê t'enê bona k'ara wê. 9 Em
şa dibin, gava em sist dibin û hûn
qewat dibin. Û em jî bona we dua

* 12:20 Aha jî tê fe'mkirinê: «T'enê xwer'a».
* 13:1 Qanûna Ducarî 19:15.

dikin, wekî hûn t'am bigihîjin.
10 Bona van yeka ez dûrva wer'a
dinivîsim, ku nebe gava ez bêm,
hindava weda h'işkîyê bikim bi
wî h'ukumê ku Xudan daye min,
ya ku bona avakirinê ye, ne bona
xirabkirinê.

11 Heyneser xûşk-birano, xweş
bin! Ser xweda werin, dil bidine
hevdu, ser nêtekê bin, li pey e'di-
layîyê bin û Xwedêyê h'izkirinê û
e'dilayîyê wê t'evî we be.

12 Silavê bidine hev bi r'amûsa-
na şîrê h'elal. T'emamîya cime'ta
Xwedê li we silav dike.

13 K'erema Xudan Îsa Mesîh,
h'izkirina Xwedê û heleqetîya
R'uh'ê Pîroz t'evî we h'emûya be.

# NE’MA PAWLOS GALATÎYAR’A

## Pêşgotin

Galatya Asya Biç’ûkda qezake R’omayê bû. Pawlos dema r’êwîtîya şandîtîya[f] xweye pêşinda bajarêd Entakya Pisîdyayê, Lîstra, Dêrbe, Qonyayêda h’îmê civînêd[f] bawermenda avîtin û usa jî carekê yan du cara çûye wir (K’arêd Şandîya 13:13–14:26, 16:6; 18:23).

Lê belê pey Pawlosr’a, çawa cîyêd dereke, usa jî nava Galatyayêda dannasînkirêd başqe hatin û civîna wan t’evîhev kirin.

Gava Mizgînîya[f] Mesîh bela bû û nav miletada hate qebûlkirinê, ev pirs jî pêşda hat û gotin: «Ewê ku t’obe[f] dike gerekê li gora Qanûna[f] Mûsa[f] bê sinetkirinê[f], ku bibe mesîhîyê[f] r’ast». Pawlos hê pêşda şirovekiribû, ku ew yek t’u car ne usa ye. Çimkî ew r’îya ku bawermenda t’evî Mesîh dike yek, ew bawerî[f] ye. Lê hinek hatine nava civînêd Galatyayê, himberî Pawlos r’abûn û gotin: «Gerekê Qanûna Mûsa bê xweykirinê, wekî ber Xwedê r’ast bêne h’esabê».

Bi vê ne’mê Pawlos dixwaze fikirêd yêd usa veger’îne berbi bawerîya r’ast, çimkî ew bi hînkirina ner’ast ji bawerîya xwe xalifî[f] bûn. Ew serhatîya xwe şirovedike, dibêje çawa ew û Barnabas[f] çûne Orşelîmê[f] û t’evî şandîyêd mayîn xeber dan û çawa Aqûb[f], Petrûs[f] û Yûh’enna[f] qulixê wan qebûl kirin û qayl bûn, ku ew nava necihûya[f] dannasîn kin. (Dibe ku Pawlos be’sa wê çûyîna xweye Orşelîmê dike, ya ku K’arêd Şandîya 15:1-4-da nivîsar e).

Pawlos îzinê dide xwe ku ew xwe şandîyê Îsa Mesîh h’esab ke. Ew piştgirîyê qulixê xwe dike û dibêje, ku ev qulixê wî ne ji alîyê merivada[f] ye, lê dayîna Xwedê ye û şandîtîya wî bona miletêd necihû ye.

Ew mêrk’îmî dibêje, ku meriv pê Qanûn qedandinê li ber Xwedê r’ast nayê h’esabê, lê t’enê bi bawerkirinê. Meriv t’u car nikare wê xilazbûna[f] ku Xwedê dide bi kirêd xweye qenc qazinc ke. Axirîyê Pawlos dibêje, ku e’mirê bawermenda gerekê bi azayîyê û h’izkirinê be, k’îjan ku R’uh’ê[f] Pîroz bi bawerkirina meriva p’êşk’êş[f] dike.

**Serecema fikira ne'mê**

Pêşgotin (1:1-10)
H'ukumê Pawlos çawa şandî (1:11–2:21)
Mizgînî k'erema Xwedê ye (3:1–4:31)
Cabdarî û azayîya bawermenda (5:1–6:10)
Paşgotin (6:11-18)

## Silavkirin

**1** [1] Ez Pawlosê şandî[f], ne ku ji
alîyê merivada yan bi destê
meriva k'ifşbûyî me, lê bi destê
Îsa Mesîh û Bav[f] Xwedê, Yê ku
Ew ji mirinê r'akir, [2] ez bi h'emû
bawermendava t'evayî berbir'î
we civînêd[f] Galatyayêda dibim.
[3] De bira k'erem[f] û e'dilayîya
Xwedê Bavê me û Xudan[f] Îsa
Mesîh li we be, [4] Yê ku canîya Xwe
anegorî e'mirê Bavê me Xwedê
ji ber gunêd meva da, wekî me ji
vî zemanê nihayî xirab xilaz[f] ke.
[5] Şikir ji Xwedêr'a h'eta-h'etayê!
Amîn[f].

## R'astî t'enê Mizgînîkêda[f] ye

[6] Ez e'cêbmayî dimînim, ku
hûn usa zû piştа xwe didine Xwe-
dêyê ku bi saya k'erema[f] Mesîh
gazî we kir û berê xwe didine
mizgînîke din. [7] R'ast mizgînîke
din t'une, lê hinek hene we t'evî
hev dikin û dixwazin Mizgînîya[f]
Mesîh biguhêzin. [8] Lê heger em
yan milyak'etek[f] jî ji e'zmên bê,
mizgînîke usa bide we, k'îjan ku
ne mîna wê Mizgînîyê ye, ya ku
me daye we, bira nifir' li wî be!
[9] Çawa me pêşda got, niha jî dîsa
dibêjim: Heger yek mizgînîke ne
mîna wê Mizgînîya ku we qebûl
kir dide we, bira nifir' li wî be!
[10] Çima ez niha dikim meriv
ji min r'azî bin, yan Xwedê? Yan
gelo ez dikim ku li meriva xweş
bêm? Heger min hê bixwesta ez
li meriva xweş bihatama, min ni-
karibû ez bibûma xulamê Mesîh.

## Çawa Xwedê Pawlos kire şandî

[11] Ez vê yekê li we didime h'e-
sandinê xûşk-birano, ku ew Miz-
gînîya min dannasîn kir, ne ya
merivayî ye. [12] Min ew ji meriva
nestand, ne jî ji kesekî hîn bûm,
lê Îsa Mesîh minva e'yan kir.
[13] We bona bêp'ergalîya mine
berêye nava cihûtîyêda bihîstîye.

Min bêh'esab civîna Xwedê dizê-
rand û dikir ku wê xirab kim. 14 Ez
nava cihûtîyêda[f] ji gelek hevalêd
xweye cihû pêşdatir çûbûm, alîyê
r'aw-r'izima[f] kal-bavada jî gelekî
xweyîxîret bûm*. 15 Lê gava Xwedê
xwest, (Yê ku ez bijartim, çaxê ez
hê zikê dîya xweda bûm û bi k'e-
rema Xwe ez k'ifş kirim), 16 Kur'ê
Xwe minva e'yan kir, ku nava ne-
cihûyada[f] Wî dannasîn kim, hingê
min şêwira xwe t'u kesî nekir*,
17 ne jî r'abûme Orşelîmê, cem
ewêd ku berî min bibûne şandî,
lê ez pêr'a-pêr'a çûme E'rebistanê
û dîsa veger'îyame Şamê. 18 Paşê
sê sala şûnda r'abûme Orşelîmê,
ku Petrûs[f]* bibînim û panzdeh
r'oja cem wî mam**. 19 Lê belê ji
şandîyêd mayîn min t'u kes nedît,
pêştirî Aqûbê[f] birê Xudan. 20 Çi
ku wer'a dinivîsim, ez ber Xwe-
dê bêxêlif dibêjim. 21 Paşê çûme
alîyêd Sûryayê û Kîlîkyayê. 22 Lê
civînêd Mesîhe Cihûstanêda[f] ez
r'û bi r'û nas nedikirim. 23 Wana
t'enê bihîstibû ku: «Ewê wextekê
em dizêrandin, niha xwexa wê
bawerîyê[f] dannasîn dike, k'îjan wî
wextekê dikir ku xirab ke». 24 Û
bona min şikirî didane Xwedê.

**Pawlos û şandîyêd mayîn**

2 1 Paşê çardeh sala şûnda
t'evî Barnabas[f] dîsa r'abûme
Orşelîmê, Tîto jî min t'evî xwe
bir*. 2 Ez çûm, çimkî Xwedê ber
min vekir, ku her'im. Û min ew
Mizgînî li wan da h'esandinê, ya
ku ez nava necihûyada dannasîn
dikim, lê ev yek min yêd sereker'a
başqe digot. Min nexwest ku ez
badîhewa[f] bibezim yan bezîbim.
3 Lê h'eta Tîtoyê t'evî min ku yû-
nan bû, p'êyî ser wî jî nekirine,
ku bê sinetkirinê[f]. Ev pirs pêşda
hat, 4 çimkî çend birayêd derew
şûlikîne nava me, wekî ce'sûsîyê
azayîya me bikin, ya ku bi saya
Mesîh Îsa me dest anîye. Wana
dixwest em bikirana bindest. 5 Lê
me qet deqekê jî gur'a[f] wan nekir,
ku r'astîya Mizgînîyê nava weda
h'îmgirtî bimîne.

* 1:14 K'arêd Şandîya 8:3; 22:3-5.
* 1:16 K'arêd Şandîya 9:3-6.
* 1:18 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Kîfas». «Kîfas» bi zimanê aramî[f] tê fe'mkirinê: «Petrûs».
** 1:18 K'arêd Şandîya 9:26-30.
* 2:1 K'arêd Şandîya 11:30; 15:2.

6 Lê bona wan jî, yêd ku sereke
k'ifş dibûn, (qet xema min nîne,
ku ew berê çi bûne, Xwedê firqîyê
nake nava meriva), wan sereka jî
t'u tiştê nû minr'a negotin. 7 Lê
serbara-serda dîtin ku li min hatîye
spartinê, wekî ez Mizgînîyê bidi-
me necihûya*, çawa ku li Petrûs
jî hatîye spartinê, wekî Mizgînîyê
bide cihûya[f]**. 8 Çimkî Xwedêyê
ku Petrûs kire şandîyê cihûya,
hema Wî jî ez kirime şandîyê
necihûya. 9 Gava Aqûb[f], Petrûs*
û Yûh'ennayê[f] ku «Stûn» dihati-
ne h'esabê, bona wê k'erema ku
minr'a hatibû dayînê pê h'esîyan,
destêd xweye r'astê çawa nîşana
t'ifaqîyê[f] dane min û Barnabas.
Ew qayl bûn, ku em her'ine na-
va necihûya û ew jî her'ine nava
cihûya. 10 T'enê wan hîvî kir, ku
em belengaza bîr nekin, ya ku ez
xwexa jî demana wê yekêda me.

### Pawlos şaşîya Petrûs hiltê[f]

11 Lê gava Petrûs hate Entakya-
yê, ez aşkere miqabilî wî r'abûm,
çimkî ewî şaş bû. 12 Berî hatina
çend merivêd ku Aqûb şandibûn,
ewî t'evî necihûyêd bawermend
nan dixwar. Lê gava ewana hatin,
ewî xwe dida alîkî û vedik'işîya,
ji tirsa ewêd ku digotin, gerekê
necihû bêne sinetkirinê. 13 Û ci-
hûyêd bawermende mayîn jî t'evî
wî dur'ûtî kirin, h'eta ku Barnabas
jî xalifî[f], k'ete nava wê dur'ûtîya
wan. 14 Lê gava min dît ku ewana
nava r'astîya Mizgînîyêda namî-
nin, hingê li ber h'emûya min gote
Petrûs: «Heger tu cihû yî, mîna
yekî necihû dijîyî û ne mîna ci-
hûya, tu çawa dikî ser necihûya,
ku bibine mîna cihûya?»

### Cihû û necihû her du jî pê bawerîyê xilaz[f] dibin

15 Eme ku e'silê xweda cihû ne
û ne ji «necihûyêd gunek'ar[f]» in,
16 zanin ku meriv bi kirêd Qanûnê
nikare r'ast bê h'esabê, lê t'enê
bi Îsa Mesîh bawerkirinê. Me jî
Mesîh Îsa bawer kir, wekî bi Mesîh
bawerkirinê em r'ast bêne h'esabê,
ne ku bi kirêd Qanûnê, çimkî t'u
qûl-bende bi kirêd Qanûnê nikare
r'ast bê h'esabê*. 17 Awa heger em
dikin bi Mesîh r'ast bêne h'esabê

---

* 2:7 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Nesinetkirîya».
** 2:7 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Sinetkirîya».
* 2:9 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Kîfas».
* 2:16 R'omayî 3:20-22.

û wê gavê xuya be, ku em xwexa
jî mîna wan gunek'ar in, hingê
Mesîh bû wek'îlê guna? T'u car!
18 Heger ew tiştêd min xirab kiri-
ne, dîsa destpêdikim çêdikim, ez
neheqîya xwe didime îzbatkirinê.
19 Çimkî ez bi Qanûnî bona Qa-
nûnê mirim, wekî bona Xwedê
bijîm. Ez t'evî Mesîh xaç[f] bûm,
20 ji vir şûnda ne ku ez dijîm, lê
Mesîh e ku nava minda dijî. Û
niha ku ez vî qalibîda dijîm, bi
Kur'ê[f] Xwedê bawerkirinê dijîm,
Yê ku ez h'iz kirim û canîya Xwe
bona min da der. 21 Ez k'erema[f]
Xwedê t'exsîr nakim, çimkî heger
r'asth'esabbûn[f] bi Qanûnê bûya,
ku usa ye Mesîh badîhewa mir.

## Qanûn û bawerî

**3** 1 Gelî galatîyêd bêh'iş! K'ê
serê we t'ijî kir?* Ne axir
Îsa Mesîh li ber ç'e'vê we xaçbûyî
hate dîyarkirinê? 2 Ez t'enê vê ye-
kê dixwazim ji we bizanibim: We
R'uh'ê Xwedê bi Qanûn qedandinê
stand, yan bi Mizgînî bihîstinê û
bawerîya xwe jê anînê? 3 Çima hûn
haqas bêh'iş in, ku we bi R'uh'ê
Xwedê destpêkir û niha bi merivayî
xilaz dikin? 4 Haqas tişt badîhewa
hatine serê we? Naqewime ku
badîhewa bin! 5 Çima ew Xwe-
dêyê ku R'uh'ê Xwe p'êşk'êşî[f] we
dike û nava weda k'eremeta dike,
bona Qanûn qedandina we dike,
yan bona ku we Mizgînî bihîst û
bawerîya xwe jê anî?

6 Mesele, bona Birahîm[f] aha
nivîsar e: «Birahîm Xwedê ba-
wer[f] kir û ew yek jêr'a r'astî hate
h'esabê»*. 7 Awa zanibin, yêd ku
bawer dikin ew in zar'êd Birahîm*.
8 Nivîsarê hê pêşda dabû k'ifşê, ku
Xwedê necihû bi bawerîyê[f] wê r'ast
h'esab bikirana û zûva Mizgînî
dabû Birahîm ku: «Bi te duayê
h'emû mileta bibe»*. 9 Awa ewêd
ku bawer dikin, t'evî Birahîmê
bawermend dua li wan tê kirinê.

10 Ewêd ku xwe spartine[f] kirêd
Qanûnê, ew binê nifir'êda ne, çimkî
nivîsar e: «Nifir' li her kesî ye, yê
ku nava h'emû nivîsarêd k'itêba
Qanûnêda namîne û naqedîne»*.
11 E'yan e t'u kes bi Qanûnê nikare

* 3:1 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Ku hûn gur'a r'astîyê nekin».
* 3:6 Destpêbûn 15:6; R'omayî 4:3.
* 3:7 R'omayî 4:16.
* 3:8 Destpêbûn 12:3; 18:18; 22:18.
* 3:10 Qanûna Ducarî 27:26.

li ber Xwedê r'ast[f] bê h'esabê, çimkî
nivîsar e: «Yê r'ast wê bijî, çimkî
bawer dike»*. **12** Lê Qanûn bi ba-
werîyê nîne, lê belê çawa nivîsar
dibêje: «K'î ku t'emîyêd Qanûnê
**biqedîne** bi wan wê bijî»*. **13** Mesîh
em ji wê nifir'a Qanûnê k'ir'în,
ew dewsa me k'ete bin wê nifir'ê,
çimkî nivîsar e: «Nifir' ser yê darva
dardakirî ye»*. **14** Ev yek bû, wekî
bi Mesîh Îsa duayê Birahîm bê
ser necihûya, ku bi bawerîyê em
R'uh'ê sozdayî bistînin.

### Sozê Xwedê û Qanûn

**15** Xûşk-birano! Ez tînime ser
e'detê dinê. Heger yekî wesîyetek[f]
t'estîq kiribe, t'u kes nikare wê
betal ke, yan jî tiştekî din serda
zêde ke. **16** Awa ew soz Birahîm û
zur'eta wîr'a hatine dayînê. Nivî-
sarêda nayê gotinê: «Zur'etêd te»
çawa bona geleka, lê bona yekî:
«Zur'eta te»* û ew zur'et Mesîh
e. **17** Awa gotî ez vê yekê dibêjim,
ew wesîyeta ku pêşda ji Xwedêda
hatibû t'estîqkirinê, Qanûna ku
çarsid sî salî şûnda derk'et, nikare
usa bike, wekî wesîyeta sozdayî
qewata xwe unda ke*. **18** Çimkî
heger wartî Qanûnêva girêdayî
bûya, wê sozdayînêva girêdayî
nîbûya, lê Xwedê bi soz p'êşk'êşî
Birahîm kir*.

**19** Îdî meremê Qanûnê çi bû?
Qanûn serda zêde bû ku neheqî bê
naskirinê û gerekê ew bima h'eta
hatina Zur'eta wî, k'îjanîr'a soz
dabû. Qanûn ji alîyê milyak'eta-
da, bi destê navçêtîya yekî* hate
dayînê**. **20** Bona wesîyetkirinê
navçêtî ne lazim e gava wesîyet
bi destê yekî tê kirinê û li vir ew
yek t'enê Xwedê ye.

### War û xulam

**21** Awa Qanûn miqabilî sozêd
Xwedê ye? T'u car! Belê heger qa-
nûnek hebûya, ku bikaribûya jîyîn
bida, hingê e'seyî r'asth'esabbûn
wê bi qanûnê bibûya. **22** Lê nivî-
sar h'emûya bin hêsîrtîya guneda[f]

* 3:11 Aha jî tê fe'mkirinê: «Yê bi bawerîyê r'asth'esabbûyî wê bijî». Hebaqûq 2:4.
* 3:12 Qanûna K'ahîntîyê 18:5.
* 3:13 Qanûna Ducarî 21:23.
* 3:16 Destpêbûn 12:7; 13:15; 24:7.
* 3:17 Derk'etin 12:40.
* 3:18 R'omayî 4:14.
* 3:19 Ew yek Mûsa[f] bû.
** 3:19 Qanûna Ducarî 33:1-3; Îbranî 2:2; K'arêd Şandîya 7:38, 52.

dide k’ifşê, wekî çi ku bi Îsa Mesîh
bawerkirinê hatibûne sozdayînê,
bawermendar’a bêne dayînê.

**23** Berî hatina bawerîyê, em bin
destê Qanûnêda çawa girtî diha-
tine xweyîkirinê, h’eta xuyabûna
wê bawerîyê ku wê bihata. **24** Bi vî
awayî Qanûn bû t’erbetdarê[f] me û
em berbir’î Mesîh anîn*, ku em bi
bawerîyê r’ast bêne h’esabê. **25** Lê
niha ku bawerî hat, em îdî ne bin
destê t’erbetdarê Qanûnêda ne.

**26** Bi bawerîyê hûn h’emû yektî-
ya Mesîh Îsada lawêd Xwedê ne*.
**27** Hûn h’emû ku yektîya Mesîhda
hatine nixumandinê[f], we Mesîh
ser xwe wergirtîye. **28** Îdî firqî ne
nava cihû û necihûyada heye, ne
nava xulam û azayada, ne jî nava
mêra û jinada, çimkî hûn h’emû
jî yek in yektîya Mesîh Îsada.
**29** Û heger hûn p’ara Mesîh in,
wekî usa ye zur’eta Birahîm in û
warêd wî sozî ne*.

**4** **1** Awa ez dibêjim, warê ku
xweyê her tiştî ye, lê h’eta
ku xişîm e ji xulêm nayê firqîki-
rinê. **2** Ew bin destê xweykirîya
û xemk’êşada ye, h’eta wî wextê
ku bavê k’ifş kirîye. **3** Usa jî em
gava hê r’uh’anîda «xişîm» bûn,
me xulamtî sixirêd[f] vê dinyayê-
r’a* dikirin. **4** Lê gava wext pêr’a
gihîşt, Xwedê Kur’ê Xwe şand, ku
ji k’ulfetê[f] bû û k’ete bin Qanûnê,
**5** wekî yêd bin Qanûnê aza ke û
em jî heqê lawtîya Xwedê bistî-
nin*. **6** Awa hûn ku lawêd Wî ne,
Xwedê R’uh’ê Kur’ê Xwe şande
nava dilê me, ku gazî Xwedê dike:
«Abba[f]!» awa gotî «Bavo!» **7** Bi vî
awayî îdî tu ne xulam î, lê law î
û heger law î, usa jî Xwedê tu kirî
warê Xwe.

### Xemgînîya Pawlos bona galatîya

**8** Berê, gava we Xwedê nas nedi-
kir, we xulamtî yêd usar’a dikirin,
ku r’ast ne xwedê bûn. **9** Lê niha
ku we Xwedê nas kirîye, lê belê
Xwedê jî hûn nas kirine, hûn çawa
dîsa vediger’ine ser wan sixirêd

* 3:24 Aha jî tê fe’mkirinê: «Qanûn bû t’erbetdar h’eta hatina Mesîh».
* 3:26 Aha jî tê fe’mkirinê: «Hûn h’emû jî ku bawerîya xwe Mesîh Îsa tînin, lawêd Xwedê ne».
* 3:29 R’omayî 4:13.
* 4:3 Bi gotineke din: «Qewat yan h’unurêd r’uh’êd vê t’ebîyetêda, yan jî r’aw-r’izim û qeyde-qanûnêd vê dinyayê».
* 4:5-7 R’omayî 8:15-17.

vê dinêye bêqewate ne t'u tişt û
dîsa dixwazin xulamtîyê wanr'a
bikin? 10 Hûn guh didine r'ojêd
h'esab, meha, r'ojgar û sala. 11 Ez
bona we ditirsim, ku ew şixulê
min bona we kirîye deya her'e.

12 Ez hîvî ji we dikim xûşk-bi-
rano, bibine mîna min, çimkî ez
jî mîna we bûme. We t'u zîyan
nedaye min. 13 Hûn zanin ku cara
pêşin bêsih'etîya qalibê min bû
me'nî, min Mizgînî da we. 14 Û
çi ku hate serê qalibê min, ew
yek bû cêr'ibandinek[f] bona we,
lê dîsa we ez bêhurmet nekirim
yan pişta xwe neda min, lê weke
milyak'etekî Xwedê ez qebûl kirim
û weke Mesîh Îsa. 15 Ew şabûna
we çawa bû? Ez weke şîrê xwe,
heger ji dest weva bihata, weyê
ç'e'vê xwe jî derxista bida min.
16 Îdî ez bûme dijminê we, wekî
min wer'a r'ast xeber daye?

17 Ewêd mayîne ku k'etine de-
mana we, ew xêra we naxwazin,
lê belê ewana dixwazin we ji min
biqetînin, wekî hûn bik'evine
demana wan. 18 Qenc e ku merî
demana qencîyêda be û ne ku
t'enê gava ez nava weda bim, lê
her gav. 19 Lawêd min, ez niha
dîsa bona we mîna êşa k'ulfeta
dik'işînim, h'eta ku Mesîh nava
weda bigihîje. 20 Xwezî ez niha li
cem we bûma û min tiherê xe-
berdana xwe biguhasta, çimkî ez
bona we nava mitalada me!

### Mesela Hacer[f] û Serayê

21 Ji minr'a bêjin, hûn ku di-
xwazin bin Qanûnêda bin, we
nebihîstîye Qanûn çi dibêje?
22 Nivîsar e ku: «Du kur'êd Bi-
rahîm hebûn, yek ji carîyê bû,
yek jî ji jina aza»*. 23 Ewê ji ca-
rîyê bû, ew bi binyat'a merivayê
bibû, lê ewê ji jina aza bû, ew li
gora sozê Xwedê bû. 24 Eva yeka
cûr'ekî mayîn tê fe'mkirinê, ev
her du jin du peyman[f] in: Yek ji
ç'îyayê Sînayê[f], bona xulamtîyê
tîne, ew Hacer[f] bû*. 25 Hacer
E'rebistanêda tê h'esabê ç'îyayê
Sînayê û himberî Orşelîma niha
dibe, ku zar'êd xweva xulamtîyê
dike. 26 Lê ya aza, ew Orşelîma
jorin tê h'esabê, ku ew dîya me
h'emûya ye*. 27 Çimkî nivîsar e:
«Şa be, bêzur'eta ku te zar'
nedanîn.

* 4:22 Destpêbûn 16:15; 21:2.

* 4:24 Destpêbûn 16.

* 4:26 Aha jî tê fe'mkirinê: «Lê Orşelîma jorin aza ye, ew dîya me ye».

Bi eşq bistirê, deng bilind ke,
ku êşa zar'anînê te nek'işand.
Çimkî zar'êd te mêrber'dayîyê
wê ji zar'êd ya xweyîmêr ge-
lektir bin»*.
**28** Awa hûn* xûşk-birano, mîna
Îshaq[f] zar'êd wî sozî ne**. **29** Lê
çawa hingê ewê ji merivayê bibû,
yê ji alîyê R'uh'da dizêrand, usa
jî niha*. **30** Lê nivîsar çi dibêje?
«Ewê carîyê kur'ê wêva berdê
derxe, çimkî kur'ê carîyê gerekê
t'evî kur'ê jina aza war nebe»*.
**31** Awa xûşk-birano, em ne zar'êd
carîyê ne, lê zar'êd ya aza ne.

### Azayîya xwe xwey kin

**5** **1** Bona azayîyê Mesîh em aza
kirine! Wê azayîyê qewîn bi-
girin û dîsa nek'evine bin wî nîrê
xulamtîyê.
**2** Bibihên, ez Pawlos wer'a di-
bêjim: Heger hûn bihêlin ku hûn
bêne sinetkirinê, Mesîh t'u k'arê
nade we. **3** Ez her merivekîr'a dî-
sa mêrk'îmî dibêjim, yê ku îzinê
dide xwe ku ew bê sinetkirinê, ew
deyndar e ku t'emamîya Qanûnê
biqedîne. **4** Û heger hûn bi Qanûn
qedandinê dixwazin r'ast h'esab
bin, wekî usa ye hûn ji Mesîh
qetîyayî ne û ji k'eremê k'etî ne.
**5** Lê çi ji me dik'eve, em bi saya
R'uh'ê Pîroz û pê bawerîyê h'eyra
wê r'asth'esabbûnêda ne, ya ku em
têda guman in. **6** Çimkî yektîya
Mesîh Îsada, ne sinetkirin tiştek
e, ne jî nesinetkirin, lê serî bawerî
ye ku bi h'izkirinê ya xwe dike.
**7** Hûn r'ind pêşda diçûn! K'ê
hûn dane sekinandinê, ku êlimî[f]
r'astîyê nebin? **8** Eva hêlana ne
ji Wî ye, Yê ku gazî we kirîye.
**9** «Hinek hevîrtir'şk[f] t'emamîya
hevîr hiltîne»*. **10** Lê ez bi yektîya
meye Xudanda weda guman im,
ku hûnê tiştekî mayîn nefikirin,
lê ewê fikirêd we t'evî hev dike
wê ser bela xwe vebe, k'î jî hebe.
**11** Lê ez xûşk-birano, heger hela
hê sinetkirinê dannasîn dikim, îdî
çima tême zêrandinê? Wekî usa
ye gerekê t'u kesê ji xaçê Mesîh
p'işk[f] nebûya. **12** Xwezî yêd ku

* 4:27 Îşaya 54:1.
* 4:28 Nav hinek destnivîsarada dewsa «hûn» «em» heye.
** 4:28 Destpêbûn 17:18-22.
* 4:29 Destpêbûn 21:9.
* 4:30 Destpêbûn 21:10.
* 5:9 Korint'î I, 5:6.

fikirêd we t’evî hev dikin, xwexa
xwe k’okêda jî bibir’îyana!
13 **Hûn** azayîyêr’a hatine ga-
zîkirinê xûşk-birano, lê t’enê
ew azayîya we bira nebe mecala
xwestina binyat’a însên. Dewsa wê
bi h’izkirinê hevdur’a xulamtîyê
bikin. 14 Çimkî t’emamîya Qanûnê
bi vê gotinê tê sêrî: «Hevalê xwe
weke xwe h’iz bike»*. 15 Lê heger
hûn dev bavêjine hevdu, hevdu
bixwin, miqatî xwe bin, ku k’oka
hevdu neynin.

### Berêd R’uh’ê[f] Pîroz û binyat’a merivayê

16 Awa ez dibêjim, bi saya R’uh’ê[f]
Pîroz bimeşin û hûnê xwestinêd
binyat’a însên nekin. 17 Çimkî
xwestina binyat’a însên miqabilî
R’uh’ e, R’uh’ miqabilî binyat’a
însên e. Ev her du li hev nakin,
lema hûn nikarin xwestinêd xwe
bikin*. 18 Lê heger hûn bi R’uh’
têne r’êberîkirinê, hûn nak’evine
bin destê Qanûnê.
19 Awa kirêd binyat’a însên
e’yan in: Bênamûsî, h’eramî[f],
toltî, 20 p’ûtp’aristî[f], pîresêrtî,
neyartî, şer’-de’w, h’evsûdî, hêrs-
k’etin, hevr’ik’î*, dutîretî, cudetî,
21 ç’e’vê xirab, mêrkujî*, serxweş,
kûç’iksantî û çi ku mîna van in.
Ez niha wer’a dibêjim, çawa ku
min pêşda jî wer’a gotibû, ku yêd
van tişta dikin, P’adşatîya[f] Xwedê
war nabin.
22 Lê berêd R’uh’ ev in: H’iz-
kirin, şabûn, e’dilayî, sebirkirin,
şîrinayî, qencî, aminî, 23 milûktî,
xwegirtin. Hindava van tiştada
qanûn t’une. 24 Û ewêd ku p’ara
Mesîh Îsa ne, binyat’a xwe bi t’evî
temêd xirab û havijîyava ser xaç
kuştine. 25 Em ku bi saya R’uh’
dijîn, bi r’êberîya R’uh’ bimeşin.
26 Em k’ubar nebin, agirê hev gur’
nekin û h’evsûdîyê li hevdu nekin.

### Barêd hevdu hildin

**6** 1 Xûşk-birano, heger yek ne-
heqîkêda bê girtinê, hûn ku
r’uh’anî ne, wî bînine ser r’îya
r’astîyê, lê bi r’uh’ê milûktîyê. Lê
haş ji xwe jî hebin, ku hûn nek’e-
vine cêr’ibandinê. 2 Barêd hevdu
hildin û bi vî awayî hûnê qanûna
Mesîh biqedînin. 3 Heger yek xwe

* 5:14 Qanûna K’ahîntîyê 19:18.
* 5:17 R’omayî 7:15-23.
* 5:20 Aha jî tê fe’mkirinê: «T’enê xwer’a».
* 5:21 Nav hinek destnivîsarada «mêrkujî» t’une.

dewsa tiştekî datîne û xwexa ne
t'u tişt e, ew xwexa xwe dixapîne.
4 Bira her kes kirinêd xwe bide ser
mêzînê û paşî hingê ji xwe r'azî be,
ne ku xwe himberî hevalê xwe ke.
5 Çimkî her kesê xurca xwe hilgire.

6 Ewê hînî xebera Xwedê di-
be, gerekê her tiştêd qenc t'evî
dersdarê xwe p'ar ke. 7 Nexapin,
Xwedê nabe pêk'enî. Çimkî me-
riv çi diçîne, wê jî diçine. 8 K'î ku
bona binyat'a xwe diçîne, ewê ji
wê binyat'ê mirinê biçine, lê k'î
ku bona R'uh' biçîne, wê ji R'uh'
jîyîna[f] h'eta-h'etayê biçine. 9 Ji qen-
cîkirinê jî aciz nebin, çimkî emê
wextda biçinin heger em nedine
der. 10 Awa h'eta ku wext destêd
meda ye, h'emûyar'a qencîyê bi-
kin, îlahî[f] neferêd mala Xwedêr'a.

## T'emî û silavêd axirîyê

11 Dîna xwe bidinê, ez bi çi
h'erfêd gir niha wer'a dinivîsim.
12 Ewêd ku dixwazin ji dervava
xwe bidine k'ifşê, ew p'êyî ser we
dikin, ku hûn bêne sinetkirinê.
Lê evana vê yekê dikin, ku t'enê
bona xaçê Mesîh ew neyêne zê-
randinê. 13 Ewêd xweyîsinet xwexa
Qanûnê xwey nakin, lê dixwazin
ku hûn bêne sinetkirinê, wekî ew
bi nîşana qalibê weyî merivayî bi-
fir'in. 14 Lê ji **min** nak'eve ku ez bi
tiştekî din bifir'im, pêştirî bi xaçê
Xudanê me Îsa Mesîh, bi k'îjanî
dinya bona min xaçbûyî ye, ez jî
bona dinyayê. 15 Belê ne sinetki-
rin tiştek e, ne jî nesinetkirin, lê
serî ew e, ku bibin e'firînekî nû.
16 De bira e'dilayî û r'e'm ser wan
h'emûya be, k'îjanêd ku anegorî
vê yekê dijîn û usa jî ser Îsraêla[f]*
Xwedê be.

17 Ji vir şûnda bira t'u kes ze'-
metê nede min, çimkî min daxa
birînêd Îsa hildaye ser bedena
xwe. 18 De bira k'erema Xudanê
me Îsa Mesîh t'evî r'uh'ê we be
xûşk-birano. Amîn.

* 6:16 «Îsraêl» r'uh'anî tê fe'mkirinê (R'omayî 3:28-29; 9:6-29; Galatî 3:28-29).

# NE’MA PAWLOS EFESÎYAR’A

## Pêşgotin

Efes qeza Asya R’omayêda bû. Eva bajarê herî e’yan bû, usa jî p’ay-t’extê wê qezayê bû. T’emamîya Împêratorîya R’omayêda[f] ew bajarê çara bû alîyê mezinayîya xweda. Ew bajarekî gelekî bedew û xweş bû. R’ast e bi dannasînkirina Pawlos civîn[f] Efesêda çênebibû, lê dîsa weke sê sala li wir ma û ew hîn kirin, dema r’êwîtîya xweye 3-a (K’arêd Şandîya 19:1; 20:31). Ewî ev ne’ma xwe ji kelê bawermendêd Efesêr’a nivîsîye (3:1; 4:1; 6:20). Ne t’enê eva ne’ma, lê usa jî ne’ma wîye Fîlîpîya, Kolosîya û Filîmon kelêda hatine nivîsarê. Evana «Ne’meyêd[f] Kelê» têne h’esabê.

Eva ne’ma çawa qirar û meremê Xwedêyî h’eta-h’etayê e’yan dike, ku gava wext pêr’a bigihîje, ew t’ivdîra Wî wê bê sêrî û h’emû tiştê «bin serwêrtîya Mesîhda girêdayî bin, hin her tiştêd li e’rdê, hin jî li e’zmên» (1:10). Usa jî gerekê h’emû milet, hin cihû[f], hin jî necihû[f] bibine mile-tek yektîya Îsa Mesîhda, pê Xwedê hevva girêdayî. Şandî[f] gazî cime’ta Xwedê vê yekê dike, ku nava vê qirara Xwedêda bimînin, bi yektîya t’evî Mesîh, t’evî yekbûna t’emamîya merivayê[f] bin.

Pawlos p’ara ne’mêye pêşinda nêt-fikira yektîya t’evî Xwedê pêşda dik’işîne, derheqa wan mecalada dibêje, ku Bav[f] Xwedê çawa cime’ta Xwe bijart, çawa gîhande guneafûbûnê û saya Kur’ê Xwe Îsa Mesîh ew aza kirin. Û usa jî derheqa wî sozê Xwedêyî mezinda dibêje, awa gotî derheqa R’uh’ê[f] Pîrozda, ku ew çawa bihê[f] ber azabûna meva tê dayînê (serêd 1-ê h’eta 3-a).

Lê p’ara dudada şandî xwendevanar’a şirovedike, ku ew jîyîneke usada bijîn, wekî ew yektîya Mesîhe nava wanda usa r’ast k’ifş be, çawa heye. Usa jî civînêda, malda, hevaltîyêda û hindava hevda qedir-hurmet bin, bi milûktîyê, h’izkirinê û xemk’êşîyê ber hev daxin (serêd 4-a h’eta 6-a).

Şandî vê ne’mêda ser sê fikirêd sûretî (sîmvolî) disekine û bi van sûreta yektîya cime’ta Xwedêye t’evî Mesîh nîşan dike:

**1.** Civîn mîna bedenekê ye, serê k'îjanê Mesîh Xwexa ye.
**2.** Civîn mîna wî avayîyî ye, kevirê e'nîşka[f] k'îjanî Mesîh e.
**3.** Civîn mîna k'ulfetekê ye, malxê k'îjanê Mesîh e.
Pawlos vê ne'mêda gelek derb dide ser k'erema[f] Xwedêye yektîya Îsa Mesîhda. Ew her tiştî h'izkirin, xwedayîn, baxşandin, k'erem û r'onaya pîrozîya[f] Mesîhva girê dide.

**Serecema fikira ne'mê**

Pêşgotin (1:1-2)
Mesîh û civîn (1:3—3:21)
Mesîhda jîyîna nû (4:1—6:20)
Paşgotin (6:21-24)

## Silavkirin

**1** [1] Ji Pawlosê bi e'mirê Xwedê şandîyê[f] Mesîh Îsa,
wan merivêd[f] Xwedêr'a, yêd ku Efesêda* dimînin û yektîya Mesîh Îsada amin in:
[2] De bira k'erem[f] û e'dilayîya Xwedêyê Bavê[f] me û Xudan[f] Îsa Mesîh li we be.

### Dua-dirozgêd r'uh'anîye bi saya Îsa Mesîh bona cihû[f] û necihûya[f]

3 Şikir ji Xwedêr'a, Bavê Xudanê
me Îsa Mesîh,
ku pê h'emû dua-dirozgêd
r'uh'anîye li dîyarê e'zmana
yektîya Mesîhda dua li me
kirin.
4 Berî e'firandina dinyayê Xwedê
yektîya Wîda em bijartin,
wekî em pîroz[f] û bêqusûr bin,
li ber Wî h'izkirinêda bijîn.
5 Ewî em pêşda k'ifş kiribûn,
çawa li qirara Wî xweş hat,
ku me bi destê Îsa Mesîh bike
lawêd Xwe*.
6 De werin em pesinê Wî bidin,
bona wê k'erema[f] Wîye xwe-
yîr'ûmet,

* 1:1 Nav hinek destnivîsarada «Efesêda» t'une.
* 1:5 Bi gotineke din: «Heqê lawtîya Xwedê bistînin».

pê k'îjanê yektîya H'izkirîyê
Xweda qencî li me kir.
7 Yektîya Wîda em aza bûne bi
xûna Wî,
awa gotî afûbûna[f] guna standîye*.
Eva yeka ji dewlemendtîya
k'erema Wî ye,
8 ya ku Wî bi mer'danî ser meda
barand,
pê h'emû serwaxtî û fe'mdarîyê.
9 Ewî sur'a xwestina Xwe meva
e'yan kir,
çawa li Wî xweş hat, ya ku hê
pêşda qirar kiribû,
wekî yektîya Mesîhda bîne sêrî,
10 ku gava wext pêr'a bigihîje, ew
t'ivdîr* mîyaser be,
h'emû tişt bin serwêrtîya Mesîhda girêdayî bin,
hin her tiştêd li e'rdê, hin jî li
e'zmana.

11 Çawa Xwedê qirara Xweda
pêşda k'ifş kiribû,
ku her tişt li gora xwestin û
e'mirê Wî be,
em cihû[f] yektîya Mesîhda p'ara
Xwedê k'etine,
12 wekî em pesinê r'ûmeta Wî
bidin
ku me pêşda gumana xwe danîye ser Mesîh.
13 Yektîya Wîda hûn necihû[f] jî
bûne p'ara Xwedê,
gava we xebera r'astîyê, awa
gotî Mizgînîya xilazbûna[f]
xwe bihîst.
We bawerîya[f] xwe Wî anî
û bi R'uh'ê[f] Pîrozî sozdayî
hatine morkirinê.
14 R'uh'ê Pîroz çawa bihê[f] hatîye
dayînê
h'eta em sozê Xwedê war bin,
çaxê Xwedê cime'ta Xwe lap
aza ke,
bona pesindayîna r'ûmeta Xwe.

## Duayê Pawlos

15 Bona vê yekê min ji hingêva
ku bona bawerîya weye ser Xudan
Îsa û ew h'izkirina weye hindava t'emamîya cime'ta Xwedêda
bihîstîye, 16 bona we min dest ji
şikirdayînê nek'işandîye. Ez t'imê
nava duayêd xweda we bîr tînim,
17 wekî Xwedêyê Xudanê me Îsa
Mesîh, Bavê xweyîr'ûmet, R'uh'ê
serwaxtîyê û e'yantîyê bide we,
ku hûn Wî t'am nas bikin. 18 Bira ç'e'vêd r'uh'ê we vebin, wekî
hûn fe'm bikin, çi ye ew gumana

* 1:7 Kolosî 1:14.
* 1:10 Aha jî tê fe'mkirinê: «Wek'îltî».

ku Wî gazî we kirîye û çi ye ew
dewlemendtîya r’ûmeta Wî, ya ku
cime’ta Wî wê war be **19** û çi ye
ew qewata Wîye mezine bêhim-
ber, ya ku nav me bawermendada
dixebite. Ev e ew qewata Wîye
zor, **20** ya ku Xwedê ser Mesîh da
xebatê, gava Ew ji nava mirîya
r’akir û li dîyarê e’zmana k’êleka[f]
Xweye r’astê da r’ûniştandinê*,
**21** Ew danî ser h’emû serwêrtîya,
h’ukumetîya, qewata, xudantîya
û usa jî ser h’emû navêd ku têne
hildanê, ne ku t’enê li vê dinê,
lê wê dinê jî. **22** Û Xwedê her tişt
kire bin p’îyêd Wî* û Ew bona
civînê[f] k’ifş kir çawa serwêrê her
tiştî**. **23** Civîn jî bedena Mesîh
e, t’emambûna Wî ye, ku Xwexa
her tişt e, her tiştî t’emam dike.

### Ji mirinê berbi jîyînê

**2** **1** Hûn ji dest neheqî û gu-
nêd xwe mirî bûn*, **2** gava
hûn pey e’detêd vê dinê diçûn,
li gora xwestina mîrê serwêrtîya
vê hewê, wî r’uh’ê ku niha jî nava
wan merivada ya xwe dike, yêd
ku ne gur’a[f] Xwedêda ne. **3** Em
h’emû jî wextekê pey wan tişta
diçûn, bi dilhavijîyêd binyat’a
merivayê dijît û dil û fikirêd mer’a
çi derbaz dibûn me ew dikirin û
binyat’a xweda jî hêjayî xezeba
Xwedê bûn, çawa yêd mayîn.
**4** Lê Xwedêyê ku xweyê r’e’ma
dewlemend e, bi h’izkirina Xweye
mezin, bi k’îjanê em h’izkirin,
**5** gava em hê ji dest neheqîyêd xwe
mirî bûn, Ewî t’evî Mesîh em sax
kirin. Bi k’eremê[f] hûn xilazbûyî
ne! **6** Yektîya Wîda em ji mirinê
r’akirin û t’evî Wî em li dîyarê
e’zmana dane r’ûniştandinê, bi
saya Mesîh Îsa. **7** Wî ev yek kir,
wekî li nava wan zemanêd ku
wê bên, dewlemendtîya k’erema
Xweye bêhimber, hindava meda
bi saya Mesîh Îsa, bi şîrinayî bide
k’ifşê. **8** Çimkî bi k’eremê hûn
xilazbûyî ne, pê bawerîyê û ev
yek ne ji we ye, lê dayîna Xwedê
ye. **9** Ev yek ne ji kirina ye, wekî
yek p’eyê xwe bide. **10** Belê em
çêkirîyêd Wî ne, yektîya Mesîh
Îsada xuliqî, bona kirinêd qenc,
ya ku Xwedê pêşda hazir kir, ku
em wanda bimînin.

* 1:20 Zebûr 110:1.
* 1:22 Zebûr 8:6.
** 1:22 Kolosî 1:18.
* 2:1 Kolosî 2:13.

### H'emû bawermend bi saya Mesîh yek in

11 Hûn ku e'silê xweda necihû
ne û ji alîyê cihûyada «bê sinet[f]»
dihatine h'esabê, yêd ku xwexa
xwe «sinetkirî» h'esab dikirin,
bi sinetîya qalibe bi desta kirî,
awa bîr bînin ku hûn hingê çi
bûn. 12 Hingê hûn bê Mesîh û
xerîb bûn hindava bajarvantîya
Îsraêlda[f] û ji peymana[f] û sozêd
wan dûr bûn û vê dinêda jî bê
guman û bê Xwedê bûn. 13 Lê
hûn ku wextekê dûrî van yeka
bûn, niha t'evî Mesîh Îsa bûne,
bi xûna Mesîh hûn nêzîk bûne.
14 Çimkî Ew e e'dilayîya me, ku
her du, cihû û necihû kirine yek.
Ewî dîwarê navbir'îyê, awa gotî
dijminatî bi bedena Xwe xirab
kir 15 û t'emî û e'mirêd Qanû-
na[f] Mûsada[f] betal kirin, wekî
yektîya Xweda, ji her duya cihû
û necihû merivekî nû bixuliqîne
û bi vî awayî bike e'dilayî*. 16 Û
Mesîh bedenekêda her du t'evî
Xwedê bi xaçê[f] Xwe li hev anîn,
çimkî bi wê kirinê dijminatî
k'okêva r'akir*. 17 Û hat Mizgî-
nîya e'dilayîyê da we necihûyêd
dûrî Xwedê û cihûyêd nêzîkî
Wî*. 18 Çimkî bi saya Wî, îzina
me her duya jî heye, bi R'uh'ekî
nêzîkî Bavê bin.
19 Awa hûn îdî ne xelq û xerîb
in, lê bajarvantîya we t'evî cime'ta
Xwedê ye û neferêd mala Xwedê
ne. 20 Hûn ser wî r'ik'inê şandîya
û p'êxembera avakirî ne, kevirê
e'nîşka[f] k'îjanî Mesîh Îsa Xwexa
ye. 21 Bi Wî t'emamîya avayî pêva
cî bi cî bona Xudan p'aristgeheke[f]
pîroz bilind dibe. 22 Bi Wî hûn
jî bi hevr'a têne avakirinê, çawa
xana Xwedê bi R'uh'ê Pîroz.

### Pawlos, şandîyê necihûya

3 1 Bona vê yekê ez Pawlos bona
Mesîh Îsa girtî me, bona we
necihûya... 2 Gerekê we bihîstibe,
ku ev wek'îltîya k'erema Xwedê
bona we minr'a hatîye dayînê.
3 Ev sur'a bi dayînekê li ber min
hate vekirinê. Min li jorê kin
wer'a nivîsî 4 û gava hûn bixûnin,
hûnê bikaribin bizanibin ku ez
çawa sur'a Mesîh fe'm dikim*.

* 2:15 Kolosî 2:14.
* 2:16 Kolosî 1:20.
* 2:17 Îşaya 57:19.
* 3:4-6 Kolosî 1:26-27.

5 Eva sur'a dewrêd bihurîda li ber
bendêd dinê venebûye, çawa ni-
ha bi R'uh'ê Pîroz li ber şandî û
p'êxemberêd Wîye pîroz vebûye.
6 Eva sur'a vebû, wekî necihû pê
Mizgînîyê t'evî Îsraêlê war bin,
bibine bedenek û xweyîp'arêd
sozê Wî bin, bi saya Mesîh Îsa.
7 Ez bûme berdestîyê vê Miz-
gînîyê, anegorî dayîna ji k'erema
Xwedê, ya ku bi kirina qewata
Wî minr'a hatîye dayînê. 8 Belê
ez ku ji nava cime'ta Xwedêda
ji yê herî biç'ûk kêmtir im, lê ev
k'erem minr'a hatîye dayînê, ku
nava necihûyada dewlemendtîya
Mesîhe ne li ber h'işa dannasîn
kim 9 û li ber h'emûya vekim, ku
çawa t'ivdîra sur'a Xwedê tê xeba-
tê, ya ku hê dewrêd berêda cem
Xwedêyê ku her tişt e'firandîye,
veşartî mabû. 10 Meremê Xwedê
ev bû, wekî niha serwaxtîya Xwe-
ye cûr'e-cûr'e, bi destê civînê[f] li
serwêrtî û h'ukumetêd dîyarêd
e'zmanava e'yan bike, 11 anegorî
qirara Wîye hê dewrêd berêda, ya
ku Wî bi destê Mesîh Îsa, Xuda-
nê me kir. 12 Yektîya Mesîhda û
pê wê bawerîya meye ser Wî em
dikarin bi mêrk'îmî û r'ûvekirî
nêzîkî Xwedê bin. 13 Awa ez ji
we hîvî dikim, ku hûn ber xwe
nek'evin, bona wan cefayêd ku
ez bona we dik'işînim. Evana
bona r'ûmeta we ne.

### H'izkirina Mesîh

14 Bona vê yekê ez li ber Bav
çok didim, 15 ji k'îjanî her qebîleke
e'rd û e'zmana navê xwe distîne.
16 De bira Ew weke dewlemendtîya
r'ûmeta Xwe qewatê bi saya R'uh'ê
Xwe bide we, ku hûn k'ûrayîya dilê
xweda bişidin, 17 bi bawerîyê Mesîh
dilê weda bijî û hûn h'izkirinêda
r'aw[f] û r'ik'inê xwe bavêjin, 18 ku
t'evî t'emamîya cime'ta Xwedê
bikaribin fe'm bikin, ku berayî,
dirêjayî, bilindayî û k'ûrayîya
h'izkirina Mesîh çi ye. 19 Belê bira
hûn h'izkirina Mesîh nas kin, ya
ku ji her h'iş-aqilî zêdetir e, wekî
hûn t'emamîya Xwedêva t'ijî bin.
20 Awa şikir ji Wîr'a be, Yê ku
dikare her tiştî hê zêde ke, ne çawa
em dixwazin yan difikirin, bi wê
qewata ku nava meda dixebite,
21 şikir ji Wîr'a nava civînêda, bi
saya Mesîh Îsa, h'emû zemanîda,
h'eta-h'etayê! Amîn[f].

### Em h'emû jî bedenek in

4 1 Awa ezî girtîyê bona navê
Xudan, hîvî ji we dikim, ku
hûn usa bijîn, çawa layîqî wê
gazîyê ye, k'îjanêr'a hûn hatine
gazîkirinê. 2 Hûn bi t'emamîya

milûktîyê û şkestî, bi sebirê h’iz-
kirinêda li ber hev daxin*. 3 Bi-
ce’dînin, ku yektîya R’uh’ pê
hevgirêdana e’dilayîyê xwey kin.
4 Çawa beden yek e û R’uh’ yek
e, hûn jî gumanekêr’a hatine ga-
zîkirinê. 5 Xudan yek e, bawerî[f]
yek e, nixumandin[f] yek e, 6 Xwedê
yek e, Ew Bavê h’emûya ye, ku
ser h’emûyar’a ye, bi h’emûya ya
Xwe dike û nava h’emûyada ye.

7 Belê ji me her kesîr’a jî k’erem
hatîye dayînê, çawa Mesîh p’a-
revekir. 8 Bona vê yekê tê gotinê:

«Gava hilk’işîya çû jorê,
hêsîr t’evî Xwe birin
û p’êşk’êş[f] dane meriva»*.

9 Ev «hilk’işîya» çi tê h’esabê?
Dixwaze bêje, ku Ew pêşda ber-
jêrî wê dinya jêrin bû. 10 Ewê ku
berjêr bû, hema Ew e, Yê ku Xwe
da fêza h’emû e’zmana, wekî
her tiştî h’izûrîya Xweva t’ijî ke.
11 Eva Ew bû, Yê ku p’êşk’êş dane
meriva, ku hinek bibine şandî,
hinek p’êxember, hinek miz-
gîndar, hinek jî se’vî û dersdar.
12 Ewî ev yek kir, wekî cime’ta
Xwedê şixulêd xizmetk’arîyêr’a
hazir be, bona avabûna bedena
Mesîh, 13 h’eta ku em h’emû jî
bigihîjine wê yekê, ku bawerîyê û
Kur’ê[f] Xwedê naskirinêda t’ifaq[f]
bin, bibine merivêd gihîştî, t’am
weke bejin-bala Mesîh.

14 Wekî usa ye ji vir şûnda em
nebine mîna zar’oka ku ji pêla
virda-wêda dik’evin û bi derewêd
meriva ber bayê her hînkirinekê
dik’evin, yêd ku bi fêlbazîya dixa-
pînin û dixalifînin[f]. 15 Lê r’astîyê
pê h’izkirinê bêjin*, her alîyada
bigihîjine sêrî, ku Mesîh e. 16 Ji
Wî t’emamîya bedenê hevva ne
û h’emû jî bi alîk’arîya her sêvi-
kekê hevva girêdayî ye. Û gava
her p’areke bedenê şixulê xwe
dike, h’izkirinêda xwexa digihîje
û mezin dibe*.

## Jîyîna nûye t’evî Mesîh çawa endemêd Bedena wî

17 Awa ez vê yekê mêrk’îmî
dibêjim û bi navê Xudan t’emî li
we dikim, ku hûn îdî t’u cara wê
r’êda neçin, çawa p’ûtp’arist[f] bi
fikirêd xweye p’ûç’ diçin. 18 Ewana
fe’mêd xweda şûna r’eşva çûn û ji

* 4:2 Kolosî 3:12-13.

* 4:8 Zebûr 68:18.

* 4:15 Aha jî tê fe’mkirinê: «Bi h’izkirinê pey r’astîyê bin».

* 4:16 Kolosî 2:19.

jîyîna Xwedê dûr k'etine, ji dest
nezanîya nava xwe û serh'işkîya
xwe. **19** Şerma r'ûyê xwe unda
kirine û usa xwe dane doxînê,
h'eta ku her cûr'e kirinêd h'eram[f]
dikin û t'êr nabin.

**20** Lê we Mesîh usa nas nekir!
**21** Belê we bona Wî bihîstîye jî û
çawa yêd p'ara Îsa, hûn wê r'astîya
nava Wîda hîn bûne. **22** De hûn
xeysetê xweyî berê ji xwe dûr xin,
wî merivê kevinî ku bi havijîyêd
h'ilek'arva dêrisbûyî ye* **23** û bi
r'uh' û fikirêd xweda nûyejîyîn
bin, **24** merivê nû li ser xwe wer-
girin, ku kirasê Xwedêda bi heqî
û h'elalîya bê qelpî xuliqî ye*.

**25** Awa derewa ji xwe dûr xin, ji
we her yek hevalê xwer'a r'ast xeber
de*, çimkî em bi hevr'a endemêd
Bedena Mesîh ne. **26** Heger hûn
hêrs k'evin, guna nekin*, bira r'o
ser hêrsa wer'a neçe ava **27** û cî
nedine mîrêcin[f]. **28** Ewê ku dizîyê
dike, bira îdî nedize, lê bi xûdana
xweye h'elal bi destêd xwe bixebite,
ku bikaribe dest bavêje k'etîya jî.
**29** Bira ji devê we qet xebereke xi-
rab derneyê, pêştirî tiştêd ku kêrî
guhdara tên û k'arê didine wan.
**30** Û R'uh'ê Xwedêyî Pîroz neêşînin,
bi K'îjanî hûn bona R'oja Azayîyê
hatine morkirinê. **31** De bira her
te'layî, hêrs, berzeqî[f], qar'e-qar'
û gotinêd ner'êda ji we dûr bin
t'evî her cûr'e k'în-boxîyêva. **32** Û
hevr'a şîrin û dilşewat bin, li hev
bibaxşînin, çawa Xwedê bi Mesîh
baxşande we.

### Çawa ç'e'v bidine Xwedê

**5** **1** Awa ç'e'v bidine Xwedê,
çawa zar'êd h'izkirî **2** û xwe
li h'izkirinê bigirin, çawa Mesîh
jî em h'iz kirin û jîyîna Xwe bo-
na me da, Xwedêr'a bû h'edî[f] û
qurbana[f] bînxweş.

**3** Lê h'eta navê qavîyê[f] û her
h'eramîyê, yan timayê jî gerekê
nava weda neyê hildanê, çawa li
cime'ta Xwedê nak'eve. **4** Usa jî
gotinêd bême'rîfetî, yan bêfe'mî,
yan h'enekêd qelpê xirab, ku li we
nak'evin, bira ji devê we derneyên,
lê dewsê şikirdarî. **5** Hûn vê yekê
zanibin ku t'u qav, yan h'eram,
yan timak'ar (ku p'ûtp'arist[f] e)
P'adşatîya Mesîh û Xwedêda war

* 4:22 Kolosî 3:9; R'omayî 6:6.
* 4:24 Kolosî 3:10.
* 4:25 Zekerîya 8:16.
* 4:26 Zebûr 4:4.

nabe. **6** Bira t'u kes bi xeberêd
p'ûç' we nexapîne, çimkî bona van
tişta hêrsa Xwedê li wan merivêd
neguhdar r'adibe. **7** Awa hûn t'evî
yêd usa nebin! **8** Hûn jî wextekê
te'rî bûn, lê niha hûn ku p'ara
Xudan in, r'onayî ne. Awa mîna
zar'êd r'onayê bijîn, **9** (çimkî berê
r'onayîyê ji her qencîyê, heqîyê
û r'astîyê dibe) **10** û bizanibin ku
çi li Xudan xweş tê. **11** T'evî wan
kirêd bêbere te'rîyê nebin, lê wan
ser avê xin, **12** çimkî bona wan
tiştêd ku ewana bi dizîva dikin
şerm e jî ku bê xeberdanê. **13** Lê
gava her tişt tê ber r'onayê, aşkere
dibe, **14** çimkî her tiştê ku aşkere
dibe, dibe r'onayî. Bona vê yekê
hatîye gotinê:

«Xewixîyo, h'işyar be!
Ji nav mirîya r'abe
û Mesîh wê te r'onayî ke»*.

**15** Awa binihêr'in ku hûn nigê
xwe fesal bavêjin, nebine mî-
na bêfe'ma, lê mîna serwaxta.
**16** Dest bidine ber wext, çimkî
zemanî xirab e*. **17** Bona vê yekê
bêfe'm nîbin, lê belê bizanibin çi
ye qirara Xudan. **18** Û bi şeravê
serxweş nebin, ku e'mirê mêriv
p'ûç' dike, lê bi R'uh'ê Pîrozva t'ijî
bin. **19** Zebûr[f] û dirozga, stiranêd
r'uh'anî hevdur'a bêjin, bistirên û
dilê xweda Xudanr'a bilovînin*.
**20** Her gav bona her tiştî r'azîbûnê
bidine Bav Xwedê, bi navê Xudanê
me Îsa Mesîh.

### Borcdarîya jin û mêra

**21** Bi xofa Mesîhe nava xweda
li ber hevdu xwe bişkênin.

**22** K'ulfetno, usa xwe li ber
mêrêd xwe bişkênin, çawa li ber
Xudan*, **23** çimkî mêr serê jinê
ye, çawa Mesîh jî serê civînê[f] ye
û Xwexa Xilazkirê[f] bedena Xwe
ye. **24** Û çawa civîn li ber Mesîh
xwe dişkêne, bira usa jî jin her
tiştîda ber mêrê xwe şkestî be.

**25** Mêrno, jinêd xwe h'iz bikin,
çawa ku Mesîh civîn h'iz kir û
jîyîna Xwe ber wêva da*, **26** wekî
wê bi xeberê buhurtî-jibare ke, pê
avê bişo*, **27** ku civînê li ber Xwe

---

* 5:14 Îşaya 26:19; 60:1.
* 5:16 Kolosî 4:5.
* 5:19 Kolosî 3:16-17.
* 5:22 Kolosî 3:18; Petrûs I, 3:1.
* 5:25 Kolosî 3:19; Petrûs I, 3:7.
* 5:26 Aha jî tê fe'mkirinê: «Wekî wê bi xeberê h'elal ke, pê ava h'ewz bişo».

qeşeng bide sekinandinê, ku t’u
lek’e yan qerç’imok, yan tiştekî
mîna van ser t’unebe, lê paqij û
bêqusûr be. 28 Usa jî gerekê mêr
jina xwe h’iz bike, çawa bedena
xwe. Yê ku jina xwe h’iz dike, ew
xwe h’iz dike. 29 Çimkî bedena t’u
kesî ber ç’e’vê wî ne r’eş e, lê wê
t’êr dike û xwey dike, çawa Mesîh
jî civînê, 30 çimkî em endemêd
bedena Wî ne. 31 Çawa nivîsar e:

> «Bona vê yekê mêr wê dê û bavê xwe bihêle, xwe li jinê bigire û her du wê bibine bedenek»*.

32 Eva sur’a k’ûr e, lê ez gotina
xwe tînime ser Mesîh û civînê.
33 Belê ji we her kes jî bira jina
xwe h’iz bike çawa xwe û jin ji
mêrê xwe xof bike.

## T’emîyêd bona zar’a û dê-bava

**6** 1 Zar’no, çawa bawermen-
dêd Xudan gur’a dê û bavê
xweda bin, çimkî ev yek r’ast e*.
2 «Qedirê dê û bavê xwe bigire»
ku ev e t’emîya pêşin t’evî soz-
dayînê, 3 «wekî çerxa te r’ast be
û ser e’rdê e’mirê te dirêj be»*.
4 Û hûn bavno, zar’êd xwe hêrs
neêxin, lê wan bi şîret û hînkirina
Xudan mezin kin*.

## Xulam û axa

5 Xulamno, bi xof û tirs, dilê sax
gur’a xweyîyêd xweye vê dinêda
bin, çawa gur’a Mesîhda*, 6 ne ku bi
xulamtîya li ber ç’e’va, ku li meriva
xweş bên, lê çawa xulamêd Mesîh
bi dil qirara Xwedê biqedînin. 7 Bi
r’ezedilî xulamtîyê bikin, çawa
Xudanr’a, ne ku merivar’a. 8 Hûn
zanin ku her kes, heger xulam be,
heger aza, çi qencîyê ku bike, weke
wê jî wê ji Xudan bistîne.
9 Hûn jî xweyîno, hindava wanda
usa bin. Dest ji gef-gur’îyê bikin.
Hûn zanin ku Xweyê wan jî, Yê
we jî li e’zmana ye û cem Wî t’u
firqî t’une*.

## Ç’ekêd Xwedê

10 Heyneser, yektîya Xudanda
qewat bin, bi zorayîya qewata Wî.

* 5:31 Destpêbûn 2:24.
* 6:1 Kolosî 3:20.
* 6:3 Qanûna Ducarî 5:16; Derk’etin 20:12.
* 6:4 Kolosî 3:21.
* 6:5-8 Kolosî 3:22-25.
* 6:9 Kolosî 4:1; Qanûna Ducarî 10:17.

**11** Her ç’ekê Xwedê li xwe kin, ku
hûn bikaribin miqabilî h’unurêd
mîrêcin[f] bisekinin. **12** Çimkî şer’ê
me ne miqabilî xûn û goşt e, lê
miqabilî serwêrtî û h’ukumetîya
ye, miqabilî mîrêd vê dinya te’rî
ye û miqabilî ordîyêd r’uh’anîye
xirabe li dîyarê e’zmana ne. **13** Bona
vê yekê ç’ekêd Xwedê hildin, ku
hûn bikaribin li ber r’oja oxirmê
giran bisekinin û piştî kirina her
tiştîr’a, cîyê xweda qewîn bisekinin.
**14** Awa cîyê xweda bisekinin,
r’astîyê mîna k’emberê li pişta
xwe bişidînin, heqîyê mîna zi-
rih’ê li sîngê xwe wergirin* **15** û
sol nigêd weda, bona Mizgînîya
e’dilayîyê hazir sekinî bin*. **16** Li
ser her tiştîr’a jî bawerîyê mîna
mert’alê bigirine xwe, bi k’îjanê
hûnê bikaribin h’emû tîrêd agirîye
ku yê Xirab davêje, bitemirînin.
**17** Û xilazbûnê mîna k’umzirih’ê
hildin, mîna şûr jî xebera Xwedê,
ku ji R’uh’ê Pîroz e*. **18** Bi h’emû
dua û r’eca her gav dua bikin pê
R’uh’ê Pîroz. Ser vê yekê h’işyar
bimînin û bona t’emamîya cime’ta
Xwedê t’imê dua bikin. **19** Û bona
min jî dua bikin, ku gava ez xeber
dim, gotinek minr’a bê dayînê,
wekî mêrk’îmî sur’a Mizgînîyê
e’yan kim, **20** bona K’îjanê ez bi
van qeydê xwe qasidîyê dikim.
Dua bikin, wekî ez bona Wê tu-
ruş kim xeber dim, çawa lazim e.

### Silavêd axirîyê

**21** Wekî hûn jî bona min bizani-
bin, haş ji h’al-h’ewalê min hebin,
Tixîkoyê birayê delal û qulixk’arê
amin yektîya Xudanda wê her tiştî
wer’a bêje. **22** Ez bona wê yekê wî
ser weda dişînim, wekî hûn haş
ji me hebin û ew bi vê yekê dil
bide we.
**23** De bira e’dilayî û h’izkirin
bawerîyêva t’evayî ji Bav Xwedê û
Xudan Îsa Mesîh li xûşk-bira be.
**24** Bira k’erem t’evî wan h’emûya
be, yêd ku bi h’izkirina bê xilazî
Xudanê me Îsa Mesîh h’iz dikin.

---

* 6:14 Îşaya 59:17.
* 6:15 Îşaya 52:7.
* 6:17 Îşaya 59:17.

# NE’MA PAWLOS FÎLÎPÎYAR’A

## Pêşgotin

Pawlosê şandî[f] eva ne’ma ji kelê civîna[f] bajarê Fîlîpyar’a nivîsîye. Ev civîn, civîna pêşin bû, ya ku axa Ewropayêda, qeza Mekedonya bin Împêratorîya R’omayêda[f] h’îmê wê hate avîtinê. Ev ne’me hingê hate nivîsarê, gava dannasînkirêd miqabilî Pawlos civînêda tiştêd şaşe miqabilî hînkirina Mizgînîyê hîn dikirin û Pawlos gelekî ber xwe dik’et. Lê alîyê dinva jî em vê ne’mêda guman û eşqeke mezin alîyê Pawlosda dibînin, ji wê bawerîya wîye ser Îsa Mesîh.

Sebebeke din jî bona nivîsara vê ne’mê hebû ku Pawlos bona bawermendêd Fîlîpyayêda r’azîbûnê dide Xwedê, wekî nava tengasîyêd[f] wîda wana k’omek dabûne wî (4:10-20). Usa jî xuya dibe ku Pawlos xwestîye vê mecalê bide xebatê, wekî bawermend xîret û e’gît bin, tengasîya wî û xwe nenihêr’in. Ew hîvî dike, ku nava wanda t’ifaq[f] hebe û mîna Mesîh şkestî bin, ne k’ubar û babax bin. Ew bîr tîne ku yektîya Mesîhda bi k’erema[f] Xwedê jîyînê pê bawerîyê[f] distînin, ne ku pê qedandina Qanûna[f] Mûsa[f]. Pawlos derheqa wê eşq û şabûnêda dibêje, k’îjanê ku Xwedê dide wan, yêd ku yektîya Îsa Mesîhda dijîn (serê 2-a). Serê 3-da, fîlîpîya t’eglîfî wê derecê dike, ku ew bice’dînin bigihîjine meremê jîyîna Mesîh, awa gotî p’êga Mesîhda her’in.

Eva ne’ma eşq, guman, yektî û sebira bona pêşdaçûyîna jîyîna bawermenda dide k’ifşê. Usa jî dide k’ifşê, ku Pawlosê şandî gelekî vê civînê h’iz dike û qedirê wan digire.

### Serecema fikira ne’mê

Pêşgotin (1:1-11)
H’alê ku Pawlos têda ye (1:12-26)
Jîyîna Mesîhda (1:27–2:18)
Şêwira bona Tîmot’êyo û Êpafrodîto (2:19-30)

H'evza xwe dijmina û qezîya bikin (3:1—4:9)
Pawlos û dostêd wîye Fîlîpyayêda (4:10-20)
Paşgotin (4:21-23)

### Silavkirin

1 [1] Ji Pawlos û Tîmot'êyoyê
xulamêd Mesîh Îsa,
t'emamîya cime'ta Xwedêr'a,
yêd ku p'ara Mesîh Îsa ne û li
alîyêd Fîlîpyayê dimînin, t'evayîya
berpirsîyar û berdestîyêd civînêva[f]:
2 De bira k'erem[f] û e'dilayîya
Xwedêyê Bavê[f] me û Xudan[f] Îsa
Mesîh li we be.

### Duayê Pawlos

3 Ez şikirîya xwe Xwedêyê xwe
tînim gava her gav we bîr tînim,
4 t'imê nava h'emû duayêd xweda,
bona we h'emûya bi dilê şa dua
dikim, 5 çimkî hûn r'oja pêşinda
h'eta îro t'evî şixulê Mizgînîdayînê
bûne. 6 Û ez vê yekêda guman im,
Ewê ku dilê weda dest bi şixulê
Xweyî qenc kirîye, wê h'eta R'o-
ja hatina Mesîh Îsa jî bigihîne
sêrî. 7 Hûn dilê minda ne û heq
e jî ku ez bona we h'emûya aha
bifikirim. Çimkî hûn h'emû jî
t'evî wê k'eremê[f] bûne, ya ku ji
Xwedêda minr'a hatîye dayînê,
çawa ez niha qeydada me, usa jî
bona Mizgînîyê sekinî bûm û min
ew dida makkirinê. 8 Xwedê şe'dê
min e, ku ez bi h'uba Mesîh Îsa
çiqasî h'eyra we h'emûyada me.
9 Û ez vê duayê dikim, ku h'iz-
kirina we hê-hê bi zanebûn û
serwaxtîya[f] gihîştîva zêde be,
10 wekî k'îjan here qenc e, hûn
wê bibijêrin. Hingê hûnê R'oja
hatina Mesîhda şîrh'elal û bêle-
k'e bin 11 û bi saya Îsa Mesîh bi
berêd heqîyêva t'ijîbûyî bin, bona
r'ûmet û pesinê Xwedê.

### Jîyîn Mesîh e

12 Ez dixwazim ku hûn bizanibin
xûşk-birano, wekî çi ku hate serê
min, ewê hê k'ar da pêşdaçûyîna
Mizgînîyê. 13 Awa t'evayîya k'oma
k'oç'ikserêva, usa jî h'emûyêd
mayînva e'yan e ku ez bona navê
Mesîh nava van qeydada me. 14 Û
dilê p'ir'anîya bawermenda jî bi
van qeydêd min yektîya Xudanda
şidîyan, ku hê bi mêrk'îmî xebera
Xwedê bê xof û tirs bêjin.
15 R'ast e hinek ji h'evsûdîyê
û mixenetîyê Mesîh dannasîn
dikin, lê hinek jî ji nêta qencîyê.

16 Evana ji h'izkirinê dannasîn
dikin, çimkî ew zanin ku ez ser
vî qulixî[f] hatime danînê, ku pişt-
girîyê Mizgînîyê bikim. 17 Lê yêd
mayîn bona hevr'ik'îyê Mesîh
dannasîn dikin, ne bi dilê r'ast.
Ew difikirin, ku tengasîyê[f] ser
qeydêd minda zêde kin.

18 Lê firqî t'une! Çawa jî bibe,
heger ewana bi qelpîyê yan bi
r'astîyê Mesîh dannasîn dikin,
ez bi vê yekê şa me. Belê ezê şa
bim jî, 19 çimkî ez zanim ku ev
yek wê axirîyê li ber azabûna min
k'eve, bi duayêd we û alîk'arîya
R'uh'ê Îsa Mesîh. 20 Ez guman
û ç'e'vnihêr'îya vê yekê me, ku
t'u tiştîva ezê şermî nemînim, lê
belê hê mêrk'îmî bim, çawa her
gav usa jî niha pesinê Mesîh bi
qalibê min bê dayînê, heger bi
mirina min be, yan jî bi jîyîna
min be. 21 Çimkî bona min jîyîn
Mesîh e û mirin jî k'ar e. 22 Heger
jîyîna vî qalibîda hê k'arê dide
şixulê min, ez nizanim k'îjanî
bibijêrim. 23 K'etime nava du
kevira: Ez h'izret im ku ji vî qa-
libî derêm, her'ime cem Mesîh,
minr'a eva hê gelekî qenc e, 24 lê
mayîna mine vî qalibîda hê bona
k'ara we ye. 25 Ez vê yekê ku bê
şik bawer dikim, lema jî zanim
ku ezê bimînim, t'evî we h'emûya
bim, wekî hûn hê pêşda her'in û
bawerîyêda[f] şa bin. 26 Awa gava ez
dîsa bême cem we, hûn pê min
bi saya Mesîh Îsa hê fir'naq bin.

27 Lê t'enê çawa layîqî Mizgî-
nîya Mesîh e, hûn xwe usa xwey
kin, ku heger ser weda bêm û we
bibînim yan dûrva bibihêm biza-
nibim ku we bi r'uh' û dilekî pişt
daye pişta hev, bona şer'k'arîya
bawerîya Mizgînîyê sekinî ne.
28 T'u alîyava ji peyk'etîyêd xwe
venek'işin. Ev yek nîşaneke un-
dabûna wan û xilazbûna[f] we ye û
ev jî ji Xwedê ye. 29 Eva k'erema
Xwedê bona xatirê Mesîh daye
we, wekî ne ku t'enê hûn bawerîya
xwe Wî bînin, lê bona Wî cefê jî
bik'işînin. 30 Niha jî hûn nava wî
şer'îda ne, k'îjan ku we ser min
dît û niha bona min dibihên*.

### Xwenimizkirina Mesîh
### û mezinayîya wî

2 1 Awa heger t'evbûna weye
t'evî Mesîh bîna ber we ye,
heger h'izkirina Wî dil dide ber we,
heger R'uh'ê[f] Pîroz we dike yek*,

* 1:30 K'arêd Şandîya 16:19-40.
* 2:1 Aha jî tê fe'mkirinê: «Heger R'uh'ê[f] Pîroz we t'evî Xwe dike yek».

heger dilşewatî û r’e’ma we heye,
2 eşqa dilê min bi t’ifaqa[f] xwe hûn
bigihînine sêrî: Bira ew h’izkirina
nava weda be û ser nêt û fikirekê
bin. 3 Tiştekî bi hevr’ik’îyê nekin
û li navê xwe neger’in, lê ji we her
yek bi milûktîyê hevalê xwe ser
xwer’a bigire. 4 T’enê li k’ara xwe
neger’in, lê bira her kes li k’ara
hevalê xwe jî biger’e. 5 Mesîh Îsa
ser çi nêt-fikirê bû, ji we her kes
jî usa bifikire:

6 Ew ku binyat’a Xweda Xwedê
bû,
pey wê yekê nek’et, ku bima
weke Xwedê,
7 lê Xwexa Xwe şkênand,
k’ete binyat’a xulamekî
û bû mîna meriva[f],
k’ete dilqê însên.
8 Ewî Xwe nimiz kir,
h’eta mirinêr’a jî qayl bû,
ew jî mirina ser xaçê[f].
9 Bona vê yekê Xwedê Ew hê
bilind kir
û navekî usa p’êşk’êşî[f] Wî kir,
ku ji h’emû nava bilindtir e,
10 wekî her çok li ber navê Îsa
bitewe,
heger li e’zmên be,
heger ser dinê be,
heger li dîyarê[f] mirîya be
11 û her zar-ziman îqrar[f] ke,
ku Îsa Mesîh Xudan e,
bona r’ûmeta Bav Xwedê*.

### Dinyayêda mîna steyrka biç’irûsin

12 Awa delalîyêd minno, çawa ez
nava weda bûm hûn t’imê guhdar
bûn, niha hê gelekî guhdar bin, gava
ne nava weda me. Bona xilazbû-
na xwe bi xof û tirs bixebitin, ku
wê yekê bigihînine sêrî, 13 çimkî
Xwedê Xwexa vê yekê dike dilê we,
ku hûn dixwazin û dikin, çawa li
Wî xweş tê.
14 Her tiştî bê bîntengî û bê şer’
û de’w bikin, 15 wekî hûn nava vî
nisilê[f] neheq û xalifîda[f] bêlek’e û
bêqusûr, zar’êd Xwedêye bêsûc
bin. Nava vanda şewq bidin mîna
r’onayêd e’zmana*, 16 çawa yêd
xebera jîyînê hilgirtî. Ezê hingê
R’oja hatina Mesîh r’ûspî bim, ku
badîhewa[f] nebezîme û badîhewa
nexebitîme. 17 Belê heger cî bê ku
xûna min ser wê bawerîya weda bê
r’êtinê, ya ku xizmetk’arîya weda
çawa qurban[f] Xwedêr’a tê dayînê,
ezê şa bim û t’evî eşqa we bim. 18 Usa
jî hûn şa bin, t’evî eşqa min bin.

* 2:11 Îşaya 45:23.
* 2:15 Qanûna Ducarî 32:5.

### Tîmot'êyo û Êpafrodîto

19 Gumana min ser Îsa Xudan
heye, ku ezê zûtirekê Tîmot'êyo ser
weda bişînim, ku dilê min r'ih'et
be, gava ez h'alê we pê bih'esim.
20 Ez dilê xwer'a yekî mîna wî
nabînim, ku bona h'alê we mîna
pêşewitîkî xem bixwe. 21 Çimkî
yêd mayîn her kes li pey k'ara
xwe k'etîye, ne ku ya Îsa Mesîh.
22 Lê hûn xwexa zanin ku ew ye-
kî çawayî cêr'ibandî[f] ye û xwexa
t'evî min Mizgînîdayînêr'a usa
xizmetî kir, çawa kur' bavêr'a.
23 Awa nêta min heye, ku ez ewî
zû bişînime cem we, gava ez haş
ji h'al-h'ewalê xwe hebim. 24 Û
ez Xudanda guman im, ku ezê
xwexa jî zûtirekê ser weda bêm.

25 Lê min usa r'ê têr'a dît, wekî ez
wî birayê me Êpafrodîto bişînime
cem we, yê ku t'evî min xebitî û
şer'ê xwe kir, k'îjan we şandibû ku
k'omek bida min. 26 Ewî jî gelekî
bîra we kirîye û ber xwe dik'eve,
wekî we bona nexweşîya wî bi-
hîstîye. 27 R'astî jî ew nexweş k'et,
çû ber derê mirinê. Lê Xwedê li
wî hate r'e'mê, ne ku t'enê li wî,
lê usa jî li min, wekî ser k'ederê
k'eder ser minda neyê. 28 Bona vê
yekê ez wî bi dil dişînim, wekî hûn
wî bibînin, dîsa şa bin û ez ber
xwe nek'evim. 29 Awa bona xatirê
navê Xudan ewî bi t'emamîya eşqa
dilê xwe qebûl kin. Qedirê yêd
mîna wî giran bigirin, 30 çimkî
ew bona şixulê Mesîh h'eta ber
derê mirinê jî çû û destê xwe ji
e'mirê xwe jî k'işand, wekî dewsa
wê xizmetk'arîya ku weyê minr'a
bikira ewî xwexa bikira.

### R'îya r'aste bona xilazbûnê

3 1 Heyneser xûşk-birayêd min,
bi Xudan şa bin! Ez aciz
nabim ku dîsa wan tişta wer'a
dinivîsim, lê ew bona bêxofîya we
ye. 2 H'evza xwe ji «se-kûç'ika»
bikin, h'evza xwe ji p'alêd xirab
bikin, h'evza xwe ji wan bikin,
yêd ku qalib dibir'in, sinet[f] dikin.
3 Çimkî sinetîya r'ast ya me ye, ku
bi R'uh'ê Xwedê em dih'ebînin*
û bi Mesîh Îsa difir'in. Gumana
me ne ser nav-nîşanêd qalib e, 4 lê
r'ast bêjim ez dikarim gumana
xwe bidime ser wan nav-nîşanêd
qalib. Heger yek difikire, ku gu-
mana wî ser qalib heye, ya min
hê zêde heye. 5 R'oja h'eyşta sinet
bûme, ji r'ik'inyata Îsraêl[f] im, ji
qebîla Binyamîn[f], îbranî[f] me û

* 3:3 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Em Xwedê bi R'uh' dih'ebînin».

kur’ê îbranîya, alîyê Qanûnêda
fêrisî[f]*, 6 min k’erbî xîretê ci-
vîna Xwedê dizêrand, hindava
wê r’astbûna ku ji Qanûnê tê ez
bêlek’e bûm*. 7 Lê çi ku k’ara
min bû, min bona Mesîh zîyan
h’esab kirîye. 8 Û serda jî ez her
tiştî zîyan h’esab dikim û himberî
vê yekê nakim, ku Xudanê xwe
Mesîh Îsa nas bikim, ku k’ara
ser k’ara ye! Bona xatirê Wî ez
ji her tiştî qetîyam û çawa gemar
h’esab dikim, wekî Mesîh qazinc
kim 9 û t’evî Wî bibime yek. Îdî
ev r’astîya[f] min, ne ku ji qanûn-
qedandina min tê, lê ji Xwedê
ye, ya ku h’îmê wê ji bawerîya
ser Mesîh e. 10 Ez dixwazim Wî
û qewata r’abûna Wîye ji mirinê
nas kim û t’evî cefayêd Wî bim,
bik’evime h’alê mirina Wî, 11 ku
bi awayîkî bikaribim bigihîjime
r’abûna mirîya.

**R’evîna berbi meremê xwe**

12 Ez nabêjim ku ez îdî gihîştime
meremê xwe yan jî îdî k’amil bû-
me, lê ez pey k’etime, ku wê xelatê
qazinc kim, bona k’îjanê Mesîh Îsa
ez qazinc kirime. 13 Xûşk-birano,
ez xwe h’esab nakim, ku min ew
yek qazinc kirîye, lê serî ew e,
ku ez tiştêd pişt xweva hiştî bîr
bikim, xwe bavêjime yêd pêşîya
xwe, 14 dice’dînim bigihîjime me-
remê xwe, wê lecxelata jorçûyînê,
awa gotî gazîya Xwedêye bi saya
Mesîh Îsa bistînim.

15 Awa ji me h’emûya, îdî k’î
«gihîştî» ye, gerekê aha bifikire.
Lê heger tiştekî din jî dilê weda
hebe, ewê yekê jî Xwedê wê ber
we veke. 16 Lê t’enê em gihîştine
çi derecê, anegorî wê yekê bijîn.

17 Ç’e’v bidine min xûşk-birano
û dîna xwe bidine wan, yêd ku
usa xwe xwey dikin, çawa ku me
bi r’abûn-r’ûniştina xwe nîşanî
we kirîye*. 18 Çimkî gelek jîyîna
xweda dijminêd xaçê Mesîh in,
bona k’îjana min gelek cara we-
r’a gotîye, niha jî bi girî dibêjim.
19 Axirîya wan undabûn e, xwe-
dêyê wan zikê wan e û kirêd wane
şermî jî r’ûmeta wan e. Ewana
t’enê ser tiştêd vê dinê difikirin.
20 Lê welatê me li e’zmana ye, ji
k’u em ç’e’vnihêr’îya Xilazkir[f],
Xudan Îsa Mesîh in. 21 Ewê qalibê
meye t’engezar biguhêze û bike

* 3:5 R’omayî 11:1; K’arêd Şandîya 23:6; 26:5.
* 3:6 K’arêd Şandîya 8:3; 22:4; 26:9-11.
* 3:17 Korint’î I, 4:16; 11:1.

mîna qalibê Xweyî xweyîr'ûmet,
bi wê qewata ku dikare her tiştî
bike bindestê Xwe.

### T'emîyêd axirîyê

4 1 Niha xûşk-birayêd mine
şîrin û h'eyran, hûn in şabûn
û k'ofîya[f] serê min delalno, yektî-
ya Xudanda aha qewîn bimînin.
2 Ez hîvî ji Eyodîyayê dikim
û hîvî ji Sintîxayê dikim, çawa
t'evî Xudan yekbûyî bira li hev
bên. 3 Belê ez hîvî ji te jî dikim
hevalbarê minî amin, tu jî alî wan
k'ulfeta[f] bike. Evana t'evî min
xebata Mizgînîdayînêda xûdan
r'êtine, usa jî t'evî Klêmês û he-
val-xebatêd mine mayîn, ku navêd
k'îjana k'itêba jîyînêda nivîsar in.
4 T'imê pê Xudan şa bin, dîsa
dibêjim t'imê şa bin! 5 Bira berbi-
hêrîya we h'emû merivava e'yan
be. Xudan nêzîk e*. 6 Bona t'u tiştî
xem nekin, lê xwestina we bira bi
dua-dirozga, r'azîbûnêva t'evayî,
Xwedêva e'yan be. 7 Û e'dilayîya
Xwedê ku ji her h'iş-aqilî derbaz-
tir e, wê dil û fikirêd we yektîya
Mesîh Îsada xwey ke.
8 Heyneser xûşk-birano, çi ku
bi r'astîyê ye, çi ku bi maqûltîyê
ye, çi ku bi heqîyê ye, çi ku bi
h'elalîyê ye, çi ku bi xweşîyê ye,
çi ku bi firasetîyê ye û her tiştêd
ku e'silî û layîqî qencgotinê ne,
ser van tişta bifikirin. 9 Hûn ji min
çi hîn bûn, we çi stand, çi bihîst
û çi dît wê yekê bikin û Xwedêyê
e'dilayîyê wê t'evî we be.

### R'azîbûna Pawlos

10 Ez bi saya Xudan gelekî şa
me, ku we pey haqas wextr'a ez
bîr anîm, bona min xem xwar.
Belê we dikir jî, lê mecal nedik'e-
te we. 11 Ne ku ez h'ewcê tiştekî
me ku vê yekê wer'a dibêjim. Ez
hîn bûme, ku h'emû h'alîda r'azî
bim. 12 T'unebûnê zanim, hebûnê
zanim, ez her alîyîda û her h'alîda
ser vê sur'ê vebûme û hîn bûme
ku r'azî bim, heger t'êr bim, he-
ger bir'çî, yan hebûnêda bim yan
jî t'unebûnêda. 13 Ez her tiştî bi
saya Wî dikarim, Yê ku qewatê
dide min.
14 Lê we qenc kir, ku tengasîya
minda k'omek da min. 15 Û belê
hûn jî zanin gelî fîlîpîya, ku ji
serê dannasînîya Mizgînîyêda
gava ez ji Mekedonyayê derk'e-
tim, t'u civînê t'evk'arîyêda destê

* 4:5 «Xudan nêzîk e» bi du cûr'a tê fe'mkirinê: «Hatina Xudan nêzîk e» yan jî: «Xudan nêzîkî me ye».

xwe dirêjî min nekir, pêştirî we.
**16** Çimkî carekê-duda ew tiştêd
minr’a kêrhatî we h’eta T’êsalonî-
kîyê jî şandin*. **17** Ez ne ku tiştekî
p’êşk’êş dixwazim, lê dixwazim
ku k’ar ser h’esabê weda zêde be.
**18** Min her tişt standîye û nava
hebûnêda me. Ew tiştêd ku we
bi destê Êpafrodîto minr’a şan-
dine ew besî min in. Ew dayîna
we bîneke xweş e, h’edîya[f] qebûl
û li Xwedê xweş e. **19** Û Xwedêyê
min wê h’emû kêmasîyêd we pê
wê xizna Xweye r’ûmete ji Mesîh
Îsa t’ijî ke. **20** Awa şikir ji Xwedê
û Bavê me, h’eta-h’etayê! Amîn[f].

### Silavêd axirîyê

**21** T’emamîya cime’ta Xwedêye
p’ara Mesîh Îsa silav kin. Ew bi-
rayêd ku t’evî min in li we silav
dikin. **22** T’emamîya cime’ta Xwedê
li we silav dike, îlahî ewêd ku ji
mala Qeyser[f] in.
**23** K’erema Xudan Îsa Mesîh
t’evî r’uh’ê we be*.

* 4:16 K’arêd Şandîya 17:1-9; Korint’î II, 11:9.
* 4:23 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «K’erema Xudanê me Îsa Mesîh t’evî we h’emûya be. Amîn».

# NE’MA PAWLOS KOLOSÎYAR’A

## Pêşgotin

Pawlos bi vê ne’mê berbir’î civîna[f] bajarê Kolosyayêda dibe. Kolosya nava Asya Biç’ûkda, bajarekî alîyê r’ohilata Efesê bû. H’îmê vê civînê r’ast e bi destê Pawlos nehatibû danînê, lê ji alîyê piştgirê wî Êpafrasê kolosîda. Lê Pawlos dîsa kiribû deynê stûyê xwe, wekî bona civîna Kolosyayê bêxem nîbe û ji Efesê heval-xebatêd xwe dişande wir, nava k’îjanada Êpafras jî bû (1:7; 4:12-13). Pawlos zanibû ku Kolosyayêda dersdarêd şaş hebûn ku cime’t hîn dikirin, wekî milyak’eta[f], xudantîya û h’ukumetîyêd jorin bih’ebînin (1:16; 2:18, 23). Ev dersdarêd şaş usa jî hîn dikirin, ku gerekê r’aw-r’izimêd[f] e’det xweyî kin, bêne sinetkirinê[f], h’eram[f] nexwin, r’ojêd h’esabe e’zîz xwey kin, ser vê yekêr’a derbaz nebin (2:6-23).

Meremê Pawlos ne’mêda ev e, ku r’îya r’ast nîşanî bawermenda ke û vê yekê bigihîne h’emûya, ku t’enê Îsa Mesîh xilazbûna[f] t’am dide, lê ew h’emû h’ebandin û bawerîyêd[f] mayîn bawermenda ji wê xilazbûnê dûr dixin. Xwedê bi destê Îsa Mesîh dinya e’firand û bi Wî jî merivayê[f] vediger’îne berbi Xwe. Îsa ser h’emû h’ukumetîyêd e’zmanar’a ye û t’enê Ew e serê civînê. T’enê yektîya Mesîhda gumana xilazbûna merivayîyê heye. Pey van şîretar’a, wekî ew haş ji xwe hebin û ji xalifandin û hînkirinêd şaşe ner’ast dûr bin, paşê p’ara ne’mêye xilazîyêda Pawlos derheqa jîyîna nûda dide k’ifşê, gerekê heleqetîya bawermendêd Mesîh hindava hevda çawa bin.

### Serecema fikira ne’mê

Pêşgotin (1:1-8)
Binyat’a Mesîh û kirêd Wî (1:9–2:19)
Mesîhda jîyîna nû (2:20–4:6)
Paşgotin (4:7-18)

### Silavkirin

1 [1] Ji Pawlosê bi e’mirê Xwedê
şandîyê[f] Mesîh Îsa û ji Tîmo-
t’êyoyê bira,
[2] cime’ta Xwedêr’a, wan xûşk-bi-
rayêd amine yektîya Mesîhda ku
Kolosyayêda dimînin:
De bira k’erem[f] û e’dilayîya
Xwedêyê Bavê[f] me* li we be.

### Dua û şikirdayîna Pawlos

[3] Em t’imê gava bona we dua
dikin, şikirîya xwe li Xwedêyê
Bavê Xudanê[f] xwe Îsa Mesîh
tînin, [4] çimkî me bona wê ba-
werîya[f] weye ser Mesîh Îsa û wê
h’izkirina weye hindava t’ema-
mîya cime’ta Xwedêda bihîstîye.
[5] Ev yek ji vê gumanê tê, ya ku
e’zmanada wer’a tê xweyîkiri-
nê, bona k’îjanê we bihîstîye,
gava pêşda xebera Mizgînîyêye
r’ast [6] gihîşte we. Û ew Mizgînî
t’emamîya dinyayêda digihîje û
ber dide, çawa nava weda jî ji wê
r’ojêda, gava we bihîst û k’erema[f]
Xwedê t’emamîya r’astîya wêva
nas kir. [7] Hûn vê yekê ji heval-
xulamê meyî h’izkirî Êpafras
hîn bûne, ku hindava meda*
berdestîkî Mesîhî[f] amin e. [8] Ewî
bona wê h’izkirina ku R’uh’ daye
we* mer’a got.
[9] Bona wê yekê jî ji wê r’ojêda
girtî, gava me bona we bihîst, me
dest ji dua û hîvîkirinê nek’işan-
dîye, wekî hûn zanebûna e’mirê
Xwedêda gihîştî bin, bi h’emû
serwaxtî[f] û zanebûna r’uh’anîva
t’ijî bin, [10] wekî hûn bikaribin
xwe usa xwey kin, çawa layîqî
Xudan e, her alîyava li Wî xweş
bên, her qencîkirinêda xweyîber
bin, bi zanebûna Xwedê bigihîjin.
[11] Bira hûn anegorî t’emamîya wê
qewata Wîye ku ji zorayîya Wîye
xweyîr’ûmet tê qewat bin, ku
hûn her tiştîda bi dûmika dirêj
sebir bikin. Bi eşq [12] şikirîya xwe
bidine Bavê*, ku hûn** layîqî vê
yekê kirine, wekî hûn P’adşatîya
r’onayêda t’evî cime’ta Wî bibine
xweyîp’ar. [13] Ewî em ji h’uku-
metîya te’rîstanîyê xilaz[f] kirin û
cî-guhastî P’adşatîya Kur’ê Xweyî

* 1:2 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Û Xudanê[f] me Îsa Mesîh».
* 1:7 Nav hinek destnivîsarada dewsa «hindava meda» «hindava weda» heye.
* 1:8 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «H’izkirina nava R’uh’da».
* 1:12 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Bav Xwedê».
** 1:12 Nav hinek destnivîsarada dewsa «hûn» «em» heye.

h'izkirî kirin, 14 pê k'îjanî* em aza bûn, awa gotî me baxşandina guna stand**.

**K'î ye Mesîh û şixulê Wî çi ye?**

15 Ew e sûretê Xwedêyê ku xuya nabe,
Ew Nixurîyê ser h'emû e'firînar'a*.
16 Çimkî bi destê Wî her tiştêd li e'rd û e'zmana e'firîne,
çi ku xuya dibin, çi ku xuya nabin,
heger k'ursî yan xudantî bin,
heger serwêrtî yan h'ukumetî bin,
her tişt bi destê Wî û bona Wî e'firîne.
17 Ew berî her tiştî hebû
û her tişt bi saya serê Wî cîyê xweda dimînin.
18 Ew e serê Bedenê, awa gotî serê civînê[f],
destpêbûna wê û nixurîyê ji nava mirîya*,
wekî her tiştîda Ew bibe Yê pêş.
19 Çimkî li Xwedê xweş hat, ku t'emamîya binyat'a xwedêtîyê nava Wîda be
20 û bi Wî her tiştî t'evî Xwe li hev bîne,
heger li ser e'rdê be, yan jî li e'zmana be*,
bi wê xûna Wîye ser xaçê[f] r'i-jîyayî e'dilayîyê bike.
21 Hûn jî ku wextekê ji dest fi-
kir û kirinêd xweye xirab, xerîb
û neyarêd Xwedê bûn, 22 lê niha
Ewî bi mirina Mesîhe bedenî hûn t'evî Xwe li hev anîn, wekî we li ber Xwe pîroz[f], bêlek'e û bêsûc bide sekinandinê. 23 Lê t'enê ge-
rekê hûn bawerîyêda h'îmgirtî qewîn bimînin û ji wê gumana Mizgînîyê nek'evin, ya ku we bihîst û wan h'emûyar'a, yêd ku bin p'er'ê e'zmênda dimînin hate dannasînkirinê. Û ez, Pawlos bûme berdestîyê wê.

* 1:14 Nav hinek destnivîsarêd paşwextîyêda aha ye: «Bi xûna Kur'ê Wî».
** 1:14 Efesî 1:7.
* 1:15 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Nixurîyê h'emû e'firîna ye». «Nixurî» tê fe'mkirinê, ku ew berî h'emû e'firîna hebûye û ser wanr'a ye. Ev be'sa heleqetîya Îsaye t'ek t'enêye t'evî Xwedê dike, ku ew ne yekî e'firî yan xuliqî ye, lê ev heleqetî çawa heleqetîya kur' û bavê ye. Awa gotî berî e'firandina dinê Kur' hebû. Bixûnin: Fîlîpî 2:6; Yûh'enna 17:5.
* 1:18 Efesî 1:22-23.
* 1:20 Efesî 2:16.

### Cefayêd Pawlose bona civîna Xwedê

24 Ez niha van cefayêd xweda,
k'îjana ku bona we dik'işînim,
şa me û wan tengasîyêd[f] Mesîhe
mayîn bi canîya xwe bona Be-
dena Wî, ya ku civîn[f] e, t'emam
dikim. 25 Ez wê civînêr'a bûme
berdestî, ev yek alîyê Xwedêda
çawa deyn k'ete stûyê min, wekî
gotina Xwedê t'emamîyê pêva
bigihînime we, 26 ew sur'a ku ji
dewr û qur'nada veşartî bû, lê niha
cime'ta Wîva e'yan bû. 27 Xwedê
xwest li ber cime'ta Xwe veke, ku
çi dewlemendtîke xweyîr'ûmet vê
sur'êda bona h'emû mileta heye.
Û ew sur' ev e, ku Mesîh nava
weda ye, awa gotî hûn gumana
wê yekê ne, ku p'ara r'ûmetê
bin. 28 Em Wî dannasîn dikin,
her kesî şîret dikin, her kesî bi
h'emû serwaxtîyê hîn dikin, wekî
her kesî yektîya Mesîhda gihîştî
li ber Xwedê bidine sekinandinê.
29 Bona wê yekê jî ez dixebitim û
anegorî wê qewata Wî şer'ê xwe
dikim, Ya ku nava minda bi zorayî
ya Xwe dike.

## 2

1 Ez dixwazim hûn zanibin ku
ez çi şer'î dikim bona we, yêd
Lawdikyayê û h'emûyêd ku r'û bi
r'û ez nedîtime*. 2 Ez aha dikim,
wekî dilşidîyayî bin, h'izkirinêda
bibin yek û bigihîjine t'emamîya
dewlemendtîya fe'mdarîyê. Hingê
ewê sur'a Xwedê nas kin, ku Mesîh
e. 3 Ew e k'ilîta h'emû xizna za-
nebûnê û serwaxtîya veşartî. 4 Ez
vê yekê dibêjim, wekî t'u kes we
bi zarê şîrin nexalifîne[f]. 5 R'ast e
ez bedena xweda ji we dûr im, lê
r'uh'ê xweda t'evî we me û ez şa
me ku p'ergalîya weye t'ifaq[f] û ew
bawerîya weye ser Mesîh şidîyayî
dibînim.

### Jîyîna yektîya Mesîhda

6 Awa we çawa Xudan Mesîh
Îsa qebûl kir, usa jî yektîya Wîda
bijîn, 7 r'aw[f] avîtî, ser Wî çêkirî û
bawerîyêda şidîyayî h'îmgirtî bin,
çawa hûn hatine hînkirinê. Û her
gav bi dilê r'azî şikirîyê bidine Wî.
8 Haş ji xwe hebin, nebe ku yek
bi serwaxtîya derewe p'ûç' dilê we
bike hêsîr. Ew ji e'detêd meriva[f]
û sixirêd[f] vê dinyayê* tên, ne ji
Mesîh. 9 Çimkî t'emamîya binyat'a
Xwedêtîyê nava Mesîhê bedenîda

* 2:1 E'yantî 1:11; 3:14.
* 2:8 Aha jî tê fe'mkirinê: «Şexsêd r'uh'anîye ku h'ukumî ser vê dinyayê dikin».

ye 10 û hûn jî yektîya Wîda gihîştî
ne, ku serê h’emû serwêrtîya û
h’ukumetîya ye.

11 Yektîya Wîda hûn bi sineta bê
dest ji alîyê Mesîhda dilê xweda
hatine sinetkirinê[f], ji binyat’a xweye
gunek’ar[f] hatine bir’înê. 12 Gava
hûn pê avê hatine nixumandinê[f],
t’evî Wî hatine definkirinê[f] û bi
wê nixumandinê jî hûn t’evî Wî ji
mirinê r’abûn, çimkî we bawerîya
xwe bi qewata Wî Xwedêyî anî, Yê
ku Mesîh ji mirinê r’akir*. 13 Û
hûn wextekê bi r’uh’anî nava ne-
heqîya û binyat’a xweye gunek’are
nesinetkirîda mirî bûn, lê Xwedê
hûn t’evî Mesîh sax kirin. Ewî
h’emû neheqîyêd me baxşandine
me* 14 û ew k’axaza deynêd meye
ku bi qeyde-qanûnî miqabilî me
hatibû nivîsarê r’esît kir, ji navê
hilda xaçva mix kir*. 15 Bi wî xaçî
Mesîh ç’ekêd serwêr û h’ukumetêd
te’rîstanîyê da danînê, ew çawa
hêsîr pey Xwe birin, nava k’oma
Xweye serk’etîda kirine sosret.

16 Awa guh nedine t’u kesî, yêd
ku bona pirsa xwarin, vexwarinê
yan jî bona pirsa cejina û cejinêd
hîva nû usa jî r’ojêd şemîya, we
lomek’ar[f] dikin*. 17 Ev h’emû sî-
ya wan tişta ne, yêd ku wê bên,
lê r’astî Mesîh e. 18 Nebe ku yek
destê we ji lecxelatê bike, yê ku
bi xwenimizkirina h’ilek’arî, mil-
yak’et[f]-h’ebandinê û bi gîrobûna
dîtinêd ber ç’e’va mijûl e. Yêd usa
bi fikirêd p’ûç’e merivayî p’işika
xweda diwerimin 19 û xwe îdî li
Sêrî nagirin, ku Mesîh e. Bi Wî
t’emamîya bedenê bi p’evgirêk û
sêvikava hevva girêdayî tê xwe-
yîkirinê û bi gîhandina Xwedê
digihîje, li gora xwestina Wî*.

20 Awa heger hûn t’evî Mesîh
mirine û ji sixirêd vê dinyayê aza
bûne, îdî hûn çima mîna berê pey
e’rf-e’detêd vê dinyayê diçin? Hûn
çima guh didine t’emîyêd aha?
Mesele: 21 «Nêzîk nebe, te’m neke,
lê nek’eve». 22 Ev h’emû mijûlî jî wê
p’ûç’ bin her’in, evana ji t’emî û
hînkirinêd meriva ne. 23 Fe’mdarî
ye ku ev e’rf-e’det çawa serwaxtî
xuya dibin, gava dikine stûyê xwe
ku milyak’eta bih’ebînin, xwe nimiz

* 2:12 R’omayî 6:4.
* 2:13 Efesî 2:1-5.
* 2:14 Efesî 2:15.
* 2:16 R’omayî 14:1-6.
* 2:19 Efesî 4:16.

kin û bedena xwe bidine cefê, lê ev
h’emû miqabilî binyat’a gunek’ar
t’u tiştî nakin.

### Jîyîna nû û jîyîna kevin

**3** 1 Awa ku hûn t’evî Mesîh ji
mirinê r’abûne, ku usa ye
li tiştêd jorin biger’in, wê dera
k’u Mesîh li milê Xwedêyî r’astê
r’ûniştî ye*. 2 Ser tiştêd jorin bifi-
kirin, ne ku ser tiştêd vê dinyayê.
3 Çimkî hûn mirine û e’mirê we
t’evî Mesîh cem Xwedê veşartî
ye. 4 Gava Mesîh, ku e’mirê we
ye xuya be, hûnê jî hingê t’evî Wî
bi r’ûmeta Wî xuya bin.

5 Awa xwestinêd dilê xweye vê
dinê bikujin: Bênamûsîyê, h’e-
ramîyê[f], temê xirab, dilhavijîya
xirab û timayê, ku p’ûtp’aristî[f]
ye. 6 Ev in sebeb ku xezeba Xwedê
wê ser wan merivêd ku ne gur’a[f]
Wîda ne bê. 7 We jî wextekê ew
tişt dikirin, gava we nava wan
kirêd xirabda dijît.

8 Lê niha hûn van h’emûya ji
xwe dûr xin: Hêrsê, berzeqîyê[f],
xirabîyê, tiştêd nebûyî û xeberêd
necayîz ji devê xwe. 9 Hevdur’a
derewa nekin, çimkî we merivê
kevin kirêd wîva ji ser xwe êxis-
tîye* 10 û ewî nû li xwe kirîye. Ew
merivê nû r’oj bi r’oj anegorî sûretê
E’firandarê xwe tê nûkirinê, wekî
Xwedê t’am nas ke*. 11 Îdî firqî ne
nava cihû[f] û necihûyada[f]* heye, ne
nava sinetkirî û nesinetkirîyada,
ne barbar û beyanîyada** û ne jî
xulam û azayada, lê serî Mesîh e û
Mesîh e nava her bawermendîda.

12 Awa çawa cime’ta Xwedêye bi-
jartîye pîroz û h’izkirî, dilşewatîyê,
qencîyê, milûktîyê, berbihêrîyê û
sebirê li xwe wergirin*. 13 Li hev
sebir kin û li hev bibaxşînin, heger
gazinê yekî li hindava yekîda hebe.
Çawa Xudan* baxşande we, hûn
jî usa bibaxşînine hev**. 14 Û ser
van h’emûyada h’izkirinê li xwe
kin, ya ku van h’emûya bi yektîya

---

* 3:1 Zebûr 110:1.
* 3:9 Efesî 4:22.
* 3:10 Efesî 4:24; Destpêbûn 1:26.
* 3:11 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Yûnan» ku li vir tê fe’mkirinê: «Necihû».
** 3:11 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Skûtî». Ew e’şîreke ç’e’vêd yûnanada here paşdamayî bû.
* 3:12-13 Efesî 4:2.
* 3:13 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Mesîh» yan jî «Xwedê bi destê Mesîh».
** 3:13 Efesî 4:32.

t’am hevva girêdide. 15 Bira e’dila-
yîya Mesîh serwêrtîyê nêt-fikirêd
we bike. Bona wê e’dilayîyê hûn
hatine gazîkirinê, ku bibine mîna
bedenekê. Û şêkirdar bin. 16 Bira
xebera Mesîh bi dewlemendtîya
xweva nava weda bimîne. Bi h’emû
serwaxtîyê li hev hîn kin û şîret
kin, zebûra[f] û her cûr’e stiranêd
r’uh’anî bi şikirdarî dilê xweda
bona Xwedê bistirên*. 17 Û çi jî
ku hûn bi xebera yan kira bikin,
her tiştî bi saya navê Xudan Îsa
bikin, bi destê Wî şikirîyê bidine
Bav Xwedê.

### T’emîyêd bona neferêd malda

18 K’ulfetno, gur’a mêrêd xwe-
da bin, çawa ku li yektîya Xudan
dik’eve*. 19 Mêrno, k’ulfetêd[f] xwe
h’iz bikin, dilê wan neêşînin*.
20 Zar’no, her tiştîda gur’a dê û
bavê xweda bin, çimkî ew yek li
Xudan xweş tê*. 21 Bavno, hêrsa
zar’êd xwe r’anekin, wekî ew ber
xwe nek’evin*.

22 Xulamno, her tiştîda gur’a
xweyîyêd xweye vê dinêda bin,
ne ku bi h’ilek’arîyê xwe bikine
dilê meriva ku bêne k’ifşê, lê bi
dilê sax û xofa Xudan xulamtîyê
bikin*. 23 Û çi jî bikin, bi dil û
can bikin, çawa bona Xudan, ne
ku bona meriva. 24 Zanibin ku
hûnê ji Xudan bêne xelatkirinê,
warê jorin bistînin. Çimkî Xudan
Mesîhr’a hûn xulamtîyê dikin.
25 Lê yê neheq wê weke neheqîya
xwe bistîne, çimkî li cem Xwedê
t’u firqî t’une*.

**4** 1 Xweyîno, xulamêd xwer’a he-
qîyê û r’astîyê bikin. Bizanibin
ku Xweyê we jî li e’zmên heye*.

### Xîreta duakirinê û serwaxtîya hindava nebawerada

2 Her gav xwe bidine dua, dua-
kirinêda h’işyar bimînin, şikirîya
xwe li Xwedê bînin. 3 Bona me jî
dua bikin, wekî Xwedê derî bona
xeberdanê li ber me veke, ku em

* 3:16-17 Efesî 5:19-20.
* 3:18 Efesî 5:22; Petrûs I, 3:1.
* 3:19 Efesî 5:25; Petrûs I, 3:7.
* 3:20 Efesî 6:1.
* 3:21 Efesî 6:4.
* 3:22-25 Efesî 6:5-8.
* 3:25 Qanûna Ducarî 10:17; Efesî 6:9.
* 4:1 Efesî 6:9.

sur’a Mesîh e’lam kin, bona k’î-
janê jî ez van qeydada me. 4 Dua
bikin, ku ez wê usa zelal bidime
e’yankirinê, çawa borcê min ew
gerekê bê gotinê.
5 Hindava nebawerada serwaxt
bin û dest bidine ber wext*. 6 Bira
xeberdana we t’imê me’rîfetî û
xwêkirî be û bizanibin ku çawa
cayîz e caba her kesî bidin.

## Silavêd axirîyê

7 Bona min Tixîko wê her tiş-
tî wer’a bêje. Ew birakî delal e,
berdestîkî amin û heval-xulamekî
yektîya Xudanda ye. 8 Ez bona wê
yekê wî ser weda dişînim, wekî
hûn haş ji me hebin û ew bi vê
yekê dil bide we. 9 Ez wî t’evî bi-
rayê meyî aminî delal Onîsîmo
dişînim, ku ew ji we ye jî. Ewana
wer’a wê bona her tiştêd ku li vir
diqewimin bêjin*.
10 Erîstarxoyê hevalê minî kelê-
da li we silav dike, usa jî Marqosê
pismamê Barnabas[f]. (Bona wî we
t’emî standîye. Gava bê cem we,
wî qebûl kin.) 11 Û Îsayê ku jêr’a
Yûsto jî dibêjin li we silav dike.
Evana t’enê ji alîyê bawermendêd
cihûyada[f] bona P’adşatîya[f] Xwedê
t’evî şixulê min in û bîna min bi
wan derk’etîye. 12 Silavê Êpafrasê
xulamê Mesîh Îsa jî li we hene, ku
ew yek ji we ye. Ew her gav bi dil
û can bona we dua dike, wekî hûn
gihîştî miqer’m sekinî bin, t’ema-
mîya e’mirê Xwedêda bawer bin.
13 Ez şe’de me, ku ew gelekî bona
we, usa jî bona yêd Lawdikyayê û
Hîrapolîsêda xîret dike. 14 Lûqayê
doxtorê delal li we silav dike, usa
jî Dîmas. 15 Silavê bidine xûşk-bi-
rayêd Lawdikyayê*, Nîmfasa xûşk
û civîna mala wêda**. 16 Gava eva
ne’ma nava weda bê xwendinê, usa
bikin ku civîna Lawdikyayêda jî
bê xwendinê û ne’ma lawdikîyar’a
şandî jî hûn bixûnin. 17 Û bêjine
Arxîpo: «Bona wî qulixê ku te ji
Xudan standîye, miqatî xwe bî,
ku bînî sêrî[f]»*.
18 Eva silava min Pawlos e, min
bi destê xwe nivîsî. Qeydêd min
bîr nekin!
K’erema Xwedê wer’a be.

* 4:5 Efesî 5:16.
* 4:9 Filîmon 1:10-12.
* 4:15-16 E’yantî 1:11; 3:14.
** 4:15 Nav hinek destnivîsarada dewsa «Nîmfasa xûşk û civîna mala wêda» «Nîmfasê (bira) û civîna mala wîda» heye.
* 4:17 Filîmon 1:2.

# NE’MA PAWLOSE PÊŞIN T’ÊSALONÎKÎYAR’A

## Pêşgotin

Bajarê T’êsalonîkê ew p’ayt’extê qeza Mekedonyayêye R’omayê bû. Pawlos li wir dima û r’êwîtîya xweye dudada h’îmê civînekê[f] jî avît, pey Fîlîpyayêr’a (K’arêd Şandîya 17:1). Lê pêr’a-pêr’a cihû[f] r’abûne miqabilî Pawlos, ç’e’vnebarî dikirin, ku şixulê dannasînkirina wî pêşda diçû (K’arêd Şandîya 17:5-9). Bona wê yekê Pawlos T’êsalonîkê hişt çû Beroyayê. Paşê çaxê ew derbazî Korint’ê bibû, ji Tîmot’êyoyê heval-xebatê xwe bona h’alê civîna T’êsalonîkê û r’abûn-r’ûniştina wan pê dih’ese. Ev bû me’nî, ku Pawlos ne’me t’êsalonîkîyar’a nivîsî, wekî dil bide ber wan û wan bişidîne. Hinek zaneyêd K’itêba[f] Pîroz hatine ser wê fikirê, ku eva ne’ma nava Peymana Nûda, nivîsara here pêşin e, sala 50-da.

Ne’mêda Pawlos r’azîbûna xwe Xwedê tîne bona h’izkirin û bawerîya[f] wan. Bîr tîne ku wî çawa r’ojêd xwe t’evî wan derbaz kirine û nexşê xwe nîşanî wan daye. Paşê caba gelek pirsêd wan dide, k’îjan derheqa mirin-r’abûn û hatina Îsada bûn: Mesele, heger bawermendek berî hatina Îsa bimire, wê bigihîje jîyîna[f] h’eta-h’etayê, yan na? Û k’engê Îsayê bê? Xwestina Pawlos ew e ku bawermend nava e’dilayî û silametîyêda bijîn, bi wê gumanê hîvîya hatina Mesîh bin.

Eva ne’ma niha jî caba pirsa wan dide, yêd ku ji mirinê xofê dik’işînin, çimkî ew dibêje ne h’ewce ye wext û sih’eta hatina Wîye duda bizanibin, lê belê çawa zar’êd r’onayê bawermend gerekê her gav bona hatina Wî hazir bin (5:1; 5:10).

### Serecema fikira ne’mê

Pêşgotin (1:1)
R’azîbûn û şikirdayîn (1:2–3:13)

Jîyîna ku li Xwedê xweş tê (4:1-12)
Hînkirin bona hatina Îsa (4:13–5:11)
T'emîyêd axirîyê (5:12-22)
Paşgotin (5:23-28)

## Silavkirin

**1** [1] Ji Pawlos, Sîlas* û Tîmot'êyo,
civîna[f] T'êsalonîkîyar'a,
ya ku p'ara Bav[f] Xwedê û Xudan[f]
Îsa Mesîh e:
De bira k'erem[f] û e'dilayî**
li we be.

## Jîyîn û bawerîya[f] t'êsalonîkîya

[2] Em her gav bona we h'emûya
r'azîbûna xwe didine Xwedê, nava
duayêd xweda t'imê we bîr tînin.
[3] Em kirêd bawerîya[f] we, xebata
weye ji h'izkirinê û sebira wê
gumana weye ser Xudanê[f] me Îsa
Mesîh tînine bîra xwe li ber Xwedê,
Bavê me. [4] Em zanin xûşk-birano,
ku hûn Xwedêda h'izkirî û bijartî
ne, [5] çimkî Mizgînîdayîna me ne
ku t'enê bi xeberê wer'a hate dayî-
nê, lê usa jî bi qewatê, bi R'uh'ê[f]
Pîroz û bê şikîyê. Hûn zanin em
bona we nava weda çawa bûne.
[6] Û we jî ç'e'v da me û Xudan,
nava gelek tengasîyada[f] xeber
qebûl kir, bi eşqa R'uh'ê Pîroz
şa bûn*. [7] Bi vî awayî hûn bona
h'emû bawermendêd Mekedonyayê
û Axayayê bûne nexşek. [8] Çimkî
ew xebera derheqa Xudanda ji we
derk'et bela bû, ne ku t'enê nava
Mekedonyayê û Axayayêda, lê
belê bona wê bawerîya weye ser
Xwedê, her dera bela bûye, usa
ku îdî ne h'ewce ye ku em tiştekî
serda zêde kin. [9] Çimkî ewana
bona me dibêjin, ku we çawa em
qebûl kirine û çawa hûn ji p'ûta li
Xwedê veger'îyane, ku xulamtîyê
Xwedêyê sax û r'astr'a bikin [10] û ji
e'zmana hîvîya hatina Kur'ê Wî
bin, k'îjan ku Wî ji nava mirîya
r'akir, Îsayê ku me ji xezeba tê
xilaz[f] dike.

---

* 1:1 Bi yûnanî «Sîlvano» nivîsar e, ku cûr'ekî navê «Sîlas» e.

** 1:1 Nav destnivîsarêd paşwextîyêda ev jî heye: «E'dilayîya Bav Xwedêye me û Xudan Îsa Mesîh».

* 1:6 K'arêd Şandîya 17:5-9.

## K'arê Pawlos li T'êsalonîkêda

**2** 1 Hûn xwexa jî zanin xûşk-bira-
no, ku em badîhewa[f] nehatine
cem we. 2 Me pêşîyê Fîlîpyayêda
cefa k'işandibû û hatibûne r'ezîl-
kirinê, çawa hûn zanin, paşê me
bi qewata Xwedêyê xwe dîsa turuş
kir, nava wê miqabilîya giranda
Mizgînîya Xwedê wer'a bêjin*. 3 Vê
hîvîkirina meda ne tiştekî xêlif
heye, ne h'eramî[f] û ne jî fêlbazî.
4 Lê çawa Xwedê em layîqî vê yekê
kirin û Mizgînîdayîn sparte[f] me,
em usa xeber didin. Em usa nakin
ku li meriva[f] xweş bên, lê li Xwedê,
Yê ku dilê me e'nene dike. 5 Me
gotinêd xweda h'ilek'arî nekirin,
çawa hûn zanin, ne jî pey timaya
t'erkelipaskirî* k'etin. Xwedê şe'de
ye! 6 Ne jî em navê xwe ger'îyan, ne
nava weda, ne nava yêd mayînda,
7 belê me dikaribû çawa şandîyêd[f]
Mesîh ser we bibûna bargiranî. Lê
belê em nava weda r'ûnerm bûne,
çawa kevanîk ku zar'êd xwer'a
dir'icife. 8 Usa jî dilê me ser we
dişewitî, h'eta ku me dixwest ne
ku t'enê Mizgînîya Xwedê bida
we, lê e'mirê xwe jî, çimkî hûn
bibûne delalîyêd me. 9 Ew xebat
û cefê me tê bîra we xûşk-bira-
no? Em şev û r'oj dixebitîn, ku
ser we t'u kesî nebine bargiranî,
gava me Mizgînîya Xwedê wer'a
dannasîn kir.

10 Hûn xwexa şe'de ne, usa jî
Xwedê, ku em t'evî we bawer-
menda çawa h'elal, r'ast û bêqu-
sûr r'abûn-r'ûniştin. 11 Hûn p'ak
zanin em hindava we her kesîda
usa bûne, çawa bav hindava za-
r'êd xweda. 12 Me dil dida we, li
ber dilê weda dihatin û lava ji we
dikir, ku hûn layîqî Wî Xwedêyî
bimeşin, Yê ku hûn gazî P'adşatî
û r'ûmeta Xwe kirine.

13 Û bona vê yekê jî em her gav
r'azîbûnê didine Xwedê: Gava we
ji me xebera Xwedê bihîst, we ne
ku çawa xebera merivayê, lê çawa
xebera Xwedê qebûl kir, r'ast jî
usa ye, ku nava we bawermen-
dada Ya xwe dike. 14 Çimkî hûn
jî xûşk-birano, k'etine h'alê wan
civînêd Xwedêye p'ara Mesîh
Îsa, ku li Cihûstanê[f] ne, we jî
xût ew cefa destê miletê xweda
k'işandin, çawa wan jî destê wan
cihûyada[f]*, 15 yêd ku hin Xudan

---

* 2:2 K'arêd Şandîya 16:19-24; 17:1-9.
* 2:5 Bi gotineke din: «Kiraskirî, veşartî».
* 2:14 K'arêd Şandîya 17:5.

Îsa, hin jî p'êxember kuştin û em
jî zêrandin. Evana li Xwedê xweş
nayên û miqabilî dinê-e'lamê ne!
16 Vana dikir, wekî em necihûyar'a[f]
xeber nedin, ku ew xilaz[f] bin. Bi
vê yekê her gav k'asa xweye guna
dadigirtin û heyneser xezeb anîne
serê xwe.

### Pawlos h'eyra t'êsalonîkîyada bû

17 Lê em xûşk-birano, r'ast e
demeke kin r'û bi r'û ji hev xe-
rîb k'etin, (lê ne bi dila), em hê
k'etine demana dîtina r'ûyê we.
18 Me xwest em bihatana cem we,
min Pawlos xwexa jî xwest çend
cara bêm, lê mîrêcin[f] r'ê neda
me. 19 Belê k'î ye gumana me,
yan jî şabûn, yan ew k'ofîya[f] em
pê difir'in, ber Xudanê me Îsa,
wî zemanê hatina Wîda, heger ne
hûn? 20 R'ast hûn in ew r'ûspîtî û
şabûna me.

## 3

1 Heyneser, me îdî nikaribû
sebir bikira. Em şêwirîn, ku
em t'enê bimînine At'înayê* 2 û
Tîmot'êyoyê birayê me, yê ku
t'evî me bona Xwedê*, Mizgînîya
Mesîhda dixebite, ser weda bişînin,
ku bawerîya we qewîn ke û dil bide
we, 3 wekî van tengasîyada t'u kes
ji we nelik'ume. Çimkî hûn xwexa
zanin ku ev yekana bona me ne.
4 Belê gava em cem we bûn, me
hê hingêda wer'a digot, ku emê
r'astî tengasîya bên û usa jî bû,
çawa hûn zanin. 5 Bona vê yekê
min îdî sebir nekir, Tîmot'êyo
şand, wekî ez haş ji bawerîya we
hebim, ku nebe Cêr'ibandkir hûn
cêr'ibandibin[f] û cefê me deya her'e.
6 Lê niha Tîmot'êyo ji cem
we ser meda veger'îya û mizgî-
nîya bawerî û h'izkirina we da
me. Wî got, ku we em xweş bîra
xweda xwey kirine û h'eyra meda
ne, çawa em jî ya weda*. 7 Awa
xûşk-birano, nava h'emû te'lî û
tengîyêd meda bi eşqî wê bawe-
rîya we bîn hate ber me, 8 çimkî
gava hûn r'îya Xudanda miqer'm
dimînin, bîn jî tê ber me. 9 Em çi
r'azîbûnê dikarin bidine Xwedê
bona we û wan h'emû şabûna, ku

* 3:1 K'arêd Şandîya 17:15.
* 3:2 Aha jî tê fe'mkirinê: «Heval-xebatê Xwedê». Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Qulixk'ar û heval-xebatê Xwedê» û nav hinek destnivîsarêd paş-wextîyêda aha ye: «Qulixk'arê Xwedê û heval-xebatê me».
* 3:6 K'arêd Şandîya 18:5.

em bona we li ber Xwedêyê xwe şa dibin? 10 Em şev û r'oj bi dil û can r'eca dikin, ku r'ûyê we bibînin û kêmasîya bawerîya we t'ijî kin. 11 De bira Xwedê, Bavê me xwexa û Xudanê me Îsa r'îya me r'ast ke, em bêne cem we. 12 Bira Xudan h'izkirina we hindava hev û h'emûyêd mayînda bigihîne û zêde ke, çawa ya me jî hindava weda heye. 13 De bira Ew dilê we bişidîne, wekî hûn pîrozîyêda[f] bêqusûr bin, li ber Xwedê Bavê me, wextê hatina Xudanê me Îsa, h'emû pîrozêd Xweva t'evayî.

### Jîyîna ku Xwedê xweş tê

**4** 1 Heyneser xûşk-birano, em bi navê Xudan Îsa hîvî û r'eca ji we dikin, ku hûn çawa ji me hîn bûn usa bimeşin, ku li Xwedê xweş bên, çawa diçin jî û wê yekêda hê pêşda her'in. 2 Çimkî hûn zanin me bi saya Xudan Îsa çi t'emî dane we. 3 Xwestina Xwedê ew e, ku hûn h'elal bin, ji qavîyê[f] dûr bin. 4 Bira ji we her kes jî zanibe qalibê xwe h'elal û bi namûsî xwey ke*, 5 ne bi xwestina temê xirab, mîna p'ûtp'arista[f], yêd ku Xwedê nas nakin. 6 Bira nebe ku yek wê yekêda ji e'siltîyê derê û namûsa xûşk-birar'a bilîze. Xudanê bona van h'emû tişta h'eyfê ji meriva hilde, çawa me ev yek pêşda wer'a got û bi me'rîfetî t'emî li we kir. 7 Çimkî Xwedê gazî me li h'eramîyê nekirîye, lê li h'elalîyê. 8 Awa k'î vê t'emîya h'elalîyê t'exsîr dike ew mêriv t'exsîr nake, lê Xwedê, Yê ku R'uh'ê Xweyî Pîroz jî dide we.

9 Lê bona h'izkirina hindava xûşk-birada, tiştekî me t'une wer'a binivîsin, çimkî hûn xwexa ji Xwedê hîn bûne, ku hev h'iz bikin. 10 Û hûn îdî wê h'izkirinê hindava h'emû xûşk-birayêd t'emamîya Mekedonyayêda didine k'ifşê. Lê em hîvî ji we dikin xûşk-birano, ku hûn wê yekêda hê pêşda her'in. 11 Bikin ku hûn giran-seqir'î bijîn û ji we her kes şixulê xweva mijûl be û bi destê xwe bixebite, çawa me t'emî li we kir, 12 wekî p'ergalîya we t'evî yêd derva me'rîfetî be û hûn h'ewcê tiştekî nebin.

### Hatina Xudan û r'abûna mirîya

13 Xûşk-birano, em dixwazin ku hûn derheqa mirîyada zanibin,

* 4:4 Aha jî tê fe'mkirinê: «Bira ji we her kes zanibe çawa h'elal û bi namûsî t'evî jina xwe bijî».

wekî ber xwe nek'evin, mîna ewêd bê guman. **14** Awa heger em bawer dikin, ku Îsa mir û ji mirinê r'abû, usa jî Xwedê wê mirîyêd ser bawerîya Îsa t'evî Wî veger'îne. **15** Em vê yekê bi gotina Xudan wer'a dibêjin: Em ku h'eta hatina Xudan bijîn sax bimînin, t'u car pêşîya mirîya nak'evin*. **16** Xudanê xwexa bi e'lametîke fermanî, bi dengê serekmilyak'et[f] û lêxistina bor'îya Xwedê ji e'zmên bê xwarê û ew mirîyêd ku bawerîya xwe Mesîh anîbûn, wê pêşîyê ji mirinê r'abin, **17** paşê, em ku sax mane, t'evî wan e'wrava bêne r'ahiştinê, hewêda r'astî Xudan bên û bi vî awayî emê h'eta-h'etayê t'evî Xudan bin. **18** Awa bi van xebera ber dilê hevda werin.

### Hatina Xudanda hazir bin

**5** **1** Lê bona wext û zemana xûşk-birano, ne h'ewce ye em tiştekî wer'a binivîsin, **2** çimkî hûn xwexa p'ak zanin ku R'oja[f] Xudan wê mîna dizê şevê bê*. **3** Gava bêjin: «Dinê seqir'î û bêxofî ye», hingê xezebê nişkêva ser wanda bê, mîna êşa k'ulfeta[f] h'emle û wê nikaribin qet jê xilaz bin. **4** Lê hûn xûşk-birano, te'rîyêda nînin ku ew R'oj mîna dizekî ser weda bigire. **5** Hûn h'emû jî zar'êd r'onayîyê ne û zar'êd r'ojê ne. Em ne yêd şevê ne, ne jî yêd te'rîyê ne. **6** Awa em xewêda nemînin mîna yêd mayîn, lê h'işyar û serxwe bin. **7** Çimkî ewêd ku r'adizên, şevê r'adizên û ewêd ku serxweş dibin, şevê serxweş dibin. **8** Lê em ku yêd r'ojê ne, gerekê serxwe bin: Zirih'a bawerîyê û h'izkirinê li xwe wergirin, k'umzirih'ê gumana xilazbûnê jî bidine serê xwe*. **9** Xwedê em bona xezebê k'ifş nekirine, lê wekî xilazbûnê bistînin, bi destê Xudanê me Îsa Mesîh. **10** Ew bona me mir, wekî em heger sax bin yan mirî bin, t'evî Wî bijîn. **11** Bona vê yekê dil bidine hev û alîk'arîya hevdu bikin, çawa hûn dikin jî.

### T'emî û silavêd axirîyê

**12** Em hîvî ji we dikin xûşk-birano, qedirê wan bigirin, yêd ku nava weda dixebitin, jîyîna xwedênasîyêda se'vîtîyê li we dikin û we şîret dikin. **13** Qedirê

---

* 4:15-17 Korint'î I, 15:51-52.
* 5:2 Metta 24:43; Lûqa 12:39; Petrûs II, 3:10.
* 5:8 Îşaya 59:17; Efesî 6:13-17.

wana bi h'izkirinê hê bilind bi-
girin bona şixulê wan. Hevr'a
t'ifaq[f] bin. 14 Em hîvî ji we dikin
xûşk-birano,

yêd bêp'ergale bêxîret şîret kin,
dil bidine ber tirsoneka,
kêrî k'etîya werin,
hindava h'emûyada sebira we
hebe.

15 Haş ji xwe hebin, nebe ku yek
ji ber xirabîyêva xirabîyê bike, lê
her gav ser nêta qencîyê bin, hin
bona hev, hin jî bona h'emûya.

16 Her t'im şa bin,
17 her gav dua bikin,
18 her tiştîda r'azîbûnê bidin,
çimkî ev e xwestina Xwedê
bi saya Mesîh Îsa bona we.
19 R'uh'ê Pîroz netemirînin.
20 P'êxembertîya[f] bêr'ûmet nekin.
21 Her tiştî bicêr'ibînin, tiştêd
qenc qewîn bigirin.
22 Ji her cûr'e xirabîyê dûr k'evin.

23 De bira Xwedêyê ku e'dilayîyê
dide, Xwexa we lap buhurtî-jibare
ke, t'emamîya r'uh', nifûs û qa-
libê we bêqusûr xwey ke, h'eta
hatina Xudanê me Îsa Mesîh.
24 Amin e Ewî ku gazî we dike,
wê mîyaser ke jî.

25 Xûşk-birano, bona me jî
dua bikin. 26 Silavê bidine h'emû
xûşk-bira, bi r'amûsana şîrê h'elal.
27 Ez li ber Xudan dikime deynê
stûyê we, ku hûn vê ne'mê ber
h'emû xûşk-bira bixûnin.

28 K'erema Xudanê me Îsa Mesîh
wer'a be.

# NE’MA PAWLOSE DUDA T’ÊSALONÎKÎYAR’A

## Pêşgotin

Nava civîna[f] bawermendêd T’êsalonîkêda derheqa hatina Mesîhe dudada deng-be’sêd cûr’e-cûr’e pêşda dihatin û ew t’evîhev dikirin. Pawlos ne’ma xweye dudada ser pirsa wan disekine, yêd ku hîn dikirin ku hatina Mesîh îdî bûye jî. Şandî[f] wan tîne ser r’astîyê, şirovedike ku pêşîya hatina Mesîh gerekê neheqî û xirabî bigihîjine wê dereca xirabîyêye here bilind, bi r’êberîya wî Merivê Neheqîyê. Ewê hingê k’ifş be û miqabilî Mesîh r’abe (2:1-12). Pawlos ser wan pirsêd ferz disekine, ku xwendevan nava bawerîya[f] xweda r’ast û h’îmgirtî bisekinin, zêrandin, cefa û de’w-doza nenihêr’in (1:4, 6-7), xwer’anedîtî û bêp’ergale bêxîret nîbin û bi xûdana xwe bijîn (3:6-12), çawa ku xwexa dike, nava qencîkirinêda bin (3:13-15). Awa gotî bawerîyê nekin me’nî, ku ji wan cabdarîya bir’evin, k’îjan ku Xwedê dane bawermenda, bona jîyîna xwedênasîyêye her r’oj.

### Serecema fikira ne’mê

Pêşgotin (1:1-2)
R’azîbûn û pesindayîn (1:3-12)
Hînkirin bona hatina Îsa (2:1-17)
Şîretêd bona bawermenda (3:1-15)
Paşgotin (3:16-18)

### Silavkirin

1 [1] Ji Pawlos, Sîlas* û Tîmot'êyo,
civîna T'êsalonîkîyar'a, ya
ku p'ara Bavê[f] me Xwedê û Xudan[f]
Îsa Mesîh e:
[2] De bira k'erem[f] û e'dilayîya
Xwedê, Bavê me û Xudan Îsa
Mesîh li we be.

### Hatina Xudan Îsaye duda û R'oja[f] Axretê

[3] Em deyndar in, ku her gav
bona we r'azîbûnê bidine Xwedê
xûşk-birano û ev yek heq e jî,
çimkî bawerîya[f] we r'ind digihî-
je û h'izkirina we hindava hevda
zêde dibe. [4] Lema em xwexa jî
nava civînêd Xwedêda pê we di-
fir'in, bona sebir û bawerîya we,
çimkî hûn wan h'emû zêrandin
û tengasîya[f] dik'işînin, yêd ku
têne serê we. [5] Ev yek îzbat dike,
ku dîwana Xwedê r'ast e. Û bi
vî awayî hûnê hêjayî P'adşatîya[f]
Xwedê bin, bona k'îjanê jî hûn
wan te'lî-tengîya dibînin. [6] Belê
ev e heqîya Xwedê: Yêd tengasîyê
didine we, Xwedê jî wê wan bide
tengasîyê [7] û yêd ji we tengasîyêda
ne, t'evî me bide hêsakirinê. Evê
aha be, gava Xudan Îsa t'evî mil-
yak'etêd[f] Xweye zor ji e'zmênva bi
k'ûra êgir xuya be, [8] wekî h'eyfê ji
wan hilde, yêd ku naxwazin Xwedê
nas kin û gur'a[f] Mizgînîya Xudanê
me Îsa nakin. [9] Ewê bela xwe ji
wêranbûna h'eta-h'etayê bibînin,
ji h'izûra Xudan û r'ûmeta qewata
Wî bêne avîtinê, [10] gava wê R'ojê
Ew bê, wekî nava cime'ta Xweda
bê pesindayînê û h'emû bawer-
mend wê h'eyr-h'ujmek'ar bin.
Hûnê jî nava wanda bin, çimkî
we bawerîya xwe şe'detîya me anî.
[11] Bona vê yekê em her gav bona
we dua dikin, ku Xwedêyê me,
we hêjayî wê gazîyê ke û h'emû
nêt-meremêd weye qenc û kirinêd
weye ji bawerîyê bi qewatê bîne
sêrî[f]. [12] Bi vî awayî wê pesinê navê
Xudanê me Îsa li nava weda bê
dayînê û hûnê jî nava Wîda bê-
ne pesindayînê, li gora k'erema[f]
Xwedêyê me û Xudan Îsa Mesîh.

### K'ifşbûna Merivê Neheqîyê û hatina Xudan Îsa Mesîh

2 [1] Em hîvî ji we dikin xûşk-bi-
rano, bona hatina Xudanê me
Îsa Mesîh û t'opbûna meye cem
Wî*, [2] hûn fikirê xweda zû şaş

* 1:1 Bi yûnanî «Sîlvano» nivîsar e, ku cûr'ekî navê «Sîlas» e.
* 2:1 T'êsalonîkî I, 4:15-17.

nebin û xwe unda nekin, ne pê
p'êxembertîyê[f], ne pê gotinê, ne
jî pê ne'ma yançîye[f] me nivîsîbe:
«Va ye R'oja Xudan îdî hatîye»*.
3 Bira t'u kes we t'u tiştîva nexa-
pîne, çimkî ew R'oj nayê, h'eta
ku r'aberîbûn pêşda neyê û ew
Merivê Neheqîyêyî p'ara ce'nimê[f]
k'ifş nebe. 4 Ewê miqabilî her tiştêd
ku xwedê têne h'esabê yan têne
h'ebandinê bisekine û xwe ser her
tiştîr'a bigire, h'eta ku p'aristgeha[f]
Xwedêda jî wê r'ûnê û e'lam ke,
ku xwexa Xwedê ye*.

5 Gelo nayê bîra we, gava ezî
hê cem we bûm, min ev tiştana
wer'a digotin? 6 Û hûn zanin ku
niha çi nahêle ew xuya be, we-
kî ew wextê k'ifşkirîda xuya be.
7 Çimkî Sur'a Neheqîyê îdî ya xwe
dike, lê ewê ku niha nahêle, wê
nehêle h'eta ku xwexa ji navê bê
hildanê. 8 Û paşê Ewê Neheqîyê
wê k'ifş be, ku Xudan Îsayê bi
hulma devê Xwe wî unda ke û bi
xuyabûna şewqa Xweva wî k'uta
ke*. 9 Hatina Yê Neheqîyê wê bi
qewata mîrêcin[f] be, h'eta h'unurê
wî hebe wê nîşan û k'eremetêd
derew bike* 10 û yêd ku unda dibin
bi her cûr'e neheqîya bixapîne.
Ewana unda dibin, çimkî wana
r'astî h'iz nekir û qebûl nekir ku
xilaz bin. 11 Lema jî Xwedê xali-
fandineke zor ser wanda dişîne, ku
ew derewîyê bawer bikin, 12 wekî
dîwana wan her kesî bibe, yêd ku
r'astî bawer nekirine, lê k'êfa wan
neheqîyêr'a hat.

### Xwedê bona xilazbûnê gazî we kirîye

13 Lê em gerekê her t'im bona
we ji Xwedê r'azî bin, xûşk-birayêd
ji alîyê Xudanda h'izkirî. Çimkî
Xwedê serê-sêrîda hûn bijartin,
wekî bi R'uh' bêne buhurtî-ji-
barekirinê*, r'astîyê bawer bikin
û xilaz bin. 14 Wê yekêr'a Ewî bi
Mizgînîdayîna me gazî we kir, ku
bi vî awayî hûn r'ûmeta Xudanê
me Îsa Mesîh bistînin. 15 Awa
xûşk-birano, nig bidin e'rdê û wan
r'aw-r'izima[f] qewîn bigirin, yêd

* 2:2 Aha jî tê fe'mkirinê: «Yançîye[f] me bi r'uh'ê p'êxembertîyê yan deva yan jî bi ne'ma gotibe: ‹Va ye R'oja Xudan îdî hatîye...›»
* 2:4 Hezekîyêl 28:2; Danîyêl 11:36.
* 2:8 Îşaya 11:4.
* 2:9 Metta 24:24.
* 2:13 Aha jî tê fe'mkirinê: «Çimkî Xwedê hûn bijartin, wekî pêşîyê hûn bi R'uh' bêne buhurtî-jibarekirinê».

ku hûn hîn bûne, heger bi goti-
nêd me be, yan bi ne'mêd me be.
16 De Xudanê me Îsa Mesîh
Xwexa û Bavê me Xwedê, Yê ku
em h'iz kirin û bi k'eremê dilda-
yîneke h'eta-h'etayê û gumaneke
qenc da me, 17 bira dil bide we
û we nava h'emû kira û gotinêd
qencda bişidîne.

### Bona me dua bikin

3 1 Heyneser xûşk-birano, bona
me dua bikin, wekî xebera
Xudan zû pêşda her'e û bê pe-
sindayînê, çawa nava weda bû.
2 Dua bikin, wekî em ji merivêd[f]
neheq û xirab xilaz bin, çimkî
her kes Mizgînîyêda amin nîne.
3 Lê Xudan Xwexa amin e, wê we
bişidîne û ji yê Xirab xwey ke.
4 Em bi saya Xudan weda guman
in, ku me çi t'emî dane we, hûn
diqedînin û hûnê biqedînin jî.
5 De bira Xudan mêla we bide ser
h'izkirina Xwedê û sebira Mesîh.

### Bona yêd bêp'ergale bêxîret

6 Em t'emî li we dikin xûşk-bira-
no, bi navê Xudanê xwe Îsa Mesîh,
ku hûn xwe ji her xûşk-birayê
bêp'ergale bêxîret dûr bigirin, yêd
ku wan r'aw-r'izimêd me dane we
naqedînin. 7 Hûn xwexa zanin ku
gerekê hûn ç'e'v bidine me, çimkî
em nava weda bêp'ergal-bêxîret
nîbûne, 8 ne jî nanê t'u kesî bê heq
xwarîye, lê bi xûdana e'nîya xwe
şev û r'oj dixebitîn, diçerçirîn, wekî
ser we t'u kesî nebine bargiranî.
9 Ne ku îzina me t'unebû, lê me
nexşê xwe nîşanî we kir, ku hûn
ç'e'v bidine me. 10 Çimkî gava em
hê cem we bûn jî, me ev yek wer'a
digot: «K'î naxwaze bixebite, bira
nexwe jî». 11 Belê em dibihên ku
nava weda hinek bêp'ergal-bêxîret
dijîn, ne şixulk'arê xwe ne, lê t'evî
şixulê xelqê dibin. 12 Em bi navê
Xudan Îsa Mesîh t'emî û hîvî ji yêd
usa dikin, ku bi me'rîfetî bixebitin
û nanê xwe bixwin.
13 Lê hûn xûşk-birano, ji qen-
cîkirinê newestin. 14 Heger yek
guhdarîya gotinêd meye vê ne'mêda
neke, wî r'aç'e'v kin û hevaltîyê
wîr'a nekin, ku şerm bike. 15 Lê
nebe ku bi ç'e'vê xirab li wî bi-
nihêr'in, lê mîna bira şîret kin.

### Dua û silavêd axirîyê

16 De bira Xudanê e'dilayîyê
xwexa, her gav, her alîyîva e'di-
layîyê bide we. Xudan t'evî we
h'emûya be. 17 Eva silava bi destê
min Pawlos e, çawa nîşana h'emû
ne'mêd min. Ez aha dinivîsim.
18 K'erema Xudanê me Îsa Mesîh
t'evî we h'emûya be.

# NE’MA PAWLOSE PÊŞIN TÎMOT’ÊYOR’A

## Pêşgotin

Tîmot’êyo xortekî bawermendî ji Asya Biç’ûk bû, dîya wî cihû[f] bû, lê bavê wî yûnan[f] (K’arêd Şandîya 16:1). Pawlos dema şandîtîya[f] xweye dudada bajarê Lîstrayêda r’astî Tîmot’êyo tê. Peyr’a Tîmot’êyo dibe heval-xebatê wîyî pêş, heval-xebatekî wîyî gelekî nêzîk, nava r’êwîtîya wîda. Bona wê yekê navê wî gelek cara K’arêd Şandîyada û h’emû ne’mê Pawlosda tê bîranînê (R’omayî 16:21; Korint’î I, 4:17; Fîlîpî 1:1; T’êsalonîkî I, 1:1; 3:2, 5, 6; T’êsalonîkî II, 1:1 û yêd mayîn). Pawlos gelek cara bona civînêd[f] nû aminîya xwe wî anî, nava cûr’e-cûr’e pirsêd ze’mete giranda.

Ne’ma Pawlose pêşinda, ya ku Tîmot’êyor’a dişîne, sê xemê wî hene:
**1.** Bona hînkirina şaşe nava civînêda dibêje, wekî miqatî xwe bin û îlahî[f] ji wê hînkirina şaşe ku gihîştîye civîna Efesê (1:3). Ev hînkirina ji fe’mê cihûtîyê û p’ûtp’aristîyê[f] dihat û ser h’îmê wê bawerîyê[f] bû ku digotin: «Eva dinya berç’e’vaye t’ebîyetî xirab e». Îdî li gora fe’mkirina wan, meriv[f] t’enê dikaribû pê zanebûn û serwaxtîke[f] sur’e veşartî xilaz bûya, usa jî gerekê xwe ji xwarin-vexwarina û h’al-zewacê dûr bigirtana. Ev hînkirin îro bi navê «Ginostîk» tê gotinê (bi yûnanî «GNOSIS» tê fe’mkirin «zanebûn») û nava sedsalîyêd pêşinda, îlahî sedsalîya duda û sisîyada fire bela bibû.
**2.** Bona r’abûn-r’ûniştin û qulixê civînê dibêje, li k’u bona xeysetê serwêr, berpirsîyar û berdestîyada jî dibêje.
**3.** Şîreta dide Tîmot’êyo. Tîmot’êyo yekî cahil bû, dibe lema ew hinekî ji wê borcdarîyê vedik’işîya (Tîmot’êyo II, 1:7). Şîreta dide wî, ku ew civînêda giran be, bi r’abûn-r’ûniştina xwe bibe xulamekî xweyê nexşê qenc bona Mesîh û cabdarîya k’omêd mesîhîye[f] cûr’e-cûr’e jî hilde ser xwe.

**Serecema fikira ne’mê**

Pêşgotin (1:1-2)
Bona civînê û xebatk’arêd wê (1:3–3:16)
T’emîyêd xebatêye bona Tîmot’êyo (4:1–6:21)

## Silavkirin

**1** 1 Ji Pawlos, şandîyê[f] Mesîh
Îsa, bi e’mirê Xwedêyê Xilaz-
kirê[f] me û Mesîh Îsayê gumana me,
2 Tîmot’êyoyê lawê xweyî ba-
werîyêdayî[f] heq-h’elalr’a:
De bira r’e’m, k’erem[f] û e’di-
layî ji Bav[f] Xwedê û Mesîh Îsayê
Xudanê[f] me li te be.

## Şîretêd derheqa hînkirina derewda

3 Gava ez diçûme Mekedonyayê,
min hîvî ji te kir, ku li Efesê bi-
mînî, wekî t’emîyê bidî çend kesa,
ku hînkirina ner’ast hîn nekin 4 û
guh nedine ç’ilovîskîya û r’eqema
silsileta[f] ku xilazîya wan t’une. Ev
yek hê şer’-de’wa t’evr’adike, ne ku
t’ivdîra* Xwedêye ku bi bawerîyê
tê naskirinê** mîyaser dike. 5 Serê
t’emîyê h’izkirin e, ku ji dilê sax, bi
îsafa[f] r’ih’et û ji bawerîya bêdur’ûtî
ye. 6 Hinek jê dager’îyan û pey goti-
nêd p’ûç’ k’etin. 7 Dixwazin bibine
dersdarêd Qanûnê, lê ew xwexa jî
nizanin çi dibêjin, ne jî wan tiştêd
ku didine zora xwe fe’m dikin.
8 Em zanin ku Qanûn qenc e,
heger yek bi qanûnî wê biqedîne.
9 Belê fe’mdarî ye, ku qanûn bona
r’asta nayê dayînê, lê bona neheq û
serh’işka, bona nep’ak û gunek’ara[f],
bona mir’dar’ û h’erama[f], bona
bavkuj û dêkuja, bona mêrkuja,
10 bênamûsa, k’ona, dizêd merîya,
derewîn û şe’dederewa ye û bona
her kesêd dine ku tiştêd miqabilî
hînkirina saxlem dikin. 11 Ev hîn-
kirin li Mizgînîya xweyîr’ûmete
Xwedêyê hêjayî şikirîyê digire,
k’îjan li min hatîye spartinê[f].

## Şêkirandina hindava r’e’ma Xwedêda

12 Ez ji Mesîh Îsayê Xudanê me
r’azî me, Yê ku qewat da min, ez

* 1:4 «T’ivdîra Xwedê» aha jî tê fe’mkirinê: «Wek’îltîya Xwedê, ya ku da destê cime’ta Xwe».
** 1:4 Aha jî tê fe’mkirinê: «T’ivdîra Xwedêye ku bi bawerîyê tîne sêrî[f]».

amin h’esab kirim, danîme ser
vê xizmetk’arîyê. 13 Min jî berê
Ew bêhurmet dikir, dizêrand û
neyartî li Wî dikir, lê r’e’m li min
bû, çimkî min nebawerîyêda bi
nezanîya xwe kirin*. 14 K’erema[f]
Xudanê me p’ir’ ser minda r’ijîya,
t’evî bawerî û h’izkirina Mesîh Îsa.
15 Vê gotinêda xêlif t’une û lap hê-
jayî qebûlkirinê ye, ku: «Mesîh Îsa
hate dinê, gunek’ara xilaz[f] bike»,
serê k’îjana ez im. 16 Lê bona wê
yekê r’e’m li min bû, wekî Mesîh
Îsa ser min, çawa serê gunek’ara
t’emamîya sebira Xwe bide k’ifşê,
çawa nexşek bona wan, yêd ku
wê bawerîya xwe Wî bînin, jîyî-
na[f] h’eta-h’etayê bistînin. 17 Awa
bira wî P’adşayê h’eta-h’etayêyî
nemirî û nexuya, Xwedêyê bêşi-
rîkî-bêhevalr’a hurmet û r’ûmet
be h’eta-h’etayê! Amîn[f].

18 Vê t’emîyê ez didime te, lawê
min Tîmot’êyo, li gora wan p’ê-
xembertîyêd[f] ku pêşda bona te
bûn, wekî tu bi wan şer’ê xweyî
qenc bikî, 19 dest ji bawerîyê neke
û îsafa xwe r’ih’et xwey ke. Hineka
ev yek ji xwe dûr xistine, dewra
bawerîya xwe welger’andin. 20 Ji
wan bûn, Hûmenayo û Skender,
yêd ku min dane destê mîrêcin[f],
wekî ew hîn bin r’astîya Xwedê
bêhurmet nekin.

**Derheqa dua û civînêda[f]**

2 1 Awa ez hîvî dikim, berî her
tiştî bona h’emû meriva[f] dua
bikin, r’eca kin, lava kin, r’azî-
bûnê bidin, 2 usa jî bona p’adşa û
h’emû serwêra, wekî em jîyîneke
e’dil û seqir’î derbaz kin, bi t’e-
mamîya xwedênasîyê û maqûlîyê.
3 Li ber Xwedêyê Xilazkirê me ev
e qenc û li Wî xweş, 4 ku dixwaze
h’emû meriv xilaz bin û r’astîyê
nas kin*. 5 Çimkî Xwedêk heye
û nava Xwedê û merivada jî nav-
çêtîk, Mesîh Îsayê Meriv, 6 ku
Xwe ji ber k’ir’îna gişkava da.
Ev yek r’ast wextda bû îzbatî, ku
Xwedê dixwaze h’emû xilaz bin.
7 Û bona vê yekê ez dannasînkir
û şandî hatime k’ifşkirinê, (ez
r’ast dibêjim, derewa nakim),
necihûyar’a bûme dersdarê ba-
werîyê û r’astîyê.

8 Awa ez dixwazim ku mêr her
dera destêd xweye h’elal bilind kin,
bê hêrs û bê şer’-de’w* dua bikin.

* 1:13 K’arêd Şandîya 8:3; 9:4-5.
* 2:4 Hezekîyêl 18:23.
* 2:8 Aha jî tê fe’mkirinê: «Bê dudilî».

**9** Usa jî bira k’ulfet[f] bi k’incêd
layîq, şermê û berbihêrîyê xwe bi-
xemilînin, ne ku bi gulî-gujanga,
yan zêr’, yan bi dur’a[f], yan jî bi
k’incêd biha*, **10** lê bi kirêd qenc,
çawa li wan k’ulfeta dik’eve, yêd
ku navê xwedênasîyê hildane ser
xwe. **11** Bira k’ulfet ker’ hîn be, bi
t’emamîya guhdarîyê. **12** Ez îzinê
nadime k’ulfet, ku hîn bike, ne
jî h’ukumî ser mêr bike, lê bira
deng neke. **13** Çimkî pêşîyê Adem[f]
xuliqî, paşê Hêwa* **14** û Adem
nexapîya, lê jin xapîya û neheqî
kir. **15** Lê jin h’alê zar’anînêda jî
wê xilaz be*, heger bi berbihêrîyê
nava bawerîyê, h’izkirinê û paqi-
jayîyêda bimînin.

### Bona serwêrêd civînê

**3** **1** Vê gotinêda xêlif t’une: Heger
temê yekî li serwêrtîyê heye,
ew şixulekî qenc dixwaze. **2** Awa
serwêr gerekê bêqusûr be, mêrê
jinekê be, xwegirtî, aqilda giran,
maqûl, mêvanh’iz, hînkirinêda
serxwe be*, **3** ne serxweş, ne sir’tûk,
lê berbihêr, ne şer’ûd, ne p’ere-
h’iz. **4** Bira malxêtîyê r’ind li mala
xwe bike, zar’êd xwe gur’a[f] xweda
her alîyava maqûlîyêda mezin ke.
**5** (Çimkî heger yek nizane mal-
xêtîyê li mala xwe bike, wê çawa
bikaribe civîna[f] Xwedê xwey ke?)
**6** Bira ne jî bawermendê nû be, ku
nebe k’ubar be, dîwana wî jî mîna
ya mîrêcin bê kirinê. **7** Wekî din jî
gerekê qedirê wî cem yêd ji civînê
der jî hebe, ku nebe bê r’ezîlkirinê
û bik’eve t’eleka mîrêcin.

### Bona berdestîyêd civînê

**8** Usa jî bira berdestî giran bin,
xeberdanêda dur’ûtîyê nekin, xwe

* 2:9 Petrûs I, 3:3.
* 2:13 Destpêbûn 2:7; 2:21-22; 3:1-6.
* 2:15 Me’na vê r’êzê ze’met e. Dewsa «h’alê zar’anînêda jî» yûnanî aha jî tê fe’mkirinê: «bi zar’anînê». K’itêba Pîroz hîn dike, ku zar’ dayîn û berek’etîya Xudan e, ku dê û bavar’a têne dayînê (Zebûr 127, 128). K’itêba Pîroz hîn nake ku zar’anîn şertê mecala xilazbûna k’ulfeta ye. Ne jî ev r’êz soz dide ku zar’anîna k’ulfetêd xwedênas wê bê êş û cefa be yan k’ulfet sax bimîne. Xuya dibe ku Pawlos miqabilî dersdarêd derewîn diçe û hîn dike ku zar’anîn ne gune ye, lê belê heger k’ulfet mêr ke û zar’a bîne, ev yek tiştekî qenc e. Hingê hineka hîn dikir û nedihiştin ku meriv bizewicin yan mêr kin (Tîmot’êyo I, 4:3). Ji sedsalîya yekê h’eta sisîya hînkirina «ginostîkîyê» fire bela dibû û digot, ku p’êşê kevantîyê û zar’anînê gune ye.
* 3:2-7 Tîto 1:6-9.

nedine şeravê, pey k'eda h'eram nek'evin. 9 R'astîya bawerîyêye e'yanbûyî* bi îsafa r'ih'et xwey kin. 10 Û evana jî bira pêşda bêne cêr'ibandinê[f], heger tiştek ser wan t'unebe, hingê bira berdestîyê bikin. 11 Usa jî bira jinêd wan* giran, ne buxdanbêj, lê xwegirtî, her tiştîda amin bin. 12 Berdestî gerekê mêrê jinekê be, qenc malxêtîyê li zar' û mala xwe bike. 13 Ewêd ku r'ind berdestîyê dikin, xwer'a dereceke bilind qazinc dikin û serbestîke[f] mezin dest tînin bona bawerîya Mesîh Îsa.

### Sur'a xwedênasîyê

14 Ez ku van tişta ter'a dinivîsim, guman heye ezê zûtirekê ser teda bêm. 15 Lê heger ez derengî jî bik'evim, tê zanibî gerekê çawa mala Xwedêda r'abin-r'ûnên, ya ku civîna Xwedêyê sax e, stûn û h'îmê r'astîyê ye. 16 Bê xeberdan, gelekî k'ûr e sur'a xwedêp'aristîya me:

Ew bi bedenî xuya bû,
bi R'uh' r'astîya Wî hate îzbatkirinê,
milyak'etava[f] hate dîtinê,
nav mileta hate dannasînkirinê,
dinyayêda hate bawerkirinê
û r'ûmetêr'a hate hilatinê.

### Dersdarêd derew

4 1 R'uh' aşkere dibêje, ku r'ojêd axirîyêda hinek wê ji bawerîyê bik'evin, guh bidine r'uh'êd derewîn û hînkirinêd cina[f]. 2 Ew hînkirin bi dur'ûtîya derewîna dibin, îsafa k'îjana k'izirî ye. 3 Ew meriv h'al-zewacê didine hildanê, ji wan xwarina paşda didine girtinê, k'îjan Xwedê ew bona bawermend û r'astînaskirîya e'firandine, ku bi r'azîbûnê bixwin. 4 Her tiştê ku Xwedê e'firandîye qenc e û tiştekî h'eram têda t'une, heger bi r'azîbûn tê qebûlkirinê, 5 çimkî bi xebera Xwedê û dua qebûl dibe.

### Qulixk'arê Mesîh Îsayî qenc

6 Heger tu van şîreta bidî xûşk-bira, tê bibî qulixk'arê Mesîh Îsayî qenc, çawa tu xwexa jî bi wan gotinêd bawerîyê û hînbûna qence ku tu pey çûyî, qinyat dibî. 7 Xwe ji ç'ilovîskîyêd pîraye h'eram dûr xwey ke. Xwe xwedênasîyêda hîndar[f] ke. 8 Hîndarîya qalib kêrî hindik tiştî tê, lê ya xwedênasîyê kêrî her tiştî tê,

* 3:9 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Sur'a bawerîyê». Ev tê fe'mkirinê ku sur'a veşartî e'yan bû.
* 3:11 Aha jî tê fe'mkirinê: «Jinêd berdestî».

sozê wê hin li vê dinê heye, hin jî li wê dinê. 9 Vê gotinêda xêlif t'une û lap hêjayî qebûlkirinê ye. 10 Bona vê yekê em dixebitin û diçerçirin, çimkî em gumana xwe li Xwedêyê sax tînin, ku Xilazkirê h'emû meriva ye, îlahî[f] Yê bawermenda.

11 T'emîya van tişta bide û hîn ke. 12 Nebe ku yek cahiltîya te bêhurmet ke, lê tu bawermendar'a bibe nexşek, xeberdanêda, r'abûn-r'ûniştinêda, h'izkirinêda, bawerîyê û h'elalîyêda. 13 H'eta hatina min xwe bide wê yekê, ku cime'têr'a nivîsarêd[f] pîroz bixûnî, şîret kî, hîn kî. 14 Hindava wê p'êşk'êşa[f] xweye r'uh'anîda bê xem nîbe, ya ku bi p'êxembertîyê ter'a hatîye dayînê, gava berpirsîyara destê xwe danîne ser te. 15 Guhê te ser wan tişta be û nava wanda bimîne, wekî pêşdaçûyîna te h'emûyava e'yan be. 16 Haş ji xwe û hînkirina xwe hebe. Her gav nava wanda bimîne, çimkî bi vî tiherî tê xwe jî xilaz kî û wan jî, k'îjanêd guhdarîya te dikin.

### Cabdarîya bona e'mirê mezin û biç'ûka

**5** 1 Dilê kalemêra neêşîne, lê dil bide wan, çawa bavê xwe. Cahila çawa birayêd xwe h'esab ke*, 2 pîra çawa dîya xwe, k'ulfetêd cahil çawa xûşkêd xwe, weke şîrê h'elal.

### Jinebîyêd e'detî

3 Qedirê jinebîya bigire, yêd ku bi e'detî jinebî ne. 4 Lê heger zar' yan nevîyêd jinebîkê hebin, bira ew zar' pêşîyê mala xweda hîn bin çawa xwedênasîya xwe bidine k'ifşê û bi vî tiherî deynê dê û bavê xwe veger'înin, çimkî ev yek li Xwedê xweş tê. 5 Jinebîya e'detî ew e, ya ku t'enê maye û gumana xwe danîye ser Xwedê, şev û r'ojêd xwe bi dua û r'eca derbaz dike. 6 Lê ya ku k'êfa dilê xwer'a ye, mirîya neç'e'lkirî ye. 7 Van tişta t'emî ke, wekî bêlek'e bin. 8 Lê heger merivek bona xwexatîya xwe, îlahî bona mala xwe xem nake, ewî bawerî înk'ar[f] kirîye û ji nebawera jî xirabtir e.

9 Bira navê wê deft'era jinebîyada bê nivîsarê, k'îjan ji şêst salî kêmtir nîne, carekê jî mêrkirî bûye, 10 bi kirinêd qencva jî berbiç'e'v e: Mesele, zar' mezin kiribin, mêvan qebûl kiribin, nigêd bawermenda şûştibin, dest avîtibe

* 5:1 Qanûna K'ahîntîyê 19:32.

k’etîya û bona her şixulê qenc jî
hazir sekinî ye.
11 Lê jinebîyêd cahil qebûl neke,
çimkî gava evana temê xwe xirab
dikin, berê xwe ji Mesîh diguhêzin,
dixwazin mêr kin 12 û bi vî awayî
evî sûcî hiltînine ser xwe, çimkî
sozê berê dane alîkî.* 13 Serda jî
mal bi mal diger’in, xwer’anedîtî
hîn dibin, ne t’enê xwer’anedîtî ne,
usa jî gilîger’o, t’evî şixulê xelqê
dibin û tiştêd necayîz xeber didin.
14 Awa ez dixwazim ku jinebîyêd
cahil mêr kin, zar’a bînin û malkir
bin, wekî zimên nekine devê ne-
yara. 15 Çimkî îdî hinek jinebîyêd
cahil xalifîn[f], pey mîrêcin çûn.
16 Heger jinebîyêd bawermende-
kê* hebin, bira ew alîk’arîya wan
bike û civînê bargiran neke, wekî
civîn bikaribe alîk’arîya jinebîyêd
e’detî bike.

### Bona berpirsîyara

17 Ew berpirsîyarêd ku serwêrtî-
yê r’ind dikin, bira dubare hêjayî
qedir bin, îlahî ewêd ku xeberdan
û hînkirinêda dixebitin. 18 Çimkî
nivîsar dibêje: «Devê gayê bêderêda
dixebite girênede»* û «P’ale hêjayî
heqê xwe ye»**. 19 Xeyba hindava
berpirsîyarda bawer neke, heger du
yan sê şe’de t’unebin*. 20 Berpir-
sîyarêd ku nava gunada dimînin,
li ber h’emûya lê hilê[f], wekî yêd
mayîn jî bitirsin.
21 Ez li ber Xwedê, Mesîh Îsa û
milyak’etêd bijartî dikime deynê
stûyê te, ku tu van şîreta bê t’agêrî[f]
xwey kî, tiştekî bi firqîyê nekî.
22 Destê xwe zû daneyne ser ye-
kî bona xizmetk’arîya Xudan, ne
jî t’evî gunêd yêd mayîn bî. Xwe
paqij xwey ke*.

---

* 5:11-12 Hinek aha fe’m dikin: Jinebîyêd civînêda navêd xwe bona xizmetkirinê deft’era civînêda didane nivîsarê, lema tê gotinê, ku jinebîyêd cahil qebûl neke, çimkî bi wê qirarê navêd xwe didane nivîsarê, wekî dîsa mêr nekin, lê t’enê civînêr’a xizmetîyê bikin. Lê gava dixwestin mêr bikirana, soz-qirarê xwe dit’er’ibandin.
* 5:16 Nav destnivîsarêd qencda «bawermend» qisimê jinê tê fe’mkirinê, lê destnivîsarêd hinekada «bawermend» tê fe’mkirinê hin qisimê jinê, hin jî mêr, usa jî hinek destnivîsarada t’enê mêr tê fe’mkirinê.
* 5:18 Qanûna Ducarî 25:4.
** 5:18 Lûqa 10:7; Metta 10:10.
* 5:19 Qanûna Ducarî 17:5-7; 19:15; Metta 18:16.
* 5:22 Tîmot’êyo I, 4:14; K’arêd Şandîya 6:6; 13:1; Tîmot’êyo II, 1:6.

23 Ji vir şûnda t’enê avê vene-
xwe, lê hinekî jî şeravê t’ev ke,
bona cîyê meh’andina xwarinê,
ku zû-zû nexweş dik’evî.

24 Hinek hene, ku gunêd wan
k’ifş in û r’ast wan dibine ber
dîwanê, lê gunêd hineka jî paşê
wê k’ifş bin. 25 Usa jî kirinêd qenc
k’ifş in û ew kirinêd ku ne k’ifş
in, ew jî veşartî namînin.

### Bona xulama

**6** 1 Ewêd ku bin nîrê xulam-
tîyêda ne, bira axayêd xwe
h’esab kin çawa hêjayî qedirê
bilind, wekî navê Xwedê û hîn-
kirina me neyê bêhurmetkirinê.
2 Axayêd k’êye bawermend hene,
bira wan bêhurmet nekin, çimkî
ew birayêd hev in. Lê bira xulam
hê r’ind xulamtîyê bikin, çim-
kî yêd ku k’arê ji xizmetk’arîya
xulama distînin, bawermend in
û delal in.

### Xizna r’ast

Van tişta hîn ke û şîret ke.
3 Heger yek tiştekî din hîn bike
û gotinêd Xudanê me Îsa Mesîhe
saxlem û hînkirina xwedêp’a-
ristîya me ne qayl e, 4 ew yekî
k’ubar e û tiştekî nizane. Ew
nexweşîya şer’ û de’wava girtî
ye, ji wê jî pêşda tên: H’evsûdî,
neyartî, gotinêd ner’êda, şikêd
xirab 5 û şer’ûdî. Ev h’emû tişt ji
nava merivêd qafseqet û ji r’astîyê
şûna r’eşva çûyî pêşda tên. Evana
xwedênasîyê h’esab dikin, çawa
kanîya k’arê.

6 Belê xwedênasî k’ara ser
k’arê ye, heger bi r’azîbûnê be.
7 Me t’u tişt neanîye dinê û
emê nikaribin t’u tiştî jî bibin*.
8 Lê k’inc û xurekê me hebin,
bi wan em r’azî bin*. 9 Lê ewêd
ku dixwazin dewletî bin, têne
cêr’ibandinê, dik’evine t’eleka
û gelek temêd axmax û zîyan-
k’ar, k’îjan mêriv nuqî mîrat’îyê
û wêranbûnê dikin*. 10 Çimkî
p’ereh’izî kanîke her cûr’e xi-
rabîyê ye. Hineka xwe dane wê,
ji bawerîyê xalifîn û xwe kirine
xweyê kul û derda.

### T’emîyêd Pawlos bona Tîmot’êyo

11 Lê tu, merivê Xwedê ji
van tişta bir’eve û pey heqîyê,

* 6:7 Îbo 1:21.
* 6:8 Gotinêd Silêman 30:8.
* 6:9 Gotinêd Silêman 23:4; 28:22.

xwedênasîyê, bawerîyê, h’izki-
rinê, sebirê û milûktîyê her’e.
12 Leca bawerîyêda qenc bir’eve,
jîyîna h’eta-h’etayê qazinc ke,
k’îjanêr’a tu hatî gazîkirinê û li
ber gelek şe’da te ew îqrara[f] qenc
îqrar kir. 13 Li ber Xwedêyê ku
e’mir dide h’emû e’firîna û li ber
Mesîh Îsayê ku li ber Pîlatoyê[f]
Pontîyo şe’detîya îqrara qenc da,
ez t’emîyê didim te*, 14 ku tu vê
t’emîyê bêlek’e û bêqusûr xwey
kî, h’eta xuyabûna Xudanê me
Îsa Mesîh. 15 Xuyabûna Wî wê
wextê xweda ji alîyê Yê hêjayî
şikirîyê û T’enêyî qewat, P’adşa-
yê p’adşaya û Xudanê xudanada
e’yan be. 16 T’enê Ewî nemirî ye,
nava r’onayîyêda ye, ku t’u kes
nikare nêzîk bê. T’u qûl-benda
Ew nedîtîye û ne jî dikare bibîne.
Qedir û qudreta h’eta-h’etayê
Wîr’a be! Amîn*.

### T’emîya bona dewletîya

17 T’emîyê bide dewletîyêd vê
dinê, bira babax nebin û gumana
xwe nedine ser hebûka[f] p’ûç’e de-
rew, lê li ser Xwedêyê ku her tiştî bi
mer’danî dide me, wekî em miraz
pê bikin*. 18 Bira qencîya bikin, bi
kirinêd qenc dewletî bin, mer’d bin
û p’arevekirinêr’a jî hazir.
19 Bi vî tiherî ewê xwer’a xiz-
nekê t’op kin, h’îmekî qenc bona
axretê, wekî wê jîyîna ku r’astî
jîyîn e qazinc kin.

### T’emîyêd axirîyê

20 Tîmot’êyo! Çi ku li te hate
spartinê xwey ke. Ji gotinêd p’ûç’e
h’eram û şer’-de’wa dûr be, ku bi
derew navê «zanebûn» dane ser.
21 Hineka xwe dane vê yekê û bi
vî awayî ji bawerîyê xalifîn.
K’erema Xwedê wer’a be.

* 6:13 Yûh’enna 18:37.
* 6:16 Derk’etin 33:20.
* 6:17 Zebûr 62:10.

# NE'MA PAWLOSE DUDA TÎMOT'ÊYOR'A

## Pêşgotin

Ev ne'ma duda Pawlos ji kelê Tîmot'êyor'a nivîsîye, gava ew R'omêda[f] girtî bû, destê wî ji her tiştî qetîyayî bû (1:8, 16) û ewî usa h'esab dikir, ku geleka ew bîr kirîye. Vê ne'mêda p'ayê-p'ir'ê t'emî û şîret in, ku dide heval-xebatê xweyî cahil Tîmot'êyo. Li vir fikira mezin ew e, ku dannasînkirêd Mizgînîyê nava zêrandin û tengasîyêda[f] sebir kin û teyax kin, lema jî ew ber dilê wîda tê, ku gerekê ew bêxof-bêtirs be û şer'ê xweyî qenc r'ind bike, çawa eskerekî Mesîhî[f] amin. Şandî[f] dil dide Tîmot'êyo ku serxwe be, bêtirs bona Îsa Mesîh şe'detîyê bide, hînkirina r'astîya Mizgînîyê û Peymana[f] Kevin xwey ke û borcê xwe çawa yekî dersdar û mizgîndar[f] bîne sêrî[f].

Şandî Tîmot'êyor'a dinivîse, ku ew haş ji xwe hebe, nek'eve nava wan de'w-dozêd p'ûç'e vala, ku ev yekana kêr nayên, lê t'enê guhdara ji r'ê derdixin, aciz dikin (2:16, 23).

Xulese, şandî nexşê e'mirê xwe, nêt-meremê şandîtîya xwe, bona bawerî[f], sebir, h'izkirin û zêrandina cefêd xwe tîne bîra heval-xebatê xwe.

Eva ne'ma kanîya berdilîya[f] e'mirê h'emû bawermenda ye, îlahî[f] ewêd ku bin barêd qulixê Xudanda[f] ne, wekî ewana bawerîyêda bi sebirê û h'izkirinê bê tirs pêşda her'in.

### Serecema fikira ne'mê

Pêşgotin (1:1-2)
R'azîbûn û şîret (1:3–2:13)
T'emî û haş ji xwe hebûn (2:14–4:5)
R'abûn-r'ûniştina e'mirê Pawlos (4:6-18)
Paşgotin (4:19-22)

## Silavkirin

1 1 Ji Pawlosê bi e'mirê Xwedê
şandîyê[f] Mesîh Îsa bona wî sozê
jîyînê, ya ku bi saya Mesîh Îsa ye,
2 Tîmot'êyoyê lawê xweyî de-
lalr'a:
De bira r'e'm, k'erem[f] û e'di-
layî ji Bav[f] Xwedê û Mesîh Îsayê
Xudanê[f] me li te be.

## R'azîbûn û dilşidandin

3 Ez ji Xwedê r'azî me, ku mîna
pêşîyêd xwe bi îsafa[f] r'ih'et Wîr'a
xulamtîyê dikim, her gav şev û r'oj
nava duayêd xweda te bîr tînim.
4 Gava ez hêsirêd te tînime bîra
xwe, dik'evime demana dîtina te,
wekî şabûn bik'eve dilê min. 5 Ez
wê bawerîya[f] teye dilê sax tînime
bîra xwe, ya ku berê cem pîrika
te Loyîsê û dîya te Eynikê hebû
û ez bawer im, ku ya te jî heye*.
6 Bona wê yekê ez dikime bîra te,
ku tu agirê p'êşk'êşa[f] Xwedê hê
gur' kî, ya ku bi destdanîna min
ter'a hate dayînê. 7 Çimkî Xwe-
dê r'uh'ekî tirsê neda me, lê Yê
qewatê, h'izkirinê û xwegirtinê*.
8 Awa şerm neke, ku bona Xu-
danê me şe'detîyê bidî, ne jî bona
min şerm bike, ku ez bona navê
Wî girtî me. Lê t'evî cefayê Miz-
gînîyê be, anegorî qewata Xwedê.

9 Xwedê em xilaz[f] kirin,
pîrozîyêr'a[f] gazî kirin,
ne ku bona kirinêd me,
lê li gora qirar û k'erema[f] Xwe.
Eva k'erema bi saya Mesîh Îsa,
ew hê dewrêd berêda
mer'a hate dayînê.
10 Lê niha bi xuyabûna Xilazkirê[f]
me
Mesîh Îsa e'yan bû, ku mirin
betal kir
û jîyîna bê mirin, bi Mizgînîyê
r'onayî kir.

11 Vê Mizgînîyêr'a ez danna-
sînkir, şandî û dersdar hatime
k'ifşkirinê 12 û lema ez vî cefayî
dik'işînim. Lê ez şerm nakim,
çimkî zanim min bawerîya xwe
K'ê anîye û guman im jî, ku Ewî
çi ku spartîye[f] min*, wê h'eta wê

* 1:5 K'arêd Şandîya 16:1.
* 1:7 Aha jî tê fe'mkirinê: «Serxwebûnê».
* 1:12 «Çi ku spartîye min» tê fe'mkirinê yan qulixê Pawlos, yan jî Mizgînî. Lê ev r'êz aha jî tê fe'mkirinê: «Ew tiştê çi ku min spartîye Wî, bona R'oja[f] Axretê wê xwey ke», mesele, jîyîna Pawlos yan jî yêd ku bi dannasînîya wî bûne bawermend.

R'ojê jî xwey ke. **13** Tu xwe li wî
nexşê hînkirina saxlem bigire,
ya ku te ji min bihîst û nava wê
bawerî û h'izkirinêda bimîne,
k'îjan ji Mesîh Îsa p'ara me k'et.
**14** Ew tiştêd qence ku li te hatine
spartinê bi wî R'uh'ê[f] Pîrozî nava
meda xwey ke.

**15** Tu zanî ewêd ku qeza As-
yayêda bûn pişta xwe dane min,
Fûgelo û Hêrmoxênîs jî t'evî wan.
**16** Bira Xudan r'e'ma xwe li mala
Onîsîforo bike, çimkî ewî gelek
cara dilê min r'ih'et kir, ji girtina
min şerm nedikir, **17** lê gava hate
R'omayê, gelekî li min ger'îya,
h'eta ez dîtim, **18** (de bira Xudan
bidê, ku ew wê R'ojê r'e'mê ji
Xudan bibîne) û Efesêda jî ewî
çiqas minr'a xizmetk'arî kir, tu
r'ind zanî.

### Eskerê Mesîh Îsayî qenc

**2** **1** Awa lawê min, bi wê k'erema
meye ku yektîya Mesîh Îsada
ye qewat be. **2** Û ew tiştêd ku te
li ber gelek şe'da ji min bihîst,
bispêre[f] wan merivêd[f] amin, yêd
ku wê bikaribin hinekêd din hîn
kin. **3** Awa t'evî cefê me be, mîna
eskerê Mesîh Îsayî qenc. **4** T'u
esker şixulê binelîtîyêva[f] mijûl
nabe, wekî li seresker xweş bê.
**5** Leck'arek[f] jî k'ofîyê[f] nastîne,
heger li gora qeyde nek'eve lecê.
**6** Û cotk'ar, ku cefê dik'işîne,
gerekê ew pêşin ji berêd e'rdê
te'm ke. **7** Bizanibe ez çi dibêjim,
çimkî Xudan her tiştîda h'iş-aqil
wê bide te.

**8** Bîr bîne wî Îsa Mesîhê ji mi-
rinê r'akirî, ji zur'eta Dawid[f], li
gora wê Mizgînîya ez dannasîn
dikim. **9** Bona vê Mizgînîyê ez
diçerçirim, h'eta mîna zulm-
k'arekî jî qeydkirî me, lê xebera
Xwedê qeydkirî nîne. **10** Lema ez
her tiştî teyax dikim, bona xatirê
bijartîya, ku ew jî wê xilazbûna[f]
ku bi saya Mesîh Îsa ye, bistînin,
bi r'ûmeta h'eta-h'etayêva t'evayî.
**11** Vê gotinêda xêlif t'une:

Heger em t'evî Wî mirin,
emê t'evî Wî bijîn jî.
**12** Heger em teyax kin,
emê p'adşatîyê jî t'evî Wî bikin.
Heger em Wî înk'ar[f] kin,
Ewê jî me înk'ar ke*.
**13** Heger em amin nemînin,
Ewê amin bimîne,
çimkî Ew nikare Xwe înk'ar
ke*.

* 2:12 Metta 10:33.
* 2:13 Jimar 23:19.

## P’alê k’etî-r’abûyî

14 Van tişta bîne bîra cime’tê, li
ber Xwedê bike deynê stûyê wan,
ku ser xebera hevr’a nek’evine
de’wê. Ew kêrî t’u kesî nayê, t’enê
mala guhdara xirab dike. 15 Bike
ku tu li Xwedê xweş bêyî, p’alekî
usa ku şerm nekî, xebera r’astîyê
r’ast şirovekî. 16 Lê ji xeberdanêd
h’erame p’ûç’ xwe dûr bigire,
çimkî evêd ku xwe dane vê yekê,
wê hê nep’akîyêda pêşda her’in
17 û xeberêd wan mîna xiş-xişê
p’enc dide. Hûmenayo û Filîto
jî ji wan in, 18 yêd ku ji r’astîyê
xalifîne[f] û dibêjin, ku r’abûna
mirîya îdî bûye û bawerîya hineka
dever’û dikin. 19 Lê belê h’îmê ku
Xwedê danî qedîm dimîne û ev
mor ser e: «Xudan yêd p’ara Xwe
nas dike»* û «Her kesêd ku navê
Xudan hildane ser xwe, bira ew
ji neheqîyê dûr bin».
20 Maleke mezinda ne ku t’enê
derdanêd[f] zêr’ û zîv hene, lê yêd ji
dar û h’er’îyê jî hene, hinek bona
derecêd bilind in, hinek jî bona
derecêd nimiz. 21 Awa heger yek
xwe ji wan tiştêd necayîz* paqij
ke, ewê bibe derdaneke dereca
bilind, buhurtî-jibare, kêrî xwe-
yê xwe hatî, bona her derecêd
qencda hazir.
22 Ji dilxwestinêd cahiltîyê bi-
r’eve, xwe li heqîyê, bawerîyê,
h’izkirinê, e’dilayîyê bigire, t’evî
wan be, yêd ku bi dilê sax gazî
navê Xudan dikin. 23 Tu xwe ji
de’w-dozêd axmaxe bêfe’m dûr
bigire, çimkî tu zanî ku şer’ ji wan
pêşda tên. 24 Li xulamê Xudan
nak’eve, ku şer’ bike, lê hindava
h’emûyada berbihêr be, bikaribe
hîn ke û bînfire be, 25 bi şîrinayî
yêd miqabil şîret ke, belkî Xwedê
mecalê bide wan, ku ji gunekirinê
veger’in[f] û r’astîyê nas kin. 26 Hingê
ewê ser h’işê xweda bên, ji t’eleka
wî mîrêcin[f] xilaz bin, k’îjanî ew
girtine, ku e’mirê wî biqedînin.

## Xirabîyêd r’ojêd axirîyê

3 1 Lê vê yekê zanibe ku r’ojêd
axirîyêda zemanêd xirab wê
bên. 2 Merivê bibine xweh’iz, p’ere-
h’iz, k’ubar, babax, buxdanbêj, ne
gur’a[f] dê-bavada, bêşêkir, h’eram,
3 dilsar, bêr’e’m, buxdanbêj, tem-
sist, zulmk’ar, neyarêd qencîyê,
4 nemam, berzeq, xwer’azî, r’ih’e-
tîh’iz, ne ku Xwedêh’iz. 5 P’işkê

* 2:19 Jimar 16:5.
* 2:21 Aha jî tê fe’mkirinê: «Ji wan meriva».

xwedênasîyê wê li wan k'eve, lê
wê qewata wê înk'ar kin. Tu xwe
ji yêd aha dûr bigire.

**6** Ji nava vanda yêd usa hene,
ku xwe vedidizine mala, k'ulfetêd[f]
ser'aye bin barêd gunada[f] şewitî
dikine hêsîr, yêd ku bi cûr'e-cûr'e
temêd xirabva têne birinê. **7** Ev
k'ulfetana her gav hîn dibin, lê
t'u car nikarin r'astîyê nas kin.
**8** Çawa Yanîs û Yambrîs miqabilî
Mûsa[f] bûn, usa jî ev merivana mi-
qabilî r'astîyê disekinin, merivne
bi fikirêd xweda şûna r'eşva çûyî,
bawerîyêda jî bêkêr in*. **9** Lê gelekî
wê pêşda neçin, çimkî bêfe'mîya
wan wê h'emûyava e'yan be, çawa
ya wan her duya bû.

### T'emîyêd axirîyê

**10** Lê te nasîya xwe daye hînki-
rin, r'abûn-r'ûniştin û nêt-meremê
min, bawerî, sebir û h'izkirina
min, bînfireyî, **11** zêrandin û ce-
fayêd min. Tu zanî li Entakyayê,
Qonyayê, Lîstrayê çi hatine serê
min: Min çi zêrandin k'işandin!
Lê Xudan ez ji h'emûya xilaz ki-
rim*. **12** Belê her kesê ku dixwaze
yektîya Mesîh Îsada bi xwedênasî
bijî wê bê zêrandinê* **13** û merivêd
xirabe xweyîfêl wê xirabîyêda pêş-
da her'in, bixalifînin û bixalifin.
**14** Lê tu, nava wan tiştada bimîne,
çi ku hîn bûyî û wê bawerîyêda
jî guman bûyî. Tu zanî ji k'îjana
hîn bûyî, **15** usa jî tu ji zar'otîya
xweda nivîsarêd[f] pîroz zanî, yêd
ku dikarin te serwaxt kin, wekî
bi bawerîya ser Mesîh Îsa xilaz
bî. **16** T'emamîya nivîsarê* ji bîna
ber Xwedê ye** û kêrhatî ye bona
hînkirinê, lêhilatinê[f], r'astkirinê û
şîretkirina jîyîna heqîyêda, **17** wekî
merivê Xwedê bêkêmasî be, bona
h'emû kirinêd qenc hazir sekinî be.

## 4

**1** Awa li ber Xwedê û wî Mesîh
Îsayê ku wê dîwana mirî û
zêndîya bike, ez bi camêrî dibê-
jim, tu li wê hatin û P'adşatîya
Wî kî: **2** Xeberê dannasîn ke, ser
wê nêt-fikirê be, heger wextda
be, yan bê wext be, li şaşîya hilê,
pêşîya neheqîyê bigire, dil bide
meriva, bi t'emamîya sebirê hîn

* 3:8 Derk'etin 7:11, 22; 8:3.
* 3:11 K'arêd Şandîya 13:14–14:22; Zebûr 34:19.
* 3:12 Yûh'enna 15:20.
* 3:16 Aha tê fe'mkirinê: «Nivîsarêd pîroz» awa gotî «K'itêba[f] Pîroz».
** 3:16 Aha jî tê fe'mkirinê: «T'emamîya nivîsarêda bîna ber Xwedê heye».

ke. 3 Çimkî zemanê bê, ku meriv
wê guh nedine hînkirina saxlem,
lê wê xwestinêd dilê xwer’a wan
dersdara serhev t’op kin, yêd ku
tiştêd li guhê wan xweş tê wê
hîn bikin. 4 Wê guhê xwe ji r’as-
tîyê dager’înin û pey ç’ilovîskîya
k’evin. 5 Lê **tu** her tiştîda serxwe
bimîne, li tengasîya[f] sebir ke,
kirê mizgîndar[f] bike, qulixê xwe
biqedîne. 6 Çimkî ez xwexa qur-
banbûnêr’a[f] îdî ser r’oj-r’oja me û
wextê çûyîna min pêr’a gihîştîye.
7 Lecêda ez qenc r’evîm, min r’î-
ya xwe qedand, bawerî xwey kir.
8 Û niha minr’a dimîne k’ofîya
heqîyêye serk’etinê, ya ku Xu-
dan, H’akimê r’ast wê bide min
wê r’ojê û ne t’enê min, lê wan
h’emûya jî, yêd ku bi h’izkirinê
h’eyra xuyabûna Wîda ne.

## Salix-sûlix

9 Bike ku zû bêyî cem min.
10 Dîmas ku dinya h’iz kir ez
hiştim û çû T’êsalonîkê. Kireskîs
çû Galatyayê, Tîto jî Dalmetya-
yê. 11 T’enê Lûqa cem min maye.
Marqos hilde t’evî xwe bîne, çimkî
vî qulixîda[f] ew kêrî min tê. 12 Ti-
xîko, min şande Efesê. 13 Tu gava
bêyî, wî qap’ûtê ku min Troyayêda
cem Karpos hişt, t’evî xwe bîne,
usa jî k’itêbêd gulomatk, îlahî[f]
yêd ç’erm.

14 Skenderê h’edad gelek xirabî
li min kir. Xudan wê weke kirinêd
wî bîne pêşîya wî. 15 Tu jî h’evza
xwe ji wî bike, çimkî gelekî li ber
gotina me r’abû.

16 Cara pêşin, gava ez li ber dî-
wanê sekinîm, kesekî pişta min
negirt, h’emûya ez hiştim çûn.
Bira ev yek wanr’a gune neyê
h’esabê! 17 Lê Xudan t’evî min
sekinî û qewat da min, wekî pê
min Mizgînîdayîn mîyaser be
û h’emû necihû[f] bibihên û ez ji
devê şêr xilaz bûm. 18 Xudan wê
min ji her kirêd xirab xilaz ke û
sax-silamet bigihîne P’adşatîya
Xweye e’zmana. Şikir ji Wîr’a
h’eta-h’etayê. Amîn[f].

## Silavêd axirîyê

19 Silavê bide Priskîlayê û Akîla,
usa jî mala Onîsîforo, 20 Êrasto
li Korint’ê ma, Trofîmo jî, min
li Mîletosê nexweş hişt. 21 Bike
ku berî zivistanê bêyî. Eybûlo,
Pûdês, Lînos, Klawdîya û h’emû
xûşk-bira li te silav dikin. 22 Xudan
t’evî r’uh’ê te be.

K’erema Xwedê wer’a be.

# NE’MA PAWLOS TÎTOR’A

## Pêşgotin

Tîto bawermendekî yûnan[f] bû, ew heval-xebatekî Pawlosî gelekî kêrhatî bû, nava qulixê şandîtîya[f] wîda (Korint’î II, 2:13; 7:5-16; 8:6, 16, 23; 12:18; Galatî 2:3; Tîmot’êyo II, 4:10). Pawlos vê ne’mê alîk’arê xweyî cahilr’a dişîne, gava ew Kirêtayêda mabû, ku serwêrtîyê şixulê civînê[f] bike.

Ne’mêda sê pirsêd mezin hene:

**1.** Pawlos tîne bîra Tîto, ku gerekê serwêrêd civînê çawa bin, îlahî[f] nava kirêtîyada, ku r’abûn-r’ûniştina wan ne qenc bû.

**2.** T’emîyêd bona Tîto, ku ew hînkirina saxlem h’emûya hîn ke, awa gotî kalemêr û pîrejina, xort û xulama. Pîrejin jî gerekê hindava xweda k’ulfetêd[f] cahil hîn kin.

**3.** T’emî bona r’abûn-r’ûniştina bawermenda, ku t’evî h’emûya ew milûk, dilsax û şîrin bin, ji k’în û mixenetîyê dûr bin, nava de’w-dozada nîbin û xwe ji cudebûnêd civînê dûr bigirin.

#### Serecema fikira ne’mê

Pêşgotin (1:1-4)
Serwêrêd civînê û borcê wan (1:5-16)
Borcêd her bawermendê nava civînêda (2:1-15)
Şîret, t’emî û hînkirin (3:1-11)
Paşgotin (3:12-15)

### Silavkirin

1 [1] Ji Pawlosê xulamê Xwedê
û şandîyê[f] Îsa Mesîh, bona
pêşdaçûyîna bawerîya[f] bijartîyêd
Xwedê û zanebûna ser r’astîyê,
anegorî xwedênasîyê, [2] usa jî bona
wê gumana jîyîna[f] h’eta-h’etayê

gazîkirî*. Bona wê jîyînê, Xwedêyê
xweyê gotina Xwe**, hê dewrêd
berêda soz daye 3 û wextê xweda
gotina Xwe bi dannasînîyê da
e'yankirinê, ya ku li min hate
spartinê[f], bi e'mirê Xwedêyê Xi-
lazkirê[f] me.

4 Tîtor'a, lawê xweyî heq-h'elalî
bawerîya meye t'omerîda:

De bira k'erem[f] û e'dilayîya
Xwedêyê Bav[f] û Mesîh Îsa Xi-
lazkirê[f] me li te be.

### Şixulê Tîto Kirêtayêda

5 Bona wê yekê min tu li Kirêtayê
hiştî, wekî çi kêmasî hebin bînî
sêrî[f] û her bajarekîda berpirsîyara
k'ifş kî, çawa min ev t'emî li te
kir: 6 Gerekê berpirsîyar bêlek'e
be, mêrê jinekê be, zar'êd wî
bawermend bin, yêd ku bona
avîtîyê yan jî bona neguhdarîyê
nek'etine nava dev-dirana. 7 Belê
serwêr çawa malkirê Xwedê, gerekê
bêlek'e be: Ne serh'işk, ne hêrs,
ne pey şeravê k'etî, ne sir'tûk, ne
pey k'eda h'eram[f], 8 lê mêvanh'iz,
xêrxwaz, aqilda giran, ser heqîyê,
Xwedêr'a dayî, xwegirtî. 9 Gere-
kê wê gotina amin qewîn bigire,
çawa ku hîn bûye, wekî bikaribe
bi hînkirina saxlem dil bide yêd
mayîn û şaşîyêd miqabila bide
r'ûyê wan.

10 Yêd xweserîxwe gelek in, yêd
xeberp'ûç' û derewîn, îlahî[f] ewêd
ku ji nava cihûyada[f]* ne. 11 Gere-
kê dengê yêd usa bidine bir'înê,
çimkî ew mala lap xirab dikin,
tiştêd necayîz hîn dikin û vê yekê
bona k'ara xweye h'eram dikin.
12 Ji kirêtîya hema xût zanekî*
wan jî gotîye:

«Kirêtî t'imê derewîn in,
ew r'e'wirêd xirab in,
û p'ir'xurêd bêxîret in».

13 Ev şe'detîke r'ast e, lema h'işk li
wan hilê[f], ku saxlem bin bawerî-
yêda 14 û guh nedine ç'ilovîskîyêd
cihûya[f] û t'emîyêd wan merivêd[f]
ku ji r'astîyê dager'îyane. 15 Her
tişt h'elal e bona h'elala, lê h'eram

---

* 1:1-2 Aha jî tê fe'mkirinê: «gazîkirîyê bona pêşdaçûyîna bawerîya bijartîyêd Xwedê û zanebûna ser r'astîyê, anegorî xwedênasîyê, ku ji wê r'astîyê ye gumana jîyîna h'eta-h'etayê».

** 1:2 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Xwedêyê ku derewa nake».

* 1:10 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Yêd ji sinetîyê[f] ne».

* 1:12 Bi yûnanî xeber bi xeber «p'êxemberekî wan» nivîsar e. Li gora hineka, navê vî zaneyî Epîmênîdes bû, ji bajarê Kinososê û şayîr bû. Ew qasî 600 salî berî Îsa Mesîh bibû.

û nebawerar'a tiştekî h'elal t'une, h'eta aqil û îsafa[f] wan jî h'er'imîne. **16** Ew dibêjin, ku Xwedê nas dikin, lê bi kirêd xwe Wî înk'ar[f] dikin, h'eram û xweserîxwe ne û her kirineke qencr'a bêkêr in.

### Hînkirina saxlem

**2** **1** Lê tu, çi li hînkirina saxlem dik'eve, hîn ke. **2** Kalemêr bira xwegirtî, giran û maqûl bin, bawerîyê, h'izkirinê û sebirêda serxwe bin.

**3** Pîrejin jî bira usa p'ergal bin, çawa li merivêd Xwedê dik'eve, ne buxdanbêj, mêla wan ne ser vexwarinê be. Lê bira xweyêd şîretêd qenc bin, **4** wekî jinêd cahil hîn kin, ku mêr û zar'êd xwe h'iz bikin, **5** aqilda giran bin, nav-namûs, malkir, h'eyf, gur'a[f] mêrê xweda bin, wekî xebera Xwedê neyê bêhurmetkirinê.

**6** Usa jî dil bide xorta, ku aqilda giran bin. **7** Her tiştîda jî, tu xwexa bibe t'erzê kirinêd qenc, nava hînkirinêda bêdur'ûtî û maqûl be, **8** bi xeberêd saxleme bê kêmasî, wekî yê miqabil şermî bimîne û hindava meda tiştekî wîyî gotinê t'unebe.

**9** Xulama şîret ke, ku gur'a axayêd xweda bin û her tiştîda li wan xweş bên, cab-sabê wan nedin, **10** destdirêjayîyê nekin, lê aminîya qence t'am nîşanî wan kin, wekî hînkirina bona Xilazkirê me Xwedê, her alîyava bixemilînin.

**11** Çimkî k'erema[f] Xwedê bona xilazbûna[f] h'emû meriva xuya bû, **12** Ew me hîn dike, ku em nep'akîyê û dilhavijîyêd dinyayê înk'ar kin û aqilda giran, bi heqîyê û xwedênasîyê bijîn li vê dinê, **13** hîvîya wê gumana xwezilî, xuyabûna r'ûmeta Xwedêyê mezin, Xilazkirê me Îsa Mesîh bin. **14** Ewî Xwe bona me da der, ku me ji h'emû neheqîya xilaz[f] ke û paqij ke, bike cime'ta Xweye xîretk'êşêd kirinêd qenc.

**15** Van tişta hîn ke, bi t'emamîya h'ukumê xwe dil bide wan û li wan hilê. Bira t'u kes te bêhurmet neke.

### R'abûn-r'ûniştina bawermenda

**3** **1** Bike bîra cime'tê, ku gur'a serwêr û h'ukumeta bikin, guhdar bin û bona h'emû kirinêd qenc hazir sekinî bin. **2** Hindava t'u kesekîda xirab xeber nedin, şer'ûd nîbin, lê milûk bin û şîrinayîya xwe hindava h'emû merivada bidine k'ifşê. **3** Çimkî em jî wextekê bêfe'm bûn, xweserîxwe, xalifî[f] û xulamêd cûr'e-cûr'e temêd xirab û k'êfa dilê xwe bûn, me nava xirabîyê û h'evsûdîyêda dijît,

em mîna me’rê r’eş, li ber ç’e’vê
hev r’eş bûn. 4 Lê gava şîrinayî û
h’izkirina Xwedê, Xilazkirê me
xuya bû, 5 Wî em xilaz kirin. Ne
ku bona wan kirinêd r’aste ku me
kirin, lê li gora r’e’ma Xwe em
xilaz kirin, bi şûştinê em nû dinê
k’etin û bi R’uh’ê[f] Pîroz nûyejîyîn
bûn*. 6 Wî Xwedêyî ew R’uh’ bi
mer’danî ser meda barand, bi
destê Îsa Mesîhê Xilazkirê me,
7 wekî bi k’erema Wî em r’ast[f] bê-
ne h’esabê û bi wê gumanê jîyîna
h’eta-h’etayê war bin. 8 Vê gotinêda
xêlif t’une. Û ez dixwazim ku tu
van tişta e’seyî kî, wekî yêd ku
bawerîya xwe Xwedê tînin, xîret
kin, tiştêd qenc bikin. Evana
merivar’a qenc û k’ar in.

9 Lê tu xwe ji de’w-dozêd ax-
maxtî, r’eqema silsileta[f], hevr’ik’îyê
û şer’-de’wêd li ser Qanûnê dûr
bigire, çimkî ew bêkêr û bêk’ar
in. 10 Ji yê ku bêt’ifaqîyê dike, ca-
rekê-duda şîret ke dûr k’eve. 11 Tu
zanî ku yê usa xalifî û gunek’ar[f] e,
ew xwexa dîwanê ser xweda tîne.

## Gotinêd axirîyê

12 Gava Artemas yan Tixîko
ez bişînime cem te, bike ku bêyî
Nîkopolîsê, cem min, çimkî min
qirar da zivistana xwe li wir derbaz
kim. 13 Zênasê qanûnzan[f] û Apo-
lo zû ver’êke, usa be ku ew r’êva
kêmasîya tiştekî nebînin. 14 Yêd
ji me jî bira hîn bin, pey kirinêd
qenc bin, wekî kêrî h’ewcetîya
merivayê bên û bê ber nebin.

15 H’emûyêd t’evî min li te silav
dikin. Silavê bide wan, yêd ku
bawerîyêda me h’iz dikin.

K’erema Xwedê we h’emûya-
r’a be.

* 3:5 Aha jî tê fe’mkirinê: «Xwedê em xilaz kirin, bi şûştina R’uh’ê Pîroz nû dinê xistin û nûyejîyîn kirin».

# NE’MA PAWLOS FILÎMONR’A

## Pêşgotin

Filîmonê bawermend yekî e’yan bû, ew dostê Pawlos bû, xuya dibe ku endemê civîna[f] Kolosyayê bû. Xulamekî wî jî hebû navê wî Onîsîmo, ew ji cem xweyê xwe r’evîbû û gerekê bona kirê xwe bihata kuştinê. Lê gava Pawlos kelêda bû, xuya dibe ku Onîsîmo wî dibîne, t’obe[f] dike, dibe bawermendê Îsa. Bi vê ne’mê Pawlos hîvî ji Filîmon dike, ku ew bibaxşîne Onîsîmo û wî qebûl ke, ne t’enê usa çawa meriv[f] dibaxşîne xulamêd xwe, lê usa bibaxşîne çawa yek dibaxşîne birakî xweyî bawermend.

Vê ne’ma kinda derseke k’ûr bona wê bawerî[f] û h’izkirina Mesîh k’ifş dibe, ku çawa gerekê nava bawermendada hindava hevda hebe.

**Serecema fikira ne’mê**

Pêşgotin (1-3)
Pesinê Filîmon dide (4-7)
Hîvîkirin bona Onîsîmo (8-22)
Paşgotin (23-25)

### Silavkirin

**1** [1] Ji Pawlos, bona Mesîh Îsa
girtî û Tîmot’êyoyê bira,
Filîmonê heval-xebat û delalê
xwer’a, [2] Afîya xûşkr’a û Arxîpo-
yê hevaleskerê xwer’a û usa jî wê
civînêr’a[f] ku mala teda dicive*:
[3] De bira k’erem[f] û e’dilayîya
Xwedêyê Bavê[f] me û Xudan[f] Îsa
Mesîh li we be.

### Bawerî[f] û h’izkirina Filîmon

[4] Ez her gav ji Xwedêyê xwe r’azî
me, gava nava duayêd xweda te
bîr tînim birayê Filîmon, [5] çimkî

* 1:2 Kolosî 4:17.

bona wê h’izkirina teye hindava
t’emamîya cime’ta Xwedêda û
bawerîya teye hindava Xudan
Îsada dibihêm. **6** Ez dua dikim,
wekî heleqetîya teye t’evî me,
nava bawerîyêda[f] me bigihîne wê
zanebûna k’ûr, ya ku hindava her
tiştêd meye qence t’evî Mesîh e.
**7** Bona wê h’izkirina dilê teda bi-
rayo, ez gelekî şa bûm û bîna min
fire bû, ku dilê cime’ta Xwedê pê
te r’ih’et bûye.

### Hîvîkirina Pawlos bona Onîsîmoyê xulamê Filîmon

**8** Bona vê yekê bi Mesîh çawa
bira, min dikaribû turuş kira,
e’mirî ser te bikira, çi ku cayîz bû,
**9** lê ji dest h’izkirinê, hîvî dikim.
Ez çawa Pawlosekî kal û niha jî
bona Mesîh Îsa girtî, **10** bona la-
wê xwe Onîsîmo hîvî ji te dikim,
yê ku qeydê minda çawa kur’ek
minr’a dinê k’et*. **11** Ew wextekê
kêrî te nedihat, lê niha hin kêrî
te tê, hin jî kêrî min*.

**12** Ez wî paşda dişînime cem te,
ew cegera min e. **13** Min dixwest ew
cem xwe bihişta, ku dewsa te ber
destê min bûya, h’eta ku ez bona
Mizgînîyê qeydada me. **14** Lê bêyî
te min nexwest tiştekî bikim, ku
qencîya te usa nebe, çawa borcek
kiribine stûyê te, lê bi r’ezedilîya
te be. **15** Belkî bona vê yekê ew
wextekê ji te dûr k’et, ku ew her
t’im bibe p’ara te, **16** ne ku çawa
xulam, lê ji xulamekî zêdetir e,
çawa birakî delal! Bona min ew
çiqasî delal e, lê bona te ewê hê
zêde be, hin alîyê xulamtîyêda,
hin jî alîyê Xudanda.

**17** Awa heger tu min çawa hevalê
xwe h’esab dikî, wî usa qebûl ke,
çawa min. **18** Heger ewî neheqîk jî
li te kiribe, yan tiştekî deyndarê
te be, ser min h’esab ke. **19** Ez
Pawlos bi destê xwe dinivîsim:
Ezê li te veger’înim (lê ez bi vê
yekê naxwazim bêjime te, ku tu
jîyîna xweva deyndarê min î.)
**20** Niha, birayê minî ji Xudanda,
vê qencîyê bona min bike, bona
xatirê Mesîh dilê min r’ih’et ke.
**21** Ez guhdarîya teda guman bûm,
lema jî min ev yek ter’a nivîsî,
çimkî ez zanim tê ji gotina min
zêdetir bikî.

### Gotinêd axirîyê

**22** Pêştirî vê yekê jî, minr’a cîkî
mayînê hazir ke, çimkî gumana

* 1:10 Kolosî 4:9.

* 1:11 «Onîsîmo» bi zimanê yûnanî tê fe’mkirinê: «Kêrhatî».

min heye, ku Xwedêyê caba dua-
yêd we bide, min paşda bide we.
23 Êpafrasê bona navê Mesîh
Îsayî t'evî min girtî, te silav dike,
24 usa jî Marqos, Erîstarxo, Dîmas
û Lûqa, heval-xebatêd min.
25 K'erema Xudan Îsa Mesîh
t'evî r'uh'êd we be.

# NE’MA ÎBRANÎYAR’A

## Pêşgotin

Navê nivîsk’arê vê ne’mê îro ne e’yan e. Gelek zane şikê dibine ser Apolo (K’arêd Şandîya 18:24; 19:1). Usa jî ne e’yan e, evî nivîsk’arî ne’ma xwe k’îjan civînêr’a[f] nivîsîye, lê bi vê ne’ma xwe berbir’î k’omeke bawermenda dibe, k’îjan ku gerekê hêdî-hêdî pêşda biçûna, lê ew nava qezî û oxirmêd giranda bûn, hindik mabû ku destê xwe ji bawerîya[f] xwe bikirana yan fikirê xwe hindava Îsa Mesîhda biguhastana.

Xudanê ne’mê dinivîse û dil dide ber wan, ku nava bawerîya xweda bimînin, usa jî dide k’ifşê, ku Îsa Mesîh r’ast mîna heyîntîya Xwedê ye û wek’îltîya wîye xilazîyê ye. Ew ser sê pirsêd r’astîyê disekine:

**1.** Îsa Kur’ê[f] Xwedayî h’eta-h’etayê ye, ku êlimîya[f] Xweye hindava Bavêda[f] bi cefêd Xwe da k’ifşê. Îsa ne ku t’enê ji p’êxemberêd Peymana[f] Kevin mestir e, lê ji milyak’eta[f] û Mûsa[f] jî mestir e.

**2.** Îsa ji Xwedêda çawa k’ahînê[f] h’eta-h’etayê k’ifşkirî ye, ew ji k’ahînêd Peymana Kevin mestir e. Wî bi carekê bona her t’im bedena Xwe kire qurban[f] û îdî ew qurbanêd Peymana Kevindaye bêh’esab berga tiştekî negirtin.

**3.** Bawermend t’enê bi destê Îsa dikare ji gune[f], tirsê û mirinê xilaz[f] be. Îsa jî çawa serekk’ahînê r’ast xilazbûna r’ast dide, ku ev yek Peymana Kevinda bi sûretî (sîmvolî) dihate kirinê, awa gotî ew h’ebandin û qurbandayînêd ku berî hatina Mesîh dikirin, şe’detîya Îsa Mesîh didan.

Nivîsk’arê vê ne’mê ji t’arîxa Îsraêlê[f], çawa t’erzêd bawerîyê hineka bîr tîne (serê 11-a) û bi vê dixwaze bêje xwendevana, ku hindava Mizgînîya Îsada amin bimînin. Serê 12-da bi dilekî şewat dibêje, ku usa h’eta axirîyê amin bimînin û ç’e’vê xwe ji Mesîh nebir’in, lê nava her cûr’e te’lî-tengîyada û hêsîrî-belengazîyada teyax kin. Ne’mê bi şîreta û silava xilaz dike.

**Serecema fikira ne'mê**

Pêşgotin: Mesîh e'yanbûna Xwedêye t'am e (1:1-3)
Mesîh ser milyak'etar'a ye (1:4–2:18)
Mesîh ser Mûsa[f] û Yêşûr'a[f] ye (3:1–4:13)
K'ahîntîya Mesîh ser her k'ahîntîyêr'a ye (4:14–7:28)
Peymana Mesîh ser her peymanar'a ye (8:1–9:28)
Mesîh qurbana ser qurbanar'a ye (10:1-39)
Bawerî (11:1–12:29)
Çawa meriv[f] li Xwedê xweş bê (13:1-19)
Duayê xilazîyê (13:20-21)
Paşgotin (13:22-25)

## Xwedê bi Kur'ê Xwe xeber dide û Kur' ji milyak'eta mestir e

1 1 Gelek cara û bi gelek cûr'a
Xwedê pêşda pê p'êxembera
kal-bavêd mer'a xeber daye, 2 lê
van r'ojêd axirîyêda pê Kur'ê[f] Xwe
mer'a xeber da, K'îjan ku k'ifş
kir, wekî axirîyê bibe xweyîwarê
her tiştî û bi Wî jî e'rd û e'zman
e'firand. 3 Ew nûra* r'ûmeta Xwe-
dê ye, xût mîna heyîntîya Wî ye,
Ew bi qewata xebera Xwe her tiştî
xwey dike. Gava Ewî mecala şûş-
tina gunêd meriva[f] hazir kir**, li
jor herema[f] mezinayîya Xwedêye
r'astê r'ûnişt. 4 Kur' haqasî ji mil-
yak'eta[f] jortir k'et, çiqasî ew navê
ku Wî stand ji navêd wan mestir
e. 5 Çimkî Xwedê t'u milyak'etîr'a
aha negotîye:

«Tu Kur'ê Min î,
Tu îro Minr'a bûyî»*
û dîsa:
«Ezê bavê Wî bim,
Ewê jî Kur'ê min be»**.

6 Û gava Xwedê nixurîyê Xwe di-
şîne dinyayê, aha jî dibêje:

«Bira h'emû milyak'etêd Xwedê
serê xwe ber Wî daynin»*.

---

* 1:3 Bi gotineke din: «R'onayî».
** 1:3 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Gava Ewî em ji gunêd me şûştin».
* 1:5 Zebûr 2:7.
** 1:5 P'adşatî II, 7:14.
* 1:6 Qanûna Ducarî 32:43; Zebûr 97:7 (welger'andina Peymana Kevine yûnanî).

7 Lê bona milyak'eta aha dibêje:
«Ew milyak'etêd Xwe dike ba
û berdestîyêd Xwe alava êgir»*.
8 Lê belê bona Kur' Xwedê dibêje:
«T'extê Te Xwedêyo, t'extê h'eta-h'etayê ye,
şiva p'adşatîya Te şiva heqîyê ye.
9 Tu heqîyê h'iz dikî û dijenî neheqîyê,
lema jî Xwedêyo, Xwedêyê Te Tu bi r'ûnê şabûnê r'ûnkirî,
ji hevalêd Te zêdetir»*.
10 Û aha jî dibêje:
«Ya Xudan[f], Te pêşîyê h'îmê dinyayê danî
û e'zman kirêd destêd Te ne.
11 Ewê wêran bin her'in, lê Tê bimînî,
h'emûyê mîna cila bip'izinin.
12 Tê wan hev bip'êç'î mîna qap'ût,
mîna k'inca wê bêne guhastinê.
Lê Tu dîsa Ew î
û salêd Te wê kêm nebin»*.
13 K'îjan milyak'etîr'a Xwedê gotîye:
«K'êleka[f] Mine r'astê r'ûnê,
h'eta Ez neyarêd Te bikime binê p'îyêd Te»?*
14 Îdî milyak'et[f] çi ne? Ew h'emû
jî r'uh'êd berdestî ne, ku bona
xizmetk'arîya wan têne şandinê,
yêd ku xilazbûnê[f] wê war bin.

## Miqatî xwe bin, ku xilazbûna mezin war bin

2 1 Bona vê yekê gerekê em hê
gelekî guh bidine wan tiştêd
me bihîstine, wekî em ji wan nexa-
lifin. 2 Çimkî heger ew xebera pê
milyak'eta hate gotinê h'îmgirtî
ma û h'emû neheqîyê û bêêlimîyê
heqê xwe r'ast standin, 3 lê emê
çawa xwe xilaz[f] kin heger em guh
nedine wê xilazbûna mezin? Bona
vê xilazbûnê Xudan pêşda danna-
sîn kir û yêd ku dengê Wî bihîstin
meva e'seyî kirin. 4 Serda jî Xwedê
bi nîşana, k'eremeta, cûr'e-cûr'e
kirêd qewat û p'êşk'êşêd[f] R'uh'ê[f]
Pîroze belakirî şe'detî da, çawa
ku e'mirê Wî bû.

## Yê ku me berbi xilazbûnê dibe

5 Xwedê ne ku milyak'et kirine
serwêrêd wê dinya ku wê bê, ser
k'îjanê em xeber didin. 6 Lê ni-
vîsar cîkî şe'detîyê dide û dibêje:

* 1:7 Zebûr 104:4 (welger'andina Peymana Kevine yûnanî).
* 1:9 Zebûr 45:6-7.
* 1:12 Zebûr 102:25-27.
* 1:13 Zebûr 110:1.

«Ya Xwedê, însan çi ye ku wî
bîr tînî,
yan bendê vê dinê* ku bona
wî xem dikî?
7 Te hinek wext* ew ji milyak'eta
nimiztir kir,
bi r'ûmet û hurmetê ew t'ac
kir,
8 h'emû tişt kirine binê nigêd
wî»*.
Awa Yê ku her tişt kirine binê ni-
gêd wî**, tiştek nehişt ku nekiribe
binê niga. Lê niha em hê her tiştî
binê nigêd însênda nabînin. **9** Lê
em niha Îsa bi r'ûmet û hurmet
k'ofî li sêrî dibînin, Yê ku hinek
wext bona cefê mirinê ji milya-
k'eta hatibû nimizkirinê, wekî
bi k'erema[f] Xwedê bona h'emûya
mirin bidîta. **10** Belê hêja bû ku
Xwedê, Yê ku her tişt bona Xwe
e'firandîye û bi destê Xwe xwey
dike R'êberê xilazbûna wan bi
cefa k'amil bikira*, wekî gelek
law t'evî r'ûmeta Îsa bikirana.
**11** Ewê ku pîroz[f] dike û ewêd ku
pîroz dibin, ev h'emû jî ji Bavekî[f]
ne. Lema Ew vê yekêda şermîyê
nabîne, ku wan xûşk-birayêd Xwe
h'esab ke **12** û dibêje:
«Derheqa navê Teda Ezê
xûşk-birayêd Xwer'a bêjim,
civînêda[f] Ezê eşqî Te bistrêm»*.
**13** Û aha jî dibêje:
«Ezê gumana Xwe bidime ser
Xwedê»*.
Û aha jî:
«Va me Ez û ew zar'êd ku
Xwedê dane Min»**.
**14** Çawa ku zar' xûn û goşt in,
Îsa Xwexa jî bû mîna wan, k'ete
binyat'a merivayê[f], wekî bi vî awayî
pê mirina Xwe, yê ku h'ukumê wî
ser mirinê heye unda ke, awa gotî
mîrêcin[f] **15** û yêd ku t'emamîya
e'mirê xweda hêsîrêd tirsa mirinê
bûne xilaz ke. **16** Belê fe'mdarî ye,
ku Ew alîk'arîya milyak'eta na-
ke, lê alîk'arîya zur'eta Birahîm[f]
dike. **17** Lema jî Îsa gerekê bi her

---

* 2:6 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Kur'ê[f] mêriv».
* 2:7 Aha jî tê fe'mkirinê: «Te ew hinekî ji milyak'eta nimiztir kir», usa jî r'êza 9-da.
* 2:8 Zebûr 8:4-6.
** 2:8 «Wî» tê fe'mkirinê «bendêd dinê» yan jî «Îsa».
* 2:10 Aha jî tê fe'mkirinê: «Bi cefa bigihîşta», awa gotî «mezin bûya».
* 2:12 Zebûr 22:22.
* 2:13 Îşaya 8:17.
** 2:13 Îşaya 8:18.

alîyava bibûya mîna xûşk-bira,
ku bibûya serekk'ahînekî[f] r'e'm
û amin li xizmetk'arîya ber Xwe-
dêda, wekî gunêd cime'tê bida
k'ewandinê[f]*. 18 Çawa Ewî cefa
k'işand, hate cêr'ibandinê[f], usa
jî dikare alîk'arîya wan bike, yêd
ku dik'evine nava cêr'ibandinê.

### Îsa ji Mûsa mestir e

3 1 Awa xûşk-birayêd pîroz,
hûn ku heval-p'arêd wê ga-
zîya e'zmên in, li Îsa binihêr'in,
Wî şandîyî[f] û Serekk'ahînê ku em
îqrar[f] dikin. 2 Ew hindava Xwe-
dêda amin bû, Yê ku Ew bona
vê yekê k'ifş kir, çawa Mûsa[f] jî
t'emamîya mala Wîda amin bû*.
3 Belê Îsa haqasî ji Mûsa zêdetir
hêjayî r'ûmetê bû, çiqasî qedirê
yê ku malê çêdike, ji qedirê ma-
lê zêdetir e. 4 (Fe'mdarî ye, her
malek bi destê yekî tê çêkirinê, lê
yê her tişt e'firandîye, Xwedê ye.)
5 R'ast e Mûsa t'emamîya mala
Wîda xulamekî amin bû, bona
şe'detîya wan tiştêd ku Xwedê
wê bigota. 6 Lê Mesîh çawa kur'
hindava mala Xwedêda amin bû.
Û ew mala Wî em in, heger em
wê e'gîtîyê û gumana ku em pê
difir'in qewîn bigirin.

### Bona cime'ta Xwedê r'ih'etîk heye

7 Bona vê yekê çawa R'uh'ê
Pîroz dibêje:

«Îro heger hûn dengê Wî bi-
bihên,
8 mîna kal-bavêd xwe serh'işk
nîbin,
çawa ku wana serî hilda, gava
ber'îyêda[f] hatine cêr'iban-
dinê,
9 wê dera ku kal-bavêd we bi
qelpê xirab Ez cêr'ibandim
û t'emamîya çil salî jî kirêd
Min dîtin.
10 Lema jî h'îlê Min ji wî nisilî[f]
çû
û Min got: ‹Dilada t'imê ew
xalifî[f] ne
û r'îya Min nas nekirine›.
11 Awa Min jî ji hêrsa sond xwar
got:
‹T'u car ewê nek'evine r'ih'e-
tîya Min!›»*

12 Haş ji xwe hebin xûşk-bira-
no, nebe ku nava we yekîda dilekî
xirab û nebawer hebe, ku pişta

* 2:17 Bi gotineke din: «Afûkirinê» yan «baxşandinê».
* 3:2 Jimar 12:7.
* 3:11 Zebûr 95:7-11. Van r'êza jî bixûnin: Derk'etin 17:1-7; Jimar 20:1-13.

xwe bide Xwedêyê sax. 13 Lê her
r’oj dil bidine hev, h’eta ku nivî-
sarêda bona me «îro» heye, wekî
ji we t’u kes bi guna nexape, nebe
serh’işk. 14 Çimkî em t’evî Mesîh
bûne xweyîp’ar, heger t’enê em wê
bawerîyê[f] ji serîda h’eta xilazîyê
qewîn bigirin. 15 Awa çawa jor
hate gotinê:

> «Îro heger hûn dengê Wî bi-
> bihên,
> serh’işk nîbin,
> çawa wextê serhildanêda»*.

16 Ew k’î bûn, yêd ku bihîstin
û serî hildan? Ew h’emû nîbûn,
yêd ku bi destê Mûsa ji Misirê[f]
derk’etibûn? 17 Çil salî h’îlê Xwedê
ji k’ê çû? Ne ji wan çû, yêd ku gu-
ne[f] kirin, cinyazêd wan ber’îyêda
man? 18 Û Xwedê bona k’ê sond
xwar ku nek’evine r’ih’etîya Wî,
heger ne bona neêlima*?** 19 Îdî
em dibînin ku evana ji dest neba-
werîya xwe nikaribûn bik’etanayê.

# 4

1 Awa ew sozê ku bona k’etina
nava r’ih’etîya Wî hê dimîne,
lema gerekê em haş ji xwe hebin,
ku ji we t’u kes ji wê r’ih’etîyê ne-
mîne. 2 Çimkî mer’a jî ew Mizgînî
hate dayînê, çawa wanr’a. Lê belê
ew Mizgînîya ku wan bihîst k’ar
neda wan, çimkî ew yek bawerî-
yêva girê nedan. 3 Lê em ku bawer
dikin, emê bik’evine wê r’ih’etîyê.
Ev yek aha ye, çawa ku Xwedê got:

> «Awa Min ji hêrsa sond xwar
> got:
> ‹T’u car ewê nek’evine r’ih’etîya
> Min!›»*

Lê Ewê ku ev yek got, şixulêd
Wî ji wextê e’firandina dinyayê-
da xilaz bibûn. 4 Cîkî bona r’oja
h’efta aha hatîye gotinê: «Û Xwedê
r’oja h’efta ji h’emû şixulêd Xwe
r’ih’et bû»*. 5 Û li vir dîsa dibêje:
«T’u car ewê nek’evine r’ih’etîya
Min»*. 6 Awa hinekê bik’evine wê
r’ih’etîyê, lê ewê ku pêşda mizgî-
nî bihîstibûn ji dest nebawerîyê*
nek’etinê. 7 Bona vê yekê Xwedê
r’ojeke din k’ifş dike û dibêje «îro»,
pey gelek wextar’a, çawa bi zarê[f]
Dawid[f] jor hate gotinê:

---

* 3:15 Zebûr 95:7-8.
* 3:18 Aha jî tê fe’mkirinê: «Nebawera».
** 3:16-18 Jimar 14:1-35.
* 4:3 Zebûr 95:11.
* 4:4 Destpêbûn 2:2.
* 4:5 Zebûr 95:11.
* 4:6 Aha jî tê fe’mkirinê: «Neêlimîyê».

«Îro heger hûn dengê Wî bi-
bihên,
serh’işk nîbin»*.
8 Heger Yêşû[f] r’ih’etî dabûya wan,
îdî Xwedê wê pey wê yekêr’a bona
r’ojeke din xeber neda. 9 Awa bona
cime’ta Xwedê hê r’ojeke r’ih’etîyê
mîna r’oja şemîyê heye. 10 Belê
ewê ku dik’eve r’ih’etîya Xwedê,
ew îdî ji şixulêd xwe r’ih’et dibe,
çawa Xwedê jî ji şixulêd Xwe*.
11 Awa em bikin ku bik’evine wê
r’ih’etîyê, wekî t’u kes mîna ne-
bawerîya* wan nek’eve r’oja wan.
12 Xebera Xwedê sax û zor e û
ji her şûrê dudevî bir’atir e, ku
derbazî h’eta navbera r’uh’ û can,
hestû û mejû dibe, nêt û fikirêd
dila jî e’nene dike. 13 Û t’u e’firîn
ji Wî veşartî nîne, lê her tişt li ber
ç’e’vê Wî vekirî û aşkere ye, ku li
ber K’îjanî emê h’esabê xwe bidin.

**Îsa serekk’ahînê ser h’emûyar’a ye**

14 Awa ku Serekk’ahînekî meyî
mezin heye, ku e’zmanar’a derbaz
bûye, Îsayê Kur’ê[f] Xwedê, de we-
rin em wê bawerîya ku îqrar dikin
qewîn bigirin. 15 Serekk’ahînekî[f]
meyî usa t’une, ku bêt’aqetîyêd
meda dilê Wî ser me neşewite, lê
Ew ji h’emû alîyada cêr’ibandî ye
mîna me, lê t’enê bêgune. 16 De
îdî em mêrk’îmî nêzîkî t’extê
Xwedêyî k’eremê bin, wekî r’e’mê
bistînin û k’eremê bibînin ku gava
em h’ewce bin, alîk’arîya me bike.

# 5

1 Her serekk’ahînek ji nav
meriva tê bijartinê û k’ifşki-
rinê, ku bona meriva li ber Xwedê
bisekine, wekî h’edî[f] û qurbana[f] ber
guna bide. 2 Ew çawa însan dikare
bi dilê şewat k’omeka wanr’a be,
yêd ku nezan û xalifî ne, çimkî
ew xwexa jî nava bêt’aqetîyada
ye. 3 Lema gerekê ew çawa bona
cime’tê, usa jî bona xwe qurbana
bona guna bide*. 4 Kesek xwese-
rîxwe vî qedirî nastîne, lê t’enê
ewê ku ji Xwedêda tê gazîkirinê,
çawa Harûn[f] bû*.
5 Usa jî Mesîh, ne ku Xwexa Xwe
bilind kir ku bibe serekk’ahîn, lê
Xwedê Ew bilind kir û Wîr’a got:

* 4:7 Zebûr 95:7-8.
* 4:10 Destpêbûn 2:2.
* 4:11 Aha jî tê fe’mkirinê: «Neêlimîyê».
* 5:3 Qanûna K’ahîntîyê 9:7.
* 5:4 Derk’etin 28:1.

«Tu Kur'ê Min î,
Tu îro Minr'a bûyî»*.
6 Çawa cîkî din jî dibêje:
«Tu h'eta-h'etayê K'ahîn î,
mîna Melk'î-Sadiq[f]»*.
7 Îsa jîyîna Xweye vê dinyayêda
gelekî k'eser û bi hêsira lava û
r'eca ji Wî dikirin, Yê ku dika-
ribû Ew ji mirinê xilaz bikira û
bona milûktî û êlimîya[f] Wî hate
bihîstinê*. 8 R'ast e Ew Kur'ê
Xwedê bû, lê dîsa bi wan cefayêd
Xwe guhdarîyê hîn bû. 9 Gava wê
yekêda hate k'amilkirinê, bona
h'emûyêd ku guhdarîya Wî di-
kin, Ew bû kanîya xilazbûna
h'eta-h'etayê 10 û ji Xwedê hate
navkirinê «Serekk'ahînê mîna
Melk'î-Sadiq».

### Haş ji xwe hebin ku ji bawerîyê nek'evin

11 Bona vê yekê gelek tiştêd
meye gotinê hene, lê şirovekiri-
na van ze'met e, çimkî guhada
hûn giran bûne. 12 R'astîyê k'eve
h'eta niha gerekê hûn dersdar
bûna, lê hûn hê h'ewce ne ku ji
gotinêd Xwedê dersêd pêşine sade
hîn bin. Hûn hela hê h'ewcê şîr
in, ne ku xwarina giran. 13 Ewê
ku şîrxur e, ew nikare hînkirina
heqîyê bimeh'îne, çimkî dergûş e.
14 Lê xwarina giran bona merivêd
gihîştî ye, yêd ku sewdayê xweda
k'etî-r'abûyî ne, qencî û xirabîyê
ji hev derdixin.

## 6

1 Awa em hînbûnêd pêşine
ser Mesîh alîkî bihêlin, bêne
ser hînbûna gihîştî. Em dîsa h'îm
nevêjin neyêne ser veger'andina[f] ji
wan kirinêd ku dibine berbi mirinê,
Xwedêbawerkirinê, 2 hînbûna ser
nixumandina[f], destdanînê, r'abû-
na mirîya û dîwana h'eta-h'etayê.
3 Emê bi destûra Xwedê hînbûna
gihîştîda pêşda her'in!
4 Çimkî yêd ku carekê hatine
r'onayîkirinê, p'êşk'êşa e'zmên
te'm kirine û R'uh'ê Pîroz p'ar
standin, 5 usa jî xebera Xwedêye
qenc û qewatêd dinya wê bê te'm
kirine, 6 heger ew ji wê bawerîyê
bik'evin, îdî nabe ku ewana dîsa
veger'in ser xweda bên, çimkî
ewana careke din Kur'ê Xwedê nav
xweda* xaç[f] dikin û dikine sosret.

---

* 5:5 Zebûr 2:7.
* 5:6 Zebûr 110:4.
* 5:7 Metta 26:36-46; Marqos 14:32-42; Lûqa 22:39-46.
* 6:6 «Nav xweda» aha jî tê fe'mkirinê: «Xwexa» yan «bi h'emdê xwe».

7 Ew e’rdê ku gelek cara baran
serda dibare, ava xwe distîne û
deremeta k’ar dide wan, bona
k’îjana tê bêcerkirinê, duayê Xwe-
dê tê ser wê. 8 Lê ewê ku dir’î û
stirîya digihîne, bêkêr e û hêjayî
nifir’ê ye, axirîya wê jî şewat e.

9 R’ast e em aha xeber didin
delalno, lê em weda guman in,
wekî hûn ser r’êke hê qenc in, ku
we dibe berbi xilazbûnê. 10 Xwedê
ser neheqîyê nîne, wekî kirêd we
û ew h’izkirina ku we bona navê
Wî da k’ifşê bîr bike, ya ku we
cime’ta Xwedêr’a xizmetk’arî kir û
dikin jî. 11 Lê em muh’tac in we-
kî ji we her yek h’eta xilazîyê wê
xîretê bide k’ifşê, ku gumana we
h’îmgirtî bimîne. 12 Em naxwazin
ku hûn xwer’anedîtî bin, lê ç’e’v
bidine wan, yêd ku bi bawerîyê
û sebirê sozêd Xwedê war dibûn.

### Sozê Xwedêye e’seyî

13 Gava Xwedê soz da Birahîm,
Ewî bi serê Xwe sond xwar, çimkî
kesekî ji Wî mestir t’unebû ku bi wî
sond bixwara. 14 Hingê got: «R’ast
Ezê zur’eta te gelekî berek’et kim,
Ezê te p’ir’ zêde kim»*. 15 Û bi
vî awayî Birahîm bi dûmika dirêj
gihîşte sozê Xwedê. 16 R’ast e me-
riv pê serê yê ji xwe mestir sond
dixwin û sond h’emû şer’-de’wê
nava wanda safî dike. 17 Bi vê
yekê Xwedê xwest wanar’a, yêd
ku wê soz jê bistandana hê bida
k’ifşê, ku ew qirara Xwe naguhê-
ze, îdî sozê Xwe bi sondxwarinê
şidand. 18 Awa îdî du tişt hene,
soz û sondê Xwedêye ku nayêne
guhastinê, k’îjanada nabe ku ew
derew derê. Van her du tiştada
dildayîneke meye e’seyî heye,
ku em lê sit’ar bûne, lema jî em
dikarin xwe bavêjine wê gumana
pêşîya xwe*. 19 Eva gumana bona
jîyîna me dibe lengereke h’îmgir-
tî û amin, ku p’er’da pîrozgeha
e’zmênr’a derbazî hindur’ê Cîyê
Herî Pîroz dibe, 20 wê dera ku Îsa
çawa pêşîk’êş bona me k’etîyê. Ew
bûye serekk’ahînê h’eta-h’etayê
mîna Melk’î-Sadiq*.

### Melk’î-Sadiqê k’ahîn

7
1 Melk’î-Sadiq* p’adşayê
Şelîmê bû, k’ahînê Xwedêyê

* 6:14 Destpêbûn 22:16-17.
* 6:18 Jimar 23:19.
* 6:20 Zebûr 110:4.
* 7:1 Destpêbûn 14:17-20.

Herî Jorin. Gava Birahîm ji p'adşa
qir'kirinê vediger'îya, Melk'î-Sa-
diq pêşîya wîda çû û dua li wî
kir. 2 Birahîm jî ji h'emû t'alanê
xwe dehek[f] da wî. (Pêşîyê navê
Melk'î-Sadiq şirovedibe: «P'adşê
Heqîyê» û alîkî dinva jî ew «P'adşê
Şelîmê*» bû, awa gotî navê wî tê
fe'mkirinê «P'adşê E'dilayîyê».)
3 Ew bê bav, bê dê û bê r'ik'inyat
bû, ne r'oja bûyîna wî e'yan bû,
ne jî xilazîya e'mirê wî. Ew mîna
Kur'ê Xwedê bû û t'imê k'ahîn
dimîne.

4 Awa dîna xwe bidinê, ku ew
yekî çawayî mezin bû, ku Birahîmê
bave'şîr jî ji t'alên dehek dayê. 5 Û
zur'eta Lêwîye[f] ku dibine k'ahîn,
bona wan t'emî Qanûnêda heye
ku ji cime'tê dehekê bistînin, awa
gotî ji miletê xwe, heger ew bedena
Birahîm in jî*. 6 Lê Melk'î-Sadiq
ne ji r'ik'inyata Lêwî bû, ewî ji
Birahîm jî dehek stand û dua li
wî kir, yê ku ji Xwedê soz stan-
dibû. 7 Eva yeka fe'mdarî ye, ku
yê biç'ûk ji yê mezin dua-dirozga
distîne. 8 Vî alîyê k'ahîntîyêda,
merivêd ku dimirin dehekê dis-
tînin, lê alîyê Melk'î-Sadiq, yê
ku dehekê distîne bona wî nivîsar
dibêje, ku ew sax e. 9 Û h'eta em
dikarin vê yekê jî bêjin, Lêwîyê
ku zur'eta wî dehekê hildide, wî
xwexa jî bi destê Birahîm dehek
da Melk'î-Sadiq. 10 Çimkî ew hê
bedena bavê xweda bû, gava Mel-
k'î-Sadiq pêşîya wîda çû.

## Îsa çawa serekk'ahînê h'eta-h'etayê mîna Melk'î-Sadiq

11 Awa heger k'amilbûn bi destê
k'ahîntîya lêwîya bibûya, (çawa
cime'ta Îsraêlê ser wî h'îmî Qa-
nûn standibû), îdî çi lazim bû ku
k'ahînekî din mîna Melk'î-Sadiq
r'abûya û ne ku mîna Harûn?
12 Çimkî gava k'ahîntî tê guhastinê,
gerekê qanûn jî bê guhastinê. 13 Û
bona k'îjanî ku ev yek tê gotinê,
ew ji qebîleke din bû, ji k'îjanê
t'u kesî gorîgehêr'a[f] xizmetk'arî
nekirîye. 14 Û çawa e'yan e Xudanê
me ji qebîla Cihûda[f] bû û Mûsa
derheqa k'ahîntîya wê qebîlêda
t'u tişt negotîye.

15 Û eva hela hê e'yan e, gava
k'ahînekî din mîna Melk'î-Sa-
diq r'adibe, 16 yê ku ne alîyê

* 7:2 «Şelîm» bi zimanê îbranî[f] tê fe'mkirinê «e'dilayî». Şelîm xwexa navê bajarê Orşelîmêyî[f] kevin e.
* 7:5 Jimar 18:21.

qeyde-qanûna pirsa zur'etîyêda
bû k'ahîn, lê alîyê qewata jîyîna
ku xilazîya wê t'une. 17 Çimkî
nivîsar şe'dê vê gotinê ye ku: «Tu
h'eta-h'etayê K'ahîn î, mîna Mel-
k'î-Sadiq»*. 18 Awa t'emîya pêşin
ji dest sistî û bêkêrîya wê hate be-
talkirinê, 19 çimkî Qanûna Mûsa
t'u tişt k'amil nekir, lê dewsa wê
gumaneke hê qenc k'ete navê, bi
k'îjanê em nêzîkî Xwedê dibin.

20 Serda jî Îsa bê sond nebû
k'ahîn! Ewêd din bê sond bûne
k'ahîn, 21 lê eva bi sond, bi destê
Xwedê bû k'ahîn gava Wîr'a got:
«Xudan sond xwar û îdî ji gotina
Xwe venager'e: Tu h'eta-h'eta-
yê K'ahîn î»*. 22 Dest vê sondê
jî Îsa wek'îltîyê peymaneke[f] hê
qenc dike*.

23 Usa jî gelek k'ahîn hebûne,
çimkî mirinê nehiştîye ku ewana
t'imê bimana. 24 Lê k'ahîntîya Evî
xilaz nabe, çimkî Ew h'eta-h'etayê
dimîne. 25 Bona vê yekê Ew her
gav* dikare wan xilaz ke, yêd ku
bi destê Wî nêzîkî Xwedê dibin,
çimkî Ew t'imê sax e, ku bona
wan lava-navçêtîyê bike.

26 Awa hema mer'a r'ast serek-
k'ahînekî aha lazim bû, pîroz,
bêsûc, bêqusûr, ji gunek'ara[f] cu-
debûyî û ji e'zmana jortir çûyî.
27 Îsar'a ne lazim e ku Ew her
r'oj mîna serekk'ahînêd mayîn
pêşîyê bona gunêd xwe û paşê
bona gunêd cime'tê qurbana bi-
de. Ewî ev yek carekê bona her
t'im kir, çaxê Xwe kire qurban*.
28 Qanûna Mûsa merivê bêt'aqet
dike serekk'ahîn, lê sonda Xwedêye
ku pey Qanûnêr'a hat Kur' dike
serekk'ahîn, Yê ku h'eta-h'etayê
hate k'amilkirinê*.

### Îsa serekk'ahînê meyî mezin e

**8** 1 Fikira wan tiştêd me pêşda
gotin ev e: Serekk'ahînekî
meyî usa heye ku li e'zmana ser
t'extê mezinayîya Xwedêye r'astê
r'ûniştîye. 2 Ew çawa serekk'ahîn
pîrozgehêda berdestîyê dike, awa
gotî wî konê[f] r'astda, k'îjan ku
Xudan vegirt, ne ku meriva.

---

* 7:17 Zebûr 110:4.
* 7:21 Zebûr 110:4.
* 7:22 Aha jî tê fe'mkirinê: «Îsa garantîya peymaneke hê qenc e».
* 7:25 Aha jî tê fe'mkirinê: «Ew dikare wan lap xilaz ke».
* 7:27 Qanûna K'ahîntîyê 9:7.
* 7:28 Aha jî tê fe'mkirinê: «hate gîhandinê», çawa gihîştî. Îbranî 2:10; 5:8-9.

3 Her serekk’ahînek bona qur-
ban û h’edîdayînê k’ifşkirî ye,
awa gerekê tiştekî vî jî hebûya ku
bida. 4 Heger eva li ser dinê bûya,
wê nebûya k’ahîn jî, çimkî hene
k’ahîn ku anegorî Qanûnê h’edîya
didin. 5 Evana xizmetk’arîya xwe
pîrozgehêda dikin, ya ku mîna sî
û sûretê wan tiştêd li e’zmên e.
Çawa Mûsar’a hate e’mirkirinê,
gava ewî wê Konê[f] Şe’detîyê ve-
girta, wîr’a hate gotinê: «Dîna
xwe bidê, ku her tiştî wî cûr’eyî
bikî, çawa serê ç’îyê min nîşanî
te kir»*. 6 Lê r’ast xizmetk’arîke
hê bilind Îsar’a hate dayînê, çawa
ku Ew navçêtîyê peymaneke hê
qenc dike, çimkî ev peymana li
ser sozêd hê qenc h’îmgirtî ye.
7 Heger peymana pêşin bê kê-
masî bûya, îdî ya duda wê h’ewce
nîbûya. 8 Lê Xwedê cime’tê neheq
dike û dibêje:
«Va r’ojê bên, Xudan dibêje,
Ezê t’evî mala Îsraêl û t’evî
mala Cihûda peymaneke
nû girêdim,
9 lê ne mîna wê peymana ku Min
t’evî kal-bavêd wan girêda,
wê r’oja ku Min destê wan girt,
wekî ji Misirê derxim.
Ewana nava peymana Minda
neman,
Min jî destê Xwe ji wan k’işand,
Xudan dibêje.
10 Lê ev e ew peyman, ya ku Ezê
t’evî mala Îsraêl girêdim,
pey wan r’ojar’a, Xudan dibêje:
Ezê qanûnêd Xwe bikime h’işê
wan
û dilê wanda jî wan binivîsim
û Ezê Xwedêyê wan bim,
ewê jî cime’ta Min be.
11 Hingê t’u kes wê hevalê xwe
yan birayê xwe hîn neke
û nebêje: ‹Xudan nas bike›,
çimkî h’emû jî wê Min nas
bikin,
ji biç’ûkêd wan h’eta mezina.
12 Ezê neheqîyêd wan bibaxşînim
û gunêd wan jî îdî bîr neynim»*.
13 Gava Xwedê bona peymaneke
«nû» got, ya pêşin kevin kir û çi ku
kevin û pîr dibe, ber undabûnê ye.

### H’ebandina li e’zmên û ser dinyayê

**9** 1 R’ast e qeyde-qanûnêd h’e-
bandina peymana pêşin jî
hebûn û pîrozgeha vê dinyayê jî.
2 Kon bi du goza vegirtî bû: Ya
derr’a «pîrozgeh» digotin, têda

* 8:5 Derk’etin 25:40.
* 8:12 Yêremîya 31:31-34.

hebûn şemdan, sifre û nanê[f] Xwe-
dêr'a dayî*. 3 Ya hindur'da pişta
p'er'dê, jêr'a «Cîyê Herî Pîroz»
digotin*. 4 Têda bûn gorîgeha
zêr'în bona şewitandina bixû-
rê[f], Sindoqa[f] Peymanê, ya ku
der û hindur'va zêr'kirî bû. Wê
sindoqêda hebûn cêr'ê zêr'în bi
manava[f] t'ijî, şivdara Harûne ku
gul da û selêd kevirîye peymanê*.
5 Ser sindoqê, xêrûbêd[f] r'ûmeta
Xudan hebûn û ser cîyê ku gune
dihatine baxşandinê, dikirine sî.
Niha ne wext e ku em bona wan
bi hûr-gilî xeber din*.

6 Ev tişt aha cîkirî bûn. K'a-
hîn her gav dik'evine goza der,
xizmetk'arîya xwe dikin*. 7 Lê
goza hindur' salê carekê t'enê
serekk'ahîn dik'evê, lê ne bê xûn,
ya ku ji ber gunêd xwe û cime'-
têva dide, k'îjan ku ji bêfe'mîya
xwe dikirin*. 8 Bi vê yekê R'uh'ê
Pîroz dide k'ifşê, ku r'îya Cîyê
Herî Pîroz nevekirîye, h'eta ku
goza der heye. 9 Ev yek sûretek
e bona zemanê niha. Eva dide
k'ifşê, ku gava h'edî û qurban
têne dayînê, evana nikarin îsafa[f]
yêd ku dih'ebînin paqij kin, 10 lê
ev yek t'enê xwarin-vexwarinê
û cûr'e-cûr'e şûştin-veşûştinêd
qeyde-qanûnêva girêdayî ne. Ev
qeyde-qanûnêd dervayî ne, k'îjan
ku h'eta wî wextê ku qanûna nû
tê danînê dimînin.

11 Lê gava Mesîh hat, çawa Se-
rekk'ahînê tiştêd qence hatî, konê
hê mezin û k'amilr'a derbaz bû,
yê ku ne bi desta hatîye çêkirinê,
awa gotî ne ji vê dinyayê. 12 Ew ne
ku pê xûna canega û nêrîya, lê bi
xûna Xwe carekê bona her t'im
k'ete Cîyê Herî Pîroz û azabûna
h'eta-h'etayê dest anî. 13 Heger
xûna canega, nêrîya û k'ozîya[f]
nogina ku dir'eşandin, yêd ku li
gora e'det h'er'imî bûn, dervava
ew paqij dikirin*, 14 lê çiqas zêde
xûna Mesîh, ku bi destê R'uh'ê
h'eta-h'etayê Xwe çawa qurbana
bêqusûr da Xwedê, wê îsafa me ji

* 9:2 Derk'etin 25:31-40; Derk'etin 25:25-30.
* 9:3 Derk'etin 26:31-33.
* 9:4 Derk'etin 30:1-6; Derk'etin 25:10-16; Derk'etin 16:33; Jimar 17:8-10; Derk'etin 25:16.
* 9:5 Derk'etin 25, 26; Jimar 17:1-10.
* 9:6 Jimar 18:2-6.
* 9:7 Qanûna K'ahîntîyê 16.
* 9:13 Qanûna K'ahîntîyê 16:15-16; Jimar 19:9, 17-19.

kirêd ku em dibirine berbi mirinê
paqij bike, wekî em xizmetk'arîyê
Xwedêyê Saxr'a bikin?
15 Bona vê yekê Mesîh navçê-
tîya peymana nû dike, wekî yêd
gazîkirî wî warê h'eta-h'etayê bis-
tînin, k'îjan ku Xwedê soz daye,
çimkî mirina Wî bona azayîya ji
neheqîyêd wan bû, yêd ku dema
peymana pêşinda kiribûn.
16 Awa k'îderê wesîyat peyman-
kirî ye, gerekê li wir e'seyî wesî-
yatdar mirî be. 17 Çimkî wesîyat
pey mirina wesîyatdarr'a qewat
dike. H'ukumê wê t'une h'eta
ku wesîyatdar sax e. 18 Lema
peymana pêşin jî bê xûn neha-
te t'estîqkirinê. 19 Gava Mûsa
h'emû t'emîyêd Qanûnê gotine
cime'tê, hingê xûna canega û
nêrîya hilda t'evî avê kir, r'îsê
sorê gevez ç'iqilê zoxêva[f] kir, pê
wê r'eşande ser k'itêba Qanûnê
û cime'tê*, 20 got: «Ev e xûna wê
peymanê, ya ku Xwedê t'emî da
we»*. 21 Usa jî ew xûn r'eşande
ser kon û h'emû derdanêd[f] bo-
na h'ebandinê*. 22 Belê anegorî
Qanûnê p'ir'anîya her tiştî pê
xûnê paqij dibû û bêyî xûnr'êtin
baxşandin nedibû*.

## Qurbanbûna Mesîh guna hildide

23 Awa gerekê sûretêd tiştêd
e'zmana bi van kirina paqij bûna,
lê hema xût yêd e'zmana jî gerekê
bi qurbanêd ji van qenctir paqij
bûna. 24 Çimkî Mesîh ne ku k'ete
pîrozgeha pê desta çêkirî mîna
sûretê ya r'ast, lê hema xût k'ete
e'zmên, wekî niha bona me li
ber Xwedê bisekine. 25 Ne jî bona
ku gelek cara Xwe bikira qurban
dik'ete pîrozgehê, çawa ku se-
rekk'ahîn her sal ne bi xûna xwe
dik'evê. 26 Heger aha bûya, Ewî
gerekê gelek cara pey e'firandina
dinyayêr'a cefa bik'işanda. Lê
niha axirîya dewrada Ewî Xwe
da k'ifşê û carekê bona her t'im
pê xwequrbankirinê gune hildan.
27 Û çawa bona meriva qirarkirî ye,
carekê bimirin û paşê ber dîwanê
bisekinin*, 28 usa jî Mesîh carekê
bona gunehildana geleka qurban

* 9:19 Derk'etin 24:3-8.
* 9:20 Derk'etin 24:8.
* 9:21 Qanûna K'ahîntîyê 8:15.
* 9:22 Qanûna K'ahîntîyê 17:11.
* 9:27 Destpêbûn 3:19.

hate dayînê*. Û Ewê cara duda
ne ku bona gunehildanê k'ifş be,
lê bona xilazbûna wan, yêd ku
hîvîya Wî ne.

**Qurbanbûna Mesîh ser qurbanêd Qanûna[f] Mûsar'a ye**

**10** [1] Qanûn sîya wan tiştêd
qenc e, k'îjane ku tên, lê
ne xût mîna wan yeka ye. Bona
vê yekê Qanûn pê wan qurbanêd
ku her sal peyhev-peyhev têne da-
yînê nikare wan k'amil bike, yêd
ku bi qurbandayînê nêzîkî Xwedê
dibin. [2] Heger paqij bûna, wana wê
dest ji qurbandayînê bik'işanda,
çimkî bi carekê yêd xweyîqurban
wê bihatana paqijkirinê, ji wir
şûnda bona guna îsafa wan wê li
wan hilnehata[f]. [3] Lê ew qurban
her sal gunêd wan tînine bîra
wan. [4] Çimkî xûna canega û nê-
rîya t'u car nikare guna r'esît ke.
[5] Lema jî, gava Mesîh wê bihata
vê dinê, got:

«Te qurban û h'edî nexwestin,
lê Te bona Min qalibek hazir
kir.
[6] Dîyarîyêd[f] t'evayîşewatê û
qurbanêd ji ber gunava Te
xweş nehatin.
[7] Hingê Min got: ‹Va me ya
Xwedê, Ez hatim
e'mirê Te bînime sêrî[f],
çawa bona Min k'itêbêda ni-
vîsar e›»*.

[8] Pêşîyê dibêje: «Qurban û h'edî,
dîyarîyêd t'evayîşewatê û qurbanêd
ji ber gunava Te nexwestin û ew li
Te xweş nehatin» (lê ew anegorî
Qanûnê têne dayînê). [9] Paşê dibêje:
«Va me ya Xwedê, Ez hatim ku
e'mirê Te bînime sêrî». Ya pêşin,
Mesîh wêda davêje, ku ya duda
t'estîq ke. [10] Bi vî awayî Îsa Mesîh
e'mirê Xwedê anî sêrî, carekê bona
her t'im bedena Xwe kire qurban,
bi vê yekê em paqij kirin.

[11] Her k'ahînek, her r'oj nava
xizmetk'arîya xweda ye û gelek cara
xût wan qurbana dide, k'îjanêd ku
t'u car nikarin guna r'esît kin. [12] Lê
Evî k'ahînî t'enê carekê bona guna
qurban da û peyr'a h'eta-h'etayê
k'êleka Xwedêye r'astê r'ûnişt* **
[13] û ji wir şûnda hîvîyê ye, h'eta ku

---

* 9:28 Îşaya 53:12.
* 10:7 Zebûr 40:6-8.
* 10:12 Aha jî tê fe'mkirinê: «Lê evî t'enê carekê qurbaneke h'eta-h'etayê bona guna da û peyr'a k'êleka Xwedêye r'astê r'ûnişt».
** 10:12 Zebûr 110:1.

dijminêd Wî bin p’îyêd Wîda bêne
danînê. 14 Bi qurbanekê Ewî yêd
ku paqij dibin h’eta-h’etayê k’amil
kirin. 15 R’uh’ê Pîroz jî şe’detîyê
dide me. Pêşîyê dibêje:

16 «Ev e ew peyman, ya ku Ezê t’evî wan girêdim,
pey wan r’ojar’a, Xudan dibêje.
Ezê qanûnêd Xwe bikime dilê wan
û h’işêd wanda wan binivîsim»*.

17 Paşê dibêje: «Ezê gune û nehe-
qîyêd wan îdî bîr neynim»*. 18 Û
ew dera ku baxşandin heye, îdî
bona guna h’edî kêr nayê.

### De bira em nêzîkî Xwedê bin

19 Awa xûşk-birano, bi saya
xûna Îsa em dikarin mêrk’îmî
bik’evine Cîyê Herî Pîroz, 20 wê
r’îya nûye saxr’a, ya ku Ewî bo-
na me nava wê p’er’dêr’a vekir,
awa gotî bi bedena Xwe. 21 Awa
ku K’ahînekî meyî mezin heye
ser mala Xwedê, 22 em dikarin
bi dilê r’ast nêzîkî Xwedê bin,
bawerîyêva t’ijî, îsafa xweda bi
xûnr’eşandinê ji xirabîyê paqij-
bûyî û qalibê xwe jî pê ava zelal
şûştî*. 23 De em wê gumana ku
em îqrar dikin qewîn bigirin û ji
cî neh’ejin, çimkî amin e, Ewê
ku soz daye. 24 Û bira em bona
hevdu xem bikin, wekî h’izkirinê
û qencîkirinêda hêlana bidine
hev. 25 Bira em dest ji lihevcivînê
nek’işînin, çawa ku hineka xwer’a
kirîye xeyset, lê em dil bidine hev
û hê zêde, çimkî hûn dibînin ku
R’oja Axretê nêzîk dibe.

26 Çimkî heger me r’astî nas
kirîye qebûl kirîye û peyr’a bi
h’emdê xwe nava gunada bimînin,
îdî ji vir şûnda bona baxşandina
guna qurban berga t’u tiştî nagi-
re, 27 lê t’enê bi lerizekê dimîne
hîvîya dîwanê û k’ûra agir, ku
wê yêd miqabilî Xwedê h’ûfî xwe
ke. 28 Yekî heger Qanûna[f] Mûsa
bit’er’ibanda, gava du yan sê şe’de
hebûna, bê r’e’m dihate kuştinê*.
29 Lê t’exmîna we, ewê hê çiqa-
sî hêjayî cezayê giran be, yê ku
Kur’ê Xwedê daye bin p’îyêd xwe
û Xûna peymanê h’eram[f] h’esab
kirîye, bi K’îjanê ew paqij bû û
R’uh’ê k’eremdayînê bêhurmet
kirîye?* 30 Belê em Wî nas dikin,

* 10:16 Yêremîya 31:33.
* 10:17 Yêremîya 31:34.
* 10:22 Qanûna K’ahîntîyê 8:30; Hezekîyêl 36:25.
* 10:28 Qanûna Ducarî 17:6.

Yê ku got: «H’eyfhildan ya Min
e, Ezê hilînim»*. Û dîsa: «Xudan
wê dîwana cime’ta Xwe bike»**.
31 Tiştekî tirs û xof e, ku bik’evine
destê Xwedêyê sax!

32 Wan r’ojêd pêşin bîr bînin,
gava hûn hatine r’onayîkirinê,
we şer’ekî çawayî giran bi cefa-
va dik’işand. 33 Carna bi qara û
zêrandina hûn aşkere dihatine
r’ezîlkirinê, carna jî t’evî h’alê wan
dibûn, yêd ku ew tişt dik’işandin.
34 Hûn dik’etine h’alê girtîya jî û
gava hebûka[f] we jî t’alan kirin, hûn
bi wê yekê eşq û şa bûn, çimkî
we xwexa zanibû ku hebûka weye
hê qenc û her t’im heye. 35 Awa
wê gumana xwe unda nekin, ya
ku hêjayî heqê mezin e. 36 Wer’a
sebir lazim e ku hûn e’mirê Xwedê
bînine sêrî û bigihîjine sozê Wî.
37 Çawa nivîsar e:

«Pey wextekî kinr’a, Ewê ku
wê bê,
wê bê û derengî nebe.
38 Lê yê ber Min r’ast[f], wê bi
bawerîyê bijî
û heger ew paşda vek’işe,
Ez wî begem nakim»*.

39 Lê em ne ji wan in, ku paşda
vek’işin û unda bin, lê em ew in,
ku bawer dikin, wekî r’uh’êd me
xilaz bin.

### Bawerî û yêd xweyîbawerî

**11** 1 Bawerî[f] e’seyîya wan tişta
ye, ku em têda guman in
û îzbatîya wan tişta ye, ku meva
ne xuya ne. 2 Bi bawerîyê pêşîyêd
me li Xwedê xweş hatin.

3 Bi bawerîyê meva e’yan e ku
dinya bi xebera Xwedê e’firîye û
ew tiştêd ku têne dîtinê ji wan
tiştêd ku nayêne dîtinê çêbûne*.
4 Bi bawerîyê Habîl[f] h’edîke ji
h’edîya Qayîn[f] çêtir da Xwedê*. Bi
wê bawerîyê ew hate begemkirinê
çawa yekî r’ast[f], çimkî h’edîyêd
wî li Xwedê xweş hatin. R’ast e
Habîl mir, lê bi bawerîya xwe hê
xeber dide.

5 Bi bawerîyê Henox* ji dinê
hate hilatinê, ku mirinê nebî-
ne. Ew t’u cîyî k’ifş nebû, çimkî

---

* 10:29 Derk’etin 24:8.
* 10:30 Qanûna Ducarî 32:35.
** 10:30 Qanûna Ducarî 32:36; Zebûr 135:14.
* 10:38 Hebaqûq 2:3-4.
* 11:3 Destpêbûn 1:1; Zebûr 33:6-9.
* 11:4 Destpêbûn 4:3-10.
* 11:5 Destpêbûn 5:21-24 (welger’andina Peymana Kevine yûnanî).

Xwedê ew hildabû. Nivîsarêda
hatîye gotinê, ku berî hilatina
wî, ew li Xwedê xweş hatibû. 6 Û
bê bawerî t'u car nabe ku însan
li Xwedê xweş bê, çimkî ewê ku
nêzîkî Xwedê dibe, gerekê bawer
bike, ku Xwedê heye û wê wan
xelat ke, k'îjan ku li Wî diger'in.
7 Bi bawerîyê Nuh[f]* bona tiştêd
ku hê nedihatine k'ifşê ferman ji
Xwedê stand û bi xofa Xwedê r'abû
bona xilazbûna mala xwe gemî
çêkir. Nuh bi wê bawerîyê dîwana
dinê kir û bû xweyîwarê wê r'ast-
h'esabbûnê[f], ya ku ji bawerîyê tê.
8 Bi bawerîyê, gava Birahîm*
hate gazîkirinê, guhdarî kir, ku
her'e wî cîyê ku wê çawa war
bistanda. Û r'abû çû, lê nizanibû
jî k'uda diçe. 9 Bi bawerîyê çawa
firarî wî welatê xerîbda ma, yê ku
Xwedê jêr'a soz dabû. Û çadirada
t'evî Îshaq û Aqûb[f] ma, ku ew jî
xweyîyêd wî warê sozdayî bûn*.
10 Çimkî ew hîvîya wî bajarê xwe-
yîr'ik'inê miqer'm bû, e'firandar
û avakirê k'îjanî Xwedê ye.
11 Bi bawerîyê Birahîm, ku zani-
bû Serayê zar' nedanî, ewê qewata
berê zika stand û wê mezinayîya
wîda zar'ek wîr'a bû*. Çimkî bawer
kir, ku Yê wîr'a soz daye amin
e**. 12 Û ji wî yekî, yê ku îdî ber
mirinê bû, weke steyrkêd e'zmên
û qûma devê be'rê bêh'esab merî
dinê k'etin*.
13 Ev h'emû jî ku bawerîyêda
mirin, lê sozêd Xwedê nestandin.
Ewana t'enê ew soz dûrva dîtin,
şa bûn û xwe mukur' hatin, ku
ew merîne xerîb û firarî ne li
ser dinê*. 14 Ewêd ku tiştêd aha
dibêjin, didine k'ifşê ku ew li
welatekî bona xwe diger'in. 15 Û
heger bona wî welatî bîr banîna ji
k'îderê ku ew derk'etibûn, mecala
wan wê hebûya veger'îyana wir.
16 Lê ji ber wêva demana wela-
tekî hê qencda bûn, awa gotî yê
e'zmanî. Lema Xwedê vê yekêda

* 11:7 Destpêbûn 6, 7, 8.
* 11:8 Destpêbûn 12:1-5.
* 11:9 Destpêbûn 23:4; 26:3; 35:12, 27.
* 11:11 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Bi bawerîyê Serayê xwexa jî ku bê zar' bû, qewat bona berê zika stand û wê mezinayîya xweda zar' anî».
** 11:11 Destpêbûn 18:1-15; 21:2.
* 11:12 Destpêbûn 15:5-6; 22:17; Derk'etin 32:13.
* 11:13 Dîrok I, 29:15.

şermîyê nabîne, ku ew jêr'a bêjin:
«Xwedêyê me», çimkî Ewî bona
wan bajarek hazir kirîye.
17 Bi bawerîyê Birahîm ku ji
Xwedê hate cêr'ibandinê, Îshaq
kire qurban*. Ewî soz standibûn,
lê dîsa kur'ê xweyî tayê t'enê diki-
re qurban, 18 bona k'îjanî Xwedê
gotibûyê: «Zur'eta teyê Îshaqda
bê navkirinê»*. 19 Çimkî Birahîm
dilê xweda digot, ku Xwedê dikare
Îshaq ji mirinê jî r'ake û ewî bi
sûretî çawa ji mirinê r'abûyî kur'ê
xwe paşda stand.
20 Bi bawerîyê Îshaq* bona wan
tiştêd ku wê biqewimîyana, dua
li Aqûb û Esaw[f] kir.
21 Bi bawerîyê Aqûb* ber mirinê
dua li her kur'ekî Ûsiv[f] kir û xwe
avîte ser şiva destê xwe, serê xwe
ber Xwedê danî.
22 Bi bawerîyê Ûsiv* ber mirinê
bona derk'etina ji Misirê kire bîra
zar'êd Îsraêl û bona hestûyêd xwe
t'emî da wan.
23 Bi bawerîyê gava Mûsa ji dîya
xwe bû, bi destêd dê û bavê xwe
sê meha hate veşartinê. Wan dît
ku kur'ik bedew e, ji fermana
p'adşê netirsîyan*.
24 Bi bawerîyê Mûsa* gava me-
zin bû, nexwest ku «kur'ê qîza
Firewin» bê h'esabê. 25 Ew fikirî,
ku hê qenc e t'evî cime'ta Xwedê
biçerçire, ne ku wextekî kin nava
k'êfa gunada derbaz ke. 26 Ewî
qara Mesîh hê hebûneke mezin
h'esab kir, ne ku xiznêd Misirê,
çimkî ç'e'vnihêr'î bû, ku heqê
xwe bistanda.
27 Bi bawerîyê Mûsa Misir hişt
û ji hêrsa p'adşê netirsîya, çimkî
Mûsa ewê ku nedihate k'ifşê didît
û ser ya xwe ma. 28 Bi bawerîyê
Mûsa cara pêşin Cejina[f] Derbaz-
bûnê t'estîq kir û xûn şêmîka da
r'eşandinê, wekî Milyak'etê Mirinê
li nixurîyêd wan nek'eta*.
29 Bi bawerîyê cime'ta Îsraêlê
be'ra Sorr'a çawa bejêr'a derbaz

* 11:17 Destpêbûn 22:1-14.
* 11:18 Destpêbûn 21:12.
* 11:20 Destpêbûn 27:27-29, 39-40.
* 11:21 Destpêbûn 47:31; 48:1-20.
* 11:22 Destpêbûn 50:24-25; Derk'etin 13:19.
* 11:23 Derk'etin 2:2.
* 11:24 Derk'etin 2:10-12.
* 11:28 Derk'etin 12.

bû. Gava misirîya jî kir ku derbaz
bin, xeniqîn*.
**30** Bi bawerîyê sûrêd bajarê Erî-
hayê* k’etin, gava h’eft r’oja dora
wan zivir’în. **31** Bi bawerîyê R’e-
xaba[f]* ç’e’vder ku ce’sûs bi e’di-
layî qebûlkirin, t’evî nebawera**
unda nebû.
**32** Ez îdî çi bêjim? Wext t’êrê
nake, ku bona Gîdeyon[f], Baraq[f],
Şimşon[f], Yêfta[f], Dawid, Samûêl[f]
û p’êxembera gilî kim, **33** yêd ku
bi bawerîyê p’adşatî bindest kirin,
heqî kirin, soz standin, devê şêra
dane girtinê*, **34** k’ûra agir te-
mirandin, ji devê şûr xilaz bûn,
ji bêt’aqetîyê qewat girtin, nava
şer’da bûne mêrxas, berî ordîyêd
xerîb dan. **35** K’ulfeta mirîyêd xwe
saxbûyî standin. Hineka jî azayî
nexwestin û nava cefada mirin,
wekî ji mirinê r’abin bigihîjine
jîyîneke hê qenc*. **36** Hinekêd
mayîn jî ber qamçîya, nava qara,
usa jî bi qeyd-zincîra û kelada[f]
hatine zêrandinê*. **37** Ew dane ber
kevira, bi bir’eka hatine bir’înê, bi
şûra hatine kuştinê, p’ostêd pêz
û bizinada ger’îyan, xelayî-ce-
layî, tengasî û cefa k’işandin*.
**38** Dinya ne layîqî wan bû! Ew li
ber’î[f] û ç’îya diger’îyan, şkeft û
ne’lada diman.
**39** Ev h’emû bawerîya xweda
berbiç’e’v bûn, lê sozê Xwedê
nestandin, **40** çimkî Xwedê bona
me hê tiştekî qenc hazir kirîye,
wekî ewana bêyî me negihîjine
k’amiltîyê.

## Dîna xwe bidine Îsa Mesîh Pêşîk’êşê bawerîyê

**12** **1** Awa ku haqas e’laleta
şe’daye giran dora me gir-
tîye, de werin em h’emû giranîyê
û wî gunê ku r’ih’et li me diwele
ji xwe dûr xin û bi teyax lecmey-
dana pêşîya xweda bir’evin. **2** De
îdî em dîna xwe bidine Îsa, wî
Pêşîk’êşî û K’amilkirê bawerîya

* 11:29 Derk’etin 14:21-31.
* 11:30 Yêşû 6:12-21.
* 11:31 Yêşû 2:1-21; 6:22-25.
** 11:31 Aha jî tê fe’mkirinê: «Neêlima».
* 11:33 Danîyêl 6.
* 11:35 P’adşatî IV, 4:25-37.
* 11:36 P’adşatî III, 22:26-28; Yêremîya 20:1-2; 37:15; 38:6.
* 11:37 Dîrok II, 24:20-21.

me, Yê ku bona wê şabûna pê-
şîya Xwe xaç hilanî, şerm ber
tiştekî h’esab nekir, paşê k’êleka
Xwedêye r’astê ser t’ext r’ûnişt*.
3 Awa ser Wî bifikirin, Yê ku li
ber wan gunek’arêd miqabilî Xwe
teyax kir. Hingê hûnê newestin
û ji îlacê nek’evin. 4 We hê h’eta
xûnr’êtinê miqabilî gune şer’ ne-
kirîye. 5 Gelo we ew dildayîna bîr
kirîye, ya ku Xwedê wer’a çawa
t’evî zar’êd Xwe xeber da?

«Lawê Min, şîreta Xudan pişt
guhê xweva nevêje
û ne jî gava ew li te hiltê, li
ber xwe k’eve.
6 Çimkî Xudan k’ê h’iz dike, wî
şîret dike
û k’îjanî çawa law qebûl dike,
ceza dike»*.

7 Hûn şîretê teyax kin, çimkî
Xwedê t’evî we r’adibe-r’ûdinî
çawa t’evî zar’êd Xwe. Ew k’îjan
zar’ e, ku bav wî şîret nake?* 8 Lê
heger hûn neyêne şîretkirinê çawa
h’emû zar’ têne şîretkirinê, ku
usa ye hûn ne zar’êd h’elal in, lê
yêd ji zinêk’arîyê ne. 9 Heger em
ku ji bavêd xweye xûn-goşt têne
şîretkirinê vedik’işin, hê çiqas
zêde gerekê em gur’a[f] Bavê r’uh’ê
xweda bin, wekî em bijîn? 10 Ba-
vêd meye xûn-goşt wextekî kin li
gora dilê xwe me şîret dikin, lê
Xwedê bona k’ara me, wekî em
jî mîna Wî bibin pîroz. 11 R’ast e
her şîretek wê demê dilê merîya
şa nake, lê dêşîne, lê belê paşê
yêd ku bi wê hînbûyî ne, berê
e’dilayîyê ji jîyîna r’ast diçinin*.

### Haş ji xwe hebin

12 Awa qolanê milêd xweye
sistbûyî û qudûmê çokêd xweye
bê t’aqet bişidînin* 13 û nigêd xwe
r’îya r’astda bavêjin, ku yê dikule
hol nebe**, lê serda qenc be.

14 Bikin ku t’evî h’emûya e’dil
bin û jîyîna pîroz derbaz kin.
Bêyî pîrozîyê t’u kes wê Xudan
nebîne. 15 Haş ji xwe hebin, nebe
ku ji we yek destê xwe ji k’erema
Xwedê bike û nebe ku yek nava
weda bibe r’awekî[f] te’l tengasîyê

* 12:2 Zebûr 110:1.
* 12:6 Gotinêd Silêman 3:11-12.
* 12:7 Qanûna Ducarî 8:5.
* 12:11 Aha jî tê fe’mkirinê: «Berêd e’dilayîyê û heqîyê distînin».
* 12:12 Îşaya 35:3.
** 12:13 Aha jî tê fe’mkirinê: «ku nigê weyî birîndar seqet nebe».

bide û geleka je’rdadayî ke. 16 Haş
ji xwe hebin, nebe ku yek ç’e’vder
yan dinêh’iz be mîna Esaw*, ku
bona zike nan nixurtîya xwe firot.
17 Awa weva e’yan e jî, paşê gava
ewî bi hêsira xwest ku ew duayê
nixurtîyê li wî jî bibe, hate t’ex-
sîrkirinê. Ç’are dêst nek’et, wekî
ew tiştê ji destê xwe kiribû paşda
bistanda*.

18 Hûn mîna cime’ta Îsraêlê
nêzîkî wî ç’îyayê* ber ç’e’va
nebûne, yê ku agir pêk’etibû, bi
te’rîstanîyê, mij-dûmanê û bobe-
lîskêva girtî bû, 19 ku li wir bor’î
lê dik’et û dengê gotinê dihat.
Gava yêd ku ev deng dibihîstin,
hîvî dikirin, ku îdî xebereke din
wanr’a neyê gotinê, 20 çimkî li wê
fermanê t’aw nedikirin ku digot:
«Heger h’eywanek jî nêzîkî ç’îyê
be, gerekê bidine ber kevira»*.
21 Ev dîtina ber ç’e’va usa saw
bû, h’eta ku Mûsa jî got: «Ez
ditirsim û dilerizim»*.

22-23 Lê hûn nêzîkî ç’îyayê Sîyo-
nê[f] bûne, wî bajarê Xwedêyê sax,
Orşelîma[f] e’zmana û nêzîkî wê
k’ombûna r’engîne milyak’etêd
bêh’esab bûne, wê civîna nixu-
rîyaye ku navêd wan li e’zmana
nivîsar e. Hûn nêzîkî Xwedê bûne,
ku h’akimê h’emûya ye û nêzîkî
r’uh’êd r’asta bûne, yêd ku gihîş-
tine k’amiltîyê 24 û nêzîkî Îsayê
ku navçêtîyê peymana nû dike û
xûna Wîye r’eşandî bûne, ku ji
xûna Habîl qenctir xeber dide*.

25 Îdî haş ji xwe hebin, nebe ku
hûn Ewî wer’a xeber dide t’exsîr
kin. Heger ewêd ku li ser dinê Mûsa
t’exsîr kirin, k’îjanî ku t’emîyêd
Xwedê didan xilaz nebûn, îdî emê
çawa bikaribin xilaz bin heger em
pişta xwe bidine Yê ku ji e’zmana
mer’a xeber dide?* 26 Dengê Wî
hingê e’rd h’ejand, lê niha soz
daye û dibêje: «Ezê careke din jî
bih’ejînim, ne ku t’enê e’rdê, lê
e’zmana jî»*. 27 Xebera «careke

---

* 12:16 Destpêbûn 25:29-34; 27:30-40.
* 12:17 Destpêbûn 27:30-40.
* 12:18 Awa gotî «ç’îyayê Sînayê[f]», wî cîyê ku cime’ta Îsraêlê t’evî Mûsa bûn, gava Xwedê Qanûn da Mûsa (Derk’etin 19:10-25; 20:1-21).
* 12:20 Derk’etin 19:12-13.
* 12:21 Qanûna Ducarî 9:19.
* 12:24 Destpêbûn 4:3-10.
* 12:25 Derk’etin 20:22.
* 12:26 Hagay 2:6 (welger’andina Peymana Kevine yûnanî).

din» dide k'ifşê, ku tiştêd e'firî
wê bih'ejin û bêne hildanê, wekî
yêd nah'ejin cîda bimînin.
28 Awa em vê yekê bişêkirînin,
ku em p'adşatîke neh'ejîyayî dis-
tînin û bi vî awayî bi xof û tirs
Xwedê bih'ebînin, çawa ku li Wî
xweş tê, 29 çimkî Xwedêyê me
agirê p'er'itandinê ye*.

### Çawa em li Xwedê xweş bên

13 1 Bira hûn t'imê çawa
xûşk-bira hevdu h'iz bikin.
2 Mêvanh'izîyê bîr nekin, çimkî
hineka bi wê yekê milyak'et qebûl
kirin, lê pê neh'esîyan*. 3 Girtîya
bîr bînin, h'esab kin ku çawa hûn
jî t'evî wan girtî ne, usa jî cefa-
k'êşa bîr bînin, çawa ku hûn jî
mîna wan xûn û goşt in.
4 H'al-zewac h'emûyar'a nav-na-
mûsî be û cî-nivîn h'elal be, çimkî
Xwedê wê dîwana ç'e'vder û zi-
nêk'ara bike.
5 P'ereh'izî bira nava jîyîna we-
da cî negire û destêd weda çiqas
heye, r'azî bin, çimkî Xwedê got:
«Ezê t'u car ji te neçim û t'u
car te ber'nadim»*.
6 Lema jî r'ûyê me digire ku em
bêjin:
«Xudan piştovanê min e
û ez natirsim.
Însanê çi li min bike?»*
7 R'êberêd xwe bîr bînin, yêd ku
wer'a xebera Xwedê gotine. Dîna
xwe bidine axirîya e'mirê wan û
ç'e'v bidine bawerîya wan. 8 Îsa
Mesîh duhu, îro û h'eta-h'etayê
yek e. 9 Ber bayê cûr'e-cûr'e hînki-
rinêd xerîb nek'evin. Qenc e ku dil
bi k'erema Xwedê bişide, ne ku bi
qeyde-qanûnêd xwarin-nexwarinê.
Ewêd ku pey tiştêd aha k'etin, t'u
kesî k'ar nestand. 10 Gorîgeheke me
heye, ku îzina t'u kesî ji wan t'une
ji wê bixwin, yêd ku p'aristgehêda*
xizmetk'arîyê dikin. 11 Çawa ew
h'eywanêd ku xûna wan bi destê
serekk'ahîn bona baxşandina guna
dihate pîrozgehê û cendekêd wan
ji zomê der dihatine şewitandinê*,
12 usa jî Îsa, ku cime't bi xûna Xwe
paqij bikira, ji dergehê bajêr der

* 12:29 Qanûna Ducarî 4:24.
* 13:2 Destpêbûn 18:1-8; 19:1-3.
* 13:5 Qanûna Ducarî 31:6.
* 13:6 Zebûr 118:6.
* 13:10 «P'aristgeh» bi yûnanî xeber bi xeber «kon» e, ku li vir fikira Konê[f] Şe'detîyê, Peymana Kevin û h'ebandina cihûyaye ser vê dinê bîr tîne.
* 13:11 Qanûna K'ahîntîyê 16:27.

cefa k'işand. 13 Awa werin, em
ji zomê derên her'ine cem Wî û
qara Wî hildine ser xwe, 14 çimkî
mer'a li vir bajarekî h'îmî t'une,
lê em h'izreta wî bajarî ne, yê ku
wê bê. 15 De werin em bi saya Wî
t'imê qurbana pesindayînê* bidine
Xwedê, awa gotî berê zar-zimanê
xwe, yêd ku navê Wî îqrar dikin.
16 Usa jî qencî û alîhevkirinê bîr
nekin, çimkî qurbanêd usa li
Xwedê xweş tên.

17 Guhdarîya r'êberêd xwe bi-
kin û gur'a wanda bin. Ewana
bona r'uh'ê we xewê ji ç'e'vê xwe
dikin, çimkî wê bona we cabdar
bin. Bira ew wî şixulê xwe eşq û
şa bikin, ne ku bi ofe-ofê, çimkî
ew yek k'arê nade we.

18 Bona me dua bikin. Em e'seyî
zanin ku îsafa me r'ih'et e û di-
xwazin ku her tiştî r'ast bikin. 19 Lê
îlahî[f] ez hîvî dikim ku dua bikin,
wekî ez zûtirekê veger'ime cem we.

**Duayê axirîyê**

20 Awa Xwedêyê e'dilayîyê, ku
Xudanê me Îsa ji mirinê r'akir, Yê
ku bi xûna peymana h'eta-h'etayê
Serekşivanê pêz e, 21 bira Ew we
her tiştêd qencva hazir ke, ku hûn
e'mirê Wî bikin û Ew nava meda
bi destê Îsa Mesîh tiştêd ku li Wî
xweş tên bike. Şikir ji Wîr'a be,
h'eta-h'etayê! Amîn[f].

**Gotinêd axirîyê**

22 Ez hîvî ji we dikim xûşk-bira-
no, hûn bi sebirê guh bidine van
gotinêd mine dildayînî, çimkî
min wer'a kin nivîsî. 23 Zanibin
ku Tîmot'êyoyê birê me ji kelê
derk'etîye. Heger ew zû bê, ezê
t'evî wî bêm we bibînim.

24 Silavê bidine h'emû r'êberêd
xwe û cime'ta Xwedê. Ewêd ku ji
Îtalyayê ne, we silav dikin. 25 K'e-
rema Xwedê t'evî we h'emûya be.

* 13:15 Zebûr 50:14.

# NE’MA AQÛB

## Pêşgotin

Ne’ma Aqûb tê bêjî mîna berevokekê ye, ya ku bona wan endemêd civîna[f] Xwedê ye, k’îjan ku t’emamîya dinyayêda belabûyî ne (1:1). Li gora şe’dêd sedsalîyêd pêşinda xudanê vê ne’mê Aqûbê[f] birê Îsa Mesîh e (Metta 13:55; Marqos 6:3) û serwêrekî civîna Orşelîmêda[f] bû (K’arêd Şandîya 12:17; 15:13; 21:18; Korint’î I, 15:7; Galatî 1:19; 2:9). Ew bi xeberêd qewat û meselêd bedew r’ê dide ber bawermenda, wekî bikaribin bi serwaxtî[f] nava e’mirekî r’astda bijîn. Ew ser çend pirsa disekine, awa gotî ser dewletîyê û feqîrîyê, cêr’ibandinê[f], jîyîna pîroz[f], firqîkirinê, bawerîyê[f] û kirinêd wê, usa jî derheqa zêdezimanîyê, serwaxtîyê, şer’-de’wa, k’ubarîyê û milûktîyê, xeybê û lomek’arîyê[f], sebirê û dua.

Vê ne’mêda ew giranîyê dide ser vê yekê, wekî jîyîna mesîhîyêda[f] gerekê hin bawerî hebe, hin jî kir. Dil dide, wekî nava cefa û tengasîyada[f] sebir kin, qewata duakirinêda bawer bin û bi r’uh’anî alî hev bikin.

**Serecema fikira ne’mê**

Pêşgotin (1:1)
Bawerî û serwaxtî (1:2-8)
Feqîrî û dewletî (1:9-11)
K’etin-r’abûn (1:12-18)
Bibihên û biqedînin (1:19-27)
Bona firqîkirinê (2:1-13)
Bawerî û kirin (2:14-26)
Bawermend û zimanê wî (3:1-18)
Bawermend û dinya (4:1–5:6)
Şîretêd cûr’e-cûr’e (5:7-20)

## Silavkirin

1 1 Ji Aqûbê[f] xulamê Xwedê û
Xudan[f] Îsa Mesîh:
Silav li we her donzdeh e'şîrêd
dinyayêda* belabûyî be.

## Bawerî[f] û serwaxtî[f]

2 Xûşk-birayêd min, şabûneke
mezin h'esab kin, gava hûn bik'e-
vine nava cûr'e-cûr'e cêr'ibandina.
3 Fe'mdarî ye, ku cêr'ibandina
bawerîya[f] we sebirê pêşda tîne. 4 Û
sebir jî, bira bi dûmika dirêj be,
wekî hûn k'amil û gihîştî bin, t'u
kêmasîke we t'unebe. 5 Heger ser-
waxtîya[f] yekî ji we t'êra wî nake, bira
hîvî ji Xwedê bike û wê ji wîr'a bê
dayînê. Ew bi mer'danî dide h'emûya
û t'u kesî bêqedir nake. 6 Lê t'enê
bira bi bawerîyê[f] bixwaze û dudilî
nebe, çimkî yê dudilî mîna pêlêd
be'rê ye ku ji bayê bilind dibin û
datînin. 7 Merivê[f] usa bira nefikire,
ku wê tiştekî ji Xudan bistîne. 8 Ew
merivê ku ser du niga dikule, h'e-
mû gavêd xweda ne ser ya xwe ye.

## Feqîr û dewletî

9 Birayê belengaz bira ser bilind-
bûna xwe bifir'e, 10 lê yê dewletî
ser nimizbûna xwe, çimkî ewê
mîna gulêd gîhê h'işk be her'e*.
11 Çawa te'v bi germayîya xweva
dertê gîhê h'işk dike, gul jê di-
warin û bedewetîya dîndara wê
jî unda dibe, usa jî yê dewletî wê
îşê xweda biç'ilmise her'e.

## K'etin-r'abûn

12 Xwezî li wî merivî, ku cê-
r'ibandinada teyax dike, çimkî
gava bi cêr'ibandinê r'ûspî derê,
ewê t'acê[f] jîyînê bistîne, k'îjan
ku Xwedê wanr'a soz daye, yêd
ku Wî h'iz dikin. 13 Bira t'u kes,
yê ku nava cêr'ibandinêda ye,
nebêje: «Xwedê min bi xirabîyê
dicêr'ibîne», çimkî Xwedê xira-
bîyada nayê cêr'ibandinê û ne jî
yekî dicêr'ibîne. 14 Lê her kes dibe
maşoqê dilhavijîyêd xwe, dixape
û tê cêr'ibandinê. 15 Hingê dil-
havijî kelê xwe distîne, gune[f] jê
difirike û gune jî ku mezin dibe,
mirin jê dibe.
16 Nexapin xûşk-birayêd mine
delal! 17 Her dayîna qenc û her
p'êşk'êşa[f] k'amil ji jor e, ji Bav[f], ji
E'firandarê r'onaya tê xwarê, Yê
ku ne Xwexa tê guhastinê, ne jî
sî ber Wî dadiger'e. 18 Ewî li gora

* 1:1 Bi gotineke din: «Donzdeh e'şîrêd Îsraêlê[f]».
* 1:10 Îşaya 40:6-7.

qirara Xwe em bi xebera r'astîyê ji
Xwe dinê xistin, wekî em bibine
awazekî berêd[f] deremeta pêşine
e'firînêd Wî.

### Bibihên û biqedînin

**19** Zanibin*, xûşk-birayêd mine
delal, bira her meriv bihîstinêda
serxwe be, lê xeberdan û hêrs-
k'etinêda giran be, **20** çimkî hêrsa
mêriv heqîya Xwedê nayne sêrî[f]*.
**21** Lema h'emû mir'dar'îyê û her
xirabîyê ji xwe dûr xin, bi milûk-
tîyê wê xebera nava weda çandî
qebûl kin, ya ku dikare r'uh'ê
we xilaz[f] ke.

**22** Xeberê biqedînin, ne ku t'e-
nê bibihên û usa xwe bixapînin.
**23** Heger yek xeberê t'enê dibihê û
naqedîne, ew mîna wî merivî ye,
yê ku neynikêda r'eng-r'ûyê xwe
dinihêr'e. **24** Xwe dibîne, derbaz
dibe diçe û zû bîr dike, ku ew
yekî çawa bû. **25** Lê ewê ku ç'e'-
vê xwe ji qanûna k'amile ku aza
dike nabir'e û nava wêda dimîne,
dibihê bîr nake, lê diqedîne, ew
wan kirinêd xweda xwezilî ye.

**26** Heger yek xwe xwedênas h'e-
sab dike û zimanê xwe nikare, ew
xwexa xwe dixapîne, xwedênasîya
wî p'ûç' e. **27** Li ber Bav Xwedêyê
me xwedênasîya r'ast û bêqusûr
ev e: Te'lî-tengîyada dest bavêjine
sêwîya[f] û jinebîya û h'evza xwe jî
ji lek'êd dinê bike.

### Firqîyê nekine nava meriva

**2** **1** Xûşk-birayêd min! Hûn ku
bawermendêd Xudanê me Îsa
Mesîhê xweyîr'ûmet in, firqîyê
nekine nava meriva. **2** Mesele,
gava yekî gustîla zêr' t'ilîyêda û
k'incêd r'ewş wergirtî bê civîna[f]
we, usa jî yekî belengaz bi k'in-
cêd p'izinîva bê **3** û hûn dîna xwe
bidine yê xweyê k'incêd r'ewş û
bêjinê: «K'erem ke vê jorê r'ûnê»,
lê yê belengazr'a bêjin: «Ser p'îya
bisekine» yan jî «vê jêrê r'ûnê»,
**4** gelo hûn nava xweda firqîyê
danaynin û nabine h'akimêd
fikirêd xirab?

**5** Bibihên xûşk-birayêd mine
delal! Ne Xwedê belengazêd vê
dinê bijartin, wekî bi bawerîyê
dewletî bin û warêd wê P'adşatîyê
bin, k'îjan ku Xwedê wanr'a soz
daye, yêd ku Wî h'iz dikin? **6** Lê
hûn belengaza bêhurmet dikin!

---

* 1:19 Nav hinek destnivîsarada dewsa «zanibin» xebera «awa» heye.
* 1:20 Aha jî tê fe'mkirinê: «Çimkî hêrsa mêriv nahêle ku meriv li ber Xwedê r'ast bijî».

Çima ew yêd dewletî nînin, ku
zorê li we dikin û we k'aşî ber
dîwanê dikin? **7** Çima ew nînin,
yêd ku wî navê qenc bêhurmet
dikin, k'îjan ser we ye?

**8** Heger hûn qanûna P'adşatîyê
biqedînin, li gora nivîsara ku di-
bêje: «Hevalê xwe weke xwe h'iz
bike»*, hûn qenc dikin. **9** Lê heger
hûn firqîyê dikin, guna dikin û
hindava Qanûnêda dibine yekî
gunek'ar[f]. **10** Ewê ku t'emamîya
Qanûnê xwey dike, lê tiştekî jê
ber'dide, ew dibe deyndarê t'e-
mamîya Qanûnê. **11** Çimkî Ewê
ku got: «Zinîyê neke»* usa jî got:
«Nekuje»**. Awa heger zinîyê nekî,
lê bikujî, dîsa Qanûnê dit'er'ibînî.
**12** Xeberdan û kirinêd xweda usa
bin, çawa yêd dîwana wanê bi wê
qanûnê bibe, ya ku azayîyê dide.
**13** Çimkî bê r'e'm wê dîwana bê-
r'e'ma bibe, lê r'e'm li ber dîwanê
r'ûspî dike*.

## Bawerî û kirin

**14** Çi feyde xûşk-birayêd min,
heger yek bêje ku bawerîya wî
heye, lê kirêd wî t'unebin? Gelo
eva bawerîya dikare wî xilaz ke?
**15** Mesele, heger birak yan xûşkek
sit'ar lê t'unebe yan h'ewcê nanê
r'ojê be, **16** ji we yek wanr'a bêje:
«Bi xêr û silamet her'in, germ û
t'êr bin», lê tiştêd ku ew h'ewce
bin nede wan, çi feyde? **17** Usa jî
bawerî, heger kirêd wê t'unebin,
bi t'enê mirî ye.

**18** Lê yekê bêje: «Bawerîya te
heye, kirêd min hene». Lê ezê
bêjim: K'a bawerîya xwe bê kiri-
na nîşanî min ke, ezê jî bawerîyê
bi kirinêd xweva nîşanî te kim.
**19** Tu bawer dikî, ku Xwedê yek
e. Qenc e! cin[f] jî bawer dikin û
dibizdin. **20** Lê tu dixwazî ev yek
bê îzbatkirinê, merivê bêh'iş,
wekî bawerî bêyî kira mirî ye?
**21** Ne Birahîmê[f] bavê me bi kira
r'ast hate h'esabê, gava kur'ê xwe
Îshaq[f] danî ser gorîgehê[f], ku bike
qurban[f]?* **22** Tu dibînî ku bawerî-
yê t'evî kirêd wî ya xwe kir û bi
wan kira bawerî k'amil bû? **23** Û
gotina nivîsarê hate sêrî, ku di-
bêje: «Birahîm Xwedê bawer kir

* 2:8 Qanûna K'ahîntîyê 19:18.
* 2:11 Derk'etin 20:14; Qanûna Ducarî 5:18.
** 2:11 Derk'etin 20:13; Qanûna Ducarî 5:17.
* 2:13 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «R'e'm ser dîwanê dik'eve».
* 2:21 Destpêbûn 22:1-14.

û ew jêr’a r’astî hate h’esabê»* û
dostê Xwedê hate gotinê**. 24 Hûn
dibînin ku meriv bi kira r’ast tê
h’esabê, ne ku t’enê bi bawerîyê?
25 Ne usa jî R’exaba[f] ç’e’vder[f] bi
kira r’ast hate h’esabê, gava ce’-
sûs qebûl kirin û ew r’êke dinva
ver’êkirin?* 26 Awa çawa qalib bê
r’uh’ mirî ye, usa jî bawerî bêyî
kira mirî ye.

## Ziman

3 1 Bira gelek ji we, birayêd
min nebine dersdar, çimkî
hûn zanin dîwanê ser me ders-
dara hê giran be. 2 Belê em h’emû
jî gelekî şaşîya dikin. Heger yek
xeberdanêda t’u şaşîyê nake, ew
yekî k’amil e, ku dikare t’emamî-
ya qalibê xwe zeft ke. 3 Em gemê
davêjine devê hespê, wekî ew bê
zeftê, ku em serwêrtîyê t’emamîya
hespê pêva bikin. 4 Em bînin ser
gemîyê jî. Ew çiqasî mezin in û ji
ber bayê qayîm têne ajotinê, lê bi
çerxeke gelekî biç’ûk têne serwêr-
tîkirinê, dilê gemîvan[f] k’îyalîda ku
bixwaze. 5 Usa jî ziman endemekî
biç’ûk e, lê tiştêd ji xwe mestir
dibêje. Dîna xwe bidine pirîske
agir, çi daristaneke mezin dikare
bişewitîne! 6 Ziman jî agirek e,
dinyake zulmk’ar e nava endemêd
meda. Ew t’emamîya qalibê me
dih’er’imîne, agir dewra jîyîna
mêriv dixe û ew xwexa ji alava
agirê dojê[f] pêgirtî ye. 7 Her cûr’e
r’e’wir, teyrede, şûlikî û h’eywa-
nêd be’rê têne zeftê û zeftî mêriv
dibin, 8 lê t’u qûl-bende zimên
nikare. Ew zulmk’arekî bêar e,
je’ra me’rava dagirtî ye. 9 Em bi
wî şikirîyê didine Xudan û Bav,
bi wî jî nifir’a mêriv dikin, yêd ku
dilqê Xwedêda hatine xuliqandinê.
10 Hema ji wî devî jî dua û nifir’
dertên. Xûşk-birayêd min, ev yek
ne cayîz e ku aha be. 11 Gelo ji
ç’e’vkanîkê ava xweş û te’l dide
der? 12 Gelo dibe xûşk-birayêd
min, wekî dara hêjîrê berê zeyt’û-
nê bide, yan jî k’ola tirîyê hêjîrê?
Ne jî ji şor’ayîyê ava xweş dertê?

## Serwaxtîya dinyayê û serwaxtîya e’zmên

13 Nava weda k’î serwaxt û aqil e?
Bira ew bi p’ergalîya xweye qenc,
kirêd xwe bi milûktîya serwaxtîyê
bide k’ifşê. 14 Lê heger dilê weda

* 2:23 Destpêbûn 15:6.
** 2:23 R’omayî 4:3; Galatî 3:6.
* 2:25 Yêşû 2:1-21; 6:22-25.

h’evsûdîya xirab û ç’e’vnebarî he-
ne, k’ubar nebin û r’astîyê derew
dernexin. 15 Eva «serwaxtîya» ne
dayîna jorin e, lê ji dinê ye, ya
merivayî ye û ji cina ye. 16 Çimkî
li k’îderê h’evsûdî û ç’e’vnebarî
hene, li wir bêt’erbetî û her kiri-
nêd xirab jî hene. 17 Lê serwaxtîya
jorin, berê pêşin paqij e, paşê e’dil
e, milûk û berbihêr e, bi r’e’mê û
berêd qencîyêva t’ijî ye, bê t’agêr[f]
û bê h’ilek’arî ye. 18 Û berê heqîyê
ji alîyê yê ku bi e’dilayîyê diçîne
tê çinînê*.

## Yarê dinê, neyarê Xwedê

**4** 1 Ji k’u ne ew şer’ û de’wê
nava weda? Ne ji temêd we
ne, ku nava dilê weda şer’ê xwe
dikin? 2 Ç’e’vê we li tişta ye, lê
nak’eve destê we, dikujin û ç’e’vne-
barîyê dikin, lê nikarin bigihîjine
meremê xwe, hingê hûn hevr’a
dik’evine h’ucetê û şer’ dikin*.
Hûn dest naxin, çimkî hûn hîvî ji
Xwedê nakin. 3 Û gava hîvî dikin,
nastînin, çimkî ser nêta xirabîyê
hîvî dikin, wekî k’êfêd dilê xwe
derbaz kin. 4 Bêe’silno! Hûn ni-
zanin k’ê vê dinê h’iz dike, ew
neyartîyê li Xwedê dike? Awa k’î
dixwaze bibe yarê dinê, ew xwe
dike neyarê Xwedê. 5 Yan t’exmîna
we badîhewa[f] nivîsar dibêje, ku
Xwedê demana wî r’uh’ê ber meda
ye?* 6 Lê belê ew hê k’eremê[f] dide
me. Lema nivîsar dibêje:

«Xwedê miqabilî k’ubar-babaxa
ye,
lê k’eremê dide şkestîya»*.

7 Awa ber Xwedê şkestî bin. Mi-
qabilî mîrêcin[f] bisekinin û ewê ji
we bir’eve. 8 Xwe li Xwedê bigirin,
Xwedê jî wê Xwe li we bigire. Destêd
xwe bişon, gunek’arno, dilê xwe
paqij kin, dudilîno. 9 Bine’lin, şîn
û girî bin, bira k’enê we bibe şîn û
eşqa we jî k’eder. 10 Li ber Xudan
xwe bişkênin û Ewê we bilind ke.

## Xeyba birê xwe neke

11 Xeyba hevdu nekin xûşk-bi-
rano. K’î xeyba birê xwe dike,
yan loma birê xwe dike, ew xeyba

* 3:18 Aha jî tê fe’mkirinê: «Û heqî ew ber e, ku yê e’dil t’oximê e’dilayîyê diçîne».

* 4:2 Aha jî tê fe’mkirinê: «Ç’e’vê we li tişta ye, lê nak’eve destê we û dibine mêrkuj. Hûn ç’e’vnebarîyê dikin, lê nikarin bigihîjine meremê xwe, hingê dik’evine h’ucetê û şer’ dikin».

* 4:5 Aha jî tê fe’mkirinê: «Ku ew r’uh’ê ber bîna me ç’e’vnebarîyêda ye».

* 4:6 Gotinêd Silêman 3:34.

Qanûnê dike û loma Qanûnê dike.
Lê heger tu loma Qanûnê dikî,
îdî tu Qanûnê naqedînî, lê h'a-
kimê wê yî. 12 T'enê Qanûndarek
û H'akimek heye, ku dikare hin
xilaz ke û hin jî unda ke. Lê tu
k'î yî ku loma hevalê xwe dikî?

### H'evza xwe ji k'ubarîyê bikin

13 Niha hûn guhdar bin, yêd
ku dibêjin: «Îro yan sibê emê
her'ine filan bajarî û li wê derê
salekê bimînin, t'ucaretîyê[f] bikin
û qazinc kin». 14 Hûn nizanin wê
sibê çi bê serê we. E'mirê we çi
ye? Hûn mîna mijê ne, hew dini-
hêr'î heye, hew dinihêr'î t'une.*
15 Gerekê hûn aha bêjin: «Heger
Xudan bixwaze, emê bijîn û filan
yan bêvan tiştî bikin». 16 Lê hûn
bi k'ubar-babaxîya xwe difir'in.
Her p'eydayîneke aha xirabî ye.
17 Awa ewê ku zane qencîyê bike
û nake, ew jêr'a gune ye.

### Bona dewletîya

5 1 Niha hûn bibihên, dewletî-
no! Bigirîn û şînê bikin bona
wê belengazîya ku wê bê serê we.
2 Hebûka[f] we r'izî ye, k'incêd we
jî bûne xurê bizûzê.* 3 Zêr' û zîvê
we zeng girtin e û zenga wanê bibe
şe'dê miqabilî we û mîna alava
êgir goştê we h'ûfî xwe ke. We
bona r'ojêd axirîyê xizne xwer'a
t'op kir! 4 We ew heqêd p'alêd ku
e'rdê we didirûtin nedanê. Va ye
ew heq dikine zarîn. Şikîyatê[f]
wan p'ala gihîştîye guhê Xudanê
Zor*. 5 We li ser dinê ç'e'vê xwe
tiştekîda nehiştîye, li gora dilê
xwe xwarîye-vexwarîye, çawa
k'ozîkirî[f], bona r'oja serjêkirinê.
6 We ew merivêd r'ast lomek'ar[f]
kirin û kuştin, k'îjan ku miqabilî
we r'anebûn.

### Sebir û dua

7 Awa xûşk-birano, sebir kin h'eta
hatina Xudan. Dîna xwe bidinê,
cotk'ar hîvîya berê e'rdêyî bi qîmet
e, bona wê yekê sebir dike h'eta
barana pêşin û paşin lêde. 8 Hûn
jî sebir kin, gumana xwe unda
nekin, çimkî hatina Xudan nêzîk
e. 9 Bîna xwe ji hevdu teng nekin
xûşk-birano, ku dîwana we nebe.
Va ye h'akim pişt dêrî sekinî ye.
10 Xûşk-birano, alîyê te'lî-ten-
gîya û sebirêda ç'e'v bidine wan

* 4:14 Gotinêd Silêman 27:1.
* 5:2-3 Metta 6:19.
* 5:4 Qanûna Ducarî 24:14-15.

p’êxembera, yêd ku bi navê Xudan
xeber dane. **11** Belê em xwezîya
xwe li yêd sebir dikin tînin. We
bona sebira Îbo bihîstîye û we
dît, Xudan axirîya wî çawa xêr
kir, çimkî Xudan gelekî îsaf[f] û
r’e’m e!*

**12** Berî her tiştî xûşk-birayêd min,
sond nexwin, ne bi e’zmên, ne bi
e’rdê, ne jî sondeke mayîn. Bira
«Belê»-ya we belê be, «Na»-ya
we na be, wekî hûn dîwanê ser
xweda neynin*.

**13** Heger yek ji we te’lî-tengîyêda
ye, bira dua bike. Heger yek şa ye,
bira eşqî Xwedê bistirê. **14** Heger
yek ji we nexweş e, bira gazî ber-
pirsîyarêd civînê ke, ser wîda bira
dua bikin, bi navê Xudan bi r’ûn[f]
r’ûn kin*. **15** Û duayê bi bawerîyê
wê yê nexweş qenc ke û Xudan
wê wî r’ake ser p’îya. Û heger
gunek jî kiribe, wê wî bê baxşan-
dinê. **16** Lema ber hev gunêd xwe
bidine r’ûyê xwe û bona hev dua
bikin, wekî hûn qenc bin. Duayê
yê r’ast gelekî qewat e û h’ukum
dike. **17** Êlyas[f] xût merivekî mîna
me bû, bi dil û can dua kir, ku
baran nebare û sê sal û nîva ser
e’rdê baran nebarî*. **18** Û paşê dîsa
dua kir, ji e’zmên baran barî û
e’rdê berê xwe da.

**19** Gelî xûşk-birayêd min! Heger
yek ji we ji r’îya r’astîyê bik’eve û
yekî din wî veger’îne, **20** bira ew
zanibe yê ku gunek’ar ji r’îya wîye
xalifî[f] vediger’îne, ew r’uh’ekî ji
mirinê xilaz dike û gelek guna
r’esît dike*.

---

* 5:11 Îbo 1:1-22; 2:10; 42:10-17; Zebûr 103:8.
* 5:12 Metta 5:34-37.
* 5:14 Marqos 6:13.
* 5:17 P’adşatî III, 17:1; 18:1; 18:41-45.
* 5:20 Petrûs I, 4:8.

# NE’MA PETRÛSE PÊŞIN

## Pêşgotin

Petrûsê[f] şandî[f] bi vê ne’ma xweye pêşin berbir’î cime’ta Xwedêye bijartî dibe, awa gotî wan bawermenda, yêd ku belayî bakura Asya Biç’ûk bibûn, ku pênc qeza dik’etine nava wê, bi h’esabê îroyîn T’irkyayêda ne. H’îmêd civînêd[f] van qeza hinek bi xûdana Pawlos, hinek jî bi ya heval-xebatêd wî hatibûne avîtinê. Li gora şe’detîya civîna sedsalîya dudada Petrûs eva ne’ma R’omayêda[f], bi navekî sur’ awa gotî «Babîlonêda[f]» (5:13), berî kuştina xwe sala 65-da nivîsîye, gava mesîhî[f] ji dest Nêronê Qeyserê[f] Împêratorîya R’omayê dihatine zêrandinê.

Meremê vê ne’mê ew e, ku dil bide ber wan xwendevana, k’îjan ku bawerîya[f] xwe Îsa tînin û nava tengasî[f] û zêrandinada ne. Xudanê[f] ne’mê vê nivîsarêda nexşê Îsa dide k’ifşê ku çawa cefê Wî, mirin, r’abûn û sozê hatina Wî wan bawermendar’a gumaneke mezin pêşda tîne. Bi vê dîtinê gerekê bawermendêd r’ast jî nava cefada teyax kin, çimkî eva yeka dide k’ifşê, ku ew r’ast bawerîyêda p’êga Îsada diçin. Û ewêd ku wê teyax kin, gava Îsa Mesîh dîsa e’yan be, Ewê wan xelat ke.

Usa jî xudanê vê ne’mê hîvî ji xwendevana dike, ku ew her t’im h’işyar û hazir bin, nava jîyîna pîrozîyêda[f], h’izkirina wane hindava hevda dur’ûtî nîbe û bibine p’aristgehêd[f] sax, li ser wî r’ik’inê navê Mesîh çêkirî.

#### Serecema fikira ne’mê

Pêşgotin (1:1-2)
Bîranîna kirêd Xwedêye bona xilazbûnê[f] (1:3-12)
Şîretêd bawermendar’a, ku bi jîyîna pîroz bijîn (1:13–2:10)
Borcêd bawermenda dema cefa û te’lî-tengîyada (2:11–4:19)
Xwedênasîya milûk û xizmetk’arîya wan (5:1-11)
Paşgotin (5:12-14)

## Silavkirin

1 [1] Ji Petrûs[f], Şandîyê Îsa Mesîh,
cime'ta Xwedêye bijartîr'a,
ya ku li welatêd Pontosê, Galat-
yayê, Kepedokyayê, Asyayê û Bî-
tênyayêda xerîb belabûyî ye. [2] Hûn
li gora wê qirara Bav[f] Xwedêye
pêşda hatine bijartinê û bi R'uh'ê
Pîroz buhurtî-jibare dibin, wekî
guhdarîya Îsa Mesîh bikin û bi
xûna Wîye r'êtî bêne paqijkirinê:
De bira k'erem[f] û e'dilayî hê li
we zêde be.

## R'azîbûn bona gumana saxîyê

[3] Şikir ji Xwedêr'a, Bavê Xudanê[f]
me Îsa Mesîh, ku ji r'e'ma Xweye
p'ir', careke din em dinê xistin,
bi r'abûna Îsa Mesîhe ji mirîya,
wekî bibine xweyê gumana sax
[4] û wan soz-qirarêd nebetale ne-
r'izî û neç'ilmisî war bin. Evana
li e'zmana wer'a xweykirî ne. [5] Û
qewata Xwedê pê bawerîya[f] we,
we xwey dike, bona wê xilazbûna[f]
hazirkirî, ya ku axirîya zemênda
wê xuya be.
[6] Hûn bi wê şa dibin, r'ast e ni-
ha jî usa diqewime ku hûn hinekî
me'dekirî ne, ji dest cûr'e-cûr'e
cêr'ibandina[f]. [7] Ev yek dibe sebeb,
wekî xalisîya bawerîya we hê bi
qîmet k'ifş be, ne ku ew zêr'ê ku
nava êgirda tê cêr'ibandinê lê dîsa
unda dibe û bi vî awayî ew bawe-
rîya we wê hêjayî pesin, r'ûmet
û qedir be, wextê xuyabûna Îsa
Mesîh. [8] We Ew nedîtîye, lê hûn
Wî h'iz dikin, niha jî nabînin, lê
bawerîya xwe Wî tînin û şa ne bi
wê eşqa mezine xweyîr'ûmet, ku
bi zara[f] nayê gotinê. [9] Çimkî hûn
xilazkirina[f] r'uh'ê xwe distînin,
ku meremê bawerîya we ye.
[10] Bona vê xilazbûnê p'êxember
lê ger'îyan û k'etibûne bin e'nena
û bona wê k'erema[f] ku wê wer'a
bibûya p'êxembertî[f] kirin. [11] R'uh'ê
Mesîhî nava wanda hê pêşda li
ber wan vedikir, ku Mesîhê cefê
bik'işîne û peyr'a bik'eve r'ûmeta
Xwe. Û wan dikir ku bizanibin
k'a bona k'engê û zemanekî ça-
wada ev yekê biqewimin. [12] Li ber
wan vebû, wekî ew ne ku bona
xwe, lê bona we xebitîn, gava ew
tiştêd niha wer'a bi destê wan
hatine gotinê, yêd ku Mizgînî
wer'a dannasîn kirin, bi R'uh'ê[f]
Pîrozî ku ji e'zmên hate şandinê.
Milyak'et[f] jî demana wan tiştada
ne, ku hema bibînin.

## H'işyar û pîroz[f] bin

[13] Bona wê yekê hûn fikirêd
xweda piştgirêdayî û h'işyar bin,
t'am gumana xwe bidine ser wê

k'eremê, ya ku wê wer'a bê da-
yînê, wextê xuyabûna Îsa Mesîh.
14 Mîna zar'êd guhdar bin, nebine
mîna wî wextê dilxwestinêd xweye
nezanîya xweda. 15 Lê mîna wî
Pîrozê ku gazî we kir, hûn jî pîroz
bin nava h'emû r'abûn-r'ûniştina
xweda. 16 Çawa nivîsar e: «Pîroz
bin, çimkî Ezî pîroz im»*.

17 Heger hûn Wîr'a Bavo dibêjin,
Yê ku bê firqî dîwana her kesî
weke e'melêd wî dike, ku usa ye
vî wextê xerîb-firarîya xweye vê
dinê bi xofa Xwedê derbaz kin.
18 Çimkî hûn zanin wekî hûn ji
r'aw-r'izimêd[f] kal-bavaye bêkêr,
pê wan tiştêd ku unda dibin,
awa gotî zêr'a yan zîva nehatine
k'ir'înê, 19 lê pê xûna Mesîhe
qîmet-giran, ku ew çawa berxekî
bêqusûr û bêlek'e bû. 20 Ew hê berî
destpêbûna dinyayê k'ifşkirî bû,
lê van axirîyada bona we e'yan
bû. 21 Bi Wî we bawerîya xwe Wî
Xwedêyî anî, Yê ku Ew ji nava
mirîya r'akir û r'ûmet da Wî, lema
bawerî û gumana we ser Xwedê
ye. 22 Awa we guhdarîya r'astîyê
kir û bi vî awayî xwe paqij kir, ku
h'izkirina we hindava xûşk-birada
bê h'ilek'arî be, niha bi dilê sax
hevdu qayîm h'iz bikin. 23 Hûn
ne ku ji havênê p'ûç' dîsa dinê
k'etine, lê ji yê nep'ûç', ji xebera
Xwedêye xweyîe'mire h'eta-h'e-
tayê. 24 Çimkî

«H'emû meriv[f] mîna gîhê ne
û t'emamîya r'ewşa wan mîna
gulê gîhê.
Gîha h'işk dibe û gulêd wê jê
diwarin,
25 lê xebera Xudan h'eta-h'etayê
dimîne».*

Ev ew xeber e, ku bi Mizgînîyê
wer'a hate dayînê.

### Kevirê sax û miletê pîroz

2 1 De her cûr'e xirabîyê, h'i-
lek'arîyê, dur'ûtîyê, h'evsû-
dîyê û buxdanbêjîyê ji p'êşa xwe
dawşînin. 2 Mîna dergûşêd li ber
bistên, h'eyra şîrê sipîyî r'uh'anîda
bin, ku hûn bi wî xilazbûnêr'a
mezin bin. 3 Çimkî nivîsar e: We
«te'ma şîrinayîya Xudan hildaye»*.
4 Xwe li Wî bigirin, Wî kevirê saxî
ku ji meriva t'exsîrkirî[f] ye, lê ji
Xwedêda bijartî û xweyîqedir e.
5 Hûn jî mîna kevirêd sax, p'arist-
geheke r'uh'anî werine çêkirinê,

* 1:16 Qanûna K'ahîntîyê 11:44-45; 19:2; 20:7.
* 1:24-25 Îşaya 40:6-8.
* 2:3 Zebûr 34:8.

çawa k'ahînêd[f] pîroz qurbanêd[f]
r'uh'anîye li Xwedê xweş bi Îsa
Mesîh bidin. 6 Çimkî k'itêbêda
nivîsar e:

«Va Ez Sîyonêda[f] kevirekî
jibareyî û xweyîqedir çawa
kevirê e'nîşkê[f] datînim
û k'î bawerîya xwe Wî bîne,
t'u car wê şermî nemîne»*.

7 Awa ew kevir bona we bawer-
menda xweyîr'ûmet e, lê bona
nebawera:

«Ew kevirê ku hosta t'exsîr kir,
Ew bû serê e'nîşkê»*,

8 «Kevirê ku meriv serda dili-
k'umin
û zinarê ku jê hol dibin»*.

Ew dilik'umin, çimkî guhdarîya
xeberê nakin û çawa wê yekêr'a
jî k'ifşkirî ne.

9 Lê hûn qebîleke jibare ne, k'a-
hînêd p'adşatîyê, miletê buhurtî,
cime'ta Xwedê, wekî k'eremetêd*
Wî bikine dengî, Yê ku hûn ji
te'rîstanîyê gazî r'onaya xweye
h'ujmek'ar kirine**. 10 Wextekê
hûn ne t'u cime't bûn, lê niha
bûne cime'ta Xwedê, hûne bê
r'e'ma Xwedê bûn, lê niha we
r'e'm dîtîye*.

### Xulamêd Xwedê

11 Delalno! Ez hîvî ji we dikim,
çawa merivêd firarî û xerîbe vê
dinê, h'evza xwe ji dilhavijîyêd be-
denê bikin, ku miqabilî r'uh'ê we
şer' dikin. 12 Nava p'ûtp'aristada[f]
hûn xwe usa p'ergal xwey kin, wekî
çi tiştîda jî we r'ezîl bikin çawa
xirab, kirêd weye qenc bibînin û
şikirîyê bidine Xwedê, wê R'oja
ku serîkî bide dinê.

13 Gur'a[f] her serwêrtîyêd meri-
vayêda bin, bona xatirê Xudan,
gur'a p'adşêda bin, çawa serwêrê
herî bilind, 14 usa jî gur'a welîya-
da[f] bin, ku ji alîyê p'adşêda şandî[f]
ne, wekî cezayê bidine neheqa û
pesin jî bidine qenca. 15 Çimkî ev
e qirara Xwedê, ku hûn bi qen-
cîkirinê dengê merivêd bêh'işe
nezan bidine bir'înê. 16 Mîna
merivêd aza bijîn. Bira azayîya we
nebe xêlîya xirabîkirinê, lê bijîn

---

* 2:6 Îşaya 28:16.
* 2:7 Zebûr 118:22.
* 2:8 Îşaya 8:14.
* 2:9 Aha jî tê fe'mkirinê: «T'or'intîya Wî».
** 2:9 Îşaya 43:20-21; Derk'etin 19:5-6.
* 2:10 Hosêya 2:23.

çawa xulamêd Xwedê. 17 Qedirê
h'emûya bigirin xûşk-bira h'iz
bikin, ji Xwedê bitirsin, qedirê
p'adşê bigirin.

### Hûn jî r'îya Mesîhe cefada her'in

18 Xulamno, bi xofk'êşîke mezin
gur'a axayêd xweda bin, ne ku
t'enê gur'a yêd qenc û berbihê-
rada bin, lê gur'a zulmk'arada
jî. 19 Çimkî eva bextewarîk e,
heger yek bona xatirê Xwedê cîkî
heqî-neheq zelûlîyê dik'işîne û
sebir dike. 20 Lê çi feyde heger
hûn bona gunekirinê bêne lêdanê
û teyax kin? Lê heger hûn bona
qencîkirinê cefê bibînin û teyax
kin, hûn li ber Xwedê bextewar
in. 21 Belê hûn vê yekêr'a hatine
gazîkirinê, çimkî Mesîh xwexa
jî bona we cefa k'işand û nexşek
wer'a hişt, wekî hûn p'êgeha Wîda
her'in. 22 Ewî gune nekir û zarê
Wîda h'ilek'arî t'unebû*. 23 Gava
dihate r'ezîlkirinê, ji berva kes
r'ezîl nedikir, gava cefa dik'işand,
gef li kesekî nedixwar, lê Xwe
spartibû[f] h'akimê ser r'astîyê*.
24 Ewî gunêd me bedena Xweda
r'akirine ser dar, wekî em hindava
gunada mirî* bin û bona heqîyê
bijîn: Bi dexmêd Wî hûn qenc
bûn**. 25 Çimkî hûn mîna pezêd
xalifî[f] bûn, lê niha hûn li Şivan
û Se'vîyê r'uh'ê xwe veger'îyane.

### T'emîya bona jin û mêr

3 1 Usa jî k'ulfetno[f], gur'a mêrê
xweda bin, wekî ji wan hinek
jî, heger guhdarîya xeberê nakin,
bi p'ergalîya jinêd xwe, bê gotin
jî bêne ser bawerîyê* 2 gava p'er-
galîya weye xofe û nave-namûs
bibînin. 3 Bira xemila we dervava
bi gulîvegirtinê û t'or'êd zêr'a, yan
jî bi k'inca nîbe*, 4 lê ya merivê
hindur'ê dilda, r'uh'ekî milûk
û girane bedewetîya nebetal e,
ku li ber Xwedê p'ir' bi qîmet e.
5 Çimkî berê bi vî tiherî k'ulfetêd
pîroze ku gumana xwe danîbûne
ser Xwedê, xwe dixemilandin,
xemila wan ew bû ku gur'a mêrê

* 2:22 Îşaya 53:9.
* 2:23 Îşaya 53:7.
* 2:24 Bi gotineke din: «Ji guna dûr» yan «aza».
** 2:24 Îşaya 53:5-6.
* 3:1 Efesî 5:22; Kolosî 3:18.
* 3:3 Tîmot'êyo I, 2:9.

xwe bikirana, 6 mîna Serayê ku
gur'a Birahîmda[f] bû û digote wî:
«Xweyê min». Îdî hûn qîzêd wê
dêyê ne, heger hûn xwe li qencîyê
digirin û ji t'u tiştî natirsin.
7 Usa jî mêrno, bi fe'mdarîyê
e'mirê xwe t'evî jinêd xwe derbaz
kin, çawa qisimê sist qedirê wan
bigirin, usa jî çawa hevalwarê
wê jîyîna ku hûnê p'êşk'êş[f] bis-
tînin, wekî t'u tişt nebine bayîsê
duayêd we*.

### Cefê bona r'astîkirinê bik'işînin

8 Heyneser h'emû jî ser nêtekê
bin, ser hev şewat bin, hev h'iz
bikin, r'e'm û şkestî bin. 9 Ji ber
xirabîyêva xirabîyê nekin, yan ji
ber bêhurmetkirinêva bêhurmet-
kirinê, lê ji ber vanva dua-dirozga
li wan bikin, çimkî hûn vê yekêr'a
hatine gazîkirinê, wekî dua-diroz-
gê sozdayî ser weda bê. 10 Çimkî
nivîsar e:

«K'î jîyînê begem dike
û dixwaze r'ojêd xweş bibîne,
bira zimanê xwe ji xirabîyê
xwey ke
û zarê xwe jî ji h'ilek'arîyê.
11 Bira ji xirabîyê veger'e, qencîyê
bike
û e'dilayîyê biger'e, li pey wê
her'e.
12 Çimkî ç'e'vê Xudan li ser r'asta
ye
û guhê Wî ser duayê wan e,
lê Xudan miqabilî wan e, yêd
ku xirabîyê dikin».*

13 K'î wê xirabîyê li we bike,
heger hûn demana qencîkiri-
nêda bin? 14 Lê heger hûn bona
r'astîkirinê cefê jî bibînin, hûne
xwezilî ne! Îdî ji meriva netirsin
û xwe unda nekin*. 15 Lê belê
Mesîh çawa Xudanê pîroz dilê
xweda bilind bigirin. Her gav
hazir bin, caba wan h'emûya
bidin, yêd ku bona wê gumana
nava weda dipirsin. Lê wê yekê
bi xof û milûktîyê bikin*, 16 xweyê
îsafa[f] r'ih'et bin, wekî, gava hûn
bêne r'ezîlkirinê, yêd ku p'ergalîya
weye qence t'evî Mesîh bêhurmet
dikin, şermî bin. 17 Hê qenc e,
heger qirara Xwedê ye, em bona
qencîyê cefê bik'işînin, ne ku
bona xirabîyê. 18 Çimkî Mesîh

* 3:7 Efesî 5:25; Kolosî 3:19.
* 3:10-12 Zebûr 34:12-16.
* 3:14 Metta 5:10.
* 3:15 Îşaya 8:12-13.

carekê bona her t'im bona guna
cefa k'işand*, Yê heq bona ne-
heqa, wekî me nêzîkî Xwedê ke.
Ew alîyê bedenîda hate kuştinê,
lê alîyê r'uh'anîda jîyînêr'a hate
veger'andinê. 19 Bi r'uh'anî çû na-
va wan r'uh'êd kelêda dannasîn
kir, 20 yêd ku wextekê ne guhdar
bûn, gava Xwedê bi dûmika dirêj
sebir dikir, wî zemanê Nuhda[f],
gava gemî dihate çêkirinê. Wêda
hindik, awa gotî h'eyşt nefs «nava
avêda» xilaz bûn*. 21 Ew av sûre-
tê nixumandinê[f] bû, k'îjan niha
we xilaz dike. Ew nixumandin
ne ku we ji qilêra bedenê dişo,
lê ji îsafa r'ih'et şe'detîk e li ber
Xwedê*. Ew yek bi r'abûna Îsa
Mesîhe ji mirîya we xilaz dike,
22 Yê ku çûye e'zmên, li milê
Xwedêyî r'astê ye û milyak'et,
h'ukumet û qudretêd r'uh'anî
bin gur'a Wîda ne.

4 1 Awa Mesîh ku bona me
bedenî cefa k'işand, hûn jî bi
wê nêt-fikirê sîlih'kirî bin. Çimkî
yê bi bedenî cefa k'işand, wî dest
ji guna k'işandîye, 2 wekî îdî h'eta
mirina xwe, ne ku li gora dilha-
vijîyêd xweye merivayî bijîn, lê li
gora qirara Xwedê. 3 Besî we ye,
ku we wextê jîyîna xweye bihu-
rîda li gora xwestina p'ûtp'arista[f]
derbaz kirîye, hûn pey h'eramîyê[f],
temxwestinêd xirab, pey-vexwa-
rinê, kûç'iksantîyê, serxweşîyê û
p'ûtp'aristîya k'irêt k'etibûn. 4 Ew
p'ûtp'arist e'cêbmayî jî dimînin,
wekî hûn t'evî avîtîya wane bêna-
mûsî nabin û navê xirab li pey we
dixin. 5 Lê ewê li ber Wî cabdar
bin, Yê ku hazir e dîwana mirî
û zêndîya bike. 6 Bona vê yekê jî
wan mirîyar'a Mizgînî hate dayî-
nê, yêd ku bi bedenî mîna meriva
dîwana wan hate kirinê, wekî bi
r'uh'anî bijîn mîna Xwedê.

### P'êşk'êşêd Xwedêye bona civînê[f]

7 Axirîya her tiştî nêzîk bûye.
Awa serwaxt û ser xwe bin, ku
bikaribin dua bikin. 8 Berî her
tiştî, h'izkirina we hindava hevda
bi dil û can be, çimkî h'izkirin
gelek guna dinixême. 9 Hindava
hevda mêvanh'iz bin, bîna xwe

* 3:18 Aha jî tê fe'mkirinê: Dewsa «cefa k'işand» «mir».
* 3:20 Destpêbûn 6:9–8:22.
* 3:21 Aha jî tê fe'mkirinê: «Lê nixumandin bona îsafa qenc şe'detî ye li ber Xwedê». Dewsa xebera «şe'detî» hinek «delîlek» fe'm dikin.

teng nekin*. 10 Ji we k’ê çi p’êş-
k’êş standîye, bi wê jî hevr’a xiz-
metk’arîyê bikin, çawa wek’îlêd
qence k’erema Xwedê. 11 Heger yek
xeber dide, bira gotinêd Xwedê
xeber de, heger yek xizmetk’arî-
yê dike, bira bi wê qewatê bike,
ku Xwedê dayê, wekî her tiştîda
navê Xwedê bê bilindkirinê bi Îsa
Mesîh, r’ûmet û qudret ji Wîr’a
h’eta-h’etayê. Amîn[f].

### Cefa û te’lî-tengîyêd bona navê Îsa Mesîh

12 Delalno! Ji wê alava ten-
gasîyê[f] e’cêbmayî nemînin, ku
bona cêr’ibandinê tê serê we û
nefikirin ku ev çi bela bû li we
qewimî. 13 Lê şa bin, ku hûn t’evî
cefêd Mesîh dibin, wekî wî wextê
xuyabûna r’ûmeta Wî hûnê ji şa-
bûnê geş bin. 14 Heger hûn bona
navê Mesîh bêne r’ezîlkirinê,
hûne xwezilî ne, ku usa ye R’u-
h’ê xweyîr’ûmet, R’uh’ê Xwedê
ser we danîye*. 15 Bira ji we t’u
kes cefê nek’işîne, çawa mêrkuj,
yan diz, yan zulmk’ar, yan jî t’evî
şixulê xelqê bûyî. 16 Lê heger cefê
bik’işîne çawa mesîhî[f], bira şerm
neke, lê şikirîyê bide Xwedê bona
vî navî, ku ser wî ye. 17 Îdî wext
pêr’a gihîştîye, wekî dîwan ji mala
Xwedêda destpêbe û heger pêşda ji
meda destpêdibe, lê axirîya wanê
çawa be, yêd ku gur’a wê Mizgî-
nîya ji Xwedê nakin? 18 Nivîsar e:

«Heger yê r’ast wê bi zorekê
xilaz be,
îdî h’alê nep’ak û gunek’ara[f]
wê çawa be?»*

19 Awa yêd ku li gora qirara Xwedê
cefê dik’işînin, bira xwe li qencî-
yê bigirin, r’uh’ê xwe bispêrine[f]
E’firandarê xweyî amin.

### Bona kerê pezê Xwedê

5 1 Ez hîvî ji berpirsîyarêd
nava weda dikim, ez xwexa
jî çawa berpirsîyar û şe’dê cefêd
Mesîh û heval-p’arê wê r’ûmetê
me, ya ku wê xuya be. 2 Şivantîyê
wî kerîyê pezê Xwedêyî li ber xwe
bikin*, ne ku bê dil, lê bi dil û
can usa xwey kin, çawa Xwedê
dixwaze, ne ku bona k’ara xwe,

* 4:9 Aqûb 5:20; Gotinêd Silêman 10:12.
* 4:14 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Ji alîyê wanva Ew tê bêhurmetkirinê, lê ji alîyê weva tê bilindkirinê».
* 4:18 Gotinêd Silêman 11:31.
* 5:2 Nav hinek destnivîsarada ev jî heye: «Çawa se’vî».

lê bi r’ezedilî**, 3 ne ku li ser yêd
ku p’ara we k’etine h’ukum kin,
lê nexşê qenc nîşanî kêrî kin. 4 Û
gava Serekşivan e’yan be, hûnê
wê t’acê[f] r’ûmetê bistînin, ku
ç’irûsîya wê unda nabe.
5 Usa jî cahilno, gur’a mezinada
bin. Û hûn h’emû jî, li ber hev
şkestî bin, xulamtîyê hevdur’a
bikin, çimkî nivîsar e:

«Xwedê miqabilî k’ubar-babaxa
ye,
lê k’eremê dide şkestîya»*.

6 Bin destê Xwedêyî zor ta bin,
ku Ew wextda we bilind ke* 7 û
h’emû xemêd xwe bavêjine ser
Wî, çimkî Ew bona we xem dike.
8 Serwaxt bin, h’işyar bimî-
nin! Mîrêcinê[f] neyarê we mîna
şêr mir’e-mir’a wî ye, diger’e k’a
k’ê h’ûfî xwe ke. 9 Bawerîyêda
h’îmgirtî miqabilî wî bisekinin,
çimkî hûn zanin ku xûşk-birêd
we jî t’emamîya dinyayêda xût
wan cefa dik’işînin. 10 Lê Xwe-
dêyê t’emamîya k’eremê, Yê ku
pê Mesîh hûn gazî r’ûmeta xweye
h’eta-h’etayê kirine, pey hinek cefa
dîtinêr’a, wê Xwexa we k’amil ke,
bişidîne, qewat ke, xweyîbingeh
ke. 11 Qudret ji wîr’a h’eta-h’eta-
yê. Amîn.

### Silavêd axirîyê

12 Min bi destê Sîlas*, çawa
birakî amin ez wî h’esab dikim,
kin wer’a nivîsî, dil didime we û
şe’detîyê didim, ku ev e k’erema
Xwedêye r’ast. Vêda hûn qewîn
bisekinin. 13 Civîna[f] Babîlonêda[f]*
li we silav dike, ya ku t’evî we
hatîye bijartinê, usa jî lawê min
Marqos. 14 Bi r’amûsana h’izkiri-
nêye dilê sax hevdu silav kin. De
bira e’dilayî li we h’emûyêd p’ara
Mesîh be. Amîn.

---

** 5:2 Yûh’enna 21:15-17.

* 5:5 Gotinêd Silêman 3:34.

* 5:6 Metta 23:12; Lûqa 14:11; 18:14.

* 5:12 Bi yûnanî «Sîlvano» nivîsar e, ku cûr’ekî navê «Sîlas» e.

* 5:13 Bi fikira hineka hingê bawermenda bajarê R’oma[f] Îtalyayêr’a digotin «Babîlon».

# NE’MA PETRÛSE DUDA

## Pêşgotin

Petrûsê[f] şandî[f] bi vê ne’ma xweye duda berbir’î h’emû bawermenda dibe. Meremê wîyî mezin ew bû, ku pêşîya hînkirina dersdarêd şaş bide girtinê û bawermend ji wê hînkirinê nexalifin, ya ku bi destê wan meriva[f] hatîye hînkirinê, k’îjana bi ç’e’vê xwe Îsa dîtibûn û bi guhê xwe gotinêd Wî bihîstibûn. Ew berk’ davêje wan, yêd ku dibêjin Mesîh venager’e û hînkirinêd zewal[f] hîn dikirin û r’abûn-r’ûniştina xweda jî ne r’êva bûn. Ew serda zêde dike ku derengîk’etina Îsa Mesîh ji sebira Xwedê ye, k’ara xilazbûna[f] r’uh’ê însên e, çimkî Xwedê naxwaze ku t’u kes unda be, lê ew dixwaze wekî h’emû jî ji gunekirinê veger’in (3:9).

### Serecema fikira ne’mê

Pêşgotin (1:1-2)
Gazî û bijartina Xwedêye hindava mesîhîyada[f] (1:3-21)
Dersdarêd şaşe derew (2:1-22)
Hatina Mesîhe duda (3:1-18)

### Silavkirin

1 [1] Ji Şimh’ûn Petrûsê[f] xulam
û şandîyê[f] Îsa Mesîh,
wanr’a, yêd ku bi heqîya Xwe-
dê Xilazkirê[f] me Îsa Mesîh* ew
bawerîya[f] xweyîqîmet standin,
çawa me stand:
[2] De bira k’erem[f] û e’dilayî bi
wê zanebûna Xwedê û Xudanê[f]
me Îsa li ser we zêde be.

### Gazî û bijartina Xwedê

[3] Qewata xwedêtîya Wî her
tiştê ku li jîyîna xwedênasîyê
dik’eve p’êşk’êşî[f] me kir, bi wê

* [1:1] Aha jî tê fe’mkirinê: «Xwedê û Xilazkirê me Îsa Mesîh».

zanebûna meye hindava Wîda,
Yê ku bi saya r’ûmet û qencîya
Xwe gazî me kir. 4 Bi vî awayî
Ewî sozêd here mezine qîmet
dane me, wekî em bi wan t’evî
binyat’a xwedêtîyê bin û ji wê
boş-betalîya ku ji dilhavijîyêd
dinê pêşda tê bir’evin.

5 Hema bona vê yekê her alîya-
va xîret kin, ser bawerîya xweda
qencîyê zêde kin, ser qencîyêda
zanebûnê, 6 ser zanebûnê xwe-
girtinê, ser xwegirtinê sebirê, ser
sebirê xwedênasîyê, 7 ser xwedê-
nasîyê h’uba xûşk-bira û ser h’uba
xûşk-bira h’izkirinê. 8 Çimkî heger
ev şuretana nava weda hene û zêde
dibin, hûn bêkêr û bêber namînin
nava wê zanebûna weye hindava
Xudanê me Îsa Mesîhda. 9 Lê li
cem k’ê ev şuretana t’unene, ew
ç’e’vada haqas me’rim e, wekî qet
nabîne û bîr kirîye ku ji gunêd
xweye berê paqij bûye.

10 Bona vê yekê xûşk-birano,
hê bikin ku wê gazî û jibarebûna
xwe t’estîq kin. Hûn ku vê yekê
bikin, t’u car nak’evin. 11 Bi vî
awayî dergehê li ber we bi mer’-
danî vebe, ku bik’evine P’adşatîya
h’eta-h’etayêye Xudan û Xilazkirê
me Îsa Mesîh.

12 Bona vê yekê ez her gav di-
xwazim ku van tişta bikime bîra
we, çawa hûn zanin û ser wê r’as-
tîya ku gihîştîye we jî h’îmgirtî
ne. 13 Ez vê yekê jî r’ast dibînim,
wekî h’eta vî qalibîda me bînime
bîra we. 14 Çimkî zanim ku ezê
zûtirekê vî qalibî ji xwe bêxim,
çawa ku Xudanê me Îsa Mesîh
e’lamî min kirîye. 15 Awa ezê
bikim, ku pey çûyîna minr’a jî,
hûn her gav bikaribin van tişta
bînine bîra xwe.

### Yêd ku bi ç’e’va r’ûmeta Îsa Mesîh dîtin

16 Em ne ku pey ç’ilovîskîyêd
hostatîye berxwederxistî k’etibûn
gava me derheqa qewat û hatina
Xudanê me Îsa Mesîhda wer’a
got, lê me bi ç’e’vêd xwe me-
zinayîya dîndara Wî dît. 17 Ewî
ji Bav[f] Xwedê r’ûmet û hurmet
stand, gava ji wê R’ûmeta Qeşeng
deng hat û got: «Ew e Kur’ê Mi-
nî delal, ji k’îjanî Ez r’azî me»*.
18 Me xwexa ev deng bihîst, gava
ji e’zmên hat, hingê em t’evî Wî
serê ç’îyayê buhurtî bûn.

19 Awa gotinêd p’êxembertîyê[f] jî
bona me hê mak dibin. Qenc e wekî
hûn dîna xwe bidine wan, çimkî

* 1:17 Metta 17:1-5.

ew mîna ç’irakê ne, ku te’rîyêda
r’onayê dide, h’eta sibeh zelal be
û steyrka berbir’o dilê weda derê.
20 Lê pêşîyê vê yekê zanibin ku t’u
kes xweserîxwe nikare p’êxember-
tîyêd nivîsarê şiroveke. 21 Çimkî
t’u p’êxembertî bi xwestina dilê
meriva[f] nehatîye dayînê, lê me-
riva bi r’êberîya R’uh’ê[f] Pîroz ji
Xwedêda xeber dane*.

### Dersdarêd derew

2 1 P’êxemberêd derew jî nava
cime’ta Îsraêlêda[f] derk’etine,
çawa li nava weda jî wê dersda-
rêd derew derên. Ewê hînkirinêd
zewal[f] vedizine nava we, wî Xwe-
yîyê ku ew k’ir’în jî înk’ar[f] kin û
zûtirekê belayê bînine serê xwe.
2 Gelek wê ber bayê bênamûsîya
wan k’evin, r’ûyê wanda wê r’îya
r’astîyê bê bêhurmetkirinê. 3 Wê ji
dest timak’arîyê bi zarê xweş we
bixapînin bona k’ara xwe. Dîwana
wanê derengî nebe, bela wan ber
şêmîkê ye.

4 Çimkî h’eyfa Xwedê li wan
milyak’etêd[f] ku gune[f] kirin nehat,
lê ew qeydkirî avîtine zindana
te’rîstanîyê, R’oja Dîwanêr’a dane
xweykirinê. 5 Û h’eyfa Wî dinya
pêşin jî nehat, t’enê h’eyşt nefs,
Nuhê[f] ku heqî dannasîn dikir,
mala wîva xilaz[f] kir gava lêyî[f]
anî ser dinya nep’aka*. 6 Dîwa-
na bajarêd Sodom[f] û Gomorayê
jî kir, ew kirin ax-xwelî, wêran
kir, bona nep’akêd pey wanr’a
dersek hişt.* 7 Lûtê[f] r’ast jî, ku ji
bêp’ergalîya nep’akaye bênamûsî
aciz bibû, xilaz kir. 8 Çimkî ewî
r’ast, ku nava wanda dima, kirêd
bêolîtîya[f] wan didîtin û dibihîstin,
her r’oj r’uh’ê wîyî r’ast xweda
dişewitî. 9 Xudan ku bi vî awayî
kir, ew zane çawa xwedênasa jî
ji cêr’ibandina[f] xilaz ke û neheqa
R’oja Dîwanêr’a xwey ke, wekî
cezayê xwe bistînin, 10 îlahî[f] wan,
yêd ku pey h’eramîya[f] xwestina
qalib k’etine, dijenine serwêrtîyê.

Ewe berzeq û xwer’azî ne, xof
jî nakin, yêd xweyîr’ûmete jorin
bêhurmet dikin, 11 lê milyak’et
çiqasî pê qewat û zorayîya xwe
ji van zêdetir in, dîsa li ber Xu-
dan bi bêhurmetkirinê şikîyatê[f]
wan nakin. 12 Ev merivana mîna

---

* 1:21 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Lê merivêd Xwedêye pîroz[f] bi r’ê-berîya R’uh’ê Pîroz xeber dane».
* 2:5 Destpêbûn 6:18; 7:13.
* 2:6-7 Destpêbûn 19.

h'eywanêd bêzare-bêziman in,
bi qafê xweye vala têne r'êberî-
kirinê, ku bona nêç'îr û kuştinê
dinê k'etine, wan tişta bêhurmet
dikin ku nizanin ew çi ne, evê
jî mîna wan h'eywana unda bin
her'in. **13** Xirabîya wanê li wan
veger'e. K'êfa dilê xwer'a xirabî-
ya ku r'o-nava-r'ojê dikin xwer'a
şabûn h'esab dikin. Evana lek'e û
h'eram in, t'evî we dixwin-vedi-
xwin û hingê nava r'îyêd xweye
derewda k'êf dikin. **14** Ç'e'vêd wan
li zinêk'arîyê ye, ji gunekirinê t'êr
nabin, bawermendêd neşidîyayî
pey xwe dibin, dilê wan t'enê hînî
timak'arîyê bûye. Nifir' ser wan
e! **15** Destê xwe ji r'îya r'ast kirin,
xalifîn[f], r'îya Bilamê[f] Beûrda çûn,
yê ku maşê neheqîyê h'iz kir*.
**16** Lê li neheqîya wî hate hilatinê[f]
gava k'era bêzare-bêziman bi zi-
manê merivayê xeber da û pêşîya
bêaqilîya p'êxember girt.

**17** Ev merivêd ha kanîyêd ç'i-
kîyayî ne û e'wrêd ji ber bê ajotî
ne. Şever'eşa te'rîstanîyê bona
wan xweykirî ye. **18** Yêd ha goti-
nêd p'ûç'e ji xwe mestir dibêjin,
bi temêd merivayêye xirab wan
dixapînin, yêd ku çendek pêşda ji
ewêd r'îya xalifîda diçin, r'evîbûn.
**19** Evana yêd ahar'a azayîyê soz
didin, lê xwexa xulamêd p'ûç'bûnê
ne, çimkî meriv çi tiştîda ku dide
der, dibe xulamê wê yekê. **20** Heger
ewêd ku pê zanebûna hindava
Xudan û Xilazkirê me Îsa Mesîh
carekêr'a destê xwe ji h'eramîyêd
dinê kirin, paşê dîsa bik'evine
nava wan h'eramîya, bidine der,
axirîya wanê ji ya pêşin xirabtir
be. **21** Wanr'a hê qenc bû, ku qet
ev r'îya heqîyê nas nekirana, ne
ku pey naskirinêr'a ji wê t'emîya
pîroz[f] dager'îyana, ya ku wanr'a
hate dayînê. **22** Ev gotin r'ast tê
serê wan:

«Se vediger'e ser ver'eşandina
xwe»* û
«Berazê şûştî dîsa xwe h'er'îyê
vedide».

### Sozê hatina Xudan

**3** **1** Delalno, eva îdî ne'ma duda
ye ez wer'a dinivîsim. Ez bi
van ne'ma dikim ku fikira weye
safî h'işyar kim, bînime bîra we.
**2** Dixwazim wekî hûn gotinêd p'ê-
xemberêd pîroz, ku pêşda gotibûn
û wê t'emîya Xudan û Xilazkir, ku
bi şandîya hatine gotinê bîr bînin.

---

* 2:15 Jimar 22.
* 2:22 Gotinêd Silêman 26:11.

3 Berî her tiştî vê yekê zanibin ku
r'ojêd axirîyêda merivê derên,
qerfê xwe xwedênasa bikin, ewê
bi xwestina dilê xwe bimeşin*
4 û wê bêjin: «K'a ew sozê hatina
Wî? Bavêd me e'mirê Xwedê cî
anîn çûn, lê her tişt hê ji wextê
e'firandina dinyayêda usa mane».
5 Yêd aha ku difikirin, vê yekê
davêjine pişt guhê xwe, ku hê
pêşda bi xebera Xwedê e'zman
hebûn û e'rd ji nava avê û bi avê
p'eyda bû*. 6 Û bi avê jî dinya be-
rê nuq bû, unda bû*. 7 Lê e'rd û
e'zmanêd niha jî xût bi wê xeberê
têne xweykirinê, ku bi agir unda
bin. Ew bona R'oja[f] Axretê têne
hiştinê, k'îjanêda merivêd nep'ak
wê unda bin her'in.

8 Lê bira ev yek weva te'rî ne-
mîne, delalno: Cem Xudan r'ojek
mîna h'ezar salî ye û h'ezar sal
jî mîna r'ojekê ye*. 9 Xudan sozê
Xwe derengî nayêxe, çawa hinek
difikirin. Ew bi dûmika dirêj li
we sebir dike, naxwaze t'u kes
unda be, lê dixwaze wekî h'emû
ji gunekirinê veger'in[f].

10 Lê R'oja hatina Xudan wê
mîna dizekî bê. Hingê e'zma-
nê bi qûjînîya mezin betavebin[f]
û tiştêd bin p'er'ê wanda jî wê
bişewitin* wêran bin, dinya û
her tiştêd wêda jî wê unda bin**
her'in***. 11 Heger ev her tişt wê
bi vî awayî wêran bin her'in, hûn
gerekê merivne çawa bin? Gerekê
hûn jîyîna h'elal û xwedênasîyêda
bimeşin, 12 hîvîya R'oja Xwedê bin
û hatina Wî lez xin. Wê r'ojê e'z-
manê bişewitin, wêran bin, agirê
jî tiştêd bin p'er'ê wêda bih'elîne.
13 Lê em hîvîya e'rdekî nû û e'z-
manêd nû ne, li gora sozê Wî,
k'îjanada heqîyê bimîne.

14 Awa delalno, hûn ku hîvîya
van yeka ne, bikin ku Ew we bê-
lek'e û bêqusûr e'dilayîyêda t'evî
Xwe bibîne. 15 Sebira Xudanê me
xilazbûn[f] h'esab kin, çawa Pawlosê

* 3:3 Cihûda 1:18.
* 3:5 Destpêbûn 1:6-7.
* 3:6 Destpêbûn 7:11.
* 3:8 Zebûr 90:4.
* 3:10 Vê r'êzêda, usa jî r'êza 12-da aha jî tê fe'mkirinê: «T'opêd e'zmana (hîv, r'o, steyrk û yêd mayîn) bin p'er'ê wanda jî wê bişewitin».
** 3:10 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Dinya û her kirêd nava wêda wê xuya bin» yan «bişewitin».
*** 3:10 Metta 24:43; T'êsalonîkî I, 5:2.

birê meyî delal jî bi wê serwaxtîya[f]
ku ji Xwedêda jêr'a hatîye dayînê,
wer'a nivîsî. 16 H'emû ne'mêd xwe-
da jî ew bona van tişta xeber dide.
Wanda çend tişt hene ku ze'met
têne fe'mkirinê, ku yêd nezane
bêbingeh şaş şirovedikin, usa jî
nivîsarêd[f] pîroze mayîn û xwexa
dibine bayîsê serê xwe.

17 Awa delalno, hê berêda hûn
ku vê yekê zanin, haş ji xwe he-
bin, ku nebe hûn bi xalifandina
merivêd bêolîtîyê[f] ji r'ê derk'evin
û ji cîyê xweyî şidîyayî bik'evin.
18 Lê k'erem[f] û zanebûna Xudan
û Xilazkirê me Îsa Mesîhda bigi-
hîjin. Şikir ji Wîr'a, niha û h'eta
h'etayê! Amîn[f].

# NE’MA YÛH’ENNAYE PÊŞIN

## Pêşgotin

Nivîsk’ar xwexa navê xwe ne’mêda nade, lê li gora wan şe’dêd sedsalîyêd pêşinda xudanê vê ne’mê Yûh’enna[f] ye, awa gotî xût ew Yûh’enna ye, yê ku «Mizgînîya li gora Yûh’enna» nivîsîye. Yûh’enna vê ne’mêda ser du merema sekinîye:

**1.** Dil dide ber xwendevana, ku yektîya Xwedê û Kur’ê Wî Îsa Mesîhda bijîn.

**2.** Xwendevan miqatî xwe bin, ku pey hînkirinêd şaş neçin, k’îjan yektîya t’ev Xwedê xirab dikin.

Li gora dîtina wan dersdarêd şaş, her tiştêd ku vê dinêda berç’e’va ne, ew xirab in, t’enê tiştêd r’uh’anî qenc in û tiştêd fîzîkî û r’uh’anî nikarin bigihîjine hev ku bibin yek. Lema jî vana bi vê fikira xwe nikaribû bawer bikira, ku Îsayê Kur’ê[f] Xwedê bi xûn û goşt hatîye vê dinê, usa jî ew nikaribû bimira. Serda jî wan dersdara hîn dikir, ku hingê meriv[f] digihîje xilazbûnê[f], gava t’ewqê xwe ji dinê diqetîne. Wana bawer dikir, ku yêd r’uh’anî dikarin her cûr’e bênamûsî û k’êfêd xweş derbaz kin, çimkî heleqetîya r’uh’ t’evî qalib t’une û r’uh’ nah’er’ime. Sedsalîya yekê h’eta sisîyada ev hînkirina «ginostîkîyê» dihate belakirinê.

Şandî[f] zelal dibêje ku Mesîh r’ast bû merî. Ewê ku vê yekê qebûl nake, wekî Îsa Mesîh bedena însênda hate dinê, ew ji R’uh’ê Xwedê xeber nade, lê ew ji ek’sîmesîh e (4:3). Zar’êd Xwedêye r’ast hindava hevda r’astîyê û h’izkirinêda dimînin, lê «yê ku h’iz nake ew Xwedê nas nake, çimkî Xwedê h’izkirin e» (4:8).

#### Serecema fikira ne’mê

Pêşgotin (1:1-4)
R’onayî û te’rî (1:5–2:29)
Zar’êd Xwedê û zar’êd mîrêcin[f] (3:1-24)

R’astî û ner’astî (4:1-6)
Borcê h’izkirinê (4:7-21)
Bawerîya serk’etî (5:1-21)

### Xebera jîyînê

**1** 1 Em ser wê yekê wer’a dibêjin, çi ku serê sêrîda hebû, me ew yek bihîst, bi ç’e’vê xwe dît, li Wî nihêr’î û dest dane Wî: Ew Xebera jîyînê ye*. 2 Jîyîn e’yan bû, me ew dît, em şe’detîyê didin û bona wê jîyîna[f] h’eta-h’etayê wer’a dibêjin, ya ku cem Bavê[f] bû û meva e’yan bû*. 3 Ew tiştê ku me dît û bihîst em wer’a jî dibêjin, wekî hûn jî meva t’evgirêdayî bin û ev t’evgirêdana me jî t’evî Bav û Kur’ê Wî Îsa Mesîh e. 4 Em van tişta wer’a dinivîsin, wekî şabûna me* t’emam be.

### Xwedê r’onayî ye: Em nava r’onayîya Wîda her’in

5 Ev e ew gotina ku me ji Wî bihîst û e’lamî we dikin, ku Xwedê r’onayî ye û t’u te’rî Wîda t’une. 6 Heger em bêjin: «Em Xwedêva t’evgirêdayî ne», lê te’rîyêda biger’in, em derewa dikin û r’astîyê nakin. 7 Lê heger em r’onayêda biger’in, çawa ku Ew r’onayêda ye, emê hevva t’evgirêdayî bin û xûna Îsayê Kur’ê Wî wê me ji h’emû guna[f] paqij ke. 8 Heger em bêjin: «Gunê[f] me t’une», em xwexa xwe dixapînin û r’astî nava meda t’une. 9 Lê heger em gunêd xwe bidine r’ûyê xwe, Ew xweyê sozê Xwe ye û heqîyê dike, wê gunêd me bibaxşîne û me ji h’emû neheqîya paqij ke. 10 Heger em bêjin: «Me gune nekirîye», em Wî derewîn derdixin û xebera Wî nava meda t’une.

### Îsa Mesîh piştgirê me ye

**2** 1 Zar’okêd min, ez vê yekê wer’a dinivîsim, wekî hûn guna nekin, lê heger yek gune bike, li cem Bavê piştgirê me, Îsa Mesîh, Yê Heq heye. 2 Ew e mecala baxşandina gunêd me û ne ku t’enê gunêd me, lê gunêd t’emamîya dinyayê jî.

* 1:1 Yûh’enna 1:1.
* 1:2 Yûh’enna 1:14.
* 1:4 Nav hinek destnivîsarada dewsa «me» «we» heye.

3 Bi wê yekê em zanin ku em Wî
nas dikin, heger em t'emîyêd Wî
xwey kin. 4 Yê ku dibêje: «Ez Wî
nas dikim», lê t'emîyêd Wî naqe-
dîne, ew derewîn e û r'astî nava
wîda t'uneye. 5 Lê yê ku gotina Wî
diqedîne, h'izkirina Xwedê r'ast
nava wîda t'emam e. Bi vê yekê
em zanin ku em nava Wîda ne:
6 Ewê ku dibêje: «Ez nava Wîda
me», gerekê usa bijî, çawa Îsa jît.

**T'emîya nû**

7 Delalno, ne ku t'emîke nû ez
wer'a dinivîsim, lê wê t'emîya
kevine ku hûn berê pêşda zanin.
T'emîya kevin ew xeber e, ya ku
we pêşda bihîstîye*. 8 Lê belê t'e-
mîke nû ez wer'a dinivîsim, ku
r'astîya wê yekê çawa nava Wîda
xuya dibe, usa jî nava weda. Çimkî
te'rî derbaz dibe û r'onaya r'ast
îdî r'onayê dide.

9 Ewê ku dibêje: «Ez nava r'o-
nayêda me», lê birê wî ber ç'e'va
r'eş e, ew hela hê nava te'rîyêda
ye. 10 Ewê ku birê xwe h'iz dike,
nava r'onayêda dimîne û nabe
sebeb, ku hinek ji r'ê bik'evin*.
11 Lê ewê, ku birê wî ber ç'e'va
r'eş e, ew nava te'rîyêda ye, nava
te'rîyêda diger'e û nizane k'uda
diçe, çimkî te'rîyê ç'e'vêd wî kor
kirine.

12 Ez wer'a dinivîsim, zar'okno,
çimkî bi saya navê Wî gunêd
we afû[f] bûne.
13 Ez wer'a dinivîsim, bavno,
çimkî hûn Wî nas dikin, Yê
ku berê pêşda heye.
Ez wer'a dinivîsim, cahilno,
çimkî hûn ser yê Xirab k'etin.
14 Ez wer'a dinivîsim xişîmno,
çimkî hûn Bavê nas dikin.
Ez wer'a dinivîsim, bavno,
çimkî hûn Wî nas dikin, Yê
ku berê pêşda hebû.
Ez wer'a dinivîsim, cahilno,
çimkî hûn qewat in
û xebera Xwedê nava weda
dimîne
û ser yê Xirab k'etine.

**Dinyayê h'iz nekin**

15 Dinyayê h'iz nekin, ne jî wan
tiştêd ku dinyayêda ne. Heger yek
dinyayê h'iz dike, h'izkirina Ba-
vê nava wîda t'une. 16 Çimkî her
tiştêd ku dinyayêda ne, dilhavijî,
ç'e'vhavijî û k'ubar-babaxîya vî
e'mirî ye, ew ne ji Bavê ne, lê ji
vê dinyayê ne. 17 Dinyayê jî derbaz

* 2:7 Yûh'enna 13:34.
* 2:10 Aha jî tê fe'mkirinê: «Û nabe sebeb, ku ew ji r'ê bik'eve».

be, havijîya wê jî, lê ewê ku e'mirê
Xwedê diqedîne wê h'eta-h'etayê
bimîne.

### H'evza xwe ji ek'sîmesîha bikin

18 Zar'no, va wextê axirîyê ye.
Û çawa we bihîstîye ku ek'sîme-
sîh wê bê, îdî gelek ek'sîmesîh
hatine. Ji wê yekê jî em zanin ku
wextê axirîyê ye. 19 Hinek ji nava
me derk'etin, lê ew ne ji me bûn.
Heger ew ji me bûna, wê t'evî
me bimana. Lê ew ji nava me
derk'etin, ku e'yan be, ew h'emû
ne ji me bûn.
20 Lê we ji Mesîhê[f] Pîroz[f] R'uh'
p'êşk'êş[f] standîye* û hûn h'emû**
jî r'astîyê zanin. 21 Ez wer'a na-
nivîsim, çawa ku hûn r'astîyê
nizanin, lê çawa ku hûn wê yekê
zanin, usa jî zanin ku her derew
ne ji r'astîyê ye. 22 K'î ye derewîn?
Hema ew e, yê ku dibêje: «Îsa ne
Mesîh e». Ew e ek'sîmesîh, yê ku
Bav û Kur' înk'ar[f] dike. 23 Ewê ku
Kur' înk'ar dike, heleqetîya wî
t'evî Bavê t'une. Lê yê ku Kur'
îqrar[f] dike, heleqetîya wî t'evî
Bavê heye.
24 Awa çi ku we pêşda bihîstîye,
bira ew nava weda bimîne. Heger
ew tiştê we pêşda bihîstîye nava
weda bimîne, hûnê jî nava Kur'
û Bavêda bimînin. 25 Û ev e ew
sozê ku Wî da me, ew jîyîna h'e-
ta-h'etayê ye.
26 Ez vî tiştî derheqa wanda we-
r'a dinivîsim, yêd ku dixwazin we
bixapînin. 27 Lê çi derheqa weda
ye, ew R'uh'ê* ku we ji Mesîh
standîye, nava weda dimîne. Îdî
ne h'ewce ye, ku yek we hîn ke,
çimkî R'uh' bona her tiştî we hîn
dike û çi ku hîn dike r'ast e, ne
derew e. Çawa Ewî hûn hînkirin,
nav Mesîhda usa bimînin.

### Zar'êd Xwedê

28 Belê zar'okno, nava Wîda
bimînin, wekî çaxê Ew e'yan
be, em ji hatina Wî venek'işin, li
ber Wî şermî nemînin. 29 Heger
hûn zanin ku Ew r'ast e, usa jî
zanibin her kesê ku r'astîyê dike,
ew ji Wî bûye.

3 1 Binihêr'in, Bavê em çawa h'iz
kirin, wekî em zar'êd Xwedê
bêne gotinê û r'ast jî em ew in.

* 2:20 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Lê hûn ji Ewî Pîroz hatine r'ûnkirinê[f]».
** 2:20 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Hûn her tiştî (h'emûya) zanin».
* 2:27 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «R'ûnkirin».

Lema dinya me nas nake, çimkî
ew jî nas nekir*. 2 Delalno, niha
em zar’êd Xwedê ne û hela hê ne
e’yan e emê bibine çi. Lê em vê
yekê zanin ku çaxê Îsa e’yan be,
emê bibine mîna Wî, çimkî emê
Wî usa bibînin, çawa heye. 3 Her
kesê ku bona vê yekê gumana xwe
danîye ser Wî, ew xwe usa paqij
dike, çawa ku Mesîh paqij e.

4 Her kesê ku gune dike, ew
Qanûna Xwedê dit’er’ibîne û gune[f]
xût qanûnt’er’ibandin e. 5 Û hûn
zanin ku Mesîh bona wê yekê
e’yan bû, wekî guna hilde û na-
va Wîda gune t’une*. 6 Her kesê
ku nava Wîda dimîne, ew nava
gunada namîne, lê her kesê ku
nava gunada dimîne, ewî ne Ew
dîtîye, ne jî nas kirîye.

7 Zar’okno, bira t’u kes we nexa-
pîne. Yê ku r’astîyê dike, ew yekî
r’ast e, çawa Îsa r’ast e. 8 Yê nava
gunada dimîne, ew ji mîrêcin e,
çimkî mîrêcin ji berê pêşda gune
dike. Bona vê yekê Kur’ê Xwedê
e’yan bû, wekî kirêd mîrêcin xirab
ke. 9 Her kesê ku ji Xwedê bûye,
nava gunada namîne, çimkî binya-
t’a Xwedê nava wîda dimîne û ew
nikare nava gunada bimîne, çimkî
ji Xwedê bûye. 10 Zar’êd Xwedê û
zar’êd mîrêcin bi vê yekê ji hev
têne firqîkirinê: Ewê ku r’astîyê
nake, ew ne ji Xwedê ye û usa jî
ewê ku birê xwe h’iz nake.

### Hevdu h’izkirin û r’ûspîtîya li ber Xwedê

11 Ev e ew gotin, ya ku we berê
pêşda bihîstîye: Gerekê em hevdu
h’iz bikin*. 12 Mîna Qayîn[f] nîbin,
ku ji yê Xirab bû û birê xwe kuşt.
Û bona çi ew kuşt? Çimkî kirêd
wî xirab bûn, lê yêd birê wî qenc*.

13 E’cêbmayî nemînin gelî
xûşk-bira, heger hûn ber ç’e’vê
dinyayê r’eş bin. 14 Em zanin ku
em ji mirinê derbazî jîyînê bûne,
çimkî em xûşk-birayêd xwe h’iz
dikin. Ewê ku h’iz nake, ew na-
va mirinêda dimîne. 15 Her kesê
ku birê wî ber ç’e’va r’eş e, ew
mêrkuj e û hûn zanin ku nava
t’u mêrkujîda jîyîna h’eta-h’etayê
t’une. 16 Em bi vê yekê h’izkirinê
h’esîyan: Îsa jîyîna Xwe bona me
da. Em jî gerekê jîyîna xwe bona

* 3:1 Yûh’enna 1:12.
* 3:5 Yûh’enna 1:29.
* 3:11 Yûh’enna 13:34.
* 3:12 Destpêbûn 4.

xûşk-birayêd xwe bidin. 17 Lê
heger hebûka[f] yekî vê dinê hebe
û birê xwe h’ewcê tiştekî dibîne,
dilê wî ser naşewite, h’izkirina
Xwedê çawa dikare dilê wîda bi-
mîne? 18 Zar’okno, ne ku em bi
xeber yan zarê xwe h’iz bikin, lê
bi kira û r’astîyê.

19 Bi vê yekê emê zanibin ku em
ji r’astîyê ne û bikaribin bi dilekî
r’ih’et ber Xwedê bisekinin. 20 Lê
heger dilê me dîsa me neheq ke,
Xwedê ji dilê me mestir e û her
tiştî zane. 21 Delalno, heger dilê
me me neheq neke, em dikarin
r’ûsipî ber Xwedê bisekinin. 22 Û
çi ku bixwazin, emê ji Wî bistînin,
çimkî em t’emîyêd Wî diqedînin
û ew tiştêd ku li Wî xweş tên, em
wan dikin. 23 Û ev e t’emîya Wî,
ku em bawerîya[f] xwe navê Kur’ê
Wî Îsa Mesîh bînin û em hevdu
h’iz bikin, çawa ku Ewî t’emî li
me kir*. 24 Û ewê ku t’emîyêd Wî
xwey dike, nava Xwedêda dimîne
û Xwedê jî nava wîda. Û em ji vê
yekê zanin ku Ew nava meda dimî-
ne, bi wî R’uh’ê ku Ewî daye me.

### R’uh’ê r’ast û r’uh’ê derew

4 1 Delalno, bawerîya xwe her
r’uh’î neynin, lê wan r’uh’a
bicêr’ibînin[f], gelo ew ji Xwedê ne?
Çimkî gelek p’êxemberêd derew
derk’etine dinê. 2 Hûn bi vê yekê
dikarin R’uh’ê Xwedê nas bikin:
Her r’uh’ê ku Îsa Mesîh bi xûn û
goşt hatî îqrar dike, ew ji Xwedê
ye. 3 Lê her r’uh’ê ku Îsa bi xûn
û goşt hatî îqrar nake, ew ne ji
Xwedê ye. Ev ji ek’sîmesîh e, bona
k’îjanî we bihîstibû ku wê bê û îdî
ew li dinyayêda ye.

4 Hûn ji Xwedê ne, zar’okno û
hûn ser p’êxemberêd derew k’e-
tine, çimkî Ew R’uh’ê nava weda
ji wî r’uh’ê ku nava dinyayêda ye
mestir e. 5 Ew ji dinyayê ne, lema
ew ji dinyayê xeber didin û dinya
guhdarîya wan dike. 6 Em ji Xwe-
dê ne. Yê ku Xwedê nas dike, ew
guhdarîya me dike. Yê ku ne ji
Xwedê ye, ew guhdarîya me nake.
Bi vê yekê em R’uh’ê r’astîyê û
r’uh’ê ner’astîyê ji hev derdixin.

### Xwedê h’izkirin e

7 Delalno, de em hevdu h’iz bi-
kin, çimkî h’izkirin ji Xwedê ye û
her kesê ku h’iz dike ew ji Xwedê
bûye û Xwedê nas dike. 8 Yê ku h’iz
nake ew Xwedê nas nake, çimkî
Xwedê h’izkirin e. 9 Bi vê yekê
h’izkirina Xwedê hindava meda

* 3:23 Yûh’enna 13:34; 15:12, 17.

xuya bû, gava ku Ewî Kur’ê Xweyî
Tayê T’enê şande dinyayê, wekî
em bi Wî bijîn. 10 H’izkirin ev e,
ne ku me Xwedê h’iz kir, lê Ewî
em h’iz kirin û Kur’ê Xwe şand
çawa mecala baxşandina gunêd
me. 11 Delalno, heger Xwedê aha
em h’iz kirin, wekî usa ye gerekê
em jî hevdu h’iz bikin. 12 T’u kesî
Xwedê t’u cara ne dîtîye. Heger
em hevdu h’iz dikin, Xwedê nava
meda dimîne û h’izkirina Wî dilê
meda gihîştîye*.

13 Bi vê yekê em zanin ku em
nava Wîda dimînin û Ew jî nava
meda, çimkî Ewî ji wî R’uh’ê
Xwe daye me. 14 Me dît û em
şe’detîyê didin, ku Bavê Kur’ê
Xwe şand, wekî bibe Xilazkirê[f]
dinyayê. 15 Heger yek îqrar dike
ku Îsa Kur’ê Xwedê ye, Xwedê
nava wîda dimîne û ew jî nava
Xwedêda. 16 Awa em wê h’izkirina
Xwedêye hindava xweda nas dikin
û bawer dikin.

Xwedê h’izkirin e û yê ku na-
va h’izkirinêda dimîne, ew nava
Xwedêda dimîne û Xwedê jî nava
wîda. 17 H’izkirin aha dilê meda
gihîştîye, wekî R’oja[f] Axretê em
r’ûsipî bin, çimkî Mesîh vê din-
yayêda çawa derbaz kir, usa jî em
derbaz dikin*. 18 H’izkirinêda tirs
t’une, lê h’izkirina gihîştî tirsê
dûr dixe, çimkî tirs xweyîcefa ye
û ewê ku ditirse, ew h’izkirinêda
hê negihîştîye.

19 Em h’iz dikin, çimkî Ewî
pêşda em h’izkirin. 20 Heger yek
bêje: «Ez Xwedê h’iz dikim», lê
birê wî ber ç’e’va r’eş e, ew de-
rewa dike. Heger ewê birê xwe
ku dibîne h’iz nake, ew nikare
Xwedê h’iz bike ku nabîne. 21 Û
Ewî ev t’emî daye me: Ewê ku
Xwedê h’iz dike, ew gerekê birê
xwe jî h’iz bike.

### Bi bawerîya ser Îsa Mesîh em dinyayê bindest dikin

5 1 Her kesê ku bawer dike, Îsa,
Mesîh e, ew ji Xwedê bûye
û her kesê ku Bavê h’iz dike, ew
zar’a Wî jî h’iz dike. 2 Bi vê yekê
em zanin ku em zar’êd Xwedê
h’iz dikin, gava em Xwedê h’iz
dikin û t’emîyêd Wî diqedînin.
3 Çimkî bi vê yekê em h’izkirina
xwe hindava Xwedêda didine
k’ifşê, gava em t’emîyêd Wî xwey

* 4:12 Yûh’enna 1:18.

* 4:17 Aha jî tê fe’mkirinê: «Çimkî heleqetîya Mesîh çawa t’evî Bavê Wî he-
ye, usa jî ya me».

dikin. Û t’emîyêd Wî ne giran
in*, 4 çimkî her kesê ku ji Xwedê
bûye, dinyayê bindest dike. Û
bi vî awayî em dinyayê bindest
dikin, awa gotî bi bawerîya xwe.
5 Û ew k’î ye, yê dinyayê bindest
dike, pêştirî ewê ku bawer dike,
ku Îsa Kur’ê Xwedê ye.

### Şe’detîya bona Îsa Mesîh

6 Eva ye, yê ku bi xûn û avê
hat, Îsa Mesîh*, ne ku t’enê bi
avê, lê bi xûn û avê. Û R’uh’ e,
yê ku şe’detîyê dide, çimkî R’uh’
r’astî ye. 7 Çimkî ev hersêk in,
ku şe’detîyê didin: 8 R’uh’, av û
xûn. Û şe’detîya van hersêka yek
e*. 9 Heger em şe’detîya meriva[f]
qebûl dikin, şe’detîya Xwedê hê
zêde ye, çimkî eva şe’detîya Xwe-
dê ye, ku bona Kur’ê Xwe şe’detî
da. 10 Yê ku bawerîya xwe Kur’ê
Xwedê tîne, nava wîda ev şe’detî
heye. Yê ku bawerîya xwe Xwedê
nayne, ew Xwedê derew derdixe,
çimkî bawerîya xwe wê şe’detîyê
nayne, ya ku Xwedê bona Kur’ê
Xwe şe’detî da. 11 Û ev e şe’detî,
ku Xwedê jîyîna h’eta-h’etayê da
me û ev jîyîn nava Kur’ê Wîda
ye*. 12 Kur’ dilê k’êda ye, jîyîna
wî heye, lê Kur’ê Xwedê dilê k’êda
t’une, jîyîna wî t’une.

### Jîyîna h’eta-h’etayê

13 Ez van tişta wer’a dinivîsim,
yêd ku bawerîya xwe navê Kur’ê
Xwedê tînin, wekî hûn bizanibin
jîyîna weye h’eta-h’etayê heye.
14 Em li ber Xwedê r’ûsipî ne, çimkî
em zanin, heger em tiştekî li gora
xwestina Wî jê bixwazin, Ew dengê
me dibihê. 15 Û heger em zanin ku
ew her tiştêd ku em jê dixwazin
dibihê, usa jî em zanin çi ku em
jê dixwazin, emê bistînin.

16 Heger yek bibîne ku birê
wî gunek kirîye, lê nabe berbi

* 5:3 Yûh’enna 14:15.
* 5:6 Gelek vê r’êzê aha fe’m dikin: «Eva ye, Yê ku bi xûna mirina Xwe û ava nixumandina Xwe, Xwe da e’yankirinê çawa Mesîh». Li gora hînkirina ginostîkîyê Îsa çawa merî dikaribû bimira, lê Mesîh awa gotî Kur’ê Xwedê çawa yekî r’uh’anî nikaribû bimira. Ew dersdarêd xalifî t’enê nixumandina Wîye pê avê qebûl dikirin. Yûh’enna vê derê miqabilî wê hînkirinê nivîsîye.
* 5:8 Nav destnivîsarêd paşwextîyêda aha jî heye: «Sisê e’zmênda şe’detîyê didin: Bav, Xeber û R’uh’ê Pîroz, ew hersêk yek in. Usa jî sisê ser e’rdê şe’detîyê didin: R’uh’, av û xûn». Lê nava destnivîsarêd kevinda ev yek t’une.
* 5:11 Yûh’enna 1:4; 3:36.

mirinê*, bira bona wî dua bike
û Xwedê wê jîyînê bide wî. Ez
vê yekê hindava wanda dibêjim,
k’îjanêd ku gunê berbi mirinê
nakin. Gune heye ku dibe berbi
mirinê. Ez nabêjim, ku bona vê
yekê dua bikin. **17** H’emû neheqî
gune ye, lê gune heye ku nabe
berbi mirinê.

**18** Em zanin her zar’eke Xwedê
nav gunada namîne, lê Nixurîyê
Xwedê wî xwey dike û yê Xirab
nêzîkî wî nabe. **19** Em zanin ku
em ji Xwedê ne û t’emamîya
dinyayê bin h’ukumê yê Xirab-
da ye. **20** Lê em usa jî zanin ku
Kur’ê Xwedê hat û fe’m da me,
wekî em Yê R’ast nas bikin. Belê
em nava Yê R’astda ne, çimkî
em nava Kur’ê Wî Îsa Mesîhda
ne. Ev e Xwedêyê r’ast û jîyîna
h’eta-h’etayê.

**21** Zar’okno, xwe ji p’ûtp’aris-
tîyê[f] xwey kin.

* 5:16 Aha jî tê fe’mkirinê: «Gunekî ku nakuje kirîye».

# NE’MA YÛH’ENNAYE DUDA

## Pêşgotin

Yûh’enna vê ne’ma xweda xwe çawa «berpirsîyarê civînê[f]» h’esab dike û vê ne’mê wê «xanima bijartî û zar’êd wêr’a» dinivîse, ku hinek fe’m dikin çawa civînek û endemêd wê.

Fikira ne’mêye sereke ew e, ku bawermend nava r’astîyêda bimînin û hevdu h’iz bikin. Bona dersdarêd şaş jî dibêje, ku bawermend h’evza xwe ji wan bikin, bona k’îjana ne’ma pêşinda bîr anîye, yêd ku hînkirinêd şaş bela dikin.

### Serecema fikira ne’mê

Pêşgotin (1-3)
H’izkirin ser her t’emîyar’a be (4-6)
H’evza xwe ji dersdarêd şaşe derew bikin (7-11)
Paşgotin (12-13)

### Silavkirin

**1** **1** Ji berpirsîyarê civînê[f],
Xanima bijartî û zar’êd
wêr’a, k’îjana ku ez bi r’astîyê
h’iz dikim, ne ku t’enê ez, lê ew
h’emû jî, yêd ku r’astîyê nas di-
kin, **2** çimkî ew r’astî nava meda
dimîne û h’eta-h’etayê wê t’evî
me be. **3** De bira r’e’m, k’erem[f]
û e’dilayî ji Bav[f] Xwedê û Îsa
Mesîhê* Kur’ê Bavê, bi r’astîyê
û h’izkirin mer’a** be.

### R’astî û h’izkirin

**4** Ez p’ir’ şa bûm, ku min ji za-
r’êd te hinek dîtin, yêd ku nava
r’astîyêda dijîn, li gora wê t’emîya

* 1:3 Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Xudan[f] Îsa Mesîh».
** 1:3 Nav hinek destnivîsarada dewsa «mer’a» «wer’a» heye.

ku me ji Bavê standîye. 5 Niha
ez hîvî ji te dikim, Xanimê, ez
t’emîke nû ter’a nanivîsim, lê ya
ku berê pêşda li me hebû, ku em
h’emû hevdu h’iz bikin*. 6 H’iz-
kirin ev e, ku em li gora t’emîyêd
Wî bijîn. T’emî ew e, ya ku we
hê berê pêşda bihîstîye, wekî hûn
h’izkirinêda bijîn*.
7 Gelekêd ku xelqê ji r’ê derdixin
hatine dinê, ew Îsa Mesîh bi xûn
û goşt hatî îqrar[f] nakin. Yêd aha
xelqê ji r’ê derdixin û ek’sîmesîh
in. 8 Hûn haş ji xwe hebin, wekî
hûn k’eda xwe* unda nekin, lê heqê
xwe t’emam bistînin**. 9 Her kesê
ku xwe pêşda davêje û nava hîn-
kirina Mesîhda namîne, Xwedêyê
wî t’une. Yê ku nava hînkirina
Mesîhda dimîne, bona wî Bav jî
heye, Kur’ jî heye. 10 Heger yek
bê cem we û vê hînkirinê neyne,
hûn wî qebûl nekine malêd xwe
û silavê nedine wî. 11 Çimkî k’î
silavê bide wî, ew t’evî kirêd wîye
xirab dibe.

### Silavêd axirîyê

12 Gelek tiştêd mine nivîsarê
wer’a hene, lê min nexwest ser
k’axazê bi h’ubirê binivîsim, çimkî
gumana min heye ezê xwexa bême
cem we û r’û bi r’û t’evî we xeber
dim, wekî eşqa me t’emam be.
13 Zar’êd xûşka teye bijartî li te
silav dikin.

---

* 1:5 Yûh’enna 13:34; 15:12, 17.
* 1:6 Yûh’enna I, 5:3.
* 1:8 Nav hinek destnivîsarada dewsa «xwe» «me» heye.
** 1:8 Nav hinek destnivîsarada dewsa «lê heqê xwe t’emam bistînin» «lê em heqê xwe t’emam bistînin» heye.

# NE’MA YÛH’ENNAYE SISÎYA

## Pêşgotin

Çawa ne’ma dudada usa jî ya sisîyada Yûh’enna[f] xwe «berpirsîyarê civînê» h’esab dike. Evê ne’mê serwêrekî civînê, Gayosr’a dişîne. Nivîsk’ar pesinê Gayos dide, ku ewî çawa alîk’arîya biratîyê kirîye û dibêjê ku ew h’evza xwe ji Dîyotrefîs bike, ku yekî miqabil û buxdanbêj bû.

Bi ne’mê r’uh’ê mêvanh’izîyê dike nava bawermenda, ku h’izkirin û bawerîya[f] r’ast dide k’ifşê.

### Serecema fikira ne’mê

Pêşgotin (1-4)
Pesinê Gayos tê dayînê (5-8)
Xirabîya Dîyotrefîs ser avê dixe (9-10)
Aminîya xwe Dîmîtrîyo tîne (11-12)
Paşgotin (13-15)

### Silavkirin

1 [1] Ji berpirsîyarê civînê,
Gayosê delalr’a, k’îjanî ku
ez bi r’astîyê h’iz dikim.
[2] Delalo, ez dua dikim, ku
h’emû alîyava çerxa te usa r’ast
be û sih’et-qewat bî, çawa minva
e’yan e ku r’uh’ê te silametîyêda
ye. [3] Ez gelekî şa bûm, çaxê çend
bira hatin û şe’detî dan, ku tu nava
r’astîyêda amin î, çawa te pêşda
r’astîyêda dijît jî. [4] Şabûna mine ji
vê mestir t’une, çaxê dibihêm ku
zar’êd min nava r’astîyêda dijîn.

### Pesinê Gayos tê dayînê

[5] Delalo, tu şixulê xweda amin
î, çi ku bona bira dikî, h’eta ku
yêd nenasr’a jî. [6] Wana şe’detîya
h’izkirina te ber civîna vir da. Tê
tiştekî qenc bikî, heger tu wan usa

ver'êkî çawa ku li Xwedê xweş tê.
7 Çimkî ewana bona navê Mesîh
k'etine r'ê û t'u tişt ji nebawera
nestandine. 8 Awa em gerekê yêd
usa qebûl kin, ku em t'evî şixulê
r'astîyê bin.

## Dîyotrefîs û Dîmîtrîyo

9 Min civînêr'a nivîsî, lê Dî-
yotrefîs ku h'iz dike ser h'emûyar'a
be, guh nade me. 10 Bona vê yekê
gava ez bêm, ezê kirêd wî gilî
kim, ku çawa davêje me, xeyba
me dike. Bi vê yekê jî r'azî nabe,
ne ku t'enê bira qebûl nake, lê
yêd ku dixwazin bira qebûl kin,
ber wan r'adibe û wan ji civînê
jî derdixe!

11 Delalo, ç'e'v nede xirabîyê,
lê qencîyê. Ewê ku qencîyê dike,
ji Xwedê ye, lê ewê ku xirabîyê
dike, ewî Xwedê nedîtîye. 12 Bo-
na Dîmîtrîyo h'emû jî şe'detîya
qenc didin, h'eta ku r'astî jî. Em
jî şe'detîyê didin û tu zanî ku
şe'detîya me r'ast e.

## Silavêd axirîyê

13 Gelek tiştêd mine nivîsarê ter'a
hebûn, lê min nexwest ser k'axazê
bi h'ubirê binivîsim. 14 Çimkî ez
bi wê gumanê me, ku ezê zûtirekê
te bibînim û emê r'û bi r'û xeber
din. 15 E'dilayî li te be. Heval-hogir
silava li te dikin. Silava yek-yek
h'emû heval-hogira bike.

# NE’MA CIHÛDA

## Pêşgotin

Cihûda bi vê ne’ma kin berbir’î h’emû bawermendêd Îsa Mesîh dibe. Li gora şe’dêd sedsalîyêd pêşinda xudanê vê ne’mê, Cihûdayê[f] birê Îsa Mesîh e (Metta 13:55; Marqos 6:3). Fe’mîna vê ne’mê nêzîkî ne’ma Petrûse[f] duda ye. Meremê vê ne’ma Cihûda ew e, wekî pêşîya wan meriva[f] bide girtinê, yêd ku Mizgînîyê t’evîhev dikin û hînkirinêd şaşe zîyank’ar bela dikin, mêriv dixalifînin[f] û e’mirê ner’ast hîn dikin. Xudanê ne’mê h’işk davêje wan, lê xwendevana dişidîne û dinivîse ku bawermend «bona wê bawerîya[f] ku carekê cime’ta Xwedêr’a hatîye dayînê» xîret kin. Ne’me bi şîret û r’azîbûneke h’ewas xilaz dibe.

### Serecema fikira ne’mê

Pêşgotin (1-2)
Xeyset û h’unurêd dersdarêd derew, hînkirin û k’etina wan (3-16)
Haş ji xwe hebin bawerîyê çawa xweyî kin (17-23)
R’azîbûn (24-25)

### Silavkirin

1 [1] Ji Cihûdayê xulamê Îsa Mesîh, birayê Aqûb[f],
wer’a, yêd ku gazîkirî ne, ji Bav[f] Xwedêda h’izkirî û xweykirîyêd Îsa Mesîh in:
[2] De bira r’e’m, e’dilayî û h’izkirin hê li we zêde be.

### Dersdarêd derew

[3] Delalno! Gava min dil kir, ku ez bona vê xilazbûna[f] meye t’omerî wer’a binivîsim, hingê min r’ê têr’a dît bona vê yekê wer’a binivîsim û dil bidime we, wekî hûn bona wê bawerîya[f] ku carekê bona her t’im cime’ta Xwedêr’a hatîye dayînê,

şer’ê xwe bikin. **4** Çimkî çend
meriv[f] dizîva k’etine nava we, ku
derheqa dîwana wanda hê pêşda
nivîsar bû. Ewêd nep’ak bin navê
k’erema[f] Xwedêyê me xwe dane
bênamûsîyê û Xudanê[f] me Îsa
Mesîh Xweyîkî bêşirîkî-bêheval
înk’ar[f] kirine.

**5** Lê ez dixwazim bînime bîra
we, çawa hûn van h’emû tişta
zanin jî, ku Xudan cime’ta Xwe
ji welatê Misirê[f] xilaz[f] kir, paşê
qir’a yêd ku bawer nekirin anî*.
**6** Û ew milyak’etêd[f] ku h’uku-
mê xwe xwey nekirin, lê cîyê
xwe şih’itandin, Xwedê wan bi
qeydêd h’eta-h’etayêye te’rîsta-
nîyêda xwey dike, bona wê R’oja
h’esabe Dîwanê. **7** Vê jî bîr nekin
çawa Sodom[f], Gomora û bajarêd
dor-berêd wan, mîna wan ji gur’a
Xwedê derk’etin qavî[f] kirin, ç’e’v
avîtine bedena başqe* û dîwana
agirîye h’eta-h’etayê ser xweda
anîn. Evana îdî bona me t’erz
û ders in.

**8** Usa jî ew meriv pey xewna di-
k’evin, qalibê xwe dih’er’imînin,
dijenine serwêrtîya û heyînêd xwe-
yîr’ûmete jorin bêhurmet dikin*.
**9** Lê Mixayîlê serekê milyak’eta[f]
ev yek nekir. Gava bona cinya-
zê Mûsa[f] r’abû mîrêcinr’a[f] k’ete
h’ucetê, turuş nekir ku bi gotinêd
bêhurmetkirinê* dîwana wî bikira,
lê got: «Bira Xudan li te hilê[f]!»
**10** Lê ev merivana serederîyê wan
tişta nakin, k’îjana ku bêhurmet
dikin, lê çi jî mîna h’eywanêd
bêzare-bêziman bi binyat’î fe’m
dikin, bi wan jî unda dibin.

**11** Wey li wan, ku r’îya Qayîn-
da[f] çûn, mîna Bilam[f] xalifîn[f],
pey k’ara xwe k’etine û mîna
r’aberîbûna Qorax[f] wê bela xwe
bibînin*. **12** Evana mesrefêd h’iz-
kirina* weda lek’e ne, t’evî we bê
xof dixwin-vedixwin, t’enê zikê
xwe diç’êrînin. Yêd ha, e’wrêd
bêave ji ber bê çûyî ne, darêd pa-
yîzêye bêber in, r’awava[f] r’akirî,
du car h’işk bûyî, **13** pêlêd be’rêye

---

* 1:5 Derk’etin 12:51; Jimar 14:29-30.

* 1:7 «Bedena başqe» li gora Destpêbûn 19:1-8 tê fe’mkirinê, ku mêra dest davîtine mêra û usa jî milyak’eta.

* 1:8 «Bêhurmet dikin» aha jî tê fe’mkirinê: «Dik’ifirin».

* 1:9 «Bi gotinêd bêhurmetkirinê» aha jî tê fe’mkirinê: «bi k’ifirîya».

* 1:11 Qayîn: Destpêbûn 4:3-8; Bilam: Jimar 22; Qorax: Jimar 16.

* 1:12 «Mesrefêd h’izkirinê» aha tê fe’mkirinê, ku bi hevr’a nan dixwarin û şîva Xudan derbaz dikirin (K’arêd Şandîya 2:46; 20:7, 11).

r’abûyî ne, ku çawa e’yba kirêd
wê mîna k’efê ser dik’eve. Ew
steyrkêd xalifî ne, bona k’îjana
dûxana te’rîstanîyê h’eta-h’etayê
xweykirî ye.
**14** Henox jî ku pey Ademr’a[f]
bavê h’efta bû, bona van meriva
p’êxembertî[f] kir û got: «Va ye
Xudan t’evî pîrozêd[f] Xweye bêh’e-
sab tê*, **15** wekî dîwana h’emûya
bike û h’emû nep’aka neheq ke,
bona h’emû kirêd wane nep’ak û
bona wan h’emû gotinêd xirab,
ku nep’akêd gunek’ar[f] hindava
Wîda xeber dan». **16** Evana me-
rivne bîntenge fiş-fişko ne, pey
xwestinêd dilê xwe diçin, ji xwe
mestir xeber didin û bona k’ara
xwe h’ilek’arîya dikin.

## Şîretêd qenc

**17** Lê hûn delalno, wan gotinêd
ku şandîyêd[f] Xudanê me Îsa Mesîh
pêşda gotine bîr bînin, **18** ku wer’a
digotin: «R’ojêd axirîyêda merivêd
qerfkir wê derên, pey xwestinêd
dilê xweye nep’ak her’in»*. **19** Ev ew
meriv in, yêd ku dutîretîyê dikin,
yêd ku bi merivayî têne r’êberîkiri-
nê, ne ku bi R’uh’ê Pîroz. **20** Lê hûn
delalno, xwe bidine ser avakirina
bawerîya xweye pîroz, bi R’uh’ê[f]
Pîroz dua bikin, **21** xwe nava wê
h’izkirina Xwedêye hindava xweda
xwey kin, hîvîya r’e’ma Xudanê
me Îsa Mesîh bin, ku jîyîna[f] h’e-
ta-h’etayê bide we. **22** Û hindava
dudilîyada r’e’m bin*. **23** Hineka jî
ji agir bir’evînin xilaz kin, dilê we
ser yêd mayîn jî bi tirs bişewite, lê
jîyîna wane gunek’are mîna k’inca
lewit’î ber ç’e’vê we r’eş be*.

## Şikirdayîn

**24** Wîr’a, Yê ku dikare we ji
k’etinê xwey ke û li ber r’ûmeta
Xwe bêqusûr eşq bide sekinandinê,
**25** Xwedêyê bêşirîkî-bêheval, Xi-
lazkirê[f] mer’a, bi destê Îsa Mesîhê
Xudanê me, şikir û mezinayî, qud-
ret û h’ukumet be, berî her-heyê
û niha jî û h’eta-h’etayê! Amîn[f].

* 1:14 Destpêbûn 5:18-24.
* 1:18 Petrûs II, 3:3.
* 1:22 Aha jî tê fe’mkirinê: «Dudilîya bişidînin».
* 1:23 Aha jî tê fe’mkirinê: «H’eyfa we wî kirasê ji bedena wan lewit’î neyê».

# E’YANTÎYA YÛH’ENNA

## Pêşgotin

Li gora şe’dêd sedsalîyêd pêşinda xudanê vê k’itêbê Yûh’ennayê şandîyê Mesîh e. Eva k’itêba bi destê wî, wextê zêrandina bawermenda, girava[f] Patmosêda hatîye nivîsarê (1:9). Yûh’enna vê giravêda ji alîyê Împêratorîya R’omayêda[f] bona dannasînkirina Mizgînîyê hatibû sirgûnkirinê, çimkî hingê hindava mesîhîyada[f] zêrandineke mezin destpêbibû. Navê vê k’itêbê «E’yantî» tê gotinê, çimkî Îsa Mesîh Yûh’ennava xuya bû û wîva e’yan kir, ku ser dinê ji hingêva girtî h’eta axirîya dinyayê wê çi biqewimin.

Vê k’itêbêda p’ayê-p’ir’ê e’yantî û dîtinok in, ku mîna sur’eke veşartî ne, lê hingê gelek ji wan xeberêd sur’îye sîmvolî bawermendar’a fe’mdarî bûne, xelqêr’a na.

Meremê vê e’yantîyê ew e ku xwendevana bişidîne û cem wan gumanê pêşda bîne, usa jî nava zêrandin û cêr’ibandinada[f] teyax û amin bin. R’ast e fikirêd vê k’itêbê meriv[f] cûr’e-cûr’e şirovedikin, lê dîsa fikirêd sereke zelal e’yan in: Îsa Mesîh hêjayî herema here jorin e. Gelek navêd Wî hene vê k’itêbêda (mesele Xudanê[f] xudana, P’adşê p’adşa...), lê hê zêde wîr’a Berx tê gotinê, çimkî Ewî Xwe merivayîyêr’a kirîye qurban[f]. Ew û Yê ser t’ext r’ûniştî (awa gotî Bav[f]) ser her tiştîda dinihêr’in, her alîyava hêjayî h’ebandinê û pesinstandinê ne. Pê destê Îsa Mesîh Xwedê wê pêşîya xirabîya û ner’astîya bide girtinê, lap bide hildanê, ji mîrêcin[f] girtî wê h’emû dijmina bindest ke û cime’ta Xwe jî bi dua-dirozgêd e’rd û e’zmanê nû xelat ke.

Meremê vê k’itêbê ne ew e ku bawermend nava tirs û xofêda bin, lê wekî bi hatina Îsaye duda û serk’etina Wî gumana wan hebe, eşq û şa bin û her alîyava her gav hazir bin. «Ewî ku şe’detîya van tişta dide, dibêje: ‹Belê, ezê zûtirê bêm›. Amîn[f]! Were, ya Xudan Îsa. K’erema[f] Xudan Îsa li we h’emûyar’a be».

**Serecema fikira k'itêbê**

Pêşgotin (1:1-8)
Dîtinoka pêşin û ne'mêd her h'eft civînar'a[f] (1:9—3:22)
K'itêba ku h'eft mora morkirî bû (4:1—8:1)
Her h'eft bor'î (8:2—11:19)
Zîya[f] û her du ce'newir (12:1—13:18)
Dîtinokêd din (14:1—15:8)
Her h'eft t'asêd xezeba Xwedê (16:1-21)
Wêranbûna Babîlonê[f], bindestbûna ce'newir, p'êxemberê derew û mîrêcin (17:1—20:10)
Dîwana xilazîyê (20:11-15)
E'rdê nû, e'zmanê nû û Orşelîma[f] nû (21:1—22:5)
Paşgotin (22:6-21)

**Pêşgotina Yûh'enna**

1 [1] Eva e'yantîya Îsa Mesîh e,
k'îjan Xwedê da Wî, wekî ew
wan tiştêd ku gerekê zûtirekê bi-
qewimin, nîşanî xulamêd Wî ke.
Îsa pê destê milyak'etê[f] Xwe şand
û e'lamî xulamê Xwe Yûh'enna
kir. [2] Yûh'enna jî şe'detîya her
tiştêd ku wî dîtibûn da, awa gotî
şe'detîya gotina Xwedê, usa jî şe'-
detîya e'lametîya Îsa Mesîhe r'ast*.
[3] Xwezî li wî, ku vê yekê bixûne û
xwezî li wan, yêd ku van xeberêd
p'êxembertîyê[f] bibihên û tiştêd ku
vêda hatine nivîsarê dilê xweda
xwey kin, çimkî wext nêzîk e.

**Ne'me her h'eft civînar'a[f], yêd ku li qeza Asyayê ne**

[4] Ji Yûh'enna, her h'eft civînar'a[f],
yêd ku qeza Asyayêda ne:
K'erem[f] û e'dilayîya Wî li we
be, Yê ku heye, Yê ku hebû, Yê
ku wê bê û ji her h'eft r'uh'êd ku
li ber t'extê Wî ne*, [5-6] usa jî ji Îsa

* 1:2 Eva xebera «şe'detîya e'lametîya Îsa Mesîh» aha tê fe'mkirinê: «Ew tiştêd ku Îsa Yûh'ennar'a e'lam kirine, Yûh'enna jî şe'detîya wan yeka dide». Lê bi yûnanî ev xeber aha jî tê fe'mkirinê: «Şe'detîya bona Îsa Mesîh», awa gotî ew tiştêd ku Yûh'enna dîtibûn û bona Mesîh dibêje.
* 1:4 Derk'etin 3:14.

Mesîhê şe’dê amin, Nixurîyê ji nava
mirîya û serwêrê p’adşêd e’rdê.
De bira r’ûmet û qudret Wî-
r’a be h’eta-h’etayê, Yê ku me
h’iz dike û em pê xûna Xwe ji
gunêd me aza kirin û em kirin
k’ahînêd[f] p’adşatîyê, wekî Bavê[f]
Wî Xwedêr’a em xizmetk’arîyê
bikin. Amîn!*

7 Va ye e’wrava Ew tê.
Her ç’e’vê Wî bibîne,
h’eta ewêd ku nek’sa Wî qul
kirin jî.
H’emû miletêd dinyayê wê li
ser Wî şîn û k’eder bin.
Belê. Amîn!*

8 «Ez Alfa[f] û Omêga me», Xu-
dan Xwedêyê[f] H’emû Zorayîyê
dibêje, Yê ku heye, Yê ku hebû
û Yê ku wê bê.

### «Yekî mîna însan»

9 Ez, Yûh’ennayê birê we me,
yektîya Îsada heval-p’arê wê ten-
gasîyê[f], p’adşatîya Wî û sebira we
me. Ez bona xebera Xwedê û şe’-
detîya bona Îsa wê giravêda[f] bûm,
ku jêr’a Patmos dibêjin. 10 R’oja[f]
Xudanda* R’uh’ê[f] Pîroz hate ser
min û min li pişt xwe dengekî
bilindî mîna dengê bor’îyê bihîst,
11 ku got: «Çi tiştê ku tu dibînî,
k’itêbêda binivîse û her h’eft ci-
vînar’a bişîne, yêd ku bajarêd
Efesê, Simîrnayê, Pergamayê,
Tîyatîrayê, Sardeysê, Filadelfyayê
û Lawdikyayêda ne».

12 Ez ser wî dengîda veger’îyam
ku bibînim, k’a k’î ye minr’a xe-
ber dide û çaxê ku ez veger’îyam,
min h’eft şemdanêd zêr’în dîtin.
13 Nava wan şemdanada «yekî mî-
na Kur’ê[f] Mêriv»* hebû, k’inceke
dirêje h’eta niga lê bû û melaxtekî
zêr’în li sîngê Wî bû. 14 P’or’ê se-
rê Wî mîna hirîya qerqaş û mîna
berfê sipî bû, ç’e’vêd Wî jî mîna
alava êgir*. 15 Nigêd Wî mîna si-
firê xasî ji k’ûra agir derxistî, ku
dibiriqe û dengê Wî mîna dengê

---

* 1:5-6 Derk’etin 19:6.

* 1:7 Danîyêl 7:13; Metta 24:30; T’êsalonîkî I, 4:17; Zekerîya 12:10-14; Yûh’enna 19:34.

* 1:10 «R’oja Xudan» t’enê vê derê Peymana[f] Nûda tê fe’mkirinê «r’oja le’dê», çimkî wê r’ojêda Xudan Îsa ji nava mirîya r’abû.

* 1:13 «Yekî mîna Kur’ê Mêriv» aha jî tê fe’mkirinê, ku ew merivek bû. Eva xebera Danîyêl 7:13 bîr tîne. Wekî din Îsa Mesîh jî gelek cara navê «Kur’ê Meriv» dida ser Xwe.

* 1:14 Danîyêl 7:9, 13; 10:6.

xule-xula gelek ava bû*. 16 Destê
Wîyî r’astêda h’eft steyrk hebûn
û ji devê Wî şûrekî dudevîyî tûj
derdik’et. R’ûyê Wî mîna r’oyê bû
ku t’emamîya qewata xweva şewq
dide. 17 Çaxê ku min Ew dît, mîna
yekî mirî k’etime ber nigêd Wî.
Ewî destê Xweyî r’astê danî ser
min û gote min: «Netirse, Ez im
Yê Pêşin û Paşin*. 18 Ez Yê sax im.
Ez Yê mirî bûm, lê va ye ez sax
im h’eta-h’etayê. Û Ez im xweyê
k’ilîtêd Mirinê û Dîyarê Mirîya[f].
19 Awa binivîse çi ku tu dibînî, çi
ku niha hene û çi wê paşê bibin.
20 Sur’a van steyrka, yêd ku te
destê Minî r’astêda dîtin, usa jî
her h’eft şemdanêd zêr’în ev e:
Ew her h’eft steyrk, milyak’etêd
her h’eft civîna ne û ew her h’eft
şemdan, her h’eft civîn in.

## T’emî û şîretêd bona civîna bajarê Efesê

**2** 1 Milyak’etê civîna Efesêr’a
binivîse bêjê:

Ewî ku h’eft steyrk destê Wîyî
r’astêda û nava h’eft şemdanêd
zêr’înda diger’e, aha dibêje: 2 Ez
haş ji kirêd te, xebata te û sebira
te heme. Ez zanim ku tu nikarî
li xiraba t’e’mûl kî. Te ew jî cêr’i-
bandin[f], yêd ku xwe şandî[f] h’esab
dikin, lê r’ast ne usa ne, te dît ku
ew derewîn in. 3 Sebira te heye,
bona navê Min te cefa k’işand û
newestîyayî. 4 Lê gazineke Min li
te heye, ku tu mîna berê Min h’iz
nakî. 5 Awa niha bîne bîra xwe,
ku tu ji k’u derê k’etîyî û ji gune-
kirinê veger’e, kirêd xweye pêşîyê
bike. Heger na, Ezê bême cem te
û şemdana te ji cîyê wê hildim.
6 Lê tiştekî r’ind li cem te heye,
ku dijenî wan kirêd nîkoloyîya,
çawa ku Ez jî dijenimê.

7 Guhê k’ê heye bira bibihê,
ku R’uh’ çi dibêje civîna. Ewê
ku serk’eve, Ezê îzinê bidime wî,
wekî ji wê dara jîyînê bixwe, ya
ku buhişta Xwedêda ye*.

## T’emî û şîretêd bona civîna bajarê Simîrnayê

8 Milyak’etê civîna Simîrnayêr’a
binivîse bêjê:

Ewî Pêşin û Paşin, Yê ku mir
û ji nava mirîya r’abû aha dibêje:
9 Ez haş ji tengasî û belengazîya
te heme, lê belê tu dewletî yî! Usa

* 1:15 Hezekîyêl 1:24.
* 1:17 Îşaya 44:6.
* 2:7 Destpêbûn 2:9.

jî haş ji buxdanêd wan heme, yêd
ku xwer'a dibêjin: ‹Eme cihû[f] ne›.
Ew ne cihû ne, lê ew ji k'inîşta[f]
mîrêcin[f] in. **10** Ji wan tengasîya
netirse, k'îjanê bêne serê te. Va
mîrêcin wê ji we hineka bavêje
kelê, wekî hûn bêne cêr'ibandinê
û hûnê dehe r'oja cefê bik'işînin.
H'eta mirinê amin bimîne, Ezê
t'acê[f] jîyînê bidime te.

**11** Guhê k'ê heye bira bibihê,
ku R'uh' çi dibêje civîna. Ewê
ku serk'eve ji mirina duda wê qet
zirarê nebîne.

### T'emî û şîretêd bona civîna bajarê Pergamayê

**12** Milyak'etê civîna Pergama-
yêr'a binivîse bêjê:

Ewê ku şûrê Wîyî dudevîyî tûj
heye aha dibêje: **13** Ez haş ji te he-
me ku tu li k'u derê dimînî, awa
gotî li wî cîyê ku t'extê mîrêcin lê
ye. Tu navê Min qewîn digirî û te
bawerîya[f] xweye hindava Minda
wan r'oja jî înk'ar[f] nekir, gava şe'-
dê Minî amin Antîpas nava weda
hate kuştinê, wî cîyê ku mîrêcin
lê dimîne. **14** Lê gazineke Min li
te heye, ku li wê derê hinek me-
rivêd te hene, ku pey hînkirina
wî Bilamî[f] diçin, yê ku Balaq hîn
kir, ku zar'êd Îsraêl[f] ji r'ê derxe,
wekî ew qurbanêd[f] p'ûta bixwin
û bênamûsîyê bikin*. **15** Usa jî
hinek merivêd te jî hene ku pey
hînkirina nîkoloyîya diçin. **16** Awa
ji gunekirinê veger'e, heger na, Ezê
zûtirê bême cem te û pê şûrê devê
Xwe t'evî wan meriva şer' kim.

**17** Guhê k'ê heye bira bibihê,
ku R'uh' çi dibêje civîna. Ewê
ku serk'eve Ezê ji wî manayê[f]
veşartî bidime wî û usa jî kevirekî
sipî bidimê, ku wê navekî nû li
ser kêvir nivîsar be û t'u kesê wî
navî nizanibe, pêştirî yê ku wî
kevirî bistîne*.

### T'emî û şîretêd bona civîna bajarê Tîyatîrayê

**18** Milyak'etê civîna Tîyatîrayêr'a
binivîse bêjê:

Kur'ê[f] Xwedê aha dibêje, Yê
ku ç'e'vêd Wî mîna alava êgir in
û nigêd Wî mîna wî sifirê xasî
ku dibiriqe: **19** Ez haş ji kirêd te,
h'izkirina te, bawerîya te, xiz-
metk'arî û sebira te heme. Ez
zanim ku kirêd teye paşwextîyê
ji yêd pêşîyê zêdetir in. **20** Lê ga-
zineke Min li te heye, ku tu wê

* 2:14 Jimar 31:16; 25:1-3.
* 2:17 Derk'etin 16:14-14.

jinê, Îzabêlê sebir dikî, ku xwe
p'êxember h'esab dike. Ewa pê
hînkirina xwe xulamêd Min ji r'ê
derdixe, wekî bênamûsîyê bikin
û qurbanêd p'ûta bixwin. **21** Min
wext da wê, wekî ew ji gunekiri-
nê veger'e, lê ew naxwaze destê
xwe ji bênamûsîya xwe bike. **22** Va
Ezê wê bavêjime nava cî-nivînê
û yêd ku t'evî wê bênamûsîyê jî
dikin, bikime h'alekî giran, heger
ji kirêd xwe veneger'in[f]. **23** Ezê
zar'êd wê xim, bikujim û h'emû
civînê bizanibin ku Ez im, Yê dil
û nêta e'nene dike. Ezê li anegorî
kirinêd we her yekî bidime we*.
**24** Lê belê Ez we, yêd mayînr'a
dibêjim ku Tîyatîrayêda ne, lê
pey vê hînkirinê nek'etine, ew
‹Sur'êd mîrêcine k'ûr› nizanin
çawa ku ew dibêjin. Ez barekî din
nadime ser milê we, **25** lê t'enê çî
we heye qewîn bigirin, h'eta ku
Ez bêm. **26-27** Ewê ku serk'eve û
h'eta xilazîyê kirêd li gora dilê
Min bike, Ezê wî h'ukumê ser
mileta bidime wî, k'îjan Min ji
Bavê Xwe hildaye

û ewê pê şivdara h'esinî şivan-
tîyê li wan bike,
mîna firaqêd ç'inî wê bip'işi-
rîne.*

**28** Û Ezê steyrka sibêye zû bi-
dime wî.
**29** Guhê k'ê heye bira bibihê,
ku R'uh' çi dibêje civîna.

### T'emî û şîretêd bona civîna bajarê Sardeysê

**3** **1** Milyak'etê civîna Sardey-
sêr'a binivîse bêjê:
Ewî ku h'eft r'uh'êd Xwedê û
h'eft steyrkêd Wî hene, aha dibêje:
Ez haş ji kirêd te heme, navê te
heye yanê tu sax î, lê r'ast tu mirî
yî. **2** H'işyar be û ewêd ku mane
lê li ber mirinê ne, bike bira ser
xweda bên, çimkî Min kirêd te li
ber Xwedêyê Xwe gihîştî nedîtin.
**3** De bîne bîra xwe ku te çi standîye
û bihîstîye, gur'a[f] wan tişta bike û
t'obe[f] ke. Lê heger tu h'işyar nebî,
Ezê mîna dizekî ser teda bigirim
û tê qet nizanibî ku Ezê k'îjan
sih'etêda ser teda bigirim*. **4** Lê
Sardeysêda çend kesêd te hene ku
wan k'incêd xwe nelewit'andine.
Ewê bi k'incêd çîle-qerqaş t'evî
Min biger'in, çimkî ewe hêja ne.
**5** Ewê ku serk'eve, ewê aha k'incêd

* 2:23 Gotinêd Silêman 24:12.
* 2:26-27 Zebûr 2:8-9.
* 3:3 Metta 24:34-44.

çîle-qerqaş li xwe wergire. Ezê
navê wî ji k'itêba jîyînê t'u car
r'esît nekim û navê wî li ber Ba-
vê Xwe û li ber milyak'etêd Wî
aşkere kim*.
6 Guhê k'ê heye bira bibihê, ku
R'uh' çi dibêje civîna.

**T'emî û şîretêd bona civîna bajarê Filadelfyayê**

7 Milyak'etê civîna Filadelfya-
yêr'a binivîse bêjê:
Ewî pîroz[f], Ewî r'ast, aha dibê-
je, Yê ku xweyê k'ilîta Dawid[f] e,
ku vedike û t'u kes nikare dade
û dadide t'u kes nikare veke*:
8 Ez haş ji kirêd te heme. Va Min
derîkî vekirî danîye ber te, ku
t'u kes nikare dade. Ez zanim
ku qewata te hinekî heye û te
gotina Min xwey kir û navê Min
înk'ar nekir. 9 Binihêr'e, hineke
ji k'inîşta mîrêcin hene, yêd ku
dibêjin: ‹Eme cihû[f] ne›, lê r'ast ne
cihû ne, ew derewa dikin. Va Ezê
p'êyî ser wan kim, ku ew bên û
li ber nigêd te ta bin û bizanibin
Ez te h'iz dikim. 10 Te ku t'emîya
Min xwey kir û sebir kir, Ezê jî
te ji wî wextê cêr'ibandinê xwey
kim, ya ku wê bê ser t'emamîya
dinyayê, ku binelîyêd[f] li r'ûbarî
dinê bicêr'ibîne. 11 Ezê zûtirekê
bêm, çî te heye qewîn bigire, we-
kî t'u kes t'acê te nestîne. 12 Ewê
ku serk'eve Ezê wî p'aristgeha[f]
Xwedêyê Xweda bikime stûn û
ewê îdî dernek'eve derva. Ezê li
ser wî navê Xwedêyê Xwe, usa jî
navê bajarê Xwedêyê Xwe, awa gotî
navê Orşelîma[f] nû binivîsim, ya
ku ji Xwedêyê Min ji e'zmên wê
bê xwarê û Ezê navê Xweyî nû jî
binivîsim*.
13 Guhê k'ê heye bira bibihê,
ku R'uh' çi dibêje civîna.

**T'emî û şîretêd bona civîna bajarê Lawdikyayê**

14 Milyak'etê civîna Lawdikya-
yêr'a binivîse bêjê:
‹Yê Amîn[f]› aha dibêje, Ew şe'dê
r'ast û amin, ç'e'vkanîya e'firîn û
xuliqîyêd Xwedê*: 15 Ez haş ji kirêd
te heme, tu ne sar î û ne jî germ
î. Xwezî tu yan sar bûyayî yan jî
germ. 16 Lê çimkî tu golî yî, ne sar
î û ne jî germ, Ezê te ji devê xwe

* 3:5 Derk'etin 32:33.
* 3:7 Îşaya 22:22.
* 3:12 Îşaya 62:2.
* 3:14 Kolosî 2:1; 4:13-16.

bir'êjim. 17 Tu dibêjî: ‹Ez dewletî
me, wê yekêda gelek pêşda çûme,
qet h'ewcê t'u tiştî nîme›. Lê tu
nizanî ku tu me'rim, r'eben, belen-
gaz, kor û te'zî yî. 18 Ez vê t'emîyê
didime te: Zêr'ê ku bi êgir hatîye
safîkirinê ji Min bik'ir'e, wekî tu
dewletî bî û k'incêd çîle-qerqaş ji
Min bik'ir'e, ku li xwe kî, wekî
şerma te'zîbûna te bê nixamti-
nê, usa jî dermanê ç'e'va, ku li
ç'e'vêd xwe dî, wekî bibînî. 19 Ez
k'îjana h'iz dikim li wan hiltêm[f]
û wan şîret dikim. Bona vê yekê
xîret ke û ji gunekirinê veger'e!*
20 Va Ez li ber derî sekinî me û
li dêrî dixim. Heger yek dengê
Min bibihê û dêrî li Min veke,
Ezê her'ime hindur', t'evî wî nan
bixwim û ewê jî t'evî Min. 21 Ewê
ku serk'eve, Ezê destûrê bidimê
ku t'evî Min ser t'extê Min r'ûnê,
çawa ku Ez serk'etim û t'evî Bavê
Xwe ser t'extê Wî r'ûniştim.

22 Guhê k'ê heye bira bibihê,
ku R'uh' çi dibêje civîna».

## T'extê e'zmênda

4 1 Pey van tiştar'a min dîna
xwe dayê, va e'zmênda derîk
vekirî ye. Û ew dengê ku min
berê mîna dengê bor'îyê bihîs-
tibû minr'a got: «R'abe were vê
jorê, Ezê wan tiştêd ku gerekê ji
vir şûnda biqewimin, nîşanî te
kim». 2 Hema hingê R'uh'ê Pî-
roz hate ser min, min dîna xwe
dayê, wê t'extek li e'zmên hebû
û yek li ser t'ext r'ûniştî bû*. 3 Û
şewqa dîndara Yê r'ûniştî mîna
ya kevirê yaspîs û sardîyon bû.
Û k'eskesorê jî dora t'ext girtibû,
mîna îşiqa zimrûdê*. 4 Li dora
wî t'extî bîst çar k'ursî hebûn û
li ser wan k'ursîya bîst çar r'ûspî[f]
r'ûniştibûn. K'incêd çîle-qerqaş
li wan bûn û t'acêd zêr'în jî li
serê wan bûn. 5 Ji t'ext birûsk û
dengêd gur'înîya e'wr-e'zmana
derdik'etin. Li ber t'ext h'eft
agirêd alavpêk'etî hebûn, ku ew
her h'eft r'uh'êd Xwedê ne*. 6 Li

* 3:19 Gotinêd Silêman 3:11-12.
* 4:2-8 Hezekîyêl 1:5-28.
* 4:3 «Yaspîs» bi zaravekî din «yêşîm» e, «sardîyon» bi zaravekî din «eqîq» û «zimrûd» jî r'engê k'eskda ye. Evana h'emû kevirêd birqoke qîmet in. Çi ku îro kevirnas jêr'a dibêjin «yaspîs» ne zelal e. Dibe ku navê «yaspîs» hingê bona «lal» bû, awa gotî «brîlyant», ku kevirê sipî ye (E'yantî 21:11, 18, 19).
* 4:5 Derk'etin 19:16.
* 4:8 Îşaya 6:3; Amos 4:13; Îşaya 41:4.

ber t’ext tiştekî mîna be’reke şûşe
hebû, ku mîna xirûstalê zelal bû.
Li dora t’ext, her alîkî çar r’uh’-
ber hebûn, ku pêşîyê û paşîyêva
ç’e’vava t’ijî bûn. 7 R’uh’berê
pêşin mîna şêr bû, r’uh’berê duda
mîna canega bû, r’uh’berê sisîya
r’ûyê wî mîna r’ûyê meriva bû û
r’uh’berê çara jî mîna teyrê sîmir’î
ku difir’e. 8 Her çar r’uh’ber jî şeş
baskî bûn, ser û binva ç’e’vava
xit-xitî bûn. Û şev û r’oj dengê
xwe nedibir’în digotin:

«Pîroz, pîroz, pîroz,
Xudan Xwedêyê H’emû Zora-
yîyê,
Yê ku hebû, Yê ku heye û Yê
ku wê bê»*.

9 Gava wan her çar r’uh’bera,
r’ûmet, hurmet û şikirî didane
Yê ku li ser t’ext r’ûniştîye û h’e-
ta-h’etayê Sax e, 10 ew her bîst çar
r’ûspî ber Yê ku li ser t’ext r’ûniştî
dever’ûya diçûn, serê xwe ber Wî
dadanîn, Yê ku h’eta-h’etayê Sax
e û t’acêd xwe davîtine ber t’ext
û digotin:

11 «Ya Xudan Xwedêyê me,
Tu hêja yî ku r’ûmet, hurmetê
û qewatê bistînî.
Çimkî Te her tişt e’firandin
û bi xwestina Te ew e’firîn û
hene».

### K’itêba gulomatkkirîye morkirî

5 1 Hingê min destê Wîyî
r’astêda, Yê ku li ser t’ext
r’ûniştibû, k’itêbeke gulomatk-
kirî dît ku her du alîyava hatibû
nivîsarê û bi h’eft mora hatibû
morkirinê*. 2 Min dîna xwe dayê,
wê milyak’etekî qewat bi dengekî
bilind digot: «K’î hêja ye ku morêd
vê k’itêbê jê r’ake û k’itêbê veke?»
3 Lê t’u kes t’unebû, ne li e’zmên,
ne li ser e’rdê û ne jî ji binê e’rdê,
ku bikaribûya eva k’itêba vekira
lê binihêr’îya. 4 Ez jî k’ele-k’el
digirîyam, ku yekî hêja nehate
dîtinê, wekî ew k’itêba vekira lê
binihêr’îya. 5 Hingê ji r’ûspîya
yekî minr’a got: «Negirî! Va Şêrê
ji qebîla Cihûda[f], tamara Dawid
serk’et û dikare her h’eft morêd
wê k’itêbê jê r’ake û veke»*.
6 Hingê min dîna xwe dayê, wê
goveka wî t’extîda, k’îjan her çar
r’uh’ber û r’ûspîya dorê girtibûn,
Berxek sekinî bû, çawa ku serjê-
kirî be. H’eft stirûyêd Wî û h’eft
ç’e’vêd Wî hebûn, Ew her h’eft

* 5:1 Hezekîyêl 2:9-10.
* 5:5 Destpêbûn 49:9; Îşaya 11:1.

r'uh'êd Xwedê ne, ku li t'emamîya
dinyayê hatine şandinê*. 7 Ew hat
û k'itêb ji destê Wîyî r'astê, Yê ku
li ser t'ext r'ûniştibû hilda. 8 Çaxê
Wî ew hilda, ew her çar r'uh'ber û
her bîst çar r'ûspî li ber wî Berxî
dever'ûya çûn. Destê her yekîda
çeng[f] û t'asêd zêr'îne t'ijî bixûr[f]
hebûn. Ew bixûr duayêd cime'ta
Xwedê ne*. 9 Û stiraneke nû dis-
tiran digotin:

«Tu hêja yî, ku wê k'itêbê hildî
û morêd wê jê r'akî.
Çimkî Tu hatî serjêkirinê
û pê xûna xwe Te meriv ji her
bereкê, ji her zimanî,
ji her cime'tê û ji her miletî
k'ir'în bona Xwedê,
10 Te ew kirin p'adşatîya k'ahîna
bona xizmetk'arîya Xwedê
û ewê li ser dinyayê p'adşatîyê
bikin»*.

11 Hingê min dîna xwe dayê, min
dengê gelek milyak'eta bihîst ku
dora t'ext, wan r'uh'bera û r'ûspîya
girtibûn. R'eqema wan digihîşte bi
h'ezara û mîlîyona. 12 Bi dengekî
bilind distiran digotin:

«Ew Berxê serjêkirî hêja ye
ku qewatê, dewlemendtîyê,
serwaxtîyê[f], karînê,
hurmetê, r'ûmetê û pesinê
bistîne»*.

13 Min bihîst ku her e'firînêd
li e'zmên, li ser e'rdê, yêd bin
e'rdê, yêd be'rêda û h'emûyêd
nava wanda, distiran:

«Bira h'eta-h'etayê pesin, hur-
met, r'ûmet û qudret
li Yê ser t'ext r'ûniştî, usa jî li
wî Berxî be!»*

14 Û wan her çar r'uh'bera digotin:
«Amîn!» û r'ûspî dever'ûya çûn,
serê xwe ber Wî danîn.

### H'eft mor çawa têne vekirinê?

6 1 Hingê min dîna xwe dayê,
wî Berxî moreke ji wan her
h'eft mora vekir û min ji wan her
çar r'uh'bera dengekî mîna den-
gê gur'înîya e'wra bihîst ku got:
«Were». 2 Min dîna xwe dayê, va
hespekî boz xuya bû, destê yê lêsî-
yarbûyîda tîrkevanek hebû, t'acek
wîr'a hate dayînê û ew çawa e'gît
çû, wekî serk'eve.

---

* 5:6 Îşaya 53:7.
* 5:8 Zebûr 141:2.
* 5:10 Derk'etin 19:6; Îşaya 61:6.
* 5:12 Dîrok I, 29:11; Îşaya 53:7.
* 5:13 Zebûr 47:8; Îşaya 6:1.

3 Çaxê Berx mora duda vekir,
min bihîst ku r'uh'berê duda got:
«Were». 4 Hingê hespekî dinêyî
r'engê zerda derk'et* û sîyarê wîr'a
îzin hate dayînê, ku e'dilayîyê ji
dinyayê hilde, wekî meriv hevdu
bikujin. Şûrekî mezin wîr'a hate
dayînê.

5 Çaxê Wî mora sisîya vekir,
min bihîst ku r'uh'berê sisîya got:
«Were». Min dîna xwe dayê, va
hespekî r'eş û destê sîyarê wîda
mêzînek hebû. 6 Hingê tê bêjî
min dengek bihîst, ji nava her
çar r'uh'bera hat û got: «Çapeke
genime biç'ûk pê zîvekî[f] û sê çapêd
biç'ûk ceh pê zîvekî*. Lê zirarê
nede zeyt'ê û şeravê».

7 Çaxê Wî mora çara vekir,
min dengê r'uh'berê çara bihîst
ku got: «Were». 8 Min dîna xwe
dayê, va hespekî şînoqî, ku navê
sîyarê wî Mirin bû, Dîyarê Mirîya
pey wî dihat. H'ukum wîr'a hate
dayînê ser p'areke ji çar p'arêd
dinyayê, wekî pê şûr, xelayîyê,
nexweşîya h'al û r'e'wirêd din-
yayê wan bikuje.

9 Çaxê Wî mora pênca vekir,
min bin gorîgehêda[f] r'uh'êd wan
meriva dîtin, yêd ku bona Xebera
Xwedê û bona şe'detîya ku dabûn
hatibûne kuştinê. 10 Wan bi den-
gekî bilind kirine gazî û gotin:
«Ya Xweyî-Xudanê pîroz û r'ast!
Tê h'eta k'engê dîwanê nekî û
h'eyfa xûna me ji binelîyêd r'ûbarî
dinê hilnedî?» 11 Hingê ji wan her
yekîr'a çuxêd çîle-qerqaş hatine
dayînê û wanr'a hate gotinê, ku
hinek wext jî hêsa bin, h'eta ku
h'esabê heval-xulamêd wan û
xûşk-birêd wane ku wê mîna wan
bêne kuştinê, t'emam be.

12 Çaxê Wî mora şeşa vekir, min
dîna xwe dayê, e'rd qayîm h'ejîya.
R'o mîna k'urxê[f] ji pir'ç'ê çêkirî
r'eş bû û hîv serda-pêda bû mîna
xûnê*. 13 Steyrkêd e'zmên usa
jorda k'etine e'rdê, çawa ku dara
hêjîrê ji ber bayê qayîm dih'eje û
berêd wê* jê diwarin**. 14 Hingê
e'zman bû mîna k'itêba gulomatk-
kirî li hev hate p'êç'anê, hilk'işî-
ya û h'emû ç'îya û girav ji cîyêd
xwe h'ejîyan. 15 Wî çaxî p'adşêd

* 6:4 Bi yûnanî aha tê fe'mkirinê: «R'engê êgirda».

* 6:6 Hingê zîvek heqê xebata r'ojeke p'alekî bû.

* 6:12 Îşaya 13:10; Yoêl 2:10, 31; 3:5 Metta 24:29.

* 6:13 Hinek fe'm dikin ku hêjîr negihîştî ne, lê hinek jî fe'm dikin ku gihîştî ne.

** 6:13-14 Îşaya 34:4.

dinyayê, mezinêd wê, sereskerêd
wê, dewletîyêd wê, e’gîtêd wê û
h’emû merivêd xulam û aza xwe
şkeft û qeyêd ç’îyada veşartin*,
16 ç’îya û qeyar’a digotin: «Ser
meda bik’evin û me ji r’ûyê Wî
veşêrin, Yê ku li ser t’ext r’ûniştî
ye, usa jî ji xezeba Berx*. 17 Çimkî
r’oja xezeba wane mezin hat û k’î
dikare teyax ke?»*

### Ji zar’êd Îsraêl
### 144 000 kes têne morkirinê

**7** 1 Pey vê yekêr’a min dîna
xwe dayê, wê çar milyak’et
li her çar qulbêd dinyayê sekinî
ne û bayêd her çar qulbêd din-
yayê h’işk girtine, wekî li e’rdê,
be’rê û t’u darê nexin*. 2 Hingê
min milyak’etekî din jî dît ku
ji r’ohilatê dihat û mora wîye ji
Xwedêyê Sax hebû. Ewî bi dengekî
bilind li wan her çar milyak’eta
kire gazî, yêd ku wanr’a hatibû
dayînê, ku zirarê bidine e’rdê û
be’rê, wanr’a got: 3 «Zirarê nedine
e’rdê, be’rê û dara, h’eta ku em
morê li e’nîya xulamêd Xwedêyê
xwe nexin»*. 4 Hingê r’eqema yêd
ku hatibûne morkirinê min bihîst:
Ji h’emû qebîlêd[f] zar’êd Îsraêl sed
çil çar h’ezar hatibûne morkirinê.
5 Ji qebîla Cihûda donzdeh h’e-
zar,
ji qebîla R’ûbên donzdeh h’e-
zar,
ji qebîla Gad donzdeh h’ezar,
6 ji qebîla Aşêr donzdeh h’ezar,
ji qebîla Neftelî donzdeh h’ezar,
ji qebîla Minaşe donzdeh h’e-
zar,
7 ji qebîla Şimh’ûn donzdeh
h’ezar,
ji qebîla Lêwî[f] donzdeh h’ezar,
ji qebîla Îsaxar donzdeh h’ezar,
8 ji qebîla Zebûlon donzdeh
h’ezar,
ji qebîla Ûsiv[f] donzdeh h’ezar
û ji qebîla Binyamîn[f] donzdeh
h’ezar hatibûne morkirinê.

### H’emû miletêd dinyayê

9 Pey vê yekêr’a min dîna xwe
dayê, va e’laleteke usa mezin, ku
t’u kesî nikaribû bijimarta ji her
miletî, ji her berekê, ji her cime’tê

---

* 6:15 Îşaya 2:19-21.
* 6:16 Hosêya 10:8.
* 6:17 Yoêl 2:11; Malaxî 3:2.
* 7:1 Danîyêl 7:2.
* 7:3 Hezekîyêl 9:4-6.

û ji her zimanî li ber t’ext û wî
Berxî sekinî bûn. Çuxêd çîle-qer-
qaş li wan bûn û ç’iqilêd xurma jî
destêd wanda bûn, 10 bi dengekî
bilind dikirine gazî digotin:

«Xilazbûn[f] ji destê Xwedêyê
me ye,
Yê ku li ser t’ext r’ûniştî ye
û ji destê wî Berxî ye».

11 Hingê ew h’emû milyak’etêd
ku li dora t’ext, r’ûspîya û wan
her çar r’uh’bera girtibûn, ber
t’ext dever’ûya çûne e’rdê, serê
xwe ber Xwedê danîn 12 û gotin:

«Amîn!
Pesin, r’ûmet, serwaxtî,
şikirî, hurmet, qewat û zorayî
bira h’eta-h’etayê Xwedêyê
mer’a be.
Amîn!»

13 Hingê ji wan r’ûspîya yekî
minr’a got: «Evêd ku çuxêd çî-
le-qerqaş wergirtî ne, ew k’î ne û ji
k’u derê hatine?» 14 Min wîr’a got:
«Ez xulam, ez nizanim, tu zanî».
Hingê ewî minr’a got: «Evana ew
in, yêd ku ji wê tengasîya mezin
hatine, çuxêd xwe pê xûna wî
Berxî şûştine, çîl-qerqaş kirine*.

15 Lema ewe li ber t’extê Xwedê
ne,
p’aristgeha Wîda şev û r’oj Wî
dih’ebînin.
Yê li ser t’ext r’ûniştî, wê konê
Xwe li ser wan vegire.
16 Ewê îdî ne t’î bin, ne bir’çî bin
û ne jî te’v û germayîyê li wan
xe*.
17 Çimkî ew Berxê ku goveka
t’extda ye,
wê şivantîyê li wan bike,
wan bibe ser kanîyêd ava jîyînê.
Û Xwedê jî wê h’emû hêsirêd
ç’e’vêd wan paqij ke»*.

## Mora h’efta

8 1 Çaxê Ewî mora h’efta vekir,
e’zmênda weke nîv sih’etî her
tişt seqir’î. 2 Hingê min ew her
h’eft milyak’etêd ku li ber Xwedê
sekinîbûn dîtin, wanr’a h’eft bor’î
hatine dayînê.

3 Milyak’etekî din bixûrdanga
zêr’în dêstda hat, li ber gorîgeha
zêr’în sekinî. Wîr’a gelek bixûr
hate dayînê, wekî bi t’evî duayêd
cime’ta Xwedê dayne ser gorîgeha
zêr’îne li ber t’extê Xwedê*. 4 Dûyê

* 7:14 Danîyêl 12:1; Metta 24:21.
* 7:16 Îşaya 49:10.
* 7:17 Zebûr 23:1-2; Îşaya 25:8; 49:10.
* 8:3 Derk’etin 30:1-3.

wê bixûrê t'evî duayêd cime'ta
Xwedê ji destê wî milyak'etî berbi
Xwedê bilind bû. 5 Paşê milyak'et
ew bixûrdang hilda, ji agirê gorî-
gehêva dagirt avîte ser e'rdê. Bû
gur'înîya dengêd e'wra birûskê
birq veda û e'rd h'ejîya.

### Her çar bor'îyêd pêşin

6 Hingê wan her h'eft milyak'e-
têd ku h'eft bor'îyêd wan hebûn
k'arê xwe kirin, ku li bor'îya xin.
7 Yê pêşin li bor'îyê xist, teyrok
û agir xûnêva t'evayî ser e'rdêda
barî. Û ji sê p'ara p'areke e'rdê
şewitî, ji sê p'ara p'areke dara
şewitî û h'emû gîhayê şîn şewitî*.
8 Milyak'etê duda li bor'îyê xist,
tiştekî mezinî mîna ç'îyakî agir
pêk'etî hate avîtinê nava be'rê. Û
ji sê p'ara p'areke be'rê bû xûn,
9 ji sê p'ara p'areke h'eywanêd be'-
rêda qir' bû û ji sê p'ara p'areke
gemîya wêran bû.
10 Milyak'etê sisîya li bor'îyê
xist û steyrkeke mezine mîna
qendîla alav pêk'etî ji e'zmên k'ete
ser p'areke ji sê p'arêd ç'ema û
avêd kanîya. 11 Navê wê steyrkê
Zirîç'k bû. Ji sê p'ara p'areke ava
bû zirîç'k û ji wê avê gelek meriv
mirin, çimkî ew av te'l bû.
12 Milyak'etê çara li bor'îyê xist,
ji sê p'ara p'areke r'oyê, ji sê p'ara
p'areke hîvê û ji sê p'ara p'areke
steyrka derb standin, usa ku ji sê
p'ara p'areke wan qarîya û ji sê
p'ara p'areke r'ojê r'onayî neda,
usa jî ji sê p'ara p'areke şevê*.
13 Hingê min dîna xwe dayê,
wê teyrekî sîmir' jor e'zmênda
difir'î û min bihîst ku wî bi den-
gekî bilind got: «Wey, wey, wey li
serê binelîyêd li r'ûbarî dinê, ku
wê ber dengê wan bor'îyêd her sê
milyak'etêd mayîn k'evin, yêd ku
wê li bor'îya xin».

### Bor'îya pênca

9 1 Milyak'etê pênca li bor'îyê
xist û min dîna xwe dayê, va
steyrkek ji e'zmên k'ete ser r'ûyê
e'rdê û k'ilîta derê gelîyê[f] hey-wayê
wê steyrkêr'a hate dayînê. 2 Ewê
derê gelîyê hey-wayê vekir, ji gelî
dû-dûxan derk'et mîna dûyê k'ûra
mezin û r'ûyê r'oyê û hewê girt*.
3 Ji wê dû-dûxanê kulî[f] derk'etine
ser r'ûyê e'rdê, wanr'a qewata
mîna qewata dûp'işkêd e'rdê hate

* 8:7 Derk'etin 9:23-25; Hezekîyêl 38:22.
* 8:12 Îşaya 13:10; Hezekîyêl 32:7; Yoêl 2:10, 31; 3:15.
* 9:2 Destpêbûn 19:28.

dayînê*. 4 Wanr'a hate gotinê,
ku zirarê nedine gîhê e'rdê, ne
jî t'u şînayîyê û darê, lê bidine
wan merivêd ku mora Xwedê li
ser e'nîya wan t'uneye*. 5 Wanr'a
hate dayînê, ku wan nekujin, lê
pênc meha bidine cefê. Êşa wan
mîna êşa lêxistina dûpişka bû.
6 Wan r'ojada merivê li mirinê
biger'in, lê wê qet nebînin, ewê
h'eyra mirinêda bin, lê mirinê ji
wan bir'eve*.

7 Qilxê wan kulîya mîna wan
hespa bûn, yê ku bona şêr' têne
hazirkirinê. Li ser serê wan tiştêd
mîna t'acêd zêr'în hebûn û r'ûyê
wan mîna r'ûyê meriva bûn*. 8 P'o-
r'ê serê wan mîna p'or'ê jina bûn
û diranêd wan mîna diranêd şêra
bûn. 9 Êlekzirih'êd[f] wan hebûn,
mîna yêd h'esinî, dengê baskêd
wan mîna dengê wan e'reba bûn,
ku çawa gelek hesp wan dik'işînin
û dajone nava şêr'. 10 Mîna dû-
p'işka jî poç'êd wan hebûn û ser
poç'a jî derzî, k'îjanada qewata
wan hebû ku pênc meha mêriv
bidine cefê. 11 Milyak'etê gelîyê
hey-wayê li ser wan p'adşa bû,
ku navê wî bi îbranî[f] «Abadûn»
bû, bi yûnanî «Apolîyon», ku tê
fe'mkirinê: «Wêrankir».

12 Weya pêşin derbaz bû. Ji vir
şûnda va du weyê jî bên.

### Bor'îya şeşa

13 Milyak'etê şeşa li bor'îyê xist
û min dengek ji her çar stirûyêd
gorîgeha zêr'îne li ber Xwedê bi-
hîst, 14 ku gote wî milyak'etê şeşa,
yê ku bor'î dêstda bû: «Wan her
çar milyak'etêd ku li ber ç'emê
Firatêyî mezin girêdayî ne veke».
15 Hingê ew her çar milyak'et
hatine ber'danê, yêd ku bona
wê sih'etê, wê r'ojê, wê mehê
û wê salê hatibûne hazirkirinê,
wekî ji sê p'ara p'areke merivayê
bikujin. 16 Min r'eqema ordîyêd
sîyarî bihîst ku dusid mîlîyon bû.
17 Wê dîtinokêda hesp û sîyarêd
wan minva aha xuya bûn: R'en-
gêd êlekzirih'êd wan r'engê sorî
mîna êgir, şîrkî mîna qalç'îç'ekê,
qîç'ikî mîna k'irk'ûtêda[f] bûn. Serê
hespêd wan mîna serê şêra bûn
û ji devê wan agir, dû û k'irk'ût
derdik'et. 18 Pê van her sê bela,

* 9:3 Derk'etin 10:12-15.
* 9:4 Hezekîyêl 9:4.
* 9:6 Yêremîya 8:3.
* 9:7 Yoêl 2:4.

ji sê p'ara p'areke merivayê, pê
agir, dû û k'irk'ûta ku ji devê van
derdik'et hatine kuştinê. 19 Çimkî
qewata hespa dev û dêlêd wanda
bûn. Dêlêd wan mîna me'ra bûn
û serê wan hebûn, ku pê wan
zirar didan.

20 Ew merivêd mayîne ku pê
van bela nehatine kuştinê, ji wan
p'ûtêd ku bi destêd xwe çêkiribûn
veneger'îyan. Wana destê xwe
ji cinh'ebandinê[f], ji wan p'ûtêd
zêr'e, zîve, sifire, kevire, dare
ku nabînin, nabihên û nager'in
nek'işandin*. 21 Usa jî ji kuştinê,
sêrbazîyê[f], bênamûsîyê û dizîya
xwe veneger'îyan.

### Milyak'et û k'itêba biç'ûke gulomatkkirî

**10** 1 Hingê min milyak'etekî
dinêyî zor dît ku ji e'zmên
dihate xwarê. E'wr lê wergirtî bû û
k'eskesor li sêrî bû, r'ûyê wî mîna
r'oyê bû, nigêd wî jî mîna stûnêd
êgir bûn. 2 Destê wîda k'itêbeke
biç'ûke vekirî hebû, nigê xweyî
r'astê danî ser be'rê, nigê xweyî
ç'epê jî danî ser bejê[f] 3 û bi dengê
bilind mîna mir'înîya şêr kire qa-
r'în. Çaxê ku wî kire qar'în, her
h'eft gur'înîyêd e'wra pê dengêd
xwe xeber dan. 4 Gava wan her
h'eft gur'înîyêd e'wra xeber dan,
min kir ku binivîsim, lê ji e'zmên
dengek hat û got: «Ew tiştêd ku
her h'eft gur'înîyêd e'wra gotin,
wan e'yan neke, nenivîse».

5 Hingê ew milyak'etê ku min
dîtibû, wekî wî nigek danîbû ser
be'rê û yek jî ser bejê, destê xweyî
r'astê berbi e'zmên bilind kir 6 û
pê Ewî sond xwar ku h'eta-h'e-
tayê Sax e, awa gotî pê Wî Yê ku
e'zman, h'emûyêd wêda, e'rd,
h'emûyêd wêda û be'r, h'emûyêd
wêda e'firandine û got: «Îdî wextê
derengî nek'eve. 7 Lê gava mil-
yak'etê h'efta deng li bor'îyê xe,
hingê wê ew sur'a t'ivdîra Xwedê
bê sêrî, ya ku Wî e'lamî xulamêd
Xwe p'êxembera kiribû».

8 Pey vê yekêr'a wî dengê ku
min ji e'zmên bihîstibû, dîsa t'evî
min xeber da û got: «Her'e, wê
k'itêba vekirî ji destê wî milyak'e-
tî hilde, yê ku li ser be'rê û bejê
sekinî ye»*. 9 Ez jî çûme cem wî
milyak'etî û min jêr'a got: «K'a
wê k'itêba biç'ûk bide min». Ewî
minr'a got: «Han vê hilde û bi-
xwe. Evê nav-dilê teda te'l be, lê

* 9:20 Zebûr 115:4-7.

* 10:8-10 Hezekîyêl 2:8–3:3.

devê teda wê mîna hingiv şîrin
be». 10 Hingê min k’itêba biç’ûk ji
destê milyak’et hilda û xwar. Devê
minda mîna hingiv şîrin bû, lê çaxê
min ew xwar, min nav-dilê xweda
te’layî k’ifş kir. 11 Wî çaxî minr’a
hate gotinê: «Gerekê tu dîsa li ser
gelek cime’ta, mileta, zimana û
p’adşa p’êxembertîyê bikî».

## Du şe’dêd ku p’êxembertîyê dikin

11 1 Hingê qamîşekî[f] mîna şiva
minr’a hate dayînê û hate
gotinê: «R’abe, p’aristgeha Xwedê
û gorîgehê çap ke û yêd ku têda
dih’ebînin jî bijmire. 2 Lê h’ewşa
p’aristgehêye derva bihêle û wê
çap neke, çimkî ew p’ûtp’aristar’a[f]
hate dayînê. Ewê Bajarê Pîroz çil
du meha bin p’îyada p’êpes kin*.
3 Û Ezê t’emîyê bidime du şe’dêd
Xwe, ewê k’urx xwekirî h’ezar du-
sid şêst r’ojî p’êxembertîyê bikin».
4 Evana ew her du darêd zeyt’ûnê
û her du şemdan in, yêd ku li ber
Xudanê dinyayê disekinin*. 5 Heger
merivek ku bixwaze ziararê bide
wan, agir ji devê wan derdik’eve,
dijminêd wan h’ûfî xwe dike. Û
heger merivek bixwaze zirarê
bide wan, gerekê ew xwexa usa
bê kuştinê. 6 H’ukumê van heye,
ku r’ojêd p’êxembertîya xweda
e’zmên dadin, wekî baran neba-
re. Usa jî h’ukumê wan li ser ava
heye, ku wan bikine xûn û k’engê
jî bixwazin, dikarin her cûr’e bela
bînine serê dinê*.

7 Gava ewana şe’detîya xwe ser
hevda bînin, hingê ew ce’newirê
ku ji gelîyê hey-wayê derdik’eve,
wê t’evî wan şer’ ke, wan bindest
ke û bikuje. 8 Cinyazêd wan wê
li ser meydana wî bajarê mezin
avîtî bin, li wî cîyê ku Xudanê
wan her duya hate xaçkirinê[f], ku
bi me’na r’uh’anî jêr’a «Sodom[f]»
û «Misir[f]» tê gotinê. 9 Ji h’emû
cime’ta, bereka, zimana û mileta
wê sê r’oj û nîva li cinyazêd wan
binihêr’in û nehêlin ku cinyazêd
wan bikine t’irba. 10 Binelîyêd li
r’ûbarî dinê wê dilê xwe li wan
şa kin û şa bin, xelata jî hevdu-
r’a bişînin, çimkî van her du
p’êxembera cefa didane yêd ku
li ser r’ûyê e’rdê diman.

11 Pey sê r’oj û nîvar’a Xwedê
r’uh’ê jîyînê ber wanda anî, ew

* 11:2 Lûqa 21:24.
* 11:4 Zekerîya 4:3, 11-14.
* 11:6 P’adşatî III, 17:1; Derk’etin 7:17-19.

r’abûne ser p’îya û xofeke mezin
k’ete ser yêd ku ew dîtin. 12 Hin-
gê wan her duya dengekî bilind
ji e’zmên bihîst ku wanr’a got:
«Werine vê jorê». Û ewana ber
ç’e’vêd dijminêd xwe e’wrava
hilk’işîyane e’zmên. 13 Wê sih’etê
e’rd qayîm h’ejîya, ji dehe p’ara
p’areke bajêr hilşîya û wê e’rdh’e-
jêda h’eft h’ezar meriv mirin, yêd
mayîn jî ç’e’vtirsîyayî bûn, şikirî
didane Xwedêyê e’zmên.
14 Weya duda derbaz bû. Va ye,
ya sisîya wê zûtirê bê.

**Dengê bor’îya h’efta:**
**H’ebandina li e’zmên**

15 Milyak’etê h’efta li bor’îyê
xist û e’zmênda dengêd bilind
hatin ku digotin:
«P’adşatîya dinyayê bû ya Xu-
danê me û Mesîhê Wî,
Ewê h’eta-h’etayê p’adşatîyê
bike»*.
16 Ew her bîst çar r’ûspîyêd ku li
ber Xwedê ser k’ursîyêd xwe r’û-
niştibûn, xwe dever’ûya avîtin, serê
xwe ber Xwedê danîn 17 û gotin:
«Ya Xudan Xwedêyê H’emû
Zorayîyê,
Yê heyî û Yê hebûyî,
em şikirîyê didine Te,
ku Te qewata Xweye mezin
stand
û dest bi h’ukumê Xwe kir*.
18 P’ûtp’arist qilqilîn, lê xezeba
Te hat.
Wext pêr’a gihîştîye, ku dîwana
mirîya bikî,
xelata bidî xulamêd Xwe, p’ê-
xembera û cime’ta Xwe
usa jî yêd ku ji Te ditirsin, ji
biç’ûka h’eta mezina.
Wext hat, ku qir’a wan bînî,
yêd ku dinê xirab dikin»*.
19 Pey vê yekêr’a p’aristgeha
Xwedêye e’zmên vebû û wêda
Sindoqa[f] Peymana Wî xuya bû.
Birûskê birq dan, gur’înîya dengêd
e’wra hate bihîstinê, e’rd h’ejîya
û teyrok barî.

**K’ulfet û zîya[f]**

**12** 1 Hingê nîşaneke mezin
e’zmênda xuya bû: K’ul-
fetekê r’o li xwe wergirtibû, hîv
binê p’îyada û t’acekî ji donzdeh
steyrka jî li sêrî bû. 2 Ew h’emle
bû û k’etibû ber zar’ê, êşa xwe
dik’işand û dikire qîr’în.

* 11:15 Derk’etin 15:18; Zebûra 10:16; Danîyêl 2:44.
* 11:17 Amos 3:13; Derk’etin 3:14.
* 11:18 Zebûr 2:1; Danîyêl 9:6; Amos 3:7; Zebûr 115:13.

3 Pey vê yekêr'a nîşaneke din
jî e'zmênda xuya bû. Min dîna
xwe dayê, va zîyakî[f] zerî mezin
ku h'eft serî û dehe stirûyêd wî
hebûn û h'eft t'ac jî li serêd wî
bûn*. 4 Poç'a wî ji sê p'ara p'areke
steyrkêd e'zmên k'işand û avîte
ser e'rdê. Ew zîya li ber wê k'ul-
feta[f] ku k'etibû ber zar'ê sekinî,
ku hema çawa zar' bibe wê zar'ê
h'ûfî xwe ke. 5 Wê k'ulfetê zar'eke
kur'în anî, ku wê bi şivdara h'esinî
şivantîyê li h'emû mileta bike. Lê
zar'a wê hate r'ahiştinê, li cem
Xwedê û ber t'extê Wî*. 6 K'ulfet jî
r'evî ber'îyê[f], li wî cîyê ku ji alîyê
Xwedêda jêr'a hatibû hazirkirinê,
wekî ew li wir h'ezar dusid şêst
r'ojî bê xweykirinê.

7 Hingê li e'zmên şer' dest pê
bû. Mixayîl milyak'etêd xweva
t'evî zîyê şer' kir, zîyê jî milya-
k'etêd xweva t'evî wan şer' kir*.
8 Lê zîyê da der, e'zmênda jî îdî
cî dest wan nek'et, 9 ew zîyayê
mezin jorda hate avîtinê. Eva ew
me'rê berê bû, ku jêr'a mîrêcin û
şeyt'an dibêjin, yê ku t'emamîya
dinê xalifandîye. Ew milyak'etêd
xweva jorda hatine avîtinê ser
r'ûyê e'rdê*.

10 Hingê min li e'zmên denge-
kî bilind bihîst ku got: «Niha ye
wextê xilazkirin[f], qewat û p'adşa-
tîya Xwedêyê me, usa jî h'ukumê
Mesîhê Wî. Çimkî Ew xeybkirê
xûşk-birêd me jorda hate avîtinê,
yê ku şev û r'oj ber Xwedêyê me
xeyba wan dikir*. 11 Ewana pê xûna
Berx û xebera şe'detîya xwe ser wî
k'etin, e'mirê xwe h'eta mirinê h'iz
nekirin. 12 Awa şa bin, e'zmanno
û yêd ku wanda dimînin. Lê wey
li e'rdê û li be'rê, çimkî mîrêcin
jorda ser weda hate avîtinê û ew
ji hêrsê xwe dixwe, ku zane wê
hindikî bimîne».

13 Gava zîyê dît ku ew jorda hate
avîtinê ser e'rdê, pey wê k'ulfetê
k'et, ya ku zar'a kur'în anîbû.
14 Du baskêd teyrê sîmir'îye mezin
wê k'ulfetêr'a hatine dayînê, wekî
bifir'e her'e ber'îyê, wî cîyê xwe,
k'îderê ji zîyê dûr wê sê sal û nîva
bihata xweykirinê. 15 Hingê zîyê
ji devê xwe mîna ç'êm av ber'da

* 12:3-4 Danîyêl 7:7; 8:10.
* 12:5 Zebûr 2:9.
* 12:7 Danîyêl 10:13, 21; 12:1.
* 12:9 Destpêbûn 3.
* 12:10 Îbo 1:9-11; Zekerîya 3:1.

pey wê k’ulfetê, wekî wê pê lêyê
bixeniqîne. 16 Lê e’rdê alîk’arîya
wê k’ulfetê kir, devê xwe vekir
û ew ç’emê ku zîyê ji devê xwe
ber’dabû daqurtand. 17 Hingê wî
zîyayî hêrsa xwe li wê k’ulfetê
r’akir û çû, wekî şer’ê xwe t’evî
wan zar’êd wêye mayîn bike, yêd
ku t’emîyêd Xwedê xwey dikin û
şe’detîya bona Îsa didin*. 18 Zîya
li devê be’rê sekinî.

### Du ce’newir derdik’evin

13 1 Hingê min dîna xwe da-
yê, va ce’newirek ji be’rê
derdik’et. H’eft serêd wî û dehe
stirûyêd wî hebûn, li ser stirûyêd
wî dehe t’ac bûn û li ser her h’eft
serêd wî jî navêd k’ifirî-zifirîya
bûn. 2 Ew ce’newirê ku min dît,
mîna piling bû, nigêd wî mîna
lepê h’ir’ç’a bûn û devê wî jî mî-
na devê şêra bû. Vî zîyayî qewata
xwe, t’extê xwe û h’ukumê xweyî
mezin da wî ce’newirî. 3 Serîkî vî
ce’newirî tê bêjî birîndar li ber
mirinê bû, lê birîna wî hate qenc-
kirinê. Û t’emamîya dinyayê ser
wî ce’newirî e’cêbmayî ma. 4 Wan
serê xwe li ber zîyê danîn, ku wî
h’ukumê xwe da wî ce’newirî. Usa
jî serê xwe li ber ce’newir danîn û
gotin: «Gelo k’î mîna vî ce’newirî
ye? Û k’î dikare t’evî vî şer’ ke?»
5 Evî ce’newirîr’a îzin hate da-
yînê ku devê xwe bême’rîfet veke
û k’ifirîya bike, usa jî wîr’a hate
dayînê, ku çil du meha bi h’ukumê
xwe bike*. 6 Ewî hindava Xwedêda
devê xwe xirab vekir û navê Wî,
konê Wî û yêd ku e’zmênda dimî-
nin bêhurmet kir. 7 Îzin wîr’a hate
dayînê, ku t’evî cime’ta Xwedê şer’
ke û serk’eve. Usa jî h’ukumê li
ser her berekê, cime’tê, zimanî û
miletî wîr’a hate dayînê. 8 H’emû
binelîyêd li r’ûbarî dinê wê serê
xwe li ber wî daynin, navêd k’îja-
na ji wextê e’firandina dinyayêda
k’itêba jîyînêye Berxê serjêkirîda
nehatine nivîsarê*.

9 Guhê k’ê heye bira bibihê:
10 Ewêd ku yê dîl k’etinê ne, wê
dîl bik’evin,
ewêd ku yêd ber şûr k’etinê
ne, ewê ber şûr k’evin*.

* 12:17 Aha jî tê fe’mkirinê: «Û şe’detîya e’lametîya Îsa xwey dikin».
* 13:5-7 Danîyêl 7:8, 21, 25.
* 13:8 Zebûr 69:28.
* 13:10 Yêremîya 15:2; 43:11. Nav hinek destnivîsarada aha ye: «Ewê ku pê şûr dikujin, ewê jî pê şûr her’in» (Bixûnin: Metta 26:52).

Li vir wê sebir û bawerîya cime’ta
Xwedê kêr bê.
11 Hingê min dîna xwe dayê,
va ce’newirekî din ji e’rdê der-
dik’et, du stirûyê wîye mîna yê
berxa hebûn û mîna zîyê xeber
dida. 12 Evî t’emamîya h’ukumê
ce’newirê pêşin li ber wî xwexa
dida xebatê û p’êyî ser e’rdê û
binelîyêd wê dikir, wekî serê xwe
li ber wî ce’newirê pêşin day-
nin, yê ku birîna wîye ku berbi
mirinê dibir hatibû qenckirinê.
13 Vî ce’newirî nîşanêd usa e’cêbe
mezin dikirin, h’eta ku agir jî ji
e’zmên li ber ç’e’vê meriva davîte
ser e’rdê. 14 Ewî pê wan nîşanêd
ku wîr’a hatibûne dayînê, wekî li
ber ce’newirê pêşin bike, binelî-
yêd li r’ûbarî dinê dixalifandin.
Ewî wanr’a got, ku h’eykelekî
wî ce’newirî çêkin, yê ku bi şûr
hatibû birîndarkirinê û dîsa sax
bû. 15 H’ukum wîr’a hate dayînê,
wekî r’uh’ ber h’eykelê ce’newirda
bîne, ku h’eykelê ce’newir xeber
de û bikaribe ewêd ku ce’newir
neh’ebînin bide kuştinê. 16 Ewî
p’êyî ser h’emûya kir, awa gotî
biç’ûk û mezina, dewletî û be-
lengaza, aza û xulama ku nîşanê
bidine ser destê xweyî r’astê yan
e’nîya xwe, 17 wekî t’u kes nikaribe
ne bik’ir’e, ne jî bifiroşe, pêştirî
wî, yê ku nîşana ce’newir, awa
gotî navê wî yan h’esabê navê
wî ser e.
18 Li vir serwaxtî kêr tê: H’iş-aqi-
lê k’ê heye, bira h’esabê ce’newir
bijmire, çimkî h’esabê merivekî
ye û h’esabê wî şeşsid şêst şeş e.

### Berx û yêd xilazbûyî

14 1 Paşê min dîna xwe da-
yê, va Berx li serê ç’îyayê
Sîyonê[f] sekinî bû û sed çil çar
h’ezar meriv t’evî Wî bûn, ku li
ser e’nîya wan navê Wî û navê
Bavê Wî nivîsar bûn. 2 Min ji e’z-
mên dengek bihîst, mîna dengê
gelek ava û mîna dengê gur’înî-
ya e’wraye qayîm. Ew dengê ku
hate min, mîna dengê miqamê
çengvana bû, ku li çengêd[f] xwe
dixin. 3 Wana li ber t’ext û li ber
wan her çar r’uh’bera û r’ûspî-
ya stiraneke nû distira. T’u kes
nikaribû wê stiranê hîn bûya,
pêştirî wan sed çil çar h’ezarêd
ku ji dinyayê hatibûne k’ir’înê.
4 Evana ew in, yêd ku serê xwe
jinar’a danenîne, ew yêd bik’ir[f]
in. Evana pey Berx diçin, k’uda
ku ew diçe. Evana ji nava meriva
hatine k’ir’înê, çawa berê[f] dere-
meta pêşin ku Xwedê û Berxr’a
bêne dayînê. 5 Derew ji devê wan
dernek’etîye, ew bêqusûr in.

### Sê milyak'et

6 Hingê min dîna xwe dayê,
va milyak'etekî din ku e'zmênda
difir'î û Mizgînîya wîye h'eta-h'e-
tayê hebû, wekî wê Mizgînîyê bide
yêd r'ûbarî dinê, awa gotî h'emû
mileta, bereka, zimana û cime'ta.
7 Wî bi dengekî bilind digot: «Ji
Xwedê bitirsin û şikirîyê bidine
Wî, çimkî sih'eta dîwankirina
Wî pêr'a gihîşt. Serê xwe ber Wî
daynin, Yê ku e'rd û e'zman, be'r
û avêd kanîya e'firandine».
8 Hingê milyak'etekî din pey
wî hat û got: «Hilşîya, wêran bû!
Ew Babîlona[f] mezin, ya ku ew
şerava qavîya[f] xweye har h'emû
milet dane vexwarinê»*.
9 Pey vê yekêr'a milyak'etekî
din jî pey wan hat û bi dengekî
bilind got: «Ewê ku serê xwe li
ber ce'newir û h'eykelê wî dayne
û nîşana wî ser e'nîya xwe yan
ser destê xwe qebûl ke, 10 ewê ji
wê şerava hêrsa Xwedê vexwe, ya
ku av t'evnekirî ye, k'asa Wîye
xezebêda dagirtî ye. Ewê li ber
milyak'etêd pîroz û li ber Berx
agir û k'irk'ûtêda cefê bik'işîne*.
11 Dûyê cefê wan wê h'eta-h'etayê
bik'işe û şev û r'oj wê r'ih'etîya
wan t'unebe, yêd ku serê xwe ber
ce'newir û h'eykelê wî datînin û
nîşana wî li ser wan e».
12 Awa li vir wê sebira cime'ta
Xwedê kêr bê, yêd ku t'emîyêd
Xwedê xwey dikin û hindava
Îsada amin in.
13 Hingê min ji e'zmên dengek
bihîst ku got: «Binivîse: Ji vir şûnda
xwezilî ne ew meriv, yêd ku bona
bawerîya ser Xudan wê bimirin».
R'uh' dibêje: «Belê! Ewê ji xebata
xwe r'ih'et bin, çimkî kirêd wan
t'evî wan diçin».

### Nandirûna[f] r'ûyê e'rdê

14 Û min dîna xwe dayê, va
e'wrekî sipî û «yekî mîna kur'ê[f]
mêriv»* li ser wî e'wrî r'ûniştî
bû. T'acekî zêr'în li serê Wî bû û
de'seke tûj jî dêstda bû**. 15 Hin-
gê milyak'etekî din ji p'aristgehê
derk'et, bi dengekî bilind li Ewî
ku li ser e'wr r'ûniştî bû kire gazî

* 14:8 Îşaya 21:9; Yêremîya 51:8.

* 14:10 Destpêbûn 19:24; Hezekîyêl 38:22.

* 14:14 Şirovekirina xebera «yekî mîna kur'ê[f] mêriv» bin r'êza E'yantî 1:13-da bixûnin.

** 14:14 Danîyêl 7:13.

û gotê: «De'sa Xwe bavêjê bidirû,
çimkî ew sih'eta nandirûnê[f] hat,
berê e'rdê îdî gihîştîye»*. 16 Ewî
ku li ser e'wr r'ûniştî bû de'sa Xwe
avîte r'ûyê e'rdê û e'rd hate dirûnê.

17 Hingê ji wê p'aristgeha e'zmên
milyak'etekî din derk'et û destê
wîda jî de'seke tûj hebû.

18 Wê hingê ji gorîgehê milya-
k'etekî din derk'et, ku h'ukumê
wî li ser êgir hebû, ewî bi dengekî
bilind li yê xweyê de'sa tûj kire
gazî û gotê: «De'sa xweye tûj ba-
vêje gûşîyêd tirîyêd e'rdê û biçine,
çimkî tirîyêd wê îdî gihîştine».
19 Wî milyak'etî jî de'sa xwe avîte
e'rdê, tirîyêd e'rdê çinîn û bona
h'incir'andinê avîte wî h'ewzê
mezinî xezeba Xwedê. 20 Ew tirî
wî h'ewzîda hatine h'incir'andinê,
ku ji bajêr der bû û ji h'ewz xûn
k'işîya, xûnê avîte gemê hespa,
qasî h'ezar şeşsid meydanî* girt.

## H'eft milyak'et û h'eft bela

15 1 Hingê min li e'zmên
nîşaneke dine mezin û
ecêb dît, h'eft milyak'etêd xweyê
h'eft belayêd axirîyê pê k'îjana wê
xezeba Xwedê bihata sêrî. 2 Wî
çaxî min tiştekî mîna be'reke şûşe
êgirva t'evayî dît, usa jî ewêd ku
ce'newir, h'eykelê wî û h'esabê
navê wî bindest kiribûn. Evana ser
be'ra şûşe sekinî bûn, çengêd ku
Xwedê dabûne wan destêd wanda
bûn 3 û stirana Mûsayê[f] xulamê
Xwedê û stirana Berx distiran:

«Kirêd Te mezin û e'cêb in
Xudan Xwedêyê H'emû Zora-
yîyê!
R'îyêd Te r'ast û ser heqîyê ne,
ya P'adşayê mileta*.
4 Xudan, k'î ji Te wê netirse
û r'ûmetê nede wî navê Te?
Çimkî Tu t'enê Yê pîroz î.
H'emû miletê berbi Te bên
û serê xwe ber Te daynin,
çimkî kirêd Teye r'ast xuya
bûn»*.

5 Pey van tiştar'a min dîna
xwe dayê, va p'aristgeha e'zmên
vebû, awa gotî Konê[f] Şe'detîyê.
6 Ew her h'eft milyak'etêd xweyê
her h'eft bela ji p'aristgehê der-
k'etin. K'itanêd paqije birqok
li wan bûn û melaxtêd zêr'în li
sîngêd wan bûn. 7 Hingê ji her

* 14:15 Yoêl 3:13.
* 14:20 «H'ezar şesid meydan» bi h'esabê niha dike sêsid kîlomêtir.
* 15:3 Qanûna Ducarî 32:4; Zebûr 145:17; Yêremîya 10:10.
* 15:4 Yêremîya 10:6-7; Zebûr 86:9; Malaxî 1:11.

çar r’uh’bera yekî h’eft t’asêd
zêr’îne xezeba wî Xwedêyîva
t’ijî, Yê ku h’eta-h’etayê Sax e,
dane wan her h’eft milyak’eta.
8 P’aristgeh dûyê r’ûmeta Xwedê
û qewata Wîva t’ijî bû û t’u kes
nikaribû bik’eta p’aristgehê, h’eta
ku her h’eft milyak’eta, her h’eft
bela neanîna sêrî[f]*.

### H’eft t’asêd xezeba Xwedê

**16** 1 Hingê min dengekî bilind
ji p’aristgehê bihîst ku gote
her h’eft milyak’eta: «Her’in, her
h’eft t’asêd xezeba Xwedê bir’êjine
ser e’rdê».

2 Milyak’etê pêşin çû t’asa xwe
r’ête ser e’rdê, p’izikêd p’îse xi-
rab li ser wan meriva derk’etin,
yêd ku nîşana ce’newir li ser wan
bû û serê xwe li ber h’eykelê wî
danîbûn*.

3 Yê duda t’asa xwe r’ête ser
be’rê, be’r bû mîna xûna mirîya û
h’emû h’eywanêd be’rêda qir’ bûn.

4 Yê sisîya t’asa xwe r’ête ser
ç’ema û avêd kanîya, ew bûne
xûn*. 5 Wî çaxî min dengê mil-
yak’etê ava bihîst ku got:

«Tu ser r’astîyê yî,
Yê heyî, Yê hebûyî û Yê
pîroz î,
ku Te dîwanêd bi vî awayî ki-
rin*.
6 Çimkî wan xûna cime’ta Xwedê
û p’êxembera r’êt
û Te xûn li wan da vexwarinê.
R’ast ew xurê vê yekê ne»*.

7 Hingê min dengê gorîgehê bihîst,
ku aha got:

«Belê, ya Xudan Xwedêyê H’e-
mû Zorayîyê*,
dîwanêd Te r’ast û heq in».

8 Milyak’etê çara t’asa xwe r’ête
ser r’oyê û wêr’a hate dayînê, ku
merivayê bi êgir biqelîne. 9 Hingê
meriv ji dest şewata germayîyê
hatine qelandinê û k’ifirî navê
Xwedê kirin, ku h’ukumê Wî li
ser van bela heye. Lê ew ji kirêd
xweye xirab veneger’îyan, wekî
şikirî bidana Wî.

10 Milyak’etê pênca t’asa xwe
r’ête ser t’extê ce’newir û te’rîstanî

* 15:8 Derk’etin 40:34; P’adşatî III, 8:10-11; Îşaya 6:1-4.
* 16:2 Derk’etin 9:10.
* 16:4 Derk’etin 7:17-21.
* 16:5 Derk’etin 3:14; Zebûr 145:17.
* 16:6 Zebûr 79:3; Îşaya 49:26.
* 16:7 Zebûr 19:9; 119:37.

hate ser p'adşatîya wî, ji êşê meriva
zimanê xwe digestin* 11 û ji dest
êşa û p'izika k'ifirî li Xwedêyê
e'zmên kirin, lê ji kirêd xweye
xirab veneger'îyan.

12 Milyak'etê şeşa t'asa xwe
r'ête ser ç'emê Firatêyî mezin,
ava ç'êm ç'ikîya, wekî r'ê bona
p'adşêd r'ohilatê bê hazirkirinê*.
13 Hingê min dîna xwe dayê, va
sê r'uh'êd[f] h'erame[f] mîna beqa, ji
devê wî zîyayî, ji devê ce'newir û
ji devê p'êxemberê derew derdi-
k'etin. 14 Evana ew r'uh'êd cina
bûn, yêd ku nîşanêd e'cêb dikin.
Ew diçine cem h'emû p'adşêd
dinyayê, wekî wan bicivînin, bona
şer'ê wê R'oja Mezine Xwedêyê
H'emû Zorayîyê.

15 «Va ye Ezê mîna diza bêm!
Xwezî li wî, yê ku h'işyar dimîne û
k'incêd xwe xwey dike, wekî te'zî
neger'e û e'yba wî xuya nebe!»

16 Hingê wan r'uh'a ew p'adşa
civandine wî cîyî ku bi îbranî jêr'a
«Harmegedon» tê gotinê.

17 Milyak'etê h'efta t'asa xwe
r'ête ser hewê û ji t'extê p'arist-
gehê dengekî bilind derk'et û got:
«Hate sêrî!» 18 Hingê birûskê lê da,
bû gur'înîya dengê e'wra û e'rd
usa qayîm h'ejîya, ku ji wê r'oja
însan dinê k'etîye h'eta niha e'rd
aha neh'ejîyaye. E'rdh'ej haqas
qayîm bû! 19 Bajarê mezin bû sê
p'ara û bajarêd mileta wêran bûn.
Babîlona mezin hate bîra Xwedê,
wekî wê k'asa xweye şerava xezeba
giranva bide wê. 20 H'emû girav
betavebûn û ç'îya îdî nehatine
xuyanê. 21 Ji e'zmên teyroka gire
weke pêncî kîloggramê ser merivada
barî. Meriva ji dest lêdana teyrokê
k'ifirî li Xwedê kirin, çimkî eva
bela gelekî giran bû*.

### Maka qavîyê

17 1 Ji wan her h'eft milyak'e-
têd ku xweyê her h'eft t'asa
bûn, yekî hat t'evî min xeber da
û got: «Were vê derê, ez dîwana
wê qava bi nav û deng nîşanî te
kim, ya ku li ser gelek ava r'ûniştî
ye*. 2 P'adşêd dinyayê t'evî vê qavî
kirin û binelîyêd r'ûbarî dinê pê
şerava qavîya wê serxweş bûn».

3 Hingê R'uh'ê Pîroz hate ser
min, wî milyak'etî ez birime

* 16:10 Derk'etin 10:21.
* 16:12 Îşaya 11:15.
* 16:21 Derk'etin 9:23.
* 17:1 Yêremîya 51:12-13.

ber'îkê. Min dîna xwe dayê, va
jinek li ser ce'newirekî sorê gevez
sîyar, ku serda-pêda ji her alîyava bi
navêd k'ifirîyêd hindava Xwedêda
t'ijî bûn û h'eft serêd wî û dehe
stirûyêd wî hebûn. **4** Ew k'ulfeta
k'inca şîrk[f] û sorê gevezva wergirtî
bû, pê zêr', kevirêd qîmet, lal û
dur'va[f] xemilî bû. K'aseke zêr'în
destê wêda bû, ew k'as jî k'irêtî
û mir'dar'îya qavîya wêva dagirtî
bû. **5** Li ser e'nîya wê navekî sur'
nivîsar bû: BABÎLONA MEZIN,
MAKA QAVA Û K'IRÊTÎYÊD
DINYAYÊ. **6** Min dîna xwe dayê,
wê ew k'ulfeta pê xûna cime'-
ta Xwedê û pê xûna şe'dêd Îsa
serxweş bûye.

Gava ku min ew dît, ez gele-
kî e'cêbmayî mam. **7** Hingê wî
milyak'etî minr'a got: «Tu çima
e'cêbmayî mayî? Ezê sur'a wê
k'ulfetê û sur'a wî ce'newirê ku
ewa lê sîyar e, k'îjan ku h'eft se-
rêd wî û dehe stirûyêd wî hene,
ter'a bêjim. **8** Ew ce'newirê ku te
dît, wextekê hebû, lê niha t'une.
Ewê zûtirê ji gelîyê hey-wayê der-
k'eve û her'e unda be. Binelîyêd
r'ûbarî dinêye ku navêd wan ji
wextê e'firandina dinyayêda k'i-
têba jîyînêda nehatine nivîsarê,
wê e'cêbmayî bimînin, gava wî
ce'newirî bibînin, yê ku hebû û
niha t'une, lê wê hebe.

**9** Li vir h'iş-aqil kêr tê. Ew her
h'eft serî, h'eft ç'îya ne, ser k'îjana
ew k'ulfet r'ûniştî ye, usa jî h'eft
p'adşa ne. **10** Ji wan pênc k'etine,
yek heye, yê din hê nehatîye û ga-
va bê, gerekê hinek wext bimîne.
**11** Ew ce'newirê ku wextekê hebû
û niha t'une, ew xwexa jî p'adşê
h'eyşta ye. Ew yekî ji wan her h'efta
ye û wê her'e unda be.

**12** Ew her dehe stirûyêd ku te
dîtine, dehe p'adşa ne, ku hê
p'adşatî nestandine, lê belê wê
h'ukum bistînin, ku t'evî ce'-
newir bona sih'etekê p'adşatîyê
bikin*. **13** Meremê van her deha
yek e, ewê qewat û h'ukumê xwe
bidine ce'newir. **14** Evana wê t'e-
vî Berx şer' bikin, lê Berx t'evî
yêd gazîkirî, bijartî û amina wê
li ser wan bikaribe, çimkî ew
Berx Xudanê xudana û P'adşê
p'adşa ye».

**15** Hingê milyak'et minr'a got:
«Ew avêd te dîtin ku ewa qav li
ser wan r'ûniştîye, ew cime't in,
e'lalet in, milet û ziman in. **16** Ew
her dehe stirûyêd ku te dîtin, usa
jî ce'newir wê hevr'a bijenine ya

* 17:12 Danîyêl 7:24.

qav. Ewê destê wê ji her tiştî bikin,
wê te’zî kin û goştê wê bixwin,
êgirda bişewitînin. 17 Çimkî Xwedê
ev yek kire dilê wan, ku xwestina
Wî bikin û ser nêtekê bin, p’ad-
şatîya xwe bidine ce’newir, h’eta
ku xeberêd Xwedê bêne sêrî. 18 Ew
jina ku te dît, ew bajarê mezin
e, yê ku p’adşatîyê li ser p’adşêd
dinyayê dike».

### Wêranbûna Babîlonê[f]

18 1 Pey van tiştar’a min dîna
xwe dayê, wê milyak’e-
tekî din ji e’zmên dihate xwarê.
Ew xweyê h’ukumê mezin bû û
ji dîndara wî r’ûyê e’rdê r’onayî
bû. 2 Ewî bi dengekî bilind kire
gazî û got:
«Hilşîya, wêran bû, Babîlona mezin!
Ew bû cî-war, misk’enê cina
û sit’ara h’emû r’uh’êd h’eram,
qelêtka h’emû teyredêd nep’ake mir’dar’*.
3 Çimkî ji wê şerava qavîya wêye har
h’emû mileta hilda vexwar,
p’adşêd dinyayê t’evî wê qavî kirin,
bazirganêd dinyayê ji agirê dilê wê dewletî bûn»*.
4 Li vir min ji e’zmên dengekî
din bihîst ku got:
«Ji nava wê derk’evin, cime’ta Min,
wekî hûn nebine heval-p’arêd gunêd wê
û ji belayêd wê p’arê nestînin*.
5 Çimkî gunêd wê ser hev cî bûne gihîştine h’eta e’zmên
û Xwedê ner’astîyêd wê anîne bîra Xwe*.
6 Wê çi kiribe usa jî hûn bînine serê wê
û li anegorî kirêd wê,
du car haqasî lê veger’înin,
ew k’asa ku wê bona we dagirt,
hûn du car te’l li wê bidine vexwarinê*.
7 Çiqas r’ûmeta xwe bilind kirîye
û k’êfa dilê xwe derbaz kirîye,
haqasî cefa-şînê serda bînin.
Çimkî dilê xweda aha dibêje:
‹Ez çawa p’adşa r’ûniştî me,
û ne jinebî me,

* 18:2 Îşaya 21:9; 13:21; Yêremîya 50:39.
* 18:3 Îşaya 23:17; Yêremîya 51:7.
* 18:4 Îşaya 52:11; Yêremîya 50:8; 51:6.
* 18:5 Destpêbûn 18:20-21; Yêremîya 51:9.
* 18:6 Zebûr 137:8; Yêremîya 50:15.

t’u car ezê şînê nebînim›*.
8 Lema jî nava r’ojekêda wê be-
layêd wê ser wêda bên:
Nexweşîya h’al, şîn û xelayî û
wê bibe xurê êgir.
Çimkî ew Xudan Xwedê qewat
e, yê ku dîwana wê dike».
9 P’adşêd dinyayê, yêd ku pê-
r’a qavî û k’êf kirine, gava dûyê
şewata wê bibînin, wê bigirîn û
ser wê şînê bikin. 10 Ji tirsa cefê
wê, ewê li dûr bisekinin û bêjin:
«Ax, ax bajarê mezin,
bajarê zor, Babîlon!
Dîwana te sih’etekêda ser teda
hat»*.
11 Bazirganêd dinyayê wê li ser
wê bigirîn û şînê bikin, çimkî
îdî t’u kesê tiştêd wane firotanê
nek’ir’e: 12 Hûr-mûrêd zêr’, zîv,
kevirêd qîmet, lal-dur’, k’itanê
qîmet, p’arç’êd şîrk[f], hevirmiş,
p’arç’êd sorê gevez, her dara bîn-
xweş û her tiştêd ji qîlêd fîla,
tiştêd ji darêd here qîmet, ji sifir,
h’esin û mermer, 13 usa jî darçîn[f],
bihareta bînxweş, bixûr, r’ûnê bîn-
xweş, bixûrê[f] e’rebî, şerav, bizirê
zeyt’ûnê, arê xas, genim, dewar,
pez, hesp, e’rebe, xulam û r’uh’êd
însên jî. 14 Bazirganê bêjin: «Ew
tiştêd dilê tedaye şîrin ji destê te
çûn û h’emû tiştêd r’ewşe birqok
ji te birîyan, îdî t’u car ew dest te
nak’evin». 15 Ew bazirganêd van
tişta, yêd ku pê Babîlonê dewle-
tî bibûn, wê ji tirsa cefê wê dûr
bisekinin bigirîn, bavêjine ser wê
16 û bêjin:
«Ax, ax bajarê mezin,
ku te k’itanê qîmet, p’arç’ê şîrk
û sorê gevez li xwe wergirtibû
û bi zêr’, kevirê qîmet, lal-dur’va
xemilî bûyî!*
17 Haqas hebûk[f] sih’etekêda p’ûç’
bû çû».
H’emû serdarêd gemîya û sîyarêd
gemîya, gemîvana[f] û h’emûyêd ku
pê xebata ser be’rê e’bûrê xwe di-
kirin, dûr sekinîn* 18 û çaxê dûyê
şewata wî dîtin, kirine qîr’în û
gotin: «Gelo bajarekî din mîna
vî bajarê mezin hebû?» 19 Xwelî li
serê xwe kirin, bi şîn û girî kirine
qîr’în û gotin:
«Ax, ax bajarê mezin,
wekî h’emûyêd be’rêdaye xwe-
yîgemî

* 18:7-8 Îşaya 47:7-9.
* 18:10 Hezekîyêl 26:17.
* 18:16 Hezekîyêl 28:13.
* 18:17 Hezekîyêl 27:26-34; Îşaya 23:14.

pê hebûka wîye xinêbûyî dew-
letî bibûn,
çawa sih'etekêda wêran bû çû!»

20 E'zmano, cime'ta Xwedê, şandî
û p'êxemberno!
Dilê xwe şa kin li wî bajarî,
ku Xwedê h'eyfa we ji wî hilda.
21 Hingê milyak'etekî qewat,
kevirek mîna beraşekî mezin
hilda, avîte be'rê û got:
«Bi vî awayî jî bajarê mezin
Babîlon wê qayîm jorda bê
avîtinê
û îdî t'u car wê xuya nebe*.
22 Wê îdî dengê çeng, sazbend,
bilûrvan û bor'îvan
nav teda t'u car neyê bihîstinê.
Wê îdî hostakî t'u p'êşeyî[f]
t'u car nav teda xuya nebe.
Wê îdî dengê beraşa jî
t'u car nav teda neyê bihîstinê*.
23 Wê îdî ç'irûsîya ç'irê jî
t'u car nav teda xuya nebe
Wê îdî dengê bûk-ze'vê jî
t'u car nav teda neyê bihîstinê.
Bazirganêd te giregirêd dinyayê
bûn
û h'emû milet bi sêrbazîya te
ji r'ê xalifîn[f]*.
24 Û xûna p'êxember û cime'ta
Xwedê k'ete stûyê wî bajarî, belê
xûna wan h'emûya ku li ser r'ûyê
e'rdê hatine r'êtinê».

### Şabûna li e'zmên

19 1 Pey van yekar'a, min
li e'zmên dengekî bilind
bihîst, mîna dengê e'laleteke gi-
ran ku digot:
«Halêlûya[f]!
Xilazbûn, r'ûmet û qewat yêd
Xwedêyê me ne!
2 Dîwanêd Wî r'ast û heq in.
Ewî dîwana wê qavê kir
ya ku pê qavîya xwe dinê h'e-
r'imand
û h'eyfa xûna xulamêd Xwedê
ji wê hilda»*.
3 Cara duda gotin:
«Halêlûya!
H'eta-h'etayê dûyê ji wê bik'i-
şe»*.
4 Her bîst çar r'ûspî û her çar
r'uh'ber dever'ûya çûn û serê

* 18:21 Yêremîya 51:63-64; Hezekîyêl 26:21.
* 18:22 Îşaya 24:8; Hezekîyêl 26:13.
* 18:23 Yêremîya 25:10.
* 19:2 Zebûr 19:9; 119:37; Qanûna Ducarî 32:43; Zebûr 79:10.
* 19:3 Îşaya 34:10.

xwe li ber wî Xwedêyê li ser t’ext
r’ûniştî danîn û gotin:
«Amîn, Halêlûya!»
5 Hingê dengek ji t’ext hat û got:
«H’emû xulamêd Wîye ku ji
Wî xof dikin,
biç’ûk û mezin pesinê Xwedêyê
me bidin»*.
6 Hingê min deng bihîst, ça-
wa dengê e’laleteke giran, mîna
dengê xule-xula gelek ava û mîna
dengê gur’înîya e’wraye qayîm
ku digotin:
«Halêlûya!
Çimkî Xudan Xwedêyê meyî
H’emû Zorayîyê
dest bi p’adşatîyê kir*.
7 Em Wîr’a gul din û şa bin
û şikirîyê bidine Wî,
çimkî de’wata Berx pêr’a gihîşt
û dergîstîya Wî k’arê xwe kirîye.
8 Bona li xwekirinê
k’itanê birqokî paqij jêr’a hate
dayînê».
(Ew k’itan nîşana kirinêd cime’ta
Xwedêye r’ast in.)*
9 Hingê wî milyak’etî minr’a
got: «Binivîse: Xwezî li wan, ku
bona şayîya de’wata Berx hatine
t’eglîfkirinê!» Serda zêde kir got:
«Ay ev in xeberêd Xwedêye r’ast»*.
10 Wî çaxî ez dever’û çûme niga,
ku serê xwe li ber wî daynim, lê
ewî minr’a got: «Vê yekê neke! Ez
jî heval-xulamekî mîna te û wan
xûşk-birêd te me, k’îjan e’lame-
tîya Îsaye r’ast xwey dikin*. Serê
xwe li ber Xwedê dayne. Çimkî
ew r’astîya ku Îsa e’lam kir ew
p’êxembera dide xeberdanê**».

**Hespê boz û sîyarê wî**

11 Hingê min dîna xwe dayê,
e’zman vebû, va ye hespekî boz,
ku sîyarê Wîr’a Amin û R’ast
digotin. Ew dîwankirinê û şer’ê
Xweda ser r’astîyê ye. 12 Ç’e’vêd
Wî mîna alava êgir bûn û gelek
t’ac li serê Wî bûn. Navek ser Wî
nivîsar bû, ku pêştirî Wî t’u kesî
nizanibû. 13 K’inceke xûnêda kirî
lê bû û navê Wî Xebera Xwedê

* 19:5 Zebûr 22:23; 134:1; 115:13.
* 19:6 Derk’etin 15:18; Zebûr 22:28; Danîyêl 7:14.
* 19:8 Îşaya 61:10.
* 19:9 Metta 22:2-14.
* 19:10 Aha jî tê fe’mkirinê: «Şe’detîyê bona Îsa didin».
** 19:10 Bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Çimkî şe’detîya Îsa ew r’uh’ê p’ê-xembertîyê ye». «Şe’detîya Îsa» aha jî tê fe’mkirinê: «Şe’detî bona Îsa». Hin jî vê cumla paşin fe’m dikin çawa xebera milyak’et e, ne ku ya Yûh’enna.

bû*. **14** Ordîyêd e’zmên jî li hespêd
boze sîyar k’itanêd çîl-qerqaşe
paqij li wan pey Wî diçûn. **15** Ji
devê Wî şûrekî tûj derdik’et, wekî
li mileta xe. Ewê pê şivdara h’esinî
şivantîyê li wan bike, wî h’ewzê
şerava xezeba Xwedêyê H’emû
Zorayîyêda wan bih’incir’îne. **16** Li
ser k’inca Wî, ser hêta Wî navek
nivîsar bû: P’ADŞÊ P’ADŞA Û
XUDANÊ XUDANA.

**17** Hingê min milyak’etek dît, ew
li ser r’oyê sekinî bû, bi dengekî
bilind kire gazî û gote h’emû tey-
redêd ku hewêda difir’in: «Werin
bicivine şayîya Xwedêye mezin*,
**18** wekî hûn cinyazêd p’adşa, serda-
ra, mêrxasa û beret’êd hespa, usa
jî cinyazêd sîyarêd wan û h’emû
meriva, aza û xulama, biç’ûk û
mezina bixwin».

**19** Hingê min ew ce’newir û
p’adşêd dinyayê ordîyêd wanva
li cîkî civîyayî dîtin, wekî şer’ê
xwe t’evî Wî sîyarê hespê boz û
ordîya Wîva bikin. **20** Hingê ew
ce’newir t’evî wî p’êxemberê derew
dîl hatine girtinê, yê ku li ber wî
ce’newirî nîşanêd e’cêb dikirin.
Ewî bi wan kira ew xalifandin,
yêd ku nîşana ce’newir qebûl
kirin û serê xwe li ber h’eykelê
wî danîn. Ce’newir û p’êxemberê
derew jî saxe-sax hatine avîtinê
nav gola agirê k’irk’ûtêyî dişixule.
**21** Ewêd mayîn jî pê wî şûrê ku ji
devê Sîyarê hespê boz derdik’et,
hatine kuştinê û h’emû teyrede ji
cinyazêd wan t’êr bûn.

### P’adşatîya h’ezar salî

# 20

**1** Hingê min dîna xwe
dayê, va milyak’etek ji
e’zmên dihate xwarê, k’ilîta ge-
lîyê hey-wayê û zincîreke mezin
destê wîda bû. **2** Ewî ew zîya girt,
awa gotî ew me’rê berê, ku xwe-
xa mîrêcin û şeyt’an e û h’ezar
salî girêda*. **3** Ewî ew avîte gelîyê
hey-wayê, ser wî k’ilît kir û mor
lêxist, wekî îdî mileta nexalifîne,
h’eta h’ezar sal t’emam be. Pey wê
yekêr’a ew gerekê bona wextekî
kin bê ber’danê.

**4** Hingê min k’ursî dîtin ku ew
li ser wan r’ûniştin, k’îjanar’a hate
dayînê, wekî dîwanê bikin. Usa jî
min r’uh’êd wan dîtin, serê k’îjana
bona şe’detîya Îsa û bona xebera
Xwedê hatibûne lêxistinê, k’îjana

* 19:13 Yûh’enna 1:1.
* 19:17-18 Hezekîyêl 39:17-20.
* 20:2 Destpêbûn 3.

serê xwe li ber ce’newir û h’eykelê
wî danenîbûn û ne jî nîşana wî
hildabûne ser e’nî yan destê xwe.
Evana dîsa sax bûn û t’evî Mesîh
h’ezar salî p’adşatî kirin. 5 (Lê ew
mirîyêd mayîn sax nebûn, h’eta
h’ezar sal t’emam bû.) Ev e r’a-
bûna mirîyaye pêşin. 6 Xwezilî û
buhurtî-jibare ye, ewê ku p’ara wî
t’evî r’abûna mirîyaye pêşin heye.
Mirina duda li ser wan h’ukum
nake, lê ewê bibine k’ahînêd Xwedê
û Mesîh û wê t’evî Wî h’ezar salî
p’adşatîyê bikin.

### Axirîya mîrêcin

7 Gava h’ezar sal t’emam be, mî-
rêcin wê ji zindana xwe bê ber’danê,
8 ewê derk’eve, wekî wan miletêd
her çar qulbêd dinêda, awa gotî
Gog û Magogê bixalifîne û wan
bona şer’ li cîkî bicivîne. R’eqema
wan wê mîna qûma devê be’rê
be*. 9 Evana wê t’emamîya e’rdê
bela bin û dora wargehê ordîya
cime’ta Xwedê û bajarê h’izkirî
bigirin. Lê ji e’zmên agirê bibare,
wan h’ûfî xwe ke. 10 Ew mîrêcinê
ku ew xalifandin, wê bê avîtinê
nava gola agirê k’irk’ûtê, wî cîyê
ku ce’newir û p’êxemberê derew
têda ne. Li wir wê şev û r’oj, h’e-
ta-h’etayê biçerçirin.

### Dîwana xilazîyê

11 Hingê min t’extekî mezinî
çîlî-qerqaş dît û Yek li ser r’û-
niştibû. E’rd û e’zman ji ber Wî
betavebûn û dewsa wan k’ifş nebû.
12 Wê hingê min mirîyêd biç’ûk û
mezin dîtin ku li ber t’ext sekinî
bûn. K’itêb vebûn û k’itêbeke din
jî vebû, awa gotî k’itêba jîyînê.
Dîwana mirîya anegorî wan ki-
rêd wane k’itêbada nivîsar hate
kirinê*. 13 Be’rê mirîyêd xwe dan,
Mirinê û Dîyarê Mirîya jî mirîyêd
xwe dan. Dîwana her merivekî
ji wan anegorî kirinêd wan hate
kirinê*. 14 Hingê Mirin û Dîyarê
Mirîya hatine avîtinê nava gola
êgir. Ev gola êgir mirina duda ye.
15 Û navê k’ê vê k’itêba jîyînêda
nivîsar t’unebû, ew hate avîtinê
nava gola êgir.

### E’rd û e’zmanê nû

**21** 1 Hingê min e’rd û e’z-
manekî nû dîtin, çimkî
e’rd û e’zmanê berê derbaz bûn û

* 20:8 Hezekîyêl 38.
* 20:12 Danîyêl 7:10.
* 20:13 Zebûr 62:12.

îdî be’r t’unebû*. 2 Min dîna xwe
dayê, va ji e’zmên Bajarê Pîroz,
Orşelîma nû mîna bûkeke xêlîkirî
bona dergîstîyê xwe xemilî ji Xwe-
dêda dihate xwarê. 3 Min ji t’ext
dengekî bilind bihîst ku got: «Va ye
konê Xwedê nava merivada! Ewê
Xwexa nav wanda bijî, ewana wê
bibine cime’ta Wî û Xwedê Xwe-
xa jî wê t’evî wan bimîne, çawa
Xwedêyê wan.** 4 Ewê ji ç’e’vêd
wan h’emû hêsirêd wan paqij ke
û îdî mirinê t’unebe, ne şîn, ne
girî, ne êş-êşûk, çimkî tiştêd berê
derbaz bûn»*.

5 Hingê Ewî li ser t’ext r’ûniştî
got: «Va Ez her tiştî nû çêdikim».
Û minr’a got: «Binivîse, çimkî ev
xeberne amin û r’ast in». 6 Usa jî
gote min: «Her tişt hate sêrî. Ez
im Alfa[f] û Omêga, Destpêbûn û
Axirî. Ezê yêd t’î, ji kanîya ava
jîyînê bêheq bidime vexwarinê.
7 Ewê ku serk’eve, her tiştê p’ara
wî bik’evin, Ezê Xwedêyê wî bim,
ewê jî lawê Min be*. 8 Lê p’ara
tirsoneka, bêamina, k’irêt-h’era-
ma[f], mêrkuja, bênamûsa, sêrbaza,
p’ûtp’arista û h’emû derewîna wê
gola agirê ku k’irk’ûtêva dişewite
bik’eve. Ev e mirina duda».

### Bajarê Orşelîma nû

9 Milyak’etekî ji wan her h’eft
milyak’eta, yêd ku h’eft t’asêd wane
h’eft belayêd xilazîyêva t’ijî hebûn,
hat t’evî min xeber da û got: «Were
vê derê, ezê bûkê nîşanî te kim,
dergîstîya Berx». 10 Hingê R’uh’ê
Pîroz hate ser min, wî ez birime
ser ç’îyakî mezinî bilind û Bajarê
Pîroz, Orşelîm nîşanî min da, ku
ji e’zmên Xwedêda dihate xwarê*.
11 R’ûmeta Xwedê nav wîda şewq
dida, ew r’onayî mîna kevirê qîmet
bû, mîna kevirê yaspîs, mîna xi-
rûstal bû. 12 Sûra wî mezin û bilind
bû, donzdeh dergehî bû û li ber
dergeha donzdeh milyak’et hebûn.
Li ser dergeha navêd her donzdeh
qebîlêd zar’êd Îsraêl nivîsar bûn*.
13 Ji alîyê r’ohilatêva sê dergeh, ji

* 21:1 Îşaya 65:17; Petrûs II, 3:13.
* 21:3 «Çawa Xwedêyê wan» bi yûnanî xeber bi xeber aha ye: «Û bibe Xwedêyê wan». Lê nav hinek destnivîsarada ev t’une.
** 21:3 Qanûna K’ahîntîyê 26:11; Hezekîyêl 37:28.
* 21:4 Îşaya 25:8.
* 21:7 Zebûr 89:26-27.
* 21:10 Hezekîyêl 40:2.
* 21:12-13 Hezekîyêl 48:30-35.

alîyê bakurêva sê dergeh, ji alîyê
başûrêva[f] sê dergeh û ji alîyê r'oa-
vayêva sê dergeh hebûn. 14 Donzdeh
h'îmêd sûra bajêr hebûn, li ser wan
her donzdeha navêd her donzdeh
şandîyêd Berx nivîsar bûn.

15 Destê wî milyak'etîda, yê ku
t'evî min xeber dida bona çapki-
rinê qamîşekî zêr'în hebû, wekî
bajêr, dergehêd wî û sûra wî çap
ke. 16 Bajar çar goşe bû, dirêjayîya
bajêr weke berayîyê bû. Ewî bajar
bi wî qamîşî çap kir, donzdeh
h'ezar meydan* derk'et. Dirêjayî,
berayî û bilindayî weke hev bûn.
17 Milyak'et sûra bajêr pê çapkirina
merivayê çap kir, bilindayîya wê
bû sed çil çar zend*. 18 Ew sûr ji
kevirê yaspîs hatibû çêkirinê û
bajar xwexa ji zêr'ê xasî mîna şûşe
zelal bû*. 19 H'îmêd sûra bajêr bi
her cûr'e kevirêd xase qîmet ha-
tibûne xemilandinê.

H'îmê pêşin yaspîsê sipî bû,
yê duda safîrê şîn,
yê sisîya xalkêdonê k'eskê ve-
kirî,
yê çara zimrûdê k'esk,
20 yê pênca sardonûksê sor,
yê şeşa sardîyonê sorê te'rî,
yê h'efta kevirê zêr'în,
yê h'eyşta zimrûdê şîn,
yê neha topazê qîç'ik,
yê deha xirîsoprasê k'esk,
yê yanzdeha yaqûtê şîrk,
yê donzdeha amêstîsê şîrkê
vekirî*.

21 Her donzdeh dergeh donzdeh
dur' bûn, her derîk ji dur'ekî bû û
meydana bajêr ji zêr'ê xasî mîna
şûşê zelal bû.

22 Min bajêrda p'aristgeh nedît,
çimkî Xudan Xwedêyê H'emû
Zorayîyê û Berx p'aristgeha wî ne.
23 Bajar ne h'ewcê te'vê û hîvê bû
ku r'onayî bidanê, çimkî r'ûme-
ta Xwedê wî r'onayî dike û Berx
ç'ira wî ye.* 24 Milet wê r'onaya
wîda biger'in û p'adşêd dinyayê
wê r'ewş-r'ûmeta xwe bînine nava

* 21:16 «Donzdeh h'ezar meydan» h'esabê niha dike du h'ezar dusid kîlomêtir.
* 21:17 «Sed çil çar zend» bi h'esabê niha dike şêst pênc mêtir. Zend wê demê 45 santî bûn, awa gotî nêzîkî nîv mêtirî.
* 21:18-21 Îşaya 54:11-12.
* 21:20 Ji van kevira k'îjan r'oja îroyîn nenas in, navêd wan ji yûnanî hatine nivîsarê. Mesele: Xalkêdon, sardonûks, xirîsopras, sardîyon. Bona xalkêdon û sardîyon bi zaravêd din hinek bawer dikin ku ev cûr'e-cûr'e eqîq in. Hinek şik ser r'engêd çend kevira heye.
* 21:23 Îşaya 60:19-20.

wî.* 25 Dergehêd wî wê t'u car
neyêne girtinê, çimkî li wir t'imê
wê r'oj be, şevê t'unebe. 26 Wê
r'ûmet û hurmeta mileta bînine
nava wî. 27 Qet tiştekî h'eram wê
nek'eve bajêr, ne jî yêd ku k'irêtîyê
û derewa dikin wê bik'evinê, t'enê
ewêd ku k'itêba Berxêye jîyînêda
hatine nivîsarê*.

22 1 Paşê wî milyak'etî ç'e-
mekî ava jîyînê, mîna
xirûstalê zelal nîşanî min kir, ku
ji t'extê Xwedê û Berx derdik'et û
nava meydana bajêrva dik'işîya.
2 Li her du alîyêd ç'êm dara jîyî-
nê* hebû, ku donzdeh cûr'e ber
danî û her meh berê xwe dida.
Belgêd[f] wê darê bona qencbûna
mileta bûn**. 3 Îdî tiştê nifir'lê-
bûyî li wir wê t'unebe.

T'extê Xwedê û yê Berx wê nav
bajêrda be û xulamêd Wî wê jêr'a
xizmetk'arîyê bikin. 4 Ewê r'ûyê
Wî bibînin û navê Wî wê li ser
e'nîya wan hebe. 5 Îdî şevê li wir
t'unebe, wê r'onaya ç'irê û r'oyê
kêr neyên, çimkî Xudan Xwedê wê
li wan r'onayî ke û h'eta-h'etayê
p'adşatîyê bikin*.

### Hatina Îsa Mesîh

6 Wî milyak'etî minr'a got: «Ev
xeberne amin û r'ast in. Xudan
Xwedêyê ku R'uh'ê Xwe dide p'ê-
xembera*, milyak'etê Xwe şand,
wekî tiştêd ku wê zûtirê biqewimin
nîşanî xulamêd Xwe ke».
7 Îsa dibêje: «Va ye Ezê zûti-
rê bêm.

Xwezî li wî, yê ku xeberêd p'ê-
xembertîyêd vê k'itêbêda xwey
dike!»
8 Min Yûh'enna ev yekana bi-
hîstin û dîtin. Û çaxê min ew
bihîstin û dîtin, dever'û çûme nigê
wî milyak'etî, yê ku ev tişt nîşanî
min kirin, wekî serê xwe li ber wî
daynim. 9 Lê ewî minr'a got: «Vê
yekê neke! Ez jî heval-xulamekî
mîna te û wan birêd te p'êxem-
bera û wan h'emûya me, yêd ku
xeberêd vê k'itêbê xwey dikin.
Serê xwe li ber Xwedê dayne».

* 21:24-25 Îşaya 60:3, 11.
* 21:27 Hezekîyêl 44:9.
* 22:2 Aha jî tê fe'mkirinê: «Darêd jîyînê».
** 22:2 Destpêbûn 2:9; Hezekîyêl 47:12.
* 22:5 Îşaya 60:19; Danîyêl 7:18.
* 22:6 Aha jî tê fe'mkirinê: «Xudan Xwedêyê r'uh'ê p'êxembera».

10 Serda jî minr'a got: «Xebe-
rêd p'êxembertîyêye vê k'itêbêda
veneşêre, çimkî wext nêzîk e.
11 Ewê ku neheqîyê dike, bira hê
neheqîyê bike, ewê ku k'irêt e,
bira hê k'irêtîyê bike, ewê ku r'ast
e, bira hê r'astîyê bike û ewê ku
pîroz e, bira hê pîroz be».
12 Îsa dibêje: «Va ye Ezê zûtirê
bêm û xelata Min destê Minda
ye, wekî anegorî kirinêd her ye-
kî bidime wî*. 13 Ez im Alfa[f] û
Omêga, Yê Pêşin û Yê Paşin,
Destpêbûn û Axirî».
14 Xwezî li wan, yêd ku çuxêd
xwe şûştine*, wekî îzina wan
hebe, ji berê dara jîyînê bixwin
û dergehêd bajêrr'a bik'evine
hindur'!** 15 Lê se-kûç'ik, sêrbaz,
bênamûs, mêrkuj, p'ûtp'arist û
her kesê ku derewa h'iz dike û
derewa dike, ewê derva bimîne.
16 «Min, Îsa, milyak'etê Xwe
şand, wekî şe'detîya van tişta nava
civînada bide. Ez Tamar û R'i-
k'inyata[f] Dawid im û Ez Steyrka
Şewqe Sibehê Zû me»*.
17 R'uh' û bûk dibêjin: «Were!»
Ewê ku dibihê bira bêje: «Were!»
Ewê ku t'î ye bira bê, ewê ku
ava jîyînê dixwaze bira bêheq
bistîne*.

## Paşgotin

18 Ez şe'detîyê didime her kesê
ku xeberêd p'êxembertîyêye vê
k'itêbêda dibihê: Heger yek tiştekî
ser vanda zêde ke, Xwedê jî van
belayêd ku vê k'itêbêda nivîsar in
wê ser wîda zêde ke*. 19 Û heger
yek ji xeberêd p'êxembertîyêye vê
k'itêbêda tiştekî kêm ke, Xwedê
jî wê p'ara wî ji dara jîyînê û ji
Bajarê Pîroz kêm ke, bona k'îjana
vê k'itêbêda nivîsar in.
20 Ewî ku şe'detîya van tişta
dide, dibêje: «Belê, Ezê zûtirê
bêm». Amîn! Were, ya Xudan Îsa.
21 K'erema Xudan Îsa h'emû-
yar'a* be.

* 22:12 Îşaya 62:11; Yêremîya 17:10.
* 22:14 Nav hinek destnivîsarada dewsa «çuxêd xwe şûştine» «t'emîyêd Wî diqedînin» heye.
** 22:14 Destpêbûn 2:9.
* 22:16 Jimar 24:17.
* 22:17 Îşaya 55:1.
* 22:18 Qanûna Ducarî 12:32.
* 22:21 Nav hinek destnivîsarada dewsa «h'emûyar'a» «cime'ta Xwedêr'a» yan jî «h'emû cime'ta Xwedêr'a» heye.

# FERHENGOK

Eva ferhengoka mîna k'ilîtekê mecalê dide, ku fe'mînêd xeberêd giran yan nenas zû fe'm bikin. Vê ferhengokêda navê p'arêd K'itêba Pîroz bi jimarêd serî û r'êzava hatine nivîsarê, awa gotî her r'êz û serî jimarkirî ne. T'evayîya Peymana Kevin 39 k'itêb in: Destpêbûn, Der-k'etin, Qanûna K'ahîntîyê, Jimar, Zebûr, K'itêbêd P'êxembera û yêd mayîn. Peymana Nû 27 k'itêb in. (Ev her du peyman hevr'a 66 k'itêb in.) Derheqa şirovekirinada hûn dikarin her 66 k'itêbada bixûnin, lê sed h'eyf ku vê k'itêbêda t'enê k'itêbêd Peymana Nû hene, yêd Peymana Kevin t'unene, çimkî ew hê bi zarav û r'êzimanîya kurmancîya welatêd Kafkazê nehatine hazirkirinê.

**Abba** – bi zimanê aramî tê fe'mkirinê «bav». Marqos 14:36; R'omayî 8:15; Galatî 4:6.

**Adem** – însanê pêşin bû, yê ku Xwedê xuliqand. Xwedê ew ji xwelîya e'rdê xuliqand (Destpêbûn 2), paşê Hêwa xuliqand. Adem û jina xwe Hêwava ew bûn, yêd ku paşê gur'a Xwedê nekirin û gune kirin (Destpêbûn 3). Hingêda însên gune kir. Korint'î I, 15:45-da tê gotinê, ku Îsa Mesîh «Ademê Axirîyê» ye. Ademê pêşin bavê t'emamîya merivaya ye û her kes jîyîna qalibî ji wî distîne. Îsa Mesîh ku Ademê duda ye, jîyîna r'uh'anî dide her kesê ku bawerîya xwe Wî tîne. Lûqa 3:38; R'omayî 5:12-15; Korint'î I, 15:22, 45-47; Tîmot'êyo I, 2:13-14; Cihûda 14.

**afû (afûkirin, afûbûn)** – baxşandin.

**Alfa û Omêga** – Alfa h'erfa elîfba yûnanîye pêşin e, Omêga h'erfa elîfba yûnanîye paşin e. «Alfa û Omêga» çawa navek hin Xwedêr'a, hin jî Îsa Mesîhr'a tê gotinê. E'yantî 1:8; 21:6; 22:13.

**amîn** – ji zimanê îbranî ye, ku me'na wê ev e: «R'ast e», «Belê», «Bira usa be», «R'ast bê xêlif», «Qayl im». Ew hingê tê gotinê gava yek gotinekê dibêje yan dua dike, yekî din gotina wî dixwaze mak ke, qaylbûna xwe bi gotina «amîn» nîşan dike. Usa jî E'yantî 3:14-da ev nava bona Îsa Mesîh hatîye xebatê,

bi fikira «Ew r'ast e», «Ew amin e». R'omayî 1:25; 9:5; Korint'î I, 14:16; Korint'î II, 1:20.

**anîne sêrî** – anîne cî, mîyaserkirin, t'emamkirin.

**anîso** – (anîs, şemît) cûr'ekî p'incar'ê ye. Metta 23:23.

**Aqûb** – 1. Aqûb kur'ê Îshaq bû, awa gotî nevîyê Birahîm, Aqûbr'a Îsraêl jî tê gotinê. Birê wîyî mezin Esaw bû. Aqûb bavê her donzdeh qebîlêd miletê Îsraêlê bû. K'itêba Pîrozda çend cara Aqûb bona miletê Îsraêlê jî tê gotinê. Ji k'erema xwe li bin xebera «mala Aqûb» û «Esaw»-da bixûnin.

2. Aqûbê Halfawo û Aqûbê Zebedîyê birê Yûh'enna, evana du şagirtêd Îsa Mesîh bûn.

3. Usa jî Aqûb navê birakî Îsa bû (Metta 13:55; Marqos 6:3; Galatî 1:19) û li gora fikira geleka ew Aqûb e, yê ku «Ne'ma Aqûb» nivîsîye.

**aramî** – zimanê aramî nêzîkî zimanê îbranî ye. Ji sala 600-î berî bûyîna Îsa ew nava sîyasetê û k'ir'în-firotana Asya R'oavayêda zimanekî navmiletîyêyî mezinî bû. Hêna Îsa Mesîhda aramî zimanê cihûyêd Filistînêyî her dem bû, usa jî îbranî û yûnanî dihatine xeberdanê. Peymana Nûda çend cî hene, wekî nivîsk'arêd Mizgînîyê xeberêd Îsa bi zimanê aramî nivîsîne û paşê welger'andine yûnanî. Metta 23:7; Marqos 5:41; 7:34; 15:22; K'arêd Şandîya 4:36; Galatî 1:18.

**Artemîs** – navê p'ûtekî ye, ku gelek meriva Asyayêda ew dih'ebandin (K'arêd Şandîya 19:24-35).

**Arxêlayo** – kur'ê Hêrodesî Mezin bû û birê Hêrodes-Antîpas bû. Pey mirina bavê xwer'a ew demeke kin bû serwêrê Cihûstanê. Ji k'erema xwe li bin xebera «Hêrodes»-da jî bixûnin.

**Aryopago** – girekî bajarê At'înayê bû, Yûnanistanêda. Merivêd xweyîqedire giregir ser wî girî dicivîyan. Civata wan jî hema «Aryopago» dihate gotinê.

**avzê (nexweşîya avzê)** – ava zer jê diçe.

**Axaya** – p'areke mezine welatê Yûnanistanê bû. P'ir'anîya bajarêd Yûnanistanêye e'yan, hingê dik'etine nava qeza Axayayêye R'omayê.

**Babîlon** – 1. Babîlon navê bajarekî gelekî kevin e. Wextekê p'adşayê Babîlonê gelek welatêd din bindest kiribûn. Miletê wî t'evî miletê Îsraêlê şer' kir û ew bindest kirin. Gelek merivêd Îsraêlê çawa xulam birine welatê xwe. Miletê Îsraêlê li wir h'eftê salî ma. Metta 1:11-12, 17; K'arêd Şandîya 7:43.

2. Babîlon E'yantîyêda jî tê nivîsarê, çawa nîşana miletêd ku

gur'a Xwedê nakin, çimkî merivêd bajarê Babîlonê usa bûn. E'yantî 14:8; 17:5; serê 18-a.

3. Petrûs I, 5:13-da heye ku «Babîlon» be'sa bajarê R'omayê dike.

**badîhewa** – vala, p'ûç'.

**Bae'l** – navê p'ûtekî kenanîya bû, ew p'ûtekî zêdebûnê awa gotî zayînê bû, bawermendêd wî p'ûtî bawer dikirin ku ewê h'eywanêd wan, zevî û r'ezêd wan berek'et ke. Me'na Bae'l «xweyî» ye. Miletê Mowab, miletê Midyan û miletê Sûr û Sayda Bae'l xwer'a Xwedê h'esab dikirin. Gelek p'ûtêd wan mileta hebûn, lê Bae'l ji h'emûya mestir bû. T'arîxa miletê Îsraêlda, çaxê ew ji Xwedê dûr dik'etin, Bae'l dih'ebandin û bi vî awayî hêrsa Xwedê li ser xweda danîn. Lê nav miletê Îsraêlda meriv hebûn, ku t'u cara Bae'l qebûl nekirine, her wext zanibûne ku pêştirî E'firandarê e'rd û e'zman t'u Xwedê îdî t'uneye. H'akimtî 2:13; 6:25, 31; P'adşatî III, 16:31; serê 18-a; 22:53-54; P'adşatî IV, 3:2; 10:18-27; 11:18; Yêremîya 2:8; 7:9; 11:17; 12:16; 19:5; 23:27; R'omayî 11:4.

**Bajarê Dawid** – Peymana Kevinda «Bajarê Dawid» wê p'ara Orşelîmêr'a tê gotinê, k'îjan ku Dawid p'adşa ji destê yebûsîya stand (P'adşatî II, 5:6-9). Lûqa 2:11-da usa jî Beytleh'mêr'a digotin bajarê Dawid, li k'u mala bavê Dawid dima. Wir Dawid ji dîya xwe dinê k'etibû û mezin bibû (P'adşatî I, 17:12; Lûqa 2:4). Usa jî li gora gotinêd p'êxembera Îsa Mesîh wir ji Meryemê dinê k'et (Metta 2:1, 5-6).

**bajarvanêd R'omayê** – ji h'emû merivêd ku Împêratorîya R'omayêda diman, t'enê hinek çawa bajarvanêd r'omayê dihatine h'esabê. Ewêd ku bajarvan dihatine h'esabê, heq û azayîyêd wane başqe hebûn, qedirê wan hê bilind bû (K'arêd Şandîya 16:37).

**bakur** – mifriq, şimal.

**bap'êş** – (bap'êşa gemîyê) car, bagir.

**Baraq** – yek ji serwêrêd miletê Îsraêlê bû. Şêr'da serwêrtî dikir û dijmin bindest kir. H'akimtî ji serêd 4-a h'eta 5-a; Îbranî 11:32.

**Barnabas** – me'na navê «Barnabas» ev e: «Kur'ê Berdilîyê» awa gotî «Yê ku ber dilada tê» (K'arêd Şandîya 4:36). Ew yekî lêwî bû ji Qubrisê û nava bawermendada serwêrek bû, yê ku Pawlos bire cem şandîyêd Orşelîmê. Ew t'evî Pawlos r'êwîtîya Pawlose pêşinda çawa qasidê Îsa çû. K'arêd Şandîya 4:36-37; 9:27; 13:1–14:28; 15:36-41; Galatî 2:9-14.

**başûr** – mişriq, ce'nûb.

**Bav (Bavê E'zmana)** – ev nav Xwedêr'a tê gotinê. K'itêba Pîrozda ew bi me'na fîzîkî (cismanî) nayê fe'mkirinê, lê bi me'na r'uh'anî. Ew Bavê r'uh'êd h'emû merivayîyê ye. Xwedê bona meriva usa xem dike, çawa bav zar'a xwer'a û hê zêde. Lê heleqetîya Xwedê çawa Bavê t'evî Îsa Mesîh cûr'ekî başqe ye. Ji k'erema xwe derheqa vê yekêda bin xebera «Kur'ê Xwedê»-da bixûnin.

**bawerî** – «Îman» xeberek e, ku ji zimanê sêmîtî (e'rebî, îbranî, sûrîyanî, aşûrî) tê, ku bi k'urdî «bawerî» ye. Pênc cûr'e xebatêd xebera «bawerî» hene:

1. Meriv bawerîya xwe li Xwedê yan yekî tîne, bawer dike ku ew amin e (Destpêbûn 15:6; Îşaya 7:9; R'omayî 4:3; Galatî 3:8).

2. Meriv dikare bawer bike ku tiştek yan kesek r'ast e (Lûqa 20:5).

3. Meriv e'seyî zane, awa gotî h'işada r'ûdinî, ku tiştek heye yan wê derbaz be (Aqûb 1:6).

4. Peymana Nûda, hînkirina şandîya bona Îsa Mesîh tê fe'mkirinê. Ew bawerîya me ye nav pîrozêd Xwedêda ye (Galatî 1:23; Efesî 4:5; Cihûda 3).

5. Bawerîke cûr'ekî başqe jî heye, çawa dayîneke ji Xwedê (Korint'î I, 12:9).

**bej** – zihayî, e'rd.

**belg** – p'elê darê.

**Belzebûl** – navekî bona mîrêcin. Pêşîyê Belzebûl navê p'ûtekî filistînîya bû, me'na «Xudanê warê bilind». Filistînî nêzîkî miletêd Îsraêlê diman. Peyr'a nav cihûyada me'nîke din stand: «Xudanê mêşa» yan «Xudanê sergîna». Ew jî bû navekî serwêrîya qewatêd cinaye xirab. Metta 10:25; 12:24, 27; Marqos 3:22; Lûqa 11:15, 18-19.

**berdilî** – baristanî.

**beret'e** – laşê mirîya yan h'eywên.

**berê deremeta pêşin** – Zemanê Peymana Kevinda, anegorî qirara Xwedê, Îsraêlêda her tiştêd pêşine nixurî, heger zar'a kur'în bûya, yan h'eywana nêrîn bûya, yan berê e'rdê û r'ezê daraye pêşin bûya, evana «berêd deremeta pêşin» dihatine h'esabê û Xwedêr'a dihatine dayînê. Berêd deremeta pêşin Xwedêr'a pîroz bûn û ew r'ast p'ara Wî bûn. Ev dayîna berê deremeta pêşin dide k'ifşê, ku her tişt p'ara Xwedê ye. Çaxê berê deremeta pêşin derdik'et û didan, hingê meriv wê yekêda guman bûn, ku h'emû deremeta wane mayîne pey deremetdayîna pêşinr'a wê berek'et be. Binihêr'e: Derk'etin 13:12-15; 34:19, 26; Qanûna K'ahîntîyê 23:17; Jimar

18:12; Gotinêd Silêman 3:9-10. Peymana Nûda eva xebera «berê deremeta pêşin» bi çend cûr'a bi me'na r'uh'anî tê bik'aranînê: R'omayî 8:23; Korint'î I, 15:20, 23; Aqûb 1:18; E'yantî 14:4.

**berzeqî** – turuşkirin, cule'tîkirin, bêşermîkirin.

**ber'î** – cîyê bê av, kevir-kuç'ik, çol û best.

**betavebûn** – undabûn.

**Beytleh'm** – bajarê Cihûdayê (Cihûstanê) ye, li k'u Dawid p'adşa dinê k'et û mezin bû, paşê jî Îsa li vir hate dinê (Metta 2:1; Lûqa 2:4; Yûh'enna 7:42).

**beyt'** – qewl, hizingirt.

**bêolîtî** – bêqanûn, bêe'det, bêe'sil û xweserîxwe.

**Bêt'-Êl** – bajarê p'adşatîya Îsraêlêyî bakurê bû. Sêsid salî ew cîkî gelekî e'yan bû bona h'ebandinê. P'adşatî III, 12:28-30; P'adşatî IV, 23:15.

**biharet** – pûng, darçîn, mêxik û yêd mayîne bînxweş.

**bihê** – p'areke qîmetê, ku berî k'ir'înê tê dayînê (Efesî 1:14).

**Bijartî (Yê Bijartî)** – bona Îsa Mesîh tê gotinê. Yê Bijartî, Mesîhê Xwedê ye, yê ku Xwedê k'ifş kirîye. Îşaya 42:1; Metta 12:18; Lûqa 23:35; Yûh'enna 1:41. Ji k'erema xwe bin xebera «Mesîh»-da bixûnin.

**bik'ir** – keç'ik, qîza mêrnekirî.

**Bilam** – p'êxember bû, yê ku Balaqê p'adşê Mowabê ji wî hîvî kir, wekî ew nifir'a miletê Îsraêlê bike, çimkî Balaqê p'adşa dixwest ew bindest kirana. Balaq ji miletê Îsraêlê ditirsîya, çaxê hatine welatê wî. Pêşîyê Bilam p'êxember got: «Na, ez nifir'a miletê Îsraêlê nakim», lê paşê çû. Gava r'êda diçû, li pêşîya wî milyak'etek sekinî. Bilam milyak'et nedît, lê k'erê Bilam milyak'et dît û pêşda neçû. Bilam nikaribû nifir' miletê Îsraêlê bikira, çimkî Xwedê dua wan kiribû. Peymana Nûda nivîsar e ku Bilam p'ereh'iz bû, lema t'evî Balaqê p'adşa qayl bû, yê ku dijminê miletê Îsraêlê bû. Jimar 22:4-35; Petrûs II, 2:15-16; Cihûda 11; E'yantî 2:14.

**binelî** – merivêd ku cîkîda dimînin binelîyêd wê derê ne.


**Binyamîn** – ji her donzdeh kur'êd Aqûb (awa gotî Îsraêl) yê herî biç'ûk bû. Ew bave'şîrekî Îsraêlê bû. Destpêbûn 35:18; K'arêd Şandîya 13:21; R'omayî 11:1; Fîlîpî 3:5; E'yantî 7:8.

**Birahîm** – bave'şîrê cime'ta Xwedê bû. Hê berê pêşda Xwedê Birahîmr'a gotibû ku: «Ezê welatekî bidime te. Gerekê tu ji welatê xwe derêyî û her'î welatekî nû». Birahîm gur'a Xwedê kir. Pey

gelek salar'a ew welat dît. Ew welatê Îsraêl e. Xwedê peyman t'evî Birahîm girêda, soz da ku ew û zur'etêd wî Xwedêr'a wê bibine cime'teke başqe, heger ew li pey Xwedê her'in. Ji k'erema xwe bin xebera «peyman»-da bixûnin. Lûqa 1:55; 3:8, 34.

**bivir** – balt'e.

**bixûr** – şîrêza darê ye. Ew ji dara tê hildanê û h'işkkirinê. Gava tê şewitandinê, bîneke gelekî xweş jê tê. Dema Peymana Kevinda p'aristgehêda ser gorîgeha bixûrê Xwedêr'a dihate şewitandinê (Derk'etin 30). Cûr'ekî dareke bixûrê E'rebistanêda jî hebû, ku gelekî qîmet bû. Steyrnasêd r'ohilatê ji wê derê Îsayê zar'okr'a p'êşk'êş anîn (Metta 2:11).



*Bixûrê e'rebî*

**bîlan** – zanebûnêda serxwe.

**buhişt** – cinet.

**Cejina Derbazbûnê (Şîva Derbazbûnê)** – ev cejina (e'yda) nav cime'ta Îsraêlêda çardehê meha Nîsanêda tê kirinê (li gora salne'ma îbranî çardehê Nîsanê niha 1-ê Aprêlê ye). Evê cejinê bona bîranîna wê yekê dikin, ku Xwedê çawa cime'ta Îsraêlê ji bindestîya Misirîya derxist (Derk'etin 12:14-20). Hingê Milyak'etê Mirinê h'emû nixurîyêd Misirîya, hin însan û hin jî h'eywan kuştin, lê ji ser malêd cime'ta Îsraêlêr'a «derbaz bû» û dest neda ji wan t'u kesî, nekuşt (Derk'etin 12:23-27). Bona vê yekê vê cejinêr'a digotin Cejina Derbazbûnê. Pêr'a-pêr'a pey Cejina Derbazbûnêr'a Cejina Nanê Şkeva bona h'eft r'oja tê derbazkirinê. Nava h'eftîya Cejina Nanê Şkevada t'enê nanê şkeva (bê hevîrtir'şk) tê xwarinê. Ji k'erema xwe bin xebera «Cejina Nanê Şkeva»-da bixûnin. Metta 26:2, 5, 18-19; Korint'î I, 5:7-8.

**Cejina H'olikçêkirinê** – her sal payîzê ji 15-a h'eta 21-ê meha Tişrîyê ye (weke yekê meha 10-a, awa gotî yekê Oktyabirê). Cihû diçûn ser r'ezêd xwe, h'olik çêdikirin û wanda h'eftêkê diman. Cihûya ev yek dikir, wekî bîr banîna, ku çawa Mûsa P'êxember miletê Îsraêlê ji Misirê derxist û ew çil salî konada man. Yûh'enna 7:2; Qanûna K'ahîntîyê 23:33-36, 39-42; Qanûna Ducarî 16:13-15; Nehemîya 8:13-18.

**Cejina Nanê Şkeva** – ev cejin (e'yd) li pey Cejina Derbazbûnêr'a tê û ji panzdeh h'eta bîst duduyê meha Nîsanê tê kirinê (li gora salne'ma îroyîn ji 2-a h'eta 9-ê Aprêlê tê kirinê). Eva cejina bona bîranîna xilazkirina miletê Îsraêlê tê kirinê, gava miletê Îsraêlê ji bindestîya Misirîya derk'et û çû wî welatê ku Xwedê dabû wan. Evê cejinêda h'eft r'oja nanê şkeva (bê hevîrtir'şk) tê xwarinê. Ji k'erema xwe bin xebera «hevîrtir'şk»-da bixûnin. Derk'etin 12:15; Metta 26:17; Marqos 14:1, 12; Lûqa 22:1, 7.

**Cejina Pîrozkirina P'aristgehê** – Weke 165 sala berî bûyîna Îsa, p'aristgeha Orşelîmê ji alîyê miletê sûrîyada hatibû h'er'imandinê. Sê sala şûnda p'aristgeh û cihû ji bin destê sûrîya bi destê Cihûda Makkabîyê serwêr aza bûn. Ji hingêva Cejina Pîrozkirina P'aristgehê derbaz kirin. Cejinê 25-ê mehê (bi îbranî Kislevê, awa gotî kêm-zêde meha 12-da) destpêdikir û h'eta h'eyşt r'oja dik'işand. Yûh'enna 10:22; 1 Makkabî 4:36-59; 2 Makkabî 1:9, 18; 10:1-8 (1 Makkabî û 2 Makkabî k'itêbêd dema Peymana Kevinda hatine nivîsarê, lê nak'evine nava 66 k'itêbêd pîroz, awa gotî k'itêbêd neqanûnî ne).

**Celîle** – qezake bakura Îsraêlê ye. Bajarê Nisretê wira ye. Îsa li wir mezin bû û dannasîn kir.

**ce'nime (doje)** – bi yûnanî GEENNA ye, bi îbranî GEHINNOM e. Ew xwexa cîyê cefê h'eta-h'etayê ye, bona ewêd ku wê R'oja Axretê dîwana wan bibe. Doje ew hema xût ce'nime ye, her du xeber vê k'itêbêda hatine xebitandinê. Ce'nime: Metta 5:29-30; 10:28; 23:15; Marqos 9:43, 45, 47; Lûqa 12:5. Doje: Metta 5:22; 18:9; 23:33; Aqûb 3:6.

**ce't'rî** – tûzik.

**cêr'ibandin, dan cêr'ibandinê, hatin cêr'ibandinê** – Cêr'ibandin ew h'alekî tengasîyê ye, k'îjanêda bawerîya mêriv ji temxwestinêd wî yan ji mîrêcin tê cêr'ibandinê. Derk'etin 17:2, 7; Îşaya 7:12; Metta 4:3, 7; K'arêd Şandîya 5:9; 15:10; Korint'î I, 7:5; 10:13; Korint'î II, 2:11; Aqûb 1:13-14; Petrûs I, 1:6, 7; Petrûs II, 2:9.

**cihû** – ji zur'eta Birahîm in. Xebera «cihû» ji xebera «Cihûda» tê. Ji donzdeh qebîlêd Îsraêlê, Cihûda qebîla here k'ifş e hêna Dawid û Silêman p'adşada. Pey cudebûna P'adşatîya t'ifaqîyêr'a, t'emamîya p'adşatîya başûrê bi navê «Cihûda» dihate gotinê. Wextê sirgûnkirina Babîlonêda û pey wêr'a jî, ev

navê «cihû» me'na fire standîye, awa gotî bona t'emamîya miletê Îsraêlê hate xebatê.

**Cihûda** – 1. Donzdeh kur'êd Îsraêl hebûn, yek ji wan Cihûda bû. Her donzdeh kur'êd wî bûne donzdeh qebîlêd Îsraêlê. Navê welatê Cihûstanê ji navê Cihûda pêşda hatîye, çimkî ew qebîl li wir dima. Destpêbûn 29:35; Metta 1:2-3; Îbranî 7:14; 8:8; E'yantî 5:5; 7:5.

2. Bi navê Cihûda du şagirtêd Îsa Mesîh hebûn. Ji wan Cihûdayê Îsxeryotî nemamîya (xayîntîya) Îsa kir û da destê wan, yêd ku dixwestin Ew bikuştana (Lûqa 22:3). Cihûdayê din Yûh'enna 14:22-da nivîsar e ku ew «ne yê Îsxeryotî» ye. Hinek difikirin ew Tedayo ye (Metta 10:3; Marqos 3:18). Ew jî tê gotinê «Cihûdayê Aqûb» (Lûqa 6:16; K'arêd Şandîya 1:13).

3. Usa jî Cihûda navê birakî Îsa bû (Metta 13:55; Marqos 6:3) û li gora fikira geleka ew Cihûda ye, yê ku «Ne'ma Cihûda» nivîsîye.

**Cihûstan** – qeza bajarê Orşelîmê bû, ew qeza başûra Îsraêlê dik'et. Hêna Îsa Mesîhda hin Cihûstan, hin Samerya, hin jî Celîle qeza bûn, usa jî Cihûstan p'areke qeza Sûryayêye r'omayî bû.

**cin** – hin mîrêcinr'a tê gotinê, hin jî wan r'uh' û milyak'etêd xirabr'a, yêd ku mîrêcin dişîne, ku xirabîyê h'emû merivar'a dikin. Peymana Nûda tê e'yankirinê, ku p'ûtp'aristî ji cina tê (Korint'î I, 10:20-21; E'yantî 9:20).

**cinak'etî** – (cingirtî, cinoyî, cinî, cinokî) yekî ku ji alîyê cin yan r'uh'êd xirabva tê girtinê, bindestkirinê, jêr'a cinak'etî dibêjin. Çaxê Îsa li ser dinê bû, ewî gelek cinak'etî aza dikirin, cin ji nav wan derdixistin (Metta 9:32).

**civîn** – 1. k'ombûna meriva.


2. k'ombûna bawermenda (xwedênasa), yêd ku bi navê Îsa dicivin. Carna bona t'emamîya bawermendêd dinê çawa bona k'omekê tê xebatê (Efesî 1:22-23; 3:10; 5:23-32; Kolosî 1:18, 24), lê p'ir'anîya cara bona k'omeke bawermendêd cîkîda (civîna Orşelîmêda, K'arêd Şandîya 8:1; civîna Entakyayêda, K'arêd Şandîya 13:1; civîna Efesêda, K'arêd Şandîya 20:16). Zemanê Peymana Nûda bawermend malada dicivîyan, dêr hela hê t'unebûn. Hingê mezinayîya mala ku têda dicivîyan bona 30 yan lapî ze'f h'eta 50 merivî bû. Metta 16:18; 18:17; K'arêd Şandîya 5:11; 11:22, 26; 20:17; Korint'î I, 1:2; E'yantî 1:4.



*Civîna giregirêd cihûya*

**civîna giregira (ya cihûya)** – ew civînek (miclîsek) bû, ku têda giregirêd cihûya li hev dicivîyan. 200 salî berî Îsa Mesîh girtî h’eta 200 salî pey Îsa Mesîhr’a ew dîwana cihûya bû. Civata giregirêd cihûya weke h’eftê meriva bû, ew k’ahîn, r’ûspî û qanûnzane bûn. Ew li hev r’ûdiniştin û bi hev dişêwirîn. Serekk’ahîn xwexa jî serekê Civîna Giregira bû. Civîna Giregira berpirsîyarê miletê Îsraêlê bû. Ew cezayêd ku ne yêd mirinê bû şixulê wan bû. Lê cezayêd mirinê danîne ber dîwana serwêrêd r’omayîya. Lema Civîna Giregira Îsa şandine cem welîyê R’omayî, Pîlato. Yûh’enna 11:47; 18:31; Lûqa 22:52, 66-71, 66. K’arêd Şandîya 4:15; 5:21; 6:12; 22:30; 23:1 û yêd mayîn.

**çeng** – hacetê miqamê, bi gelek t’êla, mîna saz û gîtarê, Dawid p’adşa lêdixist.



**çîredest** – hostayê ku r'ik'inê mala davêje, xetnîş dike (Korint'î I, 3:10).

**ç'e'vder** – forq, qav, ner'êda.

**ç'êjik** – ç'êlik.

**ç'îyayê Zeyt'ûnê** – ç'îyakî nêzîkî Orşelîmê ye, Îsa ser wî ç'îyayî dua dikir (Lûqa 19:29; K'arêd Şandîya 1:12).

**darçîn** – bihareteke ji qalikê darê ye. Bîna wê gelek e û hêna berê gelekî biha bû. Meriva eva t'evî bizirê zeyt'ûnê dikir, wekî bîna bizir xweş be. Carna meriva li xwe dixistin û carna jî bona definkirinê dihate bik'aranînê (E'yantî 18:13).

**Dawid** – Dema Peymana Kevinda Dawid p'adşê Îsraêlêyî herî mezin bû. Ji k'erema xwe li bin xebera «mala Dawid»-da bixûnin.

**definkirin** – veşartin, ç'e'lkirina mirîya.

**dehek** – Nav kur'êd Îsraêlda kur'ek hebû, navê wî Lêwî. Zur'eta wî şixulê p'aristgehê dikirin. Li gora Qanûna Mûsa zur'eta Lêwî li ser navê Xwedê dehek (ji deha p'areke) hebûkê, hasil û dayîna berê e'rdê ji cime'ta Îsraêlê xwer'a distandin (Qanûna K'ahîntîyê 27:30-32).

**derdan** – firaqa ku tişta dikinê yan têda xwey dikin.

**dersdar** – (fêrkar, mie'lim, mamosta). Ewana ji k'oma merivêd xwendî ne, nivîsarêd îbranî gelek zanibûn. Nav û dengê wan gelek cara bilind dibû ji dest zanebûna wan, çimkî ezberî gotinêd dersdarêd din digotin.

**dil** – bi fikira îbranîya, ew cî ye, ku meriv nava xweda şêwira xwe dike û qirarêd xwe dide.


**dîtindar** – cîyê têyatirê yan jî cîyê mecala civatê ku dihate derbazkirinê (K'arêd Şandîya 19:29, 31).

**dîyarê mirîya** – (dinya mirîya, dinya te'rî) Navê dîyarê mirîya bi zimanê yûnanî HADÎS e û bi zimanê îbranî ŞEOL e. Ew cîkî te'rîyî bona mirîya ye (Îbo 10:21-22). Carna K'itêba Pîrozda xebera HADÎS bi me'na doje (ce'nime) tê xebatê, ew cîkî xezebê ye. Lê Peymana Nûda HADÎS p'ir'anîya cara bi vê me'nîyê tê xebatê, cîkî ji bona yêd xirab e, bona demekê. Ew ne cîyê xezebê ye, cîyê xezeba axirîyê GEENNA ye (awa gotî ce'nime).

**dîyarîya t'evayîşewatê** – Dîyarî û qurbanêd cûr'e-cûr'e hebûn. Dîyarîyêd t'evayîşewatê bizin, berx û canega bûn. Ew r'ojê du cara bi hevr'a ser gorîgeha p'aristgehêda dihatine şewitandinê. Lê qurbanêd din t'enê p'arç'êd wan dihatine şewitandinê. Qanûna K'ahîntîyê 1:3-9; Îbranî 13:11.

**doje** – ce'nime. Ji k'erema xwe bin xebera «ce'nime»-da bixûnin.

**dur'** – kevirê sipîyî qîmet e, ku ji nav dilê cûr'ekî h'eywanê be'rê derdixin (Metta 7:6).



*T'or'ê dur'a*

**Egrîpa** – Egrîpayê duda kur'ê Hêrodes-Egrîpa bû (kur'ê Arîstopoloyê Hêrodesê Mezin). Egrîpa p'adşakî Cihûstanê bû. Pawlos li ber Egrîpa û xûşka wî Bernikê sekinî û Mizgînîya Xwedê dida wan (K'arêd Şandîya 25:13–26:32).

**Esaw** – Îshaqê kur'ê Birahîmr'a du kur'êd heval-cêwî bûn, Esaw û Aqûb. Esaw ku yê mezin bû, r'ojekê gava gelekî bir'çî bû, ewî heqê nixurtîya xwe da xwarina zika, ew firote Aqûbê birê xwe. Xwedê zur'eta Aqûb çawa cime't xwer'a bijart, ne ku ya Esaw. Destpêbûn 25:21-26; 27:1-41; 32:3–33:16; R'omayî 9:10-13; Îbranî 11:20; 12:16-17.

**e'nîşk (kevirê serê e'nîşkê)** – Peymana Nûda ev xeber bi du cûr'a tê fe'mkirinê: 1. Ew kevirê ku dîwara hevva girêdide, awa gotî «kevirê serê e'nîşkê».

2. Kevirê ku li xilazîya çêkirina avayîkî ser dergeh yan derî dihate danînê, çawa «kevirê k'ilîtê» ye, wekî h'emû kevirêd mayîn hevva bide girêdanê. Metta 21:42; Marqos 12:10; Lûqa 20:17; Efesî 2:20; Petrûs I, 2:6-7.

**êlekzirih'** – k'inceke eskera ye, ku li sîng û pişta xwe girêdidan, wekî ji şûr û tîra bêne xweykirinê. Ew ji h'esin yan jî ji ç'ermê qalim çêkirî bûn. Efesî 6:14 (zirih'); T'êsalonîkî I, 5:8 (k'umzirih'); E'yantî 9:9, 17.

**êlimî wî bûn** – t'esmîlî wî bûn, ber ta bûn, guhdarîya wî kirin.

**Êlîşa** – p'êxemberekî Îsraêlê bû, ku dema Peymana Kevinda gelek k'eremet bi destê wî dihatine kirinê (P'adşatî IV, 2:1–8:15). Pê Êlîşa jî Xwedê «Ne'manê» serwêrê eskerê Sûryayê ji k'otîbûna wî qenc kir (P'adşatî IV, 5; Lûqa 4:27).

**Êlyas** – p'êxemberekî Xwedêyî mezin bû. Ewî li p'adşakî xirab hilat, usa jî li h'emûyêd ku Îsraêlêda p'ût dih'ebandin. Gelek cihû difikirîn ku Êlyas wê dîsa bihata, wekî bona hatina Mesîh milet hazir kira. Yûh'ennayê Nixumdar gelek alîyava mîna Êlyas bû. Metta 11:14;

Marqos 9:4; Lûqa 1:17; R'omayî 11:2-5; Aqûb 5:17.

**êpîkûrî** – şagirtêd fîlosofê Êpîkûros bû. Êpîkûros sala 270 berî bûyîna Îsa mir. Ewî hîn dikir, ku gerekê meremê e'mirê meriva şabûn be, ji êş û tirsê dûr bin (K'arêd Şandîya 17:18).

**fatimok** – cûr'ekî kevotka ye.

**fêrisî** – nav cihûyada k'omeleke dînp'arist bû. Endemêd k'omela fêrisîya qanûna Mûsa qenc zanibûn. Ew dînp'aristêd sert bûn. Wana bawer dikir, ku milyak'et û r'uh' hene û mirî wê dîsa r'abin. Gelek ji van r'izim û e'deta, yêd ku fêrisîya pêk danîn, nav cihûyada hebûn. Ji van r'izim û e'deta gelek jî ne ji T'ewratê bûn. Ew bi kirêd xwe k'ubar-babax dibûn. Dixwestin çawa merivêd qenc xuya bin, lê gelekêd ji wan bi fikirêd xwe xirab bûn. Gelekêd ji wan dijenîyane Îsa û hev şêwirîn Wî bikujin.

**Firewin** – navê p'adşêd Misirê bû. Her yek ji wan bi vî navî dihate gotinê. K'arêd Şandîya 7:10, 13, 21; R'omayî 9:17; Îbranî 11:24.

**firtone** – bahoz, bobelîsk.

**fitilokêd ajotinê** – zivir'ok.

**gelîyê hey-wayê** – cîyê bêbinî. Bi yûnanî ABÛSSOS e. Li gora hînkirineke cihûyaye gelekî kevin, ev cî k'ûrayîya e'rdê bû û cin li wir girtî dihatine xweyîkirinê, h'eta cezakirina wane axirîyê. Lûqa 8:31; E'yantî 9:1-2, 11; 11:7; 17:8; 20:1, 3.

**gemîvan** – (k'eştîvan) xebatk'arê gemîyê (k'eştîyê).

**gemîwargeh** – lîman, bender.

**girav** – (ade, cizîr) e'rdekî nava be'rêda.

**Gîdeyon** – serwêrekî cime'ta Îsraêlê bû. Bawerîya wî gelek bû û dua kir wekî Xwedê r'êberîya wî bikira. Gava çû şer', eskerêd wî hindik bûn, lê Xwedê alîk'arîya wî kir serk'et. H'akimtî 6:11–8:27; Îbranî 11:32.

**gorî** – qurban, nedir.



*Gorîgeh*

**gorîgeh** – (mezbeh) t'extê ku qurban, gorî, h'edî û xêr dihatine dayînê yan serjêkirinê. Pêşîyê ew pê kevira dihate çêkirinê. Hêna Mûsada qurban t'enê ser gorîgeha Konê Şe'detîyê dihatine serjêkirinê û

paşê, gava p'aristgeh hate çêkirinê, t'enê ser gorîgeha p'aristgehê dihate serjêkirinê. P'aristgehêda gorîgeh ji sifir çêkirî bû. T'extekî din jî hebû, ji yê mezin biç'ûktir û zêr'kirî bû. K'ahîn li ser vê sifrê bixûr dişewitandin. Vêr'a digotin gorîgeha bixûrê. Destpêbûn 12:7; 22:9; Lûqa 1:11; Lûqa 11:51.

*Gorîgeha bixûrê*



**gune, gunek'ar** – t'er'ibandina qirara Xwedê ew gune tê h'esabê (Yûh'enna I, 3:4). Gunek'ar ew meriv e, yê ku ji r'îya Xwedê k'etîye û qirarêd Wî xwey nake. Li gora nivîsarêd pîroz h'emû meriv gunek'ar in û ji r'e'ma Xwedê k'etî ne (R'omayî 3:9-18, 23; Yûh'enna I, 1:8-10).

**gur'a filankesê kirin** – bi ya filankesê kirin, bi gotina filankesê bû, guhdarîya filankesê kirin.

**Habîl** – Qayîn û Habîl kur'êd Adem bûn. Habîl birê biç'ûk bû û birê wî Qayîn ew kuşt. Ji k'erema xwe bin xebera «Qayîn»-da bixûnin. Destpêbûn 4:2-9, 25; Metta 23:35; Lûqa 11:51; Îbranî 11:4; 12:24.

**Hacer** – carîya Seraya jina Birahîm bû, dîya Îsmayîl. Lê Îsmayîl ne ew bû, k'îjan ku Xwedê Birahîmr'a soz dabû. Zur'eta Îsmayîl çawa zur'eta Birahîm, çi ku Xwedê soz dabû nestandin. Paşê kur'ê Serayê jêra bû û ew bû kur'ê sozê Xwedê (Galatî 4:21-31).

**halêlûya** – Gava cihûya dixwest pesinê Xwedê bidana, dikirin qîr'în: «Halêlûya». Ji zimanê îbranî ye, ku tê fe'mkirinê: «Pesinê Xudan bidin» yan «Şikir ji Xwedê». E'yantî 19:1, 3-4, 6.

**Harûn** – ji zur'eta Lêwî bû, Lêwî jî yek ji her donzdeh kur'êd Aqûb bû. Harûn birê Mûsayî mezin bû, usa jî k'ahînê pêşin bû. Xwedê got, ku k'ahînêd cime'ta Îsraêlê gerekê ji zur'eta Harûn bêne bijartinê. Harûn û Mûsa cime'ta Îsraêlêr'a Misirêda xulamtî dikirin. Harûn alî Mûsa kir, serwêrtîya cime'ta Îsraêlê kirin û cime'ta Îsraêlê bin nîrê xulamtîyê derxistin. Derk'etin 4:14; 5:1; Jimar 12; 17; 20; Lûqa 1:5; K'arêd Şandîya 7:40; Îbranî 5:4; 7:11; 9:4.

**hebûk** – malê dinê, dewlemendtî, p'ere.

**herem** – dîwanxane, cîyê herî jorin.

**Hermês** – p’ûtekî yûnana bû. Yûnana digotin, ku ew qasidê p’ûtêd din bû. K’arêd Şandîya 14:12.

**hevîrtir’şk** – (havên) dikine nava hevîr û hevîr hiltê. Fikira vê li cem cihûya bi r’uh’anî xirab dihate fe’mkirinê, awa gotî sûretê (sîmvola) h’eramîyê, xeysetê xirab û e’mirê h’er’imî bû. Îzina cime’ta Îsraêlê t’unebû, wekî hevîrtir’şk bikirana nava nanê h’edîyêd xwe, k’îjan ku Xwedêr’a dihate dayînê (Qanûna K’ahîntîyê 2:4), ne jî dikirine nava Cejina Nanê Şkeva çawa usa jî tê fe’mkirinê, awa gotî «şkeva» (Derk’etin 12:15). K’itêba Pîrozda hevîrtir’şk çawa nîşana qewateke veşartî ye, îlahî bona qewata gune. Çawa hevîrtir’şk nava t’emamîya şkeva hevîrda bela dibe ya xwe dike, usa jî gune dikare nava cime’têda bela be û zîyanê bide cime’tê. Lûqa 12:1-da hevîrtir’şk tê fe’mkirinê çawa dur’ûtî, Metta 16:6 û 12-da hînkirina fêrisîya û sadûqîya mîna hevîrtir’şk bû, ku miqabilî Îsa disekinîn. Marqos 8:15; Korint’î I, 5:6-7; Galatî 5:9.

**Hêrodes** – Peymana Nûda çar merî hene ku pê navê «Hêrodes» tên gotinê.

1. Hêrodesê Mezin: Gava Îsa Mesîh hate dinyayê, Hêrodesê Mezin ser Cihûstanê, Celîlê, Îtûryayê û Traxonîdayê p’adşa bû (Metta 2:1-22; Lûqa 1:5). Navê bavê wî Antîpater bû. Hêrodesê Mezin yekî gelekî zulmk’ar bû, wî jineke xwe, sê kur’êd xwe, xwesîya xwe, apekî xwe û gelekêd din (pêştirî zar’okêd Beytleh’mê) kuştin.

2. Hêrodes-Antîpas: Gava Îsa Mesîh û Yûh’ennayê Nixumdar dest bi k’arêd xwe kirin, Hêrodes-Antîpas serwêrê Celîlê bû (Lûqa 3:1). Bavê wî Hêrodesê Mezin bû û navê dîya wî Maltakê bû. Ewî serê Yûh’ennayê Nixumdar da lêxistinê (Metta 14:1-12; Marqos 6:14-29; Lûqa 9:9). Berî xaçkirina Îsa, Îsa birine ber Hêrodes û wî Îsa bêhurmet kir, qerfê xwe Wî kir (Lûqa 23:7-12).

3. Hêrodes-Egrîpa p’adşa: K’arêd Şandîya 12:1-24-da Hêrodes-Egrîpa Petrûs û Aqûb girtin û Aqûbê birê Yûh’enna da kuştinê. Milyak’etê Xudan Hêrodes-Egrîpa kuşt (K’arêd Şandîya 12:21-23). Bavê Hêrodes-Egrîpa Arîstopolo bû, Arîstopolo jî kur’ê Hêrodesê Mezin bû. Navê dîya Hêrodes-Egrîpa Bernikê bû.

4. Kur’ê Hêrodes-Egrîpa, Egrîpayê duda bû. Egrîpayê duda p’adşayê Cihûstanê bû. Pawlos

li ber Egrîpa û xûşka wî Bernikê (Bernikêke din) sekinî û Mizgînîya Xwedê dida wan (K'arêd Şandîya 25:13–26:32). Egrîpayê duda Pawlos şande bajarê R'omayê, wekî Qeyser dîwana wî bikira.

**hêşî** – devê be'rê, k'ewşen.

**hilatin (li yekî hilatin)** – dengê xwe lê hildan, hilmeyîbûn.

**hîndar** – merivek nava p'êşe yan sportekêda xwe her gav hîn dike.

**hîvk'etî** – (e'diroyî, ya jorin k'etî, hîvgirtî) yê hîvê dik'evin, vediç'ir'ikin.

**hosanna** – xebereke silavdayînê ye, bi zimanê îbranî, yekî xweyîqedirr'a dihate gotinê mîna p'adşa. Pêşîyê hosanna duak bû bi me'na «Xilaz bike!», paşê ew bû gotineke bi me'na «Şikir wîr'a». Metta 21:9, 15; Marqos 11:9-10; Yûh'enna 12:13.

**h'edî** – h'edîya, p'êşk'êş, xêr, dîyarî.

**h'elal û h'eram** – 1. bona cihûya ev fe'mîn bi xwarin-vexwarinê, şûştin-veşûştinê û r'abûn-r'ûniştina e'mirê merivava girêdayî bûye. Li gora Qanûna Mûsa cûr'e-cûr'e h'eywan h'eram dihatine h'esabê: Mesele çend cûr'e teyrede, beraz, çend h'eywanêd be'rêda û h'emû me'regîsk usa jî cinyazê mirîya, merivêd k'otî û yêd bi nexweşîyêd ç'erm (Qanûna K'ahîntîyê 11; Qanûna Ducarî 14:3-21). Heger yekî destê xwe bida merivekî k'otî yan cinyazekî bik'eta, ew îdî dih'er'imî, h'eram dibû û ne cayîz bû, wekî ew meriv têk'eta nava cime'tê yan jî cîyêd pîroz. Kin gotî, gava yekî tiştek ji qanûna cihûya der bikira, ew h'eram dihate h'esabê. Cûr'e-cûr'e e'det bona h'elalbûna yekî h'eram hebûn. Mesele, gerekê qurban bida û bi avê bihata şûştinê. Bona çend cûr'eyêd h'elalbûnê gerekê k'ahîn jî li merivê h'elalbûyî binihêr'îya û bigota ku ew îdî h'elal bûye yan na (Qanûna K'ahîntîyê 13). Îsa guh neda e'detêd kal-bava hindava vê pirsêda û çend tişt miqabilî fikirêd qanûnzan û fêrisîya digot (Marqos 7:1-24). Usa jî Îsa destê Xwe da merivêd k'otî (ku h'eram dihatine h'esabê) û ew hin qenc dikirin, hin jî paqij dikirin (Metta 8:1-4). Û qewata Wî ser r'uh'êd h'eram jî hebû, cin ji cinak'etîya (ku h'eram dihatine h'esabê) derdixistin û qenc dikirin (Lûqa 4:30-36).

2. H'elal fire tê fe'mkirinê, çawa kirinêd pîroz, bê qelpî, bê dizî, bê h'ilek'arî, bi k'eda h'elal, usa jî jin-mêr h'elalê hev tên gotinê heger ew hindava hevda h'elal in, ne ç'e'vder in. H'eramî jî çawa ek'sê h'elalîyê ye.

**h'eram** – ji k'erema xwe bin xebera «h'elal û h'eram»-da bixûnin.

**îbranî** – navekî kevin e û cime'ta Îsraêlê pê vî navî hate navkirinê. Îbranî usa jî ziman e. Cime'ta Îsraêlê bi zimanê îbranî xeber didan. Peymana Kevin bi vî zimanî nivîsar e. K'itêbeke Peymana Nû jî bi vî navî heye (Ne'ma Îbranîyar'a).

**îlahî** – hê bona wê yekê, hê zêde.

**înk'ar** – yek haş ji tiştekî heye, lê xwe mukur' nayê ku zane.

**îqrarkirin** – erêyîkirin, şêkirandin.

**Îsa** – me'na navê Îsa bi îbranî ev e: «Xudan xilaz dike», yan «xilazkir», yan jî «azabûn» (Metta 1:21).

**îsaf** – wicdan.

**Îshaq** – kur'ê Birahîm û Serayê bû. Me'na navê wî «k'en» e, gava dîya wî Serayê cara pêşin bihîst ku Xwedê wê zar' bida wê, ew k'enîya, çimkî ew e'mirda mezin bû. Destpêbûn 21:1-8; K'arêd Şandîya 7:8; R'omayî 9:7; Îbranî 11:9 û yêd mayîn.

**Îsraêl** – 1. Navê meriv e. Çaxê Xwedê Aqûbê bavê miletê Îsraêlê bimbarek kir, navê wî kire Îsraêl (Destpêbûn 32:27-28; 35:10). Çend nav zur'eta Îsraêlr'a tê gotinê: «Cime'ta Îsraêl», «Zar'êd Îsraêl» û «îbranî». Cihû jî çawa miletê Îsraêlê têne h'esabê.

2. Navê welat jî tê gotinê: «Îsraêl». Zûva jêr'a digotin: «Kenan» (K'arêd Şandîya 7:11; 13:19). Navekî din jî jêr'a «Welatê Filistînê» dibêjin.

**Îşaya** – p'êxemberekî e'yan bû, ku weke 700 salî berî Îsa Mesîh hebû. Ewî derheqa Îsada gelekî p'êxembertî kirîye. K'itêba wî jî heye. Metta 3:3; K'arêd Şandîya 8:30; R'omayî 9:27-29 û yêd mayîn.

**îtoyîn** – r'obet, sosret.


**jîyîna h'eta-h'etayê** – e'mirê h'eta-h'etayê, jîyîna herheyê, h'eyata ebedî.

**kela** – h'ebs, zindan, girtîgeh.

**Kenan** – navê wî welatî ye, k'îjan ku Xwedê li gora sozê Xwe da miletê Îsraêlê, wekî bibe welatê wan. Ev navê «Kenan» hê berî li wir mayîna miletê Îsraêlê hebû. Paşê «Îsraêl» yan jî «Filistîn» hate gotinê. Metta 15:22; K'arêd Şandîya 7:11; 13:19.

**kenanî** – miletek bû ku li Kenanê diman, zur'eta kur'ê Ham, kur'ê Nuh (Destpêbûn 10:6).

**Konê Şe'detîyê (Konê Civînê)** – Gava cime'ta Îsraêlê ji Misirê derk'et, Xwedê serê ç'îyayê Sînayê Mûsar'a got, çawa gerekê Konê Şe'detîyê bê çêkirinê (Derk'etin 25). Gava çêkirin, r'ûmeta Xwedê ew cî t'ijî kir û Xwedê bi r'ûmeta Xwe şe'detî




*Konê Şe'detîyê (Konê Civînê)*

da û da xuyakirinê ku Ew t'evî wan e (Derk'etin 38:21). Konê Şe'detîyê û Konê Civînê (Derk'etin 27:21) yek bûn. Cime'ta Îsraêlê li wir dicivîyan. Silêman jî Orşelîmêda p'aristgeh dewsa wêda çêkir. Konê Şe'detîyêda (û usa jî p'aristgehêda) tiştêd pîroz jî hebûn, mesele: Sindoqa Peymana Xudan (Qanûna Ducarî 10:8), awa gotî Sindoqa Şe'detîyê (Jimar 4:5).

**kulî** – hespê gîhê, sîyarê bûkê.

**Kur'ê Dawid** – navekî k'ifş e, ku miletê cihû bona Mesîh digotin, çimkî Xwedê soz dabû, ku Mesîh wê ji r'ik'inyata Dawid bê. Metta 1:1, 6, 17, 20; 9:27; 15:22; 21:9; 22:42; Marqos 10:47-48.

**Kur'ê Mêriv (Kur'ê Însan)** – Çawa ji k'itêba Danîyêl p'êxember (7:13-14) tê xuyakirinê, berî hatina Îsa Mesîh miletê Îsraêlê bawer dikir ku Xwedê wê xilazkirekî bona cime'ta Xwe bişîne, wekî wan ji gunêd wan xilaz ke û navê Wî wê «Kur'ê Meriv» be. Peymana Nûda gelek cara Îsa Mesîh Xwexa ev nav li Xwe kir. Ev xwenavkirina Îsa bi r'engekî



*Kulî*

nixamtî dide xuyakirinê, ku Îsa ew e bona k'îjanî Xwedê gotibû, ku çawa Xilazkir wê bê dinyayê û Ew e, Yê ku Xwedê p'adşatîyêd t'emamîya dinyayê dane destê Wî. Li her çar Încîlada Îsa dibêje, Kur'ê Mêriv Xwexa ye û h'ukumê Wî bona baxşandinê û dîwankirinê heye (Marqos 2:10; Yûh'enna 5:27) û usa jî Xwexa wê jîyîna Xwe bide, wekî yêd din aza bin (Marqos 10:45). Metta 8:20; Lûqa 18:8; Yûh'enna 1:51; K'arêd Şandîya 7:56 û yêd mayîn.

**Kur'ê Xwedê** – Peymana Nûda ev nav Îsa Mesîhr'a tê gotinê, lê ew bi me'na fîzîkî (cismanî) nayê fe'mkirinê. Peymana Kevinda, «Kur'ê Xwedê» navekî bona wî P'adşayî ye, yê ku Xwedê bijart, awa gotî bona Mesîh (yê bi r'ûn k'ifşkirî), ku Berdestîyê Xwedêyî Pîroz û Amin e (Îşaya 42:1-8; 49:1-13; 50:4-11; 52:13-53:12; Zebûr 2:6-12). Ew nav «Kur'ê Xwedê» nêzîkîya heleqetîya nava Xwedê û Wîda dida k'ifşê. Awa gotî Îsa Mesîh bi me'na r'uh'anî Kur'ê Xwedê tê navkirinê. Peymana Nûda hatîye nivîsarê, ku Kur'ê Xwedê Xebera Xwedê ye (Peyva Xwedê ye) û Xebera Xwedê jî Xwexa Xwedê ye. Kur'ê Xwedê ji Bav (Xwedê) tê. Ew nûra r'ûmeta Xwedê ye û sûretê Xwedêyê ku xuya nabe. Hê berî e'firandina e'rd û e'zmana Kur' li cem Bavê bû. Bav û Kur' yek in, xwestina wan jî yek e, h'ukumê Kur' mîna h'ukumê Bavê ye û Kur' Bavê merivava dide aşkerekirinê û Kur' bi h'emû awayî t'am aşkerebûna Bavê ye. Ji k'erema xwe bin xebera «Bav»-da bixûnin. Metta 1:18-20; Kolosî 1:15-20; Îbranî 1:1-4; Yûh'enna 1:1-5; 3:16; 5:21-23; 10:30; 13:3; 14:9; 16:27-28; Lûqa 10:22; R'omayî 1:4.

**k'ahîn** – ji zur'eta Harûnê birê Mûsa bûn. K'ahîna ew gorîyêd (qurbanêd) ku miletê Îsraêlê danîn serjêdikirin. Ew bona miletê Îsraêlê ber Xwedê disekinîn û dua dikirin, navçêtî dikirin û xwestina Xwedê cime'têr'a didane e'yankirinê. Wana dehekê (ji deha p'areke) hebûkê, heger hasil bûya, yan dayîna berê e'rdê bûya, yan çi k'ar qazinc kirana ji cime'ta Îsraêlê xwer'a distandin. Nav civata giregirêd cihûyada serekêd k'ahîna jî hebûn. Yek ji wan serekêd k'ahîna bona wextekê dihate bijartinê ku bibe Serekk'ahîn, ewî serwêrîya t'emamîya k'ahîna û civata giregira dikir. Serekêd k'ahîna ew bûn jî, yêd

ku îdî carekê dora xweda bibûne Serekk'ahîn, usa jî ji yêd e'yane ji malêd wan Serekk'ahîna bûn. Qanûna K'ahîntîyê 6:8–10:20; Metta 26:57; Îbranî 6:20–8:6 û yêd mayîn.

**k'atib** – nivîsk'arê serwêrêd bajêr (K'arêd Şandîya 19:35).

**k'efen** – ji qedek (p'îne, p'aç'), mirî têda dip'êç'in.

**k'efîl (standin)** – (girew, k'efalet) p'ere ji ber merivva tê dayînê, wekî bikaribin aza bimînin h'eta r'oja dîwankirinê.

**k'erem** – Peymana Nûda gelek cara çawa p'êşk'êşek yan dayînek tê fe'mkirinê. K'erem xwestina dilê Xwedê ye, wekî tiştekî qenc, îlahî xilazbûnê bide merivêd ku ne hêjayî p'êşk'êşêd Wî ne. Ew bêheq dide meriva û li hîvîya tiştekî paşdastandinê nîne. Gelek cara K'itêba Pîrozda nivîsk'ara k'erema Xwedê çawa dua-dirozge bona hev xwestine.

**k'ewdayîna guna (k'ewandina guna)** – r'esîtkirina guna, baxşandina guna. «K'ew» tê fe'mkirinê çawa şewitandin, r'esîtkirin.

**k'êlek** – tenişt.

**k'êmûn** – (k'îmyon, zîre) t'oximê cûr'ekî p'incar'a ye. Cihûya ew çawa derman dixwarin pê qenc dibûn (Metta 23:23).



*K'inîşt*

**k'inîşt** – bi yûnanî «SUNAGOG», cîyê civata xwedênasêd cihûya ye, îlahî r'oja şemîyê, ku nivîsarêd pîroz têda dixûnin, dua dikin û hîn dikin. Her endemekî k'inîştê dikare hîn bike. Dema Îsada k'inîşt h'emû bajarêd cihûyada hebûn. Qurban li wir nedihatine serjêkirinê. Ji k'erema xwe bin xebera «p'aristgehê»-da bixûnin.

**k'irk'ût** – (k'ewk'urt') kevirekî nerm û zer e ku bi alaveke r'engê vekirî şewq dişewite û bîna wê jî qewat e (tûj e). Lûqa 17:29; E'yantî 9:17-18 û yêd mayîn.

**K'itêba Pîroz** – hin Nivîsarêd Peymana Nû t'evî yêd Peymana Kevin hevr'a dibine t'evayîya K'itêba Pîroz, awa gotî «Bîblîya» ku tê welger'andinê «K'itêba ser k'itêbar'a».

**K'itêba Zebûra** – k'itêbeke Peymana Kevin e. Zebûr xwexa k'ulam û stiranêd şikirdayînê ne bona Xwedê. Usa jî meriva ji k'ûra-

yîya dilê xwe avîtine ser h'alê xwe, dilovandine û derd-kulêd xwe Xwedêva e'lam kirine. P'ayê-p'ir'ê Dawid p'adşa ev zebûr nivîsîne.

*K'ofî*



**k'ofî** – Hêna berê nava yûnanada k'ofî ji gula yan belga bûn, gilover' bona serê meriva dihûnandin. Wan meriva k'ofî distand, yêd ku lîstikêd sportêda serdik'etin (alt' dikirin) yan jî bona eskerêd e'gît bûn ku dijmin bindest dikirin. Korint'î I, 9:25; E'yantî 2:10; 3:11; 4:4, 10 û yêd mayîn.

**k'otî (k'otîbûn)** – nexweşîk e, ku ser mêriv birîn dertên, ew birîn k'ûr dibin, ku t'u cara qenc nabin. Li gora Qanûna K'ahîntîyê ji serê 13-a h'eta 14-a zemanê berê her cûr'e nexweşîya ser ç'erm ji k'otîbûnêva girtî h'eta çend cûr'e p'izika, usa jî tiştêd k'efikî h'eram dihatine h'esabê. Cime'tê berî nexweşêd aha didan ji gund û bajara derdixistine der, lê heger nişkêva yek qenc bûya, gerekê xwe nîşanî k'ahîn bikira û h'edî bida, wekî destûr bidanê ku ew bik'eta nava cime'tê.

**k'ozî** – 1. xwelîya şewitî.

2. K'ozîkirî jî tê fe'mkirinê çawa «dermalîkirî».

**k'ulfet** – jin, pîrek.

**k'umr'eşîya Xwedê** – r'uh'anî tê fe'mkirinê. Peymana Kevinda, gava cime'ta Xwedê dest ji Xwedê k'işand û p'ût h'ebandin, ew usa dihate h'esabê, bême'ne çawa jina yekî ç'e'v bavêje mêrekî din û mêrê wê k'umr'eşîyê bike. Hosêya 2:2-13; Yêremîya 3:6-10, 20; Korint'î I, 10:22; Korint'î II, 11:2.

**k'urx** – k'inca zivir ji mûyê bizinê, çawa nîşana şînê ber Xwedê li xwe dikirin (Metta 11:21).

**leck'ar** – yê ku t'evî yekî din yan dik'eve lecê yan qoşê.

**Lêwî** – 1. Yek ji her donzdeh kur'êd Aqûb bû. Zur'eta Lêwî jî yek ji wan her donzdeh qebîlêd Îsraêlê bû. Mûsa p'êxember û birê wî Harûn, her du jî ji vê qebîlê bûn. Ji nava vê qebîlê Xwedê Harûn zur'etêva bona şixulê Xwedê p'aristgehêda, awa gotî k'ahîntîyêr'a

***Lêwî** û k'ahîn*



bijart. Yêd mayîn alîk'arîya van k'ahîna dikirin. Derk'etin 6:16-25; 32:26-29; Jimar 1:47-53; Lûqa 10:32; Îbranî 7:5, 9-10; E'yantî 7:7 û yêd mayîn.

2. Lêwîyê kur'ê Halfawo şagirtekî Îsa bû, ku jêr'a Metta jî digotin.

**lêyî** – tofan.

**lîl** – xîzge, qûm, çemûr'.

**lomekirin** – neheqkirin, dîwankirin, sûcdarkirin.

**lûfika be'rê** – lîfika (kulavê) be'rê.

**Lût** – birazîyê Birahîm bû. Gava Birahîm çû bona welatê ku Xwedê soz dabû, Lût t'evî wî çû. K'etin wî welatî û Lût çû bajarê Sodomêda ma. Destpêbûn 11:27, 31; 14:1-16; 19:1-38; Lûqa 17:28-32; Petrûs II, 2:7.

**mala Aqûb** – miletê Îsraêl. Aqûb û Îsraêl yek in. Her donzdeh kur'êd Aqûb, awa gotî her donzdeh kur'êd Îsraêl, bûne donzdeh qebîlêd Îsraêlê.

**mana** – Gava Cime'ta Îsraêl ji Misirê derk'et, t'evî Mûsa çil salî nava ber'îyêda bû. Ber'î cîkî xikî-xwelî (vikî-vala) bû, li wir her sibeh bona xwarinê Xwedê «mana» ji e'zmana dibarand û dida wan, çimkî xwarina wan t'unebû. Pêştirî r'oja şemîyê (sebtê), her sibeh cime'ta Îsraêlê derdik'et diçû, bona r'ojekê mana t'op dikirin û dikirine nan, dixwarin. Mana tiştekî weke libêd k'işmîşa xuya dibû. Libêd wî gilover' û sipî bûn û te'ma wî mîna te'ma nanê şkevayî hingivkirî bû (Derk'etin 16; Jimar 11:4-9). Hinek fe'm dikin ku mana gezo ye, lê na. Gezoyê ku dik'eve ser belgêd darêd me'zê û darêd berûyê, eva tiştekî din e, ne mana ye.

**Melk'î-Sadiq** – P'adşa û k'ahînê bajarê Şelîmê bû. Carekê dijmina birazîyê Birahîm, Lût mala wîva girtin. Birahîm çû t'ev wan dijmina şer' kir û serk'et, Lût, mal û milk'ê wîva xilaz kir paşda anî. Gava Birahîm veger'îya, yekî bi navê Melk'î-Sadiq r'astî wî hat, nan û şerav da Birahîm û dua li

wî kir. Birahîm yek ji dehe p'arêd h'emû tiştêd ku t'evî xwe ji şêr' anîn p'êşk'êşî wî kir. Gelek sal pey vê yekêr'a e'detê cime'ta Îsraêlê bû, wekî yek ji dehe p'arêd ber û tiştêd din bidana k'ahîna. Destpêbûn 14:17-20; Îbranî 5:6-10; 6:20; 7:1-17.

**meriv** – mirov, însan.

**Meryem** – Çend k'ulfet K'itêba Pîrozda hene, navê wan Meryem.

1. Dîya Îsa.

2. Meryema Mejdelanî (Metta 27:56; Marqos 16:9; Lûqa 8:2; Yûh'enna 20:1-2, 11-18).

3. Meryema xûşka Mert'a û Lazar (Lûqa 10:38-42; Yûh'enna 11:1-5; 12:1-7).

4. Meryema dîya Aqûb û Ûsiv. Hinek difikirin ku ev Meryem xût ew Meryema jina Klêpas bû (Metta 27:56; Marqos 15:40; 16:1; Lûqa 24:10).

5. Meryema dîya Yûh'enna-Marqos. Mala wê Orşelîmêda hebû, li wir şagirtêd Îsa dicivîyan (K'arêd Şandîya 12:12).

**Mesîh** – xebereke îbranî ye. Me'na wê bi zimanê îbranî ev e: «Yê bi r'ûn k'ifşkirî». Gava yek dibû p'adşa, r'ûn ser serê wîda dikirin. Ev jî dibû nîşana ku filankes bû p'adşa. Xwedê soz dabû, wekî xilazkirekî cime'ta Xwer'a bişîne, ku wan aza ke, p'adşatîya Xwedê bîne nava wan û bibe p'adşayê t'emamîya dinyayê. Lema gava Îsa hat, ew bi navê «Mesîh» hate gotinê, wekî bide k'ifşê ku ew ji Xwedêda bijartî û k'ifşkirî ye. Xebera «r'ûnkirî» bi zimanê yûnanî XRÎSTOS tê gotinê.

**mesîhî** – yê ku li pey Îsa Mesîh diçe û Wî bawer dike. K'arêd Şandîya 11:26; 26:28; Petrûs I, 4:16.

**milyak'et** – Zimanê îbranî û yûnanîda fe'mîna wê «qasid» e, çimkî evana qasidêd Xwedê ne. Evana heyînêd r'uh'anî ne, ku h'izûra Xwedêda dimînin. Nayêne dîtinê h'eta xwexa xwe e'yan nekin. Milyak'et qirara Xwedê e'lam dikin yan jî tînine sêrî. Ewana ji alîyê Xwedêda k'ifşkirî ne, ku meriva xweyî kin û guh bidine wan (K'arêd Şandîya 12:6-11; 27:23; Îbranî 1:14). Carna Xwedê milyak'eta dişîne cem meriva, wekî tiştekî wanr'a bêje. Milyak'etê serwêrê h'emû milyak'eta Mixayîl e (Cihûda 9). Yekî din jî navê wî Cibrayîl e (Lûqa 1:19, 26).

**mirarî** – (mûrdar) H'eywanê ku nayê serjêkirinê, xûn têda dimîne, h'işk dibe, ew mirar tê h'esabê.

**Misir** – welatekî nêzîkî Îsraêlê ye. Cime'ta Îsraêlê li wir çarsid salî

bû hêsîr û xulam. K'arêd Şandîya 7:34-40; Metta 2:13.

**mizgîndar** – yê ku Mizgînîya P'adşatîya Xwedê dide, Încîlê dide naskirinê (te'rîf dike).

**Mizgînî (Mizgînîya Xwedê)** – «Încîl» ji k'oka (r'awa) xebera EUAGGELÎON bi zimanê yûnanî tê. Me'na wê bi kurmancî «mizgînî» ye. Mizgînî jî tê fe'mkirinê çawa xeber yan dengekî xêr ser merivda tê.

**mîrat'** – hebûka bavê, war, wêris.

**Mîrêcin** – (Cin, Îblîs, Şeyt'an) Bi yûnanî «DÎABOLOS» e, ku tê fe'mkirinê «cin», usa jî xebera «SATANAS» tê xebatê, ku ev xeber e'silê xweda ji zimanê îbranî ye û t'ercime dibe «Yê miqabil, xeybkir, buxdanbêj». Serda jî Peymana Nûda gelek navêd wîye din hene. Mesele: Serwêrê cina (Metta 9:34; 12:24), Belzebûl (Metta 12:24), Cêr'ibandkir (Metta 4:3), Me'r û Zîya (E'yantî 20:2), Yê Xirab (Metta 5:37; 6:13), Bavê derewa (Yûh'enna 8:44) û yêd mayîn. K'itêba Pîroz e'yan dike, ku mîrêcin dijminê Xwedê û meriva ye. Ew ber Xwedê şikîyatê meriva dike. Ew xwe dike dilqê milyak'etê r'onayê (Korint'î II, 11:14), meriva dixapîne, ji r'îya Xwedê derdixe û tiştêd mayîn dide h'ebandinê, meriva dike hêsîrê guna. Usa jî K'itêba Pîroz e'yan dike, ku Îsa Mesîh hate dinyayê bi mirin û r'abûna Xwe mîrêcin bindest kir. Axirîya dinê (R'oja Axretê) Îsa wextê hatina Xweye duda wê dîwana mîrêcin û milyak'etêd wî bi agirê h'eta-h'etayê bike (Metta 25:41; E'yantî 20:10).

**Mûsa** – serwêrekî cime'ta Îsraêlêyî e'yan bû. Wextê ku cime'ta Îsraêlê hêsîr û xulamêd welatê Misirê bûn, Xwedê ew bijart û cime'ta Îsraêlê bi destê wî xilaz kir. Xwedê pê destê Mûsa Qanûn jî daye cime'ta Îsraêlê (Derk'etin serê 1-ê h'eta serê 20-î û yêd mayîn). Metta 8:4; 17:3-4; Yûh'enna 5:45-46; Îbranî 3:2-5, 16 û yêd mayîn.

**nandirûn** – p'aletî, p'aleyî.

**nanê Xwedêr'a dayî** – (nanê h'izûrê, nanê pêşberîyê) nanê pîroz hêna Mûsada Konê Şe'detîyêda (Konê Civînêda), usa jî peyr'a p'aristgehêda hebû. Ev nan li ser sifra zêr'în «li pêşberî Xudan» dihate r'êzkirinê. Her r'ojeke şemîyê k'ahîna donzdeh nanê bê hevîrtir'şk dipe'tin, li ser sifra zêr'în dadanîn û yêd ku h'eftîya dinda dewsê danîn, k'ahîna yê pêşîyê cîyê pîrozda dixwarin. Pêştirî k'ahîna îzina t'u kesî t'unebû

ev nan bixwarana. Ev nan nîşaneke Peymana Xudan bû, ku ew t'evî cime'ta Îsraêlê bû. Qanûna K'ahîntîyê 24:5-9; Metta 12:4; Marqos 2:26; Lûqa 6:4.

*Nard*



**nard** – r'ûnekî bînxweş ku ji şînayîke Hindistanê dihate çêkirinê. Marqos 14:3; Yûh'enna 12:3, 5.

**nazik** – bedew, xweşik.

**necihû (miletêd mayîn)** – h'emû miletêd dinyayê, ku e'silê xweda ne cihû ne. H'emû miletêd necihû p'ûtp'arist bûn, pêştirî hineka, yêd ku Xwedêyê cihûya, awa gotî Xudan t'enê bawer dikirin. Ji k'erema xwe bin xebera «p'ûtp'arist» û bin xebera «yûnan»-da bixûnin.

**nedir** – (gorî, qurban) Li gora Qanûna Mûsa (Derk'etin 13) însan û h'eywanêd nixurîye nêr, ew nedirêd (gorîyêd) Xwedê bûn. H'eywan dihatine serjêkirinê û ji ber însênva dihatine dayînê. Me'na wê ev e, ku her nixurî p'ara Xwedê bû, pîroz, buhurtî û t'aybetî, awa gotî Xwedêr'a cudekirî bû (Lûqa 2:23).

**nemamî** – xayîntî, bêbextî.

**nemêr** – ev ew mêr in, yêd ku ji mêrtîyê k'etî ne. Hinek ji zikmakîyêda usa ne, hinek jî meriva ew usa kirine, mesele: Zemanê berê p'adşêd vê dinê gelek xulamêd bindestê xwe nemêr dikirin, awa gotî dixesandin, ku dest neavîtana k'ulfetêd malê.

**nezîr** – tê fe'mkirinê «Xwedêr'a dayî», awa gotî yekî ku Xwedêr'a bona xizmetk'arîyê ad-qirar dikir (Jimar 6:1-21). Sê qeydêd h'îmî bona yêd nezîr hebûn:

1. Heger jin bûya yan mêr bûya, gerekê şerav-araq venexwara, ne tirî, ne jî xurekêd ji mêwa tirîyê bixwara.
2. Gerekê meqes yan dûzan p'or'ê sêrî nek'eta h'eta wî wextê adêyî k'ifşkirî xilaz nebûya.
3. Gerekê cinyazê mirîya nek'eta, ne jî nêzîk bûyayê. Wextê adkirinêyî lapî hindik sî r'oj bû, lê meriv jî hebûn bi t'emamîya e'mirê xwe Xwedêr'a ad-qirarkirî bûn, awa gotî nezîr. Peymana Kevinda

bona çend merivêd nezîre adkirî nivîsar in, mesele: Samûêl, yê ku dîya wî ew xwexa Xwedêr'a da (P'adşatî I, 1:11, 28) û Şimşon (H'akimtî 13:2-5). Peymana Nûda Yûh'ennayê Nixumdar (Lûqa 1:15; 7:33) nezîrê adkirî bû. Xuya dibe ku Pawlos û çend merivêd mayîn (K'arêd Şandîyada 18:18; 21:23-24, 26) bona demeke kin çawa nezîr adkirî bûn, wan li gora qeyde-qanûnêd nezîrîyê xilazîya wextê adêyî k'ifşkirî p'or'ê xwe kur' kirin û h'edî dan (Jimar 6:9, 18).

**Ne'man** – serwêrê eskerêd welatê Sûryayê bû, yekî e'yan bû, lê k'otî bû. Gava bona Êlîşa p'êxember bihîst, çû cem wî hîvî jê kir ku wî qenc ke. Êlîşa gotê «Her'e ç'emê Ûrdunê û h'eft cara nuqî binê avê be derê, tê qenc bî». Ne'man gur'a wî kir û Xwedê ew paqij û qenc kir. P'adşatî IV, 5:1-27; Lûqa 4:27.

**Ne'meyêd Kelê** – Efesî, Fîlîpî, Kolosî û Filîmon. Ev ne'me wextê Pawlos kelêda bû hatine nivîsarê. Efesî 3:1; 4:1; Fîlîpî 1:7, 13; Kolosî 4:3, 18; Filîmon 1, 10.

**nisil** – nifş.

**nisretî** – merivêd ji bajarê Nisretê. Ev nav bona Îsa hate gotinê (Metta 2:23; Marqos 14:67) û peyr'a jî bona mesîhîya (K'arêd Şandîya 24:5).

**nivîsar (nivîsarêd pîroz)** – Peymana Kevin û Peymana Nû. Lê gava nivîsk'arêd Peymana Nû k'itêbêd xweda be'sa «nivîsar» yan «nivîsarêd pîroz» dikirin, fikira wan ser wan k'itêbêd nihaye Peymana Kevinda bû, çimkî k'itêbêd Peymana Nû hingê hela hê çawa k'itêbek nehatibûne berevkirinê (Tîmot'êyo II, 3:16-da).

**nixumandin** – Peymana Nûda nivîsar e, ku Yûh'ennayê Nixumdar gelek meriv li ç'emê Ûrdunêda dinixumandin. Ewî got, ku gerekê ji gunekirinê veger'in û paşê bêne nixumandinê. Bi vî awayî Yûh'ennayê Nixumdar dilê meriva bona hatina Mesîh hazir dikirin. Usa jî şandî û bawermendêd Îsaye pêşin ji qur'na pêşinda, yêd ku dibûne bawermend, pê avê dinixumandin. Ev yek dibû nîşana veger'andin, paqijbûn û baxşandina gunêd wan. Usa jî nixumandina bawermenda vê sur'ê dide fe'mkirinê, ku t'evî Îsa mirin, definbûn û ji mirinê r'abûn. Metta 28:19; K'arêd Şandîya 2:38, 41; 10:47-48; R'omayî 6:3-4; Korint'î I, 10:2; 12:13; Galatî 3:27; Kolosî 2:12; Petrûs I, 3:21 û yêd mayîn.

**nixumdar** – Yûh'ennar'a digotin nixumdar. Gava wî xebera Xwedê

bela dikir, t'obedar bi avê dinixumandin. Lûqa 1:5-25; Metta 3:1.

**nixurî** – K'itêba Pîrozda, kur'ê nixurî li ser h'emû zar'ar'a bû û heqê wî ji heqê h'emûya zêdetir bû. Ji milk'ê bavê dubare p'ara wî dik'et (Qanûna Ducarî 21:15-17, Îşaya 61:7), duayê bavêyî herî qenc ewî distand (Destpêbûn 27), usa jî h'ukumê bavê (Destpêbûn 27:29, 37; 37:21-22; P'adşatî IV, 2:9). Lê kur'ekî din dikaribû heqêd nixurtîya birê xwe jê bistanda (Destpêbûn 25:34; Îbranî 12:16). Anegorî Qanûna Mûsa, her nixurîyê nêrînî ji mêriv yan h'eywên, ew p'ara Xudan bû (Qanûna K'ahîntîyê 27:26, Jimar 3:12-13). Bona vê yekê, p'êşk'êşî Xwedê dikirin (awa gotî Xwedêr'a nedir dikirin) û didane P'aristgehê (dê û bav kur'ê xweyî nixurî paşda dik'ir'în (Jimar 18:15, 3:40-51, Derk'etin 13:1 [2], 12 [13])). Xwedê h'emû milet xuliqandin, lê Îsraêl bijart wekî bibe miletê Wîyî e'zîz, awa gotî t'eybetî, lema jêr'a dibêje «kur'ê nixurî» (Derk'etin 4:22, Yêremîya 31:9) usa jî «berê deremeta pêşin» (Yêremîya 2:3). Dawid p'adşa û warê wî Mesîh, ew her du jî nixurîyê Xwedê têne gotinê. Qewat û h'ukumê wan t'eybetî bûn (Zebûr 89:27 [28 îbranî]). Peymana Nûda, Mesîhr'a dibêjin «Nixurî» çimkî h'ukum, serwêrtî û k'ursîya Wî ser h'emûyar'a ye (Îbranî 1:6; Kolosî 1:15) û Ew pêşin ji nava mirîya r'abû (Kolosî 1:18; E'yantî 1:5). Kolosî 1:15-da ev yek tê gotinê ku Mesîh Nixurîyê h'emû e'firîna ye, awa gotî, Nixurîyê Xwedêyî li ser h'emû e'firînar'a ye. H'ukumê Mesîh ser h'emû e'firîna heye û Ew Xwexa berî wê yekê hebû (bixûne Kolosî 1:16-17, usa jî Fîlîpî 2:6 û Yûh'enna 17:5). Bawermendêd Îsa Mesîh jî «nixurî» têne gotinê (Îbranî 12:23), çimkî ew merivêd Xwedêye t'aybetî ne, war û milk'ê Wî ne, ku gerekê e'mirê pîroz, buhurtî-jibare bijîn. Çawa ku Mesîh nixurîyê ji nava mirîya ye, ev yek gumanê dide bawermenda ku ew jî t'evî wê r'ûmeta r'abûna ji mirîya bin.

**Nînewa** – navê bajar e. Xwedê Ûnis p'êxember şande wir wekî bêje cime'ta wî bajarî ku ewê bajarê wan wêran ke, çimkî gelek xirabî dikirin. Gava wan xeberêd Ûnis bihîstin, bi girî ji gunekirinê veger'îyan. Xwedê baxşande wan. Îro ev bajar dik'eve nava e'rdê Îraqê, k'îderê gelek k'urd dimînin. K'itêba Ûnis; Metta 12:41; Lûqa 11:30, 32.

**Nuh** – bave'şîr û p'êxember bû. Hêna Nuhda meriva ku gelekî xirabî dikirin, Xwedê got: «Ezê tofana mezin r'akim, wekî her tiştêd dinêda wêran bin». Lê Nuh merivekî bawermend bû û gur'a Xwedêda bû. Çawa ku Xwedê gote wî, usa jî ewî gemîke mezin çêkir. Ew neferêd xweva û h'eywanêd cûr'e-cûr'e ji avê xilaz bûn, lê h'emû însanêd dinê xeniqîn. Destpêbûn 6:9–10:32; Metta 24:37-39; Lûqa 3:36; 17:26-27; Îbranî 11:7; Petrûs I, 3:20; Petrûs II, 2:5.

**Orşelîm** – îro jêr'a «Qudsa Şerîf» jî tê gotinê. Ew bajarê cihûyayî herî mezin û e'yan bû, çawa îro jî. P'aristgeha cihûya jî li wir bû. Berî 3000 sala Dawid p'adşa Orşelîm ji destê yebûsîya stand. Pêşîyê ew bajarê P'adşatîya t'ifaqîya Îsraêlê bû û paşê bû bajarê p'adşatîya başûrê, awa gotî Cihûda. Hingê Dawid p'adşayê wê bû, h'esabê merivêd wê 2000 bû. Wextê Peymana Nûda h'esabê merivêd wê lapî kêm 80_000 bû. Bona cihûya, Orşelîm bajarê herî pîroz e.

**Petrûs** – jêr'a Şimh'ûn û Kîfas jî digotin. Ew yek ji her donzdeh şagirtêd Îsa bû. Ew şandî bû. «Petrûs» bi zimanê yûnanî û «Kîfas» (awa gotî «kêfa») bi zimanê aramî têne fe'mkirinê «qeya» yan «kevir» (Yûh'enna 1:42).

**peyman** – (ahda, ad û qirar) nav du merivada, nav du k'omada, yan jî nav Xwedê û merivada tê girêdanê. Peymanek nava Xwedê û Nuhda hebû (Destpêbûn 9:8-17), nava Xwedê û Birahîmda (Destpêbûn 15), nava Xwedê û Dawidda (P'adşatî II, 7; Zebûr 89:1-37). Li serê ç'îyayê Sînayê Xwedê peymanek t'evî cime'ta Îsraêlê girêda. Li gora vê peymanê Xwedê soz da wekî Xwexa Xudanê cime'ta Îsraêlê be û wan xwey ke, lê gerekê Îsraêl jî Qanûna Xwedê biqedîne, ya ku Wî bi destê Mûsa da. Lê Îsraêlê gelek cara peyman, awa gotî Qanûna Mûsa dit'er'iband. K'itêbêd cihûyaye pîrozr'a, yêd ku berî Îsa hebûn, wanar'a dibêjin «Peymana Kevin». Wêda nivîsar e, ku Xwedê wê peymaneke nû t'evî cime'ta Xwe girêde (Yêremîya 31:27-37). Xwedê ev peymana nû pê destê Îsa Mesîh bona h'emû mileta girêda, pê xûn û mirina Wî. Marqos 14:24; Lûqa 22:20; R'omayî 3:21-26; Korint'î I, 11:25; Îbranî 10:10-22.

**Peymana Kevin** – Qirara Kevin. K'itêbêd cihûyaye pîrozr'a, yêd ku berî Îsa hebûn, wanar'a dibêjin «Peymana Kevin», çimkî wanda

bona peymana Xwedê t'evî cime'ta Îsraêlê tê gotinê. Ji k'erema xwe bin xebera «peyman»-da bixûnin.

**Peymana Nû** – Qirara Nû. Wan k'itêbêd pîrozr'a dibêjin Peymana Nû, k'îjanada derheqa Îsa Mesîh û civîna Wîda nivîsar in, çimkî nava wanda derheqa peymana Xwedêye nûda tê gotinê, ya ku t'evî meriva girêda. Eva peymana pê xûna Îsa Mesîh bona baxşandina gunêd h'emû meriva hatîye girêdanê (Marqos 14:24; Korint'î I, 11:25; Efesî 5:2; Îbranî 7:26-28). Ji k'erema xwe bin xebera «peyman»-da bixûnin.

**Pîlato** – ji Qeyserê R'omayê k'ifşkirî bû, ew welîyê welatêd Cihûstanê, Sameryayê û Îdûmeyayê bû. Maleke wî li Qeyserîyê ber be'rê bû, lê malek jî Orşelîmêda bû. Metta 27:2, 11-26; Lûqa 23:1-25 û yêd mayîn.

**pîroz** – (miqedes, bimbarek, zîyaret, buhurtî, xalis) Me'na «pîroz» li gora K'itêba Pîroz fikira r'uh'anî ye. Xwedê Xwexa pîroz e û pîrozbûna Wî ser her tiştîr'a ye. Hacet, merî û tiştêd mayîne bona h'ebandinê Xwedêr'a têne başqekirinê, çawa buhurtî-jibarekirî (pîrozkirî). Merivêd pîroz ew in, yêd ku bona xizmetk'arîya Xwedê û jîyîna buhurtî başqekirî ne (Korint'î I, 1:2). Vê welger'andinêda dewsa «Pîrozêd Xwedê» «Cime'ta Xwedê» hatîye nivîsarê (Korint'î II, 1:1). «Pîrozê Xwedê» û «Yê Pîroz» jî navêd Îsa Mesîh ne (Pîrozê Xwedê: Marqos 1:24; Lûqa 4:34; Yûh'enna 6:69; Yûh'enna I, 2:20; E'yantî 3:7; Yê Pîroz: Lûqa 1:35).

**pol** – p'erêd sifir in, yêd herî bê qîmet in. Du pol qasî qur'ûşekî ye. Marqos 12:42; Lûqa 12:59; 21:2. Ji k'erema xwe li navnîşa (tablîsa) li k'utasîya ferhengokê binihêr'in.

**pûng** – ne'ne.

**P'adşatîya Xwedê, P'adşatîya E'zmana** – bona t'evgirêdana Xwedê û cime'ta Wî tê gotinê. Çawa p'adşa cime'ta xwe xwey dike û ser wê p'adşatîyê dike, Xwedê jî usa ye. Her tiştêd ku cime't h'ewce dibe dide wan û r'êberîya wan dike. Cime'ta Wî ew meriv in, yêd ku bawerîya xwe Wî tînin û gur'a Wî dikin. Gava Îsa Mesîh cara pêşin hate dinê, p'adşatîya Xwedê bi cûr'ekî nû xuya bû, çimkî Îsa r'êke nû merivar'a vekir, wekî t'evî Xwedê t'evgirêdayî bin û bijîn. Bona vê yekê tê gotinê ku P'adşatîya Xwedê îdî destpêbûye. Lê gava Îsa Mesîh dîsa bê, wê hingê p'adşatîya Xwedê t'emam bibe û h'emû însanar'a bi cûr'ekî nû bê e'yankirinê (Metta 6:33, 19:16-30;

Marqos 10:15). Me'na P'adşatîya Xwedê û P'adşatîya E'zmana yek e. Metta xebera «E'zman» dewsa «Xwedê» da xebatê, çimkî xuya dibe ku wî Mizgînîya xwe li gora zaravê cihûya nivîsî û ne e'detê cihûya bû ku navê Xwedêyî pîroz gelek cara banîna ser zarê xwe. Lema cihûya gelek cara «E'zman» cîyê ku Xwedê dimîne, dewsa navê «Xwedê» didane xebatê. Derêd ku Metta «P'adşatîya E'zmana» nivîsîn, Marqos û Lûqa «P'adşatîya Xwedê» nivîsîn. Metta 4:17, 5:10; Marqos 1:15; Lûqa 6:20.

**p'aristgeh** – (e'bûbetxane, îbadetxane, xana Xwedê) avayîyê cihûyayî herî berbiç'e'v û e'yan bû. Silêman p'adşa cara pêşin p'aristgeh bajarê Orşelîmêda çêkir. Ew t'enê li Orşelîmê hebû. Miletê Îsraêlê dua û h'ebandinêd xwe wir dikirin û gorîyêd (qurbanêd) xwe li wir serjêdikirin. P'aristgeh ji çar p'ara bû: H'ewş, Hindur', Pîrozgeh û Cîyê Herî Pîroz. P'er'deke mezin navbir'î dida Pîrozgehê û Cîyê Herî Pîroz. Salê carekê Serekk'ahîn diçû Cîyê Herî Pîroz. Ewî li wir hin ber gunêd xweva, hin jî li ber gunêd cime'têva gorî serjêdikirin, dua dikir û baxşandina guna ji Xwedê dixwest. Gava Îsa li ser xaç mir, ev p'er'da pîroz nîvîda bû du tîşa (Lûqa 23:45-46). Sala 70-da pey bûyîna Îsa Mesîhr'a, Tîtoyê sereskerê Împêratorîya R'omîyê p'aristgeh wêran kir. Ji hingêva h'eta r'oja îroyîn p'aristgeh careke din nehatîye çêkirinê.

**p'eredang** – sindoqa (qut'îya) h'edî-dîyarî û xêra. Xelqê xêr û xêratêd xwe dikirine wir.

**p'eyn** – sergînê hûrbûyî, zibil, e'deba h'eywên.

**p'êç'ira** – r'efik, malç'ira, p'eltika ç'irê.

**p'êşe** – sine't, hostatî.

**p'êşk'êş** – dîyarî, h'edîya.

**p'êşk'êşkirin** – (dîyarîkirin) ber kesekî xelatek danîn (p'êşk'êş danê). Li gora Qanûna Mûsa zar'ok p'êşk'êşî Xwedê dikirin, wekî Xwedê ew pîroz (berek'et) bikirana.

**p'êxember** – (nebî, qasidê Xwedê, qûlê Xwedê, gotinbêjê Xwedê) ew însan bûn. Xwedê wanr'a xeber dida, ku ew gotina Wî bigihînine meriva.

**p'êxembertî** – K'itêba Pîrozda xebera «p'êxembertî» fire tê fe'mkirinê. Yê ku p'êxembertîyê dike, ew bi r'êberîya R'uh'ê Pîroz gotineke ji Xwedê e'lamî meriva dike. Çawa Pawlos Korint'î I, 14:3-da dibêje, yê ku p'êxembertîyê dike, bawerîya meriva ava dike, dil dide ber wan û ber dilê wanda tê. Îdî


p'êxembertî ne t'enê bona tiştêd ku hê neqewimî ne.

**p'işkbûn** – dilê yekî ji xebera yê din dimîne û jê diçe.

**p'işkkirin** – ji r'ê derxistin. Yek tiştekî dike, ku li yê din xweş nayê û ew ji wî diçe.

**p'îgar** – yê ku bi heqtî h'eywên xwey dike.

**p'ûtp'arist** – miletêd necihû ku p'ût dih'ebandin, dihatine h'esabê p'ûtp'arist çawa îro jî dih'ebînin. Mesele, steyrka, te'vê, hîvê, milyak'eta, heyîn û tiştêd t'ebîyetê, usa jî p'ûtêd bi desta çêkirî. P'ût jî usa tê fe'mkirinê «senem».



*Artemîsa xanim xwedê, p'ûta bajarê Efesê (K'arêd Şandîya 19:24 35)*

**qamîş** – çît, meyî.

**Qanûna Mûsa** – (Şerîe'ta Mûsa) T'ewrat e. T'ewrat jî pênc k'itêbêd Mûsa ne: Destpêbûn, Derk'etin, Qanûna K'ahîntîyê, Jimar, Qanûna Ducarî (Wek'ilandina Qanûnê). Van pênc k'itêbada qanûn, t'emî, dîrok (t'arîx) û serhatî nivîsar in. Xwedê ev Qanûn ser ç'îyayê Sînayê, nav e'wrada Mûsar'a got. Carna jî h'emû k'itêbêd «Peymana Kevin»-r'a dibêjin Qanûn.

**qanûnzan** – (zaneyê Şerîe'tê, k'atib, nivîsk'ar) Qanûnzan nav cime'ta Îsraêlda ser Qanûna Mûsa dixebitîn, Qanûn qenc zanibûn, bi desta Qanûn zêde dikirin û xelq hîn dikirin. Wan jîyîna xwe bona hînbûn û hînkirina Qanûnê didan û k'itêb dinivîsîn. P'ir'anîya wan ji fêrisîya bûn.

**qar'qar'** – qir'ik, qaj.

**qav** – qehb, forq.

**Qayîn** – kur'ê Ademî mezin bû. Gelekî h'evsûdî birê xweyî biç'ûk Habîl dikir, çimkî Xwedê berxê Habîlî qurbanê qebûl kiribû, lê genimê ku Qayîn anîbû qebûl nekiribû, ji dest sitqê wîyî ner'ast. Hingê Qayîn Habîl kuşt. Xwedê got, ku gerekê Qayîn li ser e'rdê firarî be û ji merivayê bê t'exsîrkirinê. Destpêbûn 4:1-24; Îbranî 11:4; Yûh'enna I, 3:12; Cihûda 11.

**qebîlêd Îsraêlê** – (e'şîrêd Îsraêlê, êlêd Îsraêlê) Donzdeh kur'êd Aqûb hebûn, ku wanr'a Îsraêl jî digotin. Her yek ji wan bû qebîleke Îsraêl. Destpêbûn 35:23-26; 49:1-28.

**qedir-hurmet** – r'ûmet.

**qerf** – tinaz.

**Qeyser** – navekî bona p'adşayê miletêd Împêratorîya R'omayê bû. Miletê R'omayê gelek miletêd din bindest dikirin û Qeyser p'adşê wan h'emûya bû. Her p'adşakî miletê r'omayêr'a digotin: «Qeyser». Lûqa 2:1; 3:1.

**Qorax** – serwêrê wan bû, yêd ku ber Mûsa û Harûn r'abûn. Xezeba Xwedê hindava Qorax û hevalêd wîda xuya bû, e'rd vebû ew saxe-sax e'rdêda çûn. Jimar 16:1-35; Cihûda 11.

**qulixî** – xizmetk'arî, şixul, xulamtî.

**qurban** – (gorî, nedir) bînberek ku ji ber yekî dinva tê dayînê yan kuştinê. Cûr'e-cûr'e qurban û h'edîyêd cime'ta Îsraêlê hebûn, mesele, h'edîyêd mîna h'eywanêd berx, canega, usa jî yêd genim û biharet hebûn. H'eywan dihatine serjêkirinê, paşê hinek t'emam pêva dihatine şewitandinê, hinek jî t'enê p'areke wan dihatine şewitandinê. Her h'eywan gerekê bêqusûr û bêlek'e bûya. Ji hêna Mûsada qurban bi destê k'ahîna dihate serjêkirinê (îzina cime'tê t'unebû, ku xweserîxwe serjêkirana.) Ji k'erema xwe bin xebera «gorîgeh»-da bixûnin.

**r'asth'esabbûn û r'astîya Xwedê** – Nivîsarêd pîrozda xebera «r'astîya Xwedê» bi çend cûr'a tê fe'mkirinê. Carna r'astî çawa «heqîya Xwedê» tê fe'mkirinê, ew h'unurekî Wî ye. Lê carna jî «r'astîya Xwedê» kirineke Wî ye, ku çawa Ew mêriv bêsûc dike û r'ast h'esab dike, ne ku t'enê vê yekê, lê mêriv t'evî Xwe dike yek jî. Hingê însan ber ç'e'vê Wî mîna Wî r'ast xuya dibe. Peymana Kevinda jî tê fe'mkirinê, ku merîyê r'ast ew e, yê ku gunêd wî hatine baxşandinê (Zebûr 32; R'omayî 4:4-8). Wekî din jî «r'astîya Xwedê» gelek cara fikira xilazkirinêva girêdayî ye: Xwedê r'ast e, amin e û xweyê sozê Xwe ye û yê ku gazî Wî dike, li gora sozê Xwe wî xilaz dike (Zebûr 51:14; Îşaya 46:12-13).

**r'aw** – r'a, r'ayê darê.

**r'aw-r'izim** – e'det, şîret, hînkirin û qanûnêd pêşîya.

**R'exab** – jineke ne r'îya xweda bû, lê bawerîya xwe Xwedê anî û alîk'arîya cime'ta Îsraêlê kir. Metta 1:5; Îbranî 11:31; Aqûb 2:25.

**r'ez** – 1. r'ezê tirîya, baxê tirîya, baxçe. 2. êmîş, fêkî.

**R'êvêka** – jina Îshaqê kur'ê Birahîm bû. Dîya Aqûb û Esaw (R'omayî 9:10-13).

**r'ik'inyata Dawid** – Bereka Dawid, mala Dawid. Dema Peymana Kevinda Dawid p'adşê Îsraêlêyî herî mezin bû. Pey wîr'a kur'ê wî Silêman bû p'adşayê Îsraêlê. Ji mal û zur'eta Dawid gelek p'adşa r'abûn. Îsa ji zur'eta Dawid bû. Metta 1:1, 20; Lûqa 1:27, 69; R'omayî 1:3; Tîmot'êyo II, 2:8; E'yantî 5:5; 22:16.

**R'oja Axretê** – R'oja Dîwanê, r'oja xilazîya dinyayê. Usa jî carna k'itêbêda vê r'ojêr'a «R'oja Xudan» dibêjin, awa gotî r'oja hatina Îsa. Wê r'ojê mirîyê ji mirinê r'abin û wê dîwana h'emû meriva bi destê Xwedê bibe. Îşaya 13:6, 9; Metta 10:15; 12:36; Lûqa 10:12, 14; Yûh'enna 6:39-40; 6:44; 6:54; 11:24; Petrûs II, 2:4, 9; 3:7, 10; Yûh'enna I, 4:17; 20:11-15 û yêd mayîn.

**R'oja K'ewandinê** – bona cime'ta Îsraêlê r'oja here e'zîz û pîroz bû (YOM KIPPÛR bi îbranî). Salê carekê p'aristgehêda Serekk'ahîn dewsa (berdêlîya) gunêd cime'tê û xweva bona paqijbûna p'aristgeh û gorîgehê xûna h'eywana p'êşk'êş dikir û dik'ete Cîyê Herî Pîroz (Derk'etin 30:10; Qanûna K'ahîntîyê 16:1-34; 23:27; Îbranî 9:6-7). Peymana Nûda jî Îsa Mesîh Xwe ji ber însanva kire qurban, gava ser xaç xûna Xwe r'êt, hate kuştinê. Ew k'ete Cîyê E'zmanayî Herî Pîroz, cem Bavê Xwe û xwequrbankirina Wî bona h'eta-h'etayê ye (Îbranî 9; 10:12). H'erçî bawerîya xwe Wî tînin, ew li ber baxşa xûna Îsa dik'evin û ji gunêd xwe xilaz dibin. R'omayî 3:25-26; Îbranî 2:17.

**R'oja Pêncîye h'esab (Pêntêkost)** – Bi zimanê yûnanî fe'mîna PENTÊKOSTÊ «pêncî» ye. Xwedê t'emî da cime'ta Îsraêlê, ku r'oja paşine pey destpêbûna Cejina Derbazbûnêr'a h'eft h'eftîya h'esab kin û R'oja Pêncî cejinekê jî bikin. Vê cejinêda çi ku ji deremetêd wan (dexilêd wan) pêşîyê dik'ete ber k'êlendîyê, danîn p'êşk'êşî Xwedê dikirin (Qanûna K'ahîntîyê 23:15-21). R'oja Pêncîr'a Cejina Nandirûnê (Cejina Deremetêd E'rdê) jî tê gotinê, usa jî Cejina H'eftîya. R'oja Cejina Pêncîda R'uh'ê Pîroz cara pêşin çawa p'êşk'êş bawermendar'a hatîye dayînê (K'arêd Şandîya 2:1-41).

**R'oja R'abûnê** – (R'oja Qîyametê) ew r'oj e ku h'emû merivêd qenc û xirab wê ji mirinê r'abin û li ber

Xwedê û Îsa Mesîh caba kirinêd xwe bidin.

**R'oja R'ojîya** – ji k'erema xwe bin xebera «R'oja K'ewandinê»-da bixûnin.

**r'oja şemîyê** – (r'oja sebtê) bona cime'ta Îsraêlê r'ojeke e'zîz (t'aybetî) û pîroz e (Derk'etin 16:23; 20:8, 11; 31:14-15). Bi îbranî ŞABAT e. Bi kurmancî «sebt» ji şabatê hatîye. Bona cihûya, şabat navê r'oja h'efta ye û ya xilazîya h'eftîyê ye. Înîyê êvarê, gava r'oj diçe ava, şabat destpêdike û h'eta 24 sih'eta dik'işîne. Li gora T'ewratê (Destpêbûn 2:2-3; Derk'etin 20:8-11; 35:2) r'oja şabatêda k'ar û xebat ne cayîz bû bikirana, ev r'oj r'oja r'ih'etîyê û h'ebandinê ye (Destpêbûn 1; Qanûna K'ahîntîyê 23:1-3).

**r'oja t'ivdarekkirinê** – Cihûya r'oja înîyêr'a digotin: «R'oja t'ivdarekkirinê», çimkî wê r'ojêda wan bona r'oja şemîyê hazirîya xwe didîtin. R'oja şemîyê r'oja pîroz bû, îzina wan t'unebû ku bixebitîyana. Bona cihûya înîyê çawa r'o diçû ava, hingê r'oja şemîyê destpêdikir.

**R'oja Xudan** – 1. Peymana Kevinda p'ir'anîya cara tê fe'mkirinê, ew wext yan demêd ku Xwedê dîwana cime'ta Xwe dike, mesele: Pê destê ordîyêd miletêd mayîn, yan jî pê nexweşîya (Yoêl 1:15; 2:1, 11; Amos 5:18, 20; Malaxî 4:5).

2. Peymana Nûda «R'oja Xudan» r'oja hatina Îsa Mesîhe duda bona dîwana dinyayê ye (T'êsalonîkî I, 5:2; T'êsalonîkî II, 2:2). Gelek wê bona vê r'ojê hazir nîbin (Metta 24:42-44; Lûqa 12:35-40; Petrûs II, serê 3-a). Carna tê gotinê: «R'oja Xudanê me Îsa Mesîh» (Korint'î I, 1:8) yan jî «wê R'ojê» (T'êsalonîkî II, 1:10).

3. T'enê E'yantî 1:10-da «R'oja Xudan» tê fe'mkirinê «r'oja yekşemê» (le'dê), çimkî Xudan Îsa Mesîh yekşemêda ji mirinê r'abû. Ji hingêva ew r'oj bû r'oja civîna bawermenda (K'arêd Şandîya 20:7; Korint'î I, 16:2).

**r'ojî** – K'itêba Pîrozda cûr'e-cûr'e h'alêd r'ojîgirtinê hene. H'alekîda nan ne dixwarin (P'adşatî I, 12:16-21, Metta 4:2, Lûqa 4:2), h'alekî dinda ne dixwarin ne jî vedixwarin (Derk'etin 34:28; Ezra 10:6; K'arêd Şandîya 23:12, Ûnis 3:5-8), h'alekî dinda jî ne goşt, ne şerav, ne tiştêd xweşe-te'm dixwarin-vedixwarin (Danîyêl 10:2-3). Meremê r'ojîyê K'itêba Pîrozda ev bû, ku xweyîr'ojî dua bike, nefsa xwe li ber Xwedê nimiz ke, xwe bişkêne, ne ku bona navê xwe ku ber meriva bê k'ifşê, lê wekî t'enê

Xwedêva e'yan be (Metta 6:16-18; Lûqa 2:37; Qanûna Ducarî 9:18; Danîyêl 9:20). Qanûna Mûsada t'enê r'ojeke r'ojîyêye e'detî hebû (Qanûna K'ahîntîyê 23:26-32), lê heger welat dik'ete oxirmêd giran, hingê r'ojêd din jî dihatine k'ifşkirinê, wekî r'ojî bigirtana (Yoêl 1:14). E'detê fêrisîya hebû, ku her duşemê û pêncşemê r'ojî bigirtana (Lûqa 18:12). Gava Îsa ser dinê bû, şagirtêd Îsa r'ojî negirtin (Marqos 2:18-20).

**R'oma** – îro p'ayt'extê welatê Îtalyayê ye. Hêna Îsa Mesîhda cime'ta R'omayê gelek welat bindest kiribûn, usa jî Îsraêl. Gelek cime'ta Îsraêlê dijenîyane P'adşayê R'omê (Qeyser) û h'ukumetîya wî.

**R'uh'ê Pîroz** – (R'uh'ê Xwedê, R'uh'ê Miqedes, R'uh'ê Bimbarek, R'uh'ê Buhurtî) R'uh'ê Pîroz R'uh'ê Xwedê ye. Peymana Kevinda R'uh'ê Xwedê çawa qewata Xwedê xuya dibe, k'îjanî ku Xwedê îlahî dida p'êxembera. Bi zimanêd yûnanî û îbranî xebera «ba» û «r'uh'» yek in (Yûh'enna 3:8). Peymana Nûda R'uh'ê Xwedê bi cûr'ekî nû h'emû bawermendêd Îsar'a tê dayînê (K'arêd Şandîya 2:38), usa jî hê gelekî çawa şexsek yan nefseke Xwedê tê fe'mkirinê, awa gotî ew Xwexa Xwedê ye (Metta 28:19). Gava Îsa çû cem Bavê, R'uh'ê Pîroz çawa dersdar, piştovan û p'êşk'êş bawermendar'a şand (Yûh'enna 14:26; 15:26; K'arêd Şandîya 10:45). Ew alîk'arîya meriva dike, meriva berbi t'emamîya r'astîyê dibe (Yûh'enna 16:13; Korint'î I, 2:10-13), carna bona tiştêd başqe r'êberîya meriva dike (K'arêd Şandîya 13:2; 16:6-7), li ber Xwedê bona bawermenda lava-navçêtîyê dike (R'omayî 8:26-27) û qewatê dide bawermenda, wekî xebera Xwedê bêjin û Xwedêr'a xulamtîyê bikin (Korint'î I, 2:4-5; Tîmot'êyo II, 1:7). Meremê p'êşk'êşêd R'uh'ê Pîroz ev e, ku t'emamîya civîna bawermenda bişidîne û ava ke (Korint'î I, serêd 12 h'eta 14).

**r'uh'êd h'eram** – r'uh'êd xirab. Cihûya wan r'uh'êd cinar'a digotin «r'uh'êd h'eram», yêd ku meriv pê dik'etin û yêd cinak'etî h'eram dihatine h'esabê. Îzina wan t'unebû, wekî têk'etana nava cime'tê yan jî cîyêd pîroz.

**r'uşetkirin** – bertîlkirin. Yek p'era yan tiştekî din dide h'akim yan yekî dinêyî xweyîh'ukum, wekî qanûn bê t'er'ibandinê, ku ya dilê wî bibe.

**r'ûnkirin** – (hetwankirin, dohnkirin) 1. Li gor e'detê cihûya, gava yek

dibû p'adşa, ew pê bizirê zeyt'ûnê dihate r'ûnkirinê. Ev jî dibû nîşan, ku ev kesa bûye p'adşa. Îdî r'ûnkirîyê Xwedê Ew e, Yê ku Xwedê bijart û k'ifş kir, awa gotî Mesîh e (Lûqa 4:18). Ji k'erema xwe bin xebera «Mesîh»-da bixûnin.

2. Xelqê hingê jî r'ûn, mîna r'ûnê bînxweş çawa nîşana qedir dikirine ser mêvanêd xwe (Lûqa 7:46; Zebûr 23:5), cinyazêd mirîyêd xwe jî r'ûn dikirin (Lûqa 23:56–24:1), çawa derman birînêd nexweşa dixistin (Lûqa 10:34), usa jî bi wî nexweş r'ûn dikirin, çawa sîmvol wekî Xwedê qenc ke (Marqos 6:13; Aqûb 5:14).

**r'ûspî** – bona serwêrêd miletê Îsraêlê dihate gotinê, usa jî bona serwêrêd dînê wan. Peymana Nûda ew jî endemêd civîna giregira bûn. E'yantîyêda bîst çar r'ûspî hene, ku e'zmênda Xwedê dih'ebînin û me'na wan dibe çawa nîşana t'emamîya cime'ta Xwedê.

**sadûqî** – ew nava cihûyada partîke (k'omeleke) dîndar (olp'arist) bû. Ev partî biç'ûk lê e'yan bû. P'ir'anîya endemêd wê k'ahîn bûn. Wan bawerîya xwe bi her pênc k'itêbêd Mûsa (awa gotî T'ewrat yan her pênc k'itêbêd pêşine Peymana Kevin) danîn, lê r'uh', milyak'et û r'abûna mirîya (qîyametî) bawer nedikirin. K'arêd Şandîya 4:1-2; 23:6-10; 23:8.

**samerî** – Çaxê p'adşatîya R'ehobowam (kur'ê Silêman, p'adşayê Cihûstanê) û Yêrobowamda (p'adşayê Îsraêlê), miletê Îsraêlê ji hevdu qetîyan. R'ehobowam t'evî du qebîlêd Îsraêlê bajarê Orşelîmê û Cihûstanêda ma. Yêrobowam t'evî dehe qebîlêd Îsraêlê Samerya xwer'a kire p'ayt'ext. Bi vî cûr'eyî miletê Îsraêlê bû du p'ara û dijminatîya hev kirin. Pey vê yekêr'a jî p'adşayê aşûrîya gelek miletê Îsraêlê dor-berêd Sameryayê cîşih'itî bajarêd medîya û yêd mayîn kirin (P'adşatî IV, 17:1-6) û miletêd mayîn bi p'ûtêd wanva anîn, dewsa wanda cî-war kirin (P'adşatî IV, 18:24-40). Bi vî awayî miletê samerîya t'evî miletêd p'ûtp'arista jît, dan û standin, e'sil û bawerîya xwe h'er'imandin û xwe ji T'ewratê dûr xistin. Samerî ew in, yêd ku ji Sameryayê û dor-berêd wê bûn.

**Samerya** – hin ne'ya nava Celîlê û Cihûstanêda bû, hin jî navê p'ayt'extê p'adşatîya bakurê (mifriqê) bû, awa gotî Îsraêl. Miletê Sameryayê û cihû gelekî dijenîyane hev, çimkî gelek e'det û bawerîyêd dîn û sîyaseta wan ne mîna hev bûn, usa jî bona cîyê h'ebandinê hevr'a qayl nîbûn (Lûqa 10:25-37).

**Samûêl** – p'êxemberekî e'yan bû. Bi destê wî Dawid p'adşa hate k'ifşkirinê. P'adşatî I, 1-7; K'arêd Şandîya 3:24; 13:20; Îbranî 11:32.

**serbestî** – azadî, aza.

**Serekk'ahîn** – mezinê h'emû k'ahîna bû, usa jî serekê civata giregira. Salê carekê li R'oja K'ewandinê ew dik'ete Cîyê P'aristgehêyî Herî Pîroz, wekî p'êşk'êşa xûnê bona gunêd xwe û yêd cime'ta Îsraêlê bide. K'ursîya Serekk'ahîn wextê navbera Peymana Kevin û Peymana Nûda pêşda hat. Salêd 18-36 navê Serekk'ahîn Qeyafa bû.

**serh'ezar** – ji eskerê R'omayê (Îtalyayê) bû, ku serwêrî li h'ezar eskerî dikir.

**sersed** – ji eskerê R'omayê (Îtalyayê) bû, ku serwêrî li sed eskerî dikir.

**serwaxtî** – şe'rezayî.

**sêrbazî** – k'oç'ektî.

**sêwî** – êt'îm.

**sifet** – sûret, şikil.

**Silêman** – kur'ê Dawid, p'adşê Îsraêlê bû, nivîsarêd wî jî Peymana Kevinda hene (Gotinêd Silêman 1:1; 10:1 û yêd mayîn). Xwedê gelek serwaxtî da wî, usa jî ew gelekî dewletî bû. P'aristgeh pêşda ewî da çêkirinê. P'adşatî II, 12:24-25; P'adşatî III, 1:1–11:43; Metta 1:6-7; 6:29; 12:42; Lûqa 11:31; 12:27; K'arêd Şandîya 7:47.

**silsilet** – bav, kal, kalê kala û usa diçe jor.

**Sindoqa Peymanê (Sindoqa Şe'detîyê)** – qut'îke pîroz, ji dara darcêwîyê çêkirî û zêr'kirî bû. Ew sindoq û çi ku têda bûn (awa gotî her du selêd kevirîye ku her dehe t'emîyêd Xwedêye mezin ser nivîsar, şivdara Harûn û derdana manayê), evana nîşanêd peymana Xwedêye t'evî miletê Îsraêl bûn. Gava miletê Îsraêlê r'ê diçû, yan diçû şêr', ev sindoq xwer'a dibirin. Gava cîkî disekinîn, ev sindoq Konê Şe'detîyêda Cîyê Herî Pîrozda dima. (Derk'etin 25:10-21; Îbranî 9:4; E'yantî 11:19).

**sinet** – Li cem cihûya li gora Qanûna Mûsa gerekê her zar'eke kur'în bihata sinetkirinê. Lê hê berî Qanûnê jî ev sinetî ji hêna Birahîmda hebû, ew çawa nîşana peymana Xwedê t'evî Birahîm û zur'eta wî bû (Destpêbûn 17:9-14). Bi vî awayî sinetkirin bû nîşana mêrê cihû û miletê cihûr'a carna dihate gotinê: «Miletê sinetkirî». Gava Mizgînîya Îsa Mesîh pêşîyê hate dayînê û belakirinê, ji nava cihûyêd mesîhî hinek hebûn ku digotin, heger mêr dixwaze bibe mesîhî, gerekê pêşîyê bê sinetkirinê. Eva dibû nîşan ku bûye cihû û li pey qanûna Mûsa diçe, wekî

paşê bikaribûya bibûya mesîhî. Lê Pawlosê şandî ev hînkirina cihûya qebûl nekir. Ewî bona vê pirsê ne'me galatîyar'a usa jî hinekêd dinr'a nivîsîn. Ewî digot, ku t'enê tiştek lazim e wekî meriv pê xilaz be, awa gotî bawerîya xwe Îsa Mesîh bîne. Destpêbûn 17:9-14; Derk'etin 4:25; Yûh'enna 7:22; R'omayî 2:28-29; Galatî 5:6; 6:15; Kolosî 2:11.

**sirgûnçûyîna Babîlonê** – Çaxê Nebûkedneser p'adşê k'ildanîya bû, wî cime'ta Îsraêlê ajot û sirgûnî Babîlonê kir û cime'ta Îsraêlê 70 salî li wê derê ma.

**sirke** – şerava kevin û tirş.

**sixir** – qewatêd dinyayêda ne, ku xudanêd wan k'ifş nakin.

**Sînay (Ç'îyayê Sînayê)** – ew ç'îya ye, ku wir Xwedê her dehe t'emî dane Mûsa p'êxember. Carna jî sûretî (sîmvolî) û r'uh'anî tê fe'mkirinê (Galatî 4:24).

**Sîyon** – ew ç'îya ye, ser k'îjanî p'aristgeh hate çêkirinê. Gava Dawid p'adşa Orşelîm ji destê yebûsîya stand, bajar biç'ûk bû, t'enê ser vî ç'îyayî (girî) bû. Sîyon tê fe'mkirinê carna ew ç'îyayê ku p'aristgeh lê bû, carna t'evayîya bajarê Orşelîmê (Metta 21:5), carna h'emû cime'ta Îsraêlê, carna cime'ta Xwedê yan jî bajarê Xwedêyî dinya nûda (Îbranî 12:22; E'yantî 14:1). «Qîza Sîyonê» tê fe'mkirinê bajarê Orşelîmê, awa gotî binelîyêd Orşelîmê (Yûh'enna 12:15). R'omayî 9:33; 11:26; Petrûs I, 2:6.

**Sodom û Gomora** – dema Birahîmda du bajarêd kenanîya bûn, ku nêzîkî Be'ra Mirî bûn. Merivêd her du bajara bi gunek'arîya xwe usa ji Xwedê dûr k'etibûn, ku Xwedê ew bi êgir û k'irk'ûtê şewitandin û qir'a wan anî (Destpêbûn 18:16–19:29).

**spartin (bispêre)** – t'esmîlkirin.

**stoyxî** – li pey hînkirina fîlosofê Zeno diçûn. Zeno qasî 265 salî berî bûyîna Îsa Mesîh mir. Hînkirina wî ew bû, wekî meriv jîyîna xwe qebûl bike, pê fikirê jîyîna xwe h'ukum bike, xwe bigire û dîna xwe nede şabûn û êşa (K'arêd Şandîya 17:18).

**şagirt** – yêd ku hîn dibin (die'limin). Gelek şagirtêd Îsa hebûn. Donzdeh ji nav wan bijartî bûn. Ew şandî bûn. Metta 10:1-4; Lûqa 5:1 û yêd mayîn.

**şandî** – (qasid, r'esûl) bi zimanê yûnanî APOSTOLOS e. Me'na vê xeberê bi Kurmancî «yê şandî» ye. Îsa Mesîh ji nav şagirtêd Xwe donzdeh şandî (r'esûl) bijartin û şandin, wekî Mizgînîya Xwedê

bidine miletêd dinyayê (Metta 10:1-4; Marqos 3:13-19; Lûqa 6:12-16). Evana t'evî Îsa diman û Îsa ew hîn dikirin. Pê ç'e'vêd xwe mirina Wî dîtin û paşê jî Ew pey r'abûna Wîr'a dîtin. Îsa Xwe Pawlosva jî e'yan kir û ew çawa şandî k'ifş kir. Barnabas û hinekêd din jî çawa şandî dihatine gotinê, lê ji Îsa dema e'mirê Wîda nehatibûne k'ifşkirinê.

**şih'itî** – r'ê derk'etî.

**şikîyatkirin** – gilîkirin, sûcdarkirin, gazinkirin.

**Şimh'ûn** – jêr'a Petrûs jî digotin. Ew yek ji her donzdeh şagirtêd Îsa bû. Ew şandî bû.

**Şimşon** – mêrxas û gelekî qewat bû, Xwedê bi wî gelek bela anîne serê filistînîyêd ku dijminatîya Îsraêlê dikirin. H'akimtî 13:2–16:31; Îbranî 11:32.

**şiver'ê** – r'êç'ik, r'îya p'êga merivekî yan r'îya teng.

**şîrk** – K'incêd r'engê şîrk yêd herî biha bûn û r'engê şîrk nexşekî p'adşatîyê bû.

**tengasî** – tengayî.

**tîş** – p'arç'e, p'ar. Mesele: K'inca min bû du p'arç'a (tîşa).

**t'agêr** – firqîyê dike nava meriva û pişta yekî digire.

**t'erbetdar** – yê ku tiştêd qence maqûlî zar'otîyêda girtî hîn dike.

**T'ewrat** – Qanûna Mûsa ye, awa gotî her pênc k'itêbêd pêşine Peymana Kevin in.

**t'exsîrkirin** – r'edkirin.

**t'ifaq (t'ifaqbûn, t'ifaqî)** – yekbûn, yektî.

**t'irê, (ji) kesî t'irê** – ji kesî we ye.

**t'obekirin** – ji gunekirinê veger'in, veger'in berbi Xwedê. Ji k'erema xwe bin xebera «ji gunekirinê veger'in»-da bixûnin.

**t'oximr'eş** – t'ovr'eş.

**t'ucaretî** – k'ir'în-firotan, alvêrî.

**ûd** – şînayîk e, ku ji ava wê r'ûnekî bînxweş tê çêkirinê. Cihûya ûd dikirine ser k'efenê mirîya, wekî definkirinêr'a hazir bin (Yûh'enna 19:39).

**Ûnis** – p'êxember bû, k'itêba wî jî heye. Xwedê ew şande bajarê Nînewayê, lê Ûnis nexwest gur'a Xwedê bikira. Pê gemîyê çû cîkî din, lê Xwedê firtoneke mezin şand. Cime'ta ser gemîyê Ûnis avîte be'rê, wekî ji hêrsa Xwedê xilaz bin. Me'sîyê mezin (h'ût) Ûnis h'ûfî xwe kir û Ûnis zikê me'sîda sê r'oj û sê şeva ma, dua kir, h'eta ku me'sî ew ji devê xwe avîte devê be'rê. Peyr'a Ûnis gur'a Xwedê kir û çû Nînewayê, wekî xebera Xwedê bêje wan. K'itêba Ûnis; Metta 12:39-41; 16:4; Lûqa 11:29-32.

**Ûsiv** – Çend merî K'itêba Pîrozda hene, navê wan Ûsiv:

1. Yek ji her donzdeh kur'êd Aqûb (Îsraêl) e. Birêd wî h'evsûdî li wî dikirin, çimkî bavê wan gelekî ew h'iz dikir. Birêd wî ew çawa xulam firotin, lê paşê ew bû serwêrê welatê Misirê. Birêd wî ew dîsa dîtin gava hatine Misirê ku nan bik'ir'in, çimkî welatê wanda xelayî bû. Destpêbûn 30:22-24; 37:5–50:26; Yêşû 24:32; Zebûr 105:17-22; K'arêd Şandîya 7:9-14, 18; Yûh'enna 4:5; Îbranî 11:21-22; E'yantî 7:8.

2. Ûsivê mêrê Meryema dîya Îsa. Metta 1:16, 18-20, 24; 2:13, 19.

3. Navê birakî Îsa jî Ûsiv bû. Metta 13:55; Marqos 6:3 (Yûsês).

4. Ûsivê birê Aqûbê şandî (ne birê Yûh'enna). Metta 27:56; Marqos 15:40, 47 (Yûsês).

5. Ûsivê ji Arîmetyayê, merivekî dewletî, endemê civîna giregirêd cihûya. Ew merivekî qenc bû û pey Îsa diçû. Metta 27:57-60; Marqos 15:42-46; Lûqa 23:50-53; Yûh'enna 19:38-42.

6. Ûsivê Barsabo, yek ji yêd ku hê pêşda pey Îsa diçûn. K'arêd Şandîya 1:23.

7. Ûsiv, navê wî kirin Barnabas. K'arêd Şandîya 4:36.

**veger'andin (ji gunekirinê veger'îyan)** – (t'obekirin) ew e, ku yek ji gunekirinê vediger'e, xirabî û gunêd xwe nas dike, fe'm dike ku ew xirab e, p'oşman dibe û bi dil û can ji gunekirinê vediger'e berbi Xwedê, wekî Xwedê bibaxşînê. Hezekîyêl 14:6; Zekerîya 1:6; Marqos 1:15; K'arêd Şandîya 3:19.

**wek'îlxerc** – malkir, k'edkir.

**welatp'arist** – navê partîkê ku bona welatê xwe şer' dikin. Wextê Peymana Nûda çend k'omêd cihûya hebûn, dixwestin ji bindestîya r'omayê derk'etana.

**welî** – (walî) serwêrê qezake welêt.

**wesîyet** – k'axaza şe'detîyê, ku yek berî mirinê têda bona mal-milk'êd xwe dinivîse, ku pey mirina wîr'a ew bigihîje k'ê.

**xaç** – E'detê serwêrêd bajarê R'omê hebû, merivêd xirab (qaçax, mêrkuj û yêd mayîn) ser xaç dardadikirin, bona cezakirinê. Li ser xaç meriv dimirin. Xaç ji du qut dara çêdikirin. Gelek cara gerekê qaçax xwexa xaçê xwe bida ser milê xwe bibira cîyê xaçkirinê. Li wir eskera pê mixa yan pê werisa qaçax xaçva mix dikirin yan girêdidan. Paşê xaç r'ast dikirin û qaçax wir dardakirî dima h'eta dimir. Gelek cefa didît h'eta mirinê û e'ybeke gelekî giran bû

ku ser xaç bihatana kuştinê. Îsa got, ku k'ê dixwaze bibe şagirtê Min gerekê xaçê xwe hilde û li pey Min bê. Me'na wê ev e, ku yêd li pey Îsa diçin gerekê hazir bin bona Wî h'eta mirinê jî cefê bik'işînin. Metta 10:38; 16:24; Marqos 8:34; Lûqa 9:23; 14:27.

**xalifî** – şaşbûyî, xapîyayî, jir'êderk'etî.

**Xana Xwedê** – Ew cîyê ku Xwedê bona Xwe dibijêre, Xana Xwedê dihate gotinê. Hêna Mûsada konek (Konê Şe'detîyê) hebû û peyr'a dewsa wî konî li Orşelîmê p'aristgeh hate çêkirinê û ew bû Xana Xwedê. Ew cîyê h'ebandina cime'ta Îsraêlê bû (Marqos 2:26).

**xercgir** – (bacgir, vergîstan) yê ku p'era ji cime'tê dewletêr'a distîne. Wextê Îsa Mesîhda ev xercgir bona R'omayê dixebitîn. Ew xwexa cihû bûn, lê alî R'omayê dikirin, wekî miletê cihû p'ere bona eskerêd R'omayê bida. R'omayî zulmk'ar bûn û cihû bindest kiribûn, ji wê yekê cihû gelekî dijenîyane xercgira. Xercgir jî gelek cara pê derewa û xapandinê p'ere zêde distandin, wekî wanr'a jî p'ere bima. Ew jî gunek'arêd mezin dihatine h'esabê.

**xerdal** – p'incar'ek e, ku t'oximê wê ze'f hûr e, lê gava şîn dibe, gelekî mezin dibe. Metta 13:31-32; 17:20; Marqos 4:31-32; Lûqa 13:19; 17:6.



*Xerdal*

**xeyal** – heyînêd r'uh'anîye ku bi desta nayêne girtinê.

**xêrnexwaz** – yê ku k'îna yekî digire û xêra wî naxwaze.

**xêrûb** – r'uh'berêd xweyîbask in, ev cûr'ekî milyak'etêd Xwedê ne û h'eykelêd wan ser qalp'axê Sindoqa Peymanê bi baskava çêkirî mîna milyak'eta bûn, ku r'ûmet û dîndara (h'izûrîya) Xwedê berç'e'v dikirin (Îbranî 9:5).

**xilazbûn (xilazkirin)** – azabûn (azakirin), r'izgarbûn (r'izgarkirin). Ji k'erema xwe bin xebera «xilazkir»-da bixûnin.

**xilazkir** – yê ku yekî din ji tiştekî xirab xilaz dike. K'itêba Pîrozda xebe-

rêd «xilazkir, xilazkirin, xilazbûn, xilazî» pêşîyê tê fe'mkirinê çawa xweykirin, xilazkirin ji xirabîyê û ji bela, yan jî qenckirina ji nexweşîya. Mesele, Peymana Kevinda Xwedê cime'ta Xweye Îsraêl ji Misirê, usa jî ji Babîlonê xilaz kirîye. Peymana Nûda Xwedê pê kirina Îsa Mesîh r'ê bona meriva vekir, wekî ji guna û xirabîyê xilaz bin. Bi vî awayî hin Xwedê, hin jî Îsa «Xilazkir» h'esab dibin (bona Xwedê: Qanûna Ducarî 32:15; Zebûr 27:9; Lûqa 1:47; Tîto 1:3; bona Îsa: Lûqa 1:69; Efesî 5:23; Tîto 1:4; Yûh'enna I, 4:14).

**xirnûf** – xurekê beraza ji berê darê, p'alûd.

**Xudan** – (Xweyî, R'eb) K'itêba Pîrozda me'na Xudan «xweyî» ye. Xudan navekî Xwedê ye û navek ji navêd Îsa Mesîh e. «R'eb» ji zimanê e'rebî ye û ew jî tê fe'mkirinê «xweyî».

**yançîye** – guva, gelo, ku, awa gotî.

**Yêfta** – eskerekî e'yan bû. Ew ji serwêrêd cime'ta Îsraêlê bû. H'akimtî 11:1–12:7; Îbranî 11:32.

**Yêremîya** – p'êxemberekî e'yan bû, ew weke 500 salî berî bûyîna Îsa Mesîh hebû. Wextek hebû, ji cime'ta Îsraêlê geleka gur'a Xwedê nedikirin. Yêremîya wanr'a digot, ku ji gunekirinê veger'in. Gelek tişt jî ewî bona Îsa Mesîh û miletêd necihû p'êxembertî kir. K'itêba wî jî heye, «Yêremîya». Metta 2:17; 16:14; 27:9.

**Yêşa** – bavê Dawid p'adşa bû. Îsa Mesîh ji r'ik'inyata wî hate dinê. Peymana Kevinda Îşaya p'êxember nivîsî ku Mesîhê ji zur'eta Yêşa û Dawid bibe. R'ût' 4:18-22 (17-21); P'adşatî I, 16:1-22; 17:12-14, 17; Metta 1:5-6; Lûqa 3:32; K'arêd Şandîya 13:22; R'omayî 15:12.

**Yêşûyê Nûn** – p'êxember bû, usa jî pey mirina Mûsar'a serwêrekî cime'ta Îsraêlê bû. Ewî r'êberîya cime'ta Îsraêlê kir, h'eta welatê Kenanê, k'îjan ku Xwedê bi sozdayîna Xwe da wan. Wana t'evî miletê ku li wir diman şer' dikirin û serk'etin. Peyr'a Yêşû ew welat p'arevekir û her qebîleke Îsraêlêr'a (pêştirî qebîla Lêwî ku k'ahîn bûn) p'arek da. Ew serwêrekî k'ifş bû û dixwest ku cime't bi dilekî pey Xwedê biçûya. Li ser kirinêd wî k'itêb jî heye. Derk'etin 17:8-13; Jimar 13:1-17; Yêşû 1-24; K'arêd Şandîya 7:45; Îbranî 4:8.

**Yûh'enna** – Bi navê Yûh'enna çend merî Peymana Nûda hene, lê yêd here e'yan ev in:

1. Yûh'ennayê Zebedî yek ji her donzdeh şagirtêd Îsa bû. Ew şandî bû. Ewî «Mizgînîya

Yûh'enna» û sê ne'me nivîsîne û li gora fikira geleka k'itêba «E'yantî» jî wî nivîsîye.

2. Yûh'ennayê Nixumdar, ew p'êxember û gotinbêjê xebera Xwedê bû (Lûqa 1:13-17; 7:26). T'obedar avêda dinixumandin û cime'ta Îsraêlê bona Mesîh hazir dikirin (Lûqa 3:3-20; 7:27).

**yûnan** – 1. miletê welatê Yûnanistanê.

2. Dema Îsa Mesîhda, cihûya h'emû miletêd mayînr'a «yûnan» digotin, wekî bidana k'ifşê, ku h'ebandin û kûltûra wan yêd yûnana bûn, ne ku yêd cihûya (Marqos 7:26; K'arêd Şandîya 17:4), lê hineke ji wan bawerîya xwe bi Xwedêyê Îsraêlê anîn (K'arêd Şandîya 17:4; belkî Yûh'enna 12:20-da jî usa ye). Vê welger'andinêda çend cî hene k'îderê xebera «necihû» dewsa «yûnan» hatîye xebitandinê (K'arêd Şandîya 14:1; 20:21; R'omayî 1:16; 2:9-10; 3:9; 10:12; Korint'î I, 1:24; 10:32; 12:13 Galatî 3:28; Kolosî 3:11 û yêd mayîn).

3. Çend cîya xebera «yûnan» be'sa wan cihûya dike, yêd ku ji welatê Îsraêlê der mezin bibûn û zimanê wan yûnanî bû, yan jî Îsraêlêda mezin bibûn lê zimanê yûnanî xeber didan, ne ku îbranî (K'arêd Şandîya 6:1, 9:29 û 11:20 (van r'êzada bi vî awayî hatîye bik'aranînê: «cihûyêd ku yûnanî xeber didan»); belkî Yûh'enna 7:35).

**Yûnanistan** – welat e, At'îna bajarê wêyî serekeyî mezin e, çawa hingê usa jî îro. Korint' jî bajarê Yûnanistanêda ye, çawa hingê usa jî îro. P'ir'anîya bajarêd Yûnanistanêye e'yan hingê dik'etine nava qeza Axayayêye R'omayê. Miletê Yûnanistanêyî kevin gelek xwendî bûn û bona serwaxtîya wan miletêd din qedirê wan digirtin. Zimanê wan ji alîyê h'emû xwendevanava dihate xeberdanê, ne t'enê li Yûnanistanêda, lê li welatêd der jî. Li k'îderê ku eskerêd yûnana diçûnê, kûltûra xwe li wir bela dikirin. K'itêbêd Peymana Nû pêşîyê bi zimanê yûnanî hatine nivîsarê.

**zanebêj** – zimênda serxwe.

**zar** – dev.

**zendegirtî man** – e'cêbmayî man, met'elmayî man.

**zewal** – neheqî, nexweşî, zîyan.

**Zews** – p'ûtê yûnanayî herî mezin e. «Yûpîter» jî jêr'a dihate gotinê. P'ûtekî din jî hebû, ku navê wî Hermês bû, ew çawa qasidê Zews h'esab dikirin. K'arêd Şandîya 14:12-13.

**zimir** – r'ûnekî bînxweş e, ji dara tê standinê û qîmetê wî biha bû. Hingê zimir bona êşê didane nexweşa (Marqos 15:23), usa jî li ser cinyazê mirîyada dikirin, wekî bona definkirinê hazir kin (Yûh'enna 19:39).




*Zimir*

**zîv** – bi yûnanî jêr'a digotin DRAXME yan DÎNARÎON, ku zîvekî biç'ûk bû. Evana welatêd Împêratorîya R'omayêda dihatin xebatê. Ew weke r'ojxebateke p'alekî bû. Lûqa 15:8-9.

**zîya** – (ejdeher) h'eywanek e, ku carna ç'îr'okada jî tê gotinê, gelekî qewat e, çawa me'rekî gelekî mezin xuya dibe. Jêr'a «me'r» jî dibêjin. E'yantîyêda zîya çawa nîşana mîrêcin, serwêrê r'uh'êd xirab e. E'yantî 12:3–13:4; 16:13; 20:2.

**zox** – (dareke gûrizê) dareke biç'ûk e, çawa lûfik bona e'detê dîn dihate bik'aranînê. K'ahîna xûna qurbanêda dikirin û dir'eşandine ser meriva, wekî ew meriv li ber Xwedê pîroz bin. Derk'etin 12:22; Qanûna K'ahîntîyê 14:4; Jimar 19:6, 18; Yûh'enna 19:29; Îbranî 9:19.

*Zoxa hûsopê*



# NAV-NÎŞANÊD XEBERÊD K'ILÎTE SEREKE

**Bawerî**

**bona xilazbûnê**

Yûh'enna 1:12; 3:15-18; 3:36; 6:47; 14:6; 20:31; K'arêd Şandîya 4:12; 16:30-31; R'omayî 3:20-22; 10:9-10; Galatî 2:16; Efesî 2:8-9.

**bona jîyîna mesîhîyê**

Marqos 11:22-25; Lûqa 17:5-6; Yûh'enna 14:1; R'omayî 5:1-2; 14:22-23; Korint'î I, 13:13; Korint'î II, 5:6-7; Galatî 5:6; Îbranî 11; Aqûb 1:2-8; 2:14-26; Petrûs I, 1:3-9.

**Baxşandin**

**Xwedê gunêd me dibaxşîne**

Metta 26:28; Marqos 11:25-26; K'arêd Şandîya 5:31; 10:43; 26:18; Efesî 1:7; Kolosî 1:13-14; 2:13-14; Îbranî 10:17-18; Yûh'enna I, 1:8–2:2.

**Gerekê em jî gunêd yêd din bibaxşînin**

Metta 6:12-15; 18:21-35; Marqos 11:25; Lûqa 6:37; 17:3-4; Korint'î II, 2:5-11; Efesî 4:31-32; Kolosî 3:13.

**Cefadîtin**

R'omayî 8:18-25; 8:28; Korint'î II, 1:4; 4:16-18; Aqûb 1:2-4; Petrûs I, 1:6-9; 2:19-21; 5:8-10.

**Ce'nime (Doje)**

Metta 10:28; 13:41-42; 13:47-50; 25:41-46; Lûqa 16:23-26; T'êsalonîkî II, 1:9; E'yantî 20:10-15; 21:8.

**Civîna Îsa Mesîh**

Metta 16:13-20; K'arêd Şandîya 2:41-42; R'omayî 12:4-8; Korint'î I, 12:12-30; Efesî 1:22-23; 2:19-22; 4:1-16; Kolosî 1:18; Îbranî 10:24-25; Petrûs I, 2:4-10; E'yantî 19:5-10.

**Dua**

**Hînkirin bona dua**

Metta 6:5-13; 7:7-11; 18:19-20; Marqos 11:24-25; Lûqa 11:1-13; 18:1-8; 21:36; Yûh'enna 14:13-14; 15:7; 16:23-26; R'omayî 8:26-27; 12:12; Efesî 2:18; 6:18; Fîlîpî 4:6-7; Kolosî 4:2; T'êsalonîkî I, 5:17; Tîmot'êyo I, 2:1-4; 2:8; 4:4-5; Îbranî 4:16; 10:19-22; Aqûb 1:5-8; 4:2-3; 5:13-18; Petrûs I, 4:7; Yûh'enna I, 3:21-22; 5:14-15.

**Meselêd duakirinê**

Metta 11:25-26; 14:23; 19:13-15; Marqos 1:35; Lûqa 5:16; 6:12; 22:32; 22:39-46; Yûh'enna 11:41-42; 17:1-26; K'arêd Şan-

dîya 4:24-31; 16:25; 20:36; 21:5; R'omayî 1:9-10; 10:1-2; 15:30-33; Korint'î II, 12:7-10; Efesî 1:15-20; 3:14-21; 6:19-20; Fîlîpî 1:3-5; 1:9-11; Kolosî 1:9-12; 4:3-4; T'êsalonîkî I, 3:9-13; T'êsalonîkî II, 1:11-12; 3:1-5; Îbranî 5:7; 7:25.

**Xemkirina Xwedê**
Metta 6:25-34; 10:29-31; K'arêd Şandîya 14:15-17; R'omayî 8:28; 11:36; Kolosî 1:17; Îbranî 1:3; Aqûb 4:13-16.

**E'firandina dinyayê**
Metta 19:4; Yûh'enna 1:3; K'arêd Şandîya 14:15; 17:24-26; Korint'î I, 8:6; Kolosî 1:15-16; Îbranî 1:2; 11:3; E'yantî 4:11.

**E'zman**
Lûqa 12:32-34; Yûh'enna 14:1-3; Korint'î II, 5:1-8; Fîlîpî 1:23; Kolosî 3:1; Petrûs I, 1:4-5; E'yantî 4:1-11; 21:1-4; 21:22–22:5; 22:14-15.

**Gune**

**Gune çi ye?**
R'omayî 1:18-32; 8:5-8; Galatî 5:19-21; Efesî 2:1-3; 5:3-5; Kolosî 3:5-10; Aqûb 4:17; Petrûs I, 4:3; Yûh'enna I, 3:4-5.

**H'emû meriva gune kirîye**
Yûh'enna 8:7-9; R'omayî 3:9-20; 3:23; 5:12; Galatî 3:22; Yûh'enna I, 1:8-10.

**H'ewce ye ku meriv ji cezayê guna xilaz bin**
Metta 10:28; 13:41-42; Yûh'enna 3:18-20; 3:36; K'arêd Şandîya 17:30-31; R'omayî 1:18-19; 6:23; Galatî 6:7-8; Kolosî 3:5-6; T'êsalonîkî II, 1:7-9; Îbranî 9:27; 10:26-31; Petrûs I, 1:17; 4:3-5; Cihûda 7; E'yantî 20:11-15.

**Gur'a Xwedê bikin**
Yûh'enna 14:15, 21, 23-24; 15:10-17; R'omayî 13:8-10; Petrûs I, 1:14-16; Yûh'enna I, 2:3-8; 3:22-24; Yûh'enna II, 5-6.

**H'izkirin**

**Xwedê me h'iz dike**
Yûh'enna 3:16; R'omayî 5:8; Efesî 2:4-5; Yûh'enna I, 4:9-10.

**Gerekê em Xwedê h'iz bikin**
Metta 22:37-38; Marqos 12:28-30; Yûh'enna 14:21; Petrûs I, 1:8; Yûh'enna I, 5:3.

**Gerekê em hevdu h'iz bikin**
Metta 5:43-48; 22:39; Yûh'enna 13:34-35; 15:12-17; R'omayî 12:9-10; 13:8-10; Korint'î I, 13:1-13; 16:14; Galatî 5:13-14; T'êsalonîkî I, 4:9-10; Petrûs I, 4:8; Yûh'enna I, 2:9-11; 3:11-18; 4:7-21.

**H'ukumetêd merivayêye vê dinyayê**
Metta 22:15-22; K'arêd Şandîya 5:27-29; R'omayî 13:1-7; Tîmo-

t'êyo I, 2:1-4; Tîto 3:1; Petrûs I, 2:13-17.

**Îsa Mesîh**

**Îsa Mesîh Kur'ê Xwedê ye**

Metta 11:27-30; 16:13-17; Lûqa 1:35; Yûh'enna 1:1-18; 5:19-29; 6:35-40; 8:58; 11:25-27; 14:5-11; 17:1-5; 20:26-31; K'arêd Şandîya 3:13-16; 4:10-12; R'omayî 1:3-4; Korint'î I, 1:9; Korint'î II, 4:4-6; 5:21; Galatî 4:4-5; Fîlîpî 2:5-11; Kolosî 1:15-20; 2:9-10; Îbranî 1:1-14; 7:26-28; Yûh'enna I, 2:1-2; 5:20; E'yantî 1:12-18; 19:11-16.

**Kur'ê Xwedê çawa meriv hate dinê**

Yûh'enna 1:14; Lûqa 1:26-38; Metta 1:18-25; Lûqa 2:1-20; Metta 2:1-23; Galatî 4:4-5; Fîlîpî 2:6-7; Îbranî 2:14-18.

**Îsa meriv hîn dikirin û yêd nexweş qenc dikirin**

Metta 4:23-25; 7:28-29; 9:35-36; 11:1-6; Lûqa 4:14-44; Yûh'enna 20:30-31; K'arêd Şandîya 10:36-38.

**Îsa gelek k'eremet dikirin**

Ji k'erema xwe li Navnîşa K'eremetêd Îsa Mesîh binihêr'in.

**Serwêra Îsa girtin û cezayê mirinê dane wî**

Metta 26:47-68; 27:1-2; 27:11-31; Marqos 14:43-65; 15:1-20; Lûqa 22:47-53; 22:63-71; 23:1-25; Yûh'enna 18:1-14; 18:19-24; 18:28—19:16.

**Îsa hate xaçkirinê**

Metta 27:32-56; Marqos 15:21-41; Lûqa 23:26-49; Yûh'enna 19:17-37.

**Îsa hate definkirinê**

Metta 27:57-66; Marqos 15:42-47; Lûqa 23:50-56; Yûh'enna 19:38-42.

**Îsa ji mirinê r'abû û xwe gelekava e'yan kir**

Metta 28:1-20; Marqos 16:1-8; Lûqa 24:1-49; Yûh'enna 20:1—21:14; K'arêd Şandîya 1:3-8; 2:24-32; 3:15; 4:10; 4:33; 10:39-43; 13:29-39; 17:2-3; 17:30-31; R'omayî 1:4; 4:24-25; Korint'î I, 15:3-8; 15:12-21; E'yantî 1:18.

**Îsa çû e'zmên**

Lûqa 24:50-51; K'arêd Şandîya 1:9-11; 2:32-36; 5:30-31; R'omayî 8:34; Efesî 1:20-23; Fîlîpî 2:9-11; Îbranî 1:3-11; 2:9; 4:14-16; 7:25-26; 10:12-14; Petrûs I, 3:22.

**Îsa wê dîsa veger'e**

Metta 24:29-44; Yûh'enna 14:1-3; K'arêd Şandîya 1:10-11; 3:19-21; Fîlîpî 3:20-21; Kolosî 3:4; T'êsalonîkî I, 1:9-10; 3:13; 4:13—5:11; T'êsalonîkî II, 1:6-10;

2:1-4; Tîmot'êyo I, 6:13-15; Tîmot'êyo II, 4:8; Îbranî 9:28; Petrûs II, 3:1-18; Yûh'enna I, 3:1-3; E'yantî 1:7; 22:12-13.

**Dîwana Xwedê bi destê Îsa Mesîh e**

Metta 7:21-23; 16:24-27; 25:31-46; Yûh'enna 3:18-21; 5:24-29; K'arêd Şandîya 17:30-31; R'omayî 2:1-11; 14:10-12; Korint'î I, 3:10-15; 4:5; Korint'î II, 5:9-10; T'êsalonîkî II, 1:5-10; Îbranî 9:27-28; 10:26-31; Petrûs I, 1:17; 4:3-5; E'yantî 20:11-15.

**Ji gunekirinê veger'in**

Metta 4:17; Marqos 6:12; Lûqa 13:1-5; 15:1-31; 24:45-47; K'arêd Şandîya 2:37-40; 3:19-20; 17:29-31; 20:21; 26:19-20; Korint'î II, 7:8-11; Petrûs II, 3:9; E'yantî 9:20-21.

**Jinber'dan û ji mêr dûrk'etin**

Metta 5:31-32; 19:3-9; Lûqa 16:18; R'omayî 7:2-3; Korint'î I, 7:10-16.

**Jîyîna h'eta-h'etayê, ya ku Îsa Mesîh dide wan, yêd ku bawerîya xwe wî tînin**

Metta 19:16-30; Lûqa 10:25-28; Yûh'enna 3:1-16; 5:19-29; 10:10; 11:25-26; 14:6; 17:2-3; 20:31; R'omayî 5:21; 6:5-14; 8:10-17; Korint'î II, 5:17; Galatî 2:20; Efesî 2:1-6; Kolosî 2:13; 3:1-4; Tîmot'êyo II, 1:10; Tîto 3:4-7; Petrûs I, 1:23; Yûh'enna I, 5:11-13.

**Jîyîna malêda**

**bona jin û mêra**

Metta 19:4-6; Korint'î I, 7:1-16; Efesî 5:21-33; Kolosî 3:18-19; Tîto 2:3-5; Îbranî 13:4; Petrûs I, 3:1-7.

**bona zar'a**

Metta 15:3-6; Lûqa 2:51; Efesî 6:1-3; Kolosî 3:20; Tîmot'êyo I, 5:4, 8; Îbranî 12:7-11.

**bona dê û bava**

Efesî 6:4; Kolosî 3:21; Tîmot'êyo I, 3:4-5.

**bona jinebîya**

K'arêd Şandîya 6:1; R'omayî 7:2-3; Korint'î I, 7:39-40; Tîmot'êyo I, 5:3-16; Aqûb 1:27.

**K'omekdayîn**

Metta 6:1-4; 7:12; 25:31-46; Lûqa 3:10-11; 6:38; K'arêd Şandîya 11:27-30; Korint'î I, 10:24; Korint'î II, 8:1-15; 9:1-15; Galatî 6:9-10; Fîlîpî 4:14-19; Îbranî 10:24; 13:1-3; 13:16; Aqûb 1:27; 2:15-16; Yûh'enna I, 3:16-18.

**Mirin**

Yûh'enna 6:39-40; 11:17-27; 14:1-4; R'omayî 6:10-11; 8:38-39; 14:7-9; Korint'î I, 15:12-58; Korint'î II, 5:1-10; Fîlîpî 1:20-24; T'êsalonîkî I,

4:13-18; Îbranî 2:14-15; E’yantî 14:13; 21:1-4; 22:1-5.

**Mizgînî**

Metta 24:14; K’arêd Şandîya 16:10; 20:24; R’omayî 1:2-4; 16-17; Korint’î I, 1:17-25; 15:1-7; Galatî 1:6-12; Efesî 1:13; Fîlîpî 1:27; Kolosî 1:5-6; T’êsalonîkî I, 1:5; T’êsalonîkî II, 2:14; Tîmot’êyo II, 1:8-11; 2:8-10.

**Mîrêcin**

Metta 13:19; 25:41; Lûqa 4:1-13; 22:3-4; Yûh’enna 8:42-44; Korint’î II, 2:10-11; 4:4; 11:13-15; Efesî 2:2; T’êsalonîkî I, 2:18; T’êsalonîkî II, 2:9-12; Petrûs I, 5:8-9; Yûh’enna I, 3:8-10; E’yantî 12:7-12; 20:1-3; 20:10.

**Nexweşî û qenckirin**

Metta 4:23-25; 9:35; 11:2-5; K’arêd Şandîya 3:1-6; 8:4-8; 19:11-16; 28:8-9; Korint’î I, 12:9; 12:29-30; Korint’î II, 12:7-10; Tîmot’êyo I, 5:23; Tîmot’êyo II, 4:20; Aqûb 5:14-15.

**Nivîsarêd pîroz**

Metta 4:1-4; 5:17-20; 22:29; Yûh’enna 8:31-32; 20:31; K’arêd Şandîya 20:32; R’omayî 15:4; 16:26; Kolosî 3:16; T’êsalonîkî I, 2:13; Tîmot’êyo I, 4:13; Tîmot’êyo II, 3:14-17; Îbranî 4:12; Petrûs I, 1:22-25; Petrûs II, 1:19-21; Yûh’enna II, 9-10; E’yantî 1:3.

**Nixumandina avê**

Metta 28:18-20; Yûh’enna 3:22; 4:1-2; K’arêd Şandîya 2:37-42; 8:12; 8:36-38; 10:44-48; 16:14-15; 16:31-33; 19:1-7; 22:12-16; R’omayî 6:1-4; Galatî 3:26-27; Kolosî 2:12; Petrûs I, 3:20-22.

**Paqijkirina guna pê mirina Mesîh**

Metta 26:26-29; R’omayî 3:25; 5:9-10; Efesî 1:7; Îbranî 9:11-14; Yûh’enna I, 1:6-7; E’yantî 7:14-17.

**P’ere, hebûk, mal û milk’**

Metta 6:19-21; 6:24-34; Lûqa 12:13-21; 12:32-34; K’arêd Şandîya 20:35; Tîmot’êyo I, 6:6-10; 6:17-19; Îbranî 13:5-6; Aqûb 2:1-9; 5:1-6.

**P’ûtp’aristî, sêrbazî û k’oç’ektî**

Metta 4:10; K’arêd Şandîya 13:4-12; 17:22-31; 19:11-20; Korint’î I, 5:11; 6:9-11; 8:1-13; 10:1-22; Korint’î II, 6:14-18; Galatî 5:19-21; T’êsalonîkî I, 1:9-10; Yûh’enna I, 5:21; E’yantî 21:8; 22:15.

**Qedirê serwêrêd civînê bigirin**

Korint’î I, 9:14; Galatî 6:6; T’êsalonîkî I, 5:12-13; Tîmot’êyo I, 5:17-22; Îbranî 13:7; 13:17.

**Qurban**

Metta 9:13; Marqos 12:33; R’omayî 12:1; Îbranî 9:7; 10:18.

**R'asth'esabbûn, r'astî (bêsûcbûn)**
K'arêd Şandîya 13:38-39; R'omayî 1:16-17; 3:21-26; 5:1; 5:9-10; 5:18-19; Galatî 2:16; 3:6-9; Tîto 3:7.

**R'ojî**
Metta 6:16-18; Marqos 2:18-20; K'arêd Şandîya 13:1-3; 14:23.

**R'uh'ê Pîroz**
Metta 28:19; Marqos 1:9-11; 3:28-30; Lûqa 1:35; 3:16; 4:1; 11:13; 12:12; Yûh'enna 1:32-34; 3:5-8; 7:37-39; 14:15-17; 14:26; 15:26; 16:7-15; 20:19-23; K'arêd Şandîya 1:4-5; 1:8; 2:1-18; 2:38-39; 4:31; 5:3-5; 8:14-17; 10:44-48; 13:2-4; 15:28; 16:7-10; 19:1-7; R'omayî 5:5; 8:9-16; 8:26-27; Korint'î I, 2:4; 2:9-16; 3:16; 6:11; 6:19; 12:1-13; Korint'î II, 1:21-22; 5:5; 13:14; Galatî 3:2-5; 4:6; 5:16-18; 5:22-25; Efesî 1:13-14; 1:17; 3:16; 4:3-4; 4:30; 5:18-20; 6:17-18; T'êsalonîkî I, 1:5-6; 5:19; T'êsalonîkî II, 2:13; Tîto 3:5-6; Îbranî 2:4; 9:14; Petrûs I, 1:2; 1:11; Petrûs II, 1:20-21; Yûh'enna I, 2:20; 3:24; 4:13; 5:6-8.

**Serk'etina (alt'kirina) ser mîrêcin û te'lî-tengîya**
Metta 4:1-11; 6:13; Lûqa 22:31-32; Yûh'enna 17:14-19; R'omayî 8:31-39; 12:12; 16:19-20; Korint'î I, 10:12-13; 16:13; Korint'î II, 12:7-10; Efesî 3:20-21; 6:10-18; Fîlîpî 4:13; T'êsalonîkî I, 3:5-8; T'êsalonîkî II, 3:3; Tîmot'êyo II, 1:7-8; Îbranî 2:18; 4:14-16; 12:1-2; Aqûb 4:7; Petrûs I, 1:5; 5:8-11; Yûh'enna I, 4:4; 5:3-5; E'yantî 12:7-12.

**Serwêrêd civînê**

**Xeysetêd wan û çawa têne k'ifşkirinê (şivan, berpirsîyar, malxê)**
K'arêd Şandîya 6:1-6; 14:23; Tîmot'êyo I, 3:1-13; Tîto 1:5-9.

**Hînkirina bona serwêrêd civînê**
Metta 28:18-20; Lûqa 22:24-27; K'arêd Şandîya 20:17-35; T'êsalonîkî I, 2:1-12; Tîmot'êyo I, 4:1-16; Tîmot'êyo II, 2:1-26; 3:10-17; 4:1-5; Tîto 2:7-8; Petrûs I, 5:1-4.

**Şerav-araq**
R'omayî 13:13; Korint'î I, 5:11; 6:9-11; Galatî 5:19-21; Efesî 5:18; Tîmot'êyo I, 3:1-3; Tîto 1:7; Petrûs I, 4:3-5.

**Şikirdarî**
Lûqa 17:11-19; Yûh'enna 6:11; R'omayî 1:21; Efesî 5:20; Fîlîpî 4:4-7; Kolosî 2:7; 3:17; 4:2; T'êsalonîkî I, 5:18; Tîmot'êyo I, 2:1; 4:4-5.

**Şikîyat û ber dîwanê**
Metta 5:25-26; 5:38-42; 18:15-17; R'omayî 12:14-21; Korint'î I, 6:1-8.

**Şîva Xudan**
Metta 26:26-30; Marqos 14:22-26; Lûqa 22:14-20; Korint'î I, 10:14-22; 11:17-34.

**Şkestî û milûktî**
Metta 5:3-12; 18:1-5; Lûqa 14:7-11; 18:9-14; Efesî 4:2; Fîlîpî 2:3-11; Kolosî 3:12-13; Aqûb 4:5-10; Petrûs I, 5:5-7.

**T'ifaqa xwedênasa**
Metta 18:19-20; K'arêd Şandîya 2:41-47; R'omayî 12:4-8; Efesî 1:22-23; 4:11-16; Kolosî 3:15-17; Tîmot'êyo I, 4:13; Îbranî 10:24-25.

**Xeysetê mesîhîyê**
Yûh'enna 13:34-35; 14:27; R'omayî 12:9-13; Galatî 5:22-26; Kolosî 3:12-17; T'êsalonîkî I, 5:16-18.

**Xilazkirina meriva**
Yûh'enna 3:16-17; K'arêd Şandîya 2:37-39; 4:11-12; R'omayî 5:1-11; 10:9-13; Efesî 2:1-10; Tîmot'êyo I, 1:15-16; 2:3-7; Petrûs I, 1:3-5.

**Xwedê**
Marqos 10:27; 12:29-30; Lûqa 1:37; 6:35-36; Yûh'enna 4:24; K'arêd Şandîya 14:14-17; 17:22-31; R'omayî 1:18-23; 11:33-36; Korint'î I, 8:4-6; Korint'î II, 1:3; Tîmot'êyo I, 1:17; 6:15-16; Îbranî 4:13; 10:30-31; Aqûb 1:17; Petrûs I, 1:14-17; Yûh'enna I, 1:5; 4:7-12; 4:16; Cihûda 24-25; E'yantî 4:8-11; 15:3-4.

**Zar'êd Xwedê**
Yûh'enna 1:12-13; R'omayî 8:14-17; Galatî 4:6-7; Îbranî 12:5-11; Yûh'enna I, 3:1-3.

**Zêrandin**
Metta 5:10-12; Marqos 13:9-13; Lûqa 12:4-9; Yûh'enna 15:18-21; 16:1-4; K'arêd Şandîya 5:41; R'omayî 8:35-37; 12:12-14; 12:17-21; Korint'î I, 4:11-13; Korint'î II, 4:8-11; 12:10; Fîlîpî 1:28-29; T'êsalonîkî II, 1:4-8; 3:2-4; Tîmot'êyo II, 3:10-13; Îbranî 10:32-39; 12:3-4; Petrûs I, 3:13-17; 4:12-19; E'yantî 2:10.

**Zinêk'arî û qavî**
Metta 5:27-30; Yûh'enna 8:2-11; R'omayî 13:8-10; Korint'î I, 5:9-11; 6:9-20; Galatî 5:19; Efesî 5:3; Kolosî 3:5-6; T'êsalonîkî I, 4:1-8; Îbranî 13:4; Cihûda 7.

# NAVNÎŞÊD ÇAPA Û P’ERA

## P’ERÊD DEMA ÎSA MESÎHDA

| k’urdî | yûnanî | şe’detîya wan cîya |
|---|---|---|
| pol | lepton | Marqos 12:42; Lûqa 12:59; 21:2 |
| qur’ûş | kodrantês | Metta 5:26; Marqos 12:42. |
| diravê çarqur’ûşê | assarîon | Metta 10:29; Lûqa 12:6. |
| zîv* | dînarîon | Metta 18:28 |
| | yan draxme | Metta 17:24 |
| nalê duzîvê | didraxmon | Metta 17:24 |
| nalê çarzîvê | statêr | Metta 17:27 |
| zêr’ | mna | Lûqa 19:13 |
| telant** | talanton | Metta 18:24; 25:15 |

* Zîvek qasî r’ojxebateke p’alekî bû.
** Telantek 44 kîlogram zîv bû û qîmetê wê heqê p’alekî panzdeh sala zêdetir bû.

### K’urdî

| | |
|---|---|
| 2 pol | qur’ûşek |
| 4 qur’ûş | diravekî çarqur’ûşê |
| 64 qur’ûş | zîvek |
| 4 zîv | nalekî çarzîvê |
| 100 zîv | zêr’ek |
| 6000 zîv | telantekî zîv |
| 180 000 zîv | telantekî* zêr’ |

* T’arîxêda çend cûr’e telant hebûn, ew qur’nava girêdayî bûn. Telantêd zêr’în jî hebûn ku ji 180 000 zîva qîmettir bûn.

**Yûnanî**

| | |
|---|---|
| 1 lepton | nîv kodrantês (sifir) |
| 2 lepton | kodrantês (sifir) |
| 4 quadrans | assarîon (sifir) |
| 16 assarîon | dînarîon yan draxme (zîv) |
| 4 dînarîon | statêr (zîv) |
| 100 dînarîon | mna (zêr’) |
| 6000 dînarîon | talanton (zîv) |
| 180 000 dînarîon | talanton (zêr’) |

## H’ESABÊD DIRÊJAYÊ

| k’urdî | yûnanî | h’esabêd dirêjayîyê | şe’detîya wan cîya |
|---|---|---|---|
| zend | pîxus | 45 santî yan weke nîv mêtir (ji serê t’ilîyê h’eta e’nîşkê) | E’yantî 21:17 |
| mîl | milyon (r’omayî) | 1.5 kîlomêtir | Metta 5:41 |

## H’ESABÊD PÎVANÊ

| k’urdî | yûnanî | h’esabêd pîvanê | şe’detîya wan cîya |
|---|---|---|---|
| kod | saton (aramî) | derdaneke qasî 13 lîtir av hildida | Metta 13:33; Lûqa 13:21 |
| k’ûp | batos (îbranî) | derdaneke qasî 35 lîtir av hildida | Lûqa 16:6 |
| ç’e’l | koros (îbranî) | derdaneke qasî 390 lîtir av hildida | Lûqa 16:7 |

# MESELÊD ÎSA MESÎH

| Mesele | Metta | Marqos | Lûqa |
|---|---|---|---|
| 1. Xwêya bê te'm | 5:13 | 9:50 | 14:34-35 |
| 2. Ç'ira ser p'êç'irê | 5:14-16 | 4:21-22 | 8:16-17, 11:33 |
| 3. Mala yê serwaxt û mala yê bêfe'm | 7:24-27 | – | 6:47-49 |
| 4. Kesek pê p'arç'ê nû k'inca kevin p'îne nake | 9:16 | 2:21 | 5:36 |
| 5. Şerava nû nakine meşkêd kevin | 9:17 | 2:22 | 5:37-39 |
| 6. Mesela t'oximr'eş | 13:3-8, 18-23 | 4:3-8, 14-20 | 8:5-8, 11-15 |
| 7. Mesela genim û zîwanê | 13:24-30, 36-43 | – | – |
| 8. Mesela du deyndara | – | – | 7:41-43 |
| 9. T'oximê ku digihîje | – | 4:26-29 | – |
| 10. H'eba t'oximê xerdalê | 13:31-32 | 4:30-32 | 13:18-19 |
| 11. Hevîrtir'şk | 13:33 | – | 13:20-21 |
| 12. Xizna veşartî | 13:44 | – | – |
| 13. Dur'ê qîmet | 13:45-46 | – | – |
| 14. T'or'a avîtî | 13:47-50 | – | – |
| 15. R'astîyêd kevin û nû | 13:52 | – | – |
| 16. Xulamê ku nabaxşîne | 18:23-35 | – | – |
| 17. Mesela samerîyê qenc | – | – | 10:30-37 |
| 18. Mêvanê nîvê şevê û sê nan | – | – | 11:5-8 |
| 19. Dewletîyê bê fe'm | – | – | 12:16-21 |
| 20. Xulamê h'işyar | – | 13:35-37 | 12:35-40 |

| **Mesele** | **Metta** | **Marqos** | **Lûqa** |
|---|---|---|---|
| 21. Xulamê amin û xulamê bêamin | 24:45-51 | – | 12:42-48 |
| 22. Mesela dara hêjîrêye bê ber | – | – | 13:6-9 |
| 23. Yêd ku li navê xwe diger’in | – | – | 14:7-14 |
| 24. Mesela şayîya giran | – | – | 14:16-24 |
| 25. Çawa bibine şagirtê Îsa | – | – | 14:25-33 |
| 26. Peza undabûyî | 18:12-14 | – | 15:3-7 |
| 27. Zîvê undabûyî | – | – | 15:8-10 |
| 28. Kur’ê undabûyî û birê wî | – | – | 15:11-32 |
| 29. Wek’îlxercê bêamin, lê serwaxt | – | – | 16:1-13 |
| 30. Merivê dewletî û Lazarê feqîr | – | – | 16:19-31 |
| 31. Borcdarîya xulamê amin | – | – | 17:7-10 |
| 32. Mesela jinebîyê û h’akim | – | – | 18:1-8 |
| 33. Mesela fêrisî û xercgir | – | – | 18:9-14 |
| 34. Mesela dehe zêr’a | (25:14-30) | – | 19:11-27 |
| 35. P’alêd r’ezêd tirîya û heqê wan | 20:1-16 | – | – |
| 36. Mesela du kur’a | 21:28-32 | – | – |
| 37. Mesela r’ezê tirîya û r’ezvana | 21:33-44 | 12:1-11 | 20:9-18 |
| 38. Mesela de’watê | 22:1-14 | – | – |
| 39. Dersa dara hêjîrê | 24:32-35 | 13:28-31 | 21:29-33 |
| 40. R’oj û sih’et ne e’yan e | – | 13:33-37 | – |
| 41. Mesela dehe qîzêd bik’ir | 25:1-13 | – | – |
| 42. Mesela sê xulama | 25:14-30 | – | (19:11-27) |
| 43. Pez û bizin | 25:31-46 | – | – |

# K'EREMETÊD ÎSA MESÎH

| K'eremet | Metta | Marqos | Lûqa | Yûh'enna |
|---|---|---|---|---|
| 1. *K'eremeta de'wata Qanayêda | – | – | – | 2:1-11 |
| 2. Îsa kur'ê qulixk'arekî qenc dike | – | – | – | 4:46-54 |
| 3. Îsa r'uh'ê h'eram derdixe | – | 1:23-26 | 4:33-35 | – |
| 4. Qenckirina xwesîya Petrûs û nexweşêd din | 8:14-16 | 1:30-34 | 4:38-41 | – |
| 5. *Girtina me'sîya | – | – | 5:4-11 | – |
| 6. Îsa yekî ji k'otîbûnê paqij dike | 8:2-4 | 1:40-42 | 5:12-13 | – |
| 7. Îsa şilûşe't dibaxşîne û qenc dike | 9:2-7 | 2:3-12 | 5:18-25 | – |
| 8. Nexweşê sî û h'eyşt sala qenc dibe | – | – | – | 5:1-9 |
| 9. Qenckirina merivê destk'işîyayî | 12:10-13 | 3:1-5 | 6:6-10 | – |
| 10. Îsa xulamê sersedekî qenc dike | 8:5-13 | – | 7:1-10 | – |
| 11. **Saxbûna kur'ê jinebîya Nayînê | – | – | 7:11-15 | – |
| 12. Qenckirina yê kor û lal | 12:22 | – | 11:14 | – |
| 13. *Îsa firtonê diseqir'îne | 8:23-27 | 4:35-41 | 8:22-25 | – |
| 14. Qenckirina du cinak'etîyê Gerdarînê | 8:28-34 | 5:1-20 | 8:26-39 | – |

| **K'eremet** | **Metta** | **Marqos** | **Lûqa** | **Yûh'enna** |
|---|---|---|---|---|
| 15. **Qîzika mirî û k'ulfeteke nexweş | 9:18-26 | 5:21-43 | 8:40-56 | – |
| 16. Îsa du kora qenc dike | 9:27-31 | – | – | – |
| 17. Îsa yê lal qenc dike | 9:32-33 | – | – | – |
| 18. *Îsa pênc h'ezara t'êr dike | 14:13-21 | 6:30-44 | 9:10-17 | 6:1-14 |
| 19. *Îsa p'îya li ser avêr'a diçe | 14:25-33 | 6:45-51 | – | 6:19-21 |
| 20. Bawerîya k'ulfeta kenanî | 15:21-28 | 7:24-30 | – | – |
| 21. Qenckirina geleka | 15:29-31 | – | – | – |
| 22. Qenckirina yê lal | – | 7:31-37 | – | – |
| 23. *Îsa çar h'ezara t'êr dike | 15:32-38 | 8:1-9 | – | – |
| 24. Qenckirina korê Beytsaydayê | – | 8:22-26 | – | – |
| 25. Qenckirina yê cinak'etî | 17:14-18 | 9:17-29 | 9:38-43 | – |
| 26. *Xercê p'aristgehê zikê me'sîda | 17:24-27 | – | – | – |
| 27. Vekirina ç'e'vêd yekî zikmakîyêda kor | – | – | – | 9:1-7 |
| 28. Qenckirina k'ulfeta qoncikî | – | – | 13:10-13 | – |
| 29. Qenckirina merivê avzê | – | – | 14:1-4 | – |
| 30. Qenckirina dehe k'otîya | – | – | 17:11-19 | – |

| K’eremet | Metta | Marqos | Lûqa | Yûh’enna |
|---|---|---|---|---|
| 31. **Îsa Lazarê mirî sax dike | – | – | – | 11:1-44 |
| 32. Qenckirina du korê Erîhayê | 20:29-34 | 10:46-52 | 18:35-43 | – |
| 33. *Dara hêjîrêye h’işkbûyî | 21:18-22 | 11:12-14, 20-25 | – | – |
| 34. Îsa guhê xulamê serekk’ahîn pêva dike | – | – | 22:50-51 | – |
| 35. *Girtina me’sîyaye bi k’eremet | – | – | – | 21:1-11 |

R’êzêd bê steyrk cîyêd k’eremetêd qenckirina meriva didine k’ifşê.

R’êzêd yek steyrk (*) cîyêd wan k’eremeta didine k’ifşê, li k’u h’ukumê Îsa ser t’ebîyetê xuya bûye.

R’êzêd du steyrk (**) cîyêd k’eremetêd saxkirina mirîya didine k’ifşê.

# NAVÊD K’ITÊBÊD PEYMANA KEVIN Û PEYMANA NÛ

## КНИГИ ВЕТХОГО И НОВОГО ЗАВЕТА

| Peymana Kevin | Ветхий Завет |
|---|---|
| Destpêbûn | Бытие |
| Derk’etin | Исход |
| Qanûna K’ahîntîyê | Левит |
| Jimar | Числа |
| Qanûna Ducarî | Второзаконие |
| Yêşû | Книга Иисуса Навина |
| H’akimtî | Книга Судей Израилевых |
| R’ût’ | Книга Руфь |
| P’adşatî I | Первая книга Царств |
| P’adşatî II | Вторая книга Царств |
| P’adşatî III | Третья книга Царств |
| P’adşatî IV | Четвертая книга Царств |
| Dîrok I | Первая книга Паралипоменон |
| Dîrok II | Вторая книга Паралипоменон |
| Ezra | Книга Ездры |
| Nehemîya | Книга Неемии |
| Ester | Книга Есфири |
| Îbo | Книга Иова |
| Zebûr | Псалтирь |
| Gotinêd Silêman | Книга Притчей Соломоновых |

| **Peymana Kevin** | **Ветхий Завет** |
|---|---|
| Zanebêj | Книга Екклесиаста, или Проповедника |
| Stiranêd Silêmane evîntîyê | Песнь песней Соломона |
| Îşaya | Книга пророка Исаии |
| Yêremîya | Книга пророка Иеремии |
| Lûrînêd Yêremîya | Книга Плач Иеремии |
| Hezeqêl | Книга пророка Иезекииля |
| Danîyêl | Книга пророка Даниила |
| Hosêya | Книга пророка Осии |
| Yoêl | Книга пророка Иоиля |
| Amos | Книга пророка Амоса |
| Obadîya | Книга пророка Авдия |
| Ûnis | Книга пророка Ионы |
| Mîxa | Книга пророка Михея |
| Nehûm | Книга пророка Наума |
| Hebaqûq | Книга пророка Аввакума |
| Sêfanîya | Книга пророка Софонии |
| Hagay | Книга пророка Аггея |
| Zekerîya | Книга пророка Захарии |
| Malaxî | Книга пророка Малахии |

| **Peymana Nû** | **Новый Завет** |
|---|---|
| Metta | Евангелие от Матфея |
| Marqos | Евангелие от Марка |

| **Peymana Nû** | **Новый Завет** |
|---|---|
| Lûqa | Евангелие от Луки |
| Yûh’enna | Евангелие от Иоанна |
| K’arêd Şandîya | Деяния Святых Апостолов |
| R’omayî | Послание к Римлянам |
| Korint’î I | Первое послание к Коринфянам |
| Korint’î II | Второе послание к Коринфянам |
| Galatî | Послание к Галатам |
| Efesî | Послание к Ефесянам |
| Fîlîpî | Послание к Филиппийцам |
| Kolosî | Послание к Колоссянам |
| T’êsalonîkî I | Первое послание к Фессалоникийцам |
| T’êsalonîkî II | Второе послание к Фессалоникийцам |
| Tîmot’êyo I | Первое послание к Тимофею |
| Tîmot’êyo II | Второе послание к Тимофею |
| Tîto | Послание к Титу |
| Filîmon | Послание к Филимону |
| Îbranî | Послание к Евреям |
| Aqûb | Послание Иакова |
| Petrûs I | Первое послание Петра |
| Petrûs II | Второе послание Петра |
| Yûh’enna I | Первое послание Иоанна |
| Yûh’enna II | Второе послание Иоанна |
| Yûh’enna III | Третье послание Иоанна |
| Cihûda | Послание Иуды |
| E’yantî | Откровение Иоанна Богослова |





© K'omelêd K'itêba Pîroze Dinyayê 1994




© K'omelêd K'itêba Pîroze Dinyayê 1994


# Xerîta Orşelîmêye Zemanê Îsa Mesîhda





Xerîta
P'aristgeha Orşelîmêye
Zemanê Îsa Mesîhda
Bilindcîya
Antonîya
Dergehê Bakurê
H'ewşa P'ûtp'arista
H'ewşa Îsraêlîya
Dergehê
R'oavayê
H'ewşa K'ahîna
Pîrozgeh
Cîyê
Herî Pîroz
H'ewşa K'ahîna
H'ewşa Mêra
H'ewşa
Jina
Dergehê Bedew
Dergehê
Zêr'în
Hêwangeha Silêman
Gorîgeha
Şewitandina
Qurbana
H'ewşa Îsraêlîya
H'ewşa P'ûtp'arista
Newala Tiropeon
Dîwarê R'oavayê
(niha Dîwarê Şînê ye)
Hêwangeha P'adşê
Newala Qidronê


R'êwîtîya Pawlose pêşin,
t'evî Barnabas
(K'arêd Şandîya 13:1–14:28)
Be'ra R'eş
Entakyaya Pisîdyayê
Qonya
KEPEDOKYA
Lîstra
LÛKAYONYA
Pergê
Dêrbê
Tarsûs
KIRÊTA
Entakya
QUBRIS
Selamîs
Pafos
Be'ra Sipî
(Be'ra Navîn)
0 125 250 500
kîlomêtir
Orşelîm (Quds)


MEKEDONYA
Be'ra R'eş
Fîlîpya
R'êwîtîya Pawlose duda
(K'arêd Şandîya 15:3,
15:36–18:22)
Beroya
T'êsalonîkî
Emfîpolîs
Troya
Korint'
At'îna
Efes
Entakyaya Pisîdyayê
Qonya
KEPEDOKYA
Lîstra
LÛKAYONYA
Pergê
Dêrbê
Tarsûs
KIRÊTA
Entakya
QUBRIS
Pafos
Selamîs
Be'ra Sipî
(Be'ra Navîn)
0 125 250 500
kîlomêtir
Samerya
Qeyserî
Orşelîm




**R'êwîtîya Pawlose sisîya**
**(K'arêd Şandîya 18:23–21:16)**




**R'êwîtîya Pawlose paşin h'eta R'omê**
**(K'arêd Şandîya 27:1–28:16)**

# MIZGÎNÎ

# PEYMANA NÛ

# (ÎNCÎL)

bi Standarta Kurmancîya K’urdêd welatêd Kafkazê

Новый Завет
(перевод на диалект курманджи курдского языка, латиница)

The New Testament in the Kurdish Language
(Kurmanji-Kurdish literary standard of the Caucasus Region, Latin)

Институт перевода Библии
101000 Россия, Москва, Главпочтамт, а/я 360
www.ibt.org.ru; ibt_inform@ibt.org.ru

Подписано в печать 19.12.2011
Формат 70×100 $^{1}/_{32}$. Печать офсетная. Усл. печ. л. 39,0
Тираж 1000 экз. Заказ №

Отпечатано в типографии «Принткорп»
ЛП № 02330/0494142 от 03.04.2009 г.
220141 Беларусь, Минск, ул. Ф. Скорины, 40